Bergê Dûyê
2022

Zakho Centre for Kurdish Studies

Folklorê Kurdî

Wêje, Ziman, Mêjû, Civak û Kelepûr

Kürt Folkloru

Edebiyat, Dil, Tarih, Toplum ve Kültürel

Komeka Vekoleran

Editörlü Kitap

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre for Kurdish Studies

Folkilorê Kurdî

Wêje, Ziman, Mêjû, Civak û Kelepûr

Komeka Vekoleran

Bergê Dûyê
2022

Senterê Zaxo Bo Vekolînên Kurdî

Pertûk	**Folkilorê kurdî** Wêje, Ziman, Mêjû, Civak û Kelepûr **Kürt Folkloru** Edebiyat, Dil, Tarih, Toplum ve Kültürel
Ji nivîsîna	Komeka Vekoleran
Berg	Bergê Dûyê 2022
Dîzayn û Berg	Warhêl 'Ebdulbaqî Remzîya Xelîl Ehmed Şirîn Xerîb Salih Hêlan Tewfîq Îsma'îl Sara Feyaz Teyîb Îman 'Ebd Mehcub Fatma Xald 'Ezîz
Rêkxer	Pale 'îsa
ISBN	978-9922-9167-8-1
Jimara Sipardinê	D- \2516\22

© مافێ چاپێ یێ پاراستیە بۆ
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

zcks@uoz.edu.krd +964 (0) 751 536 1550
Iraq-Kurdistan Region, Zakho- Univesity of Zakho

Folkilorê kurdî

Wêje, Ziman, Mêjû, Civak û Kelepûr

Nesim SÖNMEZ
Haşim ÖZDAŞ
Mahmut DÜNDAR
Necat KESKİN
Ahmet KIRKAN
İlyas SUVAĞCİ
Hikmettin ATLI
Mustafa ASLAN
Engin KORKMAZ
Veysel BAŞÇI
Shahab VALİ
Ramazan PERTEV
Tekin ÇİFÇİ
Şehmus KURT
Kenan SUBAŞI
Nurettin ÇİFTÇİ
Mahsum ASLAN
Selahattin POLATOĞLU
Nevzat EMİNOĞLU
Zana KARAK
Kawar Maasom ABDULQADER
Zana KARAK
Seher BİŞAROĞLU
Kerem ENGİN
Zeynelabidin ZİNAR
Sevim Uluç SUBAŞI
Eşref BURAN
Leyla KAPLAN
Burhan DOĞAN
Ziyattin YILDIRIMÇAKAR
Abdurrahman İBRAHİMOĞLU
Cahit BENEK
Ayhan YILDIZ
Ibrahim TARDUŞ
Ahmet KAN
Mustafa BORAK
Halime UÇAR
Roşan LEZGÎN
Mustafa ASLAN
Bahar ENÇ
Haci TANSU
Melahat ULUÇ
Serhat KAYA

PÊŞKÊŞKIRIN

Hisên Osman Ebdulrehman | Ebdulselam Necmedîn Ebdullah

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Piştî helbijartina vekolînan jilayê lîjneya zanistîve ،lîjneya jêrî bi karê serperiştî û amadekirina vekolînan ji pêxemet dîzaynkirin û belavkirinê rabû. lîjne ji evan berêzan pêkhatîh:

1. P.D. Hogir Tahir Tewfîq
2. P.D. Hisên Osman Ebdulrehman
3. P.H.D. Ebdulselam Necmedîn Ebdullah
4. P. H. D. Nizar Eyub Hesen

Ev pertûke (folklorê kurdî - wêje ،ziman ،mêjû ،civak û kelepûr) komeka vekolînan bi xweve dgrît ،ku bo şeşemîn konfiransê navdewletîyê senterê zaxo bo vekolînên kurdî ya ser bi fekoltîya zanistên mirovayetî li zankoya zaxo ،li rojên 11 û 12y gulana 2022ê hatîne pêşkêşkirin. vekolînên gehştîne konfiransî ji layê lîjneya zanistîve hatîne helsengandin û vekolînên hejî bo belavkirinê hatîne destnîşankirin. lîjneya zanstîya konfiransî ji evan berêzên li xwarê pêkdihêt:

P.D. Hogir Tahir Tewfqi	Zankoya Zaxo	Serokê Konfiransî
P.D. Hisên Osman Ebdulrehman	Zankoya Zaxo	Endam
P.H.D. Ebdulsalam Nacmedîn Ebdullah	Zankoya Zaxo	Endam
P.H.D. Dîyar Ebdilkerim Seîd	Zankoya Zaxo	Endam
P.H.D. Newzet Ehmed Osman	Zankoya Zaxo	Endam
P.H.D. Selwa Ferîq Salih	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Nizar Selman Tahir	Zankoya Zaxo	Endam
P.H.D. Nizar Eyub Hesen	Zankoya Zaxo	Endam
P.H.D. Mihemed Ebdulqadir Husêyn	Zankoya Zaxo	Endam
P.H.D. Faxir Hesen Yusif	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Peyman Mihemed Omer	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Şîlan Yunis Mihemed	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Kameran Îbrahim Xelaîl	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Şivan Qasim Hesen	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Sanya Cebar Ebozêd	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Jîrwan Seîd Hacî	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Kawan Îsmaîl	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Xurşîd Mihemed Resîd	Zankoya Zaxo	Endam
P.D. Cume Mihemed Qadir	Zankoya Zaxo	Endam

Doç. Dr. Mustafa Öztürk	Mardin Artuklu University	Üye
Doç. Dr. Mustafa Aslan	Mardin Artuklu University	Üye
Doç. Dr. Canser Kardaş	University of Muş Alparslan	Üye
Doç. Dr. Ayhan Tek	University of Muş Alparslan	Üye
Doç. Dr. Necat Keskin	Mardin Artuklu University	Üye
Dr. Öğr. Üyesi. M. Emin Purçak	University of Muş Alparslan	Üye
Dr. Khanna Omerkhali	Freie Universität Berlin	Üye
Dr. Yaşar Kaplan	University of Hakkari	Üye
Dr. Kenan Subaşı	Mardin Artuklu University	Üye
Dr. Şeyhmus Kurt	Mardin Artuklu University	Üye
Dr. İbrahim Tarduş	Mardin Artuklu University	Üye
Dr. Hikmettin Attı	Weqfa Mezopotamyayê	Üye
Dr. Mikail Bülbül	Weqfa Mezopotamyayê	Üye
Dr. Tekin Çiftçi	Mêrdîn	Üye

Naverok

PÊŞKÊŞKIRIN	P.D. Hisên Osman Ebdulrehman P.H.D. Ebdulselam Necmedîn Ebdullah	13
DAHÛRÎNA ÇÎROKA XELÎL BEG Û PERÎŞAN XANIMÊ	Assoc Prof. Dr .Nesim SÖNMEZ	17
DI EDEBÎYATA KURMANCÎ DE FABLÊN MENZÛM Û NIMÛNEYA HELBESTA XULDÎ	SEHER BİŞAROĞLU	33
Lİ HERÊMA HEKARÎYÊ/ CULEMÊRGÊ GOTİN Û SERPÊHATİYÊN MÎR Û ÎSÊ DELA	KEREM ENGİN	57
DESTANA DERWÊŞÊ EVDÎ Û EDÛLÊ JI ALÎYÊ HELWESTÊN ETNÎK Û DÎNÎ VE	Dr. Hikmettin Atlı	75
MEYREM XAN Û TEMAYA HIZNÊ DI SÊ KILAMÊN WÊ DE(MIHEMEDO RONÎ, ÇEMÊ BIŞÊRÎKA ŞEWITÎ, BAVÊ KOROXLÎ)	Melahat ULUÇ	91
LÊKOLÎNEK LI ÇÎROKA FOLKLORA KURDÎ	Zeynelabidin Zinar	107
DENGBÊJÎ LI RADYOYA ÛRMÎYÊ Û DENGBÊJ ÎRAN XANIMA MUCERED	Sevim Uluç Subaşı	149
ÎMAJA MÊRAN DI GOTINÊN PÊŞÎYAN DA	Eşref Buran	167
ZAROK Û ZAROKATÎ DI GOTINÊN PÊŞÎYAN DA	Dr. İlyas SUVAĞCİ	185
BERAWIRDKIRINEK DI NAVBERA GOTINÊN PÊŞIYAN ÊN KURMANCÎ Û TIRKÎ DE	Leyla KAPLAN	197
JIYANA GUNDA DI ALİYÊ FOLKLORÎK DE: MÎNAKA COLEMÊRGÊ	Dr. Engin KORKMAZ	219
DI BERHEMA ŞÊX MUHYEDÎNÊ HÊNÎ DE ÇANDA XWARIN Û VEXWARINA KURDAN	Burhan Doğan	239
Zivistan û çalakiyên zivistanê di çand û folklora kurdî de	Dr.Veysel Başçı Ziyattin Yıldırımçakar	249
“Di Şahnameyên Kurdî de Cih û Rola Sîmurx wek Hebûnekî Sersirûştî”	Dr. Shahab Vali	261

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو فەكولینێن كوردی

BIKARANÎNA ZIMAN DI ÇÎROKÊ GELERÎYÊN ZAZAKÎ DE; MÎNAKA SÊWREGÊ	Doç. Dr. Ahmet Kırkan	281
ÇANDA SERÎGIRÊDANA JINAN DI FOLKLORA KURDAN DE	Dr. Tekin ÇİFÇİ	297
PÊJGEHA HEKARÎYAN WEK PARÇEYEK JI ÇANDA KURD A	Abdurrahman İBRAHİMOĞLU	311
TOPONÎMÎYA GELÊRÎ: NAVÊN CIHAN Û VEGOTINÊN TÊKILDARÎ WAN (Li Herêmên Hezex û Nisêbînê)	Cahit BENEK	339
Bingehên Hekîmtîyê di Çanda Kurmancî de	Ayhan YILDIZ	357
Berawirdkirina 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye û Seyahatnameyên Ingîlîzan ji Alî Agahiyên Folklorî ve	İbrahim TARDUŞ	379
Durru'l-Mecalîsa Mela Mûsayê Hekarî û Girîngîya wê di Dîroka Lêkolînên Folklora Kurdî da	Dr. Ramazan PERTEV	393
BIKARANÎNA HÊMANÊN FOLKLORÊ DI PIRTÛKÊN HÎNKIRINA KURDÎ (KURMANCÎ) DA: MÎNAKÊN PIRTÛKÊN WEZARETA PERWERDEYA TIRKÎYEYÊ	Dr. Şehmus Kurt	417
Di navbera Diyarbekir û Silîvanê da Lêkolînek Onomastîk	AHMET KAN	429
DI MENZÛMEYA FOLKLORÎ YA MELA XALID DE ŞOPÊN JÎYANA GUNDEWARÎ	M. Zana KARAK	457
Folklora Kurdî di Sedsala 21emîn de: Pirsgirêk û Derfet	Doç. Dr.Necat KESKİN	491
FOLKLOR Û RISTA WÊ YA LI SER CIVAKÊ	Mustafa Borak	509
PIRNAVÎYA CUREYÊN VEGÊRANA GELÊRÎ Û NESTANDARTBÛNA WAN DI KURDÎYÊ DE	Dr.kenan Subaşı	527
BANDORA FOLKLORÊ LI SER HELBESTA MODERN YA KURDÎ BI MÎNAKA HELBESTVAN DIYA CIWAN	Halime UÇAR	553

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

NEWEPEL Û ROLA WÊ DI BERHEVKIRINA FOLKLORA ZAZAKÎ DE	Roşan Lezgîn	573
NİRXANDİN Û ANALÎZA BERHEMA KELEPORÎ YA EUGEN PRYM Û ALBERT SOCİNÎ	Assoc Prof. Dr. Mustafa ASLAN	589
Nîşaneyên Êzdîtîyê û hêmanên folklorîk di Romanên Wezîrê Eşo da	Bahar ENÇ Serhat KAYA	605
JÎYANA ZOZNÎYÊ Lİ COLEMÊRGÊ	Haci Tansu	625
Türkiye Türkçesi ile Behdînî Kürtçesi Atasözlerinin Karşılaştırmalı Biçimde İncelenmesi	Kawar Maasom Abdulqader	645
Kürt Dengbêjlik Edebiyatı ve Serhat Bölgesi Dengbêjlik Geleneği	Öğr. Gör. Nevzat EMİNOĞLU	659
KÜRT ATASÖZLERİNDE KUR'ÂN ÂYETLERİNİN ETKİSİ	Dr.Nurettin ÇİFTÇİ	675
Din-Kültür Etkileşimi: Kürt Atasözlerinde Fıkhî Unsurlar	Dr. Öğr. Üyesi Mahsum ASLAN	669
KÜRT ATASÖZLERİNDEKİ DİNÎ VE AHLAKÎ MOTİFLERİN EĞİTİM-ÖĞRETİM AÇISINDAN DEĞERLENDİRİLMESİ	Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR	717
2-5/8-11. Yüzyıl Kaynaklarında Kürt İmajı	Arş. Gör. Dr.Selahattin Polatoğlu Doç. Dr Haşim Özdaş	731

هەولێرنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

PÊŞKÊŞKIRIN

P.D. Hisên Osman Ebdulrehman
P.H.D. Ebdulselam Necmedîn Ebdullah

Peyva folklor, peyveka lêkdaye û ji dû pişkên " folk" û "lore" pêkdihêt. Pişka êkê bi ramana "xelk, gel, xelkê asayî" û pişka dûyê jî bi ramana "zianîn, zanist" dihêt.

Ev zaraveye bo êkem car jilayê w.j.thoms ê brîtanî li sala 1846ê zayînî hatîyedanan. Ew nameyekê di govara edebîya lendenê li 22î tebaxa 1846ê li jêr nasnavê ambrose merton belav kir. Li dev ewî zaraveyê folklor dê babetên weku"dabunerît, nêrîn, kevneşopî û stran û çîrokên berê" bi xwevegrît. Eve jî dibîte eger ku ev berhemê zarekî bihêteparastin û vekoler li paşerojê vekolînan li ser encam biden.

Folklor yan keltûrê gelan koma nerît, nêrîn, boçûn, efsane, çîrok, kevneşopî û stranane yên ji nifşên berê gehştîne me .Ev berheme ji nifşekî bo nifşekê dî û bi rêka zarekî hatîne veguhastn û gehştîne me .Folklor dişêt sema, dawet, gotnên meznan, mamik, noşdarîya berê û ...htd jî bi xweve bigrît .

Bi nêrîna zanayên folkilornas, folkilor xodîka jiyana nifşên berê û çawanîya hizirkirin û berê xwedana ewane bo jiyanê û gerdûnî. Bi rêka xwandna folkilorî em dişêyn bihayên ewî gelî destnîşan bikeyn.

Heta nuke pênaseyeka temam bo folkilorî nehatîye kirin. Sereray evê çendê, hemû li ser evê çendê rêkkevtîne ku folkilor pşkeke ji keltûrî û tewaukerê ewêye. Lê◌ ka erê folkilor kîj alîyan bi xweve digrît boçûnên cuda hene .Civaknas û bi taybetî zanayên entrupolojî folkilorî bi pişkek ji keltûrê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

gelan dizann û alîyê hunerî û edebîyê ewê bi mîratekê civakî dizann. Ev grope serhatîyên berê weku efsane, çîrok, mamik, stran, çîvanok û ... Htd û şêweyên dîyên zarekî bi folkilor dizanin û nerît, helkevt, cejin, aheng, bawer, yarîyên berê, huner, mehfîr û karên dîyên destî ji folkilorî cuda diken û bi pişkek ji keltûrê gelan dihjmêrin. Çunkî folkilor babetekê serbxo û cuda nîne ji keltûr û civakî, lewra grêday byavê keltûrî û cvakîye.

Vekolînên keltûrî biyaveke ku vekolînê li jêrxana civakî-keltûrîya her sîstemekê keltûrî diket û bi huyrî bas diket. Keresteyê evan vekolînan jî regezên cudayên pêkhênerên ewî sîstemê civakî-keltûrî dibît. Êk ji evan regezan, folklore .Ev regeze bi xwe jî çendîn pêkhênên dî bi xweve digrît, weku: efsane, çîrok, mamik, gotnên mezan û ...htd. Bo nmûne, ev çîrok û efsaneye ku b derbrînên weku"hebû nebû kes ji xudê mezintir nebû, serdemekî, rojekê, rojekê ji rojan". Destpêdiken. Derbirîna nerît û boçûnên destnîşankrî diket. Makuluç dibêjît: her efsaneyekê çar regezên serekî têda hene :rastî, nerît, kar û karvedan, nêrîn û bawerên berê. Di evan efsaneyanda hindek gotn hene ku fêrkarîne û rêka jiyanê nîşa guhdarî diden. Herwesa, gotnên meznan jî berhemê jiyana berê û ezmûna belîmet û danemrên ewî gelîne .Ev gotne berhem û ezmûna jiyana ewan kesane yên berî me jiyan û bi zanîna evan ezmûnan rê li dûbarekrnê û şaşîyan digrin.

Xuyaye ku samanê neteweîyê her mlletekî ku binaxeyê edebyat û şaristanîya ewî mlletîye, edebê fokilorî û kelepûre .Lewra çi efsane, çi çîrok, çi gotnên mezinan, ..., çi kerestên jiyana asaîya rojane, çi corê jiyana ewî mlletî û çawanîya mifa wergrtin siruştî, ... Hemî bi hevra digiringin.

Edebyata kurdî, herdem li gel demî guhorîn bi serda hatîye û bi bûrîna demî xwe li gel edebyata gştîya dewrûberî xwe, guncandîye. Bi rengekî eger li qonaxên edebîyata kurdî binêrîn, dê bînîn ku heta nihu li gorey demî çendîn qonaxên serekî derbaz kirîne ku ew jî birîtîne ji (edebyata folkilorî, edebyata kevin, edebyata nwî û nwîxwaz). Helbet xweyaye her êk ji evan qonaxan taybetmendî û saluxetên xwe hene .Edebiyata folkilorî êk ji zengîntrîn edebiyatên kurdîye, ku karîgerî li ser edebyata qonaxên dîtir jî hebûye. Takê kurd bi drêjahîya dîrokê di sîngê xweda û nifş bo nifşî parastîye û di gişit bîyavên jiyanê, rûniştin, şevbêrî, kar û xebat, ... Htd, bi genc û pîr û kalve bikarhînaye.

Folkilor qutabxaneyeka serzarî û praktîkîya serdemê xwe bûye, ku bêguman her êk li dûv şiyan û bîyavê karê xwe, bi hemî regez û çîn û temenanve, her ji zarokînyê heta kalbûnê, çendîn wane ji evê qutabxanê wergrtîne û bi serkevtîyane pêşkêşî mamustayê xwe yê rojgar krîye, û xweşî û nexweşyên xwe, keyf û şahyên xwe, bîrtîjî û azrandina hizrên xwe, kereste û xwarnên xwe, mijûlahî û yarîyên xwe, efsane û çîrok û serhatîyên xwe, ...htd, gişt jiyana xwe pê bûrandîye û serberz û serbixo û bêminet jiyaye.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Herçende me wek êk ji neteweyên meznên rojhelata navîn, heta nihu bi dirustî hest bi giringîya evî samanê neteweyî nekrîye, ji ber hindê behra ptiir ji edebîyata folkilora kurdî û kelepûrê kurdî, bi dirustî nehatîye komvekirin.

Vedîtna hizrên nwî û xwandnên zanistên folkilor û kelepurê kurdî, li her çar parçeyên kurdistana mezin.

Zana û bispor û xemxorên evî bîyavî bi çi şêwe berê xwe didene folkilorê kurdî?

Rêjeya têkelîya folkilorîya kurdî li gel edebyata bîyanîyan? Karîgerîya folkiloraê bîyanîyan li ser folkilorê kurdî.

Ladana mijdarîyê di gişt pişkên folkilorîda. Çawanîya parastin û belavkirina folkilorî dinav nifşên nwîda?

Cografîya û mêjûyê çi peywendî bi folkilorîve heye?

Bi çi şêwe kelepûrê kurdî bihête parastin? Ta çi rade destkarî di folkilor û kelepûrê kurdîda hatîye kirin?

Rojhelatnasan bi çi şêwe berê xwe daye folkilorê kurdî?... htd. Eve hemî armancên serekîyên evê pertûkêne.

Her wekî em dizanîn efsane, çîrok û dastan, xeyala bi hêza netewa kurd nîşan didet. Cîhana xeyalî wek pleyek ji hebûnê, cuda nebûye ji cîhana jiyana asayî û wêneyên ne di cîhana rîyalîstîda, di cîhana maddîda berceste krîye. Gotnên mezinan û meteluk, bîrtîjî û hizirmendîya bîrmendên kurd nîşan diden û kelepûr jî bi gştî, rêrewa jiyanê xweştir krîye.

Berzebûna hizra folkilorî û piştguhxistin û jibîrkirina hindek ji çeqên kelepûrê kurdî lidev takê kurd, nizim berêxwedana folkilorî, cîhangîrî û hevrkîya dezgehên ragehandnên cîhanî û kargeh û karxaneyên çêkrina kerestan û... Htd, dibine egerên hindê ku hêdî hêdî folkilor bibîte pişkek ji mêjûyê û ew mêjûya ku nehête dûbarekirin.

Lewra pêdvîye zanko û bi taybetî pişka zimanê kurdî, ji bo avakirina nivşê nw û li ser binaxê folkilorî û nemrîya evê edebyatê, pêkol ji bo vajîkrina evê prosêsê biket û folkilor û kelepûrê kurdî ser ji nw û vejînîteve.

Ev pertûke gişt tewerên edebîyata folkilorî û kelepurê kurdî, bi gişt şêwezaran vedgirît. Ji goşenîgayên formî û naverokî, edebî, zimanî, derûnî, komelayetî, eayînî, mêjûyî, cografî, ... Htd.

A. Folkilor bi giştî:

• Çîrok
• Efsane
• Heyranok
• Gotinên meznan
• Dastan
• Stran
• Meteluk
• Edebîyata folkilorîya zarokan

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

- Muzîka strana folkilorî
- ...Htd.

B. Kelepûr bi giştî:

- Amîrên muzîkê
- Corên çekan û çewanya bikarhatnê
- Dawetên kurdî
- Xwarn û saluxetên dermanyên ewan
- Şivanî, gavanî, ... Û çewanîya serederîkirin ligel ajelan
- Jiyana kurdewarî
- ...Htd.

Hejîye bêjîn ev pertûke sercemeke ji (84) vekolînan û li dûv babet û tewerên folkilorî, bi her sê zimanên (kurdî, turkî û erebî) hatîne rêkxistin. Bo nimûne: gotinên mezinan, çîrok, sitran, efsane, beyt, dab û nerît, ... Htd.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

DAHÛRÎNA ÇÎROKA XELÎL BEG Û PERÎŞAN XANIMÊ

Assoc Prof. Dr .Nesim SÖNMEZ
Beşa Ziman û ÇandaKurdî- Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê/Turkîya.

Puxte:

Çîrok, bi gelemperî di edebîyata dinyayê da û di edebîyata kurdî da pirê caran bûne mijara lêkolînan. Wek pênase çîrok tê maneya di kiraseke pexşanî da bi terzeke edebî û bi kurtasî hûnandina bûyerên rasteqînî û xeyalî. Çîrok, bi kurtinî û bûyera xwe ya ne tevlihevî û bi hindikayîya qehremanên xwe ji romanê hatîye veqetandin. Di çîrokê da bi piranî sînorê cihê bûyerê kifşkirî ye, vebêjer li ser mijarê hûr dibe û vegotina wê jî eşkera û zelal e.

Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê jî kiraseke edebî li xwe kirîye, bûye keresteya folklor û edebîyata kurd ya gelerî. Bûyera çîrokê li herêma Serhedê, di navbera bajarê Bazîd û Subhangolê da derbas dibe. Lehengên wê yên sereke birazayê Behlûl Paşa Xelîl Beg û Perîşan Xanima keça Emer Axayê Milî ne. Têda ji alîyekî va evîndarî û ji alîyê din va îxanet, fesadî û bêbextî heye. Di vê vekolînê da li gor varyantên çîrokê ji alîyê ruxsarî û naverokê va li ser hatîye rawestandin, zimanê wê, lehengên wê, cihê ku bûyer lê qewumîye û bi çi rengî hatîye hûnandin hatîye nirxandin.

Peyvên Serekî: *Çîrok, Serhed, Xelîl Beg, Perîşan Xanim, Behlûl Paşa.*

Destpêk:

Çîrok, cureyek ji folklora gel e û di nav edebîyata gelerî da hatîye bi cî kirin. Lewra lêkolîneran ew gelek caran kirine mijara lêkolînên xwe. Li gor mijarê gelek cureyên çîrokan hene, lê lazim e di çîrokê da bûyer, leheng, cih û dem hebe. Ji bo çîrokan taybetmendîya herî berbiçav û muhîm ew e ku di wan da bi kar anîna motîfan e. Her motîfek xwedîyê wateyekê ye û çîrokbêj bi alîkarîya wan motîfan hestên xwe bi lêv dike. Di nava çîrokan da ramanên dijber wek rindî-nerindî, xweşî- nexweşî, qencî-xerabî, şer-aşitî, pakî-qirêjî, xweşikî-bedî, ken-girî, dia-nifir û hwd hene û ev ramanên dijber her dem bi hev ra di nav şerda ne. Çîrok xewn e, xeyal e, xwegihîştina armancekê ye, şopa nifşên berê ye û di heman demê da jiyana gelan e.

Meriv dikare bibêje dîroka çîrokê bi dîroka merivahîyê ra destpê dike. Herçiqas di vegotina çîrokan da hinek ferq hebin jî ew hebûna alema merivahîyê ya hevpar in. Bo nimûne çîrokên almanîyan dişibihin yên ereban, yên kurdan dişibin yên farisan, yên îngilîzan dişibin yên rûsan û hwd. Lazim e ev yeka jî were goitin ku her çîrok reng û resmê neteweyê ku ew aîdî wî ye di xwe da vedişêrîne û bi saya van reng û resman meriv kêm-zêde dikare tesbît bike ku ev çîrok aîdî kîjan miletî û çandê ye.

Mijara çîrokên kurdan, bi piranî dîrok û çanda gelê kurd e. Meriv dema çîrokên kurdî di ber çavan ra derbas dike û li ser wan analîzek çêdike di naveroka wan da bi awayekî aşkere şopên dîrok, çan û folklora kurdî dibîne. Hema bêje di her çîrokê da

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

gotinên mezinan, biwêj û stranên gelerî derbas dibin û têda şîret li gel têne kirin û bi rêya wan çîrokan ew têne perwerdekirin (Alakom, 2013: 15-16).

Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê jî çîrokek bi vî rengî ye ku li devera Serhedê qewimîye û di xwe da gelek rengên folklora kurdan dihewîne. Me, xwe gîhand sê varyantên çîrokê û li gor van her sê varyantan dahurîna çîrokê çêkir. Ji van varyantan du heb ji alîyê lêkolîner Fettah Timar va ji ber devê çîrokbêjên herêma Bazîdê hatîye berhevkirin û di sala 2021î da li Stenbolê di nav weşanên "Ar"ê da bi navê *Destanên Kurdî I-II* hatîye weşandin û ya sisêyan jî varyanta ku ji alîyê lêkolîner İkram İşler va di sala 2001î da ji berdevê çîrokbêjek navçeya Erdîşa Wanê berhevkiriye û di pirtûka xwe ya bi navê *Mîrza Mihemed û Çavreşa Qîza Mîrê Ereban* da bi serenava *Xelo û Xelîl Beg* bi cih kirîye û di sala 2016an da li Wanê di nav weşanên Sîtavê da daye weşandin. Ev çîrok ji alîyê gelek dengbêjên wek Husêynê Cângorânê, Zahiro û gelek dengbêjên din va wek kilam hatîye gotin.

1. Kurteya Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê

1.1. Li Gor Fettah Timar Serpêhatîya Xelîl Beg û Perîşan Xanimê

Emer Axayê Milî kesek zêde dewlemend bû. Kerîyên pezê wî û garana dewarên wî li gelî û zozanan hilnedihatin. Ew, havînan diçû li ber Subhangola ku li herêma Serhedê di navbera Bazîd û Wanê da ye konê xwe vedigirt û hetanî payîzê wexta xwe derbas dikir. Qîzeka wî bi navê Perîşanê hebû, ew di nav herêma Serhedê da bi bedewî, zanatî û jêhatîya xwe li ser zar û zimanê xelkê bû. Gelek xizmetkar û navmalîyên Emer Axa hebûn, ji wana yek jî kesek bi navê Xelo bû. Hîna Xelo di pêçekê da bû, di encama şerê navbera eşîra Milan û Êzidîyan da dîya wî, ji tirsa kuştina xwe, wî di pêçekê da dihêle û direve diçe. Emer Axa, wî xwedî dike û navê Xelo lê datîne. Xelo ji alîyekî va bi zîrekî, wêrekî û serwextîya xwe ji alîyê din va jî bi fesadî û derewînî ya xwe bi nav û deng bû, lewra jê ra Xeloyê Fesad dihate gotin. Dema temenê Xelo dibe panzdeh-şanzdeh salî dilê wî dikeve Perîşan xanima qîza axayê wî, lê Perîşan Xanimê qet jê heznedikir û qet nedixwest di ber siha wî ra jî derbas bibe. Ew, wek benîştekê bi Perîşan Xanimê va dizeliqe û dev jê bernade. Qîzik mêze dike weha nabê, ji birayê xwe yê piçûk dixwaze ku ew, Xelo têke der û eleqeya wî, ji malê bide birîn. Li ser vê daxwazê birayê wê gazî Xelo dike, heqê wî didê û wî dişîne. Xelo radibe dikeve rê, piştî rêwîtîyek dûr û dirêj xwe digîhîne Bazîdê. Piştî demekî ew, li wê derê dibe seyîsê hespê Xelîl Begê û bi derbasbûna demê ra digel vê karê hanê pêşekarîya Xelîl Beg jî dike. Xelîl Beg, kesek nezewucandî bûye, rojekê Xelo ji Xelîl Beg ra pêşnîyaz dike ku ew here li Subhangolê keça Emer Axayê Milî Perîşan Xanimê ji xwe ra bixwaze. Xelîl Beg piştî bi destxistina hinek agahîyan vê pêşnîyazê qebûl dike. Ew, ji bo ku derkeve derveyî Bazîdê destûrê ji apê xwe Belûl Paşa distîne. Xelîl Beg û Xelo radibin li hespên xwe sîyar dibin û piştî rêwîtîya çend saetan nêzîkî Subhangolê dibin. Perîşan Xanim dema wan dibîne kilamek dibêje û Xelîl Beg ji vê kilama wê mat dimîne û ji Xeloyê Bavêzidî dipirse dibêje: Kuro ev xanim, navê min ji ku derê dizane û dibêje, Xelo dest bi fesadî û derawan dike û dibêje ev keçên şivan û gavanan nin li qisûra wan nenêre. Ew rêya xwe dewam dikin û xwe digîhînin ber konê Emer Axa, diçin hundir rûdinin, ew û zarokên Emer Begê hevûdin nas dikin û dikevên nav sohbeteke xweş û kûr. Heft rojan wek mêvan li wir dimînin û li ser daxwaza Xelîl Begê, Xelo diçe cem birayên Perîşan Xanimê û sedema hatina wan ya esasî dibêje. Birayên wê bi vê xeberê gelek kêfxweş dibin û bi bersivek erênî rêya mala xwe didin wan. Xelo, dema vedigere cem Xelîl Begê ji ber ku ew kesek nîyetxerab bû bi

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

derewan bersiva neyênîyê dide û dibêje ew keç nelayîqî camêrekî wekî we ye, birayê wê dixwazin keça xwe bidin min. Li ser vê xeberê Xelîl Beg gelek hêrs dibe, lê dîsan jî jî şerman radibe diçe ji bo ku keçikç ji Xeloyê Fesad ra bixwaze li ser kevirê xwezgînîyê rûdine. Birayên Xanimê dema vê rewşê dibînin gelek şaş dibin, yê piçûk radibe diçe cem Xelîl Begê û jê ra dibêje, me keça xwe daye te êdî ev çi tişt e ku tu hatî li vê derê rûniştî. Xelîl Beg mêze dike Xeloyê Bavêzidî derew kirîye, ew xapandîye û rastîya xeberê jê ra negotîye, radibe lêborîna xwe ji birayê wê dixwaze, diçe bi xwe Perîşan Xanimê ji xwe ra dixwaze, di nav sê - çar rojan da daweta xwe dike û Perîşan Xanimê digre berê xwe dide Bazîdê. Gava nêzîkî Bazîdê dibin li ser daxwaza Xeloyê Fesad, ew li ser kanîya Miçê konên xwe vedidin û dixwazin çend rojan li vir bisekinin û paşê biçin Bazîdê cem Behlûl Paşa. Xelo, pêşnîyaz dike ku ew û Xelo biçin nêçîrê, lê Xeloyê Fesad xwe li nexweşîyê datîne û naxwaze biçe. Xelîl Beg bi tenê diçe nêçîrê û Perîşan Xanim jî radibe taştê amade dike dibe ji Xelo ra, gava dikeve hundurê çadirê Xeloyê bênamûs dest dirêjî namûsa wê dike, Perîşan Xanim bi awayekê xwe ji destê wî xilas dike, çoyekç peyda dike û bi wê çoyê lê dixe ser û guhên wî di xwînê da dihêle. Xelo radibe diçe Bazîdê ji Behlûl Paşa ra dibê je ku Emer Axayê Milî keça xwe di dewsa bacê da ji te ra şand, lê birazayê te Xelîl di rê da dest dirêjî wê kir û namûsa te paymal kir. Li ser vê xeberê Behlûl Paşa gelek diqehire û radibe tevî çend saran diçe cem Xelîl Begê û li kêleka konê Perîşan Xanimê konê xwe vedigire. Dema Xelîl Beg ji nêçîrê te, Behlûl Paşa wî bi werisan dide girêdan û şkenceyek mezin lê dide kirin û di dawîyê da Xelîl Beg canê xwe ji dest dide. Perîşan Xanim jî li ser vê yekê piştî çil rojî di Qesra Îshaq paşayê da derdike ser birca herî bilind û xwe davêje xwarê, pişta wê bi heft cîyan dişkê û berî mirina xwe rastîya bûyerê dibêje û pişt ra dimire. Li ser vê yekê Behlûl Paşa bi rastîya bûyerê dihese, di nav rûreşîya xwe da dimîne û pêşekerên Behlûl Paşa jî têne Xeloyê Fesad bi şûran dikujin.

1.2. Li Gor Îkram Îşler Serpêhatîya Xelîl Beg û Perîşan Xanimê

Bi navê Xelo merivek Bavêzidî hebûye û ji xelkê Sînekavêzê bûye. Bavê wî gelek dewlemend bûye, piştî mirina bavê wî Xelo mal û milkê, zêr û zîvê bavê xwe bi tevahî xerc dike û tu tiştekî şûnda nahêle. Ew, dixwaze bizewice lê ji ber kû zêr û zîvên wî nemane nemimkune ku bizewice. Difikire û biryar dide ku biçe li welatê Serhedê bigere kesek dewlemend bibîne eger kurên wî tunebin jê ra bibe kur eger keçek wî ya ezeb hebê ew ê pêra bizewice û bibê zavayê wî. Xelo dibîhîze ku qet lawên Emerê Axayê Milî tunene lê keçek wî bi navê Perîşanê heye. Emerê Axayê Milî xwedîyê deşta Bişerîyê ye û ji malê dinê gelek dewlemend e. Ew her havînê mala xwe bar dike tê welatê Serhedê li kêleka Subhangolê di zozanê Mehmûd Paşa da konê xwe vedigire û havina xwe derbas dıke. Ew, îsal jî wek salên derbasbûyî tê li kêleka Subhangolê bi cih û war dibe. Xelo jî radibe diçe li konê Emer Axayê Milî dibe mêvan û dibêje lawên te tunun eger tu qebûl bikî ez ê ji te ra bibim kur. Emer Axayê Milî jî wî wek kur digire qebûl dike û cemaet radibe diçe dest û rûyê hev. Xelo bi vê biryarê gelek kêfxweş dibe û xwe bi xwe dibêje: "*Nîyeta dilan qezaya serîyan e.*" Piştî çend rojan êdî Xelo dixwaze Perîşanê bibîne û çevên wî her wext li paş perdê li hêvîya dîtina wê bûye. Carekê Perîşan ji paş perdê derdikeve û Xeloyê Fesad dibînê li qet kêfa wê ji Xelo ra nayê. Xelo têdigêhêje ku Perîşan wî nagire, radibe berê xwe didê Bazîdê diçe mala Mehmûd Paşayê apê Xelîl Begê û xwe dikê lawê wî. Xelîl Beg kesek nezewîcandî bûye û Xeloyê Fesad pêşnîyaz dike kû ew keça Emerê Axayê Milî ji xwe ra bixwaze. Xelîl Beg vê pêşnîyazê qebûl dike lê Xelo jê ra dibêje em ê îşev qîz û bûkên vî bajarî li cihek kom bikin bila werin di ber te ra

Zakho Centre
for Kurdish Studies

derbas bibin lê nebî nebî tu sêvê bavêjî li serê yekê bixînî. Xelo li alîyê din diçe vê xeberê ji Mehmûd Paşa ra dibê je, ew bi vê xeberê gelek kêfxweş dibe û emir dike ku li defa hewarê were dayîn. Bi dengê defa hewarê ra qîz û bûkên bajêr xwe didin ber neynikan, bisk û tuncikên xwe çêdikin, xwe dixemilînin û têne cihê kombûnê û di ber Xelîl Beg ra yek bi yek derbas dibin lê Xelîl Beg, sêvê li serê tu kesekê naxîne. Mehmût Paşa mat û metal dimîne ji vê rewşê ra. Xelo, radibe Xelîl Beg dide pey xwe li hespên xwe sîyar dibin û berê xwe didin Subhangolê diçin konê Emer Axayê Milî. Pir diçin hindik diçin diwestin li cihekî disekinin bîhna xwe didin û piçekî radizên. Xelîl Beg di xewna xwe da Perîşan Xanimê wek kewek gozel dibîne û wê gelek diecibîne. Di heman demê da Perîşan Xanim jî di xewna xwe da Xelîl Begê dibîne û gelek ji wî hez dike. Perîşan, dema ji xewê hişyar dibe, dibîne ku gustîla di tilîya wê da hatîye guherandin û Xelîl Begê jî ferq dike ku gustîla wî hatîye guherandin. Perîşan, xewna xwe ji dîya xwe ra dibêje lê dîya wê qîma xwe bi vê xewnê nayîne. Perîşan Xanim, cardin dikeve xewê û heman xewnê dibîne, dema hişyar dibe vê xewnê jî ji dîya xwe ra dibêje lê dîya wê dîsan bersivek baş nadê. Nîhayet Xelîl Beg û Xeloyê fesad têne ber konê Emer Axayê Milî pêya dibin û diçin li hundir rû dinin. Piştî demkê Xelîl Beg ji xwe ra Perîşan Xanimê dixwaze û sê roj û sê şevan daweta xwe dike. Xeloyê Fesad ji ber vê rewşê gelek aciz dibe û vedigere Bazîdê ji Mehmûd Paşa ra dibê ez û Xelîl Begê em çûm Subhangolê bûn mêvanê konê Emer Axayê Milî, min ji xwe ra keça wî ya bi navê Perîşanê xwest lê birazayê te bi destê zorê xanima min ji min girt û ev heft roj e bi namûsa min ra dilîze. Mehmût Paşa li ser vê xeberê gelek bihêrs dikeve û emir dide ku eskerên wî herin Xelîl û Perîşanê bi şûran bikujin û goştê wan pirtî pirtî bikin û bînin. Xelo tevî eskeran diçe Xelîl begê dikuje û Perîşan xanimê jî tîne Bazîdê. Lê Perîşan Xanim li vê bêbextîya Xeloyê Fesad sebir nake radibe xwe dikuje.

2. Serdem û Cih û Warê Çîrokê

Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê, serpêhatîyek rasteqînî ya tarîxî ye. Wek tê zanîn di her çîrokekê da rastîyek heye. Ev rastîya dîrokî îmkan dide ku meriv serpêhatîyê fêm bike. Di nav kurdan da bi taybetî jî li herêma Serhedê çîrokbêj û dengbêj gelek caran qala çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê dikin û van salên dawîyê di nav berhemên ku çîrok têda hatine berhevkirin da ji cih girtîye.

Di her du varyantên ku lêkolîner Fettah Tîmar berhevkirine da navê Behlûl Paşa û navê bajarê Bazîdê derbas dibe. Wek ji berhemên dîrokî jî tê zanîn ku Behlûl Paşa (w. 1855) yek ji mîrên Mîrektîya Bazîdê ye (Gültekin, 2014), serdema jîyana wî li gor çavkanîyan herçiqas were guhertin jî wisa tê xwîyakirin ew di sala 1840î da Mîrê Bazîdê bûye (Karzan, 2013: 25-32). Dîsan di her sê varyantada jî navê bajarê Bazîdê û Subhangolê derbas dibe. Bajarê Bazîdê, îro li herêma Serhedê navçeyek ji navçeyên bajarê Agirîyê ye û Subhangol jî di navbera navçeya Bêgirî/ Muradiye û Çardêran/ Çaldirana Wanê da cih digire. Ji van agahîyan tê xwîyakirin ku çîrok di sedsala 19an da di navbera bajarê Bazîdê û Subhangola bajarê Wanê da qewimîye.

3. Lehengên Çîrokê

Lehengên çîroka Xelîl Begê û Perîşan Xanim, di her sê varyantan da jî hevbeş in. Tenê Mîrê Bazîdê di varyantên ku Fettah Tîmar berhevkirine da Behlûl Paşa ye û di varyanta ku Îkram Îşler jî berhevkirîye da navê Mîrê Bazîdê wek Mehmûd Paşa derbas dibe. Lehengên ku di çîrokê da derbas dibin ev in:

3.1. Perîşan Xanim

Perîşan Xanim, di her sê varyantan da jî keça Emer Axayê Milî ye. Ew, keçek bi nav û deng e, nazîdar e, bedew e, xwedan esl û nesl e, delalîka mala bavê xwe ye, xwedan feraset e, bi namûs e. Perîşan Xanim, di çîrokê da rola Zîna ku di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da derbas dibe dilîze.

3.2. Xelîl Beg

Xelîl Beg, di her di her sê varyantan da jî wek kesek mîrzade, ehlê serayê, bi namûs, zana û bi edeb hatîye nasandin. Xelîl Beg, di çîrokê da rola Memî ku di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da derbas dibe dilîze.

3.3. Xelo

Navê Xelo bi eslê xwe Xelîl e lê him di berhema Fettah Tîmar da û him jî di ya Îkram Îşler da ji bo wî wek nasnav; Xelo, Xeloyê Fesad û Xeloyê Bavêzidî hatîye bi kar anîn. Di her sê varyantan da jî Xelo wek merivek; êtîm, fesad, xêrnexwaz, bi çiv û çûv, xwedîyê dek û dolaban, derewîn, bênamûs, bêqeneet û çavnebar hatîye nasandin. Bi taybetî jî Xeloyê Fesad, di vê çîrokê da rola Bekoyê Ewanê ku di destana Mem û Zînê da derbas dibe dilîze.

3.4. Emer Axayê Milî

Emer Axa, di tevahîya varyantan da kesek mîr, mezinê Eşîra Milan, xwedîyê deşta Bişerîyê, xwedîyê kerîyê pez û dewaran hatîye nasandin. Ew, kesek zivistanan li welatê germîyan û havînan jî li zozanên herêma Serhedê jîyana xwe derbas dike.

3.5. Behlûl Paşa

Navê Behlûl Paşa tenê di her du varyantên ku Fettah Tîmar berhevkirîye da derbas dibe û ew wek Mîrê Mîrektîya Bazîdê hatîye nîşandan. Di van varyantan da ew ji alîyekî va; kesek xwedan hukum, dadmend, bi rehm, qencîxwaz û ji alîyê din va; kesek zordar û zilimkar hatîye nasandin. Behlûl Paşa, di çîrokê da rola Mîrê Cizîrê Mir Zeyneddînê ku di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da derbas dibe dilîze.

3.6. Mehmûd Paşa

Navê Mehmûd Paşa, tenê di varyanta ku Îkram Îşler berhevkirîye da derbas dibe. Wisa tê xwîyakirin ku Mehmûd Paşa û Behlûl Paşa yek kes in, tenê navê wan cu da ye. Di her du varyantên Fettah Tîmar da Behlûl Paşa kesayetek bi çi rengî derebas dibe di varyanta Îkram Îşler da jî Mehmûd Paşa kesayetek bi wî rengî derbas dibe.

4. Hevbeşîya Çîroka Xelîl Begê û Perîşan Xanimê Digel Destana Mem û Zînê

Di serpêhatîya çîroka Xelîl Begê û Perîşan Xanimê da ji alîyê hûnandina bûyerê va hin motîfên ku hatine bi kar anîn dişibihin destana Mem û Zîna Ehmedê Xanî. Meriv dikare bi awayekî zela tesbît bike ku ev çîrok gelek zêde di bîn tesîra destana Mem û Zînê da maye û bi rengê bûyera Mem û Zînê hatîye boyaxkirin û nivîsandin.

4.1. Kurteya Destana Mem û Zînê

Bi armanca ku mijar baş were fêmkirin li vir bi kurtasî bûyera Destana Mem û Zînê hatîye dayîn.

Bûyera Mem û Zînê lî Cizîra Botan bi kurtasî weha derbas dibe:

“Zîn û Stî her du xwîşkên Mîrê Cizîra Botan Mir Zeyneddîn in, Tacdîn katibê dîwana Mîr e û Mem jî destbirayê Tacdîn e. Roja Newrozê Mem û Tacdîn cil û bergên keçan, Zîn û Stî jî yên mêran li xwe dikin û diçin li qada Newrozê hevûdin dibînin û kêfa

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Tacdîn gelek ji Stîyê ra û ya Memî jî ji Zînê ra tê. Tacdîn diçe Stîyê ji Mîr dixwaze û bi vê rengê ew digêhêje miradê xwe. Piştî daweta xwe Tacdîn cara duduyan diçe ku ji Mîr Zeyneddîn, Zînê ji Memî ra bixwaze. Gava meseleyê jî Mîr ra dibêje, Mîr ji Memî hezdike lê qet naxwaze Zînê bide wî. Bi navê Bekir dergevanekî Mîrî hebûye, lê ew bi navê Bekoyê Fesad hatibîye. Ew kesek gelek nebaş û fesad bûye û qet nexwestîye Zîn bibe hevjîna Memî, lewra gelek fesadî û şeytanî di navbera Mîr û Memî da kirîye. Beko xwestîye ku vê meselê bê awayekî neyînî çareser bike û ji Mîrî ra gotîye: Mîrê min, tu gazî Memî bike jêra bêje ez dixwazim bi te ra setrencê bilîzîm, lê em ê di navbera xwe da şertek daynin, kê ji kê sê car bir, ew ê daxwazîya xwe ji ê din ra bêje û ew jî wê daxwazîyê bi cih bîne. Eger te jê bir tu yê navê evîndara wî jê bipirsî, ew derewan nake, ew ê navê Zînê bibêje, wê demê em ê wî bixin zîndanê û hustukura xwe jê xilas bikin. Mîr, vê pêşnîyazî qebûl dike û gazî Memî dike û jê ra dibêje, piştî qebûlkirina Memî, ew dest bi lîstika setrencê dikin û di dawîyê da Mîr, sê caran ji Memî dibe û paşê dibêje dor hate şertê me. Ka ji min ra bêje yara te kî ye ez herim ji te ra bixwazim. Memî bersivê nade li dema ku Beko bi fesadî di derheqê yara wî da xeberên nebaş dibêje Memî mejbûr dimîne ku bibêje yara mîn Zîna Zêdan e. Mîr dema vê yekê dibîhîse gelek hêrs dibe û emir dike ku Memî bibin têxin zîndanê. Eskerên Mîrî, Memî dibin dikin zîndanê û piştî demekî Memî di zîndanê da dimire. Dema ev xeber digêhêje destbirakê Memî, Tajdînî ew radibe diçe şûrê xwe dikişîne û Bekoyê Fesad dikuje. Dema Zînê jî van xeberan dibîhîze li ber vê xebera dilsoj taqeta wê namîne ku sebir bike û pîştî çend rojan ew jî dimire.” (Xanî, 2010).

4.2. Zîn û Perîşan

Zîn û Perîşan her du jî lêhengê jin yên çîrokan in. Zin xwîşka Mîrê Cizîrê ye û Perîşan jî keça Mîrê Eşîra Milî ye. Her du leheng jî li pey meşûqê xwe bi dileke tijî eşq dişewitin, dilorînin û hêstiran wek barana biharê dibarînin. Zîn, çawa ku ji boy Memî dîn û har e û sewda li serî daye wisa jî Perîşan, ji bo Xelîlî dîn û har e û sewda li serî daye. Zîn çawa ku li pey daxwaz û xwezîyên xwe diçe û dêv ji wan bernade Perîşan jî heman rêyê dişopîne û dixwaze xwe bigîhîne daxwaz û xwezîyên xwe. Zîn piştî mirina yara xwe naxwaze bijî her weha Perîşan jî pişti mirina yara nexwestîye jîyana xwe berdewam bike û xwe kuştîye.

4.3. Memî û Xelîlî

Memî û Xelîlî, di gelek alîyan va dişibihin hev. Her du jî di çîrokan da lehengên mêr yên sereke ne. Memî kurê mîrî nîne lê gelek nêzîkî koşk û seraya wî ye, Xelîl jî kurê Mîrî nîne lê ew birazayê mîrî ye, her du leheng jî bi bengînî aşiqê yara xwe ne, dema derfet çêdibe ku xwe bigîhînin yara xwe jîyana xwe ji dest didin. Memî bi emr û fermana Mîrê Cizîrê dikeve zîndanê û di dawîya dawîyê da di zîndanê da dimire, Xelîl jî bi emr û fermana Mîrê Bazîdê tê girtin û bi işkenceyêek gelek dijwar tê kuştin.

4.4. Beko û Xelo

Beko û Xelo her du jî nûnerê nebaşîyê ne û diwarê fesadî û şeytanîyê da roleke mezin dilîzîin. Çawa Beko, bi dek û dolaban nahêle Memî xwe bigîhîne Zînê û bi miradê xwe şa be were jî Xelo, bi derewên xwe nahêle Xelîlî xwe bigîhîne Perîşanê û bi miradê xwe şa be. Sedema ketina Memî zîndanê dek û dolabên Beko ne û sedema kuştina Xelîlî jî derew û îftirayên Xelo ne. Beko bi eslê xwe mitrib e lê Xelo bi eslê xwe Êzidî ye. Beko, dergevan û pêşekar e û her weha Xelo jî dergevan û pêşekar e.

4.5. Mîr Zeyneddîn û Behlûl Paşa

Mîr Zeyneddîn û Behlûl Paşa her du kesayet jî lehengên çîrokan yên neserek ne, her du jî mîr in. Her du jî, ji alîyekê va bi camêrî û mêrxwasîya xwe derdikevin pêş ji alîyê din va jî bi zordarîyê xwe nîşanî me didin. Çawa li jor jî derbas bu di varyanta sisêyan da navê Behlûl Paşa wek Mehmûd Paşa derbas dibe.

5. Motîfên Çîrokê

Motîf, di berhemên folklorik da ji aliyê avahîsaziya vegotinê va hêmanên herî biçûk in, nayênê perçekirin û têne dubarekirin. Ew, bi tena serê xwe xwedîyê wateyekî ne û digel vê yekê ew di nava vegotinê da bi hûnandina çîrokê ra xwe bi cih dikin û dibin perçeyek ji wê. Motîf, dikarin bi heman peywirê ji çîrokek derbasî çîrokeke din bibin û di qedandina avahîya vegotinê da roleke muhîm bilîzin. Herçiqas hinek caran li gor herêman û demê di forma motîfan da hinek cudahî derdikevin jî, lê ev yeka tesîrek li ser peywira wan ya esasî nake (Attı, 2013:28).

Di vê xebatê da tesbîtkirina motîfan li gor rêbaza Indexa Stith Thompson hatine kirin. Motîfên ku mê di çîroka Xelîl Begê û Perîşan Xanimê da tesbît kirine ev in:

5.1. Motîfa Astengêr

Motîfa Astengêr, di Motîfa Indexa Stith Thompson de di beşa Hîle û Cinsiyetê da hatîye tesbîtkirin. Ev beş di heman xebatê da, di bin herfa **K** û **T** ya da hatine qeydkirin. Di her sê varyantên çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da xalên ku Xeloyê Fesad eleqedar dikin, ev in:

Mirovê xerab û xayin: Di her sê varyantên çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da jî Xeloyê Fesad, wekî kesek xayîn û bi tevahîya karên xwe xerab derdikeve pêş me.

Sûcdarkirinên xelet: Ev xal bi kirinên neheq ên Xeloyê Fesad ra têkildar e.

Di gelek destanan da wek ya *Leyla û Mecnûnê, Ferhad û Şîrînê, Tahir û Zuhreyê, Cembelî û Binefşa Narînê, Sîyabend û Xecê* û hwd. da em rastî motîfa astengêrîyê tên.

Xeloyê Fesad di çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da ji gelek alîyan va motîfa astengêriyê teşkîl dike. Hê ji destpêkê ew, di derbarê evîna Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da agehiyên şaş dide Behlûl Paşa û her weha bi rêya hîleyan dike ku Xelîl Beg li hember Behlûl Paşa, bi rêyeke ne rast bide sucdarkirin û wî bi destê Behlûl Paşa bide kuştinê. Ev agahîyên nerast dibine sebeba mirina Xelîl Beg û dû ra jî mirina Perîşan Xanimê. Motîfa astnengêriyê, di her sê varyantên çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da motîfeke pir bi hêz û esasî ye.

Wek mînak di çîrokê da Xelo weha tê nasîn:

"...Xelo ji alîyekî va bi zîrekî, wêrekî û serwextîyê ji alîyê din va jî bi fesadî û derewînî ya xwe bi nav û deng bûye, lewra jê ra Xeloyê Fesad hatîye gotin..." (Tîmar, 2021: 71)

5.2. Motîfa Hîleyê

Di çîroka Xelîl Begê û Perîşan Xanimê da motîfa hîleyê bi forma xwe ya herî karakterîstîk, di lîstina setrencê de derdikeve pêş me. Di destpêka lîstikê da Xelîl Beg, Mîr têk dibe lê Xelo mudaxeleyî rewşê dike û nahêle Xelîl Beg bi ser bikeve. Çimkî ew dibîne ku Perîşan Xanim li ber derê çadira xwe sekinîye û li wan temaşe dike. Lê pişta Xelîl Beg pêda ye û ew, wê nabîne. Xelo, bi armanca ku berê Xelîl Beg bikeve Perîşanê û konsantrasyona wî ya li ser lîstikê xerab bibe, ji Mîr û Xelîl Beg dixwaze ku ew cihê xwe

Zakho Centre
for Kurdish Studies

bi hev biguherin. Piştî ku Mîr û Xelîl Beg, cihê xwe bi hev diguherin û berê Xelîl Begê dikeve Perîşanê, bala wî ji ser lîstikê diçe. Lewma ew têk diçe û di dawiya vê hîleyê da tê kuştin. Di varyanta yekê û ya sisêyan da jî motîfa hîleyê hatîye bi kar anîn.

Varyanta Iê

"...Birazî, hingî tu çûyî, min bi tu kesekî ra têra dilê xwe kişik nelîstîye... Em ji xwe ra kişik bileyîzin ... Xelîl Beg, li pêşberî mamê xwe rûniştîye û wan dest bi lîstikê kirine... Xelîl Beg li ser hev deh caran ji Behlûl Paşa Birîye ... Xelo ... gotîye Behlûl Paşa: Paşayî xweş be! Di ûsila kişikan da, şûnguhertin jî heye. Hûn dikarin şûna xwe biguherînin ... Mam û Birazî rabûne şûna xwe guhartine. Vê carê berê Xelîl Begê ketîye çadira Perîşan Xanimê ku Perîşan Xanim lê bû ... mamê wî danzde caran bi ser hev jê birîye û di lîstika kişikan da bi ser ketîye ... " (Tîmar, 2021: 105-106)

Varyanta IIyan

"... Dema ku rûnuştin û textê kişikê anîn danîn ser erdê da ku ap û birazî bi hev ra kişikê bileyîzin. Xelo ku dêhna xwe dayê texte çi qas ku rast bû Xelîl Begê ji apê xwe dibe ... Perîşan çû derve sekinî li wan mêze kir ... Xelo got: De lawo jina te li ber derî rûniştîye seyra we dike. Heke ku tu di huzûra jina xwe da ji apê xwe bibî ji te ra şerm e. Xwe bi destê apê xwe da berde ... Wî xwe bi destê apê xwe da berda. Wan heft caran leyîstin, her heft caran jî Xelîl Begê xwe xwe bi destê Mehmût Paşayî va berda ..." (Îşler, 2016: 194-195).

5.3. Motîfên Ajelan

Ajel, di folklor û edebîyata gelerî da bi rengên cur be cur derdikevin pêş me. Ajel, keresteyên folklorê û edebîyata gelerî ne. Di folklora kurdan û edebîyata kurdî ya gelerî da motîfa ejelan zêdetir hatîye bi kar anîn. Ajalên ku me di çîrokê da tesbît kirin ev in:

5.3.1. Karxezal

Di nava folklora gel da bi taybetî di helbest û stranên gelêrî da cihê Karxezalê pir girîng û muhîm e. Karxezal, wekî motîfa xweşikîya pak û saf, xwe nîşan dide. Di çanda nêçîrvaniyê da gelek çîrokên bi nêçîra xezalan va girêdayî hene ku di van çîrokan da xweşikî û bêgunehîya xezalê derdikeve pêş. Xezal, hem bi xweşikîya xwe û hem jî bi xweşikîya çavên xwe, di edebîyata gelerî û ya klasîk da bûye motîfeke sereke. Di edebîyatê da ew wek sembola 'hezkirinê' hatîye qebûlkirin.

Di *Çîroka Xelîl Begê û Perîşan Xanim* da motîfa karxezalê tenê di varyanta sisêyan da hatiye bi kar anîn.

Varyanta IIyan

"... De wekî wisan e. Ez ê herim jê ra bêjim ku ez û Xelîl Begê çûne nêçîrê. Karxezalek ji ber me firya. Me herda jî dizgîna hespê xwe berda û zengî kir. Ha li vira, ha li wira, menzîla me dirêj bû ... Min ajot ser karxezalê û hema bi zindî girt û avête ber xwe..." (Tîmar, 2021: 149-150).

5.3.2. Hesp

Di edebîyata gelerî da bi taybet di çîrok û destanan da, motîfa hespê gelekî bi îtibar e. Lehengên çîrok û destanan pirî caran bi hepsên xwe yên efsaneyî navdar in. Hesp ne tenê di destan û çîrokan da, her wisa di nava çanda rojane ya civakê de jî gelekî muhîm e û ajalek pîroz e. Çimkî ew di demên herî dijwar da, di şer û pevçûnê da, di

rêwîtiya da avantajeke berbiçav dide xwediyê xwe da ku ew bikaribe di karên zor da bi ser bikeve. Ji ber vê yekê hesp ne tenê ji aliyê hêmanên efsaneyî va, ji aliyê çanda civakê va jî hêmanek e.

Hesp, di çand û folklora kurdan da gelek muhîm e û her lehengek çand û folklora kurdî xwedîyê hespek navdar e. Bo nimûne navê hespê Memê Alan “Bozê Rewan” e, yê Rustemê Zal “Rezşê Belek” e, yê Evdalê Zeynikê “Gogerçîn” e, yê Sîyabend “Hespê Şê” ye û yê Derwêşê Evdî jî “Hedwan” e. Her weha di çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da jî motîfa hespê hatîye bi kar anîn lê ev hesp, ne hespek dersayî ye ew, ji bo sîyarîyê û rêwîtîyê hatîye bi kar anîn. Xwedîyê hespê Xelîl Beg e û di çîrokê da motîfek esasî nîne, ew wek motîfeke “alîkar” hatîye bi kar anîn. Di her sê varyantan da jî motîfa hespê hatîye emilandin.

Varyanta Iê

“...Ji piştî mehekê an çil rojan ra, Xelo anî hatîye, Hespê Xelîl Begê, av di orta her du guhên hespê da berda ye, hetanî dêlbijîyan şûştîye. Paşê jî wî hesp birîye li qadê hinek gerandîye, çend caran ji dora qadê ra birîye û anîye ...” (Tîmar, 2021: 76).

Varyanta IIyan

“... Pêşekeran hespê wî zîn dikirin, teng û qûşa wî dişidandin. Xelîl Beg lê sîyar dibû û diçû nêçîrê ...” (Tîmar, 2021: 117).

Varyanta IIIyan

“... Lê hespê Xelîl Begê seqet e, ... Go: Lawo hespê min seqet e nikare here!” (Îşler, 2016: 165).

5.4. Motîfa Guhertina Gustê

Motîfa Gustîlê, di folklor û edebîyata gelerî da bi serê xwe motîfek muhîm e. Di vegotinên gelerî da wekî nîşana hevnaskirinê, aşiq û meşûq yadîgaran didin hev û din. Ev jî bi piranî tiştên mîna gustîl, mohr, destmal û hwd in. Di edebîyata kurdî ya gelerî da em herî zêde rastî gustîlê tên. Wekî mînak di Mem û Zînê da dema ku li qada Newrozê Tacdîn û Memî ji Stî û Zînê vediqetin gustîlên xwe bi wan ra diguherin.

Di destan û çîrokan da dîtina yekem a aşiq û meşûqê gelek muhîm e. Di çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da jî hevdîtina yekem a Xelîl Beg û Perîşan Xanimê di xewnê da bi hev ra guhertina gustîlan destpê dike. Bi hev guhertina gustîlan tenê di varyanta sisêyan a çîrokê da heye. Perîşan Xanim di xwena xwe da dibîne ku gustîla wê hatîye guherandin û her weha Xelîl Beg jî gava ji xewa xwe hişyar dibe li tilîya xwe mêze dike ku gustalî wî jî hatîye guherandin.

Varyanta IIIyan

Motîfa gustîlê weha derbas dibe:

“... Dayê ew ê hatibû bibû kurê bavê min digel Xelîl Begê birazîyê Mehmûd Paşa li filan zozanê ne. Min hêj di xewna xwe da ew dîtin. Me gustîlên xwe bi hev û din guhartin ... Dema li gustîla xwe dinêre eşqek dikeve dilê wê ... Xelîl Beg gazî kir û got: Xelo Lawo weleh keçik wa li pey me ketîye! Dibêje gustîla tilîya min guherîye. Lawo weleh gustîla tilîya min jî hatîye guhertin. Keçik rast dibêje ...” (Îşler, 2016: 163-166).

5.5. Motîfa Xewnê

Motîfa xewnê, di Motif Indexa Stith Thompson da, di beşên T: Cinsiyet, D: Sêhr, M: Tayinkirina Pêşerojê de hatiye nîşandan.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Xewn, bi piranî ji bo lehengên çîrokê di wateya pozîtîf da derdikeve pêşberî me. Lê ger di çîrokan da kesên zalim an jî padîşahên zalim hebin û ew xewnê bînin, bi piranî ev xewn ji bo wan weke xewneke nebixêr tê fêmkirin.

Ji serdemên herî kevnar û vir va meriv bi xewnan ra mijûl bûne û îro jî dibin. Bi pênaseya herî hêsan meriv dikare xewnê wekî; rêzexeyala ku di halê xewê da di hîşê meriv da derbas dibe, tarîf bike (Günay, 1999: 78). Motîfa xewnê; di cureyên mîna destan, çîrokên gelêrî û efsaneyan da derdikevine pêş û di derheqê bûyinên siberojê da nîşaneyan didine." (Kaya, 2007: 621).

Zeynelabidîn Zinar di derheqê motîfa xewnê a ku di çîrokên kurdî da derbes dibe weha dibêje: "*Di bingeha Çîroka Kurdî da xewn, umîdeke mezin e ku ji mirovan ra çêdibe. Pir tiştên dema pêşê hene ku lehengê çîrokê, bi dîtina xewnan pêzan dibe û li wê gorê dimeşe, diçe heta ku li armanca xwe sererast dibe.*" (Zinar, 2009: 129).

Motîfa xewnê di çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da jî derdikeve pêşî me. Xelîl Beg, di rêwîtîya xwe da li ciheke bi armanca bîhnvedanê disekine, di wê esnayê da radikeve, di xewna xwe da Perîşan Xanimê wekî kewek gozel dibîne, di xewnê da gustîla xwe bi ya wê ra diguherîne; Perîşan Xanim jî li mala xwe di xewna xwe da Xelîl Begê dibîne û di xewnê da gustîla xwe bi ya wê ra diguherîne.

Motîfa xewnê di çîrokê da tenê di varyanta sisêyan da derbas dibe:

Varyanta IIlyan

"*... Êvarê wan afincîyên xwe danîn, serê xwe danîne ser afincîyan û bi xew ra çûne. Bi îradeya Rebê Alemê Perîşan jî di wê demê da bi xew ra ra diçe. Xelîl Beg, Perîşanê wekî keweke gozel di xewna xwe da dibîne. Perîşan jî Xelîl Begê di xewna xwe da dibîne, her du bi hev ra dileyîzîn ...*" (Îşler, 2016: 163-162).

5.6. Motîfa Evînê

Motîfa evînê di tesnîfa Stith Thompson da motîfeke sereke ye. Motif di Indexa Stith Thomson da, di binê sernava Cinsiyetê da, li binê herfa 'T'yê hatiye qeydkirin.

Evîn, di çîrokên gelerî da mijareke bingehîn e. Di destan û çîrokên gelerî da evîn û evîndarî motîfek zêde berbelav e û mijara evînê gelek zêde derdikeve pêş me û li dor evînê tê hûnandin. Bo nimûne di destana Leyla û Mecnûnê da, Ferhad û Şîrînê da, Romeo û Julietê da, Memê Alan da, Siyabend û Xecê da, Binefş û Cembelî da, Derwêşê Evdî û Edûlê da û Zembilfiroşê da evîn. mijara sereke ye û motîfa evînê jî motîfa herî diyarker e.

Di çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da, forma hevdîtina Xelîl Beg û Perîşan Xanimê ne wekî destana folklorî ye. Di çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da her du evîndar ne ji bajarekî ne û her du leheng, di nav fend û fûtê merivek necamêr da hev û din nasdikin. Destpêka evîna wan bi dîtina xewnê ye. Di her sê varyantan da jî evîn di encama kirina dek û dolabên Xeloyê Fesad da destpê dike.

Di çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da, evînek e trajîk heye. Di her sê varyantên çîrokê da jî derdikeve pêşîya me ku Xeloyê Fesad, Behlûl Paşa dixapîne û di encamê da Behlûl Paşa, birazayê xwe Xelîl Begê dide kuştin û li ser vê kiryarê Perîşan Xanim jî xwe dikuje. Xelo bi awayekî derew ji Pehlûl Paşa ra dibêje bavê Perîşan Xanimê keça xwe ji te ra şand lê bi rê da birazayê te Xelîl Begê, dest dirêjî li namûsa te kir û ew lewitand. Li ser vê yekê Behlûl Paşa birazayê xwe Xelîl Begê dide kuştin û piştî ku Perîşan jî xwe dikuje Behlûl Paşa ji rastîya bûyerê agahdar dibe û di encamê da Xeloyê Fesad jî tê kuştin.

5.7. Hejmarên Formel

Hejmar, di jîyana merivahîyê da rolek girîng dilîze. Bawerîya bi hejmaran di van demên dawîyê da derneketine meydanê. Ji demên berê va tê bawer kirin ku di her hejmarekî da wateyên veşartî hene. Li gor vê bawerîyê hinek hejmar, şans û bextek baş didin merivan û hênek jî dibine sedema têkçûyêna wan. Di gelek çandan da, di heman demê da di şaristanîya Babîlan, Hind û Misrê da, hejmar wekî destpêka her tiştî hatîye dîtin û hin hejmar li gorî wateya xwe "pîroz" hatine hesibandin.

Hejmarên Formel di Motif Indexa Stith Thompson da di Beşa "Z" yê da hatine nîşandan.

Hema bibêje di tevahîya berhemên folklorê da bi taybetî jî di çîrok, efsane û destanan da, di çanda maddî û manewî ya civakê da gelek caran bi rengekî berbelav û hevbeş hin hejmar derdikevin pêş me. Li gor zanista folklorê meriv dikara wan hejmaran wekî 1, 3, 4, 5, 7, 9, 13, 33, 40, 70, 72, 99, 300, 360, 1000 û 1001 rêz bike. Ev hejmar hem di nava mîtolojiya civakan da, hem di nava bawerî û dînên civakê da û hem jî bi giştî di nava çanda gelêrî ya civakê da xwedîyê hinek taybetmendîyan in. Ew taybetmendiyên van hejmaran ên berbelav û hevbeş, rê vedikin ku zanyarên folklorê û cureyên zanyariyên din li ser wateya wan, dîroka wan û efsaneyên li derdora wan çêbûne bisekinin (Boratav, 2003: 117-118).

Di folklora kurd da; di çîrok, destan û efsaneyan da, em bi heman rengî rastî van hejmaran tên.

5.7.1. Hêjmara Heft (7)

Hejmara heft, di gelek bawerî û çandan da bi awayekî berbelav hatîye bi kar anîn. Di şaristanîya Misrê da ev hejmar wekî nîşaneya jîyaneke bêdawî hatîye qebûlkirin. Wek tê zanîn ku di serdema Sumerîyan da îbadetxaneyek heft derî hatîye çêkirin û piştî qedandina karê înşeatê di vê îbadetxaneyê da heft çêlek û heft mîh wek qurban hatine serjêkirin.

Di Ehda Atîk/ Peymana Kevin da derbas dibe ku Xwedê dinya di şeş rojan de afirandîye û di roja heftan da jî bîhna xwe daye.

Di alema Îslamê da jî hejmara heft, xwedîyê wateyek taybet e. Li gorî pirtûkên dînî, heft derên bihuştê hene û ji bo dojehê jî pêlekanek heft gavî heye. Kesên ku diçin hecê heft caran li dora Kabeyê dizivirin. Quran, li ser heft herfan nazil bûye. Di navbera bajarê Mekke û Medîneyê da heft keleh hene. Di Quranê da derbas dibe ku Melîkê Misrê di xwena xwe da dibîne ku heft çêlekên qelew, heft çêlekên zeîf dixwin û heft sinbilên hêşin û heft sibilên hişk dibîne. Yûsuf Pêxember vê xewnê tebîr dike û dibêje heft salan têrbûn û bereket çêdibe, pişt ra jî heft salan birçîbûn û tuneyî çêdibe (Quran, Yûsuf: 12/46).

.

Di çand û folklora kurdan da jî hejmara heft, wek hejmarek pîroz hatîye dîtin. Di destan û çîrokan da ev hejmar gelek zêde tê bi kar anîn. Bo nimûne Heft bira, heft tebeqe binê erdê, heft sal, heft roj, hûtê heft serî, heft şev û heft roj û hwd. Dîsa meriv bi heft bavê xwe tê nasîn.

Di çîrokç da hejmara heft weha derbas dibe:

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Varyanta Iê

"... Perîşan Xanimê hema çewa ku, dawî li vê benda lorandina xwe anîye, xwe ji birca Seraya Îshaq Paşa ya herî bilind, ji jor da berdaye xwarê. Çaxê ku ew ketîye erdê, pişta wê di heft cihan da şikestîye ..." (Tîmar, 2021: 112).

5.7.2. Hejmara Çil (40)

Hejmara çil, di çanda rojhelata navîn da bi fonksîyon derdikev pêş me. Di folklorê da hejmara çil, yek ji hêjmarên herî bi efsûnî ye û di rojhelata navîn da gelek berbelav e. Ev hejmar di nav dîn û bawerîyan da û terîqetan da xwedan girîngîyek berbiçav e. Wekî nimûne çil roj di înzivayê da mayîn, di çil rojî da paqijbûna ji qirêjîya manewî û hwd. Di çan da gel da, jin piştî danîna hemla xwe, çil rojî di nava cî û nivînan da dimîne. Dergûş dema dibe çil rojî tê qebûlkirin ku wî merheleyeke ji temenê xwe derbas kirîye. Di salnameya gel da merhaleya çile heye. Çileya pêşîn û çileya paşîn du merheleyên girîng ên demsala zivistanê ne. Çil roj, çil sal, çil kes di folklorê da çend biwêjên girîng in.

Di çîroka Xelîl Beg û Perîşan xanimê da hejmara çil di varyanta yekê û ya sisêyan da weha derbas dibe:

Varyanta Iê

"... Ji kerema xwe ra, herin ji Behlûl Paşa ra bêjin, bira hema çil rojî li min sebir ke. Bo ku ez hinekî di ser xwe da bêm, hişê min were serê min ..." (Tîmar, 2021: 108).

Varyanta IIIyan

"... Dayê rabe çil carîyan, çil bar hirî li hêştiran bide barkirin. Ez ê derkevime ser çemê Nezerê. Dibe ku em heta êvarê neyên, li ku Xwedê hez bike em ê vê carê vegerin û em ê vê bi heval bin..." (Îşler, 2016: 163-163).

5.7.3. Hejmara Hezar (1000)

Hejmara hezar, piranîyeke bêkêmahîî fade dike. Di civakê da, di jiyana rojane da, ev hejmar di nava biwêjên mîna; hezar sal, hezar car, hezar derd û dewa, hezar rê û dirb da tê bi kar anîn.

Di çîroka Xelîl Begê û Perîşan xanimê da hejmara hezar, tenê di varyanta sisêyan da weha derbas dibe:

Varyanta IIIyan

"... Carîyan ji Perîşanê ra gotin: Perîşan! Tu tenê bi serê xwe hezar mihî didoşî. Em sî berîvan jî dikarin hezar mihî bidoşin ..." (Îşler, 2016: 153).

Encam:

Mijar bi gelemperî di bin pênc serenavan da hate vekolandın. Di beşa dayîna kurteya çîrokê da sê epîzotên çîrokê esas hatın girtin. Di van epîzotan da ji nêzîk va hat ditın ku herçiqas di navbera varyantên çîrokê da hinek cudahî hebin jî ew ne cudahîyên esasî ne. Di derheqê mekanê lehengan da hevbeşîyek tune ye. Xelîl Beg ji bajarê Bazîdê ye û Perîşan Xanim jî bi eslê xwe ji devera Botan e û malbata wê di her demsala havînê da tê li Subhangola navbera navçeya Çardêran û Bêgirî ya Wanê da konê xwe vedide û dema xwe derbas dike. Di her sê varyantên çîrokê da jî ji alîyê statûya civakî ya lehengan va yanê statûya Xelîl Beg û Perîşan Xanimê da guhertin qet nehatın dîtin, her du leheng jî ji mala mîran in û xwedîyê eşîrên mezin in.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Hevdîtina lehengan di her sê varyantan da jî bi rengeke hevpar derket pêş me. Xelîl Beg û Perîşan Xanim di her sê varyantanda jî li ser pêşnîyaza Xeloyê Fesad xebera wan ji hev çêdibe û ew hev û din dibînin û nas dikin. Di prosesa hevdîtinê da her du leheng di xewnê da hev û din dibînin û gustîlên xwe bi hev ra diguherin.

Di çîrokê da di her sê varyantan da jî epîzota nêçîrê û ya setrencê du hevbeşîyên sereke ne. Mirina Xelîl Beg û Perîşan Xanimê di tevahîya varyantên çîrokê da kêm zêde bi rengeke hevbeş derbas dibe. Mirina Xelîl Begê li ser agahîyên nerast yên Xeloyê Fesad û bi emr û fermana Behlûl Paşa dibe û mirina Perîşan Xanimê jî li ser fesadîya Xelo û biryarên Pehlûl Paşa yên nerast di întîharkirinê diqewime.

Ji alîyê karekterên çîrokê va navê Mîrê Bazîdê di varyanta yekê û ya duduyan da Behlûl Paşa ye û di varyanta sisêyan da jî Mehmûd Paşa ye, lê wisa tê xwîyakirin ku her çiqas navê mîr cuda be jî ew kes Behlûl Paşa ye.

Di beşa avahîsazîya motîfan da me dît ku di varyanta yekê û ya duduyan da şeş (6) motîf hatine bi kar anîn û di varyanta sisêyan da jî neh (9) motîf hatine emilandin. Ev agahî jî dide xwîyakirin ku ji alîyê dewlemendîyê va varyanta herî dewlemend ya sisêyan e. Lê meriv nikare bibêje di çîrokê da bi tenê ev motîf hene. Bê guman bi xebatên cuda cuda wê zêdetir motîf di çîrokê da werine tesbîtkirin. Di vekolîna me da motîfên mîtolojîk derneketin pêşîya me.

Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê, gelek zêde di bin tesîra destana Mem û Zîna Ehmedê Xanî da maye. Wisa tê xwîyakirin ku destana Mem û Zînê çawa li gelek destna û çîrokên din ên kurdî kirîye were jî li ser vê çîrokê kirîye. Motîfa xwenê û sahneya setrencê bi piranê wek a Mem û Zînê qewimî ye.

Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê di çanda folklora kurdan da cihek bi qîmet girtîye. Çîrok, ji alîyê gelek dengbêjan va wekî kilam hatîye gotin. Ji wan dengbêjan hinekên wan ev in: Dêngbêj Husêynê Cângorânê, Dengbej Kinyas, Dengbej Zahiro û Dengbêj Hûseynê Çatê.

Di vekolînê da em li ser vê mijarê rastî tu xebateke akademîk nehatin. Ev yeka jî dide xwîyakirin ku lazim e lêkolîner li ser vê çîrokê vekolînên cuda cuda bikin.

ÇAVKANÎ:

Doğan Kaya, (2007). *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara.

Ehmedê Xanî, (2010). *Mem û Zîn*, Weşanên Wezareta Çandê û Geştûgerîyê, Ankara.

Fettah Timar, (2021). *Destanên Kurdî I-II*, weşanên "Ar", Stenbol.

Hikmettin ATTI, (2013). *Lêkolîneke Folklorî Li Ser Destana Mem û Zînê*, (Teza Mastirê ya neçapkirî), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mardîn.

İkram İşler, (2016). *Mîrza Mihemed û Çavreşa Qîza Mîrê Ereban*, weşanên Sîtav, Wan.

Karzan Mihemed, (2013). *Geştî Kont Dusêrsî Bo Kurdistan (1839-1840)*, Binkey Jîn Yayınları, Süleymaniye.

Mehmet Gültekin, (2014). "***Batılı Eski Gezginler ve 1800-1900 Yıllarında Bayezid"*** [Https://gilidax.wordpress.com/2014/01/11/dogubayazit-tarihi/], (Ragehandin:10.01.2022).

Pertev Naili, Boratav, (2003). *100 Soruda Türk Folkloru*, Weşanên K. Kitaplığı, İstanbul.

Rohat Alakom, (2013). *Di Folklora Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, Çapa Duyem, Weşanên Awesta, Stenbol.
Quran, Sûreya Yûsuf: 12/46.
Umay Günay, (1999). "Folklor Mahsullerinin Tabiatı", *Milletlerarası Türkoloji Kongresi, Tebliğler*, I-II. İstanbul.
Zeynelabidîn Zinar, (2009). *Di Çanda Kurdî De 37 Şaxên Zanistiyê*, Weşanên Pencînar, Stockholm.

ÇAVKANÎYÊN ELEKTRONÎK

https://www.youtube.com/watch?v=N455MYTvz2k
(Ragehandin: 15.02.2022, Saet:10: 00)
https://www.youtube.com/watch?v=FwHJh0XQgeU
(Ragehandin: 15.02.2022, Saet:10: 15)
https://www.youtube.com/watch?v=c3buZEs_FQQ
(Ragehandin: 15.02.2022, Saet:10: 30)
https://www.youtube.com/watch?v=IdKRDtbOWmw
(Ragehandin: 15.02.2022, Saet:10: 45)

HALİL BEY İLE PERİŞAN HANIM'IN HİKÂYESİNİN ANALİZİ

Özet:

Hikâyeler, genel olarak Dünya Edebiyatında ve Kürt edebiyatında birçok araştırma konusu olmuştur. Tanım olarak hikâye, gerçek ya da gerçeğe yakın bir olayı edebi bir üslupla aktaran kısa düzyazı şeklindeki anlatıdır. Hikâye; kısalığı, olay örgüsünün basitliği ve kahramanların sayısnın azlığıyla romandan ayrılır. Hikâyede genellikle olayın cereyan ettiği sınırlar bellidir, anlatıcı konuyu derinlemesine inceler, anlatım şekli de açık ve nettir.

Halil Bey ve Perişan Hanım'ın hikâyesi edebi bir formata girerek Kürt Halk Edebiyatı ve Folklorunun bir ürünü haline gelmiştir. Hikâye; Serhad bölgesinin Doğubayazid ilçesi ile Suphangöl arasında geçmektedir. Başlıca kahramanları Behlül Paşanın yeğeni Halil Bey ve Millî Aşiretinin Lideri Ömer Ağa'nın kızı Perişan Hanim'dır. Hikâyede bir yandan aşk, diğer yanda da ihanet, yokluk ve sefalet vardır. Bu çalışmada hikâyenin varyantları, anlatıcı ve muhtevası, dili, kahramanları, olayın gerçekleştiği yer ve oluş şekli irdelenmiştir.

Anahtar Kelimeler: *Hikâye, Serhad, Halil Bey, Perişan Hanım, Behlül Paşa.*

ANALYSİS OF THE STORY OF MR. HALİL AND MRS. PERİŞAN

Abstract:

The stories have been the subject of many researches in world literature and Kurdish literature in general. By definition, a story is a short, prose narrative that narrates a real or near-real event in a literary style. The story differs from the novel with its brevity and simple plot and few protagonists. In the story, the boundaries of

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

the scene are generally explored, the narrator examines the subject in depth and the narration is clear.

The story of Mr. Halil and Mrs. Perishan also took a literary form and became a product of Kurdish Folk Literature and folklore. Story; It passes in the Serhad region, in the region between Doğubayazid district and Subhangöl. Its main heroes are Mr. Halil, the nephew of Behlül Pasha, and Mrs. Perishan, the daughter of Omer Agha, the leader of the National Tribe. In the story, there is love on the one hand, and betrayal, absence and misery on the other. In this study, the variants of the story will be examined in terms of the narrator and its content, language, heroes, the place where the event took place and the way it happened.

Keywords: *Story, Serhad, Mr. Halil, Mrs. Perişan, Behlul Pasha*

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

DI EDEBÎYATA KURMANCÎ DE FABLÊN MENZÛM Û NIMÛNEYA HELBESTA XULDÎ

SEHER BİŞAROĞLU
Beşa Ziman û Çanda Kurdî - Zanîngeha Mardîn Artukluyê/ Turkîya

PUXTE:

Fabl cureyeke nivîsê ye ku di wan de ji dêvla mirovan ajal, riwek û tiştên derveyî însanan diaxivin û tevdigerin û kêm be jî di fablan de mirov jî hene. Fabl bi gelemperî ji bo şîret, dersdayîn û ji bo zarokan têne nivîsandin. Di nav edebîyatên klasîk, gelêrî û modern de nimûneyên fablan têne dîtin. Di nav edebîyatên cihanê de cureya fablê jî rewac dîtiye û gelek berhem bi vê cureyê hatine nivîsîn. Dema li edebîyata Kurdî ya klasîk û gelêrî tê mêzekirin tê dîtin ku fablên menzûm jî hatine nivîsîn.

Di vê xebatê de bi taybetî dê du helbestên Seyda Mela Xalidê Xuldî yên bi navê *“Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra”* û *“Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra”* were nirxandin. Herwiha dê li ser helbestên Kurmancî yên ku bi cureya fablê hatine nivîsîn jî were sekinîn.

Seyda Mela Xalidê Licewî di sala 1940î de li Licê hatiye dinyayê û di sala 2011an de li Îzmîrê wefat kiriye. Seyda Mela Xalidê Xuldî li cem gelek aliman xwendiye û îcazetnameya xwe ji Şêx Ebdulkerîmê Miderîs wergirtiye.

Licewî berhemên cur bi cur nivîsîne; yek ji van berheman jî *Dîwana* wî ye ku bi Kurdîya Kurmancî ye. Di Dîwana xwe de bi piranî mexlesa Xuldî bi kar anîye û ev Dîwan ji alîyê qewareya xwe ve têra xwe mezin e. Di Dîwana wî helbestên bi navê *“Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra”* û *“Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra”* bi cureya fablê hatine nivîsîn. Ev fablên Xuldî bi malikan hatine hûnandin. Dema li edebîyata Kurmancî ya Klasîk û gelêrî tê mêzekirin tê dîtin ku helbestên bi cureya fablê hatine nivîsîn li gorî yên pexşanî ne zêde ne. Ji ber vê yekê helbestên bi vî rengî xwedî cihekî taybet in. Ev helbesta navborî ya Xuldî hêj destxet e û nehatiye çapkirin û dê cara ewil di vê xebatê de were pêşkêşkirin.

Di vê xebatê de dê ev helbesta Xuldî bê latînîzekirin û tevî destxetê dê di dawîya vê xebatê de were dayîn. Di vê xebatê de dê helbesta Xuldî ji alîyê teşe û naverokê ve were nirxandin. Tevî vê helbesta navborî dê li ser fablên Kurmancî yên ku bi şêweya helbesta klasîk û fablên gelêrî yên kêşdar û bi qafîye hatine nivîsîn dê were rawestin. Ev helbestên ku bi cureya fablê hatine nivîsîn dê werin tespîtkirin û dê ji alîyê teşeyê ve ev fabl bên nirxandin.

Peyvên Serekî: *Seyda Mela Xalidê Licewî, Xuldî, Fabl, Edebîyata Kurmancî, Menzûm.*

DESTPÊK:

Cureya fablê di nav edebîyatên cîhanê de gelekî hatiye tercîhkirin. Nivîskaran hem bi awayê pexşan hem jî bi awayê menzûm carinan ji hem pexşan hem jî menzûm bi awayê têkel fablên xwe nivîsîne. Seyda Mela Xalidê Xuldî jî fabla xwe bi awayê menzûm

Zakho Centre for Kurdish Studies

û bi teşeya mesnewîyê nivîsîye. Berî ku em derbasî pênaseya fablê bibin divê em behsa têgeha menzûmeyê bikin.

Menzûme ji peyva nezmê hatiye dariştin. Nezm jî ew metnên ku bi wezn û qafîye ne. Menzûm ew berhemên ku bi awayê helbestkî hatine nivîsîn. Menzûme tê maneya helbesta menzûm. Di menzûmeyan de her cure agahî û peyamên exlaqî dikare were dayîn (Çıkla, 2009, r.64). Di menzûmeyan de helbestvan çîroka xwe bi awayekî helbestkî bi kêş û serwa dinivîse. Menzûme ji ber bi kêş û serwa têne nivîsîn bi aheng in û ji ber vê yekê bêtir bala mirovan dikişînin û di bîra mirovan de dimînin. Herçiqas menzûme bi awayê helbestkî û bi kêş û serwa bin jî ji alîyê helbest, estetîk û şaîrtîyê ve qels in (Çıkla, 2009, r. 71). Lewra armanca sereke ya helbestvan ne edebîtî û estetîk e, nivîskar di metna xwe de dixwaze xwênerê xwe fêr bike, ders bide û şîretan bike. Dema em li fabla Xuldî mêze dikin tê dîtin ku wî jî bi awayê menzûm fabla xwe nivîsîye.

Di vê xebata xwe de em dê li ser fablên Kurmancî yên menzûm bisekinin. Di nav helbestvanên Kurmanc de bi cureya fablê helbest hatine nivîsîn. Em dê di vê xebata xwe de li ser danasîna cureya fablê, li ser dîroka fablê, di edebîyata Kurdî ya Kurmancî de fablên menzûm û bi berfirehî li ser jîyana Mela Xalidê Licewî û fablên wî bisekinin.

1. JI CUREYÊN EDEBÎ FABL

Bêjeya "fabl"ê ji Latînî ji bêjeya "Fabula"yê çêbûye û fabl tê maneya vegotin, efsane û axaftinê (Karabacak 2015). Fabl ew çîrokên ku lehengên wan ajal, giya û tiştên gîyanbar û negîyanbar in. Fabl ji alîyê mijarên xwe ve kurt in û bêhtir ji bo armanca şîret û dersdayînê têne nivîsîn (Okur 2014). Di fablan de leheng bi piranî ajal in û wekî mirovan difikirin, diaxivin û tevdigerin. Bi kurtasî taybetîyên fablan ev in:

- Lehengên wan bi piranî ajal in.
- Fabl hem menzûm hem jî bi awayê pexşan dikarin werin nivîsandin.
- Bi piranî di dawîyê de şîret tê dayîn û jê derseke exlaqî tê wergirtin.
- Bi piranî nivîskarê fablan ne dîyar in (Ji bo agahîyên berfirehtir bnr: Altan A., Metin G., Babadağ O., Polat F., 2021, 134).

Dema em li edebîyatên cîhanê mêze dikin tê dîtin ku fabl gelek rewac dîtine û hatine nivîsîn. Di edebîyata cîhanê de ev cûre gelekî hatiye hezkirin û ji ber vê yekê bi hezaran nimûneyên vê cureyê hatine nivîsîn.

1.1. Di Edebîyata Cîhanê de Fabl

Fabl cureyeke edebîye ku lehengên wê bi piranî ji ajal û riwek, tiştên gîyanbar û ne gîyanbar û kêm be jî ji mirovan pêk tên. Gelek caran ji bo mebestên cihê hatiye bikaranîn weke: perwedekirina civakê, perwerdekirina zarokan, vegotina fikrên sîyasî, ji bo xweş wext derbaskirinnê, ji bo hicvê û hwd. Bi kîjan cureyê hatibe nivîsîn jî fabl gelekî hatine hezkirin.

Li gorî nêrînekê fabl ewil di nav gelê Yûnanan de derketiye û belav bûye û li gor nêrîneke din jî fabl cara ewil ji nav çanda Hindîyan derçûye. Herçiqas mînaka ewil a fablê ber bi Aîsopos (Ezop)ê (b.z. sedsala 6em) Yûnanî ve hatibe nîspetkirin jî agahîyeke teqez di vê mijarê de nîne. Ezop van çîrokan ji bo xweşwext derbaskirinê nivîsîye. Çîrokên Ezop berî zayînê di sala 300î de bi navê *Aîsopos* hatine berhevkirin (İpek, 2012, r.80-82). Em mînakên herî ewil yên edebîyata Hindûyan berî zayînî di salên 100-300î de dibînin. Mînaka ewil *Pançatantra* ye û bi zimanê Sanskrîtî hatiye nivîsîn. Wisa tê zenkirin ku berî Îsa di sala 200î de li Qeşmîrê hatiye berhevkirin. Piştre ev berhem piştî zayînê di

sala 750î de ji alîyê kesekî bi navê Ebdullah Îbnî el-Muqaffa ve weke *Kelîle û Dimme* hatiye wergerandin û ev berhem ji alîyê Beydaba ve hatiye vegotin. Bi vî awayî ev berhem li Rojhilata Navîn û li Rojava berbelav bûye (Karabacak, 2015, r.48-49).

Di edebîyata Yûnanî de ev cure gelekî hatiye bikaranîn û di vê edebîyatê de mînakên ewil ên fablê ji alîyê Ezop (b.z.s.s 6em), Hesiodos berî zayînê di sedsala 8an de û ji alîyê Stesîhor ve berî zayînê di salên 640-555an de hatine dayîn (Okur, 2012, r.80-81, Karabacak, 2015, r. 39). Piştre ji alîyê gelek kesan ve fabl hatine nivîsîn.

Di edebîyata Frensizî de fabl di sedsala 12an pê ve tê dîtin. Marie de France nivîskarekî girîng yê cureya fablê ye, wî fablan berhevkiriye û di pirtûkeke bi navê *Aîsopos* de civandiye. Ji bilî nivîskarê navborî di edebîyata Fransizî de kesên weke; La Fontaine (z. 1621), Gilles Corrozet (1510-1568), Guillaume Haudet (1558?), Clémet Marot (1496-1544) û hwd. di cureya fablê de berhem dane. Ji van nivîskaran La Fontane gelekî bi navdar e û bi wî li Ewropayê cureya fablê gihaştiye lûtkeya xwe (Karabacak, 2015, r.41-42).

Di edebîyata Elmanî de cureya fablê di sedsala 13em de bi nivîskarê bi navê Sticker dest pê kiriye. Ji bilî wî kesên bi navê Ulrich Boner, Heinrich Steinhövel (1412-1482), Martin Luther (1483-1546) û hwd. jî bi cureya fablê berhem nivîsîne (Karabacak, 2015, r. 43-44).

Di edebîyata Ingilîzî de kesên weke; Geoffrey Chaucer (1340?-1400), Edmund Spenser (1552-1599), John Dryden (1631-1700), Jonathan Swift (1667-1745) û hwd. bi cureya fablê berhem dane (Karabacak, 2015, r. 47).

Di edebîyata Rûsî de fabl gelekî rewac dîtiye û kesên weke; Antioh Dimitriyeviç Kantemir, Mihaîl Vasilyeviç Lomonosov, Vasiliy Krilloviç Trediakovski, Sumarokov, V. Maykov, Heraskov, Hemnitser, Dmitriyev, Izmaylov, Radişcev Derjavin, Jukovskî, Krilov û hwd. (Karabacak, 2015, r. 52-53) bi cureya fablê re mijûl bûne û berhem dane.

Di edebîyata Hindûyan de yekem kesê ku fabl nivîsîye weke Qaşayapa tê zanîn. Bi Sanskrîtî bi cureya fablê berhema herî kevin *Pançatantra* ye û tê gotin ku ev berhem ji alîyê kesekî bi navê Wishnuşarman ve ji bo perwerdekirina du mîran hatiye gotin. Di vê berhemê de em ji bilî ajalan rastî mirovan jî tên. Ev berhem bi saya wergera xwe ya bi Erebî li cîhanê belav bûye (Karabacak, 2015, r.49). Herwiha du destanên ewil ên Hindûyan; Mahabharata û Ramayana di nav nimûneyên ewil yên fablê de têne dîtin (Okur, 2012, r. 82).

Di edebîyata Erebî de cara ewil bi wegerandina berhema bi navê Kelîle û Dimme fabl hatine nivîsîn. Ev berhem bi xebatên Ebdullah îbnî el- Muqafata ji Belehlevî ji bo Erebî hatiye wegerandin (Okur, 2014, r. 28). Di edebîyata Erebî de di serdema cahîlîyê pê ve çîrokên ajalan têne dîtîn. Kesên weke; el- Mufaddal ed-Dabbî, Ebu Hîlal el-Eskerî, el-Meydanî, Ummeye b. Ebî's-salt, el-E'şa, en-Nabixa, ez-Zubyanî, Ibban b. Ebdilhemîd, el-Lahikî, Îbnû'l-Hebbariyye, Sehl b. Newbaht, Ibn Zafîr es-Sakalî, Ebû'l-A'la el-Marrî, Sîcîstanî, Ebu Ubeyde, el-Esmaî hin ji wan kesan in ku bi cureya fablê re mijûl bûne û berhem dane (İpek, 2012, r.83, Okur, 2014, r.25).

Di edebîyata Farisî de Gulistana Sadîyê Şîrazê (1213-1292) gelekî navdar e, ev berhem weke menzûm-pexşan têkel hatiye nivîsîn. Ev berhem heta niha ji bo gelek zimanan hatiye wegerandin. Herwiha ji bilî Sadîyê Şîrazî, Ubeydê Zaqanî Muhammed Bakîr Meclîs (?-1371) jî pirtûka bi navê *Muş û Gurbe* (*Mişk û Pisîk)* bi cureya fablê de nivîsîye (Karabacak, 2015, r.49-50).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Di edebîyata Tirkî de cara ewil fabl ji alîyê Şeyxî ve hatiye nivîsîn Şeyxî berhema xwe ya bi navê *Harname* di sedsala 15an de nivîsîye. Ji bilî Şeyxî kesên weke; Güvarî, Mewlana, Fuzûlî û Gülşehri bi cureya fablê berhem nivîsîne û kesên weke; Şînasî, Ahmet Mîthad Efendî (1844-1912), Nurullah Ataç (1898-1957), Orhan Veli Kanık (1914-1950), Ömer Rıza Doğrul (1893-1952) û hwd. ji zimanên cûda fabl wergerandine Tirkî (Okur, 2012, r. 82, Karabacak, 2015, r.51).

1.2. Di Edebîyata Kurdî de Fabl

Di edebîyata Kurdî ya devkî de çîrok cihekî girîng digire û hêmayeke pir berbelav e. Çîrokên evînî, çîrokên ajalan, çîrokên, çîrokên efsanewî û hwd. hatine gotin û hezkirin. Çîrokên ajalan ango fabl di edebîyata gelêrî de ji xwe re cihekî berfireh girtiye û gelek çîrok li hemû deverên ku Kurd lê dijîn hatine gotin û vegotin. Hin ji wan çîrokên fabl ku di nav Kurdan de berbelav in ev in: Rovî û Pîrê, Rovî û Dîk, Şengê û Pengê, Gur û Heft Karik, Gur û Bizin, Çûk û Pîrê, Kêzxatûn, Pîrê û Dîk, Şîva Rovî û Legleg (Duman, 2019, r.6).

Ji bilî çîrokên gelêrî em di nav helbestên klasîk û gelêrî de jî rastî cureya fablê tên. Li gor agahîyên li ber destê me di edebîyata Kurdî de cara ewil em di nav helbestên Feqîyê Teyran de rastî cureya fablê tên. Feqîyê Teyran fablên bi navê “Feqe û Bilbil” û “Ey av û av” nivîsîye. Piştî Feqîyê Teyran em di edebîyata Kurmancî de rastî kesên weke; Şêx Eskerî, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Mela Xalitê Licî (Mayî), Şêx Muşerrefê Xinûkî, Mela Silêman (Süleyman Kurşun), Seydayê Dilmeqes, Sebrî Botanî, Mela Husnî Hezîn û Seyda Mela Xalidê Licewî (Xuldî) tên ku bi cureya fablê nivîsîne. Hin ji van helbestvan û nivîskaran helbestên xwe bi kêşa erûzê nivîsîne hin ji wan bi kêşa birgeyî û hin ji wan jî bi terza helbesta serbest nivîsîne. Di edebîyata Kurmancî de fablên menzûm bi teşeyên cûr bi cûr yên weke; malik, sêyîne, çarîne û teşeyên dinê hatine nivîsîn. Herwiha di nav van teşeyan de jî bi formên cûr bi cûr fabl hatine nivîsîn.

Fablên Kurmancî hem bi awayê menzûm hem jî bi awayê pexşan hatine nivîsîn. Lê dema em li nimûneyên berdest dinêrin bi gelemperî helbestkî ango menzûm hatine nivîsîn. Kêm be jî em rastî nimûneyên pexşan tên. Osman Sebrî çendîn çîrokên xwe yên cureya fablê bi awayê pexşan nivîsîye. Helbet di serdemên dawî de gelek nimûneyên pexşan hatine nivîsîn, lê ji ber ku ew derveyî xebata me ne em dê behsa wan nekin.

Dema em li fablên Kurmancî mêze dikin di hinan de heywan bi heywan re diaxive û di hinan de jî helbestvan bi heywanan re diaxive û di hinan de jî helbestvan bi tiştên ne gîyanbar re diaxive. Dema em li fablên Kurmancî mêze dikin tê dîtin ku bi piranî lehengên wan heywan in. Weke; Bilbil, rovî, dîk, gur, çeqel, ker, quling, mirîşk, şêr, kevjal, deve, kew, mişk, pisîk, mar, meymûn, qijnîk û mêşhingiv û hwd. Ev heywan ji bo vegotina fikra helbestvan dibin navbeynkar ango ew fikrên ku nivîskar bi awayekî aşkere nikare bibêje bi rêya ajal, riwek û tiştên din tîne ziman.

Di nav fablên Kurmancî de em rastî fablên ku mijara wan tesewifî, sîyasî, şîret, dersdayîn û derbaskirina xweşwextîyê tên. Lê bi piranî fabl ji bo vegotina fikreke sîyasî hatine nivîsîn.

2. DÎ EDEBÎYATA KURDÎ DE HELBESTVANÊN KU FABL NİVÎSÎNE

Di edebîyata Kurdî Kurmancî de hem di edebîyata klasîk û hem jî di edebîyata gelêrî de fabl hatine nivîsîn. Dema em li edebîyata klasîk a Kurmancî mêze dikin kesên weke Feqîyê Teyran, Şêx Eskerî, Şêx Muşerrefê Xinûkî, Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Mela

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

Silêman, Mela Husnî Hezin û Seyda Mela Xalidê Xuldî bi cureya fablê helbest û berhem nivîsîne. Li gorî daneyên li ber dest di nav edebîyata Kurmancî de cara ewil cureya fablê di nav helbestên Feqîyê Teyran de têne dîtin.

Herwiha kesên weke; Osman Sebrî, Mela Xalitê Licî, Sebrî Botanî û Seydayê Dilmeqes bi cureya fablê helbest nivîsîne. Li jêr em dê helbestvanên ku bi cureya fablê nivîsîne bidin naskirin û nimûne ji fablên wan bidin.

2.1. Feqîyê Teyran

Feqîyê Teyran helbestvanekî Kurd e û di sala 1632an de hatiye dinyayê. Navê wî yê rastî Muhemmed e. “Feqî” mexlesa wî ya helbestê ye. Di nav gel de bêtir weke “Feqî” hatiye nasîn (Sadînî, 2014, n.r. 11-54).

- Ey Av û Av:

  Em di dîwana Feqîyê Teyran dibînin ku Feqî ji bilî ajalan bi avê re jî axivîye. Helbesta wî ya “Ey av û av” cureyeke fablê ye û ev helbest ji 51 malikan pêk hatiye. Ev fabla Feqî li ser mijara tesewifê ye. Malika ewil û ya dawî ya helbesta “Ey av û av”ê weha ye:

  Ey av û av ey av û av ma tu bi ‘işq û muhbetê
  Mewc û pêlan tavêy belav bê sekne û bê rahetê
  …
  Gava Feqe xwe têk dida pêla pêş xwe lˈ stû dida
  Feqe girt û lˈ erdê dida go: Her bimre lˈ xisaretê (Sadînî, 2014, n.r. 111-126).

- Feqe û Bilbil:

  Ev çîroka Feqîyê Teyran 20 sêyîne ye û helbest 14 kiteyî ye. Feqî di vê helbesta xwe de bi Bilbil re diaxive. Benda ewil û ya dawî ya fablê weha ye;

  Bilbil dibê awazan xirab carek xuya kir
  Bes bike şi‘r û sazan ateş li min te rakir
  Çend didî fir û bazan j’ te ra nîn in çu agir
  …
  Em dê biçîn j’ oldaş e navê mê dê bimîne
  Umrê me çû belaş e çu feyde me nedîne
  Ger qewlê me bibêjî Fatîhe j’ bo me bixwîne (Sadînî, 2014, n.r. 147-156).

2.2. Şêx Eskerî

Şêx Eskerî di sala 1898/1899an de li gundê Axtepê hatiye dinyayê û di sala 1952an de wefat kiriye. Şêx Eskerî kurê Şêx Ebdurrehmanê Axtepî ye. Şêx Eskerî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û piştî wefata bavê xwe li cem birayê xwe Şêx Kerbelayî xwendina xwe domandiye. Şêx Eskerî li gundên weke Hilêrê û li gundê Birsînê maye. Şêx Eskerî li dû xwe du pirtûk hiştiye. Yek ji wan pirtûkan Iqdê Durfam e û ya din jî Dîwana wî ye. Iqdê Durfam pirtûkek fable û behsa çîroka Qijik û Rovî dike û ev berhem bi tevahî 2579 malik e (Eskerî, 1989, n.r.5-6). Ji ber ku ev berhema Şêx Eskerî weke mesnewî hatiye nivîsîn di destpêkê de beşên weke; Tewhîd, Nûra Muhemmed, Saqî-Name, Sebebê Nezma Kîtab, Fezîleta Sebrê cih digirin. Beşa çîrokê di bin serenavê “Gotina Hinek Hîkayeyê Pîr ‘Eqil û Bijartina Çîroka Qijik û Rovî” de cih digire. Ji ber vê yekê em dê nimûneyên malikên serê beşa navborî bidin.

Bide ey saqîyê nûra du ‘eyn im
Giran bûye li min xem barî deynim
…

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Muweffeq ke di rahê dîlbera pak
Li dunya û li 'uqba dil nebim çak (Eskerî, 1989, n.r.69-170).

2.3. Cegerxwîn

Cegerxwîn di sala 1903an de li gundê Hesarê yê bi ser Kercewsê ve hatiye dinyayê û di sala 1984an de li Stocholmê wefat kiriye. Wî bi terza klasîk helbestên xwe nivîsîne. Di nav helbestên wî de em rastî cureya fablê jî tên. Cegerxwîn çendîn helbestên xwe bi vê cureyê hûnandiye. Fablên ku Cegerxwîn nivîsîne ev in:

- Serxwebûna Mirîşkan:
  Ev fabla Cegerxwîn bi tevahî ji 47 malikan pêk hatiye. Helbest bi kêşa birgeyî ya 7 kiteyî hatiye nivîsîn. Destpêk û dawîye helbestê weha ye:
  Li welatê me Xerza
  Dîkek hebû şehreza
  ...
  Wek seydayê Cegerxwîn
  Hemî bûne dilbirîn (Cegerxwîn I, 2018, nr.107-109).
- Kerê Reş:
  Ev helbesta Cegerxwîn bi cureya fablê hatiye nivîsîn. Helbest bi kêşa birgeyî û bi malikan hatiye nivîsîn. Serê fablê û dawîya wê weha ye:
  Du bihara sala par
  Ro di esrê çûbû xwar
  ...
  Perîşan û dilbirîn
  Navê te bû Cegerxwîn (Cegerxwîn, 2018, r.197).
- Kevjal Nikarin Bifirin:
  Ev helbesta Cegerxwîn bi tevahî ji 34 malikan pêk hatiye. Helbest bi kêşa birgeyî ya 7 kiteyî hatiye nivîsîn. Serî û dawîya helbestê weha ye:
  Baz hilferî çûye jor
  Çend kevjalan xwe da dor
  ...
  Ev gotina Cegerxwîn
  Rast e, mebên bûye dîn (Cegerxwîn 2018, n.r.469-470).
- Zira Kerê Lota Devê:
  Ev helbesta Cegerxwîn bi tevahî ji 120 malikan pêk hatiye. Helbest bi kêşa birgeyî ya 7 kiteyî hatiye nivîsîn. Malika ewil û ya dawîya helbestê weha ye;
  Di mêrgê deve û ker
  Diçêrîyan ser bi ser
  ...
  Bi kêferat û zanîn
  Bidin şopa Cegerxwîn (Cegerxwîn, 2018, r.197).

2.4. Seydayê Tîrêj

Di sala 1923yan de li gundê Nicmê yê li herêma Qamişlokê hatiye dinyayê. Navê wî yê rastî Naîf e. Piştî xwendina xwe ya li cem aliman diçe Amûdê. Bi kesên weke; Cegerxwîn, Qedrîcan, Hesen Hişyar, Nûredîn Zaza re hevnasîna wî çêbûye û di bin tesîra

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

wan de maye. Seydayê Tîrêj li dû xwe çendîn berhem hiştine. Wî helbest, çîrok û mewlûd nivîsîne. Di sala 2002yan de li Hesekê wefat kiriye (Tîrêj, 2014, r.4).

Seydayê Tîrêj bi cureya fablê helbest nivîsîne, helbestên Tîrêj yên ku bi cureya fablê hatine nivîsîn ev in;

- Kewa Gozel:

  Ev helbesta Tîrêj ji 17 malikan pêk hatiye. Di vê helbestê de Tîrêj bi Kewa Gozel re dipeyîve. Malika ewil û ya dawîya helbestê weha ye:

  Ji ber pacê xwe bid alî geroka gund û cîrana
  Bi min xwîna te pir talî te naxim şi’r û dîwana
  …
  Du laş in em bi yek canî nema têm te bi erzanî
  Tîrêj darê xwe va danî di vê rê de yek in ana (Tîrêj, 2014, r.287-288).

- Mûyekî Sipî:

  Ev helbesta Tîrêj bi malik û çarîneyan hatiye nivîsîn. Helbest ji 12 malik û ji 19 çarîneyan pêk hatiye. Herwiha her çarîneyek di navbera “Tîrêj û Mû” de weke danberhevekê ye. Tîrêj di vê helbesta xwe de bi Mûyekî Spî re diaxive. Ev fabl ji alîyê lehengên xwe ve ji fablên din cudatir e, lewra di fablên de gelemperî ajal bi ajalan re an jî helbestvan bi ajalan re diaxive, lê di vê fablê de Tîrêj bi Mûyekî Spî re diaxive.

  Xort û ciwan bûm emrê mi sih sal
  Bayêm bilind bû ne xem û xeyal
  …
  Tu şûrê heq e ji genca yezdan
  Da der ji nîva nîqab û perdan
  Wê çi b’ke Tîrêj darê xwe danî
  Tu dest li ber te nayêne hildan (Tîrêj, 2014, r.329-333).

- Gur û Rovî:

  Ev helbesta Tîrêj bi awayê malikan hatiye nivîsîn û bi tevahî 68 malik e û 7 kiteyî ye. Helbestvan di vê fablê de behsa çîroka Gur û Rovî dike. Malika ewil û ya dawîya helbestê weha ye:

  Dibê ji çayê Şingal
  Ji Newala Pîr Kemal
  …
  Tîrêj bi agehdarî
  Ev helbest kir dîyarî (Tîrêj, 2014, r.363-364).

- Ez û Bilbil:

  Ev helbesta Tîrêj bi çarîneyan hatiye nivîsîye û bi tevahî 16 çarîne ye û 8 kiteyî ye. Destpêk û dawîya helbestê weha ye:

  Sorgul di baxan bikivin
  Mizgîn li bilbil bû buhar
  Çendik didan dora gulê
  Şebnem li ser xuncê vexwar
  …
  Ey bilbilê mest û hezîn
  Hinga li me tê hev birîn
  Pir xweş dibin işq û evîn

Zakho Centre for Kurdish Studies

Der tên ji dil ev pêt û ar (Tîrêj, 2014, r.471-473).

- Mişk û Pisîk:

Ev helbesta Tîrêj bi malikan hatiye nivîsîn û bi tevahî ji 12 malikan pêk hatiye û helbest 7 kiteyî ye. Tîrêj di vê helbesta xwe de li ser çîroka Mişk û Pisîkê sekiniye. Destpêk û dawîya fablê weha ye:

Pisîk hat ber derê mişk
Bi girî û bi fişfişk
...
Tîrêj dibê mêr û jin
Nebin bawer bi dijmin (Tîrêj, 2014, r.478)

2.5. Şêx Muşerrefê Xinûkî

Şêx Muşerrefê Xinûkî di sala 1926an de li bajarê Sêrtê li qezaya Berwarî/Xesxêrê li gundê Xinûkê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Şêx Es‘edê Sanî ye. Şêx Muşerref xwendina xwe ya ewil li cem bavê xwe xwendiye. Piştî ku Qur’anê xitim kiriye, mewlûd, Nûbihara Biçûkan û Nehcu’l-Enam xwendiye. Piştre pirtûkên din yê medreseyê xwendiye. Şêx Muşerref li cem kesên weke; Mela Ebdullahê Saruhî, Mela Teyyîbî, Mela Ebdulhekîmê Helenzî, Şêx Mustafayê Hemzewî, Mela Ebdulhekîm, Şêx Es‘edê bavê xwe xwendiye û ji bavê xwe û ji Mela Ebdulhekîm îcazet wergirtiye. Piştî ku xwendina xwe diqedîne li gundê Rubarê dest bi melatîyê kiriye. Li wir medreseyekê vekiriye û dest bi dersdayînê kiriye. Şêx Muşerref li dû xwe gelek berhem hiştiye û bi Kurdî jî dîwanekê nivîsîye. Şêx Muşerrefê Xinûkî di sala 2008an de rehmet kiriye (Sönmez, 2018, r. 9-15). Em di dîwana Xinûkê de jî rastî cureya fablê hatin.

- Ezê Rojekê Çûme Baġê Wisal:

Ev helbesta Şêx Muşerrefê Xinûkê ji malikan pêk hatiye û bi tevahî 26 malik e. Di vê helbestê de helbestvan li ser şerê Gul û Nêrgizê radiweste. Helbest bi kêşa ‘erûzê û bi qalibê “Fe‘ûlun / Fe‘ûlun / Fe‘ûl”ê hatiye nivîsîn.

Ezê rojekê çûme baġê wiśal
Geram ez di wêda bi miŝlê ġezal
...
Îlahî bike meskenê Mîm Fa
Ewî baġê pir lezzet û hem śefa (Sönmez, 2018, n.r. 218-220).

2.6. Mela Silêman

Mela Silêman Kurşun di sala 1952yan de li Kercewsa Batmanê li gundê Midêlbê hatiye dinê. Di sala 1968an de piştî ku Qur‘anê hifz dike dest bi tehsîla zanistên Îslamî dike. Li cem kesên weke Mela Îsmaîl, Şêx Fehrettîn, Mela Remezan, Şêx Mihmmedê Erebkendî dixwîne û îcazeta xwe ji Şêx Mihemmedê Erebkendî werdigire. Mela Silêmanê Kurşun mideristî kiriye û talebeyan perwerde kiriye. Mela Silêman xwedî Dîwan û Mewlûdekê ye (Kurşun, 2002, r. 10).

- Komara Daristanê Welatê Sosreta Fermandarîya Şêr û Meymûnê:

Ev helbesta Mela Silêman bi malikan hatiye nivîsîn û bi tevahî 64 malik e û helbest 14 kiteyî ye. Di vê helbestê de Mela Silêman li ser çîroka Şêr û Meymûnê disekine. Destpêk û dawîya helbestê weha ye:

Bê dewletî qe nabe heya di nav heywana
Çi rawir û cenawir şêr e serokê wana

…
Çi rêxistin, çi sazî, çi dewletên li ser me
Wekî berê me gotî bo me fihêt û şerm e (Kurşun, 2002, n.r. 127-133).

2.7. Mela Husnî Hezîn

Mela Husnî Hezîn di sala 1943yan de li gundê Tûmikê ku li ser navçeya Gixiyê ya Çebexçûrê hatiye dinyayê û di sala 2022yan de wefat kir. Li cem bavê xwe Feqî Zeynel Qur'an û mewlûd xwendiye. Paşê li cem kesên weke; Şêx Mihammed Hadîyê Qewmanî, Mesût Efendî, Şêx Muhyeddîn, Şêx Masûm, Mela Xelîlê Qizilpare, Caferê Balekî, Şêx Ehmedê Xezna, Mela Ebdullahê Muderris û li cem Şêx Mihemmedê Erebkendî xwendiye. Îcazeta xwe ya ilmî ji Şêx Eladîn wergirtiye. Mela Husnîyê Hezîn li dû xwe gelek berhem hiştine. Wî bi zimanên weke; Erebî, Tirkî û Kurdî berhem dane (Hezîn, 2011, r.5). Mela Husnîyê Hezin xwedî Dîwaneke Kurdî ye jî. Em di nav helbestên wî de rastî cureya fablê jî tên.

- Dudoyîn:
  Ev helbesta Mela Husnîyê Hezîn bi malikan hatiye nivîsîn û bi tevahî 11 malik e. Destpêk û dawîya fablê weha ye:
  Hilo, got leglegê: Ey paqdirêjê
  Neçarê, stûxwarê, kerr û gêjê
  …
  Kesê wek te heramxwar be tu carî
  Mirov li wî dike pirs û dîyarî (Hezîn, 2011, n.r. 27-28).
- Stran:
  Ev helbesta Mela Husnîyê Hezîn bi tevahî 3 malik e û 16 kiteyî ye. Di vê helbestê de taybetîyên çend ajalan ji alîyê wan ve tê vegotin. Destpêk û dawîya helbestê weha ye:
  Şêrê bi heft bavê xwe şêr dawa şêrîtî naketin
  Tûleyê heftê bavkûçik 'ew 'ew diket "her şêr im ez
  …
  Werşeq digel pirr sivik e dîsa xwe giranbez dizan
  Kosiyê şeqkin ê reben dibêje: "rê da, ba me ez" (Hezîn, 2011, r. 43.)
- Rovî û Qijnîk û Kûsî:
  Ev helbesta Mela Husnîyê Hezîn ji 26 malikan pêk hatiye û 11 kiteyî ye. Malika ewil û ya dawî ya fablê weha ye:
  Rojekê kûsî û qijnîk û rovî
  Bi hev ra bûn bira û bûne hêvî
  …
  Bi bazdanê jî huner nayê zanîn
  Bide ber çavê xwe maran û gêlan (Hezîn, 2011, n.r. 188-190).
- Pîrik:
  Ev helbesta Mela Husnîyê Hezîn ji 37 malikan pêk hatiye û 11 kiteyî ye. Destpêk û dawîya fablê weha ye:
  Halê pîrîka zana vay' dibêje
  Guhdarî ke nebe wek kerr û gêje
  …

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Rovî terk kir ji tirsan ew welata
Qijnîkê ra ma ew nav û xelata (Heznî, 2011, n.r. 191-194).

2.8. Mele Xalidê Licî

Xalidê Saetçî (Mayî) ji Licê ji Mala Remo ye, paşnavê wî Ayçiçek e û di sala 1934an de hatiye dinyayê. Di 4-5 salîya xwe de dest bi xwendinê kiriye û di 1945an de di 10 salîya xwe de çûye gundê Elîbardaxa û li ba Seyda Mela Kemalê Elîbardaxî xwendîye. Paşê jî di Payiza sala 1946an de diçe Karazê ba Seyda Mela Îsmetullah û heta sala 1949an 4 salan ji seyda ders wergirtine. Xalidê Saetçî jî bi terza klasîk helbestan dinivîse. Kitêbeke wî ya çîrokên biqafîye, bi navê “*Serpêhatîyê Zana*” hatiye çapkirin. Mela Xalid li Sûra Diyarbekirê debara xwe di dikaneke biçûk de bi tamîra saetan dike (Karak, 2020, r. 48-49). Herwiha di nav helbestên wî de em rastî du fablên menzûm jî hatin.

- Kew û mar dibin yar?:
  Ev helbesta Mela Xalidê Licî bi malikan hatiye nivîsîn û bi tevahî 85 malik e. Mela Xalidê Licî di vê fablê de li ser çîroka Kew û Mar disekine. Destpêk û dawîya fablê weha ye:
  Heta çiyaê adem marek reşê bê îman
  Xunxwer û kedxwer û zor dikir nêçîra kewan
  ...
  Ê bindest û belengaz heta nebin wek kewan
  Ê kedxwer ê xunmij dê bimijin her biwan (Remo, 2013, n.r. 3-10).
- Rovîyê Fenek:
  Mayî di vê fabla xwe ya menzûm de gelek ajal bi hev re daye axaftin û bûyer li derdora ajalan diqewime. Ev helbest bi tevahî 581 malik e û 7 kiteyî ye. Destpêk û dawîya helbestê weha ye:
  Hebû rovîkî fenek
  Jîr û zana bû gelek
  ...
  Weka teyran difin
  Wek sîxuran digerin (Licî, 2011, n.r. 127-200).

2.9. Osman Sebrî

Osman Sebrî di sala 1905an de li gundê Narînceya Kolika Semsûrê ji dayîk bûye. Di sala 1993an de li Şamê wefat kiriye û gora wî li gundê Berkevirê ya li Binxetê ye (Sebrî, 2011, r.4). Wî gelek helbest û çîrok nivîsîne. Hin ji wan çîrokên wî bi cureya fablê hatine nivîsîn. Osman Sebrî hem fablên menzûm hem jî yên pexşan nivîsîne. Fablên Osman Sebrî ev in:

Yên pêxşan: Şêrek bi Darekî, Hevalîya Keran, Rovîyê Ehmeq, Ker û Kovî, Şêr û Rovî û Hevalîya Şêr û Gur û Rovî (Sebrî, 2011, r.84-236).

Yên menzûm: Dîk û Rovî, Gurê Pîr, Dongîya Çeqel, Rovîyê Jîr, Tevdira Mişkan, Rovîyê Ker, Quling, Ker û Azadî, Serê Şêr, Kerê Dengbêj û Kûçikê Bekiran (Sebrî, 2004, n.r. 141-169). Em dê li jêr du fablên Osman Sebrî weke nimûne bidin.

- Dîk û Rovî:
  Ev fabla Osman Sebrî ji 14 malikan pêk hatiye û 8 kiteyî ye. Destpêk û dawîya helbestê weha ye:
  Dîkek hebû qiros û xist,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Rabû li ser dîwêr vemişt.
...
Gava ko dîk halê wî dî
Şa bû dikir qîqxî qîqî (Sebrî, 2004, r. 141)

- Gurê Pîr:
  Ev fabla Osman Sebrî ji 43 malikan pêk hatiye û 7 kiteyî ye. Destpêk û dawîya helbestê weha ye:
  Dibên li nav xidirsor
  Di binhêla Kawê jor
  ...
  Gurê pîr zik kir texer
  Bi tevdîra gurê zer (Sebrî, 2004, r. 145).

2.10. Sebrî Botanî

Sebrî Botanî an jî Sebrîyê Ehmedê Temir helbestvan û nivîskarekî Kurd e. Sebrî Botanî di sala 1925an de li gundê Lodê yê navçeya Dihê hatiye dinyayê. Wî di gelek rojname û kovarên Kurdî de li ser mijarên cûrbicûr nivîs nivîsîne. Sebrî Botanî koçî Norwêcê kiriye û hetanî dawîya temenê xwe li wir maye. Botanî di sala 1998an de li Osloyê wefat kiriye.

Botanî li dû xwe berhemên weke; *Şîn û Şadî, Dilistan, Dengê Metîn û Cûdî, Dibêjin* û nêzîkî deh pirtûkên ku hêj nehatine weşandin hiştiye (Bernamegeh, 2019). Sebrî Botanî di pirtûka xwe ya bi navê *Şîn û Şadî* de cih daye şeş fablên Kurmancî yên menzûm. Fablên wî ev in: Gulbihar û Mêşa Hingiv, Gulbihar û Bilbil, Gulbihar û Kotir, Gulbihar û Pelîtank, Gulbihar û Xalxalok, Gulbihar û Kew. Em dê li jêr behsa hin fablên wî bikin.

- Gulbihar û Mêşa Hingivînê:
  Ev helbesta Sebrî Botanî ji 34 malikan pêk hatiye û 7 kiteyî ye. Di vê fablê de Gul û Mêşa hingiv diaxivin. Destpêk û dawîya helbestê weha ye:
  Ka ew hing᾽vînê cara᾽
  Di nav wan teht û dara᾽
  ...
  Di gel maç û silava᾽
  Xwedê mala te ava (Botanî, 2002, r. 19).
- Gulbihar û Bilbil:
  Ev helbesta Sebrî Botanî ji 17 malikan pêk hatiye û 7 kiteyî ye. Tê de Gul û Bilbil diaxivin. Destpêk û dawîya fablê weha ye:
  Bilbilo hunermendo
  Bêzincîr û bêqeydo
  ...
  Vêk ra qêr kîn narînka᾽
  Ez naxwînim Yasînka᾽ (Botanî, 2002, r.22)
- Gulbihar û Kotir:
  Ev fabl jî ji 47 malikan pêk hatiye û 7 kiteyî ye. Helbestvan di vê fabla xwe de Gul û Kevokê dide axaftin. Destpêk û dawîya fabla Sebrî Botanî weha ye:
  Kevoka haş û kedî

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Binivîse her çi te dî
...
Janê avêt vî dilî
Ez ji kê bikim gilî? (Botanî, 2002, r.58).

2.11. Seydayê Dilmeqes

Seydayê Dilmeqes di sala 1932yan de li Amedê ji dayîk bûye. Navê wî Mela Remezan e û bi eslê xwe ji gungê Şêxana Çixurê ye. Çixur herêmeke di navbera Bedlîs û Mûşê de ye. Navê bavê wî Emer e û Emer jî kurê Mihemmed e. Seydayê Dilmeqes xwedî Dîwaneke Kurdî ye (Dilmeqes, 2009, r. 294) û di Dîwana wî de helbestên fabl jî hene. Fablên ku di dîwana Dilmeqes de derbas dibin ev in:

- Ez û Gur:
  Ev helbesta Seydayê Dilmeqes ji 10 malikan pêk hatiye û 10 kiteyî ye. Destpêk û dawîya fablê weha ye:
  Ez derketim, diçûm ba yar
  Di nava daristan, şavî û dar
  ...
  Te min bi Meqes kir birîndar
  Ji dest min xilas nabî turê har (Dilmeqes, 2009, r. 122).
- Gur û Ker:
  Ev fabla Seydayê Dilmqes 60 malik e û 12 kiteyî ye. Destpêk û dawîya fablê weha ye:
  Gûr çû ba keran got ji wan re merheba
  Em ê çêkin peymanek di nava xwe da
  ...
  Keftar û rovî dilê min ê birîndar dîsa
  Bi hev ra dane ber hevring û meqesa (Dilmeqes, 2009, n.r. 144-149).

- Ker û Miftîxane:
  Ev helbesta Dilmeqes ya fabl bi tevahî 14 malik e û 9 kiteyî ye. Destpêk û dawîya fablê weha ye:
  Ker daxwaznameyek nivîsî
  Bi hêvî çû dadgehê ba qadî
  ...
  Jê ra hêvî heye ew bi ser keve
  Ji dadgehê bê maf dernekeve (Dilmeqes, 2009, n.r.178-179).

2.12. Mela Nezîrê Tizyanî (Xemgîn)

Mela Nezîr di sala 1919an de li gundê Tizyana (Elmabahçe) Mêrdînê hatiye dinê. Navê wî yê eslî Nezir Aydın e û ji ber ku melatî jî kiriye weke Mela Nezîr jî hatiye naskirin. Navê bavê wî Mela Evdirrehman û yê diya wî jî Henîfe ye û ji eşîra Surgucîyan e. Mela Nezîr li gelek bajar û di gelek medreseyan de li ber destê gelek seyda û melayan xwendiye. Piştî xwendina li medreseyan, îcazeta xwe ya ilmî ji Mela Hesenê Tawîkî (1888-1963) wergirtiye. Dîwançeyeke wî bi Kurmancî heye û di Kovara Hawarê de fableke wî bi navê Welatê Tiriviriyan hatiye weşandin (Zengenî, 2021, r. 48-69).

- Welatê Tiriviriyan:

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Ev menzûmeya Xemgîn ji 43 malikan pêk hatiye û 7 kiteyî ye.
Dibêjin ji Serhedan
Heya dighê Amedan
...
Çîrçîrok çû diyaran
Rahmet l'bavê guhdaran (Zengenî, 2021, r. 48-69)

3. SEYDA MELA XALIDÊ LICEWÎ (XULDÎ)

Navê fermî yê Seyda Mela Xalidê Licewî, Halit Korkusuz e û di helbestên xwe de mexlesên Xuldî, Xuleyd û Xalid bi kar anîye. Seyda Mela Xalid di sala 1940î de li Licê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Hecî Huseyn e û navê kalê wî Çerkez e. Malbata Xuldî nêzîkî 430 sal berê ji qesebeya Zerkanê ku îro dikeve nav sînorên Urdinê koçî navçeya Tekmana Erziromê kirine (Bişaroğlu, 2021, n.r. 435-436).

Seyda Mela Xalidê Xuldî di sala 1947an de li ba Mela Xelîl di heft salîya xwe de dest bi perwerdeya xwe kiriye û di deh salîya xwe de bûye hafiz. Wî ev yek di helbestên xwe de anîye ziman. (Bişaroğlu, 2021, r. 437) Seyda Mela Xalid ji ber ku perwerdeya medrseyê wergirtiye xwendina xwe ya fermî ji derve ve xelas kiriye. Wî ji kesên weke; Mela Xelîl Efendî, Mela Mihemedê Reş, Seyda Mela Hiseynê Küçük, Seyda Mela Hecî Ebdulfettah û Şêx Ebdulkerîm el- Muderîs perwerde girtiye.(Aşan, 2021, r. 1074)

Xuldî piştî ku perwerdeya xwe xelas kiriye di sala 1959an de li Şemrexa Mêrdînê weke melayê fermî dest bi wezîfeyê kiriye. Piştî ku di sala 1960î de ji leşkerîyê vegerîyaye li Licê weke mamosteyê kursa Qur'anê hatiye tayînkirin. Xuldî di ezmûna miftîtîyê de bi ser dikeve û weke miftiyê navçeya Tekmana Erziromê tê tayînkirin. Piştre bi salên dirêj li İzmîrê karê Waîztîyê dike.

Xuldî gelek kes perwerde kirine hin ji van xwendekarên wî ev in: Nihat Hatipoğlu, Mela Ekrem, Ehmed Efendî, Zafer Koç, Muhammed İnceoğlu, Mehmet Çiftçi, Mela Ehmedê Liceyî, Mola Ebdullah û gelek alim û akademîsyên din. Xuldî piştî emrekî ku di nav ilm û zanînê de bihurandîye di sala 2011an de ji ber nexweşîya pençeşêrê li Îzmîrê wefat kiriye û li Licê hatiye veşartin. (Bişaroğlu, 2021, r.437-438)

Seyda Mela Xalidê Licewî helbestvanekî piralî bûye, lewra wî hem berhemên edebî nivîsîne hem jî berhemên ilmî. Xuldî li ser mijarên cur bi cur helbestên Kurdî jî nivîsîne, ev helbestên wî heta niha weke dîwanekê bi rêk û pêk nehatine tertîpkiririn û weşandin. Dîwana Xuldî di xwe de nêzîkî 100 helbestî dihewîne û piranîya helbestên Xuldî bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn, ji ber vê yekê jî piranîya helbestên wî dirêj in. Xuldî helbestên xwe di sê defteran de berhev kirine û di dawîya defteran de ji bo helbestên xwe fîhîrîst amade kiriye.

Seyda Mela Xalidê Licewî di helbestên xwe de mexles bi kar anîne. "Xuldî", Xalid û "Xuleyd"sê mexlesên Seyda Mela Xalidê Licewî ne ku ji navê xwe ev mexles pêk anîne. Xuldî ev mexlesên xwe di piranîya helbestên xwe de bi kar anîne. Em dê li jêrê çend mînak ji helbestên wî bidin ku tê de mexlesa wî derbas dibe.

Bi destê te durr û cewher û gûl man
Mîrî ey **Xuldiyê** bêkes tû zanî
(r.74- malik/21)
Ey **Xuleyd**ê bêkes û meḥrûm li dinya tim tenê
Te nedîtî xêr ji keskî ġeyrê ji Rebbê ʿalemê

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

(r.155- malik/39)[1]

Xuldî bi zimanên Erebî, Tirkî û Kurdî baş zanibûye û bi van zimanan berhem nivîsîne. Dema em li helbestên wî yên Kurdî mêze dikin em dibînin ku zimanê xwerû û zimanê gel e. Herwiha bêjeyên hemwate jî di nav helbestên wî tê dîtin (Ji bo agahîyên berfirehtir bnr: Bişaroğlu, 2021, r. 433-439). Li gor ku Güneş Ekmekçi Aşan dîyar dike Xuldî bi Erebî, Tirkî û Kurdî sê Dîwan nivîsîye (Aşan, 2021, r.1076). Dîwana wî ya Kurdî Kurmancî niha li ber destê me ye û em li ser xebatên xwe didomînin.

3.1. Fablên Xuldî

Helbestên Xuldî yên bi navê "Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra" û *"Mijûlîya Qulingê Wekilê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra"* weke fablên menzûm hatine nivîsîn. Ev her du helbest di destxetê de li pey hev wek du helbestan hatine nivîsîn. Herçiqas Xuldî ev helbest weke du helbestan bi nav kiribe jî dema mirov dixwîne bi aşkereyî tê dîtin ku ev helbest berdewama hev in û yek helbest e. Ji ber ku ev her du helbest li pey hev dihatin û ji alîyê naveroka xwe ve berdewama hev bûn, me ev helbest weke yek helbestekê nirxand û lêkolîna xwe li gor vê yekê kir. Di van helbestan de di navbera helbestvan û Quling de axaftinek derbas dibe.

3.1.1. Ji Alîyê Naverokî ve Fablên Xuldî

Ev helbesta Xuldî di cureya fablê de hatiye nivîsîn. Em dikarin vê helbestê bikin pênc beş. Di beşa ewil de Xuldî bangî Quling û hemû çûkên ku li ser axa Kurdan dijîn û derbas dibin dike. Bangî wan dike û dibêje dijmin xaka me, welatê me şewitandin tevî hemû çûk, heywan û însanan. Divê hûn werin bibin şahîd ku ev welatê xweş û şîrîn di bin zilma neyar de maye û tê tunekirin.

Di beşa duyem de vê carê Quling bersiva Xuldî dide û dibêje; Mamosteyê hêja dema ez ji Efrîka û Misrê ber bi Sîpanê ve hatim min dît ku hemû der reşayîye û kes xuya nake. Dema em nêzîk bûn me dît ku hemû derî şewitandine û xelk kuştine. Berê ev der çiqas xweş bû niha ji bo me hêlîn jî nemane û em holê mane. Quling sebebê vê rewşê ji Xuldî dipirse.

Di beşa sêyem de Xuldî careke din bersiv didê û dibêje; Welatê me ji alîyê dijmin ve hatiye şewitandin û ew ji bilî zimanê xwe tu zimanî qebûl nakin. Divê li ser rûyê erdê kes bi hawara me ve nehat û hawara me ma ji bo Xwedê. Xuldî bangî Qulingê dike û dibêje hûn ji bo me dia bikin belkî Xwedê ji bo xatirê we heqê me ji wan re nehêle.

Di beşa çarem de Quling bersivê dide Xuldî û dibêje; Mamoste çareya we yekbûn e. Divê hûn bibin yek û çareserî dê bi sîleh û dîplomasîyê çê bibe. Divê hem dia bikin hem jî êrîşê dijmin bikin

Di beşa pêncem de Xuldî dîsa bangî Qulingê dike û dibêje; Dibêje ey Qulingo ji bo me bicivin û berê xwe bidin jor û dia bikin da ku Xwedê alîkarîya me bike û me ji vê zilm û zordestiyê xelas bike û neyarê me têk biçe. Divê ey Quling bi hev re rabin tev dia bikin ku Xwedê azadî û serbestî bide Kurd û xaka Kurdan.

Dema em tevahîya helbestê dixwînîn mirov wisa hîs dike ku Quling li hemberî Xuldî ye û Xuldî jî kerba dilê xwe ji bo wî dirijîne û ji derdê xwe re çareyekî digere. Xuldî Qulingê xistiye dewsa mirovekî û rewşa welatê xwe bo wî vegotiye û bi vî awayî xwestiye xwendayên xwe hişyar bike. Bi hunerên întaq û teşxîsê helbestvan hêzeke xurt

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

daye vegotina helbesta xwe. Dema mirov vê helbestê dixwîne ew dîmena ku helbestvan behs dike li ber çavên mirov zindî dibe.

3.1.2. Ji Alîyê Rûxsarî ve Fablên Xuldî

Ev helbestên Xuldî bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn. Mesnewî di nav teşeyên nezmê de ku ji beytan pêk tên teşeyeke girîng û naskirî ye û wek cureyeke edebî jî qadeke berfireh a edebîyata klasîk a Îslamî ye. Di mesnewîyan de her malik di nav xwe de hemserwa ne (Adak, 2019, 245).

Xuldî herçiqas van her du helbestên xwe weke du helbestan nivîsîbe jî bi awayekî aşkere tê dîtin ku ev helbest yek in e û berdewama hev in. Helbestên Xuldî bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn, lêbelê di serwaya helbesta yekem de şikestin pêk hatiye ango hin malik di nav xwe de ne hemserwa ne. Herwiha ji alîyê kêşa xwe ve jî bi qusûr e. Ev helbesta yekem ji 21 malikan pêk tê. Di helbesta yekem de ji ber ku şikestin pêk hatiye û ne li gor qalibekî hatiye nivîsîn, kêşa wê tevlîhev e. Lê helbesta duyem ji serî heta dawî bi teşeya mesnewîyê û bi 14 kiteyan hatiye nivîsîn û ji 61 malikan pêk tê. Di serwa û serwabendîya wê de qusûr tune ye.

3.2. Metna Fabla Mela Xalidê Xuldî

Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra[2] (2)

1. Ey qulinga kerb û ġeman derd û bela û kederan
   Hêvî me heye tu bidî me bîn û dil û rehtiya kul û keseran

2. Bi narîn ê xwe yê nazik bi deng-awazê şewtandî
   Tu li me bi şewtîn can û ciger kezeba reş û pertandî

3. Gelek caran bi dengê te dibin mehzûn qulingo
   Ser dar û çiyan Dicle û Xêbûr û Firatan bi rengo

4. Serê te bilind û tu bilind çûy bi jore hevalo
   Melek hatin seyra dengê te bi awazê şîrîn delalo

5. Te li bin xwe qet mêze nekir û hem ji bo me qet rû neda
   Ka gelê Kurdan bûne mehrûm hem esîrê di benda

6. Ma qet te nedît Kîzê Kîkan Girê Kûkbe
   Te gûh nedaye çiyayê Kurdan bin Xêbûrê lew nebe

7. Ma qet te li Sîpanê nenêrî ey dost û qulingo
   Ev dar û ber û gol û hêşînayî qil û nego

8. Tevdek şewtîn tevlî tirûr û heywanê di nav da
   Çunku perê wan nîn bûn ku ew bifirin ji nav da

9. Ev çendî hezar sal e tê û diçî qulingo
   Gelê kû li Sîpanê temamê wan dihat kuştin qulingo

10. Destê xwe bide ser wicdane bibe şahid qulingo
    Ev cî yû warê te temam halê dikir wan e qulingo

11. Ma cara kû derbazî bibî li ser behra Wanê

Zakho Centre for Kurdish Studies

Ercîş û we Exlat û tevî Nemrûd û Wanê

12. Halê me ye xalis wek zêr e welatê me qulingo
    Insaf bike tu av û hewa'a gelê Kurdan e qulingo

13. Ey teyrê welatê me bikin wicdan bi enwa' û we hinan
    Tevde deng bi hev xin şahid in em bona welatê Kurdan

14. Carek ku ji kanîkê vexwî avê spas kî qulingo
    Bîr nabe tu car ev çêyî yû başîtî qulingo

15. Ey werdek û qaz û kewê şîrîn û xweşik hûn
    Tevdek bibin şahid ji bona gelê Kurdan hemî hûn

16. Rabin hewar kin tev bi hev ra hûn wekî **Xuldî**
    Ser hêlîn û daran bi hev ra tev bikin rindî

17. Ya Reb bes e bêj ev zalim û wehşîtiya kurê Tûran
    Imha bike tevdek ewana hem hilîne ji ʿerdan

18. Çêkin civatek tev bi hev ra can û qulingo
    Tevdek bibin yek cimle civatê tuyûran qulingo

19. Dengê xwe bilind kin bi awazê hezîn û xweşik qulingo
    Bal ʿerşê jor ve hûn diʿa kin tev bi hev ra qulingo

20. Ya Reb xelas ke gelê Kurdan hem bela de xelkê Tûran
    Bes e ev zilm û te'da zaliman rake ji ortê zaliman

21. Da kû hûn bibin ji bona xelkê me Kurdan
    Em jî bibin yek çêkin civat li hember neyaran

Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra [3]

1. Quling digot hewar e mamosta'ê pir hêja
   Heçî tiştê te gotî hemî rast e û hêja

2. Gava ku ez bilind bûm ji Efrîqa û Misrê
   Nîyeta min Sîpan bûn di nava vê biharê

3. Hêdî hêdî ez hatim wekî karwan li rahî
   Di nava erd û asman per û bazan li rahî

4. Temamê rê û derban di nava erd û esman
   Me derbaz kir bi hev ra heta welatê Kurdan

5. Me dî temamî reş bûn dar û ber û we dehlan
   Berê çiqas pir xweş bûn dar û berê Kurdistan

6. Kurdistana me xweş bûn me jê hêlînan çêkir
   Me cêlikê xwe fir xist Kurdistanê bi xêr kir

7. Me go îsal çend sal e nehatine em waran
   Qiyametek çêbûye li ser deşt û newalan

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

8. Quling digotin Seyda em pir tirsîn bi hev ra
Me go kesek nemaye di nav gelê di Kurda

9. Per û baz û qanadan hêdî hêdî me danîn
Gava ku em nêzîk bûn me dî hemî bi nalîn

10. Hezar baġ û di bostan digel dar û beran tev
Bûbûn ar û xwelî hem ji ew mirtî radbûn tev

11. Em mane tev heyirî ji bona vî welatî
Ev warê bab û kalan em tev çûn û dihatî

12. Sebeb çi ye mamosta welat îro mehzûn e
Welatî qet nema kes ne çûn e ne hebûn e

13. Li etrafan dinêrim heçî tiştê dibînim
Bigirî û fîġan în hewar û hem enîn in

14. Tu gundek qet nemaye digel dar û beran tev
Li dor gundan ne xuyaye dar û ber û heywan tev

15. Hêlîn û war xera bûn em jî mane li ortê
Li her derê tang û top ditirsin em ji ortê

16. Ev çi top firok in li van waran bi hêrsan
Bi çûndin û bihatin êrîş hanîn Kurdistan

17. Xuda heqan nehêle ustadê baş û nazik
Em jî ji wan ditirsin wek wehşê Tîc û Tacik

18. Qulinga derd û kerban rêwîka deşt û zozan
Tu pirs ke ji bab û kalan ehwalê qewmê Turan

19. Temamê xelkê dinya dibûn serbest û azad
Ji bil qewmê di Kurdan diman mehrûm û bê dad

20. **Xuldî** ji bo te bêje zilm û hirçîtîya wan
Xelkê Tûran neda wan heqê ziman û ezman

21. Qulinga xêr û bêran giran e derdê Tûran
Bi ŧang û ŧop û bomban êrîş hanî Kurdistan

22. Evan wehş û barbarî di nav dinyayê Tûran
Heqê muzîk û lisan qebûl nakin bo Kurdan

23. Ne serbest û azadî ne komar û rûzgarî[4]
Nadin ewan tu caran heqê xebat û karî

24. Qulinga baş û qencî guhdêr e gotinê min
Bi ah û zar û fîġan beyan ke gotinê min

25. Weqta ku gelê Kurdan dikir deʿwa heqê xwe
Hicûm hanîne ser wan bi barbar û wehşê xwe

26. Gundê Kurdan talan kir şewtandî dar û heywan
Qe xanîkî nehiştin şewtand û kuştin insan

27. Qulinga xweş-sedaʾê ez heyrana dengê te
Bi ʿibret tu binêre bibin qurban ji bo te

28. Kûrê Tûran hicûm kir bi tank û hem firokan
Di kuştî kal û pîran bi ġaz û hem bi topan

29. Gundan hemî şewtandin tevî xan û beraqan
Dar û beran şewtandin tevî mal û heywanan

30. Ev reşîya te dîtî di nava gund û dehlan
Kes nexuyaye li ortê newal û hem çiyan da

31. Bûk û qîza Kurdistan Liciya min a pir hêja
Çar teref bû agir dûman çûbûne bi rica

32. Qulinga xelkê Kurdan bi ah û kerb û fîġan
Xelkê Liciya te kuştin tevî mamosta çûkan

33. Şeş roj temam şewtandin dora Licê wan sendin[5]
Nêştin[6] kesek ku bêtin digel xelkê xeber din[7]

34. Hewara Xelkê Licyan tenê mabûn Yezdan e
Dikir hewar û fîġan dest rakirin Xudan e

35. Di kuştin karkerê xort digot evan Pekekan
Oġretmen û oġrencî tevdek mehsûr ew diman

36. Çi rojekî tarî bûn ji bo bûka Kurdistan
Xelkê Licya delalî dihat kuştin li çolan

37. Serserê wan dibarîn bomba û ġaz û kîmya
Dihat kuştin jin û mêr li nav beġçan û rîya

38. Qulinga firr û bazan tu fir de xweş bi bazan
Li warê xwe binêre sîsebana bi nazan

39. Hawîrdorê wê reş bûn çi kû şewtî temamî
Nema insan û heywan ji ortê rabû canî

40. Insan dikuştin insanan ji bo heq û ezmanan
Ezmanê ku Xuda da kûrê Tûran neda wan

41. Heqê heyatê nîne ji ġeyrê xelkê Tûran
Ne heq û ne xeberdan ne milk û mal û wicdan

42. Qulingo ey qulingo bake teyr û tirûran
Bira bicivin li hev ew çêkin civata teyran

43. Bi her deng û zimanî bi xwendin û fîġanan

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Gazî bikin Yezdan e ji bona gelê Kurdan

44. Belkî Xuda’ê Barî niyaz û hem duʿa we
Qebûl ke hem xelas ke gelê Kurdan ji bo we

45. Fir din bi rast û çep ve bi hawar û bi zarîn
Bi awaz û bi dengan hûn ban kin Rebbê jorîn

46. Diʿa we pir meqbûl e çunku hûn bê gunah in
Boy xatirê we teyran belkî em jî xelas bin

47. Çi kû alkar nema ye di nava qewmê dinya
Koma milletê dinya hevalî wehşê dinya

48. Nebû alkar ji bo me qulinga xweş-sedaʾê
Dibûn alkarê zalim komara vê dinyaʾê

49. Qulinga pir delalî digot mamosta **Xuldî**
Ez im hevalê derdan ji bona gelê Kurdî

50. Welê mamosta zanî gote gelî bibin yek
Çêkin civata rengîn bibin wek destekî yek

51. Bi yekbûnê û xebatê ev îşê ha wê çê be
Bi sîlah û dîplomat bi Ewropa wê çê be

52. Xebat kin hem diʿa kin êrîş kin hem diʿa kin
Selam bigrin diʿa kin bibin yek hûn diʿa kin

53. Em tev gazî Xuda kin bibên Hûma û Yezdan
Xelas ke tu ji zilmê temamê xelkê Kurdan

54. Bi dengê dawudî tu qulinga rûh û canan
Fîġan bide li erdan hetanî nav ezmanan

55. Hewar bike ji bo me ji bona heqê insan
Rabin seyrê melek tev diʿa bikin ji Yezdan

56. Bêjin eva qulingek şêrîn û nazenîn e
Dike gazî dikale fîġan û hem zarîn e

57. Ji bo xelkê bindestan qe malê wî tunîn e
Ser û nûklê xwe rakir bi bal ‘erşê jorîn e

58. Digot ya Reb xelas kî gelê Kurdan ji zilmê
Ji kuştin û şewtandin tu derxe wan bi rehmê

59. Qehhar û Zu’l-celalî ji bo neyarê zalim
Bi qehr û hem ġezeb ke Tûranê wehşê zalim

60. Quling bi hevra rabin li dora beytu’l-me‘mûr
Bikin diʿa ji bo me bibin temamî mesrûr

61. Xuda ya Reb bidî tu serbestî û azadî
Ji bo xelkê Kurdistan gelê **Xuldî** û Kurdî

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

ENCAM:

Di edebîyata cîhanê de fabl cureya naskirî û berbelav e. Dema em li edebîyata Kurdî ya Kurmancî jî mêze dikin em rastî cureya fablê tên. Li gor agahîyên li ber destê me di edebîyata Kurmancî de nimûneyên ewil ji alîyê Feqîyê Teyran ve hatine dayîn. Piştî Feqî gelek kesên din fablên menzûm û pexşan nivîsîne. Di edebîyata Kurmanc de hat dîtin ku herî kêm ji alîyê 13 helbestvanên Kurmanc ve fablên menzûm hatine nivîsîn. Ji alîyê van 13 helbestvanan ve 42 fablên menzûm hatine nivîsîn. Di nav van fablên Kurmancî hem kêşa erûzê hem jî ya birgeyî hatiye bikaranîn. Herwiha helbestvanê ku herî zêde fablên menzûm nivîsîye Osman Sebrî ye. Me di vê xebatê de 11 fablên Osman Sebrî tesbît kirin. Herwiha Şêx Eskerî berhema xwe ya bi navê "Iqdê Durfam" bi tevahî weke fableke menzûm nivîsîye. Mela Xalid jî dîsa bi 581 malikan fableke menzûm nivîsîye. Seydayê Tîrêj fabla xwe bi teşeyeke cuda weke danberhevekê nivîsîye.

Dema em li fablên Kurmancî mêze dikin, gelemperî ajal bi ajalan re diaxivin an jî helbestvan bi ajalan re diaxive. Lê kêm be jî tiştên derveyî mirov û însanan jî di fablên Kurmancî de weke leheng cih digirin. Di van menzûmeyan de gelek ajal weke lehengên fablê derdikevin hemberî me weke; Bilbil, rovî, dîk, gur, çeqel, ker, quling, mirîşk, şêr, kevjal, deve, kew, mişk, pisîk, mar, meymûn, qijnîk û mêşhingiv. Herwiha ji bilî ajalan di fablên Kurmancî de gul, mû û av jî weke lehengên fablan derdikevin hemberî me.

Dema mirov li gelemperîya fablên cîhanê mêze dike tê xuyan ku ji bo armancekê û ji bo peyam dayînekî hatine nivîsîn. Carinan ev peyam vegotina başî û xerabîyê ye carinan şîretdayîn, carinan jî vegotina fikreke şexsî ya nivîskar bi xwe ye.

Di edebîyata Kurdî de jî em rastî fablên tesewifî, fablên ji bo dersdayînê, fablê ji bo xweş-wext derbaskirinê û rastî fablên sîyasî tên.

Seyda Mela Xalidê Xuldî jî du fablên menzûm nivîsîne. Ev her du helbestên wî yên bi navê *"Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra"* û *"Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra"* di cureya fablê de ye û bi tevahî ji 82 malikan pêk hatine. Di wezna helbesta wî ya bi navê *"Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra"* şikestin çêbûye û ji alîyê wezbê ve bi qusûr e. Helbesta wî ya bi navê *"Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra"* jî ji serî heta dawî bi 14 kîteyî hatiye nivîsîn.

Di fablên Xuldî de jî em rastî peyameke veşartî tên ku ew dixwaze gelê xwe bi rêya Qulingê hişyar bike û rewşa welat ji bo wan bide zanîn. Ew tiştên ku Xuldî bi awayekî aşkere nikare bibêje an jî nabejê bi rêya fablê tîne ziman.

ÇAVKANÎ:

Altan, A., Metin, G., Babadağ, O., Polat, F. (2021). *Türk Dili ve Edebiyatı 1*. Ankara: Ankara Meb. Yayınları.

Aşan, E. G. 2021, 'Seyda Molla Halid Korkusuz'un Ilmî ve Edebî Kişiliği, *e-Şarkiyat*, Cilt 13, hej. 3, n.r. 1071-1089.

Bernamegeh. (2019). https://www.bernamegeh.org/2019/08/18/jiyana-sebri-botani/ (dema gihandinê: 19.02.2022)

Bişaroğlu, S. (2021). *Di Edebîyata Kurdî de Mesnewîyek "Eshabê Kehf"ê.* Ashâb-ı Kehf Şehri Lice (Tarih, Edebiyat, Kültür) Sempozyumunda Sunulan Bildiri. Dicle Üniversitesi. Diyarbakır, Türkiye, 26-28 Mayıs.

Botanî, S. (2002). *Şîn û Şadî*. Stokholm: Weşanên Nefel.

Cegerxwîn. (2018). *Ronahî li Pey Tarîyê ye Cilda I*, Diyarbekir: Weşanên Lîs.

Cegerxwîn. (2018). *Ji Min Dil Bir bi Carek Cilda II*, Diyarbekir: Weşanên Lîs.
Çıkla, S. 2009, 'Şiir ve Hikâye Çevresinde Oluşan İki Tür: Manzum Hikâye ve Öykü-Şiir', *Tübar Dergisi*, Hej. 25. r. 51-85.
Dilmeqes, S. (2009). *Dîwan*. Berlin: Weşanên Dilop, Berlin.
Duman, M., (2019) *Di Helbestên Cegerxwîn de Ajal*. Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, Tirkiye.
Eskerî, Ş. (1989*). Iqdê Durfam*. Stocholm: Weşanên Apec-tryck &Förlag.
Hezîn, M. H. (2011). *Guldan.* Stenbol: Weşanên Nûbihar.
İpek, M. S. 2012, 'Arap Edebiyatında Fabl Türü', *Nüsha Dergisi*, Cilt.12, hej. 35, n. r. 79-92.
Karak, M. Z. (2020). *Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn).* Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, Tirkiye.
Kurşun, M. S. (2002). *Rêbaz Dîwana Yekem*. İstanbul: Mizgin Yayıncılık.
Licî, M. X. (2011). *Serpêhatiya Zana*. Stenbol: Weşanên Avesta.
Okur, A. (2014). *Ahmed Şevki'nin Şiirinde Fabl*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Van, Türkiye.
Remo, X. (2013). *Derde Name (Dîwan)*. Duhok: Weşan Hawar-Duhok.
Sadinî, M. X. (2014). *Feqîyê Teyran (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî).* Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar.
Sebrî, O. (2004). *Dîwana Osman Sebrî.* Stenbol: Weşanên Perî.
Sebrî, O. (2011). *Hevalê Çak (hemû pexşan)*. Dîyarbekir: Weşanxaneya Lîs.
Sönmez, N. (2018). *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî (Metn û Lêkolîn)*. Diyarbakır: Seyda Yayınları.
Tîrêj, (2014). *Dîwan (Xelat-Zozan-Cudî)*. Stenbol: Weşanxaneya Peywend.
Zengenî, Z. 2021, 'Ji Nifşê Hawarê Şa'irekî Nepenî: Xemgîn', *Kovara Wêje û Rexne*, hej. 12 n.r. 48-69

PÊVEK:

Pêvek 1: *Rûpela Yekem a Helbesta Fabl ya Seyda Mela Xalidê Xuldî.*[8]




Pêvek 2: Rûpela dawî ya Helbesta Fabl ya Seyda Mela Xalidê Xuldî.







Perawêz:

[1] Ev her du helbest di dîwana Seyda Mela Xalidê Xuldî de di rûpelên 74 û 155an derbas dibin.

[2] Ev helbesta Xuldî di dîwana wî ya Kurdî de di nav rûpelên 300-302an de cih digire.

[3] Ev helbesta Xuldî di dîwana wî ya Kurdî de di nav rûpelên 303-311an de cih digire.

[4] Rizgarî.

[5] Distendin.

[6] Nehiştin.

[7] Xeber bidin.

[8] Pêvek ji Dîwana Kurmancî ya Xuldî hatine girtin.

KURMANCİ EDEBİYATINDA MANZUM FABLLAR VE XULDİ’NİN FABL ÖRNEĞİ

ÖZET:

Fabl, insanların yerine hayvan, bitki ve insan dışında ki varlıkların konuştuğu, hareket ettiği bir yazı türüdür ve az da olsa insanlarında içinde olduğu fablar vardır. Fabllar genellikle öğretmek, öğüt vermek ve çocuklar için yazılır. Klasik, halk ve modern edebiyatı içinde fabl türüne rastlamak mümkün. Fabl dünya literatüründe de revaç bulmuş ve bu türle birçok eser yazılmıştır. Klasik Kürt ve halk edebiyatlarına bakıldığında manzum fabl tarzında yazılmış şiirlerin de olduğu görülmektedir.

Bu çalışmada Seyda Mela Xalidê Xuldî'nin *“Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra”* ve *"Mijûlîya Qulingê Wekilê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra"* adli şiirleri değerlendirilip Kurmancci lehçesiyle yazılmış fabl şiirler üzerinde de durulacaktır.

Seyda Mela Xalidê Licewî 1940 yılında Lice'de dünyaya gelmiş ve 2011 yılında İzmir'de wefat etmiştir. Seyda Mela Xalidê Xuldî, birçok âlimden ders almış ve icazetini Müderis Şêx Ebdilkerîm’den almıştır.

Licewî birçok türde eser yazmış; bu eserlerden biri de Kürtçe yazmış olduğu Divanı'dır. Divanında genelikle Xuldî mahlasını kullanmıştır. Bu Divanı hacim açısından yeterince büyüktür. Divanında yer alan *“Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra”* ve *“Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra”* adlı manzum şiirleri fabl türünde olup beyitlerle yazılmıştır. Klasik Kürt edebiyatına bakıldığında fabl türünde yazılan şiirlerin fazla olmadığı görülmektedir. Bu nedenle bu tür şiirlerin ayrı bir yeri vardır. Xuldi'nin bu şiiri henüz latinize edilmemiş ve herhangi bir yerde basılmamıştır ve bu çalışmamızda bu eser ilk kez sunulup tanıtılacaktır.

Bu çalışmanın sonunda Xuldî’nin bu eseri el yazması ve latin alfabesiyle verilecektir. Bu çalışmada Xuldi'nin şiiri şekil ve içerik açısından değerlendirilecektir. Bununla birlikte Kurmanci lehçesiyle yazılmış klasik şiirlerler ve halk edebiyatı tarzında yazılmış vezinli ve kafiyeli Kurmanci fabllar üzerinde de durulacaktır. Fabl türünde yazılan bu şiirler tespit edilip fabllar şekil açısından değerlendirilecektir.

Anahtar Kelime: *Seyda Mela Xalidê Licewî, Xuldî, Fabl, Kurmancca Edebiyatı, Manzum.*

POETİC FABLES İN KURMANJİ LİTERATURE AND THE EXAMPLE OF XULDÎ'S FABLES

Abstract:

Fable is a type of writing in which animals, plants and non-human beings speak and act instead of humans, and it is a part of humans, albeit to a lesser extent. Fables are often written to teach, counsel, and for children. It is possible to come across the type of fable in classical literature, folk literature and modern literature. Fable has also found popularity in the world literature and many works have been written in this genre. When we look at the classical Kurdish literature, it is seen that there are poems written in fable style.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

In this study, Seyda Mela Xalidê Xuldî's poems *“Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra”* and *“Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra”*and poems written in Kurmancci dialect will be emphasized.

Seyda Mela Xalide Licewî was born in Lice in 1940 and passed away in 2011 in İzmir. Seyda Mela Xalidê Xuldî took lessons from many scholars and received her ratification from Müderis Şêx Ebdilkerîm.

Licewî wrote many kinds of works; One of these works is his Divan, which he wrote in Kurdish. In his Diwan he has mostly used the property of Xuldi and this Diwan is large enough in terms of its size. Two of his poems that have taken place in his Diwan are his poems entitled *“Xem û Kederê Me Bela Dibin bi Xeberdan û Mijûlîya Teyran û Qulingan ra”* and *“Mijûlîya Qulingê Wekîlê Teyran bi Xuldîyê Dilbirîn ra”*. These poems of Xuldî were written in fable type and with couplets.

When we look at the classical Kurdish literature, it is seen that there are not many poems written in fable type. Therefore, such poems have a special place. This poem of Xuldî has not been latinized or published anywhere yet, and this work will be presented and introduced in this study.

At the end of this study, this work of Xuldî will be given in manuscript and in Latin alphabet. In this study, Xuldî's poetry will be evaluated in terms of form and content. In addition, classical poems written in Kurmanci dialect and Kurmanci fables with meter and rhyme written in folk literature will also be emphasized. These poems written in fable type will be determined and fables will be evaluated in terms of form.

Keywords: *Seyda Mela Xalide Licewî, Xuldî, Fabl, Kurmanji Literature, Manzûm.*

Lİ HERÊMA HEKARÎYÊ/CULEMÊRGÊ GOTİN Û SERPÊHATİYÊN MÎR Û ÎSÊ DELA

KEREM ENGİN
Zankoya Hekkarî/ Turkîya

PUXTE:

Li gor edebiyata Kurdan ya devkî Îsê Dela şêwirmendîya Mîri kiriye. Ev Mîre kî ye û kijan serdemî da jiyana xwe domandîye? Derheqê wê çendê da di Edebîyata Devkî da agahiyên cuda hatîne veguhastin. Mîr ji bo meselên girîng yên civakî suwalên xwe bi Îsê Dela kirîne. Îsê Dela jî bi awayekê hekîmane di derheqê wan meselan da gotinên xwe gotine. Gotinên Îsê Dela nexşê xwe di dilê civaka Kurdan de çêkirîye. Her wîsa di nav civaka Kurdan da serpêhatiyên Mîr û Îsê Dela gelek binavûdeng bûne û di edebiyata gelêrî de cihekê girîng girtîne. Van serpêhatiyan hem di rabirdû da li ser civakê tesîrek mezin avakirine, hem jî bi devê mezin û zanayan ve ji bo nifşên nû hatîne veguhastin. Her wekî hemî herêmên Kurdan li herêma Hekarê jî ev serpêhatiyên henê di şevên tarî û dirêj de piranî di demsalên zivistanê de li dîwan û koçkan da hatine vegotin. Mijarên serpêhatiyên Mîr û Îsê Dela cur bi cur in. Li ser her aliyên jiyanê van serpêhatiyan di civaka Kurdan da cihê xwe girtine. Di nav van serpêhatiyan de nukte, yarî û şîretan xwe nişan daye. Di edebiyata Tirkan da serpêhatiyên Xoce Nesreddîn (Nasrettin Hoca) çawan belav bûne, di Edebiyata Kurdan da jî serpêhatiyên Îsê Dela wisa di nav xelkê da belav bûne. Gotinên Îsê Dela wek guhareke ne ku Mîrov her demekê bike guhê xwe. Ji ber vê gîrîngiyê em jî dê di vê xebata xwe da di Edebiyata Kurdî ya Devkî li herêma Hekarî dê behsa çend Serpêhatiyên Mîr û Îsê Dela bikin. Her wîsa me behsê temayên serpêhatîyan kirin û em ji bo nifşên nû li ser girîngîya veguhastina dezgehên civakî rawestiyan.

Peyvên Serekî: *Mîr, Îsê Dela, Şêwirmend, Culemêrg, Serpêhatî, Edebiyata Devkî.*

1- Despêk

Gotin û serpêhatîyên Îsê Dela di edebiyata Kurdî ya devkî da xwedan mîratekê giranbiha ne. Ev mîratê qedîm bi sexmeratî/saya zana, rihspî û çîrokbêjan ve heta îro hatîye vegûhastin û hebûna xwe mihefeze kirîye. Serpêhatîyên Îsê Dela dergehê dinyayek nû ji bo guhdaran vediket. Îro jî ev mîrasê qedîm li gund û bajaran li civatên Kurdan şevên dirêj û tarî têne vegotin. Mijarên gotin û serpêhatiyên Îsê Dela di derheqê mijarên cur bi cur da ne. Gotinên Îsê Dela piranî li ser mijarên wek; çareserkirina pirsgirêkan, rêbaz, edalet, jin, aşitî, xweşî û neweşî, wateya şolan, iqlîm û heva, sembol/mecaz û hwd. Cur bi cur da cihê xwe di edebiyata Kurdî ya gelêrî da girtîne.

Li herêma Culemêrgê gotin û serpêhatîyên Îsê û Mîr di nav xelkê da di belav û meşhûr in. Gotinên Îsê Dela bûyîne rênîşander ji bo cavaka wî zemanî, li gor pêşnîyarîyên Îsê Mîr tedbîrên xwe wergirtîne û pirsgirêkên wî demî çareser kirîne. Ne bi tenê ji bo wî demî ne, her wîsa ji bo nifşên piştî xwe jî mîratek giranbiha paş xwe hêlaye. Gotinên wî îro jî mal û koçk û dîwana têne vegotin û di nav civaka Kurdan da ronahîyê

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

belav dikin. Teybetmendîyek wan gotin û serpêhatîyan ewe ku bi tenê ji bo demborîkirin û kêfxweşîyê nehatîne gotin û afirînerên xeyalî nînin. Bi xwe di nav jiyanê da qewimtîne, pirsgirêk û bûyerên di nav xelkê qewimtîn û her wîsa dema Mîr hewce dibû ji bo helkirina meselên giştî pirsên xwe bi Îsê Dela kîrîne. Îsê jî li gor zanîn û têgeheştina xwe gotinên xwe gotîne.

Piranîya van gotinan di jiyana xelkê da cihê xwe girtîne û li ser waqia hatîne vegotin. Ji ber hindê van gotinan gelek bandor li ser civakê avakirine û heta îro jî ev bandore dewam kirîye. Çendan sal û wext borîne jî belê gotinên Îsê wateya xwe winda nekirîne. Dîsa îro jî li civat û dîwanên Kurdan ev Mîratê qedîm di nav herêma Culemêrgîyan cihê xwe bi awayekê zindî girtiye û hebûna xwe di nav civakê dîyar dikin.

Gelek versiyonên gotinên Îsê di edebiyata devkî da hene. Di van versîyonen da hindek cih ji yek din cudan e, an jî naverok û tema wek yek in, belê bi şikl û çapan ve ji yek cudan e. Ev cudahîye jî ji bo edebiyata devkî tiştek normal e. Ji bo ku li herêmên cuda bi devê kesên cuda ve hatîne vegotin. Sedsalan ev gotin û serpêhatîye bi vî awayî hatîne veguhastin, heke guhartinek di alîyê vegotinê de hebît jî li gor teybetmendîyên herêmî çêbûne.

Îsê Dela heman demî da çîrokbêjî jî ji bo Mîr kirîye. Di kevneşopiya miletan da çîrokbêj hebûne, her wîsa di dîwanên Mîr û Axayên Kurden da jî çîrokbêj hebûne. Wan çîrokbêjan di dîwan û koçkan da ew wezîfe bikaranîye. Dema Mîr diçûne ser textê xwe yê razanê wan çîrok ji bo wan vedigotin da ku xwewa wan bêtin. Îsê jî ew kare bi cih înaye.

Armanca me ew e ku ji bo xebatên di vî warîde bêne kirin ev xebate bibîte palpişt. Me xwast ku ev mîratê giranbiha winda nebît û nifşên taze jî sûd wergirîn û jê bê bahr nebîn. Dema ev meqale me nivîsî di derheqê Mîr û Îsê Dela de me çu jêderên nivîskî peyda nekirin, agahdariyên derheqê vê mijarê de li herêma Culemêrgê me ji çend kesekan guhdarî kir. Jiber hindê ew agahiyên me neqilkirîn tiştên misoger nînin. Çend serpêhatî ji çend kesên cuda me neqilkirîne, jiber hindê versîyonên çend serpêhatîyan ji yek cuda ne. Herdu versîyon jî di orjînala serpêhatîyen da me cih daye. Her wîsa me di vê xebatê da cih daye temayên serpêhatîyan û orjînalên serpêhatîyan jî di pêvakê da nîşa daye. Em dê di vê xebatê da behsê gotin û serpêhatîyên Mîr û Îsê Dela yên li herêma Hekarîyê kin û dê cih deyne tema û analîza wan.

2. MÎR Û ÎSÊ DELA

2.1. Mîr

Peyva "Mîr" kurteya "Emîr" e. Peyva emîr jî ji peyva "emr" hatiye dariştin. Ji bo Padîşah, serwer û kesê li ser qewmê xwe xwedan emir hatiye gotin. Peyva Mîr bi herfa elifê an jî bi lama ta'rîfê an jî bê elîf û lama te'rîfê li ser sîkeyên/diravên ereb û mûslîmanan hatîne dîtin. Eslê vê peyvê ji bo Xelîfan hatiye gotin. (Dehkhoda, 1958) Elîfa serê peyvê jê ketîye, çawa Ebû Sehl bûyê Bû Sehl her wîsa Emîr jî bûye Mîr. Emîr eslê xwe peyvek erebîye û derbasî Kurdî bûye. Wateya Mîr nêzîkî mefhûmê peyvên amir û mîrza ne. Ev peyve ji bo navnasîyê têne bikaranîn. Wek Navnasa Amîr, Mîr jî ji bo hukimdaran hatîye bikaranîn. Lewra welatê Kurdan bi sedsala li bin desthetdarîya Mîrên Kurdan yên hatîne idare kirin. Yanî nav bi wateya xwe ve hatîye bi navkirin. Navnasa Mîr ji bo sultanê Xeznevîyan Mesûd û li Hindistanê jî ji bo seyîdan hatîye bikaranîn. Peyva Mîr di Tirkî de "tiştê dewletê/aîtî dewletê" wek navdêr derbas bûye. (MEB, 1971, s. 344)

2.2. Şêwirmend

Di serpêhatîyan da tê zanîn dema Mîran hukimdarî dikirin ji bo xwe şêwirmend teyîn kirîne. Mîran di derheqa şolên girîng û aloz da ligel aqilmendên xwe şêwirîne. Di vî alî da sûdek zêdê ji aqilmendên xwe wergirtîne. Îsê Dela dibe mînak ji bo şêwirmendên Mîrên Kurdan. Îsê li bin serê Mîr bûye û di rêvebirina şolên miletî da bi awayekê şarezayî ji bo çareserkirina pirsgirêkên cur bi cur ji bo Mîr şêwirmendî kirîye. Xeml û koka Mîran şêwirmwndên wan in. Wezîfeya şêwirmendan ewe ku ji bo hukimdaran aqilmendîye bikin û rê nîşa wan bidin. Mîrên Kurdan jî ji ber vê yekê girîngîyek zêde daye îstîşarê. Ew kesê îstîşarê biket xusaret û pêşeman nabît. (Süleyman b., 1985) Heke Mîrov bi tenê gotina xwe biket dê zererê bînît. Îstîşare barê berpîsyarîyê sivik diket û mesûylîyetê di nav civakê da belav diket. Aklekê kolektif bi vî awayê îstîşarê ve belav dibît. Jiber vê egera girîng Mîrên Kurdan jî îstîşare ligel şêwirmendên xwe kirîne. Îsê Dela Mîrovek têgeheştî û zana bûye, ev wezîfe bi awayekê hekîmane bi cih înaye.

2.3. Îsê Dela

Îsê li gundê Dela hatîye dinyayê. Jiber navê gundê wî gotînê Îsê Dela. Ev Dela dikevîte nav Sindîyan. Sindê jî dikevîte nav Badînan, nêzîkî Xabûrîye. Gundek din jî bi navê Delan dikevîte bin Barzan, hindek dibêjin Îsê Dela li vêrê hatîye dinyayê. (Kızılkaya, 2022) Li gor hindek dîtinên din Îsê Dela li bajarê Zaxo rexê çemê xabûr li gundê Çemkî hatîye dinyayê. (Saadi, 2017) Mîr Zubeyr (Paşa), Mîr Behrem (Paşa) û Mîr Simahîl (Paşa) ev hersê Mîre yên serdemekê ne. Wî ligel sê Mîran derbas kiriye. Îsê aqilmendê demê xwe bûye, ew ketiye di Edebiyata Kurdî ya devkî û navê wî nemir bûye. Bi aqilmendiya xwe ve reveberî kirîye û bizanîn û merîfeta xwe ve şîyaye gelek Mîrovan îqna biket. Umrê wî bahra pitir ligel Mîran derbas bûye û şêwirmendîya wan kirîye. Zubeyr paşa hukimdarîya Amêdîyê kirîye. Wî zemanî xelkê herêmê gotîne Mîrên xwe paşa, li ser zemanê Hesen paşa, Yavuz Sultan Selim navê paşatîyê danaye ser bapîrên wan, dema bûne hukimdar bi vî awayî navê paşatîyê wergirtîne. Îsê Dela di zarokatîya xwe da dayik û babên xwe winda kirîne. Îsê Dela li gel karwanekê çûye Amêdîyê da ku bête xwedankirin. Xwedanê karwanî dibîne ku eve kurekê bi aqil û fehma ye, wî teslîm Zubeyr Paşa diket. Paşa vî kurî layiqî xwandinê dibine û Îsê dide ber xwandinê. Dema Îsê ji xwandinê betal dibe, demê xwe yê xalî di dîwanxwanê da derbas diket, xizmeta dîwanxwanê diket û guhdarîya şîretên mezinan diket.

Îsê Dela pisporetî û xizmeta dîwana Zubeyr Paşa diket, piştî Zubeyr Paşa çûye ber dilovanîya xwedê, Berham Paşa Îsê dikete şêwirmendê xwe, siwalên xwe bi wî diket û berî wî çi şolan naket. Dema Îsê di dîwanxwanê da hazir neba şolên Berham Paşa bi rêve nediçûn. (Kızılkaya, 2022) Îsê zarokatîya xwe de hatîye Amêdîyê, ketîye di xizmeta Zubery Paşa da li mala wî hatîye perwewrde kirin. Zubey Paşa 1701-1714an da li ser textî bûye. Ji ber kû Îsê Mîrovekê zana bûye Zubeyr Paşa ew kirîye perwerdekerê kurê xwe yê Berham Paşa, 1714an da dema hukimdarî ketîye deste Berham Paşa, ew Îsê ji bo xwe dikete wezîr û şêwirmend. (Saadi, 2017)

2.4. Fonksîyona Serpêhatîyan

Folklor çandek hevpar e û mîratê gelan yê madî û manevîye. Ev mîratê kevin bi sexmeratî serpêhatî û çîrokan hatîye veguhastin. Ev Mîrate ji bo nifşên nû jî dibîte palpişt û rênîşander. Ew xelkê hay ji mîratê xwe yê dîrokî nebît, neşên bimînine li ser lingan û dê li ber êrişên çandên bîyanî ji holê rabin û berzebin. Ew xelkê hay li rabirdoya

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

xwe nebît, neşêt dahatûya xwe jî ava biket. Fonksiyona serpêhatîyan ewe ku vê wezîfa girîng bi cih tînît. Serpêhatîyên di derheqê Mîr û Îsê Dela da hatîne gotin û veguhastin çanda qedîm, nirxên madî û manevi bi awayekê zindî nîşa diden. Serpêhatî ji bo dezgehên civakî, urf û adet, tore, rabûn û rûniştin û nirxên Mîrovahîyê dibîte palpişt. Fonksîyonên serpêhatîyan bi tenê ji bo demborî û kêfxweşîyê nehatîne vegotin. Di heman demî da ligel jiyana civakî jî pêwendî heye. Tema û naveroka serpêhatîyan karekter û sexsîyeta civakê di nav xwe de muhefeze dikin. Serpêhatî wek nasnama xelkê xwe ne.

3. TEMAYÊN GOTİN Û SERPÊHATİYAN

3.1. Çareserkirina Pirsgirêkên Aloz

…Hûn bêjîne gundîyan ew giskê me daye we niha çend kîloye, dema biharê hûn didene me, divê hind kilo derkeve. Divê ev giske ne qelew bibît, ne jî zêîf bibît…

Her demekê ji bo pirsgirêkên aloz zehmetî hatîne kêşan. Mezinan gotiye: zehmetî dom kurt in. Bes ji bo derketina zehmetiya û çareseriya wan hewceyî bi behnfirehiyê ve heye. Wextekê navbira Mîr û Îsê nexweşî dikevîtê, Îsê diçe cihek wîsa kû Mîr nezane ku ew kive çûye. Piştî hingê Mîr hez diket ku bizane Îsê li kî derê ye. Ji bo vê çendê planekê çêdike. Mîr her gundekê gîskekê bo rêdiket. Divê ev gîske heta biharê ne qelew bibe, ne jî zeîf. Mîr bi awayek wîsa planekê çêdike kesek pê nahese. Mîr li gor teqwîmekê hereket diket. Heta ew teqwîm nederbas bît, ev mesele jî çareser nabît. Hêmanên çareserkirina hindek meselan bi zeman û mekana ve girêdayîye. Heman demî da heke mirov hez biket ku bigehîte armanca xwe dîvê hedefek jî hebe, armanc li vêrê ewe ku Mîr bizanît kanê Îsê li kî ve ye. Divê ev gîske ne qelew bît, ne jî zeîf. Vê çendê hewceyî bi zanyariyê heye. Ev gîske heta biharê dê giya bixwe, dê avê vexwe, belê kiloya wê ne zêde dibe, ne jî kêm dibe. Tiştê gîske jê bi tirse û qehrê ji bo gîskî çêbike ew jî gurg e, ew tirs û qehr dibe sebebê hinde ku gîske kiloya xwe mihefeze biket. Dîvêt xwedankirina gîskî li gor hevsengîyekê, kêşanekê û pîvanekê bête kirin. Payîzê û heta biharê ev gîske roj bi roj, dan bi dan xwarin û vexwarinê dîvê bixwet. Belê kiloya wî wek xwe be. Di çareser kirina vê meselê de aqilmendiya Îsê dê biderkevîte meydanê. Mîr dê bizanît ka Îsê li kijan gundiye. Ew gundê vê pirsgirêkê çareser biket, Mîr dê bizanê Îsê li vî gundîye. Mîri hez nekirîye ew nexweşiya di nabeyna wî û Îsê de qewimtî kesek bizanît, bi awayekê penîhî ve pirsgirêk çareser kirîye. Ji bo helkirina meselên gîring divê pêvajo penî ve bête saz kirin. Şolên muhîm divê veşartî bêne helkirin da Mîrov bigehîte hedefa xwe.

3.2. Şol Di Me’nê de Xweş in

… Mîri got: Îsê, yekparî bi çi xweş e? Îsê gotê: Yekparî bi “hê” xweş e…

Mezina gotîye: “Parîyê mezin gewrîyê dirînît”. Wateya vê gotina mezina ewe ku şol bi me’nê ve xweş in. Şolan da zêdeçûn dawiyê dê ji bo Mîrovî gelek nexweşiyan bîne wucûdê. Kirina şolan bi hîkmet û şarezahî xwedan me’ne ne. Gelek şol hene mirov neşêt di carekê da bi qetine. Ji bo qetandina wan şolan dem lazim e. Vêca rojekê Mîr dibejê Îsê Dela yekbarî bi çi xweş e, Îsê dibejê, yekbarî bi “hê” xweş e. Piştî salek derbas dibe, Mîr carek din pirs dike û dibêje ew bi çi xweş e. Îsê dibêje ew jî bi xwê xweş e. (Yalçın. 2022) Piştî salek derbas dibe carek din Mîr pirs dike û dibêje ew bi çi xweş e? Îsê dibejê ew jî bi me’nê xweş e. Hê bi xwê, xwê jî bi me’nê xweş e. Xwarina zêde bi xwê be tama wê nexweş dibe. Her wîsa xwarina xwê ya wê jî zêde be nexweşiyan jî ligel xwe

peyda dike. Her tiştekê qederek ji bo heye, divê Mîrov ji wî qederî derbas nebe. Xwarin, vexwarin, axiftin, karkirin, denk bilindkirin, rêveçûn, derbas kirina ligel Mîrovan û hwd. Di her aliyekê jiyanê de divê Mîrov pêngavên zêde neavêje. Zêdegavî ligel xwe gelek xetera peyda dikin, pir axiftin ligel xwe gelek nexweşiyan belav diket. Yanî şol di me'nê de xweş in. Dema Mîrov şolan diket li gor şiyana xwe biket, Mîrovê ji şiyana xwe zêde şolan biket sernakeve û serfiraz nabe. Mîri pirsa xwe di carekê de nekirîye, sê salan li dûvêk kirîye, her salê tiştek pirs kirîye. Bi vî awayî Mîri ji aliye zanyarî, serwextî, aqil, şexsiyet û baldaynî yê de Îsê ceribandiye ka Îsê Mîrovek çawaye. Îsê jî bi vê şarezayiya xwe ve bersiva pirsên Mîri dayine.

3.3. Mîrim Borî/Gotinê Cihê Xwe Heye

…Mîri şîr vexwar, piştî hingê got: Îsê! ez dê pîçekê razêm. Çavê te li der û doran bît, da ku çi adî/mêşûmêr bi min neveden. Dema Mîr xwew diçît, dûpişkek têt da bi Mîri vedet. Wê demê Mîr hişyar dibît û berê xwe didetê ku Îsê Dela yê li ser serê wî û xencera wî ya di destî da. Mîri got: Îsê! çi bû? Îsê di dilê xwe de got: Heke ez meselê bo wî bejim ew ji min bawer naket. Jiber hindê got: Mîrim borî…

Gelek şol diqewimin, Mîrov hez diket wan şolên qewimtîn çareser biket, belê hindek rîskên wan şolan yên heyin ku Mîrov behs jê biket. Helkirina hindek ji wan şolên bi risk bi zemanî ve digirêdayine. Ew şertên ferd û civak di nav da derfetî nadete Mîrov ku izaha wan şolan biket. Heke ew kes wê meselê dehrî biket jî kesek jê bawer naket. Dema kû wê gavê kesek ji Mîrov bawer naket, divê Mîrov wan gotina di dilê xwe de zeft biket û nebêjît. Heta derfet peyda dibît û dibêjît. Di serpêhatiya "Mîrim borî" da halêkê wîsa tête serê Îsê Dela, dema Îsê Dela dest bi xencerê diket û da dûpişkî bi kujît, wê gavê Mîr hişyar dibît û dibêjîte Îsê çi qewimt? Wê demê Îsê dibejît heke ez bêjime Mîr, da dûpişk bi te vedet, ew ji min bawer naket, ya qenç ewe ez tiştekî nebêjim. Bes Îsê got: Mîrim borî. Morala Mîr jî nexweş bû, ji bo vê tiştê Îsê jî gelek bi xwem ket. Piştî vê rewşê Îsê ji wêrê diçît û zemanekê dirêj derbas dibît. Dema şolên Mîr bi rêve neçin, hewcehî bi Îsê çêdibît û Mîr baş dizanît heke Îsê nebît û harikariya wî neket şolên wî bi rêve naçin. Hêdî ji bo Îsê wext hat û şertên wî hasil bûn ku carek din bête cem Mîri. Ji vê serhatîyê tê zanîn ji bo şirovekirin û çareserkirina pirsgirêkên bi wî curî wext lazim e. Heke ew wext nehatibe ku Mîrov wan meselan şiroveke biket, hem kesek bawer naket, hem ji belkê bibe sebebê hindek nexweşiyên din. Heke wext nehatibe ku Mîrov gotina xwe bibêje, gotina Mîrov rast jî be divê Mîrov wê gotinê nebêje.

….. Îsê rabû çû bine zevyê ew gundûrên geheştî hemî perçiqandin û herişandin heta hatîye serê zeviyê gundorek bi tenê nehêla sax, Îsê çû binê zeviya xwe carek din dest âvêtê heta hatiye serê zevîyê ew gundorên taze kulîlk dayîn hemî ber bine wan xepare kirin, avdan û hat rûnişt.…

Dema Mîri kurê xwe rêkirîye nik Îsê da carek din şêwirmendiyê biket û çareserkirina bûyerên taze ji bo wan bêjît. Îsê vê carê ne bi qal, bi hal bersiva kurê Mîri didet. Wî bi awayekê alegorik peyamek ji bo Mîr rêkir, belê kurê Mîr ne zanî û tê negeheşt ka Îsê bi halê xwe ve çi peyam rêkir. Îsê gundorên geheştî hemî perçiqandin û parçe parçe kirin, ew gundorên taze kulilk û tûtik jî dayîn carek din berbinê wan xepare kirin û av bire ser. Kurê Mîri bi vê kirinê ve Îsê wek dîna dibîne. Dema Mîrov di hikmet û felsefa meselê nezane, tê nagehe jî. Îsê di vê peyama xwe de ev tişte gote kurê Mîri, bila babê te wan kesên di der û dorên xwe ewên pîr, mejîhişk, çi tişt di nav serî da neçît,

hindekan bikete di zîndanê de û hindekan jî nehêlît, nifşê taze jî bila perwerde biket û destê xwe bi serî de bînît. Heke ew kesên pîr û destnexeş dê nifşê taze jî xirab biken. Heke bi vî şeklî dewam bike nifşê taze jî bi gotina Mîri naken. Her hûsa mezinan jî gotîye: Xeta xelet ji gaye pîr çêdibît, heka gaye pîr xeta neket, canega jî xetayê naket.

3.4. Qîmeta Baranên Nîsan û Gulanan

...Mîri got: Gelî ehlê dîwanê! Qîmeta vî kursê/Bagurdanê zêr çi ye? Her kesek kit kite bila gotina xwe bêjît. Ew kesên li wê derê hazir her yekê tiştek got û qîmetek dana ser.

Behram Beg/Mîri got: Îsê! vêca dora teye, ka qîmeta wî kursê/Bagurdanê zêr çiye?...

Di kevneşopiya Kurdan de diwanên Mîran wek meclisên miletî bûne, cihê civîna xelkê bûne û xelk ji bo çareserkirina meseleyên giring li van cihan kom bûne. Îro jî ev kevneşopiye di nav eşîran û civakên Kurdan da dewam diket. Heke qerarek bête wergirtin, xelk li kuçkên axa û malên rihspiyan kom dibin û wê qerarê werdigirin. Vêca Mîr jî bi vî awayî di diwana xwe de siwalekê diket. Dema dibêje ka qîmeta vî kursê zêr/bagurdanê zêr çiye, her kesek tiştekê dibêjît, Îsê jî wan gotinên jêrî dibejît.

Di nabeyna nîsanê û gulanê
Bêt tavek baranê
Li ser deşta dubanê
Çêtire ji vê kursê zêr yê li nava dîwanê (Kızılkaya, 2022)
Nabeyna gulan û xizîranê
Betin tavîyek baranê
Çêtire ji bagurdanê zêr
Li niveka dîwanê (Engin Ş. , 2021)
Tavîyek baranê bête deşta dubanê
Çêtire ji bagurdanê zêr
Nava dikanê (Yalçın, 2022)

Di wî demî de çend ziraet, dexl û dan û dûkakên herêma Badînan li deşta dubanê çêdibûn. Ev deşte cihê cotyariyê û çandinîyê bûye. Her wîsa ev deşte cihê debara xelkê Badînan bûye. Zêr li nik hemî miletan madenekê zêde bi qîmet e. Nexwasime kesekê bagurdanekê zêr hebît. Di agahîyên Îsê didete Mîr û ehlê dîwanê da tiştê jî vî bagurdanê zêr qîmettir tavîyên baranên nabeyna meha nisan û gulanê ne. Lewra baranên vî wextê salê ji bo çandinîyê û derametî zêde bi xêr û bereketin. Eve wextê cot û kêlanêye. Heke vî demî baran neyên wê salê hasilat dê ya zeîf bît û dê bi hişkatî derbas bît. Her wîsa di baranên nîsanê ji bo vicûda însanî bedenparêzî û fayde heye. Dîsa gotîne ev barane ji bo vicûda kesên pîr jî feyde tê de heye. (Nisan Yağmurunun Faydaları, 2019) Heke ev baranên vî wextî nebarin, ziraet naçêbe, xelk dê bimîne bê debare, xela dê rabe û dê xelk ji wan faydên din jî dê bimînine mehrum. Bi tenê taviyeka vî demî ji vî bagurdanê zêr çêtir e. Tavîyek nabeyna tavê û ewran da bi demekê kurt da barîna baranê ye. Nexwasime ew baranên vî wextî demekê dirêj bibarin. Vêca Îsê gotiye heke taviyek jî bibare ji vî bagurdanê zêr çêtir e.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

3.5. Di Derheqê Jina Baş Da

...Mîre min divê ew jina ez bo xwe bînim ya diz û hîz bît…

Carekê Mîr dibêjîte Îsê tu bo çi bo xwe jinêkê naînî? Îsê jî dibêjîtê: “Mîrê min! Divê du teybetmendî li dev wê jinê hebin ew jina ez bo xwe diînim. Yek: Ew jine ya diz bît, ya din jî ya hîz bît.

Di vê serpêhatîyê de di peyvên “diz” û “hîzan” da ifadeyên alegorik/sembolîk hene. Di nav xelkê da dizî kirinek xirabe û divê Mîrov xwe jê bidete paş. Lewra li wêrê ev her du peyve jî di wateya rastîn da nehatine bi karanîn. Di wateya mecaz da hatine bi karanîn. Gotiye divê jin ya bo malxwê xwe ya diz bît. Malê mêrê xwe belav neket, di malê de paşxwane hebît û tişti ji malê xilas neket. Ya din jî divê jin ya hîz bît. Jina hîz jî di nav civakê de jineke bê exlaq û xirab e. Belê li vê derê dîsa peyva “hîz” di wateya rastî da ne hatîye, di wateya mecazî hatîye bikaranîn. Divê jin xwe ji bo malxwê xwe hiz biket û bi xemilînît. Ne ji bo mêrên biyanî ya hîz bît. Lewre ev tiştê hem ji aliye dînî ve ya heram e, hem jî di nav civakê de tişteki xirab e. Jina qenc û baş ew jine ya ku xwe ji bo malxwê xwe law biket û bi xemilînît. Xemilandina xwe bes nîşa mêrê xwe bidet. Xwe nîşa xelkê biyanî nedet. Dema jinê xwe bo mêrê xwe xemiland kêfxweşî û aramî bi wî awayî dê di nabeyna wan peyda bît. Wekî din jî aramiya malê û xêra malê dê çît û mal dê xirab bît. Gotina Îsê Dela di wî warî de gotiye Mîri ji bo nifşên taze jî gotinek zêrîn e.

3.6. Girîngiya Îfadeyên Alegorîk

… Îsê got: Mamo! Me du pê hene, divê em bikin sê pê, pîremêrî got: Xwedê du pê dayine me, ji şola Xwedê neaxive...

Di edebiyatê de mecaz/sembol cihekê girîng digirin. Gelek caran Mîrovan merama/mebesta xwe raste rast negotîne, bi awayekê sembolik înayîne ziman. Îsê Dela jî sembol bi şarezatî di vê serpêhatiyê da bi kar înaye. Gelek caran dema Baran Beg û Îsê li gel yêk diaxiftin ehlê dîwanê tê nedigeheştin, axiftinên wî wekî yaqût û mercanan bûn, hindek caran Baran Beg gotîye ehlê dîwanê dema Îsê diaxive hûn digirnijin û dibêjin ka eve çi dibêjît, hûn gotinên wî tê nagehin.

Rojekê Îsê Dela û pîremêrek ligelêk rêvingiyê dikin. Diyaloxek di nabeyna Îsê û pîremêrî de derbas dibît, Îsê çi tiştî pirs diket pîremêr wê tiştê xelet fam diket.

Di serpêhatiya Îsê Dela û pîremêrî da zêde ifadeyên alegorîk/sembolîk hene. Gotinên “Em bikin sê pê”, “Divê yek ji me yekê bidete pişta xwe”, “Genimo! xwezî min zanîba ka xwedanî tu xwarî an ne”, “Ez nizanim ka ez mêvanê Xwedê me an jî mêvanê benya me”, “Xaniyê te baş e, belê li ser stûnekê ye”, hemî di wateya rastin de nînin, di wateyên mecazî da ne. Ev diyaloxa di navbira Îsê û pîremêrî da derbas dibît nîşa didet ku Îsê xwedan têgeheştinek zêde bûye, wî çi gotiye pîremêr tênegeheştiye. Îsê Mîrovek têgeheştî û arif bûye. Her wîsa wî bingeh û bedewîyên zimanî jî baş zanîne ku vê diyaloxê ligel pîremêrî biket.

Li jorî pênç ifadeyên mecazî derbas bûne. Ya ewil, di rêvingîya xwe de digehine rexê avekê Îsê dibejît em darekê bînin biden ber xwe da em nekevîne di çemîde, wateya “Sê pê” ew e. Ya duyê; em yek û du pişt biken, wateya wê em geheştîn evraziyekê, yek me suhbetê biket da rêka me kurt bibît û da wext biborît da rêvingiya me sanahî bikevît.Ya sêyê; Ka xwedanî ev genime firotiye, xwedan qerdare, genim selem e an ne,? Ya çarê; ka ez dê biçime mizgeftê razêm, an jî dê biçime mala kesekê bime mêvanê wî. Ya pêncê; Îsê gote pîremêrî kiça te baş e, belê pêyekê wê leng e.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

3.7. Bandora Ax û Hewayî li Ser Tebîeta Însanî

…Divê hûn xercê biden, dema ew diçin ser axa xwe dibêjin em çu xercê naden, carek din Mîr wan gazi diket û dibêjîtê ka hûn bo çî xercê nadin? Carek din dibêjin em dê xercê bidin, dema carek din diçin ser axa xwe dîsa dibêjin em xercê nadin…

Ew herêma mirov jîyana xwe li ser derbas diket ji aliyê tib'etî ve dikevîte bin bandorê wê herêmê ve. Civakên li rexê behra bin tib'etê însanên wê herêmê nerm e. Heke mirov li herêmên çiyayî û dêm bijîn tib'etê wan hişk e. Ehlê çol û çiyan hişk e û dema diaxivin bi dengekê bilind diaxivin. Erdnigarî tesîra xwe têxîte ser exlaqê însanî. (Haldun, 2004)Ax, av, dexl, dan û dûkakên heremên cuda, tama wan jî cuda ye. Mîrovên li cihên germ jiyana xwe derbas dikin, deng û rengên wan jî ji yek cuda ne. Ev hêmane tesîreke zêde di êxîte ser tib'etê Mîrovan. Bersivên însanan ji bo bûyeran li gor van hêmanan diêne guhartin. Însanên herêmekê ji bo meselekê bersivek hişk dide, însanên herêmeka din ji bo eynî mesele bersiveka nerm diden. Çand, terzê jiyana civakê, bîr û bawerî jî ji bo awayê bersivdana însanan hêmanên girîng in. Ehlê dewr û dorên behran di jîn mê ne, ehlê çol û çiyan jî nêr in. Hatiye gotin dema Mîrov biçe ser axa nêr dê day û babê xwe ji bîr biket, şexsîyeta nêr mirovî bi cesaret diêxe. Îsê Dela li vêrê vê rastiyê bi awayekê zanyarî û hekîmanê tînîte ziman.

3.8. Edalet Hebît Xweşî Jî Dê Hebît

…Heke hukimdarê kelata Amêdiyê bi edalet bît, Sipne xweş e, heke hukimdarê kelata Amêdiyê zalim bît, Sipne nexweş e…

Li herêma Hindistanê wehşî zêde hêbune û ew Mîrovên li wê herêmê dijîn li bin tehdîda van wehşiyan de bûn. Gelek caran jiber vê yekê ew kesên li wê herêmê dijîn jiyana xwe ji dest dan. Pîrejinek hebû xezûr û mêr û kurê xwe jiber vê tehdîda wehşiyan jiyana xwe jidest dabûn. Rojekê Bûda dibêje vê pîrejinê we bo çî ji wê derê mala xwe bar nekir û neçûne cihekê wîsa ku wehşî lê nebin, vî wehşî hem xezûr, hem mêr, hem jî kurê te nedixwarin. Pîrejînê wîsa got: li vê herêma me qralek bi adil heye, me hez nekir vî cîhê bi edalet bihêlîn û biçîne cihek din. (Şeriati, 2010)

Heke hukimdar xwedan ehliyet bît, heke mintiqa xwe ji êrişên biyanî muhefeze biket, ew cih dê yê xweş bît, heke neşêt herêma xwe ji êrişên biyanî muhefeze biket, bêîstiqrarî dê hebît û ew edelat jî dê winda bît. Mîri di derheqê cîhê xweş û nexweş de pirsek ji Îsê kirîye. Îsê jî gotiye Sipne hem xweş e, hem jî gotîye Sipne nexweş e. Xweşî û nexweşîyên cihekî bi edaleta hukimdarê wî cihî ve girêdayîne. Cihê edalet lê nebe, zulim, neheqî û ne reftarî dê lê belav bibe.

3.9. Xirabîyên Tamahîyê

…Mîri got: Îsê! Çi tişt dê Mîrovî serda bibet, Îsê gotê: Tamahî…

Tamahî Mîrovî serda dibet, zêde hejêkirina malê dinyayê dibîte sebebê hindê ku Mîrov tiştên xirab biket. Hindî Mîrov mutewazî hereket biket dê bêhtir di nav xweşiyê da bît û dê jiyana wî aramtir bît. Îsê dibêjît divê mîrov yê tama û hefaşo nebît, belê gotina Îsê ji bo Mîr çi wate ifade naket. Dema Mîr tirarê zêr dibîne, tamahîya tirarê zêr wî serda dibet. Jiber hindê mezinan gotîye: "Tamahî çavên Mîrov kore diket." Tamahî xesletên Mîrovahîyê wêran diket û ji mertebeyên bilind tînîte cihekê nizim. Gelek şolên xirab ligel xirabiyê peyda dibin. Îsê Mîr ceriband û gotê: Heke tu pişkilekê bikeye di devê xwe de, ez dê vî tirarê zêr bideme te, vê teklife Mîr zêde cazîb kir. Cihê

xwe û meqamê xwe ji bîr kir û sewda ser bû, dest avêtê da pişkilê bikete di devê xwe de. Îsê destê xwe daye û destê wî girt û nehêla pişkilê bikete di deve xwe de.

3.10. Rebaza Şol Qetandinê

…Mîri ev tişte kirîye şert, ew kesê bîrê biket divê deh mecîdîya bidet, wî Mîrovî got: Heta niha kesê çu mecîdî ji min nexwastîne, eve çi xerce, ez nadem…

Ev serpêhatiye rêbaza şol qetandinê nîşa didet. Heke di serî de ev Mîrove ligel qasidan nerm axiftiba, serhişkî nekiriba, da deh mecîdya det û ji vê şolê xilas bît. Belê ligel qasidan kete rikê û barê xwe giran kir. Her wîsa divê Mîrov gelek li dûv şolan neçît, şolan sivik biket û sanahî bêxît da şol zehmet nekevin. Bi nerm û helîmî gelek şol diqetin. Dîsa dîvê Mîrov gelek siwalan neket, kesê gelek siwalan biket şolên wî dê bi zehmet kevin û dûmahîyê barê wî dê giran bît. Heke wî Mîrovî serî de mecîdiyek daba da ji vê şolê xilas bît, belê yeka we kir heta çil mecîdî dayin. Emrên Mîran jî wek emrên dewletê ne, lewra wî wextî hukimdariya welatê Kurdan di destê Mîran de bûye. Dema dewletê tiştek li ser welatiyan kire şert divê ew tiş bête kirin, ew Mîrove li hemberî emrê Mîri kete rikê û ev emre bi cih neînaye. Cihê deh mecîdiya çil mecîdî dane. Heke wî Mîrovî ewil deh mecîdî dabana ew eybên wî yên din jî nediyar dibûn. Mîrovê bizanê ku eybên wî yên heyn, heke cihekê neraweste û li dûv şolan bîçît dê halê xwe nexweş ket û ew eybên wî yên din jî dê aşkere bîn.

3.11. Wek Şêran Çûye Belê Wek Rûviyan Hatîye

… Mîri gotê: Tu rast dibejî, şêr çûye nav rezî de belê wextê ew şêr derketî wekî tule û rûvîyan pûrt pêve nemaye…

Divê serpêhatiyê de jî gotinên alegorik/sembolik hene. Dema jina Îsê hêkên renk renk danane ber Mîri, wî zanî ku Îsê li mala xwe nîne û nabeyna wî û jina wî nexweşiyek ketîyê. Nalçeya potîna Mîr dikeve, piştî hingê Îsê wê nalçê dibîne, ew dizane ku Mîr hatîye mala wî. Îsê xelet tê digehe û heman demê de diçîte dîwanxwanê. Dema Mîr dibêjît Îsê te rezek heye, belê rezê te dêm bûye. Îsê dizane ka Mîr çi dibêjîte wî. Îsê jî bi awayekê sembolîk bersiva wî didet. Dibêjît, belê şêrek çûye nav rezê min da zererê bidetê. Mîr dizane Îsê aciz bûye û dilê wî bi guman ketiye. Bersivek wîsa didete Îsê ew şik û gumanên di serê wî da çêbûyîn belav diket. Mîr dibêjît, belê raste şêrek çûye nav rezê te da, belê wek tule û roviyan derketîye. Mîr dibêjît ew tişta di serê te da derbas dibe, we nîne wekî tu hizir dikî. Ez çûme mala te, belê min çi zerer nedaye jina te û namusa te. Eve meselek wîsa hesas bûye bi zimanek sembolîk Mîr û Îsê li gel yêk axiftîne. Li diwanê de wîsa neaxiftîne ku her kesek tê negehe û nezane. Her du jî li gel yêk serwext axiftîne. Nehêlane kû xeletî çêbibe û ehlê dîwanê bi kevîte gumanê û şaîbek çêbibe ku xelk bizane.

4. ENCAM

Welatê Kurdan sedsalan bi hukûmetên Mîr û Xwanedanên Kurdan ve hatîne îdarekirin. Van hukûmetan li ser erdnigarîyek berfireh desthelatdariya xwe domandîye. Hukûmetên Kurdan li gor rêk û rêbazên burokrasîyê hukim li welatê xwe kirîye. Mîrên Kurdan li gel wezîr û aqilmendên xwe îdareya welatê xwe kirine. Em vê tiştê ji Edebîyata Devkî ya Kurdî de û serpêhatîyên di derheqê Mîr û Îsê Dela da di nav xelkê de dizanîn. Serpêhatîyên Mîr û Îsê li herêmên Kurdan belav in. Jiber hinde ev serpêhatîye bi awayekê tewatur hatîna veguhastin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Îsê Dela çend Mîr dîtîne û ji bo wan aqilmendî kirîye, bi agil û şarezahîya xwe ve tesîrek mezin êxistîye ser Mîran û xelkê heremê. Axiftinên wî rê nîşa xelkê dane. Di edebiyata Kurdî ya gelêrî da di hafizeye civaka Kurden da Mîr û Îsê Dela cihek girîng girtîye. Gotin û serpêhatîyên Mîr û Îsê Dela hem kêfa guhdaran xwş dikin, hem jî pêşnîyarîyên giranbiha di nav xwe de digirin. Ev gotine wek mîratek bê bihane, ji bo guhdarî nukte û şîretên muhîm tê da hene. Jiber hindî ev mîrat'ê qedîm li koçk û dîwanan da hatîne gotin. Li mal û civatên gundî û bajêrîyan teybetî di demsalên zivistanê şevên tarî û dirêj da wan serpêhatîyan di delê xelkê Kurd de nexşê xwe danandîye.

Divê ev mîratê qedîm berze nebe û bête veguhastin da nifşên nû jê bê bahr nebin, sûd jê wergirin. Çand û kevneşopîya ligel serpêhatîyan tête veguhastin riha civakê ava dikin. Çîrok û serpêhatî bîra civakêne, dema ev bîre belav bû, ew nirxên Mîrovahî xwe pê ve digirin dê ji holê rabin. Qeyd û benden civakê dê jêk vebin û veresin.

JÊDER:

Dehkhoda, A. E. (1958). *Lügatname-yi Dehkhoda* (Cilt 3). Tahran: Müessese-yi İntişarat ve Çap-ı Danışgah-ı Tahran.

Engin, A. (1990, Adar 6). Mîr û Îsê Dela. (K. Engin, Röportaj Yapan)

Engin, Ş. (2021, Xiziran 17). Mîr û Îsê Dela. (K. Engin, Röportaj Yapan)

Haldun, İ. (2004). *Mukaddime* (Cilt 1). (H. Kendir, Dü.) Ankara: Yeni Şafak Kültür Armağanı.

Kızılkaya, A. (2022, Çileya Pêşin 17). Mir û Îsê Delan. (K. Engin, Röportaj Yapan)

MEB. (1971). *İslam Ansiklopedisi* (Cilt 8). (A. Adıvar, R. Arat, A. Ateş, C. Baysun, & B. Ç. Darkot, Çev.) İstanbul: MEB Yayınları .

Nisan Yağmurunun Faydaları. (2019, Nisan 13). Şubat 2022 tarihinde Yeni Akit Gazatesi: https://www.yeniakit.com.tr/haber/nisan-yagmurlarinin-faydalari-nisan-yagmurlari-neye-iyi-gelir-702592.html adresinden alındı

Saadi, S. A. (2017). *Behdinan Kürt Emirliği.* Dicle Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Sanatları Ana Bilim Dalı. Diyarbakır: Dicle Üniversitesi.

Süleyman b., E. (1985). *el-Mu'cemus-Seğir.* Beyrut: Darul'imar.

Şeriati, A. (2010). *Dinler Tarihi* (Cilt 1). Ankara: Fecr Yayınları.

Yalçın, İ. (2022, Çileya Pêşin 13). Mîr û Îsê Dela. (K. Engin, Röportaj Yapan)

PÊVEK:

ORJİNALÊN SERPÊHATİYAN

1- Divê Gîske ne Qelew bibe ne jî zeîf

Carekê di navbira Mîr û Îsê Dela da nexweşî çêbû. Îsê jî ji ber hindê xwe ji Mîr dûr êxist. Demekê dirêj Îsê xwe berze diket. Mîr gelek lê gerya û siwala wî kir ku wî peyda biket. Belê çi çare lê nekir. Ji bo peydakirina Îsê, Mîri gote Mîrovên xwe, her gundekê giskekê bo rêken, heta biharê wî gîskî li wî gundî bidene miştê, Hûn bêjine gundîyan ew giskê me daye we niha çend kîloye, dema biharê hûn didene me, divê hind kîlo derkeve. Divê ev giske ne qelew bibe, ne jî zêîf bibe. Ew gundê İsê çûyê gotin: Em çi bikin ku ev gîske ne qelew bibe, ne jî zêîf bibe. Îsê gote wan cihekê ji bo vî gîskî çêbiken, alifê/giyayê wî bidenê. Belê gurgekê nêzîkî wî û pêş çavên wî girêden, dema gîske giya dixwe û avê vedixwe çavekê wî dê bi gurgî bikeve û dê bitirse, bi vî awayî dê bimîne ser

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

halê xwe. Ne qelew dibe ne jî zeîf dibe. Heta biharê li ser vî halî dewam kirin. Gundên din jî gîskê Mîri gelek baş xwedankirin û zehmet pêve kêşan da ku gîske ne qelew bibe ne jî zeîf. Belê neşîyan wesa xwedan biken, gîske an qelew bûn, an jî zeîf bûn. Bes ew gundê Îsê lê dima gîske ma li ser kîloya xwe. Mîri zanî ka Îsê li kijan gundîye û bi vî şiklî Îsê peydakirin û carek din înane nik Mîri. (Kızılkaya, 2022)

2- Yekbarî Bi Çi Xweş e.

Serê salê bû, Mîri got: Îsê yekparî bi çi xweş e? Îsê gotê: Yekparî bi "hê" xweş e. Hêdî Mîri heta sala paştir çi axiftin nekirin, sala paştir carek din Mîri got: Ew bi çi xweş e. Îsê gotê: Ew jî bi xwê xweş e. Salek din serda derbas bû, carek din Mîri got: Ew bi çi xweş e. Îsê gotê: Mîrê min ew jî bi me'nê xweş e. (Yalçın, 2022)

3- Mîrim Borî

Versîyon 1

Rojekê Mîri got: Îsê! Rabe xwe hazir bike da biçîne zozana, İsê Dela hespên xwe zîn kirin û berê xwe dane zozana. Dema geheştîne zozana li nav pezî, şivan hat serhevsarê hespê Mîri girt û Mîr ji hespî hate xwarê. Mîri got: Şivano! Ji bo me pezek qer bidoşe. Şivanî pezeke qer dot û îna da Mîri. Mîri şîr vexwar, piştî hingê got: Îsê! Ez dê pîçekê razêm. Çavê te li der û doran bît, da ku çi adî/mêş û mor bi min neveden. Dema Mîr xwew diçît, dûpişkek têt da bi Mîr vedet. Wê demê Mîr hişyar dibît û berê xwe didetê ku Îsê Dela yê li ser serê wî û xencera wî ya di destî da. Mîri got: Îsê! Çi bû? Îsê di dilê xwe da got: Heke ez meselê bo wî bejim ew ji min bawernaket. Ji ber hindê got: Mîrim borî. Çendan Mîri israr kir ku Îsê bibejê ka çi qewimt, Îsê dîsa got: Mîrim borî. Keyfa Mîri nexweş bû û sariyek kete nabeyna Mîr û Îsê Dela. Rabûn qesta malên xwe kirin. Çend rojek ser vê meselê da derbasbûn. Mîri wekî berê li gel Îsê Dela xeber neda û keyfa xwe pê xweş nekir. Îsê Dela rojekê gote jina xwe, hewceye em ji vê derê mala xwe bar biken û biçîne cihek din. Jina wî jî gotê: Bo çî? Cihê me li vê derê xweş e. Em baş derbas dikin. Eve çi gotine tu dibêjî? Jina wî çi kir û nekir mêrê xwe qanî' nekir. Îsê mala xwe bar kir û kete rêkê. Çend konaxan dûr ket. Di geliyekê de zeviyek bo xwe peyda kir û malek bo xwe avakir û zeviya xwe gundor lê çandin. İsê Dela dest havête parêzvanî û baxçevaniyê. Heta demek dirêj serda derbas bû. Hêdî şolên Mîri baş derbas nebûn û miletî hêdî guhdariya Mîri nedikir. Rojekê Mîri got: Kurê min, hûn dibînin milet guhdarîya min naket û sîyaneta min nagirin. Here Îsê Dela li kirê be peyda bike û bîne nik me. Da ku ew rê nîşa me bidet û dîsa şêwirmendîya min biket, da ku em şolên miletî bişên pêk bînin. Kurê Mîri rabû li Îsê Dela gerya, piştî çend rojekan li rexê geliyekê Îsê Dela peyda kir. Dema Îsê Dela kurê Mîr dîtî, gelek keyf xweş bû.

Îsê Dela got: Teyrê xwerîb te xêre tu ji kî ve têy û dê kîve bîçî? Kurê Mîri mebesta hatina xwe ji bo Îsê Dela got. Îsê zevyek gundoran çandibû. Gundorên wî yên geheştîn û wextê xwarin û firotina wan e. Kurê Mîri gotê: Vêca ka tu dê çi bo min bêjî da ez bo babê xwe bejim, da carek din millet xeberê babê min biket û şolên me bi rêve biçin. Îsê rabû çû bine zevyê ew gundûrên geheştî hemî perçiqandin û herişandin heta hatîye serê zevîyê gundorek bi tenê nehêla sax, Îsê çû bine zeviya xwe carek din dest âvêtê heta hatîye sêrê zevyê ew gundorên taze kulîlk dayîn hemî ber binê wan xepare kirin, avdan û hat rûnişt. Kurê Mîri berê xwe dayê ku Îsê ev gundore hemî meriçandin, di dilê xwe de bo xwe got: Ev Mîrove wek dîna ye, ev gundorên geheştî hemî meriçandin û ewên taze kulîlk dayîn jî xepare kirin û avdan, heta du meh din jî ev kulîlke

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

husa mezin nabin û nagehin. Aqlê ji vî çedibe dê yê çawa bît. Babê min ji vî xiraptire ku ez rêkirîme nik vî dînî. Carek din gotê: Îsê! Tu çi dibêjî, ez çi bêjime babê xwe, Îsê tiştek negot. Kurê Mîri rabû xatra xwe ji Îsê xwast û çû. Dema vegerîya babê wî gotê: Kurê min! Te Îsê dît, wî çi gote te? Kurê wî gotê: Belê! min ew dît, çi aqlê min ji wî nebirî. Mîri gotê: Bo çî? Kurê wî mesela gundoran bo babê xwe got. Mîri gote Kurê xwe: Babo ew dîn nîne, wî peyamek bi awayek veşartî bo te gotiye, belê tu tê negehştî. Kurê wî gote babê xwe, wî çi peyam daye min. Mîri got: Kurê min wî di vê peyama xwe de hezkiriye ku bêjite me, ew Mîrovên di nav xelkê de pîr bûyin û bi xeberê te neken û nexweşîyê di dene miletî, tu wan hemiyan bîne hindekan bike di zîndanê de û hindekan jî serê wan jê bike. Wê gavê dê şolen te durist bin û milet dê bi xeberê te biken. (Ahmet, 1990)

Versiyon 2

Rojekê Mîr dibêje Îsê divê tu xwewa min bînî. Îsê jî ji bo Mîri çîrok gotin. Mîr xwew diçît. Îsê ronahî/agir temirand/vemirand da ku xwewa Mîr neçe. Îsê berê xwe dayê dûpişkek hate bine guhê Mîr, piçek maye ku dûpişk bi Mîr vedet, Îsê bo xwe got: Heke ez pê xwe lê bidim, dengê pê min dê Mîr hişyar biket, heke ez nekujim dê ew dûpişke dê bi Mîr vedet. Hema xencera xwe ji kavlanî kêşa, wê gavê sîrên ji xencera wî hat û dûpişk berze bû, Mîr jiber sîrêna xencerê hişyar bû, berê xwe dayê Îsê yê li ser serê wî û xwencera rûs ya di destê wî de. Mîri gotê: Îsê! Ma heta vêrê jî, Mîri hizir kir Îsê qesta kuştina wî kir. Mîri carek din gotê: Îsê! Çi qewimt? Îsê gotê: Mîrim borî. Îsê hizra xwe kir, heke ez bejim dûpişk da bi te vedet, ew bawer naket. Mîri gotê: Îsê! Here cihek wîsa ku tu neêye ve û ez te nebînim. Mîr aciz bû, hema ew bu ku Îsê nekujît, li gor hindek gotina Îsê Dela diçît û heft salan dimînîte bi dinyayê ve, lewra ne husaye ku heft salan mabît, sal wextekê maye bi dinyayê ve. Îsê Dela rih û simbêlên xwe berdan û cilên aşevaniyê kirine ber xwe. Ji bo xwe aşek çêkir û dest bi aşevanîyê kir. Hedî şola Mîr bi rêve neçû, xelkê wî serê xwe lê rakir û kesekê guhdarîya Mîr nekir. Mîr got: Şola min bi revê naçît, min hewcehî bi aqilmendekê heye, da ku harîkariya min biket. Piştî Îsê çû mala min xirabû, da xencerekê li min detin, belê dîsa jî Îsê bo min gelek bû. (Kızılkaya, 2022)

4- Kursê/Bagurdanê Zêr

Rojekê Mîr Behram Beg got: Min kûrsek zêr, li gor hindek rîvayetên din bagurdanek zêr heye, ez dê bînime meydanê/dîwanxwanê da ku qîmeta wî bête zanîn, wî demî gelek Mîrov ji qenc û xiraban hazir bûne.

Mîri got: Gelî ehlê dîwanê! Qîmeta vî kursê/Bagurdanê zêr çi ye? Her kesek kit kite bila gotina xwe bêjît. Ew kesên li wê derê di hazir her yekê tiştek got û qîmetek dana ser.

Behram Beg got: Îsê! Vêca dûra te ye, ka qîmeta wî kursê/Bagurdanê zêr çiye?

Îsê got:

Nabeyna nîsanê û gulanê
Bêt tavek baranê
Li ser deşta dubanê
Çêtire vê kursê/Bagurdanê zêr ya li dîwanê (Kızılkaya, 2022)

Piştî hingê Mîri gote ehlê dîwanê, çend zireet û çandinî li cihê badînan çêdibe, yanî dexil, dan, dûkak û weradeta vê herêmê hemî li deşta dubanê çêdibe, heke baran nebare, ew dexil, genim û zireet dê hemî hişk bibe, wê gavê xelkê me dê bimîne bê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

weradet, wê gavê Stenbol, Besra û Helep vî milletî xilas nakin. Ji van gotinên Mîri Wîsa tê zanîn herêma li bin hukmê Mîrî têra xwe çandin kirîne, dexl û dûkakên xwe wan bi xwe çandîne, girêdayî heremên biyanî nebûne.

5- Jina Diz û Hîz

Carekê Mîri gote Îsê Dela: Tu bo çî ji bo xwe jinekê naînî? Îsê Dela got: Mîrê min! bêjim ka bo çî ez jînê bo xwe naînim! Mîr gotê belê kerem bike bêje. Îsê Dela got: Mîre min! divê ew jina ez bo xwe bînim ya diz û hîz bît. Piştî hingê me'neya gotinên Îsê Mîri ji bo ehlê dîwanê wîsa got: Heke jin ya diz bît, dizîyê ji mala mêrê xwe biket, tiştên wî vegirît, bo mêvana bihêlît, yanî paşxwane hebît, tiştî ji malê xilas neket. Diza mala xwe bît, ne diza mala xelkê bît. Hîzbît, hez wî biket, hez kesê din neket. (Kızılkaya, 2022)

6- Hevaliya Îsê Dela û Pîremêrî

Versîyon 1

Rojekê Mîr dibêjîte Îsê Dela tu serbestî ji bo xwe jinekê hilbijêrî, kiça kê bît, da em bo te bixwazîn. Îsê derdikeve û dest bi rêvingiyê diket û da kû ji bo xwe bergerhana jin xwstinê biket. Pîremêrek dibîte rêhevalê wî û pêkve rêvingîyê diken. Pêkve têne rexê avekê/çemekê da derbas bibin. Îsê dibîne ku pîremêr dê bikevîte di avê da û dê av wî bibet. Îsê got: Mamo! Me du pê hene, divê em bikin sê pê, pîremêrî got: Xwedê du pê dayine me, ji şola Xwedê neaxive. Îsê darek îna da pîremêrî û gotê ev dare bo te, bi de ber xwe. Piştî hingê evraziyek kete rêka wan de, Îsê got: Mamo! Divê yek ji me yekê bidete pişta xwe. Pîremêrî got: Xwedê ji te razî! Ez pîremêr im, ez neşêm birêve biçim, dê çawa te deme pişta xwe. Îsê got: Baş e tu dizanî. Piştî hingê ketina deştekê, li wê deştê genim yê çand, Îsê got: Genimo xwezî min zanîba ka xwedanî tu xwarî an ne. Pîrêmêrî carek din ma hêbetî û got: Xwedê ji te razîbe, hêj genim nedurîye û nerakiriye, xwedan dê çawa xwetin, eve çi gotinêt dîna ne tu dibêjî? Îsê got: Mamo hema min jî we got. Geheştine gundekê, Îsê dîsa got: Ez nizanim ka ez mêvanê Xwedê me, an jî mêvanê benya me? Pîremêrî carek din ma hêbetî got: Eve maye te negotî, pîremêrî Îsê ligel xwe bire mala xwe. Îsê Dela got: Xaniyê te baş e, belê li ser stûnekê ye. Pîremêrî ew pirsen Îsê Dela di rêda ji wî kirîn ji bo kiça xwe gotin. Gotê kiça xwe ewî ez di rê dê gelek aciz kirim. Kiça wî got: Dema gote te "Me du pê hene divê em bikin sê pê" ewî behsa darî bû, da hûn bidin ber xwe û da ji çemî derbas bibin. Dema gotî "divê yek ji me yekê bidete pişta xwe" yanî rêka me evraziye divê yek ji me bo yê din sohbetekê biket da rêka me kurt bibît û da evrazî li ber me zehmet nekevît. Dema gotî: Ka xwedanê genîmî tu xwarî an ne, yanî xwedanê genîmî qerdare, çi selem hene an ne. Dema gotî: Ka ez mêvanê Xweda me an mêvanê evdame, ka ez dê biçime mala kesekê an jî dê biçime mizgeftê, dema gotî xaniyê te li ser stûnekê ye yanî ev jinike ya leng e. Pîrêmêrî gote kiça xwe, babo! Tu ji bo vî Mîrovî başî, pîremêrî kiça xwe li Îsê nikah kir. (Kızılkaya, 2022)

Versîyon 2

Di versiyonek din da ev serpêhatîye bi şiklekê din tête vegotin. Carekê Mîr Îsê gazi diket. Dibejîtê: Min divêt tu ji bo min bêjî dema agir li bin avê dihilbît ka bo çi dengê kelînê ji avê têt. Îsê jî derketîye rêvingîyê da kû vekolînêkê biket û piştî hingê bersiva Mîri bidet. Di versîyana me li jorî behsa wê kirî û versîyona din wek yekin, bes li serê revingiyê de behsê avê û sê pê naêt kirin. Di versîyona din de behsek têtê kirin ku di versîyona jor de nehatîye kirin. Ew jî ewe ku Îsê ligel piremerî naçîte mala wî, diçîte mizgeftê, dema pîremêr diçîte mala xwe behsa rêvingîya xwe û Îsê bo kiça xwe diket.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Kiça wî jî dibêjitê babê xwe ew kîve çû, te bo çî ew ligel xwe neîna mal. Pêremêr dibejîte kiça xwe ew çû mizgeftê. Kiça wî jî sîh nana û dazdeh hêka didete babê xwe û dibêjîtê: Babo! Van nan û hêka bo wî bibe mizgeftê, belê di rêkê da qed nexwe, da hejmara wan kêm nebît. Pîremêr çanteyê xwe dihilgirît û diçîte mizgeftê. Pîremêr di rêda zêde birsî dibît, du nan û du hêka dixwet. Dema tête mizgeftê nano hêkan didete Îsê, Îsê jî dest pê diket ewil nanî, piştî hingê jî hêkan dihejmêrît. Paşê Îsê dibejê pîremêrî li nik we meh çend rojîn, Pîremêr dibêjê: Sîh roj in. Îsê dibêje nexêr mehên we bist û heşt rojin, piştî hingê Îsê dibêjîtê dê bibejê ka li nik we sal çend rojin. Pîremêr carek din dibêjîtê li nik me sal jî dazdeh meh in. Carek din Îsê dibêjît: Min ewil gotibû ku ev Mîrove yê durist nîne, eve Mîrovekê bêaqil û dîne. Pîremêr xatra xwe jê dixwaze û diçe mala xwe û dibejîte kiça xwe, babo! Min gote te eve Mîrovekê dîne, belê te ji min bawer nekir. Kiça wî gotê babo carek din çi çêbû, ka bo min bêje. Pîremêrî gotê kiça min! Dema wî nan hejmartî gote min mehên we çend rojin? Min gote wî: Sîh rojin. Wî gote min: Nexêr mehên we ne sîh rojin, bist û heşt rôjin. Dema gote min: Salên we çend mehîn? Min gotê: Dazdeh mehîn. Wî getê min: Nexêr, ne dazdeh mehin, deh mehin. Kiça wî gotê: Babo! Ew Mîrov dîn nîne, tu tênegeştî. Min gotibû te çi nan û hêkan di rê de nexwe, belê heçkû te neşîyaye nefsa xwe. Piremêrî gote kiça xwe belê min du nan û dû hêk xwarin, kiça wî gotê: Babo! Min li gor hejmara rojên mehan û mehên salan nan û hêk dana bûn. Te du nan û du hêk xwarin û ev hejmare xirapkir. Wî ji ber hinde wîsa gotîye. Here wî bîne mala me, da ew bibe mêvanê me. Îsê dibe mêvanê wan, kiça pîremêrî dibêjîte Îsê Dela dê bo me bêje tu hatîye vêrê çi? Îsê Dela jî hal û meselên xwe bo kiça pîremêrî dibêjît. Kiça pîremêrî dibêjê: Dema agir li bin avê dihilbe û av dikele. Av hin qeder aciz û bê hal dibe, di acizahîyên xwe de dibêjît: Wey daro! Bihar û havîna tu maye bê av, tu da hişk û zuha bî, ez hatim min binê te ter kir, ez ketime nav te da, tu şîn bûyî û te xeml û koka xwe girt. Tu niha boye agir û vê bi serê min tînî. (Engin A. , 1990)

7- Mîr û Mezinên Zêbariyan

Rojekê Mîr mezinên Zebariyan gazikirin û gotê: Divê hûn diravê/xercê biden, dema ew diçin ser axa xwe dibêjin em çu diravê nadin, carek din Mîr wan gazî diket û dibêjîtê ka hûn bo çî diravê nadin? Careka din dibêjin: Em dê diravê bidin, dema carek din diçin ser axa xwe dîsa dibêjin em xercê nadin. Mîr siwala xwe bi Îsê diket ka ev Mîrove bo çi wîsa hereket dikin û diravê nadin. Îsê dibêjît: Mîrê min! Ne binasêt wan in, Mîri gotê: Be binasên çine? Îsê gote Mîri binasêt axa wan in, axa zêbariyan nêre, em dê wan bi awayekê din ceribînîn. Ka ew dê diravê biden an ne? Em dê hindek axê ji devera zêbarîya înîn danîne bin mehfûran da, axê reşînîn û mehfûran jî danîne ser, maqûlên zêbariyan bila li ser mehfûran rûnin, heke dîsa gotin em diravê nadin ew binasêt axê ne, heke dirav dan wê gavê ne binasêt axê ne, bi wî awayî ceribandin, dîsa wan gotin em diravê nadin.

8- Edalet Hebe Xweşî Jî Dê Hebe

Rojekê Mîri got: Kîjan cih xweş e, Îsê gotê: Mîrê min Sipne xweş e. Mîrî carek din got: Îsê kîjan cih nexweş e, Îsê dîsa gotê: Sipne. Mîr girnijî, wê gavê Mîr got: Gelî ehlê dîwanê! Hûn dizanin Îsê çi dibêje? Ehlê dîwanê got: Ne em nizanîn, Mîri got: dibêje Sipne hem xweş e, hem jî nexweş e. Hûn dizanin xweşî û nexweşiyên wê çi ne? Heke hukimdarê kelata Amêdiyê bi edalet bît, Sipne xweş e, heke hukimdarê kelata Amêdiyê zalim bît, Sipne nexweş e. (Kızılkaya, 2022)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

9- **Tamahiya Malê Dinyayê**

Rojekê Mîri got: Îsê! Çi tişt dê Mîrovî serda bibet, Îsê gotê: Tamahî. Mîri got: Çawa tamahî? Piştî hingê Îsê Dela tirarekê/taseke zêr dikete bin axê re, carekê Îsê û Mîr diçine wî cihî geryanê. Îsê bi kupalê xwe ve wî cihî dikole, ew tirare li wêrê veşartî dertêxît. Mîr dibîne ku ew tişte gelek bi qîmet û jêhatiye. Mîri got: Eve çi ye? Îsê got: Eve tirarek zêr e, babê min ev tirare kirîye di vêderê de û veşartiye. Belê wesiyetek babê min heye, heçî kesê pişkilekê bikete di devê xwe de ka tama wê çawaye, vî tiştî bidene wî, Mîr pişkilekê gerya da bikete di devê xwe de, Îsê gotê: Mîrê min were, min tu ceribandî, te dît ka tamahiyê çawa tu serda birî û çi bi serê te îna. Mîri got: Belê, tamahî gû jî bi Mîrov dide xwarin. (Kızılkaya, 2022)

10- Sindûqa Parên Mîr Xwalî Bû

Rojekê Mîr dibejîte Îsê sindûqa me ya para xwalî bûye, debara me têra sal bi sal naket, em çi bikên, xelk xercê didet belê têra naket, Îsê gotê: Em dê çar şertan biken ferz, ew kesê ev şerte li nik wî hebin em dê xercê jî wî bistînin. Ev kesê navê wî Ferhan bît, ev kesê bîrê biket (Bîr; cihê çêkirina şel û şepkan e), ew kesê serê wî keçel bît, ew kesê hewêciyên wî durist nebin. Ew kesê ji yek van tiştan li dev wî hebît dê xercê bidet, wê gavê dê têra me pare kom bibin. Qasidên Mîri çûne gundekê û şeq şeqa bîrê hate wan, qasidan got: Eve mecîdiyek me peyda kir, dor xanî zivirîn dîtin ku mîrovek li wêrê yê bîrê diket, gotin: Deh mecîdîya bide me, wî Mîrovî gotê: Bo çi? Qasidan gotê: Mîri ev tişte kirîye şert, ew kesê bîrê biket divê deh mecîdîya bidet. Wî mîrovî got: Heta niha kesê çu mecîdî ji min nexwastîne, eve çi xerce ez nadem, qasîdî şeqek li wî da û şepqê wî ji serî fîrî û dîtin ku ew mîrov yê keçel e, qasîdî gotê: Tu dê bîst mecîdîya bidey. Wî mîrovî got: Ez deh mecîdîya nadem, dê çawa bîst mecîdiya bidem, qasida pêhnek din jî lê dan, jina wî Mîrovî hat û got: Hewêciyên/gunên wî durist nînin hewe ew kuşt û peqand, qasidan gotê: Tu dê sîh mecîdîyan bidey. Wê gavê Mîrovek din hate wêrê û gote qasidan, we çi ji Ferhan divêt, qasidan got: Tu dê niha çil mecîdîyan bidey ku navê te jî Ferhan e. (Kızılkaya, 2022)

11-Şêrek Çûye Di Nav Rezî De Belê Wek Tula û Rûviyan Derketiye

Rojekê Mîr diçîte mala Îsê, wî demî Îsê li mal nebûye, Îsê jinek bi kemal û merîfet û xwedan edeb hebûye. Ev jine kiça baban bûye. Jina Îsê hêk ikramî Mîr kirin. Hêk reng reng bûne, Mîr têgeheşt ku Îsê li mal nîne û nabeyna wî û jina wî ya nexweş e. Mîr ji bo cerbe çûye mala Îsê, dema hêk danane ber Mîr zanî, Mîr rabû û hêk nexwarin, hindek dibêjin hêk xwarin, potîna xwe kire pê xwe, wê gavê nalçeya potîna (nalçe têxine binê potînan) wî ket, dema ketî nerakir, her wesa jinkê jî nerakir, dema Îsê hatîye mala xwe ev rewşe dît. Pişta xwe da jina xwe û çû dîwana Mîr, Mîr zanî ku kêyfa Îsê wekî berê ya xweş nîne, Mîri got: Min zanîye te rezek heye, te rezê xwe dêm kiriye, Îsê got: Belê ezbenî. Mîrî gotê: Te bo çî rezê xwe dêm kiriye? Îsê gotê: Mîrê min! Min dewsa şêrekê li nav rezê xwe dîtiye. Mîri gotê: Tu rast dibejî, şêr çûye nav rezî da belê wextê ew şêr derketî wekî tule û rûvîyan pûrt pêve nemaye, kesekê nezanî ka eve çi meseleye Mîr û Îsê di nabeyna xwe de diaxivin. Piştî hingê Îsê li mala xwe û jina xwe zivireye ve. (Kızılkaya, 2022).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Hakkari/Culemêrg Yöresinde Mir ve Îsê Dela'nın Söz ve Hikayeleri

ÖZET:

Kürt Halk edebiyatına göre Îsê Dela Mîr'e danışmanlık yapmıştır. İsê Dela'nın danışmanlık yaptığı Mîr'in kim olduğu ve hangi yüzyılda yaşadığına dair halk tarafından farklı bilgiler nakledilmiştir. Mîr önemli bulduğu toplumsal olaylara dair İsê'nin bilgisine başvurmuştur. İsê de kendisine danışılan konularla ilgili olarak hakimane ve arifane bir şekilde sözlerini söylemiştir. İsê'nin sözleri Kürt toplumunun kalbinde bir nakış gibi yerini almıştır. Aynı zamanda İsê'nin hikâyeleri ve hikmetli sözleri Kürt toplumunda yaygın olarak yer almış ve Kürt Halk Edebiyatında önemli bir yer tutmuştur. Bu hikâyeler hem geçmişte toplum üzerinde ciddi bir etki bırakmış, hem de toplumda kanaat önderleri ve bilge kişiler tarafından yeni nesillere aktarılmıştır. Diğer Kürt yörelerinde olduğu gibi Hakkâri yöresinde de bu hikayaler kış mevsimlerinde genellikle kara ve uzun gecelerde köşklerde ve divanlarda anlatılmıştır. Mîr ve Îsê hikâyelerinin konuları çeşitlidir. Hayatın her alanında bu hikâyeler Kürt toplumunda yerini almıştır. Bu hikâyeler ve sözler arasında nükte, şaka, öğütler kendini göstermiştir. Türk Halk edebiyatında Nasrettin hoca'nın hikâyeleri halk arasında nasıl yayılmışsa, aynı şekilde Kürt Halk edebiyatında da Îsê'nin hikâyeleri aynı şekilde yayılmış ve halk tarafından sevilmiştir. Îsê Dela'nın hikmetli sözleri bir küpe gibi insanın her an kulağına takması gerekmektedir. Aynı şekilde bu hikâyeler bir yolcunun yolunu kaybetmemesi için yol göstericidir. Bu nedenle bu makalede Kürt Halk Edebiyatının Hakkâri yöresinde yaygın olan Îsê'nin hikâyeleri ve hikmetli sözlerini çalıştık. Ayrıca hikâyelerin temaları üzerinde durduk ve hikâyelerin sosyal arka planını yeni nesillere aktarmanın öneminden bahsettik.

Anahtar Kelimeler: *Mîr, İsê Dela, Danışman, Hakkâri, Hikâyeler, Halk Edebiyatı*

In Hakarian/ Culamerg District Tales and Proverbs of Meer and Ise Dela

Abstract:

According to the literature of Kurdish Folk literature, Îsê Dela was an advisor to Mîr. Different information has been conveyed by the public about who Mîr is and what century he lived in. Mîr has resorted to Isê's knowledge of social events that he considers important. Isê also said his words in a judged and admicable manner regarding the issues he was consulted on. Isê's words have taken their place as an embroidery at the heart of Kurdish society. At the same time, isê's stories and wise words have been widely involved in Kurdish society and have an important place in Kurdish Folk Literature. These stories have had a serious impact on society in the past and have been passed on to new generations by opinion leaders and wise people in society. As in other Kurdish regions, these stories are usually described in mansions and divans on land and long nights in winter. The subjects of the Mîr and Îsê stories are

varied. In all areas of life, these stories have taken their place in Kurdish society. Between these stories and words, wit, jokes, advice have manifested themselves. Just as Nasrettin hodja's stories were spread among the people in Turkish folk literature, Îsê's stories were spread in the same way in Kurdish Folk literature and loved by the people. Îsê Dela's wise words should be worn in one's ear at any moment like an earring. Likewise, these stories are a guide for a passenger not to lose their way. For this reason, in this article, we studied the stories and wise words of Îsê, which is widespread in hakkari region in the literature of Kurdish Folk Literature. We also focused on the themes of stories and talked about the importance of passing on the social background of stories to new generations.

Keywords: *Meer, Ise Dela, Consultant, Hakkari, Stories, Folk Literature.*

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو فەکولینێن کوردی

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

DESTANA DERWÊŞÊ EVDÎ Û EDÛLÊ
JI ALÎYÊ HELWESTÊN ETNÎK Û DÎNÎ VE[1]

Dr. Hikmettin Atlı
Beşa Ziman û Çanda Kurdî- Enstîtuya Zimanên Zindî- Zanîngeha Mardin Artuklu/Turkîya

PUXTE:
Destanên netewî ji alîyê derbirîna nasnameyên civakî ve gelekî giring in ku em bi rêya vekolîna li ser wan di heqê civakê de digihîjin pêzanînan. Ev cure pêzanîn herçendî ku ne wekî dokumetnên dîrokî mezbût bin jî ew bi rengekî; meylên hîsî, hêvî, tegihîştina rabirdûyê û texeyulên dahtûyê yên wê koma civakî nîşanî me didin. Çawa ku di nava civakê de tebeqeyên dînî, çînî, zayendî, etnîk derdikevin pêş me wisa jî em dibînin ku metnên destanan vê pir rengîya civakê didin der. Her destan, hem ji demên berî xwe hem jî ji dema xwe gelek taybetmendîyên civakî dihewîne û wan neqlî dahatûyê dike. Lewma jî vekolîna li ser metnên destanan di heman demê de vekolîneke li ser civakê ye jî. Bi rêya xwendin û vekolînên analitik yên li ser van metnan em di heqê refleksên wê civakê de jî digihîjin gelekî agahîyan. Di vê xebatê de em ê di vê çarçoveyê de bere xwe bidin çend varyantên Destana Derwêşê Evdî û Edûlê û hewil bidin nişan bidin ku ev cure metnên folklorî çawa dibin meydana îdîayên nasnameyî yên civakan. Ev varyantên ku em ê vekolîna xwe li serê bikin ji nava civaka kurdên misilman û kurdên êzîdî hatine berhevkirin.

Peyvên Serekî: *Folklor, destan, kurd, êzîdî, etnîsîte, dîn, nasname.*

Destpêk:

Berhemên folklorî herçendî ku aliyekî wan yê edebî û estetîk hebin jî ji bo têgihîştineke tam divê ew bi tenê ji alîyê edebî û estetîk ve neyên nirxandin. Li gorî Lutz Rohirich; berhemên folklorî divê di nava wê sîstema çandî de bêne nirxandin ku ew ji navê derketine. Çand sîstemên watedayinê ne. Yanê metna ku tê xwendin, berhema ku tê îcrakirin di nava wê çandê de li gorî temen, cinsiyet û aîdyetên etnîk tê watedarkirin[2]

"Faraziyeya giştî ev e ku folklora civakekê, hin taybetmendîyên derbarê wê civakê de dihundirîne, lewre ku aydê wê civakê ye an jî ji aliyê wê civakê ve hatiye durustkirin. Taybetmendîyên xwerû yên civakê ku di nava berhema folklorê de derdiçin, esasen mijarên veşarî ne."[3]

Di berhemên folklorî yên mîna destanan de ev taybetmendî bi piranî bi avanîya wê civakê ve girêdayî ne ku civak ji wan hêmanan pêk hatiye an jî hebûna xwe ya konjektorî ya li ser rûyê zemîn li gorî wan taybetmendîyan watedar kiriye. Di destanan de ev yek wekî temsil an jî sembol derdikevin pêş me. Ev temsil carina dibe ku di şexsê takekesek honakî de şênber bibin û carina jî dibe ku bi rêya derbirîna hin kodên civakî derbiçin. Esasen her lehengê destanan bi vî rengî temsîla beşeke civakê an jî fikriyateke civakê dikin. Lewre komînîkasyona di navbera lehengên destanan de di heman deme de

komînîkasyona navber-civakî ye jî. Civak bi hev re an jî tebeqeyên civakî bi hev re bi rêya berhemên folklorê di nava komînîkasyonê de ne. Ev di heman demê de nîqaşeke civakî ye ku folklor an jî cureyên cuda yên vegotinê têne bikaranîn. Carina tê dîtin ku ev dibe komînîksyoneke navber-çandî an jî herêmî. Her guherîna di metna folklorê de ku li gorî herêm an jî çandên cuda derdikevin pêş me, di heman demê de bersivek in, ji bo ya ku jê hatiye wergirtin. Lewre ew mohra xwe ya çandî tevî nêrîna xwe ya dinyayê li wê vegotinê dixin.

Li gorî Bauman, folklor, gelek taybetiyên ji hev cuda di nava xwe de dihewîne ku ev yek bi ser aîdiyetên etnîk, dînî, çînî û zimanî ve ne. Û folklor dibe alîkar ku temsîla kolektîf ya civakên homojen derkeve. Berhemên folklorî di nava sîrkulasyoneke bi vî rengî de ne.[4]

"Tê dîtin ku foklor di nava têkiliyên hem sîmetrîk hem jî asîmetrîk de ye. Endamên hin koman an jî endamên hin kategoriyên civakî, li ser bingeha nasnameya ku parve dikin, dikarin bi hinên din re bikevin dan û stendina folklorî."[5]

Herçendî ku bi rengekî xwezayî folklor û berhemên folklorê meydana îdîayên nasnameyî bin jî di sedsalên dawîn da bi îdeolojîkbûna xebatên folklorê ve girêdayî bi taybetî girêdayî nasnameya netewî gelekî berhemên folklorê hatine manîpulekirin û ji nû ve hatine organîzekirin.

Yek ji fikra ku bandoreke mezin li folklorê kiriye, netewîtî ye. Bikaranîna folklorê ji bo nasnameyên konjektorî û demî yên polîtîk, carina lêkolerên folklorê jî ber bi tesewirên xelet ve biriye. Li vê derê em behsa folklora xwezayî ya civakê nakin. Helbet di wir de hîsên etnîk û çandî hene. Li vê derê em behsa folklora tenzîmkirî an jî bikaranîna wê li dû hin mebestên serdemî û konjektorî dikin ku vê yekê di heman demê de di xebatên folklorê de xitimandinekê pêkaniye.

"Mixabin carina folklor li şûna gerdûnîbûnê bêtir, wekî reklama neteweperestiyê hatiye îstîsmarkirin. Mînaka Brayên Grimm vê yekê nîşan dide. Bi rastî pir tiştên ku wan li miletê alman kirine mal, di nava gelekî miletên dî de jî hene."[6]

Vlademir Propp balê dikêşe ser taybetmendiya îdeolojîkbûn û konjektorîbûna fenomena folklorê.

"Folklor, dîsîplîneke îdeolojîk e. Armanc û rêbazên wê, li dû nêrînên giştî yên wê heyamê têne diyarkirin. Dema ku nêrîneke total ji holê radibe, prensîbên vekolînê ku ji aliyê wê nêrîna total ve hatine diyarkirin jî hunda dibin."[7]

Wekî ku em ji van nêrînan jî têdigihîjin, di meseleya folklor û nasnameyê da du alîyên giring hene. Yek jê ew e ku di keresteyên folklorê de bi awayekî xwezayî em rastî nîşaneyên nasnameyî yên civakê tên û ev yek rasteqînîyeke fenomena folklorê ye û ya dî jî ji nû ve organîzekirina berhemên folklorî ye ku ev bi mudaxeleyên dû re hatine kirin û li derveyê prosesa xwezayî ya berhemên folklorê ye.

1. Destana Derwêşê Evdî û Edûlê

Destana Derwêşê Evdî û Edûlê, ji alîye temsîlên nasnameya etnîk û dînî ve yek ji destana herî giring e. Ev destan çawa ku ji alîyekî ve bêsînorîya têgiha evînê nîşanê me dide wisa jî hem sînorên di navbera civaka kurdan de hem jî sînorên di navbera civaka kurd û civakên dî de bi me dide nasîn. Bi rêya vê destanê em dibînin ku beşên cuda yên ku civaka kurdî pêk tînin xwe di nava tevdehîya civaka kurdî de çawa pênase dikin û li hember civakên reqîb çawa helwestê nîşan didin. Herêma ku destan an jî bûyerên destanê lê qewimî ne, ji alîyê pirrengîya temsîlên civakî ve gelekî giring e. Li vê herêmê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

beşên giring yên ku civaka kurd pêk tînin, wekî kurdên êzîdî û kurdên misilman hene. Herwiha ji ber ku herêmeke ser-sînorî ye jî li hember van herdu beşên civaka kurdî, civakên mîna ereb û turkmen jî hene. Atmosfera destanê li derdora têgihên ku îşaret bi nasnameya kolektif dikin, wekî eşîr, milet û dîn, hatiye honandin. Di metna destanê de em vê realîteya ser erdî bi aşkerayî dibînin.

Di vê xebatê de em ê çend varyantên cuda yên vê destanê bidin ber hev ku hin ji van varyantan ji herêmên kurdên êzîdî hatine berhevkirin û hin ji van jî ji herêmên kurdên misilman. Tê dîtin ku her beşa civakî dema ku vê destanê ji nû ve îcra dike, eynî wekî ku di destanê de derdikeve pêş me, îcraya xwe li gorî kodên xwe yên etnîk û dînî pêk tîne.

Di beşa yekem ya gotarê de em ê varyantên destanê yên ku ji nava civaka kurdên êzîdî hatine berhevkirin vekolin. Ev varyant ji nava êzîdîyên Kafkasyayê (Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl[8]) û êzîdîyên herêma Şengalê (Xeyrî Şengalî[9], Ömer Uluçay[10]) hatine berhevkirin. Di vê beşê de em ê hewil bidin têbigihîjin ku civaka êzîdî dema ku vê metna zargotinî îcra dike, helwestên xwe yên nasnameyî çawa dide der. Cudabûna bawerîyê bandoreka çawa li ser tercîhên wan yên nasnameya hevpar dike? Ew xwe li hember civaka kurdên misilman û li hember civakên wekî ereb û turk çawa pênase dikin?

Di beşa duyem de, em ê varyantên destanê yên ku ji nava civaka kurdên misilman hatine berhevkirin vekolin. Em ê di vê beşê de hewil bidin nişan bidin ku civaka kurdên misilman vê destana ku tê de mohreka aşkera ya êzdîyatîyê heye çawa şirove dike, xwe di asta etnîk û dînî de li ku derê bicih dike û herwiha nêrîna xwe ya li civaka kurdên êzîdî û civakên ereb û turk çawa dide der.

Di vê beşe de jî em ê sê varyantêj ji herêmên cuda vekolin ku yek jê ji kitêba Mehmet Gültekîn hatiye wergirtin û wî neqil kiriye ku wî ev varyant di sala 1984an de ji herêma Bazîdê û ji zarê dengbêjek bi navê Xalido ji ser kasetekê veguheztiye.[11] Varyanta duyemîn ji herêma Wanê, ji dengbêjek bi navê Ehmed Zeynal ku xelkê Mûradiyê ye hatiye vegirtin ku Perwîz Cîhanî di sala 1989an de ji kasetê vegirtiye û di kovara Sîrwe de çap kiriye.[12] Varyanta dawîn ji aliyê dengbêjek bi navê Baqiyê Xido ve di sala 1987an de li ser kasetek hatiye neşirkirin û Şahînê Bekirê Soreklî ew veguheztiye metna nivîskî.[13] Ev varyant aydê herêma Kobanê ye ku ev herêm, herêma destanê ye. Taybetiyeke balkêş ya vê varyantê ev e ku vebêjê wê bi eslê xwe ereb e. Û herêm Kobanî ye ku ev herêm her çendî sed sal berê statuya wê cuda bû jî, ji sed salî vir ve ew girêdayî Sûrî ye û li wê derê kurd û ereb bi hev re dijîn.

Di vê miqayeseyê de em ê li ser esasên derçûnên nasnameya dînî û etnîk, di navbera varyantên ji zarê zarbêjên kurdên êzîdî û zarbêjên kurdên misliman de bikin. Her wiha varyantek li ber destê me heye ku zarbêjê wê kurdekî bi eslê xwe ereb e. Em ê vê varyantê jî cî bi cî tevî nava miqayeseyê bikin.

1.1. Varyantên Kurdên Êzîdî

Di pêwendiya berhemên folklorî de taybetiyeke girîng ya civaka êzîdiyan ev e ku; ew di her rewşê de mohra xwe ya etno-dînî li berhema folklorê dixin û ev reflekseke nasnameyî ya vê civakê ye. Digel ku wekî dîskûrseke polîtîk, carina di nava civaka êzîdiyan de tê dîtin ku ew xwe ji civaka kurd dûr dixin heta xwe kurd nahesibînin jî, wekî ku carina di bêjara polîtîk ya êzîdiyên herêmên Kafkasya û Şengalê tê dîtin, dema ku em berê xwe didin berhemên folklorî tê dîtin ku rewş ne wiha ye. Di berhemên folklorî de

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

em dibînin ku; digel ku di fokûsa xwe ya etno-dînî de ew çend bi israr in jî, ew bi taybetî di destan û vegotinên ku tê de konflîktên netewî hene, xwe di nava tevdehiya netewetiya kurdî de dibînin û ji komên dî yên nava kurdan bêtir xwedî dîskûrseke etnîk û netewî ne.

Di Destana Derwêşê Evdî û Edûlê de jî, ev xwe bicîhkirina etnîk-netewî ya civaka êzîdî derdikeve pêş me. Di varyantên vê destanê de ku ji nava civaka êzîdî hatine berhevkirin (çi ji herêma Şengalê û çi jî ji herêma êzdiyên Kafkasyayê), bûyerên ku di destanê de derbas dibin wekî bûyerên ku di navbera du neteweyan de (ereb û kurd) an jî sê neteweyan de (ereb, turk û kurd) derbas dibin têne teqdîmkirin. Lê di varyantên nava kurdên misliman de ev rewş bêtirî di konteksta jiyana eşîrî û konflîktên eşîrî de hatiye pêşkêşkirin. Tê xuyakirin ku kurdên êzîdî, destan an jî vegotinên gelêrî, yên ku taybetiyeke wan ya dînî-bawerî heye, dema ku li xwe adapte dikin, taybetiya wan ya dînî paş ve didin û taybetiya wan ya etnîk-netewî derdixin pêş. Ev helwesteke derûnî-civakî ye. Ji aliyek ve, ev tê vê wateyê ku civaka kurdên misilman xwe çendî di nava dîskûrseke dînî de îfade bike, ew çend rê li pêş civaka kurdên êzîdî tê girtin ku ew xwe di nava vê civakê de bi cih bike. Ev rewş di heman demê de xetereyek li ser hebûna civaka êzîdî jî peyda dike. Lewma ew berhemên folklorê yên di vê mecrayê de, bi israr ji konteksta dînî derdixin û di kontexsteke etnîk-netewî de şîrove dikin. Ev yek di heman demê de daxwaza wan ya xwe bicihkirina di nava nasnameya kurd de jî dide der.

Di varyanta birayên Celîl de hê di destpêka destanê de ev fikriyat xwe dide der. Destpêka destanê bi vî rengî ye:

"Bavê Derwêş, Evdî bû. Derwêş hê tinebû. Evdî şivanê Zor Temir Paşayê Millî bû. Hafirê Gêsî û Ecîl Brahîm- ew Milî axê Kîka û Milla bû. ***Kîka û Mila kurd bûn û Gêsa ereb bûn****.*[14]

Di hin varyantên dî de, wekî eşîrên êzîdiyan, navên *Şerqî* û *Dina* jî derbas dibin lê di vê varyantê de êzîdî xwe di nava eşîra Milî de dibînin. Lewre dema ku şêxê ereb ji Evdî re dibêje: Tu êzîdî yî, em misliman in. Tu nekeve navbera me. Evdî wiha bersîv dide jê re:

"Apo, erê bira ***ez êzdî me****, bes* ***ez eşîra*** *Zor Temir Paşayê* ***Milî*** *me."*[15]

Ji vê dîskûrsê em têdigihên ku, di vê varyantê de êzîdî xwe di nava eşîra Milî de û li hember ereban li kêleka kurdên misilman dibînin. Ji xwe di hemî varyantan de ku ji zarbêjên êzîdî hatine berhevkirin, heman bêjar heye. Wekî mînak di varyanta Xeyrî Şengalî de ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkirin heman pasaj bi vî rengî ye:

"Wextekî Huweyd Begê Gêsî, mezinê Gêsa bû û Çilî Brahîm mezinê tirka bû. Her dû hîzbek bûn û ***Şerqiya*** *û* ***Dina*** *û* ***Mila*** *hîzbek bûn."*[16]

Di vê varyantê de vebêj, ereb û tirkan wekî aliyek û eşîrên kurdan yên wekî Milî, Şerqî û Dina jî wekî aliyê kurd nîşan dide. Şerqî, eşîra Derwêşê Evdî ye. Di varyanta Şengalê ya ku di xebata Ömer Uluçay de hatiye çapkirin de jî heman meyl derdikeve pêş me.

*"Paşayê Milan dibêje, 'bira werin bin konê min.' Zor Temir Paşayê Milan, Evdî û êla wî qebûl dike. Paşa dibêje: Ez dixwazim ji mêvanê xwe re bikim çend şorane***/***Me dil heye bi Şerqiyan re bikin biratî û sozane***/Em tev kurd in weke bira ne****."*[17]

Balkêş e ku di varyantên nav kurdên misliman de, bi destanê re têkildar behsa tirkan nayê kirin lê di gelek varyantên êzîdiyan de em dibînin ku tirk jî li kêleka ereban daxilî nava şer bûne. Ev bichikirina polîtîk, di Destana Kela Dimdim de jî derdikeve pêş

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

me. Her çendî ku di piraniya varyantên Kela Dimdim de, tirk wekî mutefîkên potansiyel yên kurdan xuya dikin jî, di varyantên zarbêjên êzîdiyan de, tê dîtin ku kurd li hember tirkan jî serî hildidin.[18] Ev yek xaleke balkêş e. Wekî meyleke derûnî-civakî ya êzîdiyan derdikeve pêş me. Ew bi rêya vê destanê mesaj didin kurdên misliman ku dijminên wan li hember wan her tim îtîfaq dikin û lazim e kurdên êzîdî û kurdên misliman jî heman îtîfaqê bikin. Wekî mînak di varyanta Xeyrî Şengalî de vebêj neqil dike ku kengê kurdên êzîdî ji ber hin neheqiyan, ji kurdên misliman dûr dikevin hingê dijminên wan dibin yek û êrîş dibine ser wan.

*"Çilî Brahîm mezinê tirka bû. Selefek siwara xwe helgirt, hate mala Efirê Gêsî, gotê: Efir. Efir gotê: Yela xêr e? Vê derengiyê. Çilî Birahîm go: Bira mizgîniya mi li te! **Şerqiya (eşîra êzdiya) û Mila bar kir (ji hev cuda bûn).Em ê cerdeke giran kar kin û em ê çîn Mila din**. Em ê heyfêt kevin û nû ji Mila bin. (Efir, şert datîne ber Çilî Brahîm ku dê têkelî eşîra Şerqiya nebin.) Çilî Birahîm gotê: Bira Şerqiya û Dina (her du eşîrên êzdî) bar kiriye, Mila safî mayîne. Em ê cerdekê li Mila kin. Em ê heyfê kevin û nû ji Mila vekin û ya me û Şerqiya Xudê kerîm e heta rojeke wan jî heye."*[19]

Di heman varyantên êzîdiyan de tê dîtin ku ereb û tirk dema ku êrîşê kurdan dikin *Kitêba Pîroz, Quranê* ji xwe re dikin al û wisa êrîş dikin.

"Ecîl Brahîm milûkê wan e
Hafirê Gêsî bêyreqdarê wan e
Li ber xwe danîne Qurana ezîmşan e
Teva sond dixwar bi ezîmşan e
Emê hucûmek bidine ser Kîka û Milan e"[20]

Ev pasaj di varyanta Celîlan de çend caran dubare dibe. Di varyanta ku di pirtûka Ömer Uluçay de derbas dibe ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkirin de jî heman fokûs heye.

*"Milîno, sibeyê bila dengê min bê we tevan! Dijminên we li hev kom bûne wekî wawik û mawikên devê çeman. Tirk û Gêsan ji hev re **sond xwarine bi kitêb û Qurana** ku kuştina wan heye lê bêyî talan û namûsa Milan vegera wan tune."*[21]

Di varyantên ku ji zarbêjên êzîdiyan hatine neqilkirin de, tê dîtin ku ereb û tirk dema ku êrîşê kurdan dikin, bi bêjareke dînî û wekî ku kurd ne misliman bin tevdigerin. Bêguman ev nêrîna êzîdiyan e lewre ew naxwazin ku civaka kurd li derdora bêjara dînî bi civakên ereb û tirk re hevkariyeke dînî bikin. Eger ku ev hevkariya dînî, di nava ereb, tirk û kurdan de çê bibe, hingê ne pêkan e ku êzîdî di nava vê îtîfaqê de ji xwe re cihek bibînin. Ew li derveyî vê û bê parastin û di binê xetereya man û nemanê de dimînin. Lê di heman demê de îşaret bi rastiyeke dîrokî jî dike ku ev rewş li hember kurdan hatiye bikaranîn. Ji aliyek ve eger ku kurd bi hevkariya dînî bi ereb û tirkan re îtîfaqê bikin, hingê xetereyeke mezin li ser hebûna êzîdiyan pêk tê. Ji bo vê yekê hem di Destana Kela Dimdimê de û hem jî di Derwêşê Evdî de, zarbêjên êzîdî ala bêjara netewî bilind dikin û hewl didin ku kurdên misliman û kurdên êzîdî li hember bêjara serdest ya dînî ya ereb û tirkan, bi bêjara netewetiya kurdan bersivê bidin. Lewre ancax hingê ew dikarin li hember êrîşên tundrew yên dînî ji xwe re baneke ku parastinê dide wan çê bikin ku ev dîskûrsa netewîtiyê ye.

*"**Bila xwîna te birjihe ser erdê kurdan e***
*Ta ku Gêsan bizanin **xwîna kurdan ne erzan e***
Bavê Etman; ez te nakujim

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Te bidim xatirê Tawisî-Melek sund ***êzdiyan e***

Lê ez ê birînekê li canê te bikim,

Tu ji bîr nekî mêraniya me kurdan e"[22]

Di varyanta Xeyrî Şengalî de jî heman bêjar derdikeve pêş me. Di nava diyardeya jiyana eşîrî û dînî de, navenda propagandatîf ya vegotinê bêjara netewî ye.

"Hinga digo şerê Kîka û Gêsan e

Li piştê wane Dewletê Elî Osman e

Dîsa çi beytar û ala wane dane ser me kurdan e

Lê wey lê mire ketanî dilêrê min ketiye

Şer ketiye ser d(c)îwarê me kurdan e"[23]

Di varyantên nava êzîdiyan de, di asta nasnameyî de du temayên bingehîn hene ku mesaja destanê an jî temsîl û protestoyên nasnameyî xwe di wir de didin der. Yek jê wekî ku me li jorê îfade kir, êzîdî di varyantên xwe de hewl didin ku destanê ji zemîna konflîktên eşîrî bikêşin zemîna konflîktên neteweyî. Ji bo vê di radeya herî bilind de dîskûrsa netewî bi kar tînin û di van varyantan de bêjara kurd û Kurdistanê gelek berbelav e.

Temayeke dî ya girîng jî konflîkta navbera kurdên misliman û kurdên êzîdî ye. Di vê nuqteyê de em protestoyeke aşkera ya etno-dînî ya êzîdiyan li hember kurdên misliman dibînin. Wekî ku me di beşa destpêkê de jî diyar kiribû, ji bo nasnameyên etnîk, parastina hafizayê xaleke gelekî girîng e. Ev hafizaya kolktîf ku lazim e di hemî endamên vê koma biçûk ya etnîk de were parastin, di heman demê de hîsa hevpar ya komî jî ava dike. Kurdên êzîdî, her tim ji nêrîna kurdên misliman ya di heqê wan de bê zar in. Lewre ev nêrîn bi giranî bi motîfên dînî rapêçayî ye û êzîdiyan wekî 'kafir' an jî 'şeytanperest' dibîne. Ji xwe em vê dîskûrsê di varyantên kurdên misliman de dibînin ku ji bo Evdî wiha tê gotin:

"Eslê te êzdî ye, pîrê te Şeytan e."[24]

Di hemî varyantên deverên êzîdiyan de, beriya ku Gêsiyên ereb êrîşê kurdan bikin, di navbera bavê Derwêş, Evdî û Temir Paşayê Milî de ji ber meseleya qîzxwestinê aciziyek çê dibe û bavê Derwêş, warê xwe terk dike.

"Evdî sekinî li himberî Paşayê Milan e

Go: Paşa! Dema şer û cengan e

Em tev kurd in, egîd in, bira ne

Dema tirs ji ser we hat wergêran e

Ez êzdîkî bi du quruş û nîva me

Te soza xwişka xwe Rahmê

De min bi soza mêran e

Çima te xera kir soza kurdan e"[25]

Di varyanta Xeyrî Şengalî de, sebebê ji hev cudabûna kurdên êzîdî û misliman, bi rengek cuda tê neqilkirin. Li gorî vê varyantê beriya ku Gêsî êrîşê bikin, rojekê Evdî û Temir Paşa di geştekê de rastê Efirê Gêsî û zilamên wî tên. Paşa pir ditirse û Evdî bi şerekî lehengî wî ji wê derê xelas dike. Lê demek şûnde Paşa vê jibîr dike û li dîwana xwe heqaret li êzîdiyan dike û li ser vê yekê Evdî û kurê xwe Derwêş biryar didin ku konê xwe rakin.

"Rojekê li dîwana Temir Paşa, xelqê kire qala Derwêş û medhê wî kirin. Gotin: 'Filan rojê Derwêş hewe kire û filan rojê hewe kire.' Temir Paşa go: 'Hoo... Hema hûnê Şerqiya dipesinîn. ***Ê bi xwedê Şerqiya xweş dizêt keran e****.'"*[26]

Di varyanta Celîlan de jî kêliya tansiyonê ya di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de, bi heman rengî derbas dibe.

"(Bavê Derwêş) Go: Lawo min sed ji wan kuştin û tev ji ber bavê te reviyane
Min konê Zor Temir Paşa xilas kir ji destê neyaran e
Paşê Zor Temir Paşa çi got? Go: ***'Evdî êzdî ye,***
Li Çiyayê Şengalê dibe dizê keran e'
Tu jî ya bavê xo bikî, Zor Temir Paşa, bêbext e emekheram e."[27]

Tê dîtin ku di van her du varyantan de jî heman heqaret heye û ev heqareteke navdar e ku li êzîdiyan tê kirin û di heman demê de nasnameya wan ya etno-dînî dike armanc.

Di varyantên êzîdiyan de hem di meseleya Bavê Derwêş, Evdî de ku dixwaze bi xwişka mîr ya bi navê Rahmê re bizewice û mîr vê qebûl nake û hem jî di meseleya daxwazkariya Evdî de ku dixwaze bi Edûlê re bizewice, cudanihêrîna dînî derdikeve pêş me. Di bûyera bavê Derwêş de, kurdên misliman vê yekê naxwazin lê di bûyera Derwêş de, kurdên êzîdî jî bi tundî li hember zewaca Derwêş in. Lewre di nava civaka êzîdiyan de qedexeyeke gelekî bihêz heye li ser zewaca bi mirovek ji dînekî din re. Ev yek di heman demê de hewla parastina demografyaya koma etnîk jî îfade dike.

"Go Derwêş dil ketibû Edlê. ***Pa vêca bi qanûna me êzdiya, kêr nayê êzîdî jineke bisilman bibe****. Derwêş êzdî bû û Edlê bisilman bû."*[28]

Bavê Derwêş, li hember zewaca wî dertê. Derwêş ji bo ku destûrê bigire, diçe Şengalê cem *Babê Şêx* de ku destûra zewaca bi Edlê re jê werbigire.

"Çû dîwana Babê Şêx û kêfa Babê Şêx jê re hat bi qedr û merîfet. Bira rabû li ba Babî Şêx beyitî (?) li wê şîvê. ***Babî Şêx gotê: Kurê min Edlê kêrî te nayê, ê bisilman e****. Çavê reş sipî nabe. Her Derwêş gotê: Mi divê ti li mi helal kî. Babî Şêx qebûl nekir. Gotê: Heke mi li te helal kir, ez ê li gelekê dî helal kim."*[29]

Derwêş her çendî israr dike jî, ji Babê Şêx destûrê wernagire lê ew ji rêya xwe venagere û terka Edlê nake. Di varyanta Uluçay de jî ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkirin heman tema heye û hem bavê Derwêş û hem jî Babê Şêx destûr nadin ku Derwêş bi Edlê re bizewice.

"Derwêş:
Derdê min derdekî giran e
Derdê min evîn û eşqa dilan e
Evîndara min qîza Paşayê Milan e
Bavê min axayê Şerqiya û Dînan e
Mêrekî dîndar û şikestiyê ocaxan e
Rê nade evîna me her duwan e
Ez êzîdî me, ew jî misliman e
Babê Şêx:
Kurê mehra qîza Milan li te nabe
Qapî ji bo vê yekê venabe
Derwêş:

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Babê Şêx bizane, derdê evînê derdekî giran e
Eşq bi xwe jî bi emrê Yezdan e
Ez ê bişkînim qapiyê olan
Ez ê ji xwe re biguhêzim qîza Milan e”[30]

Di van her du varyanatan de tê dîtin ku hem bavê Derwêş û hem jî îradeya dînî bi navê *Babê Şêx*, li hember zewaca Derwêş ya bi keça misliman re dertên û ev yek hem temsîla tansiyona di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de dike û hem jî ji aliyê êzîdiyan ve hewla parastina demografiya koma etno-dînî dike. Di varyanta Şengalî de em dibînin ku Edlê dixwaze vê qedexeyê bi guhertina dînê xwe ji holê rake.

“Belê wez ê Edla qîza Zor Temir Paşayê Milî me
Wez ê li ser devê rê û dirba rûniştî me
Belê heke tirsa mi ne ji bab û birakêt mi be
Min ê gotiba ez li ser heft babê xwe de êzdî me”[31]

Tê dîtin ku di Destana Derwêşê Evdî û Edûlê de, ji bo civaka êzîdî sê tema hene ku ji bo her yekê ji wan, helwesta civaka êzîdî, bi qandî ku di metnên destanê de derdikeve pêş me, ser bi xwe ye. Temaya yekem nakokiya netewî ye ku di navbera neteweyê kurd û neteweyên tirk û ereb de ye. Digel ku di varyantên kurdên misliman de nakokî ne bi vî rengî be jî, metnên li nava civaka êzîdî vê temayê di radeya herî bilind de derdixin pêş û di vê nakokiyê de xwe di nava neteweyê kurd de wekî komeke etno-dînî bi cih dikin. Ji bo ku karibin xwe wekî komeke etno-dînî di nava neteweyê kurd de bicih bikin, çawa ku di mînaka Kela Dimdimê de jî derdikete pêş me, lazim e dîskûrsa ku li ser tansiyona vegotinê serdest e ne dînî be lê netewî be. Lê balkêş e ku di varyantên kurdên misliman de ev ne temayeke bingehîn e. Kurdên misliman, bi baldarî, nakokiyê di asta eşîrî de şîrove dikin û metna destanê li ser vê bêjarê înşa dikin.

Temaya duyemîn, nakokiya etnîk e ku ev di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de ye. Kurdên êzîdî, her çendî di rojên teng de li kêleka kurdên misliman cih digirin jî, her tim û bi rêya vê metnê jî, bi bîra wan dixin ku di navbera wan de cudahiyek heye û ew di parastina vê cudahiyê de bi israr in. Lewre di her prosesa destanê de motîfên xwe yên dînî derdixin pêş, wekî; *Melekê Tawis, Lalişa Nûranî, Êzdîxan* û hwd. Her tim bi bîra civaka kurdên misliman dixin ku, ew li wan neheqî dikin û qîmetê nadin wan û wan wekî xwe qebûl nakin. Yek ji mînakên derçûna vê temayê, meseleya zewaca Derwêş û Edûlê ye. Li vê derê her du civak jî li hember vê derdikevin lê bi taybet otorîteyên dînî yên êzîdiyan vê yekê qebûl nakin. Ev yek jî bi endîşeyên nasnameya etno-dînî ve girêdayî ye. Lê di varyantên nava kurdên misliman de em dibînin ku bi rengekî balkêş wekî ku di destanê de konflîketeke bi vî rengî tune ye tevdigerin. Êzdîbûna Derwêş û Evdî wekî meseleyeke pir detay derdiçe û heya ku ji vebêjan tê xwe ji vê temayê dûr dixin.

Temaya dawîn; temaya evînê ye û ev dînamîka herî xurt ya destanê ye jî. Li vê derê endîşeyeke bingehîn ya civaka êzîdî rû dide ku ev jî bi nasnameya wan ya etno-dînî ve girêdayî ye. Êzîdî, dizanin ku ew li hember kurdên misliman kêmar in û eger civaka wan û ya kurdên misliman bi rêya zewacê li nava hev bikeve, ne pêkan e ku ew taybetmendiya xwe ya demografîk berdewam bikin û ev yek jî xetereyê li ser hebûna wan ya etno-dînî çêdike. Lewre ew ji civaka kurdên misliman bêtir li hemberî zewacên navber-çandî û navber-bawerî dertên. Di hişyariyên Babê Şêx bo Derwêş de, em vê endîşeyê bi halê herî aşkera dibînin. Digel ku maf dide Derwêş jî, dizane ku pêşiya

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Derwêş vebike an jî ji bo vê zewacê ji wî re fetwayek derbixe, dê paşê ev rewşa îstîsnaî giştî bibe û mecbûr bimîne ku ji bo herkesê vê yekê pêk bîne. Ev yek jî dê hebûna wan ya demografîk bixe binê xetereyê.

Wekî ku tê dîtin, her sê tema jî bi rengekî bi meseleya etnîsîte û nasnameya dînî ve girêdayî ne û ev yek di heman demê de taybetmendiya îdeolojîk û polîtîk ya vê cureya vegotinên gelêrî nîşan dide.

1.2. Varyantên Kurdên Misliman

Di varyantên herêmên kurdên misliman de, tişta ku pêşî balê dikêşe ev e ku hîç dîskûrseke netewî an jî etnîk nehatiye bikaranîn. Di van hersê varyantên ber destê me de, balkêş e ku yek car jî peyva kurd an jî kurmanc nehatiye bikaranîn. Lê li hember vê têgihên civaka eşîrî bi berbelavî hatine bikaranîn. Ev yek nîşan dide ku kurdên misliman, berevajî êzîdîyan, vê bûyerê an jî destanê di konteksta konflîktên eşîrî de xwendine an jî bi helwesteke polîtîk, dixwazin ev destan di vê astê (duzlem) de bê teqdîmkirin. Her wiha bêjareke dînî jî di metna destanan de derdikeve pêş me. Ku li vê derê kurd xwe wekî parçeyeke ‘umetê’ dibînin.

“Bê axawo de rabe
Aqûto de rabe
Maqûlo de rabe
Mîrê min de rabe
Êla me êleke giran e
Mîro bê rab û rav, tiv û tivdîra te nabe”[32]

Ev pasaj, hem destpêka destanê ye û hem jî pasaja dubareyê (naqarat) ye ku di varyanta Gültekîn de her tim derdikeve pêş me û di heman demê de atmosfera vegotinê jî dide der. Di vir de wekî ku em ji têgihên mîna *axa, mîr, êl* jî têderdixin, destan bi hêmanên jiyana eşîrî rapêçayî ye. Di vê varyantê de digel ku ji serî heya dawîn fokûsa destanê li ser lehengiyên Derwêş e jî, bi tenê di cihekî de, ew jî ne ji bo şexsê wî lê bi giştî ji bo kesên ku li hember Çîl Osman şer dikin têgiha *yezîdî* hatiye bikaranîn.

“Awirekî dide notila awirê gamêşan e
Berê xwe dide ***kafir Çîl Osman e***
Lê kafiro li eresa meydanê notila mûm û şemdan e
Dengek ji xwe re tê, dengê xeybiyan e
Dibê, kuro, ***qebîla we yezîdiya çiqa nezan e***
Ma hûn nizanin çekê li canê Çîlo tevda zirx û pola ne
Sadûnê bira gava dibihîse vê gotina hane
Li ser şûrê xwe dinivîse kelîmê mihemediyan e
Berê xwe dide kafir Çîl Osman e*”*[33]

Di hemî destanê de bi tenê yekcar bêjeya ‘yezîdî’ hatiye bikaranîn û di ev cure bikaranînê de heqaret heye. Lewre vebêj, civaka êzîdî bi ‘nezanbûnê’, ‘cahiltiyê’ sûcdar dike. Divê neyê jibîrkirin ku di varyanteke herêma êzîdiyan de ne pêkan e ku tiştek wiha derbikeve pêş me. Her wiha Sedûnê ku birayê Derwêş e û ew bi xwe jî êzîdî ye, li ser bihîstina vî dengî, ‘kelîmê mihemediyan’ an jî kelîmeya şehadetê li ser şûrê xwe dinivîse û berê xwe dide Çîl Osmanê ku ‘kafir’ e. Di vê mînakê de vebêjê misliman di du cihan de sivikahî an jî helwesteke îdeolojîk li hember nasnameya êzdiyatiyê nîşan daye. Bi taybetî, êzîdiyekî wekî mislimanek teswîrkirin, helwesteke berbalev ya serdestiyê ye jî.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Eger em wiha bifikirin ku êzîdiyek dema ku lehengekî misliman teswîr bike û li ser navê wî bibêje ku got: Ya Melekê Tawis, hingê îronîkbûna rewşê bêtir bê têgihîştin.

Di vê varyantê de hemî temaya destanê hatiye berevajîkirin. Lewre wekî ku me di varyantên nava êzîdiyan de dît, yek ji temaya bingehîn ya vê destanê, di heqê nakokiyên di navbera kurdên misliman û kurdên êzîdî de bû. Û ev nakokî di her prosesa destanê de derdiket pêş me. Ji ber ku Temir Paşa heqaret li êzîdiyan dikir û ji wan re digot ‘dizê keran’, hemî eşîra Şerqiyan bar dikirin û li ser vê yekê gêsî û tirkan êrîş dibir ser kurdên misliman an jî Milan. Li vê derê, di vê varyantê de em dibînin ku temayeke bi vî rengî tune ye û heta vebêj bi rihetî dikare heqaret li civaka êzîdî bike û wan bi cahilbûnê sûcdar bike. Digel ku yên di meydana şer de şer dikin jî endamên civaka êzîdî ne.

Di varyanta ku Perwîz Cîhanî neşir kiriye de jî heman helwest derdikeve pêş me. Di hemî destanê de peyva kurd yek car jî nehatiye bikaranîn û peyva êzîdî jî bi tenê di kontekstekê de hatiye bikaranîn ku ev e: Bavê Derwêş, Edlê ji Derwêş re dixwaze û ew jî ji ber êzdîbûna wî lê heqaret dikin. Di vê varyantê de jî wekî varyanta jorîn, temaya bingehîn ya destanê evîn e. Temayên dî yên etnîk û netewî, ku di varyantên herêmên êzîdiyan de li pêş in, bi tu rengî dernakevin pêş me.

Meseleya êzdîbûna Derwêş, di konteksta evîna wî ya bi Edûlê re derdikeve pêş me. Balkêş e ku pirî caran vebêj an jî dengbêj, muameleya kesekî misliman li Derwêş dike û ji axaftinên wî an jî ji xwepênasekirinên wî, em nasnameya wî ya etno-dînî tênagihîjin. Her wiha di vê varyantê de du karakter hene ku ji welatê Serhedê tên û dibin mêvanê Evdî ku navên wan Seîd û Telhan e. Destan bi wan dest pê dike û diyar e ku ev her du kes ne êzîdî ne. Her wiha roleke girîng bi cih tînin di destanê de û Çîl Osmanê ‘gawir’ dikujin. Balkêş e ku dema Seîd û Telhan têne nava êla Miliyan, kes pêşwaziya wan nake û ew jî berê xwe didin konekî dûr ku Bavê Derwêş li wir e. Li vê derê vebêj Bavê Derwêş wekî mislimanekî baş teqdîm dike.

“Kalekî nûranî rûyê wî spî ye li ser çokan e
Diran di dêv de nemane
Hey lawo îro şaşikek li serî ye
Tizbiyeke sed û yek lib di dest de ne
Li ser postekî nimêjê rûniştiye
Ji xwe re dikişîne selawat û werdane
Seîd digot:
Telhano bira bajo derê konê hane
Ew konê hanê yeqîn dikim tertîla wî bisilman e”[34]

Di vê teqdîma vebêj de, ji aliyê nasnameyî ve rewşeke balkêş derdikeve meydanê. Digel ku vebêj bi dû re qeyd dike ku ew êzîdî ye jî, wî wekî mislimanek baş teqdîm dike û ev yek helwesteke polîtîk e. Lewre eger ku ev pasaj di varyanteke herêma êzîdiyan de derketa pêş me, wê hêmanên cudakar yên etno-dînî yên êzîdiyan bihatana pêşkêşkirin. Lê êzîdiyekî bi vî rengî teqdîmkirin, di heman demê de tê wê wateyê ku, vebêj naxwaze nasnameya wî ya etno-dînî derkeve pêş û wekî ku bixwaze bibêje: ‘Em hemî misliman in ne girîng e ku hin ji me êzîdî ne’, helwest nîşan dide. Wekî ku tê zanîn ev helwesteke tehekumî ye ku ji aliyê îdeolojiyên serdest ve her tim tê bikaranîn. Yanê digel ku nasnameya mînor tê zanîn jî, girîngî pê nayê dayîn.

Di vê varyantê de jî peyva kurd an jî kurmanc nehatiye bikaranîn û bêjara destanê bi temamî hêmanên civaka eşîrtiyê didin der.

“Go lawo tu nizanî ew kona konê Mîrê Milan e
Sêsed mêr tê de rûniştine li hundirê konan e
Her yek reîsê êlekê, di kon de rûniştine
Ji hev re bi xeber dane
Belê go: Lawo ji Mîrê Mila re hatiye
Kaxeza gawurê Çîl Osman e”[35]

Dema ku Seîd û Telhan li Bavê Derwêş dibin mêvan, (di dirêjahiya destanê de bavê Derwêş wekî Şêx Evdî tê binavkirin), Evdî ji wan re derdê xwe dibêje.

“Lawo em jê qehirîne naçin nava êla wane
Lê belê ez ji we re bikim salixan e
Îsal heft sal e, dilê Derwêş
Li Edûla qîza Mîrê Mila de ne
Ez diçime xazgîniyê Edûlê, ji mi re dibêjin
Eslê te êzdî ye, pîrê te şeytan e”[36]

Di vê pasajê de vebêj, di risteyekê de hem pênaseyeke heqaretî ji bo êzîdiyan bi kar tîne ku ji wan re dibêje ‘pîrê te şeytan e’ û hem jî rasterast ji Evdî re nabêje tu êzîdî yî lê dibêje ‘eslê te êzîdî ye’. Ev yek girîng e lewre heman vebêj li jorê Evdî wekî mislimanek baş teqdîm dike. Ev jî helewesteke polîtîk ya civakên serdest e, çawa ku di dîskûrsa neteweperestiya tirkî de jî derdikeve pêş me ku ji bo kurdan dibêjin; ‘esil kurd’ [kürd kökenli]. Di vê nêzîkatiyê de ev îma heye ku eslê te kurd be jî tu tirkî. Li gorî vê, heman helwest ji alî kurdên misliman li kurdên êzîdî tê tetbîqkirin. Heman helwestê em di prosesa destanê de di cihekî din de jî dibînin. Dema ku Derwêş biryar dide ku biçe şerê Çîl Osman bike, Edûlê derdikeve pêş wî û wiha jê re dibêje:

“Digo de were, Derwêşo de were
Lehengo de were, hûto de were
Hey malxerabo bavê mi te dixapîne
Li rêya hat nehatê de dişîne
Dilê mi liyan e, serê dilê mi dêşê
Dilê mi ji dila dilekî del û dîn e
Lawo bi heqiya Xudê be, bavê we bisulman e, kalkê we êzîdî ne
Êla te êleke giran e, hemîn sûnda te
Bi Yezdan re giran e, tirsa te tunîne.”[37]

Di vê epîzotê de em dibînin ku vebêj heman helwesta xwe ya jorîn berdewam dike. Lewre Edûlê, dema ku bang li Derwêş dike dibêje: *Bavê we bisilman e kalkê we êzîdî ne*. Yanê vebêj wekî ku bixwaze bibêje; Derwêş êzîdî nîn e, misliman e. An jî ew esil-êzîdî be jî, niha misliman e. Ev helwesteke dînî û poîtîk e. Lewre di hemî versiyonên destanê de û bi taybet di versiyonên nav êzîdiyan de, meseleya êzîdîbûna Derwêş gelek aşkera ye û ew dema ku şer dike dibêje: “Ya Melekê Tawis” an jî “Ya Şêşem”. Lê di vê varyantê û di varyantên dî yên nav kurdên misliman de, êzdîbûna Derwêş yan tê veşartin yan jî wekî meseleyeke ne girîng li serê nayê sekinîn. Heman rewş di epîzoteke dî ya vê varyantê de wiha derdikeve pêş me:

“Derwêş zivirî cem her sê biran e
Digo: Biran em ê rast derkevin pêşiyê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Li para şer e yê pêşiyê qet nizane
Lawo eger em koka wan bînin
Sibê yê bêjin mêrkê bisulman vira dikin
Îşê bisulmana bi xiyanetî ye,
Bi xiyanetî li me dane”[38]

Di vê pasajê de em dibînin ku Derwêş bi xwe xwe wekî ‘mêrikê bisilman’ pênase kiriye. Vebêj li vê derê mudaxeleyeke îdeolojîk-polîtîk li destanê kiriye û wê di çarçoveye bîr û baweriyên xwe yên dînî de guhartiye. Ev yek di heman demê de nîşan dide ku vegtoninên gelêrî, li gorî çand, etnîsîte û baweriyên cuda, di çarçoveya hêvî û tesewirên wan civakan de, wechên nûh digirin.

Di varyanta Baqiyê Xudo de, di asta dînî û eşîrî ya destanê de guherînek heye. Varyantên ku ji erdnîgariya bûyerên destanê lê qewimîne, hatine berhevkirin; problemên şênber yên civakê bêtir didin der. Her ku vegotin ji cografyaya destanê dûr dikeve ew nakokiyên dînî ku di destanê de rû didin, şolî dibin an jî dikevin dereceya duyemîn û di temaya destanê de guherîn pêktê. Di vê varyantê de ku ji herêmê hatiye berhevkirin, wekî ku di varyantên êzîdiyan de derdikeve pêş me, temaya dînî an jî nakokiya dînî ya di navbera kurdên misliman û kurdên êzîdî de derketiye pêş. Lê girîngiyek dî ya vê varyantê ev e ku, ew ji herêma Kobanê hatiye hatiye berhevkirin û vebêjê destanê bi eslê xwe ereb e lê di nava civaka kurd de dijî. Vê yekê bandorê li vegotina wî ya destanê kiriye.

Di vê varyantê de vebêj di destpêkê de bi rengekî aşkera balê dikêşe ser cudahiya dînî ya di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de. Dema ku Paşayê Milan qehwa şertê digerîne û kes newêre rakê, Derwêş radibe û wiha diaxive:

*“**Beg û serokê Milano***
Serî xwe rakin li me binêrin
We çi re serê xwe berdaye erdê
Em hîro Şerqiyan li bînanî konê we rûniştine
Va şeş meh bûn me bin vî konî nediye
We xwe bi xwe bi hev di re digo
Wê Şerqiyan bînanî vî konî nebînin heta roja mirinê
Ha hîro em li bin kon rûniştine
Wûn çi re serî xwe li me ranakin
Û hîro gulî Edûlê mor
Serfiraza sî û du hezar we yî Milan
Ketî mezat û herraca mêranê, ketî hindirî vê fîncanê
Wûn çi re serî xwe li fîncanê ranakin
We digo kurê Evdoyê Şerqî
Wê bînanî vî konî nebîne
Hîro di ortê we de rûniştî
Piştê xwe dayî dîregî ortê
Berî xwe dayî hêla heremê û jinane
Wûn çi re serî xwe lê ranakin
Wûn li pêş me ne fincan a wê
Ti karê me bi fincanê re tuneye
Em Şerqî ne, wûn Milî ne, em êzîdî ne wûn misliman in”[39]

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Wekî ku ji vê pasajê jî diyar e, vebêjê vê varyantê berevajî varyantên dî, hem yên herêmên êzîdiyan û hem jî yên herêmên kurdên misliman, konteksta destanê bi temamî li ser hêmanên cudakar datîne û cudahiya bawerî û cudahiya eşîrî dixe navenda temayê.

Di varyantên kurdên êzîdî de jî cudahiya dînî heye û temaya jiyana eşîrî jî heye lê kurdên êzîdî û kurdên misliman di binê baneke firehtir de têne cem hev ku ev ban kurdbûna wan e. Û ev dîskûrsa netewî hema bêje di hemî varyantên êzîdiyan de heye.

Di varyantên kurdên misliman de jî cudahiya bawerî paş de dihate xistin heta di hin varyantan de vebêj, wekî ku Derwêş ne êzîdî be lê misliman be tevdigerin. Li şûna dîskûrsa netewî jî, dîskûrsa umetî an jî dînî li pêş bû û di destanê de evîn temaya sereke bû. Lê di vê varyantê de em dibînin ku vebêj ji aliyê pêş de derxistina temayan de tercîheke cuda kiriye.

Di vê varyantê de jî wekî her du varyantên jorîn yek carekî jî peyva kurd an jî kurmanc derbas nebûye. Lê wekî ku di pasaja jorîn de jî xuya dike dîskûrsa civaka eşîrî gelekî li pêş e. Lê di vê dîskûrsê de jî meylekî cudakar hem di asta eşîrî û hem jî di asta dînî de heye. Dema ku Derwêş dibêje: ‘*Em Şerqî ne hûn Milî, em êzîdî ne hûn misliman*’, bi tevahî balê dikêşe ser hêmanên cudakar yên di navbera wan û yên dî de.

Di varyantên êzîdiyan de jî ev dîskûrs qismen hebû lê di bana kurdayetiyê de her du kom digihîştin hev. Her wiha Şerqî û Dina wekî du milên eşîra Milan dihatin teqdîmkirin. Heta Derwêş ji bo xwe digot: *Ez eşîra Zor Temir Paşayê Milî me*.

Di vê varyantê de cudahiyeke balkêş ji varyantên dî ev e ku Evdî û Eferê Gêsî heval an jî destbirakê hev in. Wekî ku tê zanîn Gêsî eşîreke ereban e. Di hemî varyantên dî de Eferê Gêsî wekî karakterekî ‘pir xerab’, wekî fokûsa xerabiyên di destanê de li pêş me ye lê di vê varyantê de, fokûsa xerabiyê ne Eferê Gêsî ye lê Çîl Îbrahîmê tirk e (an jî Ecîl Brahîm). Ev xaleke balkêş e lewre di nava erebên herêmê de dijayetiyeke aşkera ya tirkan heye. Lewre di vê varyantê de ku ji herêma Kobanê hatiye berhevkirin û vebêj esil-ereb e, fokûsa ‘xerabiyê’ diguhere û dibe Çîl Brahîmê tirk. Ji xwe di vê varyantê de, bi qandî ku di varyantên dî de qet dernakeve pêş me, tirk an jî bêjara dijayetiya tirkan derdikeve pêşberî me.

“Eferê Gêsî, ew û Dewrêş bi hev re bira ne. Dewrêş, birayê hespê xwe dayî Efer e. Vana li Şengalê berê diçûn hesp diçêrandin. Rokê hev dîbûn, ji hev di hezkiribûn û bi hev re bûbûn bira. Kevir bi hev re li Şengalê kiribûn erdê, her yekî kevirekî xwe kiribû erdê. ‘Kînga va kevira me ji erdê derketin,’ go, ‘kevirê me ji hev di qetiyan, wê biratî me jî ji hev biqetîne’”[40]

Beriya şer jî Efer û Derwêş hev dibînin û Efer ji Derwêş rica dike ku ew nekeve şer û jê re soz dide ku dê ew bi xwe here Edûlê jê re bîne lê Derwêş qebûl nake. Digel ku Derwêş qebûl nake jî Efer, di giraniya şer de jî dilê wî li bal Derwêş e û her tim dixwaze alî wî bike.

Dema ku Derwêş bi niyeta şer radike fîncana qehwê, Çîl Brahîm wiha jê re dibêje:

“Yekî serî xwe rakir go: ‘Law berde vê fîncanê!
Tu min nas nakî?
Ez Çîl Îbramê Begdilî me, Paşê tirkan
Tu meriyakî Şerqî yî, êzîdî yî
Tu nikanî rakî cerd û bêregê me tirk û Gêsan’*”*[41]

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Wekî ku tê dîtin, di vê varyantê de bêjara dij-tirk gelekî berbelav e û ev yek ji ber taybetmendiya herêma varyantê û faktora dengbêj e ku ew bi xwe esil-ereb e. Dema ku şer giran dibe, digel ku hemî hevalên wî mirine û ew bi tenê maye jî Derwêş şer dike û di vê kêliyê de dîsa em dibînin ku vebêj bêjara dij-tirk bi rengekî bi bandor bi kar tîne.

*"**Serdarê tirk û Gêsan** li hev di kom bûn. **Egîdê tirk û Gêsan** go, 'Xeyo, em bi vî nikanin, li ser hespê em pê nikanin; wellahî vaya bû gurê devbixwûn, kesekî ji me bernadê **ne ji tirkan û ne ji Gêsan**, wê egîdê me **tirkan û Gêsan** gîhan bikujê."*[42]

Di vê pasaja jorîn de em dibînin ku di nava paragrafekê de çar caran peyva tirk û Gêsan hatiye bikaranîn û tirk wekî qebîleyeke newêrek hatine nîşandan.

Derwêş di şer de birîndar dibe û dikeve, hingê xuşka Eferê Gêsî û dûra Eferê Gêsî bi xwe ji tirkan vediqetin û li kêleka Derwêş cih digirin.

*"Li hemberî toda Zihrê Xatûnê, xweyînga Eferê Gêsî –**Tode, yanî Ereb jê re dibêjin Huddec**; li ser piştê delûlan girê didin, ji qîzan re- Wexta ku Dewrêş kete xwarê, dibê tirkan hatinêkê, Zihrê xwe ji ser todê çen kire ser Dewrêş û **banê tirkan kir go**: 'Va kete alî min, dest jê berdin!' **Dibê tirkan şora Zihrê negirtin**, di bin wê de dîsa lêxistin. Wê çaxê Zihrê ban kir, banê Efer kir go: 'Efer birawo, dilê mi liyan e! **Tirkan pêle rûyê Gêsan kirin**. Bi ça min, vayî di bin mi de tû û wî bra ne; **li Sêrega Çiyayê Şengalê** we bi hev di re kevir berdane erdê, wûn bûne bra! Vaya wek brakî minî ji dê û bavan e. **Tu hîro nabînî tirkan di bin mi de li Dewrêş dixine**. Dibê wê çaxê Efer banê Gêsan kir, go: '**Gêsanno! Ji tirkan biqetin, tirkan merîne xayîn in, rûyê me şkênandin!**' Dibê li ser vê yekê, ku **tirkan** di bin Zihrê de li Dewrêş xistin, **tirkan û Gêsan** ji hev diqetiyan û li hemberî hev disekiniyan, dikin li hev dixînin."*[43]

Faktora vebêj û taybetmendiya herêma varyantê di vê pasaja jorîn de bi temamî aşkera dibe. Digel ku di destpêka destanê de peyvên tirk û Gêsî her tim bi hev re dihate bikaranîn, êdî Gêsî jî xwe ji aliyê tirkan vedikêşin û peyva tirk ku dibe fokûsa xerabiyê ya di destanê de, bi tena serê xwe tê bikaranîn. Vebêj dîsa balê dikêşe ser destbiraktiya Efer û Dewrêş û sadiqbûna Efer ya ji soza xwe re. Her wiha vebêj li vê derê têgiha Ereb jî di nava rewşeke pozîtîf de bi kar tîne. Yanê xuşka Efer jî wekî alîkarê Derwêş derdikeve meydanê û tirk wekî objeya nebaşiyê li meydanê ye. Ev pasaja jorî bi serê xwe meylên etnîk û nasnameyî yên di vê varyantê de didin der û nîşanî me didin ku temayên destanan li gorî faktora nasnameya etnîk ya vebêj û taybetmendiyên herêmî çawa diguherin.

Encam:

Wekî ku me di vê vekolînê de dît, metnên folklorî ne metnên sabît û neguhêrbar in. Ew di çarçoveya hin diyardeyên ku bi çand û erdnîgarîyê ve girêdayî ne, tuşî guherînan dibin û di her herêmeke çandî de bi serê xwe pêş dikevin. Ev guherînên çandî-civakî dibe ku di çarçoveya çanda madî û manewî ya wê herêmê de bin û dibe ku di çarçoveya serborîyên civakê yên rabirdûyê û texeyulên wan yên dahatûyê de bin.

Tê dîtin ku vegotinên gelêrî û bi taybetî jî destan, di her astê de gelekî taybetmendîyên civakê didin der. Di sehaya folklorê de ev taybetmendî heya niha bi piranî di asta çand û erdnîgariyê de hatine vekolîn. Lê di encama vê vekolînê de jî diyar e ku nasnameya etnîk û dîn-bawerî jî di nava berhemên folklorî de wekî temsîlên giring yên civakî cih digirin. Civak, bi taybetî jî civakên etno-dînî yên wekî civaka kurdên êzîdî, folklorê wekî platformeke veguhêz dinirxînin û bi rêya van berheman îdîayên xwe yên

nasnameyî û etno-dînî neqil dikin. Ev neqil ji du aliyan ve xwedî wate ye. Yek jê, aliyê wê yê ku xîtabê koma xwe dike û ya dî jî aliyê wê yê ku xîtabê komên dora xwe an jî hemberî xwe dike. Herwiha berevajîyê hin îdîayan, ev proses, proseseke xwezayî ye. Ne girêdayî sazî û organîzasyonên netew-dewletî ye. Ev ramanek an jî hişmendiyeke kolektîf ya komên civakî bi xwe ye.

ÇAVKANÎ:

Celîl, Celîlê-Celîl, Ordîxanê (2013), *Zargotina Kurda 1*, Weşanên Aram, Çap. 3. Amed

(2013), *Zargotina Kurda II*, Weşanên Aram, Çap. 3. Amed

Celîl, Ordîxanê (2016), *Dimdim, Kürt Kahramanlık Destanı*, Avesta Yayınları, Çev. İbrahim Kale, 2. Baskı, İstanbul

Çobanoğlu, Özkul (2012), *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ Yayınları, 6. Baskı, Ankara

Dundes, Alan, 'Halk Bilimi Çalışma Yöntemleri', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar II,* Geleneksel Yayınları, Çev. Ayşenur Nazlı.

Gültekin, Mehmet (2013), *Zargotina Kurdên Serhedê*, Weşanên Avesta, Çap I, Stenbol

Propp, Vlademir, *Folklor, Teori ve Tarih*, Avesta Yayınları, Çeviren, Necdet Hasgül-Tolga Tanyel, 1. Baskı, 1998, İstanbul.

Şengalî, Xeyrî (2011), *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre,* Bergî Yekem, Weş. Enstîtuya Kelepûrên Kurdî-Senterî Duhok, Çap. I, Duhok

---------------------(2011), *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre,* Bergî Duyem, Weş. Enstîtuya Kelepûrên Kurdî-Senterî Duhok, Çap. I, Duhok

Uluçay, Ömer (2012), *Destana Dewrêşê Evdî*, Weşanên Dîwan, Çap I, Stenbol

Perawêz

---

[1] Ev gotar wekî beşeke tez min ya doktorayê ye ku di sala 2020an de li Zanîngeha Bigolê, di Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî de hatiye temamkirin. Di çarçoveya vê xebatê da hin guhertin û lêzêdekirinên biçûk tê de hatine kirin.

[2] Lutz Rohrich, 'Halk Anlatısı Araştırmasında Anlam Arayışı', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I,* (Ed. Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayınları, Çev. Kürşat M. Korkmaz, 3. Baskı, 2006, Ankara, r. 153-154.

[3] Richard Bauman, 'Halk Biliminin Farklı Kimliği ve Sosyal Tabanı', *Halk Biliminde Kuramlar Ve Yaklaşımlar II*, Geleneksel Yayınları, Çev. Feridun Çotre, r. 41.

[4] H.b., r. 41.

[5] H.b., r. 46.

[6] A. Dundes, 'Halk Bilimi Çalışma Yöntemleri', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar II,* Geleneksel Yayınları, Çev. Ayşenur Nazlı, r. 58.

[7] Vlademir Propp, *Folklor, Teori ve Tarih*, Avesta Yayınları, Çeviren, Necdet Hasgül-Tolga Tanyel, 1. Baskı, 1998, İstanbul, r. 9-10.

[8] Celîl, Celîlê-Celîl, Ordîxanê (2013), *Zargotina Kurda 1*, Weşanên Aram, Çap. 3. Amed

[9] Şengalî, Xeyrî (2011), *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre,* Bergî Yekem, Weş. Enstîtuya Kelepûrên Kurdî-Senterî Duhok, Çap. I, Duhok

[10] Ömer Uluçay vê versîyonê ji xebata Amer Çelilk, Derwêşê Evdî, Evîndar û Qehreman (2006), wergirtiye.

[11] Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, Weş. Avesta, Çap I, 2013, Stenbol, r, 124-136.

[12] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî,* r. 223-257.

[13] H.b. r. 267-296.

[14] C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*, r. 279.

[15] H.b., r. 286.

[16] X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 276.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

[17] Ömer Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, *Tehlîl-Tesnîf-Kilam,* Weş. Dîwan, Çap I, 2012, Stenbol, r. 183.

[18] Celîl, Ordîxanê (2016), *Dimdim, Kürt Kahramanlık Destanı*, Avesta Yayınları, Çev. İbrahim Kale, 2. Baskı, İstanbul

[19] X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 284.

[20] C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*, r. 280.

[21] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 188.

[22] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 200.

[23] X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 348.

[24] Ö. Uluçay, 'Varyanata Serhedê' (Ji aliyê Perwîz Cîhanî ve hatiye weşandin), *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 231.

[25] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 203-204.

[26] X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 279.

[27] C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*., r. 282.

[28] X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 310.

[29] H.b., r, 312-313.

[30] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 187.

[31] X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem*, r. 329.

[32] M. Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, r. 124.

[33] H.b., r. 133.

[34] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 228.

[35] H.b., r. 229.

[36] H.b., r. 231.

[37] H.b., r. 244-245.

[38] H.b., r. 250-251.

[39] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 270.

[40] Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 275.

[41] H.b., r. 272-273.

[42] H.b., r. 292.

[43] H.b., r. 293.

EPIC OF DERWÊŞÊ EVDÎ AND EDÛLÊ
FORM THE PERSPECTIVE OF ETHNIC AND RELLIGOUS ATTITUDES

Abstract:

National epics are very important in the expression of social identities that we gain insights into society through research on them. This type of knowledge, although not based on historical documents, is in some way show us the emotional tendencies, hopes, perceptions of the past and future of that social group. As religious, social classes, gender, and ethnic groups emerge within society, so we see that folklore narratives reflect this diversity of society. Each folk epic, contains many social characteristics both from its own time and before its own time and transmits them to the future. Therefore the study of folk epics is also a study of society. Through reading and analytical research on these texts we also gain a lot of information about the reflexes of that society. In this study, we will look at some variants of the Epic of Derwêşê Evdî and Edulê and try to show how these types of folklore texts become the subject of societal claims of identity. These variants that we will examine in our study were compiled from the Kurdish Muslim community and the Yezidi Kurds.

Keywords: *Folklore, epic, kurd, êzîdî, ethnicity, religion, identity.*

MEYREM XAN Û TEMAYA HIZNÊ DI SÊ KILAMÊN WÊ DE
(MIHEMEDO RONÎ, ÇEMÊ BIŞÊRÎKA ŞEWITÎ, BAVÊ KOROXLÎ)

Melahat ULUÇ
Beşa Ziman û Çanda Kurdî - Zanîngeha Mardin Artukluyê\Turkîya

PUXTE:

Dengbêj ku veguhêzerên hafizeya civakê ne hest û hîsên civakê, qewimîn, şahî û xembariyên civakê bi strankî ji nifşekê gihandine nifşeke din ku bi vê sedemê nifşên nû ji gencineya çanda xwe haydar bûne. Ji ber vê sedemê dengbêj di nav civakê de her tim xwedî qedr û qîmet bûn ku gelek caran pêşengiya civakê kirine. Meryem Xan jî yek ji wan dengbêjan e ku bi berhemên xwe pêşengiya civaka xwe kiriye. Bo vê sedemê di vê xebatê de bi taybetî derbarê sê kilamên Meryem Xanê (Mihemedo Ronî, Çemê Bişêrîka Şewitî û Bavê Koroxlî) de hatiye rawestîn da ku baş bê zanîn ku Meryem Xan di kilamên xwe de li ser kîjan mijar û kîjan temayê sekiniye. Bi vê xebatê Meryem Xan bi gelek hêlên xwe ve tê nasîn. Di vê xebatê de dê ev her sê kilamên Meryem Xanê li dor temaya hizinê hatine analîzkirin ku ev xebat ji destpêkek, du beş û encamekê pêk tê. Di destpêkê de behsa mijar, armanc, pirsgirêk, rêbaz û sînorê xebatê tê kirin. Di beşa yekem de behsa jiyana Meryem Xan tê kirin. Dengbêj Meryem Xan, jiyaneke çawa derbas kiriye û di seranserê jiyana xwe de rastî çi qewimînan hatiye di vê beşê de cî digirin. Beşa duyem ya xebatê li ser analîza kilamên Meryem Xanê ye. Berhemên Meryem Xanê li dor temaya hizinê hatine dahûrîn.

Peyvên Serekî: *Meyrem Xan, muzîk, kilam, serpêhatî, hizin, dengbêjî*

PÊŞGOTIN:

Di vê xebatê de jiyana dilsoj û dramatîk ya dengbêja kurd ku di nava gel de weke "Siltana kurdan" tê binavkirin Meyrem Xanê û arasteyî vê di kilamên wê yên bi navê Mihemedo Ronî, Çemê Bişêrîka Şewitî û Bavê Koroxlî de temaya hiznê cî girtiye.

Meyrem Xan her çiqas di nav gelê xwe de bi nav û deng be û weke "Siltana kurdan" hatibe binavkirin jî derbarê jiyana wê de çavkaniyên nivîskî pir kêm in. Li gorî lêkolîna ku hatiye kirin bi taybetî li welatê wê derbarê wê de ji bilî hin nivîsên kovaran û gotaran xebateke berfireh ku îro weke çavkaniyekê bê bikaranin em rastî wê nehatin.

Ji ber ku Meyrem Xanê bi malbata xwe re piştî Şerê Cîhanê yê Yekem (1914) ji welatê xwe, ji Şirnexê koçî Rojava kiriye û êdî venegeriyaye welatê xwe, pêzanînên li ser wê ne zêde ne. Ango di temenekî pir biçûk de li gorî çavkaniyan di 10 saliya xwe de ji welatê xwe koç kiriye.

Li gundê wê (Dêrgul) ku hema hema di hemû çavkaniyan de ev gund derbas dibe ji malbata wê û ji xizmên wê tu kes nemane, li gorî agahiyên ku me ji gundiyê wê (Dûrsin Dêrgul) bi dest xistin xizmên wê koçî Ewrûpayê kirine û li wira dijîn. Lê, li kîjan welatê Ewrûpayê ne derbarê vê de me agahî bi dest nexistin.

Mebesta vê xebatê ji jiyana Meyrem Xanê zêdetir di her sê kilamên ku hatine hilbijartin temaya hiznê ye. Ji ber ku Meyrem Xan xwedî jiyaneke bi derd û kul e, ev kesera wê bandor li ser dengê wê û berhemên ku bi deng xistine jî kirine. Ev xebat jî dê nişan bide ka di kilamên wê bi xwe de û di kilamên ku bi deng xistine 'hizn' çawa û çiqas cî girtiye.

Wekî din di vê lêkolînê de, dê bê dîtin ku di tradîsyona dengbêjiyê de Meyrem Xanê cihekî çawa digire û bi deng û awaza xwe rengekî çawa daye muzîka Kurdî

DESTPÊK:

Meyrem Xan, di tradîsyona dengbêjiya kurdî de cihekî girîng digire. Meyrem Xan, weke dengbêj Reso, Şakiro, Mihemed Arîf Cîzrawî, Hesen Cîzrawî û Nesrîn Şêrwan ji bo hunera kurdî kedek mezin daye. Bi berhevkirinên kilamên kurdî ji bo radyoya Bexdayê hişt ku îro nifşên nû hay ji çand û kelepora xwe hebin. Bi sewt û awaza xwe wê jî weke gelek dengbêjan navê xwe li dîrokê nivîsî.

Her dengbêjek şêwazekî wî / wê heye. Meyrem Xanê jî bi şêwaza xwe û cureyên kilamên xwe ji dengbêjên din vediqete. Lê di bingeha hemû kilamên dengbêjiyê de em rastî realîteyên civaka kurd tên. Dengbêjan evînên ku hatine jiyin, koçberî, şer, mirin, bûyerên dîrokî, bûyerên civakî û hwd. kirine kilam û ji bo nifşên nû ev kilam bûne weke belgeyên dîrokî.

Dengbêj tiştên bihîstine, dîtine yan jî bûne şahid bi kilamên xwe ew gihandine heta roja îro. Dema em li kilamên Meyrem Xanê dinerin evînên ku li ser erdnîgariya vî welatî deng vedane ku weke kilama "Çemê Bişêrîka Şewitî" û yên din, bûyerên dîrokî weke "Bavê Koroxlî", "Bişarê çeto", evîna xwe weke kilama "Mihemedo Ronî", li ser tenêtî, xerîbî, koçberî û hwd. gelek qewimîn ji xwe re kiriye mijara kilaman yan jî kilamên bi vî rengî ji xwe re hilbijartiye û strandiye.

Taybetmendiyek din ya Meyrem Xanê ew hizna li ser dengê wê ye. Dikare bê gotin ku hemû kilamên xwe bi dengekî hizn dibêje. Ev jî li gorî baweriya me ew bûyerên ku hatine serê wê karîgerî li ser dengê wê jî kiriye. Ji xwe temaya kilamên wê bêtir hizn e. Di vir de hewce dike ku pênaseya têgeha "hizn"ê bê kirin.

Hizn, ji aliyê naveroka xwe ve têgeheke gelekî berfireh e. Her tiştê ku ji aliyê hestî yan jî hîsî mirov pê biêşe ew hizn e. Mînak; xerîbî, dûrketin, tenêtî, mişextîbûn, koçkirin, mirin, windabûn, jihevqetîna du hezkiriyan û wekî din em dikarin vê lîsteyê dirêj bikin. Ango ev hemû qewimîn dema pêk tên hesta hiznê derdikeve holê. Hizn; xemgînî, xembarî ye.

Dema meriv li naveroka stranên kurdî dinere tê dîtin ku temaya hiznê, temayeke herî xurt e. Lewre, kilamên kurdî gelekê wan di bingeha xwe de zêmar in û piraniya wan ji aliyê jinê ve hatine afirandin. Folklornas Rohat Alakom jî weke afirînerê kilamên hiznê jinê nişan dide. Piraniya stranên xerîbiyê ji devê jinan derketine û li ser hezkiriyê wan in ku li xerîbiyê mane (Alakom, 2009: 9). Di vir de em ê li ser têgehên 'xerîbî, koçkirin'ê bisekinin ku li jor me gotibû ew jî di bin sîwanka temaya hiznê de ne. Xerîbî cihê biyanî ye ku bi tu awayî tu xwe aîdê wira nabîne. Civaknas Elî Şerîatî dibêje, koçkirin ne tiştekî biçûk e. Koçkirin ew tişt e ku tu têkiliya xwe ji her tiştî qut dike. Koçber welatekî serbixwe ye (Şeriati, 1998: 38-54).

Belê, koçkirin ne tenê dûrketina ji welêt e, dûrketina ji zimanê xwe, ji nirxên xwe, ji erf û adetên xwe, çanda xwe, ji hezkiriyên xwe û bêhna welatê xwe ye. Dûrketina

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

ji welêt yan jî yan hezkiriyan her tim bûye mijara kilamên dengbêjiyê. Êdî ev bûye birîna dengbêjan.

Di kilamên Meyrem Xanê de bêtir evîn û jihevdûrketina hezkiriyan derdikeve pêş. Mînak, di kilama Mihemedo Ronî de jihevqetîn û dûrketina xwe û hezkiriyê xwe Mihemedo aniye ser zimên.

Meyrem Xan, hem kilamên mêrxasî, folklorî, dîrokî straye. Lê em dikarin bêjin ku Meyrem Xanê ji xwe re bêtir kilamên bengîtiyê û evîna welêt hilbijartiye. Lewre, mijara piraniya kilamên wê evîn e û xwezaya welêt e. Her kilameke wê di koka xwe de çîrokek dûr û dirêj e (Dêreşî, 1998: 62).

Seîd Dêreşî, destnîşan dike ku evîna evîndarên kurda herdem bi encamek û dumahiyek kovanî û trajedî derbas bûye (Dêreşî, 1998: 63). Ji bo vê yekê me jî xwest kilamên Meyrem Xanê ji aliyê hiznê ve analîz bikin.

1. MEYREM XAN Û BERHEMÊN WÊ

Derbarê jiyana Meyrem Xanê de her çiqas çavkaniyên berfireh kêm bin, pêzanîn heyî jî ji hev cuda ne. Di serî de derbarê cihê ku Meyrem Xanê lê ji dayik bûye û neseba wê de çavkaniyên cur be cur derdikevin pêş.

Li gorî ku Mela Hesen Xoşnaw û Cengî Celal Mela Hesen, ji Ebû Yûsiv Seîd vediguhêzin, hunermend Meyrem Xan xelkê Cizîrê ye, li gundê Dêrgulê ji dayik bûye, bi ser qezaya Bêrtiyê ve ye (Xoşnaw & Hesen, 2006: 20).

Xoşnaw û Celal Mela Hesen, ji Ebû Yûsiv Seîd zanyariyeke bi vî rengî jî vediguhêzin: “Hunermend Meyrem Xan xelkê Cizîra Botan e, sala 1904an li gundê bi ser bajarê Nisêbînê ve ji dayik bûye. Her wiha ji êlên Fileh e (Xoşnaw & Hesen, 2006: 20).

Lêkolîner û nivîskar Kakşar Oremar ev îdiya ku hunermend Meyrem Xan fileh e, red dike û dibêje:

“Malbata Meyrem Xanê di wê sala ku fermana Ermeniyan hatiye diyarkirin, ji Dergolê ber bi başûrê rojavayê Kurdistanê çûne. Ji bo wê jî hinek kes dibêjin Meryem Xan Ermenî yan jî Asûrî ye. Lê heta niha li ser vê hindê, lêkolînek baş nehatiye kirin û tu goman tê de nîne ku tiştekî ne rast e. Çimkî ji paşnav an jî ya rastir navê bavê wê Mihemed kurê Ehmed e, eşkere dibe ku ew kurd û bi ola xwe jî misilman e. Rewşa jiyana kurdan li wê para Kurdistanê ya di bin destê Komara Tirkiyê de, berê gelek kurdan ber bi rojavayê Kurdistanê dide û wan dişîne wira. Her wiha tê gotin ku bav û birayên Meryem Xanê ji ber helwesta xwe ya li dijî Osmaniyan û hevkarî nekirina wan ya di qirkirina Ermenî û Asûriyan de, ji rûyê neçariyê ji cihwarê jiyana xwe, koç dikin. Malbata wan li Qamişlo bi cih dibe (Oremar, 2015).

Zanyariyeke din ku Xoşnaw ji Kemal Raûf Mihemed neqil dike wiha ye: “Meyrem Xan keçê Mihemed e. Xelkê Cizîra Botan e. Li gundê Dêrgulê di sala 1904an de ji dayik bûye, bi ser qezaya Bêrtiyê , li Kurdistana Bakur e”(Xoşnaw & Hesen, 2006: 20).

Bi giştî xuya dibe, li ser cihê ku Meyrem Xanê lê ji dayik bûye îdîayên ji hev cuda hene lê, li gorî gelek çavkaniyan tê dîtin ku Meyrem Xan ji herêma Botan e û li gundê Dergulê hatiye dinê.

Çavkanî nîşan didin ku navê bavê Meyrem Xanê Mihemedê Botî ye. Li ser diya Meyrem Xanê û eşîra wê hin zanyariyên bi vî rengî di jêderkan de cî digirin. Celal Mele Hesen van pêzanînan ji Mela Ubeyd Hecî Seîd vediguhêze: “Meyrem Xan Herkî ye ji şaxa Simayil e. Ji binemalê mala Reşe navê wê Meyrem Mîkaîl Mîkaîl e, navê dayika wê Mereze ye” (Xoşnaw & Hesen, 2006: 22).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Lêkolîner Zeyneb Yaş di pirtûka xwe de li ser cihê ku Meyrem Xanê lê bûye van pêzanînan destnîşan dike:

"Devera ku gundê Dêrgulê lê ye ji aliyê; devok, folklor, kultur û kelepûra xwe ve, ku heta vê gavê jî deverek weke gencîneya folklorî tê dîtin, xwedî taybetiyeke resen û cuda ye. Bi giştî ji xelkê vê deverê re Goyî tê gotin. Gundê Dêrgulê niha jî ku nêzîkî 800 malî tê de ye, bi giştî ji eşîra Batûyan in û koçer in. Di nav devera Goyan de gelek gundên ji eşîra Herkiyan jî hene û li gor pêzanînên heyî gava ku malbata Meyrem Xanê ji ber qeyrana sala 1915an derbeder bûne, wê demê Meyrem Xan hîn zarok bû û li nav mala Eliyê Remo (Serokê eşîra Herkiyên gundê Çêlikê (Gundekî Kerboran a navçeya Mêrdînê ye) hêwiriye û li nav mala wan xebitiye, ji ber wê çendê jî hatiye gotin ku ew ji eşîra Herkiyan e" (Yaş, 2015: 121).

Li ser zarokatiya hunermend Meyrem Xanê tê gotin ku bi nexweşiya keçeliyê (gurîbûn) ketiye. Xoşnaw û Hesen derbarê vê mijarê de van pêzanînan par ve dikin:

"Meyrem Xan wexta zaro bû tûşî keçeliyê bû. Ev derd li Kurdistanê her wiha li welatê ecem, rûm û welatê ereb belav bûbû. Ji ber ku di wê serdemê de doktor û derman tune bûn, her wiha girîngî nedidan paqijiyê û sabûn tune bûn. Meyrem Xan her dem serê xwe bi laçikê girêdida" (Xoşnaw & Hesen, 2006: 17).

Jêderk nîşan didin ku Meyrem Xan hêj deh salî bû bi malbata xwe re ji welatê xwe koçî Qamişloyê dikin. Êdî ji bo Meyrem Xanê kul û hesreta welêt û salên hiznê destpê dikin.

Piştî ku Meyrem Xan diçe Şamê li wê derê malbata Bedirxaniyan nas dike û tê îdîakirin ku Meyrem Xan bi kurekî malbata Bedirxaniyan re zewiciye.Lêkolîner û nivîskar Kakşar Oremar derbarê têkiliya Meyrem Xanê û mala Bedirxaniyan de hin agahiyên bi vî rengî dest nişan dike:

"Meyrem Xan li wir bi xortekî malbata Bedirxaniyên navdar re dizewice. Min pir pirs kir ku navê wî xortê Kurd bi dest bixim, lê me kesek ji malbata Bedirxaniyan ne li Ewrûpa û ne jî li Kurdistanê peyda nekir ku navê wî bizanibin. Lê hinek kes dibêjin navê wî xortî Mihemed bûye û pişt re Meryem Xanê strana "Mihemedo Ronî" li ser wî gotiye. Tu jêder jî behsa vê xala girîng di jiyana Meryem Xanê de nakin ka ew çawa û kengî bi xortê malbata Bedirxanî re zewiciye an jî sedemên cudabûna wan çi ne!... Heta rewşenbîrên mîna Celadet û xanima wî Emîre Rewşen Bedirxan jî di tu nivîsên xwe de behsa vê hunermendê nakin. Lê li rojavayê Kurdistanê, Meryem Xanê çûn-hatina mala rewşenbîr û kurdperwerê mezin (Mîr Celadet Bedirxan) kiriye. Wê bi dengê xwe yê bi şewat di hizûra Emîre Rewşen Bedirxanê straye. Li vir xuya dibe ku destpêka naskirina wê bi xortê malbata Bedirxanî û zewaca wan li mala Celadet Bedirxan, dest pê kiriye. "Xan" jî piştî zewaca bi malbata Bedirxanî re dibe paşnavê wê yê hunerî (Oremar, 2015).

Lê belê, her çiqas îro derbarê Meyrem Xanê de zanyariyek wiha hebe jî di hevpeyvîna ku lêkolîner Zeynep Yaş bi keça Celadet Bedirxan, Sînem Bedirxanê re kiriye ev pêzanîn tên redkirin:

"Tê gotin ku ew di temenekî biçûk de çûye Şamê û demekê li wir maye. Li Şamê karê stranbêjiyê kiriye, li wê derê xortek bi navê Mihemed ku ji binemala Bedirxaniyan bûye nas kiriye û ji hev hez kirine, lê dema wê xwestiye ku ew karê dengbêjiyê bike ev hezjêkirina wan neçûye serî û ji hev qetiyane, wê kilama xwe ya bi navê "Mihemedo Ronî" li ser vê xoşevistiyê gotiye. Min ji bo piştraskirina vê pêzanînê ji keça Celadet Elî

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Bedirxan , Sînemxan Bedirxan pirsî ku ev pêzanîn rast e, lê wê got ku tu carî meseleyek wisa li nav malbata me, bi kesek ji malbata me re çênebûye” (Yaş, 2015: 121-122).

Tiştê balkêş ew e ku di kovarên weke Hawar û pirtûk û nivîsên ku malbata Bedirxaniyan weşandine li ser huner û jiyana Meyrem Xanê tiştek nehatiye nivîsîn. Kovara Hawarê tevî ku gelek karê berhevkirinê kiriye jî em rastî kilamek Meyrem Xanê nayên.

Her çiqas li ser jihevqetîna Meyrem Xanê û hevserê wê agahiyên teqez û rasteqîn di çavkaniyan de peyda nebin jî di kilama “Mihemedo Ronî” ku diyare Meyrem Xanê avêtiye ser hezkiriyê xwe hin tişt zelal dibin. Di beşa analîza kilaman de li ser çîroka kilamê bi berfirehî dê bê rawestîn.

Meyrem Xan evîndara dengbêjiyê bû. Lewre di zarokatiya xwe de di dîwanên dengbêjan de ev huner nas kiribû û pir jê hez kiribû. Bi tabîra wê êdî bê kilam nikarîbû bijiya. Li gorî îdîayan Meyrem Xan û zilamê xwe ji bo stranbêjiya wê hev du berdane. Meyrem Xan didulî dimîne lê, evîna dengbêjiyê zora evîna Mihemedê wê dibe. Tê gotin ku Meyrem Xan ji zilamê xwe re gotiye, bêyî kilaman nikarim bijîm. Di xwîna min de huner û stran hene. Heke kilaman nebêjim ez ê bimirim (Ekmek ve Gül, 2017).

Hevserê wê dibêje, em malbateke mezin in. Ji malbata me jinek nikare kilaman bêje (Ayaz, 2010). Vê daxwaza wê qebûl nake û ji hev diqetin. Tê texmîn kirin ku Meyrem Xan wê demê 20 salî bû. Helbet ev biryar ji bo wê biryareke gelek zor û zahmet bû.

Malbata Bedirxaniyan di civaka kurd de weke malbateke rewşenbîr û pêşengên xebatên kurdî tên naskirin. Hem rojnameya ewil (Kurdistan) hem kovar (Hawar-Ronahî) û gelek pirtûk malbata Bedirxaniyan derxistibûn. Lê belê, heke ev pêzanîna li ser Meyrem Xan û malbata Bedirxaniyan rast be tê dîtin ku vê malbata rewşenbîr jî xwe ji hin kevneşopî û tesîra civaka pederşahiyê xilas nekiriye.

Meyrem Xan, êdî ji Qamişloyê dê biçe Bexdayê. Wê demê dibîhise ku îngîliz li Bexdayê kilam û stranên kurdî, farisî, ermenîkî û erebî berhev dikin û qewanan (plak) saz dikin. Ev ji bo Meyrem Xanê dibe firsendek. Ji xwe xewn û xeyala Meyrem Xanê ew bû ku dengê xwe qeyd bike û jiyana xwe bi muzîkê dewam bike. Bi van gotinan vê xwestek û xeyala xwe nîşan dide. Dibêje, ez ê biçim Bexdayê dengê xwe qeyd bikim, pişt re dimirim jî bila bimirim (Nado, 2011: 7).

Lê bele, Meyrem Xan di sala 1924an de pêşî berê xwe dide Zaxoyê. Li gorî îdîayan li vira 12 salan li mala Yûsiv Şemdîn Axa dimîne. Sedema mayîna wê ya li vira nayê zanîn. Êdî ji vira ji bo ku dengê xwe qeyd bike diçe Bexdayê mala dotmama xwe Elmas Xanê. Li vê derê gelek dengbêjên weke Mihemed Arîf Cizrawî, Nesrîn Şêrwan, Hesen Cizrawî, Elî Merdan û Seîd Axayê Cizirî nas dike.

Mala Elmas Xanê ne ji maleke rêzê bû, maleke weke dibistanê bû. Wê demê hunermend, siyasetmedar û rewşenbîr li mala wê diciviyan. Ev ji bo Meyrem Xanê ku hunera xwe îcra bike şensek bû. Meyrem Xan êdî di dîwanên ku li vira dihat damezrandin kilamên xwe digotin. Rojekê dîsa dema ku ev civat li wir e Meyrem Xan Kilamekê distrê, her kes heyrana dengê wê dibe û ji wê rojê pê ve êdî Meyrem Xan di dîwan û şevbêrkan de her gav li pêş rûdinê, ji huzunbarî, xembariya xwe kilaman distrê (Nado, 2011: 8).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكۆلینێن كوردی

Meyrem Xan bi kompaniyên îngîlîzî mîna Beyzafon, Ebol-Kelp û Ûdyonê re xebatên xwe didomîne. Li gorî çavkaniyan yekemîn jin e ku bi zaravayê kurmancî sêlik (plak) derxistiye.

Di sala 1939an de radyoya Bexdayê dest bi weşanê dike û ji bo ku hunermendên kadroyî bigire di sala 1944an de pêşbaziyekê li dar dixe. Gelek dengbêj beşdarî vê pêşbaziyê dibin lê, yekemîna vê pêşbaziyê Meyrem Xan e. Êdî weke hunermendeke kadroyî di radyoya Bexdayê de dixebite. Tê gotin ku Meyrem Xanê di jiyana xwe ya hunerê de nêzî 200 kilam strane. Niha li ber destên me 44 kilamên wê hene.

Meyrem Xan li radyoyê gelek kilam berhev kirine. Ji bo çand û kelepora kurdî heta ji dest hatiye xebitiye. Ji xwe ev berhemên li ber destê me jî nîşana vê xebata wê ye. Meyrem Xan jineke girêdayî çanda xwe bû. Rojnameya Gazete Karınca ji dengbêj Mihemed Arîf Cizîrî van agahiyan vediguhêze:

"Mihemed Arîf Cîzrawîyê ku Meyrem Xan ji nêz ve nas dikir di hevpeyvînek ku ji radyoya Bexdayê re kiribû wiha digot: " Kincên Meyrem Xanê modern bûn. Lê ruhê wê, jiyana wê, hunera wê bi kurdî bû. Girêdayî adetên kurdî bû. Dema kilam digotin ji dil digot û bedena wê bi kilaman tije dibû" (Gazete Karınca, 2017).

Hunermend Meyrem Xan piştî ku ji zilamê xwe diqete û ji malbata xwe dûr dikeve xwe her tim tenê hîs dike. Jiyana wê di nav hiznê de derbas dibe. Bi nexweşiya gurçikê dikeve û li gorî Mehmet Ayaz ev bûyer wiha rû daye:

"Ev kilambêja mezin di sala 1949an de li Bexdayê çû ser dilovaniya xwe. Derheqê mirina wê de dotmama wê Elmas Xan wiha dibêje:" Di sala 1949an de Meryem Xan bi nexweşiya gurçikê dikeve. Li Bexdayê li nexweşxaneya Mîr Îlyas raza. Emeliyat bû. Doktoran çare nedîtin. Li nexweşxaneyê mir. Di wan salan de Meryem Xan gelekî xemgîn bû. Bi tenê bû. Nedixwest tu kes werin cem wê. Doktorê wê jê re digot vê hiznê ji ser xwe bavêje, kêfxweş bibe. Lê belê wê her tim dixwest tenê be.Li nexweşxaneyê jî dixwest tenê be. Rojekê bi doktorê xwe yê Cihû dikeve nîqaşê. Şelmaqekê li Meyrem Xan dixe, Dirûnên emeliyata Meryem Xanê vedibin, xwîna wê diçe û dimire" (Ayaz, 2010).

Meyrem Xan, li Bexdayê wefat dike û li wira tê definkirin. Nivîskar Ayaz wiha behsa definkirina Meyrem Xanê dike:

"Meyrem Xan, li Bexdayê bi merasîmek mezin li goristana Şêx Maarûf tê definkirin. Ji hunermendan M. Arîf Cizrawî, Nesrîn Şêrwan, Hesen Cizirî, Elmas Xan, Elî Merdan, mamoste Bakozî, Fewziye Mihemed, xebatkarên radyoya Bexdayê û nava gel jî gelek kes beşdarî merasîmê bûn" (Ayaz, 2010).

Meyrem Xan, jiyaneke bi keser jiyaye. Di 45 saliya xwe de ango di temenekî ciwan de wefat kiriye. Êdî bedena wê ev derd û kul ranekiriye bi nexweşiyê ketiye. Ev hizna ku Meyrem Xanê kişandiye bandor li ser dengê wê jî kiriye. Kilamên xwe bi dengekî hizin dibêje. Heta dema kilamên rîtmîk jî dibêje ev hizin tê hîskirin (Ayaz, 2010).

Meyrem Xan, du cure kilam gotine. Beste û lawik. Beste û lawikên wê li ser jiyana koçerî, xoşewîstî, evîndarî, şer û şûr, mêrxasî, xerîbî, tenêtî û hestên neteweyî ne. Ji lawikên Meyrem Xanê ku niha li ber destan e çend mînak ev in; Bavê Koroxlî, Mihemedo Ronî, Wele Domam, Mihemed Selîm, Hesenê Osman, Sêva Hecî Elî û hwd.

Di kilamgotinê de rêbazek aidê Meyrem Xanê heye. Ji xwe hiznek li ser dengê wê heye, ev li ber çavan e. Li gor zanista hunerê, tebeqa dengê wê "alto" ye. (Oremar,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

2004: 9) Dengê Meyrem Xan dengekî nerm e. Dema kilaman dibêje bi dengekî nerm, hêdî û nizim dibêje.

Di kilamên wê de otantîzm, esalet heye, gewriya wê resen ya kurdî ye û di kilamên wê de dengê jinên bindest heye. Qirika wê paqij e. Zimanê wê zelal û xweş e. Ji her tiştî girîngtir di dengê wê de hizin û hesretek heye. Di kilameke rîtmîk de jî ev hizn tê hîskirin (Gündem Kadın, 2004).

Taybetmendiyek din ya Meyrem Xanê ew e ku di kilamgotinê de amûrên mûzîkê yên weke kanûn û keman û wekî din bi kar aniye. Lê dengbêjên Serhedê kilamên xwe bêyî amûrên mûzîkê dibêjin. Mînak; Şakiro, Reso, Evdalê Zeynikê tu car amûrên mûzîkê bi kar neanîne. Ev jî cudatiyeke di navbera dengbêjiya Serhedê û Botan de ye.

Ji besteyên Meyrem Xanê ku niha ji aliyê gel ve tên guhdarîkirin çend mînak jî ev in: Heyla Li Min Xerîbê, Gulê Wey Nar, Lê Weso, Qumrîkê, Girê Sîra, Hay Berde, Mêremê û hwd.

2. TEMAYA HIZNÊ DI SÊ KILAMÊN MEYREM XANÊ DE (MIHEMEDO RONÎ, ÇEMÊ BIŞÊRÎKA ŞEWITÎ, BAVÊ KOROXLÎ)

Meyrem Xan dengbêjeke deng bi hizn e. Sedem ew e ku Meyrem Xan di jiyana xwe de rastî gelek bûyerên kambaxî hatiye.

Di temenekî biçûk de koçkirina wê ya ji welatê wê, jihevqetîna wê û hevserê wê, dûrketina wê ji malbata wê û tênetiya wê bûn sedema diltenikbûna wê.

Ji bo vê yekê di her kilameke Meyrem Xanê de ew kesera ku kişandiye tê hîskirin. Ev her sê kilamên li jêrê ku hatine hilbijartin wê ji aliyê temaya hiznê ve bên analîzkirin.

2.1. Mihemedo Ronî

Ev kilam ji aliyê cureyê xwe ve kilameke evînî ye û bi hizn e. Temaya wê jihevqetîn e. Hunermend Meyrem Xan ev kilam avêtiye ser hezkiriyê xwe Mihemed Ronî. Li gorî jêderkan Meyrem Xan bi xwe ev kilam nivîsiye.

Tê gotin ku ev kilam 81 sal berê di sala 1937an de hatiye nivîsîn. Piştî ku Meyrem Xan û zilamê wê ji ber stranbêjiya wê hev du berdidin, Meyrem Xanê bi dert û keser vê kilamê davêje ser hevserê xwe. Di çavkaniyên li ser jiyana Meyrem Xanê de derbarê vê kilamê de tenê em gihîştin van agahiyan. Lê, ji gotinên kilamê em digihêjin hin kitkiteyên vê rastiyê.

Ji ber ku di kilamê de teqez nayê zanîn ka Mihemedo Ronî hevserê Meyrem Xanê ye, me jî weke hezkiriyê wê şîrove kir.

“De loy loy loy loy loy loy loy loy
Ax de loy loy loy loy
Ax de loy loy loy loy de loy loy Mihemedo Ronî loy loy ax ax
De loy loy Mihemedo Ronî mi çi got û tu xeyidî
De giyayê mêrga mi û Mihemedê mi seridî
De heçî navbeyna min û Mihemedê min de fesadîkî bikê
De heke mêr bê rebî nezewice
De heke jin bê rebî newelide
De heke keç be rebî bi ciwanîka xwe şa nebî

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەكولینێن كوردی

Ax de loy loy loy loy loy loy loy loy loy loy de loy loy Mihemedo Ronî loy loy ax...
De loy loy Mihemedo Ronî
Ciwanîka Mihemedê min î çal e
Di her çar lingê wî bê nal û bê bizmar e
Wez ê bazinê destê xwe biskînim (ji hev qetandin)
De wez ê ciwanîka Mihemed derdûkê min nal û bizmar e
De wez ê pora serê xwe biqusînim
Wez ê ciwanîka(?) Mihemed derdûkê min sed sal e(?)
De wekî lawikê min çû û hate xerîbiyê
Da kesek nebêje çi kurekî bêfesal e
Loy loy loy loy loy loy loy loy loy loy
Ax de loy loy loy loy loy loy loy loy loy loy
De loy loy Mihemedo Ronî loy "

Ji gotinên kilamê xuya dibe ku rêveqetîna Meyrem Xanê û hezkiriyê wê bi gotina wê ji ber "fesadî"ya milet e. Xuyaye ku Meyrem Xan ji evîndarê xwe gelekî hez kiriye. Lê, rê li ber fesadiya gel negirtiye û gazinên xwe li Mihemedo Ronî dike. Dibêje min çi got ku tu ji min xeyidî ye.

Di kilamên dengbêjiyê yên evîniyê de 'fesad, fesadî' ji bo ew kesên ku navbera hezkiran, evîndaran xera dikin tê bikaranîn. Carinan ev dibe 'xayîn felek' jî. Heke yek bûbe sedema jihevqetîna evîndaran di kilamên dengbêjiye de nifirên resen ku ji aliyê edebî ve gelekî xurt in tên kirin.

Meyrem Xan di vê kilama xwe de bi gotinên giran nifiran li wan kesên fesad dike ku bûne sedema jihevberdana wê û hezkiriyê wê. Di vir de tê xuyakirin ku dilê Meyrem Xanê ji bo veqetîna wê û hezkiriyê wê çiqas dişewite. Hemû jan û kesera dilê xwe di vê kilamê de verişandiye. Di kilamê de du têhegên folklorîk cî digirin. Yek ji van têgeha "porqusandin" e ku di çanda kurdî de nîşana karesatên mezin e. Ji bo jinê "porkurkirin, gulîbirîn" destnîşankirina êşa nav dilê wê ye. Bi taybetî di şînan de jinan li dij êşa miriyan porê xwe qusandine an guliyên xwe birîne.

Por ji bo jinê tiştê herî biqîmet e ku hem nîşana nasname û hem jî nîşana zayenda jinê ye. Por di heman demê de nîşana xweşikbûna jinê ye. Ji bo vê yekê dema jin porê xwe diqusînin hem xweşikbûna wê û hem jî zayenda wê ji holê radibe. Ji pirtûka Kilam û Jin a nivîskar Tekin Çiftçi derbarê têgeha "porkurkirin"ê de em dikarin van zanyariyan parve bikin:

"Di gelek stranên ku qala şer û pevçûnên mezin dikin de em li vê têgehê rast tên. Her wiha ji bilî gulîbirînê di gelek stranan de jina bêçare û reben ji xwe re "porkur, rûreşê" dibêje. Dema ku em li stranên ku ev têgeh tê de derbas dibin dinihêrin, em bûyerên gelekî girîng dibînin. Her yek ji wan bi serê xwe trajedîyek e. Kîngê ku êşeke mezin çêbûye, yekî gelekî hêja hatiye kuştin, an jî tevkujiyek çêbûye, jinan porê xwe jêkiriye. Porkirin, destnîşankirina şewata nava dilê jinan e" (Çiftçi, 2014: 109).

Têgeha din ya folklorîk ku di kilamê de derbas dibe "nifir" e. Nifir di çanda devkî ya kurdî de cihekî girîng digirin. Dema kesek dikeve tengasiyê yan jî bêçare be demildest serî li nifiran didin. Çimkî kesê/a ku nifiran dike ji ber ku tu tişt ji dest nayê serî li vê rêyê didin. Di kilamên Kurdî de nifir cihekî mezin digirin. Helbet mêr jî nifiran

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو فەکولینێن کوردی

dikin lê belê dema em guhê xwe didin kilaman tê dîtin ku nifir bêtir ji aliyê jinan ve tê kirin.

Çimkî di civaka kurd de ya ku gelekî rastî ta’de û zordestiyê tê jin e. Ji bo vê yekê jin nifiran weke çekekê bi kar tînin. Jin gelek caran ji ber ku nagihêje miradê xwe ya zewaca bi zorê yan jî weke qedera Meyrem Xanê ji ber fesadiya xelkê veqetîna ji hezkiriyê xwe wê mecbûrî nifiran dike.

Meyrem Xan, jana dilê xwe bi van nifirên ku dike nîşan dide. Ji bo keçeke ku çi meqsed û mirazê wê hebin dibêje bila di dilê wê de bimîne. Ji bo jinê jî dibêje rebî newelide. Ji bo jinê nebûna zarokan di civakê de weke kêmasiyekê tê dîtin û ew jin dibe ku bê berdan yan jî hewî were ser. Ev jî dibe sedem ku ew jin di nava civakê de bibe jineke belengaz û reben. Ji bo mêr jî em dikarin heman tiştî bêjin ku mêr dema nezewicin di civakê de dibin belengaz û di heman demê de bêzuriyet dibin. Zuriyeta wan çênabe. Ev jî ji bo wan kêmasiyeke mezin e, heta dikare bê gotin ku ev rewş ji mirinê jî xerabtir e ji bo wan. Meyrem Xan êşa dilê xwe bi vî awayî raxistiye ber çavan.

Meyrem Xan, ev kilam bi hunereke edebî nivîsiye. Di vê risteya “De giyayê mêrga li min û Mihemedê mi seridî” de ew gihayên ku di dawiya demsalê de hişk dibin û êdî diseridin şibandiye jihevqetîna xwe û hezkiriyê xwe. Di heman demê de gihayên ku diseridin êdî digihêje dawiya emrê xwe ango nêzî jihevqetîn yan jî mirinê ye.

Jihevqetandina bazinan jî dikare bi vî awayî bê şîrovekirin ku êdî vegera bihevrebûnê ne pêkan e. Êdî hemû hêvî şikestine.

Motîva xerîbî, welatê xerîb, di gelek kilamên kurdî de cihekî mezin digire. Tiştê ku herî zêde mirov pê diêşeye. Di kilamê de Meyrem xan ji bo hezkiriyê xwe dibêje “de wekî çû û hate xerîbiyê”. Ango dibêje de weke hezkiriyê min çûbe xerîbiyê. Lewre naxwaze bawer bike ku vegera hezkiriyê wê tune ye.

Di vira de Meyrem Xan, xerîbiyê ji xwe re weke teseliyekê dibîne. Xerîbî her çiqas dûrketina ji her tiştî be jî, lê her tim hêviya vegera kesê li xerîbiyê jî heye.

Wekî din ev baneşanên weke “ax, oy, ay, lê, loy loy” ku di kilamên Meyrem Xanê de gelekî derbas dibin, dikare weke nîşaneyên xemgînî, dertkişandin, dilşewatbûn ango weke hiznê bên ravekirin.

2.2. Çemê Bişêrîka Şewitî

Ev kilam li ser evîndariyê ye. Ji bo vê yeke cureya vê kilamê lîrik e. Temaya wê negihandin, bêrîkirin, bêmirazî, tenêtî û hizna evînê ye.Kilameke herêma Xerzanî ye. Ev kilam ji devê jinekê hatiye girtin. Em dikarin weke lawij jî bi nav bikin. Ji ber ku gotinên dilşewat ên jinê ne. Ev pîrek, derd, keder û kesera dilê xwe bi awayekî dilşewatî tîne zimên (Yıldız & Taşkın, 2018: 77). Di kilamê de keçik ji diya xwe re behsa bêrîkirina evîndarê xwe û êşa dilê xwe dike.

Kilam heta dawiya wê bi gazina ji çarenûsa xwe ya keçikê dewam dike. Hêjayî gotinê ye ku ev evîna keça koçer Nafya, evîneke platonîk e. Çimkî haya Emînê Ehmed ji vê evînê tune ye û çênabe jî. Li jêr bi berfirehî dê analîza kilamê bê kirin.

Ji devê dengbêj Salihê Qubînî çîroka kilamê bi vî awayî ye:

“Lehengê vê kilamê Emînê Ehmed bi navekî xwe yî din Emînê Perîxanê ye. Di nav gel de weke ‘Bavê Şikrî’ jî tê nasîn. Emînê Ehmed ji gundê Kevirzo ye. Kevirzo gundekî Batmanê ye. piştî ku birayê wî Seîdê Ehmed tê kuştin jinbira xwe Wesîlayê li xwe mehr dike. Wesîla jineke jêhatî û mêr bû. Ji bo vê yekê mêrê ku bi Wesîlayê re

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

dizewicîn dibûn serokê eşîrê.Wesîlayê jî ji eşîra Remanê bû. Lehenga kilamê ku dengbêj ji devê wê kilamê dibêjin keçeke ji mihacirên Serhedê ye. Navê wê Nefya ye. Bi dergisî ye. Navê dergistiyê wê jî Tewfîq e. Keçika mihacir dilê wê dikeve Emînê Ehmed. Lê haya Emînê Ehmed ji vê eşqê tune ye û çênabe jî. Keçika mihacir rojekê radihêje zêrên xwe û diçe cem dengbêjê Êzidî Elîkê Mamed. Ji Elîkê Mamed re dibêje dema ku ez çûm tê vê kilamê bêje. Ango vê kilamê dengbêj Elîkê Mamed dinivîse. Wexta ez 12-13 salî bûm dibe kû mezintir bûm jî min dengbêj Elîkê Mamed dît, wê demê pir extiyar bû" (Qubînî, 2018).

Der barê jiyana Emînê Ehmed de ku di dîrokê de cihekî girîng digire hin zanyariyên din bi vî awayî ne.

Emînê Perîxanê, di sala 1889an de li gundê Şikefta (Suçeken) ku girêdayî navenda Batmanê ye ji dayik bûye. Navê bavê wî Ehmed, navê diya wî Perîxan e. Diya wî li herêma me ji wan jinên mêr bû, ji ber vê sedemê bi navê diya xwe weke Emînê Perîxanê (Emînê Ehmed, Emînê Remanî) hatiye naskirin. Yekî esmer, dirêj, enîfireh, çavreş û birûreş bû. Ji melayê gundê xwe hînî qur'anê bûbû û bi dengekî xurt dixwend. Xwendin-nivîsandin û zimanê tirkî li girtîgeha Diyarbekirê ku şeş mehan tê de mabû hîn bûbû. Mêrekî çavfireh bû. Di şerê bi rûsan de Emînê Ehmed li ser daxwaza hikûmeta osmanî bi eşîra xwe tevlî artêşa Kazim Karabekir bû. Bi desteka eşîra wî artêşa rûsan têk diçe. Emînê Ehmed bi tawanbarkirina sûcekî di 9ê Avrêla 1933an de li Beşîriyê hat derdestkirin. Dema ji bo darizandinê ew ji Beşîriyê dibirin Garzanê (xerzan)di dema bêhndanê de ji aliyê zabitekî ve bi çekê hat kuştin. Emînê Ehmed li Xerab Bajarî (Erzen) jiyana xwe ji dest da. Gora wî li goristana gundê Barisil (Çevrimova) ku bi ser Beşîriyê ve ye(Batman Sonsöz, 2016).

Temamê mêrên vê malbata mezin bi kuştinê çûne. Niha lawekî pîr ê Emînê Ehmed heye li heyatê. (Taşkın & Yıldız, 2018: 17)

"Lê lê yadê rebenê wez ê çûme çemê Bişêrîka şewitî
Ax dayê rebenê wez daketim, oy gewra min tu yî lê ay ax
Oy sebra min tu yî, lê de lê lê ax de lê lê ay ay ay ax
Lê lê yadê rebenê, dibê xewka min tê vê sibê wez raketim way ax
Lê lê wez ê çi qa nav heval û hogirê xwe da bilind firîm
Ax dayê rebenê wez ê nizim bi erdê ketim
Ay gewra min tu yî lê ay ay ax
Oy sebra min tu yî lê de lê lê ax de lê lê
Lê lê wez ê tobedara şêxê xwe me lo ax
De wez ê ji navekî(?) bedew ez ê bejna lawikê xwe me
ax ax de lê lê ax de lê lê, y ay ay ax
Lê lê yadê rebenê keçikê digo wez koçer im ax
Ax dayê rebenê penîr tînim, oy gewra min tu yî
Lê ay ay ay ax ay sebra min tu yî lê
De lê lê , ax de lê lê , ay ay ay ay
Lê lê yadê rebenê wez ê kolan bi kolan vê sibê digerînim ax
Lê lê wez ê çiqa çavê xwe digerînim nagerînim
Ax wez ê bejna bilind li nav wa bajara nabînim ax gewra min tu yî lê
Ay ay ay ax ax oy bermaliya min tu yî lê de lê lê
Ax ax de lê lê , ay ay ay ay ax ax"

Ev kilam weke ku dengbêj Salihê Qubînî jî dibêje, ji devê keçeke mihacir hatiye girtin. Dengbêj ji devê keçikê bêçarebûna wê ya li hember eşqeke mezin ango qêrîna wê daye bihîstîn. Keçik hemû derdê dilê xwe bi diya xwe re par ve dike. Xwe spartiye diya xwe. Bangî diya xwe dike ku diya wê jê re çareyekê bibîne.

Lewre, evînê zora wê biriye. Motîva “reben”ê ku keçik bi vî awayî bang li diya xwe dike, tê vê wateyê ku keçik tevî ku dizane tu tişt ji destê diya wê nayê jî dîsa jî xwe spartiye wê. Keseke reben; belengaz e, perişan e, tu tişt ji dest nayê. Lê, ji ber ku keçik pir dilşewat e û dizane ku tenê diya wê, wê fêhm dike hemû derdê xwe jê re dibêje.

Di kilamê de gotina “Bişêrîka şewitî” weke metaforekê hatiye bikaranîn. Ango, destnîşankirina ew cihê ku êdî jiyan lê ne pêkan e yan weke mecazî wêranbûn û xerabûna wî cihî ye. Çimkî, li gorî çîroka kilamê Emînê Ehmed li Bişêrîkê hatiye kuştin û veşartin. Êdî Bişêrîkê ji bo keça mihacir ne cihê jiyînê ye.

Di gelek kilam û zêmarên kurdî de ji bo bajarên ku qewimînên bi vî awayî dilşewat pêk hatine ev gotinên mecazî hatine bikaranîn. Di kilama bi navê “Ereba Min” ya Huseynê Farê de metaforek bi vî awayî hatiye bikaranîn “Berê mi daye sûra bedena Diyarbekira şewitî” (Meretowar, 2017: 86).

Di kilama “Rabe Rabe” ya Reso de jî ji bo Mûradê heman metafor hatiye bikaranîn. “Bihar e Mûrada şewitî lemeleme” (Beğik, 2018: 176).

Di zêmarek ji gundê Heremhedat yê Mêrdînê jî ji bo Diyarbekirê ev wateya mecazî hatiye bikaranîn. “Ez ê bi Carbekira (Diyarbekir) şewitî ketim, ne tu war e / bi ruyê germ e, bi şevê sar e.”

Wekî din em dikarin li ser motîva “koçer”ê bisekinin. Lehenga kilamê keçeke koçer e, li xerîbiyê ye. Yanê hem êşa evînê hem jî êşa xerîbiyê keçik xistiye hizneke mezin. Di bangkirina li diya xwe de tenêtiya wê, jarbûna wê û êşa welatê xerîbiyê tê xuyakirin. Keça koçer Nefya diya xwe her tim weke sebra dilê xwe dîtiye û ew kiriye şirîka derdê xwe.

Ji kilamê xuyaye ku keça mihacir heta ji dest hatiye li dû evîna xwe çûye. Her çiqas çavên xwe digerîne nagerîne, kolan bi kolan digerîne jî bejna bilind ya hezkiriyê xwe nabîne.

Êdî keça koçer fêhm dike ku ev evîn naçe serî û ji hemû jiyînên xwe poşman dibe û tobe dike. Yanê ji kîjan aliyî vê em li vê rewşa keça koçer binerin xembariyek, hiznek xwe dide der.

Di reseniya çîrokê de her çiqas karakterên reel û berbiçav hebin jî di vê varyanta kilamê de navên lehengan nayên gotin, lê bi awayeki nerasterast hatine teswîrkirin.

2.3. Bavê Koroxlî

De hêê.. wez ê bi diyarî Mûşa şewitî ez ketim navî dara ax
De wez ê bi diyarî Mûşa şewitî diketim navî dara oy oy oy oy ax ax
De bejna bavê Koroxlî bejna wê şîkan û şabikan û çîtara ay ay ax
De têlxirefekî ji bavê Koroxlî re vê sibê û hatî çil hezara ay ay ay ax
Perîşanê bi sê denga li Perîxanê dikir gazî
Digo xwehekê pora serê min û te bi kur bê ay ay ax
Derbeka lê dane li bavê Koroxlî ay bi sê gula li biniya çiyayê birîndar e

Zakho Centre for Kurdish Studies

Ay de bavo wey bavo wey bavo wey bavo oy oy oy ax ax
De wax axao tu axa yî, tu gula mala Emer î
Ay tu çira mala Temer î, tu berxê mala Xêlid î
Tu serkanê peya yî, ay tu berdevkê dewleta Ali Osmanî
Ax de bavo wey bavo wey bavo oy oy oy oy ax ax
De hê hê hê wez ê bi diyarî Mûşa şewitî diketim, navî bi genim e ay ay ax
De hê hêê.. wez ê bi diyarî Mûşa şewitî diketim navî bi genim e oy oy ax
De dibê têlxirafekî ji bavê Koroxlî re vê sibê û hatî wez ê nizanim çima, ax
Perîşanê bi sê denga li Perîxanê dikir gazî
Digo, xwehekê pora serê min û te bi kur bê ay ay ax ax
De wekî roja bavê Koroxlî lê diqewimî
Ay li pêşiya siwarê Motka mîna serdarê Cengîz Xan disekine
Ax de bavo wey bavo wey bavo wey bavo oy oy oy oy oy ax ax

Kilama” Bavê Koroxlî” bi gelek guhertoyan ve tê gotin. Kilam ji aliyê çeşnê xwe ve kilameke mêrxasiyê ye. Di varyanta ku dengbêj Şakiro dibêje behsa mêrxasiya Bavê Koroxlî tê kirin û kilama wî bi navê “lo lo Riza” ye. Lê di versiyona ku Meyrem Xanê dibêje behsa kuştina Bavê Koroxlî tê kirin û hizna wî tê kişandin.

Ji bo vê yekê cureya kilamê zêmar e. Afirînerê kilamê kî ye, nayê zanîn. Lê belê dengbêj Peroya Têxût ku dengbêja Rıza Xêlid bû dibe ku ev kilam ji aliyê wê ve jî hatibe nivîsin. Ji ber ku afirînerên gelek zêmaran jin in. Neviyê Koroxlî Evdilbaqî Güven derbarê çîroka vê kilamê de van agahiyan dest nişan dike:

“Ev kilam li ser Bavê Koroxlî Rızayê Xêlid e. Du jinên wî hene. Yek ji wan Perîşanê ye û ya din jî Gulê ye. Perîşan diya Koroxlî ye û ji Qereyaziyê ye. Çar kurên Rıza hene. Koroxlî û Sidîq her du lawên Perîşanê ne. Xalis û Letîf jî yên Gulê ne. Piştî ku Alayên Hemîdiyê tê avakirin Riza di vê alayê de dibe serbaz. Piştî ku Meşrûtiyeta Duyem tê îlankirin êdî ev alay tê belavkirin. Rıza tê binçavkirin li Mûşê. Gel û piraniya filehan giliyê wî dikin. Wê demê hejmara filehan di dewleta Osmanî de nêzî 6 mîlyon bû. Nûnerê filehan patrîk tê Mûşê û diçe kontrola girtîgehê dike. Waliyê Mûşê ji Rıza re agahiyê dişîne û dibêje were pêşwaziya patrîk bike, dibe ku te efû bike. Rıza jî dibêje, dînê min ji ber dînê wî ranebûye ez jî xwe navêjim bextê wî. Kalikê me Rıza yekî pir dîndar bû. Dema patrîk tê Rıza qet ji cihê xwe ranabe û nigê xwe davêje ser hev. Ew bala patrîk dikişîne û patrîk ji yên derdora xwe re dibêje ev kî ye. Jê re dibêjin ew Rızayê meşhur ev e. Dema hêj Rıza di girtîgehê de ye gîzmeya wî dibin boyax dikin. Kesê ku gîzmeya wî boyax dike fileh e û jahrê dixe sola wî. Helbet ew bi emrê patrîk tê kuştin. Rıza yanê Bavê Koroxlî di 57 saliya xwe de di sala 1908an de wefat dike. Qebra wî jî li Muşê li hewşa mizgefta Eladîn Paşa ye. Lê îro bi betonê ser wê hatiye girtin (, 2018).

Di vê kilama Bavê Koroxlî de jî em rastî metaforan tên. Dengbêj bi metafora “Muşa Şewitî” dixwaze nîşan bide ku êdî Muş ji bo xizmên Rıza Xêlid ku bi jahrê tê kuştin bajarekî wêran e û bajarekî tije hizn e. Me li jor jî ji bo gotina mecazî ya “Çemê Bişêrîka Şewitî” heman tişt gotibû ku êdî ev bajar jiyîn li wan ne pêkan e. Çimkî ev bajar êdî bajarên hiznê ne.

Kilamên ku Meyrem Xanê bi deng xistine ji aliyê gotinên folklorîk ve pir dewlemend in. Motîva “Porkurkirin”ê ku me li jor bi berfirehî ravekirina wê kir divê kilamê de jî em dibînin. Êdî dengbêj ji devê Perîşanê ku jina Bavê Koroxlî ye kilama xwe

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

dibêje. Li vir hêjayî gotinê ye ku di vê kilama Ku Meyrem Xanê dibêje navê hin lehengên kilamê hatine guhertin. Mînak navê hevsera Bavê Koroxlî ya din li gorî rasteqîna çîrokê ne Perîxan e, Gulê ye. Perîşanê êdî davêje ser hevserê xwe Rıza Xêlid. Ji bo vê yeke çeşnê vê kilamê zêmar e. Porkurkirin di kevneşopên miletê kurd de her çiqas ne weke berê ewqas zêde be jî hê jî li dûv miriyan por tê birîn. Ev tegver nîşana êşa dilê xizmên mirî ne.

Di kilamê de hem pesnê mêrxasiya Bavê Koroxlî û hem jî teswîra bejn û bala wî hatiye kirin. Ango di vira de ew kesa ku ev kilam avêtiye ser Bavê Koroxlî gelekî bi hizn e û dibêje heyf û xebînet e ku yekî mîna Bavê Koroxlî bi awayî hatiye kuştin. Yanê hemû tiştên bavê Koroxlî tîne bîra xwe û êşa xwe teze dike.

Gotina “ay bavo” di zêmaran de gelek derbas dibe. Perîşanê ku hevsera Rıza Xêlid e bi vê gotina “ay bavo” xembariya xwe û kesera dilê xwe radixîne ber çavan. Di heman demê de tenêtiya xwe jî tîne zimên. Çimkî Bavê Koroxlî ji bo wan hem bav bû hem axa bû û hem jî serdar bû.

ENCAM:

Derbarê hunermenda kurd Meyrem Xanê de her çiqas çavkaniyên berfireh tune bin an jî kêm bin, ji kilamên wê yên li ber destên me em xwe digihînin hin zanyariyan. Ji ber ku ev xebat ji jiyana wê zêdetir derbarê naveroka kilamên wê de ne, ji naveroka kilamên wê jî em xwe digihînin temaya hiznê.

Di vê xebatê de li ser her sê kilamên Meyrem Xanê yên bi navê “Mihemedo Ronî, Çemê Bişêrîka Şewitî û Bavê Koroxlî” hatiye rawestîn. Piştî ku analîza van kilaman hat kirin em gihîştin wê hizrê ku hunermend Meyrem Xan hem bi deng û awaza xwe hem bi giyanê xwe dilşewat e. Sedem ev e ku Meyrem Xan di seranserê jiyana xwe de rastî gelek qewimînên kambax hatiye.

Ji bo vê yekê jî kilamên ku ji xwe re hilbijartiye piraniya wan hiznê dide mirovan. Ji xwe Meyrem Xan hizna xwe ya bi salan di kilamên xwe de raxistiye ber çavan. Kilamên Bavê Koroxlî û ya Emînê Perîxanê her çiqas di bingeha xwe de kilamên mêrxasî û şer û şûr bin jî varyanta ku Meyrem Xanê ji xwe re hilbijartiye bêtir weke zêmarekê derdike pêşiya me.

Lewre, di kilama Emînê Perîxanê de ji mêrxasiya wî zêdetir evîna keça koçer derdikeve pêş. Di vê kilamê de ku li jor jî hat behskirin keça mihacir avêtiye ser evîna xwe ya platonîk ku haya Emînê Ehmed tu carî jê çênebûye.

Em dikarin kilama “Bavê Koroxlî” jî weke zêmarekê binirxînin. Di kilamê de behsa kuştina Bavê Koroxlî tê kirin. Di heman demê de behsa mêrxasiya wî jî tê kirin. Ji xwe di zêmaran de gava yek wefat dike behsa hemû taybetmendiyên wî, bejn û bala wî tê kirin, ango pesnê wî tê dayîn. Meyrem Xan ji ber ku ew jî bi malbata xwe ve koçber bûne di gelek kilamên wê de motîva “koçberî”yê jî derdikeve pêş.

Di hûnandina çîrokên kilamên Meyrem Xanê de li gorî ku me analîz kir hin gotin ji bo xweş lihevanînekê hatine bikaranîn. Lewre, di kompozisyona kilamê de tu nikarî tu wateyê bide van gotinan. Weke ku ew gotin tenê ji bo xweş lihevanînekê hatine bikaranîn.

Derbarê jiyana Meyrem Xanê de tê dîtin ku gelek pêzanînên li ser jiyana wê hêj mijara nîqaşê ne. Ev jî tê vê wateyê ku pêdivî bi lêkolînên berfireh hene. Lê, çawa be

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

jî li gorî çavkaniyên ku heta niha hatine kirin em dîsa jî xwe digihînên hin zanyariyên rasteqîn.

Mesela, li ser cihê ji dayikbûna wê hema hema hemû çavkanî gundê Dêrgulê (Şirnex) nîşan didin. Mihemed Arîf Cizîrî, Nesrîn Şêrwan ku hevalên Meyrem Xanê yên herî nêz in derbarê cihê ji dayikbûna wê gundê Dergûlê amaje dikin. Lê em dikarin vê jî bêjin ku ji devoka Meyrem Xanê xuyaye ku ew teqez ji herêma Botan e.

Meyrem Xan, her çiqas di temenekî ciwan de jiyana xwe ji dest dabe jî , li dû xwe kaniyeke kilaman hişt. Îro gelek stranbêjên jin di şopa wê de dimeşin, kilamên wê bi deng dixin. Lê, ew keda ku Meyrem Xanê ji bo çand û kelepora gelê xwe daye ku bi sedan kilam berhevkiriye, mixabin wê ewqas girîngî nedîtiye ku heta îro hêj xebateke berfireh li ser wê nehatiye kirin. Evdalê Zeynikê, Şakiro, Ferzê, Reso Eyşe Şan çawa ku em dikarin ji bo wan bêjin otorîteyên mûzîka kurdî ne di heman demê de Meyrem Xan jî

ÇAVKANÎ:

1. Çavkaniyên Nivîskî

Yaş, Z. (2015). *Şakarên Muzîka Kurdî*. Amed: Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê.

Xoşnaw, C. M. & Hesen, C. C. (2006). *Meryem Xan*. Hewlêr: Enstîtuyê Kelepûrî Kurdistan.

Nado, K. (2011). Awaza Xerîbî, Tenêtî, Huzn û Kederê Meyrem Xan. *Pêngav*, hej. 6, 5-12.

Çiftçi, T. (2014). *Kilam û Jin*, Stenbol: Weşanxaneya Nûbihar.

Alakom, R. (2009). *Di Folklora Kurdî de Serdestiyeke Jinan*. Stenbol: Avesta.

Şeriati, A. (1998). *Her Hicret Bir İnkılaptır*. İstanbul: İhtar Yayıncılık.

Yıldız, A & Taşkın, H. (2018). *Şakiro, Kewê Ribat*. Stenbol: Nûbihar

Dereşî, S. (1998). Stirana Miryemxanê “Were Domam”. *Huner*, hej. 1, 62-64

Meretowar, A. (2017). *Huseynê Farê (Jiyan û Kilam)*. İstanbul: Wardoz.

Beğik, M. (2018). *Reso Şahê Dengbêjan*. Stenbol: Nûbihar.

Oremar, K. (2004). 100 Saliya Ji Dayikbûna Meryem Xanê Pîroz be, *Hîwa*, hej. 111, 8-9

Arslan, M. (2004). Hüznün Sesi: Meryem Xan, *Gündem Kadın.*

2. Çavkaniyên Elektronîk

http://gazetekarinca.com/2017/08/ulkesini-ruhunda-askini-sesinde-tasidi-meryem-xan/ Ülkesini ruhunda, aşkını sesinde taşıdı: Meryem Xan 18.08.2018

http://rewanbej.net/meryem-xan-pesenga-karwane-sitranbejiya-jina-kurd-kaksar-oremar.html Meryem Xan Pêşenga Karwanê Sitranbêjiya Jina Kurd,18.08.2018

http://rewanbej.net/serkesa-jinen-stranbej-li-kurdistane-hunermend-meryem-xan.html Serkêşa Jinên Stranbêj li Kurdistanê, 18.08.2018

https://ekmekvegul.net/sectiklerimiz/gunun-kadini-meryem-xan, Günün Kadını: Meryem Xan, 19.08.2018

https://mehmetayaz.blogspot.com/2010/03/meyremxan-kimdir.html , Müzisyen Meryem Xan Kimdir? , 30.08.2018

http://www.batmansonsoz.net/haber/11314/emin-perixan-nin-hayati, Emînê Perîxanê’nin Hayatı 30.11.2018

3. Çavkaniyên Zindî

Salihê Qubînî, (2018). *Hevpeyvîn*. Êlih.

Dûrsin Dêrgul, (2018). *Hevpeyvîn*. Şirnex.

Evdilbaqî Güven, (2018). Hevpeyvîn. Şirnex

MERYEM XAN VE ÜÇ ESERİNDE HÜZÜN TEMASI
(MIHEMEDO RONÎ, ÇEMÊ BIŞÊRÎKA ŞEWITÎ, BAVÊ KOROXLÎ)

ÖZET:

Toplumsal hafızanın aktarıcıları olan dengbêjler, toplumun duygu ve düşüncelerini, yaşanmışlıklarını, sevinç ve üzüntülerini müzikal olarak bir kuşaktan diğer kuşağa aktarmışlar ve bu sebeple yeni kuşak kendi kültür hazinelerinden haberdar olmuş. Bunun için dengêjler toplum içinde her zaman değer sahibi olmuşlar ve çoğu zaman topluma öncülük etmişler. Meryem Xan da eserleriyle kendi toplumuna öncülük eden degbêjlerden biridir. Bunun için bu çalışmada özellikle Meryem Xan'ın üç eseri (Mihemedo Ronî, Çemê Bişêrîka Şewitî, Bavê Koroxlî) üzerinde durulmuştur. Bu vesileyle Meryem Xan eserlerinde hangî konu ve tema üzerinde durulmuş, iyi bir şekilde anlaşılacaktır. Bu çalışmayla Meryem Xan birçok yönüyle tanıtılmış olacak. Bu çalışmada Meryem Xan'ın bu üç eseri hüzün teması çerçevesinde analîz edilmiştir. Çalışma giriş, iki bölüm ve sonuç kısmından oluşmaktadır. Girişte çalışmanın konusu, amacı, sorunları, metod ve sınırları açıklanmıştır. Çalışmanın birinci bölümü Dengbêj Meryem Xan'ın hayat hikâyesi üzerinedir. Meryem Xan nasıl bir hayat yaşamış, hayatı boyunca ne gibi olaylarla karşılaştığı, ele alınmıştır. İkinci bölümde, Meryem Xan'ın eserleri hüzün teması çerçevesinde analiz edilmiştir.

Anahtar kelimeler: *Meyrem Xan, müzik, şarkı, hayathikayesi, hüzün, dengbêjî*

THE THEME OF SADNESS IN MERYEM XAN AND HER THREE WORKS (MIHEMEDO RONÎ, ÇEMÊ BIŞÊRÎKA ŞEWITÎ, BAVÊ KOROXLÎ)

ABSTRACT:

Dengbêjs, which are the conveyors of social memory, have musically transferred the feelings and thoughts, experiences, joys and sorrows of the society from one generation to the next, and therefore the new generation has become aware of its cultural treasures. For this reason, dengbêjs have always had value in society and often led society. Meryem Xan is one of the degbêjs who pioneered her community with her works. For this reason, three works by Meryem Xan (Mihemedo Ronî, Çemê Bishêrîka Şewitî, Bavê Koroxlî) were emphasized in this study. On this occasion, the subject matter and theme of Meryem Xan's works will be well understood. With this work, Meryem Xan will be introduced in many ways. In this study, these three works of Meryem Xan were analîzed within the framework of the theme of sadness. The study consists of input, two sections and the resulting part. The subject, purpose, problems, methods and limits of the study are explained in the introduction. The first part of the study is based on the life story of Dengbêj Meryem Xan. What kind of life Meryem Xan lived, what events she encountered throughout her life, is discussed. In the second chapter, the works of Meryem Xan are analyzed within the framework of the theme of sadness.

Keywords: *Meyrem Xan, Music, Song, Life Story, Sadness, Dengbêjî.*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

LÊKOLÎNEK LI ÇÎROKA FOLKLORA KURDÎ

Zeynelabidin Zinar
Weşanxaneya Kurdî – Stockholm Bromma/ Stockholm SVERIGE

PUXTE:

DI FOLKLORA KURDÎ DE GIRINGIYA ÇÎROKÊ:

Beşa mezin ji Ebebiyata Kurdî, Folklora Kurdî ye. Di folklorê de şaxê herî dewlemend çîrok e, lê piraniya wê dewlemendiyê bi devkî tê gotin.

Dema kesek an saziyek bixwaze ku miletekî, neteweyekî rind binase, divê pêşî çîrokên folklora çanda wî miletî bixwîne û lêkolîn lê bike. Bi wê yekê, du tişt derdikevin holê:

. Rewşa jiyana miletê xwediyê çîrokê
. Dewlemendî û lawaztiya çanda xwediyê çîrokê

Dewlemendiya Çîroka Kurdî, bi van sê mînakan diyar bûye:

. Di Çîroka Abidê Şkeftê de, sê dinya hene û her yek bi tewrekî cuda ye.
. Heft şaxên Çîroka Gul û Sînem hene, her yekê şax û perên xwe cuda ne.
. Di Bingeha Çîroka Kurdî de, 133 tiştên ji hev cuda hene ku bi lêkolîna 12 salan derketine holê.

DEWLEMENDIYA ÇÎROKA FOLKLORA KURDÎ:

. Di Çanda Kurdî de, beşa folklorê pir dewlemend e. Di nava foklorê de jî hunereke mezin di şaxê çîrokê de heye. Çi ji aliyê rewşa jiyanê ve bit, çi jî ji aliyê dewlemendiya Çanda Kurdî ve bit, saziyên zanistiyê lê şaş mane.
Ji ber ku Çîroka Kurdî li ser gelek tewrên babetcihê hatine honandin, di bingeha xwe de tewr û awayên cihêreng afirandine û sê parzemînên dinyayê (Asya, Ewrûpa û Efrîqa) xistine bingeha xwe.

Peyvên Serekî: *Çîrok, çîrvanok, lêkolîn, pencinar, wikipedia, zinar*

Bêguman her civatek, her neteweyek, her kesek kêm-zêde xwedanê çandekê ye. Ji ber ku çand zagona jiyanê ye, nexwe jiyana mirovan bê hebûna çandekê nayê domandin. Folklor jî, beşek ji wê çandê ye.

Folklor bi giştî ji van tiştan re tê gotin:

Vêjeya devkî, kevneşopîyên heyî, tewr û hawayên jiyanê, urf û edet, baweriyên cuda, leyztikên cuda, şêniyên wek muzîkê, stran, helbest û ayînên olî ku li welatekî di nava aleciyên wî welatî de têne bikaranîn.

Peyva FOLKLORê, di 1846an de ji aliyê lêkolînerê Îngilîz William Thomsî (1803-1885) ve hatiye bikaranîn. Piştre li nava neteweyên Arî belavbûye.

Wateya FOLKê xelk e, ya LORê jî zanistiya xelkê ye.

Bêguman çi dema yek bixwaze ku zimanekî, çandekê û toreyekê rind nas bike, berî her tiştî divê ku ew pêşî çîrokên folklora wê çandê bixwîne. Ji xwendinê zêdetir,

Zakho Centre
for Kurdish Studies

lêkolîn li folklora wî miletî jî bike. Ji lêkolînê jî zêdetir, divê ku çîrokên wê yên pirtexlît bixwîne û şiroveya wan bike.

Lewra bi xwendina çîrokên folklorî, mirov rind civata xwediyê wê folklorê dinase û tê digîje ka ew ziman û ew çand, ji aliyê lawaztî û dewlemendiya xwe ve di çi radeyê de ne û nirxê wan jî heta kîjan deverê ye.

Bêguman ev hawe, bi taybetî ji bo rewşenbîrên Kurd pir girîng e ku ew naveroka berhemên Folklora Kurdî bizanibin. Piştî pêzanîna wan, êdî ji wan re pir hêsan dibe ku ew xwezaya welatê Kurdan binasin û Toreya Neteweyê Kurd jî bizanibin. Herweha ew bi hêsanî dikarin rengê Civata Kurd jî şirove bikin û hem psîkolojiya wan, hem jî rewşa jiyana çînayetî fêm bikin.

Sal 1984, ez jî bi wê bîr û baweriyê ketim rê û min duzadeh sal lêkolîn tenê li ser Folklora Kurdî ya bi devoka kurancî kir. Bi wê yekê ez li gelek tiştên ecêb rast hatim û min bi hêsanî pirtexlîtiya Neteweyê Kurd fêm kir. Herweha min dît ku naveroka hin çêrokên Folklora Kurdî, di Folklora Yûnaniyan de û di ya hin welatên Ewrûpayê de jî heye.

Lê belê min di lêkolîna xwe de, tenê ew tiştên di nava xelkê de ku bi devan têne gotin berhev kirin, weke: Gotinên Pêşiyan, Kilam û Stiran, Bacî û Lawik, Meselok, Pêkenok, Leqemok, Lawij, Xweşbêje, Mamik, Şîret û Nesîhet, Serpêhatî, Çîrok û Çîrvanok. Lê ew tiştên wek kelûpelên jiyanê, çendî ku beşek ji folklorê ne jî, li derveyê lêkolîna min mane.

Di lêkolîna 12 salan de, 1.710 perçeyên folklorî berdest bûne û di demên cuda cuda de, bi 10 cild pirtûk û bi navê XWENÇEyê hatine weşandin.

Di nava berhemên Folklora Kurdî de, tiştên herî xweş, vêjeyî û bi nirx, çîro û çîrvanok in.

Hin çîrokên Folklora Kurdî hene ku pir dirêj in û hinek jî pir kurt in. Wek mînak: Çîroka ABIDÊ ŞKEFTÊ, tê de sê dinyayên ji hev cuda û naverokên pirtexlît hene. Hin çîrok jî hene ku tenê li ser rawila (fabl) hatine gotin, wek mînak: Çîroka Hecî Rovî û ya Mele Rovî. Meriv pir tişt ji xwendina çîrokên wisa fêr dibe.

Çîroka GUL Û SÎNEM jî, pir navdar e û heft şaxên wê yên cuda hene. Mîrze Mihemedê lehengê çîrokê, heft car çûye Çînûmaçînê (Manchurya) û bi Sînem Paşayî re xeberdaye û serêhatiya wî û Gulêya keçmama wî, ji devê wî wergirtiye.

Çîrokên Folklora Kurdî li ser gelek tewrên babetcihê hatine honandin û di bingeha xwe de tewr û awayên cihêreng henne. Bi afirandikene wisa geş û xweş ku mirov nikare salixê wan bi dev û pênûsê eşekere bike. Tenê eger mirov saline dirêj li ser wan lêkolîn bike, hingê mirov hinekî tê digîje ku xeml û rewşa çîrokan çiqas zêde ye.

Bêguman çîrok, adana giyana çandê ye; xweşî û şênîtîya çandeyî di radeya pêşî de vegirtiye û mezetiyeke zêde bi mirovan dide tahmijandin.

Xwendina çîrokên wisa, têbînî û tîjîfemtiya mirovan bê sînor dike û zanîna mirovan derdixîne sawiyeke bilindtirîn ku tîrêjên hicirkên mixê mirovan ber bi asoyeke bê dawîn ve difiştiqine û wan rewantir dike ku pê gelek taristanên di mejîyê mirovan de ruhnî û geş dibin.

Ev cûre çîrokên wisa yên çelebxweş, hîç nahêlin ku xwendevan dev ji xwendina wan berde û her tim ew xwe di nava dilê vîna mirovan de dihêwirînin.

Di çîrokên Folklorî de tewr û awayên jiyana neteweyî cih girtine. Herweha jiyana çînayetî û perwerdekirina mirovan jî tê de xweş eşkere bûne. Di çîrokan de aliyên

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

girantir zêde ev in: Balkêşî, fentezî, têkiliya kulturî, naskirina xwezayê, xweparastina li pêşberê belayan, xwenasîya nijadî, baweriya bi xwe, heskirina ji zimanê xwe û gwd...

Di çîrokên folklorî de tiştên pir hêja hene ku mirov dikare ji wan, bo xwe mîna sey (ders) tiştên hêja werbigire û pê demepêşa xwe sererast bike, zêdetir li ser wan birame û bi wan çîrokan çêyî, xirabî û mirovatiyê derxîne holê. Herweha çîrok tiştên weke şîret, xweşbêjî û qewîtîne dilovan jî didine mirov.

Çîroka Folklorî di çanda hemû neteweyan de cihekî pir girîng girtine û neşeya jiyana çandê, xweştir û şêntir kirine. Lê çandeke bê çîrok, yan çandeke çîrokqels, mînaye xwarineke rijî û giranbihatiya xwe nadêrîne.

Bêguman çandeke ku çîrokên wê hem ji aliyê naverokê ve, hem ji aliyê bêje û daçekan ve ku ne dewlemend be, giranbihatiya wê çandê jî kêm e û ew çand nikare li pêşber zordestiya çandên cîranên xwe, xwe biparêze û di pêvajoya demê de hêdî hêdî dirûxe û demek tê ku bi temamî ji holê wenda dibe.

Lê spas ji Yezdanê Dilovan re ku ev e bi sedê salan e, Çanda Kurdî çendî ku bindest e jî, herwekî ew xwedanê desthelatiyeke siyasi be, xwe heta îro jî parastiye.

Berhevkirina berhemên Folklora Kurdî, çendî ku di salên 1990î de pir zor û zehmet bû jî, lê belê Xwedayê mezin derfet û fersend da û min ew proje gehand dawiyê.

Ez li virê, dubare ji bo dewleta Swêdê ku ji bo çapkirin hinek pirtûkan alîkariya aborî daye min, spasiyên xwe pêşkêş dikim.

NEXŞEYA ÇÎROKA KURDÎ

Pêşî divê hine behsa Nexşeya Çîroka Kurdî bête kirin:

Li gor belge û materyalên ku niha di arşîva (pencînar) weşanxaneya me de hene, hemû eşkere dikin ku Çîroka Folklora Kurdî xwe li ser sê parzemînan vegirtiye. Bi taybetî jî têkiliyeke xurt di navbera Kurdistan û Çînê de daye çêkirin.

Diyar e ku Folklora Kurdî bi çîrok û çîrovanokên xwe pir dewlemend e, di çîrokan de gelek babetên cuda hene ku bi xwendina wan gelek tiştên ku bi hêsanî nayên zanîn, têne dîtin. Bi wê yekê, dinyayeke bê sînor li pêşberê mirovan vedike ku mirov di tarîstaneke bêkevî de li rewşen û ruhniya zanistiyê rast dibe. Piştre mirov nexşeyeke pir mezin li ser sê parzemînan ku Asya, Ewropa û Afrîka ye dibîne.

Li gor wan belge û materyalên Folklora Kurdî ku derketine holê, hertim Diyarbekir paytexta Çîrokên Folklorî bûye û girêdana xwe bi gelek welat û herêmêm cuda (dûr û nêz) re daye çêkirin.

Ew nexşeya di çîrokên folklorî de ku derketiye holê, weha ye:

Lehengên Çîrokên Folklora Kurdî hertim ji Diyarbekir ber bi aliyê Rojavayê ve çûne û xwe gehandine Stenbolê, ji wirê jî çûne Ewropa, li Spanyayê di tengava Cebelê Tariq de derbasê Efrîqayê bûne û di bakûrê Afrîkayê de li gelek welatan geriyane, piştre çûne heta xwe gehandine Misrê, careke din berê xwe dane berûberê deryayê û di qoziya Yemen û Ummanê de vegeriyane û di ser Çemê Dîcleyî re xwe gihandine Diyarbekirê.

Di vê gerguzariyê de hertim Diyarbekir navê xwe wek "Bajarê Şerqê" û navê Stenbolê jî wek "Bajarê Xerbê" dane xuyakirin. (Çîroka Abidê Şkeftê û serpêhatiya/çîroka Baba Ehmedê Wanî.)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Lehengên Çîrokên Folklora Kurdî ji aliyê başûrê Diyarbekirê ve, bi awayekî rojane xwe digehînin bajarê Helebê.

Lê Diyarbekir bi piranî bazirgantiya xwe bi Misr, Quds û Yemenê re jî domandiye. Ji ber hindê, gelek caran pêxwasên Diyarbekirê li zora xwe anîne ku çima pêxwasên Helebê ji wan zîrektir in, ha ji ber wê yekê şer û qirên di navabera wan de derketiye.

Riya ku ji Diyarbekirê diçe bajarê Şam, Quds û Misirê (Qahîre) jî, hertim riyeke sereke bûye û çûnûhatineke pir zêde çêbûye. Hin caran lehengên çîrokê çûne xwe gihandine welatê Hebeşiyanê jî.

Çûna ji Diyarbekirê heta Misrê, du rê hatine bikaranîn. Yek riya deryayê bûye, ya din jî riya bejê bûye. Lê belê destpêka riya deryayê ji Îskenderûnê yan bendereke din dest pê kiriye, ne diyar e. Ji vê riya ku li jorê hate gotin zêdetir, di çîrokan de têkiliya Diyarbekirê bi awayekî rojane bi Mûsil û Bexdadê re jî çêbûye. Ew têkilî hin caran xwe gihandiye hin welatên din jî.

Ji aliyê Bakûrê Diyarbekirê ve: Lehengên Çîrokên Folklora Kurdî ji aliyê bakûrê Diyarbekirê ve pir hindik ber bi bakûr ve çûne. Çûna wan tenê Ermenistan û welatê Gurciyan bûye. Ji van herdu welatan wêdetir, (Li gor baweriya min ya ji çîrokan) astengiyeke pir mezin hebûye ku ew jî Çiyayê Qaf e, ango çiyarêza Çiyayên Qefqasan. Lê belê lehengê çîrokê Mîrze Mihemed gelek caran Çiyayên Qaf jî derbas kiriye û çûye rihê Dêwê Mezin girtiye, perçiqandiye û evîndara xwe rizgar kiriye.

Ji aliyê Rojahelata Diyarbekirê ve: Lehengên Çîrokên Folklora Kurdî hertim ji Diyarbekirê ber bi aliyê Rojhelatê ve çûne. Ev çûnûhatin, pir zêde çêbûye û rê pir hêsan bûye, xasma jî çûna bajarên wek Hemedan, Esfehan, welatên wek Îran, Adarbêcan û Hindistan, ji wirê jî çûne xwe gihandine welatê Çîn û Maçînê (Manchuriya) û dîsa vegeriyae hatine Diyarbekirê.

Çewa ku tê zanîn, li pêş jî hatiye gotin ku çîrokeke folklorî bi navê GUL û SÎNEM heye. Di zaravayê kurmancî de 7 şaxên vê çîrokê hene. Çi dema çîrokbêjek berî ku dev bi çîroka Gul û Sînem bike, pêşî weha dibêje: Dibêjin heft şaxên vê çîrokê hene, lê ez tenê yekê dizanim û hêj dibêje.... Lehengê çîrokê Mîrze Mihemed çûye welatê Çînê û bi çavên xwe Sînem Beg û dotmama wî Gulê dîtiye û serpêhatiya wan ji devê Sînem bi xwe bihîztiye.

HEYÎNÊN BINGEHÎN

Bêguman di bingeha çîrok û stranên Folklora Kurdî de, hemû heyînên netewî hene. Tiştên wek şaxên dîrokî, rewşa civakî, têkiliya mirovan bi hevûdu re, têkiliya mirov û hemû texlîtên heywanan, desthelatiya mirovan li ser axa bavûkalan, têkiliya mirov bi cîranên din û biyaniyan re, rewşa bazirgantiyê, dewlemendiyên binerd û sererd û bi dehan tiştên wisa têne dîtin.

Di vê lêkolînê de tê dîtin ku *Çîroka Kurdî* çewa û li ser çi tiştan hatiye avakirin, bi çi rengî hatiye honandin û çewa lengerên xwe di nava bûyeran de daxistine tevgerê, bingeha wê li ser çi ye, ango li ser çi û çi tiştan ava bûye û rengvedana xwe bi çi tewrî saz kiriye.

Îcar piştî ku mirov bi vê yeka gotî pêzan û agahdar dibe, hingê pir hêsan dibe ku mirov hemû cûre çîrokên kurdî şirove bike û pîvan û kêşana wan derxîne holê. Piştre mirov bi hêsanî dikare rengê Civata Kurd binase û psîkolojiya civatê fêm bike. Ji ber

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

hindê, naveroka vê lêkolînê gelek balkêş e û pir jî girîng e ku mirov wê bixwîne û hertim jî lê bisêwire. Piştî xwendina vê lêkolînê, wê bala gelek rewşenbîrên Kurd têkeve ser van tiştên ku di bingeha *Çîroka Kurdî* de hene.

Deh cild pirtûka bi navê *Xwençe* (pencinar.se) tev berhemên Folklora Kurdî ya bi devoka kurmancî ne ku derketiye holê. Di serê sala 1985an de gava min *Projeya Xwençe*yê çêkiribû, min zemanê wê jî deh sal danîbû û min diyar kiribû ku wê di her salekê de cildek ji çapê derkeve. Lê ew kar 12 salan domand û deh cild pirtûk derketin holê.

Rûpelên her cildekê, ji 280 hetanî 300î A5 e. Niha ew her deh cild XWENÇE ketine hemêza mêjû û di nava refên Pirtûkxaneya Kurdistanê de, di hêlîna xwe ya folklora nîjadî de dihêwirin.

Ew tiştên folklorî yên ku di wan her deh cildên *Xwençe*yê de ne li pêşberî vê guttla Folklora Kurdî pir zêde û pir nayêne hesibandin, çewa ku mirovek çengek av ji Deryaya Okyanosê hilde, eynî wisa min jî mistek ji Folklora Kurdî hilye û di wan deh cildan de nivîsîye.

Di 1985an de gava min Projeya *Xwençe*yê hazir dikir ku wê deh cild ji Folklora Kurdî bêtin amadekirin û bi forma pirtûkê bêne çapkirin, ji min re pir zehmet dihate dîtin, bi rastî jî barekî pir giran bû. Lewra ne dirav di destên min de hebû ku ez karekî pê bidim kirin, li wî welatê biyanî ne derfeteke min hebû ku ez karibim bikim, ne min ziman dizanibû ku ez karibim rê û dirban zû nas bikim, herweha leşsaxiya min a ji ber îşkenceya 178 rojan jî ez teyîşandibûm. Lê ew gotina ku dibêjin *Kî çi bixwaze, Xwedê eyn wî tiştî didê*, ji bîra min nediçû û tengên min li vî karî dişidiyan, min hîç xwe sist nedikir û li kudandina wê berepêş diçûm.

Bêguman tiştê herî balkêş û ku ji mirovan re jî diyar e, herweha ku ji bîra min jî nediçû, ev e: Çaxê neteweyek dest ji toreya xwe, ji ziman, çand û rêveçûna xwe ya nijadî berdide, zû dihele û dibe êmê hovên biyanî, weke yên dagirkerên Kurdistanê.

Berî ku ez têkevim behsa *Bingeha Çîroka Kurdî*, divêm ku xwendevan ageh ji naveroka her deh cildên *Xwençe*yê hebin.

Navên wan 1.710 sernavên ku hene, bi kurtî ev in:

01- Gotinên Pêşiyan: 697
02- Kilam û Stiran: 340
03- Meselok: 179
04- Pêkenok: 33
05- Lawij:.. 1
06- Şroveya Gotinên Pêşiyan: 22
07- Xweşbêje: 45
08- Mamik: 11
09- Şîret û Nesîhet: 7
10- Serpêhatî: 5
11- Çîrokên Rawilan (fabil): 40
12- Çîrokên Têkel: 262
13- Çîrokên Dirêj: 68
GIŞT: 1.710

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Çewa ku li jorî jî hatiye gotin, di Folkora Kurdî de du cûre çîrok hene: Yek bi navê *çîrok* e, ya din jî *çîrvanok* e. Ev herdu babet jî, hevpişkên hevûdu ne. Lê di navbera wan de ev cudatî heye:

a) ***Çîrok:***

Hin rastiyên xwepêgir hene ku ew tişt wek bûyer rûdane û siqûmatine mezin bi serê hin kesan ve hatine. Piştre ew di nava xelkê de wek çîrok hatine gotin. Lê di wan gotinan de navên wan kesan pir kêm diyar bûye, navê cihê ku bûyer lê rûdane û zemanê bûyeran jî zêde kifş nebûne. Tenê hin caran behsa navên hin paşe, siltan û qiralan hatiye kirin. Îcar bi wê yekê mirov kêm-zêde guman dike ku ew bûyer di çi zemanî de rûdane. Ha gotina wan serpêhatiyên wisa pirî ku li nava xelkê geriyane û hatine gotin, di pêvajoya demê de bûne malê xelkê û cihê xwe di gulîstana folklora neteweyê xwe de bi navê *çîrok* vegirtine.

Çîrokên Folklorî bi rewşa naveroka xwe, kurt û dirêj hene. Hin ji wan dirêj in, weke çîroka *Abidê Şikeftê* û hinek jî kurt in. Heta hinek ji wan hene ku çend hevok in wek çîroka *Ker û Kundir* ku ji sê-çar hevokan pêk hatiye. Temamiya çîrok ev e: *Hebû kerek û hebû kundirek. Kerê kundir kot û kot. Çîroka min jî ev bû ku min got.*

b) ***Çîrvanok:***

Li hin herêmên Kurdistanê ji *Çîrvanok*ê re *Xebroşk, Çîvanok* û *Çîrçîrok* jî têne gotin.

Ev babet naverok, pir dirêj in û bi gotina di çend şevan de jî naqedin. Bi nivîskî jî gelek rûpelan dadigirin û hinek ji wan dikarin mîna pirtûkeke mezin jî wisa dirêj derkevin holê.

Di *Çîrvanok*an de hin xeyal û fentezîyên derdemî hene ku ne aqil wan tiştan dipejirîne û ne jî mikun e ku mirov karibin wan tiştan bi hêz û biriya xwe bikin. Ji ber hindê sînor ji *Çîrvanok*ê re tune, ew serbest in û çewan jê re xweş hatiye, her wisa jî xwe berfireh kirine.

Bi gotineke din, mirov dikare bêje ku *Çîrvanok* ji tiştên xeyalî û fentezî û aqilderî pêk hatine. Di wan de peyvikên wisa bi hiner û balkêş hene ku ji kirasê xwe yê vêjeyî derketine der. Gava mirov çîrvanokan dixwîne, pirî ku xwedina wan li mirov xweş tê, mirov naxwaze dev ji wan berde.

Mesela: Çîroka bi navê *Caw Cawê Te Ye,* mînaka vê yekê xweş diyar kiriye ku lemeke kurdiran bi tûrrên xwe herêmeke pir mezin vegirtiye. Çîrokeke din jî ev e: Bajarekî pir mezin di nava zebeşekî de hatiye avakirin ku tê de bi sedhezaran avayî hene, sûk û çarşî, bazirgan û dikan û gwd. di navê de rêz bûne...

Ew 133 babetên ku hene, xwe bi tewrekî pir xweş di piraniya Çîrokên Folklora Kurdî de dane nîşandan û xwendina çîrokan xweş û rewantir kirine.

Ew hemî tiştên ku li jorê hatine gotin, di hin çîrokan de li hevûdu kirine û xwe bi êkdu ve girêdane. Lê di hin çîrokan de dijberiya hev kirine, xwe ji êkdu vekişandine û riya xwe ji hevûdu averê kirine.

Îcar ew tişt bi rêza reqeman, herweha bi nêzîkbûna naveroka wan a bi hevûdu re hatine bicihkirin, û dilqa wan a di çîrokê de bi kurtî pêşkêşê xwendevanên hêja dibin:

Çewa ku hatie gotin, di *Çîroka Folklora Kurdî* de bi sedan tiştên bingehîn ên balkêş hene. Lê tiştên hatine peyitandine, wek jimar ev **133** tiştên li jrê ne:

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

NAVEROK

01- Dunya/22
02- Çiyayê Qaf/24
03- Behra Qetranê/24
04- Çem û Kanî/25

*

05- Dewlet/26
06- Aqar/27
07- Qiral û Paşa/27
08- Zîndan/28
09- Xwarin û Vexwarin/29
10- Wergirtin/30
11- Leyztik/31
12- Soz û Bext/31
13- Devê Bîrê/32
14- Dizî/32
15- Parastin/33
16- Xwendin/33
17- Serdestiya Jinê/34
18- Wezîr/35
19- Keçelok/36
20- Baxçe/37
21- Teyrê Dewletê/37
22- Bajarê Şerqê û Bajarê Xerbê/38
23- Bajarê Binê Erdê/38
24- Xan/39
25- Karwan/40
26- Bazirganî/42
27- Talan/43
28- Mazat û Bazar/44
29- Delêlî/45
30- Kole/45
31- Cariye/46
32- Qewad/47
33- Noker-Sîxur/48
34- Xopan/49
35- Axe, Beg û Mîr/49
36- Rîspî/50

*

37- Zewac/51
38- Şertên Zewicandinê/52
39- Şivantî/53
40- Bêrî û Bêrîvan/55
41- Xatûn û Qerwaş/56
42- Gavantî/57

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

43- Riya Çûn û Nehatinê/57
44- Nexweşiya Qîzan/58
45- Fîncana Jehrê/59
46- Kevirê Sebrê/60
47- Kevirê Miradan/60
48- Ziyaret/61
49- Şêtbûn/62
50- Mizgîn/63
51- Keça zengîn û xortê feqîr/64
52- Hêwî-Jinbav/65
53- Keça Hêwiyê/66
54- Dawet/66
55- Heft/67
56- Çil/68
*
57- Leheng/69
58- Xurcezîn/70
59- Mişk/70
60- Sonda Bi Erd û Asîman/70
61- Gustîl/71
62- Keçeke pir delal/72
63- Keça Dêwê/72
64- Keça Hêkê/74
65- Sê bira/74
66- Sê Xwişk/75
67- Çavreşî-Çavnebarî/76
*
68- Nêçîr/77
69- Şikeft/78
70- Efrît/79
71- Kose/79
72- Cin/79
73- Perî/80
74- Dêw/80
75- Qesr-koçk/82
76- Rihê Dêw/82
77- Pîrelk-Pîrhevok/83
78- Gurê Manco/83
*
79- Xizanî/84
80- Xizne û Gencîne/84
*
81- Pîrejin/84
82- Kalê Rihdirêj/85
83- Pîra Xwînxur/86

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

*
84- Mêrê Şevê/86
85- Xewn/86
86- Reml-Fal/87
87- Ava Şîfayê/88
88- Ava Reş û Ava Sipî/88
89- Hingiv/89
*
90- Zilamê Kurdûnde/89
91- Dermanê Zarûkanînê/90
92- Çêbûna Zarûkan/91
*
93- Şûr/91
94- Gurz/91
95- Rim/92
96- Tîr û Kevan/93
97- Hesp/93
98- Paytûn/94
99- Teyrê ji bo siwarbûnê/94
100- Beran/95
101- Zîya-Mar/96
102- Şêr/97
103- Gur/97
104- Rovî/99
105- Hirç/99
106- Paşayê Maran/100
107- Masî/101
108- Cot/103
109- Gamasî-Hût/103
110- Pisîk/103
111- Dîk/104
112- Kew/105
113- Dawudok/105
*
114- Nexweşî/106
115- Hekîm/107
116- Derman/108
117- Alîkarî/108
118- Xwezîtî/108
*
119- Derew/109
120 - Şêwra Roviyan/110
121- Hejîr/111
122- Caw/112
123- Çortan/112

هەوالنامەی کتێب
Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

124- Qapan/112
*
125- Şîrê Teyran/113
126- Beravêtina Mirîşkê/114
127- Zana Hêstirê/114
128- Hêka Mehînê/114
129- Zarûka Çîrokê/115
*
130- Bawerî/115
131- Qencî û Xirabî/116
132- Zîpika Hesinî/116
133- Mirin/116
*

Şroveya Wan 133 Tiştan:

01- **Dunya:** Yan jî dinya, di hin çîrokên kurdî de, sê dunyayên ku jiyan li wan heye û mirov lê dijîn hene. Lê bi piranî du heb dunya hene. Lehengê Çîroka Kurdî yekcaran ji vê dinyaya ku em lê dijîn derdikeve û diçe wê dunyaya din, li wirê dibe mêvanê paşe yan qiralê wê dinyayê.

Ew dunyaya din jî, kêm-zêde mînaye vê dunyaya ku em lê dijîn, çendî ku xirabî û nepakî li wirê jî çêdibin, lê hindik in. Îcar lehengê çîrokê gelek tiştên ku li vê dinyayê hene û li wê dinyayê nînin, bi xelkê wê dunyayê dide zanîn û wan fêrê tiştên ku li vê dunyayê hene dike. Di hin çîrokan de, sê dinya jî hene. Li wê dinyaya sisiyan xirabî çênabin, nepakî nînin û mirovên ku li wirê dijîn nizanin ku xirabî çiye; xisarê nadin heywanan, mirov û heywan di nava hevûdu de dijîn û kes ji kesî natirse.

Gûnê wê dinyaya sisiyan şîn e; ax, kevir, dar û ber tevek şîn in...

Îcar gava lehengê *Çîroka Kurdî* ku li pey amaca xwe ji vê dunyaya me diçe dunyaya diduyan û ji wir jî diçe dinyaya sisiyan, pêşî ew xelkê dunyaya sisiyan fêrî nêçîrê dike, fêrî girtina kew û kevokan dike, ji wan re şûr, tîr û kevanan çêdike. Piştre wan fêrî fêl û finazan dike û her ku diçe wan fêrî kuştina heywanên mezin û kirina xirabiya mirovan a bi hevûdu re dike.

02- **Çiyayê Qaf:** Di hin çîrokan de wisa tê xuyakirin ku ev dinyaya em lê dijîn rasteke dûz e û li hawîdorê wê rastê çiyarêzek heye ku navê wan bi giştî *Çiyayê Qaf* e. Pişta Çiyayê Qaf, ji vê dinyayê der e û jê nayête hesibandin. Ew herêm mîna ku dinyayeke din be û jiyaneke ji vir xweştin lê hebe tê zanîn.

Ez bawer dikim ku ev bawerî ji ola bisilmantiyê hatiye ketiye nava *Çîroka Kurdî*. Ji ber ku serpêhatiya Xocê Xizir û Ilyas Pêxember jî gelek tîna xwe li xelkê me kiriye.

03- **Behra Qetranê:** Di çîrokan de ji vê deryayê re *Behra Qîr û Zivtê* jî tê gotin. Vê deryayê xwe di *Bingeha Çîroka Kurdî* de rind daye nîşandan.

Qada wê weha ye: Seriyek bi aliyê Rojhilatê ve dikişe û seriyê din bi aliyê Rojavayî ve diçe. Berê wê jî ne pir fireh e, wisan berteng e ku mirov ji keviyekê keviya din dibîne. Hin caran pirek jî li serê heye û mirov di ser re dibihure. Lê nobetdarên li ser pirê şêr, piling û keftar in, ew nahêlin ku kes di ser re derbas bibe.

Ev derya hertim xwe di çîrokê de dixe navbera du dunyayên cuda, yan jî navbera du beşên dunyayê yên mezin û nahêle kes ji aliyekî derbasê aliyê din bibe.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Herweha kesê ku nêzê wê deryayê dibe, ew wan kaşê nava xwe dike, wan di xwe de asê dihêle û piştre jî difetisîne. Lê belê di çîrokan de gava leheng li deryayeke wisan rast tê û tê de asê dibe, piştre hêdî hêdî xwe jê difilitîne û li riya xwe didomîne. Lê pirê caran hespê lehengê çîrokê tê de asê dimîne û derxistina ji navê pir zehmet dibe.

Lehengê çîrokê li pey amaceke taybetî diçe, diçe ji aqarê xwe derdikeve yan diçe dikeve dinyayeke din, ha ku dibîne li *Behra Qetranê* rast tê. Lê pirê caran berî ku ew bigîje keviya deryayê, aqilmendek jê re behsa wê deryaya bi xeter dike û pê dide zanîn ku ew çewan bike dê nekeve nava qîr û zivtê. Yan jî leheng xewn dibîne ku dê çewan bike heta ku ji *Behra Qetranê* derbas bibe. Dema ku leheng kevî û kevî diçe, li wê pira ji textan çêkirî rast tê, bi hêsanî ew wan tebayên ku li serê ne, berteref dike û derbasê aliyê din dibe.

04- **Çem û Kanî:** Di xwezaya *Çîroka Kurdî* de gelek çem û kanî hene. Di çîrokan de dema ku danasîna xwezaya wê herêma ku bûyer lê hatiye holê tê kirin, bi piranî diyar dibe ku li du aliyan çiyarêz hene; di nava wan de geliyekî fireh ê dirêj heye, li kêlekan newal û dolî hene. Ji binê her hîmekî, tehtekî û zinarekî kaniyek fiştiqiye û ava hênik serejêr kişiyaye, li hawîdorên xwe rihan û giyayên pirtexlît hêşinandine. Ew av tevek berjêr çûne û gihane ser hevûdu, gelek ça û çemikên mezin anîne holê. Her ku ew berjê çûne, ew ça û çemik jî xwe gihandine ser hevûdu û çemine mezin, firatine boş afirandine. Di wan avan de masiyên curbicûr hene ku xelk û heywanên goştxwur debara xwe bi wan dikin.

*

05- **Dewlet:** Di piraniya çîrokên kurdî de dewletek heye ku serokê wê qiralek e yan paşayek e. Civateke wî serokî heye ku ji wezîr û kizîran pêk hatiye.

Du cûre wezîr hene: Wezîrê milê rastê û wezîrê milê çepê. Ew herdu wezîr hertim li cem serok in û serok gava bixwaze ku tiştekî bike, pêşî bi wezîrê xwe yê milê rastê piştre bi yê milê çepê dişêwire. Serok hin caran jî civata (encûmen) xwe kom dike û raya hemuyan distîne hêj biryara xwe ya dawîn dide.

Serok hin caran radibe wezîrekî yan du wezîran bi xwe re hildide, ew xwe kincguhartî dikin û diçin li nava xelkê digerin, rewşa jiyana xelkê bi çavan dibînin û şûnde vedigerin tên, li wê gorê tevdîr û ra distînin û zagonên xwe çêdikin.

06- **Aqar:** Di *Bingeha Çîroka Kurdî* de hertim gava ku dewletek hebe ku aqarê wê kifş e. Sînorên di navbera wê dewletê û dewletên din de jî bi qûçan hatine destnîşankirin. Li ser riya ku ji vî aqarî derdikeve û diçe dikeve nava aqarekî din, dîwarekî ku ji berên qirase hatiye lêkirin heye û deriyek ji pola jî li berê ye. Nobetdar li wir hene, bac û xerac distînin û hêj bazirgan û karwanan berdidin hundur, lê bac ji rêwiyan nayê stendin.

07- **Qiral û Paşa:** Di piraniya çîrokên kurdî de, eger desthelatiya dewletê hebe jî yan nebe jî, tê de qiralek an paşayek heye ku berpirsyarê her tiştî ye. Ew qiral an paşe, gelek caran bavê heft kuran e. Her tim jî kurê piçûk lehengê çîrokê ye û navê wî *Mîrze Mihemed* e.

Hin caran tenê kurekî wî heye û ew jî delaliyê malê ye. Yan jî ew tenê bavê qîzekê ye û ew qîz jî nexweş e, kût bûye û di nava livîna mirinê de dijî, nikare ji erdê rabe ser nigan.

Hin caran ew qiral an paşe kurdûnde ye; ne teled û ne jî weledên wî hene. Îcar ji bo ku jina wî zarûkekê bîne, ew ji bo peydakirina dermanekî radibe diçe li dinyayê digere. Di wê gerê de kalek xwe pê dide nîşandan û sêvekê dide wî, dibêje: *Qeştek tu dê*

Zakho Centre
for Kurdish Studies

bixwî û qeştek jî jina te bixwe. Piştî xwarina sêvê bi neh mehan, kurek dê ji we re çêbibe. Lê êdî ew kal bûye û di nêz de dimire, yan kurê xwe dibîne, yan jî kur piştbavî çêdibe.

Di *Toreya Kurdî* de ji kurên wisa re "piştbavî" tê gotin.

08- **Zîndan:** Çewa ku li nimra heftan jî hatiye gotin, di piraniya çîrokên kurdî de desthelatiya dewletê heye, di serokatiyê de qiralek an paşayek heye ku berpirsyarê her tiştî ye. Dadgeh û dadmendtî, hertişt di destên wî de ne. Wezîr, kizîr û berdevkên wî têkilî dana cezayê ku dide nabin. Çi kesên ku hewbe (sûc) dikin, ew wan ceza dike; yan serê wan dide jêkirin, yan jî wan davêje zîndanê û hin caran ew wan felat jî dike.

Şûna zîndana di *Çîroka Kurdî* de, li binê erdê ye. Devê zîndanê, mîna devê bîrekê teng e û binê wê fireh e, tarî ye û tîrêjên tavê jî nadin nava wê. Hertim binê zîndanê bi nêm e û her teref kamik girtiye, herweha ji zindaniyan zêdetir ew der wargeha kêzik û kurmik û bihokan e jî.

Xwarina ku didin zîndaniyan, di rojê de keriyek nanê tisî ye û kodikek ava germ e ku bi şerîdê bera ba wan didin, yan bi hawayekî din digehînin wan.

Felata girtiyan zû bi zû ji zîndanê tune. Eger hebe jî, tenê berdana wan bi destûr an lêborîn çêdibe. Lê hin caran qîza qirêl an ya paşe ger hiskiriyê wê di zîndanê de be, ew dikare bi hin riyan wî ji wir bide rewandin ku bavê wê pê jî nahise.

09- **Xwarin û Vexwarin:** Xwarin û Vexwarina qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de, ne ji ya xelkê ye. Xwarina wan taybetî ye. Lê sifra wan a ji bo mêvanan hertim sêdan raxistî ye. Ew sifre bi savar û goşt pir dewlemend e û navûdeng daye. Savara pehtî di sêniyên pir mezin de ye ku ji wan re lengerî jî tê gotin. Li ser savarê pariyên goştê berxan, ên beranan tije ye. Li dora her sêniyekê şeş hetanî deh kes mêvan dikarin geredor bibin û bixwin. Vexwarina pê re jî bi piranî dewê ji mastê miyan e, yan şerbeta dimsê û ya gezo ye.

Lê xwarina mêvanên taybetî, ne weke ya mêvanên ji rêzê ye; ji bo her mêvanekî wisa serê beranekî datînin ser sêniya savarê yan a birincê û li berê datînin.

Danîna seriyê beranan li ber mêvanan, toreyeke kurdî ya pir kevnare ye ku nîşana qedirgirtina zêde ye ji bo mêvanan. Ev hawe ta niha jî li hin herêmên Kurdistanê tê bikaranîn.

a) *Qehwe:* Vexwarina qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de, bi piranî qehwe ye; gimgimên qehwê şev û roj dagirtî ne û li ser êgir in. Peyayên ku qehwê çêdikin, taybetî ne û ew têkilê kirina karekî din nabin.
   Çi dema ku mêvanek hat li hundur rûnişt, pêşî qehwe jê re pêşkêş dibe û piştre hêj sifra xwarinê li ber wî tê rastkirin.
   Hin caran di sitiranên folklorî yên evînê de çi dema ku keçeke xuyaniyan gava pesnê bavê xwe ji xortê dilketiyê xwe re dide, dibêje ku *mij û dûmana qehwa bavê min weke ewrê biharê timî vegirtî ye.*
b) *Nêrgele:* Şivkêşiya qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de bi piranî nêrgele ye. Lê cigare û titûn bi qelûnê jî pir têne kişandin. Li dîwanê gelek makîneyên nêrgelê hene. Dema ku mêvanekî xuyanî tê, di serê pêşî de jê re qehwe, eger şivkêş be piştre jî nêrgele tê pêşkêşkirin û hêj sifra xwarinê li ber wî tê rastkirin.

10- **Wergirtin:** Wergirtina qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de, taybetî ye; li serê wan kolos heye, şal û şapikên kurdî yên taybetî li xwe dikin, gîzmeyeka çerm a saqdirêj lê bi

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

piranî rengsor di nigên wan de ye. Di paşiya gîzmê de hesinekî serkol bi pehniya wê ve bi qederê movikekê dirêj heye ku pê diniçînin kêleka hespê ku lê siwar in da zû here.

11- **Leyztik:** Leyztika qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de, bi piranî *tewle, setrenc, dam, nehberk, xar û kap* e. Ji van zêdetir jî hene, lê di çîrokan de zêdetir behsa vanên me gotî hatiye kirin.

12- **Soz û Bext:** *Kesê xwediyê sozê xwe be, bextê wî jî heye. Kesê bi bext be, xwediyê sozê xwe ye jî*. Ev yeka han di *Çîroka Kurdî* de pir xurt e. Dema lehengê çîrokê soz bide yekî yan yekê, bê guman e ku ew sozê xwe bi cih tîne. Dema ku leheng bext bide yekî yan yekê, tu carê ew pê re xayintî nake.

Li ser *Soz* û *Bext* gava mirov li toreya kurdî dinihêre û ew sazûmana eşîrtî ya kevnare jî ku tîne berçavan, herweha çewa ku min li pir herêmên Kurdistanê ku bi çavan jî dîtiye, dema ku yekî bigota *bi soz ez ê vî karî bikin* yan *nekim*, her kes dizanibû ku ew kes xwediyê sozê xwe ye. Herweha pir kes jî hebûn ku wek mirovê *bibext* di nava xelkê de hatibûne naskirin û kesî umîda ku ew dê xirabî bikin, nedikir.

Li ser vê yekê hin gotinên ku ta niha jî li nava xelkê digerin hene, wek: *Soz û bext û rext!* Weke: Yek ji yekî re dibêje: *Ka bêje bi sozê mêrê berê!* Li ser bêsoztiyê weha jî tê gotin: *Mêrên berê, siwar bûn li hespên berê, jinên berê avêtin pişt xwe û ji van deran çûn*.

13- **Devê Bîrê:** Ev bîra di Çîroka Kurdî de, ne ya avê ye û mirov tê re dikeve binê erdê. Di Çîroka Kurdî de gelek caran quleke girover a mîna devê bîrekê derdikeve pêşiya lehengê çîrokê. Gava lehengî li pey şopa kesên xirab diçe, dibîne ku wa ye ew xirab çûye ketiye wê bîrê. Lê gava leheng dikeve bîrê, dibîne ku di binê wê de avahîne pir mezin hene ku tê de li aliyekî xweşî û li aliyekî jî reşî heye. Lê belê bi piranî ew dever şûna xirabiyan e û şûna kirina tiştên kirêt e, herweha şûna veşartin û devera parastina kesên xirab e.

14- **Dizî:** Di nava qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de, pir dibe, yanî diziya wan tê kirin. Gelek caran xizneya dewletê tê valakirin û ew pê nahisin. Piştre gava ku pê dihisin, bi lêgerînê hin caran dizê xwe derdixin holê û hin caran jî dernaxin.

15- **Parastin:** Qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de, parastina welatê xwe rind dane kirin. Çewa ku li jorê jî behs hatiye kirin, li hawîdorê wî bajarê ku qiral an paşe lê rûdine ku ew der paytexta welêt e jî, dîwarekî bilind ê qalind heye ku jê re *beden* an *sûr, an jî kelek* tê gotin. Li ser dîwarê wê kozikên çavdêran hene ku nobetdar hertim tê de ne û hawîdor bereçav dikin.

Çi dema ku qiralek an paşayek diçe bi zora leşkerên xwe welatê yekî din vedigire, tenê wê devera asê dixe destên xwe, piştre îcar hemû herêmên welêt ji ber xwe ve dikevin destên wî. Yanî hewcedariya ku here bajar bi bajar vegire, namîne.

16- **Xwendin:** Qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de, giringîyeke pir mezin dane xwendinê. Wan gelek xwendinxane û xwendingeh ava kirine û zarûkan tê de dane xwendin, xwarina wan li wirê dane kirin û mûçe dane mamosteya.

17- **Serdestiya Jinê:** Eger serdestiya li ser qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de hebe, tenê jin e. Ew jin jî, jina wan bi xwe ye. Hin qiral û paşe hene ku zordestiyeke pir mezin ji jina xwe dibînin û newêrin ku deng jî bikin. Herweha jina wan hemû kar û divyanên xwe, bi navê dewletê bi wan dide kirin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Hin caran jî jineke ku qiral e, an paşe ye jî, ew jin zêdetir gelşê bo qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de derdixîne û li wan zordestî dike, bi wan re şer û qaleyên giran dide kirin û dibe sedem ku gelek war û avecî wêran dibin.

Serdestiya jinê, ne tenê di çîrokên kurdî yên mirovan de tê dîtin, herweha di çîrokên rawilan de jî tê dîtin. Li nimreya 95an, jina paşayê maran jî weke jina paşayê mirovan, zordestî dike û weha di behsa wê de hatiye gotin: ”Di şkeftê de, karbidestiya maran weke ya mirovan tê damezirandin; paşayekî maran heye, wezîrên wî hene, lê jina paşê dikare her tiştî bike û çu mar jî nikarin têkilî wê bibin...”

Ji sazûmana dewletiyê zêdetir, me bi xwe jî di sazûmana eşîrtiyê de bi çavan dîtiye ku di navbera salên 1960-70yî de, li gelek herêmên Kurdistanê jina Kurd gelekî serdestî û zordarî li malxweyê xwe, li zilamên din û kesên xuyanî kiriye, ew bêrûmet kirine û di nava xelkê de ew dane hetikandin. Heta hin jin hebûne ku gelek navûdeng jî dane heta hin hene ku zarûkên wan jî bi navên wan hatine naskirin. Weke Emînê Perîxanê ku serokê eşîra Reman bûye û Emê Gozê ku yek ji serokên eşîra Pencînaran bûye. Berî serokatiya Emînê Perîxanê, diya wî Perîxanê serokê eşîrê bûye û piştî mirina wê îcar kurê wê Emîn ketiye serokatiyê.

18- **Wezîr:** Wezîr, kizîr û berdevk ji bo hemû qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de hene. Wezîr hertim dido ne: Wezîrê milê rastê û wezîrê milê çepê. Wezîrê milê rastê gelekî ne zîrek, ne zana û ne şareza ye, lê ji aliyê hêza xwe ya xurtiyê ve, ji paşe û qiralê xwe ne pir kêm e. Ji ber vê yekê ew ji aliyê paşe û qiralê çîrokê ve jî pir tê jêhiskirin. Lê ew ne durust e, ne dilpak e û bi serokê xwe re xayînekî rengdost e. Hertim xirabîyan li ser navê paşe û qiralê xwe dide kirin, dike ku xelk ji wan bêzî bike û ew bi dizî bertîlan jî dixwe. Herweha ew van xirabiyên ku dike jî, nerasterê dixe situyê wezîrê milê çepê.

Lê wezîrê milê çepê, ne mîna ye wezîrê milê rastê. Ew mirovekî sergiran, helalxur û di nava xelkê de bi rûmet e. Lê mixabin ew çu rûmet ji paşe yan qiralê xwe nabîne û bi wê yekê dikedire, gelek caran nexweş dikeve û jina wî pir jê re dibe alîkar, ew teselî dike û bevzê wî bi rindî diguhurîne.

Kiryarên wezîrê milê rastê, zû-dereng derdikevin holê û paşe yan qiral pê dihisin. Gelek caran wî ji wezîrtiyê davêjin, yan serê wî jê dikin an davêjin zîndanê û wezîrê milê çepê, lê bi piranî keçelokekî dixin şûna wî...

19- **Keçelok:** Di *Çîroka Kurdî* de gelek caran behsa keçelokan hatiye kirin. Kîjan çîroka ku tê de qiral an paşe hebe, kêm-zêde tê de keçelokek jî heye.

Keçelok xortikek e, kurê pîrekê ye, ew û pîra diya xwe gelekî jar û belengaz in ku hin caran nanê tisî û pîvaza hişk jî bi destên wan nakevin. Lê belê keçelok pir zana ye, bîrewer e, têgihîştina wî di hemû tiştan de heye û ji nava her libat û livakeke wî zanistîyeke berfireh difûre.

Çi dema ku serê paşe yan qiral dikeve nava gelşeke geredor û ew nikare xwe bi hêsanî jê felat bike, wezîrê xwe yê milê rastê kincguhartî dike û dişîne, wî li nava xelkê dide gerandin, da jê re çareseriyekê bibîne. Lê wezîrê milê rastê ji heq dernakeve û bi rastlêhatinî pêrgê keçelokekî dibe. Gava ku Keçelok bi navê ”wezîr” deng li wezîr dike, wezîr şaş dimîne û dibêje Keçelok: ”Madem tu dizanî ku ez wezîr im, gerek e tu zanibî ku ez li çi jî digerrim!”

Keçelok sedemê gera wezîr jî dibêje û piştre wezîr alîkarî jê dixwaze. Keçelok tiştê pêdivî dibêje wezîr. Wezîr diçe ji paşe yan qiralê xwe re dibêje. Lê ew bawer nake

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

ku wezîr ew tişt bi xwe peyda kiriye û zorî dide wî da bibêje ku kê jê re gotiye. Wezîr jî mat dimîne û piştre navê keçelok dibêje. Îcar paşe yan qiral dişîne wî keçelokî tîne ba xwe û piştre wî dike wezîrê xwe yê milê rastê jî.

Hin caran dema ku qiral an paşe gava dimire, ew keçelok di şûna wan de dibe paşe û qiralê asasî jî.

20- **Baxçe:** Navê baxçeyê di *Çîroka Kurdî* de ku tenê ji bo kêfa qiral û paşeyan e *xazbaxçe* ye; tê de her cûre darên fêkî hene, kanî û kanîsark hene, li ber wan birkeke mezin heye ku li hawîdorê wê darine bilind ên koxelî hene û bi ser ve daweribîne, nahêlin ku tîrêjên tava havînê xwe bigehînin ser avê.

21- **Teyrê Dewletê**: Serokê dewletê hertim ji aliyê Teyrê Dewletê ve tê hilbijartin. Gava qiral an paşe dimire, ne kurê wî û ne jî merivekî wî dikeve şûnê, lê di rojeke kifşkirî de xelkê bajêr tevek li rastekê dicive û Teyrê Dewletê berdidin. Îcar ew teyr gava here li ser serê kê deyne, ew kes dibe serokê dewletê. Ew kes hin caran dibe ku jinek be, yan keçek be jî û ji hemwelatîyan kes nikare nanatî jî bike.

22- **Bajarê Şerqê û Bajarê Xerbê:** Di çîrokan de pir caran behsa *bajarê şerqê* û ya *bajarê xerbê* hatiye kirin. Kîjan çîrokbêjê ku vê yekê dibêje jî, di behsa bajarê şerqê de navê Diyarbekirê hildide û di behsa bajarê xerbê de jî navê Stenbolê dibêje.

Qiralê yan paşayê herdu bajaran bi hevûdu re kirrîn û firotin dikin, keçên xwe didin lawên hevûdu û ji hev re diyarî dişînin.

Çîrokbêj hertim bedenekê jî li dora herdu bajaran didine çêkirin û li ber dêrî leşker û qulîxdar hene ku destûra ketin û derketinê didin, an nadin û bac û xeraxa dewletê ji karwan û bazirganan distînin.

23- **Bajarê Binê Erdê:** Di Çîroka Kurdî de piraniya caran bajarek di binê erdê de heye ku ew yan ji aliyê qiralekî ve yan ji aliyê ziyayekî (mar) ve hatiye vegirtin û jiyanê li akinciyên bajêr kirine jehrî. Hin caran jî ew bajar pir xweş e û desthelatiya wî bi awayekî mirovane hatiye damezirandin ku xirabî û nepakî li wirê nayêne kirin.

24- **Xan:** Di *Çîroka Kurdî* de du texlît xan hene.

a) Xana Paşê.

b) *Xana Amê* (Xana Xelkê).

Bi piranî çi dema ku paşeyek an qiralek hebe, desthelatiya dewletê jî heye û bajarekî ku paytexta welêt e jî heye. Li paytextê koşk, qesr an xaneke pir mezin heye ku serokê dewletê tê de rûdine. Di binê wê avahiya mezin de, xizna dewletê heye. Deriyekî pola li berê ye û kilîda wê jî di bêrîka serok de ye. Di xiznê de zêr hene, zîv hene û çi tiştên giranbiha yên li dinyayê ku mirov bixwaze tê de peyda dibin. Xelk nizane ku şûna xizna dewletê kîjan dever e. Lê jina serok, hin caran kurên wî, hin caran wezîrê wî yê milê rastê jî pê dizanin.

Diziya xizna dewletê, hin caran dema ku dibe jî, bi piranî ji aliyê kesên ku pê dizanin ve çêdibe. Ev Gotina Pêşiyan ji bo vê yekê xweş tê bîra mirov: *Eger diz ji malê be, ga di kulekê re derdixe.*

Xwediyê Xana Xelkê jî dewlet e, ango ew qiral an paşeyê di serokatiyê de ye. Lê avayî ji bo giştiya hemwelatiyan vekirî ye û karkerên dewletê tê de dişixulin. Kesên

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

rêwî, karwanî û biyanî li wirê radikevin, heywanên xwe bi cih dikin heta ku bivên, hêj li riya xwe didomînin.

25- **Karwan:** Di *Çîroka Kurdî* de karwan û karwantî pir hene. Divê bila desthelatiya dewletê nebe jî, bila paşeyek an qiralek hebe yan nebe jî, jiyana karwan û karwantîyê tê domandin.

Di karwanekî de bi dehan, bi sedan heywanên barkirî hene. Hinek jî bê bar hene, wek berendam ji bo dema heywanek biweste yan nexweş bikeve, da barê wê li erdê nemîne.

Di karwantiyê de gelek peya hene; zilamek heye ku navê wî *serkarwan* e, jê re *başbazirgan* jî tê gotin. Ew timî li pêşiya karwên e û berpirsyarê her tiştî ye. Zilamek jî heye ku navê wî *binkarwan* e, yan jî *dûajo* ye, hertim li paşiya karwên e da heywaneke barkirî ji rêzê neqete û wenda nebe. Di nava heywanên di rêzê de jî, sisê yan pênc kes hene ku tenê yên ajotina heywanên barkirî ne. *Mêrxas* jî çar in an zêdetir in. Li gor mezanatî û piçûkatiya karwanan, jimara mêrxasan jî, kêm û zêde dibe. Mêrxasek li pêşîya karwên e, yek li dawiya wî ye û yên din jî li herdu kêlekan berûber diçin û parastinê dikin.

Parastina karwanan, ne tenê ji bo şêlandin û diziyê ye. Herweha parastina ji heywanên kovî jî pir girîng e, yên weke ji şêr, piling, gur û hwd.

Karwantiya navdar a di *Çîroka Kurdî* de, bi piranî di nava *Bajarê Şerqê* û *Bajarê Xerbê* de tê kirin. Li gorî çîrokbêjan (çewa ku li pêş jî hatiye gotin) *Bajarê Şerqê* hertim Diyarbekir e û *Bajarê Xerbê jî* hertim Stenbol e.

Barkêşiya di karwantîyê de, bi heywanên yeksim tê kirin wek hesp, axte, bergîr û hêstir. Tê de huştur (deve) jî pir caran tê bikaranîn.

Heçîka ker, ga û çêlek in, bi piranî di koçkirinê de û di koçertiyê de têne barkirin. Lê ev heywanên stûr ên din, ji bo riyên dirêj, ên pir dirêj ku ji welatan diçin welatan têne bikaranîn.

Barên di karwantiyê de bi piranî yên bazirganan in, yan jî yên dewletê ne. Eger bar ên bazirganan bin, mal tevek yê kirrîn û firotinê ye û di riyan de bac û xerac jê tê stendin. Lê eger ew bar yên dewletê bin, ji xwe tenê di nava sînorên dewleta xwe de diçin û tên, kes bac û xerac jê nastîne.

Karwan, pir caran têne şêlandin. Ji ber hindê bazirgan tev mêrxasan ji xwe re digirin da ew nehêlin ku kes karwanê wan bişêlîne. Mêrxas jî gelek caran qûlên reş in, ango ew ji desthilanînê û bizavê re zîrek in.

Hin caran lehengê *Çîroka Kurdî* karwaniyan dişêlîne û mêrxasên karwên nabizivin. Li ser nebizava wan, hin kurteçîrok jî hene ku di nava xelkê de têne gotin.

26- **Bazirganî:** Yan jî *bazirgantî* di *Çîroka Kurdî* de pîşeyeke pir girîng e. Divê bila desthelatiya dewletê hebe yan nebe, yan bila paşeyek an qiralek hebe yan jî bila nebe, bazirgan û bazirgantî hertim hebûne û hene, hatine domandin.

Bazirgan ew kesen e ku kirrîn û firotinê dike. Bazirgantî kirina îşê kirrîn û firrotinê ye.

Di nimreya 23an de çewa ku behsa karwantiyê hatiye kirin, bazirgantiya mezin jî bi karwantiyê tê kirin. Mesela, bazirganek mal ji virê dikirre û bi barkêşiya di karwantiyê de dibe welatekî dûr, li wirê ew malê xwe difiroşe û piştre ji wirê malê ku li virê pêdivî ye dikirre û tîne li virê difiroşe.

Di hinek çîrokan de behsa bazirgantiya di navbera bajarê Stenbolê û bajarê Cizîra Botan de jî hatiye kirin ku bazirganan malê weke kincên caw, qumaş, tiştên hesin û hinek jî tiştên xwarinê yên hişk ji Stenbolê anîne bajarê Cizîra Botan û li bazarê firotine. Piştre wan ji Cizîrê jî tiştên weke penîr, rûn, hevrîşim, genim, birinc, goştê hişkkirî û tiştên wisa kirrîne û birine li Stenbolê firotine.

Herweha hin caran di çîrokan de behsa bazirgantiya di navbera Diyarbekir û Helebê, Diyarbekir û Şamê, Diyarbekir û Mûsilê, Diyarbekir û Bexdadê, Diyarbekir û hin bajarên ku niha li bakûrê Kurdistana Îro dimînin hatiye kirin. Lê behsa bazirgantiya di navbera Kurdistan û Hindistanê de jî ne hindik hatiye kirin.

Di piraniya çîrokên Rostemê Zal de hin caran navê Hindistanê derbas dibe û behsa wê ne hindik hatiye kirin. Ev yek hin caran bi navê şer û êrîşan, hin caran jî bi navê bazirgan û bazirgantiyê çêbûye.

27- **Talan:** Di *Çîroka Kurdî* de talan pir heye, hem jî bi zorê tê kirin. Di talanê de ”mêrxastî” û ”mêrantî” pir heye. kesê yan kesên ku ne di wan xeysetan de bin, nikarin ku herin talanê xelkê bînin.

Peyvika *talan*ê xwe di ferhenga kurdî de rind daye xuyakirin. Ew kiryar ne tenê di nava dewletan de, zêdetir di nava eşîran de, yan di nava du gundan de çêdibe. Ev gund an ev eşîr diçe pez û dewarên wî gundî an yên wê eşîrê tev tîne û tê. Piştre xwedî jî li pey malê xwe tên û şer di navbera wan de dest pê dike, gelek zilam ji hevûdu dikujin, yan talanê xwe vedigerînin, an jî na.

Gelek caran dema ku aliyek talan dibe, mirovên xuyanî dikevin navbera wan û ew li hev tînin, mal li xwediyan vedigerînin, nahêlin ku siqûmatek rûbide û kes bête kuştin.

28- **Mazat û Bazar:** Di *Çîroka Kurdî* de *mazat* û *bazar* ji bo jiyana mirovan, heyînine pir girîng in. Wek naverok, kêm-zêde herdu jî yek tişt in. Ji bo bazarê qadeke kifş heye û her kes pê dizane. Lê ji bo mazatê çendî ku qadeke kifş tune, her kes jî pê dizane û zû pê dihise.

Çi malê ku firotina wî bi bêgavî çêdibe û ku davêjin mazatê delêlî li nava bajêr, li taxê, li nava gund tev digere, bi dengekî bilind gazî dike û firotina wî tiştî eşkere dike. Ew çax xelk lê kom dibe, bihayê wî malî li hevûdu zêde dikin. Kê zêdetir bide, ew mal jê re ye. Lê şûna bazarê kifş e û her kes pê dizane ku kîjan dever e.

Li piraniya bajaran, hema bêje li her bajarekî yan li her herêmekê qadeke kifş heye ku tişt lê têne kirrîn û forotin. Lê hin caran cihê wê tê guhartin û her heftî li devereke din tê vegirtin.

Çewa ku di nimra 23 û 24an de jî hatiye behskirin, dema karwanek malê bazirgantiyê ji devereke dûr dibe bajarekî yan herêmekê, li mazata wir an li devera ku jê re bazar tê gotin datîne û malê xwe difiroşe. Herweha xelkê wê herêmê bi xwe jî malê xwe tîne û li wirê difiroşe.

29- **Delêlî:** Ji bêjeya şidandi ya ”della”a erebî ketiye nava zimanê kurdî û tê de rind bi cih bûye. Îcar di bilêvkirina bi kurdî de awayê tewandina wê hatiye gotin, çewa ku li virê hatiye nivîsandin.

Xeysetnavê Delêlî ji wî kesî re tê gotin dema ku malekî firotanê davêjin mazatê, ew bi dengekî bilind dibêje û diqîre û bihayê wî malê bi erzanî dibêje, da kirrox werin bikirrin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Li nimreya 26an behsa *mazat*ê hatiye kirin ku mal li wirê tê firotin. *Delêlî* jî çi li mazatê be û çi li nava sûkê be digere, hin caran li nava taxên bajaran jî digere, bi dengê bilind gazî dike û bihayê erzaniya malê ku dê bête firotin, dibêje. Herweha *delêlî* hin caran ji bo tiştên ne yê firotinê jî gazî dike, weke erênî û neyêniyên desthelatiyê dibêje xelkê, da her kes pê bizanibe û pê bihise.

30- **Kole:** Di *Çîroka Kurdî* de, du cûre kole hene:

a) Ji bo îş: Ev cûre kole îşê xelkê dike, weke rêncberan her îşê ku jê re bê gotin dike. Heqê kole li ser xwediyê wî, tenê têrkirina zikê wî ye û wergirtina kincan e.

b) Ji bo mêrxastiyê: Ev cûre kole, tenê ji bo şeran tê xwedîkirin. Yê ku ev celeb kole xwedî dike, yan bazirgan e yan jî karekî bi xeter dike. Ji ber hindê pêdiviya wî bi mêrxasan heye û ew koleyên mêrxas digire, lêçûyeke zêde li wan dike û ew rind bi kinc, xwarin û çek dike, pere jî dide wan.

Di nimreya 23 û 24 an de behsa wan hatiye kirin ku mêrxasên bazirganan hene ku mal û karwanê wan diparêzin. Ev celeb kole tenê karê parastinê dikin.

Li gorî gotina çîrokbêjên Kurdan, ev celeb kole weha ne: Zilamine dirêj in, reşê qertîş in, ser û sinçê wan weke yên keftaran in, dema diqehirin kef bi devê wan dikeve û bi şûr seriyan dipekînin weke ku tu bi dasê serê şivikan diçilikînî.

31- **Cariye:** Di zimanê kurdî de wek term *cariye* û *qerwaş/qewraş* ji hev cuda ne. Cariye bêjeyeke erebî ye ku bi riya bisilmantiyê hatiye nava zimanê kurdî. Lê *qerwaş* bêjeyeke xwerû kurdî ye û di nimreya 38an de behsa wê hatiye kirin.

Li gor îdeolojiya bisilmantiyê, çi dema ku şerek bi "kafir"an re bête kirin, wek dîl kesên ku têkevin destên bisilmanan, zilam *kole* ne û jin jî *cariye* ne. Lê ji ber ku di nava jinan de tenê keçikên delal têne hilbijartin, bi wan re têkiliya cinsî jî rewa hatiye dêrandin.

Kirrîn û firotina carîyeyan, ji derveyê şeran jî rewa hatiye domandin. Keçikên delal wek cariye hertim hatine kirrîn û firotin. Kê ew ji xwe re kirrîne, rewatiya kirina têkiliya cinsî jî bi kirrînê re çêbûye.

Zilamekî dewlemend karibûye gelek cariye ji xwe re bikirre. Zarûkên ku ji wan çêbûne jî, wek zarûkên ji dolê normal hatine pejirandin. Mesela, Îbrahîmê kurê Mihemed Pêxemberê me, ji cariyeyeke Qibtî çêbûye ku navê wê Mariya bû.

32- **Qewadî:** Kirina *qewadî*yê dehfandina keç û jinan e bi bal têkiliya cinsî ya ne rewa ve. *Qewad* ew kes e ku wî karî dike. Yê ku vî karê xirab dike jî, bi piranî zilam e. Zilamek ji bo sûda xwe ya diravî, diçe keçan an jinan ji bo zilaman peyda dike. Herweha di vê yekê de cûreyek firotina keçan/jinan ji bo demekurtekê jî heye.

Di *Çîroka Kurdî* de çewa ku tiştên rind hene, mixabin tiştên xirab jî hene ku dema mirov bi wan re rûqal dibe, bîr û hizrên mirov dikevin belayê. Weke *qewad*tîyê ku bûye bela li serê hin keç û jinên nezan ku ew pê dikevin rêne xirab û ji civata xwe averê dibin, siqûmat têne serê wan û atarine giran li wan rûdidin.

33- **Noker-sîxur:** Di *Çîroka Kurdî* de *nokertî/ sîxurtî* jî cihê xwe girtiye. Ew nîşana xirabiyan in. Kesê noker hem fesadiyê hem casûstiyê dike. Kesê ku van karan dike çewa ku jê re *noker* tê gotin, jê re *sîxur* jî tê gotin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Nokertî yan *sîxurtî* di nava Kurdan de gelekî xirab hatiye pejirandin. Her kes ji wan bêzî dike û gelek dijûn bi wan têne kirin. Herweha Kurd gelek caran li ser tiştên beredayî hevûdu bi *nokertî* yan *sîxurtî jî* gunehbar dikin.

Di folklora kurdî de navê Bekoyê Ewan wek *noker* hatiye bicihkirin. Niha Kurd tev wî navî dinasin û hîç jibîr nakin, hertim behsa xirabiya Beko dikin ku wî fesadiya Zînê û Memo ji Mîr Zeynedîn re kiriye û bûye sedem ku ew herdu evîndar negihane hev. Bekoyê Ewan çendî ku peyayekî mêrxas bûye jî û ji Mîrê Kurdistanê re gelekî durust bûye jî, lê mixabin ew kiryarên wî, di mêjû de rûpelekî rewş jê re vegirtine.

34- **Xopan:** Ev peyvika *nifir*ê zêdetir ne ji mirovan re lê ji cih û waran re tê gotin. Gava du dilketî nagîjin hevûdu, nifir li cihê xwe ku gun e yan bajar e dikin û dibêjin *xopanê gundê me*, yan navê bajarê xwe hildidin û dibêjin (mesela) *xopana Diyarbekrê...* Hin caran jî gava nerazîbûnek ji desthelatiyê çêdibe ew bajar yan serbajar bi *xopan*ê tê nifirkirin. Yan jî eger nerazîbûn ji aliyê xwezayê ve be, dîsa jî wek nifir peyvika *xopan* tê bikaranîn. Wek nimûne: Di stiranên folklorî de gelek caran peyvika xopan ji Diyarbekir û Mûsilkê re hatiye gotin.

35- **Axe**, **Beg** û **Mîr:** Di *Bingeha Çîroka Kurdî* de cihekî xwe yê taybetî hene. Ev yek ji ber rewşa Kurdan a feodalî jî bûye ku di çîrokên kurdî de hertim mirov li navê axe/axa, beg, mîr, maqûl û kesên wisa ras tê.

Axa û axatî sazûmanine pir kevnare bûne ku ji bingeha desthelatiya Neteweyê Kurd derketine. Gotineke weha heye: *Mirov bê Xwedê dibe, lê bê axe nabe*. Axe, xwediyê axê ye û serokê eşîrê ye jî, lê dibe ku ji van herduyan yeka tenê jî jê re hebe. Desthelatiya axê, herwekî desthelatiya dewletekê ye, ew sazûman bi her awayên xwe ve tê meşandin. Lê beg û mîr/mîrîtî ne wisan in. Ew çend rade ji axa û axatiyê kêmtir in. Li Kurdistanê gelek mîr û beg jî hene, lê dibe ku ew ne xwediyê ax û eşîrekê bin jî dîsa bi wan nasnavan têne naskirin.

36- **Rîspî:** Di *Çîroka Kurdî* de dilqekî xwe yê pir girîng heye. Rîspî karê dadmend û dadgehan dikirin. Heta van salên dawîn ku me bi çavan jî dîtiye, li her gundekî Kurdistanê çend rîspî hebûne ku digel meleyê gun an şêxê herêmê, hemû sergêjî û teşqeleyên xelkê yên bi hevûdu re çareser dikirin û yê niheq ceza û yê xwdîheq jî heqê wî didanê. Ew cezayê ku didan jî, afarozkirina wî kesî bû, yan tiştekî jê distendin û didane feqîran, an didane feqiyên ku li wirê dixwendin.

Ev cudatiya ji hev a heq û niheqan, pirê caran ne li gorî Şerî'eta Bisilmantiyê jî dihatin kirin. Çendî ku bavê min meletî dikir û min didît ku hertim karê weha dihatin ber destên wî, pêşî bavê min gazî du-sê rîspiyan dikir û hêj ew ji hev vediqetandin. Biryarên ku dihatin dayîn, li gor toreya kurdî bûn û ji aliyan kesî ve jî nanatî nedihate kirin.

37- **Zewac:** Zewaca di çîroka kurdî de, hin caran toreya kurdî serobin dike û dijberiya xwe pê re didomîne. Ji ber ku di çîrokan de kêm caran dê û bavên xortan diçin keçan ji kurên xwe re dixwazin, piranî xort bi tena serê xwe diçin cem bavên keçan û keçên wan ji xwe re dixwazin. Yan jî keç diçin xortan ji xwe re dibînin û pêşniyara zewaca xwe bi wan re dikin.

Hin caran jî, xortekî bê kes û kilûs radibe bi tena serê xwe diçe li dinyayê digere û li deverekê, xasma li ba padîşe, qiral û xuyanîyekî dibe suxrevan û nanoziko dişixule.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Îcar ji ber ku ew xort timî dilqê lehengtiyê nîşan dide, piştre ew paşe keça xwe didê û wî li ba xwe dihêle.

Melesa: Siyabendê Silîvî dema ku çûye Geliyê Hewrê li ba Emer Axa maye. Axê dîtiye ku Siyabend peyayekî hêja ye, keça xwe Elîfê daye wî û xwesiye ku Siyabend li ba wî bimîne. Lê Siyabend ew yek nevaye û ji wir çûye nava Şikakiyan li Xecê rast hatiye.

Zewaca di çîrokan de, ne tenê karê mirovan e, herweha heywan jî bi hevûdu re dizewicin, hem jî heywanine ne ji famîlakê. Weke zewaca *rovî û hirçê, gur û rovî,* ya *kund û bilbil, kevok û qijik* û gwd...

38- **Şertên Zewicandinê:** Di Çîroka Kurdî de şertên zewicandinê pir in. Lê bi giştî û bi rewatiya di nava xelkê de *qelen* e.

Ji *Qelen* re *next jî tê gotin.* Qelen tiştekî rewa hatiye dîtin. Keça ku bê qelen be, ango tê gotin ku *qîmet*a wê jî kêm e. Li ser qelen û bêqelentiyê gelek meselok jî hene ku yek ji wan weha hatiye gotin: *Du jinên yekî hebûne. Herdu bi avê ve çûne. Gava hewar li pey wan ketiye, zilam gotiye: Qenim ya bi qelen bifilitiya rind çêdibî, ya din eger çûbûna jî tiştek nedibû, min qelen pê nedaye...*

Qelenê qîza çîrokê sed huştir, sed hesp, sed çêlek, sed conega, keriyek pez û gelek xelat, perû û piştderî. Hin caran jî ji ber qîzekê ve, qîzek bi navê *berdêlî* tê dayîn û hin caran jî ji ber qîzekê ve heft qîz têne dayîn. Hin caran jî qîz bi terazûyê têne kişandin û ji bo her kêluyeka wê, kêluyek zêr tê dayîn.

Mesela: Dema ku Siyabendê Silîvî çûye û Xecêya Şikakî xwestiye, gotine wî ku *berdêliya Xecê heft qîz in. Heft birayên wê hene, gereke her yekê wan qîzek ji wan re bînî.*

Ji aliyekî ve xortê jar, ji bedêla qelen ve şivantî jî dike. Şivantiya ji bo qîzan, wisa menşûr bûye ku heft sal in û jê kêmtir nabe. Ev yeka han pir caran di stiranên folklorî de jî hatiye dubarekirin.

Ev hawe şivantî, ne tenê di *Toreya Kurdî* de, lê tê dîtin ku di toreya hin miletên din de jî rûdaye û çêbûye. Mesela, Mûsa Pêxember ji bedêla qelenê qîza Şû'eyb Pêxember ve deh salan şivantîya xezûrê xwe kiriye.

39- **Şivantî:** Şivan ew kes e ku pez dibe li çolê diçêrîne. Pîşeya vî karî jî *şivantî* ye.

Şivantî di *Bingeha Çîroka Kurdî* de cihekî xwe yê taybetî heye. Ji ber ku pez bûjena herî girîng e ji bo jiyana mirovan, xasma jî li Kurdistanê ku piraniya xwezaya wê çiya ye, ew çiya bi dar û devî ne, mêrg û kanî pir lê hene, gelek zozanên xweş hene û ji bo xwedîkirina pêz wargeheke pir giranbiha ye. Herweha pez ji Kurdan re jî pêdivî ye û ew gelek jî xwedî dikin. Ji ber hindê şivantî di bingeha *Çîroka Kurdî* de dilqekî xwe yê sereke daye nîşandan.

Gotineke Pêşiyan weha heye: *Rez û pez, dewleta bi lez û bez*.

Kirina şivantîyê gelek caran bûye şertê dana qîzan. Bavê qîzê şert datîne ber xort ku ew heft salan şivantiya wî bike, hêj dê qîza xwe bide wî. Ev yeka han di gelek stiranên folklorî de jî eşkere hatiye gotin.

Şivantîya çîrokê dabeşê li ser sê aweyan bûye:

a) *Şivantiya Pez:* Di nava keriyê pez de, mih û bizin hene. Yê şivan bi heqê xwe kerî xwedî dike. Li gor normalê şivantî şeş meh in an jî duwazdeh meh in. Eger pezê malekê pir hebe, yek dikare tenê pezê xwe bi xwe jî xwedî bike. Hingê ji wî re jî şivan tê gotin, ango şivanê xwe.

Lê eger şivantî ji bo şertê dana qîzekê be, zemanê wê heft sal in. Xort heft salan şivantî dike, piştre hêj bavê qîzê qîza xwe dide xortê ku heft salan jê re şivantî kiriye. Hin caran jî xort gava ku heft salan şivantîya bavê qîzê temam dike jî, piştre bav qîza xwe nade wî û dide xortekî din. Wê hingê teşqelene mezin dest pê dikin.

b) *Şivantiya Qazan:* Di *Bingeha Çîroka Kurdî* de şivantiya qazan jî pir balkêş û bi teşqele ye. Bêweku zilamekî kal, yan bi piranî kurê pîrejinekê ku hertim jî ew keçel e, dibe şivanê qazan û bê ku zemanê şivantiya wî kifş be, ew nanoziko bi salan wî karî dike. Di vê dema şivantiyê de, keça xwediyê qazan dilê xwe dixe şivanê qazên bavê xwe û pê re têkilî datîne. Lê şivên xwe hemkûfê wê nabîne û hertim xwe jê dûr dihêle.

c) *Şivantiya Berazan:* Di *Bingeha Çîroka Kurdî* de şivantiya berazan jî pir balkêş û bi sergêjî ye. Çendî ku niha beraz zêde li Kurdistanê nayêne xwedîkirin jî, lê di çîrokan de hin caran têne dîtin ku dema kesekî xuyanî dil dikeve qîzekê, bavê wê şertê dana qîza xwe lirina şivantiya berazan dide pêş. Wek mesela Şêxê Sen'anî ku dil ketiye keça keşîşekî Ermen û çûye ji bo xatirê ku qîzikê bidin wî şivantiya berazan kiriye. Li gorî rîwayetan tê gotin ku Şêxê Sin'anî, Şêx Evdilqadirê Gêlanî bi xwe bûye.

40- **Bêrî û bêrîvan:** Di *Bingeha Çîroka Kurdî* de *bêrî û bêrîvantî* pir balkêş in û ji bo jiyana civakî jî pir girîng in.

Ev peyvika *bêrî,* tê gotin ku ji navê çîçekeke mor hatiye wergirtin ku ew di tehtik û zinarên Kurdistanê de şîn dibe.

Her roj du caran keç û jin diçin pez li devereke kifş didoşin. Yanî di rojê de du caran bêrî heye. Carekê dibêjin *bêriya danê sibê,* carekê dibêjin *bêriya danê varê*. Lê di dawiya payîzê de gava ku şîrê pez hindik dibe, di rojê de tenê carek bêrî tê kirin.

Malên ku pezê wan pir heye, qerwaşên wan hene ku diçin bêriyê. Kesê yan kesa ku diçe bêriyê, navê xwe *bêrîvan* e. Kirina wî karî bi giştî jî *bêrî* ye.

Li bêriyê hevdîtina keç û xortan jî pir çêdibe. Ev yeka han xwe di sitiranên folklorî de jî pir eşkere daye diyarkirin.

41- **Xatûn û qerwaş:** Di Bingeha Çîroka Kurdî de *xatûn* û *qerwaş* rind xwe dane xuyakirin û di stiranên folklorî de jî cihekî xwe yê taybetî vegirtine.

Xatûn, xwediya malê ye, bi piranî jina sermiyanê malê ye, hin caran didbe ku qîza xwediyê malê, yan jî xuşka wî be. *Qerwaş*, karê nava malê dike, yanî li ber destê xatûna malê dişixule.

Li hin deverên Kurdistanê, xasma li wan herêmên nêzê Erebistanê, ji qerwaşê re *cariye* yan *cêrî* jî tê gotin. Ev cariye, ne ji babetê cariyeya li nimreya 29an e. Ev tenê karê malê dike û li ber destên xatûnê dişixule, dibe ku mêrê wê hebe û zarûkên wê jî hebin.

Di çîrokan de xatûn ji aliyê fizîkî ve pir delal e. Lê hin caran qerwaş ji xatûnê delaltir e jî.

Xortek dema dil dikeve qîzekê, lê rê tune ku ew keçikê bibîne, hingê ew xort xwe dike şivan da bi hêsanî karibe qîzikê bibîne. Îcar dema ku qîz/xatûn tê bêriyê û ku qerwaşa wê jî pê re ye, lê qerwaş ji xatûna xwe delaltir e, xort hin caran dilê xwe ji xatûnê vedikişîne û dil dikeve qerwaşê.

42- **Gavantî:** Di *Bingeha Çîroka Kurdî de* gavantî jî weke şivantiyê girîng e. Navê wan heywanên ku gavan wan li çolê diçêrîne, bi giştî *garan* e. Gavan ew kes e ku dewaran dibe li çolê diçêrîne. Kirina vî karî jî *gavantî* ye.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Di garanê de ev heywan hene: Ga, çêlek û yên ji wan çêdibin. Ker, hesp, axte, bergîr û hêstir.

Zemanê *gavantî*yê şeş meh in, lê bi piranî duwazdeh meh in. Di gavantiyê de şertên weke yên ku di şivantiyê de hene nînin. Di toreya kurdî de kesê ku gavantî dike, hinekî kêm tê dîtin. Lê hin kesên xuyanî, maqûl û bi şan û şeref jî hene ku ji ber hin siqûmat û bûyerên ku li wan rûdane diçin li herêmeke dûr dibin gavan û xwe bi wî karî ji civatê didin veşartin.

43- **Riya Çûn û Nehatinê:** Di Bingeha Çîroka Kurdî de gelek caran *Riya Çûn û Nehatinê* bûye şertek ji şertên dana qîzê. Bêweku hin caran dema ku xort dil ketiye qîzekê û çûye ku wê qîzê bixwaze, lê bavê qîzê nexwestiye ku qîza xwe bide wî, hingê bav şertine zehmet datîne ber xort û kirina tiştên nebûyî jê dixwaze. Xort jî bi gumana *belkî*yê be jî, şertên wî dipejirîne û bi riya dûr a bi xeter ve diçe. Lê gava ew diçe êdî nayê. Ji vê yekê re tê gotin: *Riya Çûn û Nehatinê.*

Ev gotin, di *Toreya Kurdî* de wek termeke balkêş gelek caran tê gotin. Çi dema ku yek tiştekî ji biriya mirovan zêdetir dibêje, bersiva wî *ev gotina te ya Riya Çûn û Nehatinê ye* tê dayîn.

Riya Çûn û Nehatinê, ne tenê di derheqê çûna bi riyeke nenas a bi xeter ve tê gotn. Herweha ji bo kirina karekî bi xeter jî tê gotin. Weke di serpêhatiya Ferhad û Şêrînê de jî, qulkirina binê çiyayê mezin ji Ferhadê Kurd re pir hêsan hatiye dîtin. Lê ew kar jê re bûye *Riya Çûn û Nehatinê*.

Ji hemî karê weha yê bi xeter re *Riya Çûn û Nehatinê tê gotin.*

44- **Nexweşiya Qîzan:** Ev qîza ku di *Çîroka Kurdî* de nexweş dikeve, bi piranî qîza qiralekî ye, yan a paşeyekî ye, ya beg û maqûlekî ye. Yanî qîzik ji wan malbatan e ku endamên malê nikarin xwe mîna her kesî têxin nava xelkê û bi daxwaza dilê xwe bilipikin.

Gelek caran gava ku qîza çîrokê nexweş dikeve, di wî jiyê cuwan de bi wê nexweşînê jî dimre. Bi piranî nexweşiya qîzan, pêşî ji ber dilketinê çêdibe. Qîz, mesela, dil ketiye xortekî, lê riya ku bigîje wî tune. Hingê ew nexweş dikeve û bavê wê jê re li dermanan digere.

Dema ku bav ji leşsaxîtiya qîza xwe ya nexweş bêumîd dibe, hingê fermanek dide û dibêje: *Kiyê ku qîza min ji nexweşînê sax bike, ez ê qîza xwe bidim wî*. Wê demê ew xortê ku qîzik dil ketiyê diçe û wê bi dermanekî normal xweş dike û piştre herdu bi hev re jî dizewicin.

45- **Fîncana Jehrê:** Hin caran di *Çîroka Kurdî* de zewaza qîzan bi zorê çêdibe. Gava keç dil dikeve xortekî, lê berî zewicandinê siqûmatek tê serê xort û ew bi hev re nazewicin, îcar birayê xort an yekî din ku dixwaze bi keçikê re bizewice û dest bi kirina dawetê dikin, yan keçê bi zor dane xortekî ku ew jê hisnake, jan jî keçikê dane kalekî kertoxî, hingê keçik fîncanek ku tê de jehr heye bi destên xwe digire û nahêle kes nêzî wê bibe. Çi kesê/kesa ku nêzî keçikê dibe jî, keçik hema fîncana jehrê dibe ber devê xwe da ku vexwe û xwe bikuje.

Gelek caran dema ku keçik dixwaze jehrê vexwe, pîrejinek diçe ba wê û bi dizî mizgîniya dilhebînê wê dide wê. Hingê keçik ji vexwarina jehriyê vedikişe û pîrejin wê fincanê ji destan derdixe.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

46- **Kevirê Sebrê:** Ev kevir, dema ku tengasiyek çêdibe, xwe di *Çîroka Kurdî* de eşkere dike. Bi piranî ji bo qîzan û jinan hatiye bikaranîn. Xasma jî dema qîzek bi zorê hatiye revandin, yan zilamekî bê daxwaza wê ew kiriye jina xwe, yan dema ku qîzek dikeve zîndanekê, herweha dema ku qîzek an jinek ji bo honandina tevnê yan çêkirina xalîçe, berr, bissttir û sûtina kulav di avahiyekê de tê girtin û derketina derve jî lê hatiye qedexekirin, hingê ew kevirokekî mîna yê *leyztika heftokê* ji xwe re peyda dike û pê hedana xwe tîne. Navê wî kevirê ku hate gotin, *Kevirê Sebrê* ye.

Ew kevir dibe teselî ji wê qîzê yan jinê re ku jiyana xwe di wê devera dorgirtî de bi bêgavî didomîne û pê dihedine jî, piştre ew pê digîje felatê jî.

47- **Kevirê Miradan:** Ev kevir, ji babeta *Kevirê Sebrê* ye, lê bi vajiyê dorgirtina qîz û jinan e. Dema ku tengasiya dilketinê, yan tiştekî wisan çêdibe, ger qîz be yan jin be, herweha hin caran xort û zilam jî, umîda xwe didin ser *kevirê miradan* û pê xewnerojka jiyana xwe ya demepêşê çareser dikin. Çewa ku em ê niha behsa behsa vê yekê di nimreya 45an de jî bikin:

48- **Ziyaret:** Li Kurdistanê ziyaret gelek hene. Ji çûna ser ziyaretê re *serdan/seredan û cimayî/civayî* jî têne gotin. Ev ziyaret bi umîda alîkariya nihênî ye ji kesên xuyanî yên ku ew ji mêj ve mirine.

Devera ziyaretê, bi piranî gora mirovekî menşûr e. Kesê ku belayek lê çêbûye û derdek lê rûdaye, ew diçe ser wê ziyareta kifşe û jê daxwaza kamebûna mirazê xwe dike. Ew miraz êdî çi dibe bila bibe, her kes li gor xwe tiştekî dixwaze.

Mesela: Gora Melayê Cizîrî li Cizîra Botanê ku di binê Mizgefta Sor de ye, ziyareteke bi navûnîşan e. Ez bi xwe jî çûme wir. Mirov xwe bi derencokan bera jêrê dike. Gora Melê bi perdeyên kesk ku nivîsa bi erebî li serê hatiye vegirtin. Li ber dîwarê aliyê bakûr, bi qederê bêjingeke tije kevirokên ji liba nokê mezintir hene. Ew kevirok *Kevirê Miradan* in. Mirov di dilê xwe de xuteke (niyet) tenê dike yan daxwazekê dike û bi kevirokekî digire, dide dîwêr û destê xwe jê berdide. Eger kevirok bi dîwêr ve zeliqî û wisa ma, li gor baweriya xelkê ew niyet, ew daxwaz wê çêbibe. Lê eger kevirok bi dîwêr ve nezeliqe û terabe erdê, ew niyet û daxwaz jî çênabe.

Carekê min bi xwe dît ku kevirokên hin kesan bi dîwêr ve dizeliqîn û yên hin kesan pê ve nedizeliqîn. Îcar çi kesê ku ji ba gora Melê derdiket, gava mirov li ruyê wî dinihêrî, mirov di rengê wî de ferq dikir ku kevirê wî bi dîwêr ve zeliqiye yan nezeliqiye.

49- **Şêtbûn:** *Şêtî* yan *dînîtî* hin caran xwe di *Bingeha Çîroka Kurdî* de kiriye bûjena alîkarî û felata ji tişt û hin deverên bi xeter. Ev babet jî, cûreyeke nexwşînê bi xwe ye.

Hin mirovên leşxweş û zana, dilqên şêtan didin xwe û li pey amacine taybetî digerin. Herweha ew hin caran li pey derxistina hin tiştên veşartî, yên wendabûyî û bi destxistina hin materyalên ji bo bikaranîna tiştên girîng digerrin.

Ev *şêtbûn* hin caran jî ji aliyê qîz, bûk û zeriyan ve tê kirin. Xasma jî, dema ku bêdilketinek çêdibe, dest bi vê nexweşînê tê kirin. Herweha hin caran wek nazî jî, ji aliyê jinekê ve li mêrê xwe, ji aliyê dê yan bavekî ve li zarûkên xwe tê kirin û ew wan diceribînin ka qedrê xwe hene yanena.

Di folklora kurdî de, pirê caran kesê ku xwe dîn dike, jineke şûkirî ye. Xeysetê wê jinê ev e ku bi jiyê xwe gelek ji mêrê xwe piçûktir e. Yan jî jinik xwe pir *delal* û *bedew* dibîne û pê sergiranî li mêrê xwe dike. Yan hin caran, jin dixwaze ku gotina xwe li ser

Zakho Centre
for Kurdish Studies

mêrê xwe ferz bike û wî bêgav bihêle ku weke wê bête pejirandin an kar û îş li gor daxwaza dilê wê bêtin meşandin.

Eger ev tiştên han li gor daxwazê çênebin, hingê ew kes dest bi dek û dolabên cihê dikin, xwe nexweştir dixînin, xwe dîntir dikin û dest bi hin livakên bêmirêz dikin.

Yan eger jinek bixwaze ku xwe ji mêrê xwe bide berdan, ji ber ku di *Toreya Kurdî* de ew rasterats nikare meselê bibêje, çeka wê ya herî xurt ev e ku xwe nexweş dide nîşandan, xwe dîn û şêt dike û laşê xwe, serçavê xwe gemar dihêle û tiştên bêrê dike, heta ku mêrê wê ew berdide, yan tiştekî din pê dike.

50- **Mizgîn:** Peyveke pir xweş e ku pê dilê mirovan vedibe, mirov pê gelekî şad dibin û xweş û hêsan dimînin. Dema ku tavilek ji bo tiştekî tê kirin, piştî demekê yek xeberê dide ku ew tişt bi hêsanî çêbûye, yan rûdana xirab ku hatibû bihîztin ne wisan e, hingê mirov pê şad û bextewer dibe.

Kesên ku zêdetir bi mizgîna tiştan şad dibin, bi piranî jin in. Mesla, kurê jinekê çûye devereke dûr, an ji bo karekî bi xeter çûye deverekê û nehatiye, diya wî dikeve tavil û gumanan û ji bo hatina wî hertim çavrênî dike. Ew diya dilsoj, gelek caran ji bo hatina kurê xwe dema ku dirame, yan xewneke xweş dibîne ku yek tê de mizgîn dide wê, yan jî yek mizgîniyeke rast a eşkere dide wê, hingê ew pir kêfxweş dibe. Herweha ew dê, dema ku pirpirokekê yan ew kêzika rengîn ku jê re *Xecê* tê gotin jî dibîne, kêfxweş dibe. Ji ber ku pirpirok û Xecê di nava Kurdan de nîşana dana mizgîniya xêrê ne. Hin caran jî ew diya dilsoj di xewnê de *Mêrê Şevê* yê ku di nimreya 74an de behsa wê babetê hatiye kirin, dibîne ku her tiştî jê re eşkere û bi devkî dibêje.

51- **Keça zengîn û xortê feqîr:**
Yan **keça feqîr û xortê zengîn**:

Di hin çîrokan de keçeke zengîn heye ku bi xortekî feqîr re dizewice, yan keçeke feqîr heye ku bi xortekî zengîn re dizewice.

Wek mesela ku dibêjin: *Dil fermanê nasnake*, hin caran ev tişt pê li *Toreya Kurdî* jî kiriye û keça qiralekî yan a paşayekî bi kurê xulamekî bavê xwe re zewiciye yan li pey ketiye. Yan kurê qiralekî/kurê paşayekî bi keça xulamekî bavê xwe re zewiciye, yan wê ji xwe re revandiye.

Ji vê yekê zêdetir, yan keça zengînekî bi kurê feqîrekî re direve û hin caran kurê zengînekî radibe keça feqîrekî ji xwe re direvîne, yan jî normal û bi xwestin pê re dizewice.

52- **Hêwî-jinbav:** Di gelek çîrokan de jineke din jî ya bavê mirov heye ku jê re çend nav têne gotin, weke *hêwî*ya dê, *jinbav, damarî, dêmarî* û hwd..

Di piraniya çîrokan de bavekî ku du jinên wî hene, jinek miriye û yek sax maye, ji jina mirî qîzek, an qîzek û kurek mane. Jinbava wan zordetî û xirabî li wan zarûkan dike. Ew zarûk pir diêşin û nikarin li pêşberî jinbava xwe derkevin. Herweha çi tiştê ku jinbav dibêje wan, ew mecbûr dimînin ku bi cih bînin.

Ew zarûkên di çîrokê de ku diya wan miriye, eger qîz bin jî eger kur bin jî, pir delal û rindik in. Lê zarûkên jinbava wan, ne delal in û gumurokî ne.

Ev çîrokên wisa, di hemû devokên kurdî de weke kirdikî (zazakî), kurmancî, goranî û yên din de hene. Mesela çîroka *Elik û Fatik* di vî warî de pir balkêş e.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

53- **Keça Hêwiyê:** Di *Çîroka Kurdî* de, keça hêwiyê pir delal e, bedew e, spehî ye û zîrek e. Lê ji ber ku diya wê tune, niheqiyeke pir mezin ji aliyê jinbava wê ve lê hatiye kirin û hertim birçî maye, belengaz û şerpeze bûye.

Keçeke jinbava *keça hêwiyê* jî heye ku ew herdu hevjî ne. Lê ev keçik ji aliyê fizîkî ve ne delal e, bê mirêz û bê teşe ye û gelek jî tirral e.

Îcar çaxê ku xwezgînî ji bo *keça hêwiyê* tên û wê erê dikin, piştre nîşan dikin, îcar çaxê birina bûkê, timî jinbav keça xwe ya ne delal li şûna wê kiriye bûk û xwestiye ku bi dawetvaniyan re bişîne mala zavê. Lê berî siwarkirina bûkê, teyrek an bi piranî dîkek bi zimanekî mexlûte xwendiye û bi dawetvaniyan daye zanîk ku ew keça dê bibin, ne ewa ku xwestibûn e, ya ku bûka rastîn e, ew ji aliyê jinbava xwe ve hatiye veşartin.

54- **Dawet:** Piştî ku şertên zewacê kame dibin, îcar dawet dest pê dike.

Di *Çîroka Kurdî* de dawet bi hawayekî pir xweş çêdibe ku her kes li xweşiya wê şaş dimîne. Dawetên di çîrokan de, ji aliyê zeman ve yan sê roj û sê şev in, yan heft roj û heft şev in, yan jî çil roj û çil şev in. Xwarina di dawetê de jî bi piranî savar û goşt e.

Di dawetê de bi piranî beran têne serjêkirin, bi hindikî çil beran, yan jî sed beran têne serjêkirin, herweha gelek kavir, berx, conega û çêlek jî têne serjêkirin.

Xwarina goştê dawetê, ne tenê ji bo mirovan bûye devera kêfê, ew ji bo heywanên weke seg, pisîk û yên goştxur jî bûye şadiyeke mezin.

Mesela di çîroka *Kêzê û Mişko* de, roja ku daweta mala *Xan Evdal* bûye, mişko û kêzê li beravê bûne, mişko çûye wir da hinek xwarina dawetê ji xwe û kêzê re bîne.

Herweha gelek heywanên goştxwur jî li hawîdorê mala dawetê kom dibin û bi hestiyan kêf dikin.

Di govenda dawetê de, leyztikên pirtexlît têne leyztandin û di wan de stiranên kevnare yên folklora kurdî têne gotin, def û zirne têne lêxistin û haytehola ku radibe, deng dide û behsa wê belav dibe heta ku bi salan nayê jibîrkirin.

55- **Heft:**Ev jimara *heft,* di Çîroka Kurdî de gelekî balkêş e û pir jî hatiye dubarekirin. Sedemê wê yekê çi be jî, ez bi xwe di lêkolîna xwe ya duwazdeh salên li Folklora Kurdî de lê rast nehatime ku çima ev jimar wisa zêde hatiye dubarekirin. Wek nimûne: (Ji bo dawetan) *heft roj û heft şev dawet,* di kirîvatiyê de *heft roj û heft şev şahî, heft werîs, werîsên heft gundan, garana heft gundan, heft nan, heft kutilk, heft pîvaz,* ji bo qelenî qîzan *heft sal şivantî,* di çûna rêwîtiyê an eskeriyê de *heft salên xerîbiyê, heft bira, heft xwişk, heft bira û xwişk, heft bûkên malê, heft gule, heft rê, heft hezar,* (di jinanînê de) *heft jin,* (di mêrkirinê de) *heft mêr, heft sîtil savar û heft sîtil goşt* û gwd. di Folklora Kurdî de pir caran hatine gotin.

56- **Çil:** Ev jimara *çil* jî mîna ya *heft,* di Çîroka Kurdî de gelekî balkêş e ku wisa hatiye dubarekirin, sedemê vê jî mîna jimara *heft* ne diyar e. Lê jimara *çil,* di dawet û şahiyan de *çil şev û çil roj* tê gotin. Di çêbûna zarûkan de ji bo dê û ji bo zarûkê (di çil rojên pêşî de) *çilî* tê gotin. Ji bo du zarûkên ku ev çil rojên wan ên pêşî ketine nava hevûdu, dibêjin *çilê wan yek e*. Piştî mirina yekî/ê ji bo bîranînê *çilrojîya wî* tê bibîranîn. Gava yek sondekê dixwo an adekê li xwe dide, dibêje ku ew *heta çil rojî* weha weha nake yan dê bike. Yekî an yeka ku zêde dipeyive û tiştên bêpêdivî dibêje, yekî duyemîn jê re dibêje (eger jin be) *çilzimanê* (yan eger mêr be dibêje) *çilzimano.* Gelek caran gava ji bo çareserkirina tiştekî jî ku zeman tê kifşkirin, bi piranî *çil roj* qewlê xwe datînin û gwd...

Zakho Centre
for Kurdish Studies

57- **Leheng:** Di her çîrokeka kurdî de, lehengek heye. Ew leheng divê bila mêr be yan jin be, yan mezin be yan jî piçûk be, dilqê xwe yê di çîrokê de her dide leyîztandin. Lê bi piranî lehengê *Çîroka Kurdî* mêr e û navê wî *Mîrze Mihemed* e.

Leheng di çîrokên rawilan (fabil) de jî hene. Bê guman e ku leheng di van tîp çîrokan de bi piranî şêr e, hin caran jî rovî ye. Lê di çîroka *Hecî Rovî* de, leheng Dawudok e, ango Silêmanê Dunikul.

Tê gotin ku berî Ola Bisilmantiyê, navê lehengê Çîroka Kurdî tenê *Mîrze* bûye. Lê piştî ku Ola Bisilmantiyê hatiye Kurdistanê, piraniya Kurdan jî ku bûne bisilman, Kurdan navê *Mihemed* jî bi navê lehengê çîroka xwe ve danîne, îcar ew nav niha bûye *Mîrze Mihemed*.

58- **Xurcezîn:**Di Çîroka Kurdî de nîşana zîrektî, zanatî û jêhatîtiya qîzan e ku ji xortan re bûye mîna pêbawerî. Keça ku çêkirina xurcezînan nizanibe, ew di zewaca xwe de li xortekî baş jî rast nayê. Herweha xurcezîn ji kesên xuyanî re pir girîng e, lê eger nexş û nimûşên xurcezînê xweşiktir bin, kesê siwar pê dipesine û xwe pê serbilind dike.

Rêwiyê xuyanî gava bi siwariya hespê diçe rêwîtiyekê, bi piranî zêrên xwe, dirav û tiştên xwe yên giranbiha tê de diparêze.

59- **Mişk:** Di Çîroka Kurdî de çewa ku lehegê çîrokê bi piranî zilam e û hertim jî ku navê wî Mîrze MIhemed e, lê hin caran di Çîroka Kurdî de mişkek lehengiyê dide ser xwe û biserkeftî jî dibe. Çi dema ku lehengê çîrokê yê zilam ku nikaribe ew tiştê zehmet ê di çîrokê de çareser bike, mişk jê re dibe alîkar heta ku ew digîje amanca xwe. Hin caran jî, weke mişk tyrek jî dibe lehengê Çîroka Kurdî û lehemgê zilam ji mirinê rizgar dike.

60- **Sonda Bi Erd û Asîman:** Sonda ku di Çîroka Kurdî de heye, ne mînaye sondên vê sedsala Bîstî ya ku bihurî. Ew sondên di Çîroka Kurdî de bi piranî bi xwezayê û bi mirovan têne kirin, ango bi gora filankes têne kirin. Gava bêbaweriyek dikeve nava kesên di Çîroka Kurdî de, ji bo bawerkirina hevûdu sond tê xwarin.

Bi piranî sond, *Sonda Bi Erd û Asîman* e, hincaran tenê sond bi erdê ye, hin caran sond tenê bi asîman e, hin caran sond bi rojê ye, pirê caran sond bi agir û bi ruhniyê ye. Lê zêdetir sonda Kurdan bi çirayê tê kirin. Herweha sonda di çîrokê de hin caran bi avê ye, hin caran bi nan e, hin caran bi gora hin miriyên xuyanî ye û gwd...

61- **Gustîl:** Ji bo lehendê çîrokê, bûjeneke pir nirxdar û bikêrhatî ye. Çi dema ku leheng dikeve tengasiyan, gustîla di tiliya xwe de badide, pêre pêre du efrît li ber wî hazir dibin û çi tiştê ku ew bixwaze, mîna daxwaza wî çêdikin.

Bidestxistina gustêlê jî bi piranî pisîk dike ku dê behsa wê di nimreya 99an de bê kirin. Lê pirê caran dema ku lehengê çîrokê qenciyeke mezin bi zarûkên cinan, ên efrîtan dike, li pêşberî wê yekê gustîleke wisa ku sosret jê çêdibin wek diyarî didin wî.

62- **Keçeke pir delal:** Di çîrokan de çewa ku lehengê çîrokê heye, hin caran keçeke tenê ya pir delal jî heye ku xwe bi lehengê çîrokê dide nîşandan û jê re dibe alîkar, piştre jî pê re dizewice, hin caran jî pê re nazewice.

Îcar delalî û rindiya wê keçê bi dev û zimanan nayête gotin û bi xameya rengîn jî nayête nivîsandin. Lewra her kes ji delaliya wê re hişmetheyran dimîne. Deng û behsa delaliya wê keçê, li dinyayê belav dibe û ji bo dîtina wê pir kes dikevin tavila jîn û mirinê.

Wek nimûne: Çîroka Qiralê ku qesrekê ji qoqên xortan avakiriye. Bi kurtî çîrok weha ye: *...kîjan xort çûye ku qîza Qirêl bixwaze, wî şert daye berê û gotiye 'eger tu*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

şertê min bi cih neyinî, ez ê serê te jê bikim. Berî ku xort razî bibe, wî ew dîwarê wê qesra ku ji qoqê xortan ava kiriye, pê daye nîşanda." Bi vê yekê jî xort razî bûye û çûye *riya Çûn û nehatinê.*

63- **Keça Dêwê:** Di hin çîrokên kurdî de, gava ku lehengê çîrokê li navsera çiyan bi pîredêwekê re şer dike û dêwê pê nikare û ji ber leheng direve, bi bez diçe dikeve şikeftekê û xwe davêje pişt qîza xwe. Qîza dêwê jî bi lehengê çîrokê ve hêvî û zarî dike da ew diya wê nekuje. Lê pirî ku qîzik delal û bedew e, zû demara leheng a mêrantiyê sist dibe û şûrê xwe yan tîr û kevanê xwe dadixîne û zoq lê dinihêre. Hem jî bi lênêrîneke wisan tûj ku avşûtik ji devê wî dadiweribe.

Li gorî gotina çîrokbêjan, delaliya qîza dêwê jî weha tê şirovekirin: Gava av veduxwe, qulpik di gewriya wê de têne dîtin. Gava mewîja reş dadiqurtîne, heta diçe jêrê jî tê dîtin. Kêlsima wê weke ya xezalên Çiyayê Şengalê ye. Meşa wê weke ya werdekê ye. Çîpên wê yên gewreyî, mînane kêviyên berfa çiyayê Sîpanê Xelatê. Herdu çavên Zînê û yên Xecê, wênekêşiya li ber herdu çavên wê çêbûne. Eniya wê ya geverî, erçena kortikî, lêvên tenikî, hinarokên zivzîkî wisanê xweş reng didin rengan ku yên nîvmirî jî ji wê re sergêj û dewxgîr dimînin... Lehengê *Çîroka Kurdî* ji wê qîza delal re heyran dimîne û dixwaze ku ew jê re be. Lê leheng jî bi delaliya xwe, bi bedewtiya xwe ji qîzikê ne kêmtir e. Îcar dema ku dêwê dibîne ku bala leheng ketiye ser qîza wê, dibêje: ”Eger tu min nekujî, ez ê vê qîza xwe bidim te...” Leheng bi wê yekê razî dibe û wê nakuje.

Di hin çîrokan de ew qîz digîje leheng, di hin çîrokan de jî nagîje wî.

64- **Keça Hêkê:** Eynî mîna *Keça Dêwê*, di hin çîrokên kurdî de gava ku lehengê çîrokê diçe ji xwe re li qîzeke delal digere, lê peyda nake û diçe li navsera çiyan digere, li şkeftekê rast dibe û tê de hêkekê, yan du hêkan, yan jî sê hêkan dibîne û wan hêkan tîne, diçe ser kaniyeke ku ava wê şîfa ye û hêkan datîne ser giyayê, pêre pêre ew hêk difidiqin û weke çîçikan qîz ji wan derdikevin, lê tenê qîzek ji wan di qasê de mezin dibe û yên din nepenî dibin.

Delalî û bedewtiya *Keça Hêkê* jî, ji ya *Keça Dêwê,* ne kêmtir e. Leheng piştre xerîkê gelek bela û bûyeran dibe, di serê pêşî de ew û *Keça Hêkê* ji hev dûr dikevin û bi hev miraz nakin. Lê piştre mîna ku talih û bextê wan ji aliyê felekê ve tê guhartin, ew digîjin hev û bi hev re dizewicin, dest bi jiyaneke nû dikin.

65- **Sê bira:** Di Çîroka Kurdî de, piraniya caran çend bira dilqên xwe pêk anîne û ji destpêkê heta dawiyê, ew bûne avakiroxê wê. Di hin çîrokan de du bira hene, di hinan de sê bira hene û di hinekan de yazdeh bira hene û di hinekan de jî zêdetir bira hene. Lê bi piranî di çîtrokan de, jimara wan sisê ye.

Di çîrokê de timî birayê piçûk zîrek e, pir zana ye û bikêrhatî ye. Herweha lehengtiya çîrokê jî timî birayê piçûk digire ser xwe û ji birayên din re dibe alîkar.

Birayê mezin jî, hertim xwe xistiye dilqê yekî nezan, bêmirêz, gumorrî û dilqê belengaztiyê daye ser xwe. Birayê navîn jî, kêm-zêde ji birayê mezin pir ne zêdetir e.

66- **Sê Xwişk:** Di *Çîroka Kurdî* de hertim du xwişk, yan sê xwişkên hevûdu hene ku ji nepeniyê derdikevin û tên xwe nîşanê lehengê çîrokê didin. Ew xwişk pir delal in, lê ya piçûk hîn delaltir û spehîtir e.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Di hin çîrokan de jimara xwişkan, çewa ku li jorê jî hatiye gotin, ji sisiyan zêdetir dibe heta ku digêje yazdehan. Û di hin çîrokan de jî 40 xwişk hene.

Gava lehengê çîrokê dixwaze ku bihna xwe berde, xasma çaxê ku li nava *xazbaxçe*yekî li ser birkekê rûdine, ew xwişk xwe pê nîşan didin, yan jî xwe dixin şiltê kevokan û têne ser birkê, şilt ji xwe dikin û bi laşê tazî dikevin avê.

Lehengê çîrokê û ew keç bi hevûdu re dipeyivin, li hev dikin û leheng wan bi xwe re dibe malê.

Xwişka piçûk hertim ji lehengê çîrokê re ye, xwika navîn ji birayê leheng ê navîn re ye û xwişka mezin jî ji birayê leheng ê mezin re ye.

67- **Çavreşî-Çavnebarî:** Di çîrokan de hertim çavreşî û çavnebarî û gelek bêzîtiyên wisa xwe nîşan didin ku xirabî dixin navbera birayan.

Çavreşî li ser gelek tiştan çêdibe. Mesela: Gava dê û bav ji kurekî xwe zêdetir his dikin, yan birayek zêdetir ji aliyê xelkê ve tê hiskirin, birayên din çavreşî davêjin wî birayê hisjêkirî û sergêjî jê re çêdikin, heta hin caran wî dikujin an didine wendakirin.

Lê ji ber ku ew birayê hisjêkirî hertim dibe lehengê çîrokê, hemû siqûmat û kirêtiyên ku bi ser ve tên, ji pêşiya xwe dadimalîne û zû dikare xwe ji hemû dek û dolabên gêdûkane bifilitîne.

Ew bira kesekî dilpak e û ji bo tolstandina ji birayên xwe jî kînedozî nake.

Çavreşiya ku di nava birayan de çêdibe, zêdetir li ser keçan e. Lehengê çîrokê gava du xwişkan an sê xwişkan bi xwe re tîne malê, hertim keça delal ku xwişka piçûk e, ji xwe re hiltîne. Îcar birayên din çavreşî davêjin wî û dixwazin ku wê keçê jê bistînin.

*

68- **Nêçîr:** Ev pîşe xwe di gelek çîrokan de kiriye beşek ji jiyana lehengê çîroka kurdî.

Çewa ku ji dîrokê jî tê zanîn, jiyana mirovan xwe di serê pêşî de bi nêçîrê ragirtiye. Di *Çîroka Kurdî* de jî, nêçîr pir tê xuyakirin. Ev yeka han dibe ku girêdayê bi xwezaya Kurdistanê ve be jî, ji ber ku di çiya û geliyên welatê me de, gelek heywanên nêçîrê hebûne û niha jî pir hene. Herweha çewa ku tê dîtin û hatiye bihîztin jî, piraniya xuyanî, maqûl, beg, xan û desthilatdarên Kurdistanê jî pir nêçîr kirine. Herweha di *Çîroka Kurdî* de pir kesên jar hebûne ku debara malbata xwe tenê bi goştê heywanên nêçîrê jî kirine.

Herweha nêçîr karekî herî balkêş e di nava qiral û paşeyên di *Çîroka Kurdî* de. Ew piraniya rojên xwe yên vala bi nêçîra xezalan dibihurînin. Lê ew dest ji nêçîra pezkovî, kew, werdek, qaz, bett, kêvrûşk û tiştên wisa jî bernadin.

Nêçîra wan bi siwariya hespan tê kirin, bi piranî tê de tîr û kevan, rim û çek jî bi kar tînin. Lê bi giştî û zêdetir bûjena girtina heywanên kovî *qoç, tor, faq* û *dav* in.

Di hin çîrokan de jî dema ku jina yekî xwestiye ku siqûmatek were serê mêrê wê da ew jê xilas bibe, goştê nêçîrê kiriye behane û mêrê xwe di berfa zivistanê ya xedar de hinartiye nêçîrê û mêrik di berfê de fetisî ye, yan guran ew xwariye. Hin caran jî mêrik xwe gihandiye şikeftekê, li dêwan an li cinan rast hatiye û bela hatine serê wî.

69**- Şikeft:** Yan jî *şkeft*. Ev avahî wargeha girîng a *Çîroka Kurdî* ye. Hertim lehengê çîrokê li şkeftekê rast tê û li wir pêrgê dêwan, cinan, maran û pîrhevokan/pîrelkan dibe. Yan jî leheng di şkeftê de gelşên xwe yên zehmet çareser dike û riya felatê dibîne.

Li ser şikeftan pir-zêde çîrok û meselok hene ku mirov didine sêwirandin. Bi kurtî ez dikarim bêjim ku şkeft Xanedana Çîroka Kurdî ye.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Di şkeftê de timî êzing hene ku lehengê Çîroka Kurdî di rojên serma û yên zivistanan de agir pêdixe hem xwe pê germ bike û hem jî goşt ji xwe re bide bistê. Herweha di gelek şkeftan de kanî yan jî sarinc hene ku pê pêdiviya vexwarina xwe dikin. Min bi xwe jî li Çiyayên Kosorê êzingên kevnare di hin şkeftan de dîtin, gava ku min sedemê hebûna wan pirsiye, gotine ku ji bo şewitandina di zivistanê de ne ji bo kesên li der û şivanên li herêmê.

70- **Efrît:** Di *Çîroka Kurdî* de tenê du efrît hene. Di nava xelkê de ji wan re *Efrîtê Cina* tê gotin. Hin caran efrîtek tenê xwe eşkere dike û tê alîkariya lehengê çîrokê, lê pirê caran jî herdu efrît bi hevûdu re tên alîkariya wî.

Çewa ku di nimreya 53an de jî behsa efrîtan hatiye kirin, hin caran gava ku serê lehengê çîrokê dikeve belayeke giran, ew gustîla xwe badide, hema pêre pêre du efrît li ber wî hazir dibin û jê dipirsin: *Tu dixwazî ku em dinyayê xira bikin, yan ava bikin?* Îcar piştre leheng çi dibêje, ew efrît jî her wisa dikin û daxwaza wî bi cih tînin.

71- **Kose:** Ev koseyê di Çîroka Kurdî de, texlîtek ji efrît, dêw û lehengan e. Ji aliyê fizîkî ve di şûfê mirovan de ne, lê pir qelew in, bi zend û bend in û laşê wan bê mû ye. Lê belê hertim kose di şikeftên di binê erdê de dijîn û zêdetir jî xirabî dikin, gelek caran jinê mirovan ji rê derdixînin û bi wan re têkilîya cinsî dikin, heta zarûkên wan jî çêdibin. Wekî din xirabî bi mirovan nakin.

72- **Cin:** Di çîrokê de, cin tebayên xirabiyê ne û hertim teşqele ji mirovan re derdixin. Lê ew hin caran alîkarî jî bi mirovan re dikin.

Yekcaran keçeke cinî dibe evîndarê lehengê *Çîroka Kurdî* û pê re dizewice.

Çaxê kurê paşayê cinan an keça wî nexweş dikeve, timî mirovek, bi piranî lehengê *Çîroka Kurdî* ji wan re dibe alîkar û wek bizişkekî diçe tedawiya wan dike.

Cin, ji mirovan zêdetir dijminatiya maran dikin û wan dixin dorbestê, çewa ku li pêş hatiye gotin wan dixin şkefteke di binê erdê de û nahêlin ku ew derkevin derva.

Ev dijminahiya ku di navbera cin û maran de ye, ji bo çi ye û ji çi jî rûdaye, mixabin min ew yek di lêkolîna xwe ya li ser folklora kurdî de nepeyitand. Lê ez hêvî dikim ku hin biraderên din li ser vê yekê rawestin û lê bikolin, ka ew sedem ji bo çi ye bizanibin.

73- **Perî:** Ango *horî*, yanî ew qîzikên di bihişta Xwedê de ku wek diyarî dide zilaman.

Gava ku di *Çîroka Kurdî* de navê *perî*yan tê gotin, amaca bingehîn jê qîzeke pir delal e ku di şûfê horiyên bihiştê de ye û hemtayê wê di delaltî û bedewtiyê de nînin. Ew periya ku di çîrokê de tê xuyakirin, hertim digîje lehengê Çîroka Kurdî.

74- **Dêw:** Di *Çîroka Kurdî* de gelek dêw hene û hertim bi lehengê çîrokê re şer dikin.

Dêwên jin hene û yên mêr hene.

Pirê dêwan duserî ne, lê dêwa mê hertim heftserî ye û hertim jî heft kurên wê yên yekserî hehe.

Mala dêwan şkeftek e û li navsera çiyayekî ye. Herweha herêmeke çiyayî tevek arinzî malê dêwekî ye. Kar û îşê dêwan, nêçîr e. Dêw naçin nava aqarên hevdûdu û nêçîr nakin. Dema ku dêwek bi şaşî yan bi qestî diçe nava aqarê dêwekî din, dijminatî dest pê dike û hevûdu dikujin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Ez dikarim bi kurtî bibêjim ku dêwên di *Çîroka Kurdî* de jî weke dijminên niha axa Kurdistanê di nava xwe de dabeş kirine û her yekê di nava herêma xwe de ye û jê dernakeve der.

Di şkeftekê de yan dêweke heftserî digel heft lawên xwe yên yekserî hene, yan heft dêwên birayên hevûdu hene ku bi hev re di şkeftekê de dijîn, yan jî dêwekî tenê heye ku di şkeftekê de bi tena serê xwe dijî.

Eger dêwekî mêr tenê be, tu kes pê nikare. Lehengê *Çîroka Kurdî* jî bi şer pê nikare. Lê ew diçe digerre da rihê wî bibîne û bikuje. Rihê wî dêwî jî, sê kurmik in û li pişta Çiyayê Qaf di qutîkekê de ne, qutîk jî di zikê heywaneke kovî de ye. Bi piranî jî ew heywan xezalek e. Rengê wan kurmikan jî bi piranî weha ye: Yek reş e, yek sor e û yek jî spî ye.

Gava lehengê çîrokê çend seriyên dêwa heftserî bi şûr jê dike jî, dêwê namire. Ji bo mirina wê, divê ku her heft serîyên wê bêne jêkirin.

75- **Qesr-koçk:** Di piraniya çîrokan de qesrek, an koçkek heye. Devera ku qesr an ew koçk lê ye, navsera çiyayekî ye û bi tenê ye, wekî din çu avayî li wirê nînin. Di wê qesrê de yan dêwek dijî, yan dêweke jin tevî keçeka xwe, yan tevî heft kurên xwe dijîn.

Lehengê çîrokê gava li wê qesrê rast tê, dibe mêvanê malê û hin caran pê xirabî dikin hin caran jî jê re dibin alîkar.

76- **Rihê Dêw:** Rihê dêwê yekane ê zilam, sê kurmik in. Ew kurmik di qutîkekê de ne, qutîk di zikê çivîkekê de ye, çîvîk di zikê kîvroşkekê de ye, kîvroşk di zikê xezalekê de ye û xezal jî li pişta Çîyayê Qaf e. Ew xezal hertin avê ji kaniyeke taybetî ve dixwe, da ew kurmikên di zikê wê de nerizin.

Lehengê *Çîroka Kurdî* diçe wan kurmikan ji nava zikê hewqas heywan derdixîne û diperçêqe, wê hingê ew dêw jî dimire.

77- **Pirhevok-Pîrelk:** Ji dêwan û cinan zêdetir, di çîrokan de pîrhevok û pîrelk jî pir hene. Ev pîrelk zêdetir xwe di çîrokên tirsê de nîşan didin û xasma ji bo tirsandina zarûkan têne gotin ku ew bi tenê negerrin û bi riyên xeter ve neçin.

78- **Gurê Manco:** Ev gur, ne ji tîpa gurê di nimreya 92yan de ye.

Di *Çîroka Kurdî* de gelek cûre gur hene, lê *Gurê Manco* tenê yê tirsî ye. Dayikên Kurd gava ku zarûkên xwe êvarê radizînin, lê zarûk şûmîtî dikin û ranazên, ew wan bi *Gurê Manco* ditirsînin, da rakevin û xewşihitandî nemînin.

Her kurdek, ji derveyê beşek ji nîvşa bajarî, di zaroktiya xwe de bi *Gurê Manco* hatiye tirsandin. Bi tirsandineke wisan ku êdî ew gur ji zarûkan re dibû wek nexweşînê.

Ez bi xwe jî di zarûktiya xwe de gelek bi *Gurê Manco* hatime tirsandin. Dema ku diya min, an meta bavê min a gorbihişt Hawê gava digotin min: *Razê! Wa ye Gorê Manco hate te!* Ez pir ditirsiyam û min jî tîpa Gurê Manco weha dianî ber çavên xwe: ”Qîlên wî bihostek dirêj bûne, çavên wî mîna lembaya makînê bi ruhniyeke zer û tûj in, her lepekî wî mînaye dareke guvîjê, pûrta wî mîna dirrika reş tîk bûne, lêvên xwe serobin kirine, gewdê wî mînaye hespê me yê şînboz û wa ye tê ku min bixwe...”

*

79- **Xizanî** (feqîrtî, belengazî û tunetî): Xizaniya di çîrokan de tîneke xirab li lehengê çîrokê dike. Timî xortek an du bira ji ber xizantiyê, warê xwe li cih dihêlin û diçin devereke dûr, li bajarekî biyanî nanoziko dişixulin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ew xortê xizan di demekurtekê de zengîn dibe û dibe kesekî xuyanî, piştre jî dibe paşe yan qiralê wî bajarî.

80- **Xizne û Gencîne:** Çewa ku li jorê hatiye gotin ku xizaniya di çîrokan de tîneke xirab li lehengê çîrokê dike, lê hin caran jî lehengê xizan li xizne û gencîneyên zêran ras tê û hanûhan dewlemend dibe, êdî bi haweyekî wisa dewlemend dibe heta ku paşe û qiral jî xweziya xwe pê tînin. Kesê ku xizne bi yê xizan nîşan dide, navê wî *Mêrê Şevê* ye.

*

81- **Pîrejin:** Karê pîrejînê di *Çîroka Kurdî* de, birin û anîna peyaman e. Ew deverên ku mêr nikarin xwe bigehînin wirê, pîrejinekê dişînin. Xasma di gihandina keç û xortan de, pîrejin dilqekî mezin dide nîşandan. Lê hin caran pîrejin ji bo fesadî û xirabiyan jî tê bikaranîn, hin caran ji bo jirêderxistina jin û qîzan tê bikaranîn û hin caran ji bo kuştina hin kesên xuyanî jî tê bikaranîn.

82- **Kalê Rihdirêj:** Ji vî kalî re *Kalê Mirîxur* jî tê gotin. Lê di Çîroka Kurdî de Kalê Rihdirêj, nîşana xirabiyan e û timî derdikeve pêşiya lehengê çîrokê, jê re sergêjî çêdike.

Bejna Kalê Rihdirêj pir qut e, mîna bihostekê ye. Rihê Kalo ji bejna wî pir dirêjtir e. Kalo gava bi rê ve diçe, rihê xwe li navtenga xwe dipêçe. Ew kal pir xwarin jî dixwe û pirî ku kal bûye, ji mûyan avdeyeke reş di laşê wî de nemaye û her dera wî wisa fîq-spî bûye.

Kalê Rihdirêj timî keçan direvîne û wan dibe dixe şkefta xwe ya di binê erdê de, lê têkilê wan nabe, tenê wan bihn dike û rojê du-sê caran li wan dinere, bi wî hawayî kêmûşa xwe mişt dike û kewja dilê xwe dadixîne. Lê ew Kalê Rihdirêj hertim ji aliyê lehengê çîrokê ve tê kuştin û leheng wan keçan jî xilas dike.

83- **Pîra Xwînxur:** Di Çîroka Kurdî de pîrek heye ku timî vexwarina wê xwîna mirovan e. Di zilaman de jî kalekî rihdirêj heye ku goştê merivan dixwo. Ji yê zilam re dibêjin *Kalê Mirîxwur* yan *Kalê Merivxwur*. Lê ji ya jin re dibêjin *Pîra Xwînxur*. Vexwarina wê jî weha ye: Ew pîrejin timî li tiliya qîzan dimije û xwîna wan dimisîne heta diqedîne.

*

84- **Mêrê Şevê:** Di Çîroka Kurdî de, Mêrê Şevê hertim xwe tîne xewna lehengê çîrokê û pê riya rast, eger leheng xizan be pê xizne û gencîneyên zêran nîşan dide. Lê gava leheng ji xewna xwe bawer neke, îcar Mêrê Şevê xwe lê eşkere dike û her tiştî jê re bi devkî dibêje.

Ev Mêrê Şevê, tê gotin ku piştî bisilmantiyê navê xwe di *Çîroka Kurdî* de guhartiye û kiriye *Xocê Xizir*.

85- **Xewn:** Di *Bingeha Çîroka Kurdî* de xewn, umîdeke mezin e ku ji mirovan re çêdibe. Pir tiştên demepêşê hene ku lehengê çîrokê bi dîtina xewnan pêzan dibe û li wê gorê dimeşe, diçe heta ku li amaca xwe sererast dibe.

Hin caran lehengê çîrokê ji dîtina wê xewna xwe bawer nake, lê careke din û di şeva din de eynî xewnê dibîne. Ew hin caran ji xewna şeva diduyan jî bawe nake, lê di şeva sisyan de jî eynî xewnê dibîne. Eger ji vê carê jî bawer neke, îcar zilamek xwe di xewnê de lê eşkere dike. Eger ew ji vê yekê jî bawer neke, hingê ew zilamê ku tê xewna wî, yê razayî ji xewê şiyar dike û eşkere tiştan jê re dibêje, piştre jî xwe ji ber çavên wî wenda dike.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

86- **Reml-Fal:** *Reml* û *Fal* kêm-zêde herdu nêzê hevûdû ne. Lê belê avêtina *reml*ê ji vekirina falê tîna xwe zêdetir heye.

Zilam bi piranî ji xwe re *remlê* davêjin û kesên ku remlzan in jî zilam in. Lê jin jî bi piranî ji xwe re *falê* vedikin û kesên ku falbêj in jî bi piranî jin in. *Fal* ji bo peyitandina karên piçûk têne vekirin, lê *reml* ji bo peyîtandina karên mezin û mezintir têne avêtin.

Di warê olî û oldariyê de *wehy, mucîze, keşf* û *kerame* hene. Ji aliyê desthelatî û wekî din ve jî *reml* û *fal* hene. Heçîka ev *reml* û *fal* in, çewa ku di nava xelkê de pir hebûne, herweha di çîrokan de jî pir hatine bikaranîn. Çi dema ku bêumûdiyekê xwe li lehengê çîrokê pêçaye, di serê pêşî de wî hewara xwe gihandiye remlzanekî yan falbêjekê.

Ji lehengê çîrokan zêdetir, pirê caran kesên ku desthelatiya wan heye weke paşe, qiran, xan, key û kesên wisa, bi piranî demepêşa xwe bi avêtina remlan dipeyitînin û li wê gorê serûsinçê jiyana desthelatiya xwe bi rêkûpk dikin.

87- **Ava Şîfayê**: Di piraniya çîrokan de kaniyek heye ku ava wê şîfa ye û kesên ku jê vedixwin, nexweş nakevin, jiyê wan dirêj dibe û zû bi zû namirin.

88- **Ava Reş û Ava Sipî:** Di Çîroka Kurdî de du cure av hene ku ji yekê re *Ava Reş* tê gotin: Mirovê delal gava xwe pê bişo, ne delal dibe. Ava din ji *Ava Sipî* ye: Mirovê ne delal gava xwe pê bişo, delal dibe. Ev herdu cure av, di newaleke bêav de hema wisa ji nişka ve derdibin û wisa gur diherikin. Îcar qîzên ne delal yên ku sêwî ne, bê kes û bê mal in û xort wan ji xwe re nabin, gava xwe bi ava sipî dişon, pir delal dibin û dilê xortan dikeve wan, piştre ew ji xwe re dibin û bi wan re dizewicin. Hin caran jî gava sihûd û şans ji qîzekê tê sitendin, ew bi şaşî diçe xwe bi *Ava Reş* dişo û di mala bavê de dimîne.

89- **Hingiv:** Di *Çîroka Kurdî* de pir giranbiha û xweşkiroxê nexweşîyan e. Xasma jî ew nexweşîya ku derman jê re nayê peydakirin, bi hingiv tê tedawîkirin û pê nexweşê li ser doşeka mirinê radibe ser nigan û li jiyana xwe didomîne.

Herweha hingiv mînakek e ji evîndaran re jî ku sing û berê delala xwe pê digêrrînin û di xewnerojkan de li şanikên wê dimijin, delaliya wê bi regê hingivê Berwariyê dişûfînin û soremoçkiya tê de ji bîr nakin.

Behsa hingiv di hin helbestan de û di hin destnivîsên weke yên şîret û pendan de jî pir hatiye kirin ku ew dermanê her derdî ye. Jixwe ev kalên ku xwe di şûfê xortan de dibînin, xwarina wan bêtir hingiv e û şerbeta wî jî pir vedixwun.

90- **Zilamê Kurdûnde:** Di gelek çîrokan de tê dîtin ku paşayek, qiralek an zilamekî pir dewlemend heye ku kurdûnde ye; ji dola wî ne zarûk çêbûne û ne jî pismamekî wî heye. Ha ew bi wî hawayî jiyana xwe domandiye heta ku ew kal bûye û jina wî jî pîr bûye.

Piştî wê yekê, ew zilamê kurdûnde rabûye di jiyê kalîtiyê de geriyaye û bi bajar û diyaran ve çûye, da dermanekî peyda bike ku zarûkek ji jina wî re çêbibe.

Dema ku ev li dermên geriyaye, kalekî rihsipî yan pîrejinekê, xwe li ser devê riya wî pê daye nîşandan û gotiye wî ku *dermanê anîna zarûkan* sêv e.

91- **Dermanê Zarûkanînê:** Sêv dermanekî pir girîng e, xasma di *Çîroka Kurdî* de hertim nîşana xweşî, şadî, evîndarî û dermanê anîna zarûkan e.

Çewa ku li nimreya 79an jî hatiye behskirin, lehengê çîrokê gava sêvekê dibîne yan yek sêvekê dide wî, ew yek weha dibêje wî: ”Êvarê gava tu û jina xwe berî ku rakevin, vê sêvê bikin du qeşt. Qeştekê tu bixwe û yekê bila ew bixwe, hêj bi hev re razên. Wê kurek ji we re çêbibe û navê wî deynin (mesela) Mîzre Mihemed...”

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Çi dema ku lehengê çîrokê gava di hunduruyekî de li keçeke razayî ku rastê tê, dibîne ku sewîlekî tije av û sêveke sor jî di dev de li wirê ye. Pêşî ew hinek av vedixwe, piştre sêvê dike du qeşt û yekê dixwe, yekê jî ji qîzikê re dihêle.

92- **Çêbûna zarûkan:** Di *Çîroka Kurdî* de çi dema ku zarûkek ji jina lehengê çîrokê re çêbûye, kur/law bûye û kêm caran qîz çêbûye yan jî hîç çênebûye. Hertim jî ew kurik bûye mirovekî pir mezin û navûdengê wî li dinyayê belav bûye, hin caran ew bûye paşe, qiral û desthelatiya welatan ketiye binê destên wî. Lê bavê wî, diya wî negihane dema ku ew bûye paşe yan qiral.

93- **Şûr:** Di *Çîroka Kurdî* de bûjena herî navdar a ji bo şerkirinê şûr û mertal in. Lehengê ku şûr bi kar tîne, gelekî mêrxas e. Lewra bi şûr pir nêzê hevûdu dibin.

Her şûrek li gor lehengê xwe tê guhartin. Mesela şûrê Rostemê Zal, her carê çend seriyan bi weşandinekê pekandiye û zilamekî din nikaribûye ku şûrê wî bişixulîne. Li gor çîrokên bisilmantiyê şûrê Hz. Elî ango *Zulfeqar* jî ne kêmê şûrê Rostemê Zal bûye.

94- **Gurz:** Di *Çîroka Kurdî* de ev cûre bûjen, ji bo hilweşandin û rûxandina tiştên girîng e ku di şerên giran de hatiye bikaranîn. Çi dema ku gurz hatiye daweşandin, tu hedefê xwe li ber wî ranegirtiye û rûxiyaye. Mesela eger gurz li siwarekî bikeve, siwar tevî hespê xwe dikevin erdê. Eger li dîwarê sûrekê, an li kelehekê bikeve, rûdixîne yan qul dike.

Di serê pêşî de behsa Gurzê Rostemê Zal tê kirin ku çar zilaman nikaribûne ji cih bileqînin, lê Rostem tiliyeka xwe dixist qulpa wî û dibir û dianî.

95- **Rim:** Di *Çîroka Kurdî* de rim jî çekeke bi navûdeng e. Rim darekî dirêj e û qalindiya wê bi qederê ku destek lê tê hev e, di serê wê de hesinekî tûj heye ku jê re sintîr/sintîrik tê gotin. Du cûre rim hene, yek *Rima Heftmovik* e û ya din *Rima Duwazdehmovik* e. Siwarê ku ne mêrxas be û pir jî bi xwe ne bi bawer be, ew nikare *Rima Duwazdehmovik* bi kar bîne.

Di stiranên folklorî de gava behsa kuştina yekî ku bi *Rima Duwazdehmovik* hatiye kuştin tê kirin, pesnê wî jî tê dayîn ku ew bi wê rima navdar hatiye kuştin û ku hewqas movik jî di laşê wî re derbas bûne. Zilamê ku vê rimê bi kar tîne jî, mêrantiya wî bi derbaskirina gelek movikên rimê diyar dibe ku di laşê yê ku lêxistî de derbas dike.

Di serpêhatiya *Hemdîn û Şemdîn* de, li Zozanê Şerefdînê gava ku bavê Hemdîno Hiseyn Axa bi destê birayê xwe Ehmed Axa hatiye kuştin, ji paş ve *Rima Duwazdehmovik* lê ketiye.

96- **Tîr û Kevan:** Di *Çîroka Kurdî* de bûjena herî navdar a duyemîn ji bo şerkirinê, *tîr û kevan* e. Ji kevên re *keban* jî tê gotin. Şûrê Rostemê Zal çewa ku di *Çîroka Kurdî* de navûdeng daye, herweha di *Çîroka Kurdî* de tîr û kevanê Siyabendê Silîvî jî navûdeng daye. Dema ku Siyabend nav li xwe daye, weha gotiye: *Ez Siyabendê Silîvî me, xwediyê tîr û kevanê zêr û zîvî me...*

Tê gotin ku kevanê Siyabendê Silîvî ji zêr bûye û tîrên wî jî ji zîv bûne. Lê ew gotina ku jinmama wî ew birçî dihişt û wî têr nan nedixwar, tê jibîrkirin.

97- **Hesp:** Çewa ku di çîrokan de ji mirovan lehengek heye, herweha ji heywanan jî lehengek heye ku ew bi piranî jî hespek e, hin caran teryek e, hin caran jî mişkek e. Lê di

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

çîrokên lawiran de bi piranî şêr e û hin caran jî rovî ye. Lewra hatiye gotin ku *şêr qiralê daristannê ye* ku dê behsa wî di nimreya 91ê de bê kirin.

Di çîroka kurdî de hesp devereke pir girîng distîne û ji siwarê xwe re pir alîkarî dike; riyên nenas dinase, psîkolojiya mirovên biyanî û ya herêmên nenas dizane, tiştan bi îşaretan bi swarê xwe dide zanîn û wî bi sqûmatên ku dê hêj nû bibin, dihisîne. Ew hesp hin caran dilqê xwe diguhêre û tiştine dervedemî jî dike.

Dilqê mişk jî di çîroka kurdî de, pir girîng e û mişk mîna mirovan dipeyive, tiştên nihênî bi lehengê çîrokê dide zanîn û riyên nenas jê re dibêje, jê re pir dibe alîkar heta ku wî hin caran ji mirinê jî difilitîne.

Di çîrokan de, sê tîp hesp hene:

a) Hespê Bayê (Hespê ku difire).

b) Hespê Agir (Hespê Brûskê).

c) Hespê Avê (Hespê Deryayê).

Lê ev hersê texlît hesp, di çîrokekê de cih nagirin, tenê ev hersê di çîroka *Gul û Sînem* de hene.

98- **Paytûn:** Jê re Texterewan jî tê gotin. Di *Çîroka Kurdî* de bûjena siwariya qiral, paşe, maqûl û kesên ji wê çînê bûye. Çewa ku paytûn li Kurdistanê heta salên 1960-70yî jî dihatin bikaranîn, ji bo veguhaztina bûkan jî hatine bikaranin.

99- **Teyrê ji bo siwarbûnê:** Di piraniya çîrokan de hertim teyrek heye ku alîkariya lehengê çîrokê dike. Ew teyr hin caran lehengê çîrokê li xwe siwar dike, wî ji devereke pir dûr dibe devera ku dixwaze herê, yan wî ji devereke dûr dibe mala wî. Yekcaran jî teyr lehengê çîrokê ji dinyayekê dibe dinyayeke din.

Ew teyrê efsûn di piraniya çîrokan de bi navê *Teyrê Sîmir* tê binavkirin.

Ew teyrê ku ji lehengê çîrokê re dibe alîkar, pirê caran kal e, di sîxan de ye û nikare bifirre, demeke dirêj xwedîkirineke taybetî lê tê kirin heta ku tê ser kewna xwe ya berê, pirtikên nû di laşê wî de şîn dibin û hêj difirre.

Di *Çîroka Kurdî* de teyrek bi navê *Teyrê Dewletê* jî heye ku behsa wî di nimreya 20î de hatiye kirin, ne ji babeta vî teyrî ye.

100- **Beran:** Di Çîroka Kurdî de du cûre beran hene.

a) Beranê Sêr.

b) *Beranê Hêç.*

Herwekî teyr û hesp û mişk, ew du cûre beran jî di çîrokan de dilqekî mezin didine leyîztandin. Beranê Sêr li ser ruyê erdê ye û devera ku Beranê Hêç lê ye, binê erdê ye.

Di çîrokê de du tîp beranên binê erdê hene: Yek reş e û hertim xirabiyê dike, yek jî fîq-sipî ye û hertim qencîyê dike.

Beranê reş û beranê sipî hertim şer dikin û bi hirran li hevûdu dixin. Lehengê çîrokê dema di binê erdê de ye û dixwaze ku ji wir derbikeve, xwe davêje ser pişta beranê sipî û beran wî derdixîne ser ruyê erdê. Lê eger leheng bi şaşî xwe bavêje ser pişta beranê reş, beran wî dibe binê heft tebeqên erdê.

101- **Zîya-Mar:** Di çîrokan de pirê caran ziyayek (ejdiya- ejdiha, ejderha) dilqê xwe nîşan dide. Îcar ew ziya bi gewdê xwe pirî ku mezin e, salixên wî nayên dayîn. Hin cara ew

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

ziya, xwe li hawîdorê bajarekî geredor dike. Hin caran xwe li hawîdorê xazbaxçeyekî geredor dike û nahêle kes derkeve derva yan here hundur. Gava ew ziya hilma xwe dikişîne pê re mirov, heywan û dar û ber tev diçin dikevin nava wî.

Lê ziyayê çîrokê, tebayekî dilpak e û kêm caran xirabî bi xelkê dike, hin caran jî dixwaze ku xwe bi destên lehengê *Çîroka Kurdî* bide kuştin. Ji ber ku ew ziya berê hin niheqî li mirovan kiriye û xwe gunehkar dihesibîne, cezayê xwe bi kuştinê rewa dibîne.

Ev ziyayê ku di *Çîroka Kurdî* de cih girtiye, di mîtolojiya Grek û Farisan de jî, eynî di şûfê yê kurdî de xwe nîşan dide.

102- **Şêr:** Di *Çîroka Kurdî* de nîşana mêrxastî, palewantî, egîdtî û qehremantiyê ye. Ev heywanê ku *qiralê daristanê* ye, çewa ku di çîrokên kurdî yên rawilan de xwe nîşan daye, di hin çîrokên piraniya neteweyên din de jî her bi eynî dilqî xwe nîşan daye.

Di *Çîroka Kurdî* de çewa ku ji her çîrokê re lehengek heye û di yên mirovan de ew leheng ku *Mîrze Mihemed* e, eynî wisa di yên rawilan de jî leheng bi piranî şêr e.

Şêr di gelek çîrokan de bi rovî re dibe heval û herdu bi hevûdu re dostanî dikin. Hin caran jî rovî dek û dolaban li serê şêr digerîne û şêr ageh ji xwe namîne.

Çi dema ku gelşek, nexweşiyek û teşqeleyek dikeve navbera heywanên kovî, ew pêşî diçin ba şêr û derdê xwe jê re dibêjin. Şêr jî li gor desthelatiya xwe ya daristanê, biryar dide ku kîjan niheq e û kîjan xwediheq e.

103- **Gur:** Di *Çîroka Kurdî* de eşkere bûye ku gur nîşana xirabî, kulzikî, çavnebarî, çavxirabî û gelaciyan e. Herweha ew heywanekî çavbirçî, zikreş, dexez û dilnepak e jî. Ji van xeysetên xirab zêdetir, gur hertim fesadî, gelacî, nebûkarî û derewan jî dike. Ji ber van sedeman e ku gur di nava heywanên kovî yên di *Çîroka Kurdî* de tebayekî nepêbawer û bêrêz hatiye pejirandin.

Di piraniya *Çîrokên Rawilan* de hertim bela gur û hirçê, yan jî ya gur û rovî dikeve nava hevûdu. Ew piştre diçin ba şêr da xwe ji hev safî bikin. Lê hertim gur niheq tê dîtin û Şêr ceza dide wî, an jî wî ji herêmê derdixe.

Lê hin caran şêr tinazên xwe bi gur dike û serê wî mezin dike, pesnê wî dide da ku ew xwe ji xirabiyan vekişîne û heywanên kovî xisar jê nebînin.

Ji bilî *Çîrokên Rawilan ên Kurdî* gelek caran gur bela xwe daye şivanan jî û ketiye nava kerî, ji xwarina xwe zêdetir, gelek mih û bizin û beran herweha kar û berx jî kuştine û bi lez çûye xwe wenda kiriye.

Di xapandin û dek, dolab û fetlan de tenê rovî dikare bi gur û teşqeleyan bîne serê wî. Wekî din gur bi hêsanî şêrê qiralê daristanê jî dixapîne, hirçê jî dixapîne, piling û keftar jî dixapîne û xwe ji destên wan rizgar dike. Lê di *Çîroka Gurê Selikê* de, rovê bi hêsanî gur, bê ku ew ageh ji xwe bimîne xistiye nava selikeke girover û devê wê bi şivikan honaye, li serê girekî bilind bera jêrê daye, selik gêndirr bûye heta ku çûye jêrê nava pêz û şivanan ew kuştiye.

104- **Rovî:** Di gelek *Çîrokên Rawilan* de, leheng e. Herweha çîrokên ku rovî tê de ye, gelekî xweş in û ji aliyê zarûkan ve jî têne jêheskirin. Ji vê yekê zêdetir, rovî gelek caran henekan jî dike û xelkê dide kenandin. Hin caran rovî weke mirovan tiştê ku bi şixulandina mejiyê mirovan derdikeve holê, rovî ew derdixîne holê û pê karê xwe dimeşîne.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Rovî di civata heywanên kovî de bûye nîşana dek, dolab, xap, fetl û hîlebaziyan. Çewa ku ew bi nasnavê *roviyê qarçek*, *roviyê şilqat*, *roviyê xasûk* û *roviyê dekvan* hatiye naskirin, herweha ew bi nasnavê *roviyê jîr, roviyê zana* û *roviyê mêrxas* jî hatiye binavkirin.

Di vî warî de gotinên li ser rovî pir hene. Kesê ku bixwaze zêdetir finazkên rovî bizanibe, bila deh cildên *Xwençe*yê di ber çavan re derbas bike û xasma jî li beşên çîrokên rawilan binihêre

105- **Hirç:** Di piraniya *Çîrokên Rawilan* de, nîşana tiralî û sistatîyê ye. Lê hirç heywaneke çavtêr, nefsmezin, jixwerazî û qure ye, gelek jî milahîm e, heta ku mirov bela xwe lê nexe, ew bela xwe li mirov naxe.

Lê belê gelek caran bela hirçê û rovî dikeve nava hevûdu, lê piştre rovî siqûmateke mezin tîne serê wê. Hin caran hirç û rovî bi hev re dibin xwişebira. Hin caran jî hirç û rovî bi hev re dizewicin; hirç dibe bûk û rovî jî dibe zava.

Dema ku rovî ji hirçê dixeyide û tahn û niçan dide wê, dibêje *hirça devgenî*, *hirça qûnbipirç*, *hirça tirrek*, *hirça virrikî*, *hirça tirsonek* û hwd... Ev gotin pir li zora hirçê diçin û bi wan dixeyide, radibe ku rovî bikuje.

Bi rastî jî hirç pir ditirse, çewa ku di çîrokan de jî hatiye diyarkirin, herweha kesên ku bi çavan jî dîtine, dibêjin ku *dema tiştek ji nedî ve li hirçê derdikeve*, ew dibore û vîrik davêje. Lê camêriya hirçê jî nayê nikarkirin ku dema hirç dikeve nava pêz, yeke tenê ji xwe re dibe û diçe. Yanî weke gur ne zikreş e.

106- **Paşatiya Mar:**

Yekcaran cin li van jîndarên ku *mar* ji wan re tê gotin, tên xezebê û li wan mana li ser ruyê erdê qedexe dikin, wan dixin şkefteke di binê erdê de, destûra derketina ser ruyê erdê jî nadin wan.

Ev mar, ne ji cûnê yê di jimara 90î de ye. Çi dema ku marek xwe di pêvajoya çîrokê de nîşan dide û lehengê çîrokê derb lê dixe, piştre ew mar derdikeve jina kurê paşayê maran. Îcar leşker tên û lehengê çîrokê dibin, didin dadgeha xwe. Hin caran leheng ceza dikin û hin caran jî ew perû dikin.

Di şkeftê de, karbidestiya maran weke ya mirovan hatiye damezirandin; paşayekî maran heye, wezîrên wî hene, lê jina paşê dikare her tiştî bike û çu mar jî nikarin têkilî wê bibin.

Hin caran mar bi dizî derdikevine ser ruyê erdê, da hem xwe li ber tavê germ bikin û hem jî xurekê ji xwe re peyda bikin. Hingê teşqela wan û lehengê çîrokê dikeve nava hev. Îcar gava lehengê çîrokê derb li marekî dixe, marên leşker tên û wî digirin dibine ba paşayê xwe da wî ceza bike. Lê leheng û paşe zû li hevûdu tên û paşe jê alîkarî dixwaze da mar ji binê erdê derkevin ser ruyê erdê. Leheng jî disersebibe heta ku destûra derketina wan ji cinan werdigire yan jî wernagire.

107- **Masî:** Di *Çîroka Kurdî* de çendî ku zêdetir behsa masî nehatiye kirn jî, lê ji aliyê naverokê ve pirê caran navê masî ji bo tiştên sextekarî, nebûkarî û xirabiyan hatiye gotin, çewa ku dibêjin *Masiyê Bejî, Kenê Masî, Masiyê Nêr, Masiya Mê* û hin tiştên wisa yên din... Ev yeka han jî zêdetir li ser weynên jinan ku li mêrê xwe dikin tê gotin.

Mesela *Masiyê Bejî*, tê gotin ku jinekê çend masî birine çolê, li nava erdê ku dê mêrê wê roja din cot bike weşanrtine. Roja din mêrik çûye û çot kiriye, ha ku dîtiye çend

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

masî bi gisnê wî re ji binê axê derketin û xwe bi xwe gotiye: *Hikmetê Xwedê mezin in û rizqê mirovan ji axê dide*... Wî ew masî birine malê û gotiye jina xwe ku *sibehê bo şîva êvarê çêbike*. Rojtira din gava ku zilan êvarê ji cot hatiye malê, jina wî masî di binê savara di sêniyê de veşartine û şîv daniye ber wî. Mêrik gava ew masîyên do nedîtine, pirsa wan kiriye. Jina wî gotiye *ma tu şêt bûyî? Kê dîtiye ku masî ji binê axê derketine? Ma tu nizanî ku masî di avê de dijîn?* Û jinikê li nava xelkê belav kiriye ku mêrê wê şêt bûye ango hişê xwe wenda kiriye heta ku dibêje wî masî ji binê erdê derxistine.

Herweha *Kenê Masî* jî bûye nîşan ji bo jina çavxirab ku ji mêrê xwe tenê têr nabe û têkilî bi zilamine din re dike. Jixwe piraniya Kurdan bi serpêhatiya *masiyê nêr* dizanin...

108- **Cot:** Çendî ku bi wateya *ne kit* e, lê di *Bingeha Çîroka Kurdî* de ev e ku di jiyana mirovan de karekî pir girîng e ku ew ji bo xurê xwe bi cotkirinê çandinî dikin û debara xwe pê dikin. Ev kar bi hezarên salan e ku dest pê hatiye kirin û hêj jî lê tê domandin.

Di piraniya çîrokên ku tê de behsa debara mirovan hatiye kirin, behsa çotkirinê jî tê de hatiye kirin.

Gelek caran bela jî ji cotariyan re derdikeve. Dema ku cotarî diçe ser zeviya xwe û gayên xwe dixe binê nîr da cot bike hingê bela wî û rovî, yan bela wî û hirçê li hevûdu dikeve.

109- **Gamasî-Hûh:** Di *Bingeha Çîroka Kurdî* de gamasiyek heye ku ew vê dinyaya ku em lê dijîn, li ser tûjika qiloçekî xwe ragirtiyye.

Ev bawerîya pelişî tiştekî pir kevn e ku hêjî xwe di hin çîrokên kurdî de diparêze. Lê hin caran pisporên *Çîroka Kurdî* dibêjin ku ev gamasî bi wateya ga û masî ye, yanî jiyana mirovan li deverên ku av lê heye bi masiyan û li deverên ku bej e jî bi ga, yanî bi cotkirinê tê meşandin.

110- **Pisîk:** Çi dema ku pisîk xwe di çîrokeke kurdî de nîşan dide, hertim bi xwediyê xwe re melaqî, şelaqî, henek û şorekiyan dike. Heta ku ji pisîkê tê, ew xwe bi xwediyê xwe şêrîn dike. Lê hin caran pisîk karê birin û anîna peyamên nihênî jî dike, hin caran rê nişanê lehengê çîrokê ango xwediyê xwe dide û li pêşiya wî diçe, heta ku wî digehîne devera ku dê here wir.

Hin caran jî pisîk bi mar û seg re jî hevaltî dike û hersê alîkariya xwediyê xwe dikin, wî ji siqûmat û atarên giran rizgar dikin û wî digehînin felatê.

111- **Dîk:** Di hemû çîrokên kurdî de gava ku dîk hebe, bêguman karê wî yê sereke *meletî* ye û bang dide, xelkê ji xew şiyar dike da kes ji kar û îşê xwe û ji bo perestiniya ji Xwedê re dereng nemîne.

Dîk ji aliyê jinan ve jî pir zîrek e û di ola wî de mehra wî li gelek jinan dibe, jê re sînorê jimara jinanînê tune. Ev yeka dîk, bûye derbûmesele ji wan zilaman re jî ku gelek jin tînin, xelk dibêje wan: *Ma tu bûyî dîk?* Ji xwe mesela *Dîkê Hesen Begê* jî li Kurdistanê navûdeng daye.

Lê gelek caran teşqele dikevin navbera dîk û rovî jî. Herweha teşqele di navbera dîk û wawîk de jî pir çêdibin. Ji xwe qirêna dîk û elokan deng daye.

112- **Kew:** Di kîjan *Çîroka Kurdî* de eger kew hebe, ew nîşana delalî û xweşikatiyê ye. Karê wî yê sereke xwendin e, dike qebeqeb û dengekî xweş dixe dol, newal û gelîyên çiyayên Kurditanê. Hin caran jî kew bi safîtî û bi bêfamî tê nasîn.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Di çîrokên rawilan de gelek caran bela kew û rovî dikeve nava hevûdu, hin caran jî kew bi rovî re dibe heval û berê xwe dide mala Xwedê ango pê re diçe Hecê. Lê ew piştre bi devê rovî tê xwarin.

113- **Dawudok:** Ji vî teyrikê piçûk re *Silêmanê Dunikul* jî tê gotin. Di kîjan *Çîroka Kurdî* de be, ew nîşana evînê û bûjena dana mizgîniyan e. Herweha gelek caran ew bi rovî re hevaltî û bi kew re jî dostanî dike, bi hevûdu re dest bi kar û îşê mirovatiyê dikin.

Di ferhenga erebî de jê re *hudhud* tê gotin. Ev teyrikê piçûk, dibe ku ji serpêhatiya Belqîz û Silêman Pêxember be jî, gelek rind tê naskirin. Herweha ji bo xortên Kurd jî bûye dermanê evîndartiyê.

114- **Nexweşî:** Çewa ku nexweşî di nava xelkê de heye, herweha di *Çîroka Kurdî* de jî pir heye. Lê di çîrokan de bi piranî nexweş qîz e, ew qîz jî yan qîza paşayekî ye, yan qîza qiralekî ye, yan jî qîza yekî weke wan e.

Ew nexweşî, ji ber dilketinê çêdibe. Qîz gava ku dil dikeve xortekî, yan ji fihêtan nikare eşkere bike yan jî ji tirsan nikare, herweha belkî çara ku bike jî tune, îcar ew pê dikedire û hin bi hin nexweş dikeve. Herweha destûra ku xort were qîzikê ji bavê wê bixwaze jî tune, ji ber hindê qîzik dibe nexweşa mirinê.

Îcar bavê qîzikê li dermanê xweşkirina qîza xwe digere û hekîman dide berhevkirin û bi fermanekê dide xuyakirin ku kê qîza wî baş bike, ew dê qîza xwe bide wî. Ha piştî vê fermanê, riya ku dilketiyê qîzikê xwe bi xeysetê hekîmekî bigehîne ba wê, vedibe û bi tedawiyeke hindik qîzik ji nexweşiyê radibe, piştre jî digîje mirazê xwe û bi dilketiyê xwe re dizewice. Lê hin caran jî ew diketin di qelpika wê de asê dibe û nagîje mirazê xwe.

Nexweşîna din jî ya jinan e, ango nexweşiya jina bi mêr e. Jin dixwaze belakê bîne serê mêrê xwe, lê wek behane nexweşîna xwe dide nîşandan û mêrê xwe bo peydakirina derman dişîne li bajar û welatan dide gerandin. Di wê gerê de, hin caran bela tên serê mêrik û hin caran jî ew venagere mala xwe. Lê hin caran jî ew li mirovekî zana û bîrewer rast tê û derdê jina xwe jê re dibêje. Ew kes fikreke nû dide mêrê jinikê û mêrik bi şûnde vedigere diçe mala xwe, li wê gorê çare ji ”nexweşî”na jina xwe re dibîne. Nimûneya vê yekî çîroka "Xwişka te li Pirmiz dike tir û fis, nanê me yê genim li vir dibe ceh û garis" eşkere daye zanîn.

115- **Hekîm:** Ev peyvika erebî, rind xwe di nava zimanê kurdî de bi cih kiriye ku bi wateya *darû, bizişk, textor/doktor* û xweşkiroxê nexweşînan e. Di nava xelkê de dema ku dibêjin *hekîmê kurmancî*, ew kes e ku dermanê wî tev ji giya û şînatiyan in. Lê bi rastî jî hekîm pirê caran bûne xweşkiroxê nexweşînên giran û nexweşan ji doşeka mirinê rakirine ser nigan.

Di *Çîroka Kurdî* de çi dema ku qiralek, paşayek û desthelatiyek li deverekê hebe, hekîmek û zêdetir, ên wê desthelatiyê jî hene. Ew hekîm çi li nava bajaran be û çi jî li gundan be, li nava xelkê jî digerrin û nexweşan derman dikin.

Ji dermankirina berbiçav zêdetir, pirê caran hekîm xwe xistine nava stiranên folklorî jî xasma di yên evîn û evîndariyê de ku bangê hekîm dikin û dibêjin t*u bi Xwedê kî hekîmo/ were vî dilê min biqelişîne/ kula tê de derbixîne/ dermanekî jê re bibîne...*

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

116- **Derman:** Ji bo çareseriya nexweşînan, gava ku *derman* li nexweşê çîrokê tê bikaranîn, pêre pêre ew nexweşî xwe bi xweşiyê vedigêrre û yê/ya nexweş radibe ser nigan, dest bi jiyaneke nû ya xweştir dike.

Gelek cureyên cuda yên dermanan hene ku her yekê ji bo derdekî yan ji bo nexweşînekê têne xebitandin. Ew derman pirê caran sîv e û navê wê jî bi piranî *Sêva Xweşiyê* ye.

Gotineke Pêşiyan weha hatiye gotin: *Xwedê derd daye, derman jî daye*.

117- **Alîkarî:** Yan jî *yarmerî*, hem di *Çîroka Kurdî* de û hem jî di *Toreya Kurdî* de rind xwe bi cih kiriye û ji hezarê salan ve ye ku li alîkarîya bi hevûdu re tê domandin. Alîkarî ne tenê ji bo ya mirovan bi hevûdu re û di nava mirovan de, herweha di nava heywanên kovî de jî bingeheke asasî ye ku yên cuwan bi yên pîr û seqet re alîkarî dikin.

118- **Xwezîtî:** Ev gotin gelek caran û ji aliyê pir kesan ve tê gotin, xasma jî jin pirê caran vê gotinê dubare dikin. Çewa ku di *Çîroka Kurdî* de tê gotin, di nava xelkê de jî pir tê dubarekirin. Weke:

- *Xwezî* ez kole nejiyabûma.
- *Xwezî* ez gihabûma azadiyê.
- *Xwezî* dijminê min hinekî zana bibûna.
- Xwezî mêrê min law bûna, bila kirasê min caw bûna (Gotina Pêşiyan).

Lê pêdivî ye ku ev gotina pêşiyan ji bîra mirov neçe: *Mirov bi xweziyan, ranahêje baqê keziyan*.

*

119- **Derew:** Devera ku gotina rast lê hebe, wê gotina derew jî lê hebe. Çewa ku devera xweşî lê hebe, hin caran wê reşî jî lê çêbibe.

Ev peyvika sik, jê re gotina mixabiniyê ye ku çi di nava xelkê de be û çi jî di çîrokên me de bin, hin caran tê bikaranîn.

Gotineke menşûr weha hatiye gotin: *Derew hene û derewkok hene*. Lê hin derewên ku di *Çîroka Kurdî* de hene, ji van herdu babetan jî cuda ne; ew, derewên wisa qirase ne ku ne zanîna mirovan û ne jî biriya mirovan digîje wan radeyan. Mesela weke ku dibêjin:

- *Ewr qelişîne, filankes çûye ku wan pîne bike.*
- *Min di xelayê de du cewrik xwaribûn, niha ew di zikê min de bûne seg û dirreyîn.*
- *Min zebeşekî ji lemê kir û ketim navê, ha ku min dît ez di nava sûka bajarekî de me.*
- *Ji mêran re derew, ji pîrekan re dizî çênabe.*
- *Lema kundirê tûrrên xwe dirêj kirine heta ku çiya û banî tevek di binê wan tûran de wenda bûn.* Û gwd...

Gotineke pêşiyên me weha jî heye:

- *Mirovê derewîn, carekê dixwo firavîn.*

Di nava xelkê de ji kesên ku pir derew dikin re xeysetnavên weke *qelşo, tîşo, çîro, vîro, çorto û hwd* jî dibêjin.

120- **Şêwra Roviyan:** Di Çîroka Kurdî de gava lehengê çîrokê (kî dibe bila bibe) bixwaze tiştekî bike, bi hinekan dişêwire hêj wî tiştî dike yan nake. Ew şêwr jî hin caran bi jîrik tê kirin, hin caran bira bi bira re dike û hin caran jî civateke şêwrê heye ku leheng an yê kesthelat pê dişêwire. Ha ew şêwr, di Çîroka Kurdî de xwe xistiye nava rawilên çolane jî.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Rovî di nava rawilên çolane de gelek xirab, xasûk, dekvan, bêbext û bêsoz hatiye naskirin. Herweha bêtifaq, serberedayî û gelek ji xwe razî jî hatiye pejirandin. Lê belê dîsa jî, rovî bêgav maye ku rêz li şêwr û şêwirmendiya di Çîroka Kurdî de bigire.

Îcar rovî tev bi şev li şikeftekê kom dibin û şêwra xwe dikin ka wê sibehê çi bikin û çi nekin. Ew di şêwra xwe de soz û peyman didin hevûdu û behsa gelek tiştan dikin ku wê sibehê bikin. Lê gava dibe sibeh, her roviyek radibe bi tena serê xwe derdikeve û diçe nêçîra xwe.

Îcar ev gotina han di Çîroka Kurdî de bûye nîşana bêtifaqî, pêkenîn û bêbawerîyê. Çi gava zilamek tiştekî dibêje, ango wê sibehê, dusiban weha û weha bike, zilamê duyemîn dibêje wî: *Bila ne mîna şêwra roviyan be*! Ango divê ku tu bikî.

121- **Hejîr:** Çi di *Çîroka Kurdî* de be û çi jî di nava xelkê Kurd de be, dema ku behsa hejîran tê kirin, derew têne bîra mirov. Di pirê caran de jî behsa *hejîr*ê di derewên ku têkiliya xwe bi karê kêmûşê ve heye tê gotin. Li ser vê yekê gelek meselok hene, lê bi kurtî ez ê tenê vê binivîsim:

- Zilamek çûye diziya hejîran, rabûye serê kemekê (dar) û hejîr xwarine. Keçek jî pawancîya hejîran bûye. Dema keçikê dîtiye wa ye zilamek li serê kema hejîrê ye û hejîran dixwe, dijûn pê kirine. Zilam jî gotiye keçikê: *Hiş be, eger ez werim xwarê, ez ê wiha wihayê te bikim*. Keçik bêdeng maye û li benda ku zilam were xwarê demekurtek sekiniye, lê zilam nehatiye xwarê û her hejîr xwarine. Îcar keçikê di ber xwe de wisa hêdî gotiye: *Hema hejîran dixwo û derewan dike*.

121- **Caw:** Ev peyvik çi di *Çîroka Kurdî* de be û çi jî di nava xelkê Kurd de be, bûye nîşana derewên pir mezin ên ku tîşo-bertîşo ne.

Çi dema ku zilamek dikeve nava xeberdanê û bê ku ageh ji xwe bimîne, hema dibêje û li axaftina xwe didomîne, kesên li dorê jî tev dizanin ku rastî ji wê gotina wî re tune.

Ev gotina *caw cawê te ye* jî çîrokeke bi serê xwe ye ku xwerû ji derewên pir mezin hatiye holê.

123- **Çortan:** Ev peyvik çi di *Çîroka Kurdî* de be û çi jî di nava xelkê Kurd de be, eynî weke *caw* û *hejîr*ê bûye nîşana derewên pir mezin ên tîşo-bertîşo ku ji wan re pîvan û kêşan û sînor nînin.

Çaxê yek dikeve nava xeberdanê, bê ku ew ageh ji xwe bimîne, hema bi derew gava dibêje û dibilîne, kesên li ba wî jî tev dizanin ku ew ne rast dibêje, îcar jê re van xeysetnavan jî dibêjin: *Çorto, tîşo, qelşo, çortan çortanê te ye, malçortan*...

Çortan, seriyekî girover weke pîvazeke normal e ku ji dewê hişkkirî çêdibe. Jê re *keşk* jî tê gotin. Dema ku mirov seriyek çortan dixe nava ava germ, hin bi hin ew dipişife û mîna xwe wek berê dîsa dibe dew. Bi piranî ji bo mehîr û taxûza zivistanê tê bikaranîn.

124- **Qapan:** Ev peyvik çi di *Çîroka Kurdî* de be û çi jî di nava xelkê Kurd de be, nîşana sistayî, qanîmanîtî, dixwerenedîtî û bêqudûmtîyê ye.

125- **Şîrê Teyran:** Ev gotina nebûyî ango *mehal*, di *Çîroka Kurdî* de rind cihê xwe girtiye û di nava xelkê de jî tê bikaranîn. Dema xwedîkirineke, lêmêzekirineke zêde li tiştekî yan li mirovekî tê kirin, piştre dibêjin ku *ew bi şîrê teyran hatiye xwedîkirin*.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ev gotin weke term di çîroka *Gul û Sînem* de xweş diyar bûye, gava ku Sînem serpêhatiya xwe û dotmama xwe Gulê ji lehengê Çîroka Kurdî re gotiye, weha daye zanîn: *"...Min Gulê bi şîrê teyran xwedî dikir..."*

126- **Beravêtina Mirîşkê:** Ev peyvik ji tiştên nebûyî re ango ku kirina wî tiştî ne mikun e ku bibe re tê gotin. Lê di *Çîroka Kurdî* de û di nava xelkê Kurd de pir tê gotin. Xasma jî dema ku di çîrokê de keçek û xortek digîjin hevûdu û bi hev şad dibin, lê pir kesên din hene ku zivêr dibin û nerihet dimînin, tê gotin ku *mirîşkan jî ber avêtin*, yanî tiştekî ecêb, sosret û nebûyî bûye.

Heywanên ku hêkan dikin ber navêjin, lê yên ku dizên ber davêjin.

127- **Zana Hêstirê:** Ev peyvik çi di *Çîroka Kurdî* de be û çi jî di nava xelkê Kurd de be, li ser tiştên nebûyî, neciriyayî û ji tiştên ku kirina wan ne mikun be re tê gotin. Herweha dema ku bûyereke mezin jî çêdibe û xelk ji ber wê şaş dimîne, tê gotin ku *ma hêstir zaye?* Yanî normal e ku ev tişt çêbûye.

Hêstir heywanek e ku maka wê mehîn e û bavê wê ker e. Lê zêdeyî ji dola wê çênabe.

128- **Hêka Mehînê:** Ev peyvik çi di *Çîroka Kurdî* de be û çi jî di nava xelkê Kurd de be, nîşana saxiktî, bêfamî, nezanî û bêramantiyê ye ku ji hin kesên xwediyê van xeysetan re tê gotin. Herweha çîrokek jî bi navê *Hêka Mehînê* heye (Mehîn heywanek e ku dizê).

129- **Zarûka Çîrokê:** Çi dema ku tiştek zû serê xwe digire û derdikeve holê, herweha di nava xelkê de zû belav dibe û tê naskirin, tê gotin ku weke *Zarûka Çîrokê* çêbûye. Lewra di *Çîroka Kurdî* de gava ku zarûkek çêdibe, ew bi demekurtekê mezin dibe û dest bi lehengtiyê dike.

Ev peyvik çi di *Çîroka Kurdî* de be û çi jî di nava xelkê Kurd de be, pir caran tê gotin û hertim dubare dibe.

130- **Bawerî:** Di *Çîroka Kurdî* de bawerîyeke pir xurt heye û teqla wê zahf giran e. Lehengê çîrokê hertim bi xwe bawer e ku dê di wî/di vî karê ku wî dest avêtiyê de bi ser bikeve. Herweha di çîrokê de dazanîneke ango hêzeke nepenî jî heye ku timî danasîna riya felatê bi berfirehtî xistiye hinavên lehengî û di bingeha hisiyatên wî de bi cih kiriye.

131- **Qencî û Xirabî:** Di Çîroka Kurdî de hertim qencî û xirabî derdikevin pêşberê hev û şerên hevûdu dikin. Lê di encamê de timî qencî zora xirabiyê dibe û bi ser ser dikeve.

Lehengê *Çîroka Kurdî* hertim qencîyê dike û hîç li xirabiyê nasêwire. Ew li pêşberî xiraban jî rind dilipike, heta ku xirabiyeke eşkere ji kesî nebîne, xirabî jî pê nake.

132- **Zîpika Hesinî:** Di Çîroka Kurdî de nîşana felaketê ye û gotina ji bo rûdana atarine giran tê gotin. Gava yekî dilxirab bixwaze ku bigîje amaceke xwe ya taybetî, bi hatina *Zîpika Hesinî* tirsê dixe dilê mirovan. Bi piranî jî di nava jinan de, xasma jî ji aliyê jinbavê ve ji bo zarûkên hêwiya wê pirê caran tê gotin.

133- **Mirin:** Di *Çîroka Kurdî* de devera dawîn, mirin e. Çewa ku mirin zagona jiyanê ye, lehengê *çîrokê* jî hertim xwe ji mirinê re amade dike. Pir îş hene ku ew dizan jî dê jiyana wî tê de bigîje dawîyê, dîsa jî ew bê tirsa ji mirinê dike. Ji vê yekê zêdetir, ev yek jî pir balkêş e ku dema lehengê çîrokê diçe riyeke dûr, diya wî, yan bavê wî, yan jî yeke/yekî din jî ku pir çavrêniya wî dike û ji bo wî nexweş dikeve, heta ku dimire jî, leheng nayê. Lê dema ku leheng tê, pêşî diçe seredana gora wan miriyên xwe û tiştekî xêra wan li jar û belengazan belav dike.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Kürt folklurunda hikaye araştırması

Özet:

Kürt Edebiyatının büyük bir bölümü, Kürt Folklorudur. Folklorun en zengin dalı hikayelerdir. Ancak bu zenginliğin çoğu sözlü olarak anlatılır.

Bir kişi veya kurum eger bir milleti, güzel bir şekilde tanımak istediğinde, önce o milletin kültürüne ait folklor hikayelerini okumalı ve incelemelidir. Böylece iki şey ortaya çıkıyor:

. Hikayelerin sahibi olan milletin yaşam durumu

. Hikaye sahibi ola milletin Kültürünün zenginliği ve zayıflığı.

Kürt hikayesinin zenginliği şu üç örnekle gösterilmektedir:

. ”Çîroka Abidê Şkeftê” (Mağara Abidi) masalında, 3 değişik dünya var, her biri başka bir yaşam tarzına sahiptir.

. ”Gul û Sînem” (Gül ve Sinem) hikâyesi'nin 7 değişik versionu vardır. Her biri, diğişik anlatım şekline sahiptir.

. Kürt Öykü Veritabanında, 12 yıllık araştırmam sonucunda ortaya çıkan 133 farklı nesne vardır.

ANAHTAR KELİMELER: *Hikaye, hikaye anlatımı, araştırma, pencinar, wikipedia, zınar*

DENGBÊJÎ LI RADYOYA ÛRMÎYÊ Û DENGBÊJ ÎRAN XANIMA MUCERED

Sevim Uluç Subaşı
Beşa Ziman û Çanda Kurdî-Zaningeha/ Turkîya

PUXTE:

Her neteweyek xwediyê çand û hunerekê ye. Ev çand û huner xwe bi gelek awayan dide der. Di nava Kurdan de dengbêjî yek ji van huneran e. Ev huner nerîteke berbelav e ku ji gencîneya çand û zimanê Kurdî xwedî dibe. Tê de vegêran, dîrok, awaz û gelek rengên civakê veşartî ne. Ev çand û nerît di nava kurdan de her çiqas bi tesîra gelek sedeman lawaz bûbe jî hêj jî didome û digihêje nifşên nû. Di nav vê nerîtê de gelek dengbêj deng û reng vedan, li dû xwe mîratek û gencîneyeke dewlemend hiştin. Hin dengbêjên ku di nava tradisyona hunera dengbêjiyê de xwedî bûbûn, ji wan gelek kesayet hatin jibîrkirin û hin ji wan jî weku temsîlkar bi nav û deng û temsîliyetên xwe ketin nav hafizeya miletê xwe. Îran Xanima Mucerred (1951-2001) jî yek ji van hunermendan e ku yekem car bi awayekî fermî li rojhilatê Kurdistanê, di radyoya Ûrmiyê de kilam strane. Radyoya Ûrmiyê di sala 1969an de dest bi weşana Kurdî kiriye. Ji bilî Îran Xanimê dengbêjên weku Xalê Birê (Îbrahîm Newrozî 1928-2000), Hemîd Yûsifî (1926-1979), Mistefa Elîzade û Ehmed Ehmedî jî di Radyoya Ûrmiyê de bi salan kilam strane. Girîngiya Îran Xanimê di nav nerîta dengbêjiyê de bêyî Radyoya Ûrmiyê nabe ku bê ravekirin. Loma di vê xebatê de qala Radyoya Ûrmiyê û weku temsîlkara dengbêjên jin qala jiyan, kilam û şêwaza Îran Xanimê hatiye kirin. Tê zanîn ku Îran Xanimê gelek kilam strane ku li gorî hin lêkolîneran hejmara wan digihêje nêzî dused kilaman. Lê di vê gotarê de ji ber qewareya gotarê weku nimûne neh kilamên wê hatine deşîfrekirin û nirxandin. Yekem kilama wê ya ku li Radyoya Ûrmiyê straye jî di nav van kilamên deşîfrekirî de bi cih bûye. Di vê xebatê de du xalên girîng tên ravekirin. Yek jê weku temsîlkara dengbêjên jin, rewşa Îran Xanimê û micadeleya wê ya dengbêjiyê ya li beramberî civakê tê destnîşankirin. Ya duyem jî çawa ku li Iraqê Radyoya Bexdayê, li Kavkazê Radyoya Rewanê bûye serdemeke nû ji bo dengbêjîyê û tomarkirina dengên dengbêjan, peywendîya wan a bi civakê re û xisûsen derketina pêş a dengbêjên jin bi heman rengî li Îranê jî Radyoya Ûrmiyê di vê temsîliyetê de bûye cih û stargeha dengbêjên rojhilatê Kurdistanê. Em di vê xebatê de weku encam gihiştin çend xalên girîng. Ya yekem şêwaza dengbêjiya Îran Xanimê û tesîrwergirtina wê ya ji Dengbêj Xalê Birê ye. Ya duyem mîna gelek dengbêjên jin serborî û sernivişta wê ya xemnak e ku ev dîyar bû ku bi nasnameya wê ya jintiyê re gelek peywendîdar e. Ya sêyem jî rola Radyoya Ûrmiyê û tesîra wê ya li civak û dengbêjan û xuyabûna dengbêjên rojhilatê Kurdistanê bi awayekî neteweyî.

Peyvên Serekî: *Radyoya Ûrmiyê, Dengbêjî, Kilam, Dengbêjên Jin, Îran Xanima Mucered*

Zakho Centre
for Kurdish Studies

DESTPÊK:

Dengbêjî çandeke kevnare ye ku hemû hêmanên çanda kurdan di xwe de dihewîne. Tradîsyona çanda devkî ye. Êş û azarên milletekî, çîrokên evînî, qehremanî û mêraniyê, kêf û şadî, hezkirin û hwd. mijarên sereke yên dengbêjiyê ne. Ev mijarên curbicur bi awayekî hunerî û estetîk ji aliyê dengbêjan ve bi rengekî nû ve tê veguhastin.Yanî dengbêjek dikare mijara kilama xwe bi efsaneya milletê xwe, bi serboriyên xwe yan jî bi serboriyên derdora xwe bi awayekî rengîn estetîze bike. Dengbêj bi çanda devkî mezin bûne û şert û mercên civaka xwe, kelepor û kevneşopiya xwe baş dizanin û vê jî bi hafizayeke xurt dixemilînin. Hin dengbêj kilamên xwe bi enstruman, hin ji wan jî bê enstruman strane. Em bi rehetî dikarin bibêjin ku dengbêjek hem şair û muzîkjen hem jî edebiyatzanek e.

Kilamên dengbêjan bi her awayî, çi evînî çi qehremanî be ruhekî neteweyî di nava gel de pêk tîne. Kurdek di kilamekê de dikare hestên xwe, bîr û baweriyên xwe, êşên xwe, erdnîgarîya xwe û tarîxa xwe bibîne û hîs bike. Ev jî hişmendiyeke neteweyî pêk tîne û tesîreke mezin li gel dike. Gelek dengbêj mal bi mal, gund bi gund geriyane û li dîwanan, kilam gotine. Em dikarin bibêjin ku ev dengbêjên dîwanan xwediyê kêm guhdêran bûne. Çimkî tenê bi malek yan jî bi gundekî sînorkirî mane. Digel vê hin dengbêj jî bi saya dezgehên ragihandinê yên weku radyoyan gihiştin hemû bajarên derveyî welêt. Radyoya Ûrmiyê yek ji van radyoyan e ku di sala 1969an de li rojhilatê Kurdistanê di hundirê hefteyekê de bi tevahî saetek dest bi weşana kurdî kiriye (Mahabad, 2022, Bernamegeh). Piştre di hundirê hefteyê de rojê du saet di Radyoyên Tehran û Kirmanşahê de weşana Kurdî dest pê kiriye. Gundiyek, bajarîyek di heman demê de bêyî ku hev nas bikin li heman radyoyê bi heman hestî gudarî kirin. Ev hest di nava Kurdan de çi bi zanetî çi bi nezantî hestek û ruheke hevpar û neteweyî pêk anî.

Ji bilî Radyoya Ûrmîyê, Radyoya Êrîvanê di sala 1955an de di hefteyê de sê car êvaran 15 deqe, paşê di demsala payîzê de nîv saet, piştî saleke din jî saetek dest bi weşana Kurdî kiriye. Radyoya Bexdadê jî di sala 1939an de rojê 15 deqîqe dest bi weşana Kurdî kiriye. Di sala 1954an de saetek weşana Kurdî kiriye (Elend, 2021: 82-90). Bi hezaran kilamên dengbêjan hate arşîvkirin. Bi saya van radyoyan gelek dengbêj bi deng û kilamên xwe hatin naskirin. Bi taybetî jî dengbêjiya jinan zêdetir bal dikêşa. Rewş û atmosfera Rojhilata Navîn ji bo jineke ku pêşengîya çanda neteweya xwe û hunera xwe bike zehmet bû, lê gelek dengbêjên jinên Kurd dengê xwe û rengê çand û hunera xwe li hemû dinyayê belav kirin. Ji van dengbêjan çend kes ev in; Ezniva Reşîd, Sûsika Simo, Meyremxan, Eyşe Şan, Elmas Xan, Zadina Şakir, Nesrîn Şêrwan, Aslîka Qadir, Sîma Bîna, Xanim Baqirî, Gulbihar Amedî, Fatma Îsa, Dayika Cemalî, Fetane Walidî û hwd. (Yaş, 2020, Dilop). Yekem car li Rojhilatê Kurdistanê bi navê Îran Xanima Mucerred li Radyoya Ûrmîyê dengbêjeke jin bi awayekî fermî bi zaravayê kurmancî straye. Helbet beriya Îran Xanimê jî gelek jin di nava malbatan de, li gundan li dawetan û bi daxwazên derdora xwe gelek kilam strane. Li Xorasanê yekemîn car Nene Qemerûnî û piştî wê Banû Şerwanî dest bi kilamgotinê kiriye. Li mintiqa Mukiryanê Menic Heyran di dawet û şahiyan de straye. Li mintiqa Sinê Fettane Welîdî straye. Li Kirmanşahê jî yekem car Qemer Benî Erdelan, Xanim Baqirî û Mestûre Esedî kilam gotine. Li Bakurê Kurdistanê yekem car weke Gula Fille tê zanîn lê dengê wê tüneye. Loma em dikarin bibêjin yekem car Meryemxan straye. Li Başûrê Kurdistanê jî yekem car Gulbihar û Fewzîye

Mihemmed ku her du xwişk bûn, strane. Di naveroka kilamên wan de nimûneyên evîndarî, hişyarî, gilî û gazin û bangên neteweyî hene (Oramar, 2016, Bernameya Awaz).

1. Radyoya Ûrmîyeyê û Weşana Wê Ya Kurdî

Mintiqeya Ûrmiyê xwediyê dîrokeke qedîm û kevnare bûye. Gelek bûyer û serboriyên dîrokî li vê mintiqeyê qewimîye. Loma bajarê Ûrmîyê navendeke çand û hunerê bûye. Di gelek berhemên kevin de behsa bajarê Ûrmiyê û rewşa xweserbûna wê hatiye kirin. Ji gelek medeniyetan re bûye weku paytext. Her gav ev bajar û herêma wê ya kevnare û qedîm bûye hêlîna kelepora Kurdî. Ev herêm bûye navenda gelek dengbêj, heyranokbêj û hunermendên navdar (Oremar, 2016, Bername Awaz). Kilamên wan, deng û awazên wan bi awayekî gihiştiye heta derveyî welêt jî. Ev kilamên dengbêjan; çi evînî çi qehremanî be ruhekî neteweyî di nava gel de pêk aniye. Ji ber ku kurdek di kilamekê de dikare hestên xwe, bîr û baweriyên xwe, êşên xwe, erdnîgariya xwe û tarîxa xwe bibîne û hîs bike. Ev jî tesîreke mezin li mirovan dike. Gelek dengbêj mal bi mal, gund bi gund geriyane û li dîwanan kilam gotine. Em dikarin bibêjin ku ev dengbêjên dîwanan xwediyê kêm guhdêran bûne. Çimkî tenê bi malek yan jî bi gundek sînorkirî mane. Digel vê jî hin dengbêj jî bi saya dezgehên ragihandinê wekû radyoyan gihiştin hemû bajarên derveyî herêma Rojhilata Kurdistanê. Radyoya Ûrmiyê yek ji van radyoyan e ku di sala 1969an de li rojhilatê Kurdistanê di hundirê hefteyekê de bi tevahî yek saet dest bi weşana kurdî dike. Heke kêm be jî jinên dengbêj (bêyî rewşeke fermî) li devera Ûrmîyê hebûne. Di radyoyê de cara ewil Îran Xanima Mucerred li ser daxwaza dengbêj Xalê Birê, Mistefa Elîzade û Hemîd Yûsûfî di sala 1971an de weku temsîlkarên dengbêjên jin bi awayekî fermî li Radyoyê Ûrmîyê dest bi kilamgotinê dike. Ji bilî Îran Xanima Mucerred, Îbrahîm Newrozî (Dengbêj Xalê Birê), Hemîd Yûsûfî, Mistefa Elîzade jî dengbêjên bi nav û deng ên Radyoya Ûrmîyê bûne. Dengbêj Xalê Birê li radyoyê gelek kilam gotine. Wî bi xwe bo nêzî şeş sed kilaman beste çêkiriye. Hemîd Yûsifî û Mistefa Elîzade jî bi deng û awazên xwe gelek xizmet dane. Di Radyoya Ûrmîyê de gelek kilam hatin arşîvkirin. Piştre di hundirê hefteyê de rojê du saet li Radyoyên Tehran û Kirmanşahê dest bi weşana kurdî dike (Mahabad, 2022, Bernamegeh). Bi rehetî em dikarin bibêjin ku gundiyek, bajarîyek di heman demê de bêyî ku hev nas bikin li heman radyoyê bi heman hestî gudarî kir û hest û hişmendî di nava Kurdan de çi bi zanetî çi bi nezantî hesteke û ruheke hevpar û neteweyî pêk anî.

2. Îran Xanima Mucered û Cihê Wê di Radyoya Ûrmîyê de

Îran Xanima Mucered di sala 1950-1951an de li rojhilatê Kurdistanê li gundê Înkesûya li herêma Biradostan ji dayik bûye ku ew der niha girêdayî bajarê Ûrmîyeyê ye. Navê dêya wê Perîşan bûye. Navê bavê wê jî Ebdurrehman bûye. Malbata Îran Xanimê malbateke feqîr, cotkar û karker bûye. Ciwaniya wê di nav malên dewlemend û mezin de wek karker derbas dibe. (Oramar, 2016: Bername Awaz).

Îran Xanim hêj di ciwaniya xwe de dest bi kilamgotinê dike. Li dawet, şahî û şînan de gelek kilam, stran û zêmar gotine. Bi ciwanekî re dizewice ku navê wî Seîd e û ew jî ji herêma Ûrmiyeyê ye. Paşê ew û hevserê xwe Seîd diçin gundê Somanawa li wir niştecih dibin. Du kur û qîzeke wan çêdibe. Îran Xanim dev ji kilamgotinê bernade û îcar bi hevserê xwe Seîd re diçin dawet, şahî û malên mezinan bi dehan stran distrên. Hevserê wê Seîd gelek piştgirî dide wê. Îran Xanim di sala 1970-1971an de bi awayekî fermî di beşa Kurdî ya Radyoya Ûrmîyeyê de dest bi kilamgotinê dike. Li gorî gotina hin

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

kesan jî Îran Xanim bi qîza xwe Gulistanê re diçû Radyoyê û berî ku bibe êvar jî dihate malê bo ku peyv û gotinên nexweş derbarê wê neyê gotin û bihîstin. Çimkî di nava civateke eşîrî de bi tene serê xwe çûyîna radyoyê û kilamgotina jinekê wêrekîyek û xîreteke mezin dixwest. Di wê demê de Îran Xanimê wê rewşa hişk û tund a li hemberî jinan, bê tirs şikand û dengê wê li herêmê her ku diçû belavtir dibû. Tenê ne li Rojhilatê Kurdistanê, li Bakurê Kurdistanê jî dengê wê bi taybetî jî li bajarê Hekarî, Wan û Agirîyê belav û naskirî bû. Îran Xanimê bi sedan kilam gotine. Tê gotin ku wê sih û yek sal dengbêjiya xwe domandiye. Hinek ji kilamên wê ev in: *Arifo Lawo*, *Bajo Emrê min*, *Delal Ez Bi Heyran*, *Bavê Lalo*, *Delal Lo*, *Delalê Malê*, Lê Meyrê, Bavê Edo, Bavê Filît (Axao), Wey Narînê, Lêlê Yeman (Domamê), Werî Lêlê (Zerîyê), Bavê Firhê û hwd. Her ku diçû hezkiriyên dengê Îran Xanimê li bakurê Kurdistanê zêdetir dibû. Çûn û hatina Îran Xanimê ji bo kilamgotinê li Radyoya Ûrmîyeyê heta sala 1979an didome. Paşê bi Înqilaba Xumeynî ra kilamgotina Kurdî li radyoyê qedexe dibe, rewş zehmettir û xirabtir dibe Bi giştî ji bo hemû Kurdan û bi taybetî jî rê li ber xebat û hunera Kurdî tê girtin. Vê guherînê ji bo hunerhez û dengbêjan zordestîyeke mezin bi xwe ra anîbû.

Piştî demekê di sih salîya xwe da hevserê wê Seîd jinekê tîne ser û ev yek tesîreke mezin li Îran Xanimê dike û roj û demên pir dijwar derbas dike. Ew dev ji hevserê xwe û zarokên xwe berdide û diçe. Demekê li cem malbavanê xwe dimîne. Midetek şunda bi Dadaş Nasirî re dizewice û li Tehranê bi cih dibe. Piştre ji Tehranê dîsa vedigere Ûrmîyê û dikanekê vedike û debara xwe bi vî şikilî diborîne.(Oremar, 2016: Bername Awaz).

3. Deşîfrasyon û Nirxandina Kilamên Wê

Îran Xanim di Radyoya Ûrmîyê de nêzî 200 sed kilam tomar kirine. Bi zaravayê Kurmancî straye. Gelek kilamên ku ji berê de hatiye gotin strane û digel wê jî hin kilam bixwe çêdikirin û distran. Dema ku em bala xwe didin naverokên kilamên ku Îran Xanimê strane, du xalên giring dibînin. Ya yekem; Îran Xanim piştî ku ji hevserê xwe Seîd vediqete, gelek di bin tesîra wî de dimîne û dîsa jî dev ji jiyana xwe ya hunerî bernade, dengbêjiya xwe didomîne. Ev jiyan û rewşa wê, êşek û xemgînîyeke mezin li dengê wê bar dike. Di kilamên wê de êşa evîndarî, mêrxasî, neteweyî û banga hişyarî û civakî tê hîskirin. Piştî ku bi Dadaş Nasirî ra dizewice, temaya kilamên wê zêdetir dibe evînî. Em dikarin bibêjin ku wê di kilama *Arifo Lawo* de her weku gilî û gazinên xwe li hevserê xwe yê berê kiribe. Vê tesîrekê li bijartina kilamên wê jî kiriye ku dê paşê wan bistrê (Oremar, 2016: Bername Awaz). Me di vê xebatê de kilama Arifo Lawo, Meyrê, Lêlê Dotmamê, Bavê Lalo, Delal, Mala Min, Bavê Edo, Werî Lêlê (Zerîyê), Bavê Firhê û Bavê Filît (Wey Axao) deşîfre kirine û bi hin varyantên wan ên din ra berawird kirine û çendek çîrokên kilaman jî peyda kirine û digel kilaman parve kiriye.

3.1. Kilama Arifo Lawo

Arifo lawooo Arifo lawooo
Belê Arifo lawooo low te ez helandim
Were Arif lawo tu vê şevê geriya rojê wez xapandim
Te wez kirime peza kûvî nav selefê veqetandim
Ewa çi çaxê qîma te pê nehatê ez kirime şarekî kirime nava destê têzîya tevizandim
Tu car qêma te pê nehatiye ez kirime şûşekî ferfûr dame destê mîran û hekîma axx we çivandim

Arif lawo Arifo lawo dest te nadim
Emman were wereee were wereee Arif were were Arif lawo were were wereee Arif were were Arif lawooo
Min dî ji wê sibê Arif lawê min sekiniye ber xêbetê
Serê min xwira ewa bejna bilind çavê biriyê reş û belek qabilyetê
Rîşêkê bi egalê dadikevine ser gobeka vê sihetê
Wez nikarim sê kelîma ji te re bêjim şermê bavê te ba cimaetê
Tu wê were mi go kê dest û dinya pev kin dakivne nav bexçê gula selahetê
Mi baqeke gulan çînî ji qesra vê cinnetê
Mi diyarî ji te re şandin bona ayyy yar muhebetê
Tu wê were destê min bi gewreyne bavêje ber bextê ferman dê dewletê
Tu wê were destê min bigre birevîne bavêje ber bextê ferman dê dewletê
Tu hêvîkê bixwaze Rebbê alemê padişahê vê ummetê
Îja heçî kesê bira xwastin werin kerem kin bêne ser dawetê Arif lawooo
Were were wereee were loy loy were lêy lêy were loy loy
Were were wereee were loy loy Arif lawooo
Arif lawo bejna min zirav e dara darberî ne
Lawo de qasî gûze memika mi mêrg û çîmen hewz û kanî ne
Ji vê sibê qîzîn û bûka ji werdekêj…?[1] giran ser girtî ne
Îja zane heynûka qîz û xorta ber dilê xelkê w alemê Xaliqo çend şîrîn e
Ewa serê ser wextê min tev bûn kaxiz û defterê teqefhîn e
Keçê dînê w ez ê çi bikim ez mexmûryê dewletî me
Îja te rê kumêtekî kavirê salê nava êlê destê min bigre min birevîne
Were loyloy were lêy lêy
Îja çavên fesad û neyaran li fêdeyî ne
Were loy loy were lêy lêy were were were were loy loy Arif lawo
Were Arifo lawoo tu bes bêje
Arif lawo ji bona her du dilaaa tu bes bêjeee
Hilma dinya germ e way germanî dikelije
Arif lawo dinya germ e low ji alem gêjeee
Tu bê were go wê kê çoga xwe bide çoga min evdalê rûnê low darêjeee
Hema tu wê qise bike zimanê şirîn low birêjeee
Tu gotinê xelqê û alemê ji vê dilê min bavêjeee
Îja tê were ba melekî dazde ilim rûnê
Bila ji gotinakî tevê ba her du dunya ji te re bêjeee
Arif lawoo eman were wereee were loy loy were lêy lêy
Were loy loy were were wereee were lêy lêy Arif lawooo

Di çanda dengbêjiyê de vegêrên kilamên evîniyê zêdetir jin in. Kilam ji serî heta dawîyê ji devê jinekê hatiye vegêran. Em dikarin kilama *Arifo Lawo* weku kilameke evîniya bêbedêl binirxînin. Evîndar ji bo ku hezkiriyê xwe bi dest bixe, gelek hewil dide. Bi hin têgehên weke “ax”, “lawo”, “were” û “bes e” nîşaneya êş, keser û bêmirazî û bêçarebûna evîndarekê nîşan dide. Em ji kilamê têdigihêjin ku navê dildarê jinê Arif e. Lê em di kilamê de bi navê jinê nahesin. Em bi gotina “Wez nikarim sê kelîma ji te re bêjim şermê bavê te ba cimaetê” pê dihesin ku evîndara Arif weku jinek di nav cimaetê da ji ber hin astengîyan nikare ya dilê xwe bi rahetî derbirîne. Di vê kilamê de aliyê mêr

Zakho Centre
for Kurdish Studies

pasîf û bê îrade an jî bê arezû xuyaye û aliyê jin jî talebkar û bi gazinc e. Herçend gazîyeke xurt a dildara Arif hebe jî em pê dihesin ku ev evîn bê encam maye an jî gihiştina her du aliyan pêk nehatiye. Heman kilam ji aliyê hunermend Rojdayê ve jî hatiye gotin. Piştî ku Îran Xanim û hevserê xwe Seîd dev ji hev berdidin, kilamgotinên wê zêdetir li ser evînê bûye. Her wekî Îran Xanimê gilî û gazin, hêvî û bendewariya xwe li hevserê xwe di vê kilamê de nîşan daye. Çimkî hevserê wê dixwaze jinek bîne ser û ew jî qebûl nake. Herçiqas gelek jê hez bike jî mecbûr dimîne dev jê berde ku ev êş û azareke mezin didê.

Herwiha divê em dîyar bikin ku ev kilam, kilama yekem e Îran Xanimê qeyd kiriye. An jî di Radyoya Ûrmiyê de yekem car ev kilam hatiye qeydkirin (Oremar, 2016: Bername Awaz).

3.2. Kilama Bavê Lalo

Mala min, mala min, mala min mal mala min
Xwuda tu nekî kêmasiya dînê nebî Mihemmedî mala min
Îja çi kes hildane derdê dilê min
Ya hatî serê min bila neyê serê dijminê min
Îja çi kes nizane derdê dilê min
Yo konê Silêmanê rehmet barkirin danîne Kopa Parnosê
Nîvê dinê rex konê bavê min
Şêliz tê ji vê mala Emewît ocaxê wan qelanen hêlan e
Imbêzîka di ber himbêza min
Erd û ezmana bi ya gûmana min
Ya derbeka Silêmanê Rehme Bavê Lalo keve riba dane
Îjar rebenê şikandine qudûmê çongê min
Were mala min mala min mala min mala min mal mala min
Îro konê Silêmanê Ehme barkirin danîne korpa Parnosê nîvê dinê
Îro ka qezake ji babê Lalo ra derketê…limê
Ez nizanim êvara Xwedê da ez çima komê kurmam û pismama xeyîne
Yanî eskî tî keç çima nade xwendinê
Gedûka qonteq te xwand gedûkê xalê befê ke tunê
Îro destê Silêmanê Ehmed kelepça aleman girêdane
Berê wî dane korpa Panosê mala mirinê
Îja bê zod ceranê ez nizanim xelat e yan biray te yanê ceza didinê
Were mala min mala min mala min mala min mala min mal mala min
Îro konê Silêmanê Ehme bar kirin danîne korpa Parnosê lê de lêy
Û jin jî oca ez derimê temam kişiya hate serê
Dibên pêşiyê qolqumandar Aliyê Heynder e
Em ê rabin xwe bavêjine ber tor û bextê Aliyê Heynder bêjnê bide
Bo xatrê Xwedê û pêxember e
Nekuje Silêmanê Ehmed fenayî kewê gozel e
Neqelîn e û tu ocaxê mêra ji mala Emer e
Egîtilê didî Silêmanê Ehmed kêleka rastê nede kêleka çepê nede der e
Dibê ji gotina toxtora tefsîrê kitêba
Kêleka çepê gurcik û digere
Egîtilê didîtilî pêşke Silêmanê Ehmed nazik û Mahmûdî ne

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەكولینێن كوردی

Nava dersê ra xwûna reş diniqite xwe va destê nava gûstîla zêr û zîv û mucever e
Were mala min, mala min, mala min mala min mal mala min
Îro konê Silêmanê Ehmed bar kirin danîne kolma Parnosê li vî girî
Û jin jî oca ez derimê temam kişîya lê virî
Dibên pêşê qolqomandar Aliyê Heyndera
Dora şewqê xwe xercî kirî
Ji hêsirê destê Bavê Lalo kelemça alema girêdane
Gedûka duxanê li serê virê
Dane pêşiya du kûçikê cendirma Gedûka Duxanê derbas kirê
Bêzo digote te li odeyanê ja bavê me tirkî nizane kurdî digote kurdo yûrî yûrî

Li gorî dengbêj Zilkifê Qado serpêhatiya kilama Bavê Lalo bi vî şiklî bûye; Sertîfê Hesenî layê Fethullah beg bûye. Du kurê wî hebûne bi navê Liya û Ziya, her du jî lal bûne. Di nava gel de jê re gotine Bavê Lalo. Sertîvê Hesenî di serhildana Şêx Saîd de li wan kesan xwedî derketiye ku ji aliye dewletê ve lêgerînên wan hebûne, yên ku derbasî Îranê bûne û yên ku li bakurê Kurdistanê mane. Serleşkerê Kopê Eliyê Heynder hay ji vê rewşa Sertîfê Hesenî hebûye, çavê xwe her tim jê re girtiye, nekiriye pirsgirêk. Wê demê xelat li ser wan digrie û ji bo xelatekê îstîxbaratekê dişînin wê herêmê. Bi taybetî jî diçin nav malên feqîr. Bi vî şikilî ji xwe re îtîrafkarekî peyda dikin. Paşê dibêje min bi çavên xwe dît ku gelek kes dihatin mala wî, alîkarîya wan dikir. Alaya Xelatê biryara îdamkirina Sertîf Begê dide. Ji Enqereyê dişînin Mûşê cem walî û qeymeqaman mor dikin, dişînin pey Sertîf Begê, ew dibin Xelatê lê îfadeyên wî nagirin û wê nameyê didin destê wî û jê re dibêjin bibe Kela Kopê bide destê serleşkerê Elî Heynder da ku ji te re bibêje. Nade xwendin bo ku mohra wê xirab nebe. Lawê Rizayê Xêlit, Xalis dibêje veke em li hundirê nameyê binerin, çi heye lê venake. Dibe sibe bi xwe re du peyayan dibe û diçin Kela Kopê. Li Kela Kopê nameyê didin destê serleşker Elî Heynder. Elî Heynder nameyê dixwîne kelexwîdan pê digire. Meraq dike dipirse gelo ji te re qala nameyê nekirin an tiştek din, îfadeyek negirtin? Dibêje na. Elî Heynder mecbûrî mohr dike. Paşê didin destên leşkeran. Di nava leşkeran de leşkerekî kurd hebûye, deng diçe wî dibêjin; wî bibin Mûşê yan bikujin yan jî îdam bikin. Ew merivên ku pê re hatine yek ji wan xwe xilas dike lê yên din wê naterikînin pê re diçin. Bi Sertîf Begê re tên. Eskerê Xelatê wî digirin ku bibin Mûşê. Wî tînin dibine Dugnûgê û digihêjin ser Mûradê bi navê Ala Kor çemek hebûye. Sertîf Beg li wira êdî fam dike ku ew ê kuştinê ye, xwe li sutiyê leşkerekî dixe bi salixan. Leşkerê din jî bi singûyan dikujin. Piştî vê bûyerê malbata wî dişînin sirgûnê. Gelekî feqîrî û belengazî dikişînin. (Qado, 2020, Can tv).

Li gor Ayhan Erkmen jî serpêhatiya Sertîfê Fethullah Begî wiha bûye; Bavê Lalo Sertîfê Fethullah begê bûye. Mirovekî egît, evîndar û mêrxasê Dignûgê bûye. Fethullah Begê bavê wî jî fermandarê alayeke Hemîdîyan bûye. Dilê Sertîfê Fethullah Beg û Perîzadeya Mihemmed Emîn Beg di hevdu de bûye. Sertîf çend caran xwazgîniyan dişîne lê nadin wî. Sertîf di dawiyê de Perîzadeyê direvîne. Dûre malbat li hev tên.

Berî serhildana Şêx Saîd a di sala1925an de dewlet dest bi berhevkirina bacê dike û dûre kesên ku neçûne leşkeriyê, qaçax in berhev dike. Ji bo wê dewlet bi ser gundê Xanoxliyê de digire. Li Xanoxliyê pevçûn dertê. Şefîqê birê Perîzadeyê di pevçûnê de tê kuştin. Birayê wê yî din jî Elî Baqî, fermandar jî di nav de heşt leşkeran dikuje.

Sê zariyê Sertîf Beg û Perîzadeyê çêdibin. Cemîl, Ziya û Xalid. Her sê jî ker û lal in. Ji ber wê ye ku dengbêj stranê ji ber kuştina wî davêjin ser û wî bi navê “Bavê Lalo”

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

bi nav dikin. Sertîfê Fethullah Begê eşkere tevî serhildana Şêx Seîd nabe. Lê kesên ku tevî serhildanê bûne nas û bûrayên wî bûne, merivên wî bûne. Xalid Begê Hesenî, Silêmanê Ahmed, Ferzendê Silêmîn, Elî Baqiyê bûrayê wî. Wextê serhildanê û piştî serhildanê derbarê wî de li Kopê û Milazgirê îxbar çêdibe. Lê Fermandariya Milazgirê û Kopê pir bi ser Sertîf de nayên. Paşê îxbara wî li Xelatê dikin. Fermandarîya Xelatê bangî wî dike. Sertîf Beg li hespê Kûvî siwar dibe û berê xwe dide Xelatê. Fermandar zerfekê dirêjî wî dike û dibêje di hundirê vê zerfê de diyariyek ji bo te heye. Biçe bide fermandariya Kopê. Sertîf zerfê hildide tê. Ber bi êvarî bûye. Wê êvarê li gundê xwe Dignûgê dimîne. Mele Emîn dibêje ka em li zerfê binerin, lê qebûl nake û dibêje qey ji bo min dê peywirek hebe. Sibetirê dê bi rê keve. Sibetirê Sertîf digel Mûsayê bavê Andrîk û Reşîtê Eliyê Alo berê xwe dide Kopê diçe ba fermandar Elî Riza û zerfa ku Xelatê daye, dide wî. Elî Riza jê re dibêje te qet ev nîşanî kesî dabû? Ew jî dibêje na. Fermandar dibêje te fermana xwe aniye. Destên wî û ji ber ku Reşît û Mûsa jî bûne şahidê bûyerê, destên wan jî li kelemçê dixe û dide pêşiya çend eskeran. Dibêje vana bibin bintara Kopê ber Ava Kor bikujin lê ne bi guleyan, bi singuyan ku deng dernekeve. Reşît bi awayekî direve lê Sertîf û Mûsa didin ber singûyan. Sertîf bi wî halê xwe eskerekî difetisîne. Esker jî wan her duyan dikuje. Ji ber ku Reşît wan dîtine cinazên wan hildidin. Hêj jî kes nizane cinazên Sertîf û Mûsa li ku ne? Piştî bûyerê malbata wî perîşan dibin (Erkmen, 2022, Çîrokbêj).

Ev kilam ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye gotin. Miradê Kinê, Dengbêj Keremê Panosê, Dengbêj Arif, Dengbêj Hekê, Dengbêj Kerîm Jîrkî, Dengbêj Salihê Qubînî, Dengbêj Keremo, Şivan Perwer û hwd. strane.

Ev kilam, kilameke gelêrî ye. Ev kilam kilameke mêrxasî û egîtiyê ye. Kilam bi devê jinekê ji serî heta dawiyê behsa egîdî û mêrxasiya Sertîf begî dike. Di kilamê de tirs û xofa dil bi awayekî serkeftî hatiye derbirîn. Ev jî nîşan dide ku Îran Xanimê bi hêmû hest û ramanên xwe ve din av bûyerê de xwe hîs kiriye û parçeyek ji xwe dîtiye.

3.3. Kilama Werî Lê Lê (Zerîyê)

Werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê wey axao
Ax werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Kurikî digo domamê ê ez nizanim vê sibê te dilê min kulkirî êşanî tu çima rast serê min dêşînî
Ji vê sibê tu çawa rast ser min niqqilî birî bijankê sîme lo min dişikinî (..)
Ez nizanim kalê gunda ye semîê evdalê Xwedê ra te kê dît hêja di çar ro xwe digerînî
Ji wê sibê te wê bir ji bona qoqalanyek kofiya şêr te alandiye
Ez nizanim çima te dilê xwo lo min dixelînî
Ji wê sibê te wê tu yekî nêçirvana serê cergê min daye
Ji çar tilîka bûzî cemeda ser kezeba min tu dihelînî
Ax werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Kurikî digo domamê ez sibê de ez rabûme îja ez nizanim çawa kim
Hey lê delalê ez sibê de ez ê rabûme îja ez nizanim ez ê çawa kim
Ez ê rabim birekî qîz û xortê ji kara gundê me gazî kim dest û tiliyê wan hine kim

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Ez ê rabim birekî siyarî sakîncerê mala bavê te peya kim
Ez ê destê te bigirim ji alîkî nûzînî erebî çar salî siyar kim
Ez ê te ji destê te bigirim te bigerînim mela wû qaziya
Mehra te û kotî heramî şindokî mêro lo te betal kim
Min sond xwariye xemla bejna bilind çawa bûye reş û belek xira nake
Îja ez ê destê te bigirim daynim ber pencera şaneşînê
Rojê te dane qebûl meraqê derdê dilê xwe pê te bela kim
Ax werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê

Domamê digo îja pismamo dilê min kanîka
Ji çemê Mûrada şewitî çar rojberiyê benda hayyy
Ez ê rabim serê canê delalê dilê xwe bigihêm bi meşê Carbekira şewitî ez tena li benda
Min çend car go neke xeberê naneşîv
Nav merda heyy
Ewila xwe şûşekî qayê paşê bişkêne lo serê çel e qendayêee
Tu bi xwe dizanî îsal heft sal e wez qazarê kem e gundan e kotî heramî şindokî mizgînî mêra
Ne tême girtin ne tême kuştin
Pismamo dîsa ne tême berdanê
Ax werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Werî lê lê werî lê lê werî lê lê
Domamê digo pismamo awa tu dibêjî tu cara lo hayy nabe
Îja qurban du şûşe hecî gava dişkê tu car lo bettal lê nabe eyyy
Tu carî tu car başiya lolîcezvê nabe
Ew gotinê tu dibêjî ser dinyayê nayê min û te ra çend xerab e
Ez ê ji te ra bêjim hêlînîka min û te li ser dinyayekî
Îja bilanî beramberî me kire bezayê ser bavê min û te qeza be oyyy
Ev kilam kilameke evînîyê ye. Kilam ji du parçe û bendan pêk tê.

Tê de dotmam û pismam davêjin ber hev. Vegêr di benda ewil de pismam e ku gazincên xwe ji dotmama xwe ya mêrkirî dike ku çima pê nake û nayê cem û dilê xwe jê dixelîne. Ji gotinên pismam dîyar in ku dotmama wî jineke zerî ye. Vegêr di benda duyem de dotmam e. Dotmam li beramberî gazincên pismamê xwe bêçaretî û nemimkûnîya vê evînê dibêje. Herwiha ji gotinên dotmamê tê famkirin ku ew li hêla çemê Mûradê mêrkirî ye û pismamê wî jî li hêla Diyarbekirê ye. Herwiha em ji gotinên dotmamê fam dikin ku jineke mêrkirî bi rahetî nikare li dijî tore û adetên civakê rabe û bi ya dilê xwe bike. Digel vê di kilamê de hêmanên weke bextreşî, neçarî û jihevqetînê li pêş in. Mebest ji vê gotinê “Ne tême girtinê ne tême kuştinê ne tême berdanê” liberketin û dilsoziya neçarîyê ye ku ji deve jinekê anku dotmamê hatiye gotin.

Çend hunermend û dengbêj jî ev kilam strane. Kesên weku Adil Bêrtî, Sîpan Havîn, Dengbêj Hekê, Dengbêj Ahmedê Bêrtî ji wan çend kes in.

3.4. Kilama Bavê Edo

Lo wî loy loy wî lo loy wî loy loy
Were wî loy loy wî loy wî loy loy wî loy loy

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ay wî loy loy wî bavo
Were wî loy loy wî loy loy wî lo loy
Ji vê sibê koçka bavê Edo egît e
De girê Qelqelê ser hudûdê Îranê
Ji vê sibê bavê Edo siyarî bozê
Ji girê Qelqelê sekiniye hikum zor e hicûm danê
Wekî ji vê sibê ser serê bavê Edo dûx e na yamê ne bayê
Bela lêdeketana birekî egît û xweşmêrê eşîratêyê
Na wele eşîr eşîra lo Kurdistanêyê
Wele nemînim nemînim nemînim nemînim ay nemînim pismamo li dinyayê
Were wî lo loy wî lo loy wî lo loy wî lo loy
Wele bavê Edo siyarî bozê, îro şer e lê şer bi dor e
Peya xwe ajotê meydanê îro şer e lê şer bi dor e
Ji girê Qelqelê çepê ra Bavê Edo siyarî bozê
Sekiniye hizar û heft sed mêrê xwedan mor e
Ji vê sibê hikum danê hicûm zor e
Wele nemînim nemînim nemînim neminim ay nemînim maqûlo li dinyayê
Were wî lo loy wî lo loy wî lo loy wî lo loy wî lo loloyy
Ji vê sibê bavê Edo siyarî bozê ji mal siyar bû hikum dest daye
De çepera bavê Edo siyarî bozê hezar û heftsid mêrê bi esker rawestaye
De şert û şirûtê bavê Edo li dinyayê gelek hene
Topraxa xwe rakiriye …? bona xîret û namûsa ji Kurdaye
Wele nemînim nemînim nemînim neminim ay nemînim maqûlo li dinyayê
Wele wî lo loy wî loy wî lo loy wî loy wî loy loy wî loy loy
Ji vê sibê bavê Edo siyarî bozê ji mal siyar bû
De berê xwe da merzê sewqiyatê
Ji vê sibê berê siwarê mala bavê min mal siyar bûn.
Pey bavê Edo gele bi camêriyê teqîbatê
Dibê bavê Edo siyarî bozê
Ji heft sala mahkûm e mehkûmê hikûmatê
Wele nemînim nemînim nemînim nemînim a nemînim maqûlo li dinyayê
Ev kilam kilameke egîdî, mêrxasî û şerekî neteweyî ye.
Kilam behsa mêranî, qehremantî û fedakariya Bavê Edo ya ji bo miletê xwe dike. Vegêra jin dotmama Bavê Edo ye ku em vê yekê ji vê gotinê “Were nemînim nemînim nemînim nemînim ay nemînim pismamo li dinyayê” fam dikin. Kilam seranser ji devê dotmama Bavê Edo tê vegêran. Kilam behsa hicûmkirin û şerê mala Bavê Edo ya li ser dewletê dike. Dîyar e ku Bavê Edo li Qelqelîyê ye û bi her awayî xwe di vê rêyê de feda kiriye û heta hemû ax û sermaya xwe jî xistiye vê rêyê ku em vê yekê ji gotina “Topraxa xwe rakiriye …? bona xîret û namûsa ji Kurdaye” fam dikin. Berî ku şer û hicûma Bavê Edo dest pê bike, jê re palpiştî û sewqiyatek ji hêla Îranê ve tê ku ew jî bi piranî pismam û xizmên Bavê Edo yên aliyê din ê sînor in. Wisa xuyaye ku artêşa Bavê Edo gelek giran û qelebalix bûye ku vegêr vê yekê wiha tîne ziman: “De çepera bavê Edo siyarî bozê hezar û heftsid mêrê bi esker rawestaye”. Herî dawî vegêr destnîşan dike ku Bavê Edo dîl ketîye û têk çûye ku heft salan di heps û zindanan de maye. Lê vegêr vî şerî ji şerekî eşîrî bêtir weku şerekî neteweyî û

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Kurdistanî nîşan dide ku li derekî kilamê wiha amaje bi vê yekê dike: “Bela lêdeketana birekî egît û xweşmêrê eşîratêyê. Na wele eşîr eşîra lo Kurdistanêyê”.

Ev kilam ji aliyê çend dengbêjên din jî hatiye gotin ku ev Hozan Şemdîn, Hozan Aydin, Hesenê Qaso, Dengbêj Eto, Dengbêj Mehemedê Agirî ne.

3.5. Kilama Lêlê Yeman (Domamê)

Wayê wayê wayê wayê wayê wayê wayê lê lê yeman
Lê lê lê yeman wayê wayê
Lê lê yemman wayê wayê
Eylê wayê wayê wayê wayê lê domamê
Te dîwan e wayê wayê xweş dîwan e wayê wayê
Ji vê sibê egîtno û xweşmêrî serê xwe danane
Kotiyê heramî şinokî mîna jinê mal ba...? kîne
Rimê heval erebê hildane
Heçiyê kesek ji mala Xalid berdestekî kinca xwe dike
Dîwanê mîran û hekîman digere
Êja maqûlo dibêjin em axa ne lê lê lê yeman
De lê lê yeman lê lê yeman lê lê lê yeman
Ey lê lê domamê vêdrê ...? Xwedê ye lê yeman de lê yeman lê yeman lê lê yeman
Ax de lê lê yeman lê lê yeman lê lê lê yeman
Ey lê wê wê wê lê domamê
Derê mala bavê domama mi bexêr e
Ey lê lê domamê
Derê mala bavê domama mi bexêr e
Nîviyê ji vê sibê domama min sekiniye şewkanê reş erebî ye
Wezê bi bejna xwe ya kinî devê dinêre
Ez rê bibire boy xwe min go domamê
Sibê ji te re sibe xêr e lê lê yeman

Ev kilam bi devê mêrek hatiye vegêran. Vegêr li vir xwe weku pismamê dotmama xwe nîşan dide û deng li dotmama xwe dike. Ji kilamê dîyar e ku vegêr anku pismamê dotmamê ji mala Xalid e û xwazgîniyê dotmama wî hatine, lê mala Xalid kesek ji wan nabe asteng bo vê xwazgînîyê ku vegêr bi vî rengî wan rexne dike: “Heçiyê kesek ji mala Xalid berdestekî kinca xwe dike. Dîwanê mîran û hekîman digere. Êja maqûlo dibêjin em axa ne lê lê lê yeman” Ku qaşo wiha pesnê xwe didin û xwe qure dikin, lê nikarin bibin astengê vê xwazgînîyê. Herwiha em ji dawiya kilamê têdigihêjin ku pismamê dotmamê amaje bi revandina wê dike. Lê em erênî yan nerênî tu bertekek ji dotmamê nahesin di kilamê da. Kilam bêtir helandin û neçarîya zilamekî ya ji bo jidestçûna evîndara wî ye.

3.6. Kilama Bavê Firhê

Qurbaniyo emrê wê wê wê ax navê tayê cezalîyo
Bila qaskê sira Qerecdaxê daye serê min û Bavê Firhê wê wê wê ay bilindayiyê cezalîyo
Ji vê sibê bila ez û Bavê Firhê têra herin ser wî çîyayî fermanîyo
Heywax min evdala Xwedê Bavê Firhê te dinyayê têr nedîyo oy li minê
Bavê Firhê qurban te bûhar e wê wê wê ayy xweş bûhar e cezalîyo

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Min dî ji wê sibê Bavê Firhê ciwaniyê wê wê wê ayy şêr bû siyarê cerganîyo
Ji vê sibê cewabekî ne di xêrê dane destê min rebenê go Bavê Firhê ji dewleta Alî Osmanîyan bû firarê fermanîyo
Heywax min rebena Xwedê te dinyayê têr nedîyo oy li minê
Bavê Firhê qurban te bûhar e wê wê wê abhinê cot û cezalîyo
Bavê Firhê qurban te bûhar e abhinê cot daye fermanîyo
Xwezî ji vê carê Bavê Firhê binya xetê fireh, ji kela nakeve gelîya nav her çar malê ay me Reşkotayê fermanîyo
Serê çend saleka ez û Bavê Firhê em ê rûniştana ji karê dinê, me yê gilî û gazinên xwe oy ji te ra bigota eyy fermanîyo
Heywax min evdala Xwedê bavê Firhê te dinyayê têr nedîyo oy li minê

Serpêhatiya Bavê Firhê li bakurê Kurdistanê li herêma Xerzan qewimîye. Li gorî hin varyantan lehengê kilamê weku Bavê Fexrîya û Bavê Ferxo jî hatiye binavkirin. Li herêma Xerzan Bavê Fexrîya weku gavan, şivan tê zanîn lê dema ku em li kilaman dinihêrin di kilaman de em wî weku mêrxasekî ji eşîra Reşkotan dinasin. Bavê Fexrîya ji binemala Filîtê Quto bûye. Navê wî Sebrîyê Hecî Mihemedê Mistê Quto bûye. Fexriya keçika wî bûye û kilam bi vî navî deng vedaye di nava gel de. Lê di varyanta Îran Xanim Mucered de Firhê derbas dibe ku Firhê ji keçikan bêtir dirûvê navê lawikan dide. Mimkûn e ku Îran Xanimê şaş veguhastibe. Çimkî di piranîya varyantan de weku Fexrîya derbas dibe. Gelek pevçûnên Reşkotîyan bi dewletê re çêbûne û Bavê Fexrîya bi xwe van pevçûnan gelek caran bi serfirazî bi dawî kiriye. Eşîra Reşkotan jî di nav de, tevî çend eşîrên Xerzan, Diyarbekirê, Êlihê ji aliye dewletê ve fermana wan tê rakirin û derbasî binxetê dibin.

Îcar em dixwazin li ser çîroka kilama Bavê Fexriya bisekinin û serpêhatiya vê çîrokê ronî bikin. Li gorî Salih Kevirbirî (2002: 109-110) ev kilam ji devê jineke fileh tê gotin ku evîndara Bavê Fexriya bûye. Tê gotin ku keçikê bi dehan stran li ser bavê Fexriya çêkiriye lê hayê Bavê Fexriya jê çênebûye. Keçika fileh navê xwe di kilamên ku avêtiye ser Bavê Fexrîya de tu wextî diyar nekiriye lê di kilamê de tenê navê “Bavê Fexriya” bi kar aniye. Li gorî agahiyên dengbêjên herêmê keçikê bi deh meqaman kilam li ser Bavê Fexriya çêkirine. Tê gotin ku piştî ku sal û zeman di ser çêkirina vê kilamê re derbas dibe û di nava gel de ji aliye dengbêjan ve belav dibe, Bavê Fexriya hay ji evîna keçika file çêdibe.

Li gorî Dengbêj Eda Mado (Youtube, 2011) Bavê Fexriya birayê Filîtê Quto bûye. Ji eşîra Reşkotî bûye. Xwarziyên Êzdîyan û kurên Şemê bûne. Tirba wan li Bolindê ye. Ew jî Filît jî ji mêrxasîya xwe hatine kuştin. Bavê Fexrî û dewletê pev çinîye paşê ji aliyê dewletê ve fermana wan tê rakirin û derbasî bin xetê dibin û li gundê Kerengo niştecih dibin. Bavê Fexrî rojekê bi meraqa dîtina miletê xwe li hespê xwe siyar tê û radibe diçe welatê xwe, diçe li ser kaniya Bolindê keçikekê cirnê wê di destan de ye û dadigire û pê ra jî kilama Bavê Fexriya distrê. Bavê Fexrî ji keçikê dipirse ku kes bi navê Bavê Fexrî li gundê we hebûye û bi ku derê çûye? Keçik dibêje çûye Sûriyê. Bavê Fexrî dîsa dipirse “Tu ji bo çi davêje ser?” Keçik dibêje ez evîndarê wî me li ser wî distrêm. Paşê Bavê Fexrî dibêje Bavê Fexriya ez im û keçik dibêje divê tu min jî bi xwe re bibî. Bavê Fexrî dibêje ez mehkûm im, li çola me. Paşê ji keçikê re dibêje: “Ger ku vegerim soz didim ku te bi xwe re bibim.”.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Di kilamê de dîyar e ku ji devê jinek tê vegêran. Lêbelê di vê varyanta Îran Xanimê da tu îşaretek tuneye ku ev jina vegêr a ku kilam avêtiye ser Bavê Firhê file ye an mensûbê dînekî din. Herî zêde em bi vê yekê dihesin ku jina vegêr li ber dikeve ku Bavê Firhê têr nejiyaye, dinyayê nedîye. Ji vir jî merşv tê digehe ku Bavê Firhê ciwan bûye dema ku dimire. Herweha çûna wî ya binxetê, fermana wî ya ji hêla dewletê ve hatiye dayîn ku ev dewleta Alî Osmanî bûye, di vê varyantê de jî diborin. Heta em pê dihesin ku jina vegêr xwe weku Reşkotî ji heman eşîra Bav3e Firhê dihesibîne ku wiha dibêje: “Xwezî ji vê carê Bavê Firhê binya xetê fireh, ji kela nakeve gelîya nav her çar malê ay me Reşkotayê fermanîyo”.

Gelek varyantên vê kilamê ji hêla dengbêjan ve hatine gotin. Dengbêj Arif, Eda Mado, Karapetê Xaço, M. Salihê Beynatî ji wan çend kes in.

3.7. Kilama Meyrê

Lê lê lê lê lê lê wî lê lê wî lê lê wî lê lê zozan sê ne
Ez ê ji kêyfa dilê xwe bi te ra nakevme deştê gulan naçînim ruhana
Lê lê lê lê lê lê wî lê lê wî lê lê wî lê lê qaşimlê ne
Wey gundîno wey cînarno hûnê Rebê alemê destê xwe nedin cotê zer memikên mi tev nedin emanetyê lê a bi xelqê ne ewww
De were were were were were were Meyrê de wereee were Meyrê
De lê lê Meyrê naçime zozanan
Lê lê lê lê lê lê wî lê lê wî lê lê wî lê lê zozan sar e
Ji kêyfa dilê xwe bi te ra nakevime deştê gulan naçînim
Lê wî lê lê lê lê lê lê lê wî lê lê wî lê lê wî lê lê ruhan can e
Wey gundîno wey cînarno hûn Xwedê neke pirsiyara qîzîn û bûkên vî dewrî vî zemanî ji min dikin
Hemû xortê li xelqê ra lebê ye qewl lo lê a bi qerar in
De were were were were were Meyrêêê de were were were Meyrê
De lê lê Meyrêêê were Kela Xinûsê roj bidime Meyrema
Wî lê wî lê lê lê lê lê wî lê lê wî lê lê wî lê lê meçû awa
Dibê rabe vê dinyayê mi evdalê ji Xwedê kalê gundan neke
Sîqalekê bide bejna bilind lê lê lê lê lê lê lê wî lê lê wî lê lê belekçawa
Şeytan û fesadê xelqê û alemê rabûne mal di gunda
Şeytan û fesadê min û Meyrema min rabûne de lê lê lê lê lê lê ayy malî bava yêê ax
De were were were were Meyrê de were were were Meyrê

Kilam kilameke evînîyê ye. Kilam bi devê xortek hatiye vegêran. Di kilamê da em weku cih bi navê Kela Xinûsê dihesin ku ev jî nîşanî me dide ku bûyerê li tanga Erzirom Xinûsê rû daye. Herwiha evîndara vegêrê xort Meyrê ye. Ji her du rêzikên dawî tê famkirin ku hin fesadên ji mala xortê vegêr nahêlin ew û Meyrê bigihêjine hev. Xort ji vê rewşê ecêbmayî dibe. Di seranserê kilamê da kela dilê xwe, hezkirina xwe, nefreta xwe ya li fesad û xêrnexwazan bi zar dike. Herwiha êşa negihiştina xwe ya Meyrê jî bi zar û ziman dike û heta tirsa wî jî heye ku Meyrê di şûna wî da bi kalên gundan mahr bikin.

Zakho Centre for Kurdish Studies

3.8. Kilama Wey Narînê

Wey narînê baranekê barî erdê
Ax û esman ay ay herê lê lê lê dost herê lêwww
Van xizêman keleşgewra mi law loy mi şirîkê
Wey xaliqo şîrkê xizêmê dadikeve ser dev û lêva uyyy loyy bi didana
Yar herê lê uyy herê lê herê lê uyy dost herê lê herê lê herê lê
De were mal cînara oyyy mi cînara wey mi cînara wey mi cînara mi cînara wey mal di gunda
Cînar canê wezê ciyê tu yê loyyy bûlanixê
Cînar canê min ê baqeke gula cînarê te ax tev sûlixê
Uyyy yar herê lê uyyy dost herê looo
Emma îsal ji heft sal bû min cînara xwe we inda kiribû.
Wey xaliqo îsal pê da wez ketime ser salix û sûlûxa sewdalixê
Dost herê lê uyy herê lê herê lê mal cînar oyy mi cînar oy mi cînar oyy
De were mal cînar êy cînar êy cînar êy cînar êyyy al cînar oy mal di gunda
Cînar canê ji wê sibê cînara mi ji derê mala bavê xwe rebenê tê wû diçe way bi meşkê
Kirasê cînara mi ji qedîfê etlesê ecem e ji dawa sîsê êyyyy li xwe geş ke
Bila Xwedê mala mele û qazîkê welatê me da xera bike
Çawa serê vê payîzê orta min û cînara min û heft qola xatûnê reş kin
Yar herê lê uyy herê lê herê lê uyyy mal cînar êy cînar êy cînar êy
De were mal cînara uyyy min cînar ay min cînarê weyy cînar êyy mal cînara mal di gunda yêê

Ev kilam kilameke evînê ye. Kilam ji devê mêrekî hatiye vegêran. Vegêrê mêr li ser dildara xwe û eşqa xwe gotiye. Dîyar e ku dildara evîndar cînara wî ye. Piştî gelek salan evîndar dildara xwe peyda dike. Lêbelê mîna gelek rûdanên evîndarîyê hin kes dibin asteng bo gihiştina wî dildar/cînara wî. Li gorî kilamê yên ku nahêlin evîndar bigihêjin hev mele û qazîyên welatê wî ne. Ji ber vê mimkûn e ev evîneke di navbera du dînên cuda de bin ku li Kurdistanê evînên trajîk ên bi vî rengî gelek qewimîne ku ev jî mînakek jê be. Ev kilam ji aliyê Hozan Şemdîn, Dengbej Selahaddîn ve jî hatiye gotin.

3.9. Kilama Axao (Senar Mamedî)

Yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo de yo yo yo maqûlo yeqîn şer e
Wey axao vê sibê wezê Çemê Serhenanê sêyr lêketê Gilîdaxê ye
Maqûlo vê sibê wezê Çemê Serhenanê sêyr lêketê Gilîdaxê ye
Ji vê sibê şer e ser serê bavê li Esho
Kama û kerwanê Îranê dikişiyane ser cadê ye
Cewed vê sibê da bi sê denga gazî dikir digo bavê Eshed
Tu li meydanê bisekine ezê werme Têhrana şewitî bikim şikayeta cendirmê Îranê ye
De yo yo yo yo de yo yo de yo yo de yo yo yo maqûlo şer giran e
De yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo axao şer giran e
Tu dêna xwe bidê wê sibekê ji Girê Bişîmana…? şer danane
Axao ji sibê girê da…? îmana şer danane
Tifinga destê Bavê Esho keçî caba Tirka ji yeqîn malê bi Alman e
Mi dî vê sibê du peya ji mal derketin xwe rext û çeka di pêçane
Ji peyayê ortê tê ji ber gula malê nehewiyane

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Ji peyayê pê şayikê Senar Bavê Çengîz, reîsê êl û eşîrata Mamedîyan e
De yo yo yo yo yo êyyy yo yo yo yo yo êyyy de yo yo yo axao şer giran e
De peyayê pêşê Senar Bavê Çengîz reîsê êl eşîrata Mamedîyan e
De gurgê çavbel şêrê navmilpan e
Her çî wextê ortê meydanê disekine qisse dike ema serê çi axao çi maqûla nexuyane
De yo yo yo yo yo yo yo yo yo de yo yo yo axao yeqîn şer e
Ax de yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo axao
Vê sibê wez ê Çemê Serhenana şewitî sêyr lêkete
Zozanê sayîşeka şewitî seyr lêkete semta Serhenanê
Cewed sê denga gazî dikir Bavê Filît dêna xwe bidê
Ji ser serê Bavê Çengîz şer e xweş tê dengê tanqa li topa
Na welle babo giran e xweş tê dengê mîrata cebilxanê
Na welle babo giran e mîrata cebilxanê
Qorqima dara sê denga gazî dikir digo axao tu teslîm be
Ji tifinga milê xwe bîne ji min re danêêê

Kilam kilameke mêrxasiyê ye. Şerê di navbera Kurdên Mamedî û dewleta Îranê ye. Ji kilamê tê famkirin ku aliyekî şer ji eşîra Mamedîyan in ku Bavê Esho, Bavê Filît, Senar Bavê Cengîz sê mêrxasên ji vê eşîrê ne û li hemberî wan jî li gorî kilamê kesekî bi navê Cewed heye ku van mêrxasan bi artêş û cendirmeyên Îranê tehdîd dike. Li gorî kilamê dîyar e ku Cewed karkaterekî xayîn e û li dijî van mêrxasên Mamedîyan şirîk û hevkarê artêşa Îranê ye. Kilam balê dikêşe ser cengawerî û şerê mêrxasên eşîra Mamedîyan û xisûsen li ser Senar Mamedî anku Senar Bavê Çengîz. Em dizanin ku Senar Mamedî 1924an de li Selmasê hatiye dinê û ji eşîra Mamedîyan e. Senar di 17 saliya xwe da dikeve nav refên Hizbî Demokratî Kurdistanî Îran û dibe berpirsê liqê rojhelat û gelek xizmetan dike. Senar piştî salên 1960î li dijî rejîma Şah şerê çekdarî dike. Di sala 1965an de diçe tevilî şoreşa başûrê Kurdistanê dibe û di şer de birîndar dikeve û teslîmê Îranê dikin û bi salan di zindanên Îranê de dimîne. Şer li minitiqeya Selmasê û li gorî kilamê li hêla Çemê Serhenanê (ev nav baş nehatiye tesbîtkirin) pêk hatiye.

Me hêj tesbît nekiriye gelo cara ewil vê kilamê Îran Xanimê li ser straye yan ji dengbêjekî din girtiye. Lê eşkere ye ku vê kilamê li ser şerê Senar Mamedî yê li dijî Îranê gotiye.

ENCAM:

Îran Xanima Mucerred (1951-2001) jî yek ji van hunermendan e ku yekem car bi awayekî fermî li rojhilatê Kurdistanê, di radyoya Ûrmiyê de kilam strane. Radyoya Ûrmiyê di sala 1969an de dest bi weşana Kurdî kiriye. Ji bilî Îran Xanimê dengbêjên weku Xalê Birê (Îbrahîm Newrozî 1928-2000), Hemîd Yûsifî (1926-1979), Mistefa Elîzade û Ehmed Ehmedî jî di Radyoya Ûrmiyê de bi salan kilam strane. Girîngiya Îran Xanimê di nav nerîta dengbêjiyê de bêyî Radyoya Ûrmiyê nabe ku bê ravekirin. Loma di vê xebatê de qala Radyoya Ûrmiyê û weku temsîlkara dengbêjên jin qala jiyan, kilam û şêwaza Îran Xanimê hatiye kirin. Tê zanîn ku Îran Xanimê gelek kilam strane.

Em di vê xebatê de weku encam gihiştin çend xalên girîng.Ya yekem şêwaza dengbêjiya Îran Xanimê û tesîrwergirtina wê ya ji Dengbêj Xalê Birê ye. Herwiha Îran Xanim nêzî şêwaza dengbêjên Serhedê bi devoka Behdînî kilam strane. Ya duyem mîna gelek dengbêjên jin serborî û sernivişta wê ya xemnak e ku ev dîyar bû ku bi nasnameya

Zakho Centre for Kurdish Studies

wê ya jintiyê re gelek peywendîdar e. Herwiha vê nasnameya wê tesîrê li şêwaza kilambêjiya wê kiriye. Xisûsen di kilamên evîna trajîk da em bi deng û hîsiyata wê dihesin. Ya sêyem jî rola Radyoya Ûrmiyê û tesîra wê ya li civak û dengbêjan û xuyabûna dengbêjên rojhilatê Kurdistanê bi awayekî neteweyî ye. Ji bo vê jî kilam Lo Axao ye ku li ser qeheremanekî neteweyî Senar Mamedî gotiye.

ÇAVKANÎ:

Elend, Kamran (2021) Kimliği Terennüm Etmek; Erivan Radyosu Kürtçe Yayını, İstanbul: İletişim Yayınları.
Erkmen, Ayhan (2022) Çîrokbêj: Bavê Lalo, https://www.youtube.com/watch?v=J--GOkPdorc (28.02.2022).
Mado,Eda(2011)BaveFexriya-EdaMado, https://www.youtube.com/watch?v=RlsGlye7s8g (07.03.2022).
Mahabad,Occo.Dengbêjekî Xelkî Museyîb Gülşenzade https://occomahabad.wordpress.com/2021/07/19/dengbejeki-xelki-museyib-gulsenzade-occo-mahabad/ (14.01.2022).
Mahabad, Occo. Urmiye Radyosunun Kürt Yıldızları https://www.academia.edu/45414726/URMİYE_RADYOSUNUN_KÜRT_YILDIZLARI (14.01.2022).
Oremar, Kakşar (2016) Bername: Awaz, Mijar: Jiyan û Berhemî Hunerî Êran Xanim, https://www.youtube.com/watch?v=-wXgheZQ7po (14.01.2022).
Özmen, Berekat (2021) Ji Arşîva wî: Kilama Arifo Lawo, Bavê Lalo, Bavê Edo, Bavê Firhê, Lê Yeman/Domamê, Werî Lêlê/Zerîyê, Meyrê, Wey Narînê, Lo Axao/Senar Mamedî, Amed.
Parıltı, Abidin (2006) Dengbêjler; Sözün Yazgısı, İstanbul: İthaki Yayınları.
Qado, Zilkif (2020) Can TV: Çîroka Bavê Lalo, https://m.facebook.com/serocantatos/videos/842907296502411/ (03.03.2022).
Surûş, Ebdulkerîm (2016) Gilî û Gazinên Evîndaran; Ji Kelepora Kurmancên Îranê, İstanbul: Nûbihar.
Yaş, Zeyneb, (2020) Dengbêjiya Serhedê ji ser Zarê Jinekê: Îran Xan, http://www.kovaradilop.net/2020/05/05/dengbejiya-serhede-ji-ser-zare-jineke-iran-xan-mucered/ (14.01.2022).

Perawez:

[1] Cihê ku ev îşaret lê ye, tê maneya ku ew der baş nehatiye famkirin û ne zelal e.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

URMİYE RADYOSU'NDA DENGBÊJLİK VE DENGBÊJ İRAN HANIM MUCERED

ÖZET:

Her milettin sahip olduğu bir kültürü ve sanatı vardır. Bu sanat ve kültür farklı şekillerde ortaya çıkar. Kürtlerde dengbêjlik de bu sanatlardan biridir. Bu sanat çok yaygın bir gelenek olup Kürt kültürü hazinesinden beslenmektedir. İçinde toplumun anlatısı, tarihi, sesi ve çok renkliliği saklıdır. Bu gelenek ve kültür her ne kadar Kürtler arasında bazı sebeplerden dolayı zayıflamşsa da halen devam ediyor ve gelecek nesillere ulaşıyor. Bu gelenek içerisinde birçok dengbêj rengi ve sesiyle varoldu, geriye zengin bir hazine ve miras bıraktılar. Dengbêjlik sanatı tradisyonunda yetişen dengbêjlerden bir çoğu unutuldu, bir kısmı da temsilci gibi şan ve şöhretleriyle milletlerinin hafızasına kazıldılar. İran Hanım Mucered (1951-2001) da bu temsilcilerden biridir ki Doğu Kürdistan'da Urmiye Radyosu'nda ilk defa resmi bir şekide kılamlar (şarkılar) söylemiştir. Urmiye Radyosu 1969 yılında Kürtçe yayına başlamıştır. Urmiye Radyosunda İran Hanım dışında Xalê Birê (İbrahim Newrozî 1928-2000), Hamid Yusifî (1926-1979), Mustafa Alizade ve Ehmed Ehmedî de Urmiye Radyosu'nda yıllarca kılam (şarkı) söylemişler. İran Hanım'ın dengbêjlik geleneğindeki önemi Urmiye Radyosu olmaksızın anlatılmaz. Bundan dolayı bu çalışmada Urmiye Radyosu'ndan ve kadın dengbêjlerin temsilcisi olarak İran Hanım Mucered'in hayatı, metodu ve şarkılarından bahsedilmiştir. Bilindiği gibi İran Hanım birçok şarkı söylemiştir. Bazı araştırmacılara göre bunların sayısı 200'e yakındır. Bu makalede, makalenin hacminden dolayı dokuz kılamı deşifre edilmiş ve değerlendirilmiştir. Urmiye Radyosu'nda ilk söylediği kılam da deşifre edilen kılamlar arasındadır. Bu çalışmada iki önemli nokta anlatılmaktadır. Birincisi kadın dengbêjlerin temsilcisi olarak İran Hanım'ın toplum karşısındakı dengbêjlik mücadelesi ve durumu ifade ediliyor. İkincisi de nasılki Kafkasya'da Erivan Radyosu, Irak'da Bağdat Radyosu dengbêjlerin ses arşivi ve dengbêjlik için yeni bir dönem olmuşsa, aynı şekilde onların toplumla ilişkileri ve özellikle İran'da da Urmiye Radyosu Doğu Kürdistan denbêjlerinin yeri ve mekanı olmuştur. Bu çalışmada birkaç önemli noktaya ulaştık. Birincisi İran Hanım'ın dengbêjlik metodu ve Xalê Birê'den alım şeklidir. İkincisi birçok kadın denbêjler gibi efkarlı alın yazısı ve hayatı ki bu da onun kadın kimliğiyle bağlantılı olduğuna işarettir. Üçüncüsü de Urmiye Radyosu'nun rolü toplum ve denbêjlere etkisi ile Doğu Kürdistan'da milli bir şekilde denbêjlerin ortaya çıkması serüvenidir.

Anahtar Kelimeler: *Urmiye Radyosu, Dengbêjlik, Kilam/Şarkı, Kadın Dengbêjler, Îran Hanım Mucered*

DENGBÊJÎ/SINGING IN RADIO URMIA AND DENGBÊJ IRAN KHANIM MUCERED

ABSTRACT:

Every nation has its own culture and art. This culture and art manifests itself in many ways. Among the Kurds, singing is one of these arts. This art is a widespread tradition of the Kurdish culture and language. It includes the traditions, history, sounds

Zakho Centre
for Kurdish Studies

and many colors of society. This culture and tradition among the Kurds, although weakened by various factors, still exists and is passed on to new generations. In this tradition many singers cast their voices and colors, leaving behind a rich legacy. Some of them were forgotten and some of them are in the memory of their nation as representatives with their names and voices and representations. Iran Mucerred (1951-2001) is one of these artists who officially sang for the first time in East Kurdistan, on the radio of Urmia. Radio Urmia started broadcasting in Kurdish in 1969. In addition to Iran Khanim, singers such as Xalê Birê (Îbrahim Newrozî 1928-2000), Hamîd Yûsifî (1926-1979), Mustafa Elîzade and Ehmed Ehmedî also sang for years on Radio Urmia.The importance of Iran Khanim in terms of dengbêjî can not be explained without Radio Urmia. Therefore, in this study, Radio Urmia talks about the life, *kilam*s and style of Iran Khanim as a representative of women singers. It is known that Iran Khanim sings many *kilam*s which according to some researchers number up to nearly two hundred. But in this article because of the size of the article nine of its keys have been deciphered and evaluated as an example. Her first song, which was broadcast on Radio Urmia, was also included in these decoded songs. Two important points are explained in this work. Iran Khanim is the representative of women dengbêjs; and also her situation and her challenge of dengbêjî in spite of the society is explained. Secondly, just as Radio Baghdad in Iraq, Radio Rewan in the Caucasus, has become a new era for the recording of dengbêjs, their relationship with society and the emergence of women dengbêjs in Iran, so Radio Urmia has become the place and shelter of the dengbêjs of eastern Kurdistan. We have reached some important points as a result of this work. The first is the style of Iran Khanim's vocals and her influence from Dengbêj Xalê Birê. The second is like many female voice actors and her tragic title which seemed to have a lot to do with her identity as a woman. Third is the role of Radio Urmia and its impact on society and the audience and the national identity of East Kurdistan.

Keywords: *Radio Urmia, Dengbêjî/Singing, Kilam/Song, Kurdish Woman Dengbêjs, Îran Khanim Mucered*

ÎMAJA MÊRAN DI GOTINÊN PÊŞÎYAN DA

Eşref Buran
Beşa Ziman û Çanda Kurdî- Zanîngeha Dîcleyê/ Turkîya

PUXTE:

Gotinên pêşîyan, dewlemendtirîn cureya edebîyata gelêrî ye. Vê cureya dewlemend û belav li temamê dinyayê bala lêkoleran kêşaye. Gotinên pêşîyan, ne cureyeka fosîlîzebûyî ye, ew hîn jî zindî û xurt e di nava civaka kurd da. Bi taybetî ji devê mezinan gotinên pêşîyan kêm nabin. Çimkî mezinên me, bi van gotinan perwerde bûne û guhên wan tijî ne bi van gotinan. Ji bedêla ku dûr û dirêj qala tiştekî bikin, gotineka wisa xweş û lihevhatî dikin û yekser cilika xwe ji avê derdixin.

Di gotinên pêşîyan da maneyên kûr û veşartî hene, bi qasî di ser ra ne, ewqas ji binve ne. Me jî di vê xebatê da berê xwe da vê cureya giring û me gotinên pêşîyan analîz kirin û nirxandin. Ev vekolîn, bêtir xwe dispêre xebatên çapkirî, pir kêm me îstifade ji kesên jêder girt.

Dîroka xebatên li ser gotinên pêşîyan yên kurdî ketîye sê sed salîya xwe. Di van sê sed salan da gelek xebatên hêja hatine kirin. Herçend xebatên her du sedsalên pêşîn bi tenê berhevkarî bin jî, di sedsala dawîn da kurdan jî bêtir bi çavekî zanistî li gotinên pêşîyan nêrîye, ew polîn û analîz kirine. Bi taybetî di van salên dawîn da, gelek xebatên baş li ser gotinên pêşîyan hatine kirin.

Di xebata xwe da, me berê xwe da îmaja mêran ya di gotinên pêşîyan da. Pirsa me ya sereke ew bû ku, civaka kurd bi çi çavî li mêran nêrîye? Vekolîna me dabeşî sê beşan bûye, di beşa yekem da armanc, sînor û rêbazên vekolînê hatine dîyarkirin û qala hin xebatên sereke yên mijarê hatîye kirin. Di beşa duyem da, têgihên gotinên pêşîyan û îmajê hatine pênasekirin û nasandin. Hin îmajên di gotinên pêşîyan da wekî mînak hatine dayîn. Di beşa sêyem da jî li ser gotinên pêşîyan xebateka analîzî hatîye kirin. Di beşa encamê da jî tespît, bîr û boçûnên me yên derbarê mijarê da hatin eşkerekirin.

Peyvên serekî: *Kurd, gotinên pêşîyan, mêr, îmaj, îmaja mêran*

1-Çarçoveya vekolînê û bîbloyografyaya babetê:

Zanista folklorê, xwedî çarçoveyeka ewçend fireh e ku gelek caran mirov di nava wê çarçoveyê da wenda dibe. Hêleka vê zanistê mil dide zimanzanîyê, hêlek şax diavêje edebîyatê, û çendîn hêlên din jî xwe dispêrin çendîn zanistên din yên mîna dîrok, civaknasî û etnolojîyê. Herçend li ser pênase û çarçoveya têgiha folklorê lihevkirineka sedîsed tune be jî folklor, li ser çanda madî û manevî ya gelan kar dike. Herweki ku ji bêjeya wê jî tê famkirin ew tê maneya agahîyên(lore) derbarê gelî(folk) da.

Ji ber meseleya tengbûn û firehbûna çarçoveya zanista folklorê, beş û binbeşên folklorê jî li gor teorî û lêkoleran guherbar e. Herçend guherbar be jî piranîya lêkoleran li ser rijd in ku stûna sereka ya zanista folklorê, edebîyata gelêrî ye. Jixwe dema mirov dêhna xwe dide qewareya xebatên heyî, ev yek berçav e, çimkî piranîya xebatan li ser

Zakho Centre for Kurdish Studies

vê beşê ye. Di kurdî da ji bo vê beşa folklorê, navên cuda cuda hatine bikaranîn. Navên wekî, 'zargotin', 'edebî millî', 'edebîyata devkî', 'edebîyata zarkî', 'edebîyata gelêrî' her ji bo vê beşa folklorê hatine bikaranîn. Terma 'edebiyata gelêrî' wekî qebûleka giştî bêhtir tê bikaranîn, ji lew ra di vê xebatê de jî ev term hatîye emilandin. Edebîyata gelêrî ew edebîyat e ku ji hêla gelî ve hatîye afirandin, bi rêya devkî ji nifşan derbasî nifşan bûye û şopên xwemalîyê li ser dîyar in.

Edebîyata gelêrî jî di nava xwe da li gor pîvana ku esas tê girtin dabeşî çendîn beşan dibe. Ji binbeşan yek jî gotinên pêşîyan e. Gotinên pêşîyan ji hiş û raman û tecribeyên pêşîyan dawerivîne û bûne hevokên qalibî û darazî. Pêşîyan li ser gelek babetan, hizir û hestên xwe dîyar kirine. Têgiha civakî 'mêr', jî yek ji wan babetan e ku pêşîyan me gelek tişt li ser gotine. Gelek tiştên erênî û neyînî li ser navê mêrî hatine gotin. Di xebata xwe da, dê em nekevin pey pirsa ka ev daraz çendî rast in yan xelet in, çimkî em dê bi çavê îmajî li meseleyê binêrin. Îmaj jî jixwe nakeve pey rastîya tiştan dikeve pey awayê xuyana wan. Ne ku di rastîya xwe da çi ye, çawa ye, çima ye; lê mêr, di çavê pêşîyan da bi çi awayî ne? Civat û cimeata kurd hizir û hestên xwe yên derbarê mêran da, bi çi awayî li gotinên pêşîyan bar kirine, mêr bi kîjan taybetîyên ketine nava van gotinan?

Di xebatê da astengîya sereke ew bû ku em negihîştin hemû çavkanîyên ku me divîyan. Ji ber şertên kurdan yên xweser -pirbûna alfabeyan, pirbûna zaravayan, jîna li welatên cuda, veçapa pirtûkên ku çapa wan tune ye- hin pirtûk bi destê me neketin. Bi taybet ev pirtûkên han giringbûn ji bo mijara me.

Alakom (2013:74) dibêje ku Hecîyê Cindî, sala 1985ê li Êrîvanê pirtûkek bi navê 'Meselok û Xeberokêd Cimaeta Kurd' çap kirîye û tê da bîst û pênc hezar gotinên pêşîyan hene. Alî jî di xebata xwe da destnîşan dike ku folklorîsta kurd Ş. Resûlê teza xwe ya doktorayê li Rûsyayê li ser gotinên pêşîyan kirîye. Derfet nebû ku em vê xebatê jî peyda bikin. (2017:8). Cemîl Şêlazî (2020) di gotareka xwe da amaje pê dike, bi tenê ji salên heftêyî heta vêga 16 pirtûkên gotinên pêşîyan/gotinên mezinan çap bûne. Mixabin ji van berheman, me xwe gihand du sê heban. Ev jî kêmasîyeka din ya xebatê ye.

Li gel astengîyan divê bi kurtayî be jî mirov behsa bîbloyografyaya babetê jî bike. Helbet ji ber ku xebatên derbarê mijarê da "heta sala 1711ê diçin" (Cindî vgh Yildirim, Pertev, Aslan; 2013:52) xebatên derbarê mijarê da gelek in. Me ji wan hinek destnîşan kirin.

Ji alîyê lêkoleran ve tê gotin ku xebata ewilîn xebateka berhevkarîyê ye û sala wê 1711 e û di vê berhevokê da 115 gotinên pêşîyan hene. Alî, ji Şukrîye Resûlê neqil dike ku lêkoler Yegîzarev (1878), Fon Lîkok (1901) û Hugo Mekes (1926) di berhevokên xwe yên derbarê folklora kurdî da cih dane gotinên pêşîyan. (Resûl vgh Alî, 2017:4). "Law Reşîd di pênc jimareyên kovara Jînê (1918) de, bi sernavê 'Kürdlerde Durûb-i Emsal' gotinên pêşîyan ên kurdî berhev kirine û polîn kirine." (Pertev, 2018:219).

Bi qasî ku tê xuyan yekem pirtûka serbixwe ya berhevkarîyê ya Îsmaîl Heqî Şawês e ku wî, ew di sala 1933ê da çap kirîye û tê da 613 pendên pêşîyan hene. (Alî, 2017:5). Piştî vê xebatê em rastî xebata Kamûran Ali Bedirxan-Lucy Paule Margueritte tên, ya bi navê 'Proverbes Kurdes' (Gotinên Pêşiyan Ên Kurdî), tên ku ew sala 1937ê li Parîsê çap bûye. (Öztürk, 2015). "Herwisan 'Pîremêrdî' jî pirtûkek bi navê ''Pendekanî Pîremêrd'' nivîsîye. Di pirtûka xwe da Pîremêrdî gotinên mezinan bi hozankî nivîsandîne." (Saeed,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

2019:17). Şêx Mihemed Xal jî sala 1957ê pirtûkeka gotinên pêşîyan ya bi navê ‘Pendên Pêşînan’ nivîsîye ku tê da 1308 gotinên pêşîyan hene. (Alî, 2017:6). Hecîyê Cindî jî di berhevoka xwe ya bi navê Folklora Kurmancîyê (1957) da di bin navê beşa ‘Metel’ da cih daye gotinên pêşîyan. (2016:441).

Birayên Celîl jî derbarê vê mijarê da berhevkarî kirine, xebatên wan bi navên cuda jî çap bûne. Xebata wan ya pêşî “sala 1976ê li Zurîhê bi navê ‘Mesele û Metelokên Kurdî’ çap bûye.” (Alakom, 2013:73). Hecîyê Cindî sala 1985ê li Yêrîvanê pirtûkek çap kirîye ku nêzî 25 hezar gotinên pêşîyan tê da hene. (Alakom, 2013:74). Hecî Ce’ferî jî sala 1986ê pirtûkeka berhevkarîyê çap kirîye ku navê wê ‘Gotnêt Mezinan Li Devera Behdînan’ e. Mele Mehmûd Dêrşewî jî di sala 1989ê da pirtûkek çap kirîye ku navê wê ‘MişTaxa Çîya Ji Gotinên Pêşîya’ ye. Amed Tîgrîsî jî di berhevoka xwe da cih daye 6762 gotinên pêşîyan, sala çapê ya berhemê 2001 e. Bîlal Hesen jî berhevkarî li Herêma Efrînê kirîye û berhevoka wî di sala 2008ê da çap bûye. Navê berhemê ‘Ji Wêjeya Gel Pend û Peng’ e. Zülfükar Ayyildizî jî gotinên pêşîyan yên kirmanckî bi navê ‘Vateyê Verênan de Ma (Zazaca Atasözleri ve Deyimler)’ sala 2013ê çap kirîye. (Can, 2018:39).

Xelîlê Çaçanî jî sala 2015ê gotinên pêşîyan yên kurdên Kafkazê wekî pirtûkeka berhevkarîyê çap kirîye. Mohammad Nooruldeen Saeedî sala 2019ê derbarê gotinên pêşîyan da tezeka lîsansa bilind amade kirîye ku navê teza wî ‘Layenê Perwerdekirinê Di Gotinên Mezinan Da’ ye. Ehmed Qerenî (2019) jî di pirtûka xwe ya bi navê ‘Gotinên Pêşînan di Navbera çanda Civakî û Perwerdeya Xêzanî da’ li ser rola gotinên pêşîyan rawestaye. Gulê Şadkamê sala 2020î li Xoresanê berhevkarî kirîye û berhem li Tirkîyeyê çap bûye. Mehmet Oncuyî jî sala 2020î pêncî hezar gotinên pêşîyan berhev kirine û Weşanxaneya Sîtavê ev wekî 4 cild çap kirîye. Bi qasî ku em gihîştin çavkanîyan, firehtirîn berhema derbarê mijarê da ev e.

1. **Gotinên pêşîyan û îmaj:**

1.1. **Gotinên pêşîyan**

Herçend xebatên derbarê gotinên pêşîyan yên kurdî da gihiştibe sê sed salîya xwe jî piranîya xebatên heyî, yên sedsala dawîn in. Xebatên sedsalên borî, temamî yên berhevkarîyê ne, di vê sedsala dawîn da, lêkolerên kurd dest bi polînkirin, şirovekirina van berhemên gelêrî kirine. Gotinên pêşîyan, di nava polînkirina edebîyata gelêrî da xwedî cihekî dîyar in ku çendî lêkoleran (Resûl, 1970); (Celîl&Celîl, 2013); (Yildirim&Pertev&Aslan, 2013); (Keskîn, 2019); (Yildirim&Pertev&Aslan, 2013); di polînkirinên xwe da ev cure wekî cureyeka serbixwe dîyar kirine.

Ev cureya serbixwe, xwedî dewlemendîyeka mezin e, bi qasî ku dewlemend e ewçend jî cureyeka belav e, ku mirov li her civateka kurdî rast li gelekan tê. Ji ber kurtbûn û qalibbûna xwe ew bi rihetî têne gotin, jiberkirin û veguhastin. Çaçan, di pêşeka berhevoka xwe da wiha qala vê cureyê/janrê dike; “Janreke wê folklorê, gotinên pêşîyan in. Gotinên pêşîyan di nava janrên folklorê de yên lap e belavbûyî ne. Ti çîrokan, kilaman, lêgendan, beyt û serhatîyan em nikarin hemberî gotinên pêşîyan bikin.” (2015:9). Öztürk jî gotara xwe da ya derbarê babetê da wiha qala giringî û belavbûna vê cureyê kirîye; “Di nav neteweyên cîhanê de, ji nava hemû teşeyên wêjeya gelêrî de, yeka herî berbelav û kêrhatî gotinên pêşiyan e. Lewma em dikarin gotinên pêşiyan, ji aliyê hebûnê û bikaranînê ve wekî cûreyeke gerdûnî bihesibînin.” (2015). Berhevkar Bîlal Hesen jî di pêşeka berhevoka xwe da wiha qala giringîya gotinên pêşîyan dike;

Zakho Centre for Kurdish Studies

“…[P]end û peng bi teybetî abîneyeke û neynikeke hemo aliyên miletan bi şêwekî test û rebeq dide xiyirin. Li gor nirîna min, eger kesek bixwaze miletekî analîzebike û binirxîne, divê ji hemû beşên kelepûrê, bêtir xwe bi ser pend û pengan de birêse û xwe rafêkêyê.”

Saeedî jî di teza xwe da derbarê mijarê da wisa dibêje; “Gotinên mezinan beşeke girîng a edebê folklorê pêk tînin. Ji ber ku hemû kes xwe di gotinên mezinan da dibînin, çi mezin yan genc yan jî zarok. Gotinên mezinan weke jêderekê bawerpêkirî ji alîyê hemû taxên civakî ve hatîye pesendkirin.” (2019:2).

1.1.1. Navê gotinên pêşîyan:

Wekî gelek têgihên din yên kurdî ev têgih jî xwedî çend navên cuda ye. Hinek ji van navan yên zaravayî ne, hinek jî yên devokî ne. Di kurmancîyê da li gor herêman ev navên hanê hatine bi kar anîne. Kurdên Xoresanê dibêjinê, mesel; (Şadkam, 2020:7), kurdên Kafkasê dibêjinê, metelok (Celîl&Celîl, 2013), (Cindî, 2016); kurdên Behdînanê dibêjinê; gotinên(t) mezinan, (Şêlazî, 2020), gelek herêmên din jî navên gotinên pêşîyan, pend, gotinê bav û kalan, qiseyên bav û kalan, gotinên berê, gotinên bav û bapîran bi kar diînin.

Keskîn (2019) jî derbarê mijarê da navên bi kurmancî yên borî rêz dike û dibêje; “[D]i zazakî de vateyê verênan û di soranî de jî wek pendê pêşiyan tê bikaranîn.” (297). Babayiğit ji Hayig û Werner neqil dike ku di zaravayê kirmanckî da navên ‘pîlvatik, giseyverênan, vatenavêrenan’ jî dihê bikaranîn. (Hayig&Warner vgh Babayiğit, 2020:29). Di xebatên pêşîn yên kurdî da ji ber bandora tirkî-osmanî Law Reşîd û Hilmîyê Siwêrekî gotina durub-i emsal jî bi kar anîne. (Pertev, 2018:219-232). Meyila giştî van çend sal in ku li ser têgiha gotina pêşîyan e, ji ber vê yekê me jî di xebata xwe ev têgih emiland.

1.1.2. Pênaseya gotinên pêşîyan:

Dema ku mirov dêhna xwe dide awayê dariştina vê têgihê, kêm zêde hin raman di serî da peyda dibin. Gotinên ku pêşîyan gotine, gotinên ku pêşîyên me bawerîya xwe pê anîne û ew neqilî me kirine. Helbet dema ku mirov dikeve nava kûrahîya mijarê tê dîtin ku, çi lêkolerên kurd çi jî yên bîyanî bi awayekî cidî serê xwe bi meseleya pênasekirina têgihê ra êşandine. Alî ji Şikrîye Resûl neqil dike ku wê pênaseya gotinên pêşîyan bi vî awayî kirîye. “Hevokekî kurt a watedar e, piranî wezin û serwadar e. Di alîyê zêde watyê û zêde bikaranînê de hêzekî zêde ji bo xemilandina qise heye.” (Resûl vgh Alî, 2017:2). Mazî jî di xebata xwe da pênaseyeka wisa danîye ji bo gotinên pêşîyan: “Gotinên pêşiyan; hevokên bi darazî, hukmî û bi pendî li nava gel ji bo vegotin û rexneya tiştekî û bûyerekê an ramanekê hatine zimên.” (2018:15) Saeed pênaseya Kerîm Şarezayî wisa neqil dike. “Gotinên mezinan çend peyvekên kurt ên zimanê Kurdî ne. Ku ramanek bilind tê da ye ku ji kevin da hatîne di nava zimanê Kurdî da. Çawanîya jîyanê, rewşit, bîr û baweran nîşan dide.” (Şareza vgh Saeed, 2019:3). Bi qasî ku ji pênaseyan tê famkirin, lêkoleran di pênaseyên xwe da yan hin taybetîyên gotinên pêşîyan derxistine pêş yan jî qala babetan kirine. Pênaseya ku Öztürkî (2015) kirîye, bêtir berfireh û cihgir e. Pênaseya Öztürkî bi vî awayî ye:

“Gotinên pêşiyan, texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku, serborî, tecribe û rabirdûya civakan bi awayekî zargotinî û bi bandor rave dike. Gotinên pêşiyan; raman û hestên

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

rayagiştî, nexşerêya helwesta jiyana neteweyî, rengvedana zanist û çanda gel, paşxaneya daneheva civakî û hilberînên binehişa kolektîfî ye.”

Li gel pênaseya Öztürkî pênaseya Şadkamê jî pênaseyeka xurt û zelal e. Şadkam di xebata xwe da meselê ango gotinên pêşîyan wiha pênase dike: “Mesel, yek yan çend hevok in ku xelk di gotinên rojane da, wekî şîret, agahî, qanûn û norm bi kar tîne ku bikaribe mebesta xwe bi ronahî û kurtahî bigihîne. Mesel, berhema zanist û ezmûnên civakê ne.” (2020:7). Keskîn jî pênaseya gotinên pêşîyan kirîye, pênaseya wî jî bi vî awayî ye: “Gotinên pêşiyan, ev gotinên qalibgirtî ne ku di nav demên dûr û dirêj de heta bi roja me hatine û rewş û têkiliyên civakê bi me didin nasîn.” (2019:297). Çîftçî jî derbarê gotinên pêşîyan da dibêje ku; “Gotinên pêşiyan di nava pêvajoya dîrokê de weke zagonên neteweyan e ku şiklê jîna wan, kevneşopî û ‘edetên wan destnîşan dikin. Gotinên pêşiyan di nava demsal û sedsalên dûr û dirêj de dişikilin û nirxên dunyewî, olî û exlaqî yên civakan berpêş dikin.” (2016).

1.1.3. Taybetîyên gotinên pêşîyan:

Ev cureya hinde çalak û zindî, herweha xwedî dewlemendîyeka zêde û berberbelav, gelo xwedî çi taybetmendîyan e ku karîye ewqas rengdêrên erênî daîne ber navê xwe? Helbet divê xwedî hin taybetîyên wisa be ku ew bibin egerên vê zindîbûn, dewlemendî û berbelavîyê. Bi giştî mirov dikare van xalan daîne ji taybetmendîyên gotinên pêşîyan:

- Taybetmendîya herî sereke ya gotinên pêşiyan qalibgirtîbûna wan e. (Keskîn, 2019:299). Helbet dikare peyv û awayê gotinê li gor dever, herêm û zaravayan c uda be, lê mebest ji qalibbûnê ne ev e. Mebest jê li herêmekê bi çi awayî be, şênîyên wê herêmê wî qalibî naguherînin.
- Malê gel in, nivîskarê wan ne diyar in. (Mazî, 2018:17). Gotinên pêşîyan jî wekî cureyên din yên edebîyata gelêrî, ne dîyar e kengî derketine yan jî kê ew gotine. Loma jî ew anonîm in, gelêrî ne.
- Gotinên pêşiyan, bi kurtî û bi puxtedarî tên avakirin. Her çend awarteyên wê hebin jî, bi piranî ji hevokekê yan ji du hevokan pêk tên. (Öztürk, 2015). Piranîya gotinên pêşîyan kurt in, hin jê hene du peyv in, hin jê hene sê yan çar. Bi raya min egereka zindîbûn û berbelavbûna wan jî ev kurtbûna wan e ku bi rihetî tên jiberkirin û gotin.
- “…[G]otinên pêşiyan encama taqekirina gel e, gelek ji van li ser mijarekê, bi du rengên dijhev, yanê, bi erênî û neyênî tên gotin. Wekî nimûne: *“Dîkê rojekê be, ne mirîşka salekê be* (erênî *) “Destê tu nikanî gezkî, maçke û deyne ser serî xwe* (neyênî)” (Cefer, 2006:2). Gotinên pêşîyan ji tecrûbeya gelî derketine û nizilîne û heta roja me hatine. Ji ber ku li dinyayê li ser babetekê tiştên cuda û carnan jî li dijî hev diqewimin, pir asayî ye ku gotinên pêşîyan jî di daraza xwe da ji hev cuda heta li dijî hev bin jî.
- Gotinên pêşiyan bi piranî ji aliyê ziman ve xwedî nasnameyeke netewî ne. (Keskîn, 2019:300). Herçend di zimanên din varyant û ji alîyê maneyê ve hevmaneyên van gotinan hebin jî her gelî li gor ol, rabirdû, erdnigarî, tore û feresata xwe ya jîyanê, rengê xwe daye gotinên xwe, mohra xwe lêxistîye.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

- Di gotinên pêşiyan da mecaz heye. (Öncü, 2020:28). Herçend gelek gotinên pêşîyan ji rûdan, bûyer û tiştên rasteqîn nizilîbin jî gelek ji wan maneya xwe ya bingehîn winda kirine û di maneya mecazî da dihên bikaranîn. Wekî ku dibêjin, *"Kutiko wêsan nêlewano."* (Düzgün&Comerd&Tornêcengi, 1992:60). tê gotin ku, kûçikê birçî naewtê. Ev gotina pêşîyan sedî sed mecaz e, çimkî kûçik birçî be jî diewte têr be jî diewte. Maneya wê ew e ku, têrxawinî tune be, mirov bêtir bêdeng e. Gelek gotinên pêşîyan hene ku maneya wan ya mecazî xurttir e ji ya bingehîn.
- Ne di gotinên Kurdî bi tenê da, lêbelê di gotinên gelên din jî da hest bi kêş û curekê musîqayê têkirin. Eve dibe e mercê cudakirina gotina ji axaftinên rojane. (Şareza vgh Saeed, 2019:40). Di navbera peyvên gotinên pêşîyan da kêş, ahenga dengî heye, gelek caran serwa û paşserwa jî hene. Wekî ku di vê gotinê da, *"Bi**ke** bi**vîne**, me**ke** me**vîne**."* (Aldatmaz, 2014:75). jî tê dîtin ev hevoka ku ji du hevokên sade pêk hatîye di navbera hevokan da hem kêş heye hem jî serwa heye.

1.2. **Îmaj:**

Xebat û rayên derbarê tegiha îmajê da diçin heta Yûnana Antîk. Fîlozîfê Yûnana Antîk Arîstoteles derbarê îmajê da dibêje ku; "ji bilî maneya bêjeyekê dema mirov maneyeke din lê bar bike ew tişt îmaj e." (İnce vgh Acun, 2018:25). Ango tişteyek bi maneya xwe hebe ew nasnameya wê ye, lê bi çavekî derekî maneyeka din lê bihê barkirin ew jî îmaja wê ye, rengvedana wê tişteyê ye. Ji ber ku her kes bi çavekî dîtir li tişte û bûyer û têgihan dinêre û carnan jî riwangeya mirovî jî bixwe diguhere îmaj diguherin. Loma jî Millas dibêje ku, îmaj têgihîştineke guherbar e. (vgh Kan, 2019:18). Ango famkirineka giştî nîn e, jixwe dê di rûpelên pêş da derkeve ku gelê kurd; li ser bûyer, kes û tecribeyan xwedî çendîn boçûnên cuda ye.

2.2.1. Pênaseyên îmajê:

Divê bê zanîn ku li gor dîsîplînên cuda wateya terma îmajê guherîye. Kan di pirtûka xwe ya derbarê mijarê da wiha dibêje;

"Îmaj dikare bi awayekî giştî wiha bê pênasekirin: 1. Rewşa kes an heyînê ye ku bi rêya huner, wêne û fotograf çêbûye. 2. Rengvedan an xeyal e ku ji rûxareke rewnaq an neynikekê xuya dibe. 3. Xeyala kes an tiştekî ya di mêjî da ye. Di nava van pênaseyên îmajê da ya ku me zêdetir eleqedar dike benda sêyem e. Li gor pênaseya îmajê ya benda sêyem ew dikare wekî wateya tiştekî yan kesekî ya sembolîk bê şî

rovekirin. Bi gotineka din ew dikare wekî kurteya çavnêrîya tiştekî yan kesekî bê pejirandin. (Kan, 2019: 17).

Roger Acun jî gotina helbestvanê tirk Özdemir İnce neqil dike û dibêje; "Îmaj di mêjîyê mirov de vebeyîna tiştan e. Vejandina tiştan ya di hişê mirov de [ye.] Ango rastîya tiştên ji me xweser ku di mêjiyê me de rû vedidin." (İnce vgh Acun, 2018: 28). Mirov dikare wekî temsîlkirin yan jî sembolkirinê jî jê fam bike. Îmaj dişibe rastîyê bixwe lê rastî bixwe nîn e, hestpêkirin û têgihîştina rastîyê ye.

Bi giştî mirov dikare ji gelek alîyan ve îmajan dabeş bike. Lê ji bo ku meseleya me ya temsîl yan jî sembolê baş bihê famkirin dabeşkirina herî pratîk û karîger dabeşkirineka du alî ye. Mebest jê îmajên erênî û îmajên neyînî ne. Birayên Celîl jî di

xebata xwe da wiha dibêjin; "Piranîya gotinên pêşîyan, bi par ve dibin li ser du qisman: kar û kirêd baş û kirêd xerab." (2018:14).

Di gotinên pêşîyan da carna jî dê em rast lê bihên ku li ser heman tiştî hem fikirên erênî hene hem jî yên neyînî. Mesela di vê gotina pêşîyan da ku dibêje *"Çovê kê stûr e, ardê wî hûr e"* (Celîl&Celîl, 2018:140). Çov, bi maneya mecazî zilim û xurtî ye. Di vê gotina pêşîyan da îmaja zilim û kotekîyê erênî ye. Mebest jê heke tu xurt bî, hêz û qeweta te hebe dê her tişt li gor dilê te bibe. Lê dema ku mirov bala xwe dide vê gotinê ku dibêje; *"Tajî te ku bi zorê şande awê,[1] ti awê nakê."* (Celîl&Celîl, 2018:140). Di vê gotina pêşîyan da jî îmaja xurtî û zorîyê neyînî ye ango tê gotin ku mirov bi zorê nagihîje meqsed û miradê xwe.

2.2.2. Hin Îmajên Di Gotinên Pêşîyan Da:

Miletê kurd ji serborî, hest û hizrên xwe gelek şîret derxistine ku îro roj em di dirûvê gotinên pêşîyan da rastî wan şîretan tên. Li ser gelek babet, tişte, bûyer, hest, hizir û bûneweran em liqayî gotinên pêşîyan tên. Çi tişt nemaye ku pêşîyên me negotine, jixwe loma jî dibêjin, pêşîyan ji paşîyan ra tiştek nehiştîye. Helbet ne cihê wê ye ku mirov behsa gelekan bike, wekî nimûne em dê behsa hin îmajan bikin.

2.2.2.1. Îmaja Meh û Demsalan*:*

Kurd miletekî xwezahez in, çimkî piranîya jîyana bav û bapîrên kurdan li nava xwezayê derbas bûye. Kurdên gundî pirtir bûn ji gundên bajarî. Loma jî wan baş bala xwe daye bûyer û guhertinên meh û demsal û salnameya gelêrî. Ji gotina *"Adar e, sibehê sar e, êvarê bihar e."* (Hesen, 2012:12) Em fam dikin ku adar meheka derbasok û hewaya wê guherbar e û divê mirov bawerîya xwe bi germîya wê neîne. Ji vê gotina pêşîyan ya ku dibêje *"Mastê biharan bidin neyaran, mastê payîzan bidin ezîzan."* (Cefer, 2006:47) em fam dikin ku pez û dewar hem nû zaye hem jî biharan çêre û gîya pir e, loma jî şîrê ajelan ron e. Mastê şîrê ron jî ron e û xwarina wî zor e û tam li gor tama devê neyaran e. Berovajîyê wê payîzan şîrê ajelan kêm dibe lê şîrî heyî şîrekî tîr e. Mastê vî şîrî jî wekî qaliban tê û xwarina wî xweş e, loma jî layiqî devê mirovên hêja û ezîz e. Dîsa di vê gotina pêşîyan da tê gotin ku *"Zivistan sar e, qerpal yar e."* (Aydoğdu, 2020:199). Ev gotin temîyekî li mirovan dike ku zivistanê dosta/ê mirovî cilên stûr in, çimkî ew cil tune bin dê ji ber sermayê yan nexweş bikeve yan jî bimire.

2.2.2.2. Îmaja Gotin/Axaftinê*:*

Gotin yan jî axaftin rêya têkilîdana mirovan e. Pêşîyên me li ser gotinê jî gelek tişt gotine. Ji *"Gotina siba û êvara nabit êk."* (Dêrşewî,1989:87) em fam dikin hin mirov hene ku li gor şert û mercan gotina xwe diguherin, ew kes mîna nanê sêlê durû ne. Tişta êvarî dibêjin sibê qebûl nakin yan jî tişta sibê dibêjin êvarê berovajîyê wê dikin. Dîsa ji vê gotina pêşîyan ya ku dibêje; *"Heywan bi bênd,[2] merî[3] bi qisê tên girêdan."*ê (Zarbêja 1.) em fam dikin ku kurdan qîmeteka zêde daye sozê/qiseyê. Sozdan wekî senedê qebûl kirine ku divê mirov pê ve girêdayî bimîne û soza xwe nexwe. Ji gotina *"Zimanê xwe jê ke, dewsa xwe çêke."* (Öncü, 2020a:493) jî em têdigihên ku pirbêjî dibe belaya serê mirovî. Ji bo ku qîmeta te hebe, divê li cihê hewce tu xeber bidî, rêya cihçêkirinê di kêmxeberdanê ra derbas dibe. Ev gotin şîreta kêmxeberdanê li me dike. Ji van mînakan jî em fam dikin ku kurdan bi çendîn alî û çavên cuda li vî karî nêrîne.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

2.2.2.3. Îmaja Cîranan/Cîrantîyê*:*

Cîrantî awayekî têkilîyan e ku di navbera mirovên malên wan nêzî hev in pêk dihê. Cîrantî jî mîna xizimtî û kirîvatîyê xwedî rê û rêgezên toreyî ye. Di nava cîranan de hiqûqek jî heye ku ev hiqûq encama serborîyên hezarsalî ye. Ji gotina *"Deriyê xwe bigire, cîranê xwe diz dernexe"* (Omerî, 2021:44) em fam dikin ku herçend îmaja malcîranekê baş be jî nayê wê maneyê ku her tişt jî serbest e di navbera malcîranan da. Loma jî hiqûqa cîrantîyê ferz dike ku mirov tevdîra xwe li hember cîranê xwe jî bigire. Ji vê gotina pêşîyan ya ku dibêje, *"Cîranê xerab heft taxan xera dike."* (Öncü, 2009:102) divê em fam bikin ku cîranê xerab gelek tiştên xerab dikare biîne serê mirovî. Ev gotin şîretê li kesan dike ku tim û daîm divê mirov hifza xwe ji cîranên nebaş bike.

2.2.2.4. Îmaja Agirî*:*

Peyva agirî di gotinên pêşîyan da wekî ar, adir jî derbas dibe. Ji ber ku di pêşketina şaristanîyê da roleka sereka ya agirî heye, kurdan jî li ser agirî gelek gotinên pêşîyan çêkirine. Agir ji gelek alîyan ve û bi gelek awayan hatîye şirovekirin. Di vê gotina pêşîyan da tê gotin ku, *"Agir bêalav nabe."* ('Elî, 2006:34) du mane hene, hem maneya rastî hem jî ya mecazî. Maneya rastî ew e ku li ku derê agir hebe, dê alavî jî li wir be, çimkî alav encama sotînê ye. Maneya mecazî jî ew e ku li derekê qîsûrek, kêmasîyek hebe, helbet sebeba wê jî heye. Ti tişt belasebeb nayêne gotin. Dîsa di gotineka din ya kurdî da kurdan bala xwe daye talûkebûna agirî. Loma bi zarê agirî dibêjin ku; *"Agir dibêje bi min bimîze lê bi min nelîze."* (Tîgrîs, 2001:12). Bi vê gotina pêşîyan jî zarok tên pererdekirin ku agir ne pêlîstok e, xeternak e û ew dikare zirarê bide mirovî.

2.2.2.5. Îmaja Azadî/Bindestîyê*:*

Têgiha azadîyê û têgiha dijberî wê bindestî/koletîyê bala miletê kurd kêşaye û li ser van têgihan jî hizir û hestên xwe dîyar kirine. Bêtir azadî hatîye pesinandin, bindestî û koletî jî hatine rexnekirin. Ji gotina *"Bila mirî û li gorê bim, bila ne girtî û li hepsê bim."* (Öncü, 2020a:634) em fam dikin ku mirin jî xweştir e ji dîlbûn û bindestîyê. Ango mirov dikare berovajîyê wê jî bihizire ku bindestî hîn ji mirinê jî xerabtir e. Dîsa di vê gotina pêşîyan da, ya ku dibêje, *"Bila mirov dîkê rojekê bit, ne mirişka sê sala bit!"* (Dêrşewî,1989:32) tê famkirin ku azadîya rojekê, ji bindestîya sê salan baştir e. Dîk azadîyê sembol dike, mirîşk jî xulamtî û bindestîyê.

2.2.2.6. Îmaja Mirinê:

Ji bo jîndaran tiştê herî xeternak talûkeya mirinê û mirin e. Dema mirov bi çavê lêkolînê li gotinên pêşîyan yê derbarê mirinê dinêre, dibîne ku kurdan analîzên baş li ser mirinê kirine. Di gotina *"Nîşanên baranê ba ye, yên mirinê ta ye."*yê (Cefer, 2006:53) da tê dîtin ku gelek mirov piştî bi tayê ketine mirine. Ta, bûye nîşana hatina mirinê. Birra jî wexta nexweşî li mirovî giran dikin ta ji canê mirovî dernayê. Li nava xelkê tê gotin ku berê ji ber kêmbûna dermanan û nebûna bijîşkan gelek mirov bi tayê diketin û dimirin. Ji gotina*"Bi girî, nayê şûna xwe mirî"* (Öncü, 2020c:1047) jî derdikeve ku kesek mir, êdî nikare şûn ve vegere. Mirov bike hawar û fixan jî mirî venagere, çimkî çûn heye hatin tune ye. Loma jî girî bêfeyde ye. Di vê gotinê da jî ya ku dibêje;*"Mirina qelender ji mele re şîn e, mirina dewlemendan ji mele re mizgîn e."* (Aydoğdu, 2020:147). rastîyeka dinyayê hatîye eşkerekirin. Belê mirin her kesî dike yek, lê şîna her kesî jî ne wekî hev e. Şînkirên beg, şêx, axa, dewlemendan, bêtir in ji yên feqîr û bêkesan. Ji ber ku mela di

şînan da hem dixwin vedixwin hem jî ji xêra mirîyê/î sûdê werdigirin, dê helbet qîmeteka zêdetir bidin dewlemendan. Çimkî li şîna feqîr û bêkesan ne xwarineka xweş heye, ne jî îsqat û xêrên din.

2.2.2.7. Îmaja Keç/Kuran:

Keç û law berendamên jintî û mêrtîyê ne herweha yên dayiktî û bavtîyê ne. Ji ber ku nifşên dahatûyê li ser destên wan radibin, pêşîyan bi baldarî tişt li ser wan gotine. Ev gotina ha ku dibêje, *"Bira mirov ziyareta xirab bike, navê qîza xirab neke."* (Alakom, 2013:83). bala me dikişîne ser xirabkirina navê keçikê. Xirabkirina navê wê, ji xirabkirina zîyaretê jî xirabtir e. Gelo çima? Çimkî kurd kêm zêde civateka feodal bûne û li wargehên biçûk jîyane. Ku navê keçikekê bi xirabîyê derê, êdî kes qîmetê nade wê, kes pê ra nazewice, kes pê ra hevalî û dostîyê nake. Loma jî ev gotina pêşîyan civakê hişyar dike, divê navê keçikan bi xirabîyê dernekeve ku derket êdî paqijîya wî navî nîn e. Di vê gotinê da jî *"Bavê qîza sultan in"* (Celîl&Celîl, 2018:140). tê dîtin ku keç ji dayik û bavê xwe ra baştir in ji lawan. Di paş perdeya vê gotinê da berawirdîyeka heye, ku bavê keçikan û bavê lawan dide ber hev. Bi serborî û tecribeyan jî eşkere ye ku keçik bêtir qîmetê didin dayik û bavê xwe û di rojên wan yên teng da li wan xwedî derdikevin.

"Bila kurê pîrê tîravêj be, bila tîra ewil li bin guhê pîrê be." (Bîngöl, 2014:31) Ev gotina pêşîyan pesnê kurên jîr û jêhatî dide. Li gor raya giştî ya kurdî divê ewladên kurîn jîr û jêhatî bin, îmaja kuran li cem civakê bi vî awayî ye. Nabe ku kurek tirsok û devnerm be, divê ew tîravêj be. Tîravêjî sembola jîrtîyê ye. Ev gotin jî *"Kurê baş ji malbatê re dostan, ê xerab jî neyaran çêdike."* (Omerî, 2021:109) bi bîra me tîne ku kurên baş hene û yên xerab jî hene. Kurên baş karê dikin, yên xerab zirarê dikin; yek dostan zêde dike yê din dijminan. Ev gotin di ber ra, kurên baş dipesnîne û kurên xerab jî rexne dike.

2. **Îmaja mêran û gotinên pêşîyan:**

Herwekî ku di beşên pêş da jî hat dîyarkirin ku gotinên pêşîyan neynika neteweyekê ne, heke mirov bivê neteweyekê nas bike, divê li gotinên pêşîyan yên wî miletî binêre; çimkî awayê hizirîn û hestpêkirina miletî di van gotinan da xweş kişf dibe. Her kurê ku ciwanîyê li pey xwe dihêle ji alîyê civaka kurd ve wekî mêr tê qebûlkirin û binavkirin. Ango mirov ji alîyê zayendî ve lê binêre, hema hema nîvê mirovên li dinyayê di demeka emrê xwe da dibin mêr. Loma jî pêşîyan li ser vê zayendê, li ser pêvajoya temenî gelek tişt ristine. Çi çê û xerab, çi bi awayê netar behsa mêr/zilam/peyayan di gotinên pêşîyan da zaf hatîye kirin.

Dema mirov çavê xwe li gotinên pêşîyan yên ku navê mêr/zilam/peyayî tê da heyî dinêre yekser liqayî wê tê ku di gelek gotinên pêşîyan da gotina 'mêr'î û mêranîyê ji alîyê wateyê ve têkilhev bûye. Wekî ku geleke caran dayikek ji kurê xwe ra dibêje, *"Ma tu ne mêr î?"* Mebesta vê gotinê êdî ji zayendbûna vê borîye û bûye mecaz; maneya jêhatî, hêzê, şerî û karkirinê di xwe da dihewîne. Xaleka din jî heye ku di hin gotinên pêşîyan da ti taybetîyek bi navê mêrî ve nayê kirin û peyva mêr wekî netar tê bikaranîn. Ango ne alîyê erênî tê gotin ne jî alîyê neyînî yê peyvê. Bi gotineka din îmajeka wan tune ye. Wekî ku di vê gotinê da dibêje *"Jin û mêr tevr û bêr."* (Aydoğdu, 2015:119). Derbarê mêrî da em nabin xwedî ti agahî. Tenê tê famkirin ku divê jin û mêr bêhev bêkêr in, yan jî asta kêrdarîya wan kêm e. Wekî tê zanîn li gundan û di karên çandinî û ajeldarîyê da, ne bê tevrî karekî baş tê kirin ne jî bê bêrê. *"Serê mêra çîyaê bidûman e."* (Celîl&Celîl, 2018:76). Di vê gotina pêşîyan da jî tê gotin ku mêr dikevin nava gelek bûyer û rûdanan.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Teşqeleya wan qet xelas nabe. Di vê gotinê da jî em rastî alîyekî erênî yan neyînî nayên. Ji ber ku bi awayekî giştî di gotinên pêşîyan da yan îmaja erênî heye yan jî îmaja neyînî li ser mêran e, loma jî me ew kirin du bir.

2.1. **Îmaja mêran ya erênî:**

Mêr bi awayekî erênî bi çendîn taybetîyên xwe di gotinên pêşîyan da cih digirin. Bi van taybetî yan jî rengdêran mêr hatine pesinandin û yên ku ji van taybetmendîyan bêpar in jî bi rêya berawirdîyê hatine rexnekirin. Taybetmendîyên mîna comerdî, xebatkarî, zanatî û mêrxasîyê hin ji wan îmajên erênî ne. Ango civaka kurd bi rêya gotinên pêşîyan nirxên baş wekî armancekê dîyar dike. Helbet divê zarok, xort û civak gişt li gor vê armancê tev bigire da ku nirxên baş yên civakê bên parastin û domandin.

3.1.1. Îmaja mêrê mêrxas/egîd:

Li gor hizra giştî ya kurdan divê mêr; ji şer û pevçûn û kuştin û lêdanê netirsin. Delîleka vê jî ew e peyvên mîna 'mêr-xas' û 'mêr-anî'yê jî ji reha peyva mêrî derketine. Di şerî da tirsonekî, dudilî ne karê mêran e, civaka kurd van mêran şermende dike û bi gotinan jî wan rexne dike. Herweha mêranî û egîdîyê jî xweş dike li pêş çavên kesan. Çimkî kesek mêr be û li ser vê mêranîya xwe bê kuştin jî xem nake, navê wî dimîne li dinyayê loma jî dibêjin, *"Ga dimre çerm dimîne, mêr dimre nav dimîne."* (Mazî, 2018:179). Dîsa wekî vêya dibêjin,*"Xûnê meran, la arde namîna."* (Kömür, 2003:84). Ango divê mirov ji mirinê û kuştinê netirse, ku mirov bimire jî zarokên mirovî -çimkî wisa tê bawerkirin ku "bav mêr be, zarok jî dê li bavê xwe biçin"- dê heyfa mirovî hildin. Gotina din ku îmaja mêran ya mêrxasîyê nîşan dide ev gotin e; *"Mêrê mêrxas dûr va kivş e."* (Celîl&Celîl, 2018:76). Ji ber ku her kes ji mêrxasan şayişîya xwe dike nav û dengê wan zû belav dibe û xelk wan nas dike, ew êdî kifş dibin. Di vê gotinê da jî *"Şevereş, şeva mêrê çê ye."* (Celîl&Celîl, 2018:78). Şevreşî nîşana rojên tal û teng û zorîyê ye, ku kesek mêr be divê di rojên wisa da xwe nede paş, çimkî encax mêrên egîd bikarin ji bin barên wan rojan rabin. *"Kihêl di bin mêrxasan de dibezin."* (Hesen, 2012:162) Ji vê gotinê jî tê famkirin ku ne tenê mirov qedir didin mêrxasan, heywan bi heywanetîya xwe jî dizanin ku çi baş e çi xirab e. Kihêl, qedrê mêrxasan digire, qelsemêr û mêrxasan nake heman kodê.

3.1.2. Îmaja mêrê jîr û zana:

Jîrî û zanatî li tevayîya dinyayê du nirxên baş û erênî ne. Ev her du nirx li mêran jî hatîye kirin ku mêrek xwedî van her du taybetmendîyan be, kara wî digihîje her kesî. Hem hevser û zarokên wî, hem malbat û êl û eşîra wî hem jî civaka ku lê dijî pê rihet e. Lê helbet nîşaneyên mirovên zana û jîr çi ne? Em bersiva vê, pirsê jî ji gotinên pêşîyan fêr dibin. Li gor pêşîyan, mêrê baqil ewilî guhdar dike, gotina xwe piştî guhdarkirinê dibêje, loma jî gotine *"Merkî baqil, şore xa paran daka."*(Kömür, 2003:70). Dîsa ji gotineka din ya pêşîyan em hîn dibin ku nîşaneyeka din ya zanatîyê jî hesabgerî ye. Ji nava koma mêran mêrê herî baş ew e ku dema tiştekî dike, hem hesabê pêş dike hem jî yê paş. Loma jî dibêjin,*"Ji milka aş, ji haceta simteraş, ji mêra mêrê dike hîsabê pêş û paş."* (Hesen, 2012:133). Di vê gotinê da mêrê hesabger, aş û simtiraş dikeve heman komê û ku her yek di nava koma xwe da ya/ê herî baş e. Herçend îro roj ti qîmeta aş û simtiraşê nemabe jî, mêrê ku hesabê pêş û paşîyê dike hîn jî zana û jîr tê hesibandin.

3.1.3. Îmaja mêrê xebatkar:

Li ser feyde û handana xebitînê çendîn gotinên pêşîyan hatine gotin ku di wan da bi awayên cuda cuda şîret li mirovan tê kirin ku bixebitin. Ligel pesindana xebatê rexne jî li teralîyê hatine kirin ku wekî di vê gotina pîşîyan da dibêje,*"Destê betala li ser zikê vala"* ye. (Aydoğdu, 2015:61). Ku mirov xwe li betalîyê daîne, dawîya betalîyê her xesar e, dê zik birçî û vala bimîne. Ku mirovek bivê zikê xwe têr bike divê destê xwe jî qilêr bike, çimkî *"Destê bi qilêr bide ser zikê têr"* (Aydoğdu, 2015:61). Ji van gotinên pêşîyan yên ku xebitînê raberî mirovan dikin hinek jê li ser zilaman jî hatine gotin.

Li gor qinyata kurdan, mêrê baş û çê, berpirs e ji ziktêrkirina pîreka xwe û zarokên xwe. Ku mêrek vê peywirê neîne cih ew wekî mêrekî xerab yan jî nebaş tê dîtin. Loma jî mêr di civaka kurdan da hewl didin ku nekevin vê asta nebaşîyê, ji ber vê jî bi şev û roj dixebitin ku malîyên wî mihtacî kesekî din nebin. Loma jî pêşîyan gotine, *"Merki camêr nanî xa ja kevir tîna dar."* (Kömür, 2003:71). Şert û merc çiqas giran bibin jî, nan ketibe nava kevirî jî dê kurd wî kevirî bişikîne û xwarina malîyên xwe peyda bike. Çawa ku şêr ji bo zikê xwe û çêlikên xwe di hewldanê da ye, çi ti tiştekî natirse û xwe ji qeda û belayan nade alî, mêr jî wisa ye di nava kurdan da. Loma jî destên mêrî şibandine lepên şêrî û gotine, *"Şêr bi lepê xwe mêr bi destê xwe."* (Hesen, 2012:232). Di vê gotina pêşîyan da jî tê gotin ku *"Xezîna zêra xilas dibe lêbelê şulê mêra xilas nabît."* (Cefer vgh Saeed, 2019:73). Mane jê ev e, dibêje ku dê û bav, dema hûn keça xwe didin mêrî, li dewlemendî, zêr û zîv û pere; mal û milkên zavayî nenêrin. Mal û milkê wî zêrên wî bi qasî xezîneyekî pir bin jî wexta ku ew mêr şixulker nebe dê ew zêrên xezîneyê jî biqedin. Lê ku ew mêr şixulker û karker ke dê ti car karê wî xilas nebe, çimkî mirovê ku bi keda enîya xwe, bi şixula xwe pere qezenc bike qedr û qîmeta wî pereyî jî dizane. Ev gotina pêşîyan şîretê li dê û bavan dike, herwesa li keçên berzewac. Gotineka din jî heye ku dibêje,*"Mêr ki wi qerêt bin, mal li dinê pir e."* (Şadkam, 2020:110) Ev gotin jî li ser mêrên xîretkêş hatîye gotin. Gotin amaje pê dike ku li dinyayê mal û milk û qezenc pir zêde ye, bes bila mêr bivê. Heke mêrekî xîretkêş be dikare bibe xwedîyê mal û milkên dinyayê. Pîvana dîyarker ya mal û hebûnê xîretkêşîya zilamî ye. Hevmaneya vê gotinê jî heye ku dibêje; *"Milk hemû milk e, mêr gerekê jê hilke."* (Celîl&Celîl, 2018:73)

3.1.4. Îmaja mêrê namûskar:

Têgiha namûsê di nava civaka kurd da xwedî navekî giran e. Herçend di van çend salên dawîn da ji ber hin bûyerên sotîner û nerewa kevir û kuçik li vê tegihê bên barandin jî hîn li gor qinyata kurdan wa ye ku, kurd û namûs bê hev nabin. Li gor kurdan namûs hem giring e hem jî pîroz e loma jî gotine, *"Namûs çe[ng] kirin kûçka, kûçka nexwar."* (Celîl&Celîl, 2018:163). Ev tê wê maneyê ku kûçik bi kûçiktîya xwe dizanin namûs çendî giring û pîroz e. Ji ber vê giringî û pîrozîya wê ew tiştekî daîmî ye, ne tê berdan ne jî tê girtin, loma jî gotine *"Namûs ne xeml e."* (Öncü, 2009:523). Mêr nikare bênamûsîyê qebûl bike, bênamûsî lekeya herî xetar e ji bo mêrê kurd. Çawa ku mar bi jehrê xwe diparêze û jehra marî tune be kesek ji marî natirse û mar bêkêr dibe. Ji bo mêrekî jî wisa ye, namûsa wî tune be ew li ber helakê ye. Ji ber wê jî gotine; *"Namûs ji mêr re, jehr ji mar re."* (Öncü, 2020c:1148). Ango ne mêr bê namûs dikare bijî ne jî mar dikare bê jehr bijî. Ji ber ku barê namûsê hinde giran e, mêrê mêr ji bo parastina namûsa xwe xwe ji talûke û xeterayan nade alî, li ser namûsa xwe tê kuştinê.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Di vê gotina pêşîyan da jî dibêje ku *“Mêrê mêr, ser namûsa xwe tê kuştinê.”* (Celîl&Celîl, 2018:163). Gelek caran li Erxenîyê rast lê hatime ku di diayên piştî nimêjê da dibêjin; *“Ya Reb tu me bi namûsê terbîye nekî!”* (Zarbêja 1.) Li gor bawerîya xelkê terbîyeya bi namûsê, du rêyan dide ber bi mirovî. Yan tu dê bênamûsîyê qebûl bikî, yan jî êrîşkarê namûsê bikujî yan jî li ser namûsa xwe bêyî kuştin. Mirov dema bal û dêhna xwe dide civaka kurdî û dîroka kurdî ya devkî tê da tê xuyan ku li ser namûsê çendîn mêr hatine kuştin. Loma jî gotine ku, *“Serbar lokan dikujê, namûs mêran dikujê.”* (Celîl&Celîl, 2018:163).

3.1.5. Îmaja mêrê çavtêr/comerd:

Çavtêrbûn yan jî comerdî nirxeka erênî ye ku kêmasîya di vê nirxê da mirov dike çavbirçî û tima/çikûs. Kurdan comerdî û çavtêrî wekî nîşana mirovên çê û baş dîyar kirîye. Nandarîya mirovan zû bi zû nayê jibîrkirin, di gotineka pêşîyan da mirovê comerd bi dara biber hatîye şibandin û gotine; “*Dar bi berê xwe, mirov bi nanê xwe.”* (Öncü, 2020b:226). Civakê ev nirxa baş, li ser mêran jî barkirîye û gotîye; *“Mêr bi nanê xwe xwe, teyr bi refa xwe, birûsk bi zepa xwe.”* (Öncü, 2020b:248). Ango nîşana qebûlîna civakê nandarî ye. Mêr, bi nandarîya xwe tê nasîn û navandin. Hin mêr jî hene ku pîleya comerdîya wan bilind e. Ji bo wan kesan jî tê gotin ku; *“Nan û gayek li cem mêran yek e.”* (Öncü, 2020b:235). Helbet bi maneya mecazî hatîye gotin, lê îşaret dike ku li dinyayê hin mirov hene wexta pêdivî pê çêbe hesabê pereyên mezin jî nakin û wekî ku xêra mirîyên xwe nanek dabin, xêrên mezin dikin. Mêr wexta bixwaze comerdîyê bike, kes nikare li ber rabe û asteng bike, bi giştî hevsara wî nikare rê li ber bigire. Mêr di dayîna xwe da serbest in, nikare bibêje “Weleh jina min nahêle.” Ev dibe serjinikî û li gor raya kurdan kêmanîyek e ji bo mêrî. Ti hincet tune ye ku mêr comerdîyê neke, lê ku nekir jî ew ji çikûsîya wî bi xwe ye, loma jî gotine, *“Destên mêran, nayên girtin.”* (Omerî, 2021:47).

3.1.6. Îmaja mêrê xwedîsoz:

Îmajeka din ya erênî jî, îmaja wan mêran e ku xwedî li soza xwe derdikevin, ji bo berjewendîya xwe soza xwe naxwin û cimeat soza wan wekî senedê qebûl dike. Soza mêran bextê mêran e. Loma jî gotine,*“Hesp bi hevsara, mêr bi qirara."* (Celîl&Celîl, 2018:73). Çawa ku tişta hespê dide sekinandin hevsarê wê ye, gotina mêran jî ji bo wan girêdan e. Loma jî hîn di nava cimeata kurdan da biwêja “soza mêrê berê” tê gotin. Ev soz peyman e, ne tê kirîn ne tê firotin. Bihayê gotina mêrê çê tune ye, çimkî ew qiseya xwe nafiroşe. Ji ber wê jî pêşîyan gotîye,*“Mêrê çê qisa xwe bi peran nade.”* (Öncü, 2020c:945).

2.2. **Îmaja mêran ya neyînî:**

Di gotinên pêşîyan da em rast lê tên ku gelek caran qalibên mîna “mêrê xirab”, “mêrê nebaş”, “mêrê pîs” hatine bikaranîn. Ev mêrên ku xwedî taybetmendîyên nebaş in, bi rêya gotinên pêşîyan hatine kivşkirin û eşkerekirin. Hin ji wan mêran xewar in, hin jê teral in, hin jê jî tima û nezan û tirsok in. Hin ji wan ji jinên xwe ditirsin serjinik in, hin ji wan jî hîz û xayîn û bêbext in. Civaka kurd, bi rêya gotinên pêşîyan hem endamên xwe perwerde dike hem jî hilbijardeyan pêşkeşî endaman dike da ew xeletîyan nekin. Loma jî tê gotin ku, *“Mêrê bêesil mîna tîra bêfesil.”* (Celîl&Celîl, 2018:163). Ango ti sûda wî mêrî nagihîje kesekî û divê keçên berzewac ji wan mêran dûr bin. Helbet di gotinên

pêşîyan da bi gelek awayan taybetîyên neyînî yên mêran hatine gotin, lê me ji wan hinên sereke neqandin û nirxandin.

3.2.1 Îmaja mêrê şermok:

Li gor civaka giştî ya îroyîn şermkirin ne tiştekî baş e û li ser derûnîya mirovî bandora wê ya neyînî heye. Çawa ku zanista îro şermkirinê erênî nabîne, kal û pîrên kurdan jî baş nedîtine, lê tenê ji bo mêran. Li gor qinyata dilê kurdan divê mêr şerm nekin, lê jin şerm bikin; mêrên şermoke hatine ricimandin lê jinên şermoke hatine pesinandin. Di gelek gotinên pêşîyan yên derbarê şermê da em rast lê hatin ku berawirdîya şerma mêr û jinê heye. Li gor gelê kurd *“Mêrê şermoke bi kundekî, jina şermoke bi gundekî.”* **(**Çaçan, 2015:60). Ji vê gotina pêşîyan em fam dikin ku mêrê şermoke bi qasî kundekî jî ne xwedî qîmet e. Dîsa di vê gotina pêşîyan da *“Ne mêrên şermok, ne jinên kenok.”* (Aslan vgh Babayiğit, 2020:89). tê gotin ku mêrên şermok jî wekî jinên kenok bi kêr nayên. Helbet ev hevokeka netemamkirî ye lê em ji awa û cihê bikaranînê fam dikin ku tê çi maneyê. Ev gotina ha jî ku dibêje, *“Jina şermîn bi miletekî, mêrê şermîn bi kirasekî.”* (Aydoğdu, 2015:120). ji alîyê maneyê ve nêzîkî ya jorê ye. Qedr û qîmeta mêrê fedîyokî bi qasî kirasekî jî tune ye. Şerma mêran hatîye rexnekirin, şerma jinan hatîye pesinandin.

3.2.2. Îmaja mêrê tirsok:

Tirsokî/newêrekî rengdêreka neyînî ye ku mêr li ser navê mêrtîya xwe jê aciz in. Wexta ku mêrtî tê gotin, yekser wêrekî tê bîra mirovî lê civaka kurd balkêşaye ser awa û cureyên mêranîyê û gotîye, *“ Mêr ku heye, carna rûvî ye, carna şêr e.”* (Celîl&Celîl, 2018:74). Helbet li vir rovîbûn ne nîşana tirsê be jî lê divê mêr jî li ser navê mêrtîyê tim çavsorîyê nekin û xwe neavêjin nava agirî. Divê xwe carna li rovîtîyê daîne lê li cihê hewce jî divê mêr bibe şêr. Jixwe ev gotin *“Mêrê ji serê xwe bitirse, ne mêr e.”* (Öncü, 2020d:658) dîyar dike ku divê mêr bêtirs bin ku tirsîyan ew mêranîya wan ya pîroz ji wan tê stendin û êdî dibin nemêr. Wexta ku mêr bitirsin pir eyb e, loma tê gotin ku, *“Mêr ketin kewara, jin çûn hewara.”* (Hesen, 2012:184). Piştî ku mêr ji tirsa herin xwe veşêrin dê meydana mêran jî ji jinan ra bimîne. Mêrên tirsok ti car nagihîjin mirada dilê xwe. Li gor qinyata kurdan ku mêrek xwedî daxwazekê be divê wêrek be, tirsok û newêrek nikarin tema xwe pêk bîînin. *“Mêrê newêrek sînga gewrê nabîne.”* (Tîgrîs, 2001:174). Ev gotin, hal û hewalê tirsokan rasterast radixe ber çavan. Rêya serkeftinê ew e ku mêr netirse. Jixwe gelek caran mêrê tirsok wekî mêr nayê qebûlkirin û tê gotin ku, *“Ne jina gerok, ne mêrê tirsok.”* (Cefer, 2006:52). Ango her du jî bêkêr in; ne jina gerok hêjayî tiştekî ye ne jî mêrê tirsok. Civakê asta her duyan kirîye yek û ew asta jî, asta netiyan e.

3.2.3. Îmaja mêrê serjinik:

Di nava mêrên xirab da îmaja herî xirab îmaja serjinikan e. Çimkî em di xebata xwe bi çendîn awayan rast lê hatin ku li ser vê îmajê gelek gotinên pêşîyan hene. Serjinik ew mêr e ku guhê xwe dide jina xwe. Serjinik ew kes e ku kebanîya malê bûye malxweyê malê. Serjinik ew kes e ku mala xwe ji nik malbava xwe bar dike dibe cem malxezûran. Kurdan gotineka xwe ya pêşîyan bi awayê dia-daxwazê ristîye û gotîye, *“Bila mêr mirî bê û leçeka jina ne li sêrî bê.”* (Cefer, 2006:13). Ji mêrê ku bi xebera jina xwe dike ra mirin çêtir e ji jîyanê. Çimkî ew ketîye bin emirê pîreka xwe. Ev gotin jî, *“Ew*

Zakho Centre for Kurdish Studies

mal xirab bibit ewa jin tê da bibit malxwê." (Dêrşewî,1989:73) balê dikêşe ser heman babetê ku divê jin nebin sermîyan/malxwêyên malê. Xirabbûna wê malê çêtir e ji rewşa heyî ku jin lê malxwêtîyê dike. Mêrê ku bi fermana hevsara xwe tev bigere, cihê wî nava şekalan e û kurdan daxwaz kirîye ku ew mêrên bi vî rengî emirkin bin û zû bimirin. *"Bila sisê bêne ber mirinê: Berxê ber bizinê, mêrê bi gotina jinê, miskê terazinê."* (Cefer, 2006:13). Çawa ku berxê li ber bizinê bêkêr e, çawa ku mişkê terazînê mirovî aciz dike; mêrê xeberjin jî bêyî zirara wan tiştekî wan tune ye.

"Teresê dinê mala xwe bar kir, bir cem mala bavê jinê." (Zarbêjê 2.) Ev gotin jî nîşan dide ku li gor toreya kurdan zilamek mala xwe bibe cem malxezûran eyb û fedî ye, çiku cihê mala zilamî li nik malbava wî ye. Nabe ku mêr bide ser şopa jinê here, divê jin bide dûv mêrî û ew here cem malbava mêrê xwe. Loma jî ew wekî teresê dinyayê hatîye îlankirin. Ev gotina ku dibêje,*"Mêrê kotî, mirîyê jinê ye."* (Serdar, 2018:69) jî dîsa heman mêran rexne dike ku ew ji jina xwe pir hez dikin, ew mirîyê jina xwe ne. Helbet divê mêr ji jina xwe hez bike lê ne bi qasî ku li ser wê dîn û har bibe û bibe mirîyê wê. Çimkî mêrek ewqas ji hevsara xwe hez bike, sedî sed dê gura wê jî bike û bibe xeberjin û serjinik. Loma jî rengdêra kotîbûnê layiqî wî mêrî ye.

3.2.4. Îmaja mêrê hîz/tolaz:

Mêrê tolaz jî xwedî îmajeka neyînî ye. Jixwe tolî/tolazî li gor toreya kurdî hem ji bo jinê hem ji bo mêrî eybeka mezin e û zû bi zû nayê efûkirin û jibîrkirin. Tolazî jî navê mêran bi xerabî û pîsêyê derdixe, wekî ku di vê gotinê da dibêje; *"Mêr pîs e ku ker be, çav li der be, bêkar be û seraser be."* (Tîgrîs, 2001:173). Serserîtî, tolazî, bêkarbûn û kerbûna zilamekî nîşaneyên pîsîtîya wî ne. Ku zilamekî çav berdabe keç û jinên xelkê, ew mêr êdî nikare mêrtîyê ji jina xwe ra bike. Û li gor bîr û boçûna kurdan ya di gotinên pêşîyan da eyan bûye, wexta mêr tolaz be, jin dikeve rewşa bêçaretîyê û xwelîserîyê, loma jî dibêjin; *"Mêr çav li der e, jinik xwelî li ser e."* (Mazî, 2018:285). Xwelîserîya ku li vir tê gotin ne ku wê qebehetek kirîye, lê xwelî li serê wê bûye û ew di nava cimaetê da rezîl û riswa bûye.

"Mêrê çavlider, mêranîyê ji jina xwe re nake." (Öncü, 2020c:943). Ev gotin jî tê wê maneyê ku di navbera mêr û jinê da sarîyê rûdabe êdî ne ew mêr ji wê jinê ra mêrtîyê dike, ne jî ew jin ji wî mêrî ra jintîyê dike. Ango ew mal xera dibe û diçe. Lê ev gotina pêşîyan jî bi bîra me dixe ku *"Mêrga bifirîz, gayê devgilîz, zelamê hîz çi cara lê nabine payîz."* (Saeed, 2019:107) ango mêrê hîz ti car negihîje tişta ku hêvî kirîye. Demsala payîzê wê tiştê temsîl dike ku her tişt dikemile û digihîje asta xwarin û encamdanê. Meqsed û miradên mêrê tolaz jî dê di nîvî da bimînin. Çawa ku firîz ji nava erdê tê rakirin, gayê devgilîz/bêkêr/nexweş tê serjêkirin; mêrê hîz jî dê miradqurmiçî bibe.

3.2.5. Îmaja mêrê bêçare:

Civaka kurd hinde pesnê taybetîyên baş û qenc daye û hinde rexne li tiştên deradetî kirine hin rewşên asayî yên jîyanê jî wekî tiştên deradetî hatine neyînîkirin. Di jîyana mirovan da; kalbûn, bêçarebûn, tenêbûn herçend tiştên asayî bin jî li gor toreya kurdî ev tişt wekî deradetî hatine dîtin û postê neyînîyê li wan hatîye kirin. Ji ber ku di civaka kurd da mêr wekî xwedî şîyan, wêrek, desthilat, mêrxas, comerd hatîye teswîrkirin; nebûna van taybetîyan jî wekî neyînî derdikeve pêş. Ev gotina ku dibêje*"Mêrê mêrebî, mîna tevirê bêdestî."* (Öncü, 2020c:950) qal dike ku jina mêrekî

bimire ev dibe wekî tevirekî bêdestî, ew bêkêr dibe û bêqîmet dibe. *“Mêr bê xwedî bin, jar dibin; jin bê xwedî bin har dibin.”* (Hesen, 2012:183). Ev gotin jî dîsa li ser tenêbûn û bêçarebûna zilamî hatîye gotin, di tenêtîya xwe da ew jar û qels dibin, ji hukim û qudreta xwe dikevin.

3.2.6. Îmaja mêrê çikûs:

Timayî dibe sebeba gelek nexweşî û neqencîyan; malekê, êlekê ji hev difişkilîne loma jî dibêjin, *“Timayî fenahî ye.”* (Celîl&Celîl, 2018:83). Timayî ji bo mêran wekî kêmanîyê hatîye dîtin ji alîyê civakê ve. Mêrê çikûs dijberê mêrê comerd e, çawa ku li cem mêrê comerd dayîna nan û gayekî heman tişt e, li bal mêrê çikûs jî her tişt bi çavekî berjewendîparêz tê nirxandin. Mêrê çikûs, tiştên nemayî dikin, loma jî gotine*“Mêrê kotî li mêşê dimije paşê diavêje.”* (Öncü, 2020b:248). Ango dema mêşê jî digire dihizire ku ka çawa sûdekê ji wê mêşê bi dest bixe. Ewqas ji minfeatê hez dike ku ji mêşê jî qezencekê bi dest dixe, îcar dê têkilîya wî mêrî bi mirovan ra li ser berjewendîyê be. Gotineka din a pêşîyan jî jî şîretê li mêran dike ku ew tima nebin. Pêşîyan gotîye, *“Gele mêra, mevne tima; mal û zêrê dinê ra mevne cima.”* (Celîl&Celîl, 2018:34). çimkî mal û zêrên li dinyayê li dinyayê dimînin, ne hewce ye ku mêrek ji bo mal û milkê dinyayê navê xwe û timatîyê biîne ba hev.

Encam:

Gotinên pêşîyan neynika civat û neteweyekê ne ku mirov awayê hizirîn û hestpêkirina miletekî di wan da xweş dibîne. Gotinên pêşîyan ew gotinên kurt û qalibî ne ku pêşîyan ceribîn, serborî, hest û hizirên xwe pê eşkera kirine û ew bi rêya devkî hatine veguhastin û parastin.

Gotinên pêşîyan wekî bincureyeka edebîyata gelêrî, cureyeka sereke û serbixwe ye. Ev cure, zaf belavbûyî û zindî ye. Helbet gelek sebebên vê belavbûn û zindîbûnê hene ku kurtbûn, aheng ji wan sebeban duyên sereke ne. Li ser gotinên pêşîyan ligel neqşên navneteweyî neqşên xwemalî jî hene. Li erdnigariyên cuda yên dinyayê li ser gelek babetan gotinên pêşîyan yên nêzî hev hene.

Îmaj, awayê dîtin û şirovekirina tiştan e ku li gor kes û deman guherbar e. Îmaj rastî bi xwe nîn e, awayê dîtin û famkirinê ye. Di gotinên pêşîyan yên kurdî da gelek îmaj hene, kurdan li ser têgihekê, bûyerekê, tişteyekê şiroveyên cuda cuda kirine. Ji van têgihan yek jî têgiha mêrî ye. Di gotinên pêşîyan yên kurdî da mêr bi gelek taybetîyan hatîye rengandin û teswîrkirin.

Hin gotinên pêşîyan yên derbarê mêran da, ti taybetîyeka mêran destnîşan nakin. Lê piranîya gotinên pêşîyan yên derbarê mêran da li ser du stûnan hatine ristin. Îmaja mêran ya erênî û îmaja neyînî. Bi giştî îmaja baş, bi qalibên “mêrê mêrxas, mêrê çê, mêrê baş, mêrê jêhatî” hatine sazkirin. Îmaja erênî ya mêran bêtir li ser nirxên baş yên civakê ava bûne, civaka kurd bala xwe zaf nedaya taybetîyên fîzîkî yên mîna çelengbûn, dirêjbûn û xurtbûnê. Îmajên neyînî yên derbarê mêran da jî bêtir bi qalibên “mêrê xirab, mêrê nebaş, mêrê kotî, mêrê pîs” hatine sazkirin. Di îmaja neyînî da jî taybetîyên fîzîkî pir derneketine pêş.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Çavkanî:

Pirtûk:

Acun, R. (2018). *Îmaj di Helbesta Kurdî ya Modern de.* Enqere: Weşanên J&Jyê.
Alakom, R. (2013). *Di Folklora Kurdî De Serdestiyeke Jinan.* (çapa 2.). Stenbol: Weşanên Avestayê.
Aldatmaz, G. N. (2014). *Folklorê Kirmancan Ser O.* Stenbol: Weşanxaneyê Roşna.
Aydoğdu, A. (2020). *Gotinên Pêşiyan.* (çapa 3.) Îzmîr: Weşanên Nayê.
Bîngöl, A. (2014). *Gotinên Pêşiyan û Biwêj.* (çapa 2.). Îzmîr: Weşanên Nayê.
Cefer, E. (2006). *Gotinên Pêşiyan -Ji berhemvaniya devkî a gelêrî 2-*?:Weşanên Xanî.
Celîl O.&Celîl C. (2013). *Zargotina Kurda 2.* Amed: Weşanên Aramê.
--------------------- (2018). *Gotinên Pêşîyan* (çapa 3.). Stenbol: Weşanên Wardozê.
Cindî, H. (2016). *Folklora Kurmancîyê.* (çapa 2.) Amed: Weşanên Lîsê.
Çaçan, X. (2015). *Gotinên Pêşîyan.* (tîpguh: M. Têmûr, D. Têmûr). Amed: Weşanên Lîsê.
Dêrşewî, M. M. (1989). *Miştaxa Çîya Ji Gotinên Pêşîya.* (tîpguh: S. Zaxoyî) Stockholm: Çapxana Şefîqê.
Düzgün, M.&Comerd, M.&Tornêcengi, H. (1992). *Dêrsim De Diwayî Qesê Pî-Kalikan Erf û Mecazî Çibenokî Xeletnayenî.* Enqere: Çapxanê Berheme.
'Elî, M. A. (2006). *Gotin û Civak.* Hewlêr. Çapxaneya Arasê.
Hesen, B. (2008). Ji Wêjeya Gel Pend û Peng. ?.?
Kan, G. (2019). *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yên Sovyetê de.* Stenbol: Weşanên Peywendê.
Keskîn, N. (2019). *Folklor û Edebîyata Gelêrî.* Stenbol: Weşanên Avestayê.
Kömür, M. (2003). *Taw Dilo (Akçadağ-Elbistan Ağzıyla Kürt Folkloründen Seçmeler).* Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
Mazî, Ç. (2018). *Ferhenga Gotinên Pêşiyan.* (çapa 2.) Stenbol. Weşanxaneya Berbangê.
Omerî, S. (2021). *Ji Gotinên Pêşîyan* (çapa 2.) Stenbol: Weşanên Dengê.
Öncü, M. (2009). *Gotinên Pêşiyan.* Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
(2020a). *Gotinên Pêşiyan.* (cilda 1.). Enqere: Weşanên Sîtavê.
(2020b). *Gotinên Pêşiyan.* (cilda 2.). Enqere: Weşanên Sîtavê.
(2020c). *Gotinên Pêşiyan.* (cilda 3.). Enqere: Weşanên Sîtavê.
(2020d). *Gotinên Pêşiyan.* (cilda 4.). Enqere: Weşanên Sîtavê.
Pertev, R. (2018). *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946).* Stenbol: Weşanên Avestayê.
Resûl, M. Î. (1970). *Edebî Folklorî Kurdî* (Lêkolînewe). Bexda: Çapxaneya Elcahfayê.
Serdar, E. (2018). *Keşkûl.* (çapa 2.). (amd: N. Emerîk). Enqere: Weşanên Lîsê.
Şadkam, G. (2020). *Gotinên Pêşîyan Ji Xoresanê.* Stenbol: Weşanên Wardozê.
Tîgrîs, A. (2001). *6762 Gotinên Pêşiyan.* Stockholm. Weşanên Rewşenê.
Yıldırım, K.&Pertev, R.&Aslan, M. (2013*). Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî.* Stenbol: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

Tez

Alî, A. H. O. (2017). *Ciwankarî Di Pend û Gotinên Pêşîyan De Bi Mînakên 'Pendî Pêşînan' a Şêx Mihemedê Xal.* Teza Lîsansê ya Çapnebûyî. Wan: ZYY. Enstîtuya Zimanên Zindî.
Babayîğit, V. M. (2020). *Türkçe, Kürtçe ve İngilizce Atasözleri-Bağlamsal Bir Karşılaştırma.* Teza Doktorayê ya Çapnebûyî. Dîyarbekir: Zanîngeha Dîcleyê Enstîtuya Zanistên Civakî Beşa Ziman û Çanda Kurdî.
Can, M. (2018). *Bîblîyografyaya Kirmanckî (Zazakî).* Teza Lîsansê ya Çapnebûyî. Mêrdîn. Zanîngeha Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî.
Saeed, N. M. (2019). *Layenê Perwerdekirinê Di Gotinên Mezinan Da.* Teza Lîsansê ya Çapnebûyî. Wan: ZYY. Enstîtuya Zimanên Zindî.

Gotar:
Öztürk, M. (2015). Vekolînek Derbarê Gotinên Pêşiyan ên Kurmancî De. *Mukaddîme*. 6 (2). 319-337.
Şêlazî, C. (2020). Rewşa folklorê li Devera Behdînanê (Ji salên heftîyan ta nuke). *Folklora Me*. Hejmara 8. 50-60.
Çîftçî, H. (2016). Ortak Atasözlerinin Hikâyeleri: Farsî-Kurmancî-Zazakî -2-. *Bingöl ÜniversitesiYaşayan Diller Enstitüsü Dergisi.* 2(4). 8-21.
Kesên jêder
Zarbêja 1.: Mircan Buran-50-Nexwende-Gundê Kêydalîyayê/Erxenî/Dîyarbekir-2010.
Zarbêjê 2.: Mistefa Buran-60-Xwende-Gundê Kêydalîyayê/Erxenî/Dîyarbekir-2016.

Perawêz:

---

[1] aw: bi tirkî av; tê maneya nêçîr, seydê.
[2] bênd: bend, ben; awayê tewandî yê peyvê.
[3] merî: mirov.

ATASÖZLERİNDE ERKEK İMAJI

Özet:

Atasözleri halk edebiyatının en zengin türüdür. Bu zengin ve yaygın edebi tür, tüm dünyada araştırmacıların ilgisini çekmiştir. Atasözleri fosilleşmiş bir tür değil, aksine Kürt toplumunda canlı, yaşıyor ve iyi durumda. Özellikle yaşlıların ağzından atasözleri eksilmez. Çünkü yaşlılar bu sözlerle eğitildiler ve kulakları bu sözlerle dolu. Bir şey hakkında uzun uzun konuşmak yerine bir atasözü söyleyip taşı gediğine koyarlar.

Atasözlerinde derin ve gizli anlamlar vardır. Bu önemli konuyu bu çalışmada ele aldık ve atasözlerini analiz edip değerlendirdik. Daha çok basılı eserlere dayanan bu çalışmada, sözlü materyallerden nadiren yararlanma yoluna gidilmiştir.

Kürt atasözleri üzerine yapılan çalışmalar üç asrı geride bırakmıştır. Bu üç yüz yılda bu alanda çok önemli çalışmalara imza atılmıştır. İlk iki yüzyılda yapılan çalışmaların çoğu derleme çalışmalarıdır. Birçok millet gibi Kürt araştırmacılar da bu yüzyılda tasnif ve tahlil için çalışmıştır. Bu alanda yapılan çok değerli çalışmaları gözlemliyoruz.

Çalışmamızda öncelikle Kürt atasözlerinde erkek/adam imajının nasıl olduğunu anlamaya çalıştık ve amacımız “Kürt toplumunun erkeklere bakış açısı nasıldır?” sorusunun cevabını bulmaktı. Çalışmamız üç bölümden oluşmaktadır. Çalışmanın ilk bölümünde çalışmanın amaç, yöntem ve çerçevesi çizilmiştir. Birinci bölümün sonunda bazı önemli çalışmalara değinilmiştir. İkinci bölümde atasözleri ve imge/imaj kavramları üzerinde çalışılmış ve atasözlerinde geçen bazı imgelere değinilmiştir. Üçüncü bölümde ise atasözlerinde geçen erkek/adam imgelerine örnekler verilmiş ve konunun analizi yapılmıştır. Çalışmanın sonuç kısmında ise tespit ve çıkarımlarımız yer almıştır.

Anahtar Kelimeler: *Kürt, atasözleri, erkek/adam, imaj, erkek imajı*

MALE IMAGE IN THE PROVERBS

Abstract:

Proverbs is the richest type of popular literature. This rich and widespread type has attracted the attention of researchers all over the world. The proverb is not a fossilized type, it is still alive and well in Kurdish society. Especially from the mouths of old men and women the first words are not lacking. For the old men and women were educated by these words and their ears are filled with these words. Instead of talking long and hard about something, they make such a nice statement and immediately take their place.

There are deep and hidden meanings in the proverbs, as much as they are above, so much below. We have already covered this important topic in this study and we have analyzed and evaluated the previous statements on the one hand. This study, relying more on printed works, rarely did we take advantage of the verbal material.

The studies that have done about Kurdish proverbs left three centuries behind. In these three hundred years, very important studies have been signed in this field. Even if most of the studies that have been done in the first two centuries were compilation studies. Kurdish such as most of different nations, too, studied for classifying and analyzing in this century. We observe very precious studies done in this field.

In our study firstly we tried to understand how was male/men’s image in Kurdish proverbs and our aim was to find the answer of this question, “How is the perspective of Kurdish society for men?” Our study consists of three parts. İn the first part of study it signed its aim, method and framework. At the end of the first part, some important studies were mentioned. İn the second part, proverbs and image concepts were studied and some images in the proverbs were mentioned. At the third part, were given examples for male/men images in the proverbs and done the analyze of the subject. At the result part of the study, our findines and inferences were placed.

Keywords: *Kurd, proverbs, men/male, image, male imageş*

ZAROK Û ZAROKATÎ DI GOTINÊN PÊŞÎYAN DA

Dr. İlyas SUVAĞCİ
Beşa Ziman û Çanda Turkî- Zanîngeha *Dicle*/ Turkîya

PUXTE:

Di nav çavkanîyên edebîyata zarokan û perwerdehîya zarokan da ji bilî çavkanîyên nivîskî pêşîyê cureyên folklorê yên wek lorî, çîrvanok, efsane, destan, metelok hwd cih digirin. Ligel vê yekê em dişên bibêjin ku mirov dikare ji gotinên pêşîyan, mamik û zûgotinokan jî sûdê werbigire. Yek ji van cureyên ku bi awayekî eşkere nêrîna civaka xwe nîşan dide gotinên pêşîyan in. Em bîr û bawerî, çand û huner û gelek taybetmendîyên din yên civakê di wan (gotinên pêşîyan) da dibînin. Her wiha di wan da hemû serpêhatîyên civakê jî tên dîtin. Ji ber vê yekê em wan wek neynika civakê binirxînin dê ev yek nebe mubalexe. Girêdayî bîr û bawerîya her civakê di folklora civakê da li ser têgihiştin, fêrkirin û hizirkirina zarokan gelek gotinên pêşîyan cih digirin. Ev yek di gotinên pêşîyan yên Kurdî da jî tên dîtin. Herçend ku ev cure hemû ji alîyê mezinan ve hatine hilberîn jî di çarçoveya babeta zarokan da cudahîya gotinên pêşîyan ji van cureyên din yên folklorê ew e ku gotinên pêşîyan nêrîna mezinan ya li ser zarokan zelaltir nîşan dide. Mirov dikare vê yekê wek taybetîyeka gotinên peşîyan binirxîne. Wate, zarok yan jî zarokatî herî zêde di gotinên peşîyan da hatine vegotin. Ev yek jî ji bo zanîna fikrên civakê yên li ser zarokan gelek nimûneyan pêşberî me dike. Lewma di vê lêkolîna me da ji nav cureyên din yên folklorê bijartina gotinên peşîyan ne bi awayekî lêrasthatinî lê ji ber bijartineka bîrewer pek hatîye. Girêdayî pêşketina zanistên wek pedagojî, civaknasî, psîkolojî û pedîyatrîyê têgeha zarok yan jî zarokatîyê bi demê ra hatîye guhertin. Wek mînak di demên berê da di navbera zarok û mezinan da tu cudahî nedihat dîtin. Lewma di nêrîna civakê da zarok jî wek mezinan bûn. Berhem yan jî materyalên ku ji bo mezinan dihatin amadekirin her wiha ji bo zarokan jî bûn. Lê bi demê ra ev fikir hate guhertin û zarok jî ne wek mezinan lê wek takekes hatine dîtin. Em jî di vê xebata xwe da di gotinên pêşîyan yên Kurdî (mebesta me zaraveya Kurmancî ye) da li ser têgehên zarok û zarokatîyê disekinin. Ka gelo mirov dikare wan di çarçoveya pîvanên edebîyata zarokan çawa binirxîne, senifandina wan bike û şîrove bike. Bi vê yekê em ê nêrîna civaka Kurd ya li ser zarokan hîn bibin ka gelo ji bo Kurdan wateya zarok yan jî zarokatîyê çi ye, herî zêde li ser kîjan taybetmendîyên zarokan hatîye sekinandin, fikrên li ser perwerdehîya wan, zarokên baş û nebaş, hezkirina zarokan, girêdayî zayendê ji bo zarokên keç yan jî kur cudahîyek çawa derdikeve holê hwd.

Peyvên Serekî: *Zarok, Folklor, Gotinên Pêşîyan, Edebîyata Zarokan, Folklora Zarokan*

1. DESTPÊK

Wekî cureyeka folklorê gotinên pêşîyan herçend ku ji alîyê pêşîyan ve hatibin hilberîn jî ew di nav hêmanên lêkolînê ya edebîyata zarokan û folklora zarokan da jî cih digire. Taybetmendîya hevpar ya van herdu qadan zarok yan jî zarokatî ye. Lewma berî

Zakho Centre for Kurdish Studies

ku em derbasî gotinên pêşîyan bibin divê em li ser zarok yan jî zarokatîyê bisekinin. Zarok ji kesê ku di navbera 0-16 salan da ye tê gotin û ew ji alîyê bedenî û hişî ve ji mezinan cudatir in. Lê dîsa jî li ser vê heyama zarokatîyê lihevkirineka giştî tune ye. Lewma bi dîtineka din ev heyam heta 18 salîyê berdewam dike. Ligel vê yekê gelek alîyên din yên zarokan jî girêdayî çand, erdnîgarî û bawerîyan tê guhertin. Wek mînak têgeha zarokatîyê ya heyama serdemnavîn (English; Medieval) û dema me wek hev nîne. Wate, têgeha zarokatîyê jî bi demê ra hatîye guhertin (Yalçın û Aytaş, 2017, r.13). Di fêmkirina zarokatîyê da guhertinên herî girîng di sedsalên 16. û 17. da pêk hatîye. Dema aborî ji çandinîyê ber bi pîşesazîyê ve hat guhertin, çîna navîn bi pêş ket, rol û binyata malbatê diguhere, mirinên zarokan kêm dibin, têkilîya dê û bavî ligel zarokî bi pêwendîya hîsî tê girêdan. Piştî van guhertinan êdî zarokatî ji berê cudatir dibe heyameka cuda ya jîyanê (Ji Bekir Onur Vghz Şimşek û Yakar, 2018, r.15). Piştî van geşedanan êdî bi demê ra hat qebûlkirin ku zarok wekî takekes ji mezinan cudatir in, cîhana zarokan jî her wiha ne wekî ya mezinan e, ew xwedîyê xeyalên bêsînor in. Girêdayî vê yekê qadên lêkolînê yên wekî edebîyata zarokan û folklora zarokan derketin holê. Edebîyata zarokan, berhemên ji bo zarokan yan jî bi zarokane hatine nivîsandin vedihewîne û em di wan da şopên gîyanê zarokan dibînin. Ev berhemên devkî û nivîskî li ser hest û fikrên zarokan in. Edebîyata zarokan girêdayî kawdana zarokan ya hişî, bedenî û gîyanî wekî heyama pêşdibistanê (0-6 sal), heyama dibistanê (7-11 sal), heyama gihiştî (12-16) tê cudakirin. Ev edebîyat ji alîyê şêwaz, ziman û babetê ve ji edebîyata mezinan cudatir e, piranî xwedîyê taybetîyên perwerdeker û exlaqî ye, kêf û zewqê dide zarokan (Bilkan, 2018, hr.24-25). Folklora zarokan jî baranberî berhemên çandî, daringî û menewî yên nivîskî û devkî ku ji berîya ku zarok ji dayîk bibe heta ew dibe mezinek, ji alîyê mezinan, zarokan yan jî bi şirîkatîya wan hatine hilberîn, pêk tê. Ev berhem wekî edebîyata zarokan li ser zarokan in û cîhana wan dide der. Ew ji nav nerît, rîtuel û bawerîyên gel, felsefe û zanîna gel ya kevneşopî derdikevin holê. Wate, herçend ku li ser zarokan jî be di asasê xwe da mirov nikare wê ji folklorê cuda bike. Ew qadeka folklorê ya taybet e. Bi alîkarîya van hêmanên navborî, norm û nirxên civakî û çandî li zarokan yan jî nifşên nû tên veguhastin. Folklora Zarokan bi vê yekê dixwaze zarokan perwerde bike, kêf û zewqê bide wan, demên xweş bi wan bide derbaskirin. Muxetebê folklora zarokan zarok bixwe ne û di navenda wê da zarok cih digirin (Keskin, 2021, r.8).

Gotinên pêşîyan jî çawa ku me berî niha jî dîyar kir ligel zûgotinok, lorî, çîrvanok, efsane, destan, metelok di nav hêmanên folklora zarokan û edebîyata zarokan jî cih digire. Lewma ji ber taybetîya gotinên pêşîyan ev lêkolîna me him dikeve nav sînorê folklora zarokan him jî edebîyata zarokan. Emê li gor pîvanên van herdu qadan li ser gotinên pêşîyan bisekinin ka gelo di wan da zarok û zarokatî çawa hatîye şîrovekirin. Lê divê em behsa taybetîyên gotinên pêşîyan bikin. Gotinên pêşîyan yekîneyên kevneşopî û puxtedar in, ew bi gelemperî qalibgirtî û carinan jî xwedîyê wateyên mecazî ne. Ew bi kêrî avakirina vegotineka bêkêmasî tên û ji bo ku axaftin pêk bê tên bikaranîn. Ew xwedîyê şîyanîyeka retorîk in, dema mirov wan di nav cureyên din da dibîne bêyî zihmetî wan cuda dike û nas dike. Ew xwedîyê naverokeka dîdaktîk in û neguherbar in. Wekî yekîneyên kevneşopî yên xwedîyê şêwazeka helbestkî û serbixwe tên karakterîzekirin. Gotinên pêşîyan ji serpêhatîyên jîyana gel pêk hatine. Lewma wekî hêmanên zanyarîyê yên kevneşopî ku bi performansên hatine dubarekirin derketine holê. Ew carinan bi awayekî eşkere fermanên civakî jî radigihînin (Norrick, 2014, r.8).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ فەکولینێن کوردی

Di lêkolînên Kurdî da heta niha gotinên pêşîya rastûrast di çarçoveya folklora zarokan û edebîyata zarokan da nehatîye nirxandin. Bi tenê em pêrgî teza masterê ya bi navê *Layenê Perwerdekirinê Di Gotinên Mezinan Da* ya M. Nooruldeen Saeed hatin. Ew di vê lêkolîna xwe da ne bi awayekî taybet li ser zarokan lê gotinên pêşîyan di çarçoveya perwerdehîyê da dinirxîne. Ji derveyî gotinên pêşîyan di çarçoveya folklora zarokan û perwerdehîya zarokan da em xebata H. Yiğit Taştan ya li ser zûgotinokan, xebatên Kenan Subaşı yên li ser mamikan û lîstîkên zarokan dibînin. Lewma wek me dîyar kir ev lêkolîna me ji ber ku gotinên pêşîyan rastûrast di çarçoveya folklora zarokan û edebîyata zarokan da dinirxîne di vê babetê da di nav mînakên ewil da cih digire. Ev yek jî xebata me girîng dike.

Me hemû gotinên pêşîyan yên di vê lêkolîna xwe da bi kar anîn ji berhema Mehmet Oncu girtin. Ligel vê yekê me li gotinên pêşîyan yên di berhemên Çîya Mazî, Mustafa Borak, Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, Mehpûs Serhedî û Rênas Xendekî yên li ser folklora *Hawar* û *Roja Nû* da jî xwendin. Gotinên pêşîyên di berhema Mehmet Oncu da cih digirin ji berhemên din yên navborî berfirehtir e. Ew hemû gotinên pêşîyên li ser zarokan yên di berhemên din da jî derbas dibin jî vedihewîne. Lewma me ew esas girt.

2. Zarok û Zarokatî di Gotinên Pêşîyan da

Di lêkolîna xwe da me gotinên pêşîyan yên Kurdî di çarçoveya hêmanên zarok û zarokatîyê di di van binbeşan da nirxand; Zayend, Zarokên Baş û Nebaş, Hezkirina Zarokan, Perwerdehî û Kawdana Zarokan. Ji bo her binbeşekê ji bo ku mijar baştir were têgihiştin me ji gotinên pêşîyan mînak nîşan dan. Lê divê em dîyar bikin ku di xebatên bi vî rengî yên tematîk û li ser naverokê da mirov nikare ji nav mînakan senifandineka misoger bike. Lewma heman gotinên pêşîyekê dikare di nav sernavên cuda da bê şîrovekirin û berpêşkirin. Hindî ku me karî me ji bo her binbeşekê mînakên cuda nîşan dan lê wek me dîyar ki ev nayê wê wateyê ku têkilîya heman mînakê ligel binbeşeka din tune ye. Her wiha ji bilî van binbeşan jî di mijarên cuda da me gelek gotinên pêşîyan destnîşan kirin lê hejmara wan ji bo binbeşekê têrê nedikir lewma me cih neda wan. Heke lêkolîneka berfirehtir bê kirin dibe ku hejmara van serenav û binbeşan jî zêdetir bibe. Dîsa jî em dişên bibêjin ku nimûneyên me di vê lêkolîna xwe da bi kar anîn di vê babetê da têra nîşandana panaromaya gotinên pêşîyan yên Kurdî dike.

2.1.Zayend

Di lêkolîna xwe da me dît ku bi gelemperî pesnê zarokên kur tê dayîn lewma wek hejmar jî zêdetir li ser kuran gotinên pêşîyan hatine gotin. Girêdayî vê yekê heke dê û bav wê bibin xwedîyê zarokekî herçend ew ê bibe bar jî, çavê wî jî kor be, dîsa jî tê xwestin ku bila ew kur be. Bi tenê ji bo ku dê û bav bibin xwedîyê kurekî yan jî lawekî ew qebûl dikin ku “kirasê wan caw be”. Bi tenê “bila ew kurik be bila navê keçan lê be” (r.1149). Heke zarok cewî jî bin bila herdu jî kur bibin. Dema kurik biçûk dê û bav wî wek çare, dema mezin dibe wek axa, piştî zewicî jî wek dîwarê xwe dibînin. Dê û bav bi kurên xwe serbilind in. Ew hêvîya, ronahîya çavên wan û ezîzê li ber dilê wan in. Lê “skûra meriyan bi alîyê qîzê de xwar e” (r.1179). Yek ji sedemên ku daxwaza zêde ya xwedîbûna kuran ew e ku kurik dê li malê bimîne, li dê û bavê xwe xwedan bibe lê keç wê bizewice û here. Lewma; gava kur be mizgînî ji xwedîyan re, gava qîz be mizgînî ji kesan re (r.1155), kur darê pişta bavê xwe ye, qîz warê xelkê ye (r.1163), kur dîwarê hundir in, qîz dîwarê derve ne (r.1163), qîz malê xelkê ne mêvanê bava ne (r.1176). Di rojên tengasîyê da tê gotin ku dê û bav pêşîyê hawara xwe dibin kurê xwe. Lewma; “kur

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

strîyê çavê dijmin e” (r.1165). Kesên xwedan kur li şûnwaran namînin. Ji bo dê û bav mala kur ji mala keçê xweştir e, bi bereket e. Lewma; “mala kur zêr û dur” e (r.1172), “mala mêr lê kanîya zêr lê” (r.1172), “zêr biçûk e kur mezin” (r.1189). Carinan jî dijberî vê yekê ji ber hebûna bûkê mala keçikê xweştir hatîye vegotin. Wek; “mala qîzan şindî ye, mala lawan pintî ye” (r.1172). Têkilîya di navbera bûk û xesûyê jî ji bo zayenda civakî nimûneyan pêşberî me dike. Lewma dayîk yan jî xesû gazindan dike ku wê kur xwedan kirîye, mezin kirîye lê piştî ku zewicandîye bûkê ew bi jinbûna xwe lêbandîye jê dûr kirîye. Lewma “min xwedî kir bi bistanê xwe, jinê ji min stend bi navrana xwe” (r.1174) tê gotin.

Yek ji mijara ku di çarçoveya zayendê da hatîye vegotin îrsîyet e. Di gotinên pêşîyan da tê gotin ku kur li bav keç jî li dayîka xwe diçe lewma “keç teşîya dê radike, law tîra bavê” (r.1158). Em dikarin vê yekê di çarçoveya erkên zayenda civakî da binirxînin. Zayend jidayîkbûnê dîyar dibe. Wate, dema zarok ji dayîk dibin zayenda wan wek kur yan jî keç tê binavkirin. Zayenda civakî jî li girêdayî taybetîyên civakê bi demê ra erkên ku li ser keç û kuran tê ferzkirin derdikeve holê. Wek mînak di civakên pederşahî da navenda herikîna jîyanê da mêr cih digire û her hêman girêdayî wî tê bicihkirin. Jin jî wek alîkar yek ji van hêmanan e. Lewma hebûna jinê girêdayî pêkanîna yan jî navendkirina mêr û biryarên wî ye. Hemû kar û erkên aktîv yên wek ewlehî, aborî, karûbar, danûstandin, têkilîdanîn ji alîyê mêr ve tê kirin. Jin jî xwedîyên erkên pasîv yên wek xwedîkirina zarokan, paqijîya malê, amadekirina xwarinê ye. Zarokên kur li gor erkên bav, yên keç jî li gor erkên dêya xwe tên mezinkirin.

Lewma di gotinên pêşîyan yên Kurdî da jî em dibînin ku li gor erkên zayenda civakî li ser keçê hatîye ferzkirin ku teşîya dêya xwe rake ne li tîra bavê xwe. Li gor van erkên zayenda civakî bav mêrxas in lewma kurên wan jî li wan diçin. Wek; kurê mêrê çê kotî nabe (r.1166), kurên mêrxas li bavan diçin (r.1169). Her wiha dema keç jî mezin bibe dê alîkarîya dêya xwe bike, wek “qîz pêşa dê hildide” (r.1176).

Di civakên perderşahî da berdewamîya tov girêdayî hebûna kur e lewma; kurê meriv ocaxê meriv e (r.1167), heke kur nebe dê ocaxê mirov li dinyayê vemire. Daxwaza xwedîbûna kuran yan jî nexwestina keçan zêdetir li ser hebûna kuran yan jî nedîtina keçan hatîye vegotin. Lewma hebûna kur derd e lê tunebûna wî jî xem e (r.1168). Her wiha xwedî(ne)bûna keç û kuran jî carinan bi hişyarîyeka zayendparêz ya wek “lawê te hebin, bi gidîyan nekene, keçên te hebin bi qehpikan nekene” (r.1170) tê vegotin. Lê dîsa jî ew duayan ji Xwedê dikin ku bibin xwedîyê kurekî. Wek “serê salê binê salê, Xwedê kurekî bide vê malê” (r.1179).

Herçend ku kurik li ser hebûna bav hatibe vegotin jî di mînaka “zarok ê dê ye, ne yê bavê ye” (r.1185) da em dayîkê jî dibînin. Ji ber ku keda dayîkê li ser zarokan zêdetir e. Her wiha wek berî niha jî me dîyar kir li gor zayenda civakî ji mezinkirina zarokan dayîk berpirsyar e. Ji ber ku bav hîn nebûye karên ku civakê li ser jina wî ferz kirîye bike û ji sînorê ku erkên zayenda civakî li ser wî ferz kirîye derkeve, Lewma herî zêde dema dayîk dimire zarok bêxwedî dimînin. Ji ber vê yekê “zarokê bê dê wek gundê bê rê” (r.1187) tê gotin.

Kêm jî be carinan em di gotinên pêşîyan da dibînin ku qedirê keçikê tê girtin. Wek; keça xwe qurbanî kurê kesê neke (r.1161), qîz delala malê ye (r.1177). Carinan jî cudahî di navbera kur û keçan nayê dîtin. Wekî; ku Xwedê kur jî da bi xêr, keç jî da bi xêr

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو فەکولینێن کوردی

(r.1163), kur jî keç jî yê Xwedê ne (r.1164), maleke kura ye, yeke qîza ye (r.1173), qîz jî kur jî kerema Xwedê ne (r.1176), zarok zarok in, keç û kur ferq nakin (r.1187).

Wek di mînakên jor da jî em dibînin ku li ser xwedîbûna zarokan zayenda civakî tê veavakirin. Lewma dê û bavên xwedan zarok tên pesinandin lê yên bê zarok jî wek di rewşeka gelek nebaş da bin tên vegotin. Ew kes jî wek “ocaxkor” tên nîşandan. Ev yek carinan bi metaforan tên vegotin. Wek; “dar bi berê xwe şîn e” (r.1150). Li gor van gotinên pêşîyan avabûn yan jî avanebûna malê bi hebûna zarokan tê dîyarkirin. Wek; mal bi zarokan şên e (r.1173), zarok şênahîya malê ne (r.1173). Mala bê zarok bê bereket e, wek xana xerabe ye. Her wiha; mala ku zarok tê da ye Ehreman naçe wir, berevajî vê yekê ferîşte tê da ne, xem û derd nakevê. Hebûna zarokan bi kêrî çareserkirina dijberîyên di navbera dê û bav da jî tê. Lewma; zarok di nav dê û bavan de tuxta zêrîn e (r.1184), ew nava jin û mêr in (r.1186). Li gor zayenda civakî dema jin û mêr zewicîn êdî divê ew bibin xwedî zarok. Lewma xwedîbûna zarokan yek ji normên civakê ye. Dema zarok nebin ew wek malbateka netawawbûyî tê dîtin.

2.2. **Zarokên Baş û Nebaş**

Dê û bav dixwazin bi zarokên xwe serbilind bibin, ew perwerdehîyeka baş bigirin, bizewicin, xwe û dê û bavên xwe xwedan bikin, wan ji bîr nekin. Di gotinên pêşîyan yên Kurdî da em dibînin ku zarok dijberî van hêvîyên dê û bav carinan dibin sedemên gelek nexweşîyan ku mezin nikarin wan çareser bikin. Wek; “kevirê ku zarok biavêjin bingerê mezin nikarin derxin” (r.1159). Dê û bav duayan dikin ku bila zarokekî/a wan yê/ya nebaş nebe, bêzarokbûn dê ji vê rewşê çêtir be. Zarokên nebaş wiha tên vegotin; di zikê min de xwîna min xwar, dema bû canê min xwar, ku ez mirim malê min xwar (r.1151), ewladê bê xêr ne xêrxwaz e (r.1152), kesên wiha “tune be çêtir e” (r.1153), mirov dibin ber derîyê dijmin (r.1154), mereza dê û bavan e (r.1154), derdê bêderman e (r.1154), parêzê serê heft riyan e (r.1154).

Em başbûn yan jî nebaşbûna zarokan di gotinên pêşîyan da bi danberheva zarokên baş û yên nebaş jî dibînin. Wek; ewladê çê maleke xwe dike, yê xirab malê heyî com (binav) dike (r.1153), ewladê pak tîne yê xirab hiltîne (r.1154), yê baş bavê xwe dike wezîr yê xirab bavê xwe dike rezîl (r.1155). Mirov dikare van mînakan girêdayî dîn jî şîrove bike. Çawa tê zanîn rêjeya herî mezin ya Kurdan Misilman in. Di dînê Îslamîyetê da jî li ser başbûn û nebaşbûna zarokan behsa bavên ku bi kurên xwe tên ceribandin tê kirin. Mirov dikare zarokên Adem pêxember Habil û Kabil, zarokê Nuh pêxember Kenan, zarokê Yaqûb pêxember Yûsiv ji bo vê yekê mînak nîşan bide (Yılmaz, 2016, r.8).

Nebaşîya zarokan bi neguhdarkirina dê û bavan, ji heddê xwe derbasbûnê jî tê vegotin. Wek; ji min ketîye, pêşîya min dihere (r.1157). Xaleka din jî ku divê dê û bav ji bîr nekin mijara zewacê ye. Heke ew zarokên xwe zû nezewicînin ev yek her car ji bo wan dê bi talûke be. Wek; “kurê bêwar çav li der e” (r. 1165).

Çawa ku di binbeşa Zayendê da me dîyar kir dê û bav bi xwedîbûna zarokên kur keyfxweş in, her wiha dema kur yekî nebaş jî be ew ji vê yekê gazindan dikin. Wek; “diya kuranê xwedîyê kulanê” (r.1152). Yan jî kurên bêxêr û keçên bixêr tên muqayesekirin. Wek; keçeke bi xêr beramberî sed kurê bêxêr e (r.1158). Lê dîsa jî tê gotin “ku bêxêr bû ha kur ha keç, wekî hev in” (r.1162).

Zarokên baş serweta dê û bavê xwe ne, ji dê û bav hêvîya milk nakin. Piranî başî û nebaşî li ser kuran hatîye vegotin. Kurên baş; birayê bavê xwe ye (r.1165), mala xwe dike, kurê xerab a heyî winda dike (r.1165), kurê baş ne li bav dinihêre ne li dê

Zakho Centre
for Kurdish Studies

dinihêre (r.1165), navê bavê xwe bilind dike (r.1166), xwe navêje pişt bavê xirab (r.1170).

Kurê nebaş; ji bav re ji dijmin xirabtir e (r.1170), tava zipikê ye (r.1170), kur hene gula bavan e, kur hene kula bava ne (r.1163), kur li milan e, kul li dilan e (r.1164), kur mezin bû xem mezin bû (r.1164), kurê ku ne bi serê min, bi tirba min sond dixwe bila tune be (r.1166), *kurê xirab* mala bavê xwe wêran dike (r.1168), talankirê bavan e (r. 1168), bela serê bavê baş e (r.1168). Yek jî taybetîyên kurê nebaş derewkerîya wî ye. Wek; “Lawê derewîn carek dixwe firavîn” (r. 1170).

Li ser başbûn û nebaşbûna keçan em kêm gotinên pêşîyan dibînin. Wek; qiçik mera dişînin qapîyê dijminan jî (r.1176), qîza baş pey bibe kaş (r.1177). Başî û nebaşîya zarokan carinan bi têgehên dînî tên vegotin. Wek; “ewladên şeva înê, ewladên salih in” (r.1155), “ne bi mala hela hela ne bi zarokê bi şêx û melan” (r.1175). Wek berî niha jî me dîyar kir gotinên pêşîyan xwedîyê taybetîyên metaforîk in. Dema behsa başî û nabaşîya zarokî tê vegotin ew wek kezeb yan jî cîger tê nîşandan. Ji bo zarokên baş û nebaş “cîger heye av e, cîger heye agir e” (r.1149) tê gotin.

2.3. **Hezkirina Zarokan**

Hezkirina zarokan ya dê û bav di gotinên pêşîyan da carinan bi peyvên erênî carinan di nav peywendeka neyînî da tê vegotin. Wek; ewlad dilê dê û bavan in (r.1152), gula dê û bavan in (r.1152), keç û kurê malê gula malê (r.1158), kes naxwaze kes jê çêtir be, herkes dixwaze zarokên wî jê çêtir bin (r.1159), kezeb di ser her tiştî re ye (r.1159), rûmeta ewladan di ser ya merivatîyê re ye (r.1179), yekî çîçekek da destê kusî, got ‘bibe here bide destê zarokekî xweşik’, kusî bir da destê çêlikê xwe (r.1181), zaroka meymûnê li ber çavên diya xwe xezal e (r.1187), zarok bihara dilan e (r.1183), *zarok* gul e, kula dil e (r.1185), guleya zêrîn e (r.1186), kêf û şahîya malê ne (r.1186), kezeba dê û bavan e (r.1186), milyaket in (r.1186), zarokê hundir in, lal û dur in (r.1188), derdê kezebê ji derdê bira bijantir e (r.1151), kezeb ji birayan şîrîntir e (r.1160), kes kezeba xwe navêje (r.1159), kezeb avêtine ber kûçikan, kûçikan nexwarîye (r.1159).

Dê û bav ji bo zarokên xwe fedakarîyên mezin dikin û gelek talûkeyan didin ber çavên xwe. Wek; ji bo geda mirov xwe dike feda (r.1157), kezeb gurê har e ne eyb e û ne ar e (r.1159), ne dibe ar û ne dibe sar e (r.1159), kezeba bavêje neqebê, sê siwar tên bi xezeb e (r.1160), zaroka ku panîya mero jê nebe xwîn, bi ser mero de nake hezn û şîn (r.1186).

Herçend ku piranî ji bo hezkirinê zayenda zarokan neyê dîyarkirin jî em bi piranî hezkirina kuran pir kêm jî ya keçan dibînin. Wek; kezeba ji kuran, mirov nade bi bav û biran (r.1160), lawikê min pir delal e, mêrkar û xwedî mal e, wek şêr û şepal e (r.1171), qîz delala malê ye (r.1177).

Di nav zarokan da jî girêdayî zarokê mezin û yê biçûk asta hezkirina dê û bav jî diguhere. Piranî ew ji zarokê herî biçûk hez dikin. Wek; berxê paşîyê dimîne ji makê re (r.1147), biçûkê malê delalê dê û bavê (r.1148), kurê mezin derdê malê ye, kurê biçûk delalê malê ye (r.1167), toyê sicilê para zara delalî ye (r.1180), zarokên biçûk çûkên bihuştê ne (r.1188), kurê mezin heye, birayê bavê ye (r.1167). Lê carinan jî ji ber ku di rêza herî dûmayîkê da ye her kar jê ra dimînin zarokê biçûk bi awayekî mîzahî tê vegotin. Wek; biçûkê malê kûçikê malê (r.1148).

Hezkirina di navbera zarok û nevîyan, zarok û birayan da jî ne wek hev e. Ji zarokan zêdetir ji nevîyan, ji xwişk û birayan zêdetir ji zarokan bixwe tê hezkirin. Dê û

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەكولینێن كوردی

bav ji zarokên xwe hez bikin jî zarokên wan jî ji zarokên xwe hez dikin. Wek; ewlad dara gûzê ye, torin kakilê gûzê ye (r.1152), keç qaşil e, nevî kakil e (r.1158), ez didim lawê xwe, lawê min jî dide lawê xwe (r.1155), meriv zikê xwe nade bi pişta xwe (r.1173). Di van mînakan da em piranî têkilîya dapîr û bapîr ya ligel zarokî dibînin. Çawa ku di kevneşopîya malbata Kurd da malbatên mezin hene û ev cure malbat gelek qerbalix e. Dapîr û bapîr, dê û bav, mam, met, zarok, nevî bihevra dijîn. Lewma ji ber ku di kevneşopîya jîyana berê da ji bilî dapîr û bapîr û zarokan her kes li dû karekî bû piranî dapîr û bapîra bi zarokan ra eleqedar dibûn. Hebûna van gotinên pêşîyan yên Kurd û hezkirina wan ya nevîyan mirov dikare bi vî cure malbatê jî rave bike.

Ligel gotinên pêşîyan yên li ser hezkirina zarokan carinan nehezkirina zarokên nevisî yan jî zavayan jî tê vegotin. Wek; kurê mino, ne ji mino, rojê koçê barê mino (r.1167), yê hewîya min yekole ye, serî hindole ye (r.1180), kurê xelkê şiva dahlê ye, hat malxweyê malê, nehat qeza salê (r.1168).

2.4. **Perwerdehî û Kawdana Zarokan**

Di serdema zarokatîyê da malbat, dibistan û derdor xwedîyê rolekî girîng in û zarok her car ligel wan di nav têkilîyekê da ne. Bi gotineka din ev her sê hêman pêdivîyên zarokan bi cih tînin. Zarok di vê serdemê da derdora xwe nas dike, her wiha kesên ji van her sê derdoran ji xwe ra mînak digire. Bi vê yekê ew şarezayîyên civakî bi dest dixe. Lewma ev şarezayîyên zarokî ji alîyê kawdana wî ve jî girîng in. Zarok van şarezayîyan bi modelgirtinê, teqlîdkirinê yan jî di nav pergala perwerdehîyê da bi awayekî plankirî hîn dibe (Samancı û Uçan, 2017, h.r.282-284). Mijara perwerdehîyê di gotinên pêşîyan da jî wek li jor hat ravekirin bi modelgirtin yan jî teqlîdkirina dê û bav yan jî zarokan bixwe tê vegotin. Wek; bizin dide ser şivêlê û rêçê û karika xwe jî li pey xwe diçe (r.1149), kar li şûna bizinê dimexele (r.1158), çêlê qirê jî wek qirê ye (r.1150), ku sabî çi dibîne wî hiltîne (r.1162), mezinan got, biçûkan firot (r.1174), zarokên şêxan bê sir nabin (r.1189), zarok gotinên mezinan dibêjin (r.1185), zar bavê xwe ji gişka qûçaxtir (mêrxas) dizane (r.1181), girîyê zarokan bi hev re tê (r.1156). Carinan jî bi hişyarî û şîretan li ser babeta perwerdehîyê tê sekinandin. Wek; gûzekê nedin zarokê xwe, ta ku diduyan nexwaze (r.1156), heta ew kûçik li devê derîyê we be, girîyê zarokan wê wer be (r.1156), te anî dunyayê mezin bike (r.1180). Ji van mînakan em dibînin ku dê û bav çi dikin zarok jî çav didin wan. Lewma ji bo ku zarokên xwe perwerde bikin divê pêşîyê dê û bav vê rastîyê ji bîr nekin. Berî ku ew şîretan li zarokên xwe bikin li xeberdan û tevgerên xwe vegerin, li xwe hişyar bibin.

Dê û bav li ser ewqas şîretan dema dibînin ku zarokên wan hîn jî heman xeletîyan dubare dikin ew gelek aciz dibin. Lewma ji bo zarokên ku guhdarîya dê û bav nekin şîret û hişyarîyên ku di nav da tundî jî heye tên kirin. Wek; hêwîya min ez jîr kirim, qîza min ez pîr kirim (r.1157), ku tu li kurê xwe nexî, tu yê li çoka xwe bixî (r.1163), zar û mar ha bira bikin qareqar (r.1182), mirovê ku zarokan bişîne deran, divê bi xwe jî li pey here (r.1174).

Ji dê û bavan ra tê gotin ku divê hûn bi zarokan ra wek wan bibin, guhdarîya wan bikin. Heke wisa bikin dê zarok xwe baş fêr bikin û bi pêş bixin. Wek; yê ku bi zarokan re rojîyê bigire, ê cejna xwe jî vê re bike (r.1181), qûna xwe nîşa zaroka bike, belê devê xwe nîşa zarokan neke (r.1177), katan nebirin dê bibin dar (r.1158).

Di hemû pêvajoya hînbûn û perwerdehîyê da tevlîbûn û helwesta kesê tevlî vê yekê dibe gelek girîng e. Di vê babetê da divê em di perwerdehîyê da behsa cihê lîstîkê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

bikin. Lîstîk navgîneka perwerdehîyê û rêbazeka karîger ya hîndekarîyê ye. Dema zarok lîstîkan dileyîzin azad in. Di vê navberê da bêyî ku xeberê wan jê çêbe mirov dikare gelek tiştan hînî zarokan bike. Di lîstîkan da ji serkeftin û têkçûnan zêdetir ya girîng di vê pêvajoyê da destkeftîyên zarok in. Lîstîk zarokan amadeyî jîyanê dike û bi vê yekê ew jîyanê watedar dikin. Bi dîtina Piaget lîstîk lezê dide kawdana zarokî ya kognîtîv. Her wiha zarok wê derfetê dibînin ku şîyan û destkeftîyên xwe bi kêfxweşî tetbîqî jîyanê bikin (Vghzr. Karagül, 2020, r.155). Di gotinên pêşîyan yên Kurdî da jî li ser lîstîkên zarokan yan jî leyîstina zarokan û rola wê ya di perwerdehîya da yan jî li ser taybetîyên zarokan em mînakan dibînin. Wek; zar bi lîstîkê mezin dibin (r.1181), zaro bi lîstîkê gir dibin (r.1183), lîstîka zarokan ji dil e (r.1171), qiçik li ser tirba xwe dilîzin (r.1176), zarok perdeyên spî ne, nexşên xweşik lê dîne (r.1187), qîza delalî revek e, kurê delalî virek e (r.1177).

Dema ku hîn di zikê dayîkê da heta dibe mezin û balixî dibe kawdana zarokan wek babet ligel qadên din di nav qada lêkolînên edebîyata zarokan da jî ye. Di gotinên pêşîyan yên Kurdî da jî em vê yekê di çend alîyan da dibînin. Yek ji wan mirina dê yan jî bav e. Dema ji dê û bav yek bimire di kawdana zarok da muşkîle derdikevin holê. Zarokên ku dê yan jî bavên wan dimirin bi gelek muşîleyan ve rûbirû dimînin. Mirina wan ji alîyên hîsî, fizîkî û civakî ve xisarê li zarokan dike. Heta carinan bandorê li ser hemû jîyana zarokî yan jî tekekesî dike (Attepe, 2010, r.24). Di gotinên pêşîyan yên Kurdî da em bandora mirina dê û bav ya li ser kawdana zarokî di van mînakan da dibînin; bav bimire zarok har dibin, dê bimire zarok jar dibin (r.1146), zarokên bêbav, wek zozanên bêav (r.1188), zarok bi ketin û rabûnê mezin dibin (r.1183).

Dema ku zarok bikeve rehma dêya xwe êdî ew wek gîyandar tê hesibandin. Wek; çi yê li zikê dê, çi siwarê li ser pişta hespê (r.1150), mejîyê zarokan av e (r.1173), ku kete meha şeşan, zarok dayne ser merşan (r.1162). Lê di kawdanê da mirov nikare behsa sekinandina vê pêvajoyê bike. Çawa jî be zarok wê mezin bibin. Wek; berû her wê ji qemçika xwe derê (r.1146), zebeş ji lema xwe direve (r.1189), berxê îro beranê sibê ye (r.1147), gîskê par nêrîyê îsal e (r.1156). Zarok gava mezin jî dibin dê û bav jî zêdetir derdê wan dikêşin. Wek; ku zarok gir dibin, xemên dê û bavan jî bi wan re gir dibin (r.1163).

3. Encam

Di gotinên pêşîyan yên Kurdî da bi alîkarîya metafor û şibandinên wek; dar, war, dîwar, strî, kanî, zêr, parêz, cîger, kezeb, gul, kul, milyaket, çûk, berx, gîsk, nêrî, beran, kûçik, kakil, qaşil, şiv li ser zarokan û zarokatîyê hatîye sekinandin. Bikaranîna van metafor û şibandinan ji alîyekê ve jîyana kevneşop ya Kurdan nîşan dide. Ji alîyê din ve cihê zarokî bikaranîna van metafor û şibandinan taybetîyeka gotinên pêşîyan e. Çawa ku me di beşa destpêkê da jî dîyar kir bi rêya van metaforan şêwzeka helbestkî û vegotineka bêkêmasî pêk tê. Bi rêya van Kurdan fikrên xwe yên li ser zarokan û zarokatîyê vegotine. Me dît ku gotinên pêşîyan yên Kurdî li ser vê babetê têra xwe nimûneyan dihewîne. Piranî li ser zarokên kur hatîye sekinandin bê ka çima kur ji bo siberoja binemalekê girîng in. Li alîyê din pir kêm nimûne li ser keçan hene. Ev jî nîşan dide ku di gotinên pêşîyan da erkên zayenda civakî hatine parastin. Lewma ji alîyê edebîyata zarokan ve mirov nikare van nimûneyan ji bo perwerdehîyê bi kar bîne. Ji ber ku edebîyata zarokan dixwaze kur û keç ne girêdayî nirxên zayendparêz bên

perwerdekirin yan jî zayendek li ser ya/yê din bê dîtin. Dixwaze ku ew wekhevîxwaz bibin. Dîsa jî divê em ji bîr nekin di nav van nimûneyan da wek hejmar kêm jî be ji bo wekhevîya keç û kuran jî mînakên baş hene. Dîsa me dît ku li ser başî û nebaşîıya zarokan jî zarok carinan wek sedemên arîşeyên mezin hatine dîtin. Heri wiha li ser taybetîyên zarokên baş û nebaş hatîye sekinandin, ew hatine muqayesekirin. Li vir jî herî zêde li ser kuran gotinên pêşîyan hatine gotin. Ev yek li ser hezkirina zarokan jî tê dîtin. Wate, piranî em hezkirina kuran dibînin. Lêre sedemên hezkirina zarokan tê ravekirin. Me di van nimûneyan da dît ku civaka Kurd gelek ji zarokên xwe hez dike, wan li hember talûkeyan hişyar dike, rêya baş û nebaş hînî wan dike. Ev xal hemû her wiha di nav pîvanên edebîyata zarokan da jî cih digirin. Di perwerdehîya zarokan da jî wek rêbazeka bingehîn ya hîndekarîyê em di gotinên pêşîyan da ji alîyê zarokan ve teqlîdkirin û modelgirtina mezinan dibînin. Ev babet di çarçoveya kawdana zarokan ve hatîye vegotin. Lewma kêm nimûne hebin jî mirov dikare bi rêbazên perwerdehîyê û kawdanê yên nûjen gotinên pêşîyan yên Kurdî binirxîne. Ji ber vê yekê piranî gotinên pêşîyan yên Kurdî li ser jîyana Kurdan ya kevneşop in. Lewma ew wek cureyeka folklorê xwedîyê rabirdûyeka dirêj in. Her çend ew wê derfetê bidin me ku em nirxên Kurdan yên kevin, fikrên wan yên li ser zarok û zarokatîyê hîn bibin jî ew ji gelek alîyan ve ji derveyî pîvanên edebîyata zarokan û rastîyên dewra modern in. Dîsa jî divêt em bi bîr bînin ku girêdayî guhertina demê û jîyana nû ya modern di dema me jî da pêkan e ku gotinên pêşîyan yên nû derkevin holê. Pê ra li ser zarok û zarokatîyê jî fikrên nû bên vegotin. Lewma heke mirov naveroka van gotinên pêşîyan yên Kurdî li gor dema niha şîrove bike ew ê nerast be û piranî dibe ku bi vê yekê em dê negihin encameka rasteqîn.

ÇAVKANÎ:

Attepe, S. (2010). “Anne Baba Kaybının Çocuklar Üzerindeki Etkileri”, *Aile ve Toplum,* Yıl: 11, Cilt: 6, Sayı: 23, ss: 23-28.

Bilkan, A. F. (2018). “Çocuk Edebiyatı Kavram ve Mahiyet”. İçinde. *Hece Çocuk Edebiyatı Özel Sayısı,* İkinci Baskı, Ankara, ss.24-35.

Borak, M. (1996). *Gotinê Pêşiyên Kurda.* İstanbul: Berfin Yayınları.

Celîl, O. û Celîl, C. (2018). *Gotinên Pêşîyan.* Amed: Weşanên Wardoz.

Karagül, S. (2020). “Çocuk, Oyun ve Türkçe Eğitimi”. İçinde. *Türkçe Eğitiminde Tiyatro ve Drama.* Ankara: Eğiten Kitap, ss. 151-183.

Keskin, A. (2021). “Çocuk Folklorunun Kavramsal Çerçevesi, Tanımı, Kapsamı, Sınıflandırılması, Başlıca Özellikleri ve İşlevleri”. Uyanıker, N ve Ayaz, B. (der.) İçinde. *O Piti Piti Karamela Sepeti (Çocuk Folkloru Kitabı).* Çanakkale: Paradigma Akademi, ss.3-32.

Mazî, Ç. (2014). *Baxek Ji Folklora Kurdî Ji Derdora Mêrdîn.,* Stenbol:Weşanên Berbang.

Norrick, Neal R. (2014). “Subject Area, Terminology, Proverb Definitions, Proverb Features”, (Ed.) Hrisztalina, H.-Gotthardt, Melita, A. V.. In. *Introduction to Paremiology: A Comprehensive Guide to Proverb Studies.* Warsaw/Berlin: De Gruyter Open Ltd, pp.7-27.

Oncu, M. (2020). *Gotinên Pêşiyan (Senifandin-Şîrove-Ferheng).* Wan: Weşanên Sîtav, Berg IV.

Zakho Centre for Kurdish Studies

Saeed, M. N. (2019). *Layenê Perwerdekirinê Di Gotinên Mezinan Da*. Wan: Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê Enstîtûya Zimanên Zindî Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî.

Samancı, O. ve Uçan, Z. (2017). "Çocuklarda Sosyal Beceri Eğitimi", *Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, 21(1), ss.281-288.

Serhedî, M. (ber.). (2018). *Folklora Hawarê.* Amed:Weşanên Wardoz.

Subaşı, K. (2014). *Ji Bo Zarokan Di Fêrkırına Kurdî De Rola Mamikan (Vekolîn-Senifandin).* Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

(2021). "Lîstikên Zarokan yên Qedîm û Berdewamîya Wan li Devera Hekarîyê", *Folklor û Ziman,* C: 2 H: 2(1), h.r.61-96.

Şimşek, T. ve Yakar, Y. M. (2018). "Çocuk ve Edebiyat", Şimşek, T. (der.) İçinde. *Kuramdan Uygulamaya Çocuk Edebiyatı El Kitabı.* 5. Baskı. Ankara: Grafiker, ss.13-42.

Taştan, H. Yiğit (2019). *Di Lîstikên Zarokan De Ciyê Zûgotinokan*. Wan: Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê Enstîtûya Zimanên Zindî Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî.

Yalçın, A. ve Aytaş, G. (2017). *Çocuk Edebiyatı.* 9. Baskı. Ankara: Akçağ Yayınları.

Yılmaz, B. (2016). "(Dini İçerikli) Halk Anlatılarında Ebeveynin Evlat Sevgisi ile İmtihanı", *IBAD Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Dergisi,* Cilt:1, Sayı: 1, ss:1-9.

Xendekî, R. (ber.). (2018). *Folklora Roja Nûyê.* Amed: Weşanên Wardoz.

ATASÖZLERİNDE ÇOCUK VE ÇOCUKLUK

ÖZET:

Çocuk edebiyatının kaynakları arasında yazılı kaynaklar dışında öncelikle; fıkra, destan, efsane, masal, ninni gibi folklor türleri yer almaktadır. Bununla birlikte atasözleri, bilmece ve tekerlemelerden de faydalanılabilir. Kendi toplumunun bakış açısını açıkça yansıtan folklor ürünlerinden biri de atasözleridir. Bizler atasözlerinde içinden çıktığı toplumun inanç, zihniyet, kültür ve sanat gibi birçok özelliğini görürüz. Yine toplumun edindiği birçok tecrübeyi de atasözlerinde buluruz. Bundan dolayı atasözlerini toplumun aynası olarak yorumlarsak bu abartı olmayacaktır. Her bir toplumun inanç ve zihni dünyasına uygun şekilde sözkonusu toplumun folklorunda çocukların ele alındığı, onların anlaşılmasını sağlayan birçok atasözü bulunmaktadır. Aynı durum Kürt atasözlerinde de görülür. Her ne kadar diğer folklor ürünleri de yetişkinler tarafından üretilmiş olsa da çocukları ele alması ve büyüklerin çocuklar hakkındaki düşüncelerini açıkça yansıtması dolayısıyla atasözleri diğer folklor ürünlerinden ayrılır. Bu durum atasözlerinin bir özelliği olarak görülebilir. Yani, çocuk ya da çocukluk bilhassa atasözlerinde anlatılmıştır. Bu nedenle atasözleri toplumun çocuklar hakkında ne düşündüğünü ve onları nasıl ele aldığını bilinmesi açısından birçok örnek teşkil eder. Diğer folklor ürünleri içerisinde atasözlerini incelememiz bu açıdan bir

tesadüf değil bilinçli bir tercihten kaynaklanmaktadır. Sosyoloji, psikoloji, pedagoji ve pediatri gibi bilimlerin gelişmesine paralel bir şekilde çocuk ve çocukluk kavramı da zamanla değişikliğe uğramıştır. Örneğin eski zamanlarda çocuklar ve yetişkinler arasında herhangi bir fark gözetilmemiştir. Öyle ki toplumun bakış açısına göre çocuklar da büyükler gibidir. Büyükler için yazılan eserler ve hazırlanan materyaller çocuklar için de kullanılmıştır. Bununla birlikte zamanla bu düşünce geçerliliğini yitirir, çocukların büyüklerden farklı ve birey oldukları kabul edilir. Bizler de bu çalışmamızda Kürtçe'nin Kurmanci lehçesindeki atasözlerinde çocuk ve çocukluk kavramlarının nasıl yorumlandığını ele aldık. Tespit edilen atasözlerinin çocuk edebiyatı içerisinde nasıl değerlendirilip sınıflandırılabileceğini inceledik. Bundan hareketle Kürt toplumunun çocuklarla ilgili bakış açısının nasıl olduğunu, Kürtler için çocuk ve çocukluk kavramlarının ne anlamlara geldiğini, bilhassa çocukların hangi özellikleri ile anlatıldığını, onların eğitimleri, iyi ve kötü çocuklar ile çocuk sevgileri ile ilgili neler düşündüğünü, cinsiyete göre kız ve erkek çocuklar için ne tür farklılıkların öne çıktığını inceledik.

Anahtar Kelimeler*: Çocuk, Folklor, Atasözü, Çocuk Edebiyatı, Çocuk Folkloru*

CHILDREN AND CHILDHOOD IN PROVERBS

Abstract:

Apart from written sources among the sources of children's literature; There are folklore genres such as anecdotes, epics, legends, fairy tales, and lullabies. In addition, proverbs, riddles and rhymes can also be used. Proverbs are one of the folklore products that clearly reflect the point of view of their own society. In proverbs, we see many features of the society from which it emerged, such as belief, mentality, culture and art. Again, we find many experiences of society in proverbs. Therefore, it will not be an exaggeration if we interpret the proverbs as the mirror of the society. In accordance with the belief and mental world of each society, there are many proverbs in the folklore of the society in question, in which children are dealt with and that enable children to be understood. The same situation is seen in Kurdish proverbs. Although other folklore products were produced by adults, proverbs differ from other folklore products in that they deal with children and clearly reflect the thoughts of adults about children. This situation can be seen as a feature of proverbs. In other words the child or childhood is especially described in proverbs. For this reason, proverbs constitute many examples in terms of knowing what the society thinks about children and how they deal with them. Our research on proverbs among other folklore products is not a coincidence, but a conscious choice. In parallel with the development of sciences such as sociology, psychology, pedagogy and pediatrics, the concept of child and childhood has also changed over time. For example, in ancient times, no distinction was made between children and adults. So, from the point of view of society, children are like adults. The works written for adults and the materials prepared were also used for children. However, over time, this idea loses its validity, and children are considered

to be different and individual from adults. In this study, we discussed how the concepts of child and childhood are interpreted in the proverbs of the Kurmanji dialect of Kurdish. We examined how the determined proverbs can be evaluated and classified in children's literature. From this point of view, we discussed how the Kurdish society's perspective on children is, and what the concepts of child and childhood mean for Kurds. In addition, we examined the characteristics of children in particular, what they think about their education, good and bad children, and their love for children, and what differences stand out for boys and girls by gender.

Keywords: *Child, Folklore, Proverb, Children's Literature, Children's Folklore*

BERAWIRDKIRINEK DI NAVBERA GOTINÊN PÊŞIYAN ÊN KURMANCÎ Û TIRKÎ DE

Leyla KAPLAN
Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî- Zanîngeha Mardin Artukluyê/Turkîya

PUXTE:

Gotinên pêşiyan di nav xwe de hemû mijar û bûyerên ku bi jiyana mirovan a rojane re eleqeder in dihewîne. Ji ber vê yekê gotinên pêşiyan ji bo naskirina civak an jî miletan roleke girîng dilîzin. Gotinên pêşiyan ên kurmancî jî ji ber van sedeman gelek fonksiyonel in. Her çiqas xebatên akademîk yên li ser gotinên pêşiyan ên kurmancî hebin jî hejmara van xebatan kêm in û xebatên li ser gotinên pêşiyan ên kurmancî zehfî ji berhevkirin û weşandinê pêk tên. Di nav xebatên kurdî de li ser berawirdkirina gotinên pêşiyan ên kurdî û tirkî jî kêm xebat hatine kirin. Di vê xebatê de armanca sereke berawirdkirineke di navbera gotinên pêşiyan ên kurdî û tirkî de ye. Ji bo pêkanîna vê armancê gotinên pêşiyan ên kurmancî yên ku li hemberê wan di tirkî de jî hene hatin diyarkirin û nivîsandin. Hate dîtin ku beramberê 178 heb gotinên pêşiyan ên kurmancî di tirkî de jî hene û ji van 178 gotinên pêşiyan 33 heb rasterast wek wergerên hev in. Hejmara van gotinên pêşiyan dide xuyakirin ku du miletên ku bi sedan sal in bi hev re dijîn li ser hev bandor kirine û gotinên pêşiyan ên hevpar bi kar anîne.

Peyvên Serekî: *Gotinên pêşiyan ên kurmancî, gotinên pêşiyan ên tirkî, berawirdkirin*

BEŞA YEKEM:

1. Gotinên Pêşiyan

1.1. Pênaseya Gotinên Pêşiyan

Gotinên pêşiyan di tirkî de "*atasözü, atalar sözü*", di ingilîzî de wek "*proverb*" tê bikaranîn. Di kurmancî de wek "*gotinên pêşiyan, gotinên mezinan*", di zazakî de "*vateyêverênan*", di soranî de wek "*pendê pêşiyan*" tê bikaranîn. Di osmanî de ji gotinên pêşiyan re "*darb-ı mesel*" dihat gotin. Beriya ku em li ser taybetmendiyên gotinên pêşiyan bisekinin em ê cih bidin çend pênaseyên gotinên pêşiyan ku aliyê lêkolînerên mijarê ve hatine kirin:

"Gotinên têrwate ne ku xwe dispêrin ceribandinên bav û kalên me. Ev ceribandin piştî demên dirêjhatine bidestxistin ku darazan bi awayekî giştî dixe nav ramanên zanistî an jî pendgirtinê. Ji teşeyên qalibgirtî pêk tên û ji aliyê gelemperiya civakê ve hatine pejirandin" (Aksoy, 1994:37)"

"*Gotinên bav û kalên me yên ku bi cerebeya hezaran salan kemilî, bi demê re bi qalibên mayînde teşe girtî û teva qalib û teşeyên xwe ên ku veguherîne raman, pend û şîretên giranbiha û di heman demê de ji aliyê gel ve hatine pejirandin re têne gotin"*(Öncü, 2019: 13).

"Gotinên pêşiyan; hevokên bi darazî, hukmî û bi pendî li nava gel ji bo vegotin û rexneya tiştekî û bûyerekê an ramanekê hatine zimên" (Mazî, 2018: 15).

"Gotinên pêşiyan, darb-ı mesel. Ji wan gotinên xwedî hikmet yên bi kêm pêyvan hatine vegotin û bûne malê gel re tê gotin. Gotinên pêşiyan gotinên kevin in ku bi hunerên vegotinê hatine ve hatine nuxumandin. Ev di nav kurtbûn û xwerûtiyê de hin rastiyan vedibêjin, lê nayê zanîn ku ev gotinên puxtedar ji aliyê kê ve û kengê hatine gotin" (Kunos, 1978: 157).

"Gotinên pêşiyan, gotinên qalibgirtî yên ku di demên berê de ji aliyê pêşiyan ve hatine gotin û ceribandinên wan ên cûr bi cûr nîşan didin û nifş bi nifş heta roja me neqilkirin wekî 'gotinên pêşiyan' tên binavkirin" (Yıldırım, 2012: 389).

"Gotinên pêşiyan, texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku, serborî, tecribe û rabirdûya civakan bi awayekî zargotinî û bi bandor rave dike. Gotinên pêşiyan; raman û hestên rayagiştî, nexşerêya helwesta jiyana neteweyî, rengvedana zanist û çanda gel, paxşaneya daneheva civakî û hilberînên binehişa kolektîfî ye" (Öztürk, 2015: 321).

Ji van pênaseyan jî tê fêmkirin ku gotinên pêşiyan gotinên qalibgirtî ne û bi tecrubeyên mezinan yên sedsalane şikl girtine û nifş bi nifş heta roja me hatine. Gotinên pêşiyan ji aliyê gel ve hatine pejirandin û bi demê re hatine bikaranîn û bi vî awayî ji windabûnê xelas bûne. Ji ber ku ev gotin cara ewil ji aliyê kê ve hatine gotin nayê zanîn bûne anonîm yanê malê gel in.

1.2. Taybetmendiyên Gotinên Pêşiyan

Gotinên pêşiyan darazî û hukmî ne. Gotinên pêşiyan hukum dikin û darazî ne. Bo mînak "*Tu pê li cihê şil nekî, tu naçerixî*", "*kesê xêrê naçe dêrê*". Ev gotinên pêşiyan encamên darizandinê ne û di dawiya wan de hukum heye. Dixwaze bibêje ku tu vê tevgerê nekî ev bûyer nayê serê te an tu bikî, evê bê serê te.

Gotinên pêşiyan hevokên bi qalib in. Ew di nava gel de bi demê re bûne qalib û bi rêzebendî hatine zimên. Bi qalibbûn û rêzebendiya wan ji bo ku gotin neyên jibîrkirin û hê xweş bê fêmkirin an belav bibin hatiye holê. Mînak: "*Şer şêr e, çi jin e çi mêr e*", "*Çavê li deriya xwelî li seriya*", "*Menêr li mirûz, binêr li gurûz*" û hwd.

Gotinên pêşiyan malê gel in, nivîskarên wan ne diyar in. Gelêrî- anonîmbûna wan taybetmendiyeke sereke ye. Mirov dikare bibêje zehfê gotinên pêşiyan ji aliyê her kesî ve tê zanîn. Mirovên xwende û nexwende, jin, mêr her kes pir an jî hindik gotinên pêşiyan dizanin û bi kar tînin. Ev jî xuya dike ku gotinên pêşiyan ji nava gel derketiye û di nava gel de dijîn.

Gotinên pêşiyan bi piranî mecazî ne. Mecazîbûn ji bo gotinên pêşiyan taybetiyeke girîng e. Wek mînak em dikarin bibêjin "*Ar di kûtikê kevn de ye*" an "*Agir di qurman de ye*". "Ar" di wateya "hêz" an "zanebûnê" de ye. "Kûtik" jî di wateya "kal" an "pîr" de ye. Tê wê wateyê ku hêz û zanebûn bi mirovên kal re heye.

Gotinên pêşiyan pendî ne, ji bo mirovan dibin pend û ronahî û şîret. Di gotinên pêşiyan de şîret heye. Carinan bav ji lawê xwe re dibêje lawo; "*Golikê malê ji gayê malê natirse*". Ev tê wateya ku mirov ji lêzimên xwe fedî nakin an bi hêsanî mirov dikarin yên nêzikê xwe rexne bikin. Di vê derê de, bav li lawê xwe şîretê dike û dibêje, "Divê tu li yê herî nêzikî xwe miqate û haydar bî".

Gotinên pêşiyan netewî ne. Gotinên pêşiyan li gor rewş, civak, çand û erdnîgariya netewan hatine gotin. Lê ev yek ne pir qutebirî ye. Carinan gotinên cînaran jî hatine bikaranîn. Ji ber koçberiyê, ji ber sînor guherandinê, ji ber şer û bindestiyê; hinek gotinên pêşiyan bûne navnetewî û lig elek netewan bi heman wateyê jî tê bikaranîn. Lê

ev rewş dîsa netewîbûna wan winda nake. Gotinên pêşiyan ne wek biwêjan ku li nava welatekî din neyên fêmkirin. Li gelek welatan hinek gotin hatine afirandin û pir nêzî hinekên welatên din in. Mijara netewîbûna gotinên pêşiyan ji wateyên wan tê fêmkirin. Mirovên netewan an gelê welatan, li ser çipir mijûl dibin an kul û êşên wan bi piranî çi bin gotin jî bi piranî li ser wê yekê hatine afirandin. Bo mînak di kurdî de dibêjin "*Bi gulekê nabe bihar*"; di tirkî de dibêjin "*Bir çiçekleyaz olmaz*[1]"; di Îngilîzî de dibêjin "*One swalow does not make a summer*[2]" (Mazî,2018: 17-20).

Herçiqas gotinên pêşiyan yên dirêj hebin jî bi piranî kurt in û ji hevokekê an jî du hevokan pêk tên. Wek mînak em dikarin bibêjin "Aqlê sivik barê giran e", "Kurmê şîrî heta pîrî" (Keskin, 2019a: 300; Keskin, 2019b: 19).

Gotinên pêşiyan ji aliyê afirandinê ve lihevhatî ne. Bo mînak "*Mirovê sebrê, melîkêMisrê"* (Keskin, 2019a: 300).

Hin gotinên pêşiyan hene ku tevî hunera edebî ya peyvê, fablî ne jî. Bo mînak: "Sibatoka dînik dibêje ez weyn dikim /Dur o danekî ji xweka Adarê deyn dikim/ Postê gîskan bi ser sergo de wer dikim" (Yıldız, 2017: 217).

Rastbûna gotinên pêşiyan ji aliyê herkesî ve tên pejirandin. Weke ku di gotinên pêşiyan de hene: "*Peyvê kalan, nexşê beran*". "*Gotinê kalan, betal nabin*" (Öncü, 2019: 21).

1.3. Yekem Xebatên Li Ser Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî

Her çiqas li ser gotinên pêşiyan ên kurmancî hin xebat hatibine kirin jî ev xebat piranî berhevkirin û nivîsandina gotinên pêşiyan bûne û xebatên akademîk ên li ser gotinên pêşiyan zêde nehatine kirin. Bi taybetî di hin kovaran de hin rêzegotarên bi gotinên pêşiyan re eleqedar hatine weşandin. Em ê li vir zêdetir li ser kovarên ku tê de xebatên li ser gotinên pêşiyan hene bisekinin.

Kovara Jînê ji yekem çavkaniyan e ku tê de li ser gotinên pêşiyan rêzegotar hatine weşandin. Ev rêzegotar ji aliyê Law Reşîd û Hîlmiyê Siwêrekî ve hatine nivîsandin. M. Emîn Bozarslan li ser kovara Jînê dixebite û behsa xebatên Law Reşîd û Hîlmiyê Siwêrekî jî dike: Ew peyvên pêşiyan ên ku ji aliyê *Law Reşîd* ve hatine berhevkirin û nivîsandin di pênc jimareyên *Kovara Jînê* de derketine. Jimareyên kovarê: 3, 4, 5, 7 û 8 e. Dîsa di heman kovarê de gotinên pêşiyan ên ku Hîlmiyê Siwêrekî berhev kirine di hejmarên 14, 19 û 24an de hatine weşandin (Bozarslan, 1985: 73). Ev rêzegotarên di derheqê gotinên pêşiyan de bi zimanê tirkî û bi navê "*Kürdlerde Durûb-ı Emsal*" tên çapkirin. Ev xebat wek xebata yekem a di derheqê gotinên pêşiyan de tê dîtin (Keskin, 2019a: 297).

Di kovara Hawarê de di sala 1942an de di pênc hejmarên li pêy hev de ji aliyê Tawûsparêz ve berhevkirinên gotinên pêşiyan ên Kurmancî hatine weşandin. Tawûsparêz di vê rêzenivîsa xwe de derbarê gotinên pêşiyan de tu pênase, şîrove yan jî raman diyar nekiriye û rasterast van gotinên ku berhev kiriye veguhizandiye û li pêy wan jî wergerên wan yên zimanê Frensizî tomar kiriye. Girîngiya vê hewldanê ew e ku, ev xebat derbarê gotinên pêşiyan ên kurmancî de di nav ên ewilîn de ye û her wiha taybetmendiyeke wê yeka din jî ev e ku sernivîsên van nivîsan ne bi kurdî bi Frensizî hatiye danîn (Öztürk, 2015: 333).

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Kovareke din ya ku cih daye derheqê gotinên pêşiyan ên Kurmancî kovara *War*ê ye. *Veroj Seîd* di vê gotarê de sê gotarên di derheqê gotinên pêşiyan de weşandiye (Öztürk, 2015: 334).

Kovara *Kurd Teawun we Tereqqî*, di hejmara 6an de "berhevoka gotinên pêşiyan" daye çapkirin. Dîsa di kovara *Rojî Kurd* de Xelîl Xeyalî yê Mûtkî, gotarek li ser ferheng, berhevkirina gotinên pêşiyan û kilaman nivîsiye (Yıldız, 2017: 219).

BEŞA DUYEM:

2. BERAWIRDKIRINEK DI NAVBERA GOTINÊN PÊŞIYAN ÊN KURMANCÎ Û TIRKÎ DE

Di vê beşê de gotinên pêşiyan yên kurdî bi awayekî alfabetîk hatine dayîn. Li hemberê her gotinê gotinekî pêşiyan ên tirkî hatiye nivîsîn. Ev gotinên pêşiyan an rasterast wekî wergera wê ya kurdî ye an jî gotinekî ku ji bo heman rewşê hatiye gotin e. Di vê beşê de tenê gotinên pêşiyan yên di her du zimanan de li şûna hev û ji bo heman rewş an jî bûyerê dikarin bên gotin hatine bijartin.

Me pêşî li gorî alfabeyê gotinên pêşiyan ên kurdî rêz kir. Piştî nivîsandina gotinên pêşiyan ên kurdî me lib û lib wateya wan jî nivîsand. Piştî wateya gotinê pêşiyan di tirkî de ew gotin li beramberî kîjan gotinê hatibe bikaranîn me ew gotinê pêşiyan jî nivîsand. Mînakên ku me tespît kirine ev in:

2.1. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "A"yê Dest Pê Dikin

"**Agir ket mala derewînan, kesî bawer nekir** (Oncu, 2014: 15)." "Agir kete mala derewînan kesî jê bawer nekir (Mazî, 2018: 72; Aydoğdu,2020: 11)" "Agir girt mala derewîn, kesî bawer nekir (Bingöl, 2014: 9)"Ev gotin li ser derewînan hatiye gotin. Kesên ku derewan dikin rojekê xelk bi wan dihese. Dema ku xelk pê hesiya êdî rast jî bibêjin kes ji wan bawer nake. "**Yalancının evi yanmış kimse inanmamış** (Aksoy, 1994: 465)".

"**Ahê feqîran namîne ji mîran re." "Ahê bizina kol namîne ji ya biqiloç re." "Ahê sêwiyan namîne ji zaliman re." Ahê vî destî namîne ji wî destî re** (Oncu, 2014: 17)." Her kesek ji ber kirinên xwe yên xirab dê cezayê xwe bibîne. Ahê mazlûman namîne ji zaliman re. **"Kimsenin ahı kimsede kalmaz (**Aksoy, 1994: 364**)".**

"Aqil di seriyan de ye, ne di rihan de ye (Oncu, 2014: 19)". Biaqilî bi temenê mirovan ve girêdayî nîne; bi zanîn û şarezatiya mirov ve girêdayî ye. **"Akıl yaşta değil, baştadır** (Aksoy, 1994: 131).

"Aqil serdestî aqil e (Oncu, 2014: 29; Aydoğdu, 2020: 14)" "Aqil ji aqilan zêde ye (Çaçan, 2015: 68)" Mirov der barê tiştekî de yan di mijarekê de çiqas gihiştî û zana be jî, hê ji mirov gihîştîtir û zanatir hene, lewre divê mirov bi hev bişêwire.**"Akıl akıldan üstündür** (Aksoy, 1994: 128)".

"Av ava biçûkan, peyv peyva mezinan (Oncu, 2014: 25)". Biçûk nikarin xwe li ber tîbûnê ragirin, lewre avê pêşî didin wan. Lê mafê xeberdanê yê mezinan e, ji ber ku kesên mezin dinyadîtî ne û wisa tê bawerkirin ku ew baştir dizanin.**"Su küçüğün, sofra (söz) büyüğün** (Aksoy, 1994: 434)".

"Avzêr kirin teneke, dîsa kire teqereq (Oncu, 2014: 29)". Heger kesekî bê esil be tu çiqas cil û xuyandina wî biguherînî jî xûy û xisletê wî nayê guhertin. **"Eşeğe altın semer vursalar yine eşektir** (Aksoy, 1994: 272)".

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

2.2. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "B"yê Dest Pê Dikin

"Barek pirtûk li kerê bikî, ker dîsa ker e (Oncu, 2014: 36)". Hin kes hene çiqas bixwînin jî di kesayetiye wan de zêde tiştek naguhere.**"Eşeğe altın semer vursalar yine eşektir** (Aksoy, 1994: 272)".

"Barîna baranê ji tavê xuya ye (Oncu, 2014: 36)". Divê mirov nîşanên hin tiştan bizanibe. Hin tişt ji nîşanên xwe diyar in ka tên an nayên.**"Perşembenin gelişi çarşambadan bellidir** (Aksoy, 1994: 414)".

"Behr bi devê segan nalewite (Oncu, 2014: 39)"."Behr bi devê kûçika heram nabe (Aydoğdu, 2020: 25)".Mirovekî nezan nikare dewlemendiya (ji aliyê zanistiyê ve) mirovekî zana bilewitîne û têk bibe.**"Altın yere düşmekle pul olmaz" "Altın yerde paslanmaz, taş yağmurdan ıslanmaz** (Aksoy, 1994: 144)".

"Beq danîne ser bera neqşîn, dîsa xwe kiriye heriyê (Oncu, 2014: 41)". Hin tişt çiqas baş bin jî bi kerî hin kesan nayên, her kes ji tiştên li gorî naskirin û mercên xwe hez dike. **"Bülbülü altın kafese koymuşlar, "ah vatanım" demiş** (Aksoy, 1994: 208)".

"Bi ava hindik aş nagere (Oncu, 2014: 53)". Pêwîst e mirov têra heyîna xwe pergala xwe bigerîne, tiştên mezin li ser bingehên biçûk û kêm çênabin.**"Lafla (lakırdı ile) peynir gemisi yürümez** (Aksoy, 1994: 383)".

"Bibare nebare, meha adarê xedar e (Bingöl, 2014: 26)". Di meha adarê de hêj sermaya bixeter derbas nebûye. Her çendî ew meh meha biharê jî tê hesabkirin lê divê ewleyî lê neyê. **"Mart kapıdan baktıtır, kazma kürek yaktırır** (Aksoy, 1994: 387)".

"Bi darê zorê xweşqurbankî nabe (Oncu, 2014: 55)". Dema yek ji mirov hez neke mirov nikare bi darê zorê xwe pê bide hezkirin. **"Zorla güzellik olmaz** (Aksoy, 1994: 485)".

"Bi destekî çepik li hev nakevin (Oncu, 2014: 55". Mirovekî çiqas jêhatî be jî wekî du mirovên bi hev re ne jêhatî ye. **"Bir elin sesi çıkmaz". "Bir elin nesi var, iki elin sesi var** (Aksoy, 1994: 195)".

"Bi gotegot mirov naçe cot (Oncu, 2014: 57; Aydoğdu, 2020: 30)". Kar bi kirinê çê dibin, tenê bi xeberdanê ne mirov dikare dest pê bike ne jî biqedîne. **"Lafla (lakırdı ile) peynir gemisi yürümez** (Aksoy, 1994: 383)**".**

"Bi lez ket, dereng ket (Oncu, 2014: 59; Aydoğdu, 2020: 37)". Hin kes ji bo ku karê xwe zû biqedînin lez dikin û ji ber lezkirinê jî xelet dikin û dizivirin serî careke din dest pê dikin. Lewre dereng dimînin.**"Acele yürüyen yolda kalır" "Acele işe şeytan karışır** (Aksoy, 1994: 107)".

"Bi pirsê mirov diçe Qudsê." "Bi pirsê mirov diçe Şamê (Oncu, 2014: 60, 61)". Mirov di jiyana xwe de gelek tiştan bi pirsan hînî dibe.**"Sora sora Bağdat (Kâbe) bulunur** (Aksoy, 1994: 430)".

"Bihar bi kulîlkekê nayê (Oncu, 2014: 66)".**"Dinya bi gulekê nabe bihar** (Mazî, 2018: 153)".**"Bi gulekê bihar nayê** (Bingöl, 2014: 28)".Dema îşaretek spehî lê belê biçûk derbikeve holê, umîdekê dide meriv, lê belê ew nayê wê wateyê ku ew armanca tê hêvîkirin çêbûye.**"Bir çiçekle yaz olmaz (gelmez)** (Aksoy, 1994: 193)**"**

"**Bila dereng be lê ne bizehmet be** (Oncu, 2014: 70)". Heger mirov bixwaze tiştekî saxlem bike divê mirov baş li ser bisekine û zor nediyê ku di demeke kin de biqede. **"Geç olsun da güç olmasın** (Aksoy, 1994: 284)".

"Bila dil bi dil be, bila welatê dûr be, bila tûrê parsê li mil be, binê tûr jî qul be." " Bila dil bi dil be, lihêf ji heft cihî qul be, balgih jî kevir be (Oncu, 2014: 70)".

Zakho Centre for Kurdish Studies

Dema jin û mêr bi dilê hev bin, tu tiştê wan tune be jî yan jî zêde feqîr bin jî dîsa xema wan nîn e. **“İki gönül bir olursa (olunca) samanlık seyran olur** (Aksoy, 1994: 322)”.

“Bila mirina kerêji ceh be (Oncu, 2014: 75)”. Bila mirina mirov ne ji tunebûnê be, bila ji têrbûnê be.**“Atın ölümü arpadan olsun** (Aksoy, 1994: 162)”.

“Binçengek ne bes e ji du zebeşan re (Oncu, 2014: 80)”. Mirov nikare tiştên ji qeweta xwe zêdetir bike. Mirov nikare du karan bi hev re bike. **“İki karpuz bir koltuğa sığmaz** (Aksoy, 1994: 322)”.

“Bizin bi bizinitiya xwe cihê xwe paqij dike (Oncu, 2014: 87)”. Warê mirov divê paqij be. Paqijî ji jiyîna mirov re şert e. **“Arslan yatağından (yattığı yerden) bellidir (belli olur)** (Aksoy, 1994: 154)”.

“Bizin bi lingê xwe, mî bi lingê xwe bi dar ve ye (Oncu, 2014: 87)”.**“Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe** (Öncü, 2019: 31)”.Her kes ji jiyana xwe berpirsyar e, kî çi bike dê berdêlê wê bide. **“Her koyun kendi bacağından asılır** (Aksoy, 1994: 312)”.

“Bizin ketiye derdê serê xwe, şivan ketiye derdê bezê bizinê (Oncu, 2014: 88)”. Hin kes dikevin derdê canê xwe, lê hin kes jî dikevin derdê fêdeya ku dê jê were.**“Koyun can derdinde kasap yağ derdinde** (Aksoy, 1994: 370)”. **“Keçiye can kaygısı, kasaba yağ kaygısı** (Aksoy, 1994: 354)”.

“Bûk li hespê ye, hevsar li destê Mistê ye, kes nizane qismetê kê ye (Oncu, 2014: 90)”.**“Bûk li ser hespê ye, kes nizane nesîbê kê ye** (Oncu, 2020: 31)”. Heta mirov dawiya bûyeran an jî ya tiştan nebîne, mirov nikare bi biryar biaxive.**“Gelini ata bindirmişler ‘ya nasip’ demiş** (Aksoy, 1994: 286)”.

2.3. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “C”yê Dest Pê Dikin

“Can li ber mal e(Oncu, 2014: 94)”. Can serdestî mal e, çi bûyerên nebaş bibin bila bi serê mal de bên, ne bi serê can de bên. Yan jî mal wekî can girîng e. Bûyer ha hate serê mal, ha hate serê can, ferq tune. **“Cana gelecek (kaza, zarar) mala gelsin** (Aksoy, 1994: 211)”.

“Caniya çê, ji ber hespê belî ye (Oncu, 2014: 95; Aydoğdu, 2020: 42)”. Kesên baş di şopa yên baş de tên. Kesên baş başiyê li pey xwe dihêlin.**“Anasına bak kızını al, kenarına (kıyısına, tarağına) bak bezini al** (Aksoy, 1994: 147)”.

“Cer di riya avê de dişikê (Bingöl, 2014: 44)”. Meriv di riya kê û di riya çi de bixebite wê di wê rê de jiyana xwe jî bide.**“Su testisi suyolunda kırılır** (Aksoy, 1994: 434)”.

“Cihê ku agir lê neyê kirin, dû jê ranabe (Oncu, 2014: 97; Aydoğdu, 2020: 43)”. Dema ku mirov bi karên xerab re mijûl nebe kes di der heqê mirov de tewş xeber nade. **“Ateş olmayan yerden duman çıkmaz** (Aksoy, 1994: 161)”.

“Cihê ku agir pê ketî dişewite (Oncu, 2014: 97; Aydoğdu, 2020: 43)”. Êş, kul û keder li kû bikeve wê derê diêşîne.**”Ateş düştüğü yeri yakar** (Aksoy, 1994: 161)”.

“Cîran hewceyê ava cîran e (Bingöl, 2014: 45)”. Ji ber nêzikiya malên me ji xizmên xwe bêhtir em bi cîranên xwe re rû bi rû dimînin. Em bi wan re di piştevaniyeke beramber de ne. **“Komşu komşunun külüne (tütününe) muhtaçtır** (Aksoy, 1994: 368)”.

“Cîranê temah mirov xwedî mal dike (Oncu, 2014: 102)”.Dema ku cîranên mirov kesên destgirtî bin ji bo ku mirov mihtacê wan nebe zêdetir dixebite da ku ji wan tiştekî nexweze. **“Kötü komşu insanı (adamı) hacet (mal) sahibi eder** (Aksoy, 1994: 375)”.

2.4. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "Ç"yê Dest Pê Dikin

"Çar mirov ji yekî re bibêjindîn e, dîn dibe (Oncu, 2014: 104)". Di jiyana mirov de bal û dîtinên xelkê yên di der heqê mirov de ji bo mirov girîng in.**"Bir adama kırk gün (deli dersen deli, akıllı dersen akıllı olur) ne dersen o olur** (Aksoy, 1994: 191)".

"Çend derzî li şûjinekê werin hev, wê pê kanibin (Oncu, 2014: 109)". Ku kesên jar û belengaz yek bin dê hêzeke xurt derkeve holê. **"Bir (tek) elin var, iki elin sesi var. (Bir elin sesi çıkmaz.)** (Aksoy, 1994: 195)".

"Çê kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro (Oncu, 2014: 110)". Mirov çi dike bi xwe dike. Mirov heger baş be dê başî bibîne, xerab be dê xerabî bibîne. **"Ne doğrarsan aşına, o çikar karşına (kaşığına)" "Ne ekersen onu biçersin** (Aksoy, 1994: 395)".

"Çêlikên şêran jî şêr in (Oncu, 2014: 110)". Kesên mêrxas zêçên wan jî mêrxas in.**"Anasına bak kızını al, kenarına (kıyısına, tarağına) bak bezini al** (Aksoy, 1994: 147)".

"Çiniyek goşt hezar eybî vedişêre (Oncu, 2014: 114)". Kesên jar kêmasiya bejna wan ji rû ve dixuye. Kesên zexm kêmasiya bejna wan goştê wan vedişêre. An jî heyîn kêmasiyên mirov vedişêre. **"Bir dirhem et bin ayıp örter** (Aksoy, 1994: 194)".

"Çiya bi çiya nakevin, çav li çavan dikevin (Oncu, 2014: 116; Mazî, 2018: 124)".**"Çiya rastî çîya nayê, lê meriv rastî merivan tê** (Çaçan, 2015: 66)".**"Çiya li çiyayan nakeve, lê çav li çavan dikeve** (Bingöl, 2014: 52)".Çiyayên ji hev dûr hev nabînin lê mirov dûr û nêzik rojekê rastî hev tên. **"Dağ dağa kavuşmaz, insan insana kavuşur** (Aksoy, 1994: 227)".

"Çiyayê xuya bike ne dûr e (Oncu, 2014: 119)". Dema mirov qonax û armanca xwe bizanibe, rê ji mirov re bêdawî nayê. Ji ber ku mirov dawiya wê dibîne.**"Görünen dağın uzağı olmaz** (Aksoy, 1994: 292)".

2.3. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "D"yê Dest Pê Dikin

"Dar bêyî kelem/ gêle nabe (Oncu, 2014: 125)". Di her başî û xweşiyê de kêmasiyek heye, divê ev yek neyê jibîrkirin. **"Dikensiz gül olmaz** (Aksoy, 1994: 240)".

"Dara lezê fêkiyên poşmaniyê dide (Oncu, 2014: 128)". Dema mirov karekî bi lez bike, her tim kêmasiyek tê de dimîne û mirov tim jê poşman dibe.**"Acele işe şeytan karışır** (Aksoy, 1994: 107)".

"Darbiro daran bibir, hêviyên xwe ji Xwedê nebir (Oncu, 2014: 129)". Ku karê mirov çiqas zor û zehmet be jî pêwîst e ku mirov hêviyên xwe winda neke, ji ber ku mirov bê hêvî nikare jiyana xwe bidomîne.**"Allah'tan umut kesilmez**(Aksoy, 1994: 140)".

"Dawiya/Paşiya derewan bostek e (Oncu, 2014: 132; Aydoğdu, 2020: 56)". Derew çiqas bibawer bin jî, dê di demeke kin de rastiya wan derkeve holê. Ji ber ku bingeha wan tune ye.**"Yalancının mumu yatsıya kadar yanar**(Aksoy, 1994: 465)".

"Daxwaza qirê bibûya dê tebaxê berf bibariya (Oncu, 2014: 132)". Dema daxwaz û diayên kesên nebaş bihata pejirandin dê jiyan serobino bibûya.**"İtin (köpeğin) duası kabul (makbul) olsa (-ydı) gökten kemik yağar(-dı)** (Aksoy, 1994: 333)".

"Dengê daholê ji dûr ve xweş e (Oncu, 2014: 139)".**"Dengê defê ji dûr ve xweş e** (Mazî, 2018: 135; Bingöl, 2014: 58)".Gelek tişt û bûyer ji dûr ve xweş xuya dikin lê dema mirov tevlî wan dibe mirov dibîne ku ne wekî xuyana xwe ne.**"Davulun sesi uzaktan hoş gelir** (Aksoy, 1994: 229)".

Zakho Centre for Kurdish Studies

“Dengê mirinê zû belav dibe (Oncu, 2014: 140)”. Xebera reş û xerab zû belav dibe.**“Kara (kötü) haber tez duyulur** (Aksoy, 1994: 343)”.

“Derb hesin nabire, gotin dibire (Oncu, 2014: 142)”. Carinan ji hin kesan re tirs û lêdan fêde nake, lê bi gotinên xweş gelekî bi hêsanî têne rê. **“Tatlı dil yılanı deliğinden çıkarır** (Aksoy, 1994: 444)”.

“Derdê feqîran nan e, derdê axê dawet û dîlan e (Oncu, 2014: 144)”. Haya kesî ji derdê kesî tune. Her kes di xema çareseriya derdê xwe de ye. **“Koyun can derdinde, kasap yağ derdinde** (Aksoy, 1994: 370)”.

“Dest heye ji her destî pîroztir e (Oncu, 2014: 150)”. Li ser rûyê dinê her kes ji hev cuda ye. Mirov çiqas qenc û baş be jî divê mirov bizanibe dibe ku yên ji mirov çêtir jî hene.**“El elden üstündür (ta arşa kadar) (arşa çıkıncaya, varıncaya kadar)** (Aksoy, 1994: 261)”.

“Destê tenê deng jê nayê (Oncu, 2014: 153; Çaçan, 2015: 106)”. Kesê tenê nikare zêde tiştekî bike. Çiqas bixwaze bike jî nikare wekî du kesan bike. **“Bir (tek) elin nesi var, iki elin sesi var** (Aksoy, 1994: 195)”.

“Destê tu nikaribî gez bikî, maç bike (Oncu, 2014: 153; Bingöl, 2014:63)”. Dema mirov nikaribe destekî bitewîne yan jî nikaribe bi yekî, divê mirov destê wî maç bike û bi ya wî bike.**“Bükemediğin (ısıramadığın) eli öp, başına koy** (Aksoy, 1994: 208)”.

“Dê bibîne, dotê bistîne (Oncu, 2014: 163)”.**“Dayê bibîne, dotê werîne** (Çaçan, 2015: 47, Bingöl, 2014: 71)”.Ji ber ku keç di şopa diya xwe de diçin, nexwe dayika wan çi be ew jî ew in.**“Anasına bak kızını al, kenarına (kıyısına, tarağına) bak bezini al** (Aksoy, 1994: 147)”.

“Di roja teng de dostê baş xuya ye (Oncu, 2014: 167)”. Di rojên teng de dostên baş bi destê mirov digirin û alikariya mirov dikin.**”Dost (iyi dost) kara günde belli olur** (Aksoy, 1994: 248)”.

“Diayên kûçikan qebûl bibûna, dinya wê bibûya selexane (Oncu, 2014: 168)”. Hin kes ji ber ku dilê wan xerab e yan jî daxwazên wan ne baş in, nayên qebûlkirin. Dema diayên wan bên qebûlkirin dê dinya bi ser serê xelkê de were xwarê.**“İtin (köpeğin) duası kabul (makbul) olsa (-ydı) gökten kemik yağar(-dı)** (Aksoy, 1994: 333)”.

“Dijminê biaqil, ji dostê bêaqil çêtir e (Oncu, 2014: 169)”. Dijminê biaqil mirov dizane dê çi bike lê hevalê bêaqil mirov nizane dê kengê çibike.**“Akıllı düşman, akılsız dosttan hayırlıdır. (Deli dostun olacağına akıllı düşmanın olsun)** (Aksoy, 1994: 128)”.

“Dil gotinan nabihîze (Oncu, 2014: 171)”. Dil bi giştî li pey daxwaza xwe ye, guh nade gotin û giliyan. **“Gönül ferman dinlemez** (Aksoy, 1994: 290)”.

“Dil ji kê hez bike, pêrî ew e (Oncu, 2014: 171)”. Dema dil ji yekî hez bike ji wî kesî bedewtir li ser rûyêerdê tune ye. Ji ber ku çav ji xeynî wî tiştekî nabîne.**“Gönül kimi severse güzel odur** (Aksoy, 1994: 291)”.

“Dinya ji kesî re nabe bar û pişt (Oncu, 2014: 178)”. Dinya nabe malê kesî, yên ku xwe xwediyê dinyayê dihesiband jî mirin û ji bilî kefen nekarîn tiştekî ji xwe re bibin.**“Dünya (Peygamber) Süleyman’a bile kalmamış** (Aksoy, 1994: 252)”.

“Dîkê zû bang dide, serê wî zû jê dikin (Oncu, 2014: 185)”. Dema mirov bê wext di derheqê tiştan de biaxive û wan tiştan ji kesê din re rave bike, dê mirov berdêla wê jî bide.**“Vakitsiz öten horozun başını keserler** (Aksoy, 1994: 458)”.

“Du caran guhdar be carekê biaxive (Oncu, 2014: 193; Aydoğdu, 2020: 71)”.Dema mirov di derheqê tiştekî de biaxive, divê mirov pêşî li yê hemberî xwe

guhdariyê bike. Heta mirov di mijarekê de xwedî agahiyên teqez nebe divê mirov neaxive.**“İki dinle (bin işit) bir söyle. (Bir söyle iki dinle)** (Aksoy, 1994: 321)”.

“Du dilên tevahî çiya didin ser çiya (Oncu, 2014: 193; Mazî, 2018: 162)”. Dema du kes destên xwe bidin hev tu astengî û pirsgirêk xwe li ber wan nagirin.**“İki gönül bir olursa (olunca) samanlık seyran olur** (Aksoy, 1994: 322)”.

“Dûrî çavan dûrî dilan e jî (Oncu, 2014: 196)”. Kesên ji çavan dûr zû tên jibîrkirin.**“Gözden ırak (uzak) olan gönülden de ırak (uzak) olur** (Aksoy, 1994: 293)”.

“Dûvikê derewan ne dirêj e (Oncu, 2014: 198)”. Peyva derew zû derkeve holê. Tiştên ne rast ji ber ku ne rast in mirov nikare veşêre, dê teqez derkeve holê.**“Yalancının mumu yatsıya kadar yanar** (Aksoy, 1994: 465)”.

2.4. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “Ê”yê Dest Pê Dikin

“Ê ceh çand genim naçîne (Oncu, 2014: 215)”. Mirovê ku qenciyan bike qenciyan, neqenciyan bike wê neqenciyan bibîne.**“Ne ekersen onu biçersin. (Herkes ektiğini biçer)** (Aksoy, 1994: 395)”.

“Ê hatî cihê yê çûyî tijî nake (Oncu, 2014: 218)”. Bi giştî yên tên ji yên diçin xerabtir dertên. Carinan mirov dixwaze ku hin tişt biguherin lê dema diguherin, çavê mirov li yê çûyî digere. Yanê mirov li daxwaza xwe poşman dibe. **“Gelen gidene rahmet okutur” “Gelen gideni aratır.”** (Aksoy, 1994: 285)”.

“Ê kêşandî bi ehwalê derdan dizane (Oncu, 2014: 221)”. Kesê kul û derdan dikişîne bi halê kesê ku wan derdan dikişîne dizane. Heta mirov hin tiştan nebîne, mirov bi wan nizane. **“Dert çekene göredir** (Aksoy, 1994: 236)”.

“Ê ku bi hêrs rabe, eniya xwe li serdarê derî dixe(Oncu, 2014: 222)”. Kesê ku bi hêrs rabe ji ber ku bêhneka fireh nikare bifikire xeletiyan dike.**“Öfkeyle kalkan zararla (ziyanla) oturur** (Aksoy, 1994: 405)”.

“Ê ku çûyî diziya hingiv, bi pêgirtina mêşan qebûl e (Oncu, 2014: 223)”. Dema mirov xwe li ber tiştekî deyne divê mirov berdêla wî tiştî jî bide ber çav. Ji bo tiştên hêja divê mirov berdêlên hêja bide. **“Gülü seven dilenine katlanır** (Aksoy, 1994: 295)”.

“Ê neketî û ranebûyî bi tenê Xwedê ye (Oncu, 2014: 230)”. Zindiyê ku li ser rûyê dinê bijî û jiyayî muheqeq bûyer hatine serê wî û dê bên jî. **“Düşmez kalkmaz bir Allah** (Aksoy, 1994: 254)”.

“Ê siwar ji halê yê peya fêm nake (Oncu, 2014: 231)”. Kesê ku feqîrî û xizanî nedîtibe bi halê kesên wisa nizane. Kesên dewlemend wisa difikirin ku her kes mîna wan di nav xweşiyê de ye. **“Tok, acın halinden bilmez (ne bilir)” “Var ne bilsin yok halinden** (Aksoy, 1994: 449)”.

2.5. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “G”yê Dest Pê Dikin

“Girara xwe li gorî kufletê xwe bikelîne (Oncu, 2014: 252)”.**“Serê xwe li gorî mêrê xwe girê bide** (Oncu, 2014: 602)”. Rastiya jiyana mirov çi be divê mirov li gorî wê bijî. Tiştên rastiya jiyana te nede der, wî tiştî neke.**“Ayağını yorganına göre uzat** (Aksoy, 1994: 166)”.

“Giyayê hewşê tehl e (Oncu, 2014: 253)”. Bi giştî malê mirov bi mirov ne xweş û bê rûmet dixuye, lê yê xelkê ji mirov re xweş tê.**“Komşunun tavuğu, komşuya kaz görünür (karısı kız görünür)** (Aksoy, 1994: 368)”.

“Goşt û neynûk ji hev naqetin (Oncu, 2014: 254)”.**“Goşt û neynûk ji hev nabin** (Bingöl, 2014: 108)”. **“Goşt ji neynûk naqete** (Aydoğdu, 2020: 90)”.Kesên ku li hev

Zakho Centre for Kurdish Studies

hatibin, ji hev hez bikin, tiştên ku bi hev ve girêdayî bin ji hev nabin. Ji ber ku ji bo hev pêwîst in.**"Et tırnaktan ayrılmaz** (Aksoy, 1994: 277)".

"Gul bê strî nabe (Oncu, 2014: 272; Aydoğdu, 2020: 92)". Her xweşiyekê nexweşî û tengasiyeke wê heye. Heta mirov nekeve astengiyan mirov xweşiyê nabîne.**"Dikensiz gül olmaz" "Gül dikensiz olmaz"** (Aksoy, 1994: 241)".

"Gul li gulê dinihere, sor dibe (Oncu, 2014: 272)". Tiştên spehî li ba tiştên baş û sipehî baştir û sipehîtir dibin. **"Üzüm üzüme baka baka kararır** (Aksoy, 1994: 457)".

"Gur xwediyê mihê pirs nake (Oncu, 2014:276)". Gur li xwarina xwe dinêre, jê re ne lazim e bê ka mal malê kê ye. Kesê ku xerabiyê dike li kesê ku dê bixesire nafikire.**"Üzümü(-nü) ye de bağını sorma** (Aksoy, 1994: 256)".

2.6. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "H"yê Dest Pê Dikin

"Hec bi silavan qebûl nabe (Oncu, 2014: 283)". Ji bo pêkhatina hin tiştan divê mirov kedekê bide. Berdêla her tiştî heye. Dema mirov tiştekî bixwaze divê mirov berdêla wî bide. **"Taşıma (dökme) su ile değirmen dönmez** (Aksoy, 1994: 443)".

"Hemû tişt derew in, lê mirin rast e (Oncu, 2014: 290)". Mirin dawiya jiyana hemû zindiyan e. Tiştên ku mirov dijî bi demê re diherikin û diçin. Ku mirov dimire pê ve jiyana mirov dibe derew. **"Dünya ölümlü, gün akşamlı** (Aksoy, 1994: 252)".

"Heqê cîranan berî her heqî ye (Oncu, 2014: 291)". Heqê cîranan heqekî girîng e, divê mirov bi cîranên xwe re baş biborîne.**"Komşu hakkı, Tanrı hakkı (-dır)** (Aksoy, 1994: 367)".

"Her dîk axayê sergoyê xwe ye (Bingöl, 2014: 133)". Her kes di derdora xwe de xwedî qîmet e.**"Her horoz kendi çöplüğünde (küllüğünde) öter (eşinir)** (Aksoy, 1994: 308)".

"Her egîdek rêveçûneke wî heye (Oncu, 2014: 292)". Her kes li gorî xwe tiştan dinirxînin û li gorî fersendên xwe livên xwe kifş dikin.**"Her yiğidin bir yoğurt yiyişi vardır** (Aksoy, 1994: 313)".

"Her hevrazek nişûvekî wî heye (Oncu, 2014: 293)". Çareseriyeke her pirsgirêk û tengasiyê heye. Mirov çiqas bikeve neçarî û astengiyan jî dema mirov ked bide dê mirov bi ser bikeve. **"Her inişin bir yokuşu (her yokuşun bir inişi) vardır** (Aksoy, 1994: 308)".

"Her jinek di mala xwe de xatûn e." "Her kes axayê mala xwe ye (Oncu, 2014: 294)". Her mirov serkarê mala xwe ye.**"Her horoz kendi çöplüğünde (küllüğünde) öter (eşinir)** (Aksoy, 1994: 308)".

"Her kes bi qasî çandiniya xwe radike (Oncu, 2014: 295)". Mirov di jiyana xwe de çi bike, wê sûdê werdigire. Mirov li dinê çi bike ji bo xwe dike.**"Ne ekersen onu biçersin** (Aksoy, 1994: 395)".

"Her kes li ber deriyê xwe egîd e (Oncu, 2014: 296)". Her kes li warê xwe bin av û deng e. Ji ber ku kes nikare li warê kesî rab eli kesî mêraniyê bike.**"Her horoz kendi çöplüğünde (küllüğünde) öter (eşinir)** (Aksoy, 1994: 308)".

"Her kur bi çavê diya xwe egîdek e (Oncu, 2014: 299)".**"Her keçel bi çavê diya xwe porherîrek e** (Oncu, 2014: 294)". Zarokên dêyekê çiqas beredayî û ne delal bin jî, li ber çavên wê ji wan delaltir tu kes tune ye.**"Kuzguna yavrusu anka (şahin, güzel) görünür (Aksoy, 1994: 381)" "Karga yavrusuna bakmş, 'benim ak pak evladım' demiş** (Aksoy, 1994: 346)".

"Her rindekê qisûreke wê heye (Oncu, 2014: 301)". Tu kesê bêqisûr tune ye. Kêmasî an jî qisûreke her tiştî heye, yên hinekan diyar in û yên hinekan jî veşartî ne. **"Her güzelin bir kusuru (huyu) vardır** (Aksoy, 1994: 307)".

"Her teyr bi bangdana xwe tê nasîn (Oncu, 2014: 303)". Her kes teşeyeke wî heye û bi wê teşeyê ji aliyê kesên din ve tê nasîn. Her kes bi deng û rengê xwe tê nasîn.**"Her yiğidin bir yoğurt yiyişi vardır** (Aksoy, 1994:313)".

"Her tişt di dema xwe de (Oncu, 2014: 304)". Her tişt demeke wî heye û ji aliyê mirovan ve wê demê balkêş e. Her tişt di dema xwe de bitam e.**"Her şeyin vakti var, horoz bile vaktinde öter** (Aksoy, 1994: 312)".

"Hesin dema bişixule, zengê nagire (Oncu, 2014: 305)". Mirov dema bixebite tim li ser xwe û zindî dimîne.**"İşleyen demir pas tutmaz (paslanmaz, ışıldar)** (Aksoy, 1994: 331)".

"Hestî di zimên de tune". "Hestiyê zimên tune (Oncu, 2014: 310)" Her kes dikare her tiştî bibêje.**"Dilin kemiği yok** (Aksoy, 1994: 243)".

"Hêvî taştêya mirovên neçar e (Oncu, 2014: 318)". Kesên neçar bê hêvî nabin, ji ber ku ew jî li ser hêviyan dijîn. Tiştên ku wan bi jiyanê ve girê dide hêviyên wan in.**"Umut, fakirin (garibin) ekmeğidir** (Aksoy, 1994: 453)".

"Hevalê xwe ji min re bibêje, da ku ez zanibim tu kî yî (Oncu, 2014: 318)". Ji ber ku mirov dişibe hevalê xwe, yan jî bi giştî bandora wî li ser mirov dibe, mirov jî dibe wekî hevalê xwe.**"Arkadaşını söyle, kim olduğunu söyleyeyim** (Aksoy, 1994: 152)".

2.7. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "Î"yê Dest Pê Dikin

"Îşê bilez serê xwe nabîne (Oncu, 2014: 334)".**"Xebata bilez dawiya xwe nabîne** (Oncu, 2014: 662)". Dema mirov li ser karekî bilezîne mirov bi giştî wî karî bi dawî nake. Ji ber ku dema mirov heta radeyekê tê û dibîne ku kêmasî tê de hene û careke din ji serî ve dest pê dike.**"Acele işe şeytan karışır** (Aksoy, 1994: 107)".

2.8. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "J"yê Dest Pê Dikin

"Ji ava şêlo û mirovê bêdeng bitirse(Oncu, 2014: 336)".**"Ji mirovê bêdeng bitirse** (Oncu, 2014:352)". Kesê bêdeng wekî bîra bêbinî ye, mirov nizane çi tê de ye. Kes nizane ku dê kengê çi bike.**"Adamın yere bakanından, suyun sessiz (yavaş) akanından kork (Suyun yavaş akanından, insanın yere bakanından kork)** (Aksoy, 1994: 117)".

"Ji bo xatirê dostan mirov barek xwê jî dixwe (Oncu, 2014: 339)". Ji bo hevalên baş mirov divê xwe ji astengiyan nede paş. Ji bo xatirê dostê xwe mirov her dijwariyê dide ber çavên xwe.**"Hatır için çiğ tavuk (da) yenir** (Aksoy, 1994: 304)".

"Ji her bêdînekî re bêîmanek lazim e (Bingöl, 2014: 161)". Ew kesê ku ji axaftinê fêm neke û bê însaf be, yekî hîn ji wî bi hêztir û bê însaftir dikare wî bîne ser rê.**"Dinsizin hakkından imansız gelir** (Aksoy, 1994: 243)".

"Ji kesê bêar re her bihar e (Oncu, 2014: 349)". Kesên bêar çi were serê wan ji wan re ne xem e.**"Deliye (göre) her gün bayram** (Aksoy, 1994: 232)".

"Ji mirinê wêdetir rê tune (Oncu, 2014: 352; Aydoğdu, 2020: 116)".Dema kesek bi bûyerekê re rû bir û bimîne û bikeve tengasiyê, dur ê li ber hene; yan tu yê

bêrûmet bimînî yan jî tê bikî û xwe jê xelas bikî. **“Dünya ölümlü, gün akşamlı** (Aksoy, 1994: 252)”.

“Ji seyê ku pir direyê netirse (Oncu, 2014: 354)”. Kesê ku pir gefan li mirov bixwe, divê mirov jê netirse. **“(Çok) havlayan köpek ısırmaz** (Aksoy, 1994: 223)”.

“Ji ya cîranî ve mirîşka cîran qaz e, jina wî baz e (Oncu, 2014:356)”. Bi giştî malê gelek cîranan li hinek cîranên çavbirçî gelek mezin û hêja dixuyin.**“Komşunun tavuğu, komşuya kaz görünür (karısı kız görünür)** (Aksoy, 1994: 368)”.

“Ji ya dînan ve her roj îd e (Bingöl, 2014: 171)”. Ew kesê elimî be serserîtiyê rojên xwe mîna îdan derbas dike.**“Deliye (göre) her gün bayram** (Aksoy, 1994: 232)”.

“Jin dikare peyayê xwe rezîl jî bike, ezîz jî bike (Oncu, 2014: 359)”.**“Jin heye mirov dike wezîr, jin heye mirov dike rezîl** (Oncu, 2020: 18)”.Dema jin bixwaze dikare mêrê xwe bi rûmet bike û dema bixwaze dikare serê mêrê xwe di nav civakê de bitewîne. **“Kadın kocasını isterse vezir, isterse rezil eder. (Kocasını vezir eden de rezil eden de karısıdır.)** (Aksoy, 1994: 340)”.

2.9. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “K”yê Dest Pê Dikin

“Keç li metê, lawik li xalê (Oncu, 2020:176)”. Gava zarok tên dinyayê ku keç bin li metan diçin, ku law bin dişibin xalan.**“Oğlan dayıya, kız halaya çeker** (Aksoy, 1994: 398)”.

“Keçel dermanan zanibe, wê pêşî li serê xwe bide (Oncu, 2014: 374)”.**“Keçel hekîm bûya wê dermanê serê xwe çêkiribûya** (Bingöl, 2014:173)”.Ji bo kesên ku fêdeya wan li wan nabe lê ji bo xelkê dibin hekîm tê gotin. Yanê ew kesên hewceyiya wan bi xwe bi şîretan heye, lê radibin şîretan li xelkê dikin.**“Kelin ilacı (merhemi) olsa başına sürer. (Kel ilaç bilse kendi başına sürer.)** (Aksoy, 1994: 356)”.

“Keçikekê hezar heb dixwazin, dibe para yekî (Oncu, 2014: 376)”. Gelek kes dixwazin tiştekî bikin lê bi tenê hinek vê daxwaza xwe bi cîh tînin.**“Bir kızı bin kişi ister (de) bir kişi alır** (Aksoy, 1994: 197)”.

“Ker dimire hefsar dimîne, mêr dimire nav dimîne (Oncu, 2014: 379)”. Kesên bênav û deng piştî ku bimire bi bîra kesî ve nayên. Lê kesên hêja piştî ku dimirin ji aliyê gel ve her têne bibîranîn. **“At ölür meydan (nalı) kalır, yiğit ölür şan (namı) kalır** (Aksoy, 1994: 163)”.

“Ker nabihîzin ji ber xwe ve çêdikin (Oncu, 2014: 380)” Kesên ku nabihîsin tiştê ji wan re tê gotin bi hizra xwe çêdikin. **“Sağır işitmez (duymaz) uydurur (yakıştırır)** (Aksoy, 1994: 419)”.

“Kes nabêje dewê/ mastê min tirş e (Oncu, 2014: 387; Mazî, 2018: 250; Bingöl, 2014: 184)”. Kes kêmasiyên xwe ji her kesî re eşkere nake. Kes xerabiyên xwe ji kesî re venake.**“Kimse ayranım (yoğurdum) ekşi demez. (Yoğurdum, ayranım ekşidir diyen olmaz.)** (Aksoy, 1994: 363)”.

“Kes nakeve gora kesî (Oncu, 2014: 387)”. Kes di şûna kesî de suc û gunehên kesî hilnagire û kes ji bo kesî xwe nade kuştin.**“Kimse kimsenin çukurunu doldurmaz** (Aksoy, 1994: 364)”.

“Kesê ku bi hindikê qane nebe, pirê nabîne (Oncu, 2014: 390)”. Kesê ku hindikê qebûl neke, nikare pirê berhev bike. Pir bi berhevkirina hindikan tê holê.**“Aza kanaat etmeyen çoğu hiç bulamaz** (Aksoy, 1994: 169)”.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

“Kew xistin qefesa zê got; ‘Ax welat!’ (Oncu, 2014: 397)”.**“Bilbil xistine qefesa zêrîn dîsa gotiye: ‘ax welat’…** (Bingöl, 2014: 35)”.Welatê mirov çawa be jî ji bo mirov ji welatên biyanî yên wekî cenetê jî xweştir tê. Welatê mirov bi mirov xweş e.**“Bülbülü altın kafese koymuşlar, ‘ah vatanım’ demiş** (Aksoy, 1994: 208)”.

“Kê genim çandiye û garis rakiriye? (Oncu, 2014: 399)”. Mirov li ser çi bixebite û mirov tovê çi bireşîne dahata wî jî ew e yan jî li gorî wê ye. Dema mirov karekî baş bike nabe ku mirov encameke xerab jê bigire.**“Ne ekersen onu biçersin. (Herkes ektiğini biçer)** (Aksoy, 1994: 395)”.

“Kor dimirin çavdîndogî dibin (Oncu, 2014: 407)”.**“Gurî dimirin, gulîsor dibin** (Oncu, 2014: 278)”. Heke kesek di saxiya xwe de her çiqas nebaş û ne jêhatîbejî piştî ku dimire xwediyên wî pesnên wî didin û başiya wî dibêjin. Alavên ku dem adi destê mirov de bin tu rûmeta wan nîn be, dema ku ji dest diçin girîngiya wan zêdetir dibe.**“Kör ölür badem gözlü olur, kel ölür sırma saçlı olur** (Aksoy, 1994: 374)”.

“Kor dixwaze çavekî, Xwedê didiyê du çav (Bingöl, 2014:192)”. Dema ji kesekî re di wexteke ku qet hêvî nedikir de tiştekî ku gelek jê hez dike bê pêşniyarkirin, bi vê munasebetê ev tê gotin.**“Körün istediği bir göz, iki(-si) olursa ne söz** (Aksoy, 1994: 374)”.

“Ku du dil bibin tevahî, dê çiya hildin ser çiyayî (Oncu, 2014: 412)”. Ku dilê jin û mêrekî li hev û yek be, dê bi hemû neqenciyan bikaribin.**“İki gönül bir olursa (olunca) samanlık seyran olur** (Aksoy, 1994: 322)”.

“Ku kerê mirov winda bû, xelk dê bi kilaman lê bigere (Oncu, 2014: 416)”. Dema bûyereke nebaş yan jî barekî giran li ser mirov de were, divê mirov bixwe ji bo çareseriyê lê bixebite. Di rewşên wiha de divê mirov çareseriyê li hêviya xelkê nehêle.**“El elin eşeğini türkü çağırarak arar** (Aksoy, 1994: 261)”.

“Kundirê avê (cêrê) li rêya avê dişikê (Oncu, 2014: 437)”. Kesê karê xwe nebaş bike û karên sexte bike dê negihîje mirazê xwe. Kesê karekî xeter bike dê oxira wî karî de jiyana xwe ji dest bide.**“Su testisi su yolunda kırılır** (Aksoy, 1994: 434)”.

“Kûçikê ku bireye, dev li mirov nake (Oncu, 2014: 445)”. Kesê ku zêde bi ser xelkê de biqîre, yan jî kesê zêde pesnê xwe bide livên wî ne wekî axaftina wî ne.**“(Çok) Havlayan köpek ısırmaz** (Aksoy, 1994: 223)”.

2.10. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “L”yê Dest Pê Dikin

“Lingê xwe bi qasî (li gorî) merşika xwe dirêj bike (Oncu, 2014: 456; Bingöl, 2014: 198)”. Mirov divê li gorî rewşa xwe ya aboriyê mesrefa xwe bike. **“Ayağını yorganına göre uzat** (Aksoy, 1994: 166)”.

2.11. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “M”yê Dest Pê Dikin

“Mal qoçê mêran e (Oncu, 2014: 462)”. Dema mal di destê mirov de tune be mirov nikare jiyana xwe bi hêsanî bidomîne.**“Mal canın yongasıdır** (Aksoy, 1994: 385)”.

“Mala keç lê, mala naz lê (Oncu, 2014: 464)”. Keç nazdar in. Cihê keç lê ji wî cihî nazî kêm nabe. **“Kız evi naz evi** (Aksoy, 1994: 362)”.

“Malê egîdan li meydanê (Oncu, 2014: 469)”. Kesên egîd malê xwe ji kesî venaşêrin, çi heyîna wan hebe li ber çavan e. Ên wisa dikarin malê xwe ji her talûkeyê biparêzin.**“Yiğidin malı meydandadır** (Aksoy, 1994: 476)”.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەكولینێن كوردی

“Malê pir bê heram, şorên pir bê derew nabin (Oncu, 2014: 472)”. Temenê mirovan têra berhevkirina serweteke paqij nake. Heke li derekê gelek pere kom bibin heramiyek an jî sûcek di bingeha wê de heye. Gotinên pir jî wisa ne. **“Çok mal haramsız, çok laf yalansız olmaz** (Aksoy, 1994: 223)”.

“Malê dinê, dinê dimîne (Celîl & Celîl, 2019: 36)”. Dema mirov dimire li gel xwe tiştekî nabe, her tişt li dû mirov dimîne. **“Dünya malı dünyada kalır** (Aksoy, 1994: 252)”.

“Meke lez, tê zimanê xwe bikî gez (Oncu, 2014: 480)”. Dema mirov tiştekî bi lez bike mirov dê yan xesarê li xwe bike yan jî kêmasiyekê di wî tiştî de bihêle.**“Acele işe şeytan karışır** (Aksoy, 1994: 107)”.

“Merhemeta pir merez e (Oncu, 2014: 483)” Carinan qenciya ku li hin kesan dibe, dibe xirabî û li mirov dizivire.**“Merhametten maraz doğar (hasıl olur)** (Aksoy, 1994: 389)".

“Mêvan bi nan û avaxwe tê (Oncu, 2014: 491)”.**“Risqê mêvan bi mêvan re ye** (Oncu, 2014: 584)”. Dema mêvanek li malekê bibe mêvan bereketa wî li wê malê dibe. Bi xwarin û vexwarina mêvan tiştek ji heyîna malê kêm nabe.**“Misafir kısmeti ile gelir** (Aksoy, 1994: 391)”.

“Mêvan ji mêvan ne xweş bû, mazûvan ji herduyan ne xweş bû (Oncu, 2014: 491; Aydoğdu, 2020: 145)”.**“Mêvan ji mêvan hez nake, xweyiyê malê ji her duyan hez nake** (Çaçan, 2015: 57)”.Mêvan dema herin derekê dixwazin ku ji wan pê ve tu mêvan tune bin li wir, dema hebin ji wan aciz dibin ji ber ku ditirsin ku xizmeta wan kêm bimîne. Dema hebin jî nerazîbûna xwe nîşan didin. Di vê rewşê de xwediyê malê ji herduyan jî ne razî ye.**“Misafir misafiri (dilenci dilenciyi) istemez (sevmez), ev sahibi ikisini de** (Aksoy, 1994: 391)”.

“Mirîşka belengazan fer û fer hêk dike (Oncu, 2014: 501)”. Mal û tiştên feqîr û belengazan jî mîna dahata wan bê kêr, bê feyde û kêm e.**“Fukarnın tavuğu tek tek yumurtlar** (Aksoy, 1994: 281).

“Mirov çiqas biaqil be jî, her hewceyî aqilan e (Oncu, 2014: 506)”. Mirov çiqas aqilmend be jî yên ji mirov biaqiltir hene.**“Bin bilsen de bir bilene danış** (Aksoy, 1994: 189)”.

“Mirov di heftan de çi be, di hefteyî de jî ew e (Oncu, 2014: 506)”. Mirov dema di zarokatiya xwe de teşeyê xwe digire, bi giştî hetanî bimire li ser wî teşeyî didomîne û naguhere.**“İnsan yedisinde ne ise yetmişinde de odur** (Aksoy, 1994: 328)”.

“Mirov seba karê xwe, ji yarê diya xwe re dibêje apo (Oncu, 2014: 512)”. Ji bo ku karê mirovan bi rêk û pêk bimeşe, divê mirov hinekî zor û zehmetiyan bigire ber çavan. **“Köprüyü geçinceye kadar ayıya dayı derler** (Aksoy, 1994: 372)”.

“Misk û amber dane ber difna kerê, ker pê gêj bûye (Oncu, 2014: 520)”. Dema yek ji tiştên sipehî û xweşik fêm neke, mirov çi tiştên rind û sipehî bide destê wî jî xêra wê nîn e.**“Eşeğe altın semer vursalar yine eşektir** (Aksoy, 1994: 272)”.

2.12. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “N”yê Dest Pê Dikin

“Nanê êvarê bihêle sibê, şixûlê êvarê nehêle sibê (Oncu, 2014: 526)”. Divê mirov karê xwe yê niha nehêle paşê. Keda îro tedbîra sibê ye. Dema îro di destê mirov de dahata mirov zêde be, divê mirov îsraf neke û ji bo sibê bihêle. **“Bugünkü (akşamın)işini yarına (sabaha) bırakma (koyma)** (Aksoy, 1994: 206)”.

“Nanê ku ji tiran hatî, dê bi viran here (Oncu, 2014: 527)”. Nanê ku bê ked û bê zehmet bikeve dest, dê bi hêsanî ji destê mirov derkeve. Ji ber ku mirov girîngiya wî nizane.**“Haydan gelen huya gider (selden gelen suya gider)** (Aksoy, 1994: 304)”.

“Navê betê ji dûr ve xweş e (Oncu, 2014: 530)”. Navê hin tiştan ji dûr ve li mirov xweş tê. Lê dema mirov dibîne ne wekî ku mirov hêvî dike ye, dilê mirov jê sar dibe. **“Davulun sesi uzaktan hoş gelir** (Aksoy, 1994: 229)”.

“Navê gur bîne, pelendar lê werîne (Bingöl, 2014: 230)”. Meriv di civatan de behsa kê bike hema ew kes tê wê derê. **“İti an, (değneği yanına koy) taşı eline al** (Aksoy, 1994: 332)”.

“Ne yê pir sal dîtî dizane, yê pir digere dizane (Oncu, 2014: 537)”. Mirov ne bi pir jiyînê fêrî tiştan dibe, mirov bi ger û lêkolînê dinê nas dike û hînî tiştan dibe.**“Çok yaşayan (okuyan) bilmez, çok gezen bilir** (Aksoy, 1994: 224)”.

2.13. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “P”yê Dest Pê Dikin

“Pariyê mezin bixwe, gotinên mezin meke (Oncu, 2014: 545)”. Heçî mirov bi nefsa xwe nikaribe jî divê mirov bes bi zimanê xwe bikaribe. Dema mirov tiştên ji quweta xwe zêdetir bibêje, dê mirov bikeve tengasiyên ji quweta xwe zêdetir.**“Büyük lokma ye (de) büyük söyleme** (Aksoy, 1994: 209)”.

“Paşiya sebrê rehetî ye (Oncu, 2014: 548)”. Dema mirov li hemberî tiştekî xerab an jî li hemberî astengiyekê bisebir be dê mirov di dawiyê de bigihîje rehetiyê.**“Sabrın sonu selamettir** (Aksoy, 1994: 418)”.

“Peza bimîne paşiyê, ava şêlû vedixwe (Oncu, 2014: 551)”. Kesên ji bo kirina tiştan dereng bimînin bi bermahiya wî tiştî qane dibin, ji ber ku tiştek ji wan re namîne. Divê mirov her tiştî di wextî wî de bikaribe bike.**“Sona kalan donakalır** (Aksoy, 1994: 429)”.

Pênc tiliyên dest nabin yek (Bingöl, 2014: 243)”. Yanê meriv çijialiyê ruh ve be, çi ji aliyê bedenê ve be ji hev cihê hatine afirandin.**“Beş parmak bir değil (olamaz)** (Aksoy, 1994: 186)”.

“Piçek goşt hezar eyban vedişêre (Bingöl, 2014: 243)”. Ew kesên zeîfbeden bin eyb û kirêtiyên wan derdikevin meydanê. Lê dema hinek qelew dibin, ew kêmasî ji wan diçe. **“Bir dirhem et bin ayıp örter** (Aksoy, 1994: 194)”.

“Pirs bi pirs mirov diçe mala Xwedê (Oncu, 2014: 556)”. Mirov dikare cihê ku bixwaze biçe bibîne. **“Sora sora Bağdat (Kâbe) bulunur** (Aksoy, 1994: 430)”.

2.14. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “Q”yê Dest Pê Dikin

“Qala guran dikin, gur hazir in (Oncu, 2014: 562)”. Hin tişt an jî kes hene dema mirov behsa wan dike hew mirov dibîne ku li cem wan amade ne. Carinan mirov li ser hin bûyerên xerab diaxive, mirov dibîne ku ew bûyer di serê mirov de tê.**“İti an, (değneği yanına koy) taşı eline al** (Aksoy, 1994: 332)”.

“Qencî bi qenciyan vedigere (Oncu, 2014: 565)”. Her dem li ber qenciyekê qenciyeke din heye.**“İyilik eden iyilik bulur** (Aksoy, 1994: 336)”.

“Qesab di derdê bezê bizinê de ye, bizin di derdê serê xwe de ye (Oncu, 2014: 566)”. Li vê dinê her kes li pey tiştekî ye. Tiştê ku bi kêrî hin kesan tê ji hin kesan re dibe nexweşî û mirin.**“Keçiye can kaygısı, kasaba yağ kaygısı (Koyun can derdinde, kasap yağ derdinde)** (Aksoy, 1994: 354)”.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

“Qirşekî heram hezar qirşên helal bi xwe re dişewitîne (Oncu, 2014: 568)”. Tiştên mirov çiqas paqij û zelal bin jî dema mirov tiştekî beredayî tevlî bike her tiştî bi xwe re xera dike, paqij û delaliya tiştên berê tev bi xwe re xera dike.**“Kurunun (arasında) yanında yaş da yanar. (Yaşın yanında kuru da yanar)** (Aksoy, 1994: 379)”.

“Qul gazî neke, xizir nagihe hewarê (Oncu, 2014: 571)”. Kesên ku ji bo xwe nexweze û li ber xwe nede nagihîje tu deran.**“Kul sıkılmayınca (bunalmayınca) Hızır yetişmez** (Aksoy, 1994: 377)”.

2.15. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “R”yê Dest Pê Dikin

“Rêya mirinê tune (Oncu, 2014: 582)” Mirin her heye û kes nikare ji mirinê bireve. Mirov çiqas zêde bijî jî dê dîsa rojekê bimire. Ray li mirinê nabe. **“Ölüme çare bulunmaz (Aksoy, 1994: 407)” “Ecele (ölüme) çare bulunmaz (Aksoy, 1994: 256)”**

“Risqê mêvan bi mêvan re ye.” “Risqê mêvanan fireh e (Oncu, 2014: 584)”. Dema mêvanek li malekê bibe mêvan bereketa wî li wê malê dibe. Bi xwarin û vexwarina mêvan tiştek ji heyîna malê kêm nabe. **“Misafir kısmeti ile gelir** (Aksoy, 1994: 390)”.

“Roja reş dost kifş dibe (Bingöl, 2014: 262)”. Rojên xweş û keyfê kesên dostaniya mirov bikin pir in. Lê dostaniya rojên wiha ne lê ne. Dost ew e ku di rojên reş de dest ji dostê xwe bernede û dostaniyê bidomîne.**“Dost (iyi dost) kara günde belli olur** (Aksoy, 1994: 248)”.

2.16. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “S”yê Dest Pê Dikin

“Sebr tehl e, fêkiyê wê şîrîn e (Oncu, 2014: 596)”. Sebr gelek caran li mirov zor û zehmet tê, gelek caran tê radeyekê wisa ku mirov nikare îdare bike, lê encama wê bi giştî xweşî û dilgeşî ye.**“Sabır acıdır, (acı ise de) meyvesi tatlıdır** (Aksoy, 1994: 418)”.

“Se direyê, kerwan dibore (Bingöl, 2014: 268)”. Ew tişta em zanibin ku ji bom e û ji bo civaka me baş e û rind e, em ê wî tiştî bikin û li ser kirina wî jî israr bikin.**“İt ürür, kervan yürür** (Aksoy, 1994: 335)”.

“Serê xwe li gorî mêrê xwe girê bide (Oncu, 2014: 602)”. Rastiya jiyana te çi ye li gorî wê bijî û ligorî wê tevbigere. Tiştên rastiya jiyana te nede der, wîtiştî neke.**“Ayağını yorganına göre uzat** (Aksoy, 1994: 166)”.

“Serî ji êqil diêşe (Oncu, 2014: 602)”. Dema mirov bi hiş û aqil be, bi qasî hezkerên mirov kesên ku ji mirov hez nekin jî zêde dibin.**“Meyveli ağacı taşlarlar** (Aksoy, 1994: 390)”.

“Serkanî şêlû be, dûvkanî jixwe şêlû ye (Oncu, 2014: 604)”. Ku di civakê de serkêşên civakê xerab bin, civak giş xerab dibe.**“Balık baştan kokar** (Aksoy, 1994: 178)”.

“Sêva çê para hirçê ye (Oncu, 2014: 606)”.**“Êmîşê çê, teyr û tûrên xerab dixwin** (Oncu, 2014: 235)”. Tiştên xweş û hêja tim para heywan û kesên beredayî ne. Kesên mêrxas û bedew bi giştî rastî tiştên beredayî tên.**“Armudun iyisini ayılar yer (Aksoy, 1994: 152)” “Ahlatın (armudun) iyisini (dağda) ayılar yer** (Aksoy, 1994: 125)”.

“Sira xwe nede dostê xwe, ew ê jî bide dostê xwe (Oncu, 2014: 609”. Dema sireke te hebe, ji hevalê xwe re jî nebêje. Dê ew jî here ji hevalê xwe re bibêje û dê wisa belav bibe.**“Açma sırrını (sırrını açma) dostuna, (dostunun dostu vardır) o da söyler dostuna** (Aksoy, 1994: 113)”.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولينێن كوردی

2.17. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "Ş"yê Dest Pê Dikin

"Şîva xwe bi gor rûnê xwe çêke (Oncu, 2014: 623)". Karê ku mirov dike divê di bin hikmê mirov de be. Divê mirov ji karê xwe agahdar be. **"Ayağını yorganına göre uzat** (Aksoy, 1994: 166)".

"Şor hene mirov berdar dikin, şor hene mirov ji dar datînin (Oncu, 2014: 623)". Hin gotin hene ku mirov di şûnê de biaxive mirov ji mirinê rizgar dikin; hin gotin hene serê mirov dixin belayeke mezin. Divê mirov xwediyê devê xwe be û her tim bizanibe li kû çit ê gotin.**"Söz var, iş bitirir; söz var, baş yitirir** (Aksoy, 1994: 432)".

2.18. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "T"yê Dest Pê Dikin

"Te çi çand tê wî biçinî (Oncu, 2014: 630)". Mirov çi biçîne dê mirov sûda wî wergire. Mirov li ser çi, çawa bixebite dêmirov ji wî wisa fêdeyê bibîne.**"Ne ekersen onu biçersin (Herkes ektiğini biçer). (Eken biçer, konan göçer)** (Aksoy, 1994: 395)".

"Tenêbûn li Xwedê tê (Oncu, 2014: 632)". Mirov zindiyekî komelî ye û bi civakê hêzeke wî û wateyeka wî heye. Kesê ne muhtacê hevaltî û piraniyê bi tenê Xwedê ye.**"Yalnızlık, Allah'a mahsustur (yaraşır)** (Aksoy, 1994: 465)".

"Tirî bixwe, pirsa rezvanî neke (Oncu, 2014: 640)". Dema te jitiştekî fêde dît zêde jêderka wî tiştî tev nede. Dema tu wisa bikî dibe ku fêdeya li te bû bibe xesar.**"Üzümü(-nü) ye de bağını sorma** (Aksoy, 1994: 456)".

"Tu çi biçînî, tu dê wê bibînî (Bingöl, 2014: 304)". Çi qencî be çi xerabî be, tu çi bikî tu dê pêşeroja xwe de bi tenê wê bibînî.**"Ne ekersen onu biçersin** (Aksoy, 1994: 395)".

"Tu hevalê kê bî, tu dê wekî wî bî (Oncu, 2014: 650)".**"Bibêje, hevalê tek î ye; bibêjim tu kî yî** (Çaçan, 2015: 66)".**"Tu hevalê xwe ji min re bibêje, ez ê ji te re bibêjim ka tu kî yî** (Bingöl, 2014: 305)".Hevalên mirov çawa bin bi giştî mirov jî dişibe wan û diçe ser fikr û tevgerên wan.**"Arkadaşını söyle, kim olduğunu söyleyeyim** (Aksoy, 1994: 152)".

2.19. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa "X"yê Dest Pê Dikin

"Xaltî nîvê dayikê ye (Oncu, 2014: 660)". Xaltî ji zarên xwehên xwe re baş in. Her wiha xwarzî jî xaltiya xwe wekî dayikê ji xwe re dibînin.**"Teyze, ana yarısıdır** (Aksoy, 1994: 448)".

"Xebera reş zû belav dibe (Oncu, 2014: 662)". Xeber û nûçeyên nebaş li nav gel zû belav dibin û zû digihin cihê xwe.**"Kara (kötü) haber tez duyulur** (Aksoy, 1994: 343)".

"Xêran bike, keviran deyne ser û here(Oncu, 2014: 669)". Dema mirov qenciyek li yekî kir divê mirov wê qenciyê li tu derê eşkere neke.**"İyilik et denize at, balık bilmezse Halik bilir** (Aksoy, 1994: 336)".

"Xwarina îro bihêle sibê, lê şixulê îro nehêle sibê (Bingöl, 2014: 315)" Divê hemû kar di wextê xwe de bên kirin, neyên taluxkirin. **"Bugünkü (akşamın) işini yarına (sabaha) bırakma (koyma)** (Aksoy, 1994: 206)".

"Xwedê çiya dibîne, berfê lê dibarîne (Oncu, 2014: 673; Mazî, 2018: 382)". Xwedê li gorî fiêla mirov tiştan dide mirov û mirov dixe rewşekê.**"Allah dağına göre kar verir (verir kışı)** (Aksoy, 1994: 138)".

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ فەکولینێن کوردی

“Xwediyê sebrê bûye mîrê Misrê (Oncu, 2014: 678; Mazî, 2018: 387)”. Ku mirov li hemberî bûyeran bisebr be bi giştî di dawiyê de serkeftinekê bi dest dixe û dibe xwediyê rewşeke xweş. **“Sabreden derviş muradına ermiş** (Aksoy, 1994: 418)”.

“Xwestin fihêt e, lê nedan rûreşî ye (Oncu, 2014: 680)”. Dema tiştek jimirov re lazim bibe ne eyb e ku mirov ji xelkê bixwaze. Carinan xwestina hin tiştan ne baş be jî kesê ku tişt jê tê xwestin divê wê tiştê ku mirov dixwaze bide.**“İsteyenin bir yüzü kara, vermeyenin iki yüzü** (Aksoy, 1994: 329)”.

2.20. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “Y”yê Dest Pê Dikin

“Yek yek e, dudu komek e (Oncu, 2014: 686)”. Hindik çiqas bihêz bin jî wekî duduyan ne bihêz in. Yek zêde deng jê dernayê lê dudu ji yekî zêdetir deng didin. **“Bir (tek) elin nesi var, iki elin sesi var** (Aksoy, 1994: 195)”.

“Yekî dîn kevirek avête bîrê, çil aqildarî nekarîbû derxe (Oncu, 2014: 687)” Carinan hinek kesên ku ji aliyê civakê ve gelek biaqil nayên dîtin hin tiştên ku nayên fêmkirin dibêjin. Bi rastî ser û berê vê gotinê vala ye û tu tişt tê tune ye.**“Bir deli kuyuya taş atmış, kırk akıllı çıkaramamış. (Bir delinin kuyuya attığı taşı kırk akıllı çıkaramaz)** (Aksoy, 1994: 193)”.

2.21. Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî Yên Bi Tîpa “Z”yê Dest Pê Dikin

“Zikê têr hay ji yê birçî nîn e (Oncu, 2014: 696)”. Kesên têr û dewlemend bi halê kesên birçî û belengaz nizanin, ji ber ku qet neketine wê rewşê.**“Tok, acın halinden bilmez (ne bilir). (Var ne bilsin yok halinden)** (Aksoy, 1994: 449)”.

BEŞA SÊYEM:
3. GOTINÊN PÊŞIYAN ÊN KURMANCÎ Û TIRKÎ YÊN RASTERAST HATINE WERGERANDIN

Di vê beşê de em ê li ser gotinên pêşiyan ên ku rasterast weke wergerên hev tên bikaranîn bisekinin. Mînakên ku me tespît kirine ev in:

- “Aqil serdestî aqil e”:*“Akıl akıldan üstündür.”*
- “Av ava biçûkan, peyv peyva mezinan”:*“Su küçüğün, sofra (söz) büyüğün*.
- “Bi darê zorê xweşqurbankî nabe”:*“Zorla güzellik olmaz”*
- “Bila dereng be lê ne bizehmet be”:*“Geç olsun da güç olmasın”*
- “Bila mirina kerê ji ceh be”:*“Atın ölümü arpadan olsun”*
- “Cer di riya avê de dişikê”:*“Su testisi suyolunda kırılır*.
- “Cihê ku agir lê neyê kirin, dû jê ranabe”: *“Ateş olmayan yerden duman çıkmaz”*
- “Cihê ku agir pê ketî dişewite”:*“Ateş düştüğü yeri yakar”*
- “Çiniyek goşt hezar eybî vedişêre”:*“Bir dirhem et bin ayıp örter”*
- “Çiyayê xuya bike ne dûr e”:*“Görünen dağın uzağı olmaz”*
- “Dengê daholê ji dûr ve xweş e”:*“Davulun sesi uzaktan hoş gelir”*
- “Destê tu nikaribî gez bikî, maç bike”:*“Bükemediğin (ısıramadığın) eli öp, başına koy”*
- “Dijminê biaqil, ji dostê bêaqil çêtir e”:*“Akıllı düşman, akılsız dosttan hayırlıdır”*
- “Dil ji kê hez bike, pêrî ew e”:*“Gönül kimi severse güzel odur”*
- “Du caran guhdar be carekê biaxive”:*“İki dinle (bin işit) bir söyle”*

- “Dûrî çavan dûrî dilan e jî”:*“Gözden ırak (uzak) olan gönülden de ırak (uzak) olur”*
- “Ê neketî û ranebûyî bi tenê Xwedê ye”:*“Düşmez kalkmaz bir Allah”*
- “Goşt û neynûk ji hev naqetin”:*“Et tırnaktan ayrılmaz”*
- “Gul bê strî nabe Dikensiz gül olmaz” :*“Gül dikensiz olmaz”*
- “Her hevrazek nişûvekî wî heye”:*“Her inişin bir yokuşu (her yokuşun bir inişi) vardır”.*
- “Her rindekê qisûreke wê heye”:*“Her güzelin bir kusuru (huyu) vardır”*
- “Hesin dema bişixule, zengê nagire”:*“İşleyen demir pas tutmaz (paslanmaz, ışıldar)”*
- “Hestî di zimên de tune.”:*“Dilin kemiği yok”*
- “Ji ya dînan ve her roj îd e”:*“Deliye (göre) her gün bayram”*
- “Keç li metê, lawik li xalê”:*“Oğlan dayıya, kız halaya çeker”*
- “Malê dinê, dinê dimîne”:*“Dünya malı dünyada kalır”*
- “Malê egîdan li meydanê”:*“Yiğidin malı meydandadır”*
- “Malê pir bê heram, şorên pir bê derew nabin”:*“Çok mal haramsız, çok laf yalansız olmaz”*
- “Mirîşka belengazan fer û fer hêk dike”:*“Fukaranın tavuğu tek tek yumurtlar”*
- “Mirov di heftan de çi be, di hefteyî de jî ew e”:*“İnsan yedisinde neyse yetmişinde de odur”*
- “Ne yê pir sal dîtî dizane, yê pir digere dizane”:*“Çok yaşayan bilmez, çok gezen bilir”*
- “Sebr tehl e, fêkiyê wê şîrîn e”:*“Sabır acıdır, (acı ise de) meyvesi tatlıdır”*
- “Te çi çand tê wî biçinî”:*“Ne ekersen onu biçersin”*
- “Xaltî nîvê dayikê ye”:*“Teyze ana yarısıdır”*

ENCAM:

Di vê xebatê de hewl hate dayîn ku beramberên gotinên pêşiyan yên kurdî di gotinên pêşiyan yên tirkî de bên tespîtkirin. Ji bo pêkanîna vê armancê gotinên pêşiyan ên di pirtûkên gotinên pêşiyan ên kurmancî de lib û lib hatin xwendin û yên ku li hemberê wan di gotinên pêşiyan ên tirkî de hene hatin tespîtkirin. Gotinên pêşiyan ên kurmancî yên ku hatine tespîtkirin li gorî rêza alfabetîk hatine rêzkirin û li hemberê wê gotinê di tirkî de kîjan gotinê pêşiyan hebe ew hate nivîsandin. Hate dîtin ku hin gotinên pêşiyan ên kurmancî û tirkî raterast weke wergerên hev tên bikaranîn û ew gotinên pêşiyan ên bi vî awayî jî di bin sernava “Gotinên Pêşiyan ên Kurmancî û Tirkî yên Rasterast Hatine Wergerandin” hatine nivîsandin.

Beşeke din a xebata me jî ji agahiyên berfireh ên di derheqê gotinên pêşiyan de ye. Di serî de pênaseya gotinên pêşiyan ên ji aliyê hin lêkolîneran ve hate kirin û paşê taybetmendiyên gotinên pêşiyan ên sereke hatine rêzkirin. Yekem xebatên li ser gotinên pêşiyan ên kurmancî hatine kirin jî hate nivîsandin.

Xebatên li ser gotinên pêşiyan ên kurmancî bi piranî weke xebatên berhevkirin û weşandina gotinên pêşiyan de ne. Xebatên akademîk ên li ser gotinên pêşiyan ên kurmancî zêde nehatine kirin û hejmara wan jî kêm e. Divê zêdetir xebatên zanistî li ser gotinên pêşiyan ên kurmancî bêne kirin û valahiya di vê qadê de divê bê tijekirin.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Bi vê xebatê hate dîtin ku beramberê 178 heb gotinên pêşiyan ên kurmancî di gotinên pêşiya ên tirkî de hene û ji van 178 heban 33 heb rasterast weke wergerên hev in. Bi xebatên berfirehtir dibe ku hejmara beramberên gotinên pêşiyan yên her du zimanan de zêdetir jî be. Ji van gotinên pêşiyan ên hevpar tê fêmkirin ku gelên bi sedan sal in bi hev re jiyane li ser hev bandor kirine û ev bandor di mînakên wan ên gotinên pêşiyan de jî xuya dike.

ÇAVKANÎ:

Aksoy, Ö. A. (1994). *Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü*. İstanbul: İnkılâp Kitabevi.
Aydoğdu, A. (2020). *Gotinên Pêşiyan*. İzmir: Weşanên Na.
Bingöl, A. (2014). *Gotinên Pêşiyan û Biwêj*. İzmir: Weşanên Na.
Bozarslan, M. E. (1985). *Haydariyên Giştî Di Heqê Kovara Jîn Da*. Uppsala-Sweden: Kovara Jîn, Hj. 1. r 7-89.
Celîl, O & Celîl, C. (2019). *Gotinên Pêşîyan*. Stenbol: Weşanên Wardozê.
Çaçan, X. (2015). *Gotinên Pêşîyan*. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
Êvaran mirov ji gund an jî bê çinîna giya dihatin zozanan. Êvaran jî jiyana civakî ya li zozanan geş bû. Êvaran xelk li nava zozanan kom dibûn û lîstikên (wek şirê keleş, holane, kabanê, biranê, cirîdanê, kelvelenê,,,, û hwd.) dikirin (Omer Yaşar, hevpeyvîna 28.01.2022; Asiye. Tatlı, hevpeyvîna 25.01.2022). Paleyan ji bo heywanên xwe yên siwarî yê giya anîn gund an jî cihê ku gîha durîn. Heywanên siwarî (hêstir, hesp, ker) bi konî ve girêdidan, lewma gîyayên (şiv dewar) ku di vî warî de dihatin anîn êvarê diavêtin pêşiya wan û heta sibehê ewan heywanan şivdewar di xwar. Bi rastî, dewar êvaran bi cihên nêzî konî têne girêdan. Ji ber ku, berê diziya ajalan zehf bû. Bi vî awayî, ji cihê ku pez lê dicivin û bi şev radizên re dibêjin guhur, ji cihê ku heywanreşe lê radizê re dibêjin

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

mexel. Di zivistanê de ji avahiya ku pez lê tên xwedîkirin jê ra dibejîn bêla anjî gove, ji avahiyên ku komên dewar û hespan tê de cih digirin re dibêjin extexan.

Li zozanan şîre pezân mast, jajî, nivîşk diête çêkirin. Mastê zozanan zeh tame û tûyek stur ser di girît. Rêçalên zozana her dem xweş û qiymete. Ji vane ya heri girînge masterûn e. Masterûn, cureyekî jajî ye, bi tama wê tirşe gîyaye ki navê wê sorê ye û rûn (nîvîşk) têtkene navda. Bi taybetî li deverên bilind ên wek Berwar, Bileh û Nebirnavê yên girêdayî navenda Colemêrgê berhemên ji şîr tên bidestxistin gelekî navdar in. Berhema herî girîng a ku ji şîrê gund û zozanan tê bidestxistin penîr e. Giyayên wek siyabo, çevir û sîrkê dixin nav penîran. Penîr hêvenê giya (giyahêvenk) tê çêkirin (Halime Özkan, hevpeyvîna 18.01.2022; Kibar Arslan, hevpeyvîna 25.01.2022).

Dema ku gund di çarçoveya jiyana ku li jor hatî vegotin de têne nirxandin, gelek aliyên tal û şîrîn di xwe de dihewîne. Piraniya van mercan dema ku ji aliyê dîrokî û civakî ve bên nirxandin, hêmanên folklorîk di xwe de dihewîne. Mînak gotina stran bi xebatên gundan ên ku ji bo hevgirtinê li gundan tên kirin, delîla herî girîng a vê yekê ye. Divê bê gotin ku tevî bedewiyan li gundan jî bêîmkanî hene. Mînak di mehên zivistanê de piraniya gundan tekilîyên va yêt gel bajêran qut dibin. Karê gund her tim dijwar e, ev rewş bûye sedem ku gundî her tim mijûl bin (Ahmet Yakis, hevpeyvîna 22.01.2022). Tevî hemû zehmetiyên jiyana gundan jî piraniya kesên ku bi wan re axivîn diyar kirin ku wan pir bêriya jiyana gunda kiriye. Lê piştî ku ji salên 1990'î ve gund hatin valakirin, di demên paş da dîsa vegeriyan gund, lê tama kevin nehatîye hilgirtin. Li gel vê her çend jiyana civakî ya li gund ber bi bajaran ve çûbe jî, ev rewşe ber bi dawîbûnê ve diçe. Ji ber vê yekê di avakirina çandî ya Colemêrgê de jiyana gund xwedî mîsyoneke girîng e. Li gel vê çandê, li gund sewalkarî stûnên bingehîn ên jiyana mirovan bû. Wek mînak, ji hiriya pez gelek cureyên cil û bergên wek gore, lepik, saqên çoka, êlek tên çêkirin. Ji xeynî vê, malzemeyên wek doşek û lihef ji hirî yê tên çêkirin. Bi taybetî ji bo doşeka nivînê hirya berxa (liva) tê tercîh kirin. Materyalên wekî xalîçe, çadir û hwd ji hirî û amûra tevnandinê ya bi navê tevin tê çêkirin. Tahtî an jî taq ji bo danîna nav malan û avêtina ser pişta ajalên siwarî dihat çêkirin. Tahtî ji hirî ji aliyê kesên bi navê kûrinç dihat çêkirin.

Encam û Nirxandin:

Wek cihekî niştecihbunê gund, du tiştên girîng di nava xweda vedişêrît. Yêk hemanên civakî ne, ya dî ji xweza ye. Ev her du tiştên he, ser jîyana însana û heyvanî bandorê çê diket. Tişta ku bi hêmanên xwezayî tê îfadekirin cihê erdnîgariya gund, şert û mercên avhewa, ax, nebat, avên binerd û rûerdê û hwd.. taybetmendiyên wê hene. Tişta ku tê xwestin bi hêmanên civakî were îfadekirin; rewşa demografîk (asta perwerdehiyê, temen, zayend, hwd.), çalakiyên aborî, adet û kevneşopî, hêmanên çandî, hwd.

Şert û mercên civakî jî li ser jiyan û hêmanên çandî yên gund bandor dike. Mînak pêkhatiya nifûsê bandorek xurt li ser hilberîna rasterast û bi vî rengî li ser asta refaha gund dike. Ji aliyê din ve, edet û kevneşopîya xelkê gund dikarin rasterast bandorê li adetên xwarina wan jî bikin.

Ji ber ku li gundan îmkanên neqliyê û ragihandinê nîn in, jiyana bi şêwaza ya ku li jor hatî gotin, tate wate dîtin. Îro di serdemeke ku nifûsa ciwan zêde dibe de mirov nikarin di qada bajaran da kar peyda bike. Di vê wateyê de zanîna rabirdûya jiyana gund a ku mirovahî pêdiviya wê pê heye, girîng e. Helbet jiyana gundan a nûjen bi metodên nûjen di bin ronahiya teknolojî û zanistê de dikare biête kirin. Lêbelê, pêvîste ku mirov

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

dînamîkên dîrokî û çandî yên jiyanê ku behsa wan tê kirin bi zanît. Ji ber vê yekê, hemî çîrokên ku li jor hatine destnîşan kirin ji bo ku dînamîkên navborî ca neyên jibîrkirin armancek zehf girînge.

Jiyana folklorî ji, jiyana xwezayî û gundîtiyê diêt. Lewma ev jiyana xwezayî şopên jiyana mirov û heywanan hildigire. Heger em bû mînak bibejin; hemû pêdiviyên jiyanê, ji cil û bergên rengîn ên jinên gundên Kurdan bigire heta stranan, aliyên folklorîk di xwe de dihewîne. Her wîsa dengbêjî, yarî kirin, rekas, metelûk hlw faktorên ku jiyana navborî watedar dikin. Di vî warî de, her çalakiya li gundan, ji xwarina ajalan bigire heta kirinên însanî, parçeyek ji pergala folklorîk a bi coş anjî xem e. Mesela cotkarî ya mirovan stran gotinê an ku ev şola giran wekî leyîze kê hatiye bikar anîn.

Bi kurtahî ve gunda çand, jiyan û hêmanên bingehîn ên ku jiyanê bi serê xwe watedar temsîl diket. Di vî warî de her çend carinan jîyana mirovan zehmet bike jî, heywandarî û hêmanên wê temamkerê hêmanên jorîn in. Helbet ji ber ku îro jiyan li gundan dijwar bûye û bandora bêkariyê li gundan hatiye kirin, gel jiyana li gund xistiye paş. Teybetî nifşên nû bi bandora xwendinêve jî jîyana gunda ra hes na diken. Bes wekî mirov lê fikirît, jîyana gunda hatibîte berê dawiye jî, kêrmasî û nexweşiyên bajara zehf bîne lewra de mirov demekî kurt da ve gerhine gunda. Ev tişte qethî ye ku gelek însan bere xwe di dene gund û derên tenha berku bê şolî û stres a bajaran gelek zede bûye. Bes dema ku mirovan berê xwe dida gunda şol û kespa xwe ne wekî berê kevneşopî de peybînît. Mirov wê bin ronahiya zanistê, teknîkê û astekî hemdemî xwe rêkpek bikên. Bu mînak em şên bi bejin li Turkîya yê her sal hezaran xwendekar li bîstana xwendînên xwe qedînin bes çû şola destxwe na êxin. Dema ku rewş eve ye, pêvîste ev mirovên he bu aborê xwe teybûrekê biken. Wê demê zivirîna ser gundan û jîyan a gundan bu mirovan rêyekî berkeftî ye. Wekî vê nivîse ji derketî holê, pergala gundan ya berê biête zanin û keda hinge biête fehmkirin bu pêşe roje jî hindek ders dê biêne dan.

Di encamê de bi vê gotarê hewl hat dayîn ku, bîranînên kevneşopî yên civakan neyên jibîrkirin. Faktorên sereke yên ku pêşî li hilweşandina civakekê digirin ziman, çand, nasname û hwd. Her çiqas evene hemî hebin jî hafizeya civakî ya ku rê dide wan bijîn jî girîng e. Ji ber vê yeke, hemû şêwazên jiyanê yên li jor behs kirin (her çend ji hêla hin kesan ve nepêwist were dîtin jî) stûnên bingehîn ên zindî kirina bîranîna civakî û çandî pêk tînît.

Çavkanî:

Akın. İ. (2019). *Hakkâri Beyliği (1130-1849)*. Teza masterê ya neçapkirî, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Van.

Belli, O. (2008). *Van Gölü'nün Güneydoğusu ile Hakkâri Bölgesi'nde Bulunan Tarih Öncesi Döneme Ait Kayaüstü Resimleri*. III. Uluslararası Van Gölü Havzası Sempozyumu, Ankara. Ajans Türk Basım.

Gencer, F. (2010). *Merkeziyetçi İdari Düzenlemeler BağlamındaBedirhan Bey Olayı.* Teza PhD ya neçapkirî, Ankara Üniversitesi, Ankara.

Gökburun, İ. (2018). Yüksekova'da Hayvancılık Faaliyetlerinin Geliştirilmesine Yönelik Öneriler. *Marmara Coğrafya Dergisi,* 2018(37). 204-18.

Guli, N. H. (2016). *Hakkâri Beyliğinin Seceresi, Uluslararası Tarihte Hakkâri Sempozyumu*.
Ankara: Canset Matbaacılık, I(I), 295-296.

Kaya, A. M. (2007). *Sosyal ve Kültürel Yönleri ile Hakkâri*. Yayınlanmış Teza masterê ya neçapkiri, Erciyes Üniversitesi, Erzincan.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ فەکولینێن کوردی

Korkmaz, E. (2018). Hakkari İlinde Halk Takvimi ve Sosyo-Ekonomik Etkileri. Ahtamara Sosyal Bilimler Kongresi, 25-26 Ağustos 2018, Gevaş – Van.
Minorsky, V. ve Bios, T. (2008). *Kürt Milliyetçiliği*. (E. Karahan, H. Akkuş, N. Uğurlu, Werger.). İstanbul: Örgün Yayınevi.
Kaplan, Y. (2014) *Tarihte Hakkâri, Şemdinan ve Nehri*. Uluslararası Muttasavıf Seyyid Taha- i Hakkâri Sempozyumu, İstanbul: Kayhan Matbaacılık, 108-127.
Kodaman, B. (1987). *Sultan II. Abdülhamit'in Doğu Anadolu Politikası.*Ankara: Tük Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları, 67, 4(21).
Özgen, Ö. (2016). *Hakkâri Vilayetinin Sosyo-İktisadi ve Siyasi Yapısı (1923-1960)*. Teza PhD ya neçapkirî, Uşak Üniversitesi, Uşak.
Ülke, C. (2018). *Osmanlı İdaresinin Hakkâri'de Tesisi, I*. M. Adıyaman, Y. Kaplan, X. Sadini (Ed.), I. Uluslararası Zap Havzası Uleması Sempozyumu (473-479), Hakkâri Üniversitesi Yayınları.

Lîsteya Hevpeyvînê:

Nav û Paşnav	**Emir**	**Bajerê Wî**	**Karê Wî**
Abdulkadir Kızılkaya	80	Colemêrg	Nivîskar
Zübeyt Ceylan	64	Yüksekova	Cotkar
Ramazan Tekin	57	Colemêrg	Serbest
Rahime Kaval	58	Colemêrg	Xanima malê
Tayyip Biçer	42	Colemêrg	Gundî
Fatma Tekin	50	Colemêrg	Xanima malê
Hasan Kaval	60	Colemêrg	Serbest
Edip Silehi	72	Colemêrg	Gundî
Halime Özkan	43	Colemêrg	Xanima malê
Şehmuz Artık	73	Colemêrg	Gundî
Şükrü Silehi	57	Colemêrg	Gundî
Cevdet Miroğlu	49	Colemêrg	Muxtar
Nesrin Kaya	54	Colemêrg	Xanima malê
Ubeyt Aslan	60	Colemêrg	Serbest
Şükrü Aslan	79	Colemêrg	Gundî
Rıfat Tezcan	48	Colemêrg	Ajuvan
Kibar Arslan	50	Colemêrg	Xanima malê
Ömer Yaşar	65	Colemêrg	Cerdewanê teqawît
Asiye Tatlı	94	Colemêrg	Xanima malê
Ahmet Yakış	53		
Serbest		Colemêrg/Yüksekova	
Sayime Yakış	50		
Xanima malê		Colemêrg/Yüksekova	
Tahir Güldal	67	Colemêrg	Cerdewanê teqawît
Yıldız Çetin	58	Colemêrg	Xanima malê
Mehmet Çetin	60	Colemêrg	Gundî
Hacı Tansu	50	Colemêrg	Ketkar

PÊVEKAN:

Foto-1: Garte
Foto: Gökburun, 2018:212.

Foto-2: Lo
Foto: Engin Korkmaz

Foto-3: Pez Dotin
Foto: Hacı Tansu

Foto-4: Wêneyek Zozan a
Foto: Hacı Tansu

Foto-5: Pez Birîn
Foto: Hacı Tansu

Foto-6: Li gunda wêneyek zivistanê (Xenanis)
Foto: Engin Korkmaz

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Foto-7: Kolê Zivistan’e ya pê gîya di kêşin.
Foto: Engin Korkmaz

Foto-8: Bizinên zivistanê taze zayî.
Foto: Engin Korkmaz

Foto-9: Dünhe da bizin a zayî.
Foto: Engin Korkmaz

Foto: Engin Korkmaz
Foto-10: Pezê nav dünhê.

Foto-11: Keşan a gîya bu nav dünhê.
Foto: Engin Korkmaz

VILLAGE LIFE: THE EXAMPLE OF HAKKARİ

Abstract:

Villages play an important role in the lives of communities and individuals. From daily activities to social events in these villages there are important moments that give meaning to people's lives. Recognition and meaning of rural life also play an important role in defining the advantages and disadvantages of urban life. The impact of rural life on the villagers can also be effective in changing and transforming the social structure. The village also affects the liver and character of the people. For example, when people living in rural areas are more altruistic and helpful, people living in urban areas may have opposite feelings. In addition, the villagers have a severe liver condition due to the impact of living conditions. Despite this, the difficult living conditions of the villages promote a sense of unity of the people and they act together in pain and joy. This situation ensures the construction of unquestionable sociological relationships on the basis of fundamental relationships.

In order to sustain rural life, a clear order is required in each season. One of the most important issues is the long winters in the villages and the provision of sufficient food for humans and animals. Villagers therefore have to calculate each month of the year in a specific plan. This situation also requires people to lead their lives on a regular lifestyle. For example, if animals are not fed in the summer, significant problems may occur in the winter.

Our aim in this study is to provide information about rural life in general and the daily and annual lifestyle in the villages of central Hakkari in particular. Particularly in Hakkari, forced migration began in the 1990s with a sharp influx from rural to urban areas. As a result the phenomenon of village and peasantry fell behind. But it is important to describe social relations in terms of lifestyles such as social relations, social cohesion, conflict, pain and joy in the villages of Hakkari. One of the main aims of this study is to provide information, especially for the new generations who are under the influence of urban culture, on the way of life and social relations in the village. It also helps to keep historical and cultural memory alive. The research data were collected based on the stories of people who live in the center of Hakkari and are aware of rural life. These narrations have been compiled separately over the course of four season of year. The data obtained in the study were analyzed within the framework of the principles of science.

Keywords*:* *Village, Colemêrg, social life.*

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

DI BERHEMA ŞÊX MUHYEDÎNÊ HÊNÎ DE ÇANDA XWARIN Û VEXWARINA KURDAN

Burhan Doğan /Turkîya

PUXTE:

Di edebiyata klasîk a Kurdî de gelek berhemên girîng hene ku yek ji wan jî berhema *'Fî Beyani'l-E'time we Mezaqîha'* (Beyana Xwarin û Zewqên Wan) a Şêx Muhyedînê Hênî ye. Ev berhem di biwara simatiyeyê de berhemeke sereke ye. Wî berhema xwe bi Kurdî û di forma mesnewiyê de bi awayekî menzûm nivîsiye. Herçend ev berhem ji aliyê şikl û şemalê ve di nav edebiyata klasîk de cih bigire jî ji bo keltura xwarin û vexwarina Kurdan ji aliyê naverokê ve çavkaniyeke sereke ye. Ji ber ku di vê berhemê de şair Şêx Muhyedîn behsa her cure xwarin ûvexwarina Kurdan kiriye, çawa tê pijandin, digel çi tê xwarin, tehma wan çawa xweştir dibe, di kîjan herêman de peyda dibe û babetên bi vî rengî ji xwe re kiriye mijar. Lewma em ê jî di vê lêkolînê de bi çavê folklor û keltûrê ve berhema Şêx Muhyedîn binirxînin, hewl bidin ku keltûra xwarin û vexwarina Kurdan a sedsala XIXan tesbît bikin û girîngiya berhemê derxin pêş.

Peyvên Serekî: *Şêx Muhyedînê Hênî, Beyana Xwarin û Zewqên Wan, simatiye, keltûra xwarin û vexwarina Kurdan, metbex*

DESTPÊK:

Çîroka Derxistina Vê Kitêbê

Çiqas hemd û sena hene ji Rebbê Alemê re ne ku xwarin û av çêkirine ji bo însanan. Selat û silavên herî delal û xweşik li ser Pêxemberê ku beyana helal û heramî, paqij û necisiyê kiriye û her weha selat û silav li ser al, heval û pêgirtiyên wî bin jî, ku heta roja îro Tibba Nebewî zelal kirine. Çawa dibêjin; a zehmettirîn destpêkirin e. Rast e, ez jî nizanim çawa dest bi çîroka xwe bikim. Bes cardin jî em dê weha birêsin û bihûnin. Dema ez feqî bûm, rojek li pirtûkxaneyeke Batmanê min li eserên kevin dinêriya, vê menzûmeya ku di dawiya Dîwana Şêx Evdirrehmanê Axtepî de cih digirt bala min kişand. Min ew kirî û anî medreseyê. Ji wê rojê û vir de ez vê kitêba ku bi Dîwana Şêx Evdirrehmanê Axtepî û hinek qesîdeyên Siyahpoş re li çapxaneya Diyarbakir- Sozê (1997)13 hatibû çapkirin, mitale dikim û li ser diponijim. Çend sal berê jî ez rabûm û min latîniya wê çêkir û li ba xwe hişt. Min bala xwe dida berhemên Kurdî ku nivîskarên wan hertim di eynî rêz û beşê de kitêb çap dikirin. Û min dît ku valahiyek di warê mitbexa Kurdan de heye. Çawa xwarinên çînî, mitbexa japonî, sufreya Ereban û teamê ewrûpiyan meşhûr e, her weha kîler û mitbexa Kurdan jî bi nav û deng e. Lê berhemên wek vê heta niha nehatine mihafezekirin. Ev kitêb mitbexa çanda Kurdan derdixe holê û bi me dide naskirinê. Jixwe heger ev eser bi tena serê xwe were zimên, yekane ye. Lewra heta niha di çanda Kurdan de, bi qasî ez dizanim, bi nivîskî û nezimkî kitêbek wuha nehatiye berhevkirin. Ev berhem her çend bi hecm û qebareya xwe biçûk be jî di eynî demê de dewlemendiya çanda mitbexa Kurdan e. Însan bi vê menzûmeyê,

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

xwarinên Kurdan ên taybet û qedîm, tesîra hin xwarinên cîranan (yên Tirk û Ereban) nas dike. Belê, muelîfê wê her çiqas bi berfirehî wan xwarinan rave nekiribe jî, lê bi navdayîna wan çanda sufreyan me derxistiye ber çavan û hêja ye ku bête lêkolîn û nîqaşkirin. Ji ber ku nivîs, dîtin, gotin û têgehên wê pir dewlemend in. Meriv dikare bi rehetî bibêje ku ji bo Kurdiya sedsala 19an jî çavkaniyek e. Bila ev alî jî li ber çavê fîlologan be.

Ku ez cardin vegerim çîroka xwe, belê, ji ber van sebeban ez rabûm li ser vê eserê ketim teftîş û lêkolînê. Cara ewil min dît ku xetatê vê nusxeyê Mela Zeynelabidîn Amidî ye. (Zeynelabidîn Amidî, di sala 1417/1996an a 8ê Şe'banê de li ber vê destxetê îstinsaxa xwe kiriye.) Çûm balê û min jê pirsî ka çawa bi dest xistiye, kengê, bi çi minasebetê îstinsax kiriye. Her wiha min jê pirsî ka nusxeya esil li balê heye an ji ku girtiye. Mixabin, min bersivên zelal negirtin. Got na li cem min tuneye, wenda bûye. Çumkî, wexta min jê pirsî, hingê haya wî ji vê nivîsandinê çêbû, hat hişê wî û got rast e min nivîsandiye. Li ser vê yekê di metnê de çend cihê ku vala mabûn an nehatibûn xwendin û hin xwarinên ku min navê wan cara ewil dibihîstin min jê pirsî. Lê sed mixabin digel ku min pê re mizakere kir jî cardin nedihat hişê wî ew kelîme çi ye û tête çi wateyê! Piştî ku min destxeta Amidî latînîze kir, hertim çavê min li ya orjînal bû. Divê xwendevan vê jî zanibe ku di destxeta Amidî de, hinek şemitandin, zêdekirin û kêmasî hebûn. Piştre seyda Amidî, serboriya vê nusxeya xwe ji min re weha got:

"Dema di sala 1996an de ez çûm cem Şêx Şafiyê Axtepî (ku ji nesla Şêx Evdirrrehmanê Axtepî ye), rabû cara yekemîn eserên şêxên Axtepiyan dane min da ku ez wan binivîsim û biweşînim. Di nav wan xetan de digel qesîdeyekê ev kitêb jî hebû ku bi destxetên Şêx Evdirrehmanê Axtepî an jî yê Şêx Muhemmed Can hatibû xetkirin. Ji min re got wan jî binivîse. Lê çend beyt hebûn (behsa zazayan) ji ber hinek sedeman min nenivîsandin. Û du cî hebûn ku nehatin xwendin û ji hev derneketîbûn, lewma min ew nenivîsandin û vala hiştin"

Lê piştî meraqa min a domdar seyda Amidî di nav kitêbxaneya xwe de cardin lê geriya û mizgînî da min ku destxeta resen dîtiye. Ez bi kêf û heyecaneke mezin rabûm çûm balê. Piştî ku heyecana min pariyek vemirî, min her du xetan da ber hev. Di navbera wan de ferq hebûn. Lê ji min re tiştê girîng vê kêliyê ev bû ku kê ew nivîsîbû. Li gor Amidî, ku bi yeqîn û tehqîq digot, ew xeta Şêx Evdirrehmanê Axtepî bû. Ji ber ku Amidî xetên Rewd'un-Neîm û Dîwana Axtepî baş dinasî. Tiştekî din jî, ev destxet di nav keşkûlekê de cih girtibû, ji ber ku tê de beytên Feqiyê Teyra, Cizîrelî Efendî (Melayê Cizîrî), Siyahpoş, Şêx Evdilqadirê Hezanî û Muhemmedê Lîcewî (Seydayê Lîcî) hebûn. Belê ev menzûmeya derbarê xwarinê û yeka piçûk a (qesîde) ku bi "Ya Reb..." dest pê dikir jî hebûn.

Di beramberkirina destxeta resen û îstinsaxa Amidî de hin ferq hebûn. Ferqa mezin jî ew bû ku Amidî hin beytên ku behsa "Dimbilî/dimilî/zaza"yan dikir, jê derxistibû an li ser navê "xêra umûmê" hinekan guhertibû. Di ya resen de Şêx Muhyedîn ango Sa'î, bi kerb behsa Dimîliyan dikir. Piştî dîtin û xwendina vê destxetê min xwest ez sebebe vê yekê hîn bibim. Bi vê meqsedê min ji malbat û alimên wê derdorê pirsî. Gotin ku dema Sa'î di nav Dimbiliyan de maye û melatî kiriye zêde ew êşandine, aciz kirine, belkî ji ber vê sebebê wî hin beyt nivîsîbin. Yanê diyar bû, ev tiştekî şexsî bû, bi zazayên gundê lê mabû, sînorkirî bû. Lewra ji neviyên wî Mela Ehmed got ku Şêx xwestiye mewlîdek bi kirmanckî ji bo zazayan binivîse, lê dema dibihîze Melayê Xasî (1867-1951) tiştekî wisa

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

dinivîse, ji ber hurmet û xizmeta Xasî dev jê berdide. Yanê ger kîneke giştî ya Şêx Muhyedîn hebûya, bi qenaeta me ew dilxwestina çêkirina mewlîdê çênedibû. Wek me got derdê wî bi wan zazayên gundê wî re sînorminasibkirî bû. Erê, kîneke muellîf ji netewa wî û amiyan tunebû. Bilekîs, wexta me malbata wî lêkolîn kir, em rast hatin ku Sa'î jî tê de malbateke gelek netewperwer, qedirşînas û fedakar e. Ji xizmet û eserên wan bigire, hetanî berxwedana Şêx Seîd ev yek eşkere bû. Wan jî piştî têkçûna serhildanê ji nefî û perîşaniyê nesîbê xwe girtibûn.

Dema bi vê minasebetê ez çûm Hênê û Karazê û min ji gelek mela, alim, waîz û rûspiyan pirs kir, ev aliyê netewperwer eşkeretir bû. Belê, gava behsa Şêx Ehmed Efendî (bavê nivîskar) dihat kirin, haya wan bi temamî jê hebû. Lê dema ku gotin dihat ser Şêx Muhyedîn her kes matmayî dima. Xuya bû ku bi nefîkirina "qiyam"ê re malbat belawela û peregende bûbû. Ne tenê ev, ji şewitandin û wendabûna kitêban jî malbat para xwe zêde girtibû. Mesela ji wan kesan Şêx Şafî beyan kir ku Mela Yasînê Şemê bi qasî barê merkebekî ji kitêbên kalikê wan bi emanetî biribû, lê hew anîbû. Dîsa jî ji bo ku ez bi riya Şêx Şafî bigihêjim vê destxetê min gelek hewl da lê ez negihaştimê. Çawa ku min li jorê beyan kir wî miqamî destxet kete destê min. Bes fotokopîya wê li ba min heye.

Hew agahiyên derheqê Sa'î yanê Şêx Muhyedîn de gelek kêm in. Bêtir şîfaî ne û jêdera me jî Şêx Heybetê neviyê wî ye. Feqî, telmîz û nasdarên wî alimê meşhûr ji bo me hinek melûmat hiştine. Mesela, Mela Salih (li gundekî Hênê ye) ji Şêx Heybet weha rîwayet dike: "Heyfa me tê li du tiştan: Yek jê; hewqasî malbat û kalikên me, tev li tevgera mala Şêx Seîd bûne, bi wan re bûne heval, rabûne û rûniştine, pêgirtiyê wan bûne jî me baş dizanî ku kî di wê serhildanê de xaîn, nexaîn an kî bixîret bûye. Lê sed mixabin, me ew bûyer û ehwalê ha nenivîsandine. A dîtir; kalikê min, yanê Şêx Muhyedîn, gelek berhem û nivîsên wî hebûne, lê me ew mihafeze nekirine, heta ku mişkan tevekê kitêbên wî xwarin. Heta dîwaneke wî jî hebûye, lê pir heyf û hezar mixabin me ew jî neparast ji bo neslên dû xwe re". Û her wisa Mela Ehmedê (ev zat aniha li Enedolê ye) lawê Şêx Heybet ê lawê Şewket ê lawê Şêx Muhyedîn jî weha ji min re got: "Li cem bavê min ê rehmetî kitêbeke şi'ran ya Şêx Muhyedîn hebû, lê aniha ez nava kitêbên xwe geriyam, ez rastî wê nehatim. Texmîn dikim wê çaxê feqiyeki wî ew bi xwe re biriye û tu melûmatê min jê tuneye. Her wisa gelek kitêbên me yên ku bi destxetan hatibû nivîsandin û eserên kalên me jî, ji ber tirs û xofê, me ew wenda kirin û xistin binê erdê û şewitandin."

Divê ez bibêjim ku derbarê vî zatê li ber jibîrbûnê de, piştre min ferq kir ku çend agahiyên nivîskî jî hene. Yek jê teblîxeke mamoste Abdurrahman Adak e. Adak jî ji du çavkaniyên şîfaî neqil dike ku Sa'î-i Hanewî, yanê Şêx Muhyedîn, kurê çaremîn ê Şêx Ahmedê Karazî ye û li dora 1849an hatiye dinyayê û 1897an de jî çûye rehmetê; gora wî li Hênê li rexê qubbeya bavê wî ye û dîwana wî ya giranbiha ya wenda, ku li jorê çend rîwayet li ser hebûn, di erdheja Lîcê ya 1975an de wenda bûye. Agahiya nivîskî ya din jî ji xebata bi navê Tezkîre-î Meşayîhî Amîd e. Li gor Şefîk Korkusuz, Şêx Muhyedîn kurê Şêx Ehmed Efendiyê Hênî ye û bi eslê xwe ji Mêrdînê ne, seyîd û ji malbatek malmezin e û ew xelîfeyê telmîzê Mewlana Xalidê Kurd e. Şêx Ehmed piştî meletiya li gundên Batman û heft salê li Karazê, dûvre bi sebebê xewneke menewî radibe diçe Hênê û li wir bi cî dibe, jiyana xwe li wir didomîne. Di eynî demê de murşidê Şêx Eliyê Mala Bûbê ye, lê piştre ev zat diçe ba Şêx Hesenê Nûranî.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Şefik Korkusuz di kitêba xwe de[1] wefata Şêx Ehmedê Karazî wek Hicrî 1301 (M. 1883) nîşan dide û dibêje dema wefat kir 63 salî bû. Korkusuz, wek jêder kitêbek nîşan dide ku ji aliyê Şêx Me'rûf ve hatiye nivîsandin û piştre ji aliyê Şêx Heybet ve wergeraye ser Tirkî. Lê hevdîtin û sohbeta me ya bi neviyê Şêx Me'rûf Şex Cemal re tarîxeke din derxist

Muelîfê me li Hênê çêbûye û li wir wefat kiriye. Aniha qebra wî di goristana bavê wî de ye, ku rehmetiyê bavê wî ev erd keriye û ji bo goristana ehl û xelîfeyên xwe, kiriye weqif. Kêlikên tirba Şêx Muhyedîn jî çend sal berê bi sebebê definkirina Şêx Hesîbê birayê Şêx Heybet, ji binê xweliyê derketiye û pê hesiyane ku ya Şêx Muhyedîn e. Radibin kêlê didin alî, lê piştre dema tirbên wan nuh dikin ew kêl wenda dibe, em nizanin gelo di bin tirbekê de maye an jî li ber serê hinekî din xistine û bi çîmentoyê sewax kirine. Şêx Muhyedîn, tevekê ilmê xwe li ba bavê xwe xwendiye û qedandiye. Ji xeynî zimanê dayikê, Erebî, farisî û Tirkiya osmanî baş dizanibû, ji xeynî kurmancî zaravayê zazakî jî baş hîn bûbû. Di eynî demê de ez hîn bûm ku ev zat Xalê Salih Begê Hênî ye. Bi navê Zeyneb keçeke Şêx Ehmed heye ku xweha miellîfê me ye. Ev xwişka wî bi Seîdê Hênî re dizewice û ji wan alim û zanayê Kurd Salih Begê Hênî (1869-1925) çêdibe. Ev zat li cem xalê xwe Sa'î dixwîne û îcazetê werdigire.

Di ilmê şi'rê de gelek jêhatî û bi navûdeng bûye, wisa meşhûr e ku Şêx Evdirrehmanê Axtepî bi xwe behsa Şêx Muhyedîn dike û dibêje: "Heger di nava Kurdan de şair hebin, ew jî ez û Şêx Muhyedîn in. Lewra helbesteke Şêx Muhyedîn berdêlî tevekê Rewd-un-Ne'îma min e." Gava ez çûm Hênê da ku malumat bi dest bixim seydayekî bi navê Mela Salih ku feqiyê neviyê Şêx Muhyedîn e vê agahiyê da min. Wî jî ev meydanê. Şêx Cemal bi zimanekî qet'î ji min re got ku wefata Şêx Ehmed 1870 ye.

Belê, mexlesa wî jî "Sa'î" ye û tam jî li gor "se'y" û xebata xwe navê wî minasib e. Di vê menzûmeyê de navê wî tuneye, bes mexlesa wî û navçeya wî heye. Me jî ji malbat û micazên wan pirsin. Gotin erê, ev mexles ya Şêx Muhyedîn e. Lewra neviyê wî Şêx Heybet dema mora xwe dinivîsand weha xet dikir: Hefîd-u's-Sa'î (yanê neviyê Sa'î).[2] Sa'î di eynî demê de navê mertebeyek e di helbestan de, mertebeya wî kesê ku wezn û qafiyeyê li hev tîne. Lê di sê ciyê vê menzûmeyê de (di beytên 8, 31 û 83an de) xwe wek "Heqî" jî bi nav dike: "Eger tu b' gumanî bipirs ez Heqî", "Heme dem li we bin ji Heqî selav", "Li finc aşî naête xwarin Heqî".

Min çiqasî lêkolîn kir û ji neviyên pismamê wî jî pirs kir ez rastî tarîxa wîladet û wefata wî nehatim. Mixabin di vê behsê de ji malbatê, agahiyeke zelal ji bo me çênebû. Lê li gorî tarîxa wefata bavê wî û esra Şêxê Axtepî dide zanîn ku di paşiya sedsala 19. û serê sedsala 20. de jiyaye. Li gor Şêx Evdirrehman di sala 1907an de wefat kiriye, ev zat ji nêz û dûr di wan tarîxa de çûye ser rehma Xwedê. Têkiliyên wî û Şêxê Axtepî pir zêde hebûne. Lewma ji hev re menzûme û şi'r digot û dişandin. Wek me got bi hev re muşa'ere kirine. Lê birayekî wî Şêx Me'rûf ê kurê Şêx Ehmed heye, hêja ye ku jiyana wî jî bête teftîşkirin. Ew jî alimekî mezin bûye, heta tê gotin ku ji Şêx Ehmed jî zanatir bûye. Ji ber vê şarezatiyê bûye xelîfeyê bavê xwe û jiyana bavê xwe nivîsandiye. Û bi qasî Şêx Merûf tê nasîn Şêx Muhyedîn ewqas nayête naskirin. Belku ev xebat vê muşkîleyê pariyek berteref bike.

Heger em ser eserên wî jî çend tişt bibêjin, di destê me de ev malûmat hene. Wexta me ji Mela Ehmed pirsî kitêbeke kalikê we ya wiha heye, ji xwe şaş û matmayî ma û gote ez nizanim. Bes Mela Ehmed got wî "kitêba şi'ran" jî hebû. Tê de behsa gelek

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

eşîretên Kurdan û herêman (mîna eşîra Qaziyan) dikir. Hetanî hinek dibêjin, ev kitêb derheqê eşîret û deverên wan de esereke menzûm a bi serê xwe ye. Û her weha ziriyeta wî û birayên wî jî nedizanîn ku ev menzûme heye. Yek ji begên Hênê got: Min zemanekî çend helbestên Şêx Muhyedîn xwendibû ku behs û qala ‘xanim’ dikir, ew li ser işqê bû. Ev malûmat û helbesta me ya paşîn jî dide zanîn ku dîwaneke wî ya bi serê xwe hebûye, loma hinek mela beytên aîdê wî dixwînin, mîna yên Cizîrî û Feqî. Lê aniha ne li ber destan in. Ya li ber destê me manzûmeya *fî Beyanî’l Et’îme we Mezaqîha* ye, ku dê ji mirin û fetisandinê bête xelaskirin înşellah. Belê, ew beyta ku di dawiya menzûmeyê de di nav xelkê Hênê, Karaz û Hezro de meşhûr e, ev e:

Penîrê Qerecdaxê nanê genim
Digel zebeşê çem benimdir benim[3]

Her wisan Cegerxwîn jî di kitêba xwe ya bi navê Jînenîgeriya Min de dema teswîra Herêma Qerecdaxê dike, vê beytê nisbetî Şêx Evdirrehmanê Axtepî dike. Lê ya rastîn her çiqas ev berhem di nav pirtûkxaneya wan de û bi xetên wan be jî, ya esehtirîn ew e ku navê Sa’îyê Hênî derbas dibe.[4]

Her wiha di nav medreseyên Kurdan û xelkên me de jî hin beytên vê menzûmeyê gelekî meşhûr in. Li ba xelkê beyta wî yî li ser tirşî, tirşik û yên dîtir jî pir meşhûr in. Wek nimûne:

Selam-un ‘eleykum eya tirşiyê Kerem ke were pêşiya sêniyê
Kutilkê bi kuncî qeda lê keve
Wek rêxa buharê ku kurm tê keve

Û weha ferdik bi ferdik ev qesîdeya ha li ser zimanê milet car bi car meriv dibihîse. Lê her wekî hûn dibînin, ev dubeytên jor û yên di menzûmeyê de ji hev cuda ne û peyv û cihê kelîman hatiye guhertin, yanê serûbin bûne. Ez bawer im vî ellameyê nemir li dû xwe gelek eser hiştine lê kesek li wan xwedî derneketiye an jî afetên wek erdhejê de çûne. Ya ku ketiye ber qelema seydayê Axtepî (êdî xetat kîjan be)[5] dîsa Xwedê jê razî be. Belku wan esera bi xêra hinek dîwanên dîtir û di nava kitêbên hinekên din de rojek bibin nesîbê dîtin û çapkirinê. Lê ji ber ku nusxeya Amidî bû sebebê vê lêkolînê û me di dawiyê de destxeta resen peyda kir, em minetdar û spasdarî Zeynelabidîn Amidî ne.

Belê, menzûme ji bo behsa xwe sernav nedanîbû lê belê fesil fesil mijara xwe qiset kiribû. Yanê di nav xwe de li gor behsa tiştan, menzûme dabeşkirî bû. Behsa karê xemûr (hevîr), borek, zerzewat û fêkî, helaw, goşt û kebaban, şorbe, şêranî, pincar û gîha, rîçal û tirşiyan dikir. Lê destê me neçû ku em li gor vê naverokê sernav daynin, di şûna wê de ji bo her behsa nû, me rûpelê cardin da dest pê kirin. Jixwe dê ji nasê edebiyatê re ne xerîb be ev menzûme bi terza mesnewiyê (aa, bb, cc ...) hatiye nivîsîn û her wiha 186 beytan pêk tê.

Di dawiya karê me û nivîsandina vê muqeddîmeyê de teferûateke nû derket meydanê ku divê li ser wê jî çend peyvan binivîsim. Belê, çend beytên bi navê mexlesa “Heqî” ji keşkûleke li cem min hebûn ku ji qesîdeyên Melayê Bateyî, ‘Eliyê Herîrî, ji xezelên Esamî û ji xezeleke Derfeşanî pêk dihat. Wekî ku me got di sê misreyên menzûmeya xwarinê de Şêx Muhyedîn, ji xeynî Sa’î wek “Heqî” jî behsa xwe dikir. Bi rastî “qesîde”ya[6] wî ya bi mexlasa Sa’î, ku bi xezelên din re di pêvekê de ye, ji aliyê uslûb û ristinê ve pir dişibiya van helbestên ku navê Heqî li ser bû. Belê, Şêx Muhyedîn di

Zakho Centre
for Kurdish Studies

menzûmeyê de mexlesa Sa’î jî û ya Heqî jî bi kar anîbû. Lê dîsa jî berî ku em di pêvekê de cih bidin wan xezelan, me xwest em vê zen û şika xwe çend heval û nasan re jî parve bikin. Mamoste Remezan Alan jî wekî min zen dibir ku ev xezel ji dîwana Sa’î ya wenda mabûn. Lê ji bo ku ev behs, bi awayekî ilmî ronî bibe, me xwe gîhand hin kesên ehlê helbesta klasîk.

Çareserkirina şaşî û kêmasiyan metnê, her wiha bi dayîna muxemmesê re mamoste Adak kedeke mezin da vê xebatê. Kêfxweş im ku me bi hev re metn anî dereceya kamilbûnê. Digel vê ez yek bi yek ji Mamoste Kadri Yıldırım, Remezan Alan û Serdar Şengül re spas dikim ji bona alîkarî, serêşandin û rêberiyê.

Tewfîq ji Xwedayê Keremkar e û alîkarî ji evdên gunehkar e.

ENCAM:

Ev berhem heta niha li gor em dizanin ya ku li ser mitbexa Kurdî û nezimkî hatiye nivîsandin tekane ye. Şêx Mihyedînê Hênî bi mexlesa Saî û Heqqî di beşa sîmatname ango simatiyeyê yek ji wan kesan e ku di edebîyata Kurdî (Kurmancî) de cihê xwe nedîtiye û heta anha ti zanko an sazî di beşa gastronomiyê de heqê wî şairî yê rewa jê ra eşkera nekiriye. Xwarin û pêxwarinên kîlera me ya Kurdan bi zimanekî zelal raxistiye ber çavên me. Di 12 babet û 360 beytan de bi curmeyek biçûk ya şiklê rîsaleyê de 140 şikil û cure xwarinan beyan kiriye. Xwarinên Dimbilî (zaza)yan bi zimanekî fesîh cara ewil wî aniye ziman, Deh beytên Osmanî eşkera dike ku di sedsala 19. de xwarinên serdema Osmanî û sarayan gelekî di rewacê de bû. Orjînala vê berhemê bi elfabeya Erebî di 7 wereqeyan de ji hêla Axtepîyan ve hatiye îstînsax kirin û yek jî ji hêla Mela Muhemmedê Dêrîşî ve hatiye nivîsîn.

ÇAVKANÎ:

Axtepî, Ş. E. (1986). Rewdu'n-Ne'im, (amd.) Mela Zeynelabidin Amidi, Diyarbekir.

Bedirxan, C. (2009). Ferhenga Kurdî-Kurdi, Stenbol: Avesta.

Bender, C. (2003). Kürt Mutfak Kültürü ve Kürt Yemekleri, İstanbul: weş. Berfin.

Cegerxwîn, (2003). Hayat Hikayem, wer. Gazi Fincan, İstanbul: Evrensel Basım Yayın.

Farqînî, Z. (2005). Ferhenga Kurdî-Tirkî, Stenbol: Weşanxaneya Enstituya Kurdî ya Stenbolê.

Hakan, S. (2007). Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürtler ve Kürt Direnişi, İstanbul: Doz.

Hênî Ş. M. (2015). Beyana Xwarinan û Zewqên Wan, M. B. Tarînî (amd.), Stembol: Peywend.

izoli, D. (1992). Ferheng Kurdi-Turki Türkçe-Kürtçe, Stenbol: Deng Yayınlar.

Kanar, M. (2013). Farsça Türkçe Sözlük, İstanbul Say Yayınları.

Korkusuz, Ş. (1996). Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması, Melisa Matbaası.

Korkusuz, Ş. (2004). Tezkire-i Meşayîh-i Amid, İstanbul: weş. Kent.

Messick, B. (1996). The Calligraphic State: Textual Domination and History in a Muslim Society, Berkeley and Los Angeles: University of California Press.

Mitchell, T. (2001). Mısır'ın Sömürgeleştirilmesi, wer. Zeynep Altok, İstanbul: İletişim.

Mukriyanî, G. (2010). Ferhengî Kurdistan Kurdî-Kurdî, Enstítuya Kurdî ya Amedê.

Ricoeur, P. (2012). Hafiza, Tarih, Unutus, wer. M. Emin Özcan, İstanbul: Metis.

Ricoeur, P. (2013). Zaman ve Anlah - Dört: Anlatılan (Öykülenen) Zaman, wer. Atakan Altınörs &Umut Öksüzan, İstanbul: YKY.

Somel, Selçuk A. (2010). Osmanlı'da Eğitimin Modernleşmesi (1839-1908), wer. Osman Yener, Istanbul: İletişim.
Traverso, E. (2009). Geçmişi Kullanma kılavuzu: Tarih, Bellek, Politika, wer. Işık Ergüden, Verso.
Yıldırım, K. (2010). Mem û Zîn: Çeviri ve Kavramsal Tahlil, Stembol: Avesta.

PÊVEK:

Pêvek 3: 3 rûpel ji nusxeya malbata Axtepiyan a Berhema Beyana Xwarinan û Zewqên Wan.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Pêvek 4: 3 wêne ji gor û kêlên gora Şêx Mihyedînê Hênî.

Perawez:

[1] Korkusuz, Şefik Tezkire-i Meşayih-i Amid, Diyarbekir Velileri I-II, Kent, 2004, r. 71-73.

[2] Waîzê teqawitkirî Mela Se'dullah Hatipoglu.

[3] Min cara yekemîn dema feqetiya xwe de ji bavê seydayê xwe Mela Remzî bi navê Hecî Ehmedê Hezroyî seh kiribû.

[4] Ya em dizanin di ti çavkaniyên Kurdan de bi nivîskî behsa vê berhemê nehatiye kirin, bes evqasî Cegerxwîn cih daye vê ferdikê, lê bi devkî beytên wê di nav xas û aman de belav e.

[5] Ev destxet dibe ku ya Şêx Mihemmed Can û yan jî ya malbata Axtepiyan be.

[6] Di nav ehlê medreseyên Kurdî de hema bêje ji her cure şi're re "qesîde" tê gotin, lê bi dîtina me ev şi'ra ha di rengê "xezel"ê de ye, lewma em ê jê re ji vir şûnde bibêjin "xezel".

ŞEYH MUHYEDİN-İ HANEVİ'NİN ESERİNDE KÜRT YEMEK VE İÇECEK KÜLTÜRÜ

ÖZET:

Klasik Kürt edebiyatında, Şeyh Muhyiddin Hani'nin *'Fi Beyani'l-E'time we Mezaqîha'* (Yemeklerin Beyanı ve Lezzetleri) aralarında olmak üzere birçok önemli eser bulunmaktadır. Bu ürün simatiye alanında öncü bir eserdir. Şair eserini Kürtçe ve mesnevi şeklinde kaleme almıştır. Bu ürün şekil ve biçim bakımından klasik edebiyatta yer alsa da Kürt yeme içme kültürü için de önemli temel bir kaynaktır. Zira bu eserde şair Şeyh Muhyedin her türlü Kürt yiyecek ve içeceklerini, nasıl pişirildiğini, neyle yendiğini, lezzetinin nasıl daha güzel olduğunu, hangi yörelerde bulunduğundan bahsetmiş ve bu tür konuları kendine konu edinmiştir. Bu nedenle bu çalışmamızda Şeyh Muhyeddin'in eserini folklor ve kültür gözüyle değerlendireceğiz ve 19. yüzyıl Kürt yeme içme kültürünü tespit edip eserin önemini vurgulamaya çalışacağız.

Anahtar Kelimeler*: Şeyh Muhyedin Hanewî, Beyana Xwarinan û Zewqên Wan, Simatiye, Kürt yemek ve içecek kültürü, mutfak*

KURDISH FOOD AND DRINK CULTURE IN THE WORK OF SHEIKH MIHYEDÎNÊ HÊNÎ

Abstract:

There are many important works in classical Kurdish literature, among them Sheikh Muhyiddin Hani's *'Fi Beyani'l-E'time we Mezaqîha'* (Declaration and Tastes of Food). This product is a pioneering work in the field of simati. The poet wrote his work in Kurdish and in the form of masnavi. Although this product takes place in classical literature in terms of shape and form, it is also an important basic source for Kurdish eating and drinking culture. Because in this work, the poet Sheikh Muhyedin talked about all kinds of Kurdish food and drinks, how it was cooked, what it was eaten with, how it tasted better, in which regions it was found, and made such subjects his subject. Therefore, in this study, we will evaluate Sheikh Muhyeddin's work from the point of view of folklore and culture, and we will try to identify the 19th century Kurdish food and drink culture and try to emphasize the importance of the work.

Keywords*: Sheikh Mihyedinê Hênî, Beyana Xwarinan û Zewqên Wan, Simatiye, Kurdish food and beverage culture, cuisine.*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Zivistan û çalakiyên zivistanê di çand û folklora kurdî de

Dr.Veysel Başçı
Lêkolîner – Nivîskar
Ziyattin Yıldırımçakar
Zankoya Mardin Artuklu/ Tutkîya

PUXTE:

Di vê xebate de em dê bahsa erf, adet û çanda kurdan di zivistanê de bikin ku bi tevahî li ser çîrok, ferheng û folklora gelêri ava bûne. Derheqê çîle di folklora kurdî de gelek agahî hatîye dayîn. Em dê bibînin ka di nav kurdan de çile û bawerîyen çile çi îfade dike. Bê guman heta xwarin û vexwarina kurdan di zivistanê de diguherin, nêçîr û nêçîrvanên zivistanê, hin lîstik û şevbuherkên kurdan di folklorê de gelek tê behskirin. Lîstikên wekî kose û kosegerî, hin gotînên peşîyan li ser zivistanê û çilê, hin helbestên şaîrên kurdan li ser çile û her wekî vê; ev hemû çanda zivistanê didin xuyakirin ku di nav kurdan de cih girtiye. Di gelek bajar û gundên kurdan de, xelkên navçeyê li ser vê baweriyê ne ku zivistan ji du çileyê mezin û piçuk bi qasî şêst rojan pêk tê. Çileyê mezin ji destpekâ meha berfanbarê dest pê dike û heta dehê meha rebendanê didome. Bi vi awayî em dê di vê xebatê de bibînin ka di folklara kurdan de çile çi ye û adet û folklora kurdan çiqas berfireh e. Ji xeynî van agahiyan, di vê lêkolînê de hinek lîstikên malê yên ku di rojên zivistanê de têne lîstin jî dê bêne gotin.

Peyvên serekî: *Zivistan, çalakî û lîstikên zivistanê, folklor, kurd*

Destpêk:

Demsala Zivistanê ji çar beşan pêk tê. Kanûnkiz, çile, kanûnkiş û sibat. Kanûnkiz 11 roj e, çile 40 roj e, kanûnkiş 11 roj e û sibat bîst û heşt roj e (Karker, 2015, r. 49).

Kanûnkiz destpêka Zivistanê ye. Kanûnkiz 11 roj e lê li gorî hin çavkaniyan jî Kanûnkiz 12 roj e (Ûskan, 2017, r. 120). Li gorî rîwayetekê dibêjin ji ber sermayê xwe ewqas radidin ber kanûnê lewma mûyên canê wan dikizirin. Dibêjin navê kanûnkizê ji ber vê derketiye. Li gorî riwayeteke din jî dibêjin di heyama kanûnkizê de dunya ewqas dicemide ku mirov li ber sermaya wê dikizire. Dibêjin navê kanûnkizê ji ber kizirandina vê sermayê derketiye (Ûskan, 2017, r. 120).

Çile piştî kanûnkizê dest pê dike. Wekî ku ji navê wê jî diyar e çile 40 rojî dikişîne. Dema herî sar a zivistanê ye. Lewma dema ku çile diqede zivistan wekî ku qediyaye tê hesabê.

Kanûnkiş piştî çileyê dest pê dike. Di vê demê de êdî dunya hinek germ dibe û ber bi xweşiyê diçe. Sibat dawiya zivistanê ye. Ev meh di nav gel de wekî “Sibatoka Dînik” jî tê binav kirin. Ji ber ku hin caran baran dibare hin caran berf dibare û hin caran jî hewa xweş e (Karker, 2015, r. 49).

Ev xebata me li ser çalakiyên Zivistanê yên di çand û folklora kurdan de ye. Çanda kurdî gelek berfireh e û bi saya edebiyata devkî geş bûye heta ku hatiye ya

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

nivîskî. Bi saya edebiyata devkî jî keresteyên gotinên pêşiyan, biwêj, baweriyên gel, çîrok û çîrvanok, lîstik di nav gel de belav bûye û vê jî çanda û folklora kurdî geş kiriye. Yek ji wan demên ku pêdivî bi van keresteyên folklorê hebû ku gel guhdar bike dema zivistanê bû. Ji ber ku hewa sar bû, û demên berê cereyan, televizyon, telefon û hwd tune bûn, miletê kurd bi taybetî yên gundan dema xwe bi hev re derbas dikirin, li odeyekî, xaniyekî yan ber tendûrê kom dibûn û diaxivîn, çîrok digotin, dileyîstin, bi saya dengbêjiyê şevbuhêrk li dar dixistin.

Di vê xebata xwe de me behsa *Efsanê û Baweriyên Zivistanê*, *di gotinên pêşiyan û biwêjan de zivistan*, *Hin xwarin û vexwarinên zivistanê*, *çalakiyên zivistanê wekî şevbuhêrk û lîstik*an kir. Li jêrê bi rêzê ve em van rave dikin û derbarê wan de agahiyan didin.

Em dixwazin li vir derbarê peyva zivistanê de jî hin agahiyan bidin. Zivistan demsalek e ku di wê demsalê de berf dibare, sir û seqem, berf û baran lê kêm nabe, bi taybetî li Kurdistanê berfa ku dibare gelek e. Ji bo zivistanê li derdora Farqînê peyva “jivistan”, li Urmiyê peyva “zistan”, li Dêrika Mêrdînê peyva “zivtan”, bi li Sêrtê jî peyva “vîstan” tê bikaranîn. Heman peyv di zimanê pehlewî de bi gotina “zem”, bi zaravayê Zazakî û bi zimanê Farsî wek ”zimistan”, bi zaravayê hewramî wek “zimsan”, bi zaravayê soranî wek “zistan” û bi zimanê Osetî jî wek “zimag” tê bilêvkirin. Ji ber ku Zivistan ji çar werzên salê yê herî sar e, di vê werzê de gel nikare karan bike û li ber tendûrê rûdinên. Bêguman ev rûniştina li ber tendûrê ji bo folklora kurdî ya devkî keresteyên baş derdixe holê (Oncu, 2020, r. 1208).

1. **Zivistan di Efsane û Baweriyê de**

Di efsane û baweriyên kurdan de jî zivistan derbas dibe. Li jêrê em ê qala hin efsane û baweriyên ku derbarê zivistanê de ne bikin. Ewilî em ê rave bikin ka efsane û bawerî çi ne.

Peyva efsane bi eslê xwe ji Farisî hatiye. Bi erebî ji bo efsaneyê peyva “esatîr” yan jî “ustûre” derbas dibe. Bi îngîlîzî “legend”, bi Almanî “sage”, bi Fransî “légende”, bi îtalyanî “leggende”, bi îspanyolî “leyenda” tên bikaranîn. (Sakaoglu, 1980, r. 4). Wekî em di mînakan de jî dibînin di zimanên rojavayî de koka têgeha efsaneyê ji peyva latînî “legendus” tê. Ev têgeha latînî, çîrokên ezîzên Xrîstiyan in ku di cejnan de, di ayînên pîroz de dixwînin ku derbarê jiyana ezîzan de ye.

Ji ber ku çarçoveya baweriyên gelî berfireh e, pirî caran li ser baweriyên gelî pênaseyên cuda hatine kirin. Lê ji ber ku navbera baweriyên gelî û derûniya mirovan ji hev ne qut e, pênaseyên ku hatine kirin jî gelek caran dişibin hev. Alfred Lehmanî di pirtûka xwe “Bawerî û Sêr” da li ser pênaseyên baweriyên gelî wiha gotiye: “Bawerî, ew tiştê ku di serdemekê de ji realîteya zanistî û olî dûr e û di heman demê de jî di nava gelî de hatiye qebûlkirin û bûye parçeyeka ji jiyana mirovan”. Herwiha Kant jî dibê je ku “baweriyên gelî; ji qanûnên jiyana rasteqînî dûr in”. Di encama van nêrînan de mirov baweriyên gelî dikare bi vî awayî pênase bike: Baweriyên gelî teqez li gor olekê nîn e û esil û fesilê wê jî tune ye. An jî li gor demeke dûr û dirêj tu bingeheke wê ya zanistî jî tune ye, bi tevahî xwezayî û ferazî ye. Bi xwestekeke xwezayî jî di pêşeroja jiyana mirovî de cihê xwe digire. (Vural, 2021-2022, r. 50).

Mirov dikare wateya peyva baweriyê bi zimanên cuda bîne zimên. Peyva baweriyê yan jî “batil” ji “butlan”ê tê. Butlan jî tê wateya “neheqî”, “valabûn”, û “bêhikûmtî”yê. Di nava gel de gelek caran ji dewsa peyva “batil yan jî baweri”yê peyva

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

“xurafe” tê bikaranîn. Ev tişt jî şaş e û şaşîtîyê derdixe holê. “Xurafe” jî peyveke erebî ye, lê wateya wê “çîrokên ecêb ên olî ye” yan jî peyvên bêbingeh û bêwate ne. . (Vural, 2021-2022, r. 50).

Piştî ku me pênaseya efsane û baweriyê da, li jêrê em ê derbarê hinek efsane û baweriyên ku di derbarê zivistanê de di çanda kurdan de derbas dibe hinek agahiyan bidin.

Di çîrokeke kurdî ku navê wê *Mewijên Eynterî* ye baweriya derbarê zivistanê de bi vî awayî derbas dibe: Eynter bazirgan û xwediyê karwanekî mezin bûye, di serê heyama zivistanê de 40 meqijî dike bêrika xwe û rojê yekî dixwe. Li gorî hesabê wî dema ku mewijên di bêrika wî de biqedin zivistan jî dê biqede. Lê hesabê wî û mewij hev nagirin ji ber ku du mewij bi hev ve dizeliqin û Eynter herduyan bi hev re dixwe. Ji ber ku wusa hesab dike ku zivistan qediyaye Eynter dikeve rêya xwe diçe seferê. Di rê de tofan radibe û Eynter di nav tofanê de dimîne. Ji ber neçariyê hêstira xwe serjê dike û dikeve nav postê wê (Ûskan, 2017, r. 122).

Dîsa dehikên dermaleyan edetek e ku li zivistanê pêk tê. Li gorî vê edetê dermale (ew heywanê ku li derê malê tê xwedîkirin ku qelew be û paşê tê serjêkirin) di şeveke bibaran û sar li ber şewqa çirayê tê serjêkirin. Di şevên bibaran û sar de cîran naçin mala hev û kes bi kesî nabe mêvan. Goştê dermaleyan pir biqîmet e. Lewma xwediyê dermaleyê naxwaze goştê xwe bi kesên din re parve bike. Ji ber vê yekê dermale şeveke ku kes naçe mala kesekî de tê serjêkirin. Hin goştê wê wê demê tê xwarin. Hin goştê wê jî dikin qelî û hildidin. (Ûskan, 2017, r. 121).

Li welatê bakur, tarî, sar, şev û şevên zivistanê, di wextê bahoz û bagerên berfê de ku roj û tav tê niximandin bi awayekî bêyom û xerab tên teswîrkirin û pê tê bawerkirin (Subaşı,2, 2022). Disa wekî ku Subaşı (Subaşı, 2022, r. 2) îfade dike Aşît û Afat ku du felaketên eskatolojîk in û ziyankar in weku zarokên dêwan hatine nirxandin. Bi piranî ev afat di ba û bager û tofana zivistanê de pêk tên. Weku di Avestayê de jî dibore anîna zivistanê karekî dêwan e ku ev bawerî îşaretî wir dike. Jixwe bi vê bawerîyê re peywendîdar li bal Êzdîyan ruhê neqenc ê bi navê Sibat jî heye ku bi sermayê û surê ve girêdayî ye. Dîsa di nav mîtolojîya Îranî de tofan bi bager, sur û sermaya zivistanê pêk tê. Di serdema Cemşîd de Ehûremezda ji Cemşîd re dibêje dê zivistaneke pirberf û kujer were. Divê tu Verêyek ava bikî û ji her tovên kerî û mirovan lê bicivînî, jiyan û mirovahiyê biparêzî.

2. **Zivistan di Gotinen Peşiyan û Biwêjan de**

2.1. **Gotinên Pêşiyan**

Gotinên pêşiyan û biwêj hemayên zargotinê ne ku bi taybetî di kurdî de bi hezaran numûneyên wê hene. Yek ji sedema girîng ya vê yekê jî ev e ku di kurdî de folklora devkî gelek pêş de çû ye ûv ev numûne jî keresteyên folklora devkî ne.

Di kurdî de hema derbarê hemû aliyên jiyanê de gotinên pêşiyan û biwêj hatine gotin. Herwiha derbarê zivistanê de jî gelek gotinên pêşiyan û biwêj hatine gotin.

Di vê binbeşê de em ê nimûneyên gotinên pêşiyan ên derbarê zivistanê de hatine gotin bidin û derbarê van nimûneyan de hin ravekirin û şîrovekirinan bînin zimên.

Ewilî em dixwazin pênaseya gotinên pêşiyan bidin û derbarê taybetiyên wan de hinek agahiyan bidin: Gotinên pêşiyan ew gotin in ku bi salan ji aliyê pêşiyên me hatine gotin heta îro hatine. Gotinên pêşiyan tecrubeyên kal û bavên me heta roja îro tînin û bi

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

saya wan em dersekê ji tecrubeyên wan distînin. Gotinên pêşiyan heman fikir, raman û helwestên gel nîşan didin û rêyekê nîşanî me didin. Helwesteke ku bi gotineke pêşiyan ve hatiye piştrastkirin ji aliyê herkesî ve tê qebûlkirin. Dema ku nakikiyek di navberê de çêbibe gotineke pêşiyan wekî hikumekî tê dîtin û rêyek nîşan dide. Hin taybetiyên gotinên pêşiyan hene ku divê em hinek ji wan binivîsin. Mirov nikare peyvên gotinên pêşiyan biguherîne, divê mirov bi heman peyvan îfade bike. Heke wusa nebe ahenga gotinê xira dibe û herwiha wateya wê jî xira dibe. (Aksoy, 1988, r. 132).

-Agir gula zivistanê ye

Agir di zivistanê de ji bo xwegermkirinê tê bikar anîn, lewma ji ber sir û seqema Kurdistanê qîmeta êgir hêj zêdetir dibe. Di vê gotina pêşiyan de “agir” şibandine “gul”ekê ku gul nebateke gelek xweşik e. (Oncu, 2020, r. 1208).

-Bihara pez, payîzê rez, zivistanê ez.

Ev gotin, bi devê jinekê ve hatiye gotin. Dibêje dema biharê wextê elaqedarbûna bi pêz re ye, payîzê bi rezê xwe ve bikeve û zivistanê jî bi min û mihabeta min ve mijûl bibe.

Çil çil e, çil piştî çil e, nûka bihara ji dil e.

Ev gotina ku di hesabê salnameya kurdî de hesabkirina rojên zivistanê ye, dibêje; çil roj piştî çileyê zivistanê, mirov êdî digihêje rojên biharê. Herwiha çend guhertoyên vê gotinê jî hene, wekî:

-Çil çile ye, çil biçe ye, çilekî din, paşê bihara me ye.

-Çil piştî çile, nû giha bihra jidil e.

-Çile, çil roj jî ji piştî çile, hê nû tê bihara jidil e. (Oncu, 2020, r. 1209).

Dibêjin tu here serma zivistanê ji çermê kuçikan pirs bike (Oncu, 2020, r. 1212).

Ev gotin ji aliyekî ve şîdeta sermayê rave dike. Sermaya Zivistanê heqas gelek e ku mirov ji xwe re hundir de rûdinê ferqê de nîn e. Lewma ji bo mirov baş jê bizane divê mirov ji halê kûçikan binêre ku ji ber sermayê diqefilin. Herwiha li aliyekî din ve jî wuha tê şîrovekirin ku kesê ku di nav belayekê de ye derd û belayên wê bûyerê baştir dizane.
Her zivistanek bihar li pey e. (Oncu, 2020, r. 1213).

Ev gotin derbarê “hêvî”yê de ye. Zivistan meha sir û serma û tengasiyê ye lê bi biharê re derûdor xweş dibe û dilê merivan jî bi wê germ dibe. Lewma wekî ev gotin jî îfade dike, piştî sir û seqema zivistanê bihar tê. Bihar semboleke hêvîyê ye.

Li jêrê hinek gotinên pçşiyan yên din ku derbarê zivistanê de hatine gotin hatine nivîsîn:

Sibat tiro viro, adar ma bîst û du roj.

Sibatê kûçik xwe davêjin siya latê.

Sibatê, berf û ba tê.

Serê kanûnan, selata xiyaran.

Sibat jina bî ye, sibê dikene êvarê digirî.

Sibat, gur hat.

Sibat e, malxoyê mal e ne kar e ne xebat e, kevanî di nav malê a maye mat e.

Sibat e, berf dibe qula te.

Meha Sibatê, geh baran e, geh tav e, geh jî ba tê.

Sibat disibsibîne, adar diqesibîne, nîsan dibêje tu qemçikê bi destê min gîne.
(Karker, 2015, r. 50,).

2.2. **Biwêj**

Di her zimanî de biwêj hene. Û mirov dikare biwêjan ji gelek hêlan de binirxîne, wekî: Sosyolojî, psîkolojî, felsefe, dîrok, exlaq, folklor… ji ber xweşgotina wan, hêza vegotina wan, zengîniya têgehî ya wan biwêj di zimanekî de pêkhateyên gelek girîng in. (Aksoy, 1988, r. 131).

Biwêj gotinên anonîm in. Helbet biwêj ji aliyê hin kesan ve hatine afirandin. Lê dema ku ji aliyê gel ve hatine bikaranîn bi demê re guherîne û "bingeha xwe girtine, bûne weke qalib". Ji ber vê yekê mirov nikare rêza peyvên biwêjan xira bike û mirov nikare peyvên biwêjan biguherîne û ji dewsa wan – her çiqas di heman wateyê de be jî- peyvên nû bikar bîne.

Digel gotinên pêşiyan gelek biwêj jî hene ku derbarê zivistanê de hatine nivîsîn. Me hinek ji wan li jêr nivîsandin.

Çilê zivistanê bûyîn: Di çil rojên zivistanê yên sar de bûyîn. (Oncu, 2015, r. 116).

Zivistanê ser girt: Zivistan bi hemû dijwariya xwe hat, sar û serma daketin. (Oncu, 2015, r. 591).

Di sir û sermayê de; di sir û seqema zivistanê de: Ku mirov di sir û sermaya zivistanê de tiştekî bike ev biwêj tê gotin. Minak: Di vê sir û sermayê de li derve çi dikî bira? (Zeraq, 2005, r. 455).

3. **Hin xwarin û vexwarinên zivistanê**

Di nav kurdan de xwarinên zivistanê bi cur bi cur xwarinan pêk tê. Li jêrê me hinek xwarinên ku ji aliyê kurdan ve li zivistanê tên amadekirin nivîsandin. Hinek xwarinên li jêr ku me dane di cur bu i cur deverên Kurdistanê de tên çêkirin. Dibe ku hinek ji wan bi navên cuda bêne zanîn.

Şorbeya Kuşneyê: Ev xwarina bi hinek kuşne, savar, pîvaz, ava goşt, birinc, xwey, biharat û bi taybetî jî îsotê pêk tê. Van zadan di nav beroşê de dikelînin û xwarin amade dibe. (Çelik, 2016, r. 7).

Şorbeya nîskan: Ev xwarin wekî em dizanin di mitbexên gelên din de, wekî yên tirk, jî berbelav e. Cureyeke şorbeyê ye ku bi nîskan tê çêkirin. (Çelik, 2016, r. 8).

Qebûlî: Xwarinek bi lezzet e ku bi birincê, bi nokên şikestî û bi hestiyên çêlek an jî bi hestiyên mîhan tê amade kirin. Bi vî şiklî tê amade kirin (Çelik, 2016, r. 8).

Savar: Ev xwarina jî dîsa xwarinek e berbelav e. Di deveran cuda bi navên cuda jî tê naskirin. Wekî mînak li herêma Mêrdînê li hin deveran jê re "girar" jî tê gotin. (Çelik, 2016, r. 8).

Meqalûr: Ev xwarin di herêma bajarê Urmiye, Sumay an jî li Beradûstê tê çêkirin. Ev xwarin pirr tûj û bi lezzet e. Bi kundir, nokên sipî û bi îsota sor çêdibe. (Çelik, 2016, r. 9).

Şorbeya Birwêş: Birwêş cûreyek ji zadan e. Gelek însan birwêşê wekî savarê zen dikin lê ne savar e. Savar ji kepekên wê hatiyê çêkirin lê birwêş cûreyek savarê ye. Helbet jê biçûktir û ziravtir e. Îhtîmalek mezin li herêmên Kurdistanê digêhije û tê xwarin. (Çelik, 2016, r. 9).

Lepêne: Amadekirina wê wekî kuşne û nîskê ye lê xwarina vê xwarinê ji kuşne û nîskê kêmtir e. Ferqa wê ev e ku ava bacana dikeviyê û wekî ava goşt aveke bi tirît jê re çêdikin û dixwin. (Çelik, 2016, r. 10).

Porîşke: Ev xwarin ji heft cure malzemeyan pêk tê ku ew jî ev in: Şehriye, pîvaza sorkirî, mişmiş, nok, fasolî, nîsk û hêk. (Çelik, 2016, r. 10).

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Genimşîr: Xelkên Elşîtir ên bajarên Loristanê di zivistanê de ji mêvanên xwe re xwarinên cûreyên genimî çêdikin. Genim dixin beroşekî, hin şîr berdidin ser, qasek disekinînin paşê genim li ber tavê hişk dikin û li qox hildidin. Zivistanê tînin dikelînin û carna hinek mewij jî tev dikin, dixwin. (Çelik, 2016, r. 10).
Şewpate: Xelkê Mahabadê di gundên xwe de di mehên zivistanê de tibabek zad paqij dikin û dixin hûndirê dîzikê. Mahîçe û hestiyan jî dixin nav. Piştre hinek av, biharat û xwê tevlî wê dikin. Sêniyêk vala datînin ser devê dîzikê û bi heriyê devê wê digirin û dixin hûndirê tenûrê. Roja dinê dîzikê ji bo taştê ji tenûrê derdixin, heriya ser wê davêjin û xwarina xwe bi noşîcan dixwin. (Çelik, 2016, r. 11).
Pirpole: Di bajarê Qizqorpî de gelên Efşarê di mehên zivistanê de ji ard hevîr peyda dikin û ji wî hevîrî jî şehriye çêdikin. Tibabek nokên kelandî, na’ne, zeyt, zerdeçal, pîvazek hûrkirî, xwê û hinek av dixin nav. Heta ku baş bipije dixin nava tenûrê. Ji vê xwarinê pirr îstîfade dikin. (Çelik, 2016, r. 11).
Xurma û Ron: Tibabek xurme ji dendikên wê derdixin û dixin sêniyek metal. Hinek ava germ bera ser wan didin û datînin ser êgir. Gava kelîya tibabek ard tevlî wê dikin û heta ku baş bipije li nav hev dixin. Herî dawî zeyta sorkirî davêjin ser wê. Ji bo enerjiyeke baş bide mirovan vê xwarinê amade dikin û dixwin. (Çelik, 2016, r. 11).
Tirxêne (Şelemên): Çend heb tirxineyan dixin beroşekê û hinek ava cemidî bera ser wê didin û datînin ser êgir da ku xweş bikele. Piştî ku keliya pîvaza sorkirî, xwê û îsotê davêjin ser wê û dixin sêniyekê. Piştre hinek zeyta qelandî bera ser wê didin û dixwin. Ji bo ku xwe ji sermaya zivistanê biparêzin û ji bo hinekî nava wan germ bibe vê şorbeyê di demên sar ên zivistanê dixwin. (Çelik, 2016, r. 11).
Xidir Zendok: Xelkên Mukriyanê di panzdeh rojên ewil yên meha zivistanê de simnûpizanê yan jî bi navê xwe yê din xidir zindokê ji xwe re kirinin wek kevneşopekê. Genimên şînbûyî di hawanê de dipelçiqînin, ava wê distînin û diparzinînin. Dixin mencelên paxir ên mezin, datînin ser êgir dikelinin û ava genim jî bera ser didin. Piştî ku ew ava genim pijiya, tibabek ardê genimê xas li ser zêde dikin û çend kesan ji bo vî karî dikin berpirsyar. Kesên ji bo vî karî hatine eyarkirin di wextê xwe de simnûyê (cureyek şeraniya genim e) tev didin da ku binê wê negire. Pijandina semenûyê êvarî tê çêkirin. Piştî ku semenûyê çêdikin heta ku dema xwe bistîne wê disekinînin. Hemî kesên ku ji bo amadekirina semenûyê hatine ba hev li dora qazanê kom dibin û nîyet dikin. Di vê navberê de kesek ji wan bi dengekî bilind xîtabî xizir aleyhîselam dike û dibêje: ‘’ Ey Xizir aleyhîselam em hemî li dora semenûya te kom bûne û her yek daxwazên wan ê cûda cûda hene ku tu ji van daxwazan agahdar e. Sond ji Xwedayê ku heta neha te zindî hiştiye, arezû û daxwazên me bi cih bîne da ku tu heta hetayê zindî bimînî. (Çelik, 2016, r. 13).
Kortikên Keleman: Bi piranî malbatên Sineyê di şevên yeldayên de kortikên keleman çêdikin. Ji bo amadekirina wê birinc, şînkayî, goşt, mewîj û zeytê dixin nav hev. Ji vê têkelê re ‘’pasay dolme’’ dibêjin. Vê têkelê dixin nav pelên kelemên ku ji berê de din av avê de hatiye kelandin. Van pelan yek bi yek dipêçin û di binê beroşekê de rêz dikin. Piştre hinek av bera ser beroşê didin. Gava xwarin çêdibe û baş dema xwe distîne wan kortikan dixin sêniyên porselen ku xelk ji van sêniyên porselen re ‘’dewrî ‘’ dibêjin. Piştre hinek dims û zeyt jî li ser zêde dikin. Namzetên malen ku li ser kursîyên dûrî hev rûdinên kortikên keleman bi petêxên tirş, bi çerezan, bi mewîjan û bi cûreyên wekî van tiştan dixwin û şeva xwe bi kêfxweşî û bextewarî derbas dikin. (Çelik, 2016, r. 14).

Sayle: Ji xwarinên zivistanê ye. Tibabek qawût (cûreyek ard e) û hinek kuncî li nav hen dixin. Di serî de qawûtê dixin qabekê û hinek av bera ser wê didin. Piştre wê datînin ser êgir û qedera bîst deqîqeyan li ser êgir dikelînin. Piştre nîv kîlo şekir û pîvaza sorkirî bera ser wê didin. Piştî nîv saetê şorbeya sayleyê qenc çêdibe. (Çelik, 2016, r. 14).

Digel van xwarinên ku me hejmartî herwiha hin xwarin jî hene ku ji bo “amadekariya zivistanê” tên çêkirin û tên veşartin û parastin û zivistanê tên xwarin. Li jêrê em ê hinek ji van xwarinan binivîsin.

Hinek cureyên penêr hene ku tên veşartin ku ji wan yên li jêr me hejmartî herçiqas di çavkaniya me de wekî penêrên Dîyarbekirê hatiye terîfkirin jî di gelek deverên din jî tên çêkirin. Ji ber ku di Kurdistanê de cure cure pincar hene, gelek penêrên li jêr me hejmartî bi pincarekê tê çêkirin ku tameke xweş jê derdikeve.

Penêrê babûrî,
Penêrê bisîrik,
Penêrê derfa,
Penêrê bipincar,
Penêrê badayî/keziya,
Penêrê siyabo,
Penêrê şoravê,
Penêrê teze,

Toraq.

Digel van hinek nimuneyên wekî goşt jî tên çêkirin û ji bo zivistanê tên rakirin. Ji van, goşt serî dikişîne. Dema berê goşt dihate kelandin û dixisitine nav kûpan û rûnê nivîşk berdadine ser û heta zivistanê dihate parastin.
Wekî din:
Kedit (qedîd, sernisî, goştê meqsûd): Ev cureyê goşt tê hişkkirin û ji bo zivistanê tê parastin. Amadekirina wê wiha ye: Heywanek tê serjêkirin, du rojan li derve disekine, paşê diguron, û temîz dikin, bi kêran ker dikin, dixine qabeke mezin û xwey dikin, du roja ji bo ku xweya xwe bikişîne nav qab de disekine. Paşê li cihekî tê dardakirin ji bo ku hişk bibe. Qedera bîst rojî wusa hişk dibe û paşê ji bo zivistanê tê veşartin.

Herwiha xêncî van xwarinan hinek xwarinên zivistanê yên din jî hene ku em li jêr dinivîsin:
Qelî: Goştê sor e ku bi tevayî don tê kelandin û ji bo zivistanê tê parastin.
Şirdan (Şîlav) : Ev jî dîsa cureyeke goşt e ku tê kelandin û parastin ji bo zivistanê.
Şehrîye (Şehîre) : Ev wekî cureyeke makarnayê ye ku bi rûn, ard, xwey tê çêkirin, tê hişkirin û tê veşartin û zivistanê derdixin di nav av û rûn de dikelînin û dixwin.
Zahter: Bi quncî û nokan tê çêkirin. Û wekî şehriyê tê veşartin û zivistanê tê çêkirin û xwarin.

Herwiha hin cureyên xwarinan hene ku divê em navê wan binivîsin ku ji bo zivistanê tên amadekirin û veşartin:
Ava bacanan (salçe), **tirşîn**,

Dîsa hinek xwarin tên hişkirin û ji bo zivistanê tên parastin wekî: **îsot**, **bacanê reş**, **bacanê sor**, **simaq** (Öncü, 2015, rr. 50-73).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Çalakiyen Zivistanê

Şevên zivistanê gelekî dirêj bûn. Lewma gel pêdiviya wan hebû ku li cihekî rûnên sohbet bikin, hev bibînin, biaxivin û lîstikan bilîzin; û bi vî awayî jî bêhna xwe fireh bikin. Li jêrê me derbarê hinek çalakiyên ku di zivistanê de dihatin kirin nivîsandin.

3.1. **Şevbuherk**

Li Kurdîstanê bi taybetî li heremên wek serhedê zivistan pir dijwar derbas dibin. Li van deveran berf gelek caran şeş heft mehan li erde dimîne deşt û çiya bi berfê mişt dibin; mirov jî ji mecbûrî li cih û warên xwe mane, ew şevên dirêj yên zivistanê jî wek barên ser baran e. Gel ji bo dembihurandinek xweş piştî kar û barên xwe, li hev kom bûne. Kurdan ev hatina ber hev wek "şevbihêrk" bi nav kirine. Şevbihêrk bêjeyeke hevedûdaniyê, ji bêjeya şev û bihurandin (borandin) pêk tê. Ew jî tê wateya xweş derbaskirin, bihurandina şevê. Dengbêjan ev şevên dirêj, bi çîrok, pekenok, mamik û stranên xwe neqişandine, bûne xeml û xêza van şevbihêrkan. Ev şevbihêrk gelek caran li qesr û qonaxên mîr û began, carinan jî li odeyê gundan dihatin lidarxistin. Dema dengbêjên gerok bihatina civat ji bo xatirê wan bi carekê kom dibûn (Güney û Erol, 2019, r. 131).

Di şevbuhêrkan de dengbêjan bi rêzê stranên xwe digotin. Hin caran jî dengbêjan diavêtin ber hev. Yanê dengbêjan li hemberî hev stran digotin û bi vî awayî ev rewş wekî pêşbaziyekî berdewam dikir. Hin dengbêj di vê avêtinaberhev de serdiketin hinek jî tên diçûn.

Di şevbuhêrkan de digel dengbêjiyê meselok, çîrok jî dihatin gotin. Hin kesên ku bi çîrokbejiya xwe navdar in çîrokên xwe digotin û ew kesên devdorê jî guhdar dikirin. Bi vî awayî bi saya şevbuhêrkan ew şevên sar ên zivistanê germ dibû, û herwiha bi vî awayî hem li cihekî germ berhev dibûn xwe germ dikirin hem jî bi vê çalakiyê bêhna xwe di şevên zivistanê de fireh dikirin.

3.2. **Lîstik**

Şevên sar û dirêj ên zivistanê de dem zehf bû. Lewma digel ew çalakiyên me li jor hejmarî hinek lîstikên zivistanê jî di nav gel de berbelav bû, ku bi saya van lîstikan şevên dirêj ên zivistanê ji wan kurttir û xweştir dibû. Li jêrê em ê hin lîstikên ku di zivistanê de ji aliyê kurdan ve tên lîstin birêz bikin.

Lîstika Gorê

Ev lîstik li devera kurdên Mukrî de tê lîstin. Dibe ku li deverên din jî hebe û bi heman navî yan jî bi naveke cuda bê lîstin. Ev lîstik bi deh goreyên hevreşîmî tê lîstin. Ev lîstik bi du koman tê lîstin. Ev herdu kom di nav xwe de bi çar grûbî yan bi heşt grubî dabeş dibin. Gore bi awayekî du rêzî li hemberî lîstikvanan tên rêzkirin. Kesên ku vê lîstikê baş dilîzin kevirekî biçûk û gilover li binê tilîyên xwe de vedişêre û kêvir dihêle di hundirê goreyê de. . Koma li hemberî vê komê, gereke bi awayekî balkêş dest û tevgerên wî temaşe bikin û bizanin ku ew beşen di nav hundirê kîjan gorê de ye. Di her komekê de kesekî bispor heye.Koma hemberî dikarin, sê goran hilbijêrin û dikarin hinek goran jî ji lîstîkê derbixin, lê eger bawer bikin ku ew beşen di nav hundirê ew gorên hilbijartî de ne dibêjin: Gul! Lê ihtimale ew beşên di nav gorên hilbijartî yên din de be jî... Eger ew bi sê ceribandina wê beşenê peyda nekin, puanek ji bo gruba hemberî tê hesibandin. Ev lîstîk çend caran tê dubarekirin û koma cara ewil puana xwe kire panzdeh, ew kom qazanç dike. (Sabri, 2016, r. 9)

Şah û Wezîr

Ev lîstik li navçeya Sencaî ya Kirmanşahê dema Zivistanê tê lîstin. Ev lîstik bi qabekî tê lîstin. Ew qab divê çar aliyên wê hebin: Aliyek şah, aliyek vezîr, aliyek dewlemend, aliyê din jî diz e. Ew kesên ku li wê derê hazir in bi rêzê ve ewî qabî davêjin. Ewilî şah derdikeve, dûv re wezîr, dûv re dewlemend û herî dawî jî diz derdikevin. Dema ku diz derdikeve ew kesê dewlemend destê diz digire dibe cem wezîr, wezîr wî dibe cem şah, şah piştî çend pirsan cezayê wî dide. (Sabri, 2016, r. 9.)

Qeşe Qeşanê

Ev lîstik li Senendecê tê lîstin. Bi taybetî di navbera ciwanan de tê lîstin. Tişstekî wekî qabekî radikin û bi wê şah û wezîr têne hilbijartin. Ew kesên berhevbûne wî qabî diavêjin. Eger kesek diz an derewîn derkeve bi destûra şah û wezîr şeleqan lê didin. Eger ew kes nekarî taba şeleqan bîne wê gavê ji cimaetê re fêkî yan şisînayiyê tîne. (Sabri, 2016, r. 10.)

Lîstika hêka xirabbûyî

Çend kes yên ji herêma Şerîf Axa, şevê derdorê hev du kom dibin bi hevdu re lêba dikin. Yek ji wan hêkekê nîşanî cimae'tê dide û dibêje: Ev hêka li bin komê de, Destar, her kesê ku dixwaze, bila bêje, ez ê bêhn bikim û wê peyda bikim, kesek ê biçe li ber derê hevalê wî, hêkê didane li bin komê, kesê ku mêhvan e an jî ji wê derê biyanî be û wê lîstikê nizane, wê bibêje hevalê xwe: Were endam be dibîne ew dostê wî komên hemuyan bêhn dike, dema şikê bibe li ser yekê ku hêk cem wî ye mistekê li nav serê wî dixe, wê demê hêk dişikê, ew hêk li ser û rindînê wî de jor de tê xwar û cilê wî qirêjû dike, ew mêhvan jî pê dikenin û keyfxweş dibin. (Sabri, 2016, r. 10.)

Encam:

Me di xebata xwe de di bin van serenavan de behsa çalakiyên zivistanê di folklor û çanda kurdî de kir: *Efsanê û Baweriyên Zivistanê*, *di gotinên pêşiyan û biwêjan de zivistan*, *Hin xwarin û vexwarinên zivistanê*, *çalakiyên zivistanê wekî şevbuhêrk û lîstik.*

Zivistan wekî hemû demsalan demsalek e lê her demsalek taybetiyeke wê heye. Lewma Zivistan jî xwedî gelek taybetmendiyan e ku me di destpêkê de behs kiribû û wekî ku di hemû demsalan de ji aliyê folklorê ve nimûneyên cuda cuda tên ber çavên me di zivistanê de jî dîsa nimûne û keresteyên cuda têne ber çavên me.

Bi çavkaniyên ku me karî em xwe bigihênin me keresteyên folklorê yên zivistanê berhev kir û li vir pêşkêş kir. Em hêvî dikin ku ev xebata me ku me ji çend çavkaniyan û nêrînên xwe îstîfade kir û nivîsand dê ji bo yên ku elaqedar bin bibe çavkaniyek ku jê îstîfade bikin.

Çanda kurdî ji aliyê nimûneyên folklorîk ve zehf dewlemend e. Armanca me ji bo nivîsandina vê nivîsarê jî ew bû ku em derbarê hin keresteyên folklorîk ên di çanda kurdî de û ên derbarê zivistanê de raxin ber çavan. Em hêvîdar in ku kêrhatî be.

ÇAVKANÎ:

Cihat Güney, Kemal Erol, *Di Zargotina Kurdan De Erka Saziya Dengbêjiyê*:, Uluslararası Denbejlik Kültürü ve dengbejler Sempozyumu, Sempozyum Bildirileri, Şırnak Üniversitesi, 2019.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Dilawer Zeraq, *Deyimler Sözlüğü Ferhenga Bijêwan*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005.
Haşim Selimî, *Zimistan Der Ferhengî Merdumê Kurd, Surûş, Tehran, 1381.*
Kenan Subaşı, *Dêw û formên dêwan di folklora kurdî de*, Avesta, 2022.
Kübra Çelik, *Teza Lîsansê*, Zanîngeha Mardin Artuklu Fakulteya Edebîyatê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Merdîn, 2016.
Mehmet Oncu, *Gotinên Pêşiyan (Senifandin, Şîrove, Ferheng),* Berg 4, Sitav, Van, 2020.
Mehmet Oncu, *Ferhenga Biwêjan*, Sitav, Van, 2015.
Mehmet Öncü, Meyir – Diyarbakır Yemekleri ve Yemek Kültürü, Gün Matbacılık, İstanbul, 2015.
Miradê Karker, *Di Zargotina Kurdan de Demsala Zivistanê*, **Folklora Kurdan**, Sal 1, Hejmar 1, Gün Matbacılık, Diyarbakır, 2015.
Nûredîn Vûral, Baweriyên Gelî, **Folklora Kurdan**, Hejmar 10, Gün Matbacılık, Diyarbakır, Sibat 2021-2022.
Ömer Asım Aksoy, Atasözleri Deyimler, Türk Dili Araştırmaları Yıllığı Belleten-1962, TDK Yay: 217, Ankara, 1988.
Sabri , *Teza Lîsansê*, Zanîngeha Mardin Artuklu Fakulteya Edebîyatê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Merdîn, 2016.
Sadiq Ûskan, *Payîzxêr*, Wardoz, Istanbul, 2017.
Sakaoglu, Saim, Anadolu Türk Efsanelerinde Ta Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Katalogu, Ankara Üniversitesi Basımevi, Ankara, 1980.
Şükran Cevizli, *Teza Lîsansê*, Zanîngeha Mardin Artuklu Fakulteya Edebîyatê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Merdîn, 2017.

Kürt kültüründe ve Kürt folklorunda kış ve kış etkinlikleri

Özet:

Bu çalışmamızda tamamen halk hikâyeleri, gelenekler ve folklor üzerine kurulu Kürt folkloru, kış âdet ve kültürünü ele alacağız. Kürt folklorunda kışla ilgili pek çok bilgi vardır. Kürtlerde kış ve kış inancının ne anlama geldiğini göreceğiz. Kürtlerin yiyecek ve içecekleri kışın değişir. Kış avcılığı ve avcıları, bazı Kürt oyunları ve toplantıları folklorda yaygın olarak yer almaktadır. Köse ve kösegerî gibi oyunlar, Ocak ve Aralık ile ilgili bazı atasözleri, Kürt şairlerin kışın derinliği ile ilgili bazı şiirleri vb. bunların hepsi Kürtler arasında yaşanan köklü kış kültürünü gösteriyor. Birçok Kürt kasaba ve köyünde insanlar kışın çetinliğinin [çile] büyük ve küçük olmak üzere iki ay sürdüğüne inanıyor. Kışın çetinliği Aralık ayının başında başlar ve Ocak ayının onuncusuna kadar sürer. Böylece bu çalışmada Kürt folklorunda Kışın çetinliğinin/zorluğunun nasıl olduğunu ve Kürt folklor geleneğinin ne kadar geniş olduğunu görmüş olacağız. Bu bilgilerin yanı sıra kış günlerinde oynanan ev içi oyunlardan bazılarına da bu çalışmada değinilecektir.

Anahtar Kelimeler*: Kış, kış etkinlikleri ve oyunları, folklor, Kürtçe*

Winter and winter activities in Kurdish culture and folklore

Abstract:

In this study we will discuss the Kurdish folklor, customs and culture in winter that are based entirely on folk tales, dictionaries and folklore. There is a lot of information about winter in Kurdish folklore. We will see what winter and winter beliefs means among the Kurds. Food and drink of the Kurds change in the winter. Winter hunting and hunters, some Kurdish games and gatherings are widely mentioned in folklore. Games such as kose and kosegerî, some proverbs about January and December, some poems of Kurdish poets about depth of winter and so on; these all show the deep-rooted winter culture that has taken place among the Kurds. In many Kurdish towns and villages, the people believe that depth of winter [çile] lasts for two months as the big one and the small one. The big depth of winter begins at the beginning of December and lasts until the tenth of January. In this way we will see in this study how Depth of winter is in Kurdish folklore and how broad the Kurdish folklore tradition is. In addition to this information, some of the home games that are played on winter days will also be mentioned in this study.

Keywords: *Winter, activities and games in winter, folklore, Kurdish.*

هەوالنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

“Di Şahnameyên Kurdî de Cih û Rola Sîmurx wek Hebûnekî Sersirûştî”

Dr. Shahab Vali
Zaningeha Mêrdîn-Artuklu/ Turkîya

PUXTE:

Di çanda İranî/Kurdî, devkî yan nivîskî, de yek ji hebûnên derasayî Sîmurg e. Navê Sîmûrg di nav aferîdeyên sersirûştî yekem car di metnên zerdûştî de wek Saenaya (bi pehlewî: Senmurv) tê behskirin. Li gor edebiyata zerduştî, Sîmûrg li ser darekê dijî ku hemû tov tê de ne, bi perên xwe şer dike, tovên ku bi baran û bayî hatine li ser hemû rûyê erdê belav dike.

Hebûna Sîmurg di binhêşa kolektifa İranî/Kurdî de, piştî Îslam jî dewam dike û dikare bê dîtin ku Sîmûrg wek sembol, xwedî cihekî pir girîng e di serdemên îslamî yên Îranê de. Ev çûk wek nemir tê qebûlkirin, bi taybetî di pirtûka navdar a Farîd al-Dîn ‘Attar Nîşâbûrî (m. 1220) de. Sîmûrg, di berheman de, di nivîsên mîstîk de û ji aliyê ‘irfanî ve wek rêber an jî yekî nuwaze tê nîşandan. Xuyabûna Sîmûrg sembola “Eqlê Mutleq” e.

Ji xeynî edebiyata îrfanî, yek ji sahayên edebî ku Sîmurg tê de xwedî rolek giring e, edebeyata destanî û bi taybet jî çîrokên Şahname ye. Digel ku di beşa mîtolojîk a Şahnameyê de, hêzên derxwezayî tevlî jiyana insanan nabin, lê tê dîtin ku Sîmûrga wek nûnera xwedêyan, dibe parastvana Zal û kurê wî û bi îhtîmaleke mezin ew xwedî roleke totemîk e.

Armanca xebata hazir, nişandan û analîz kirina rol û cihê Sîmurg di rivayetên Şahnameyên Kurdî ye.

Peyvên Serekî: *Sîmurg, Edebiyata Kurdî, Destan, Mitolojî, Şehname*

Destpêk:

Bêguman sehaya herî girîng ku çîrokên mîtîk tê de tomar bûne û gihiştine roja me, edebiyata destanî ye. Edebiyata destanî, devkî û nivîskî, neynika gotin û vegotina çîrokên mîtîk e. Destan bi piranî wek “helbestek ku bi gelemperî ji kevneşopiya devkî ya kevnar, di forma vegotinek domdar de, destkeftiyên yek an çend karakterên lehengî ên dîrokî an efsanewî, pîroz dike”, tê pênasekirin.

Helbesta destanî, bi gelemperî helbestek dirêj e û mijara wê ya sereke jî serpêhatî û kiryarên awarte yên lehengek, mêr yan jin in, yên li hember xwedayan, hêzên tarî û sersirûştî. Destan bi piranî xwedî taybetiya neteweyî ne û bi vegotin û tekrarê destkeftî û serfiraziyên lehengên gelêrî, hisê xwebawerî û rabirdûyek bi ihtişam û zêrîn, ji bo nifşên nû ava dikin. Yanî em dikarên bibêjin ku mythopoeia, bi zanebûnê, afirandin û çêkirina destanên edebî, bi bikaranîna mythosên kevin ên gelêrî, xwedî rolek bingehîn û girîng e di avabûna hişmendiya gelan de. Destan behsa riwayetekê dike ku di serdemekê de, ji bo xelkê xwediyê wê destanê, wek rastiya tarîxî ya raboriya wan, derbas bûye. Helbesta destanî “objektîf” e û tenê dikare zarûriyetê temsîl bike û bi

Zakho Centre
for Kurdish Studies

awayekî derveyî riwayetê vebêje û ji kiryarê bêtir bi serketin û serfiraziyê re eleqedar e (Schelling, 1989: r. 248).

Naveroka helbesta destanî ji komek çîrokên mîtolojîkpêk tê, yên ku "dîroka pîroz" a mezin û gerdûnî ava dikin.(Montanari, 2012, r. 7) Lê forma bûyer/bûyeran, di riwayeta destanî de tên guhertin. Di heman demê de destanên edebî jî wek mythosê, bi gelemperî kompozisyonên kevneşopiyê ne û xwedî çend taybetiyanin. Yek ji taybetiyên girîng di destanên edebî de ev e ku di şerî de kiryarên derasayî dihewîne û di wan kiryarên mezin de îzed û hêzên sersirûştî yên din jî roleke aktîf dileyîzin. (Abrams & Harpham, 2012, r. 108.)

Di destanên edebî yên kurdî de jî hebûnên derasayî û aferîdeyên sersiruştî rolekî girîng dilîzin.Di nav aferîdeyên sersiruştî yên kudi çanda kurdî/ îranî de têne behskrin, Sîmurx, ku wek Teyrê Sîmir jî nasrav e, li pêşiya hemûyan e. Navê Sîmurx ku yekem car di metnên zerdûştî de wek "Saena"yê tê behskirin, bi pehlewî wek "Senmurv" tomar bûye. Li gor baweriya zerdûştî, Sîmurx li ser darê hemû tovan dijî, bi lihevdana baskên xwe, tovên ku bi baran û bayî re diçin, li ser hemû rûyê erdê belav dike.

Koka vê peyvê dibe ku "Sîn Morgh" be. Lêkolîner peyva "Maragho Saena"ya ku di *Avesta*yê de derbas dibe, wek "baz, balinde" werdigerînin (Ferenbeg Dadegî, 1380, rr. 171-172)û bi peyveke avestayî ya "varaghan" diyar dikin. Di nav van du konseptan de şibandinek heye: bi avestayî "Saena" û bi farisî "Sîmurx". Li vir peywendiyek heye di nav balindeyê navdar û navê zana-bijîşkekî de. Weku tê zanîn, di serdemên kevn de kesên ruhanî, ligel peywirên xwe yên dînî, bi tenduristî û dermankirinê re jî eleqedar bûn. Dibe ku yek ji zanayên dînî yên serdema kevn navê "Saena" hilgirtibe, navê vê balindeyê. Li gorî Avestayê ew xwediyê cihekî girîng ê ruhanî bûye û ji ber hêza xwe ya dermanî nasrav bûye. Di serdemên piştî wî de, balinde taybetmendiyên vî zanayî distîne: hunera dermankirina wî (Restgar Fesaî, 1381: r. 587).

Di metnêBundehişê de, ev balinde wisa tê behskirin ku çêlikên xwe bi şîr xwedî dike. Her wiha, wek balindeyeke bi "xwezayeke taybet" tê dîtin. (Ferenbeg Dadegî, 1380, rr. 78-7) Tê gotin ku hêlîna Sîmurx li ser darê bû û pêşî xirabiyê digirt(Rezî, 1376: r. 1849). Schmidt jî wisa nîşan dide ku Saena ji navê balindeyekî tê(Schmidt).

Sîmurx wek sembol, xwedî cihekî pir girîng e di serdemên îslamî yên Îranê de. Ev balinde hatiye nemirkirin, bi taybetî di pirtûka navdar a Ferîduddîn 'Ettar Nîşabûrî (m. 1220) de. Sîmurx, di berhem û nivîsên tesewufî de derbas dibe û ji bo 'arifan wek nîşaneya rêber an jî însanê kamil e. Tecelliya Sîmurx wek sembola "Eqlê Mutleq"û (Carnoy,1383, r. 45) rastiyê hatiye şîrovekirin (Amir-Moezzi, 1381, r. 94).

Di efsaneya îranî de sê aliyên Sîmurx hene: aferîde, însan û îlah. Wiha jî tê nîşandan: dirende, mamoste, perwerdekar. Her yek ji van hêmanan girêdayî têgehekêne: mirin, aferîde/dirende, vejîn: mirov/perwerdekar, zanyarî: îlahî/mamoste (Esma'îlî, 1381, rr. 193-194).

Daketina Sîmurx a ser rûyê erdê wek hevrêyêruhê însan xuya dike. Weku Corbin diyar dike, bi awayekî ev daketin, *hiérophanie* an teceliya "pîroz" e li ser erdê. Li gorî Corbin, Sîmurx bi daketina xwe ya ligel her ruhê însanî, di heman demê de jê cuda ye wek paradîgma, dijber û şirîka wî ya esmanî. Dikare bê gotin Sîmurx wî ruhî diparêze û çavdêriya wî dike (Corbin, 1971: r. 237).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Di çanda dinyaya îranî de, sehayek din a ku Sîmurx wek hebûnek sersirûştî, zana û şervan xwedî rolek girîng e, edebiyata destanî û bi taybet jî rivayetên Şahnameyêne. Di efsaneyên serdemên nêzîktir de, Sîmurx zarokên biçûk xwedî dike û her çiqas pênasekirina wê ligel Sîmurxa efsaneyek derengtir mimkun lê teqez nebe jî, ecêb e ku mirov çawa di *Şahname*ya Fîrdewsî de rastî balindeyeke nuwaze ya ji heman cureyê bê ku xwedî hêzên derxwezayî ye, û ew di çîroka Zal û kurê wî Rustem de xwedî roleke girîng e (Sarkhosh Curtis, 1994, r. 39).

Li gorî Behar, di beşa mîtolojîk a *Şahname*yê de, hêzên derxwezayî tevlî jiyana însanan nabin. Ji xeynî bûyerekê ku Sîmurxa wek nûnera xwedayan, dibe parastvanê Zal û kurê wî û îhtimaleke mezin e ku xwedî roleke totemîk be (Behar, 1352, rr. 46-47).

Di rivayetên *Şahname*yê de,kurdî an farisî, du aliyên Sîmurx hene: yekemîn sembola zanyariyê û qenciyê ye. Di beşa Zal û Rustem de em dikarin zanyariya wê bibînin. Ya din jî di çîroka İsfendiyar de dikare bê dîtin. Di çîroka İsfendiyar de, Sîmurx dibe sembola xirabiyê.(Raşid Mohessel, 1369, r. 95). Di *Şahname*yê de, ev balinde her wiha sembola metamorfozê (dirûvguherîn) ye. Sîmurx, wek bûyereke derxwezayî, xwedî çend taybetmendiyan e: hekîm û zanyar, kahîn, parastvanê Zal û malbata wî, tolhildêr. Em dikarin wî wek totema malbata Zal jî bihesibînin (Restgar Fesaî, 1381, r. 53).

Di Şahnameyên Kurdî de Rol û Cihê Sîmurx:

Şahnameyên Kurdî, ku bi zaraveyên cuda yên zimanê kurdî hatine gotin, kuliyateke mezin e li ser gotegot û çîrokên mîtolojîk, hemasî û lehengî ku kevneşopiya neteweyî, ayînî, dînî û civakî ya kurdan vebeyan dike. Ev mecmua bi piranî ji riwayetên mitolojîk û destanî yên pehlewanî-lehengî û car caran evînî yên çanda kurdan pêk hatiye û ji bo nasîna ayîn û kevneşopiyên kevin ên kurdan jî çavkaniyeke gelekî girîng e. Çîrokên Şahnameyê dikarin wekî yek ji navgînên girîng bên dîtin ku kurdan tarîxa mîtolojîk-lehengî-efsanewî yan “tarîxa zêrîn”a xwe pê veguhestiye. Yanî dikare bê gotin ku çîrokên Şahnameyê hem di çanda kurdan de cihê xwe yê folklorîk girtine û hem jî bi awayekî xurt bi tarîxa kurdan re tevlihev bûne. Ev çîrok, ji peydabûna kurdan bigire heta jiyana wan a rojane, hazir in. Li cem kurdan kesayetên Şahnameyê ji şêwaza xwe ya epîk derdikevin û dikevin nav çanda wan. Peydabûna gelê kurd jî bi kesayetên Şahnameyê ve girêdayî ye. Îro hê jî kurdên kelhurî xwe wisa dibînin ku ji Ferhad an jî Gûderz hatine. Kurdên goran bawer dikin ku ji Behram Gûr hatine, kurdên herêma Hewramanê xwe wek zarokên Rustemê Zal dizanin. Her wiha tê gotin ku İsfendiyarê ku yek ji kurên padişah Goştasp e, bapîrê loran, bextiyariyan û kurdên hewramî ye. Yanî binhişê kurdan, pêwendiyek xwînî û rasterast di nav nifşên kurdên îro û wan lehengên mîtolojîk-destanî ava dike. (Vali, 2021, r.24)

Şahname û riwayetên destanî yên wê di çanda kurdan de rolekî mezin dilîzin. Her çi qas diyarkirina tarîxa avabûna Şahnameyên Kurdî karekî zehmet û dijwar be jî (Kerimiyan Serdeştî, 1392, r. 67) tê bawerkirin ku ew çîrok berî *Şahname*ya Firdewsî ava bûne û gotina wan di serdemên cuda de, di nav kurdan de dewam kiriye. (Neqşibendî & Kazzazi& Dawudabadi, 1393, r. 152). Veznên manzûmeyên kurdî li ser hejmara heceyê/kiteyê ne û em dikarin bibêjin ku bi piranî li jêr bandora helbesta berî îslamê û serdema Sasaniyan ava bûne. Veznên herî girîng, li gor kevneşopiya kevin ku esasa vezna helbestê ya di wejeya kurdî de ye, şeş, heft, heşt û deh heceyî ne, lê vezna herî

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

berbelav û herî kevin a helbesta kurdî vezna deh-heceyî ye û Şahnameyên Kurdî jî wek helbestên deh-heceyî hatine vegotin. Digel ku di berhemên cuda cuda de li ser tarîxa edebiyata kurdî navên çend şairên wekî Elmas Xan Kendûleyî (m. ss 12a koçî) û Mistefa Goranî tomar bin jî, lêkolînên nû xeletbûna wan agahiyan eşkere dikin û dikarê bê gotin ku şairên Şahnameyên Kurdî bi piranî ne diyar in. Hin pispor, Şahnameyên Kurdî bi du beşan parve dikin: Devkî û nivîskî. Vebêja versiyona devkî bi piranî aîdê dengbêjan e ku di çanda kurdî de cihê wan ê taybet heye. Ew versiyonên curbicur çîrokên Şahnameyê riwayet dikin.(Chaman Ara,139, r.122)

Di Şahnameyên Kurdî de, du polên asîmanî û erdî wek pîramîd, dikare bên tespitkirin. Di sertapa vê pîramîdê de Xwedê heye. Paşê ferîşte û perî. Paşê padîşah û di pola dawî de jî leheng heye. Raman û baweriya kurdî jî li çar serenavan hatiye ravekirin: 1. Têgînên sirûştî: roj, hîv, stêr, şewq, tarî, asîman, erd, av, dar. 2. Têgînên asmanî: Xwedê, ferîşte, perî, balindeya sersiruştî wek Sîmurx, bext, bihuşt û dojeh. 3. Têgînên civakî: Padîşah, şahzade, leheng, mirovên dînî, vezîr, gel. (Vali, 2021, r.38)

Sîmurx di sê rivayetên Şahnameya Kurdîde ku ber dest in, wek têgînek asmanî xwedî rolek girîng û bingehîn e.

Di “Qehremanname”yê de Sîmurx:

Xuyabûna Sîmurx a di *Şahname*ya Firdewsî de, bi çîroka Zal dest pê dike. Dema ku bavê Zal wî naxwaze û terka wî dike, wî datînin ba Elborzê, çiyayekî pir bilind û ji her kesî dûr. (Firdewsî, 1997 r. 166) Hêlîna Sîmurx li ser vî çiyayî bû û ji her derî dûr bû. Çêlikên Sîmurx birçî bûn; balindeyê hêzdar ji hêlîna xwe derdikeve û difire. Zarokekî dibîne ku digirî û pêdiviya wî bi şîr heye. Xwedê rehmê dixe dilê Sîmurx û balinde êdî naxwaze tiştekî pê bike. Radihêjê û heta hêlîna xwe ya ser çiyayê Elborzê dibe.Sîmurx dibe xwedîkera Zal. Goştê herî nerm dibîne, da ku mêvanê wî yê biçûk bikaribe xwîna goşt bimêje, ji ber ku şîr tuneye. Bi vî awayî Zal li hêlîna Sîmurx dimîne(Firdewsî, 1997 r. 167-168).

Dema ku Samê bavê Zal biryar dide ku lê bigere, Sîmurx derdikeve ser çiyê, Sam û alîgirên wî dibîne. Dizane ku Sam ji bo kurê xwe hatiye. Dema ku wî dibe cem Sam, Sîmurx yek ji perên xwe dide Zal, da ku di bin siya hêza wî de bimîne: “Heke tu têkevî rewşeke xetere, heke kesek hember te derkeve, baş an xirab, vî perî biavêje nav agir û tu yê di demê de hêza min bibînî, lewre min tu di bin perên xwe de mezin kirî. Min tu bi çêlikên xwe re mezin kirî. Ez ê wek ewrekî reş bêm bi te re, da ku te sax û silamet bigihînim wir. Nehêle ku evîna dilê te, hemberî muxediya te sar bibe, lewre evîna te pir mezin e di dilê min de.”(Firdewsî, 1997 r.172).

Di rivayetên kurdî de, li gor kronolojîya mîtolojîk, yekem çîrok ku Sîmurx wek têgînek asmanî xuya dibe, çîroka Qehreman yan “Qehremanname” ye. Qehremanname berhemek destanî ye ku mijara wê çîroka jiyan, serpêhatî û şerên lehengek bi navê Qehreman e. Çîroka Qehreman û serpêhatiyên wî di Şahnameya Firdewsî de nehatiye behskirin. Lê dîsa jî nimuneyên Qehremannameyê bi zimanên cuda,wek kurdî û farisî, mewcûdin (Parsa Teleb & Muezzinî & Hadî, 1399, rr. 201-226).

Li gor rivayeta Qehremannameya Kurdî, ku mensûb bi Derwêş Qulî Kerendî ye (Lutfî Nia, Hemase, 1388 r. 183), Qehreman kurê Hûşeng e. Li gorî *Şahname*yê, Hûşeng kurê Siyamekê Keyûmers e. Lê *Bundehiş* li ser vê şecereyê agahiyeke din dide: Hûşeng kurê Meşîyê kurê Keyûmers e. Bernavkê wî "Pîşdad" e û ev jî vê wateyê dide: "yekemîn

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

kesê ku dad ava kiriye". Xanedana pîşdadiyan bi Hûşeng dest pê dike ku ew jî di nav kesayetên zerdûştî yên navdar de tê nîşandan. Bûyera wî ya girîng a ewil kuştina wî ya Ehrîmen û tolhildana bavê wî ye di dema serweriya bapîrê wî de. Ev bûyerên ku di serdema Hûşeng û Tehmûres de pêk tên û di dema hezareya (mîlenyûm) ewil de ye, heftê sal berdewam dikin. Ev hostetiya Hûşeng a hemberî dêwan di Mînevî Xêred de jî derbas dibe Li gorî rivayetên Îranî, ew padişahê cîhanê ye, bi îhtiyat û edalet e. Ew li şûna bapîrê xwe Keyûmers tac datîne ser serê xwe û çil sal ezman li ser serê wî dizivirin. Xwedî "ferr"ê padişahiyê ye. Ev "ferr" bi wî dest pê kir. Padişahiya wî li gorî *Bundehiş* çil sal berdewam dike. Wî hesin îcad kir. Di mîtolojiya îranî de agir û hesin ji aliyê Hûşeng ve hatin îcadkirin û piştî bidestxistina hesinî, rêya avakirina mîtan amade bû ji bo însanan. Yên îranî wek qible lê dinêrin û bi saetan li dora wî dizivirin û dua dikin. Wî li ser perestgehên navdar û pîroz de bilind dikin. Yekemîn kesê ku ev avahî saz kiriye Hûşeng e (Vali, 2011, rr. 83-89).

Li gor riwayetên Şahnameyên Kurdî, ku li ber destê me mevcûd in, nijada Rustemê Zal wusa hatiye behskirin: Rustem kurê Zal, kurê Sam, kurê Nerîman, kurê Kerîman (Qehreman), kurê Gerşasb e. Di destxeta Şahnameya Kurdî ya *Heft Leşker* de ew şecere wusa tomar bûye:

“Binvîs ey Rustem nevêy Zalê Sam
Baş bala destê dilêran temam
Sahibê zor û zat serdarê Îran
Merdê roy neberd şay nêrê şêran
Serdarê sengî nevêy Nerîman
Ferzendê reşîd pûrê Kerîman” (Heft Leşker, r. 1)

Di riwayetên gelêrî yên kurdan de jî gava ku behsa şecereya Rustemê Zal tê kirin, navê Qereman derbas dibe: Rustemê Zal, Zalê Dal, Dalê Kam, Kamê Sam, Samê Narîman, Narîmanê Qereman. (Celîl & Celîl, 2013, r. 21).

Li gor agahiyên ku li jor hatine dayîn, û peywendiya taybet di nav Sîmurx/ Qehreman – Sîmurx/ Zal, em dikarin bibêjen ku di rivayetên kurdî de Qehreman heman Kerîman/ Qereman, yanî bapîrê Rustemê Zal e.

Li gor rivayeta kurdî, piştî ku Qehreman ji dayik dibe, ji aliyê dêwan ve tê revandin. Qehreman di nav dêwan de mezin dibe lê piştre dizane ku kî ye û bavê wî yê rastî padişahê Îranêye. Qehreman vedigere welatê xwe û dibe lehengê herî mezin di artêşa bavê xwe de. Qehreman di jiyana xwe ya lehengî de serpêhatiyên mezin derbas dike. Bêguman mijara navendî di çîroka Qehreman de şerê wî yê hember dêwan e.

Li gor rivayeta çîrokê, dema ku Qehreman xwe ji bo azadkirina jina Şehbal Şah, ku di çiyayek bi navê Bîzar, bi zindanîya dêwan bû, amade dike, dipirse ka ev çiya li ku ye? Dibêjin ku çiyayek berz e ku ji xeynî Sîmurx kes nikare xwe bigihîne wî çiyayî:

“Eslen perende nemekey guzer
bi xeyr ne Sîmurx rux hunerwer” (Hamze’ee, 1393: r. 877).

Qehreman dipirse Sîmurx li ku ye? Dibêjin: hêlîna Sîmurx li ser çiyayek bi nav Bilûr e:

“Qehreman pirsa Sîmurx hane kû
Biwaçin perîm axir çûn mebû
Watiş dilawer me’lûm bû ne lat
Yek kûhî mebû ne sehray heyhat

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Ew quley Bilûr kuçik maçan pêş
Mekan û maway Sîmurx ha ve têş
Dewr û dayirey ex kû giran seng
Diraza û pehnaş çil hezar ferseng
Aşiyaney murx ne ev ca mebû
Xeylî buzurg in Sîmurxê xweşbû
Ne weqtê perwaz î bal ta ev bal
Xeylî diraz in bê hed bê misal" (Hamze'ee, 1393: r. 877).

Qehreman ji bo peydakirina Sîmurx dikeve rê û diçe heta çiyayê Bilûrê. Gava ku Qehreman xwe digihîne hêlîna Sîmurx, dibîne ku Sîmurx ne li vir e û ejdehayek dixwaze biçûkên Sîmurxê bixwe. Biçûkên Sîmurx dixwazin bifirin û xwe ji ejdeha xelas bikin lê nikarin. Qehreman bi lêz kevana xwe amade dike û tîrekê diavêje ejdehayê. Tîr çavê wî diqulpîne û ji pişta wî derdikeve. Piştre şûrê xwe dikişîne û ejdehayê dike du parçe:

"Dîş yek ejdehayî xeylî sehemnak
Peyda bî ve emrê dehendey bêbak
Pêy beçe Sîmurx dehan kirdiş waz
Beçe ve aşiyan ama we perwaz
Ca han pehliwan îdiş dî we çem
Keman ber award xurûşa ve hem
Reha da ne şest mewdat pir xeter
Da ne yek dîdeş ne pişt kird guzer
Hewr kêşa şemşîr bewrê rûy neberd
Bi wêney xiyar ejdeha şeq kird" (Hamze'ee, 1393: r. 879).

Gava ku Sîmurx vedigere hêlîna xwe û dibîne ku ejdehayek du parçeketiye ser erdê, ji biçûkên xwe dipirse ka ew karê kê ye? Biçûkên Sîmurx dibêjin dema ku ejdeha êrîşî wan kir, lehengek xuya bû û ejder du parçe kir û kuşt. Biçûkên Sîmurx cihê Qehreman nişanî wê didin. Sîmurx tê ba Qehreman, jê re dibêje: îro te ji min re tiştekî wisa kirku heta mirinê, ez qenciya te ji bîr nakim. Ji min re bêje tu çima hatî vir, tu çi bixwazî ez ê pêk bînim:

"Ama we payîn ser firûd awird
Watiş kî yen î bewrê rûy neberd
İmroj perî min karî tu kirdin
Feramûş niyen ta rojê mirdin
Muradit çîş in amanî vê ca
Beyan ker ne lam şêrê ser fena" (Hamze'ee, 1393: r. 880).

Qehreman jê re dibêje ku ew dixwaze biçe wî çiyayî. Sîmurx bersivê dide ku ew ê vê daxwazê bi cih bîne û Qehreman hildide ser baskê xwe û radibe. Sê roj û şevan difirin heta ku digihîjin wî çiyayî. Qehreman ji Sîmurxê xatir dixwaze û ji bo rizgarkirina jina padişahê dikeve rê û tevlî şerêhember dêwan dibe. Dema ku dengê qerîna Qehreman di qada şerê de digihije heta hêlîna Sîmurx, teyrê serfiraz ji bo wî dua dike:

"Seda çî ne gûşê Sîmurx ve sitem
Kirdiş munacat pêy şêrê xurrem" (Hamze'ee, 1393: r. 881).

Sehman, nûnerê Hûşeng li pey Qehreman diçe hêlîna Sîmurx û cihê wî ji Sîmurxê dipirse:

"Yawa ve Sîmurx Sehmanê pir fam

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ve eynê erkan bikirdiş selam
Watiş fidat bam salarê murxan
Min im kêmtirîn bendey Qehreman
Nişan bider pêm tu henit xever
Biwaçe hana ku bewrê dilawer" (Hamze'ee, 1393: r. 884).

Sîmurx jê re dibêje ku Qehreman li qelayê dêwan e û xerîkê şer e. Sehman jê re dixwaze ku wî bibe wir. Bi hev re dikevin rê û diçin welatê dêwan. Dema ku Sîmurx û Sehman digihêjin welatê wan, Qehreman hêj xerîkî şer e. Sehman ji dûr ve mêrxasekî dibîne ku hember dêw şerî dike. Ji Sîmurxê zana dipirse: ev mêrxas kî yê? Sîmurx jê re dibêje ku ev Qehreman e. Dema Sehman û Sîmurx şerê Qehreman yê hember dêwan dibînin, hêrs dibin û xwe diavêjin nav şerê. Sîmurx difire, kevirên mezin hildide û wan dibarîne ser dêwan û bi vî awayî alîkariya Qehreman dike. Ev sehne, dikare wek sehneyek girîng bê nirxandin. Ji ber ku aliyê şervanîya Sîmurxê nişanê me dide:

"Sîmurx wat ev ne tûy hesar in
Sergermê mesaf rûy karzar in
Sehman wat ve murx biçîmiwe bi ev ca
Her du çenî hem ve Cihan Nema
Her du çenî hem rahî bîn revan
Aman ve hesar ve lay Qehreman
Sehman dî şexsî ha ne şûrê şer
Dêwan mepaçû çûn xiyarê ter
Pirsa ne Sîmurx danayê suxendan
Î şexse kî yin ku in Qehreman
Sîmurx wat Sehman, ye Qehreman in
Xerq ne cewahir daney giran in
Sehman şikûfa çûn gul ne gulşen
Mûş wêney direfş berçî ne cewşen
Cûşa û xirûşa ve ne'retey giran
Çûn xezay qabiz rû kird ve dêwan
Ni ew teref Sîmurx keleş coş awird
Bal da ve hem da xîza pêy neberd
Her carî yek seng wezin hezar men
Mawerd ne kavan xermen ve xermen
Merîzan ne ser dêwanê bêdîn
Mewiyan ve xerxal ne rûy serzemîn" (Hamze'ee, 1393: r. 884).

Di dawiyê de hemû dêw tên kuştin lê paşan hîn dibin ku dêwan jina padişah birine Çiyayê Qemerê. Qehreman ji bo ku bikare xwe bigihîne wî çiyayî, rêberek hewce dike. Sîmurx vî karî digire ser xwe. Wan li ser baskên xwe digire, difire û digihîne Çiyayê Qemerê. Di wê sehneyê de dîsa Sîmurx wek rêberek zana xuya dibe.

"Qehreman ferma meyûm yek rehber
Reberîm kerû ta quley Qemer
Sîmurx ser firûd awird ve sucûd
Watiş î xidmet min mekem mewcûd" (Hamze'ee, 1393: r. 884).

Qehreman bi rêberî û alîkariya Sîmurx xwe digihîne wî çîyayî û piştî şerê hember dêw û kuştina wan, jina padişah rizgar dike. Piştî vê bûyerê Qehreman

Zakho Centre
for Kurdish Studies

ronahiyekêli serê çiyayekî dibine ku wek rojê dibiriqe. Dipirse ka ew çi ye? Dibêjin ku: Ew “Camê Cem” e.

Li vir divê bê diyarkirin ku Camê Cem (qedeha Cemê) motîfek pir girîng e di rivayetên mîtolojîya Îranî de. Li gorî rivayetên ber dest, yekemîn kes ku bûye xwediyê vê Camê, Cemşîd e û girîngiyeke kesayeta wî ew e ku xwediyê “Qedeh”ê ye û ev bi navê wî jî girêdayî ye: “Camê Cem”an jî “Qedeha Cemşîd”. Li gorî çîroka *Şahname*yê, “Qedeha Cem”hemû cîhan dihewand. Li gorî mîtolojiya cîhana Îranî, wî bi destê zanayan qedehek wisa daye çêkirin ku bi vê qedehê hemû bûyerên cîhanê dikare bên dîtin (Uşîdarî, 1383, r. 231).Ev qedeh wek objeyeke metamorfozê tê dîtin. (Rastgâr Fasâî, 1381,r. 152) Piştre Key Xusrew dê bibe xwediyê vê qedehê û yek ji hêmayên mucîzewî ya kesayeta wî, xwedîbûna wî ya “QedehaCem”e ku ev tişt hem di *Şahname*yê de, hem jî ji aliyê Şehabedîn Suhrewardî ve hatiye behskirin. Li gor wî, Key Xusrew xwediyê “Camê Gîtînemay” (qedeha ku kaînatê nîşan dide) bû. Çi bixwesta dikarîbû tê de bidîta, haya wî ji her tiştê veşartî çêdibû û ji kaînatê agahdar dibû. Dibêjin ku di şeklê qûçê (konî) de bû û qilifeke wê ya çermîn hebû ku bi deh benikan dihate girêdan, dema ku dixwest ji xeybê tiştekî bibîne, dema ku roj rast (îstîva) dibû, qedeha xwe ber bi wê ve digirt, wexta ku ronahiya herî mezin diçûrisî,hemû qeder û xêz jê re xuya dibûn. (Suhrewerdî, 1976,r. 423)

Hêza *Qedehê* bi taybetî di çîroka Bîjen û Menîje de xuya dibe. Li gorî rivayetê, dema ku Bîjen diçe sînorê Tûranê ji bo nêçirvaniya berazan, dilê wî dikeve keça Efrasiyab û piştre xwe di nav çalekê de girtî dibîne. Key Xusrew biryar dide ku bi rêya *Qedeha* xwe Bîjen bibîne. Key Xusrew li benda Newrozê dimîne. Di wê roja şahiyê de Key Xusrew fîstanê xwe yê taybet li xwe dike û diçe da ku xwe pêşkêşî Aferîdeyê cîhanê bike. Demeke dirêj li ser *Qedeha* biriqî şikir dike, jê hêvî û lava dike, li hemberî Ehrîmen edaletê dixwaze. Piştre vedigere qesra xwe, taca padişahiyê datîne ser serê xwe û *Qedeh*êdigire destê xwe. Bi hunera xwe ya efsûnî heft welatan, yên ku jê derbas bûye û şiklê esmanê mezin, sûretê hemû cîhanê û pêşerojê dibîne. Dawiya dawî dibîne ku Bîjen di nav çalekê de ye (Mokri,1966, r. 20).

Lê tê dîtîn ku di rivayeta kurdî de yekem kes ku bi alîkariya Sîmurx dibe xwedî Camê Cem, Qehreman e. Qehreman dizane ku anîna Camê Cem tenê karê Sîmurx e û ji wê dixwaze ku wî bîne. Sîmurx radibe, sê roj û sê şevan difire, Camê Cem bi çengê xwe digire û tîne ber Qehreman:

“Yek roj Qehreman new qesr û eyvan
Ber ama ve ber ve ezmê seyran
Weqtî nigah kird ve bar mete kû
Dîş ki nûr new ca bêhed mewarû
Şûley şewqê nûr çûn şewqê aftav
Tecellî westin ne rûy mewcê av
Yek şûle henî bewrê dilawer
Ew ne periyan mepirsa xewer
Watin fidat îm ye şewqê Cam in
Ew Camê dûrbîn Cihan temam in
Qehreman ferma şay murxê salar
îd hem karê tu in bawerî biwar
Sîmurx sicde bird ve şad ve e’zem

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Perwaz da ve bal perî Camê Cem
Sê şebane roj ne subh ta ve şam
Hîz gird ne heva ta yawa ve Cam
Hewr giridş ne çeng der dem Camê Zer
Awird ve payîn ve zerbê şahper
Niya ve huzûr bewrê bêendîş
Qehreman bêhed heyran bî ve pêş” (Hamze’ee, 1393: r. 892).

Piştî ku Qehreman peywira xwe bi cih tîne û serpêjatiya xwe diqedîne, Sîmurx wî û hevalên wî datîne ser baskên xwe û wan vedigerîne welatê Hûşeng Şah. Şah ji Qehreman dipirse ka ew teyr kî yê? Qehreman bersiv dide ku: ew “Sîmurx”e û min çi bi dest xistibe, bi saya wî bû”. Padişah gelek pesnê Sîmurx dide. Sîmurx ji wan xatir dixwaze û dibêje ku her tim di xizmeta wan e. Piştre radibe û ber bi çiyayê Bilûrê difire:

“Hûşeng çenîşan ve mihribanî
Ve lefzê şêrîn gewher fişanî
Rû kird ve lay şêr Qehreman
Î murxe kî in wenim ker eyan
Watiş fidat im Sîmurx bi wêş in
Firawan ixlas riyazet kêş in
Her fethî temam wêş fethiş kirdin
Nîknamî ve şay Îran awirdin
Hûşeng îd şineft ve murx kird selam
Cuwaw da eleyk murxê xweş kelam” (Hamze’ee, 1393: r. 895).
“Sîmurx wat min ne çakiran im
Bendey dewr ne gûş î pehlean im
Himmet xwahî kird murxê pir Kemal
Pêy semtê Bilûr şeqe da ne bal” (Hamze’ee, 1393: r. 896).

Di çîroka “Jidayikbûna Rustemê Zal” de rola Sîmurx:

Wekî li jor jî hat gotin, di rivayetên Şahnameyê de Zalê bavê Rustem û Sîmurx xwedî pêwendiyek ruhanî û xurt in. Dikare bê gotin ku yek ji bûyerên herî girîng di jiyana Zal de, evîna wî û Rûdabe, keça Mihrabê padişahê Kabul e.Zîra piştî wê evîn û zewacê ye ku lehengê herî navdar ê çanda kurdan, çêdibe.Li gorî Şahnameyên Kurdî Mihrab xwedî keçekê bû bi navê Rûdabe, ku bi husn û cemal û kemalê di dinyayê de meşhûr bû. Gava ku Zal terîfa bedewiya Rûdabe dibihîze, bêyî ku wê bibîne evîndarê wê dibe û piştî gelek zehmetiyan bi wê re dizewce.

Li gor riwayeta çîrokê, piştî neh meh û neh rojan Rûdabe kurek tîne dinyayê. Ew kur ji aliyê şikl û şemayilê xwe ve dişibe Nerîman û Sam. Navê wî dikin Zevare.Pîştî heft salan Rûdabe carek dî bardar dibe. Lê barê wê giran û zikê wê pir mezin e. Zikê wê ew qas giran e ku mirov dibêje qey kevir an jî hesin e. Rûdabe her roj ze’if dibe. Hemû bijîşkên navdar kom dibin lê nikarin dermanê derdê Rûdabeyê bibînin. Rojekê Rûdabe ji hişê xwe diçe. Ji Zal re agahî tê dayîn ku dibe ku jina wî bimire. Li vir riwayet dest bi avakirina kesayeta leheng dike. Jidayikbûna Rustem nikare wek jidayikbûna birayê xwe Zevare be. Zîra digel ku Zevare jî pehlewanek girîng e, lê leheng Rustem e û di mythosê de gava ku behsa “leheng” heye, jidayikbûn jî mucizewî ye. (Vali, 2021, r. 71). Dema ku

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Zal hemû hêviyên xwe wenda kiribûn, fikrek tê hişê wî û bi lêz diçe ser çiyayî, cem Sîmurx. Sîmurx sedema xemgîniya wî dipirse û Zal hemû ehwalan vedibêje:

“Ta vadey heft sal nî mabeyn wiyerd
Rûdabe banû bare hemliş kird
Nu mang û nu roj saet bî temam
Pêçiya ve derd şoxê nû nemam
Şevan ta ve ro pêçiya ve derd
Wêney ze’feran zaîf û zerd
Luqmananê dewr Erestû meqam
Cem kirdin ne dewr şoxê cemîn cam
Hîç kesî nekird ilaciş ve derd
Zalê Zer kêşa henasanê serd
Ve çar naçar rû niya ve kû
Ta ve lay Sîmurx dad û rû ve rû
Sicde da zemîn bûse da ve xak
Naley girîniş wiyerd ve eflak
Sîmurx watiş ferzend zarît ve çîş in
Biwaçe penim xatirim rîş in
Biwaçe perîm halat seraser
Pinhan mekere ferzendê dilber
Zal wat ey peder ziwanim leng in
Perî Rûdabe xatirim teng in
Heft roj in temam gîrûdey derd in
Ruxsariş wêney ze’feran zerd in
Rûdabe banû berliva ve dest
Weqt in firar bû ruhim ve qefes
Peyda nemebû tifiliş ve beden
Erzim her îd in babû ercumen”(Hamze’ee, 1393: rr. 910-911).

Jidayîkbûna mucîzewî ya Rustem, bi emrê Xwedê û bi rêberiya Sîmurx çêdibe. Ew Zarok, ku qerar e bibe serlehengê hemû destanên kurdan, bi awayekî asayî nayê dinyayê. Rêber, ango Sîmurx bo Zal dibêje ka ev zarok dê çawa bê dinyayê. Ji Zal re ferman dide ku bila bijîşk bi kêrekê aliyê çepê Rûdabeyê bibirin û zarokî ji zikê wê derxin. Piştre divê cihê ku jê kiribû dîsa bidûre û perekî Sîmurx bişewitînin û datînin ser birînan. Sîmurx ji Zal re mizgîniyê dide ku ew kur wê bibe wek şêrekî bi nav û deng ku hem tacê padişahî bibexşîne û hem jî bistîne. Zal jî, ji bo jidayîkbûna Rustem, tiştên ku Sîmurx jê re gotine pêk tîne û Rustem tê dinyayê:

“Ve hukmê ferman heyyê Kirdigar
Ve teref çepê banû bêmedar
Parekin ve tîx ser mewday xeter
Tifilê bê zuwan bawerûn ve der
Cerahan wî tewr banû ken pare
Zerer newînû bilind sitare
Biwaçim ve pêd ferzendê nazar
Nigehdarî ken ferzendê salar
Baş balades giştser mesan e

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Hem tacbexş in hem tac sitan e
Rûley şa perî mederûm ve tu
Bane weqt teng dayim ve pêt bû
Zere ve ew pere bisûzû ve nar
Birîze ve nav ew zexmê qehar
Ve umîdê heq şoxê nûnemam
Ne evil bêhtir salim bû temam
Îne şerhê hal watim ve tu
Ve te’cîl biçû ve nezdê banû
Desgird ve sîne Zale sehmnak
Sê def’e temam bûse da ve xak
Rû niya v era te’cîl ve duwan
Ama ve xidmet banûy banûwan
Her çi Sîmurx wat yekayek temam
‘Erz kird ve xidmet banûy cemîn cam
Rûdabe şineft xeylî bî xweşhal
Kirdiş şukur ve zat danay zulcelal
Xase hekîman yekayek çerîn
Lay çepê banû ve hem da dirîn
Banû ve bêhûş cirav da avan
Awird ve bîrûn tifilê bêzuwan
Nigay tifiliş kird hekîmê ‘aqil
Wat şukrim ve tu helnumay muşkil” (Hamze’ee, 1393: rr. 911-912).

Di “Şerê Rustem û İsfendiyar” de Sîmurx

Di Rivayetên Îranî da İsfendiyar kurê padişahê navdar Goştasp e û bê guman yek ji kesayetên navendî ye di dîroka destanî ya Îrana kevn de ku weksembola civaka homojen a sasaniyan tê qebûlkirin (Xaleqî Mutleq, 1381, r. 83).Li gorî mîtê, di hemû deman de tenê Rustem bi wî re wekhev bû di bûyerên lehengî de (Coyajee,1380, rr. 519-554).Rola wî ya bingehîn jî ew e ku mîsyoneriya dînê zerdûştiyê kiriye. İsfendiyar ji bo parastina dînê nû çek digire destê xwe û cîhanê ji kafirû pûtperestan paqij dike û agirê ronahiya ku Zerdûşt ji bihuştê anîbû, vêdixe. Ew lehengeke ku rasterast ji aliye Zerdûşt ve hatiye pîrozkirin.İsfendiyar dibe însanek wisa ku birîndar nabe, bedena wî dibe wek tûncê. Birîndarnebûna İsfendiyar wek objeyeke metamorfozê tê dîtin. (Restgar Fesaî, 1381, r. 152).

Li gor rivayetên Îranî,Goştasp ji Zerdûşt çar daxwazan dike: diyarkirina cihê wî yê li bihuştê, birîndarnebûn, zanista li ser paşeroj û pêşerojê û nemirî. Pêxember jê re dibêje ku ew ê nekaribe van her çar daxwazan bide wî, lewre Xwedê dê qebûl neke ku van her çaran jî bide kesekî tenê. Goştasp qebûl dike ku pêxember qenciyek tenê jê re bike û her sê daxwazên din jî bide sê kesên din: Peşûten, İsfendiyar û Camasp. Peşûten dibe nemir. Camasp dibe xwediyêlutfê zanistê û İsfendiyar jî bi xwarina hinara bihuştê ku ji aliyê pêxember ve jê re hatiye pêşkêşkirin, êdî birîndar nabe (Bahram Pajdo, 1338, rr. 72-78).Li ser birîndarnebûna İsfendiyar versiyonek din jî heye. Li gorî vê versiyonê wexta ku Zerdûşt tê cem Goştasp û xwe wek "pêxember" dide nasandin, padişah jê dixwaze ku çend mucîzeyan nîşanî wî bide. Zerdûşt jê dixwaze ku İsfendiyar bîne

Zakho Centre
for Kurdish Studies

hemamê. Zerdûşt bi duayan avê li ser serê şehzade dike ji bo paqijbûneke manewî. Wexta ku av li ser wî dirije, şehzade bê hemdê xwe çavên xwe digire. Av li çavên wî nakeve û ji ber vê jî çavên wî wek xala zeîf a bedenê İsfendiyar dimînin. (Şîrazî, 1363, rr. 7-8-20/Behramî, 1385, rr. 48-49). Li gorî versiyoneke din jî Zerdûşt hinarekê dide İsfendiyar. İsfendiyar hinarê dixwe û êdî birîndar nabe(‘Efîfî, 1374, r. 437).

Li gor rivayetên îranî/kurdî İsfendiyar her tim ji Goştasbê dixwaze ku textê xwe ji bo wî bihêle. Goştasb her carê şertekî dijwar tayîn dike da ku textê xwe bide wî. İsfendiyar her tim şertên wî bi cih tîne û bi ser dikeve. Lê peywira dawî ya İsfendiyar girtina lehengê herî navdar û herî bi îhtişam ê dîroka destanî ya cîhana Îranê, yanî Rustemê Zal û şerê hember wî ye. Dema ku İsfendiyar careke din daxwaza tac û text dike, Goştaspê Padişahê Îranê ku qedera İsfendiyar dizane, ji bo wî peywireke dawî dide: Girtina Rustem.İsfendiyarli dijî vî tiştî derdikeve û nîşan dide ku naxwaze vê peywirê bi cih bîne. Hemû xizmetên ku Rustem ji bo padişahên Îranê kirine, dizane.Lê Goştasp bi israr jê dixwaze ku destê Rustem girê bide.İsfendiyar dizane ku ji bo Padişah ev ne meseleya Zal an jî Rustem e, lê ev mahneyek e ji bo Padişah ku xwe ji İsfendiyar xilas bike, lê dîsa jî daxwaza Goştasp tîne cih û ligel artêşa xwe diçe welatê Sîstanê. Li gorî Meskoob, trajediya vî şerî ew e ku her du alî jî kesên pîroz in. Di vî şerî de kesê xirab tuneye (Meskub, 2536, r. 98).

Peywira İsfendiyar a girtina Rustem peywireke ne mimkun e(Kazzazi, 1380, r. 82).Gava gihîştina Sîstanê, İsfendiyar kurê xwe Behmen dişînê pey Rustem ji bo ku şertên xwe bêjê: qebûlkirina zincîrên esaretê. Ev şertekî ne mimkun e ji bo Rustem. Rustem jê dixwaze ku bila bê mala wî û wî şerefyar bike. İsfendiyar vê daxwazê red dike û bi ser de jî malbata Rustem bê hurmet dike. Heta dê bêje ku Zal, kesê nehezkirî, kurê dêwekî bû, nikare îddiayê kokeke baş bike û demeke dirêj wî ji Sam veşartine û Zal bi gelemperî wek sebeba xirabiya dinyayê hatiye dîtin. Dibêje heta Sîmurx jî di wî de tu işareteke mezinahî an jî heybetê nedîtiye û her wiha wexta ew dîtiye ji birçiyan digiriya, dilê Sîmurx neçûyê ku goştê Zal bixwe. Dawiyê İsfendiyar, Sam wek kêmaqil bi nav dike.Dawiya dawî ev her du kesayetên mezin ji bo şer xwe amade dikin. Quweta her du şervanan jî wekhev bû, heta İsfendiyar kevanê xwe digire û tîran diavêje, Rustem û hespê wî birîndar dike. Berevajî vê, yên ku Rustem avêtin li İsfendiyar neketin, lewre İsfendiyar birîndar nabe, bedena wî wisa ye ku çi jî lê bikeve tiştek pê nayê. Bedena Rustem û Rexş ew qas bê hêz bû ku nikarîbûn berdewamî şer bikin. Bi vî awayî Rustemê ku têkçûyî xuya dibû, ji ber ku ji mirinê bireve, li rêyekê geriya. Ji hespê xwe peya bû û berê xwe da çiyê. Rexş bi çargavî berê xwe da qesrê û ji xwediyê xwe veqetiya. Divê Rustem derneketa hember wî, lewre İsfendiyar têk naçe û birîndar nabe. Ev yekane car eku Rustem di şer de dikeve vê rewşê û hespê wî jê vediqete. Divê bê zanîn ku li vir mebest destnîşankirina hêza derxwezayî ya İsfendiyar e di dîroka destaniya *Şahname*yê de.

Rustem vedigere qesra xwe. Vî tiştî dizane ku heke bikaribe ji tîrên İsfendiyar xwe xilas bike, ev tê wê maneyê ku vejîneke nû dest pê dike ji bo wî. Dema ku Zal dibîne kurê wî jiyana xwe li hemberî İsfendiyar dixe rîskê, dibêje rêyek heye ku ji vê xilas bibe. Ji mirinê re alternatîvek hebû. Esas rêyek hebû ji bo Rustem û ev rê ji xeynî rêberê wî yê ruhanî Sîmurx, ne tiştek din bû. Gazî Sîmurx dike ji bo alîkariyê. Dizane ku heke Sîmurx bixwaze rêberiya Zal bike, dê tiştek neyê serê welat û mîrektiya wan, heke ne dê welatê wan ji aliyê İsfendiyar ve bê hilweşandin.Derdikeve ser çiyayekî bilind. Wexta ku digihîje

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەكولينێن كوردى

ser çiyê, parçeyeke ji perekî Sîmurx derdixe û wî perekî di nav agirî de dişewitîne. Wê demê her der tarî dibe, ango hewa dibe wek ewrekî reş ûbalindeyê efsanewî dîsa di sehneya *Şahname*yê de xuya dibe. Sîmurx ji esman dadikeve û nêzîkî Zal dibe.Zal çend caran wê diperisîne. Sîmurx jê dipirse: Çi qewimî ku pêdiviya Zal bi wî çêbû? Zal di rewşeke ne baş de jê re behsa Rustem, birînên wî û yên Rexş dike.

“Belê ey ferzend ve min gûş bider
Îd in çim ve ban î kû seranser” (Hamze’ee, 1393: r. 417).
Liwa ve eyvan qedrî ateş berd
Şî ve ban kû ew şêrê neberd
Ateş aawan kird ve hukmê dawer
New dumay sendûqê per hawird ve ber
Ne balay ew kû ateş efrûza
Niya ve ateş ew pere sûza
Dîş ke ew Sîmurx ama ve dewan
Ve lay Zalê Zer hem babûy giran
Zalê Zer xêza ve çend dax der
Sîmurxê dewran istiqbal bikerd
Sîmurx wat ve Zal peşêwît çîş in
Ney şevê deycûr ser ve endîş in
Vey şevê dêycûr min teleb kirdî
Karê tu çîş in şêrê neberdî
Watiş ey Şah Murx Rustem çî ve bad
İlticam îd in biyawî ve dad” (Hamze’ee, 1393: r. 418).
“Zal wat ey ferzend mebe dil hezîn
Ce girdê gerdûn menîşe xemîn
Min bi yek tedbîr mesazû kariş
Ta tu xelas bî ce gîr û dariş
Yek per ce Sîmurx yadigarim in
Pêy rojê tengî mededkarim in
Niya bi ayir bi endek zeman
Keft ne rûy zemîn zelzeley deman
Hewagirt Sîmurx derdem ne rûy xak
Hajey bal xêza ce gird eflak
Seday sam balê Sîmurx sehimgîn
Şorişî xêziya ne rûy serzemîn
Bal kirdewe seywan bargey Zalê Zer
Ama bi guftar çenî şêrê nêr
Çîş in muradit bawer ve hem
Eger xurşîd in ne çerxê çuwarim
Seranser kirdarê Rûyînten wana
Ne pay çetrê balê Sîmurxê dana” (Emînî, 2010, r.615)
Piştî guhdariya Zal, Rustem û Rexş tînin cem Sîmurx da ku wan derman bike.

Sîmurx gazindan li Rustem dike û dibêje: Çima te xwest bi İsfendiyar re şer bikî? Çima te xwest derkevî hemberî İsfendiyar, lehengê pîroz û rûyînten?

Zakho Centre
for Kurdish Studies

“Sîmurx wat meger çî wertir guftar
Namana gûşit ce İsfendiyar
Karger niyen weniş tîxê kîn
Pûse mewaçan Rûyînten rûyîn” (Emînî, 2010, r. 615).
“Watiş bawiran Rustem çenî Rexş
Bewrê serfiraz şêrê tacbexş
Watin Pîlten mujde bû ve tu
Bawere Rexşit bû ve balay kû
Rustem çenî Rexş çîn ve balay kû
Sicde bird ve rux bewrê pir şikû
Sîmurx wat Rustem çûn sersam enî
Cigerxestey dewr rûy eyyam enî
Pêy çîş ceng kirdî ve İsfendiyar
Tayifey Destan mekerû kuştar
Temam tuxmitan mekenû ve bin
Esîr mewerû merdan çenî jin” (Hamze’ee, 1393: r. 418).

Sîmurx ji bedena Rustem heşt seriyên tîran dikşîne, xwîna ku diçe ser baskên wê dimije. Rustem dîsa hêz û enerjiya xwe bi dest dixe. Piştre Sîmurx ji bedena Rexş jî şeş seriyên tîranji sitûyê wî derdixe û wî jî derman dike:

“Der dem ve minqar Şa Murxê zeberd
Heşt xedeng ne gyanê Rustem ber hawird
Ve zexman ew saf mala şaper
Sarêj bî zexman temam seranser
Yek perî henî mala ne tûy şîr
Dan ne rûy zexman xestey gaygîr”(Hamze’ee, 1393: r. 418).
“Sîmurx wat Rustem zûd Rexşit bawer
Bizanim Çûn in perendey bêper
Ber hawird şeş tîr ne gardenê Rexş
Per mala ne zexm Rexşê tacbexş”(Hamze’ee, 1393: r. 419).

Zal careke din ji Sîmurx lava dike ûdîsa ev Sîmurx e ku ji Rustem resirra “mirin”aİsfendiyar û qedera “kesê ku İsfendiyar bikuje”, eşkere dike. Sîmurx ji Rustem re yekane şêwaza kuştina İsfendiyar vedibêje: sirra ku di nav giyayê gezê de veşartiye. Sîmurx difire, diçe ber bi derya û çûbê gez ku bi qedera İsfendiyar ve girêdayî ye, tîne ûjê re dibêje ka dê çawa tîrek jê amade bike bo kuştina İsfendiyar. Rustem ji giyayê gezê tîrekê amade dike.

Sîmurx dîsa tekrar dike ku “kesê ku İsfendiyar bikuje, temenê wî jî kurt bibe”. Lê Rustem jê re dibêje ku ev qedera Yezdan e. Piştî ku Sîmurx xatir ji Zal dixwaze, wî hembêz dike, perek dide wî û ber bi esman ve difire û wenda dibe. Ev sehneya dawî ye ku Sîmurx di Şahnameyê de xuya dibe:

“Watiş er hey şêrê bewr Tehemten
Pêy çîş rezmit kird çenî Rûyînten
Temamî gyaniş tilismperwer in
Zûrbendî destê Peyxeber in
Belê Pîlten serdarê serheng

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Perî kuştiniş dil mawer ve teng
Çûbî ne derya ismî çûbê Gez
Bend kereû peykan bider abê rez
Derdem perwaz kird ŞaMurxê jiyan
Çûbê Gez hawird te'cîl ve duwan
Sîmurx wat Rustem wenit diyar bû
Dumay Şahzade umrit kêm mebû
Rustem wat fermanê Perwerdigar in
Bayed bikûşîm çarem naçar in
Belê hey Sîmurx perendey salar
Texsîrim niyen ne rûy rûzigar
Watiş xatircem serhengê salar
Zanim kuşte bû Şay İsfendiyar
Yek perî henî derdem da ve Zal
Himetxwahî kird şeqe da ve bal" (Hamze'ee, 1393: r. 419)
"Ane çûbî hen ne deryay Qulzum
Du haçey barîk ber an sengê sum
Bend kerî weniş peykan çenî per
Ne roy karzar wêney şêrê nêr
Red nimebû tîrî ce dîdeş
Ber an bo peykan çepî çemîdeş" (Emînî, 2010, r. 615).
"Murx wat mawerûş bi yek çem zeden
Ta necat bibû Rustem ce duşmen
Ama ne perwaz rû kird ne Qulzum
Ne pêy çûbê tîr zenendey merdum
Çeng pêkawe behr cube tîr awird bîrûn
Bal dawe û bergeşt ne rûy gerdûn
Awird da bi dest Zalê bêmisal
Mala bi cestey Rustem per û bal
Sarêj bî ce zexm herbey Rûyînten
Xêza pêy tedbîr ne rûy mekr û fen" (Emînî, 2010, r. 616).

Roja din Rustem vedigere meydanê û hewl dide ku agirbestekê çêke pê re. Lê İsfendiyar daxwaza Rustem red dike. Her wiha, wisa difikirî ku roja berê gava ku Rustem gihaştibû qesra xwe, ruhê xwe teslîm kiribû. Dizanîbû ku Rustem gelek zana ye û tedbîrên wî hene, her wiha ji ber cadûgeriya Zal e ku Rustem hate ser hemdê xwe.Wexta ku Rustem dibîne ku ev şîret li hemberî İsfendiyar bi kêrî tiştekî nayên, kevana xwe amade dike, tîrê ji gezê ku hesinê wê bi şerabê çêbûbû li kevanê bi cih dike ûçawa ku Sîmurx nîşan dabû, lezelez tîrê xwe bi cih dike û diavêje nav çavênİsfendiyar.

Bê guman, ev yek ji sehneyên herî bîrewer e di mîtolojiya cîhana îranî de. Çawa ku Rustem tîrê xwe diavêje, dinya li ber çavê İsfendiyar tarî dibe, hişê xwe wenda dike û hêza wî terka wî dike. Serê wî xwar dibe û kevanê wî ji destan dikeve. Bijiyê hespê xwe digire û xwîna wî li meydanê wer dibe.Şehzadeyê navdarbi carekê ve têk diçe. Tîrê ku ji serî heta binî bi xwînê wer bûye digire û dibêje: Ne ji ber wêrekiya wî ye ku kurê Destan (Rustem) ez kuştim; binêre ev şitlê giyayê gezê ku ez di destê xwe de digirim, ji aliyê Sîmurx û Rustem ve hatiye çêkirin ku dawî bi jiyana min bînin, ewZal e ku evcadûgerî

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

çêkiriye, lewre ew cadûgerî û tiştên wisa dizane.Divê bê gotin ku geza du serî ya ku Rustem pê Isfendiyar dikuje, wek perên Sîmurx tê hesibandin (Purnamderien, 1383, r. 199/r. 202).

Ev hevokên İsfendiyar girîngiya mirina wî nîşan didin. İsfendiyar Rustem, Sîmurx, Zal û wî giyayî bi hev re sûcdar dike. Ev kesên sûcdar dawiya İsfendiyar anîne. Berpirsiyar ne bes Rustem e:

"Bizan ve merdî ersey meydan
Nebîm sernigûn ve destî Destan
Bi kerdey Sîmurx Zalê cadûger
Ke sasim kirdin emin ney guzer
Nigah ker vey tîr girtinim ve des
Ye kirdey karî Sîmurx in û bes"(Emînî, 2010, r. 620).

Encam:

Weku tê dîtin, di rivayetên Şahnameyên Kurdî de, Sîmurx di nav aferîdeyên çîrokî yên ku di metnên kevn yên wek Avesta û metnên Pehlewî jîtêne behskirin, li pêşiya hemûyan e. Di rivayetên Şahnameyên Kurdî de Sîmurx ku bi rengdêrên cuda cuda yên wek: Sîmurxê ruxhunerwer, Sîmurxê xweşbû, bê misal, salarê murxan, danayê suxendan, xwedî tedbir, zana û Şahê murx hatiye pênasekirin, xwedî hêzên derxwezayî ye û di çîroka malbata Zal û kurê wî Rustem de xwedî roleke girîng e.

Sîmurx di sehneya Şahnameyên Kurdî de wek, teyrek ku hêlina wî li ser çiyayek bi navê Bilûr e û dengê balên wî sehmgîn in, xuya dibe. Di rivayetên Îranî yên wek *Şahname*ya Firdewsî de, Sam kurê xwe Zal, li derekî nêzî çiyayê Elborzê, çiyayê ku çûkê navdar Sîmurx hêlîna xwe lê çêkiriye, terk dike. Sîmurx Zalê sava dibîne lê Xwedê rehmê dixe dilê Sîmurx da ku wî zarokî nexwe û wusa Sîmurx dibe xwediyê Zal. Ew bûyer, destpêka peywendiya Sîmurx û malbata Zalê Zêr e. Lê wekî hat dîtin, di Şahnameyên Kurdî de yekem car Sîmurx di çîroka *Qehremanname*yê de derdikeve holê û rêberiya Qehreman, ku bi ihtimalek mezin bapîrê malbata Rustemê Zal e, dike. Ew peywendî, peywendiyek xurt e û bi îhtîmaleke mezin rola Sîmurx di sepêhatîyên malbata Rustemê Zal de, roleke totemîk e.

Livir divê bê gotin ku cudahiyên riwayet yan hebûna destanên serbixwe di Şahnameyên Kurdî de, ku di riwayetên din ên Îranê de wekî ya Firdewsî, tune ne, dikare nîşan bide ku Şahnameyên Kurdî ne kopîkirina *Şahname*ya Firdewsî ne. Yanî dikare bê qebûlkirin ku berhemên ku wek Şahnameyên Kurdî tên binavkirin, li gorî naverok, mijar û avahiya xwe bi taybet aîdê gelê kurd in û di pêvajoya xwe ya dîrokî ya taybet de hatine avakirin.

Weku hat dîtin, di Şahnameyên Kurdî de Sîmurx, xwedî çend taybetmendiyan e: Hekîm û zanyar, bijîşk, rêber, şervan û kahîn. Di çîroka Qehreman de yekem car Sîmurx wek rêber rola xwe bi cih tîne. Piştre wek şervanekî tevlî şer dibe û alîkariya Qehreman dike hember dêw. Di heman demê de Sîmurx "Camê Cem"ê giranbiha tîne û diyarî wî dike. Di dawiyê de jî Qehreman û hevalên wî datîne ser baskên xwe û wan vedigerîne cem padişahê Îranê.

Di çîroka jidayikbûna Rustemê Zal de, rola Sîmurx zêdetir rola bîjişkekê e. Dema ku Zal perê wî dişewitîne, Sîmurx derhal xuya dibe û rê û rêbaza jidayikbûna Rustem nişanî Zal dide. Di çîroka Rustem û İsfendiyar de jî aliyê kehanet û zanatiya

Sîmurx tê dîtin. Sîmurx sirra kuştina İsfendiyar ji bo Rustem eşkere dike. Darê gezê tîne da ku Rustem bikare bi tîra wê darê hember İsfendiyar bi ser bikeve.

Yanî dikare bê gotin ku hemû rengdêr û taybetî ku di metnên Îrana berî îslamê de, wek Avesta û metnên Pehlewî, yên ji bo pênasekirina Sîmurx hatine tomarkirin, di Şahnameyên Kurdî de jî tên dîtin. Ew jî dikare wek nişaneyek ji hebûn û belavbûna wan metnan dinav kurdan de bê qebûlkirin.

Çavkanî:

- Abrams, M.H., Harpham, G.G. (2012). *A Glossary Of Literary Terms*. tenth Edition. Boston: Wadsworth.
- Amir-Moezzi, M.A.(1381).« Nokatî Çend Derbareyê Te'abîrê 'Irfanîyê Şahname» di *Tenê Pehlevan ve Revanê Xeredmend* de. Meskub, Sh. (ed.). çapa duyemîn. Tehran: Enteşaratê Terhê No.
- Bahram Pajdo, Z.(1338). *Zaratosht Nameh.* Rosenberg F. (éd), werg. Dabîr Sayaqî. Tehran Enteşaratê Tehûrî.
- Behar, M. (1352). *Esatîrê Iran*. Tehran: Enteşaratê Bonyadê Ferhengê Iran.
- Behramî, Î. (1385). *Ruîntenî ve Javdanegî der Esatîr*. Tehran:Neşrê Verjavend.
- Carnoy, A.J.(1383). *Esatîrê Iranî*. werger: A.Tebatebaî. Çapa duyemîn. Tehran: 'Elmî ve Ferhengî.
- Celîl, O., Celîl, C. (2013). *Zargotina Kurda 1*. çapa sêyem. Diyarbekir: Aram.
- Chaman Ara, B. (1390). "Deramedî ber Edebê Hemasî ve Pehliwanî Kurdî ba têkyê ber Şahname Kurdî". *Costarhayê Edebî*, Şomarê 172.
- Corbin, H. (1971). *En Islam Iranien, Aspects Spirituels et Philosophiques, II, Sohrawardî et les Platoniciens de Perse*. Paris: Gallimard.
- Coyajee, J.C. (1380). « Miyanverdê Esfandiyar der Şahname ». di *Bonyadhayê Ostûreh ve Hemaseh Iran.* werg. J.Dûstxah. Tehran: Neşrê Ageh.
- Efîfî, R. (1374). *Esatîr ve Ferhengê Iranî der Neveshtehhayê Pehlevî*, Tehran: Enteşaratê Tûs.
- Emînî, M.R. (amadekar) (2010). *Şahnamey Kurdî (Hewramî)*, Slêmanî: Melbendî Roşenbîrî Hewraman.
- Esma'îlî, H. (1381). "Dastanê Zal ez Dîdgehê Qowm Şenasî", di *Tenê Paehlevan ve Revanê Xeredmend*, Meskub, Sh. (ed.). Tehran: Terhê No.
- Ferenbeg Dadegî. (1380). *Bundehiş.* ed. M. Behar, çapa duyemîn, Tehran: Enteşaratê Tûs.
- Firdewsî, E.,(1997). *Şahname. Defter-i Yekom*. J. Khaleghi-Motlagh. New York: Bibliothrca Persica.
- Hamze'ee, F. (1393). *Rezmname: Ustûrehayê Kuhenê Zagros*, 4 berg, Kirmanşah: İntişaratê Danişgahê Razî.
- *Heft Leşker*. nusxeya destxet, Sazmanê Esnad ve Ketabxanêyê Melliyê Cumhuriyê İslamî yê Îran, hejmarê Nusxe: 2941360
- Kazzazî, M.J. (1380). *Maz hayê Raz,Jostar hayî der Şahname*. çapa duyemîn, Tehran: Neşrê Merkez.
- Kerimiyan Serdeştî, N.(1392). "Şahnamehayê Kurdî". *Nameyê Baharistan*, Dorê Cedîd, Şomarê Evvel, Payîz.
- Lutfî Nia, H.(1388). *Hemasehayê Qewmê Kurd*. Tehran: Neşrê Semîra.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

- Meskub, Ş. (2536). *Muqeddemeh-i ber Rostem ve Esfendiyar.*, çapa 5mîn, Tehran: Şerkatê Sehamiyê Ketabhayê Cîbî.
- Mokri, M. (1966). *La Légende de Bizan-u Manija, Version Populaire du Sud du Kurdistan en Langue Gouranie (épisode du Shahnama, épopée Iranienne), Texte établi, Introduction, Traduction, Themes folkloriques, Notes Linguistiques et Glossaire*. Paris: Klincksieck.
- Montanari, F. (2012). "The Homeric question Today", di nav *Homeric Contexts, Neoanalysis and the Interpretation of Oral Poetry*, edited by Montanari. Franco, Rengakos, Antonios, Tsagalis, Christos, de Gruyter. Berlin/Boston.
- Neqşibendî, S.E., Kazzazi, M.J., Dawudabadi Farahanî, M.A.(1393). "Nigahî be Şahname-Sorayî ve Rezmname-Sorayî der Edebê Kurdî ve sanjesh an ba Shahname Firdewsi". *Faslname Ilmi Pajuheshi Zaban va Edeb-e Farsi- Daneshkade Edebiyat va Zabanha-ye Khareji Daneshgah Azad İslami vahed Sanandaj*, sal 6. shomare 18. Bahar.
- Parsa Teleb, A., Muezzinî A.M., Hadî, R. (1399). "Mu'errifî Nusexê Nuyaftê Qehreman Name (dastanê Qehremanê Qatil) Ve Mu'errifî Şexsiyetê Qehreman". *Dumahnamê Ferheng ve Edebiyatê Ammê*, Sal 8, Şomarê 32.
- Purnamderien, T. (1383). *Remz ve Dastan hayê Remzî der Edebê Farsî, Tehlîlî ez Dastan hayê 'Irfanî-Felsefîyê Ibn Sîna ve Sohreverdî*. çapa 5mîn, Tehran: Enteşaratê 'Ilmî-Ferhengî.
- Raşid Mohessel, M.R. (1369). « Eşareyê Tosîfî beh Berxî ez 'Enasorê Bonyadîyê Hemaseh hayê Iran » di *Ferheng*, *Ketabê Heftom*. Tehran: Moesseseyê Motale'at ve Tehqîqatê Ferhengî.
- Rastgar Fesaî, M. (1381). «Peykergerdaniyê Mowjûdatê Esatîrî der Şahname», di *Ferdowsî ve Huvîyet Şenasi Iranî, Mejmû'eh Meqalat derbareyê Şahname Ferdowsî* de. Tehran: Terhê No.
- Rezi, H.(1376).*Vendidad, Vidaevo Date*. cild. 4. Tehran: Enteşaratê Fekrê Ruz.
- Sarkhosh Curtis, V. (1994). *Mythes Perses.* werg. P. Chemla, Paris: Edition du Seuil.
- Schelling, F. (1989). *The Philosophy of Art*, ed. and trans. D. W. Stott, Minneapolis: University of Minnesota Press.
- Schmidt, H., P. (2002). "Simorgh", *Enc. Ir.,*http://www.iranica.com/newsite.
- Şîrazî, S.A.A. (1363). *Ferdowsîname*, çapa duyemîn. Tehran: Enteşaratê 'Ilmî.
- Suhrewerdî, Sh. (1976). *L'Archange Empourpré, Quinze Traités et Récits Mystiques*, traduits du persan et de l'arabe par Henry Corbin. Paris: Fayard.
- Uşîderî, C. (1383). *Daneşname Mezdisna*. çapa 3mîn, Tehran: Neşr Merkez.
- Vali, Sh. (2011). *Les Yarsan, Aspects Mythologiques-Aspects Doctrineux*. Saarbrbrücken: Editions Universitaires Europeennes.
- Vali, Sh. (2021). *Şahnameya Kurdî, Rustemê Zal û Heft Xana Wî*. İstanbul: Avesta.
- Xaleqî Mutleq, J.(1381). «'Enasorê Dram der Berxî ez Destenheyê Şahname». di *Tenê Pehlevan ve Revanê Xeredmend.* de. Meskub, Sh. (ed.). çapa duyemîn. Tehran: Enteşaratê Terhê No.

Bir Doğa-Üstü Varlık Olarak Simurg'un Kürt Şehnamelerinde Yeri ve Rolü

ÖZET:

İran/Kürt kültüründe sözlü veya yazılı olarak Simurg, en önemli mitolojik varlıklardan biridir. Simurg adı doğa üstü varlıklar arasında ilk defa Zerdüşti metinlerde Saenaya (Pehlevice: Senmurv) olarak geçmektedir. Zerdüşti metinlere göre Simurg, tüm tohumların bulunduğu bir ağaç üzerinde mesken edinmiş, kanatlarıyla savaşa bilen, yağmur ve rüzgarla gelen tohumları tüm yeryüzüne yayar.

Simurg'un varlığı İran/Kürt kolektif belleğinde İslam'dan sonra da devam etmekte ve bir sembol olarak Simurg'un İran'ın İslam döneminde de çok önemli bir yere sahip olduğu görülmektedir. Bu kuş, özellikle Farid al-Din 'Attar Nishiburi'nin (ö. 1220) ünlü kitabı Mantik'ul-Teyr de ölümüzleşmiştir . Simurg, farklı eserlerde, tasavvuf metinlerinde ve mutasavvıflar nezdinde bir rehber veya İnsan-i Kâmil olarak tasvir edilmiştir. Simurg'un ortaya çıkışı "Mutlak Akıl"ın bir simgesidir.

Tasavvuf edebiyatı dışında Simurg'un önemli rol oynadığı edebi alanlardan biri de destan edebiyatı ve özellikle Şehname'nin hikâyeleridir. Şehname'nin mitolojik kısmında her ne kadar doğa üstü güçlerin insan yaşamına dahil olması nadir ise de, Simurg, kutsal varlıkların temsilcisi olarak, Zal ve oğlunun koruyucusu rolünü üstleniyor ve ve büyük olasılıkla totemik bir rol oynuyor.

Bu çalışmanın amacı, Simurg'un Kürt şehname anlatımlarındaki rolünü ve yerini ortaya koymak ve analiz etmektir.

Anahtar Kelimeler: *Sîmurg, Edebiyata Kurdî, Destan, Mitolojî, Şehname*

"The Place and Role of Simurgh as a Supernatural Being in Kurdish Shahnameh"

Abstract:

Simurg is one of the most important mythological beings in Iranian/Kurdish Oral or written, culture. The name "Simurg" is mentioned for the first time as Saenaya (Pehlewi: Senmurv) in Zoroastrian texts among supernatural beings. According to the Zoroastrian texts, Simurgh has settled on a tree where all the seeds are located, can fight with its wings, spreads the seeds that come with rain and wind.

The existence of Simurg continues in the Iranian/Kurdish collective memory after Islam and it is seen that Simurgh as a symbol has a very important place in Iran's Islamic period. This bird is immortalized especially in Farid al-Din 'Attar Nishaburi's (d. 1220) famous book Mantik'ul-Teyr.

Simurg is depicted as a guide or Perfect Human being in different Works and mystic texts. The emergence of Simurg is a symbol of "Absolute Mind".

Apart from Sufi literature, one of the literary fields in which Simurg played an important role is epic literature and especially the stories of Shahnameh. Although it is rare for supernatural forces to be involved in human life in the mythological part of the Shahnameh, Simurg assumes the role of the protector of Zal and his son, as the representative of holy beings, and most likely plays a totemic role.

The aim of this study is to reveal and analyze the role and place of Simurg in Kurdish Shahname narratives.

Key Words: *Sîmurg, Kurdish Literature, Epic, Mythology, Shahname.*

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

BIKARANÎNA ZIMAN DI ÇÎROKÊ GELERÎYÊN ZAZAKÎ DE; MÎNAKA SÊWREGÊ

Doç. Dr. Ahmet Kırkan
Beşê Ziwan û Edebîyatê Kurdî-Fakulteya Edebîyatî-Unîversîteya Mardin Artuklu/ Turkîya

PUXTE:

Di nav dîyalektên kurdî de dîyalekta herî paş de mayî û derengketî zazakî ye. Dîroka nivîsandina wî sedsalê derbas nake. Heya niha li ser dîyalektên din yê kurdî gelek xebat hatine kirin lêbelê zazakî ji wan xebatan bêpar maye. Piştê salên 2010an li bakurê derbarê ziman û çanda kurdî de hîn xebatên akademîk û sîstematîk hatine kirin. Di vê pêvajoyê de li ser zazakî jî hîn xebat hatine kirin. Ew gotar encamê vê pêvajoyê de ye. Em di xebata xwe de li ser zazakî û devokên zazakî hîn agahîyan bidin, li ser çrokên gelerî emê rawestin. Di zazakî de çîrokên gelerî wekî mehsûlê aqilê hevpar gelek berbeav tene bikaranîn. Eslê xwe de ew çîrok ji bo zimannasî, folklor, edebiyatê keresteyên baş in. Emê li gotara xwe de wan çîrokan gore pîvanên zimannasî binirxînin. Zazakî li bakurê cografyayake fireh de tê axaftin, ji ber vî yekê me sînorê xwe tenê li navçeya Sêwregê ve sînordar kirine. Materyal û doneyên ku ma li qadê komkirine emê li gor krîterên zimannasî analîz bikin û ji alîyê fonolojî, morfolojî, morfosentaks û sentaksê ve wan çîrokê gelerîyên Sêwregê binirxînin. Armanca wê xebatê di çanda Sêwregi de tespîtkirina bikaranîna ziman e. Çîrokên ku li qadê hatine komkirin, bi çaveke zimannasî û vegêrannasî dê bên analîzkirin.

Peyvên Serekî: *Çîrok, Zazakî, Sêwregi, Zimannasî, Fonolojî, Morfolojî, Sentaks.*

Destpêk:

Mîyanê dîyalektanê kurdkî de dîyalekta ereymendê û apeymendê zazakî ya. Tarîxê nuştişê zazakî hîna seserra ra vêşî nîyo. Heta nika dîyalektanê bînan ser o geleke xebatî ameyêkerdiş labelê zazakî nê xebatan ra bêpar menda. Badê serranê 2010an vakur de derbarê dîyalektanê kurdkî xebatanê akademîkan dest pêkerdo labelê zazakî ser o qasê kurmancî xebatî nêameyêkerdene. Na xebate encamê nê pêvajoyî de ameya meydan. Ma na xebate de malzemeyanê folklorîkan ser ra yew etudêkê ziwannasî binusê. Malzemeyê folklorîkî seba edebîyatî, tarîx, ziwannasî ûsn zanistan keresteyanê bingeyînan ra yê. Tîya de zî malzemeyanê folklorîkan ser o ma vindertî.

Amancê na xebate, malzemayê folklorîkan de bikarardişê ziwanî nirxnayiş o. Zazakî mintiqayêka tenge de yena qalîkerdene. Labelê na mintiqa de gelek ziwanêko dewlemend ameyo afirnayene. Hetê cografya ra kes eşkeno mintiqayana zazakî sey vakur û başûrî dabeş bikero. Qismê vakurî de ziwanê fekkî kilam û deyîran de zêdetir xo nîşanê ma ano labelê qismê başûrî de ziwano fekkî deyîr û kilaman ra zêdetir cureyanê bînan de vejîyêno meydan. Ma do tîya de binbeşanê folklorî, tesîrê folklorî, peywendîya folklorî û zanistanê bînan nêkerê. Reyna ma do na xebate de mintiqayanê zazakî ra fekê Sêwregi sey monogram bigîrê û malzemaynê na mintiqa ser o xebate bikerê. Fekê

Zakho Centre for Kurdish Studies

Sêwregi zî hetê malzemeyanê folklorîkî ra dewlemend o û na mintiqa de peywendîya ziwananê sey tirkî, erebkî, kurmanckî û zazakî kewto têmîyan. Qandê cû malzemyê na mintiqa seba xebate gelek doneyê erjayeyan danê. Ma do seba na xebate çend hebî sanikan, çend hebî fiqra, mertal û lezvatikan tedqîq bikerê. Mîyanê nê malzemeyan de bikarardişî ziwanî îzah bikerê.

ZAZAKÎÛXEBATÊ FOLKLORÎ

Mîyanê lehçeyanê kurdkî de warê edebîyato nuştekî de lehçeya tewr erey mendê zazakî ya. Eserê ke ci ser o munaqeşe esto netêda, edebîyato klasîk yê kurdkî bi Baba Tahirê Uryan ya dest pêkeno. Baba Tahirê Uryanî eserê xo bi lehçeya lurkî ya daye. Badê cû edebîyatê kurdkî lehçeyanê kurmanckî û gorankî ser ra aver şîyê. Edebîyatê kurdkî averşîyayîşê xo seserra 19. ra dima lehçeyanê kurdkîya naverast (sorankî) û kurmanckî ya dewam kerdo. Labelê heta peynîya na seserre warê zazakî de tu eserêk nêameyê nuştene. Zazakî de esero tewr verên ancax serra 1899î de ameyo çap kerdene.

Babeta na xebatî edebîyatê klasîk yê zazakî ya. Edebîyatê klasîk yê zazakî serra 1899î de bi mewlîdê Mela Ehmedê Xasî ya dest pêkerdo û no proses hîna zî dewam keno. Çunke edebîyatê klasîk yê zazakî seserra XX. de dest pêkerdo û hîna zî dewam keno, o semed ra edebîyatê klasîk yê zazakîkes nêeşkeno goreyê serdeman/seserran tesnîf biko. Bê ney, kirmancî tena mîyanê sînoranê Tirkîya de cuyenê, qandê cû kes nêeşkeno nê edebîyatî goreyê mekanî zî tesnîf bikero. Seba zazakî, edebîyato modern û klasîk yewpar o.

Zazakî de heta nika zaf xebatê folklorîkî ameyê kerdene. Xususen Unîversîteya Mêrdînî de badê abîyayîşê Enstîtuyê Ziwananê Ganîyan no war de zaf xebatê erjayeyî, bi destanê wendekaran û mamostayan a virazîyayî. Labelê mintiqayanê zazayan ra heme malzemeyê folklorîkî nêameyê komkerdene. Heta nika bi desana projeyanê masterê bêtezî de malzemeyê folklorîkî ameyê komkerdene û hîna zî na xebate dewam kena. Nê xebatî ancax serranê dergan ra dima, bi şeklêko kumulatîf do kom bibê û korpusêk do bêro meydan.

Edebîyatê zazakîde nuşteyê tewr verênî, metnê folklorîkîyê. Nê nuşteyî sey tekstan bi destê Peter Î. Lerchî ameyê komkerdene. Serra 1979î de M. Malmîsanijî taye embazanê xo reyde *Kovara Tîrêj* veta û edebîyatê modernî û xebata folklorîke ya zazakî bi na kovare reyde reyna dest pêkerdo. Badê cû M. Malmîsanijî derheqê folklorê zazayan de bi nameyê *Folklorê Ma Ra Nimûney* kitabêk zî nuşto. Nika gelek kesan warê folklorî de xebatî kerdê û malzemeyê folklorîkî arêdayê.

Seke cor ra zî ifâde bîbî, nika derbarê folklore zazakî de gelek metnê akademîkî û rojaneyî ma dest de estê. Ma do na xebate de tenya metnanê fekê Sêwregi ser o vinderîyê. Mentee ke ma tîya de tedqîq kenê, ganî sey metnê ortaxî yê zazayan bêrê qebûlkerdene. Çunke nê metnî heme mintiqayanê zazayan de ca gênê. Ma do na xebate, metnanê folklorîkan de hetê fonolojî û morfolojî ra bikarardişê ziwanî analîz bikerê.

HETÊ FONOLOJÎ RA METNANÊ FOLKLORÎKAN DE BIKARARDIŞÊ ZIWANÎ

Metnanê folklorîkan de ma bikarardişê ziwanî de taybetmendîyê folklorîkî hetê çend krîteran ameyê analîzkerdene.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Devkîbûn

Devkîbûn, di zazakî de guherîna konsonantên nazal a navxweyî û bi hin konsonantên din re ye. Devkîbûn di eslê xwe de bûyera hevşibînê ye. Di zazakî de dengên /m/ û /n/ yê konsonantên nazal in. Çawa ku ev deng di peyvê de di nav xwe de diguherin herwiha bi dengên cuda re jî diguherin. Ji van guherînan ya herî berbiçav û belavbûyî veguherîna bi bandora konsonanta bilabial /b/ yê ku konsonanta nazal /n/ vediguherîne dengê /m/ yê ye. Ji vê bûyera deng re di farisî de *îdğam* tên gotin.[1]

"Barê soli **dîmdayo** ma ser."[2]

"Dîkê **enbîryanandê** ma yo altunî vejeno, keynaya ma do cî vejo."[3]

"**Xam** (xav) kewteni."[4]

"Kewti **vîyedê** ci."[5]

"Wexto kı çay yena nina ver, ninara zew **cambaz** vano: "Ezdo xorê kırtleme bısıma."[6]

"Maye zî birayê werdî di şina. Destê birayê werdî vila yo; **embazan** a geyreno, şimeno, weno."[7]

Lêvkîbûn

Dengên vokal ên gilover, bi hevşibînê dengên ku piştî xwe tên jî dike gilover, ji vê bûyera deng re lêvkîbûn tên gotin.[8]Ev bûyera deng ku di zazakî de zêdetir di dengên gilover de pêk tên, di konsonantên /n/>/b/ de tên dîtin.

"Şêx hendê nîm seetê duşmuş bî, qisey nêkerdî. B**ado** va:

-No birayê to benzemişê murîdanê Şêx Evdilhekîmî beno. Nêbo ki no şiro ey het."[9]

"**Behdo** mi xeyal kerdi ki, oyo bi neya adirê inan puf keno."[10]

"**Bado** apê mi cî merd."[11]

Giloverbûn

Vokaleke rast bi bandora dengên li ba xwe yên konsonantên labial ;/b/, /m/, /p/, /w/, /v/ vediguhere konsonantên gilover, ji vê bûyera deng re giloverbûn tên gotin.[12] Di vê guherîna deng de bandora konsonantên lêvî gelekî zêde ye. Di zazakî de bi taybetî semî-vokala /w/ yê dibe sedema giloverbûna vokalên rast. Ev konsonant dengên vokal yên berîya xwe diguherînin. Lê di hin mînakan de hatiye tespîtkirin ku konsonantên labîal bandorê li vokalên rast ên pişt xwe dike û dibe sedema giloverbûnê. Dibe ku di zazakî de giloverbûn bi awayê hevşibîna paşveçûyî û ya pêşveçûyî be. Herwiha dibe ku giloverbûn di peyvên zazakî û peyvên ji zimanên bîyanî ketine zazakî de bê dîtin.

"Meymanê rizî cîya yo, meymanê **bulxurî** cîya yo."[13]

Zêdebûn-Kêmbûna Dengan

Di yekeyên ziman degn pergalek çawalêhato çênakin. Bûyerên deng ên mîna guherîna deng, cîhguherîna deng, zêdebûn û kêmbûna deng hema hema di hemû zimanan de hene. Gelek bûyerên deng yên di nava pergala ziman a deng de pê tên li gor qayîdeyan pêk tên. Lê hin bûyerên deng bêpergal in. Dibe ku bûyera zêdebûn an kêmbûna deng ji ber axaftina axêver ya xelet be. Bikaranînên xelet li gor qayîdeyan nayên vekolîn û ne di nava sînorên vê xebatê de ne. Li jêr bûyerên di zazakî de pêk tên ên kêmbûn-zêdebûna deng hatiye dayîn.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ketina Deng

Ketina deng, ji ber hin sedemên curbicur nebilêvkirina vokal an konsonantên di peyvê de ye.[14] Ev bûyera deng bi giştî deng kurt dike. Dibe ku ketin di pêşdeng, dengêhundirîn an paşdengî de pêk bê. Cûreyên ketina deng yên wiha hene; ketina konsonantên ezmanî, ketina vokalên semî-vokal, ketina konsonantên qirikî, ketina vokalan, ketina vokalên dengêhundirîn.[15] Di farisî de ev wek hazf tên binavkirin.[16] Hin ketinên deng demborî ne, lê hin ketin mayînde ne. Guherîna deng a ku dem adi zazakî de dema lêkerê diguhere pêk tê, mînakek ketinên mayînde ye. Lêzêdekirin, bi taybetî dema dengên vokal li peyvê tên zêdekirin guherîna deng pêk tên guherînên bi vî rengî yên demborî ne û dema ku lêzêdekirin ji holê tên rakirin peyv dibe wek bere.

Dema ku peyvên ji erebî yên *mîna hemmam, ewwel, emma, qessab, hecc, sirr* û hwd. dikevin zazakî yek ji konsonantên cot dikeve. Dibe ku ev wek guherîna deng bê qebûlkirin lê dema lêzêdekirinê di peyvê de hin ji van dengan dîsa tên û konsonant car din dibin cot. Ev guherîna deng wek ketin an zêdebûn (cotbûn) tên qebûlkirin.

Di zazakî de ketina deng li gor vê senifandinê hatiye vekolîn: ketina deng a ku di pêşdengan de pêk tên (apheresis), ya di dengêhundirîn de pêk tên (syncope) û ya di paşdengan de pêk tên (apocope). Li gor herêmên ku lêkolîn lê hatine kirin, ji mentên folklorîk yên li ber dest mînakên ketina deng hatine dayîn. Dê mînakên ketina deng bêyî ku senifandineke li gor herêman bê kirin bê dayîn.

"Rezî **amnanî** bol bîyên şênî."[17]

"**Arwêş**, biewnî ez a nika tîya di rakewî. Eki over ra karwanê vijîyeno ti mi kenê aya."[18]

"Rocê şina na cinêk xû rê gezmaxî. Keyneker cî kena **teme**."[19]

"**Wêrandê** rezanra tayini rezê xo piştên, tayin reze xo birnayê…"[20]

"Leyranê **zareca**, sêkur meverdı."[21]

"Qandê coy, kam ki tîyara ravêrdên, na boy ra fek û zincîya bi **dismalda** woya girotên."[22]

"**Wustay** zî goşto ki anto, kerden şîşira, çehar teney şîşê goştinî viraştî…"[23]

Tam wexta na Serwet cî **wija** d'…"[24]

"Arwêş **qulda** sedirî di vindeno?"[25]

"Boynî, **sukêndo**, **welatêndo** bol durî di **istorêndo** bol har esta."[26]

"**Zewmbî** eynando çire wina bikerdên?"[27]

HETÊ MORFOLOJÎ RA METNANÊ FOLKLORÎKAN DE BIKARARDIŞÊ ZIWANÎ

Nê beşî de ma do tenya karan ser o vinderê û zazakîya Sêwregi de bikarardişê karan analîz bikerê. Tîya de karî Goreyê deman ameyê rêzekerdene.

Demo Vîyarteyo Dîyar

Demo vîyarteyo dîyar; kar, kerdiş, rewşe û hedîseyê ke demêko vîyarteyo nêzdî de qewimîyayê îfade keno. No dem sey *preterît* zî yeno namekerdene. Preterît, bi şekilêko tesil demê vîyarteyî de qewimîyayişî îfade keno.

Demo Vîyarteyo Dîyar

Demê vîyarteyê dîyarî de karanê derbasdaran de karê cumle binê tesîrê objeyî de yê. Karanê derbasdaran de demê vîyarteyo dîyarî de zemîrê şexsan, zemîrê îşaretî û sifetê îşaretî halê oblîkî de yenê û nê sey objeyî wezîfe vînenê (Gündüz, 2009: 228).

Gama ke kokê demê vîyarte û halê oblîkî de zemîrî pîya bêrê karanê derbasdaran de cumle awan bena. Na rewşe de hîrê halî vejîyênê meydan.

Oxil to çire winî **kerd**? (Adabeyi, 2005: 43).

Demo Vîyarteyo Nedîyar

Demo vîyarteyo nedîyar; kar, kerdiş, bîyayîş yan rewşa ke demê vîyarte de qewimîyayê; qalîkerdox nînan rê şahîd nêbîyo, nînan nêzano û nê nêvînayê labelê sewbîna kesêk ra meydan ameyîşê nînan eşnawito yan dima ra ferq kerdo û nînan ra behs keno. Karê nê demî verê qalîkerdişî qedîyayê. Mabênê di demanê vîyarteyî de ferqo tewir muhîm vînayîş-nêvînayîş, zanayîş-nezanayîş, eşnawitiş yan nêeşnawitişê karî yo. Eke kar terefê subjeyî ra nêvîneyayo, nêzanayeno û ameyo eşnawitene kes eşkeno behsê demê vîyarteyê nedîyarî bikero.

Na cinêk gîna sereyê ci weş weş **şiwena**(Adabeyi, 2005: 173).

Wıllı esto se, dışmenê ma **ameyê** u a **remnaya berda**(Berz, 2001: 57).

Wuza dı, Gorma'hmed vatena keyneker **keno xo vira** ew keynek ney boll finena teng; ew keynek zana kı Gorma'hmedi **xo vira kerdo**(Hayıg, 2007: 13).

Demo Nikayin

Demo nikayin, wextê qalîkerdişî de destpêkerdişî û dewamîya, kerdiş û bîyayîşê karî ramojneno. Demo nikayin tirkî de sey *şimdiki zaman*, îngilîzkî de *thepresent tense,* erebkî de **صيغة الحاصر - الحال**û fariskî de sey **مضارع اخباری**ya, sorankî de sey **کاتی ایستا**û kurmanckî de sey de *dema niha* ya yeno namekerdene(Korkmaz, 2014: 548; Karaağaç, 2019: 361;Mutçalı, 2012. 859; Çiftçi, 2013: 110 Baran, 2012: 144; Amêdî, 2012: 216; Bilbil&Oztirk, 2019: 15). No dem karan de yew nuqtaya destpêkerdişî û dewamîye îfade keno. Qalîkerdişî de kar dest pêkeno û prosesê qalîkerdişî de kar dewam keno. Nê demî de kar û hereket vatişî ya heman demde qewimîyeno. Hem kurmanckî hem zî zazakî de antişê demê nikayinî de kokê demê nikayinî yeno şuxulnayene (Baran, 2012: 144; Malmîsanij, 2015; 215).

O sıre de Fethi Beg pers **keno** u **vano**(Berz, 2001: 172).

A no mêrdek cinîya xû **gîno û şino**(Adabeyi, 2005: 71).

Demo Ameyox

Demo ameyox demêko tesil o, û heme ziwanan de demanê bingeyênan ra yo. No dem destpêkê qalîkerdoxî ra dest pêkeno û prosesê zemanî de dewam keno. Karê ke nê demî de yenê meydan, hîna nêqewimîyayê labelê tesil do biqewimîyêyê (Karaağaç, 2019: 367-368; Demîr, 2015: 72). Demê ameyoxî de kar, kerdiş, bîyayiş heme ameyoxî reyde têkildarî yê. Demê qalîkerdişî de nê karî hîna nêameyêkerdiş û nê karî do demê ameyoxî de biqewimîyê

Kam **do** verî **bêro** ser

Lajê axay **do** verî **bêro** ser

Şah Îsmayîl **do** verî **bêro** ser (Adabeyi, 2005: 31).

Demo Hîra

Demo hîra de karê ke demo vîyarte de dest pêkenê û demo ameyoxî de dewam kenê îfade benê. Demo hîra mabênê deman de têkilîye roneno. Kerdiş, bîyayîş, kar û rewşa ke dewamîye, edet, tradîsyon ûsn taybetmendîyan xo de hewênenê, demê hîra de îfade benê.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Vana ew pêlekê altûnan xwo pistin ra **vejena dana** mêrdedê xwo (Ayyıldız, 2019: 19).

ENCAM:

ÇIMEYÎ

Ammann, M. (2008). *Akademik Çeviri Eğitimine Giriş*. Çev: Emine Deniz Ekeman, İstanbul:

Bedirxan, C. A. (2008). "Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendî", *Vate: Kovara Kulturî*, Hûmare: 9 (29), Îstanbul, Payîz.

Bingöl, H. (2019). "Zaza Şiir Tarihi Üzerine Bir İnceleme". Ed: Nurettin Beltekin-Ahmet Kırkan, *Sözden Yazıya Zazaca*. İstanbul: Nûbihar.

Birgül, F. (2016). *Rêberê Bikarardişê Setê Gulgulînê Gedeyan*. Çev: Roşan Lezgîn, Diyarbekir: DİSA.

Kırkan, A. (2019). *Zazacanın Fonetik Açıdan İncelenmesi; Kuzey, Güney ve Merkez Zazacasının Karşılaştırılması*. Basılmamış Doktora Tezi, Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Wolde, G. (2007). *Tûte Hurdî yo*. Çev: J. Îhsan Espar, Stockholm: Weşanxaneya Apecê.

Yıldırım, K. & Bingöl İ. & Lezgîn R.(2012). *Edebiyatê Kirmanckî ra Nimûneyî (Zazaca Edebiyatından Örnekler),* Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

PÊVEK:

MIHOCIN

Beno nêbeno Pîrê bena. Lajêndê ci beno. Nameyê ci Miho beno. Miho tim winêno hewa ra ey ra ci rê vanê Mihocin. Mihocin beno gird. Bol gangiran o. Maya Mihocinî Mihoyî zewijnena. Maya ci gurweyêna, cinêka ci gurweyêna Mihoy û qeçanê ci warî kena.

Rojê Miho şino kar. Miho gineno erd ro. Miho bol teweno. Miho terseno û hinî nêşino kar. Cinêk sekena nêkena Miho nêşino kar. Maya Mihoy sekena Miho fina nêşino kar. Cinêk û maya Mihoyî şinê keye dê embiryanan. Vanê ki:

−Ma tayn kilênceyî virazê bîyarê keye dê şima. Teqa ra ma berzê qeçekî do şirê bigîrê. Miho do vajo juwer bidê mi.

Eki Miho winî vano maya ci û cinêka ci zî vanê ki:

−To kul nêveto ti zî şo xo rê juwer bigî.

Miho zerreyê keyî ra vijyêno teber ê kêberî gênê. Miho sekeno kêberî ci rê nêakenê. Miho tayn gêreno û beno têşan şino înî ser awe bişimo. Hendi winêno ki şêrêno yeno. Miho tersan ra vijyêno dare ser. Şêr xo saweno dare ra. Miho dare ser ra guneno şêrî serro. Her dina goşanê şêrî tepêşeno. Şêr xo akişt çerq keno nakişt çerq keno Mihoy nêşeno xo ser ra berzo. Şêr tersan ra mîzî verdano xo. Uja ra eskerê padîşahî yenê vanê:

−Miho xo qayte ki.

Eskerî tirkûvanî erzenê û şêrî kişenê. Eskerî Mihocinî gênê benê padîşahî het. Vanê padîşah no şêx o. Padîşah zî vano ki:

−Eki şêx bo nika bellî beno.

Padîşah gulê keno doşekî bin. Nameyê cinêkerda Mihocinî Gule ya. O zî vano ax Gulê ax Gulê! No girwe to ard mi sere de. Eki Miho wina vano padîşah vano no raşt şêx o. Herb esto. Padîşah vano ez do Mihocinî teslîmê şima kera. No senî keno şima zî winî bikerê. Padîşah eskerandê xo rê vano Mihocinî bigîrê berê wa xo rê estor biecibno. Nê Mihocinî gênê benê tewla. Estorî bolî yê. Jew estor mîyaneyê ci kul o. Mihocin ey ecibneno. Eskerî çîyê herbî danê xo ra labelê Mihocin qilîcê tenya gêno. Nê şinê herb. Mihocin ray ra sîyênda gird û xasek vîneno. Vano ez na sîyer bigîra bera Gule rê. Roşanê Qurbanî dİ Gule do a sîyer sero ma rê goşt bikûwo û ma rê qîmeyê goştî alawo.

Wexta eskerî zî herkes sîyê keno heqîbeyê xo. Nê xeylê ray şinê û layê vejîyena ver. Awe bol a qandê coy nêşenê la ravêrê. Herkes heqîbedê xo ra sîya xo vejenê. La mîyan de xo rê ray virazenê. Nê layer vêrenê, şinê nezdîyê dijmenî. Mihocin senî ki dijmenî vîneno tersan ra mîzî verdano xo. Mîyaneyê estora Mihocinî kul a, mîzî şina kulda estorî. Mîyaneyê estor veşeno û estor remena şina eskeranê dijminî mîyan. Mihocin tersan ra qilîca xo raşaneno. Bol eskerî keno dirbetin, bol eskerî zî kişeno. Eskerê padîşahê Mihoy zî kewnê herbî mîyan. Ê ki kişenê ê ki êsîr gênê herbî qezenç kenê. Agêrenê yenê vanê padîşahê ma Şêx Mihocin bol cesaretin, bol baqil kewt herbî mîyan. Verê hemin pêro dirbetin kerdî, kiştî. Ma zî xeyrê ey herbî qezenç kerd.
Padîşahî veynda Mihoy. Mihoy rê altûnî daye. Mihoy rê mehaş girêdê. Miho şî keye va:
−Ax Gulê ax Gulê! To çi girwe ard mi sere di.

MANGAYA BOR

Beno nêbeno. Jew keyneki bena. Na keyneki embazanê xo ya şinê distarî tehnenê. Na keyneki uja di tîzê kena. Jew embaza keyneki werzana vana ki:

−Birardê mi sere di bo mi nêkerda.

Embaza keyneka bîn werzena vana:

−Birardê mi sere di bo ki mi zî nêkerda.

Birayê keyneki çin yo. Poxta ci ra keyneki werzena vana:

−Golikê çare beşî sere di bo ki mi nêkerda.

Embazê keyneki uja di huyenê keyneki. Keyneki şermayêna, ariqê mergî yeno keyneki. Keyneki dana piro şina keydê xo. Resena keye veyndana maya xo. Maya ci yena ci het. Maya ci vana:

−Xeyr o keynaya mi? Silametey a?

Keyneki meselaya xo marda xo rê vana û marda xo ra perskena. Vana:

−Dayê çi rê birayê mi zî çin yê? Eki birayê mi bibiyayê mi do zî bivatê birardê mi sere di bo ki mi nêkerda.

Maya keyneki vana:

−Keynaya mi birayê to estê. Hem zî hewt birayê to yê. Labelê dûrî di yê.

Keyneki vana:

−Dayê to çi rê mi rê rew nêvati? Eki to mi rê rew bivatê mi do bişîyayê birayanê xo bidînayê.

Keyneki tayn fikrîyêna û qerarê xo dana. Vana ez do şira birayanê xo bidîna. Keyneki werzena marda xo rê vana:

−Mi rê wel ra herê viraze. Ez şira birayanê xo bidîna.

Maya keyneki ci rê wel ra herekê virazena. Keyneki nişena herdê xo kewna raye. Tayn şina bol şina birayanê xo vînena. Şina birayanê xo het. Birayê ci vanê:

Zakho Centre for Kurdish Studies

−Ti kes a? Ti çi kûsî ya?

Keyneki vana:

−Ez waya şima ya?

Birayê keyneki verî emel nêkenê. Dima taye persî ci ra perskenê ki na ya raşt vana. Uja de nê peşîyenê pêro.

Mabên ra serrê di serrî vêreno nê hewt Biray zî zewijênê. Biray cinîyandê xo rê vanê ki:

−Bewnîyê, na jew waya ma tenya ya. Şima do qedirê warda ma bizanê.

Biracînî riyê mêrdanê xo di vanê:

−Temam.

Rojê nê hewt Biray şinê kar. Cinî keye di tenya manenê. Xo mabên di qisey kenê vanê ma senî na keyneki ra bireyê? Biracinîya pîl vana ez zana ma do senî nay ra bireyê. Vana:

−Ma tîrmarê tepişê. Dekerê awa dorî mîyan. Keyneki awa pîya nê tîrmarî bişimo û o tîrmar do pîzeyê keyneki di gird bo. Biray zî ê do vajê na keyneki bîya heram û ê do berê bikişê.

Biracînîyê bînî vanê:

−Temam.

Keyneki şina dorî ra awe şimena tîrmarî zî awa pîya kena war. Tayn wext ravêreno no tîrmar pîzeyê keyneki di beno gird. Biray winênê ki pîzeyê warda ci masayo. Vanê qey waya ma çîyo pîs kerdo. Ma gerek nay bikişê. Qerar gênê birayo werdî do keneki bero gem di bikişo. Birayo werdî keyneki gêno beno gem darê bin. Birayo werdî qîymişê warda xo nêbeno. Fikrîyêno fikrîyêno vana ez do sekera? Ez nay nêşena bera keye. Fikrê yeno ci. Vano wayê bê sereyê xo saqeyê mi serne, xo rê rakewi. Keyneki sereyê xo nana saqeyê birayê xo ser. Biray ci zî ci rê lûlî ceneno. Keyneki şina hewna. Keyneke hewn ra werzana ki birayê ci çin yo. Akişt winêna nakişt winêna bira çin yo. Birayê xo rê zewtî dana. Vana:

−Birayê mi ti bê tellîyê to ling kewo ti bigeyrê nêgeyrê o tellî to ling de bibo dare. Heta destê mi nêgino piro to rê derman çinê bo.

Zewta keyneke qebûl bena. Tellî kewno birayê ci ling, o tellî ci ling de beno dare. No geyreno nêgeyreno, çijayê tixtor nêverdano linga xo rê dermanê nêvîneno. No nişeno herdê xo dewi bi dewi geyreno xo rê derman. Rojê şino dewi raştê qeçekî yeno. Qeçek winêno ki dara mêrdekî ling di. Qeçek remeno şino marda xo het vano:

−Dayê dayê mêrdekêno herî sero dara ci ling de ya.

Maya lajekî vana şo ê mêrdekî çoşme di wina vaje:

Xal Mûso entar o
Kerê reş bar o
Bar heme bazar o
Destê îsmaxana ware derman o.

Lajek şino çoşmeyê mêrdekî di nê qisan vano. Senî ki veng şino mêrdekî mêrdek lajekî tepêşeno vano mi ber marda xo het. Lajek, mêrdekî gêno beno marda xo het. Mêrdek derdê xo cinêk rê vano. Cinêk lajê xo rê vano şo mi rê derzîn bîya. Lajek derzînî ano dano marda xo. Cinêk senî derzînî dana linga mêrdekî ro dare hema kewna. Mêrdek vano mi ra malê dinyay çiçî wazena biwazi. Ez do bîya ra ca. Cinêk vana:

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

– Birayê mi wexto ket o ez berda gem de kerda salme ez a ya. Ez qîymişê to nêbîya ki to rê zewtî girdî bida. Wija di waye xo kena eşkera. Waye vana ez zewjîyaya. Qeçê mi estê. Mi rê malê dinyayî lazim nîyo. To rê helal bo.

Çîroka min a dîyarî

Rehmet bavê guhdarî

HEWNÊ MIHEMEDÎ

Beno nêbeno. Jew lajekê beno. Nameyê lajekî Mihemed beno. Mihemed şino mekteb. Mihemed rojê şino mekteb. Ogretmenê Mihemedî ders di vano eki şima hewn vînenê heta ki kes şima rê nêvano xeyr bo şima hewnê xo ci rê mevajê.

Mihemed rojê werzeno ki hewnê dîyo. Maya xo rê vano:

–Dayê, dayê mi hewn dî.

Maya lajekî vana:

–Hele hewnê xo mi rê vaji. To çiçî dîyo?

Hema maya lajekî nêvana xeyr bo. Lajek jî vano:

–Ez nêvana.

Maya lajekî wija di bena hêrs. Vana ti çi rê mi rê nêvanê û sîlleyê repisnena lajekî ro.

Lajek bermîya vijêno teber. Pîyê lajekî û apê ci yenê ki lajeko tebera bermeno. Vanê xeyr o? Ti çi rê bermenê? Lajek vano mi hewn dî. Poxta ci ra dayê da mi ro. Pîyê lajekî vano:

–Mi rê vaji.

Lajek înan rê jî nêvano. Pîyê ci beno hêrs û o jî sîlleyêna rehmanî anceno ci ra. Mihemed jî qehrêno şino ray sere. Ray ser ra karwanê ravêreno. Lajekî erzenê estorî ser û gênê benê. Mêrdek lajekî rê vano:

–Ti zanê mayê to çiçî rê benê?

Lajek vano:

–Çiçî rê şimayê mi benê?

Mêrdek vano:

–Jû keynayênda min a werdî esta şina mekteb. Ez qayila ki ti ci rê embazîn bikerê û şima pîya şi rê mekteb. Eza qandê coy to bena.

Mêrdek lajekî rê nêvano ti kamê? Kamî ra yê? Ti kamcî eşîr ra yê? Lajekî ra çîyê pers nêkeno. Lajek jî qalê çîyê nêkeno. Karwan tayn şino bol şino reseno keydê mêrdekî. Lajek û keyneki pîya şinê mekteb. Nê benê girdî, pîya mektebî qedînenê. Mêrdek winêno ki no lajek lajekêndo rind o. Mêrdek veyndano merdimanê xu. Înan rê vano:

–Ez wazena keynaya xu bida nê lajekî. Şima se vanê?

Merdimê mêrdekî vanê:

–To qe pers kerdo no lajek kam o? Kamcî eşîr ra yo? May û pîyê ci kam o?

Mêrdek vano:

–Nê!

Mêrdek şino lajekî het. Ci ra pers keno:

–Ti kê ra yê? Şima kamcî eşîr ra yê? May û pîyê to esto?

Lajek vano:

– May û pîyê mi esto. Eşîra mi esta. Mi hewnê dî. Mi hewnê xu keyî rê nêva. Ê zî mi ra bî hêrsî û ez keye ra qewirnaya.

Mêrdek vano:

–No hendayê girwe qandê hewnê ame to sere. To hewnê xu di çiçî dîyo? He mi rê vaji.

Lajek vano:

–Nê!

Mêrdek jî vano:

–Eki ti mi rê jî nêvanê tîya ra şo. Ez keynaya xu jî nêdana to.

Lajek keyî terkneno û fina tebera maneno. Rojê padîşah vijêno teber halê milleta xu pers bikero. Padîşahî rê qalê nê lajekî kenê. Padîşah nê lajekî veyndano xu het. Padişah lajekî rê vano ti çi rê kewtê kuçan? Lajek meselaya xu padîşahî rê vano. Padîşah şaş maneno, kewno meraq. Lajekî rê vano:

–No çi hewn o? Mi rê vaji.

Lajek vano:

–Nê!

Padîşah se keno nêkeno lajek ci rê nêvano. Padîşah jî beno hêrs. Eskeranê xu rê emir dano vano:

–Ney hema tepêşê û berzê zindan.

Eskerî hema lajekî tepêşenê û erzenê zindanêndo tarî. Zindan di lajekî veyşan teyşan verdanê.

Lajek eskero ki zindan di ci paweno ey rê vano:

–Nika na dewlete çi rê mi rê nan nêdana? Çi rê mi teyşan verdana?

Esker vano:

–Dewlete vera to vera. Derdê dewlet esto.

Lajek vano:

–Çi ameyo dewlet sere ti do mi rê vajê.

Esker vano:

–Qralê gawiran padîşahî rê di gordey riştê. Vato kamcî rind a xu rê bigîrê kamcî pîs a pey di birişê. Qral vano kam aqil o ma bivînê.

Lajek vano:

–Ney ra qolay çiçî esto. Ez ney zana.

Esker hûweno lajekî û vano:

–Hendayê merdimê dewlet estê. Ti do bizanê.

Lajek vano:

–No qolay o. Di teştî pirrê aw kerê. Gordeyan berzê aw mîyan. Kamcî rind o o do dekewo aw bin. Kamcî xirab o o do bivijyo aw ser. Kamcî vijya aw ser ey birişê qralî rê.

Esker nê qisan keno xu aqil şino padîşahî het. Vano wina bikerê. Labirê qalê lajekî nêkeno. Zey fikrê xu nê qisan padîşahî rê vano. Padîşah vano:

–Rew di teştî pirrê aw kerê û mi rê bîyarê.

Hizmetkarî emrê padîşahî anê ca. Padîşah gordeyan erzeno aw mîyan. Gordeyan ra jew kewna aw bin. Jew jî aw sero manena. Gordeya ki kewna aw bin padişah ay xu rê gêno a bîn jî rişeno qralî rê. Qral winêno ki padîşahî a xirabi rişta ci rê.

Qral vano:

–Err! Nînan mîyan di merdimê baqilî bol î.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Demeyê ravêreno qral na fin di estorî rişeno padîşahî rê. Di estorî jî zey pê yê, jû reng dê. Vano kamcî estor rind o xu rê bigîrê kamcî gewşega mi rê birişê. Padîşah hema veyndano ê eskerî. Vano:

−Baqilê ma tîyê. Ney rê çareyê bivîne. Ma do se kerê?

Esker padîşahî ra tayn wext wazeno. Padîşah vano:

−Temam.

Esker padîşahî het ra abirêno şino lajekî het. Lajekî rê qalê mesela keno. Lajek vano:

−No qolay o. Çewres metre erd aşanê. Di esparî wa cinişê estoran ser. Estora xort do xu serra çekero gewşeg jî pey di biremo.

Esker remayîşa şino padîşahî het. Padîşahî rê vano eki ma wina bikerê ma do kamcî rind a kamcî gewşega ma do fehm bikerê. Padîşah emir dano hizmetkarandê xu. Hizmetkarî çewres metre erd aşanenê. Estora xort xu erzena a gewşeg pey di remena. Padîşah estora gewşeger qralî rê pey di rişeno. Qral winêno ki estora gewşeg rişta. Qral vano:

−Aqilê nînan bol o. Ma se kerê?

Qral problemna vejêno. Padîşahî rê xeber rişeno. Vano:

−Estoranê şima mîyan di nêweşîn esta. Wija di estorê şima nêweşî tîya di bergîrê ma mîrenê. Padîşahî rê vano şima gerek estoranê xu pêrkin bikişê.

Padîşah fina veyndano ê eskerî. Eskerî rê vano:

−Baqilê ma tîyê. Ma do se kerê? Mi rê vaji.

Esker fina padîşahî ra tayn wext wazeno.

Padîşah vano:

−Temam.

Esker hema şino zindan lajekî het. Mihemedî rê mesela vano. Lajek eskerî rê vano:

−No jî qolay o.

Esker vano:

−Senî qolay o. Mi rê vaji.

Lajek vano:

−Nê!

Esker vano:

−Çi rê ti nêvanê? Ti çiçî wazenê?

Lajek vano:

−Kamî mi dekerdo no zindan wa mi tîya ra vejo ez ci rê vaja.

Ekser se keno lajek ci rê nêvano. Esker winêno ki rayna nêmenda şino padîşahî rê vano:

−Nê aqilan pêrkin lajeko ki zindan di day mi. Nê fikrê mi nîyê. Ê ey ê.

Padişah emir dano eskeran vano:

−Şirê ê lajekî zindan ra vejê bîya rê mi het.

Eskerî şinê zindan ra lajekî vejenê. Anê padîşahî het. Padîşah vano hal meden mesele wina yo. Ma se kerê?

Lajek padîşahî rê vano:

−Mi rê çewres esker û çewres estor bîya. Mi çawişê nê eskeran ki. Ez se vaja eskerî do zey mi bikerê. Ez do şira qralî het.

Padişah vano:

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

−Temam.

Padîşah çewres esker dano emrê lajekî. Lajek û çewres esker raşt benê şinê welatê gawiran. Nê tayn şinê bol şinê resenê welatê qralî. Lajek eskeran rê emir dano vano şima kotî di kutikê vînenê bikişê heta qralî het. Nê kutikan kişenê şinê resenê qralî het. Qral lajekî rê vano:

−Sebebê nê kutikan çiçî bî. Nê kutikan se kerdo şima ti do mi rê vajê. Lajek vano:

−Kutikî tîya di lawayê wija di vergî kewtê çarwanê padîşahî mîyan.

Qral vano:

−Qe çîyêndo wina beno. Na zûrî ya. Tîyê zûrî kenê.

Lajek vano:

−Çi welatê ma de estorî nêweş kewnê tîya di bergîrê şima mirenê? Çi rê ê şima beno çi rê ê ma nêbeno?

Qral vano:

−Mi qandê herbî wina kerdê. To bi aqilê xo ya herb vindarna. Jû keynaya mi tenya esta. Aqilê to bol o ez do keynaya xu bida to.

Qral keynaya xu dano lajekî. Mihemed keyanaya qralî gêno û çewres eskera kewno ray. Xeber yena padîşahî rê ki Mihemedî cewabê qralî dayo. Qralî jî qandê xelata lajekî keynaya xo daya ci. Padîşah jî vano ez do jî keynaya xu bida ci. Lajek yeno welatê padîşahî. Padîşah Mîhemedî rê keye roneno û keynaya xu dano ci. Benê di cinîyê lajekî.

Lajek rojê şewra werzeno dest û rîyê xu bişûwo. Cinî vanê wa mêrdeyê ma nêedzîyo wa nêşiro tebera dest û rîyê xu nêşûwo. Cinîyan ra jew Mihemedî rê îbriq û dismal ana a bîn jî teşt ana ki Mihemed mîyan di dest û rîyê xu bişûwo. Lajek yeno winêno nînan ra û hûweno. Keynaya padîşahî vana:

− Ti çiçî rê hûwenê? Ez keynaya padîşahî ya.

Keynaya qralî vana:

−Ez jî keynaya qralî ya. Ti çiçî rê hûwenê?

Cinî pîya vanê:

−Ti hûwenê ma. Mayê şinê.

Mihemed vano:

−Vinderê. Ez nêhûwaya şima. Mi demeyê hewnê dîbî eza qandê ey hûwena.

Mihemed senî qalê hewnî keno her di cinî finê ra vanê:

−Xeyr bo!

Vano ez hewt sere bîya mi hewnê dî. Hewnê mi zî no yo:

− Aşmî mi dest bî, roj jî mi pistin di bî.

Keynaya padîşahî vana:

−Roj ez bîya.

Keynaya qralî vana:

−Aşmî jî ez bîya.

ELÎ Û FATÎMA

Beno nêbeno. Wayê û birayê bena. Nameyê keyneker Fatîma ya ê lajekî jî Elî yo. Maya qeçikan şina rehmet. Pîyê qeçikan xu rê fina zewjêno. Qeçikan rê dêmarî ano. Dêmarî jî bol zalim bena. Dêmarî tim û tim qehrêna qeçikan ra. Dana qeçikan ro, qeçikan kûwena. Dêmarî hen di ki zalim a pîyê qeçikan çiçî kareno, çiçî rameno kuho nêbeno. Rezê herkesî beno kuho ê mêrdekî nêbeno. Dêmarî mêrdeyê xu rê vana:

−Mêrdekî şo zîyar duay biki. Beno ki duayê to qebûl bê çîyê ma kuho bo.

Mêrdek vano:

−Temam cinêkî. Ez do şira.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Mêrdek kewno ray şino. Cinîya mêrdekî jî raya bîn ra remena verê mêrdekî resena zîyar ser. Wija di xu dar peynî di nimnena. Mêrdek yeno zîyar. Veyndano Ellay. Vano:

–Ez çiçî ramena kuho nêbeno. Ê herkesî beno ê mi nêbeno.

Dêmarî dar pey ra cewab dana mêrdekî. Vana:

–Elî û Fatîma pîya sere bibirni gonîya ci tê mîyan ki çîyê to do kuho bo, bol bo.

Mêrdek beno raşt, vera keydê xu yeno. Dêmarî verê mêrdekî resena keye. Mêrdek jî dêmarî dima yeno kewno zerre. Cinêk mêrdeyê xu ra perskena. Vana:

–Ziyar to rê se va mêrdekî?

Mêrdek vano:

–Zîyar mi rê çîyê va. Labirê çîyo ki mi rê va bol çetin o. Ez ey nêkena. Nêşena bikera çunki mi rê bol çetin yeno.

Cinêk vana:

–Nika to rê se va?

Mêrdek vano:

–Mi rê va sereyê Elî û Fatîma bibirni.

Cinêk vana:

–Ma bibirnê. No rehat o.

Mêrdek vano:

–Ê şîyê qirş arêkerê. Ti ci rê cemê nan hadire bike wa nanê xu bûrê ma hendo cikerê.

Cinêk vana:

–Temam.

Elî û Fatîma qirş ra yenê. Vanê:

–Dayê mayê veyşanî.

Cinêk vana:

–Qurban mi şima rê nan hadire kerdo. O yo zerre di. Şirê pîzeyê xu mird kerê.

Fatîma gird a Elî werdî yo. Elî nêzano û nanê xu weno. Fatîma xu mîyan di vana no nan ma rê hadire nêbeno û ê nanî nêwena. Hechecik pencera ra qisey kena. Vana:

–Biremê! Ê yê kardîyan gênê û yenê. Fatîma nanî çekena hechecik rê û birayê xu gêna lojin ra vijêna û remena. Elî û Fatîma xeyle ray şinê. Şinê welato dûrî. Elî werdî yo damiş nêbeno, beno teyşan. Awe wazeno. Fatîma Elî rê vana:

–Elî birayê mi bewnî ti kamcî paling ra aw bişimê ti do o heywan bê. Aw meşimi.

Elî vano:

–Waqe. Ez do bişima. Ez bîya teyşan.

Fatîma vana:

–Elî meşimi. Ti do heywan bê.

Elî vano:

–Nê! Ez do bişima. Eza teyşan.

Elî çalê di aw vîneno. Çal çoşmedê rêça linga kaviran esta. Elî aw şimeno beno kavirek. Warda xu dima tim şino. Nê tayn şinê bol şinê yeno jew dol ver. Dol vero sayêrênda bol gird bena. Fatîma vijêna sayêr ser. Rîyê Fatîma awa dol sero aseno. Lajê axay yeno dol estora xu aw bido. Lajê axay rîyê Fatîma aw sero vîneno. Lajê axay xu ra cor winêno keynekêna sayêr sero. Vano:

–Ti kam a? Ti kotî ra ya?

Fatîma vana:

–Kesê min çin yo.

Lajê axay vano:

Zakho Centre
for Kurdish Studies

−Ti tîya di dar sero vindi ez do bêra to bigîra.

Lajek şino pêrdê xu het pêrdê xu rê vano:

−Mi xu rê jew dîya. A ya sayêr sero. Sayêra ki dol vero ya.

Axa vano:

−Wa bo. Şo bîya.

Kêberî pey di keynaya cînganî goştareya nînan kena. Keynaya cînganî hema şina dol het. Vijêna sayêr ser û Fatîma erzena cêr. Fatîma tîya di bena xayib, bena vinî. Veyvî yeno winênê dar ser ki keynekênda sîm û sîya ya. Keyneki rê vanê:

−Ti çi rê hendayê sîya ya?

Keyneki vana:

−Şima erey mendî ez ay ra bîya sîya.

Veyvî keynaya cînganî gênê benê. Lajê axay naya zewjêno. Fatîma jî hewşê lajê axayî di bena sayêrênda gird. Wexto ki keynaya cînganî şina sayêr bin sayêr bena wişk. Çi wext lajê axay şino sayêr bin sayêr bena kuho. Keynaya cînganî bena hêrs mêrdeyê xu rê vana ma na darer cikerê. Lajê axay dar birneno. Kolîyanê ci dano pîrekê. Keyeyê pîrer jî zey zindanî tarî yo. Pîri kolîyan bena keydê xu keyeyê pîrer zey tîjî beno roşn. Pîri rojê yena keydê xu ki keynekênda xasek keye da. Pîri tersena. Keyneki pîri rê vana:

−Mi kesî rê mevaji. Ez xu rê bena keynaya to.

Pîri qebûl kena. Vana:

−Temam.

Tayn şino bol şino zimistan yeno. Vewri varena. Zimistan çetin ravêreno. Lajê axay nêşeno estoranê xu warî kero. Estoranê xu dewijan rê vila keno. Vano her gi keye do estorê warî kero. Jew estor jî beno keydê pîrer. Pîri vana:

−Mi rê meya. Ez feqîr a. Ez do çiçî bida ney. No do tîya di bimiro.

Lajê axay vano:

−Eki estorê mi merd boçika ci mi rê bîya ki ez bizana estor merdo. Mi rê bes o.

Lajê axay estorê jî dano pîri. Fatîma kotî di destanê xu şûwena wija beno kuho. Estor ê kuhoyînî wena. Estorê pîrer beno bol rind. Zimistan qedêno lajê axay estoran arêdano. Winêno ki estorî heme merdê ê pîrer tenya mendo. O jî bîyo bol rind. Wexto ki kenê estorî berê keyneki destê xu dana estorî ro vana:

−Hîrê qorî çoşmeyê dew di bigeyrî dima bê orteyê dew di bikewe. Heta ki ez nîna destê xu nêdana to ro mewerzi.

Lajê axay senî estorî vejeno teber estor dest ra reyeno. Estor çoşmeyê dew hîrê qorî remeno yeno orteyê dew di xu erzena erd. Lajê axay se keno nêkeno estor nêwerzeno. Veyndano dewijan kes nêşeno estor werzano. Lajê axay vano:

−Dew di kes mend?

Pîri vana:

−Keynaya mi menda. Eki ti wazenê wa a jî bêro.

Lajê axay vano:

−Wa a jî bêro.

Şinê veyndanê Fatîma. Vanê:

−Lajê axay veyndano to.

Fatîma vana:

−Heta keydê mi ra estorî het text nêgirêdeyo ez nîna.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Lajek keye ra heta estorî text girêdano. Fatîma ê textan ser ra şina estorî het.Lajek pîri rê vano:

−To na keyneki kotî ra ard a? A ki mi sayêr sero dîya na a ya.

Pîri vana:

−Wexto ki to kolî day mi ez ameya ki a ya keydê mi di.

Fatîma yena destê xu dana estorî ro estor hema werzeno. Keyneki wexta lajê axay rê vana:

−Na cînganer ez sayêr ser ra eşta. Lajê axay wija di cînganer qewirneno Fatîma gêno.

Perawêz:

---

[1] Baqiri, **Muqeddimati Zebanşinasi**, r. 217.

[2] Kafur Seçilmek, **Edebîyatê Fekkî yê Kırmanckî (Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi,** Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin 2018, r. 130.

[3] Adabeyi, **Estanekanê Sêwregi ra**, r. 105.

[4] Seçilmek, **Edebîyatê Fekkî yê Kırmanckî (Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi**, r. 151.

[5] Seçilmek, **Edebîyatê Fekkî yê Kırmanckî (Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi**, r. 140.

[6] Hayıg, **Mahmeşa**, r. 66.

[7] Seçilmek, **Edebîyatê Fekkî yê Kırmanckî (Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi**, r. 80.

[8] Özkan, **Türkiye Türkçesi Ses ve Yazım Bilgisi**, r. 208-209.

[9] Seçilmek, **Edebîyatê Fekkî yê Kırmanckî (Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi**, r. 111.

[10] Ayyıldız, **Hersê Zerrî**, r. 72.

[11] Adabeyi, **Estanekanê Sêwregi ra**, r. 164.

[12] Özkan, **Türkiye Türkçesi Ses ve Yazım Bilgisi**, r. 214.

[13] Seçilmek, **Edebîyatê Fekkî yê Kırmanckî (Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi**, r. 142.

[14] Özkan, **Türkiye Türkçesi Ses ve Yazım Bilgisi**, r. 179.

[15] Özkan, **Türkiye Türkçesi Ses ve Yazım Bilgisi**, r. 179-187.

[16] Baqiri, **Muqeddimati Zebanşinasi**, r. 217-218.

[17] Ayyıldız, **Hersê Zerrî**, r. 47.

[18] Kürkçü, **Çend Estanekê Ma**,r. 14.

[19] Adabeyi, **Estanekanê Sêwregi ra**, r. 180.

[20] Ayyıldız, **Hersê Zerrî**, r. 48.

[21] Ergun, **Na Fin Do Bıbo**, r. 91.

[22] Ayyıldız, **Hersê Zerrî**, r. 88.

[23] Ayyıldız, **Hersê Zerrî**, r. 67.

[24] Adabeyi, **Estanekanê Sêwregi ra**, r. 187.

[25] Seçilmek, **Edebîyatê Fekkî yê Kırmanckî (Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi**, r. 161.

[26] Adabeyi, **Estanekanê Sêwregi ra**, r. 114.

[27] Ayyıldız, **Hersê Zerrî**, r. 10.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینین کوردی

ZAZACA HALK HİKAYELERİNDE DİLİN KULLANIMI: SİVEREK ÖRNEĞİ

Özet:

Kürtçenin diyalektleri içerisinde en geride kalmış ve geç kalmış olan Zazacadır. Bu diyalektin yazılı edebiyatı geçmesinin üzerinden hala yüzyıl geçmemiştir. Şimdiye kadar Kürtçenin diğer diyalektleri üzerinde birçok çalışma yapılmıştır ama Zazaca bundan mahrum kalmıştır. 2010 yılından sonra özellikle akademinin açılmasından sonra, kuzeyde Kürt Dili ve Kültürüyle ilgili akademik ve sistematik çalışmalar yapılmaya başlanmıştır. Bu süreçte Zazaca üzerinde bazı çalışmalara yapılmaya başlanmıştır. Bu makale böyle bir sürecin sonucudur. Bu makalemizde Zazalar ve Zazacanın ağızları üzerine bilgiler verilmiş ve folklorik hikayeler üzerinde durulacaktır. Zazacada da halk masalları veya halk hikayeleri ortak akılın bir ürünü olarak ortaya çıkmışlardır. Aslında bu materyaller dil bilim, folklor ve edebiyat için önemli kaynaklardır. Biz bu makalemizde bu hikayeleri dil bilim kriterlerine göre değerlendireceğiz. Zazaca geniş bir coğrafyada konuşulan bir dildir, bundan dolayı biz makalemizin sınırını Zazacanın Siverek ağzıyla sınırlı tuttuk. Çalışma sahasından derlediğimiz materyalleri ve verileri, dil bilim kriterlerine göre değerlendireceğiz ve bu verileri fonoloji, morfoloji, morfo-sentaks ve sentaks açısından inceleyeceğiz. Bu çalışmanın amacı, Siverek ağzındaki Zazaca folklorik hikayelerde dilin kullanımını ortaya çıkarmaktır. Sahadan toplanmış olan hikayeler, çeşitli metotlar kullanılarak incelenmiştir.

Anahtar Kelimeler: *Hikaye, Zazaca, Siverek, Dil bilim, Fonoloji, Morfoloji, Sentaks.*

THE USE OF LANGUAGE IN ZAZA FOLK STORIES: THE EXAMPLE OF SİVEREK

Abstract:

Among the dialects of Kurdish, Zazaki is the mostbackward and late. It has not been a century since thisdialectpassedthrough the written literature. So far, manystudieshavebeendone on otherdialects of Kurdish, but Zazaki has beendeprived of this. After 2010, especiallyafter the opening of the academy, academic and systematicstudies on Kurdish Language and Culturebegan to be carriedout in the north. Inthisprocess, some studies were started on Zazaki. Thisarticle is the result of such a process. Inthisarticle, information on Zazas and theirdialectswill be given and folkloricstorieswill be emphasized. Folk tales or folk tales in Zazaki haveemerged as a product of the commonmind. In fact, thesematerials are importantsources for linguistics, folklore and literature. Inthisarticle, we willevaluatethesestoriesaccording to linguisticcriteria. Zazaki is a languagespoken in a widegeography, so we havelimited the scope of ourarticle to the Siverek dialect of Zazaki. We willevaluate the materials and datacollectedfrom the studyareaaccording to linguisticcriteria and examinethese data in terms of phonology, morphology, morpho-syntax and syntax. The aim of thisstudy is to reveal the use of language in Zazaki folkloricstories in Siverek dialect. The storiescollectedfrom the field were analyzedusingvariousmethods.

Keywords: *Story, Zazaki, Siverek, Linguistics, Phonology, Morphology, Syntax.*

ÇANDA SERÎGIRÊDANA JINAN DI FOLKLORA KURDAN DE

Dr. Tekin ÇİFÇİ
Artuklu-Mardin/Turkîya

PUXTE:

Dema ku em behsa folklora kurdan dikin rola jina kurd a di veguhestina çanda kurdan de tê rojevê. Lewre, tê zanîn ku ji amadekirina xwarin û xurekan heta cil û bergan ta mamik, çîrok, kilam û çîrvanokan hemû çand bi dest û devê jinan ji nifşekî vediguheze ser nifşekî din. Yek ji taybetiya folklora kurdan û remza jinên kurd cureyên sergirêdana wan, ango poşiya û xêliya wan e. Jinên kurd ji temenê xwe yê piçûk û pê ve dest bi nixûmandina pora xwe dikin. Ev yek, ji aliyê ol û baweriyê ve wekî bicihanîna pêwîstiyekê ye. Ji aliyê din ve wekî amûreke xemla jinan bûye beşek ji jiyana rojane. Li her devera welatê me jin bi teşe û amûrên cuda serê xwe girêdidin. Amûrên girêdanê û navlêkirina wan li gorî herêman diguhere. Wek mînak, li herêma Mêrdînê jin çarikên sipî û dirêj didin sere xwe û bi hibriyan dora sere xwe girêdidin. Li herêma Rihayê jin, kumekî ji rengê qedîfeyê didin sere xwe û kitaneke xemrî (purple-mor) davêjin ser serê xwe. Lî herêma Serhedê jin kitaneke spî ku dora wê bi morî û mircanan hatiye neqişandin didin serê xwe. Jinên navsal û bawermend çarik û kitanên xwe naxemilînin û qet rê nadin ku pora wan ji der ve xûya bike. Ev xebat, li ser amûr, cure û rêbazên serîgirêdana jinên herêma Semsûrê ango kevneşopiya kofî/çît û kulikê jinan hûr dibe.

Bajar, ji aliyê başûr û başûrrojhilat ve bi bendava Atatûrkê hatiye pêçan. Li bakurê Semsûrê jî çiyayên bilind û asê rêz dibin. Ev teşeya erdnîgariyê bi awayekî xwezayî bûye sedema parastina çanda qedîm ya Kurdan. Yek ji nimûneya vê çandê serîgirêdan ango xêliya jinên kurd e. Li herêmê wekî “kofî” ango çît û kulik” tê navlêkirin. Di girêdana kofiyê de berê li gorî mezinbûna serî pirtiyên qedîfe ango empîrme “kum” tê dirûtin. Piştre dîsa bi pirtiyên rengîn ên bermayî “şidika binstû” tê amadekirin. Pirti, du-sê caran li ser tê dutakirin û dirûtin. Jin, kum didin serê xwe û dirêjahiya şidikê dipîvin. Şidik di rasta her du guhan de bi kum ve tê dirûtin. Dema ku kum didin serê xwe şidikê jî di bin çena xwe re derbas dikin. Bi vî rengî kum li ser serê jinan sabît disekine. Di rêza sêyemîn de girêdana “çît”ê heye. Çît, piranî ji pirtiyê herîr û sirmeyê tê çêkirin. Etar ango bazirgan çîtan ji aliyê Rihayê (Urfa), Îranê an Helebê dikirin û tînin herêmê. Çît, li dora kum tê gerandin û li pêşiya serî wekî girêkekê tê girêdan. Bi vî awayî wekî qalibekî sabît dimîne. Piştî girêdana çîtê dora kitan ango çarika spî ye. Kitanê ji gûçikên (qunc/goşe) wê çep û rast duta dikin û davêjin ser çîtê. Herdu gûçikên dirêj li ser singa xwe digihînin hev û girêdidin. Ji bo ku kitan ji ser çît û kulik neşemite bi nîkeke zivîn ango zêrîn tê girtin. Herî dawî dora xeml û xişrên dora kofiyê ye. Qorek pîlik/pelikên ji zêr an zîv bi pêşiya kofiyê ve tê daliqandin. Berî ku gelê herêmê bi amûrên teknolojiye û perwerdehiyê re hevnas bibin, cara pêşî di serdema derbasbûna ji zaroktiyê û ber bi keçikbûnê de jinên kurd kofî girêdidan. Di vê demê de çarika ser kofiyê rengîn e û bi morî û mircanan tê xemilandin. Dema ku jin dizewice, tenê çarika

Zakho Centre
for Kurdish Studies

spî davêje ser kofiyê lê xişrên dora kofiyê zêde dibin. Dema ku jin pîr dibe, kofî sade dibe û xişr ji holê radibin.

Wekî encam hate dîtin ku sergirêdana/serpoşa jinan li gorî serdemên jiyanê, mezheb û eşîran teşe û reng diguherîne. Di salên dawî de keçik û jinên ciwan nema kofiyê didin serê xwe. Li herêmê kêm jinên pîr û navsal vê çandê didomînin. Berê ku ev ji holê rabe divê xebatên tomarkirinê û lêkolînên li ser vê çandê bêne zêdekirin.

Peyvên Sereke: *Folklora Kurdan, Semsûr (Adıyaman), Cil û bergên Jinan, Kofî*

Despêk:

Nivîskarê navdar Yaşar Kemal, ku bi selê xwe ji malbateke kurd e, di pirtûka xwe bi navê Nuhun Gemisi (Keştiya Nuh) de behsa kofiyên jinên Kurd dike û dibêje "Ji serpoşa ku didin serê xwe re "kofî" dibêjin. Pirtiyên rengîn ên hewrişîmî pêçane li dora kofiyê. Rengên baldar û dilbijok." (Kemal, 2004).

Dema ku em behsa çanda folklora civakekê bikin, di serî de çanda devkî, kevneşopî, xwarin libas û serpoş tê hişê mirov. Di erdnîgariya Kurdistanê de kurd, bi gelek cûreyên cil û bergan, serpoşan balê dikişînin. Xeml û xişrên jinan jî her dem bûne remza xweşikî, statû û desthilatiyê (Kaya, 2021). Ji ber ku ji serdemên Antîk heta niha bi sedan şaristaniyan li herêma Kurdistanê desthilatiya xwe li dar xistine û her yekê ji wan çanda xwe li ser çanda şaristaniya berî xwe zêde kirine.

Tê zanîn ku di çanda kurdan de gelek cureyên serîgirêdana jinan hene. Mijara vê danezanê çanda serîgirêdana jinên kurd e. Bi taybetî, em dê li ser kofiya jinan hûr bibin. Lewra kofî xemleke netewî ya kurdan e. Ji aliyekî ve xeml û xweşikiya jinan diyar dike ji aliyê din ve jî berdevkiya çanda kurdan dike. Di kofiyê de remzên kurdî xûya dikin. Ji ber ku jinên Kurd, heta nîveka sedsala 20an jiyana xwe piranî li gûndewaran derbas kirine, wekî gelek kevneşopiyên din kevneşopiya kofîyê- bi devoka Semsûrê çît û kulik- heta îro li ser piya maye. Jinên Kurd, di jiyana xwe ya rojane de, di şahiyên wekî hinne, dawet, nîşan û cejnan de kofiyên xwe didin serê xwe, dora wê dixemilînin. Bi vî rengî hem ji kevneşopiya xwe didomînin hem jî bala her kesê xerîb bi hêsanî dikişinin (Kültür ve Turizm Bakanlığı 2022). Lê mixabin ji ber sedemên cûda roj bi çanda kofîgirêdanê wekî berfa li ber rojê dihele.

Dîroka çanda kofiyê:

Semsûr, hem ji aliyê çanda devkî hem jî ji aliyê çanda libas û serîgirêdana jinan ve xwediyê cihekî xwemalî ye. Di vê çanda sergîrêdana jinan de şopên hezarsalan, gel û baweriyên cûda hene. Em ji bermahiyên dîrokî fahm dikin ku li herêma Semsûrê, ji serdema Paleolîtîk heta niha gelek şaristanî bi cih û war bûne (Halaçoğlu, 1988). Her gelê ku li ser vê xakê bi cih û war bûye, şaristaniya xwe li ser şaristaniya berî xwe ava kiriye. Ji ol û baweriyan bigre heta bi rê û rêgezên jiyanê; ji çandiniyê bigre heta bi pergala sazkirina rêvebiriyê di hemû qadên jiyanê de pêşketinên nû li yên berê zêde kirine. Li Semsûrê, li deverên cihê gelek bermahiyên piştî serdema Paleolîtîk jî heta îro li ser piya mane. Lêkolînên ku li Şikefta Palaniyê, Heyderan û Xerabeyên Pîrînê hatine kirin diyar dikin ku dîroka vî bajarî digihêje 40 hezar sal beriya zayîna Hz. Îsa. Li şûnwara Şehremûsê a navçeya Semsatê bermahiyên serdema Paleolîtîk (BZ. 7000) heta serdema Tûncê hatine dîtin. Herweha li gundê Encûzê (Bi Tirkî: Eskîtaş) li ser kêlên goristanên kevin xetên Hîtîtiyan hatine dîtin (Adıyaman Valiliği 2022). Piştî Hîtîtiyan bi dorê Hurrî,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكۆلینێن كوردی

Mîtannî, Kummuh, Asûr, Pers, Komagene, Roma, Bîzansî, Selçûqî û Osmaniyan jî li herêmê desthilatiya xwe li dar xistine (Toprak, 2018). Peykerên li serê çiyayê Nemrûdê, Keleha Kolikê, stûnên li derdora Bêhisniyê hîn li dar in. Ji ber vê yekê, bi hêsanî em dikarin bêjin ku Semsûr xwediyê dîrok û çandeke gelekî dewlemend û kevnare ye. Ev demlemendiya dîrokî xwe di çanda cil û bergên jinan de jî dide der. Bi taybetî jî di kofiyê jinan de. Hin lêkolînerên tirk, dixwazin çanda kofiyê bi baweriya şamanîzmê ve girêdin û ji pesendkirina vê yekê jî hin teswîrên serdema padîşahê Osmaniyan Siltan Silêman nîşan didin (Ağırmatlı & Begiç 2021). Lê belê dema ku em li peykerên li serê Çiyayê Nemrûdê dinihêrin, em dibînin ku di serê peykerê xwedavendê Kommageniyan Fortuna de serpoşeke wekî kofiyên îro heye (Kültür ve Turizm Bakanlığı 2022).



Fortuna (Xwedavwenda Siûdê)

Wekî serpoşekê çanda kofiyê ne tenê li herêma Semsûrê, li bajarên bakur yên wekî Sêwaz, Erzirom, Erzingan, Dêrsim, Mûş, Agirî, Bilîs û Hekariyê jî bi awayên cûda hebûna xwe didomîne. Wek mînak, li gûndewarên bajarê Meletiyê, jin "kulik" didin serê xwe. Kulik, ji kulavê hirî tê çêkirin û bi şidikekê bi stû ve tê girêdan. Tasikeke zivîn an ji sifir didin ser kulik bi xişrên cuda tê xemilandin. Qoleke ji zêrên piçûk pêşiya kulik dixemilîne (Özus, Erden & Tufan 2014).

Cil û ber û kofiyên jinên Kurd, ji berê heta niha bala lêkolîner û gerokên biyanî jî kişandiye. Gerok û folklornasê Brîtanî Lucy M.J. Garnett (1849-1934), di berhema xwe ya bi navê *"The Women of Turkey ande Theîr Folk-lore/Kurdish Women"* ku di sala 1891an de weşandiye de behsa jinên kurd dike û dibêje ku *"Li serê wan*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

koloseke/kofiyeke giran heye. Dişibe taca serê Serkeşeyan (Psîkopos). Li ser wî kolosî şalên rengîn ên hewrişîmî hene. Kofî, tevî van serpoşan bi qasî 2 fîtan (61 cm) dirêj dibe. Guçikên (Kûnc/goşe) wan kofiyan heta erdê dirêj dibin. Hin ji van kofiyan bi sirmeyên rengzêrîn, pereyên kevin, pîlik û moriyan hatiye xemilandin. Ev kofî xemla jinên kurd e. Digel ku bikaranîna wê ne hêsan e jî hin ji wan bi şevê jî kofiyê xwe ji serê xwe danaxin. Guliyên pora wan li her du aliyan xwe berdide xwarê." (Bayrak, 2002). Serbazê Brîtanî E.W. Charles Noel, di berhema xwe ya bi navê "Diary of Major Noel on Specîal Duty in Kurdistan (1919)" de behsa eşîrên herêma Semsûrê dike û dibêje ku *"Jinên ku ji mezheba sûnniyan e kum didin serê xwe û çîta sipî davêjin ser kum."* (Noel, 2014).

Digel ku teqez naye zanîn bê ka di kîjan serdema jiyanê de kofî tê girêdan, li gorî lêkolînên ku me li gundewarên Semsûrê kirine û agahiyên ku me ji jêderên zindî wergirtine kofî di derbasbûna zaroktiyê ta heyama xortaniyê de wekî diyardeyekê tê pêkanîn (Adıyaman'da kofi kültürü kayboluyor 2020). Li hin herêman di dema xelatkirin ango dawetê de kofî bi rê û rismekê tê girêdan. Ji ber ku kurd wekî eşîran bi rêxistin bûne, her eşîrekê jî li gorî xwe rêbazeke lixwekirina kincan (libasan) û serpoşan a xwemalî diyar kiriye û li gorî wê kevneşopiyê jiyana xwe saz kirine. Ev kevneşopî nasnameya jinan a civakî jî diyar dike. Wek mînak, jinên ji eşîra Kawiyan piştî ku çît û kulik didin serê xwe kitaneke spî (gewr) û dirêj davêjin ser kofiyê. Jinên ji eşîra Îzoliyan berê kum didin serê xwe, piştre kitana spî davêjin serê xwe û piştre çîta zivîn li dora kitanê dipêçin (Kaygusuz, 2017). Li gorî lêkolîner û nivîskar Turan, jinan berê kêm caran kofiya serê xwe bi temamî davêtin. Ew jî ji ber sedemên tendirûstiyê bû. Lewra kum ji kulavan dihate çêkirin û tevî çît û xişrên din gelekî giran dibû. Ew yek jî dibû sedema serêşê (Kofî Bir kadın Aksesuar Giysisi ve Parçasıdır 2016). Lê mixabin, têkilî pêşketinên şaristanî û nûjenîbûnê roj bi roj çanda eşîrtiyê qels dibe û nifşên nû êdî kofiyê nadin serê xwe. Û herweha gelek jinên navsal jî (piranî ji ber sedemên tendirûstiyê) dev ji kofiyê berdidin û tenê kitana spî didin serê xwe. Jinên nûcivan ji dêvila kofiyê tenê kitanê an şarpeyê didin serê xwe.

Amadekirina Kofiyê

Jin, bi alîkariya kofiya xwe hin peyamên bêdeng didin kesên hemberî xwe û civakê. Ji ber vê yekê amadekirina kofiyê karekî nazenîn e û baldariyê dixwaze. Şaşitiyeke piçûk dibe ku bibe sedema pirsgirêkên mezin. Lewra her kîtekîta kofiyê xwediyê wateyeke kûr e. Wek mînak, heger jinekê çîta xwe li ser kitanê girêdabe ew tê wê wateyê ku ev jin ji herêma deşta Semsûrê ye û endama eşîreke Henefî ye (Sever, 2021). Herweha peydekirina têkberên kofiyê jî gelekî dijwar e. Hin perçeyên kofiyê ji welatên gelekî dûr û nirxeke biha têne temînkirin. Hin ji wan di encama xebatên gelek rojan de derdikevin holê. Lewra, serpoşa ku bi navê kofî an çît û kulikê tê penasekirin, komplekseke û ji tar (elb/fes), kum/kulik, şidika binstû, çît (serpoşa hewrişîmî), kitan, nîk û xişrên ku kofiyê dixemilîne pêk tê. Ji ber vê yekê divê em bi kurtî danasîna van têkberan bikin. Lê bo ku em zanibin bê em behsa çi dikin divê em bala xwe bidin vê wêneya li jêr.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی



(Ela Hemî Elî/Elif Pulat-SEMSÛR)

Tar (Elb/Fes):

Di amadekirina kofiyê de li gorî demê hin guhertoyên piçûk têne dîtin. Berê hîmê kofiyê "elbik" ango tar bû. Tar, ji depekî tenik ê wekî tara bêjingan dihate amadekirin. Berê qalibê serî dihate girtin da ku tar/elb li ser serî rûne. Dep, di avê de dihatê nermkirin an jî bi destê necaran her du aliyê depê wekî xelekekê bi hev ve dihate danîn. Bi vî rengî tar/elba serî dihate amadekirin. Piştre, aliyê ser ê tarê jî bi perçeyek depê ê gilover dihate nixamtin. Elb, ji aliyê hundir û derve ve bi pirtiyê qedîfe dihatê nixûmandin. Rengê pirtî li gorî daxwaza jinan diguheriya lê piranî rengên zer û zivîn dihate bikaranîn.

Tar bê xeml

Tara bi pirti pêçandî

Li herêma Semsûrê di demên dawî de ji dêvila tar/elbê qarton (kaxiz) dihate bikaranîn. Îro jî ne tar ne jî qarton (qaxiz) tê bikaranîn. Îro, ji dêvla tar û qartonî kum tê bikaranîn.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Kum: Ji aliyê teşe ve hinekî dişibe kumên misilmanan û cihûyan. Lê belê kumê jinan hem ji aliyê mezinbûn, hem jî ji aliyê pirti ve hinekî din cûda ye. Kum, ji pirtiyên pemboyî, empîrme û hwd. tê amadekirin. Ji bo ku xweşik xûya bike, ji pirtiyên rengîn perçe wekî sêgoşe têne birîn, Piştre hemû perçeyan li gorî lihevhatina wan didin rex hev û din û teşeyê kum diyar dikin. Hemû perçeyan bi hev û din ve didûrin. Pirti, teşeyê kilorê (gilover) digre. Li gorî mezinbûna serî mezinbûna kum diyar dikin. Heger pir firek û mezin be, hinekî jê dikin Derdora kum duta dikin û li ser hev dicivînin. Mebest ew e ku devê kum ber bi hev were û teng bibe. Lastîkê bi kar nayînin. Lewre dibe ku lastîk serê jinê biêşîne. Heger pêwîstî an daxwaz hebe pirtiyekî rengîn û xweşik jî bi nîveka kum ve pîne dikin. Di vir de mebest dîtbarî ye.

Şidika Binstû: Piştî ku kum hate amadekirin, dora amadekirina şidika binstû ye. Du fonksîyonên (erk/peywir) sereke yên şidika binstû hene. Yek sabîtgirtina kum a li ser serî ye, a din jî xeml ango dîtbarî ye. Şidika bin dîsa bi pirtiyên rengîn ên bermayî ên herî xweşik tê amadekirin. Ji perçeyê herî xweşik û rengîn yê pirtiyê bermayî, şidikeke bi qasî du-sê santîman (cm) firek û kêm zêde du bihostan dirêj tê birrîn. Şidik, li gorî tercîhê/daxwazê û pêwîstiyê du-sê caran li ser hev tê dutakirin û dirûtin. Jin, kumê ku berê amadekirine didin serê xwe şidikê jî di bin çena xwe re derbas dikin û bi vî rengî dirêjahiya şidikê dipîvin. Ê zêde dibirin. Piştre, şidik di rasta her du guhan de bi kum ve tê dirûtin. Di vir de divê jin zêdetir baldar bin. Ji ber du sedeman: Yek, heger şidik bi devereke şaş ve bê dirûtin dê hevsengiya kum xera bibe. Dido, heger kin be dê stûyê jinan biêşîne; dirêj be dê sist bimîne û nahêle ku kofî li ser serê jinê bisekine. Bi vî rengî kum bi alîkariya şidika binstû li ser serê jinan sabît disekine (Yolun, 2022).

Çît (Serpoşa Hewrişîmî):

Çît, pirtiyeke hewrişîmî ye. Jinên herêmê, di demên berê de di tevnan de bixwe çîtên xwe hûnane. Lê belê ji ber ku peydekirina hewrişîm gelekî zehmet bûye çît ji pembo û hiriyê hatine hûnandin. Piştî ku bazirganî -bi taybetî jî qaçaxiya titûnê û çayê- li herêmê pêş ketiye, têkilî bi herêmên din re hatiye danîn û çît ji herêmên wekî Riha, Diyarbekir û Helebê hatine anîn. Bi gumaneke mezin, çît ji herêmên Asyaya Navîn û Asyaya Dûr hatiye welatên Îran û Suriyeyê û ji wir jî hatiye nav Kurdên Tirkiyeyê.

Ji aliyê teşe û mezinbûnê ve çîtên ku li herêma Semsûrê têne bikaranîn hemû kêm-zêde bi qasî hev in. Berê çîtan bi qasî metroyekê ye û dirêjahiya wan jî nêzikî du metroyan e. Her çar aliyên çîtan bi gulikan hatine xemilandin. Ji aliyê pirtiyê ve sê cureyên çîtan derdikevin pêş: Çîtên herî hêja, temendirêj, xweşik û bi nirx ji hewrîşim têne çêkirin. Hewrîşîm piraniya wê bi rengê sirme (zêrîn) e lê di nav de xetên reş jî hene. Bi vî rengî reş û zer xweş li hev tên. Dema ku ji dûr ve tê xûyakirin dibiriqe/diperije. Cureyê duyemîn ji pembo tê çêkirin û vê carê xetên reş li ser rengê spî/gewr bi cih dibin. Dora vî cureyê bi gulikên spî hatiye xemilandin. Li gorî çîtên sirme gelekî sivik in. Cureya herî dawî de sentetîk û pembo bi hev re hatine bikaranîn û tenê spî/gewr e. Ji hemû cureyan siviktir e. Jinên herî xizan, yên zêde oldar û yên pîr ku êdî nikarin giraniyê li ser serê xwe bihêlin vî cureyî bi kar tînin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Kitan:

Kitan ango çarik, serpoşa dawî ya kofiyê ye. Berê ji hiriyê jî dihate hûnandin lê yên sedsala dawî hema bêje hemû pemboyî ne. Mezinbûna kitanan bi qasî1,5-2 metroyan e. Gelekî sivik in. Berê wan û dirêjahiya wan nêzikî hev e. Rengê wan li gorî rewşa aborî, jiyana rojane, eşîr û mezheban diguhere. Keçik di demên civantiyê de kitanên rengîn davêjin ser kofiya xwe. Piştî ku zewicîn piranî kitanên spî bi kar tînin. Jinên ku li gundan dijîn û karên çandiniyê û sewalxwedîkirinê re mijûl dibin, di nav malê de kitanên rengtarî bi kar tînin. Di şîn, pîrozbahî, dawet û mêvandariyan de kitana xwe ya spî bi kar tînin. Jinên ku girêdayî mezheba Elewîtiyê ne, kitanên rengîn û yên spî jî bi kar tînin. Lê jinên girêdayî mezheba Henefîtiyê bêtir yên spî bi kar tînin. Kitanên jinên nûciwan dora wan bi morî û mircananên rengîn nexişandî ne lê jinên navsere kitanên sade bi kar tînin. Di pîrozbahiyên netewî (wekî Newrozê) kitanên ku bi morî û mircanên kesk û sor û zer hatine xemilandin têne bi kar anîn. Di bikaranîna kitanê de teşe û rêbaz li gorî mezbeban û eşîran diguhere. Hin jinên Elewî kitana xwe ji goşeyên dûrî hev û din duta dikin. Kitan dibe sêgoşe. Goşeyekî wê li nîveka piştê rast tê û her duyên din jî di ser milan re dadikevin ser singê jinan û li wir bi hev û din re têne girêdan. Ji bo ku li ser kofiyê neşemite jî bi nîkekê an derziyeke devgirtî (fîrket) bi pêşiya çîtê ve tê sabîtkirin. Hin jinên gundewarî (çiyayî*) kitana xwe duta nakin. Goşeyekî li dehma eniya xwe, yekî li nîveka pişta xwe rast tînin û her duyên din jî li ser singa xwe, an jî bin stûyê xwe digihînin hev û din. Jinên ku kitana xwe bi vî rengî bi kar tînin, li gorî rewş û derfetên xwe zêrekî an jî pîlikekî/pelikekî bi goşeyê li dehma eniya xwe ve dadilqînin. Ev pîlik/pelik hem xeml e, hem jî hevsengiya kitanê tekûz dike. Jinên ji eşîrên Henefî (bi devoka herêmê"Sûnnî/Sinni"), kitana xwe di bin çîta xwe de davêjin ser kumê xwe. Piştre çîta xwe li serê xwe dipêçin. Kitanên wan piranî spî ne û bê xeml û xişr in.

Kitaneke spî ya herêmî

Di bikaranîna kofiyê de bandora rewşa aborî:

Teşeyê girêdana kofiyê wekî ku li jorê jî hatibû diyarkirin li gorî rewşa aborî ya jinan naguhere. Lê belê çawaniya (qelîte/nirx) kofiyê li gorî rewşa aboriya jinan diguhere. Jinên maldar, kumê xwe ji pirtiyên hewrişîmî amade dikin. Çîtên wan ji sirmeyê hewrişîm in û ji yekê zêdetir in. Çîta nav malê û ya mêvandariyê, şîn û dawetan ji hev cuda ne. Dema kû çîta wan hinekî kevin dibe bi xêra xwe didin jineke feqîr. Jinên dewlemend, berê qolê zêran ku herî kêm ji bîst û çar zêran pêk dihat bi pêşiya kofiya

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

xwe ve dadiliqandin. Jinên ku rewşa wan a aborî qels e, ji dêvila çîta hewrişîmî çîtên pemboyî bi kar dianîn û ji dêvla zêran jî bi xişrên zivîn û hwd. kofiya xwe dixemilandin. Herweha ji bo ku çîta wan kevin nebe, gelek caran kitaneke kevin ango şareke kevin didan serê xwe. Dema ku kesekî xerîb li kofiya jinekê binihêrta rewşa malbata wan aborî kêm zêde pêşbînî (texmîn) dikir. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku nirx û dîtbariya kofiyê gelek caran dibe cihê pesindanê an jî xemgîniyê. Di vê mijarê de jêder Şîrîn Pulat weha dibêje:

"Berê feqîrî pir bû. Çît jî ê pir biha bûn. Hîn jî ê biha ne. Xelî (gelek) jinan emrê xwe bi çît û kulikekî derbas dikir. Min bixwe çît û kulik neda serê xwe. Lê ê diya min heta ku mir jî li serê wê bû. Tim mistik zêr di ber kulikî xwe de vedişart. Digo, *'Zêrê meriya, pişta meriya ne.'* Ê bavî min qaçaxiya titûn dikir. Diçû Urfê (Riha), Heranê, heta Binxetê[*] diçû. Êkcaran çîtên rind dikirîn û tanîn li vir difrotin. Li wê derê bi titûnî qaçax diguhartin. Loma ê serî diya min ê tim nû bû." (Pulat, 2022).

Namzetên zavatiyê, berî ku daweta xwe li dar bixin, wekî diyarî ji destgirtiya xwe re çît û pirti dikirîn. Keçikan jî bi van diyariyan li bal hevalên xwe forsa xwe dirêtin. Berzavayên ku nikaribûn çîtên sirme ji destgirtiyên xwe re bikirin, kitan û xişrên zîvîn wekî diyarî dişandin malxezûranên xwe (Koparal 2022).

Jinên ku demekê li gundan mane û piştre çûne li navenda bajarê Semsûrê bi cih bûne, li wir bi çanda bajariyan re hevnas bûne. Him di bin bandora wan de mane û him jî nexwastine ku dev ji kevneşopiyên xwe berdin. Ji ber vê yekê jî hîzara reş ku jinên bajarî ango peywirdarên dewleta Osmaniyan li xwe dikirin, di ser kofiyê de li xwe kirine.

Xemlek zîvîn ji bo ser kofiyê.

Nîk û Xişrên Kofiyê: Nîk, hem ji bo sabîtkirina kitanê ya li ser kofiyê pêwîstiyek e, hem jî xemleke xweşik a jinan e. Nîkên berê ji zêr an zîv bûn. Bi qasî zêrekî nîv bûn, Li ser nîkan çînikên (nexş/nîgar), rengîn hebûn. Di navbera herdu seriyên nîkan de zincîreke duta ya bi qasî bihostekê hebû. Aliyekî nîkê bi pêşiya çîtê ve tê girêdan, aliyê din jî bi kitanê ve dihate girêdan.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Li hin herêmên Semsûrê ji van xîşran re "rîşme" yan "reşme" jî tê gotin.

Encam:

Wekî encam hate dîtin ku kofî ango çît û kulik, xemleke netewî ya Kurdan e. Îro kêm be bî li herêma Semsûrê ji aliyê hin jinên navsere yên Kurdan ve tê bikaranîn. Kofî ango çît û kulik, ji aliyekî ve xeml û xweşikiya jinan diyar dike ji aliyê din ve jî berdevkiya çanda Kurdan dike. Sergirêdana/serpoşa jinan a bi kofiyê li gorî serdemên jiyanê, mezheb û eşîran teşe û reng diguherîne. Di salên dawî de keçik û jinên ciwan nema kofiyê didin serê xwe. Li herêmê kêm jinên pîr û navsal vê çandê didomînin. Berî ku ev çand ji holê rabe divê lêkolîn û xebatên tomarkirina vê çandê bêne zêdekirin.

JÊDER:

Adıyaman Valiliği 2022, *Adıyaman Tarihi*, Dîroka ragihandinê 10.01.2022, http://www.adiyaman.gov.tr/adiyaman-tarihi

Adıyaman'da kofi kültürü kayboluyor, Karakuş F., Dîroka ragihandinê 01.02.2022. https://www.adiyamandahaber.com/haber/adiyamanda-kofi-kulturu-kayboluyor-704.html

Ağırmatlı HH & Begiç HN 2021, 'Anadolu'da Kaybolmakta Olan Geleneksel Bir Giyim Kuşam Unsuru: Zaza Püskülü', *Çeşm-i Cihan: Tarih Kültür ve Sanat Araştırmaları Dergisi E-Dergisi*, 8.2, nrp. 30-46.

Bayrak, M. (2002). *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*. Ankara: Özge Yayınları.

Halaçoğlu, Y. (1988). *"Adıyaman", Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*. İstanbul: TDV Yayınları.

https://igdir.ktb.gov.tr/TR-55676/yoresel-giysiler.html

Kemal, Y. (2004). *Nuhun Gemisi/Bu Diyar Baştan Başa.* İstanbul: YKY Yayınları.

Kofî Bir Kadının Aksesuar Giysisi ve Parçasıdır. Turan H., Dîroka ragihandinê 01.01.2022. http://memlekethavadis.com/haber/kofi-bir-kadin-aksesuar-giysisi-ve-parcasidir-20958.html?m=1

Kültür ve Turizm Bakanlığı, *Nemrut Dağı (Adıyaman - Kahta)*, Dîroka ragihandinê 01.02.2022. https://kvmgm.ktb.gov.tr/TR-44428/nemrut-dagi-adiyaman---kahta.html

Kültür ve Turizm Bakanlığı, *Yöresel Giysiler,* Dîroka ragihandinê 18.01.2022.

Noel, EWC.(2014). *Diary of Major Noel on Special Duty in Kurdistan (Kürdistan 1919 Binbaşı Noel'in Günlüğü.* İstanbul: Avesta Yayınları.

Özus E, Erden F & Tufan M 2014, 'Malatya Yöresi Geleneksel Kadın Kıyafetlerden Günümüze Yansımalar', *International Journal Of Sport Culture And Science*, 2. Special Issue.1, nrp. 650-664.

Toprak, SV. (2018). *Hısnımansur.* Adıyaman: Adıyaman Üniversitesi Yayınları.

(Jêder: https://adiyamanmanset.com/haber/adiyamanda-kofi-kulturu-kayboluyor-537.html)

Jêderên Zindî

Ayşe Kaygusuz, 96 salî, Ji navçeya Cêlikan /Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 26.01.2022.

Besê Yolun, 69 salî, ji gundê Narince/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 26.01.2022.

Gulî Sever, 90 salî, ji gundê Komîrê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 15.07. 2021.

Nure Kaya, 65 salî, Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 15.07.2021.

Şîrîn Pulat, 52 salî, ji gundê Qozanê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 25.01.2022.

Zeynep Koparal, 70 salî, ji gundê Çarkeziyê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 26.01.2022.

Perawêz:

---

* Ji ber ku herêma Semsûrê ji aliyê erdnîgariyê ve nêvî deşt e û nêvî jî çiya ye, li herêmê gel wekî "deştî" û "çiyayî" jî tê dabeşkirin. "Deştî" hinekî pêşketî lê çikûs, "çiyayî" jî paşdemayî û "destfireh/camêr/comerd" têne penasekirin. Helbet ev yek, li gorî kes, dem û derfetan diguhere lê di nav gel de kevnebaweriyeke bi vî rengî heye.

* Kurdên Tirkiyeyê, ji bo bakur û bakurrojavayê Suriyeyê têgeha "Binxet"ê bi kar tînin. Lewra sînorê Tirkiyê û Suriyeyê bi vê xeta trênê ji hev diqete. Heta ku mayin li herêmê hatin raxistin (û van salên dawî jî dîwarên mezin) Kurdên Bakur û yên Rojava di navbera her du perçeyan ji bo bazirganiyê (carinan jî ji ber sedemên siyasî) diçûn û dihatin.

KÜRT FOLKLORUNDA KOFİ (BAŞLIK) KÜLTÜRÜ

Özet:
Kürt folkloru denildiğinde Kürt kadınlarının kültürü aktarmadaki rolü öne çıkmaktadır. Çünkü yiyecek ve içeceklerin hazırlanmasından giyime, mani, hikâye, masal ve şarkılara kadar kültürün her bir öğesi kadınlar tarafından nesilden nesile aktarılmaktadır. Kürt folklorunun ve kadın giyiminin temel karakterlerinden biri de kadınların örtünme biçimi yani kofi takma geleneğidir. Kürt kadınları küçük yaşlardan itibaren başlarını örtmeye başlamaktadır. Bu, Kürtler açısından dini inancın bir gereği olarak görülmektedir. Başörtüsünün diğer bir işlevi de günlük yaşamda güzel görünmek amacıyla aksesuar olarak kullanılıyor olmasıdır. Kürtlerin yaşadığı coğrafyanın her bir bölgede farklı örtünme şekilleri ve takılara rastlanmaktadır. Örtünme araçları ve tekniklerine bağlı olarak adlandırmada da değişiklikler gözlenmektedir. Mesela, Mardin yöresindeki kadınlar neredeyse diz hizasına kadar sarkan "çarik" dedikleri beyaz tülbentlerle başlarını örter, üzerine de "hibrî" dedikleri renkli eşarpla başlarını sararlar. Riha (Urfa) bölgesindeki Kürt kadınları kadife renkli bir takkenin üzerine mor renkli uzun bir tülbent takarlar. Serhat bölgesinde kadınlar, etrafı çeşitli renklerdeki boncuklarla işlemeli beyaz tülbentler takarlar. Saçlarının ön tarafı ve zülüfleri dışarıdan görünecek şekilde örtünürler. Yaşlı ve/veya aşırı dindar kadınlar tülbentlerini boncuk ve işlemelerle süslemez, saçlarını dışarıdan görünmeyecek şekilde örterler. Bu çalışma, Semsûr (Adıyaman) bölgesindeki kadınların örtünme araçlarını ve örtünme biçimlerini yani "çît û kulik/kofî" takma geleneğini incelemeyi amaçlamaktadır.

Semsûr (Adıyaman)'un güneyi ve güneydoğusu Atatürk Barajı ile çevrelenmişdurumdadır. Kuzeyinde ise yüksek ve sarp dağlar sıralanmaktadır. Bu coğrafik konum, şehrin kadim kültürünün bugüne kadar korunmuş olmasına önemli katkıda bulunmuştur. Bu kadim kültürün yaşayan en güzel örneklerinden biri de Kürt kadınlarının "Çît û Kulik" veya "Kofî" dedikleri kompleks baş örtme/başlık aksesuarıdır.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Kofinin hazırlanmasında öncelikle, en alt katmanı oluşturacak olan "kum" yani takke hazırlanır. Takke, yumuşak ve pamuklu kumaşın başın büyüklüğü esas alınarak yuvarlak ve iki kat olacak şekilde dikilmesiyle hazırlanır. Daha sonra, artık kumaş parçaları şerit halinde kesilerek üst üste katlanır ve çeşitli renklerdeki boncuklarla dikilerek "şidika binstû" olarak adlandırılan çenelik hazırlanır. Kadınlar, takkeyi başlarına geçirdikten sonra çeneliğin ne kadar uzunlukta olması gerektiğini belirler. Ölçülen çenelik kulak hizasından takkeye dikilir. Burada dikkat edilmesi gereken birkaç husus vardır: çeneliğin çene ve boğazı sıkmaması, yumuşak olması, esnek olması, kolaylıkla çıkarılıp takılabilmesi ve dışarıdan estetik görünmesi. Sıradaki işlem "çît"in yani sırmalı ipek kumaşın takkenin etrafına sarılmasıdır. Çît, genellikle sırmalı ipek kumaştan yapılmaktadır. Çît, kumaş tüccarları veya tütün tüccarları tarafından Riha (Urfa)'dan veya Halep'ten (bazen de İran'dan) satın alınarak bölgedeki kadınlara ulaştırılmaktadır. Çok pahalı aynı zamanda dayanıklı olduğu için her kadının en fazla iki tane "çît"i bulunmaktadır. Üçgen şeklinde katlanan "çît", takkenin etrafında dolandırılmak suretiyle sarık şekline getirilir. Çîtin başa sarılmasında ilmiğin ön tarafa denk getirilmesine dikkat edilir. Bu işlem yetenek ve zahmet gerektirdiği için bozulma veya kirlenme dışında "çît" çözülmez; takke ile birlikte kalıp şeklinde çıkarılır ve takılır. Kofînin en üst katmanını "kitan" denilen beyaz tülbent oluşturmaktadır. Tülbentler, aşiretin geleneklerine göre değişmekle beraber genellikle en az bir metrekare büyüklüğünde pamuklu kumaştan hazırlanmaktadır. Kalınlıklarına göre yazlık ve kışlık olarak ikiye ayrılmaktadır. Kitan, çapraz köşeleri üst üste gelecek şekilde ikiye katlanarak çîtin üzerine örtülür. Üçgen biçimini almış olan kitanın uzun olan iki köşesi göğüs hizasında bağlanırken diğer ucunun belin orta kısmına denk gelmesine dikkat edilir. Kitanın kofi üzerinde sabit kalmasını sağlamak amacıyla gümüş veya altın tokalı bir zincir ve çengelli iğne kullanılır. Sırada kofinin süslenmesi vardır. Kofinin ön tarafı, karşıdan görünecek şekilde, kadının maddi durumuna göre altın veya gümüş zincir takılarla bezenir. Böylece kofî tamamlanmış olur. Bölge halkı, eğitim ve teknoloji ile tanışmadan önce, kadınlar ilk gençlik döneminde kofî takmaya başlar ve kofîlerini rengarenk kitanlarla örter, etrafını çeşitli renk ve ebatlardaki boncuklarla süslerdi. Kadın evlendikten sonra kitanın rengi değişir, sadece beyaza dönüşür ancak altın ve gümüş takılarda artış gözlemlenir. Yaş ilerledikçe takı ve süslerde azalma görülür, kofi sadeleşir.

Sonuç olarak, Semsûr (Adıyaman) bölgesindeki Kürt kadınlarda "çît û kulik/kofî" (başlık) takma geleneği mezhep ve aşiretlere göre değişkenlik göstermektedir. Son yıllarda kadın ve kızların bu geleneği hızla terk ettiği gözlenmektedir. Bölgede çok az sayıda yaşlı kadının bu geleneği sürdürdüğü gözlemlenmektedir. Bu kadim gelenek tamamen kaybolma tehlikesi ile karşı karşıyadır. Bu nedenle, bir an önce bu alandaki inceleme ve araştırmaların artırılması, bütün ayrıntılarıyla derlenip kayıt altına alınması, Kürt kültürü ve folkloru açısından önemlidir.

Anahtar Sözcükler*: Kürt kültürü, Adıyaman, kadın giyimi, kofi takma geleneği*

KOFÎ (FEZ/HEAD) CULTURE IN KURDISH FOLKLORE

Abstract:

When Kurdish folklore is mentioned, the role of Kurdish women in conveying culture comes to the fore. Because every element of culture, from the preparation of food and beverages to clothing, mania, stories, fairy tales and songs, is passed on from generation to generation by women. One of the main characters of Kurdish folklore and women's clothing is the way women cover, that is, the tradition of wearing kofi. Kurdish women start to cover their heads from an early age. Covering is seen as a requirement of both tradition and religious belief for Kurds. Another function of the kofî is that it is used as an accessory in order to look beautiful in daily life. In each region of the geography where the Kurds live, different types of veiling and jewelry can be found. Depending on the covering tools and techniques, changes are also observed in naming. For example, women in the Mardin region cover their heads with white tulle, which they call "çarik", which hangs almost to the knee level, and then they wrap their heads with colorful scarves they call "hybri". Kurdish women in the Riha (Urfa) region wear a long purple cheesecloth over a velvet colored cap. In the Serhat region, women wear white tulle embroidered with beads of various colors. The front of their hair and their hoods are covered in such a way that they are visible from the outside. Elderly and/or overly religious women do not embellish their tulle with beads and embroideries, but cover their hair so that it cannot be seen from the outside. This study aims to examine the veiling tools and veiling styles of women in the Semsûr (Adıyaman) region, namely the tradition of wearing "çit û kulik/kofi".

The south and southeast of Semsûr (Adıyaman) is surrounded by the Atatürk Dam. To the north are high and steep mountains. This geographical location has contributed significantly to the preservation of the ancient culture of the city until today. One of the most beautiful living examples of this ancient culture is the complex head covering/hood accessory that Kurdish women call "Çît û Kulik" or "Kofî". In the preparation of the kofî, first of all, the "sand", that is, the skullcap, which will form the bottom layer, is prepared. The skullcap is prepared by sewing a soft and cotton fabric in a round and two-fold way based on the size of the head. Then, the scraps of fabric are cut into strips, folded over and stitched with beads of various colors to prepare the chinrest known as "şidika binstû". Women determine how long the chinrest should be after putting on the skullcap. The measured chinrest is sewn to the cap at ear level. There are a few things to consider here: the chinrest should not squeeze the chin and throat, it should be soft, flexible, can be easily removed and put on, and it looks aesthetically pleasing from the outside. The next step is to wrap the "fence", or brocade silk fabric, around the cap. The fence (çît) is usually made of brocade and black patterned silk fabric. Çît is purchased from Riha (Urfa) or Aleppo (sometimes Iran) and delivered to women in the region by fabric traders or tobacco traders. Since it is very expensive and durable, every woman has at most two "çît" (a kind of silk cover). "Çît", folded in the shape of a triangle is formed into a kofî (fez) shape by wrapping it around the skullcap. While wrapping the "çît" (a kind of silk cover) on the head, care is taken to ensure that the noose corresponds to the front. Since this process requires skill and

effort, the "çît" is not solved except for deterioration or contamination. Kofî is taken out and put on in the form of a mold together with the skullcap. The top layer of the kofî is a white cheesecloth called "kitan". Cheesecloths vary according to the traditions of the tribe, but are generally produced from cotton fabric, which is at least one square meter in size. According to their thickness, there are two types to be used as summer and winter. The "kitan" (a type of tulle) is folded in half so that its diagonal corners overlap and is covered over the çît. While the two long corners of the triangular "kitan" are tied at the chest level, care should be taken to ensure that the other end coincides with the middle of the waist. In order to keep the kitan on the kofî, a chain with silver or gold buckles and safety pins are used. Next is the decoration of the kofî. Gold or silver chains, beads, etc., depending on the woman's financial situation, so that the front of the kofî can be seen from the front, adorned with jewellery. Thus, the kofî is completed. Before the people of the region met with education and technology, women started to wear kofi in their first youth, covered their kofi with colorful chitans, and adorned them with beads of various colors and sizes. After the woman marries, the color of the kitan changes, it just turns white. However, an increase is observed in gold and silver jewelry. As the age progressed, there was a decrease in jewelry and ornaments, and kofî would be simplified. As a result, the tradition of wearing a "çît û kulik/kofî" (headpiece) among Kurdish women in the Semsûr (Adıyaman) region varies according to sects and tribes. In recent years, it has been observed that women and girls have rapidly abandoned this tradition. It can be said that very few old women in the region continue this tradition. This ancient tradition is in danger of being completely lost. For this reason, it is important for Kurdish culture and folklore to increase the studies and researches in this field as soon as possible, to compile and record them in all details.

Keywords: *Kurdish culture and folklore, Adıyaman, women's clothing, the tradition of wearing kofî (fez)*

PÊJGEHA HEKARÎYAN WEK PARÇEYEK JI ÇANDA KURD A

Abdurrahman İBRAHİMOĞLU

PUXTE:

Yek ji girîngtirîn taybetiyên folklorîk ên çanda gelêrî, bêguman çanda xwarinê ye. Çanda sifre û xwarinê nasnameya neteweke ye. Pêkhatina vê çandê de, kevneşopiyên civakî, aborî, olî û floraya erdnîgariya ku lê dijîn bandoreke girîng digire. Bi rastî jî çanda xwarinê yek ji hêmanên diyarker ên nasnameya gel e û pirrengî û dewlemendiya çanda xwarinê jî yek ji nîşaneyên pêşkeftina civakî-aborî ya neteweke ye jî. Îro, em li ku derê cîhanê bin, dema ku dor tê ser pêjgeha çînî, pêjgeha îtalî an jî pêjgeha Fransî, nasnameyeke bêhempa tê hole.

Pejgeya Hekarîyan jî di heman demê de xwedî nasnameyekê dîrokî ye û xwedî rolekê girîng e ku bandorê li xwarinên derdorê dike. Ev çanda ku di serdema serdestiya Mîran a bi sedsalan de ava bûye, di sunet û dawetan de sifreyên bi hezaran kesî dixemilîne. Bingeha vê cihêrengîya çanda xwarinê ya Hekarîyan, dewlemendîya wê ya etnîkî û olî û paşerdeke mezin a erdnîgarî bû. Ev pêkhateya pir nasnameyî û pir-olî ya ku heta çaryeka ewil a salên 1900î dewam kir, li ser pêjgeha heremê bandorekê pir girîng kir û heta 20, 30 sal berê niha jî berdewam bu. Lê mixabin îro bi sedema bandora çanda xwarinên Anatolyayê û bandora fast food a ev çande roj bi roj paş dikeve û berze dibe û tenê di merasîmên dawetan de ev cihêrengî tê hembêzkirin.

Tevî van hemû zehmetîyan, di salên dawî de hin xwarinên di nav pirtûkên ku li çar aliyê welêt di çarçoveya gastro-turîzmê de tên weşandin de cih digirin û li tevahîya Tirkiyeyê bi navûdeng bûne. Hin xwarinên jî bi Nîşana Erdnîgariya Tirkiyeyê hatine qeydkirin. Ev yek ne tenê wê misoger bike ku pêjgeha Hekariyan vegere cihê ku heq dike, di heman demê de dê rê li ber pêjgeha Hekarîyan jî veke ku di nav pêjgehên gerdûnî de cihê xwe bigire. Di çanda xwarinê ya Hekariyan da hêmana sereke goşt û giyayên xwezayî ye. Digel ku Kirîs, doxeba û doleme xwarinên bi goşt ên herî girîng in, Xwarinên ku bi gelek cureyên pel û giyayên xwezayî tên çêkirin jî hene. Hinek ji wan; pelên tirî, pelên kelemê, pelên tıvrê û pelên kaşimê ne.

Di vê xebatê de çavkanîya çanda xwarinê ya Hekarîyan, civakên etnîkî û olî yên ku bandor li pêkhatina vê çandê kirîne û gîyayên xwezayî yên ku tama xwe li sifreya Hekarîyan zêde dikin hatîne nîqaşkirin. Di çarçoveya berfirehîya çanda xwarinê ya Hekarîyan de, Em ê amadekirina xwarinên ku ji dîrokê heta niha zêdetir tên zanîn û hîn jî di rojeva Hekarîyan da ne bidin nasîn û resmên çend xwarinên jî pêşkêş bikîn.

Mcleod, S. (2007) '[Maslow's Hierarchy of Needs]'. Available at: https://www.simplypsychology.org/maslow.html (Accessed: 23 January 2022).

Parlatır, İ. and Türk Dil Kurumu (eds) (1998) *Türkçe sözlük*. 9. baskı. Ankara: Atatürk Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu, Türk Dil Kurumu (Türk Dil Kurumu yayınları ; Sözlük Bilim ve Uygulama Kolu yayınları. Türkçe sözlük dizisi, 549. 1).

Ron, A.S. and Timothy, D.J. (2013) 'Biblical foods, heritage and Holy Land tourism', *Journal of Heritage Tourism* [Preprint]. Available at: https://www.researchgate.net/publication/270790011_Understanding_heritage_cuisines_and_tourism_Identity_image_authenticity_and_change (Accessed: 23 January 2022).

Şenkul, Ç. and Kaya, S. (2017) 'Türkiye endemik bitkilerinin coğrafi dağılışı', *Türk Coğrafya Dergisi 69 (2017) 109-120*, (69), pp. 109–120. Available at: https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/381756 (Accessed: 25 January 2022).

Sevin, V. (2005) *Hakkâri taşları*. 1. baskı. İstanbul: YKY (Yapı Kredi yayınları ; Sanat, 2278. 129).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Sevin, V. and Özfırat, A. (2001) ‘Hakkari Stelleri: Doğu Anadolu’da Savaşçı Çobanlar İlk Not’, *Belleten Türk Tarih Kurumu*, 65(243), pp. 201–2018. Available at: https://belleten.gov.tr/tam-metin/2601/tur (Accessed: 30 January 2022).
Soğandereli, F. (2020) ‘Eski Mezopotamya ve Anadolu’da Mutfak Kültürü’, p. 35.
Soruç, K. (2021) *Mutfak Kültürünün Sürdürülebilirlğinde Gastronomi Müzelerinin Rolü*. Sakarya Uygulamalı Bilimler Üniversitesi.
TÜİK (2020) *TÜİK Gösterge*. Available at: https://biruni.tuik.gov.tr/ilgosterge/?locale=tr (Accessed: 20 September 2020).
Tümer, H. (2018) ‘Doğu Toros Petroglifleri: Tırşin Yaylası ve Çevresi’, *Anadolu Araştırmaları*, (21), pp. 21–41. Available at: https://dergipark.org.tr/tr/pub/iuanadolu/426507 (Accessed: 22 September 2020).
Türk Patent (2017) *Coğrafi İşaretler Portalı*. Available at: https://www.ci.gov.tr/cografi-isaretler/liste?il=30 (Accessed: 20 September 2020).

WÊNE:

1. Wêne: Kîris
2. Wêne: Doxeba
3. Wêne: Gilol
4. Wêne: Doleme
5. Wêne: Tirşik a Çelya
6. Wêne: Kêpayê
7. Wêne: Kiftesir
8. Wêne: Birincê Karyê
9. Wêne: Maş
10. Wêne: Cembeli
11. Wêne: Laleped (Çavkani: Yeni Şafak)
12. Wêne: Xebîs
13. Wenê: Kade
14. Wêne: Selete ya Şivana
15. Wêne :Taştêya Hekarîyê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

KÜRT KÜLTÜRÜNÜN BİR PARÇASI OLARAK HAKKARİ MUTFAĞI

ÖZET:

Popüler kültürün en önemli folklorik özelliklerinden biri de kuşkusuz yemek kültürüdür. Sofra ve yemek kültürü bir milletin kimliğidir. Bu kültürün oluşumunda yaşadıkları coğrafyanın sosyal, ekonomik, dini ve coğrafi gelenekleri önemli bir etkiye sahiptir. Gerçekten de yemek kültürü popüler kimliğin belirleyici unsurlarından biridir ve yemek kültürünün çeşitliliği ve zenginliği de bir milletin sosyo-ekonomik gelişmişliğinin göstergelerinden biridir.Bugün dünyanın neresinde olursak olalım, konu Çin olunca Çin mutfağı, İtalyan mutfağı veya Fransız mutfağı, sözkonusu kimlikleri benzersiz kılıyor.

Hakkari mutfağı da tarihi bir kimliğe sahiptir ve çevre mutfağını etkilemede önemli bir rol oynar. Yüzyıllar boyunca Mirlerin saltanatı sırasında kurulan bu kültür, sünnet ve düğünlerde binlerce kişinin sofrasını süslüyor. Bu çeşitliliğin temelinde Hakkari yemek kültürü, etnik ve dini zenginliği ve büyük coğrafi genişliği yatmaktadır. 1900'lü yılların ilk çeyreğine kadar varlığını sürdüren bu çok kimlikli ve çok dinli yapı, mutfak üzerinde çok önemli bir etki yarattı ve bu etki 20, 30 yıl öncesine kadar devam etti. Ama ne yazık ki günümüzde Anadolu yemek kültürü ve fast food etkisiyle bu kültür her geçen gün azalmakta ve sadece düğünlerde bu çeşitlilik benimsenmektedir.

Tüm bu zorluklara rağmen, son yıllarda ülkenin her yerinde gastro-turizm kapsamında yayınlanan kitaplarda bazı yiyeceklere yer verilmiş ve Türkiye genelinde popüler hale gelmiştir. Bazı yemekler de Türkiye Coğrafi İşareti'ne kayıtlıdır. Bu, Hakkari mutfağının hak ettiği yere geri dönmesini sağlayacağı gibi, Hakkari mutfağının evrensel mutfaklar arasında yerini almasının da önünü açacaktır.

Hakkari yemek kültüründe ana unsur doğal otlar ve ettir. Kirîs, doxeba ve doleme en önemli et yemekleri olsa da, birçok doğal yaprak ve ot türü ile yapılan yemekler de vardır. Bazıları; üzüm yaprağı, lahana yaprağı, turp yaprağı ve kaşim yaprağıdır.

Bu çalışmada Hakkari yemek kültürünün kaynağı, bu kültürün oluşumunda etkili olan etnik ve dini topluluklar ve Hakkari sofrasına lezzet katan doğal otlar ele alınmaktadır. Hakkari yemek kültürünün bir parçası olarak, geçmişten günümüze daha çok bilinen ve Hakkari'nin gündeminde olmayan yemeklerin yapılışını tanıtacağız ve bazı yemeklerin resimlerini de sunacağız.

Anahtar Kelimeler: *Hakkari mutfağı, Hakkari kültürü, Kürt yemek kültürü, Doxeba, kiris, doleme*

HAKKARI CUISINE AS A PART OF KURDISH CULTURE

Abstract:

One of the most important folkloric features of popular culture is undoubtedly the food culture. Table and food culture is the identity of a nation. The social, economic, religious and geographical traditions of the geography they live in have an important effect on the formation of this culture. Indeed, food culture is one of the

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

defining elements of popular identity, and the diversity and richness of food culture is one of the indicators of a nation's socio-economic development. Wherever we are in the world today, when it comes to China, Chinese cuisine, Italian cuisine or French cuisine make these identities unique.

Hakkari cuisine also has a historical identity and plays an important role in influencing the surrounding cuisine. This culture, which was established during the reign of the Mirs for centuries, adorns the table of thousands of people in circumcision ceremonies and weddings. The basis of this diversity is Hakkari's food culture, ethnic and religious richness, and great geographical breadth. This multi-identity and multi-religious structure, which existed until the first quarter of the 1900s, had a very important effect on the kitchen and this effect continued until 20, 30 years ago. But unfortunately, today, with the influence of Anatolian food culture and fast food, this culture is decreasing day by day and this diversity is adopted only in weddings.

Despite all these difficulties, some foods have been included in the books published within the scope of gastro-tourism all over the country in recent years and have become popular throughout Turkey. Some dishes are also registered to the Turkish Geographical Indication. This will ensure that Hakkari cuisine will return to the place it deserves, and will also pave the way for Hakkari cuisine to take its place among the universal cuisines.

The main element in Hakkari food culture is natural herbs and meat. Although Kirîs, doxeba and doleme are the most important meat dishes, there are also dishes made with many natural leaves and herbs. Some are grape leaves, cabbage leaves, radish leaves and cashew leaves.

In this study, the source of Hakkari food culture, the ethnic and religious communities that were effective in the formation of this culture, and the natural herbs that add flavor to the Hakkari table are discussed. As a part of Hakkari food culture, we will introduce the cooking of dishes that are known more from past to present and that are not popular today in Hakkari, and we will also present pictures of some dishes.

Keywords: *Hakkari cuisine, Hakkari culture, Kurdish food culture, Doxeba, kiris, doleme*

TOPONÎMÎYA GELÊRÎ: NAVÊN CIHAN Û VEGOTINÊN TÊKILDARÎ WAN
(Li Herêmên Hezex û Nisêbînê)

Cahit BENEK
Beşa Ziman û Çanda Kurdî- Zanîngeha Mardin Artukluyê/ Turkîya

PUXTE:

Mijara vê gotarê, ew vegotinên gelêrî ne ku bi awayekî têkildarî navên cih û waran in û dikare wek toponîmîya gelêrî jî were binavkirin. Bi gotineka din navên wan cih û waran hatine vekolan ku têkildarî wan, vegotineka gelêrî heye. Ev vegotinên gelêrî bi xebateka sehayî ya li herêmeka dîyar û di çarçoveya rê û rêbazên zanistî da hatine berhevkirin. Ji ber ku ev vegotin mînakên wêjeya devkî ne, gelek kodên folklorîk vedihewînin. Her wiha ji ber ku ev vegotin têkildarî navên cih û waran in, rasterast bi zanista toponîmîyê ve jî tên girêdan. Bi armanca ku zanista toponîmîyê were zelalkirin, di vê xebatê da danasîna şaxên toponîmîyê dê were kirin û bi rêya tabloyekê ev şax dê werin nîşandan.

Di vê xebatê da çar mînak dê werin pêşkêşkirin ku mînaka *Elo Dîno* li ser navê qesrekê; mînaka *Keçika Bikezî* li ser navê zîyareteka yekgorî; mînaka *Kelha Hêtim* li ser navê kelihekê û mînaka *Qesirbelek*ê jî li ser navê gundekî ye. Piştî pêşkêşkirina her vegotina gelêrî ku nav yan jî awayê navlêkirina cih û warekî vedibêje, analîzek dê were kirin û bi vê analîzê dê kêm-zêde were fêmkirin bê ka navên cih û warên di vê sehayê da bi çi awayî hatine danîn û vê navlêkirinê di wêjeya devkî da roleka çawa pêk anîye.

Peyvên Serekî: *Folklor, toponîmî, cih û war, nav, vegotinên gelêrî*

Destpêk:

Çi zindî çi ne zindî; çi afirîner çi aferîde, her hebûnek navekî xwe heye û bi vî navê ku ji alîyê mirovan ve hatîye danîn dihê naskirin û zanîn. Ne mimkun e tiştek bêyî navê xwe bibe xwedîyê wateyekê. Ji ber vê yekê nav hêmaneka gelekî girîng e bo mirovahîyê. Helbet ev nav jî jixweber derneketine holê anku her navek di çarçoveya disîplînekê da hatîye danîn. Her wiha ev navlêkirin jî li gorî hin edet û nêrîtan pêk hatîye. Navên cih û waran jî di vê çarçoveyê da ne ku pêşî ji bo zanista onomastîkê û piştra jî ji bo binbeşeka wê toponîmîyê dibine mijar.

Ev xebat li ser navê cih û waran hatîye kirin lê mijara wê ne tenê navê hin cih û waran û awayê çêbûna wan, di heman demê da awayê cihgirtina wan a di edebîyata gelêrî da ye. Anku rengvedana van navan a di edebîyata gelêrî da mijara bingehîn e bo vê xebatê.

Armanca vê lêkolînê ew e ku têkilîya di navbera toponîmî û edebîyata gelêrî da raxe ber çavan. Bi vê boneyê li ser navê hin cih û waran sekinîye û vegotinên gelêrî yên der barê navê van cihan da pêşkêş kirine ku bi saya wan, mirov dibîne bê ka cihek çawa nav digire, çima vî navî digire û bi vî awayî jî navê van cihan watedartir dibe. Her wiha bi

neqilkirina van vegotinan, tradîsyona navlêkirinê jî zelaltir kirîye lewra her vegotina gelêrî ku li ser toponîmîya cihekî ye di heman demê da awayê navlêkirinê jî vedibêje. Bê çawa her cihek navê xwe heye, her navlêkirin jî sedemeka xwe heye. Yanî dema ku cihek bi nav dibe, bêguman di wê navlêkirinê da rola rûdanekê heye. Her wiha mimkun e ji vê rûdanê der barê vî navî da vegotinek jî hatibe honan. Dîsa mimkun e ev vegotin bi heman formê hatibe neqilkirin yan jî di neqilkirinê da kirasê xwe guhertibe. Helbet îhtîmal heye ku rewş berovajîyê vê yekê jî be. Yanî dibe ku halê hazir vegotinek hebe û li gorî vê vegotinê nav li cihekî were danîn.

Çawa ku her cih û warekî navekî xwe heye bêguman der barê navlêkirina wir da jî behsek heye. Anku wateyeka wî navî heye û di encama rûdanekê da derketîye holê. Îhtîmal e ku tenê ji ber layîqdîtinekê jî nav li cihekî hatibe kirin û der barê wî navî da vegotinek çênebûbe. Lê dîsa jî ew nav ji vê wateyê ne bêrî ye.

Her çend li gorî xwezayîya ziman û axaftinê gelek nav deforme bûbin û bi halê xwe yê dawî tiştekî nehînin bîra mirov jî dema mirov pey koka wan dikeve ev wateya ku em behs dikin gelek caran derdikeve holê. Em dikarin bêjin ku heke navek hebe, bi çend hevokan be jî der barê wî navî da wek sedema navlêkirinê/wateya navî behsek jî heye û tecrûbeyên me yên sehayî jî bûn palpişt bo vê angaştê. Helbet ev behs her demê nagihîjê wê astê ku bikeve formata vegotineka gelêrî da. Lewma me jî tenê ew behs kirin mijar bo vê xebatê ku di formata vegotinên gelêrî da ne û der barê navê cih û warekî yan jî navlêkirina wir da ne. Ev vegotin her demê rasterast wateya navê cih û warî nadin anku ne li ser etîmolojîya navî ne. Carinan der barê wê rûdanê da ne ku di encamê da cih bi nav bûye; carinan der barê wî kesî/ê/tiştî da ne ku cih pê bi nav bûye. Lê dîsa jî her du derdikevin heman cihî û navê wî cih û warî watedar dikin.

Onomastîk û Binbeşa Wê Toponîmî:

Navlêkirin ji bo mirovan kevneşopîyeka jêneger e. Mirovan, herdem nav li kes û tiştan kirine û xuya ye li gorî van navan wate dane tiştan. Anku navê tiştên şênber, razber, zindî, nezindî, mirov û her cure heyberan bi vî awayî bûne xwedîyê wateyekê û hatine naskirin. Mirovan; mirov jî di nav da ji bo her tiştî pêdivî pê birine ku navekî dîyar bikin û wî/wê tiştî/kesî/kesê bi vî navî nas bikin û bidine naskirin. Lewra dema ku mirov bifikire, ne mimkun e ku bêyî navan jîyan bimeşe û mirov têkilîyê bi hev ra danin. Li gorî Platon, ji bo her heybera ku heye divê mirov der heqê wê heyberê da sê tiştan bizane û ev nav, pênase û nima ne (Poyraz, 2004, r. 236). Dîyar e ku ev çanda navlêkirinê ya jêneger dê her bidome.

Xebatên di çarçoveya navlêkirinê da bûne mijara “onomastîk”ê ku mirov dikare wek “navnasî” kurdîze bike. İbrahim Şahin di çarçoveya onomastîkê da navan wek “onîm (navê taybet)” û “apelyatîf (navê cureyî/cinsî)” dabeş dike. Onîm dihê wateya navê taybet û di têgeha onomastîkê da, di navlêkirina şaxên wê da û di vesazkirina gelek têgehên têkildarî onomastîkê da peywirê digire û ji “ovoμa, ovuμa”ya grekî pêk hatîye (Şahin, 2018, r. 11).

Ger mirov têgeha navî wek “peyva ku kesek yan jî tiştek pê dihê naskirin” pênase bike û onomastîk jî zanista navî be mirov dikare bêje onomastîk ew zanist e ku li ser navan û navên kesan lêkolînan dike; ji alîyê kokê, geşedana dîrokî û pirsgirêkên çand û zimanî ve li ser wan disekine (TDK, 2005, r. 21). Berfirehtirîn pênaseya onomastîkê ji alîyê Dilek Keleş ve hatîye kirin. Li gorî vê pênaseyê;

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

Onomastîk ew zanist e ku li ser wate, kok û awayê dayîna navî lêkolînan dike, bi vî awayî pêşketin û çanda civakan destnîşan dike; bi zimannasî, dîrok, cografya, civaknasî, derûnnasî, folklor û arkeolojîyê ra di nava têkilîyeka xurt da ye; li welatên rojava wek dîsîplîneka serbixwe kar dike lê li welatê me [Tirkîye] di nava zanistên din da dihê meşandin (Keleş, 1996, r. 1).

Helbet divê were destnîşankirin ku ev zanist li ser navên taybet anku serenavan disekine. “Ev zanist, li ser awayê lêkirina navên taybet yên wek navê mirovan, navê cihan, navê kuçe, kolan û taxan, navê gel û netewan, navê beşên erdnîgarî, navê lehengên di berhemên wêjeyî de, navê berhem û merqeyan û hwd dixebite” (Öçal, 2016, r. 2).

Lêkolînên li ser navlêkirinê bi awayekî rêk û pêk di bin banê zanista têkildar onomastîkê da hatine kirin. Bi gotineka din xebatên li ser navan bi afirandina zanista onomastîkê ra sîstematîze bûne û ketine çarçoveya dîsîplînekê da. Ev yek jî gelekî ne dûr e lewra onomastîk zanisteka nû ye. Sala 1949ê li Parîsê konseyek ji bo xebatên di vî warî da dihê avakirin ku heta niha jî xebatên xwe didomîne. Ev konsey kovareka bi navê “onoma” diweşîne û civînên navnetewî li dar dixe. 1951ê jî li Emerîkayê bi navê “The American Name Society” komeleyek dihê damezrandin ku li gel navên Emerîkî li ser hemû navên cîhanê dixebite (Öçal, 2016, r. 9).

Şaxên Onomastîkê:

Onomastîk wek sehayeka zanistê, xwedî gelek binbeşan e. Di vê zanistê da dîsa li gel binbeşên xwe sê şaxên sereke hene:

Zanista navên cih û waran (toponymie, toponomy)

Zanista navên cografîk: Navên çeman: (1: hdyronymie, hydronymy, hydronymie; navên çîyayan: (2: oronymie, oronymy)

Zanista navên kesan (anthroponymie, anhroponymy, antroponymie) (Yavuz & Şenel, 2013, r. 2241).

Weke dîyar dibe zanista onomastîkê di çarçoveya xebata xwe da li gorî hin taybetmendîyan navan kategorîze dike, ji bo her kategorîyekê binbeşeka xwe heye û li ser her cure navekî di bin beşa têkildar da li gorî qaîdeyên taybet hûr dibe. Di nav van da navên cih û waran anku toponîm û navên kesan anku antroponîm bêtir li kar in. Çiku herî zêde navên kesan û navê cihê ku lê dijîn dihêne bikarînan (Yavuz & Şenel, 2013, r. 2241).

Yavuz û Şenel li gorî vê kategorîzekirinê hîdronîm û oronîman rasterast wek binbeşên zanista onomastîkê nîşan didin lê Şahin wan wek cureyên toponîmîyê destnîşan dike ku ew jî binbeşeka onomastîkê ye. Şahin li ser têgehên toponîmîyê bi awayekî berfireh xebitîye lewma em ê jî bêtir senifandina İbrahim Şahinî referans bigirin.

Şahin di pirtûka “navnasî” da urbonîm wek şaxeka onomastîkê destnîşan dike lê di gotara xwe da ku bi navê “Pirsgirêkên Senifandina Têgeh û Cureyan di Navwarnasîya (toponîmî) Tirkîyeyê da” weşandîye, urbonîm wek cureyekî toponîmîyê destnîşan dike. Ew êdî di wê bawerîyê da ye ku divê urbonîm ne wek cureyekî onîman yan jî toponîman were nirxandin. Divê mîna mîkrotoponîmî û makrotoponîmîyê wek sehayekê were nirxandin ku toponîm lê dihêne berhevkirin (Şahin, 2018, r. 87).

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Wek Zanistekê Toponîmî:

Toponîm cureyekî onîmê (navê taybet) ye ku dihê wateya her cure navlêkirinên cografîk ên weke oronîm (navê çîyayan), hîdronîm (navê avan), urbonîm (navê bajaran) û agroonîman (navê zevîyan) (Şahin, 2013, r. 48). Hemû navên cografîk ên welatekî yan jî erdeka dîyar wek toponîmîya wî welatî/wê erdê dihê binavkirin (Yusifov & Kerimov, 2017, r. 17). Têgeha toponîmê koka xwe grekî ye ku wek "topos" anku cih û "onoma" anku nav, ji du hêmanan pêk dihê û dihê wateya "navên cografîk", "navê cih û waran" (Albayrak, 2004, r. 15).

Toponîmî jî navê wê zanistê ye ku li ser toponîman disekine. Anku wek binbeşa sereka ya onomastîkê û wek zantistekê toponîmî li ser navê cih û waran disekine, wan disenifîne û li ser wateya wan hûr dibe. Toponîmîya cihekî hemû navên cografîk ên li wî cihî di nav xwe da dihewîne. Yediyıldız jî dibêje toponîmî di wateya teng da şaxeka zimannasîyê û bi giştî jî şaxeka onomastîkê ye ku bi gelemperî li navên taybet dikole (Yediyıldız, 1984, r. 25). Zanista ku ji alîyê wate, kok, rastnîvîsîn, gramer, çêbûn û geşedanê ve behsa toponîman dike wek toponîmî dihê binavkirin (Yusifov & Kerimov, 2017, r. 17) . Li gorî Şahin jî toponîmî binbeşeka onomastîkê ye ku lê digere bê ka navên cih û waran çawa derketine holê, ew cih çawa avabûne û li ser geşedanên wan ên dîrokî lêkolînan dike (Şahin, 2013, r. 49). Li gorî Hasan Eren toponîmî zanisteka serbixwe ye û şaxeka rêzimanê ye ku hewil dide navên cihan ji alîyê avanî, wate û rayekê ve rave bike (Eren, 2018, r. 11). Wek encam mirov dikare zanista toponîmîyê wek "navwarnasî" kurdîze bike.

Şahin dibêje toponîmî, xebatên zimanî yên li ser navên taybet ên weke oykonîm, oronîm û hîdronîman vedihewîne ku li gund, bajar, welat yan jî herêmekê dihêne kirin û toponîmîyê wek du şaxan vediqetîne:

Toponîmîya Nivîskî (Yazınyeradbilim): Li ser lêkolînên navên wan cihan disekine ku di berhemên edebî yên weke roman, hîkayet, destan, çîrok û tiştanokan da derbas dibin. Vê têgehê ji toponimika poetiçeskaya ya rûsî pêşnîyar dike. Her wiha dibêje, dibe ku ev cih cihên rasteqîn bin yan jî ji alîyê nivîskar ve hatibine afirandin û xeyalî bin.

Toponîmîya Heşifî (Silikyeradbilim): Ew şaxa toponîmîyê ye ku li ser navê heyberên wek çîya, gir, til, mer'a, zevî, ziving, şûn (cih), kanî, best, qelîştekên şapeyê, bîr û hwd lêkolînan dike. Ev cih tenê ji alîyê şênîyên wir ve dihêne zanîn lê şênîyên cihên din nizanin lewma di nexşeyan da cih nagirin û bi rêya neqilkirina nifş bi nifş xwe digihînin îro (Şahin, 2013, r. 49).

Li gorî vê nêrînê dikare bê gotin ku toponîmên biçûk hene û yên mezin hene û li gorî berfirehbûna erda xwe wek makrotoponîn û mîkrotoponîm dibine du kom. Makrotoponîm beranberî erdên berfireh; mîkrotoponîm beranberî erdên berteng dihê (Albayrak, 2004, r. 35). Bi gotineka din mîkrotoponîm navê cihên teng û xwezayî ku dihên zanîn îfade dike (Yavuz & Şenel, 2013, r. 2248). Minkun e mirov li her cihî li yên mezin rast were lê yên biçûk di herêmeka teng da veşartî mane. Mîkrotoponîm weke oronîm, hîdronîm, oykonîm, horonîm, dromonîm, agronîm, urbonîm û drîmonîm her cure navên cihan in ku tenê ji alîyê şênîyên wî cihî ve dihêne bikarînan, di nexşeyeka çapa xwe 1/100.000 da jî cih nagirin û nifş bi nifş xwe digihînin roja me (Şahin, 2011, r. 1749).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Mimkun e ku di cihekî teng da bi hezaran mîkrotoponîm hebin. Dema li gundekî û derdora wî were nêrîn dê were dîtin ku navê her bestikê, her rezî, her tilî anku her niqteyê heye û gelek caran hemû jî ji alîyên şênîyan ve nahên zanîn. Dibe ku navê wan bihîstibin û zanibin jî lê cihê wan nizanibin. Ji ber ku rewş ev e û mîkrotoponîm jî jixwe nehatine nivîsîn, ev yek jibîrkirin û her wiha windabûna wan jî bileztir û hêsantir dike. Valakirina gundan, koçkirin, karesatên xwezayî, êş, komkujî, mirin û tiştên bi vî awayî jî dibine sedema windabûna mîkrotoponîman (Şahin, 2011, r. 1751).

Gelek caran ne pêkan e di berhemên edebî da yan jî di xebatên teorîk da mîkrotoponîm bihên dîtin lê di vegotinên gelêrî yên li herêmeka teng da xuya dibin. Lewra ew lokal in û di nexşeyan da jî cih nabînin. Mesela mextel[1] ji bo mîkrotoponîman dibine mînakên baş. Ji ber ku ev mîkrotoponîm bêtir di hişê mirovan da xwe diparêzin divê lêkolêrên ku li ser toponîmîyê dixebitin bi rêya berhevkarîya li herêmê, xwe bigihînin wan (Murzayev, vgh: Şahin, 2013, r. 49). Helbet bo mîkrotoponîman çavkanî tenê ne kes in. Lêkoler ji bo xwe bigihînin wan dikarin serî li hin çavkanîyên nivîskî jî bidin ku rola wan jî girîng e ji bo mîkrotoponîman. Kîtabet (tr: tahrir defterleri), sîcîlên şerîyeyî, lênûsên weqfan û salname jî dibine çavkanî bo lêgerînên mîkrotoponîman (Şahin & Köse, 2014, r. 173).

Ji alîyê din ve Yusifov û Kerimov bi [2]giştî ji bo toponîman (û her wiha xebatên toponîmîk) wek "çavkanîyên toponîmîk" sê çavkanîyan destnîşan dikin:

Çavkanîyên Nîvîskî: Di nivîsên Şimur-Akkad, Asur û Urartuyan da li ser erdnîgarîya Azerbeycanê[3] hin toponîm û etnonîm hatine tomarkirin. Di sedsala destpêkê û ya navîn da hin nivîskarên ermen hin navên cografîk dane û dîsa di çavkanîyên edebî da, di nivîsên gerokan da hin navên cografîk derbas dibin.

Bîrdarîyên Epîgrafîk: Ev kîtabeyên kevirîn wek çavkanîyên toponîmîk gelekî girîng in.

Nimûneyên Afirînerîya Gel (Folklor): Hin destanên qehremanî û evînê ku bi sedsalan bi awayekî bihîzbarî nifş bi nifş hatine veguhastin navê gelek bajar, çîya, bestan di xwe da vehewandine (Yusifov & Kerimov, 2017, r. 69-72).

Her çend zanista toponîmîyê ji dawîya sedsala 19em û pê ve hatibe bikarînan jî cihgirtina meseleyên toponîmîk gelekî kevintir e ku bi taybetî di hin berhemên zanyarên yewnana antîk de cih girtine û heta weke îro jî di berhemên hinek dîroknas, zimanzan û zemînnasan da hene (Albayrak, 2004, r. 16). Lewma dikare bê gotin ku toponîmî bi dîrok, ziman, cografya û çandê ra di nava têkilîyeka xurt da ye.

Fonksîyona navlêkirinê û navên cografîk di jîyana sosyal da roleka xwe ya pir girîng heye. Dema mirov li pirsên mîna "tu ji ku yî?, "tu ji ku dihêyî?", "tu diçî ku?", "ev der ku der e?" û hwd bifikire, ev fonksîyon dê baştir bihê fêmkirin. Ji alîyê din ve Kerimov û Yusifov behsa pênc fonksîyonên zanista toponîmîyê dikin ku ji toponîmîstê navdar E. M. Murzayez neqil kirine:

1. Agahker,
2. Pedagojî,
3. Sazkirina navlêkirin û navguhertinê,
4. Fonksîyona navên cografîk,
5. Rastnîvîsîna navên cografîk, wergerandina wan bo zimanekî din (Yusifov & Kerimov, 2017, r. 20).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Şaxên Toponîmîyê û Cureyên Toponîman:

Zanista toponîmîyê navan li gorî taybetmendîyan kategorîze dike û ji bo navê her cihekî/tiştekî şaxeka xwe li gel binbeşên xwe heye ku ev şax navê zanistê îfade dikin. Binbeş cureyên toponîman îfade dikin ku dîsa di nav xwe da vediqetin. İbrahim Şahin wek oykonîmî, oronîmî, hîdronîmî, urbonîmî, horonîmî, drîmonîmî, dromonîmî û agroonîmî heşt şaxan ji toponîmîyê dibe (Şahin, 2013, r. 56).

Her wiha toponîman jî wek heşt cureyan destnîşan dike û wiha rêz dike: Oykonîm, oronîm, hîdronîm, urbonîm, horonîm, drîmonîm, dromonîm, agroonîm (Şahin, 2013, r. 48). Anku oykonîmî wek şaxeka toponîmîyê navê zanistê be oykonîm jî wek navê cihan (toponîm) dibine keresteyên vê zanistê.

Oykonîmî şaxeka toponîmîyê ye ku li ser navên meskenan disekine û mirov dikare wek "navmeskennasî" kurdîze bike. Ev mesken wek mal, avahî û hwd warê rûniştinê îfade dike. Ev zanist derketina holê ya meskenan, geşedana wan, teşegirtina wan û rola wan dike mijara lêkolînê (Şahin, 2013, r. 52). "Oykos" bi grekî dihê wateya mesken, war, mal û "onîm" jî dihê wateya navî (Yavuz & Şenel, 2013, r. 2249). Ev cure wek *komonîm* ku li navê gund, gundik (mezra) û çewlikan dikole û wek *astîonîm* ku li navê bajaran dikole dibe du beş (Podol'skaya, vgh: Şahin, 2013, r. 52). Şahin wek "orpedyonîm" beşeka din lê zêde dike ku li ser navê zozanan dikole (Şahin, 2013, r. 52).

Oronîm ji "oros" anku çîya ku bi zimanê grekî ye û "onîma" anku nav hatîye dariştin. Cureyekî toponîman e ku navên çîya, gir, til, gelî, kendal, bor, deşt û hwd îfade dike (Murzayev; Podol'skaya; Ahmedov, vgh: Şahin, 2013, r. 52). Speleonîm beşa oronîman e ku ji "spelon (yew: şikeft)" û "onîm"ê pêk dihê û navên şikeft, zinar, kendal, bestik û hwd îfade dike ku bi awayekî xwezayî di binê erdê da çêbûne (Yavuz & Şenel, 2013, r. 2251). Oronîmî jî navê zanista têkildar e ku mirov dikare wek "navçîyanasî" kurdîze bike.

Hîdronîm hem navên avên xwezayî hem navên avên çêkirî îfade dike. Ji "hîdro"ya grekî û "onîma" pêk dihê ku di rûsî da wek gîdronîm û di almanî da wek hydronym dihê zanîn (Podol'skaya; Ahmedov, vgh: Şahin, 2013, r. 53). Helbet têgeha "av"ê li gel behran; zerya, gol, çem, best û hwd jî îfade dike. Hîdronîm jî wek potamonîm (navê bestan), lîmnomonîm (navê golan), okyeanonîm (navê zeryayan) û helonîm (navê çiravan) dibe çar beş û pelagonîm (navê behran) jî beşa okyeanonîman e (Şahin, 2013, r. 53). Mirov dikare di kurdî da ji bo vê zanistê bêje "navavnasî".

Urbonîm tiştên aîdî bajaran îfade dike ku Albayrak wek "urbanonîm" dîyar dike û dibêje ew toponîm in ku navên rez, bexçe, park, keleh, pir, avahî, meydan, rê, kuçe û hwd didine zanîn (Albayrak, 2004, r. 32). Urbonîm wek agoronîm (navê meydanan), godonîm (navê şiverêyan), gorodskoy horonîm (navê semt, mehele, zîyaret û hwd ên li bajarî) û ktemtonîm (navê sazîyan) vediqete binbeşan (Şahin, 2013, r. 54).

Horonîm ji "horo"ya grekî ku dihê wateya welat, êl, sînor û onîm pêk hatîye (Şahin, 2013, r. 54). Ew toponîm in ku navê erdên niştimanî-îdarî-cografî didine zanîn (Albayrak, 2004, r. 32). Ji horo (yew: welat) û onîma pêk dihê û wek welat, vîlayet, herêm, bajar û hwd navên taybet ên her erda îdarî û xwezayî dîyar dike (Yavuz & Şenel, 2013, r. 246). Her wiha horonîmî jî şaxa toponîmîyê ye ku koka horonîman, derketina wan, geşedana wan, teşegirtina wan û rola wan dikole (Şahin, 2013, r. 54). Horonîm dibine du beş: Admînstratîvniy horonîm ku sînorên welat, herêm, bajar û hwd îfade dikin û di belgeyên fermî da dihêne qebûlkirin; prîrodniy horonîm jî wan cihan îfade

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

dike ku sînorên wan ê fermî nîn in lê sînorên xwezayî hene (Podol'skaya; vgh: Şahin, 2013, r. 54-55).

Drîmonîmî li ser koka drîmonîman, derketina wan, geşedana wan, teşegirtina wan û rola wan disekine (Şahin, 2013, r. 55). Têgeha drîmonîm wek drîmos (yew = daristan) + onîm anku nav hatîye dariştin (Yusifov & Kerimov, 2017, r. 191). Anku drîmonîm dehl jî di nav da navên daristanan îfade dike û drîmonîmî jî navê zanista têkildar e.

Bi grekî "agros" dihê wateya "alan, erd, zevî"yê. Agroonîm bi bestina agros û onîma pêk hatîye û agroonîmî jî şaxa toponîmîyê ye ku li ser navên wan disekine (Şahin, 2013, r. 55). Agroonîm navê taybet ên erd, zevî û alanan e ku çandinî li ser wan dihê kirin. Mirov dikare navê şaxê wek "navzevînasî" kurdîze bike.

Dromonîm cureyekî toponîman e û navê taybet ê xet û rêyan îfade dike ku mirov dikare di kurdî da wek "navrênasî" jî bi nav bike. Ev rê û xet avî, hewayî, di bin erdê da û li ser erdê dibin. Ji "dromos" anku "rê"ya grekî û onîma pêk hatîye (Şahin, 2013, r. 55). Dromonîmî jî dibe navê zanistê ku şaxeka toponîmîyê ye. Rêya Hevrîşîm, Qenala Suveyşê, xeta petrolê ya Baku-Tiflîs-Ceyhanê mînak in.

Li ser kategorîzekirina toponîman, di hin cihan da toponîmîst ji hev cuda difikirin lê ger em li gorî kategorîzekirina jor şemayekê çêkin tiştekî bi vî rengî dê derkeve pêşberî me:



Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Wek Kevneşopîyekê Navlêkirin:

Navlêkirin, xîmekî girîng e di têkilîya mirovan da û xuya ye û ev rol ji berê heta niha her hatîye pratîzekirin. Ev navlêkirin ji bo hemû hebûnan derbasdar e. Mirovan nav hem li tiştan hem li cihan kirine. Heta berî mirovan Xwedê nav li cih û tiştan kirine. Navên cihan ew hêman in ku çand, ziman û nasname tê da bi cih dibin, îdeolojî pê dihêne şayesandin, bi rêya wan navên şexsan nemir dibin û di sêrî da Xwedê piştra jî mirovan çêkirine (Yavuz & Şenel, 2013, r. 2239).

Li gorî olên yekxwedayî Xwedê nav li tişt û gîyandaran kirine û ew hînî Ademî kirine. Bi heman awayî li gorî gelek bawerîyên pirxwedayî, navlêkirin di pêvajoya afirandinê da bûye û nav ji alîyê pêşîyan ve hatine dayîn (Emiroğlu & Aydın, 2003, r. 8).

Em tiştên li derdora xwe li gorî navên ku me dane wan vesaz dikin, li gorî van navan em wan tesnîf dikin û agahîyên xwe yên der barê wan da bi navê wan îfade dikin. Bi rêya navlêkirinê wateyek li wî tiştî dihê barkirin û bi vî awayî ew tişt jî dibê xwedîyê wateyekê (Poyraz, 2004, r. 227). Çi ji bo tiştan, çi ji bo kesan, çi ji bo cihan di navbera nav û tişt, kes, yan jî cihê ku nav lê dihê kirin têkilîyeka xurt heye. Lêwra her heyber li gorî taybetmendîyên xwe navî digire. Ê ku navan bizane heyberan jî dizane, tiştek bê nav nabe, xweda jî di nav da her tişt bi navlêkirinê/bi navê xwe dibe hebûnek (Poyraz, 2004, r. 229). Ji bo hemû heyberan navlêkirin jî di çarçoveya hin qaîdeyan da pêk dihê û di vê navlêkirinê da tiştên dîyarker û sereke hene.

Dema mirovek dihê dinyayê yekem tişta ku dê û bavê wî/wê pêdivîyê pê dibin ew e ku navekî lê bikin. Wek amrazeka ku nasnameya civakî nîşan didin nav, ji bo dinyaya civakî û nasnameyê dibine referans (Çelik, 2007, r. 6). Lewma navlêkirin ne bi awayekî çawalêhato, di çarçoveya hinek qaîdeyên xwezayî da pêk dihê. Weke ku Celalettin Çelik jî dîyar dike tiştên ku navan dikine faktoreka nasname û cudabûnê û wan dikine hêmanên sembolîk; bawerîyên dînî, fikrên çandî û îdeolojîk in. Her wiha di bingeha hemû pratîkên navlêkirinê da dîn wek faktoreka sereke derdikeve pêş (Çelik, 2006, r. 40). Weke ku Örnek jî dibêje wateya navî li ber çavan dihê girtin çiku ew wate dê kesayet, karakter, dahatû û cihê zarokî/ê yê di civakê da dîyar bike. Yanî bawerî ew e ku wateya navî dê rengê xwe bide zarokê/î jî (Örnek, 1975, r. 103).

Weke her tiştê din her cihek jî navekî xwe heye û her cih bi navê xwe dihê zanîn. Çawa ku ji bo naskirina tişt û kesan nav fonksîyonel e ji bo naskirina cihan jî ev derbasdar e. Şahin û Köse wek "têgeha cografî ya mehelî" pênaseyekê ji Murzayev û Podolskayayî neqil dikin ku dibêjin cure û xuyanga teşeyekî cografîk îfade dike û bi piranî di afirandina navên cihan da dihê bikarînan û di rûsî da wek goegrafîçeskîy û mestniy geografîçeskîy; di ingîlîzî da jî wek generic term derbas dibe (Şahin & Köse, 2014, r. 174). Ev têgeh di navên cih û waran da wek îndîkator peywirê digirine ser xwe û hinek roja îroyîn ji alîyê her kesî ve dihêne zanîn (wek çîya, newal, av, deşt, girav û hwd) lê hinek bûne arkaîk, lewma jî ji bo ku çawanî û wateya navên cih û waran were vegotin divê toponîmîst li ser wan lêkolînan bikin (Şahin, 2015, r. 184). Ev bandora teşeyên cografîk di navlêkirinê da hem pratîk e hem kartêker e û ji ber van taybetmendîyên xwe ji alîyê mirovan ve her hatîne bikarînan. Çiku dema ku mirov tiştekî salox bide, her demê bi awayekî xwezayî ji taybetmendîya herî xuya dest pê dike. Ji ber vê yekê di çanda navlêkirina cihan da rêbaza herî berbelav ew e ku ew cih navê xwe, wek kaş, zinar, çem û hwd ji objeyên cografîk ên derdora xwe bigire (Şahin, 2015, r. 186). Wê demê bi du awayan mirov dikare behsa navên cihan bike; navek bi awayê xwezayî pêk hatîye, navê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

din jî ji alîyê mirovan ve hatîye lêkirin. Navê xwezayî li gorî taybetmendîyên wî cihî yên cografîk pêk dihê, navê taybet jî li gorî hin qaîdeyan çêdibe û xwe dispêre sedemekê.

Navên ku ji alîyê mirovan ve li cihan dihêne kirin dîsa weke navê şexsan ne bi awayekî çawalêhato dibin û sedemeka xwe ya mentiqî heye. Hakan Poyraz ku di çarçoveyeka felsefîk da û li gorî nêrînên feylesofan navlêkirinê dinirxîne dibêje kesê ku navî dide (onomatos) tiştekî, li gorî xwezayîya wî tiştî navî dide û bi vî awayî nav wek navên dirust dihêne qebûlkirin. Alîgirên Demokrîtos dibêjin erê nav ji alîyê mirovan ve li tiştan dihêne kirin lê ev navlêkirin ne bi awayekî kêfî ye, ew xwe dispêre bingeheka dîyar. Ger di navbera bêje û tişta ku ew bêje nîşan dide da hevsengîyek nebe mirov nikare qala “wate”yê bike (Poyraz, 2004, r. 230).

Navên cihan ne nav yan jî bêjeyên ji rêzê ne, her yek wateyeka xwe heye û têkilîyeka xwe bi kesek, tiştek yan jî bûyerekê ra heye ku paralelî vê têkilîyê ew nav çêbûye. Ev wateya ku hin caran aşkere û hin caran veşartî ye di nava xwe da hin daneyan jî vedihewîne ku ji bo ziman, sîyaset, dîrok, jîyana berê ya mirov û ajalan, kes û civakên girîng ku li wir jîyane, bûyerên girîng ku li wir rû dane û hwd dikarin roleka fonksîyonel pêk bînin. Her wiha di çarçoveya zimannasîyê da li Ewropayê li ser navê cih û waran lêkolîn hatine kirin û di encama van lêkolînan da ji bo etnîsîte, ziman û dîroka van cihan daneyên girîng hatine bidestxistin (Yağmur, 2014, r. 244). Ji bo lêkolînên di van waran da mîkrotoponîm ji makrotoponîman kartêkertir in. Çiku wek Şahin û Köse jî dîyar dikin her mîkrotoponîmek wek navnîşaneka kurt e, gelek ji wan bi hezaran salan rabirdûya wan heye û ji ber ku bi awayekî devkî hatine veguhastin di bin bandora derveyî da namînin. Lewma jî ev cure navên cihan di dîyarkirina çanda navlêkirinê û dewlemendîya zimanî da dibine keresteyên bikêr (Şahin & Köse, 2014, r. 172).

“Kes” û “navê cihan” du têgeh in ku têkilîyeka xurt di navbera wan da heye. Çiku “ji navên kesan navên cihan; ji navên cihan navên kesan dihêne lêkirin û bi vî awayî heyberên zindî û nezindî dihêne binavkirin (Gülensoy, 1998, r. 41). Anku her çend cografya di bin bandora mirov da be, ji alîyê din ve mirov jî di bin bandora cografyayê da ye ku nikare ji vê yekê bireve. Her wiha Başkan li gorî lêkolînên xwe, navlêkirina cihan wek “navên ku xwe dispêrin mercên xwezayî û fîzîkî” û “navên ku xwe dispêrin civak û mirovan di bin du serenavan da dinirxînê (Başkan, 1971, r. 241).

Di navlêkirina cihan da hin tiştên serekê ku li derdorê hene xwedîyê bandoreke xuya ne û di navlêkirinê da bikarînana van tiştan wek rêbazekê derdikeve pêş. Yılmaz Kurt di gotara xwe da ku bi navê *Diyarbekir Sancağı Yer Adları* da weşîyaye, van xalan destnîşan dike:

Navê milet û eşîran di navlêkirina cihan da rêbazeka berbelav e.

Dema gund û taxek nû ava dibe navê serokeşîrê ku ew gund yan jî tax ava kirîye wek navê cihî derdikeve pêş.

Teşeyê cografîk ê wê derdorê di navlêkirina wî cihî da girîng e.

Navê ajalan di navlêkirina cihekî da dihê bikarînan.

Xan, qesir, şikeft yan jî zîyareteka li wir dibe navê gund yan jî gundikan. (Kurt, 2008, r. 410-414).

Evlîya Çelebî jî wek bêje li navê gelek cihan kolaye û sedema ku ew nav li wî cihî hatîye kirin vegotîye. Li gel van xalên jor wî dîyar kirîye ku hin cih bi fetihkarê xwe bi nav dibin û hin cih jî bi têkçûyîyên xwe. Ji alîyê din ve cihin hene bi kesekî/a ku li wir çêbûye bi nav bûne (Cunbur, 1984, r. 206-207). Helbet navên cihan ne tenê li gorî tiştek yan jî

Zakho Centre
for Kurdish Studies

taybetmendîyeka li derdorê dibin, hin caran jî xwe dispêrine bûyer û efsaneyan jî. Evlîya Çelebî hin navên cihan dispêre gotinek û hevokeka ku di dema fetihê da hatî gotin yan jî guherînên ku di wan da pêk hatin (Cunbur, 1984, r. 209). Ev guhertina ku ji alîyê kesê sêyem ve dihê kirin jî bêguman dê bi awayekî were pirrolekirin ku êdî ev jî vê yekê dike efsaneyek. Hin navên cihan bi demê ra dihêne guhertin, teşeyê xwe yê berê winda dikin û di teşeyê nû da dibine navê wî cihî. Hin nav hene ji bo tiştekî li wir ku êdî hatîye xirakirin wek bîranîn dihê bikarînan, hin nav jî bi taybetî ji bo wir û bi mebesteka dîyar dihêne lêkirin (Sakaoğlu, 1984, r. 260).

Toponîmî di Vegotinên Gelêrî da:

Pêkan e ku her zanist ji bo zanistên din daneyan vehewîne û bi danûstandina li ser van daneyan, têkilîyek di navbera zanistan da saz bibe. Bi taybetî jî têkilîyeka xurt di navbera toponîmî û folklorê da heye ku sehaya hilberîna folklorê civak bixwe ye. Bi nêrîneka din ji ber ku navlêkirina cih û waran (ku mijara toponîmîyê ye) rasterast afirandinên civakê ne, têkilîya toponîmî û folklorê têra xwe xurt e. Yanî her tişta ku dibe kereste bo toponîmîyê berîya wê jixwe keresteya folklorê ye. Wek mînak; pêşî civak nav li çîyayekî dike piştra toponîmî di çarçoveya xwe da li ser wî navî disekine û lê dikole. Bi vî awayî bixwaze nexwaze xebata li ser toponîmîyê tûşî zanista folklorê dibe. Jixwe Yusifov û Kerimov wek çavkanîyên toponîmîk sê çavkanî dîyar kirine ku yek ji van jî “nimûneyên afirînerîya gel” in. Ev çavkanî ji destanên qehremanî û evînê pêk dihên ku navên toponîman vedihewînin (Yusifov & Kerimov, 2017, r. 69-72).

Di vê xebatê da jî bi giştî fokûs li ser wan vegotinên gelêrî ye ku çavkanîyên toponîman in. Lewma divê bersiv ji wan pirsan ra were dîtin bê ka toponîmî û vegotinên gelêrî li ku digihine hev, têkilîyeka çawa di navbera wan da derdikeve holê û çi pev dibêjin. Tam di vê xalê da dîsa du parametre derdikevine pêşberî me ku xwe dispêrin tecrûbe û çavdêrîyên me yên sehayî.

1- Yan navê cihekî jixwe heye (helbet em behsa dîroka vî navî nakin) û vegotineka gelêrî li ser vî navî hatîye afirandin,
2- Yan jî vegotineka gelêrî heye/hatîye afirandin û ew cih jî li gorî vê vegotina gelêrî bi nav bûye.

Anku yan vegotineka navê cihî heye yan jî ji navê cihî vegotinek heye. Ji ku alîyî ve lê were nêrîn dîsa heman encam derdikeve holê: têkilîyeka xurt di navbera toponîmî û vegotinên gelêrî da heye heta jê wêdetir her du ji hev dizên.

Niha ew vegotinên gelêrî dê werin pêşkêşkirin ku di çarçoveya van her du pîvanan da hatine berhevkirin. Di vir da tenê kurteya van vegotinan dê cih bigire ku halê wan ê dirêj di teza masterê ya bi navê *“Toponîmî di Vegotinên Gelêrî da (Li Herêmên Hezex û Nisêbînê)”* da hene. Her wiha piştî pêşkêşkirina kurteya her vegotina gelêrî analîza wê dê were kirin. Di vê nirxandinê da çarçove dê ew be bê ka ji bo kîjan cureyê toponîman dibe mînak, di nav da çi cureyên toponîman hene û ji vî alîyî ve dikeve kîjan kategorîyê da; li gorî kîjan pîvanê cihî navê xwe girtîye û taybetmendîyên kîjan vegotinên gelêrî vedihewîne.

Elo Dîno:

Li gundê Bafê yê girêdayî Hezexê, li binîya Kelha Bafê qesrek heye. Qesir di ber çem da ye û wek Qesra Elo Dîno dihê binavkirin. Li ser Elo Dîno hîkayetek dihê gotin ku ne tenê li vê herêmê li gelek herêmên kurdan belav bûye û dihê zanîn. Vebêjer Qudbedîn ev hîkayet ji Deham Acar wergirtîye û ji me ra neqil kirîye.

Tîcareta Bexda û Musilê û hemû herêmê li ser Çemê Dîcleyê dihê kirin. Elo Dîno li kêleka avê qesra xwe ava dike, zîncîrekê ji vî alîyê çemî dikişîne alîyê din û her keleka ku di çemî ra derrbas dibe xercê jê distîne. Piştî demekê mîrê Cîzîra Bota ji vê rewşê hay dibe û xwe pê ne qayîl dike ku kesekî din di herêma wî da xercê bistîne. Çend caran wezîrê xwe dişîne pey Elo Dîno ku were cem mîr lê Elo Dîno naçe. Herî dawî qasidekî dişîne û dibêje ku mîr dixwaze bi te ra li hev bike. Bi vî awayî Elo Dîno dikişîne qesra xwe û bi fenekê wî digire û dixe zîndanê da. Ser milên Elo Dîno dikole û findan tê da datîne. Dema ku mîr diçe cem Elo Dîno û jê dipirsê "ma halekî ji vî halî xirabtir heye?" Elo Dîno vê bersivê dide mîr: "Erê mîrê min. Ew hal ji vî halî xirabtir e ku mêvanek were mala mirov û tiştek nebe mirov keremî mêvanê xwe bike." Wê demê mîr fêm dike ku ji bo Elo Dîno xwe û malbata xwe xwedî bike ev yek kirîye. Fermanê dide ku zincîrên wî werin vekirin lê êdî dereng e.

Dema jina Elo Dîno ya duyem ducanî dibîne ku mêrê wê venagere, direve û xwe li gundekî dora Çîyayê Gabarê digire. Piştî 15-16 salan ji kurê xwe ra hal û meseleyê vedibêje, xencera bavê wî dixe ber wî da û careka din berê xwe didin Cîzîra Bota. Bi ricaya ji mîrî, kurê xwe teslîmî mîrî dike û jê dixwaze ku di qesrê xwe da karekî bide kurê wê yê sêwî. Bi demê ra kurê Elo Dîno dibe zilamê mîrî yê herî nêzîk. Piştî ku mîr ji kurik piştrast dibe, kurê Elo Dîno bi xencera bavê xwe mîrî dikujê û heyfa bavê xwe dihilîne.

Mirov dikare li ser vegotina Elo Dîno van nirxandinan bike:

Her çend ev cih di hin vegotinan da wek kelehê were binavkirin jî li gorî agahîyên ku vebêjer Qudbedîn dide ew ne keleh lê qesr e. Ya rastî li vî cihî ne tenê qesir di heman demê da kelehek jî heye ku ji Qesra Elo Dîno kevintir e û wek Keleha Bafê dihê binavkirin. Ew li wê niqteyê ne ku Çemê Dîcleyê û Şetê Bota dibine yek û cihêkî stratejîk e. Ji ber ku ev keleh û qesir di heman demê da wek mala Elo Dîno dihê zanîn, mirov dikare bêje ku ew warekî rûniştinê ye û dibe oykonîmek. Navê kelehan bixwe cureyekî urbonîman dihê hesibandin lê belê şert ew e ku aîdî bajaran bin. Di vê mînakê da dihê dîtin ku ev der ne aîdî bajarekî lê cihekî xweser e lewma mirov nikare bêje urbonîm e.

Ne teqez e bê ka kelehê/qesrê navê xwe ji navê şexsî wergirtîye yan şexsî navê xwe ji navê kelehê/qesrê wergirtîye lê belê wisa xuya dike ku keleh/qesir bi navê Elo Dîno bi nav bûye. Lewra li gorî bawerîyê Elo Dîno ew der ava kirîye ji bo armanceka dîyar. Lewma ya lojîk ew e ku mirov bêje keleh bi şexsî bi nav bûye.

Her çend vebêjêr vê wek hîkayeyê bi nav bikin jî ji bilî hîkayeyê hin taybetmendîyên efsaneyan jî vedihewîne. Lewra ji ber ku çi rast çi xeyalî, ew der barê cih û kesekî da ye û bi cihekî dîyar ve dihê girêdan, di dema nêzîk da ye, aîdî vê dinyayê ye û leheng mirov in. Alîyê serleheng ên efsaneyî nîn in lê belê ew bi tevgera xwe di nav civakê da bûye kesekî efsaneyî ku wek Robîn Hoodê kurdan jî dihê binavkirin. Lewra wî ji dewlemandan distand û dida gelê Botanê. Ji ber ku mijar qehremanî ye û hem pexşanî û hem beşeka biçûk be jî menzûm tê da heye mirov dikare bike nav hîkayeyên gelêrî da. Li gel vê yekê vêbêjer jî li gel navê rîwayetê wek hîkaye jî nav lê dikin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Keçika Bikezî:

Li gundê Evdika yê li ser Hezexê derbarê toponîmîya zîyaretekê da vegotineka gelêrî hatîye berhevkirin. Lehenga sereke ya vegotinê keçikek e ku bi taybetmendîyeka xwe ya fizîkî hatîye binavkirin. Ev zîyaret di çîyayê Evdika da ye û li gorî agahîyên ku vebêjer dide ev keçik ji Evdika ye. Ew keseka pîroz û bêguneh e lê bebextî lê hatîye kirin.

Ev vegotin ne tenê li gundê Evdika li gundên derdorê jî dihê zanîn û demeka dirêj e dihê gotin. Bi taybetî van demên dawî berbelavtir bûye û bo hin xebatên modeyî jî bûye materyal ku bi vî awayî hinekî ji eslê xwe jî hatîye dûrxistin.

Vebêjer Hemed Sedîqê Seyd Tahir ku ji gundê Evdika ye dibêje ev keçik dibe metika me, heft bavan dûrî me ye û texrîben pênsed-şesed sal heye. Navê wê nayê gotin, me her "Keçika Bikezî" bihîstîye lê îxtîyarekî me digo navê wê Sedîqa ye. Li gorî neqilkirina wî kurte bi vî awayî ye:

Keçika Bikezî ku sê birayên wê hene seyîd e û li gel malbata xwe ji gundekî seyîdan ê bi navê Bêcirman hatîye û di Beriha Evdika da bi cih bûye. Ev keçik her roj sitilên xwe yên şîr dibe û diçe çolê. Her roj li heman cihî pezkovî lê kom dibin û şîrê guhanên xwe pêşkêşî wê dikin. Pezkovîyên ku dema mirovan dibînin direvin tenê li wê dibanin çiku ew keseka salîhe ye. Piştî demekê jinbira wê jê diheside û ji mêrê xwe ra dibêje: Xwişka te nebaşîyê bi şivanan ra dike û şîvan vî şîrî didine wê, heke na her roj vî şîrî ji ku dîîne. Birayê wî jî bêyî ku li hal û meseleyê bipirse, tîrekê diavêje singa xwişka xwe û wê dikuje. Berîya ku Keçika Bikezî ruh bisipêre ji birayê xwe ra dibêje, te ez kuştim lê demekê li vir bisekine û piştra here. Piştî gavekê pezkovî tên, qiloçên xwe didin bin laşê wê û dema ku xwînê dibînin mîna mirovan diqîrin. Wê demê birayê wê fêm dike ku mala xwe xirab kir lê êdî fêde nake.

Berîya hingê jî ji birayê xwe ra gotîye min li vî çîyayê bilind veşêrin û bila tu insan jî li cem min nebin lewma gora wê bi tenê ye.

Mirov dikare vê vegotinê bi vî awayî binirxîne:

Ev dever zîyaretek e ku tenê gorek lê heye ji ber vê yekê jî di eslê xwe da ne zîyaret lê hicir/hicrik e û wek cihekî pîroz dihê qebûlkirin. Balkêş e ku ev gor neşibe gorên din ên misilmanan çiku berê wê bi awayekî tekûz ne li qubletê ye lê sedema vê yekê nayê zanîn. Ji ber ku ew zîyaretek e ji alîyê toponîmîk ve mirov dikare wek gorodskoy horonîm bihesîbîne ku cureyekî urbonîman e lê şertê aîdbûna bajarekî wê li derveyî vî cureyî dihêle. Lewra divê mirov vî cihî tenê wek mîkrotopîmekê destnîşan bike. Cihî navê xwe li gorî kes û serpêhatîya wê wergirtîye ku darên wê derdorê jî wek Darên Keçika Bikezî dihên binavkirin.

Li gorî vebêjer û li gorî kesên vê herêmê ev bûyer rast e anku serpêhatîyek e ku wek mesele bi nav dikin. Der barê kes, bûyer û cihekî rast da ne lewma bi vî alîyê xwe dişibe efsaneyan. Her wiha jê dihê bawerkirin û dihê qebûlkirin ku ev bûyer qewimîye lê belê qala bûyer û mirovên derasayî nake. Lewma jî bi awayekî tekûz nabe mînak bo efsaneyan. Têkilîya Keçika Bikezî ya bi pezkûvîyan ra derasayî û wek hêmaneka çîrokî xuya bike jî ne gelekî dûrî aqilan e û ev yek jî bi tena serê xwe têrê nake ku mirov bêje efsane yan jî çîrok e. Tevî vê yekê bi gotinên qalibgirtî dest pê nake û naqede, pexşan e û mekan jî ev dinya ye lewma ev taybetmendî jî wê ji çîrokbûnê dûr dixin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Kelha Hêtim[4]:

Li gundê Mezra Seyîda yê Nisêbîne derbarê kelihekê da vegotineka gelêrî hatîye berhevkirin ku têkildarî toponîmîyê ye. Ev keleh ne di nava gundî da ye, li Çîyayê Bagokê ye û têra xwe jî ji gundî dûr e lê belê di aqarê Mezra Seyîda da ye. Li gorî gotinan, xwedîyê vê kelîhê kesekî bi navê Hêtim e ku di heman demê da pêşengê gelê xwe ye. “Hatemê ku mezinê qebîleya Tay e helbestvanekî girîng ê serdema cahilîyeyê ye û kunyeya wî Hatem bin Abdullah bin Sa’d et-Tai el-Kahtani ye. Dîroka jidayîkbûn û mirina wî nayê zanîn lê li gorî texmînan piştî çêbûna Pêxemer Mihemed bi heft salan, anku di sala 578an da mirîye” (rne.com.tr).[5]

Merdî, rasteqînî, şohret û alîyê efsaneyî yê Hêtimî di *Mem û Zîn*ê da jî derdikeve pêşberî me ku Ehmedê Xanî navê wî bi yê Rustemê Zal ra hildidêre. Dema Xanî di *Mem û Zîn*ê da pesnê kurdan dide, di malika 219an da behsê dihîne ser destvekirîya Hêtimî ku her mîrekî kurdan dişibîne wî:

“Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mêrekî wan bi rezmê Rustem” (Dost, 2010, r. 132).

Hêtimê ku bi merdî anku destvekirîya xwe li cografyayeka berfireh bi nav û deng e, di dorpêçkirina kelehê da heft salan li ber xwe dide. Tam wextê ku dê bi zîrekîya xwe bi ser keve, bi îxaneta xwarzîyê xwe têk diçe lê belê ev têkçûn tiştekî ji navdarîya wî kêm nake.

Mirov diakare vê kurteyê ji vegotina vebêjêr Xelîlê Mexso derxe:

Hêtim zivistanan dihê û li herêma di navbera Çîyayê Bagokê û Nisêbînê da bi cih dibe. Ji vir ra dibêje “Wele tu xweş weten î lê hinekî teng î!” çiku miletî wî ewqasî gelek e.

Wextê ku Xwedê Hêtim dide dikin û nakin singa dêya xwe nagire. Di dawîyê da zanayek dibêje singeka dêya wî bixin devê wî û ya din jî bixin devê zarokekî din wê demê belkî bigire. Heta wisa nakin singê nagire çiku firşikê wî ji merdîyê ye ku heta îro jî Hêtim bi destvekirîya xwe dihê zanîn. Heta ku balix dibe û dibe melik jî kê çi jê bixwesta wî zêdetir dida wan.

Leşkerên siltanan heft salan keliha wî dorpêç kirine lê nekarîne dagir bikin. Piştî heft salan tu qûtê wî namîne lewma diçe ji axura dewaran hinek ceh dide hev û dike nan; şîrê dêlesegekê jî didoşe û dike mast. Vî nan û cehî dişîne nav wan leşkeran, dema ku leşker nan û mastî dibînin dibêjin “heylooo, hê li cem Hêtim bihar e, hê mast û şîr dixwe! Wele em nikarin safî bikin!” Dorpêç radibe lê heke ji nêza be heke ji bo berjewendîyên xwe be xwarzîyê Hêtim digihe leşker û hal û meseleyê ji wan ra dibêje. Li ser xayîntîya xwarzîyê wî leşker vedigere, kelihê dagir dike û Hêtim jî dikuje.

Mirov dikare van nirxandinan li ser vê vegotinê bike:

Urbonîm ew cure toponîm in ku navê rez, bexçe, pir, keleh û hwd vedibêjin. Di vê çarçoveyê da Kelha Hêtim dibe mînaka urbonîman lê belê şert ew e ku ev cih aîdî bajaran bin. Her çend ji vî alîyî ve ev keleh ne aîdî bajarekî xuya bike û ji ber vê yekê ji pênaseyê dûr bimîne jî dîsa divê mirov wê wek urbonîmekê qebûl bike. Lewra wek ku ji neqilkirina vebêjer jî dihê fêmkirin di dema xwe da ev keleh bixwe di statuya bajarekî da bûye.

Ji alîyê awayê navlêkirinê ve jî pîvan ew e ku cihî navê xwe ji kesî wergirtîye. Ev keleh berîya Hêtimî hebû yan ji alîyê wî ve hatîye çêkirin cihê nîqaşê ye. Lewra li gorî Süleyman Tülücü wî jîyana xwe li Gelîyê Hâîl derbas kirîye û niha jî gora wî li wir e

Zakho Centre
for Kurdish Studies

(Tülücü, 1997, r. 472). Heke ev agahî rast be wê demê mirov dikare bêje ku ev keleh jixwe hebûye û ev vegotina gelêrî li ser vî cihî hatîye afirandin. Helbet ev yek jî îhtîmal e lê hasilî her çawa be ya aşkere ew e ku keleh bi Hêtimî hatîye binavkirin û dihê naskirin.

Rasteqînîya lehengên mirov, mekanê dîyar û hebûna bûyerê ew taybetmendîyên vê vegotinê ne ku bi yên efsaneyan ra hevpar in. Lê çima ku derasayîbûn taybetmendîya sereke ya efsaneyan e û di vê vegotinê da jî derasayîbûn nîn e ew nabe mînak bo efsaneyan. Li gorî bawerîya gelê vê herêmê, Hêtim nêzîkî pênsed salî jîyaye ku belkî mirov karibe vê angaştê wek taybetmendîyeka derasayî binirxîne. Her wiha weke Adem û Nûh gelek kesên ku di hafizeya civakan da bi vî awayî cih girtine, layîqî temenekî dirêj hatine dîtin û bi vê angaştê bûne kesên efsaneyî. Vebêjer vê vegotinê wek "mesele" bi nav dike lewma dikare bihê gotin ku li gorî vebêjerî (û giştîyê civakê) ji rastîya wê şik û guman nîn e.

Ev vegotin jî wek destanan li ser kesekî îdeal û rêvebirê civakê ye lê belê ji ber ku şerê behs li ser e, ne di navbera lehengî û afirîdeyên derasayî da ye, wek cure li derveyî destanan jî dimîne. Ji alîyê mijarê ve bişibe Keleha Dimdimê jî sehneyên şexsan bi hûrgulî nahên vegotin, vegotin ne li gel enstrûmanekê ye û ji alîyê qebareyê ve jî li gorî cureyê destanê kurt dimîne. Her çend hîkayeteka der barê kesekî û qehremanîya wî da be jî tekst tenê pexşan e. Di hin varyantên din da beşên menzûm hebin jî varyanta ku me berhev kirî ji vî alîyê xwe ve nabe destanek.

Qesirbelek:

Gundê Nisêbînê yê bi navê xwe Qesirbelekê, navê xwe ji qesrekê digire ku îro ne li ser pîyan e û tenê wek kavil şûna wê maye. Bêjeya "qesra belek" her wê yekê dihîne bîra mirov ku qesir bi awayê xeteka reş û yeka spî hatîye çêkirin û ji ber vê jî rengdêra belek lê dihê zêdekirin. Ev yek ji bo Birca Belek a Cizîrê jî derbasdar e ku li gorî vegotina Xelîlê Mexso jixwe têkilîya van her du cih û navan jî bi hev ra heye. Bi saloxan dîwarên qesra li vî gundî jî bi heman awayî ji xeteka reş û yeka spî pêk dihatin ku heta demeka nêzîk wek bermahî li ser pîyan bûn. Her wiha belekîya Birca Belek îro jî li ber çavan e ku mirov dikare bêje ev yek dibe stûnek bo vî fikrî. Helbet dibe ku bi rastî jî rengdêra belek ji ber rengê dîwarên wan derketibe holê lê li gorî vegotina hatî berhevkirin îhtîmaleka din derdikeve holê. Lewra bêjeya "belek" ji navê hostayê van cihan dihê ku navê wî Cihûwê Belek e. Vebêjer Xelîlê Mexso ev vegotina gelêrî ji mer a neqil kirîye ku kurteya wê wiha ye:

Wê demê navê mîrê Bota Mendelî ye. Pismamê wî Miheme darbeyê lê dikê ku di encamê da dihê sirgûnkirin û li gel xulamê xwe Silêman diçe Stenbolê. Mala ku ji xwe raa li Stenbolê digire nêzî mala keça siltanî ye. Rojekê Mendelî ji Silêman dixwaze ku jê ra çend kilamên cihê Bota bibêje. Dema ku keça siltan dengê Silêman dibihîze di bin tesîra wî da dimîne û gelekî mêraq dike bê ka ev stran ji kê ra dihên gotin. Dide pey şopa Mendelî û ku wî dibîne ne bi dilekî bi sed dilî dil dikevîyê.

Keça siltanî her êvar bi cêrîya xwe ra xwarinê dişînê mala Mendelî û serê çendekî jî hinek zêran dike binê sênîyê da lê Silêman ji Mendelî ra qet behsa van zêran nake û jixwe haya Mendelî ji keçikê jî nîn e. Silêman bi van zêran dîsa bêyî ku haya Mendelî jê çêbibe ji kurdên li Stenbolê artêşekê ava dike. Piştî demekê Frensa Stenbolê dorpêç dike. Silêman jî dibêje Mendelî alîkarîya siltanî bike lê mendelî dibêje ma çawa bikim, ne kesekî min heye ne kûsek! Wê gavê Silêman behsa artêşê ji mîrî ra dike. Mendelî bi vê artêşê şerekî baş dike û bala siltanî dikişîne. Hasilî siltan piştra keça xwe

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆڵینێن کوردی

dide Mendelî û dîsa wî wek mîr dişîne Cîzîra Bota û dibêje ma tu wek dîyarî çi ji min dixwazî. Mendelî dibêje ez tiştekî naxwazim, tenê Cihûwê Belek bi min ra bişîne.

Cihûwê Belek li Cîzîra Bota Birca Belek ji mîrî ra çêdike ku hema bêje bi temamî di rengê qesra siltanî da ye. Mihemê vê yekê dibe guhê siltanî û dibêje te keça xwe da Mendelî lê zavayê te li vir qesreka mîna ya te çêdike, anku xwe dike hevrikê te. Li ser vê yekê siltan hêrs dibe û teftîşê dike. Di encamê da dibîne ku Miheme bêbextîyan dike çiku Mendelî qesra xwe du rêzan kêmî ya siltanî lê kirîye. Ji bo vê bebextîya wî siltan Miheme davêje Çemê Dîcleyê ku îro jî cihê lê hatîye xeniqandin wek "Gera Mîr Miheme" dihê binavkirin. Careka din Mendelî dibe mîr û di rêya vegerê da Cihûwê Belek li gundê Qesirbelekê jî qesrekê çêdike.

Dema em bala xwe didine vê vegotinê em dibînin ku ev vegotin hem navê qesrekê hem navê gundekî vedibêje ku bi wê qesrê bi nav bûye. Çi navê qesrê çi navê gundî, ji alîyê toponîmîyê ve dibe mînaka oykonîman ku li ser navê meskenan disekine. Lê heke mirov wek navê gundî bixwe binirxîne wê demê dibe komonîm ku ew jî dîsa cureyekî oykonîman e. Ji alîyê navlêkirinê ve jî zîncîrek heye ku qesir navê xwe ji hostayê xwe anku kesekî û gund jî navê xwe ji qesrê werdigire.

Heke çêkirî be jî mirov dikare bêje ev vegotin li ser hebûna vê qesrê hatîye afirandin lewra şûn be jî bi awayekî şênber cihek heye. Yanî ne ku vegotinek jixwe heye û piştra ew cih li gorî vê vegotinê bi nav bûye; cihek heye û vegotinek li ser hatîye honan. Jixwe ne pêkan e vebêjer şadihê van bûyeran be lê wî ji pêşîyên xwe wergirtîye û neqil dike û rasterast wek "serhatî" bi nav dike. Ev jî dihê wê wateyê ku jê ne piştrast be jî di hişê xwe da wek rastîyan bi cih kirîye û wisa qebûl dike. Her wiha di kêlîya neqilkirinê da jî ev yek daye hîskirin. Lê divê neyê jibîrkirin ku bêjeya serhatî (serpêhatî) ji bo vebêjer û lîteratûrê ne heman tiştî îfade dike. Lewra li gorî destnîşankirina Necat Keskin ev nav ji bo çîrok û memoratan jî dihê bikarînan (Keskin, 2019, r. 204-205). Memorat tecrûbeyên şexsî bin û ji wan were bawerkirin jî çîrok çêkirî ne û ji bo wan cîdîyetek nayê nîşandan. Ji alîyê din ve lehengên çîrokan ajal û heyberên derasayî ne û ne girêdayî dem û mekanekî ne. Lê di vê vegotinê da leheng kesên rasteqîn in; dem xumam be jî mekan dîyar in.

Encam:

Navê her cihekî di bin sîwana şaxa eleqedar a toponîmîyê da dihê senifandin lê li ser van şaxan û çarçoveya wan konsensusek di navbera toponîmîstan da pêk nehatîye. Hin caran toponîmîstan li ser dîyarkirina van şaxan hev rexne kirine hin caran jî bi berfirehkirin û kûrkirina lêkolînê, xebatên xwe revîze kirine. Li gorî fikrê me dîsa jî ev qad hê nekemilîye ku karibe bibe bersiveka têrker. Wek mînak gorodskoy horonîm ku cureyekî oronîman e û navên zîyaretan îfade dike lê şertê aîdbûna bajaran derdixe pêş. Weke ku di mînaka *Keçika Bikezî* da jî xuya dike, dibe ku zîyaretek bi tena serê xwe li cihekî be û ne aîdî bajar yan jî gundekî be. Lewma li gorî fikrê me divê ev şax werin zêdekirin yan jî çarçoveya wan bi awayekî zelaltir were berfirehkirin.

Heman problem ji bo cureyên vegotinên gelêrî jî derbasdar e. Di vê xebatê da me herî zêde di wê xalê da kêmanî hîs kir ku vêbêjer li gel hinek îstîsnayan ji hemû cureyên vegotinan ra "mesele" yan jî "çîrok" dibêjin. Helbet asayî ye ku navlêkirina sehayî û ya teorîk hev negirin lewra tiştekî ji rêzê ye ku haya vebêjeran ji teorîyê nebe. Li gorî çavdêrîyên xwe, di vê xalê da em dikarin bêjin heke vebêjer wan tiştên ku vedibêje ji rastîyê qebûl bike wek "mesele" û heke ne ji rastîyê qebûl bike jî wek "çîrok" bi nav dike û ev binavkirin jî têra xwe berbelav e.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Li gorî ku nav wateyê dide tiştan bêguman divê nav bixwe jî xwedîyê wateyekê be. Navlêkirin jî lêgerîna vê wateyê bixwe ye ku di çarçoveya disîplînekê da pêk dihê. Ev rê û rêçikên navlêkirinê ji bo gelek zanistên sosyo-çandî hem sehayekê vedikin hem daneyên girîng didin ku ev kevneşopî bixwe jî bi serê xwe çandek e. Çawa ku navlêkirina şexsan parelelî çand, bawerî, bîrdozî û nêrîtan e; navlêkirina cih û waran jî ji van lêgerînên mirov ne bêrî ye. Anku navê her cih û warekî jî ji bo şênîyên wî cihî (çi kevin çi nû) tiştekî/wateyekê îfade dike ku bi vî awayî aîdîyetek saz dibe. Ev wate carinan bi çend gotinan dihê îfadekirin carinan digihîje wê qebareyê ku vegotineka gelêrî jê derdikeve.

Navên cihan yan bi awayê xwezayî dibe ku li gorî taybetmendîyên cografîk e yan jî ji alîyên mirovan ve dihê danîn ku ew jî li gorî hin qaîdeyan e û xwe dispêrin sedemekê. Her çend bi halên xwe yên deformebûyî gelek caran tiştekî îfade nekin jî li gorî bawerîya me, navê her cihekî çavkanîyeka xwe heye. Ev çavkanî carinan şexsek û carinan jî rûdanek e ku di encamê da navê cihî derketîye holê. Helbet carinan cihî navê xwe ji şexsî wergirtîye, carinan jî şexs bi cihî bi nav bûye. Anku "kes" û "navên cihan" du têgeh in ku têkilîyeka bi vî awayî di navbera wan da heye: Ji navên kesan navên cihan; ji navên cihan navên kesan çêdibin.

Heman tişt ji bo rûdan/bûyerê jî derbasdar e ku encama wê dibe çavkanîya vegotineka gelêrî. Yan jixwe vegotineka gelêrî heye û cih û war li gorî wê navê xwe girtîye yan jî navê cih û warî heye û vegotineka gelêrî li ser vî navî hatîye afirandin. Her du îhtîmal jî heman tiştî didin: Navê cih û waran çawalêhato çênebûne, her yek xwe dispêre wate û sedemeka maqûl.

Çavkanî:

Albayrak, R., 2004. *Toponim Teknikleri ve Kafkasya-Borçalı Yer Adları.* Ankara: Berikan Yayınevi.

Anon., 2021. *rne.com.tr.* http://www.rne.com.tr/portreler/hatem-i-tai/

Başkan, Ö., 1971. Türkiye Köy Adları Üzerine Bir Deneme. *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Belleten,* rr. 237-251.

Cunbur, M., 1984. *Evliya Çelebi Seyahatnamesi'nde Yer Adları.* Ankara, Başbakanlık Basımevi, rr. 201-217.

Çelik, C., 2006. Kültürel Sembol Sistemi Olarak İsimler: İsim Sosyolojisine Giriş. *Çukurova Üniversitesi İlâhiyat Fakültesi Dergisi (Çukurova University Journal of Fakulty of Divinity),* 6(2), rr. 39-61.

Çelik, C., 2007. Bir Kimlik Beyanı Olarak İsimler: Kişi İsimlerine Sosyolojik Bir Bakış. *Sosyoloji Araştırmaları Dergisi/Journal of Sociological Research,* 10(2), rr. 5-21.

Dost, J., 2010. *Ehmedê Xanî Mem û Zîn Şîrove û Kurdîya Îro.* Stembol: Weşanên Avesta.

Emiroğlu, K. & Aydın, S., 2003. *Antropoloji Sözlüğü.* Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.

Eren, H., 2018. *Yer Adlarımızın Dili.* Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.

Gülensoy, T., 1998. Anadolu Yer Adlarına Genel Bir Bakış. Di nav da *Prof. Dr. Dursun Yıldırım Armağanı.* Ankara: Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi, rr. 41-48.

Keleş, D., 1996. *Türk Adbilimi Bibliyografyası.* Ankara: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.

Keskin, N., 2019. *Folklor û Edebîyata Gelêrî.* Stenbol: Avesta.

Kurt, Y., 2008. Diyarbekir Sancağı Yer Adları. Di nav da B. Yediyıldız & K. Tomenendal (ed.), *Osmanlı'dan Cumhuriyete Yer Adları-II.* Ankara: Diyarbakır Valiliği ve Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları, rr. 405-418.

Öçal, S., 2016. *Awayê Lêkirina Navan Li Herêma Dêrikê (Lêkolîneke Onomastîk-Sosyolojîk).* Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.

Örnek, S. V., 1975. Türk Folklorunda Ad Seçme ve Ad Koyma. *Boğaziçi Üniversitesi Halkbilim Yıllığı,* rr. 101-112.

Poyraz, H., 2004. Adlandırmanın Doğası Ve Adların Nesnesine Uygunluğu Ekseninde Doğalcılık-Uzlaşmacılık Tartışması. *Sakarya Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi,* Hejmar 7, rr. 226-242.

Sakaoğlu, S., 1984. *İnsan Adlarından Kaynaklanan Yer Adlarımız.* Ankara, Başbakanlık Basımevi, rr. 259-264.

Şahin, İ., 2011. Yeradıbilimi Araştırmalarında Mikrotoponiminin Yeri, Önemi ve Araştırma Yöntemi: Tırnak Köyü (İçel/Gülnar) Örneği. *Turkish Studies-International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume,* 6(1), rr. 1748-1770.

Şahin, İ., 2013. Türkiye Yeradbiliminde Terim Ve Tür Sınıflandırması Sorunları. *Avrasya Terim Dergisi,* 1(1), rr. 46-58.

Şahin, İ., 2015. *Bir Yerel Coğrafi Terim, Çok Sayıda Toponim: Türk Dili Coğrafyasında Eşme/Espe.* Saraybosna, Bilkent Üviversitesi/Serayevo Üniversitesi, rr. 184-187.

Şahin, İ., 2018. *Adbilim.* Çap 3. Ankara: Pegem Akademi.

Şahin, İ. & Köse, S., 2014. Karaburun Silikyeradlarında (Mikrotoponimisinde) Görülen Coğrafi Terimler. *Dil Araştırmaları,* Hejmar 14, rr. 171-187.

TDK, 2005. *Türkçe Sözlük.* Ankara: Türk Dil Kurumu.

Tülücü, S., 1997. Hâtim et-Tâî. *TDV İslam Ansiklopedisi,* Cild 16, rr. 472-473.

Yağmur, Ö., 2014. Höbek köyü Yer Adları Üzerine Bir İnceleme. *Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi,* 49(49), rr. 243-262.

Yavuz, S. & Şenel, M., 2013. Yer Adları (Toponim) Terimler Sözlüğü. *Turkish Studies-International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume,* Hejmar 8/8, rr. 2239-2254.

Yediyıldız, B., 1984. *Türkiye'de Yer Adı Verme Usulleri.* Ankara, Başbakanlık Basımevi, rr. 25-41.

Yusifov, Y. & Kerimov, S., 2017. *Toponiminin Esasları Üzerine Bir İnceleme.* Çap 2. Ankara: Asos Yayınları.

Kesên Çavkanî:

Hemed Sedîqê Seyd Tahir (40), Evdika, (2018).

Qudbedînê Emînê Hecî Tahir (39), Hezex, (2019).

Xelîlê Mexso (81), Delavê Qesrê, (2019).

Perawêz:

---

1 Mextel ew cih e ku kesek lê hatîye kuştin û êdî ew niqte bi wî kesî dihê binavkirin.

2

3 Ji ber ku ev kes li ser toponîmîya Azerbeycanê xebitînê wek mînak wê didin.

4 Navê vî kesî li vê herêmê wek Hêtim dihê bilevkirin lê di çavkanîyê nivîskî da wek Hatem derbas dibe. Îhtîmal e ku “Hêtim” awayê tewandî be lê êdî nav bi tena serê xwe jî bi vî awayî dihê bilêvkirin.

5 http://www.rne.com.tr/portreler/hatem-i-tai/ (Dîroka gihiştinê: 01/03/2021).

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Halk Toponimisi: Yer Adları ve Onlara İlişkin Sözlü Anlatımlar (İdil ve Nusaybin Yöreleri)

Özet:

Bu makalenin konusu, halk toponimisi olarak da anlandırılabilecek yer ve mekan adlarıyla ilişkili halk anlatılarıdır. Başka bir deyişle ilişkili bir halk anlatısı var olan yer ve mekan isimleri araştırılmıştır. Bu halk anlatıları; belirli bir bölgede, bir saha çalışması ve bilimsel yol ve yöntemler çerçevesinde derlenmiştir. Bu anlatılar sözlü edebiyatın örnekleri olduğundan birçok folklorik kod barındırırlar. Nitekim bu anlatılar yer ve mekan isimleri ile alakalı olduğundan, doğrudan toponimi bilimi ile de bağdaştırılırlar. Toponimi bilimin anlaşılması amacı ile bu çalışmada toponiminin dalları tanıtılacak ve bu dallar bir tablo yoluyla gösterilecektir.

Bu çalışmada sunulacak dört örnekten *Elo Dîno* örneği bir saray ismine ilişkin; *Keçika Bikezî* örneği tek mezarlı bi ziyaret ismine ilişkin; *Kelha Hêtim* örneği bir kale ismine ilişkin ve *Qesirbelek* örneği de bir köy ismine ilişkindir. İsim ya da isimlendirme şeklini anlatan her halk anlatısının sunumundan sonra bir analiz yapılacak ve bu şekilde bu sahadaki yer ve mekan isimlerinin veriliş şekli ve isimlendirmenin sözlü edebiyattaki rolü az çok anlaşılacaktır.

Anahtar Kelimeler: *Folklor, toponimi, yer ve mekan, isim, halk anlatıları*

Folk Toponyms: Place Names and Oral Narratives Regarding Them (Idil and Nusaybin Region)

Abstract:

This article will investigate folk narratives related to place names which can also be called folk toponyms. These folk narratives were compiled within the framework of a field study and scientific methods in a specific region. Since these narratives are examples of oral literature, they contain many folkloric codes. Since these narratives are related to the names of places, they are directly associated with the science of toponymy. In order to understand the science of toponymy, in this study, the branches of toponymy will be introduced and these branches will be shown through a table.

Of the four examples that will be presented in this study, the example of Elo Dino is about a palace name, the example of Keçika Bikezî is about a visitor name with one grave, the example of Kelha Hêtim is about a castle name, and the example of Qesirbelek is about a village name. An analysis will be made after the presentation of each folk narrative describing the name or the way of naming, and in this way, the way the place names are given in this field and the role of naming in oral literature will be understood.

Keywords: *Folklore, toponymy, place, name, folk narratives.*

Bingehên Hekîmtîyê di Çanda Kurmancî de

Ayhan YILDIZ
Mardin Artuklu Üni/Turkîya

PUXTE:

Hekîmtîya gel (bizîşkîya gelêrî) ji zemanê berê ve di nav civaka kurmancan de heye. Hin nexwşînên mîna navketin, şikestina hestîyan, bîrov, sorik, nezer (çavînokî), zerik û heloq ku di serdema me de tedawîya wan digel derfetên pêşketî jî zehmet e hekîmên gel wan tîmar dikin. Hekîmên gel bi giştî li gundan di mala xwe de ji bo tendirustîya civakê xizmet dikin. Digel kêmderfetîyan jî bi pisporîya xwe ya kevneşopî hîna jî dixebitin. Piranîya hekîmên gel ên kurmancî, bingeha pîşeya xwe ji ocaxên terîq û malê melayan werdigirin. Herçiqas gelek hekîmên derveyî ocaxan di warê tedawiya nexweşînên cîyawaz de pispor bin jî, piranîya hekîmên nexweşînên din, an ji malbateke melayan yaxud bi xwe ji kevneşopîya ocaxekê dihên. Heger hekîmek bi xwe ne ji malbateke xwedan ocax be jî, wî-wê bingeha hekîmtîya xwe bi awayê destûrdayînê ji kesekê/î hekîm wergirtîye. Ev hekîmên gel an bi destê xwe mirovên nexweş tedawî dikin an, dû û dermanan didin wan, an ji nexweşan re dermanan dibêjin an jî rêya tedawîyê nîşanî wan didin. Li cografyaya kurmancên Bakur kevneşopîya hekîmtîyê bingeha xwe ji kû wedigire, vê pîşeyê di nav gel de çawa dest pê kirîye, çawa cih girtîye û heta serdema me çawa hatîye helbet şayanê lêkolîneke berfireh e.

Di vê xebatê de şopa dîrokî ya hekîmtîya gel a kurmancî dê bihê gerandin. Hekîmên gel ên kurmancî û ocaxan wan, yên ku ji ocaxan destûr wergirtîye û yên ku bi derfetên xwe yên taybet ev pîşe bi dest xistine mijara vê lêkolînê ye.

Peyvên Serekî*:* *Dû û derman, hekîmtîya kurmancî, ocax, tendirustîya gelêrî*

Destpêk:

Hekîmtîya tradîsyonel di nav kurdan de hîna ji sedsala IX û X-an ve bi alimên îslamê ketîye rewacê. Ebû Henîfe Ahmed Dînawerî (m. 820-896) û Ebû Seîd Ubeydulla bin Cebraîl bin Ubeydullah bin Bextîşû (wf. 450/1058) ji wan alimên îlmê tibbê ne ku di serdema xwe de di biwarê tibbê de li welatê kurdan xebatên zanistî kirine. Bi taybetî di serdema dethilatdarîya Dewleta Merwanî de îlmê tibbê li cografyaya îslamê nav û deng daye. Herçiqas di serdema me de li nav kurdan ev şaxê tibbê lawaz ketibe jî, digel bêderfetîyan jî hîna hebûna xwe diparêze. Hekîmtîya gel a kevneşopîya kurmancî ku mijara vê lêkolînê ye, ji qedîmî zeman ve di nav gel de xwedan qedir û qîmet bûye. Herçiqas Mela Mehmûdê Bazidî (1797-1867) bi çavekî nebaş li çanda hekîmtîya kurmancî binihêre û gelê kurd tewanbar bike jî, hekîmên navdar di nav kurmancan de gihaştine û wan bi sedsalan gelek derdên mezin ên gelek nexweşan hêdî kirine. Lewre hêjayî mereqê ye ku mirov li alîyê wê yê dîrokî û serçavîya wê bikole.

Çawa ku lêkolîner amaje pê dikin ji bo her xebateke zanistî merhele hene. Pisporan lêkolîneke zanistî li ser şeş *merhele*yan nirxandîye (Erişti, 2013): *i)* pêjinkirina

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

zehmetîyê *ii)* pênasekirina zehmetîyê di nav problemê de *iii)* pêşnîyazkirina hîpotezan/ferezîyan ji bo çareserîya problemê *iv)* tesbîtkirina çavdêrîyê ji bo testkirina hîpotezan *v)* testkirina hîpotezan û *vi)* raporkirin. Gava vê xebatê ev mijar da ber xwe, dît ku piranîya hekîmên binavûdeng berî sî-çil salî rehmet kirîye û tu kesî şûna wan negirtîye. Lewre gelek pirsên lêkolînê bêbersiv man. Herçiqas di destpêkê de pêjna zehmetîyên xebatê hatibû kirin jî, bes piştî ku lêkolînê berê xwe da war û qada xebatê, *zehmet*îyê hîn zêdetir xwe nîşan da.

Lêkolînerek gava nîyet bike ku dest bi xebata lêkolîneke zanistî bike, serê ewil divê "pirs"ekê destnîşan bike. Di pey dîyarkirina vê pirsê de êdî koşiş û têkoşîna wî/wê her ew e ku ji bo bersivandina vê pirsê bixebite. Lewre gava xwendekarekî/e serlîsansê, çi master be, çi jî doktora be, îlhez divê ji bo tezê xwe pirseke lêkolînê ku karibe ji bin barê bersivandina wê derkeve ji xwe re tesbît bike. Çawa ku pispor di vê biwarê de balê dikêşin ser hewila lêkolîner, divê ku ew bi xwe li "pirsa lêkolînê" *bigere*, wê bibîne û tesbît bike. Çunkî lêkolîn, bi *pirs*ê dest pê dike (Tayşir, 2020). Di wextê pêvajoya vê lêkolînê de hat dîtin ku xebatên li ser esil û bingeha raborî ya dermandêrîya kurmancî û hekîmtîya gel a kevneşopî xebatên berbiçav û sîstematîk ên bi kurdî kêm in. Ji ber ku ji nîvê dawî yê sedsala bîstan pê ve karîgerîya dermandêrî û hekîmtîya gel di çanda kurmancan de bi taybetî li Bakur her ku dem pê dikeve lawaz dibe, êdî derfetên lêkolînên li ser vê qadê her ku diçe zehmet dibe.

Bi qasî ku mirov ji rewşa li ber çavan tê digihîje ev per û baskên çanda gel gava bişkên, -bi rastî têra xwe lawaz ketine- dê ji bo reng û rûyê zimanê kurdî û çanda wî bibe sedemê wendahîyeke dramî. Digel vê dê realîteya hekîmtîya kurmancî di nav hekîmtîyên gel ên neteweyên dunyayê de ji navê rabe. Jixwe li Bakur lêkolînên zanistî ku heqqê hekîmtîya kurmancî bi temamî bide kêm in. Hin xebatên ku li ser vê hekîmtîyê hatine kirin jî, bi zimanê xeyrî kurmancî ne. Ji ber ku ew jî wekî rengekî geş ê çanda mirovahîyê ye, bivê nevê xemxurên vê çandê dê ji dewlemendîya wê mehrûm bimînin. Lewre ev wekî pirsgirêkeke gewre mirovan dide *ponijandin*. Li ser vê bingehê di destpêka vê xebatê de ev pirsa bû cîyê halanê:

"Gelo bingehên hekîmtî û dermandarîyê di çanda kurmancan de ji kû dihên?"

Bi vê pirsa eslî ya lêkolînê ve peywendîdar çend pirsên din jî dikevin bin banê xebatê: "Gelo hekîmtî û dermandarîya gelêrî ya kurmancan bi rastî jî di nav dermandarî û hekîmtîya gelêrî ya tradîsyonel a gelên dinyayê de heye? Heger hekîmtîya kurmancî ya gelêrî hebe, ji kû, bi çi, bi kê û kengê dest pê dike? Gelo hekîmên gel ên kurmancî, bi temamî ji dergayên tesewwufê derketine? Ma melayên medreseyên kurdan jî hekîmtîya kevneşopî dikin? Ji bilî şêx û melayan kesên din ku hekîmtîya gelêrî dikin di nav çanda kurdan de hene gelo? Rewşa hekîmtî û dermandarîya kurmancî li Bakur di nav çanda gel de çawa ye? Wekî şaxekî gelnasîyê (folklor) hekîmtîya kurmancî bi çand û zimanê kurdî re çiqas têkildar e? Gelo derfetên parastina çanda hekîmtîyê di nav kurmancên Bakur de hene, yan na?

Digel ku piranîya neteweyên dinyayê ji sala 1970 ku World Health Organization WHO [Rêxistina Tenduristîya Cîhanê RTC] balê kêşa ser Tibba Tradisyonel, li ser hekîmtîyên xwe yên gelêrî dest bi xebatê kirine jî, heta niha xebateke baş ku heqqê tam ê hekîmtî û dermadêrîya kurmancî bide, bi kêrî parastina hekîmtîya kurdan bihê û têra bipêşvebirina wê bike, li Bakur ku bala mirovan nakêşe hatîye kirin gelo? Mîna nirxên din, çanda hekîmtîya gel a kurdî jî li cihanê bê pişt û al maye gelo?

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەكولینێن كوردى

Ev pirsên jorîn çawa ku ji bo çanda giştî temamê gelê kurd girîng in, bivê nevê bersiva wan jî girîng e û heger mirov bi çavekî înternasyonal lê mêze bike, bi hêsanî dibîne ku ji bo çanda tenduristî ya hemû mirovahîyê jî girîng e. Jixwe Lewre hêja bû ku lêkolîneke zanistî ya qadî li serê bihata kirin û rêya çareserkirina arîşeyê bihata lêkolan. Ji bo ku reng û dewlemendîya hekîmtîya gel a kurmancî cîyê xwe yê layîq di nav dîroka hekîmtîyên gelên dunyayê de bibîne û bal û dêhna lêkolînerên vê qadê bikêşe ser xwe, bi vê lêkolînê hewl dihê dayîn ku esil û bingeha wê bihê dîyarkirin, halan bihê dayîn ku kes û sazîyên peywendîdar piştevanîya wê bikin û mîna yên gelên dunyayê hekîmtîya gel a kurmancî jî bi reng û rûyê xwe yê cîyawaz hebûna xwe berdewam bike.

Piştî ku lêkolîner problema lêkolîna xwe dîyar kir, êdî dorê diêne ser "metoda/rêbaza lêkolînê". Lewre divê ji bo lêkolîna xwe rêbazekê bineqîne. Ev rêbaz jî, li gor pisporên qadê (Şenol, 2012) du ne: Metoda *îstiqra'/berbigiştîve* (tr: tümevarım; ing: induction) û metoda *îstidlalê/jigiştîve*[1] (tr: tümdengelim; ing: deduction) ye. Bi *rêbaza/metoda îstiqraê/induction*ê lêkolîner, teorîyekê saz dike; bi *rêbaza/metoda îstidlalê/deduction*ê rastî-nerastîya teorîyeke heyî diceribîne. Heger lêkolîner li ser problemeke ku çareserîya wê nizane lêkolîn bike, *metoda îstiqraê/induction*ê bi kar diêne. Çunkî lêkolîner, di metoda îstiqraê/inductionê de, li bersiva van pirsan digere: 1) Çima?, 2) Li kû?, 3) Ber bi kê derê ve?, 4) Kîjan? û 5) Kî?; îca di metoda *îstidlalê*/deductionê de lêkolîner li bersiva van pirsan digere: 1) Gelo pêkan e? û 2) Gelo bi rastî jî wisa ye? Di vê lêkolînê de xebat li ser bingeha metoda *îstidlalê*/deductionê dê bihê kirin.

Metodên danhevîya daneyan, **v**edîtin, analîza daneyan ku ji bo çareserkirina problemê hatine kirin û şiroveya van di lêkolînê de, hemû li gor rastîya metoda danhevîya daneyan qîmet werdigire. Gava metoda lêkolînê rast be, bawerîya bi encamên lêkolînê de jî zêdetir dibe (Bakioğlu & Kurnaz, 2014). Di destpêka pêvajoya lêkolînê de piştî dîyarkirina pirsan û problemîzekirina mijarê, vê xebatê hîpotezek danîye ber xwe. Li gor pêşpejn û texmînê, di encamê de, ji bo ku rastî yaxud xeletîya hîpotezê derkeve holê, helbet dê hêmanên lêkolînên bihên ceribandin. Li gor daraza a niha, rêya çareserîyeke rast a problema vê lêkolînê, bendewarî heye ku bi çavdêrîya ku li ser daneyên unîversaya qadê bihên berhevkirin derkeve. Lewre hîpoteza lêkolînê ev e: "Heger çend lêkolîner lêkolînên zanistî li ser hekîmtîya gel a kurmancî bikin, dîrok, rewş û rasteqînîya wê dîyar bikin, dam û dezgayên peywendîdar piştevanîya parastin û bipêşvebirina wê bikin, dê ji mirinê xelas bibe û di nav hekîmtîyên gelên dinyayê de cîyê xwe yê rengîn bigire."

Ev lêkolîn bi vê ferzkirin û pêşpejnîyê derdikeve qada lêkolînê û li ser daneyên unîversayê çavdêrîyê dike. Li vir wekî encameke demdemî ev lêkolîn dîyar dike ku "çanda hekîmtîya gel a kurmancan, bi tevî ku ji hekîmtîya sofîyên teswwufê û melayên medreseyan ku kana wan Tibba Nebewî ye mifa wergirtîye, ji kana kevneşopîya xwe ya "teqlîdî" ketîye nav geşedan û peresanê; lêbelê îro ji ber bêderfetîyan ketîye nav mirin jînê." Di pey vê pêşpejn û pêşbînîyê, dîsa dê di pêvajoya lêkolînê de li ser unîversayê çavdêrî bihê kirin û dê ji daneyên ku li qadê bihên bidestxistin, ev daraz bihê testkirin.

Ji bo ku lêkolîner pirsa lêkolînê ji xwe re peyde bike, helbet serê ewil divê serî lîteratura qadê bide û divê xebatên qada xwe ji serî heta dawî *bixwîn*e. Bi xêra vê xwendinê, ew hem dê hînî awayê lêkolînê bibe hem jî bi awayekî ji awayan dê bikeve nav jimnastîkeke bîr û hizirî. Çunkî zanist ku heye bi rêya tecrubeyan gihaştîye vê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

merheleyê û zaneran ji qedîmî zeman ve bi rêya *xwendina lîteratura qada* xwe pirsên lêkolînê tesbît kirine û peyre wan dest bi lêkolînên nû kirine. Lêkolerên nû, piştî vê xwendinê dê hêz û baldarîya xwe nas bikin, meraqa xwe teşxîs bikin, dê tê bigihîjin bê ka bi rastî ew dixwazin li ser çi bixebitin û êdî dê karibin *gavekî rast* ji bo dîtina pirsa lêkolînê bavêjin (Tayşir, 2020). Ji bo vê lêkolînê jî li ser mijarê serê ewil me berê bal û dêhna xwe da ser xebatên ku berê hatine kirin.

Gava mirov li lîteratura qadî ya hekîmtîya kurmancî digere di van biwaran de basa wan derdikeve pêşber. Di serî de mirov dibîne ku ji pirtûkên dîroka felsefefeyê, edebîyata nivîskî ya îslamî-tesewwufî heta metnên edebî û xebatên li ser folklora kurmancî ku di kovaran de hatine weşandin basa çanda hekîmtîya gel a kurmancî kirine. Ji berhemên edebîyata devkî ya gel çîrok/xeberoşk û kilam jî basa hekîmtîyê dikin. Ji bilî van di unîversaya lêkolînê de melayên medreseyê, sofîyên tesewwufê, seyyîd û hekîmên ku li heyatê ne û ew kesên ku li ber destê hekîman ji nexweşînên xwe rehet bûne hene. Ji bo tesbîtkirina bingehên hekîmtîya kurmancî dê ji van çavkanîyan sûd bihê wergirtin.

Li dinyayê lêkolînerên florayê gava basa navên nebat û riwekan ser rûyê erdê dikin, navên hinek ji wan bi nisbeta kurd, bajarên wan û welatê wan Kurdistanê dikin (Dirîhî, 2013). Wekî mînak mirov dikare çend navên ku lid dinyayê dihên naskirin bide: amygdalus carduchorum (behîva/vama kurdan), alcea kurdica (hîroya kurda) paeonia mascula ssp. kurdistanica (gulhirça/heşvila kurdsitan). Bi qasî ku em ji daneyên a niha û çavkanîyên nivîskî tê digihîjin hekîmtîya kurmancî di nav kurdên Bakur de ji sedsala IX û X-an ve bi alimên îslamê ketîye nav geşedanê. Berî wan hekîmên teqlîdî ku derî dergayên tesewwufê û melayên medreseyan bi dermandêrî û tedawîya nexweşan re mijûl bûbin hebin jî, a niha agadarîyek bi dest neketîye. Ebû Henîfe Ahmed Dînawerî (m. 820-896) li ser floraya cografyaya kurdan xebitîye û wî pirtûkeke bi navê *Kitabu'n-Nebat* ku ji şeş cildan pêk dihê nivîsîye. Wî di vê xebata xwe de riwek ji hêla morfolojîk ve polîn kirine û pê re jî morfolojîya axê, hidrolojîya wê û madenan vekolaye (Izady, 2004). Alimekî din ê Dînawerê Ahmed b. Muhammed ed-Dînawerî (wf. 363/973) ye ku kitêbeke tibbê bi navê *et-Tibbu'n-Nebewî* nivîsîye (Karataş, 2019).

Di serdema Dewleta Merwanî (sedsala 10 û 11) de alimên herêmê bi awayekî hûr û kûr li ser îlmê tibbê xebitîne û wan hîna ji wê hingê ve cîyekî gewre daye lêkolînên têkildarî tenduristîyê. Ji malbata Bextîşûyan Ebû Seîd Ubeydullah bin Cebraîl bin Ubeydullah bin Bextîşû (wf. 450/1058) yek ji wan alimên îlmê tibbê ye ku li payîtexta Deleta Merwanî Meyafariqînê jîyaye[2] û wê hingê di biwarê tibbê de li piranîya cografyaya îslamê nav û dengê wî belav bûye. Bextîşû dostê hekîmê navdar Îbn Butlan (wf. 458/1066) e û wî û Îbn Ridwanê Qahireyî ji hev û din re name şandine. Wî berhemên bi navê *Kitabu Menaqibi'l-Etibba, Kitabu'rRewzati't-Tibbîyye, Kitabu't-Tewasul ila Hifzi't-Tenasul, Risaletun fî Beyani Wucûbi Hereketi'n-Nefs, Kitabu Newadiri'l-Mesalil Muqtezibeten min Îlmi'l-Ewail fi't-Tibb, Kitabu Tebîetu'l-Heyewan we Xewassuha we Menafi Azaiha, Tefsîru li Kitabi Tehrîmi Defnı'l-Ehya li Calînûs, Kitabu fî't-Tibbi'l-Exlaq* û *fî Wucûbi'n-Nezer 'ele't-Tebîb fî'l-Ehdasi'n-Nefsanîyye we fî Kewni'l-Işqi Merezen* (*Risletu'n fî't-Tibb we'l-Ehdasi'n-Nefsanîyye*) li ser îlmê tibbê nivîsîne. Kitêba wî ya bi navê *er-Rewzetu't-Tibbîyye* di sala 1927an de li Qahîreyê hatîye çapkirin û Abdulkadir Coşkun berhema wî ya bi navê *fî Wucûbi'n-Nezer 'ele't-Tebîb fî'l-Ehdasi'n-*

Nefsanîyye we fî Kewni'l-Işqi Merezen wergeraye zimanê tirkî û digel metnên wê yê erebî di sala 2014an de li Stenbolê çap kirîye.

Mela Mamûdê Bazidî (1797-1867) di xebata xwe ya bi navê *Adat û Rusûmatnameê Ekradîyye* de cih daye çanda dermandêrî û nexweşîyan. Li gor wî kurd ji hekîman zêdetir bawerî bi berbejinên (nivişt) şêxan diênin.[3] R. P. Giuseppe Campanile di xebata xwe ya *Storia Della Regione del Kurdistan* de wekî hekîmekî misyoner ê hawarî di salên 1800î de çûye li nav mîrektîyên kurdan gerîyaye û ji ber ku mîrekî kurd hekîmekî napolî yê bi navê Vincenet Ruvo di sala 1785an de kuştîye, êdî bi rik û girr û kîneke ecêb û bi zimenkî tûj û tund basa xwe û hekîmtîya xwe û kurdan dike.[4]

Melayê Erwasî ku di dawîya sedsala XVII-an de pirtûkeke bi navê *Tibba Erwasî* amade kirîye, wekî hekîmekî sofî ku ji çanda tesewwufê dihê, cîyê herî girîng di lîteratura qadî ya hekîmtîya kurmancî ya nivîskî de girtîye. Wî pirtûka xwe li ser bingeha *Tibba Calînos*[5] amade kirîye. Erwasî bi gotina Calînos dest pê dike û piştî ku elametên nexweşîyan rêz dike, îca dermanên wan dîyar dike.

Andranîk di salên 1888an de li herêma Dêrsimê gerîyaye û gera xwe wekî gername bi zimanê ermenî nivîsîye. Têmûrê Xelîl ev berhem wergeraye kurmancî û bi navê *Dêrsim Rêwîtî û Erdnîgarî* çap kirîye (Andranîk, 2009). Wî di vê gernameya xwe de cih daye hin gîyayên herêmê ku ji kîjan nexweşînan re baş in. İ. A. Orbeli di xebata xwe ya *Li Muksê Folklor û Jîyana Rojane* de cih daye tenduristîya gelêrî (Orbelî, 2011) ya gelê herêmê. Ew di salên 1911an de hatîye Muksê, li nav gelê ermen û kurmanc gerîyaye û wî çanda wan a gelêrî nivîsîye.

Dr. Ehmed Nafiz (1932) di sernivîsa xwe ya bi navê "Nexweşî û Dermanqirin" di bin banê Quncika Bijisqî ya kovara *Hawar*ê hejmara 3yem de basa nexweşîna tayê û dermankirina wê dike. Cîyê xebînetê ye ku ji vê hejmara bi şûn ve êdî ev quncikê doxtor hatîye girtin. Dengbêj Şeroyê Biro (1888-1970) di kilama xwe ya bi navê *Hekîmo* de ji devê pîrekekê hin dermanên kurmancî dibêje.[6] Sedîq Sefîzade Borekeyî (1982) pirtûkeke bi navê *Tebbê Sunnatî der Miyanê Kordha* amade kirîye û li Tehranê çap kirîye (Yıldırım, et al., 2013).

Mela Ebdulletîfê Berwarî kitêbeke bi navê *Muntexebatu Kutubi'l-E'lam li Şiafi'l-Alam we'l-Esqam* di sala 1980an de ji zimanê erebî wergeraye kurmancî, navê *Dermanê Derda* lê danîye û Hanifi Taşkın li ser çapkirina wê dixebite. Mela Ebdulletîfê Berwarî bi navê *Tibba Kurdî* xebetake din jî amade kirîye (Berwarî, 2020) û hîna wekî destxet li mala wî ye. M. Reşîd Irgat (2000) *Tibba Erwasî* ji destxetan transkrîpeyî tîpên latînî kirîye, navê *Dermanên Bijîşkîya Gelêrî* lê danîye û digel pêşgotinekê di nav Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de çap kirîye.

Buwar Nureddîn (2004) bi navê *Bîblîyografîyay Kitêbî Folklorî Kurdî (1860-2004)* xebatek amade kirîye û tê de cih daye nasnameya 10 berhemên li ser gîya, nebat, riwek, pizîşkîya millî ya kurdî, dermanxaney siruştî û dermangerîya kurdî bi ferheng û vegotinê derbirîye.

Xalidê Hekarî (2006) bi navê *Ji Dermanxaneya Siruştî Zerzxewatên Şîfadar* xebatek çap kir ku di biwarê xwe de li Bakur wekî xebata yekem cih girt. Mümine Kalındemirtaş (2010) ku kedkareke tibba modern e, li ser hekîmtîya gel a gundekî Semsûrê teza masterê bi zimanê tirkî bi navê *Geleneksel Tıbbın Halk Üzerindeki Etkisi: Adıyaman İli Ören Köyü Örneği* [Karîgerîya Tibba Kevneşopî li Ser Gel: Mînaka Gundê Parêzgaya Semsûrê Orenê] amade kirîye û pêşkêşî Zanîngeha Sakaryayê kirîye. Oren li

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

ser Besnîyê ye. Ew li gor beşa makezanista sosyolojîyê ji hêla komelnasîyê ve li ser hekîmtîya gel xebitîye.

Ahmet Kasimoğlu (2013) ji serê salên 2000î dest bi xebatên floraya welatê kurmanc û kirmancan kirîye, bi lêkolînên xwe beşdarî xebatên têkildarî flora kurdî ku lêkolînerên kurmanc û kirmanc (zaza) li Bakur, Başûr û Ewrûpayê pêk anîne bûye. Wî di semîner, kombûn, sempozyûman de lêkolînên xwe yên li ser navên nebatên kurmancî û kirmancî pêşkêş kirine û gotarên xwe di kovara *Kurmancî, Vate* û rojnameya *Newepel* de weşandine.[7] Wî peyre ferhengeke mezin a riwek û gîyayan bi kurmancî-kirmancî-latînî-tirkî, bi navê *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî* amade kirîye û daye çapkirin. Li Bakur heta niha xebateke bi vê ebad û qewareyê nehatibû kirin. Wî pêşgotineke mezin jî bi xebata xwe ve kirîye.

Abdilwehab Hajî Mahmoud (2013) bi xebata xwe ya *Zanistîya Tenduristîya Gel* cîyekî nû di lîteratura hekîmtîyê gel a Bakur de dagirt. Ev jî di qada xwe de lêkolîneke tekane ye. Wî di vê xebatê de navên nexweşînan bi kurmancî vegotine. Mehmet Fırat (2013) xebateke bi navê *Ferhenga Navên Riwekan Bi Kurdî* da çapkirin. Wî di vê xebata xwe de cih daye navên riwekên herêma Serhed û herêmên din ên Bakur û li pêşberî zimanê latîn û tirkî, navên riwekan bi kurmancî daye. Yildirim, Pertev û Aslan (2013) di nav zanyarîyên gelêrî de bi navê nexweşî û bijîjkîya gelêrî cih daye hekîmtîya gel. Kadri Yıldırım (2013) *Tibba Erwasî* ji destxetan transkîrîpeyî latînîya kurdî kirîye, navê *Ji Sedsala 18. Pirtûkeke Kurdî ya Bijîşkîya Gelêrî Tiba Melayê Erwasî* lê danîye û digel wergera wê ya tirkî û dahûrîna wê çap kirîye. Zeynelabidîn Zinar (2016) bi sernavê “Hekîmê Kurmancî, Dermanê Kurmancî”, basa çanda hekîmtîya kurmancî kirîye û di malpera *Ria Taza* de weşandîye.[8]

Hekîmtîya kurmancî di çîrokeke gel a bi navê *Çîroka Stenbolê Darê Çam e* (2019) de bi navê dermanê nojdarê bi tevî çanda hekîmekî û destmiza wî derbas dibe.[9] Di çîroka bi navê *Meryemnîgarê* (2019) de gava lawikek nexweş dikeve û derdê xwe ji dêya xwe re dibêje, dêya wî digel kurê xwe ji bo çareserîya derdê xwe berê xwe dide mala melê.[10]

Nîhat Oner (2019) di xebata xwe ya *Ji Binbîra Kurdan Bawerîyên Gelêrî* de cih daye bawerîyên têkildarî nexweşî û dermanan.[11] İbrahim Halil Köprüdüz (2019) li ser tetbîqên hekîmtîya gel a navçeya Siwêrekê tezeke masterê bi zimanê tirkî amade kirîye û ji beşa xwe ya Makezanista Ziman û Edebîyata Tirkî bi navê *Siverek Halk Hekimliği Uygulamaları* [Tetbîqên Hekîmtîya Gel a Siwêrekê] pêşkêşî Çağ Üniversitesi kirîye. Wî di vê lêkolîna xwe de serî li 57 hekîmên Siwêrek û gundên dormedora wê daye û li ser cureyên nexweşîn û tedawîyên wan agadarî wergirtine û ew bi çanda hekîmtîya kevneşopî ya tirkî ve girê daye.

Tekin Çiftçi (2019) bi navê *Adıyaman ve Çevresinde Halk İnançları ve Halk Hekimliği [Bawerîyên Gel û Dermanê Kurmancî li Herêma Semsûrê]* tezeke masterê amade kirîye û pêşkêşî Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı kirîye. Xebata wî li Tirkîyeyê ya ewil e ku rasterast li ser bingeha rasteqînî ya hekîmtîya kurmancî ye. Çiftçi di xebata xwe de navên têgehên têkildarî hekîmtîya kurmancî digel nexewşînên gel rave kirine û peyre bi taybetî li ser çanda dermandarîya herêma Semsûrê kûr bûye.

Cihan Varli (2020) tezeke lîsansê li ser hekîmên derdora Şirnexê amade kir û pêşkêşî Zanînngeha Mardîn Arukluyê kir. Teza wî di qada xwe de yekem bû ku bi kurmancî hatibû amadekirin.

Tixûbê unîversaya vê lêkolînê çawa ku ji kurmancîaxivan bi kurmancên Bakur re sînorkirî ye û hekîmên kurmanc ên Rojhilat, Başûr û Binxetê li derveyê wê hatine hiştin, ew xebatên hekîmtîya gelêrî ku di nav kurmancên Sovyeta Berê de heye jî ne di nav çarçêweya wê de ye. Ji ber ku derfetên çûyîna her alîyê herêmên Bakur jî kêm bûn û mesrefa wê giran bû, hevdîtina bi hemû hekîmên hemû deverên vê herêmê re jî ji dest nehat; lewre herêma Semsûr, Meletî, Serhed û Colemêrgê jî li derveyî xebatê hat hiştin.

Di pey xwendin û nirxandina lîteratura qadî ya vê lêkolînê de beşa ewil a lêkolînê dê bi giştî mijar bibe têgeh û dîroka hekîmtîya gel. Peyre dê bi giranî basa hekîmên kurmanc ên li Bakur bihê kirin û analîza taybetmendîyên çavkanîyên wan bihê kirin. Li gor derfetan dê ji çavkanîyên ku di lîteraturê de cih girtine mifa bihê wergirtin û ji hekîmên ku li heyatê ne beresiva hin *pirs*ên ku di vê qadê de lêkolîner (Ekici, 2018) ji wan dikin bihê wergirtin (Yıldırım, et al., 2013): 1) Ji kê hînî karûbarên tedawîyê bûyî? 2) Di çend salîya xwe de hînî vî karî bûy? 3) Hosteyê te li heyatê ye? 4) Ji ber karê te xelk tu navekî hekîmtîyê, mîna cebirvanê hestîyan, zerikbir, hekîmê nezerê li te danîye gelo? 5) Kitêbek, defterek yaxud kitêbeke duayan ku di tedawîyê de bi kar diênî heye? 6) Nexweşên ku dihên cem te li kê derê tedawî dikî? 7) Ocax çi ye û ocaxa te heye? 8) Destwergirtin çi ye, te dest ji kê wergirtîye? 9) Ev destpêdayîn bi çi awayî ye? 10) Kî dikare dest bide? 11) Tu dikarî dest bidî kesî? 12) Yekî/e ku ji hinekan dest wergirtibe yaxud xwedan ocax e, tenê yek nexweşîyekê tedawî dike yan zêdetir? 13) Kîjan nexweşînan tedawî dikî? 14) Di tedawîyê de çi bi kar diênî? 15) Dermanên xwe tu amade dikî? 16) Dermanên xwe çawa peyde dikî? 16) Destmiza xwe digirî? 17) Di ber hekîmtîyê de karekî din dikî? 18) Ji bo teşxîsa nexweşînan kîjan navgîn, alav û amûran bi kar diênî? 19) Çi cure tedawîyên dînî hene? 20) Tîmarkirin û girêdana hestîyên jicihderketî, derizî yaxud şikestî çawa ye? 21) Digel dermanên kurmancî, dermanên modern jî bi kar diênî? 22) Hekîmên karê dransazîyê hene gelo? 23) Sunnetçî di çi rewşê de ne? 24) Peywendîya te digel hekîmên din ên nav gel çawa ye? û mîna van. Bi tevî hekîman pirsên di dirûvê van de ji gel jî hatin kirin.

1. Têgehên Têkildarî Hekîmtîyê

Ji ber ku bêjeya *hekîmtî*yê ji hêla teşeyî ve bi bêjeya *hekîm* re peywendîdar e pêşî li vir dê cih ji pênaseya wê re bihê dayîn û peyre dê pênaseya têgehî ya hekîmtîyê bihê kirin.

1.1. Hekîm

Têgeha hekîm, wekî bêje bi eslê xwe ji zimanê erebî الحكيم hatîye ketîye zimanên din ên mîna farisî, tirkî û erebî. Ev bêje, bi zanista felsefeyê re wekî têgeheke ramanî ketîye ferhengan. Dîroknûsên felsefeyê radigihînin ku têgeha hekîm ji ber têgeha zimanê grekî **sophos** derketîye meydanê. Heta serdema Physagor, Braklos, Bizograstos û hinekên din bêjeya *felsefe*yê li ser zar û zimanê zanayan bûye. Bêjeya felsefe, ji alîyê binyada xwe ya morfolojîk ve bêjeyeke pevedudanî ye û ji bêjeya **philo** (hezkirin) û **sophia** (hikmet)ê pêk hatîye. Îca bêjeya **philosophia**, di sedsalên ewil de li cem grekîyan tunebûye. Cara ewil Herodoth di pirtûka xwe de bêjeya **fîlozof** bi kar anîye. Phisagoras gotîye ku "Ji bilî Xwedê kes ne sofos (hekîm) e; mirov tenê dikare bibe

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

fîlozof." Praklîsî jî piştevanîya wî kirîye û gotîye: "Em tenê erbabê aqil û wêrekîyê ne (Merheba, 1993/1414)." Li gor Îbnu'l-Erebî (wf.638/1240) sûfî hekîm e û hekîm ew kes e ku zanistên îlahî, tebiî, rîyazî û mentiqî di xwe de dihewîne (Küçük, 2018).

1.2. Raborîya Wateyî ya Têgeha Hekîm

Bi destpêka şaristanîyê re û piştî geşedana wê, zanyaran hewl daye ku pênaseyeke zelal ji bo têgeha fîlozof (philosophia) dîyar bikin. Li gor pênaseya alim û zanayên berê fîlozof ew kes in ku ketine nav kûrahîya felsefeyê, lewre wan navê **sophos** ango hekîm الحكيم li fîlozofan datanî. Zemanê ku Physagoras (B.Z. 497-572) hat, wî bêjeya "sofos" (hekîm) qebûl nekir û xwe wekî "feylesof" ango "hezkirîyê hikmetê" da naskirin. Li gor bîr û raya wî sifeta *hekîm*tîyê tenê xasî bi Xwedê ye. Peyre Sokrates (B.Z. 399-468) jî da ser şopa wî û got ku "Ez navê sofos û hekîmtîyê ji bo xwe qebûl nakim, çunkî ji bilî Xwedayê tek, nabe ku ev navê mezin li tu kesekî din bihê danîn. Lewre ez tenê xwe wekî hezkirîyê hikmetê ango feylesof dihesibînim (Mesûd, 1999). Di serdema antîk de ji bo fîlozofan hekîm (**sofos**) dihat gotin. Bêjeya hekîm dihat wateya kesê ku xwedan hikmet e û bi hemû zanistan dizane. Piştre wan fam kir ku ev sifet ji bo mirovan ne mumkun e, lewre wan êdî ev têgeha sofos (hakim/hekîm) ji bo xwe bi kar neanî; li şûna wê, wan dest bi bikaranîna têgeha feylesof (fîlozof) kir. Îca alimên îslamê ev têgeha feylesof û hekîm digel hev bi kar anî. Li gor wan jî bêjeya feylesof û hekîm di heman wateyê de ne. Wateya bêjeya hekîm, ji ya bêjeya fîlozof berfirehtir û kûrtir e. Digel ku her hekîm fîlozof e, her fîlozof ne hekîm e. Çunkî hekîm ew kes e ku bûye mezherê zanîna îlahî. Lewre ji ber ku Xwedê hikmet daye Hz. Luqman, di Qur'anê de jê re Luqman hekîm hatîye gotin (Bayrakdar, 2013).

Bêjeya felsefe û hikmetê, heta sedsala 17an ji bo zanîn lêkolînên aqlî yên li ser hebûna tişt û rûdanan dihat bikaranîn. Lewre fîlozofên edîb û fîlozofên alim ku xwedan hizir, raman, bîr û rayên cuda bûn di manaşa zanistî de cih digirtin. Ji sedsala 17an bi şûn ve tevlîhevîyeke fikrî ya dijberî dîn di vê biwarê de derket. Bi taybetî nivîskarên tebîetperest ên mîna Volter (1694-1778), Russo (1712-1778) û Dîdero (1713-1784) li dijberî dîn derketin wan mewqifeke cîya da ramangirên dînî. Li gor doza wan mirov dikare bi hukmê aqilê xwe hukum li tebîetê bike. Di pey vê rûdanê de di serdema me de hin derdor, navê fîlozof (feylesof) tenê li wan kesên ku înkara dîn dikin, xwe ji emr û nehîyên dîn azade dihesibînin dikin; çi heye ku ev xeta ye. Çunkî ne lazim e ku fîlozofek mandelkarê dîn be yaxud kafir be (Mesûd, 1999).

2. Tebîb û Fîlozof

Fîlzofê tebîb/hekîm Îbn Hindû (wf.423/1032) raya Galen a "Her tebîb di heman wextê de divê fîlozof be jî." nîqaş dike û dîyar dike ku felsefe, jixwe ilimê tibbê jî di bin banê xwe de dihewîne, lewre cîyê ku her tebîbek di heman wextê de bibe fîlozof, her fîlozof tebîb be çêtir e. Çunkî hewce nake tebîb bi metafizîkê re mijûl bibe, li şûna wî, pêdivîya hekîman bi ilmê mentiq û exlaqê zêdetir heye (Bahtişû, 2014).

3. Tibb

Li gor ferhenga erebî bêjeya tibbê, (الطب) dihê wateya dermankirin û tîmakirina nexweşînan (Huseyn, 2013/1424). Bêjeya tibbê di zimanê erebî de bi wateya *rifq*ê, ango nermîyê jî dihê zanîn. Digel vê bi wateya tîmarkirina nefs û bedenê, îslehkirin û mahirîyê jî dihê qebûlkirin. Li gor Îbn Sîna (h. 370-468)/(m. 980-1037) tibb, ew ilim e ku hal û rewşên bedena mirovan, ji hêla tiştên ku qewetê didin sihhetê û tiştên ku zerarê li

sihhetê dikin ve pê dihê naskirin û di encama vê naskirinê de sihheta mirovan pê dihê parastin (Sîna, 2014/1435).

Fîlozofên îslamê bi awayên curbicur ilmê tibbê pênase kirine û bi awayekî ku ji tesnîfa fîzozofên grek cîyawaz be di nav ilimên din de bi cih kirîye. Li gor nirxandina Gutas (2003) fîlozofên îslamê li ser çexera "mamosteyê ewil" Aristoteles çûne wan jî qebûl kirîye ku *felsefeya teorîk*, ji fîzîk (siruşt), metafizîk û matematîkê pêk dihê; *felsefeya pratîk* ji exlaq, birêvebirina malbatê û sîyasetê pêk dihê. Ji ber vê yekê fîlozofên îslamê ilmê tibbê daxilî nav felsefeyê nekirîye û ew wekî ilmekî serbixwe yê hunerî ku ji taybetmendîyên teorîk ên felsefeyê mifa werdigire li qelem daye (Bahtişû, 2014).

Li gor ku dîroknasê ilmê tibbê Îbn Ebî Useybi'e ji bîr û rayên hekîman neqil dike tibb ew cure ilimê bedenan e ku li kêleka ilimê dînan cih digire. Pêdivîya mirovan bi du tiştan heye: xêr û lezzet. Îca ev her du jî ji bo mirovan bi hebûna sihhetê tekûz dibin. Lezzet ku heye mirov li darê dinyayê jê tehm dibîne; lêbelê xêr, li dara axretê. Dîsa jî heta ku dewama sihhetê û bunyeya mirov tunebe, mirov nikare bigihîje yekî jî. Lewre hunera tibbê, tenduristîya mewcûd diparêze û ew tenduristîya ku wenda bûye careke din ji nû ve li mirovan dizivirîne. Ji ber vê yekê, şerefa hunera tibbê zêde dibe û mirov di her wext û zemanî de pêdivî bi wê dibînin (Useybi'e, bêdîrok).

4. Çavkanîya Tibbê

Li gor fîlozofên tebîb ên yûnanî yên mîna Calînos û Hipoqrat Xwedê ilimê tibbê îlhamî mirovan kirîye. Hinek ji lêkolînerên tecrubeyê gotine ku mirovan bi xwe ji tecrubeyên jîyana xwe ev ilim derxistîye, hinekan gotîye misrîyan derxistîye û hinekan jî gotîye ku Hurmus mîna felsefe û hunerên din tibb jî derxistîye. Di pey wan de hinekan jî gotîye ku qûyîyan (xelkê bajarê Hipoqrat) derxistîye (Useybi'ete, ?). Li gor hin lêkolîneran jî çavkanîya eslî ya ilimê tibbê îlham, tecrube û wehîya îlahî ye. Li jêrê dê bîr û rayên zanayan ku têkildarî mijarê ne bihên derbirîn.

4. Hekîmtîya Gel (Folk Medicine / الطب التقليدي-شعبي)

Navê hekîmtîyê ji hêla gelnasan ve bi awayên cîya cîya hatîye qeydkirin. Wekî mînak Boratav (1907-1998) jê re "halk hekimliği" dibêje pênaseya wê dike û bi awayê "Ji temamîya wan rêbaz û karên ku gel bi mebesta ku nexweşînê nas bike û nexweş baş bike di zemanê berê de wextê ku derfetên gel tunebûn yaxud ji ber sedemên din gava gel nikaribû biçûya doxtoran yaxud nexwesta biçûya doxtor bi kar dianî re hekîmtîya gel dibêjin (Boratav, 2013) pênase dike. Digel ku tibba modern hekîmtîya gel heqîr dibîne jî, dîsa wê li pêşberî hemû geşedanên tibbî yên nû xwe li ser lingan ragirtîye. Hin kesên ku tenê tibba modern dihebînin, dermanên ku hekîmên hekîmtîya gel wan amade dikin û didin nexweşan, bi navê "dermanên kocakari"yê bi nav dikin û qedrê wan dadixînin (Yalçınkaya, 2019). Lêbelê îro em dibînin ku Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê jî girîngî bi hekîmtîya gel a kevneşopî diêne.

4.1. Hekîmtîya Gel û Tibba Modern

Piştî ku World Health Organization (WHO) ango Rêxistina Tenduristîya Cihanê (RTC) li ser hekîmtîya gel stratejîyên xwe yên erênî li dinyayê belav kirin, lêkolîneran bi çavekî din li vê qadê nihêrt û wan dest bi xebatên berhevkirina vê qadê kir. Lewre ji sala 2018an pê ve wan navên mîna *traditional medicine* (tibba kevneşopî), *complementary*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

medicine (tibba temamker), *alternative medicine* (tibba alternatîf), integrative medicine (tibba giştîparêz) û *herbal medicine* (tibba riwekî) jî lê danîn, wan ew bi awayê fermî li sernasrî dinyayê qebûl kir û ew ji nû ve pênase kirin (Who, 2019):

4.1.1. Tibba Kevneşopî (Traditional Medicine)

Li gor pênaseya WHOyê tibba kevneşopî ew cure ye ku di demeke dûredirêj de di nav çandên cîyawaz de derdikeve, bingeha wê li ser teorî, bawerî û tecrubeyan e û bi tevî ku hinek ji wan dihên ravekirin, hinek jî nahên ravekirin; bes temamîya wan li ser zanîn, behremendî û tetbîqan e ku hem di parastina tenduristîyê de hem di bergirî, teşxîs û başkirina nexweşînên ruhî û fizîkî de hem jî di tîmarkirinê de dihên bikaranîn.

4.1.2. Tibba Temamker (Complementary Medicine)

Li gor pênaseya WHOyê ji tibba complementary re tibba alternatîf dihê gotin. Ev cure tibb, li her welatekî xasî bi kevneşopîya wir e, ne beşeke ji tibba konvansîyel (tibba edetî ya serdemê) e, bi sîstema desthilatdar a tenduristîyê re nehatîye entegrekirin û li ser bingeha komeke berfeireh a tetbîqên din ên parastina tenduristîyê çê dibe. Lewre li hin welatan navê tibba temamker û tibba kevneşopî di nav hev de dihê bikaranîn.

4.1.3. Dermandarîya Riwekî (Herbal Medicine)

Dermanên gîyayî û riwekî, li ser bingeha beşên riwek, materyalên riwekî yaxud kombînasyonên riwekan dikeve tetbîqê. Di vî terzê dermandarîyê de gîyayên şîfadar, mustehzerên riwekî û gîyayên hişkbûyî dihên bikaranîn.

5. Hekîmtîya Gel û Cureyên Wê

5.1 Cureyên Hekîmtîya Gel ji Alîyê Gelan ve

Lêkolîner û dîroknasên hekîmtîya gel (el-Cewziyye, ?) ew ji hêla cîyawazîyên gelan ve polîn kirine û navên mîna *i)* tibba îran, *ii)* tibba hind, *iii)* tibba yûnan, *iv)* tibba çîn, *v)* tibba ereb, *vi)* tibba misirê, *vii)* tibba suryan, *viii)* tibba turk û *ix)* tibba derveyî bajaran li wan danîne.

5.2. Cureyên Hekîmtîya Gel ji Alîyê Dînên Semawî ve

Gava bi giştî mirov berê bala xwe dide ser berhemên dîroka hekîmtîyê dibîne ku hin lêkoleran (Useybi'ete, ?) ji hêla dînên îlahî ve jî ew polîn kirîye. Wekî mînak *i)* tibba yehûdîyan, *ii)* tibba zerduştîyan, *iii)* tibba nesranîyan û *iv)* tibba îslamê. Hinek ji lêkolînerên tibba nebewî (Salih, 2021) ji bo tibba îslamê têgeha *tibba rasteqîn* jî bi kar diênin. Divê mirov ji bîra neke ku Hz. Îsa jî di biwarê ilimê tibbê de pir li pêş bûye û li ser destê wî qendera mirî jî sax bûne. Dibe ku ji ber vê yekê alimên nesranî gelek zêde di qada tibbê de bi pêş ketine.

5.3. Cureyên Hekîmtîya Gel ji Alîyê Qadan ve

Piştî ku di nav cogrfyaya îslamê de bi destê aliman tibb ket nav peresan û geşedanê, wan bi awayekî din jî ew polîn kirin: *i)* Tibba bedenan *ii)* Tibba dilan/qelban (el-Cewziyye, ?) *iii)* Tibba ruhan û *iv)* Tibba nefsan (Cûzî, ?). Fîlozofê îslamê yê sedsala dehan Ebûbekir er-Razî (wf.313/925) ku wekî Galenê Ereban dihê naskirin, li gor hin qadên din jî wê polîn dike: *i)* Tibba bedenî û derûnî/psîkolojîk û *i)* Tibba li ser nexweşînên exlaqî. Lewre wî navê tibba exlaqî danîye “tibba rûhanî” (Bahtişû, 2014).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

6. Dîroka Hekîmtîyê

Çawa ku dîroknasên dîroka felsefeyê amaje pê dikin xebatên zanistê, berî fîlozofên grekî dest pê kirîye raborîya wê diçe digihîje 2700 sal berî zayînê. Çunkî li Misira qedîm, Çîna berê, Îran û Hinda berê jî zanyaran, li serê lêkolînên zanistî û hikemî kirine. (Mesûd, 1999) Li gor hedîseke ku Îbn Ebbas ew rîwayet kirîye Cenabê Nebî weha gotîye: "Suleymanê kurê Dawûd selama Xwedê li wan be rojekê gava nimêj dikir, dareke hêşînbûyî li ber destê xwe dît. Lewre jê pirsî bê ka te nav çi ye? Heger tu ya danînê bî, te dênim, ku ya nivîsînê bî te binîvisim." Li gor qewmekî ji yehûdîyan gotîye ku Xwedê teala rêyên şifayê nazilî ser Mûsa kirîye, hinekên din ji îsraîlîyan gotîye ku senayîya tibbê bi destê Bûqal bin Lamix bin Mitûşalix hatîye derxistin. Mecûsî ku hene dibêjin bi awayê nivîskî ji Zerdeştê Nebî hatîye. Li gor bawerîya sûran, suryan û keldanîyan wan bi xwe cara ewil ev ilim keşif kirîye. Faris dibêjin ku Hurmus bi vî ilimî zanibûye, ji wir çûye Misirê û yûnanîyan ji wir wergirtîye. Emîr Ebû'l-Wefa el-Muşîr bin Fatek di kitêba xwe ya *Muxtaru'l-Hikemi we Mehasinu'l-Kelmi* de dîyar kirîye ku zemanê ku Îskender welatê Dara dagir kir, kitêbên dînê mecûsîyan şewitandin; lêbelê yên stêrknasî, tibb û felsefeyê wergerand zimanê yûnanî ew birin welatê xwe. Ebû Suleyman el-Mentiqî gotîye ku Îbn 'Edî bi şexsê jê re gotîye ku ilimên celîl ên ilimên felsefeyê li cem hindûyan bûye. Li gor qenaetekê ilimê tibbê ji Hz. Adem wekî mîras maye (Useybi'ete, ?).

6.1. Hekîmtî di Serdema Fîlozofên Îranî de

Li cografyaya Îranê zanyarî li ser bingeha felsefeya Zerdeşt (B.Z. 583-660) çê bûye. Di hizra zanayên wan de bi navê xêr û şer du hêman hene. Li gor wan tek îlahek heye û wî nav Ahûramazda ye. Ew îlahê ronahî û esmanan e. Vî îlahê tek tecellîyê ser heft mezahiran kirîye: Nûr, aqilê teyyîb, heqq, sultan, teqwa, xêr û xulûdî. Zerdeşt mirovan vedixwîne exlaqê bifezîlet (Mesûd, 1999). Li gor wan ilimê tibbê jî digel ilimmên din di nav xêrê de ye.

6.2. Hekîmtî di Serdema Fîlozofên Hindî de

Zanyarîya herêma Hindê ji serdema Yûpanşadî ve dest pê dike. Mijara bîr û raya wî sirrê ku mirovan bi qîmet dike fehma mirovan e. Lewre divê ji xwe bipirse bê ka em ji kû hatine, li kû rûdinên û ber bi kû ve diçin? Hekîmên hindî serê ewil dersa xalisîyê dane telebeyên xwe û ku ew jî divê mirov bizanibe ku aqilê mirovan bi qusûr e, li ber razên mezinahîya alemê biçûk e û têra têgihaştina ji vê alemê nake. Digel vê yekê li gor felsefeya Hindê eqîdeya tenasuxa ruhan heye. Îca ji bo mirovek divê bi rêya rîyazeta nefsê bixebite û ji van dewreyên tenasuxê xwe xelas bike. Gava mirovek bi rêya tezehhudê ji hemû şehwetên nefsê xwe xelas bike, êdî ew ne ferdekî/e bi tenê ye; bes dibe parçeyekî ji ruhê alemê (Mesûd, 1999).

6.3. Hekîmtî di Serdema Fîlozofên Grekî de

Mamosteyê Medreseya Pîsagorîyê fîlozofê hekîm Pîsagor, çawa ku di biwarê nefs, hejmar, tenasux felekan de nêrînên xwe derbirîne, li ser tibb, nexweşîn û tenduristîyê jî bîr û rayên xwe vegotine. Li gor wî sihhet û merez li ser bingeha *hejmar*an e. Bi vê bawerîya xwe ew ji cureyên tibbên din cîyawaz dibe. Tibba wî li ser wê nêrînê ye ku tenasub di nav tiştên dijberî hev de bi çi awayî çê dibe. Çunkî cisim ji çar keyfîyetan pêk hatîye: germ, serma, rutûbet û ziwahî. Îca sihhet, di encama wezna van de çê dibe; nexweşîn ji ber netewezûnîya wan derdikeve. Pîsagor zemanê ku wekî mamosteyê tibbê çûye Aqretxonayê ku bajarekî Samûsê yê li Îtalyayê ye û medreseya wê tibbê

Zakho Centre for Kurdish Studies

heye, li wir girîngîya îtîdalê nîşan daye ku çawa di sihhetê cîyê wê mezin e. Di wê medreseyê de pêşaweyekî bi navê Alcmeon hebûye û bûye şagirtê Pîsagorî (Merheba, 1993/1414).

Li gor ku Îshaq b. Elî er-Ruhawî di berhema xwe ya *Edebu't-Tebîb* de ji Galen (Calînos) radigihîne, cara ewil li Yewnana Berê hekîmên grekî ku wekî bavên tibbê dihên naskirin, ji bo ku mafên xwe bixin bin garantîyê û pîşeya hekîmtîyê ji destê kesên qelp (hekîmên sexetekar) û nezan biparêzin, wan wekî sazî perwerdeya fermî li ser hekîman ferz kirîye û piştî qedandina perwerdeyê jî, gava yekî bixwesta biketa nav vê pîşeyê, wan ew di azmûnekê de derbas dikir peyre jê re musaede dikir. Rayedarên wê serdemê jî bi îhtîyat mane û wan jî li her bajarekî hekîmên herî navdar û şareza neqandine û ji bo îmtîhankirina hekîmên nû ew wezîfedar kirine. Wan kursîyê hekîmtîyê tenê daye wan kesan ku ji vê azmûnê bi serfirazî derbas bûne (Akpınar, 1998).

Li gor ku Îbn Xeldûn (h. 832-808)/(m. 1332-1406) radigihîne Calînos di warê hunera tibbê de kitêbeke mezin nivîsîye û ew pêşewayê vê senayîyê ye. Ev kitêba wî ji alîyê alimên berê ve hatîye tercumekirin. Dihê gotin ku ew hevdemê Îsa eleyhisselam e. Lewre kitêba wî ya tibbê, dayîka temamê kitêbên tibbê ye. Elî b. Ebbas el-Mecûsî ku alimekî faris ê tibbê ye, er-Razî, Îbn Sîna û ji Endulusê Ebdulmelik Ebû Merwan (wf. 557h) ku tebîbê Endulusî ye, Îbn Zuhr di pey ilimê wî de hatine û li cograyaya îslamê navdar bûne (Xeldûn, 2019/1440).

6.4. Hekîmtî di Serdema Fîlozofên Çînî de

Ji hîyama antîk ve gelê Çînê xwedî şaristanîyekê bûye. Li welatê wan astronomî, matematîk, kiştûkal û tib bi pêş ketîye. Îro jî hinek keşfên tibba kevneşopî ya gelê Çînê ji bo zanistê cîyê mereqê ne. Lewre hîna jî vê hekîmtîya wan di parastin û tîmarkirina tenduristîya gelêrî de risteke qewî heye. Digel ku tibba Rojava bedena mirovan, bi awayekî ku ji derdora xwe cîyakirî be dibîne û li serê dixebite, tibba gel a kevneşopî ya Çînê, di wê bawaerîyê de ku yasayên gerdûnî/alemgiştî li ser bedenê hene û beden di van hêmanên unîversayî/kewnî de wekî "unîversayeke biçûk" cih digire. Di van 50 salên dawî de bi awayê zanistî hatîye peyîtandin ku tibba gelêrî ya Çînê bi kêrî tîmarkirina gelek nexweşîyan hatîye.[12]

6.5. Hekîmtî di Serdema Zanayên Ereban de

Li gor Îbn Xeldûn (wf. 808/1406) di nav ereban de tibba gelêrî li ser bingeha tecrubeyê berbelav bûye û gelek hekîmên navdar ên mîna Haris b. Kelde di nav wan de hebûne (Xeldûn, 1019/1440).

7. Hekîmtî di Şaristanîya Îslamê de

Pêxemberê îslamê Cenabê Muhemmed bi peyv û pratîkên xwe ji bo xweparastina ji nexweşînan li sehabîyên xwe pêşnîyaz kirine ku ji wan re gotîye ku di wextê nexweşînan xwe tedawî bikin. Li ser vê helwesta wî alimên cografyaya îslamê bi peywendîdarîyeke taybet berê bal û dêhna xwe dane ser zanista tibbê. Lewre di dîrokê de mirov dibîne ku wan ji bo vî îlmî dam û dezga jî ava kirine. Cenabê Nebî rêbaza huqûqî ya hekîmtîyê jî dîyar kirîye: "Kesekî ku di warê hekîmtîyê de ne pispor be dest bi tedawîya nexweşan bike [û ew nexweş] ji destê wî bimire, dê dîyeta wî bide."

Hîna di sedsala yekem a koçî de sultanê Emewî Mensûr di wextê desthilatdarîya xwe de gelek qîmet daye kar û barên wergerê û ji zimanê grek, suryanî,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

hindî û îranî berhem li zimanê erebî dane wergerandin. Digel wergerê wî qedir û qîmeteke mezin daye malbata hekîmê nestûrî Bextîşû (Çubukçu, 1977). Ji sedsala VIII-an a mîladî pê ve ji zimanê grek gelek berhemên felsefî, stêrnasî û tibbî li zimanê erebî bi palpişîtîya xelîfeyan hatin wergerandin û ev tevgera wan ilimparêzîyê di vê sedsalê de wisa kir ku xelîfeyên Ebbasî yên Bexdadê, wekî “Reîsû’l-Etibba we’l-Felasife” [serokên hekîm û feylesofan) bihên binavkirin (Bahtişû, 2014). Ebû Bekir Muehmmed b. Zekerîya er-Razî (wf. 313/925) çawa ku fîlozofekî navdar ê îslamî ye, di serdema xwe de hekîmekî mezin û fîzîknasekî wisa ye ku xelîfeyê serdema wî hurmeteke mezin nîşanî wî daye. Bi taybetî pirtûka wî ya *Kitab el-Hawî* mîna ye ansîklopedîyeke tibbê. Ewrûpîyan ew wergeraye zimanê latînî heta sedsala XVII-an di zanîngehên Rojava de wekî çavkanîyekê bûye (Çubukçu, 1977).

7.1. Tibba Nebewî

Ji ber ku peywendîyeke berbiçav a hekîmtîya kurmancî digel Tibba Nebewî çê bûye, li vir ev sernav û basa wê hat kirin. Pêxemberê îslamê Hz. Muhemmed di biwarê parastina sihheta mirovan, dermankirina nexweşînan û awayê qûtwergirtina bisihhet a mirovan de peyv îfade kirine, rîwayetkarên hedîsan ên mîna Buxarî[13], Ebû Dawûd û Îmam Malik di kitêbên hedîsê de cîyekî taybet bi navê *Kitabu’t-Tibbi* û *Kitabu’l-Merḍa* veqetandîye û peyre bi domana demê re alimên îslamê kitêbên serbixwe yên bi navê *Tibbu’n-Nebewî* li ber hedîsan amade kirine. Herçiqas navê vê qadê Tibba Nebewî be jî, di Qur’anê de jî hin ayetên têkildarî nexweşînên dil û şîfayê hene. Lewre alîyê yê wehyî jî heye. Ji ber vê yekê temamê wan zanînên ku li ser parastina sihhetê û tewsîyeyên li ser tedawîyê ku di Qur’anê de hene û ji Cenabê Pêxember bi awayê sehîh hatine, bi qewl, pratîk û teqrîrên xwe nîşan dane gişt dikevin bin banê Tibba Nebewî.

7.1.1. Naveroka Tibba Nebewî

Li ser taybetmendî û naveroka Tibba Nebewî seranserê sedsalan di nav aliman de nîqaş çê bûne. Li gor Îbn Qeyyim el-Cewzîyye (hicrî 751-691) tibba Cenabê Nebî ne mîna tibbên din e; bes yeqînî, birra û îlahî ye. Ji lewre ew ji ber qendîla nubuwwetê û kemala aqilî derketîye. Îca tibba yên din, li ser asasê pêjnbarî, zenn û tecrubeyê ye. Gelek mirov nikarin ji Tibba Nebewî mifa wergirin, çunkî ancax ew kesên ku bawerî pê diênin pê şifa dibînin (Karataş, 2019).

Li gor raya Îbn Xeldûn (wf. 808/1406) sinaeta tibbê yek ji sinaetên tebîîyyatê ye ku ji hêla nexweşîn, sihhetê ve li ser bedena mirovan kûr dibe û hewl dide ku digel berevanîya sihheta mirovan, wan tedawî bike û xidayên ku jê re baş in tesbît bike. Bi tevî vê ilimê tibbê dixebite ku sedemên nexweşînên ku di organên bedena mirovan de derdikevin bizanibe û pê derxe ka ji çi derketine. Lewre piranîya wê bi xêra tecrubeyan dihê hînkirin. Îca ew tibba menqûl (kevneşopî) ku di şer’îyyatê de heye, bi vê teherê ye û tiştekî wehyî tê de tuneye. Hetta ew hal û hereketên Nebî (e.s.w) jî ku bi hedîsên sehîh gihaştine me, ji vî cureyî ne. Alîyekî wê yê meşrû‘ ku divê mirov pê emel bike nîne û ne ji tibba mizacî ye. Digel vê jî dîsa karîgerîyeke mezin, bikêrhatî û erênî ya hedîsan li ser tenduristîya mirovan heye (Xeldûn, 2019/1440).

Digel vê nêrîna Xeldûn jî, dîsa li gor lêkolînên modern ên serdema me hin tewsîyeyên Tibba Nebewî bi awayekî nuwaze bi kêrî tibba modern hatine. Wekî numûne ew hedîsa ku “Hebba Sewda (reşreşk) ji bilî mirinê wekî şîfaya hemû derdan” nîşan dide bawerîya mirovan bi Tibba Nebewî zêdetir dike. Çunkî derketîye holê Reşreşk

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

çawa ku ji bo pergala menaeyê gelek baş e, li dijberî nexweşîna eydizê têdikoşe (es-Sabûnî, 2016/1437).

Ji lêkolînerên hemdem Fezlu'r-Rehman di wê qenaetê de ye ku Tibba Nebewî ji alîyê nifşên nû yên muslim ve li ber ronahîya ayetên Qur'anê û hedîsên Cenabê Nebî yên li ser tibbê hatîye amadekirin. Lewre alimên îslamê xwestîye ku reng û rûyekî pîroz bidin ilimê tibbê, wê bixin nav ilimên pîroz ên dînî yên îslamî û berê xelkê bidin ser tenduristîya parêzer û şîfadêr (Karataş, 2019).

Nîqaşên li ser Tibba Nebewî hîna jî berdewam in; bes gava mirov berê bal û dêhna xwe dide ser lîteratura vê qadê dibîne ku ji nîvê dawî yê sedsala II a koçî heta sedsala XX-î gelek aliman gelek berhemên bi navê *Tibba Nebewî* nivîsîne û li nav cografyaya îslamê belav kirine. Ebû'l-Hesen Alî b. Mûsa (wf. 203/818) hedîsên Cenabê Pêxember ên têkildarî tibbê civandine û navê *er-Risaletu'z-Zehebîyye* lê danîye û pêşkêşî Xelîfeyê Ebbasî Me'mûn kirîye. Ebdulmelîk b. Hebîb el-Endulusî (wf. 238/653) kitêbeke rasterast bi navê *Tibbu'n-Nebewî* nivîsîye. Ahmed b. Muhammed ed-Dînawerî (wf. 363/973) ye ku kitêbeke tibbê bi navê *et-Tibbu'n-Nebewî* nivîsîye. Îbn Qeyyim el-Cewzîyye (h. 751-691) berhemeke bi navê *Tibba Nebewî* nivîsîye. Karataş (2019) navê 42 kitêbên bi navê Tibba Nebewî ku alimên îslamê ew nivbîsîne rêz kirine.

8. Hekîmtî û Tesewwuf

Ji ber ku peywendîya mijarê bi hêla tesewwufî ya hekîmtîya kurmancî re heye li vir cih ji vê binbeşê re hat dayîn. Hekîmên kurmancî yên gelêrî li cogrfayaya kurmancan digel sofîyên xwedan derga û terîqet, di nav ahengeke mezin de jîyane. Lewre pêdivî hat dîtin ku basa wan jî bihê kirin. Sofîyên navdar di wê qenaetê de ne ku ilimê tibbê îlahî ye. Xezalî di pirtûka xwe ya *el-Munqaz* de dîyar dike ku ilimê tibbê ne bi ceribînan; bes bi îlhamê dihê zanîn. Ew di qenaetê de ye ku xelq çawa bi tebîban bawer dike, wisa bi pêxemberan jî bawer bikira dê tu pirsgirêkeke îmanê nemaya. Li gor Îbnu'l-Erebî navekî sûfî, "hîkem" e, îca hekîm ew kes e ku ilimê îlahî, tebîî, rîyazî û mentiqî gişt di xwe de digihîne hev. Ji Îbn Sîna, Ebû'l-Fezil el-Cişyanî el-Gassanî el-Endulusî (wf. 602/1205) û Mecduddîn Bexdadî (wf. 616/1219) heta Mewlana Celaleddînê Rûmî (wf. 672/1273), Hesen b. Ahmed b. Zefr el-Erbîlî (726/1326), Ahmed Buxarî (wf. 922/1516), Îdrîsê Bidlîsî (wf. 926/1520) û Îbrahîm Heqqî Erzurûmî (wf. 1194/1780) gelek alimên sûfî li ser ilimê tibbê xebitîne û wan di vê qadê de berhem nivîsîne (Küçük, 2018). Wisa xuya ye ku esil û usûla gelek hekîmên kurmancî yên Bakur bi awayê silsileyî ji ocaxekê dihê û piranîya hekîmên berî çil-pêncî yê salî yên vê herêmê di nav gel de bi şêx û seyyîdîyê dihên naskirin.

9. Hekîm û "Hekîmtîya Kevneşopî"yê di Kurmancî de

Bêjeya *hekîm* di kurmancî de mîna teleffuza zimanê erebî الحكيم cih girtîye û wateya wê tebîb e, dixtor e. Wateya bêjeya hekîm, di ferhengên kurdî de bi bêjeyên mîna tebîb (el-Meqdisî, 2011/1432), bijîjk, diktor (Îzolî, 2013), nûjdar, dojdar û avzan (Farqînî, 2000) hatîye danasîn. Irgat (2000) ji bo hekîmtîya tradîsyonel navên mîna *bijîşkîya gelêrî, bijîşkîya kevneşopî* û *dermanên kurmancî* bi kar diêne. Yıldırım (2013) di xebata xwe ya bo *Tibba Erwasî* de jê re *nûjdarîya gelî* dibêje. Yıldırım & Pertev û Aslan (2013) ji bo hekîmtîya gel têgeha *bijîşkîya gelêrî* bi kar diênin. Di nav gel de li hin herêmên kurmancîaxiv -wekî herêma Xerzan- navê hekîmtîya gel *hekîmtîya kurmancî* û

dermanên kurmancî ye (Zinar, 2016), li herêna Semsûrê *dermanê kurmancî* (Çiftçi, 2019) dihê gotin.

10. Hekîmtî li Welatê Kurdan

Ji ber ku mijara vê xebatê bi cografyaya Bakur tixûbkirîye, mebest ji bêjeya welat tenê herêma kurmancên Bakur e, lewre tenê dê berê lêkolînê li ser vê derê be. Bi taybetî Meyafariqîn bi xebat û xizmetên xwe li cografyaya îslamê nav û deng daye. Hîna di sedsala X-an de Hemdenaîyan li vir nexweşxane vekirîye û Merwanîyan jî xebatên tibbî dane berdewamkirin. Digel vê derê li Sêrt û Erzenê jî hekîmên navdar gihaştine û Emmar b. Elî el-Mewsilî (wf. 1010) li emelîyata çavan kirîye. Ji malbata Bextîşû Cebraîlê Hekîm ji bo tedawîkirina Mumehhiduddewle di salên 392/1001ê de ji Bexdadê hatîye Meyafariqînê pîşeya tibbê pê bi pêş ve çûye. Merwanîyan di sala 414/1023yan de Xestexaneya Mezin înşa kirîye bi awayekî hîn moderntir kar û barên tenduristîyê bi pêş xistine. Lewre nivîskarekî mîna Zahidu'l-Ulema ku berhema bi navê *Kitabu'l-Bîmaristanat* nivîsîye, wekî avakarê wê dihê neqilkirin. Digel xanedanên Merwanîyan wezîrên wan jî çi muslim bin çi ne muslim bin, qedir û qîmeteke mezin daye hekîman. Ji ber vê qedirşînasîyê hekîmên wan bi tevî avakirina xestexaneyê wan hem derman amade kirine, hem alav û amûran çê kirine hem jî berhemên tibbî nivîsîne (Yaz, 2019).

Dîroknasê tibbê Îbnu Ebû 'Useybi'e di cildê duyem ê kitêba xwe ya *'Uyûnu'l-Enba fî Tebeqati'l-Etibba*yê de cîyekî taybet bi navê "Etibbau'l-Iraqiyyîn we'l-Cezîre we'd-Dîyarbekr" daye hekîmên herêmê yên mîna Îbn Dînar, el-Fedil b. Cerîrî et-Tikrîtî û Zahidu'l-Ulemayê Nestûrî. Ji vê raborîyê jî dîyar dibe ku paşxaneya qewî ya ilimê tibbê hîna ji berî hezar salî ve li herêmê hebûye. Dibe ku ji ber vê paşxaneyê di qada tibbê de bi navê hekîmtîya kurmancî û dermandarîya kurmancî nûjdarî di nav kurmancan de berbelav bûbe.

Ji bilî serdema Merwanîyan serdema mîrektîyên kurmancan jî hêjayî lêkolînê ye ji bo paşxaneya tibba kurmancan. Ji sedsala XI-an heta sedsala XV-an bi qasî çar qernan di dîroka kurmancan de alim bi tibbê re çiqas mijûl bûne, helbet cîyê mereqê ye. Ji sedsala XV-an heta sedsala XIX-an ku dawîya mîrektîyên kurmancan e, rewşa ilimê tibbê li cem mîran çawa bûye, dîsa hêjayî lêkolînê ye. Çawa ku di serdema wan dam û dezgayên tesewwuf, ilimê medreseyê û dengbêjî hebûye, dibe ku ev ilim jî hebûbe. Çawa ku Feqîyê Teyran di çarîneke menzûmeya xwe ya *Şêxê Sen'an* de navê hekîman weha zikir dike (Sadinî, 2011):

Şîret û pendê hekîman
Xeberê pîrê 'ezîman
Beldeyê ehlê helîman
Kes nizanit qîmetê

10.1. Teşeyên Hekîmtîyê Li Herêma Kurmancan

Ji bo vê xebatê digel bîst hekîmî li Batman, Dîyarbekir, Şirnex, Ruha û Mêrdînê hevdîtin hatin kirin û pirsên peywendîdarê mijarê ji wan hatin kirin. Ji wan nîvî pîrek; nîvî zilam bûn. Cureyê hekîmtîya wan bi giştî zerikbirî, bîrovbirî, navhilênerî, girêdarîya hestîyan, xwînberdan, xwendina li avê û dayîna dermanên organîk bû. Paşxaneya hinek ji wan ocaxên şêx û seyyîdan, melayên Tibba Nebewî, destwergirtina ji hekîmekî û tecrubeya bav û kalan bû. Hinek ji hekîman bi rêya xewnan hekîmtîya xwe bi dest

Zakho Centre
for Kurdish Studies

xistîye; hinek jî tenê li ser nexweşên ku bi cinan ketine kar dikin. Hinek ji van hekîmên herêmê tu ucretekê wernagirin; hinek jî werdigirin.

10.1. Hekîmên Ocaxseyyîd

Bi taybetî li Batman, Dîyarbekir û Ruhayê piranîya hekîman ji malbatên xwedan ocax bûn. Hekîmên ku ne ji van ocaxan bûn jî, bi rêya dayîk û malxalanên xwe yên seyyîd dest ji wan wergirtibûn û bi îzna wan hekîmtîya xwe di nav gel de îcra dikirin. Li Batmanê Mala Şêx Muhemedê Zîlî û destûrdayînên wan, Mala Şêx Sebrîyê Teraşî û destûrdayînên wan, Mala Şêx Elî û neslên wan hebûn.

Şêx Silêmanê Şabê ku ji nesla Şêx Mihemedê Şembekî (Şêxbal) ye, ji bav û kalan ve li herêmê bi hezaran nexweş dihên -a niha kêm bûne, çunkî şêx pîr û kal ketîye- cem wan û detstdayîyên wan. Ocaxa Şêxbal tenê sedemê nexweşînan, navê nexewşînê û dermanê wan dibêje; bes tu materyalekî dermanî nade û tu ucretekê qebûl nake. Hekîma pîrek Xalîseya Melkîşa ku hîna li heyatê ye û Hecî Sadûnê Reşkotî ku xwarzê Mala Şêxbal bû, bi îzna wan navê hiltînin. Hecî Sadûn wefat kirîye û kesî şûna wî negirtîye (KÇ7). Şêx Tahir ku îro mala wan li Celdekan e destûra navhilanînê daye Hecî Sadûn; lê kesî ji wan ev kar negirt ser milê xwe (KÇ12)

Ji binemala Zîlî Mala Şêx Xalidê Zîlî di serdema xwe de derman daye nexweşan û ji bo şîfayê bi ser wan de xwendîye; bes êdî jê kesekî ku vî karî bike nemaye (KÇ10). Îro jî hekîmeke pîrek bi navê Qudret li Malabadê ya Farqînê karê girêdana hestîyan dike û wê destûr ji bavê dêya xwe wergirtîye û ew jî ji Mala Zîlî bûye.

Li hêla Xerzan li gundê Dilşanê hekîmekî bi navê Şêx Elî hebû, xelk zaf diçû balê. Wextakî kurê wî Şêx Ahmed li cîyê wî rûnişt, vêga jî Seyfedîn cîyê wî girtîye. Li karê girêdana hestîyan dinêre. Li Apika Mala Şêxê Reş hebû, Şêx Yehya dermanan digot. (KÇ9).

Li Dîyarbekirê Mala Şêx Şemsedîn û destwergirtîyên wan, Mala Şêx Guzel û destûrdayînên wan û Mala Şêx Cezayîr hene. Şêxê Karazê Şêx Îsmetullah wekî ocax hîna jî hekîmtîya kesên ku bi cinan dikevin dikin. Digel van li hêla Çîyayê Qerecdaxê (Çîyayê Reş) ku di navbera Ruha, Mêrdîn û Dîyarbekirê de cih digire Mala Şêxê Zirav heye. Çawa ku nevîyên vê ocaxê nexweşînên mîna birîna zerik û bîrovê hîna jî îcra dikin, eqrebayên wan ku ji alîyê pîrekan ve digihîjin wan jî bi îzna wan vî karî dikin (KÇ11).

Bi navê Jinika Hesendelî hekîmek li gundê Silîva/Farqînê Hesnedelîyê hebû ku gelek navdar bû û xwedankermaet bû. Ji ber hîna sî sal berê wefat kirîye derfet çê nebû ku pê re hevdîtin çê bibe. Wê bi çavan li mirovên ku diçûne balê mêze dikir, navê nexewşîna wan digot û ya derman dide wan, ya jî ji wan re dermanan pêşnîyaz dikir.

Li hêla Siwêrekê Şêxê Mala Bûbê (Nisibîn) hene. Di navbera Çêrmûka Dîyarbekir û Siwêreka Ruhayê de gundek heye û bi navê Şêx Cezayîr hekîmekî navsere heye. Di wextê hevdîtinê de wî bi xwe dîyar kir ku pêşîyên wan digihîjin Şêx Guzelê Dîyarbekirê. Ji deh bavan vir ve ew li vê herêmê hekîmtî û dermandarîya riweka û gîyayan dikin. Li gor wî hekîmtîya wî “sirrî” ye (KÇ5). Şêx Şemsedîn ji bav û kalan ve karê hekîmtîyê dikin û wan bi xebata tesewwufî ev hekîmtî bi dest xistine û dewrî nifşên xwe kirine (KÇ6). Li hêla Mêrdîn-Nisêbînê jî hekîma bîrovbir Sacîde Akyuz ji destê xaltîya xwe ya Helîmeya Seyyîd hekîmtîya xwe wergirtîye û hîna berdewam dike.

Hekîmên Mala Şêx Feqîrullahê Tillo ya Sêrtê, hema hema li hermû deverên Bakur nêzî sedsalekê ye ku karê sunnetçîtîyê dikin (KÇ14)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

10.2. Hekîmtîya Melayan

Herçiqas di serdema me de kêm bûbin jî zemanekî melayan li ber Tibba Nebewî karê hekîmtîyê kirîye û gelek nexweşan xwe li wan girtîye. Wekî mînak li hêla Batman-Hezoyê (herêma Xerzan) melayekî bi navê Mela Yehya hebû dermanan jî digot, nezerê jî dibirî (KÇ9).

Ji bilî van li herêma Batmanê Mela Elîyê Zîlî di çarşema pêşî ya serê sibatê de nivişt çê dikir û ji gel kî bihata cem didayê. Îca wî jî îzna niviştnivîsînê dida melayê ku layîq bûya (KÇ2). Di destê melayên herêmê de bi taybetî kitêba bi navê *er-Rehmetu fî't-Tibbi'l-Hikmeti* ya Celaleddîn Ebdurrehman es-Suyûtî (wf. H. 911) û kitêba *et-Tibbu'n-Nebewî* ya Îbn Qeyyim el-Cewzî heye.

10.3. Hekîmên Tecrubeyî

Li herêma Xerzan Elîyê Wezîr ji gundê Daragûzî ya Hezoya Batmanê hekîmekî bi nav û deng bû. Hem nexweşînan tedawî dikir hem hestîyên wan ên zedegirtî girê dida hem jî birînan derman dikir, gava marekî bi yekî veda yaxud bi heywanekî veda jehra wan dimêt û baş dibûn. Îş û karê wî bi temamî hekîmtî bû. Gel jê re marmij digot. Wî çawa ku nebatên derman dida xelkê, navê gîyayan jî dida nexweşan. Berî sî salî hebû, di pey wî de kesî şûna wî negirt û ne seyîd bû (KÇ9).

Sureyya Şadîya ku li ser Dîyarekirê ye ji bav û kalan wergirtîye, ne seyîd e, pêşîyên wan zerika reş birîye û ew jî sê çarşeman li ser hev zerika nexweşên xwe dibirin û ew li ser destê wan baş dibin (KÇ13).

Hecî Hacî İlhan **ji** Xirabê Zerzarê girêdayî bi welayeta Şernex 42 sal e karê girêdana hestîyan dike. Carinan rojê nêzî 100 mirovî dihên cem wî. Bi gotina wî, bi domana demê re Xwedê teala hin sirrên girêdanê nîşanî me dide û em karê xwe bi serfirazî dikin. Xelk jê re şikestebend (KÇ15). Li hêla Mêrdîn-Qoserê Şêxmûsê Kurikî (80 salî) ji 70 salî vir ve karê girêdana hestîyên mirov û heywanan gişt dike.

Hekîmên ku bi tecrubeya xwe hînî hekîmtîyê bûne, bi piranî li ser girêdana hestîyan, dermankirina pêvedana maran, zerikbirî û bîrovbirîyê dixebitin. Van salan hin hekîmên kurmancî ku ji Binxetê hatine Bakur jî hekîmtîya xwe di nav gel de berdewam dikin.

Encam:

Pîşeya hekîmtîya kurmancî û dermandêrîya kurmancî, li ser çexera ocaxseyyîd, malmela û malbatên xwedantecrube gihaştîye îro. Hekîmên kurmancî yên Bakur bi awayê silsileyî pîşeya xwe neqlî nifşên pey xwe kirine. Herçiqas di serdema me de ev pîşe gelek zêde lawaz ketibe jî, bi piranî bi destê kesên seyyîd û kesên tecrubedar berdewam dike. Piranîya hekîmên seyyîd, xwedan paşxaneyeke tesewwufî ne. Li Bakur digel ku derfetên tibba modern ewqas zêde bi pêş ketîye jî hîna jî bawerîya gel bi hekîman heye û hîna jî ji bo derman û tedawîyê qesda wan dikin.

Li gor qada vê lêkolînê çawa ku ji lîteratura qadê dîyar dibe, cîyekî gewre yên hekîmtîya serdema Merwanîyan di dîroka hekîmtîya kurmancî de heye. Di pey Merwanîyan de hekîmtî ji serdema mîrektîyên kurmanc ve di çi rewşê de bûye û di nav kîjan merheleyan de derbas bûye, muhtacî lêkolînê ye. Bi tevî tebîbên Merwanîyan wisa

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

dîyar dibe ku rista Tibba Nebewî jî di hekîmtîya kurmancî de heye. Tibba Nebewî bi destê ehlê tesewwuf û melayan li nav gel belav bûye.

Çavkanî:

Ehmedê D., Ahmet Kasımoğlu, 2013. *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî/Kürtçe Bitki Adları Sözlüğü (Kurdî-Kurdî-Latînî-Tirkî)*, İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

Akpınar, C., 1998. *Türkiye Diyanet Vakfı Ansiklopedisi.* [Çevrimiçi] Available at: https://islamansiklopedisi.org.tr/hekimbasi [Erişildi: 17 02 2022].

Andranîk, 2009. *Dêrsim Rêwîtî û Erdnîgarî, (Wergera ji Ermenîya Kevin: Têmûrê Xelîl).* İstanbul: Weşanên Deng.

Bahtişû, Î., 2014. *Tıp Sanatı ve Nefsin Halleri (Tercüme: Abdulkadir Coşkun).* 1 dü. İstanbul: Litera Yayıncılık.

Bakioğlu, A. & Kurnaz, Ö., 2014. *Araştırmada Kalite.* Ankara: Nobel Akademik Yayıncılık.

Bayrakdar, M., 2013. *İslam Düşüncesi ve Kaynakları", İslam Düşünce Tarihi.* 1 dü. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayını.

Berwarî, M. E., 2020. *Dehdehê Evînê, (Amadekar: Yakup Aykaç & Hanifi Taşkın).* 1 dü. Wan: Weşanên Lorya.

Boratav, P. N., 2013. *100 Soruda Türk Folkloru (İnançlar, Töreler ve Törenler, Oyunlar).* Ankara: Bilgesu.

Cûzî, Î., ?. *et-Tibbu'r-Rûhanî (Tehqîq we Şerh: Feryal Ulyan).* 1 dü. Mekketu'l-Mukerremeh: el-Mektebetu't-Ticariyyeti.

Çiftçi, T., 2019. *Adıyaman ve Çevresinde Halk İnançları ve Halk Hekimliği (Teza Neçapkirî ya Doktorayê).* 1 dü. Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Çubukçu, İ. A., 1977. *İslam Düşünürleri.* Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları.

Ekici, M., 2018. *Halk Bilgisi (Folklor) Derleme ve Inceleme Yöntemleri.* (8. Baskı) dü. Ankara: Geleneksel Yayıncılık.

el-Cewziyye, Î. Q., ?. *et-Tibbu'n-Nebewî.* ? dü. Beyrût: Daru'l-Kutubu'l-Ilmiyye.

el-Meqdisî, Z. P. X., 2011/1432. *el-Hedîyyetu'l-Hemîdîyyeti fî Luxet'l-Kurdîyyeti, (Tehqîq: Muhemmed Mukrî).* 1 dü. Diyarbakır: Mektebetu Dîyarbekir.

Erişti, S. D. B., 2013. Bilimsel Araştırma Yöntemleri. %1 içindeA. A. Kurt, dü. *Bilimsel Araştırma Yöntemleri.* Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları, p. 7.

es-Sabûnî, M. E., 2016/1437. *eş_Şerhu'l-Muyesser li Sehîhi'l-Buxarî, c. 5.* Beyrût: el-Mektebetu'l-Esrîyye.

Farqînî, Z., 2000. *Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük.* 1 dü. İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları.

Huseyn, E. R. Z., 2013/1424. *Mu'cemu'n-Nefaisi'l-Esasî.* saniye dü. Beyrut: Darulfikir.

Izady, M. R., 2004. *Bir El Kitabı Kürtler, (İngilizcedan Çeviren: Cemal Atila).* İstanbul: Doz Yayınlarıı.

Îzolî, D., 2013. *Ferheng Kurdî-Tirkî&Türkçe-Kürtçe,(Amadekar: Kamer Baysulen).* 2 dü. İstanbul: Weşanên Deng.

Karataş, M., 2019. *Müslüman'ın Şifa Rehberi Tıbb-ı Nebevî.* 1 dü. İstanbul: Hayykitap.

Küçük, H., 2018. *Tasavvuf ve Tıp Selim Kalbin Fizyolojisi.* 2 dü. İstanbul: Ensar Neşriyat.

Merheba, M. E., 1993/1414. *Tarîxu'l-Felsefeti'l-Yûnanîyyeti min Bidayetiha Hette'l-Merheleti'l-Hilinisiyyeti.* Beyrût: Muessesetu Îzzeddîn li't-Tebaeti we'n-Neşri.
Mesûd, M., 1999. *Udebau Felasifeti: Behsu fî'l-Edebi we'l-Felsefeti Xilale'l-Usûri'l-Cahilîyyi we'l-Umewiyyi we'l-Ebbasiyyi,.* 1 dü. Beyrût: Darulîlmi Lilmelayîn, (Tebetu's-Saniyet).
Orbelî, Î. A., 2011. *Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane, (Amadekar: Sînan Hakan; Wergera ji Rûsî: Têmûrê Xelîl).* İstanbul: Nûbihar.
Salih, A., 2021. *Son Söz.* 10 dü. İstanbul: Maur Yayıncılık.
Sîna, E. E. e.-H. b. E. Î., 2014/1435. *al-Qanûnu fî't-Tibb (Tehqîq: Seîd el-Hessam), c. 1, r. 29..* Tebetulûla dü. Beyrût: Darulfikir.
Şenol, Ş., 2012. *Araştırma ve Örnekleme Yöntemleri.* (1. Basım) dü. İstanbul: Nobel Akademik Yayınevi.
Tayşir, E. A., 2020. *Bu Tez Nasıl Bitecek? Lisansüstü Öğrencileri İçin Araştırma Klavuzu.* 13 dü. İstanbul: İletişim Yayınları.
Useybi'ete, Î. E., ?. *'Uyûnu'l-Enba' fî Tebeqati'l-Etibba', c. 1..* 1 dü. Beyrût: Darusseqafeti.
Who, 2019. *World Helath Organization.* [Çevrimiçi]

Available at:
https://www.who.int/health-topics/traditional-complementary-and-integrative-medicine#tab=tab_1
[Erişildi: 15 02 2022].
Xeldûn, E. b. M. Î., 2019/1440. *Muqeddîme.* Beyrût: Muessesetu'r-Risaleti Naşirûn.
Yalçınkaya, F., 2019. Halk Hekimliğinde Sağalma Yöntem ve Teknikleri. *Halkbilimi Araştırmaları Derneği Uluslararası Halkbilimi Araştırma Dergisi,* 1(2), pp. 1-12.
Yaz, A., 2019. *Mervanî Emiri Nasrüddevle Ahmed ve Dönemi.* Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Snatları Anabilim Dalı (Teza Neçapkirî ya Doktorayê).
Yıldırım, K., Pertev, R. & Aslan, M., 2013. *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî.* İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları (Çapa Yekem).
Zinar, Z., 2016. *Riataza.* [Çevrimiçi]

Available at:
https://krd.riataza.com/2016/10/21/hekime-kurmanci-dermane-kurmanci/
[Erişildi: 17 02 2022].

KÇ: Kesa/ê Çavkanî

KÇ1 Muhemmedîyê Şahwelîya, 1950, Gundê Gêlêya Dîyarbekir, Cotyar-Rêncber (Kesê li cem Hekîmê Seyyîd Kalê Şêx Emerê Termila Têrkan
KÇ2 Mela Ebdurrehmanê Teraş, 1955, Gundê Hezoya Batmanê, Melayê Malnişîn
KÇ3 Mela Ebdurrehmanê Hezro, 1970, Dîyarbekir, Melayê Mizgeftê
KÇ4 Pîra Qanqirdê, 1960, Dîyarbekir, Pîreka Malê. (Bîrov û Zerikê dibire, ji destê Şêxê Zirav ê Qerecdaxê wergeritîye)
KÇ5 Şêx Cezayir 1957, Çermîk, Dîyarbekir, Hekîmê Seyyîd (Dermanên riwekî dide nexweşan)

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

KÇ6 Şêx Şemsedîn, 1950, Baxlar, Dîyarbekir, Hekîmê Seyyîd (Li ser avê dixwîne û dide nexwşan)
KÇ7 Xalîseya Melkîşa, 1956, Hezo, Batman (Pîrik, navhilêner. Ji destê Malbata Şêx Sebrîyê Şabê dest wergirtîye)
KÇ8 Xaltîya Malabadê, 1960, Silîva, Dîyarbekir, (Karê girêdana hestîyên derizî, jicihderketî yaxud şikestî dike, ji destê binemala Şêx Mihemedê Zîlî dest wergirtîye)
KÇ9 Hecî Şirînê Daragûzî, 1945, Hezo, Batman.
KÇ10 Hecî Ebdurrehmanê Kifîfî, 1940, Hezo, Batman.
KÇ11 Pîra Qanqirdê, 1955, Qerecdax, Dîyarbekir.
KÇ12 Heme Şîrîn Kurhan, 1960, Qubîn/Bişêrî, Batman
KÇ13 Sureyya Şadîya, 1980, Dîyarbekir
KÇ14 Şêx Ahmedê Tilloyî, 1950, Tillo, Sêrt
KÇ15 Nasuh Sevinik, 1965, Cizîr, Şirnex

Perawêz:

---

[1] Di ferhengê de li pêşberî têgiha îngilîzî *deduction*ê, bi zimanê erebî digel bêjeya *te'lîl*ê, bêjeya *îstintac* û *îqtita'* jî heye.

[2] Ji bo agadarîyên zêdetir bnr. Îbn Bahtişu, *Tıp Sanatı ve Nefisn Halleri*, (Tercüme: Abdulkadir Coşkun), Litera Yayıncılık, İstanbul, 2014.

[3] Ji bo agadarîyên zêdetir bnr. Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Ravekirin, Tîpguhêzî û Lêkolîn: Jan Dost), Nûbihar, İstanbul, 1010, r. 54. û r. 101.

[4] Ji bo berfirehîya mijarê bnr. R. P. Giuseppe Campanile, *Kürdistan Tarihi*, (Fransızcadan Çeviren: Heval Bucak), Avesta, İstanbul, 2009, r. 22.

[5] Galen (Miladî 129-201) yek ji hekîmên navdartirîn ê Romaya Antîk e. Claude Galen yaxud Galenê Bergamayî, di zimanê yûnanî de bi navê Galenos; di zimanê latînî de bi navê Galenus dihê zanîn. Di nav alema îslamê de navê wî Calînûs e. Ew li Pergamonê (Bergama) hatîye dinyayê û wî perwerdeya xwe ya ewil li cem bavê xwe yê mîmar Nikon wergirtîye. Çendakî dirêj li Romayê jîyaye. Wî digel dersên geometrîk û arîtmetîk, tehsîla mentiq û tibbê jî dîtîye. Bi taybetî ew çûye bajarên mîna Îzmîr, Corinthos û Skenderîyeyê û li wan deran hînî îlmê tibbê bûye. Li Girava Midîllîyê Medreseya Arîsto û felsefevanan nas kirîye. Peyre li ser vexwendina Lucius Verus û Marcus Aurelius çûye bakurê Îtalyayê. Çendakî di bin hîmayeya Imperetor Commodus û Septimus Sevberus de wekî fizîkvanekî xebitîye û dersên tib û felsefeyê daye û di vê biwarê de berhem nivîsîne. Ji bilî van wî cerrahtî ji bo gladyatorên Romayî kirîye û di seraya Împeretorîyê de bûye hekîm. Ew digel xebatên tedawîyê, li ser anatomî, fîzyolojî, farmakolojî û felsefeyê jî xebitîye. Galen, di serdema xwe de bûye hakimê zanista tibba zemanê xwe û wî ev şaxê zanistê li gor prensîbên orjînal ji nû ve bi keys kirîye. Bi vî awayî wî di qada metodolojîyê de nav û deng daye. Lewre li gor bîr û raya wî nexweşîn, ancax li ser bingeha analîzan dihên vekolan û başkirin. Fikrên felsefî yên Galen digel ên Îsewîtîyê ku wê hîna nû teşe digirt li hev dikirin. Lewre derdora Dêrê, lêkolînên zanistî û tezên felsefî yên Galenî diezimandin. Ji 400 berhemên wî 100 jê bi xêra parastina Dêrê gihaştine xelkê. Di pey wefata wî de jî berhemên wî hatine xwendin. Ji ber ku wî cara ewil ji Drogan derman îmal kirîye,

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

wekî bavê Eczatîtî û Teknolojîya Farmasotîkê dihê hesibandin. bnr. https://www.felsefe.gen.tr/galen-galenos-kimdir/ (tarîxa pêgihaştinê: 13.02.2022)

[6] Ji bo metin û dengê wê bnr. https://www.youtube.com/watch?v=SBbs6nzXoXQ (13.02.2022)

[7] Ji bo agadarîyên zêdetir bnr. Ahmet Kasımoğlu / Ehmedê Dirîhî, *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî/Kürtçe Bitki Adları Sözlüğü (Kurdî-Kurdî-Latînî-Tirkî)*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013.

[8] Bnr. https://krd.riataza.com/2016/10/21/hekime-kurmanci-dermane-kurmanci/ (tarîxa pêgihaştinê: 12.02.2022)

[9] Ji bo agadarîyên zêdetir bnr. *Kûçikê Daleqandî*, (Berhevkar: Dîyarî Asûr), Weşanên Weqfa Mezoptamyayê, İstanbul, 2019, r. 93-94.

[10] Bnr. *Meryemnîgarê*, (Berhevkar: Evîndar Şevîn), Weşanên Weqfa Mezopotamyayê, İst. 2019, r. 12-13.

[11] Ji bo bawerîyan bnr. *Ji Binbîra Kurdan Bawerîyên Gelêrî*, (Berhevkar: Nîhat Oner), Weşanên Wardozê, İstanbul, 2019, r. 49.

[12] Ji bo agadarîyên zêdetir bnr. Lio Yuqun, *Geleneksel Çin Tubbı*, (Çevirmen: Tuğba Andaç), Kaynak Yayınları, (1. Basım), 2016.

[13] Ji bo mijarê bnr. *eş-Şerhu'l-Muyesser li Sehîhi'l-Buxarî*, (Bi Qelemi Muhemmed Elî es-Sabûnî), el-Mucelledu'l-Xamisu, el-Mektebetu'l-Esriyye, Beyrût, 2016/1437, r. 254.

Kürmanci Kültüründe Halk Hekimliğinin Kökenleri

Özet:

Eski zamanlardan beri Kürmanc toplumunda halk hekimliği vardır. Göbekkayması, kırık-çıkık, psoriasis, nazar, kızamık, sarılık ve küçük dil iltihabı gibi günümüzdeki ileri olanaklara rağmen tedavisi zor olan hastalıkları halk hekimleri tedavi ediyorlar. Halk hekimleri çoğunlukla köylerde kendi evlerinde halk sağlığına hizmet etmektedirler. Onlar kısıtlı olanaklara rağmen gelneksel uzmanlıklarıyla hala çalışıyorlar. Kürmanc halk hekimlerinin mesleklerinin çoğunun kaynağını tarikat ocakları ve hoca evlerinden alırlar. Her ne kadar ocaklar dışında çeşitli hastalıkları tedavi eden hekim olsa da diğer çoğu hastalıkların hekimleri bir hoca evinden veya bir ocak geleneğinden gelmektedir. Bir hekim bizatihi bir ocak ailesinden değilse de o, hekimliğini daha önce hekim olan birisinden almıştır. Bu halk hekimleri ya kendi elleriyle hastaları tedavi ederler ya onlara ilaç verirler ya onlara ilaçları söylerler ya da onlara tedavi yollarını gösterirler. Kuzey Kürmancların coğrafyasındaki hekimlik, aslını nereden almış, bu meslek halk arasında nasıl başlamış, nasıl yer edinmiş ve günümüze kadar nasıl gelmiş elbette geniş bir araştımaya değerdir. Bu çalışmada Kürmanci halk hekimliğinin tarihi geçmişinin izi sürülecektir. Kürmanc halk hekimlerinin ocaklı olanları, ocaklılardan izin alanlar ve kendi özel imkanlarıyla bu mesleği elde edenler bu araştırmanın konusudur.

Anahtar sözcükler: *İlaç ve tedavi, Kürmanci hekimliği, ocak, halk sağlığı*

Zakho Centre for Kurdish Studies

Origin of Folk Medicine in Kurmanji

Abstract:

There is the folk medicine among Kurmanj public since old times. Despite the advanced facilities in nowadays it is hard to treat belly slip, fracture-discloation, psoriasis, touching by evil eye, measles, jaundice, inflammation of uvula however folk physicians treat these diseases. Most of folk physicians' are serving in their homes' in the villages. They are trying to serve despite the scant facilities. The source of most of the professions of the Kurmanc folk physicians is based on religious cult and hodja homes. Nevertheless there are other physicians is not based on religious cult or hodja home who is treating other various diseases however most of folk physicians are based on traditional cult quarry or hodja home. Even if a physician not based on actual religious cult he/she had permission from someone who used to be a physician. These folk physicians treat patients with their hands or give them medicine or tell them medicine or show them how to treat. Where did the medicine in northern Kurmanc geography get its origin, how this profession started among the people. How it took its place and how it has survived to the present day is of course worthy of a research. This research will search the history of Kurmanc folk medicine. Folk physicians who based on religious cult, who had permission from another physician and who do this job with their special facilities is subject in this research.

Key words: medicine and treat, Kurmanji medicine, religious cult, public health

Berawirdkirina ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiye û Seyahatnameyên Ingîlîzan ji Alî Agahiyên Folklorî ve

İbrahim TARDUŞ
Beşa Ziman û Çanda Kurdî-Zaningeha Artûklûyê-MARDİN-Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê/ Turkîya

Puxte:

Çavkaniyên dîrokî yên derbarê folklora Kurdan de agahiyan dihewînîn, dikarin pirekî di navbera rabirdû û dahatûyê de ava bikin. Yek ji wan, berhema Mele Mehmûdê Bazidî a bi navê Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye ye ku tê de derheqê foklora Kurdan a sedsala 19. gelek agahî hene. Gava ev berhem tê xwendin kêm zêde di serê mirov de çarçoveyeke jiyana Kurdan a wê çaxê zindî dibe. Mele Mehmûdê Bazidî vê berhema xwe di sala 1858-1959an de nivisiye. Yek ji aliyên wî yên girîng ew bû ku ev berhema derheqê çanda Kurdan de ji alî kesekî Kurd ve bi Kurdî hatibû nivîsîn. Heke em bixwazin folklora Kurdan a sedsala 19. vekolin ji bilî Mele Mehmûdê Bazidî, seyahatnameyên Ewropiyan bi taybetî jî seyahatnameyên Brîtanîyan dertêne pêşberî me. Ji ber ku Kurdîstan li ser rêya Hindistanê bû û Hindistan jî mêtingeha Brîtanyayê bû, gelek leşker, jeolog, sîxur, dîplomat an misyonerên Brîtanî berê xwe dabûne Kurdistanê di vê sedsalê de. Hin kesên ku hatibûne Kurdistanê, piştî vegera xwe seyahatname weşandibûn ku van seyahatnameyan derbarê folklora Kurdan de gelek agahiyên girîng dihewandin. Ji ber ku seyyah, di nav civata Kurdan de mabûn, berhemên wan, çavdêriyên wan ên rasterast bûn û derbarê Kurdên rêveber û Kurdên jirêzê de xwedî agahîyên berfireh bûn. Ji ber van taybetiyên xwe seyahatname rê didin ku mirov wan wekî çavkaniyên folklorî bi kar bîne. Lê ji ber ku agahiyên van seyahatnameyan bi çavekî xerîb, çavekî derveyî hatibûne dayîn, hin gûman li ser wan hene. Helbet çareserkirina vê meselê dikare bi saya agahiyên kesekî ku ji nav Kurdan li Kurdan dinêre, bê ronîkirin. Ji ber vê jî di vê xebatê de ê hewl bê dayîn ku du çavkaniyên folklorî yên sedsala 19., ango Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye û seyahatnameyên Brîtaniyan, bêne berawirdkirin û herweha şaşî, rastî û nirxa seyahatnameyan bê peytandin.

Peyvên Serekî: *Mele Mehmûdê Bazidî, çavkaniyên folklorî, ss.19., Seyahatnameyên Ingilîzî, Berawirdkirin*

1. Nijad û Zimanê Kurdan

Bazidî pêşiyên Kurdan ji eşîrên bedewî yên Ereban dihesibîne. Li gorî wî Kurd berî ku navê Kurd bistînîn çûne sînorên Îran û Xorosanê li wîr jiyane û bi bihûrîna demê re zimanê xwe yê bere ango erebî terikandine û ji zimanên li dora Îran û Xorasanê peyv standine û zimanê xwe ava kirine. Bazidî dibêje, li hin ciyên cuda hin ferq hene di navbera zimanê wan de û ev tişteke asayî ye. (Bayezîdî, 2012, r.35-40)

Li gorî seyyahên Îngîlîz ev mesele ne wisa ye. Seyyahên Îngîlîz piranî Kurdan wek neviyên Kardoxan dihesibînin. (Mignan, 1839, r.207-208) Hem erdnîgariya Kurdan

Zakho Centre for Kurdish Studies

hem jî şervaniya wan rê daye ku ev îhtîmal ji aliye wan we zêdetir bê parastin. Fraser dibêje ku Kurd wekî serdema Kardoxan hê jî şervan in, ev aliyê wan gelek bi qewet e. (Fraser,1840,c.1, r.73)Fikra Mîllîngen di vê mijarê de xwedî cudatiyekî ye, ew jî Kurdan wek neviyên Kardoxan dihesibîne, lê dibêje dibeku Kardox û Part bi hev ve hatibin gîrêdan û yek netewekî, netewa Kurdan pêk anîbin.(Millingen, 1870, r.207-208)Fikra Harrîs a di vê mijarê de cudatir e. Li gorî Harris Kurd, Med, Part an jî Kardu'yên dema Hîtîtîyan in û gava Arî hatine welatê wan ew jî bûne Arî.(Harris, 1896, r.177-178)Bi rastî jî ev şibandina şervaniya Kardoxan û Kurdan ne belesebep e. Balkêş e ku gava Bazidî behsa rêbazekî şervaniya Kurdan dike, rasterast vegotinên Ksonophon tê bira mirov. Çawa Bazidî dibêje gava dijmin zede bin û êrîşê bibin ser malên Kurdan, Kurd hildikişin çiyayan. Dijmin gava tên û bi talanê re mijûl dibin Kurd êrîşê wan dikin û elbette bi ser dikevin. (Bayezîdî, 2012, r.47) Çawa Ksenophon jî dibêje gava ew û dehhazar leşkerên xwe digihijine gundê Kardoxan li gund kesî nabînîn ji ber ku Kardox hilkişiyane çiyayan. Leşker gava digihijine gund, gundan talan dikin û paşî Kardox li ciyên guncav êrîşê wan dikin. (Ksenophon, 2009)

Çawa li jorê hatibû behskirin, Bazidî Kurdî wek ji Erebî derketî û peyvên ji dora Îranê û Xorasanê berhevbûyî dihesiband. Di vê mijarê de seyyahên Îngîlîz bêşik û guman Kurdî rasterast zimanekî serbixwe û xwedî diyalektan dihesibînin.(Harris, 1896, r.179) A ji bo wan sedî sed çareser nebûyî diyalektên Kurdî ne.Tozer, destnîşan dike ku Kurdî Medbinyad û ji malbata Hînd-Awropî ye, û ji alî peyv û rêzimana xwe ve nêzîkê Farisî ye. (Tozer, 1881, r.257-258)

2. Razan

Bazidî gava behsa wextê dawetên Kurdan dike, dibêje ku ew dawetên xwe axlebî biharan dikin, ji ber ku zivistanan ji bo bûk û zava ciyeke tenha tune ye. Pey re agahiyeke din dide li gor vê agahiyê eger cî tune be hemû malbat bi hev re di malekî de radizên. (Bayezîdî, 2012, r.43) Di ciyeke din a berhema xwe de jî dibêje eger di malek an di konekî de deh pazdeh kes ji hebin xwişk, bra bav, kur, dê, bûk zava tev bi hev re odeyekî de radizên, ev zarurî ye ji ber ku cî tuneye. (Bayezîdî, 2012, r.106) Ev agahî di seyahatnameya Millingen de jî dertê hemberî me. Çawa Millingen jî behs dike, ku ew di seyahatnameya xwe de axlebî behsa derdora Wanê û Erziromê dike ku ew der ciyên sar ên Kurdistanê ne, odeyekî malen Kurdan hem oda razanê hem jî oda rûniştinê ye, hemû malbat li vê odê radizên. (Millingen, 1870, r.178) Fowler jî dema li Diyadînê dibe mêvanê gundekî şahidiya heman tiştî dike, herkes li oda agir lê bi hev re radizê.(Fowler, 1841, c.1, r.240-241)

3. Xweparastina ji Xwînîbûnê

Adat û Rusûmatnameyê de tê destnişankirin ku Kurd ji bo xwîndarî nebin meyla qetlê/kuştinê nakin. Di şer de an jî di rêbirrî de ne alîgirê kuştinê ne, mirovan dişelînin û berdidin. (Bayezîdî, 2012, r.47) Heman agahî di seyahatnameyan de jî heye. Bo nimûne, Shîel behs dike ku rojek gava ew di rê de ne qantirçîyekî wî bêhnvedanek dixwaze, lê daxwaza wî nayê pejirandin. Qantirçî aciz dibe pêşiya wan digire û careke din bêhnvedanê dixwaze paşî navbera qantirçî û keseke din de şer dertê her du pevdiçin. Kesên din wan ji hev vediqetînin. Shîel dibêje ku bi her duyan re jî çek hebû, wan bixwesta dikaribû çeken xwe bi kar anîba, lê wan qet tiştekî wisa nefikirîbû ji ber ku wan nedixwest xwîndarîyekî bidin destpêkirin. (Shiel, 1831, r.79) Fraser jî gava behsa

Kurdan dike dibêje ew ji xwînrijandinê xwe nadine paş lê kuştinê jî naxwazin ji ber ku ew zanin paşî gelek encamên giran ên vê meseleyê dertên holê.(Fraser, 1840, c.1, r.192)Millîngen jî gava behsa mijara talanê dike, dibêje talanên Kurdan de armanc bidestxistina malê ye, ji ber wî ew xwîn narijînin û kesî nakujin. (Millingen, 1870, r.241-242)

4. Jin

Hem di Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyeyê de hem jî di seyahatnameyan de, derheqê jinên Kurd de gelek agahî hene û ev agahî hema bêje hevûdu piştrast dikin, ferqeke berbiçav tune di navbera wan de. Bazidî li gelek ciyan de behsa jinên Kurd dike, hetta li hin ciyan jinên Kurd ên niştecih û koçer berawird jî dike. Li gor adat û Rusûmatnameyê Ekradiyeyê jinên Kurd, di şer de alikariya meran dikin şervan in.(Bayezîdî, 2012, r.46) Ew wekî milletê Efrencî, Ewropiyan serbest in. Jin û keçên kurdan zêde şolker/jêhatî, wêrek û xwedî huner in, kulav berr û têrran çêdikin, hemû karên malê dikin, hespên mêrê xwe xwedî dikin, bazar dayîn û standin li ser milên wan e, di şewran de fikrên xwe dibêjin, (Bayezîdî, 2012, r.48-49)qedrê jinan di civakê de pir e, ew gava dikevine navberê neyaran, wan li hev tînin, (Bayezîdî, 2012, r.54) Bi ricaya jinan xwînî jî tên bexişîn, (Bayezîdî, 2012, r.58) Ew bi nefsa xwe mixtar nînin, gava bab an bira jê bixwazin bi kesekî re bizewice, keçik bixwaze nexwaze bi wî kesî re dizewice. (Bayezîdî, 2012, r.55) Kurd carna meseleya xwîndarîyê de jibo ku bi hev bikin keç û xwişkên xwe didin xweyiyê xwîne. Eger keç an keçeke xwîndar a nezewicî hebe û xweyiyê xwînê qebûl bike, xwindar xwişk an keça xwe ji ber xwînê dide xweyiyê xwînê. (Bayezîdî, 2012, r.89) Jinên kurdan zede şolker in, her dixebitin û karen malê dikin ji ber vî jî kêm nîmêjê dikin. (Bayezîdî, 2012, r.65) kemal îdrak û eqlê jinên Kurd ji yê mêrên Kurd zêdetir e, ew gelek dilivan in, (Bayezîdî, 2012, r.87) ehle qeneat in, xweyî îtaet in, di malan de zede îxtiyar in, xwedî qewt in, yanî ên malê bir ê ve dibin ew in. (Bayezîdî, 2012, r.88)Ew wekî jinên ereban rû enî û lêvên xwe deq didin. (106) lê bivênevê pirsek tê bira mirov, heta vê dere tiştên ku Bazidî di derheqê jinên Kurd de daye gelo tene ji bo jinên Kurd ên Koçer derbasdar in an na? Ji ber ku gava Bazidî jina yerlû/niştecih û koçeran berawird dike, kêm zede agahiyên berê dubare û kurte dike û derheqê jinên Kurd ên niştecih de dibêje ew hêsayîperwer în, zêde tirsonek in, ew hemû karen malê nakin tenê nan dipêjin, xwarin çê dikin û cildişon karen din hemû li ser meran in. (Bayezîdî, 2012, r.119-120)

Seyyahan gava behsa jinên kurdan kirine, yekem tiştê ku bala wan kişandiye, rûnepoşiya jinên kurdan e. Li gor Kinneir, Layard û Harrîs hemû jinên kurd rûyê xwe naxumînin.(Kinneir, 1818, r.411 ; Layard, 1853, c.1, r.153 ; Harris, 1896, r.236) Lê li gorî Shiel jinên bajarnişîn rûyê xwe dinuxîminin, lê yên çadirnîşîn rûyê xwe naxumînin.(Shiel, 1831, r.69) Bi destnişankirina vê taybetiyê armanca wan nîşandayîna serbestiya jinan e. Çawa Bazidî ferqek dêxe navbera jinên yerlû û koçeran seyyah jî rasterast nebêjin jî gava behsa jinên koçer dikin dibejin ku ew azad, çalak û di meseleyên malbatî de xwedî maf û gotinan e, ew ne bindest in û dikarin bi meran re di heman ciyê de bin.(Kinneir, 1818, r.411 ; Layard, 1853, c.1, r.314 ; Harris, 1896, r.236, Shiel, 1831, r.69)Ew di hareme de ne hebskirî ne û di kirin û gotinên xwe de wek jinên ewropî azad in.(Mignan, 1839, c.1, r.299)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Bazidî di berhema xwe de destnîşan dike ku mêrên Kurd ne kumreş û bedguman in. Jin eger din av meran de xeber bidin, bikenin û bilîzin jî mêrên wan tiştên nebaş nafikirin. Jinên Kurd perdenişîn/rûnixumandî nebin jî axlebê wan baş in, lê gelek kêm be jî yên nebaş hene. Gava jinek di wê manê de xirabiyek bike, tê kuştin. Eger jina xirab û mêrê ku ew kar pê re kirî bene dîtin her du jî tene kuştin.(Bayezîdî, 2012, r.107-108) ev agahiyên ku ji alî Bazidî ve hatine dayîn hem ji alî seyyahên berî wî hem jî ji seyyahên piştî vî dikarin bên piştrastkirin. Bo nimûne gava Rich behsa jinên Kurd dike dibêje herçiqas ew azad û neşermoke bin jî, qet jinek wekî jinên Kurd nikare biedeb û biehlaq be.(Rich, 1836, c.1, r.284-285)Harrîs jî div ê mijarê de tiştên manend dibêje, li gorî harrîs din av kurdan de bê exleqî hema bêje qet peyda nabe, lê eger îxanetek qewimî her du alî jî tene kuştin. (Harris, 1896, r.171)

Millingen yek ji wan seyyah e ku derheqê jiyana jinên Kurdan de agahiyên berfireh dane. Çawa ku Mîllîngen destnîşan dike ew, li gor jinên misliman ên cinar azadtirin, di têkiliya mêr û jinan de êdî rehet in û di mijarên civakî û polîtîk te xwedî gotin in. Ew di mijarên xwîndarî, plan û kompolyên eşîrê de her tiştî zanin. Bo nimûne, xanima serokeşîra Mîlî wekî şêwirmend, sekreter û xezînedara mêrê xwe bû, gava mêrê wê miribû, mezinên eşîra pir rûmet dabûyê. (Millingen, 1873, r.251) rojek gava Millingen li maleke Kurdan mêvan bû, ji ber meraqa xwe ji odeya xwe derketiye û çûye mitbexê, li mitbexê du jin dîtine. Li wir tiştekî bala milingen kişandiye, ew her dû jin wekî jinên Ermeniyan netirsiyane û wekî jinên tirkan teqlîda şermê nekirine û wê rewşê wekî rewşeke edetî ditine.(Millingen, 1873, r.126)

Çawa ku Aînsworth neqil dike, du jinên serokê Kurdên Akçadaxê rûvekirî û wek dayikên lehengan biesl li rex mêrê xwe li ser hespên xwe siwar bûne. (Ainsworth, 1842, c.1, r.250) Û çawa ku Heude jî neqil dike, jinên Kurd her tim li ba mêrên xwe ne û bi cesaret û maharet siwarên hespên xwe ne. (Heude, 1819, r. 209)

Me li jorê destnîşan kiribû ku Bazidî ji alî kemal, îdrak û eqlê ve pesnê jinên kurd dabû. Di vê mijarê de Lady Shiel ji bo jinên kurd dibêje ji ber ku ew tevlîmeseleyên malbatî û eşîrkî dibin ew gelek jîrek in.(Sheil, 1856, r.253) Xebatkariya jinên kurdan bala gelek seyyahan kişandiye, wan di berhemên xwe de xebatkarî û jiyana wan a zehmet destnîşan kirine û ji be r jiyana wan a zehmet vê jî lê zêdekirina, delaliya wan a demen ciwantiyê ji ber zehmetî, zayîn û pirkariya wan nemaye demen paşî û ew zû pîr bûne. (Bird, 1891, c.2, r.353; Fraser, 1840, c.1, r.193; Brant&Glascott, 1840, r.418) Heude derbarê vê mijarê de wiha dibêje: Jinên Kurd, di xortaniya xwe de şîrîn, rûken û wek perîyên çiyayan in. Ew di navseretiya xwe de wek amazonan in, Helwestên wan wek perçeyek ji rewşa wan a azad e. Lê çerm û zerafata rûçika wan piştî demekî kin girêdayî şert û mercên jiyanê diguhere. Ew di 15 û 20 saliya xwe de serdemên xwe yên zêrîn dijîn lê di 25 saliya xwe de hêdî hêdî diçilmisin.(Heude, 1819, r.209)

Tişteke din ku hem Bazidî hem jî Seyyah behsê dikin deq e. Bazidî di berhema xwe de nivîsandiye ku keç û jinên Kurdan wekî jinên Ereban rû, enî û lêvên xwe deq didin. (Bayezîdî, 2012, r.106) Buckîngham gava ji Amûdê derbas dibe neqil dike ku jinên wê dere wekî jinên Erebên çolê lêvên xwe şîn dikin. (Buckingham, 1827, r.236) Û gava Layard kona eşîra Milîyan ziyaret dike dinivisîne ku li ser mil û laşê jinan deq hene. (Layard, 1853, c.1, r.314-315)

Mirov dikare li vir behsa serbestiya jinan bike. Gelo gava Bazidî û Seyyah behsa serbestiya jinan dikin ev serbestî tê wê wateyê ku jin bixwaze çi bike dike an ev serbestî

ew e ku carna fikira xwe ya di nav civatê de bêje û li hember biyaniyan şerm neke? Li gorî min ne hewceye ku ev rewş bê romantîzekirin, serbestiya jinên kurd ne serbestiyeke bêsînor bû, serbestiya wan di karên rojane de bû, di meseleyên heyatî de ew ne serbest bûn.

5. Zome û Kon

Bazidî di berhema xwe de behsa jiyana zomeyê û taybetiyên konan dike, wekî wî seyyah ji gava li konan dibine mêvan behsa jiyana zome û konan de agahiyan didin. Çawa ku Bazidî behs dike, Kurd piştî meha Adarê pêşî diçine Warê Kozê, Warê Kozê nêzîkê qişlakan e, wextek şûn de havînan jî dertên zozanan.(Bayezîdî, 2012, r.44) Jiyana Kurdan a li warê kozê û Zomeyê di konan de derbas dibe. Her zomeyekî de du nobedar hene her yekli kenarekî zomê nobedariyê dike, gava nobedar pejna dijminan bikin dikine gazî, xelqê zomeyê jî bi wî alî ve diçin.(Bayezîdî, 2012, r.50) Mêvanên ku bene zomeyê mêvanên axa an jî rispî ne. Heger zede bin wan li konan belav dikin. (Bayezîdî, 2012, r.50) Axa maqul û dewletlû xwediyên qehwe û taxîm in. Eger taxîmên mêvanan hebin jî axa nahêlin ku wan taximan bikarbînîn. Axa taximên xwe didin şixulandin. (Bayezîdî, 2012, r.50)Di konên axa û rispiyan de çît hene, kon bi van çîtan hatine dabeşkirin, alî meran dîwanxane ye, mêvan li wir dimînin. (Bayezîdî, 2012, r.51)Li her zomê de melayek heye, ew mela bang dide, nimêj dide kirin, dersa zarokan dide, nikah dibirre, li ser miriyan dixwîne û wan defn dike. Zome jî zekat û fitreyên xwe dide wî melayî. (Bayezîdî, 2012, r.51)Axayên mezîn xwedî konên Erebî yên çarstûnî ne ku wekî dîwanxane bi kar tînin. Li derdora wê konê jî bi qasî deh konên soî hene ku ji bo xulam, qaweçî, solgerî, şîrger, terzî, çakmakçî, û serraciyan in. Rojê du caran xwarin tê dayîn di kona Erebî de. Bi qasî çarsed-pênsed kesan di vê konê de xwarin dixwar. Hin axa hebûn kudi ji bo xwarinê rojê barek birinc û ritilrk qahwe xerc dikirin. Kesên eşîrê û cîran dihatin xwarin dixwarin û qahwe vedixwarin. (Bayezîdî, 2012, r.(86) Konên Kurdan ji du stûnan heta neh stûnan e. Konên jaran du sê an çar stunî ne. Yên ewset yanî navîn pênc şeş û heft stûnî ne. Yên axayan û û dewlemendan jî nehstûnî ne. Çadirên wan bi çîtan hatine dabeşkirin alîyek ji bo jinan û aliyek ji bo meran e gava baran dibare û dibe sermayek li aliye jinan yek jîşi aliye meran du agir hil dikin û konê germ dikin. (Bayezîdî, 2012, r.125)

Seyyah jî di behsa kon û zomeyan da van agahiyan didin ku ev agahî û agahiyên Bazidî dayî hema bêje hev piştrast dikin. Lê divê bê gotin ku seyyahên li zomeyan bûne mêvan axlebî li konên axayan bûne mêvan ji ber vê jî agahiyên wan zêdetir derbarê konên axayan de ne. Jixwe Bazidî jî destnîşan kiribû ku mêvanên zomeyê axlebî dibine mêvanên axa û rispiyan. Li gor çavdêriyên seyyahan zomeyên Kurdan axlebî nêzîkê avê tên avakirin. Nêzikbûna avê meseleyeke heyatî ye ji ber ku xelk bi xêra avê paqijiya xwe dikin û ava vexwarinê bi dest dixin. (Fraser, 1840, c.1, r.49; Shiel, 1831, r.88) Konên axayan di navenda zomeyê de ye, û konên di wek xelekekî li dora kona axa cî digirin.(Shiel, 1831, r.88) Li navendîbûna kona axa ji du aliyan ve girîng e. Bi vî awayî axa hem hakimê zomeya xwe ye û hem jî li ciyê herî ewle ye, dema êrîşek bê ser zomeyê parastina axa hêsantir dibe. Axlebî li dora kona axa nobedar hene. Gava Harris li nêzîkê Mahabadê mêvanê Baîz Axa ye li ber derîyê wî du nobedar dîtine.(Harris, 1896, r.204-205) Hem xelk hem jî rispiyên zomeyê li kona axa dicivin û pirsgirêkên rojane xeber didin. (Millingen, 1870, r.285) Li konê ji bo hemûkesan qehwe tê pijandin û qelûna mêvanan tê pêxistin. Parry di vê mijarê de dibêje ku her axayek qehweciyekî xwe hebû,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینین کوردی

piştî qulîbina tavê, ji bo herkesê li konê qehwe dihat pijandin.(Parry, 1895, r.24)Vexwarina qehwê hewqas berbelav e ku seyyahek ji vê rewşê heyirî dimine û dibêje ez nizanim gava qehwe tunebû Kurdan çî vedixwar?(Mignan, 1839, c.1, r.265)

Ligorî Mignan zomeya Kurdan ji sê ristikan pêk tê, li ristika yekem ango li navendê kona axa heye, li ristika duyem konên eqrebayên axa yên herî nêzîk hene, li ristika sêyem jî konên reayaya girêdayî axa hene. (Shiel, 1831, r.88) Lê li vir divê bê destnîşankirin ku ev agahiya Mignan dayî û ya Bazidî rasterast hev nagirin. Çawa Bazidî destnîşan kiribû di li dora kona Erebî ya axa bi qasî deh konên spî hebûn ku ji bo xulam, qaweçî, solgerî, şîrger, terzî, çakmakçî, û serraciyan bûn. Yanî li gor Bazidî konên nêzîkê kona axa konên xizmetkarên wî ne, lê li gorî Mignan jî konên eqrebayên axa ne.

Konên Kurdan exlebî reş in. (Kinneir, 1818, r.375; Harris, 1896, r.197) Li gor meziniya xwe xwedî stûnan in, stûn dora 2,5-3 metreyan dirêj in.(Harris, 1896, r.197-198) Seyyahan derbarê hejmara stûnan de agahiyên cuda dane û sedemekî ji bo hejmara wan ne gotine. Lê Bazidî hejmara stûnan bi dewlemendî û statuya kesan ve girêdabû. Harris ji bo piraniya konên kurdan dibêje ku ew ji 3-5 stûnan pêk tên.(Harris, 1896, r.198) Kinneîr li nêzikê Çiyayê Sîpanê gava dibe mêvanê axayekî Kurd dibêje kona wî ji neh stûnan pêk dihat.(Kinneir, 1818, r.375) Rawlinson gava behsa konan dike ku destnîşan dike hejmara stûnan di navbera 10 û 20î de diguhere.(Rawlinson, 1839, r.50)Dikare bê gotin ku hejmara stûnan bêgûman bi dewlemendî û statûye ve girêdayî ye, lê herem herem ji diguhere. Yên Bazidî behskirî axlebî derdora Erzirom û Wanê ne, kona ku Kinneir lê mêvanbûyî jî ji neh stûnan pêk dihat û di teritoryaya Bazidî behskirî de bû.

Li gor çavdêriyên seyyahan jî konên Kurdan bi çîtan hatine dabeşkirin, li aliyekî jin dijîn li aliyekî jî mêr.(Shiel, 1839, r.313-314) Rawlinson di vê mijarê de hin agahiyên cudatir dide. Çawa ku ew dibêje di konên Kurdan de qismên diwanxane, aliye jinan/enderûn, cihê xizmetkaran, mitbex û pang/axur heye. Li diwanxanê xaliyên ku jina raçandî raxistîne û di nîveka diwanxanê de kortalek heye ji bo agirê.(Rawlinson, 1839, r.50) Hundirê konan bi xaliyan raxistî ne û tê de gelek minder hene.

6. Mirî û Mirin

Bazidî di Adat û Rusûmatnameyê de ûseyyah jî di seyahatnameyên xwe de derheqê rîtuelên mirîveşartinê de hin agahiyan didin. Dema ev her du çavkanî bên vekolan tê ditîn ku Bazidî agahiyên êdî bi teferruat in. Lê heke agahiyên ku seyyahan dane bi yên Bazidî re bên berawirdkirin tê dîtin ku agahiyên seyyahan herçiqas perçe perçe bin jî ji rastiyê ne dûr in. Li gor Bazidî gava yek dimire, xelk cilên reş li xwe dikin, jin û keç û xweh guliyên xwe jê dikin. Eger mirî mêr be, hespê wî dixemilînin, çekên wî bi hespê ve girê didin, bi vî awayî hespê mirî jî tevlî cinazeya mirî dibe. Cileke bi qîmet a mirî jî heta davêjine ser tabuta wî û heta serê qebran dibin. Ewcil paşî bo meleyan dimînin. Bi qedr û bi rûmet mirî tê veşartin. Kesên ku guliyên xwe jê kirine, guliyên xwe li ser qebrê dilawêsin. Jin ji bo mirî lawjeyên qezebşewitî dibêjin. Heta panzdeh rojan nas û dostê mirî qebra wî ziyaret dikin, dixwînin, sedeqe didin û xêran dikin. Heta sê rojan li mala mirî xwarin nayê pijandin, cîran xwarin tînin. Gava heft roj temam dibin cîran diçin cilên mirî dişon û li feqîran belav dikin. Gava bîst rojê mirî temam dibe helawa mirî çê dikin û belav dikin. Kesên reşgirêdayî heta şeş mehan an salekî cilên reş li xwe dikin û di wê maweyê de naçin dawet û kêfxweşiyan. Paşî axayên wan an xizmekî

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

wan, wan teselli dikin û cîlên van ên reş ji wan distînin û yên nû didine wan. (Bayezîdî, 2012, r.52-53)

Agahiyên ku seyyahan dane di mijara mirî û mirinê de ev in: Dema axa an leşkerek bimire, haya nas û dostan jê çêdikin, ji bo xakspartina mirî wextek tê diyarkirin, di wê wextê te tabuta mirî hildigirin. Hema li pişt tabutê hespê kesê mirî heye û li ser hespê jî çek û cilên mirî. Jina mirî û nasên wî cilên reş li xwe dikin.(Millingen, 1870, r.380)Jina mirî wextê xakspartinê de xwelî li sere xwe dike û bi şûrê mêrê xwe pora xwe jê dike.(Layard, 1853, c1, r.94)Jin li ser qebrê miriyan lawjeyan dibêjin û pir li ber wan dikevin.(Fraser, 1840, c.1, 153-154)

7. Rastbêji

Bazidî di ciyeke berhema xwe de gava behsa wêrekî û rastbêjiya Kurdan dike dinivisîne ku eger ew zanibin ê îşkence li wan bê kirin û ew ê bên kuştin jî dîsa ew dev ji rastbêjî û wêrekiya xwe bernadin. (Bayezîdî, 2012, r.63) Seyyah li gelek ciyan behsa wêrekiya Kurdan dikin, seyahatnameyekî ku behsa wêrekiya kurdan tê de tunebe tuneye. Lê di seyahatnameyan de rasterast behsa rastbêjiya Kurdan nayê kirin. Disa jî minakek heye ku esasen sê taybetiyên Kurdan dihewîne. Wêrekî, baweriya bi qederê û rastbêjî. Ev minak di seyahatnameya Curzon de cî digire û Curzon bixwe bûye şahide vê. Çawa ku Curzon neqil dike: Rêvebirên Erziromê sê sal in ku li pey kesekî ne. Wî kesî gelek kes kuştine û tevlî gelek diziyan bûye. Cara dawîn hespek diziye û biriye Erziromê da ku bifiroşe. Xwediyê hespê, hesp dîtiye û nas kiriye. Paşî çûye giliya wî kiriye. Rêvabiran sûcdar girtine. Gava waliyê Erziromê jê pirs kiriye tu kî yî? Wî gotiye: " Bêguman ev qeder e, ez ew kes im ku hûn li pey in. Qedera min, ez anîm Erziromê û vêga ji ber ku min hespek diziye hatime girtin. Dema min ev hesp dizî, min hest kir ku ê mirinamin ji ber vê hespê be. Wextê min qediya. Ev qeder e." Piştî van gotinan beyî ku şikayet bike diçe sêdarê û tê darvekirin. (Curzon, 1854, r.89) Ev bûyer ji bo Curzon ecêb hatiye, ji ber ku diz dikaribû tene cezayekî biçûk bistîne ji ber diziya hespê, lê wî sucên xwe yên din jî îtîraf kiribû û bîbû sebebe darvekirina xwe. (Curzon, 1854, r.96)

8. Xwarin

Bazidî gava behsa dawetan dike, behsa xwarinên Kurdan jî dike. Lê Bazidî di vê mijarê de êdî ji kijan sedemê be agahiyên kêm dane, ji ber ku di seyahatnameyên Îngîlîzan de behsa gelek cûre xwarin û vexwarinan tê kirin. Çawa ku Bazidî dibêje, Kurd tenê goşt û birince çê dikin ji ber ku wan kêm cure zadan dîtine û nizanin tiştên din çekin. (Bayezîdî, 2012, r.72) Lê metna Bazidî de hin agahiyên din hene ku vê tesbîta Bazidî têk dibin. Bo nimûne dibêje Kurd çiqas xwedî pez û rizq bin jî ji bo xwe pez şerjê nakin, heke mêvanek bê şerjê dikin. Hetta ew hindek mubalaxa dike dibêje ku ew bimirin jî ji bo xwe pezekî şerjê nakin. (Bayezîdî, 2012, r.98-99) Diyar e ku di navbera van agahiyan de dubendiyek heye. Kesên ku tenê dikarin goşt û birinc çêkin eger ji bo xwe pez şerjê nekin ê bimirin ji birçînan, encax mêvanek were bigihîje hawara wan. Di vê mijarê de eger mirov wisa bifikire dikare neheqiyê jî li Bazidî bike ji ber ku gava wî behsa goşt û birincê kiriye esasen behsa xwarinên dawet û ziyafetan kiriye.

Seyyahên Îngîlîz gava li mal an konên Kurdan bûne mêvan behsa xwarinên ku dane wan kirine. Ji agahiyên wan em dikarin zêdetir derbarê xarinên Kurdan xwedî agahî bibin. Li gor seyyahan meseleya goşt û birince zêdetir bi dewlemendiyê ve eleqedar e, neku bi nezanînê ve.Dema ew bûne mêvanên axa an dewlemandan goşt û

Zakho Centre
for Kurdish Studies

birinc û hin cure xwarinên din dane wan. Gava bûne mêvanê jar û feqîran jî goştê mirîşkan û savar û gelek cûre xwarinên din dane wan. Millingen bixwe hem bûye mêvanê dewlemend û feqiran û çavdêriyên xwe nivisandine.(Millingen,1870, r.20) Dîsa li gor çavdêriyn seyyahan dikare bê gotin ku goştê sûsik, werdek û masiyan jî gelek dihate xwarin. (Fraser, 1840, c.1, r.96-97) Bi taybetî li dora Wanê xwarina masiyan zaf bû, xelkê hatina dema masigiriyê bi mihrîcan pîroz dikirin. (Millingen, 1870, r.189) Ji bilî van seyyah behsa kofte û xurmeyên di donê de qelandî,(Brant&Glascott, 1840, r.415)gelek fêkî û sewzeyên hişkkirî,(Millingen, 1870, r.181; Maunsell, 1890, r.112-113) û cureyên sirke, nardank, şerbet û dimsan kirine.(Millingen, 1870, r.128-129; Parry, 1895, r.173-174, Forbes, 1839, r.427)

9. Qişlakçî

Bazidî gava behsa têkiliyên Kurd û fillehan dike, behsa qişlakçiyan jî dike. Qişlakçî Kurdên koçer in ku zivistanan tên gundên filleh û Kurdan û li gundên wan diminin. Hem Bazidî hem jî seyyah destnîşan dikin ku koçer gelek neheqiyê li niştecihan dikin. Bazidî dibêje ku qişlakçî hate biharê li gundan dimînin û bi qotekî nan û zaden niştecihan ji wan distînin û gelek zehmet û xisarê didin filleh û misilmanên niştecih. (Bayezîdî, 2012, r.115) Gava dewarekî qişlakçiyan zivistanê li gund dimire, qişlakçî gava diçin zozanan heqê wê dewarê ji gundiyan distînin. Eger gundî nedin bi qotekî ji wan distînin. Carna diçûn hin gundan kîsê vala didane wan da ku wan kîsan bi ceh û genim tijî bikin. Helbet ew nan û genim neheqê wan bû lê dîsa jî ji wan distandin. Gundî ji koçeran pir ditirsiyan û neçarî bi ya wan dikirin. Ji bo wan reyekî din tunebû. Bazidî dibêje ku ev tişt heta Siltan ebdilmecîd Esakirî Nizamiye ava bike berdewam kiriye. (Bayezîdî, 2012, r.116-117)

Gava seyyah behsa vê meseleye dikin kêm zêde agahiyên Bazidî dayî dubare dikin lê di metnên wan de du xal balê dikişinin. A pêşî ew tenê ji bo derdora Mûşê behsa vê meseleyê dikin, a duyem jî heke mirov li metnên seyyahan binere zen dike ku ev nihaqiya qişlakçiyan tene li ser Xristiyanên heremê heye. Ew her behs dikin ku ev neheqî li Xrîstiyanan tê kirin. Ew, vê meseleyê wekî sedema herî girîng a koçkirina Ermenan dibinin. (Ainsworth, 1842, c.2, r.378-381; Tozer, 1881, r.285; Millingen, 1870, r.243; Brant, 1836, r.353; Brant, 1836, r.348) Çawa tê zanîn piştî şerên Osmanî û Rûsan gelek Ermenîyên heremê, koçî Rusyayê kiribû. Çawa ku Ainsworth destnîşan dike tenê ji deşta Mûşê hezar malbatên Ermeniyan koçî Rusyayê kiribû.(Ainsworth, 1842, c.2, r.379)

10. Ziyaret, Şêx û Nivişt

Çawa ku Bazidî neql dike Kurd zaf îtîbarê didine ziyaretan. Ew dar an berekî ziyaret dizanin û qurbanan dibin şerjê dikin û mûmam vêdixin. Gava nexweşekê wan hebe, ehd didin ku nexweşê wan baş bibe, ew ê pêxwas herin wê ziyaretê û qurban û mûman bibin. Gava nexwêşê wan baş dibe ehda xwe bi cî tînin. (Bayezîdî, 2012, r.82)

Seyyahên ku li Kurdistanê geriyane li gelek ciyan behsa ziyaretan kirine. Çawa ku ew behs dikin Kurdan gelek îtîbarê didan wan ziyaretan. Ji ber vî ye ku ew darên dora ziyaretan qet jê nakin û naşêwitînin û gava van ziyaretan ziyaret dikin ji bo ku ji nexweşî, derd û qedara xwe bifilitin kincan bi daran ve dikin. (Maunsell, 1890, r.83; Millingen, 1870, r.220) Heywanên ku li derdora ziyaretan dijîn nayên nêçîrkirin û kesên ku li wan deran nêçîrê dikin wekî bêdîn tên dîtin.(Rich, 1836, c.1, r.51-52) Fraser gava nêzîkê Silêmanî dibe û ji Silêmanî dertê hin ziyaretan dibine. Ji rehberê xwe pirs dike ku ev ziyaret çawa ava bûne. Rehbere wî jê re dibêje, eger kesekî nexweş di xewna xwe de li

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

ciyekî weliyekî Xwedê an melayekî bibine, ev tê wê wateyê ku ew weliyê Xwedê an mela dixwaze ew der bê selihandin. Kesê ku xewndîtî jî ji bo minetdariya xwe nişan bide hin keviran dibe wê derê û wê dere destnîşan dike. Û paşî hin nexweşên din tên wê derê û keviran tînin û bi demê re gelek kevir li wir kom dibin. Kesên difikirin ku bi xêra wê derê baş bûne ji cilên xwe perçeyek diqetînin û bi çiqlên darên wê derê ve dikin. (Fraser, 1840, c.1, r.166)

Ziyaret ne tenê ji bo Kurdên misilman ji bo Kurdên Êzidî û Kurdên Yarsan jî pir girîng in. Bo nimûne ziyareta Baba Yadgar ji bo Yarsanan ciyeke pîroz e.(Rawlinson, 1839, r.36) Dîsa ziyareta Dikkanî Dawûd ji bo wan ciyeke pîroz e. Çawa Bird destnîşan dike Yarsan her sal wekî wezifeya xwe ya hecê bi cî bînin diçine Dikkanî Dawûd û qurbanan şerjê dikin.(Bird, 1891, c.1, r.85)Herweha seyyah behsa ziyaretên Êzidiyan jî dikin. Êzidî her sal diçin Şeyh Adî ziyaret dikin, cilên xwe yên nû bi ava wê derê dişon, ji axa wê hinek radijinê û her şeveq piçek jê dixwin. Û divê di tirba her Êzidiyekî de hinek ji wê axê hebe.(Maunsell, 1890, c.1, r.149) Ciyeke din ê ku ji bo wan pîroz, Şêxan e. Ew wek rituelekî her sal wê derê jî tawaf dikin.(Buckingham, 1827, r.266)

Bazidî di derheqê Şêxan de nivisiye ku Kurd zêde qedrê Şêxan digirin, ji xeberên wan dernakevin. Eger malê şêxan li çolê jî bibînin nadizin. Nexweş, dîn û harên xwe tînin ocaxa şêxan û bawer dikin ku şêx ê wan baş bikin. Gava tên ligel xwe pez û dewaran tînin û dikin qurban ji bo van ocaxan. Dîsa her eşîrekî Kurd şêxekî xwe heye û her kurdek salê carek diçe ba şêxê xwe û dewarekî dike diyarî. Zarokên kurdan jî bi şêxê bavê xwe ve girêdayî ne û naçine ba şêxeke din. Gava Bazidî van agahiyan dide vê rewşê rexne jî dike û vê helwestê wekî helwesteke cahiliyeyê dibîne. Dibêje kaşo bab û kalên şêxan mirovên salih û şêx bûne,lê ewladên wan ên vêga cahil bêedeb û nezan in. (Bayezîdî, 2012, r.103-104)

Di seyahatnameyan de jî derheqê şêxên Kurdan de hin agahî hene. Li gor seyahatnameyan tê fêmkirin ku şêx di nav civata Kurdan de ne tênê di meseleyên dînî de, di meseleyên civakî û polîtîk de jî xwedî bandoreke xurt bûn. Li gorî Millingen, Kurdan di meseleyên dînî de gelek baweriya xwe bi şêxan dianîn û gelek rêza wan digirtin. Şêx wek serokên wan ên dînî bûn. Eger di meseleyekî de niqaş hebûna, Şêx diciviyan û biryar didan, biryara wan wekî qanûnê bû. (Millingen, 1870, r.219) Di seyahatnameyan de bi awayekî hûrgilî behsa du şêxên misilman tê kirin. Yek Şêx Mewlana Xalid e, yek jî Şêx Taher. Gava Rîch behsa Mewlana Xalid dike dibêje ku yên li Silêmaniyê Şêx Xaid re dibêjin Mewlana Xalid û wek gotînên wî wek îlhamî û hedîsan dibînin. Nêzikê duwazdeh hezar miridên wî hene. Di nav mirîdên wî de ne tenê xelk hene. Mahmûd Paşa, Osman Beg û hemû rêvebirên Kurdan jî mirîdên wî ne. Ew keseke di merteba Evdilqadir Geylanî de ye. Rêvebirên Silêmanîyê jibo ku pêşiya îxanetê bigirin li ba wî li ser şûr, Quran û telaqên xwe sond xwarine. (Rich, 1836, c.1, r.148) Layard jî di seyahatnameya xwe de cî dide Şêx Taher. Çawa ku ew destnîşan dike di navbera Şêx Taher û Mîr Bedirxan de pêwendîyeke xurt heye û wî piştgirî daye êrîşa Bedirxan a li ser Nasturiyan. Bavê Şêx Taher jî bi kerametên xwe di hemû Kurdistanê de bi navûdeng bûye.(Layard, 1849, c.1, r.227)

Di adat û rusûmatnameyê de hatiye nivîsîn ku Kurd jibo ji nexweşî û derdên xwe bifilitin niviştan didin nivîsîn. (Bayezîdî, 2012, r.111-112) Seyyahan jî derheqê niviştan da heman tişt nivîsîne. Bo nimûne gava Forbes li Şengalê bûye, hin gundiyan jibo wan ji nexweşî û xetereya biparêze, hin jinan jî ji bo keçên wan zû bizewicin ji Forbes xwestine ku ew nivişt binivîse.(Forbes, 1839, r.419) Çawa Fraser ji rehberên xwe neql dike li Hewlêrê jineke pîr heye, gava zarok nexweş dikevin zarokan dibin ba wê pîrejinê, pîrejin li ser wan dixwîne perçeyek pot û pereyekî hesin dide wan. Ev pereyên hesin û pot jibo wan biparêze bi serpûşa zarokan ve tê dirûn.(Fraser, 1840, c.1, r.82)

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Herçiqas Fraser rasterast tiştê behsa tiştên di nav potê de nekiribe jî, pir hêsan em dikarin bêjin ku di nav wî potê de kaxezeke nivisî heye û Kurd ji vê tiştê re dibêjin nivişt.

11. Çekdarî

Bazidî dinivîse ku Kurd zêde zêde qedrê hesp û çêkên xwe dizanin, wan bi emanetî nadin birayê xwe jî. Her daîm çek û alatên herbê ligel wan in. Dibêjin me hewqas alat û çekan hilgirtiye, eger rojek pêdivî bi wan hebe û ew ne ligel me bin, nabe. Hetta Bazidî destnîşan dike ku wextê nimêjê jî çekên wan ligel wan in. (Bayezîdî, 2012, r.90) Ew zarokên xwe hînî silahşoriyê dikin, rimbazî, siwarî û tifingendaziyê hînî wan dikin. Her tim behsa şer û pevçûnên berê dikin ji wan re.(Bayezîdî, 2012, r.97) Di nav Kurdande lîstina şûr ûmertalê zêdeye. Lawêd wan zêde rahênan dikin ku di bikaranîna mertalê de jêhatîbin. Dawiyê de ew hewqas jêhatî dibin ku dikarin xwe ji hemûşûr û derban biparêzin. Heta şivan, gavan û zarokên Kurdan jî xwedî şûr, mertal û xencer in. Kurdên Botan Hekarî Badînan hemû xwedî şeşxane ne. Ew bê çek naçin serê avê jî û ew zaf gulleendaz in, dikarin bi şeşxana xwe çivikên li hewayê jî bixin. Heta mela û biçûkên wan jî xweyî şeşxane, çek û xencer in. Kesên dewlemend mexsûs bo şeşxaneyekî diçin stenbolê dikirin û tên. (Bayezîdî, 2012, r.128)Bazidî xwestiye qedrê çek û hespan a li ba Kurdan bi vî awayî destnîşan bike. Ji ber ku ev rewş ji bo wî nerewşeke awarteye, zêde behsa kitekitan nekiriye. Lê gava seyyahan behsa çek, alat, hespû çekdariya Kurdan kirine, bi hûrgilî mînakan dane. Dikare bê gotin ku pêwendiya çek, hesp û Kurdan ji bo wan gelek balkêş hatiye.[1] Çawa ku Layard dibêje Kurd ji serî heta binî biçek in.(Layard, 1853, c.1, r.53) Buckingham bixwe dîtiye hê zarokekî ku ji deh salî bîçûktir, bi hostetî rîmê bi kar tîne, çekan vala dike û siwarekî gelek baş e.(Buckingham, 1827, r.256) Fowler jî dibêje hê gava zarok heft salî ne bikaranîna çekan hînî wan dikin. (Fowler, 1841, c.2, r.23) Hezkirina çekan ne tenê aîdê mêran e, çawa ku Buckinham vediguheze, jin jî herî kêm bi qasî mêran ji çekan hez dikin.(Buckingham, 1827, r.171-172) Wek Bazidî bi taybetî behs dike ku Kurd qet çêk û alatên xwe jixwe dûr naxin, seyyah jî behsa vî tiştî dikin. Shiel vê rewşê wisa diyar dike. Kurd di mala xwe de jî bi xencer, pîstol û şûr in, gava ew diçine ciyekî jî zirx, tevra cengê, rîm û mertalên wan ligel wan in.(Heude, 1819, r.209)Kinneir hin tiştên li meselê zêde dike, li gor veguhastina wî, hespên li tewlê tenê êvaran bê nal in, ji ber ku nikare bê texmînkirin ku ê li Kurdistanê çi biqewme, divê ji bo her tiştî amade bin.(Shiel, 1831, r.72)

12. Kirîn û Firotina Heywanan

Xwedikirina heywanan bi taybetî ji bo Kurdên Koçer awayekî xwe xwedîkirin û debarê bû. Wan hem pêdiviyên xwe yên rojane ji wan bidest dixist hem jî bi kirîn û firotina wan debara xwe dikir. Helbet taybetiyên coxrafyaya Kurdistanê jî rê dida vê yekî. Çawa ku Bazidî dinivîse, Kurdên dewlemend bi perên xwe herî kêm hezar heb hogecan dikirîn. Salê carekî xelkên Şam û Erebîstanê dihatin Kurdistanê û wan hogecan ji wan dikirîn.(Bayezîdî, 2012, r.96) Çawa ku seyyah dinivîsînin li Kurdistanê ev awa bazirganî berbelav e. Bazirganççn ku salê carek dihatin Cizîrê, Mûşê, Hekariyê, Sêwasê û Silêmaniyê û ciyên din, heywanan dikiriyan û ew heywan dibirin, Haleb, Şam, Bêrûd û Stenbolê. (Maunsell, 1894, r.87; Millingen, 1870, r.160; Mignan, 1839, c.1, r.286) Li gor Millingen, mihên Kurdistanê hewqas zêde bûn ku hirî û nivişka ji wan dihat bidestxistin hem têrî herem û derdora wî dikir hem jî heta Sûrî, Enadol û Stebolê dihat şandin.(Millingen,1870, r.154)Ji bilî van jî gava koçerên Kurd koç dikirin li bajarên ser rêya xwe pêdiviyên xwe distandin û ji ber wan ve mamulên heywanên xwe didan. (Brant, 1836, r.213).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

13. Dema Leyz û Şahiyê

Dema leyz û şahiyan rasterast bi jiyana Kurdan ve eleqedar e. Ne di Adat û Rusûmatnameyê de ne jî di seyahatnameyan de behsa leyz û şahiyên serê sibê û nivroyê nayê kirin ji ber ku Kurd wan çaxan li ser karên xwe ne. Lê piştî ku karên wan ên rojane xilas dibin ew dicivin û kêf û şahiyê dikin. Li gor Adat û Rusûmatnameyê ber êvaran xort dertên û hol û cîrîdê dilîzin û kesên îxtiyar, keç, bûk û jinên ciwan jî li wan temaşe dikin. Êvaran jî teqrîben du saet piştî şîvê li pêşiya konan govend digirin, distirên û dilîzin. (Bayezîdî, 2012, r.130) Seyyahan jî kêm zêde wekî Bazidî behsa vê meseleyê kiriye. Çawa ku Bird qal dike li Mahabadê ber êvarê xort li hespê siwar dibûn û şiyanperweriya xwe nîşan didan û jinan jî li wan temaşe dikir.(Bird,1891, c.2, r.209) Harris ji gava li Banê ye şahidiya vê yekê dike ku Kurd ber êvaran govend digerînin, şerê kewan li dardixin û perwerdeya çekdariyê dikin.(Harris, 1896, r.232)Rich ji ber kêf û şahiya Kurdan a şevan tespîtek dike dibêje ew yegane xelk in li rojhelatê ku şevan dereng radizên. Ew şevan diçine sera hev, qalûnê dikişînin, li muzîkê guhdarî dikin û sohbet dikin. Carna şevê du sê seredanan dikin. (Rich, 1836, c.1, r.103-104) Millingen jî gava li konekî Kurdan dibe mêvan şahidiya kêf ûşahiya wan a şevan dike. Şeva ew mêvan e, xelk piştî şivê li derve kom dibin, bi hev re henekan dikin, sohbet dikin û stranan dibêjin. Stran carna ji alî kesekî ve tê gotin carna jî tev bi hev re dibêjin. (Millingen, 1870, r.313-314)

Encam:

Me di vê xebata xwe de hewl da kuAdat û Rusûmatnameyê Ekradiye û Seyahatnameyên Îngîlîzî yên sedsala 19. ji hin aliyan ve berawird bikin. Bazidî çavekî hundirî û seyyah jî çavên derveyî bûn. Eger çavdêriyên hundirî li gor a derveyî rasttir û objektîftir bêne qebûlkirin, ev tişt dikare rê bide pîvana rastiya çavdêriyên derveyî. Lê helbet ev pîvan ne pîvaneke bêqisûr e. Dibe ku hin caran çavên derveyî hin tiştan ji çavên hundirî baştir û teferruattir jî bibînin. Ji ber ku çavên hundirî ji nav rastiyê dinihêrin lê ferq nakin. Li hember wê jî hin tiştên jibo çavên derveyî balkêştir, bi teferruattir têne qalkirin Berawirdkirina me de derkete holê ku gava seyyah û Bazidî behsa heman mijarê kirine tiştên nêzî hev gotine, di van agahiyan de nakokiyeke berçav derneketiye holê. Lê seyyah zêdetir li ser kitekitan sekînine û derheqê meselê de zêdetir agahiyan dane. Lêbelê divê neyê jibîrkirin ku Bazidî tena serê xwe û li hember wî bi qasî 30 seyyah hebûn. Herweha dikare bê gotin ku bi vî awayî Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye û seyahatnameyên Îngîlîzan ne dijberîhev lê temamkerên hev in. Dîsa vê berawirdkirinê rê da ku em karibin rastbêjî û objektiviya seyyahan jî bipîvin. Li gor berawirdkirinê derket holê ku agahiyên seyyahan agahiyên rast in û bi vê nêrinê di gelek xebatan da mirov dikare ji wan sûd werbigire.

Çavkanî:

AINSWORTH, W. F. (1842)*Travels and Researches in Asia Minor, Mesopotamia, Chaldea and Armenia*, Vol.1-2, John Parker, West Strand, London

BIRD, I. L.(1891)*Journey in Persia and Kurdistan*, Vol.1-2, John Murray, London.

BRANT, J.,GLASCOTT A. G. “Notes of a Journey through a part of Kurdistan, in the Summer of 1838” Journal of the Royal Geographical Society,Vol.10, 341-432.

BRANT, J. “Journey Through A Part of Armenia and Asia Minor in The Year 1835”, The Journal of Royal Geographical Society of London, Vol. 6, 187-223.

BUCKINGHAM, J. S.(1827)*Travels in Mesopotamia Including a Journey From Aleppo to Bagdad, By the Route of Beer, Orfah, Diarbekr, Mardin & Mousul with Researches on the Ruins of Nineveh, Bablylon and Other Ancient Cities*, Henry Colburn New Burlington Street, London

CURZON, R.(1854)*Armenia; A Year At Erzeroom and On The Frontiers of Russia, Turkey, and Persia,* John Murray Albemarle Street, London

FORBES, F. “A Visit to the Sinjár Hills in 1838, with Some Account of the Sect of Yezídís, and ofVarious Places in the Mesopotamian Desert, between the Rivers Tigris and Khábúr”, The Journal of the Royal Geographical Society of London, Vol. 9, 409-430.

Zakho Centre for Kurdish Studies

FOWLER, G. (1841)*Three Years in Persia with Travelling Adventures in Koordistan,* Henry Colburn, Publisher, Vol.1-2, London
FRASER, J. B.(1840)*Travels in Koordistan, Mesopotamia, Including an Account of Parts of Those Countries Hitherto Unvisited by Europeans with Sketches of the Character and Manners of Koordish and Arab Tribes*, Vol.1-2, Richard Bentley, London
HARRIS, W. B.(1896)*From Batum to Baghdad via Tiflis, Tabriz, and Persian Kurdistan,* William Blackwood and Sons, London
HEUDE, W.(1819)*A Voyage Up to Persian Gulf and a Journey Overland from India to England in 1817*, Strahan and Spottiswoode, London
KINNEIR, J. M.(1818)*Journey through Asia Minor, Armenia, and Koordistan in the Years 1813-1814 with Remarks on the Marches of Alexander and Retreat of the Ten Thousand,* John Murray Albemarle Street, London
KSENOPHON, (2009)*Anabasis-On Binler'in Dönüşü*, Ari Çokona, (wer.), Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul
LAYARD, A. H.(1853)*Discoveries in the Ruins of Nineveh and Babylon; With Travels in Armenia, Kurdistan and the Desert: Being Result of a Second Expedition,* part I. John Murray, London
LAYARD, A. H. (1849)*Nineveh and its Remains: with an Account of a Visit to the Chaldean Christians of Kurdistan, and the Yazidis, or Devil-worshippers; and an Enquiry into the Manners and Arts of the Ancient Assyrians,* Vol.1-2, John Murray, London
MAUNSELL, F. R. "Kurdistan" the Geographical Journal, Vol.3/2, 81-96.
MAUNSELL, F. R. (1890)*Reconnaissances in Mesopotamia, Kurdistan, North-West Persia and Luristan from Apr to Oct 1880,* Vol.1, Government Central Printing Office, Simla
Mela Mehmûdê Bayezîdî, (2012)*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, lêkolîn: Jan Dost, Weşanên Nûbihar, Stenbol
MIGNAN, R. D.(1839)*Winter Journey Through Russia, the Caucasian Alps and Georgia: Thence Across Mount Zagros by the Pass of Xenophon and the Ten Thousand Greeks, into Koordistaun*,Vol.1-2,Richard Bentley, London
MILLINGEN, F.(1870)*Wild Life Among the Koords*, Savill Edwards and co., London
PARRY, O. H.(1895)*Six Months in a Syrian Monestry,* Horace Cox, Windsor, House, Bream's Buildings, E. C., London
RAWLINSON, Henry Creswicke, "Notes on a March from Zohab at the foot of Zagros, along the Mountains to Khuzistan(Susiana), and from thence through the Province of Luristan to Kirmanshah, in the Year 1836‟, Journal of the Royal Geographical Society of London, Vol.9, 26-116.
RICH, C. J.(1836)*Narrative of a Residence in Koordistan, and on the Site of Ancient Nineveh,* Vol.1-2 , James Duncan, Paternoster Row, London
SHEIL, L.(1856)*Glimpses of Life and Manners in Persia with Notes on Russia, Koords, Toorkomans, Nestorians, Khiva and Persia*, John Murray, London
SHIEL, J. "Notes on a Journey from Tabriz through Kurdistan, via Van, Bitlis, Se‟ert, Erbil to Suleimanieyh in July and August 1836", Journal of the Royal Geographical Society of London,Vol.8, 54-101.
TOZER, H. F.(1881)*Turkish Armenia and Eastern Asia Minor*, Longmans Green and Co. London

Perawêz:

[1] Jibo teswîrên hûrgilî yên Çekdar/Şervanên Kurd bnr. (Kinneir, 1818, r.391; Fraser, 1840,c.1, r.87.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Adat û RusûmatnameyêEkradiye ve İngiliz Seyahatnamelerinin Folklorik Bilgi Açısından Karşılaştırılması

Ozet:

Kürt folkloru hakkında bilgi içeren tarihi kaynaklar geçmiş ve gelecek arasında bir köprü kurabilirler. 19. yüzyıl Kürtlerinin folkloru hakkında bilgi içeren kaynaklardan biri Mele MehmûdêBazidî'nin 'Adat û RusûmatnameyêEkradiye adlı eseridir. Bu eser okunduğunda o zamanki Kürtlerin yaşamının bir çerçevesi canlanır. Mele MehmûdêBazidî bu eserini 1858-59'da yazdı. Bu kitabın önemli yönlerinden biri onun bir Kürt tarafından Kürtçe olarak Kürtlerin kültürü hakkında yazılmış olmasıydı. Eğer Kürtlerin 19. Yüzyıl folklorları hakkında bir araştırma yapmak istersek Mele Mehmûdê Bazidî'nin eseri dışında Avrupalıların seyahatnameleri özellikle de İngilizlerin yazdığı seyahatnamelerle karşılaşırız. Kürdistan, Hindistan güzergâhında olduğundan ve Hindistan da İngiltere'nin sömürgesi olduğundan bu yüzyılda birçok Britanyalı asker, jeolog, ajan, diplomat ya da misyoner Kürdistan'a seyahat etmişti. Bu seyahat edenlerin birkısmı döndükten sonra Kürt folkloru hakkında birçok önemli bilgi içeren seyahatnameler yayımlamıştı. Seyyahlar Kürtlerle birlikte kaldıkları için onların eserleri onların birincil gözlemlerine dayanıyordu ve yönetici ve reaya Kürtler hakkında birçok bilgi içeriyordu. Bu özelliklerinden dolayı seyahatnameler bir folklor araştırmasıiçin kaynak olarak kullanılabilmeye uygundur. Fakat bu seyahatnamelerdeki bilgiler yabancı-dışarıdan bir gözle aktarıldığı için üzerlerinde hep bir şüphe bulunur. Bu meselenin aydınlatılması aynı dönemlerde Kürtleri yansıtan ve Kürt biri tarafından yazılan bilgilerle sağlanabilir. Bundan dolayı bu çalışmada 19. Yüzyıl Kürtleri hakkında bilgiler aktaran Adat û RusûmatnameyêEkradiye ve İngiliz seyahatnameleri karşılaştırılacak ve böylece seyahatnamelerin yanlışlığı, doğruluğu ve değeri tespit edilmeye çalışılacaktır.

Anahtar Kelimeler: *Mele MehmûdêBazidî, folklorik kaynaklar, 19. Yüzyıl, İngiliz seyahatnameleri, karşılaştırma*

Comparing of the 'Adat û Rusûmatname'êEkradiyeand Britistish Travelogues in term of Folklore

Abstract:

Historical sources which containin formation about Kurdish folklore, can build a bridge between the past and the future. One of them is the book of Mele Mehmûdê Bazidî called Adat û Rusûmat nameyê Ekradiye, which contains a lot of information about the Kurdish folklore of the 19th century. When we read this book, the context of Kurdish life at that time comesto life. Mele Mehmûdê Bazidî wrote this book in 1858-1959. One of the most important aspects was that this book about Kurdish culture was written in Kurdish by a Kurdish person. If we want to study the Kurdish folklore of the 19th century, apart from Mele Mehmûdê Bazidî, we have European travelogues, especially British travelogues. Because of the Kurdistan was on the road to India and India was a

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

British colonial, many British soldiers, geologists, spies, diplomat sormissionaries had alread yarrived in Kurdistan during this century. Some of those who came to Kurdistan, published travelogues that contained a lot of important information about Kurdish folklore. Because of the travelers remained with in the Kurdish community, their products contain their direct observation sand have detailed information about the administrator and ordinary Kurds. Because of these features travelogues allow touse them as folklore sources. But because the information in these travelogues was given from astrange, out side eye, the reare some doubts about them. Of course, the solution to this problem can be clarified through the information of someone who looks at the Kurds from inside. Therefore, in this study, an attempt will be made tocompare the two folklore sources of the 19th century, namely the Adat û Rusûmat nameyê Ekradiyeand the British travelogues to investigate the error, truth and value of travelogues.

Keywords: *Mele MehmûdêBazidî, folklore sources, ss.19., English travelogues, comparing*

*Durru'l-Mecalîs*a Mela Mûsayê Hekarî û Girîngîya wê di Dîroka Lêkolînên Folklora Kurdî da

Dr. Ramazan PERTEV
Fakulteya Edebîyat- Université Libre de Bruxelles/ Belçîka

PUXTE:

Ev gotar li ser xebata zanayê kurd Mela Mûsayê Hekarî ya bi sernavê *Durru'l-Mecalîs*ê radiweste û hewl dide ku ji çend alîyan ve wê bide nasîn.

Ji sedsala 18. û vir da ji alîyê lêkolînerên bîyanî ve gelek keresteyên folklora kurdî hatine berhevkirin. Di nav wan da xasima di koleksîyona Auguste Aleksandre Jaba da gelek nimûneyên berhevkarîyê ya folklora kurdî hene. Bo nimûne berhevkarîya Mela Mehmûdê Bazîdî yek ji karên sereke yên vê arşîvê ne. Di nav vê koleksîyona navborî da xebateke Mela Mûsayê Hekarî bi sernavê *Durru'l-Mecalîs* heye ku heta niha zêde behsa wê nîne. Ev xebat ji 58 hîkayetan pêk tê û ji ber ku di salên 1600î wan da hatîye nivîsîn em dikarin bibêjin ku yekem ji nimûneyên pexşana kurdî/kurmancî ne. Ji nav van hîkayetan çend ji wan gelekî orijînal in weku "Ferhad û Şîrîn" (hîkayeta 23.) û "Dehhak" (hîkayeta 36.) ku di naveroka wan da regezên folklorîk pir bi aşkereyî xuya ne.

Li gorî agahîyên di *Seyahatname*ya Evlîya Çelebi da Mela Mûsayê Hekarî di navbera sedsala 16. û 17. da jîyaye û yek ji wan zanayên naskirî yê devera Hekarîyê bûye. Wî ji çavkanîyên curbicur hîkayet wergerandine kurmancî, belku bi piranî ji zimanê farisî ne.

Hîkayetên Mela Mûsa xwedî du fonksîyonan in: armanca pedagojîk û armanca xweşwextderbaskirinê. Yanî wî li gorî nirx, etîk û estetîka serdema xwe bi rêya van hîkayetan ra xwestîye ku peyaman bide civaka xwe û li hember rûdanên jîyanê helwest û tevgerên rast nîşanî wan bide û ji alîyê din ve jî xwestîye ku di şevbuhêrkên kurmancan da wextê wan bi awayekî xweş derbas bibe. Mijarên hîkayetan li ser taybetmendîyên kesayetî û civakî ne, wekî başî û xerabî, quretî û nefsbiçûkî, dadmendî û neheqî, comerdî û çavbirçîtî, evînî û dilsozî, rastî û derewkarî, dewlemendî û xizanî, qehremanî û tirsonekî, arîkarî û piştgirî, mîzaha civakî, tevgerên jin û mêran, jîyana pêxemberan û hwd.

Di vê gotarê da bi rêya analîzên teşeyî û naverokî em taybetmendîyên folklorî û zimanî yên van hîkayetên *Durru'l-Mecalîs* ê vedikolînin û girîngîya wan ya di cihê folklora kurdî da nîşan didin.

Peyvên serekî : *Foklora kurdî, Pexşana kurdî, Durru'l-Mecalîs, Mela Mûsayê Hekarî, Ferhad û Şîrîn, Efsaneya Dehhak.*

Destpêk:

Li gorî agahîyên li ber dest, çi ji alîyê bîyanîyan bin û çi ji alîyê kurdan, li ser folklora kurdî gelek xebat hatine encamdan.[1] Xasima di dirêjahîya du sedsalên borî da

Zakho Centre for Kurdish Studies

em dibînin ku li ser dîrok, ziman, çand, erdnîgarî, edebîyat û folklora kurdî kulîyateke pir giring û mezin çêbûye.[2]

Herweku tê zanîn çanda gelêrî heta sedsalên 16.-17. bi piranî bi awayekî devkî û zarekî bi pêwendîyên tradîsyonî hatîye veguhastin. Bi geşedana hizra neteweyî, xasima li rojavayê Ewropayê rewşenbîrên bi ser bizava netewetîya romantîk zêdetir berê xwe dane çanda gelêrî û keresteyên folklorî tomar kirine. Bi bawerîya wan yekem nişaneyên neteweyî ku nasnameya wan dîyar dikir folklora wan bû. Bo nimûne li Elmanyayê Johann Gottfried Herder, Wilhelm Grimm û Jacob Ludwig Karl Grimm, li Îngiltereyê William John Thoms û wd. yekem ji wan kesan in ku keresteyên folklorî yên di nava gel da berhev kirine. Ev bizava neteweperwerîya romantîk pêl bi pêl pêşî li temamê Ewropayê û pişt ra jî li cîhana mayî belav bûye.[3]

Di nav kurdan da jî xasima di serê sedsala 20. da hişmendîya li ser folklora kurdî xurtir bûye û kesên wek Kurdîyê Bitlîsî, Kemal Fewzî, Law Reşîd, Hilmîye Siwerekî, Mehmed Mîhrî, Celadet Bedirxan, Kamuran Bedirxan pêşengîyên xebatên li ser folklora kurdî kirine. Herweha weku *Jîn*, *Serbestî*, *Kurdistan, Hawar, Ronahî, Stêr, Roja Nû* di nav weşanên wê serdemê da weku efsane, destan, çîrok, stranên gelêrî, gotinên pêşîyan, gelek nimûneyên ji folklora kurdî hatine weşandin.

Ji sedsala 18. û vir da weku Peter Lerch, A.Jaba, Ferdinand Justi, Albert Socin û Eugene Prym, Albert von Lecog, S.A. Egiazarov, Bagrat Chalatianz, Hugo Makas û Oscar Mann, Archimandrite Comitas, İosif Abgar Orbeli, V. Minorsky, O.L. Vilçevsky, Dieter Christensen, Bazil Nikitin, Roger Lescot, Thomas Bois ji alîyê lêkolîner û peywirdarên bîyanî ve gelek keresteyên folklora kurdî hatine berhevkirin. Di nav van da koleksîyona Auguste A.Jaba bi gelek nimûneyên berhevkarîyê ya folklora kurdî di pêş da ye.[4] Bo nimûne berhevkarîya Mela Mehmûdê Bazîdî yek ji karên sereke yên vê arşîvê ne.

*Durru'l-Mecalîs*a Mela Mûsayê Hekarî jî ku mijara vê gotarê ye di nav vê koleksîyona navborî da ye ku heta niha zêde behsa wê nehatîye kirin.[5]

Durru'l-Mecalis ji 58 hîkayetan pêk tê ku em dikarin bibêjin ku yekem ji nimûneyên pexşana kurdî ne, lewra derdora di salên 1600î wan da hatîye nivîsîn. Mela Mûsa ev hîkaye çend çavkanîyan berhev kirine û bi kurmancî nivîsîne. Ji nav van hîkayetan çend ji wan gelekî orijînal in weku Ferhad û Şîrîn (hîkayeta 23.), Ristemê Zal (hîkayeta 25.), Yûsif û Zilêxa (hîkayeta 31.), Dehhak (hîkayeta 36.), Hz Nûh û Tofan (hîkayeta 52.), Seyda Şeref û Naîm Begê Dîyarbekirî (hîkayeta 57.).

Em dê amaje hindek ji van hîkayetan bikin û hewl bidin ku bi analîzên teşeyî û naverokî girîngîya wan a di cihê folklora kurdî da nîşan bidin.

1. Agahîyên derbarê Mela Mûsayê Hekarî û *Durru'l-Mecalis*ê da

Mela Mûsa ji bajarê Colemêrgê/Hekarîyê ye ku ev dever îro di nav sînorên Tirkîyeyê da ye. Derbarê jînenîgarîya Mela Mûsa da zêde agahî li ber destên me nînin. Em ji çend agahîyên seyahê navdar ê osmanî Evliya Çelebi (1611-1682) hîn dibin ku li Hekarîyê ew yek ji wan alimên meqbûl û miteberê serdema xwe bûye. Di *Seyahatname*ya Evliya Çelebi da navê Mela Musayê Hekarî wekî "Monlâ Mûsâ-yı Hakkarî" derbas dibe ku li gorî agahîyên ku wî daye, digel çendîn navên ku jimartine, Mela Mûsa jî yek ji zanayên mezin yê wê serdemê bûye. Li gorî qeydan Evlîya Çelebi li derdora salên 1650yî wan li devera Bitlîs, Wan û Diyarbekirê gerîyaye. Yanî piştrast dibe ku ew di dawîya sedsala 16. yan di serê sedsala 17. da wate derdora salên 1600î wan da jîyaye. Agahîya li ser Mela Mûsa di *Seyahatname*yê da wiha ye:

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

“Derbarê zanayên mezin: Gelek alimên wan yên yekta yên serdemê hene, lê belê yên ku haya me ji wan heye ev in: Pêşî Mela Hesen Efendîyê Yekçav û Mela Zeynudîn û Melazade Mela Ebûbekir û Melayê Şerefîyeyê û Mela Mihrabzade Elî Efendî û Mela Cebraîl û Mela Mûsayê Hekarî û Mela Îsrafîl û Mela Botanî û ...”[6]

Agahîyeke din jî di nav arşîva Jaba da heye ku ew weku miqerîr yanî vebêjerê *Durru’l-Mecalîs*ê tê danasîn. Qeyda istînsexê (wr. 48a) bi vî awayî ye :

“Temam bû tercema kitêba Durru’l-Mecalîsî bi zimanê Kurmancî ji teqrîra Mela Mûsayê Hekarî ji boy cenabê qonsol Jaba. Fî sene 1274.”[7]

Teqrîra Mela Mûsayê Hekarî yanî ew hîkayetên ku wî li jêrnavê *Durru’l-Mecalîs* gotine/qal kirine. Ji vê qeyda istînsexê jî pişrast dibe ku Mela Mûsa ji Hekarîyê ye û wê gavê ne li ber heyat e. Dema ku em agahîyên Evliya Çelebi û agahîya vê qeyda istînsexê didin ber hev, ev herdu agahî xweş li hev tên û hevûdu temam dikin.

Ji ber ku ev xebata Jaba bi destê bi dehan melayên Kurd pêk hatîye, em tê derdixin ku navê Mela Mûsa piştî dused û pêncî salan jî li derdora medreseyên Kurdistanê maye û ev berhema wî hatîye parastin. Yanî *Durru’l-Mecalîs* tê naskirin û li ser daxwaza Jaba dema ku berhemên giring tên berhevkirin û jinûvenivîsîn ev jî hêja tê hesibandin ku were istînsexkirin.

Li vir hêjayî gotinê ye ku di nav koleksîyona Jaba da destnivêke din bi navê *Durru’l-Mecalîs*ê heye ku ji alîyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatîye istinsexkirin lê weku naverok çend hîkayetên hevpar ne têda pêwendîyeke wê bi *Durru’l-Mecalîs*a Mela Mûsayê Hekarî ra tune ye.[8]

Derbarê asta perwerdeya Mela Mûsa da pêzanînên me tunene, lê ji ziman û şêwaza wî ya nivîsê dîyar dibe ku ew bi zimanên erebî, farisî û tirkî dizane. Lewra wî gelek caran ji Quranê û ji hedîsan mînak dane, helbestên farisî neqil kirine û peyv û hevokên tirkî bi kar anîne. Li gorî agahîyên me yên dîrokî Hekarî yek ji wan navendan bû ku xwedî medreseyên bi navûdeng hebûn. Bo nimûne li gorî Ebdurrehîm Rehmîyê Hekarî li Hekarîyê medreseyên mîna “Medreseya Meydanê” û “Medreseya Pêzanê” di serdema xwe da jêdera zanîn û hunerê bû ku kesên wek Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Pertew Begê Hekarî gihandine.[9] Lewma îhtimal e ku Mela Mûsa jî ji van medreseyan gihabe.

A. Jaba li ser van hîkayetan xebitîye û xwestîye ku tîpguhêzîya wan bo elfabeya latîni bike û wergerîne zimanê fransî. Lewma di vê arşîvê da sê nusxeyên cuda yên *Durru’l-Mecalîs*ê hene. Nusxeya 40, 41a û 41b. Em ê niha van her sê nusxeyan bidin nasîn.[10]

Nusxeya destxeta 40ê 48 wereq e. Wereqên zehrîye, 1a, 48b û 49a-yê vala ne. Bi elfabeya Erebî û bi xeta ruqeyê hatîye nivîsîn. Destxet di nava bergeke çermereş da ye. Kaxezeke zer û ji rêzê hatîye bikaranîn. Li hin cihan li pêrawizan bi zimanê Fransî têbinîyên kurt hene. Hejmarên rûpelan li jora rûpelan bi Erebî hatine destnîşankirin. Nusxe ji 2480 risteyan pêk tê. Rûpela yekem 19, rûpela dawî 8 riste ne. Di hejmara risteyan da standardek tune ye, bi piranî di navbera 25-30yî da ne. Rûpela 61ê 32 riste ne û ebada destxetê 35×22 cm ye.

Nusxeya temam ya *Durru’l-Mecalîs*ê ev e, nusxeyên din ne temam in, nîvco mane. Lewma di vê gotarê da me ev nusxe esas girtîye.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Nusxeya destxeta 41a-yê bi sernavê fransî « Perle des Séances (Durru'l-Mecalîs), Contes Populaires Kurdes Traduit Bi Kurdî: Durru'l-Mecalîs, mielîf: Mela Mûsayê Hekarî, Wergêr: Auguste A. Jaba, Consul da Russie à Erzeroum, 1860.

Ev Nusxe 227 wereq, yanî 454 rûpel e. Bi elfabeya erebî û bi xeta ruqeyê hatîye nivîsîn, cihên ku Jaba wergera vê berhemê kirîye jî bi fransî ne. Kaxeza zer û bi xêz hatîye bikaranîn. Rûpelên rastê ji navberê bi xêzekê wekî du beşan hatîye dabeşkirin. Di nîvê da bi tîpên erebî berhema resen, di nîvê din da jî wergera fransî hatîye nivîsandin. Her wiha rûpelên çepê jî bi armanca wergera fransî hatine terxankirin. Hejmarên rûpelan li jorê bi tîpên erebî hatine tomarkirin. Nusxe bi giştî 1980 riste ye. Piranî her rûpel 9 riste ye. Heta rûpela 93yan 2 sitûn e, lê jê û wê da yek sitûn e û ebada destxetê 27×18 cm ye.

Di vê nusxeyê da 20 hîkayet hene. Heta rûpela 70yî li rûpelên çepê wergera çîrokan a bi fransî heye, lê ji wir pê ve ew rûpelên çepê vala ne. Heta rûpela 93yan yanî di her sê çîrokên ewil de, rûpelên rastê du sitûn in. Di sitûna pêşî da çîrok bi tîpên Erebî hatine nivîsandin. Di sitûna duyem da Jaba, heman tişt bi tîpên latînî-fransî nivîsîne. Jê pê ve rûpelên rastê yek sitûn in û tenê bi tîpên erebî ne. Xuya ye ku ev xebata Jaba nîvco maye.

Nusxeya destxeta 41b-yê bi sernavê "Dourer Mejalis (Durru'l-Mecalîs) Fransî: Les perles da la réunion", ji naveroka berhemê dîyar dibe ku hîkayetên Mela Mûsayê Hekarî ne û ji alîyê Aleksandre Jaba bo fransî hatine wergerandin. A. Jaba, wî bi xwe ew istinsax kirîye.

Ev nusxe 44 wereq û 87 rûpel e. Wereqên 6a, 14a, 39b, 40a, 42b û 43-yê vala ne. Elfabeya latînî ya fransî hatîye bikaranîn. Kaxezeke zer û ji rêzê hatîye bikaranîn û hin wereq ji cihên xwe qetîyayî ne. Wereqên berhemê bi awayekî rêkûpêk nehatine nivîsîn, bêtir di teşeya reşnivîsê da ne. Gelek rêzên ku şaş hatine nivîsîn, ser wan hatine xêzkirin. Lewma jî standarteke hejmara rêzan tune ye û ebada destxetê 35×22 cm ye.

Jaba li vir 19 hîkayet wergerandine fransî. Wî li gorî naverokên hîkayetan bi zimanê fransî sernavekî minasib li wan kirîye, weku: "Ganym, Bersîsa, Perroquet, 6ème Conte, Conte VII, Conte VIII, Conte IX, Conte X: Neuchirvan, Conte XI: Djafar Vézir Haroun Raşid, Conte XII: Griffon, Conte 19ème, XIII: Khoja Abdullah Riche Négociant, Conte 14ème XIV: Iskender Zul-Qwrnayn, Conte XV: Baba Mourad, Conte XVI: Timourleng et Bayazid Yilderim, XVII: Hatem Şay, Conte XVIII: Le Pêcheur, XIX: Bagdad, Conte XX: Pharaon."

2. Çavkanîyên hîkayetên di *Durru'l-Mecalîs*ê da

Folklor û edebîyatên gelên cîran û herweha yên cihanê gelek caran bûne mijara xebatên berawirdîyê. Lewma di lêkolînên folklor û edebîyatê da xebatên berawirdî beşek ji giring yên vê qadê ne û gelek populer in.

Li gorî A. Jaba ev hîkayetên ku di nav *Durru'l-Mecalîs*ê da bi kurmancî hatine komkirin weku resen farisî ne :

"Kurdan ev hîkayet bi piranî ji çîrokên farisî yên naskirî li jêr navê Durru'l-Mecalîs wergirtine, yanî Mirwarîyên Şevbuhêrkan."[11]

Li gorî Hêmîn Omer Xwoşnaw jî, *Durru'l-Mecalîs*a bi zimanê farisî ya Seyfuzafer Nevbaharî çavkanîya van hîkayetan e, lê belê Mela Mûsa ev hemû wernegerandine belku beşek ji wan xistine nav *Durru'l-Mecalîs*a xwe.[12]

Dema ku em bala xwe didin destpêka hîkayetan em dibînin ku nivîskar bixwe jî gelek caran amaje bi çavkanîyên xwe kirîye. Bo nimûne, tewarîxêd Hezretî Silêman, Silêmanname, mûcîzated hezretî Îsa, Rawîyên tewarîxêd Xelîfan, Îskendername, Seyahetnameyên rawîyan, kitêbêd Benî Îsraîlîyan, tewarîxa Fetha Bîladan, tewarixêd Îranê, rawîyêd bajêrê Şîrazê, Qisseya qetla Hezretî Hesen, Qisseya qetla Hezretî Husên, Quran (5-21-54-55) û wd. Dîyar dibe ku gelek ji van hîkayetan di cureyê Îsraîlîyatê da ne.

Herçendî wî bi nav nekiribe jî ji hîkayeta "Dehhak" mirov tê derdixe ku *Şahname*ya Firdewsî[13] û ji yên weku "Tûtî û Hezretî Silêman", "Hîkayeta Siltan Mehmûd Xeznewî û Iyaz", *Mesnewî*ya Mewlana Celaledînê Romî jî di nav van çavkanîyan da ne.[14]

Herçend em rasterast pergî çîrokekê ji wan nehatibin jî mirov dikare bibêje wekû hîkayeta "Seyda Şeref û Naîm Begê Dîyarbekirî", bêhn û çejna çîrokên *Hezar û Şevek*ê jî ji van hîkayetan difûre.[15]

Ji xeynî van çavkanîyên dîyar, Mela Mûsa carinan amaje bi kesên anonim ji kirîye, weku "riwayet tête kirin ku", "hîkayet tête kirin ku", "tête riwayetkirin ku", "wiha neql û beyan dikin ku" û wd.

Bêguman yek ji çavkanîyên giring yê Mela Mûsa gel bixwe bû, ji ber ku wî hindek caran amaje bi rawî, naqil, neqqalan kirîye. Li vir mirov dikare "naqil" û "neqqalan" weku "qissebêj" û "çîrokbêj"an qebûl bike.

2.1. Nîşaneyên Kurd û Kurdî di *Durru'l-Mecalîs*ê da

Herçendî ku hîkayetên *Durru'l-Mecalîs*ê piranî werger bin jî nivîskar çend caran amaje bi kurd û kurmancan kirîye ku ev gelek giring e ji bo fehmkirina hesta aîdbûna wî. Bonimûne, di dawîya hîkayeta Ferhad û Şîrîn da wî îfadeyeke wiha bi kar anîye:

"Eve meselekê meşhûr e di nêv Ekradan ku dibêjin Ferhad mirîye ku dengê kulingê nayê."

Wate, Kurd hîkayeta "Ferhad û Şîrîn"ê baş dizanin û cihekî Ferhad di bîra hevpar ya kurdan da heye. Di roja me da jî li hemû alîyen Kurdistanê kurd navê Ferhad li zarokên xwe dikin.

Di dawîya hîkayeta 47. da ku em dikarin sernavê wê bikin "Bîjen Xan û Keçika Mitrib", Mela Mûsa îfadeyeke wiha bi kar anîye:

"Lewra kurmanc dibêjin ku "çi qeder mizgeft xerab bibe, dîsanî mihrab li cih e!"

Ji van herdu delîlan jî piştrast dibe ku wî kirasekî kurdewarî/kurmancî li van hîkayetan kirîye.

3. Mijar û naverokên hîkayetan

Mijarên hîkayetan li ser taybetmendîyên kesayetî û civakî ne, wekî başî û xerabî, quretî û nefsbiçûkî, dadmendî û neheqî, comerdî û çavbirçîtî, evînî û dilsozî, rastî û bêbextî, qehremanî û tirsonekî, arîkarî û piştgirî, mîzaha civakî, tevgerên jin û mêran, jîyana pêxemberan, û hwd. Hîkayeta pêşî bi sernavê "Hîkayeta Şêx Bersîsayî ye" hatîye binavkirin. Hîkayetên din bi jimareyan hatine dîyarkirin wekî "Hîkayet 2", "Hîkayet 3", "Hîkayet 58".

Li gorî naveroka van 58 hîkayetan û li gorî rêza destxetê em dikarin sernavên her yekê bi vî awayî nîşan bidin :

1. Hîkayeta Şêx Bersîsayî, 2. Hîkayeta Tûtî û Hezretî Silêman, 3. Hîkayeta Ğanim û Hezretî Dawid, 4. Hîkayeta Kewden û Harûn Reşîd, 5. Hezreti Silêman û Belqîsa, 6.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Hîkayeta Hezretî Silêman û Keça Kertal yê Padîşahê Meşriqê, 7. Hîkayeta Hezretî Îsa û Jin û Mêrek, 8. Hîkayeta Hezretî Dawid û Jina Urya, 9. Hîkateya Hezretî Îsa û Malbatekê, 10. Hîkayeta Noşîrwan û Tucarekî Ereb, 11. Hîkayeta Wezîr Caferê Bermekî û Xwace Elî, 12. Hîkayeta Hezretî Silêman û Sîmurx Anqa, 13. Hîkayeta Tûtî û Xwace Ebdullah, 14. Hîkayeta Îskenderê Zîlqerneyn, 15. Hîkayeta Baba Mirad, 16. Hîkayeta Siltan Bayezîd Yildirim û Teymûrxanê Leng, 17. Hîkayeta Hatemê Tayî û Xwace Ğorî, 18. Seyyadê Masîgir û Telebeyên ilmê, 19. Hîkayeta Xwace Cercîs ü Felah, 20. Hîkayeta Firaûnê Misrê, 21. Hîkayeta Deqyanûs û Esahbê Kehf, 22. Hîkayeta Siltan Mirad û Genc Osman, 23. Hîkayeta Ferhad û Şîrîn, 24. Hîkayeta Ebû Elî Sîna û Haris, 25. Hîkayeta Keyxusrew, Ristemê Zal û Seferberîya Hindistanê, 26. Hîkayeta Heyder Fazil û Gulendam Banû, 27. Hîkayeta Hezretî Silêman û Mirovê Pîr, 28. Hîkayeta Asimê Jar û Siltanê Belxê, 29. Hîkayeta Şah Ğîyas û Mirovê Bêguneh, 30. Hîkayeta Noşîrwan û Xarkeş, 31. Hîkayeta Yûsif û Zulêxa, 32. Hîkayeta Hezretî Eyub , 33. Hîkayeta Xwace Ebas û Bisbaseyê Heramzade, 34. Hîkayeta Omerê Hîlebaz û Pîrejinê, 35. Hîkayeta Hezretî Mûsa û Firaûn, 36. Hîkayeta Dehhak, 37. Hîkayeta Hezretî Silêman û Rizqê Mexlûqan, 38. Hîkayeta Xwace Mahirê Turkistanî, 39. Hîkayeta Hafizê Şîrazî û Şax Nebat, 40. Hîkayeta Lûlûya Keça Kaşif Begî û Mela Selahedîn, 41. Hîkayeta Qetla Hezretî Hesen, 42. Hîkayeta Qetla Hezretî Hisên, 43. Hîkayeta Siltan Mehmûd Xeznewî û Iyaz, 44. Hîkayeta Hatemê Tayî û Necaşî, 45. Hîkayeta Ristem bin Zal û Ristemê Yekdest, 46. Hîkayeta Hezretî Silêman û Hişam, 47. Hîkayeta Bîjen Xanê kurê Çengîz Xan û Beranîyê Keçika Mitrib, 48. Hîkayeta Hezretî Adem, Hezretî Hewa û Habil û Qabil, 49. Hîkayeta Hezretî Idrîs û Azraîl, 50. Hîkayeta Nemrûd û Hezretî Ibrahîm, 51. Hîkayeta Hezretî Lût û Qewmê wî, 52. Hîkayeta Hezretî Nûh û Tofan, 53. Hîkayeta Hezretî Yûnis û Qewmê wî, 54. Hîkayeta Şeddad ibn Ad û Baxê Îrem, 55. Hîkayeta Harût û Marût, 56. Hîkayeta Oste Ehmedê Necar, 57. Seyda Şeref û Naîm Begê Dîyarbekirî, 58. Hîkayeta Azîm Xanê Mesger û Oste Omerê Dellak.

4. Folklorîkbûna hîkayetên *Durrul Mecalîs*ê

Gelek hîkayetên di *Durru'l-Mecalîs*ê da ji alîyê Mela Mûsa ve ji zimanê farisî hatibin wergerandin jî ji awayê derbirîna wan dîyar dibe ku ew piranî bi awayekî serbest tevgerîyaye.

Vladimîr Propp behsa geranê ya berhemên folklorîk dike bê ka çawa ew dibin mijara berhemên edebî û herweha ev berhemên edebî di nav geşt û gerê da çawa ji nû ve vedigerin kirasekî folklorîk werdigirin. Li gorî wî di serdemên seretayî da edebîyat bi temamî folklor bû.[16]

Geşt û gera *Memê Alan*a folklorî bo mesnewîya *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî û di pey ra bo kurteçîroka *Mem û Zîn*a Mela Mehmûdê Bazidî, pişt ra bo temaşeya bi erebî ya *Mem û Zîn*a Evdilmesîh Wezîr û îro roj weku *Saturn*a Remezan Alan bo çend romanên kurdî yek ji mînakeke berbiçav ya vê rasteqîneyê ye.[17]

Durru'l-Mecalîs bi hîkayeta Şêx Bersîsayî destpê dike ku hevoka pêşî bi vî awayî ye:

"Heye nîne têkda fanî ne, ê ku ebed Xudê Teala dimîne. Carek ji caran rehmet li bab û dayê guhdaran..."

Herweku em dizanin çîrokên kurdî piranî bi çend formelên sereke yên tîpîk destpê dikin:

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

“Hebû tunebû, kes ji Xwedê meztir tunebû”, “Rojek ji rojan”, “Hebû tunebû, carek ji caran, rehme li dê û bavê guhdaran”[18]

Bi zelalî xuya dibe ku Mela Mûsa bi formeleke destpêkê ya tîpîk ya kurmancî dest bi hîkayeta xwe kirîye. Di hîkayetên din da jî formelên wekî “riwayet tête kirin ku”, “hîkayet tête kirin ku”, “têre riwayetkirin ku”, “wiha neql û beyan dikin ku” hatine bikaranîn.

Mela Mûsa di dawîya her hîkayetekê da pend û şîretek kirîye û bi piranî bi bêjeya “Da tu bizanî” destpê dikin û bi bêjeyên “wesselam” yan “amîn” diqedin.

Hindek ji van pend û şîretên di dawîya hîkayetan da bi vî awayî ne:

“Meram ji vê hîkayetê ew e ku hûn edaweta Iblîs bizanin û xwe ji şerê wî di dinya û axretê hazir bikin.”

“Merama benîyan nabe bi xeyr ji xwestan. Xudê teala derheqê min wuha emir kir, bû û çare nîne.”

“Lazim e benî adem di her şolekê da însaf û mirovetî ji destê xwe ber nede. Mirovek bêrehmîyê bike rastî bêrehmîyê tê. Xudê teala birehm e û hez ji rehîman dike, wesselam.”

“Himet û ihsan bi dil e, bi mezin û biçûkayîyê nîne. Bilanî ew şah û ez geda bim. Wesselam.”

“Li nik Xudê teala, hezretî Silêman û gundî û şah padişah yek e û kerema wî ji aqlê Benî Ademan dûr e. Seb vê xeberê qenc nîne ku meriv mesxere û teraneyê bi kesekî bike, zemane li halekî namîne. Paşê dibe ku ew mirov ji wî çêtir bi derkeve. Axirî her şola Xudê teala dizane, wesselam.”

“Tu tedbîr dikî eger muqedderek dibe û eger muqedderek nîne nabî, wesselam.”

“Da tu bizanî, hemû caran şêwir qenc e, aqil ji aqlê zêde, wekî di şolekê da tu ketî tengavîyê, şêwrê bi dostekî bike.”

“Elbete ji bab û dayêd şecî, ewladêd wiha dibin. Şibhe nîne ku esil zayî nabî, wesselam.”

“Da tu bizanî ku îtîbara Siltanî û dewleta dinyayê nîne, fena ye û betal e, daîm ji kesekî ra namîne, wesselam.”

“Mirad ji vê hikayeyê ew e ku tu bizanî, mal û dewleta dinyayê zayîl dibe û diçe. Lakin sewabê ihsanê di axretê baqî ye û navê wî mirovî jî heta ku dinya heye dête gotin. Hinde miqdar zemane bû ku Hatemê Tayî ji dinyayê borîye, lakin îsm û şuhreta eta û sexa wî hêj heye û belke heta roja qîyametê jî bête gotin, meger Xudê teala qet kesekî bednam neke, amîn.”

“Da tu bizanî ku ilm û kemal zayî nabî, ilm û zanîn û kemal cewahir e. Elbete rojekê muşterî lê peyda dibî. Bi ilm û kemal nebînî mirovê bêmarifet heywan e, qet ferq nîne.”

“Da tu bizanî, xûna naheq li erdê namîne, elbete Xudê teala sebebekê peyda dike, qatil jî ekserî têne kuştin. Xudê zilmê qebûl nake, zû û dereng, elbete îcra dike, wesselam.”

“Da tu bizanî ku di hikûmetê da îhmalî, axirî dibe sebebê zewala hikûmetê. Wekî ezîz sist kir, axirî milk jî çû û bi xwe jî hate qetilkirin û axirê zilmê jî tune. Firaûn zilm kirî û xerq bû. Dinya ji boyê kesekî ra wefa nekirîye û nake, bizanî.”

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

“Da tu bizanî ku dayin û istandeyn bi Xudê ye, eger dayina ebdan e, ew jî bi emrê Xudê ye. Dilê xwe bi xeyrê ji Xudê bi kesekî girê nede.”

“Da tu bizanî, ahê mezlûman li nik Xudê teala zayî nabî, elbete heqê jaran di dinya û axretê tête îcrakireyn.”

“Da tu bizanî ku dinya fena ye û betal e ji boyê pêxemberan û padişahan jî wefa ne kirîye. Ê tête dinyayê elbete dê rojekê rihlet bike, ê qenc ew e ku tu digel her kesî qencî bikî.”

“Da tu bizanî ku wekî hezretî Eyub kesekî sabîr nîhayet e dinyayê, sebra Eyub û umrê Nuh dinyayê meşûr e, wesselam.”

“Da tu bizanî ku xulamê sadiq ji hezaran yek bi dest dikeve! Wekî xulamê sadiq lazim e qedrê bizanî.”

“Da tu bizanî, dan û istandîn, îzet û zîlet, heyî û neyî, pêkve bi emrê Xudê ye, wesselam.”

“Mirad ji vê qisseye ew e ku da tu bizanî qeza û qederêd Xudê teala defî nabî, bi belaya biçûk razî bibe!”

“Da tu bizanî, Xudê teala elbete zaliman qehr dike û ahê mezlûman û heyfa feqîran ji wan exz dike.”

“Da tu bizanî, wekî ebdêd gunahkar tobe bikin û ji kirina xwe poşman bibin, elbete Xudê teala toba wan qebûl dike û qisûra wan efû dike.”

“Da tu bizanî, sirrê kitim ê eşyayan eşq e, her çi kesê ku eşq tunebî hesêb ke heywan e. Eşq mirovan kamil û sahib îrfan dike, wallahul alem.”

“Şola dinyayê wihe ye, bê zehmet tiştek nabî. Da tu bizanî û li ber belayan sebrê bikî ku “es sebru miftahul ferec”, meşûr mesel e birader!”

“Da tu bizanî ku wekî Xudê teala nede ebdekî cemîê nas bicivin qadir nabin ku faydeyekê bigihînine yekî. Wekî cenabê Xudê ihsanekê li ebdekî bike, kesek qadir nabî ku ji wî bistîne.”

Herweha di nav hîkayetên *Durru’l-Mecalîs*ê da bi dehan nimûneyên gotinên pêşîyan û biwêjên kurdî hene. Lewma em bi hêsanî dikarin bibêjin ku êdî ev tekstên xwemalî yên folklora kurmancî ne.

4.1. Gotinên pêşîyan di *Durru’l-Mecalîs*ê da

Gotinên pêşîyan beşek ji folklor û edebîyata gelêrî ne. Di *Durru’l-Mecalîs*ê da ew weku “qiseyê heq”, “meşhûr mesel” û “gotinên hikeman” hatine binavkirin ku bi dehan nimûneyên van hene weku em li jêr nîşan didin:

“Ahê kesekî ji kesekî ra namîne.”

“Aqil ji aqlê zêde ye.”

“Bê zehmet tiştek nabî.”

“Cîranê xerab qewî belayekê mezin e.”

“Çi qeder ji dest te têtin, bê hewceyî neçî derê wizera wikelayan, axirî elbete poşmanî dikêşî!”

“Çi qeder mizgeft xerab bibe, dîsanî mihrab li cih e!”

“Di hemû şolan da sebr û silamet e û acele milamet e.”

“Dinya bê xem nabî.”

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

"Eger feqîrek dewletmend bibe, heta çil salan dîsanî bihna feqîrîyê ji wî mirovî têtin û eger mirovekî necîb û xweyî dewlet jî meazallah feqîr û jar bibe, dîsanî heta çil salan bihna necabet û dewlemendîyê ji wî mirovî têtin."

"Esil zayî nabî."

"Ferhad mirîye ku dengê kulingê nayê."

"Her çi kesê ku eşq tunebî hesêb ke heywan e."

"Her kesê xîyanetê bike, axirî di dinya û axretê rûreş û berbad dibe."

"Insaf û miriwet lazim e, egerçi derheqê dijminan da jî bibe."

"Însan di jarîyê jar û feqîr dibe û di nîmetê da jî har dibe û kibr û xirûr peyda dike."

"Ji te têtin cehd bike, nav û şan peyda bike."

"Mêr dimire nav dimîne, tewar dimire kortan dimîne."

"Mirovê bêmarifet heywan e, qet ferq nîne."

"Mirovê emîn jar nabî û mirovê xayin berxudar nabî."

"Nefs dijminekî mezin e."

"Paşîya hîleyê tunîne, axirî rezalet e."

"Qenc qencîyê dibîne û xerab xerabî tîne."

"Qencî bike bavêje avê, masî nizanî Xaliq dizanî."

"Xulamê sadiq ji hezaran yek bi dest dikeve."

"Xweşî û rahetîya dinyayê bi hisn û îmtizacê dibî."

"Zilm dişibe kurmê darê, kurm darî dixwe, axirê dar jî berbad dibe û kurm jî helak dibe."

4.2. Biwêj di *Durru'l-Mecalîs*ê da

Durru'l-Mecalîs ji alîyê bikaranîna biwêjên kurdî ve jî gelekî dewlemend e. Hindek bîwêjên ku me tespît kirine bi vî awayî ne:

"Ev cihê henekan nîne!"

"Ev çi xewn e, ez li ku, Şam li ku?"

"Hesêb ke nan ji derîyan dicivandin"

"Heyva di çardeh da"

"Îro subê, were here"

"Ji can û dil"

"Ji xeberdanê man"

"Ket heyretê"

"Kete zimanê xelqê"

"Nîv can xwe bi der ve avêt"

"Rût û tazî"

"Rût, tena kirasê bûn"

"Rûyê te reş!"

"Teva li te"

(Bi dest ketin) "Ez ji ehlê Babilê me û li nêçîrê digeriyam, îroke tiştek **bi dest min nekevt**."

(Dest çûyin): "**Destê kê diçe** ku te qetil bike!"

(Hatin zimanî): "Çewan bû ku **hate zimanî**"

(Heta mirinê) : "Êdî **heta mirinê** nayêm!"

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

(Ji rê deranîn / Ji rê derxistin): “Da tu bizanî ku ev nefsa insanî qewî zalim e û hewa, hewes xalib e, mirovî zû **ji rê bi dertîne**.”

(Ji xwe çûn): “Wekî mirovekî **ji xwe ve çûyî**”

(Ketina bîra yekî): “Ez **dikevim bîra wî**.”

(Ketin destê yekî) “Ordî û çadir û xeyme, herçi heye **bi dest eskerê Tatar ket** û yexma bû...”

(...mirin çêtir e ji jînê) “Xudê neke wekî îtîbar û namûs ku nebû **mirin çêtir e ji jînê**!”

(Nehatin rê): “Adem aleyhîselam şîret kir, go “kurê min eve nabî, emrê Xudê nîne, mixalifê şeria ye!” nebû, bi terzekê Habil **nehate rê**, îla ez dê xweha xwe bistînim!”

(Serê xwe hilanîn û çûn): Bîjen gote wezîrî “îla xeberê dibêjî babê min û hem lazim e îcra bibî û ger ne ez dê **serê xwe hilêm û biçime** welatê Çînê.”

5. Taybetmendîyên zimanî di *Durru’l-Mecalîs*ê da

Zimanê nivîsînê ya Mela Mûsa heta bibêjî herikbar e û digel ku çar sed sal berê hatîye nivîsîn di roja me ya îro da jî em dikarin bibêjin ku kurmancîya wî tê fehmkirin ku devoka Hekarî/Behdînanê ye. Hindek caran ji sentaksa hevokan bêhna farisî tê. Lê belê dîyar dibe ku heta ji dest hatîye wî hewl daye ku îmkanên derbirîna kurmancî bi kar bîne. Di şêwaza wî da û di hilbijartina wî ya peyvan da gelek caran estetîkeke serkeftî li ber çavan e. Bo nimûne em li jêr paragrafeke ji pîrozbahîya çêbûna zarokekî Wezîr Cafer vediguhêzînin :

“Wê hingê adeta kebîran ew bû ku, paşê wiladetê sê rojan dawet û zîyafetekê mezin dikirin. Ulema û suleha gazî dikirin, paşê zadî ew zarok bi qundaq tanîne meclisê, di nêv wê cemaetê dia dikirin û navekî munasib lê datînan û paşê di nêv kaxizan pere civîn dikirin û her kesekî gora hal û rutba wî didanî. Wê rojê Cafer zîyafeta mewlûdê hebû. Ulema û şurefa û sadat û ayanêd Bexdayê dawet kiribû û tedarikekê azîm kiribûn û zehf dirav jî civîn kiribûn. Wekî êvarî bû kaffeyê ekabîr û xewasêd Bexdadê hazirî sera Caferî bûn. Meşale û qendîl û çiraxan, bûyê ûd û enber û bixûr vêketin. Sirûr û sirûhekê mulûkane û meclisekê alî muntezîm bûyî. Esbab û alatêd keyf û terpê hemû mîna zewq û sefayekê xundkarane kirin.”[19]

5.1. Karîgerîya Erebî , Farisî û Tirkî di *Durru’l-Mecalîs*ê da

Herweku tê zanîn zimanên weku erebî, farisî, kurdî, tirkî, ûrdîyî, peştûyî û wd. ku li Rojhilata Navîn û li derdora wê erdnîgarîyê tê axaftin ji ber paşxaneya hevpar ya çandî û ayînî, tradîsyoneke hemanzemîn û cureyên edebî yên hevbeş afirandine. Li vir karîgerîya erebî li ser zimanên din li ber çavan be jî ev pêwendî gelek caran piralî ne. Kurdî ji weku zimanekî ji Rojhilata Navîn gelek caran ketîye bin tesîra zimanê erebî û farisî û heta radeyekê jî tirkî.

Bêguman di kurmancîya *Durru’l-Mecalîs*ê da jî ev karîgerî li pêş çavan e. Li vê beşê ji heryekê bi çend mînakan em amaje bi vê rewşê dikin.

5.1.1. Karîgerîya zimanê erebî

Ji ber dînê îslamê gelekî karîgerîya zimanê erebî heye li ser kurdî ku îro roj jî ev her wisa ye. Lewma em dê tenê çend nimûne ji peyv û vegotinên erebî bidin ku di nav hîkayetan da derbas dibin ku di kurdîya me ya îro da nayên bikaranîn:

“Fîlhal”, Fîlwaqî, Etwar, Zîqîmet, Muetel man, Hey kirin, Balzurûr, Bade’l selam û el-îkram, Mulaqî bûn, Mialece kirin, Fîlcumle, Fusûlêd erbae, Tazîr kirin, Tûlumrî, Mexzûb bûn, Meşûru’l sexa û malûmu’l eta û sahîb muruwet û ihsan.”

Çend gotinên wecîz û ji Quranê:

“Kulî şeyî yercael lî esle”.[20]

“El insan, abîdetel ihsan”[21]

Ev jî mînakek ji dîyalogeke erebî ye:

“-Selamû aleyk!

-Es selam!”

Ev jî mînakek ji dîyalogeke têkel bi kurdî û erebî:

“...virê kir, go “subeyê alesseher!”

5.1.2. Karîgerîya zimanê farisî

Kurdî û farisî, du zimanên endamên famîlya zimanî ya Îndo-Ewropî ne ku ji şaxa Îranî ne. Lewma xwedî ferheng, dîrok û çandeke hevpar in. Lê belê ji ber şert û mercên dîrokî û sîyasî zimanê farisî bêtir karîye tesîrê li ser kurdî bike. Herweku me di serî da jî got, ev hîkayet bipiranî ji zimanê farisî hatine wergerandin, lewma karîgerîya zimanê farisî li ser awayê derbirîna nivîskar aşkere ye.

Çend mînak karigerîya farisî li ser sentaksa Mela Mûsa:

“Hîkayet tête kirin di weqt û zemanê Dawid aleyhîselam mirovek hebû Ğanim **nav**.”

“Mirovek hebû Xwace Elî **nav**.”

“Keça padişahê Mexribê Tembûs şah, Fîzûre **nam**, muqeder bûye jiboyê kurê padişahê Meşriqê...”

Li gorî hevoksazîya wan yên kurmancî ev hevok divîya wisa bûna:

“Hîkayet tête kirin di weqt û zemanê Dawid aleyhîselam **bi navê** Ğanim mirovek hebû.”

“**Bi navê** Xwace Elî mirovek hebû.”

“Keça padişahê Mexribê Tembûs şah, **bi navê** Fîzûre, muqeder bûye jiboyê kurê padişahê Meşriqê...”

Çend nimûne ji peyvên farisî yên ku di kurmancî da nayên bikaranîn bi vî awayî ne:

Damen (daw): “Zêr ji damena xwe rêtin”

Ğezebnak (yê ku hatîye xezebê, bixezeb): Hezret xezebnak bû

Xamûş (bêdeng): “Ev xebera go û hudhud xamûş bû.”

Nagah (ji nişka ve): “Nagah rojekê cota min digel birekî tûtîyan li rûyê hewayê digerîyan.”

Terane (tinaz) : “Bi vê xeberê bi keça masîgirî terane dikirin.”

Bûy (bêhn): “bûyê ûd û enber û bixûr vêketin”

Pare pare bû (parçe parçe bû)

Hala (hê, hîn) “keç hala li nik min e”

Pistan dida (pêsîr dida)

Xoşamedî (xêrhatinî)

Şîrînguftar, Giriftar (şîrînbêj, girtî)

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Di nav hîkayetan da hindek hevokên farisî jî hene ku nehatine wergerandin:
Osta Omer jî go: “ber ser çeşm!”[22]

Ji hîkayeta 39. (Hafizê Şîrazî û Şax Nebat) helbesteke farisî:
“Şeb heme şeb ta be rûz,
An puserê pînedûz,
Bang dehed çun xurûs,
Eskî pabûc kimde var?”[23]

Mînakek ji hîkayeta 16. (Siltan Bayezîd Yildirim û Teymûrxanê Leng):

“Wisan riwayet dikin ku Siltan Bayezîd, berê ji bo seferê lihêf û doşek ji semûrê çêkiribû ku tê da necemide. Wê şevê wiha li kenarê tendûrê li cihê hişk raza. Subeyê ku rabû, jê pirsiyar kirin ku “îşeve te çewan rahet kir ?”

Go ku “şebê semûr gozeşt, lebê tenûr gozeşt”[24]

Mînakek ji hîkayeta 57. (Seyda Şeref û Begzadeyê Diyarbekirî) :
“Der în donya kesî bîgam nebaşed,
Eger başed, Benî Adem nebaşed.”[25]
Mînakeke din ji heman hîkayetê:
“Zen ez pehlûyê çep şod aferîde
Kes ez çep rastî hergiz nedîde!”[26]

5.1.3. Karîgerîya zimanê tirkî

Di *Durru’l-Mecalîs*ê da karîgerîyeke zimanê tirkî jî li ber çava ye. Lê belê ev karîgerî ne ji alîyê sentaksê ve bêtir ji alîyê bikaranîna peyv û termên tirkî ne. Qasî ku me tesbît kirin beşek zêde ji wan di warê termên leşkerî da ne. Herweha di mînaka jorê ya helbesteke farisî da ku bala we kişandîye malika dawî bi tirkî ye: “Eskî pabûc kimde var?”

Hindek minak ji peyv û lêkerên zimanê tirkî yên di nav hîkayetan da bi vê awayî ne:

Begen kirin (tirkî: beğenmek), kurmancî “ecibandin” yan “hezkirin”
“Kewden qewî zêde ev qesîde begen kir.”
“Xelîfe badu’l nezer qewî zêde qesîde begen kirî.”
Cixiz kirin (tirkî: çizmek), kurmancî “xêz kirin”, “çixêz kirin”
Otrax kirin (tirkî: otak kurmak), kurmancî “çadir danîn”
Êlçî (tirkî: elçi), kurmancî “qasid”
“Ê qenc ew e ku berê em nameyekê û êlçîyekî û miqdarekî hedîye virê kin.”
Laqirdî (tirkî: lakırdı), kurmancî “galgal” yan “gotegota tinazker”
“Wiha bi laqirdî gotibû keçêd gundîyan”
Pelî kî (tirkî: belli ki), kurmancî “dîyar e ku” yan “aşkere ye ku”
“Pelîkî we bi min terane dikir”
Sikdir sikdir here! (tirkî: siktir siktir git!), kurmancî “bicehime here!”

“Axa pêş ve hat û gote Elî “teva li te! te digel kelbekî kirîye şer û tu hatiyî birîndarkirin, sikdir sikdir here tu kurê min nînî! Ne heyf e tu kurê min bibî!”

Dêrdağın (tirkî: darmadağın), kurmancî “belavela”, “ji hev ketin”
“Eve leşkera dêrdağin bûyî.”
Çend nimûne ji peyvên tirkî yên din:

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

“**Aşçîbaşî** (aşçıbaşı), **Aşxana** (aşxane), **Bekçî** (bekçi), **Beyraq** (bayrak), **Doşek** (döşek), **Firtone** (fırtına), **Hemamçî** (hamamcı), **Koç** (göç), **Kor û Topal** (kör ve topal), **Oldaş** (yoldaş), **Ordî** (ordu), **Ote** (oda), **Qatir quyruxî** (Katır kuyruğu) “Ev navê gîyayeke şîfabexş e, kurmancîya wê kêrat, qereqaç (latînî “anagyris foetida), **Qonax** (konak), **Tapût** (tabut), **Taqûm** (takım), **Yaxme** (yağma) û wd.”

5.2. Awayên vegotinê û bikaranîna hin lêkeran

Di bin vê binbeşê da em li ser awayên vegotinê, xîtab û bikaranîna çend lekêrên *Durru'l-Mecalîs*ê radiwestin û çend mînakan didin.

Mela Mûsa piranî zimanekî gelêrî bi kar anîye û teknîka vegotina wî pabendî vegotina çîrokbêjîyê ye. Dema ku di nav hîkayetekê da ji rudanekê derbasî ya din bûye, weku “li vî kenarî em bêne ehwalê...”, “ji vî kenarî em bêne halê...”, “ew li ser hatinê be...” û wd. gelek caran formelên çîrokbêjîyê bi kar anîne:

“Li vî kenarî **em bêne ehwalê** kurê padişahê Meşriqê Nigîn şah.”

“**Em bêne halê** wê sûretê kewterê ku Osta Azîm Xan avête nêva behrê.”

“Xulase, bi vî halî Zilêxa û Melik Reyan li cihekî man, **em bêne ehwalê** hezretî Yûsif.

“**Em bêne halê** hezretî Yûsif, ku ew rojekê di çalê da mayî, karbanek hate nêzûkî çalê û ewîrî.

“**Ji vî kenarî em bêne halê** Lûlûyeyê.”

“Gurge Koya jî pehlewan û leşkerê xwe hilanî, ew jî qesda ordûya Şîpal Şah kirî. **Ew li ser hatinê be, ji vî kenarî** wekî sê roj mihleta Feramerzî temam bû, bîla taxîr kosê herbê da lêdan û cewab virê kir, go “subeyê alesseher!”

Carinan jî di nav kevanê da agahî dane:

“(Wisan meşûr e, goya ev ava heyatê wê demê ro bû bi ser Qatir quyruxî, dibêjin. Lewra daîma di fusûlêd erbae da heşîn e, lakin Xudê dizanî.)”

Dema ku mesele dirêj bûye, wiha kurt kirîye:

“Xulase, **xeberê dirêj nekin**, middeyekê Çengîz Xan înad kir, go “ez şola ne layiq nakim!”

“Xulase, **xeberê dirêj nekim**, cara sêyê dîsanî min gurzek êdî qewî mihkem li serê Ristemê Yekdest dayî.”

“Wezîr ev xebera **wekî me gotî** ji seyyadî pirsîyar kir.”

“Û laşe hilanîn înane nik xundkarî û ehwalê bûyî, macerayê ewwel û axîr **wekî bûyî** ji bo xundkarî **neqil kirîn**.”

“**Qiseya halî wekî bûyî** ji du terefan li hizûra hezretî Dawid **neqil kirîn**.”

“Xwace Mahir ehwalê qutana xwe **wekî bûyî gote** rîsipî.”

Carina leheng di dilê xwe da daye axaftin:

“Min di dilê xwe go ku “kuro ez Ristem bim, ev yekdesta evê keçê wiha silamet bibe, ez dê evî qetil bikim û keçê bibim û biçim.”

“Min nêrî ku egerçi ez namirim, îlla beden û azayê min qewî bêhal bû. mecala rabûn û rûniştin û hereketê roj bi roj kêm dibe.”

Hinek awayên vegotinê jî weha ne:

“Ev Elî kurê min e, lakin tu guh bide ku bizanî.”

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

"Te çi şole pê"
"Rabûn çûn"
"Rabû, rast çû dîwana Hatem"
"Rica kir, go"
"Îna virê kir"
"Goya can dayî, mir"

Çend xîtab û xeberdanên ku di hîkayetan da em rast hatin bi vî awayî ne:
"Gelî, Hurme, axa, kuro, hay, hey, heyho, ey, ya, ewê bêdînê!, vî zalimî!"
"Gelî nasan!", "Gelî tûtîyan!", "Gelî misilmanan"
"Hay Xwace Elî tu li ku mayî?"
"Heyho tu çi dikî?"
"Kurê gundî, tu dîn bûyî!"
"Ji kerema xwe"
"Malî ava"

Em dibînin îro jî kurmanc di jîyana rojane da van xîtaban bi kar tînin.

Di *Durru'l-Mecalîs*ê da weku "jîn, jêrdest, bijarî, faydemend, pêşkeş, bixweser, rûyê hewayê" hindek peyv û weku "êrîş birin, êrûş kirin, xepitîn, pêkanîn, hûrî bûn, bi kar kirin, bestin, tiraştin" hindek lêkerên balkêş hene.

Ji bo lêkera **tiraştin** (kur kirin/qusandin) û awayê kêşana wê, dîyaloga li jêr mînakek ji hîkayeta 58. gelekî enteresan e:

"Evan nanan bibin ji boyê Osta Omerî da serêd me **bitiraşit**, me pare çunîne! Filwaqî ew Ereban ew nan dîsanî bi eynî înane nik Osta Omer, go "serê me **bitirêşe**, ev nanane ji boyê te bin! Lakin Osta Omer ew nan nenasî, serêd wan **tiraşî** û ew nan istandî."

6. Analîza du hîkayetan ji *Durru'l-Mecalîs*ê

Em dê di vê beşa gotara xwe da analîza du hîkayetên kurt yên di *Durru'l-Mecalîs*ê da bikin ku me ew li gorî naverokên wan weku "Ferhad û Şîrîn" û "Dehhak" binavkirin. Herweha me metna temam ya van herdu hîkayetan di pêvekê da dan, da ku lêkolîner û xwendevan bikarin wan bixwînin û miqayeseyê bikin.

6.1. Ferhad û Şîrîn

Çîrok li bajarê Heratê derbas dibe, lê dem ne dîyar e. Ferhad, Şîrîn û Perwîz, hersê lehengên çîrokê jî esîlzade ne. Şîrîn û Ferhad bi wesfên sipehî û xweşik tên danasîn :

"...di bajêrê Heratê da bazirganekî qewî maldar, navê Xwace Nesîr hebû û keçekê wî jî zêde qewî cemal û kemal, navê Şîrîn di heddê bilûxê da bûyî. Dîsanî ji eşraf û ehlê bajêrê Heratê, begzadeyek navê Ferhad, lawekî qewî spehî..."[27]

Lê belê Perwîz tenê bi begzadeyî tê danasîn:

"Dîsan ji begzadeyêd Heratê, ciwanekî dinê hebû navê wî Perwîz."

Pêşî dilê Ferhad dikeve Şîrînê û piştre Şîrîn jî dil dide Ferhad. Piştî ku ev eşqa wan li bajêr belav dibe Perwîz jî li cihekî Şîrînê dibîne û ew jî li Şîrînê aşiq dibe. Lê dilê

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Şîrînê bi eşqa Ferhad girêdayî ye, ew meyla Perwîz nake. Lewma di nabêna herdu begzadeyên ciwan da rikberîyek destpê dike. Bavê Şîrînê ji bo ku mesele pir mezin nebe û negihê radeya şer û pevçûnê şert datîne li pêş Ferhad û Perwîz ku kîjan ji wan bi tena serê xwe û bê arîkarîya kesekî vî şertê xwe zûtir pêk bîne, dê Şîrînê bide wî. Şertê Perwîz ew e ku divê di sê heyvan da cowa avê bîne bajêr û yê Ferhad jî divê di heman maweyê da zînarekî yekgir ku di çîyakilekê nêzî bajêr da heye bi dirêjahîya deh gir menzîlan bikole.

Ji ber ku eşqa Ferhad zêdetir bû wî zinar baş kola û anî ber qedandinê. Lê Perwîz zêde pêş da neçibû.

Li vir motîfa "jinekê ecûze" dikeve nava vê çîrokê û piştgirîya Perwîz dike bi şertê ku Perwîz pereyên ku dixwaze bidê. Perwîz di cih da qebûl dike û jinika ecûze plana xwe jê ra dibêje:

"Tu bîne çend top cawê sipî hazir bike û miqdarekê şûr û bi şev ewan cawan wiha bi dirêjayî raxîne û dirêj bike heta nêzûkî bajêr û evî şûrî li ser van cawan raxîne, wekî subeyê tav bi derdikeve, caw ji dûr ve sipî dike û şûrek li ser dibiriqe. Ez jî subeyê bi tavê ra diçime nik Ferhad û dibêjime wî ku tu çi dixebitî, Perwîz şola xwe temam kir û av îna wergerande bajêrî. Ew bawer nake, ez ji dûr ve ewan cawan ku li rismê cowan dirêj bûye û şûrek li ser dibiriqe nîşan didim. Ferhad mirovekî xeyûr e, elbete xwe telef dike û tu Şîrînê distînî."

Herweku xuya ye plan li ser xapandina Ferhad bi rêya îluzyonê ye, wate tiştek yan bûyerek ne weku xwe lê bi awayekî din dîtin û wiha qebûl kirin.

Perwîz weku lazim e dike û ecûze jî beşa dawî ya vê planê bi cih tîne, bi vî awayî Ferhad ji wan bawer dike:

"Aqlê Ferhad ji serî çûyî, filhal xwe ji berê avêt û telef bû."

Çawa ku Şîrîn mirina Ferhad dibihîse ew jî di cih da fincanekê jehrê vedixwe û can dide.

Di vê çîroka kurt da 5 lehengên xwedî rol hene: Ferhad, Şîrîn, Perwîz, Bavê Şîrînê Xwace Nesîr û jinika ecûze. Ferhad û Şîrîn karekterên naîf û erênî ne. Perwîz û Jinika ecûze weku karekterên nerênî tevdigerin. Bavê Şîrînê Xwace Nesîr jî karekterekî jîr û rasyonel, yanî erênî ye. Herwiha karekterên weku "xwazgînî", "eqreba û tealiq" jî hene lê di çîrokê da roleke wan ya giring tune ye.

Alîyeke balkêş ji vegotina vê hîkayete ew e ku digel ku hersê lehengên sereke (Xwace Nesîr, Perwîz, Jinika ecûze) diaxivin, du serlehengên hîkayetê (Ferhad û Şîrînê) qet naaxivin, tenê em tevgerên wan dizanin.

Di talîya vê çîroka evînî da em dibînin ku herdu evîndar nagêhin hev. Li gorî Mela Mûsa ev çîrok di nav kurdan da pir berbelav e ku kurd dibêjin "Ferhad mirîye ku dengê kulingê nayê."

Weku encam mirov dikare bibêje ku ev yekem nimûneya pexşanê ya hîkayeta Ferhad û Şîrîn e bi kurmancî û lewma ji alîyê dîroka folklor û edebîyata kurdî ve xwedî cihekî bêmînak e.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

6.2. Dehhak

Ev weku hîkayeta 36. hatîye binavkirin. Balkêş e di serê hîkayetê da Dehhak padişekî adil û dilovan e. Iblîs ji tevgera wî pir dilteng e û dixwaze wî bi rêya peyayekî xwe ji rê der bixe :

"… Dehhak padişahekî qewî zêde adil û minsîf bû. Iblîs aleyhîlanet ji edl û insafa wî û zêde merhemeta [wî] qewî dilteng bûyî, xwast ku ewî ji rê bi der îne. Emrê aweneyekî xwe kir, go elbete ez ji te dixwezim ku Dehhakî ji rê bi der înî!"[28]

Piştî fermana Iblîs, ev peya dilqê xwe diguherîne, dibe mirovekî ciwan û diçe cem Dehhak du sê salan baş xizmeta wî dike. Pişt ra goya destûra xwe dixwaze da ku vegere mala xwe.

Dehhak dike nake nikare vî peyayî razî bike ji bo mayînê û axirî li beranberî xizmeta wî dixwaze herçi daxwazîyeka wî hebe bidê.

Ev peya bi vê fersendê ra daxwazeke wiha dike:

"Îhtîyaca min bi tiştekî nîne, eger tu dixwezî ez jî ji te razî bibim, min jî zêde mihebeta te heye, herdu sermilêd xwe veke ez ramûsim û biçime şola xwe."

Dehhak herdu sermilêd xwe vedike û awenê iblîs wan diramûse û diçe, yanî digêhe meqseda xwe.

Piştî çend rojan herdu sermilên Dehhakî dixurin, der vedibin, dibin birîn û ji her birînekê serê marekî bi der ve tê. Êdî jîyana Dehhak diguhere û rehetî je ra namîne. Dehhak gazî temamê pizîşk, jîrik û stêrknasan dike da ku çareyekê ji vî derdê wî ra bibînin û wî derman bikin.

Piştî lêkolînên xwe evana hemû bi yekdengî çareya xwe bo vî derdî dibêjin:

"Çara wê ew e ku her rojê benî ademekî ciwan çarde salî bête qetilkireyn û mejîya wî bidine van maran ku sakin bibin û ger ne, çare nîne!"

Dehhak jî bi ya wan dike:

"Îcarê Dehhak emir kir wekî qurayê bi nobet her roj neferekî benî ademan wekî hekîman gotî kur be we ya keç be distandeyn û qetil dikireyn, mejûya wî didane maran. Meazallah bi vê uslûbê middeyekê kêşa û ji zilm û cewra Dehhakî nas perakende bûyî, bi etraf eknafan belav bûn."

Navê lehengê sereke yê çîrokê weku Xerdeng derbas dibe ku ew jî weku "Kawa" hesinger e. Piştî ku doza kurê wî yê duyem jî dikin, ew nema tehemûl dike û serî li dijî Dehhak hil dide:

"...di nêv bajêr da hedadek hebû, navê Xerdeng Aherger bû. Ewî mirovî du kur hebûn, nobeta berê kurekî wî istandeyn û bireyn qetil kireyn. Paşê middeyekê dîsanî dor hate Xerdeng Aherger ku kurê dinê jî bistînin. Dilêd Xerdengî qewî sotî, piştmala xwe kirî beyraq û kirîye gazî "Eman ji zilma vî zalimî!"

Xelk giş radibin, êrîş dibin ser Dehhak, wî dikujin û di şûna wî da kurmamê wî Ferîdûn dikin padişah. Bi vî awayî ji zilma Dehhak rizgar dibin.

Herwekî dîyar e, Dehhak bi xwe jî qurbanîyekî îblîs e. Xuya ye ku ev hîkayet varyanteke ji mîtolojîya îranî ye lê ne ya bi temamî. Di vê hîkayetê da lehengên sereke "Dehhak, Iblîs, Aweneyê Iblîsî û Xerdengê hesinger" in. Wekî din, "hekim, etibba, minecim, îbadallah (xelk), du kurên Xerdengê ahenger û Ferîdûn" jî hene.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

Ev hîkayet gelekî kurt e, em nizanin Mela Mûsa ev çima ewqas kurt birîye. Lê bi her awayî guman tê da nîne ku ev varyanteke ji hîkayeta Dehhak û Kawayê Hesinger e.

Encam:

Di vê lêkolînê da me xebata Mela Mûsayê Hekarî ya bi navê *Durru'l-Mecalîs*ê nirxand û da naskirin. Mela Mûsa di dawîya sedsala 16.û di serê sedsala 17. da 58 hîkayet ku bi piranî resen farisî ne, wergerandine zimanê kurdî.

Hîkayetên Mela Mûsa bêtir bi erdnîgarîya Îran, Hindistan, Turkistan, Erebîstan, Kurdistan, Misir û Romê ra eleqedar e weku Medayîn, Belx, Cihanabad, Herat, Şîraz, Nîşapur, Sîstan, Babil, Bexdad, Besra, Şam, Yêmen, Cizîra Mesqetê, Hîcaz, Cîde, Rom, Dîyarbekir, Stenbol û wd navên bajaran tê da derbas dibin.

Di van hîkayetan da ku ji nêvî zêdetir di cureyê Îsraîlîyatê da ne, kesayetên weku Hezretî Silêman, Hezretî Dawid, Hezretî Îdrîs, Hezretî Eyub, Hezretî Mûsa, Hezretî Îsa, Firaûn, Hezretî Îbrahîm, Hezretî Yûnis, Hezretî Lût, Nemrût, Cengizxan, Tîmûrleng, Siltan Muradxan, Siltan Bayezîd Yildirim, Siltan Mehmûd Xeznewî, Ristemê Zal, Ferhad û Şîrîn, Yûsif û Zuleyxa, Dehhak, Ferîdûn, Hatemê Tayî, Hesen ü Husên, Noşîrwan, Harûn Reşîd, Hafizê Şîrazî, Iskenderê Zîlqerneyn, Xwace Cercîs, Firaûnê Misrê, Deqyanûs, Keyxusrew, Genc Osman, Hezretî Adem û Hewa, Habil û Qabil, Harût û Marût û wd. hene.

Ji vê lêkolîna me jî piştrast dibe ku *Durru'l-Mecalîs*a Mela Mûsayê Hekarî yekem ji nimûneyên pexşannivîsîya kurmancî ye û herweha yekem ji wergerên kurmancî ye ku gelek hîkayeten ji zimanê farisî û belku ji zimanên din jî wergerandine. Di hîkayetên Mela Mûsa da karîgerîya zimanên erebî û farisî li ser kurmancî ji alîyê sentaksê û ji alîyê peyvan da, karîgerîya zimanê tirkî hew ji alîyê peyvan da ye.

Ji awa û şêwaza nivîsînê dîyar dibe ku asta wî ya edebî û bikaranîna wî ya hunera vegotinê bilind û serkeftî ye. Aşkere ye ku di serdema wî da tradîsyoneke pexşannivîsîyê di kurmancî da heye. Ev hîkayet bi piranî werger bin jî wî bi awayekî serkeftî kirasekî kurmancî li wan kirîye. Lewra di dawîya çend hîkayetan da wî amaje bi kurd û kurmancan ra kirîye.

Di van hîkayetan da gelek formelên çîrokbêjîya kurdî peyda dibin weku "Heye nîne têkda fanî ne, Carek ji caran rehmet li bab û dayê guhdaran...", "Hîkayet tête kirin ku", "Tête riwayetkirin ku", "Wiha neql û beyan dikin ku", "Li vî kenarî em bêne ehwalê...", "Ji vî kenarî em bêne halê...", "Ew li ser hatinê be...", "Xulase, dirêj nekim...", "Da tu bizanî...", "Wesselam" û wd.

Herweha weku "qiseyê heq", "meşhûr mesel" û "gotinên hikeman" bi dehan biwêj û gotinên pêşîyan ku beşeke giring ji folklor û edebîyata gelêrî ne di nav van hîkayetan da cih girtine.

Di *Durru'l-Mecalîs*ê da varyantên hîkayeta "Ferhad û Şîrîn", û efsaneya "Dehhak" jî hene ku ji alîyê naverokê ve zêde naşibin varyantên adetî yên van hîkayetan. Me ev herdu hîkayet jî bi awayekî giştî analîz kirin û me hewl da ku taybetmendîyên wan nîşan bidin.

Lêkolînên li ser folklora kurdî yên ji alîyê bîyanîyan ve xwedî dîrokeke kevn in û heta niha me yên xwemalî bêtir bi xebatên Mela Mehmûdê Bazîdî dida destpêkirin, yanî piştî nivê duyem ê sedsala nozdemîn. Bi ronîkirina *Durru'l-Mecalîs*a Mela Mûsayê Hekarî ra êdî em dikarin vê dîrokê vegerînin bo serê sedsala şanzdemîn.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Çavkanî:
Alakom, Rohat, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787/1987),* Deng, Istanbul, 1987.
Alan, Remezan, *Folklor û Roman*, Peywend, Stenbol, 2013.
, Remezan, *Saturn*, Avesta, Stenbol, 2002.
Aran, Umran, *Roman û Gotar*, Peywend, Stenbol, 2019.
Aslan, Mustafa & Yildiz, Ayhan, "Nirxandina Kurteçîrokên Mela Mehmûdê Bazîdîyî yên bi navê Durru'l-Mecalîsê", *Folklor û Ziman*, 2021.
Aydınlu, Seccat, *Firdevsi'nin Şahnamesi'inde Kürtler*, (wer. Erkan Çardakçı), Avesta, Stenbol, 2012.
Bazîdî, Mela Mehmûdê, *Camieya Risaleyan û Hîkayetan Bi Zimanê Kurmancî*, (amd. Ziya Avcı), Lîs, Stenbol, 2010.
Chyet, Michael L., "Mem û Zîn, Şax û Şovên Zargotî û Şîira Ehmedê Xanî", *Çira*, j.7, 1996.
Dankoff, Prof. Dr. Robert - Kahraman, Seyit Ali - Dağlı, Dr. Yücel (haz.), *Evlîyâ Çelebi Seyahatnâmesi*, cild 4, Yapı Kredi Yayınları, Istanbul, 2000.
Eminoğlu, Nevzat, "Nêrinek Gelemperî li Edebiyata Kurdî ya Serdema Mîrektiya Hekariyê", *Nûbihar Akademî*, j.13.,2020.
Evdilmesîh Wezîr, "Mem û Zîn, Temaşeke Kurdî ê Abadîn", (wer. Celadet Bedirxan), *Ronahî*, j.23, 1944.
Hakkarili Rahmi (Ebdurrehîm Rehmîyê Hekarî), "Tazyik ve İnkişaf", *Kurdistan*, j.1., 1919.
Jaba, Aleksandre, "Arşîva A. Jaba ya li Enstîtuya Zimanên Zindî li Zanîngeha Mardîn Artukluyê."
Keskin, Necat, *Folklor û Edebîyata Gelêrî*, Avesta, Stenbol, 2019.
Lescot, Roger, *Memê Alan*, Avesta, ç.2., Stenbol, 2010.
Mewlâna Celâleddin Rûmî, *Mesnewî*, (wer. Mela Ahmedê Şerefxanî), Weşanên Çandî ya Şaredarîya Konyayê, Konya, 2015.
Öztürk, Mustafa, *Koleksîyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan)*, Lîs, Ankara, 2017.
Pertev, Ramazan, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-I*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2015.
, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*, Avesta, Stenbol, 2018,
, *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedagojîya Kurdî)*, Doz, Stenbol, 2008.
Propp, Vladimir, *Folklor : Teorî ve Tarih* (wer. Necdet Hasgül, Tolga Tanyel), Avesta. Istanbul, 1998.
Roşan, Serdar, *Hezar û Şevekê*, (werger ji swêdî) Nûdem, Stockholm, 1998.
Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, (tîpguhêzî û wer. M.Emin Bozarslan), Hasat, Istanbul, 1990.
Xoşnaw, Hêmin Omer, *Durru'l-Mecalîs (Yekemîn komelleçîrok le mêjûyî pexşanî kurdî-wergêran da)*, çapxaney Hêvî, Hewlêr, 2019.
Yıldırım, Kadri & Pertev, Ramazan & Aslan, Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî*, Weşanên Zanîngeha Mardin Artuklu, Mêrdîn, 2013.

Pêvek:

Pêvek 1

Ferhad û Şîrîn (Hîkayeta 23.)

Naqilanê şîrînguftar wiha riwayet kirine ku di bajêrê Heratê da bazirganekî qewî maldar, navê Xwace Nesîr hebû û keçekê wî jî zêde qewî cemal û kemal, navê Şîrîn di heddê bilûxê da bûyî. Dîsanî ji eşraf û ehlê bajêrê Heratê, begzadeyek navê Ferhat,

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

lawekî qewî spehî dil ketibû Şîrîn û zêde li hisn û cemala wê aşiq bûyî. Rojekê Ferhad xwe tezeyun kirî çûye ser rîya Şîrîn. Bi emrê Xudê wekî Şîrîn jî Ferhad bi wî lîbasê faxîre dît, ew jî bêîxtîyar dil daye û li Ferhad aşiq bûyî. Ji her du kenaran bazara eşqê roj bi roj zêde bû û ew Ferhad û Şîrîn, yekûdu meftûn û mecbûr bûyî. Qisseya eşqa wan û zehfîya hisna Şîrîn kete zimanê xelqê bajêr. Dîsan ji begzadeyêd Heratê, ciwanekî dinê hebû navê wî Perwîz. Wekî Perwîzî tarîfa hisn û cemala Şîrîn seh kir, bi xwe bi xwe milaheze kir, go "eve çi tewr hisn û cemal e ku bûye baisê hinde guftûgoyê, elbete ez dê ji goşeyekê temaşa Şîrînê bikim û bibînim ku çi behs e li ser vê xeberê."

Rojekê, Perwîz li cihekî Şîrîn dî, bi emrê Xudê Perwîz jî li Şîrîn aşiq bû. Lakin dilê Şîrîn bi eşqa Ferhad mibtela bû, ewê meyla Perwîzî nekir. Îcarê, maşûq yek û aşiq bûne du û ev hewadisa di nêv bajêr da şayîi bûyî. Ji herdu terefan jî xwezgînî li Şîrînê rabûn û mirov ji boyê xwastinê virê kirin û fitne û fesad ji boyê vê xeberê di mabeyna eqreba û tealiqêd Ferhad û Perwîz peyda bû. Babê Şîrînê, Xwace Nesîr heyirî û ji fesadî tirsîya, eger keçê bidete yekî, ji kenarê dinê elbete dawa û şemate dê peyda bibe. Mirovekî aqil bû, milaheze kir "ez dê şolekê mihal li van herdukan teklîf bikim û bibêjim ku herçî ku ji Ferhad û Perwîz ji wê şolê berê xelas bûyî, zû pêk anî, ez dê keça xwe bidime wî. Eger wiha nebî, dê dawayekê mezin peyda bî!"

Îna virê kir, gazî Ferhad û Perwîz kirî, gote wan "digel heryekê ji we şertekê min heye, lakin bi nefsa xwe, bîla arîkarî û muîn, herçî ji we bi destê xwe ewî amelî temam dike, ez dê keça xwe bidime wî, herçî ku bi şû ve mayî êdî tu dawa nîne!"

Li ser vê xeberê herdu teref razî bûyî, qewl û qerar kirin. Bi sê saet mesafe li ser çîyayekî, avekê cesîm hebû. Gote Perwîz ku "di middeya sê heyvan eger te ew ave îna, wergerande nêv bajêr, ez dê keçê bidim te" û gote Ferhad ku "nêzûkî bajêr di çîyakilekê da zinarekî yekgir heye, ji te jî dixwezim di nêv sê heyvan da, bixwe, bi nefsa xwe ewî zinarî biqewêrî û di nêv wî zinarî destek xaniman ku deh gir menzîl bin, di nêv yekûdu ji berê bikoloyî, herçî ji we amelê xwe di van sê heyvan da berê temam kirî, ez dê keçê bidime wî!"

Li ser vê xeberê qewl birin û herdu kenar jî razî bûyî, fitne û fesad ji mabeynê rabûyî. Ferhad kuling hilgirtî çûye kolana zinarî û Perwîz jî tivir û bêr hilanî çûye înana cowa avê. Evne wiha herdu li ser şolêd xwe muqîm bûn. Lakin eşqa Ferhad êdî zêde bû, qewî bi cid û saî dixebitî û şola wî êdî pêş ve çûyî. Rojekê jinekê ecûze çû nik Ferhad û dît hindik mayî ku Ferhad ji şola xwe xelas bibe, teecib kirî hate nik Perwîz û dît ku şola Perwîz qet pêş ve neçûye. Ecûze gote Perwîzî ku "cefayê mede ber xwe, şola te betal e, te heta niha şolek nedîye. Middeyê we nêzûk bû, ez çûm û min dî Ferhad şola xwe pêk anîye û xelasbûyina wî heman nêzûk e. Elbete ew dê Şîrînê bistîne."

Perwîz wekî ev xebera bihîst, heyirî û gote acûzê "bes tedbîra vê çi ye?"

Ecûzê go ku "eger hinde diravî didî min, ez çareyekê dikim û ger ne, şola te betal e!"

Îcarê Perwîz gote ecûzê "herçî te divê, ez dê bidime te, heman tedbîrekê li vê şolê bike!"

Ecûzê gote Perwîz ku "tu bîne çend top cawê sipî hazir bike û miqdarekê şûr û bi şev ewan cawan wiha bi dirêjayî raxîne û dirêj bike heta nêzûkî bajêr û evî şûrî li ser van cawan raxîne, wekî subeyê tav bi derdikeve, caw ji dûr ve sipî dike û şûrek li ser dibiriqe. Ez jî subeyê bi tavê ra diçime nik Ferhad û dibêjime wî ku tu çi dixebitî, Perwîz şola xwe temam kir û av îna wergerande bajêrî. Ew bawer nake, ez ji dûr ve ewan

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

cawan ku li rismê cowan dirêj bûye û şûrek li ser dibiriqe nîşan didim. Ferhad mirovekî xeyûr e, elbete xwe telef dike û tu Şîrînê distînî.”

Ecûzê, Perwîz ev qewl û qerar kirî û ev hîle bi kar kirin. Wekî gotina ecûzê, Perwîz bişev caw raxistin û subeyê ecûze çû nik Ferhad ku heman nêzûk e Ferhad xelas bibe. Îcarê ewê bêdînê gote Ferhad ku “heyho tu çi dikî? Şîrîn ji dest te çû, Perwîz av îna wergerande bajêrî. Eger tu bawer nakî, were ez nîşanî te bidim! Ferhad bi der ve îna û ji dûr ve tavê lê dabû, ew caw sipî dikir û şûrek li ser dibiriqî, nîşanî Ferhad [da] û go ku “eve cowa avê te dît!”

Aqlê Ferhad ji serî çûyî, filhal xwe ji berê avêt û telef bû.

Eve meselekê meşhûr e di nêv Ekradan ku dibêjin “Ferhad mirîye ku dengê kulingê nayê.”

Paşê ew telefbûna Ferhadî şayîi bû û eve xebera ku giha Şîrînê, ew jî filhal fincanekê jarê xwarî, xwe telefê nefis kirî. Ew herdu aşiq û maşûqêd sadiq wiha bi mekr û hîleya ecûzek telefunnefs bûn.

Xudê teala hifzê mirovan ji fitne û hîleyêd jinan bike, ekser bela û fitne ku di dinyayê peyda bûne, ji mekr û fesada jinan waqî bûne. Da tu bizanî û bi xebera jinan amel nekî birader!

Pêvek 2

Dehhak (Hîkayeta 36.)

Wiha neql û beyan dikin, Dehhak padişahekî qewî zêde adil û minsîf bû. Iblîs aleyhîlanet ji edl û insafa wî û zêde merhemeta [wî] qewî dilteng bûyî, xwast ku ewî ji rê bi der îne. Emrê aweneyekî xwe kir, go “elbete ez ji te dixwezim ku Dehhakî ji rê bi der înî!”

Ewî aweneyî xwe xiste sûreta mirovekî ciwan û hate nik Dehhakî û middeya du sê salan qewî xizmetekê qenc ji boyê Dehhak kirî, Dehhak zêde ji xwe razî kir. Paşê rojekê îzin ji Dehhak xwast “destûra min ez dê biçime mala xwe.”

Herçend Dehhak gote ku “meçe, li nik min bimîne”, aweneyî go ku “hêvî dikim ku bi riza te ez dê biçim.”

Dehhakî destûr da û gote aweneyî ku “te hinde xizmeta min kir, çi dixwezî bidime te!”

Aweneyî go ku “îhtîyaca min bi tiştekî nîne, eger tu dixwezî ez jî ji te razî bibim, min jî zêde mihebeta te heye, herdu sermilêd xwe veke ez ramûsim û biçime şola xwe.”

Dehhakî herdu sermilêd xwe vekir, awenê iblîs ramûsaye û çûye şola [xwe].

Paşê çend rojekan herdu sermilêd Dehhakî xurîyan û dervebûn û bûye birîn û ji birînan heryekê serê marekî bi der ve hat. Ewan maran Dehhak bêhizûr kirî, êdî rahetîya Dehhak nemayî. Her çi qeder li etraf eknafan hekîm û etibba hebûn, cema kir, go “elbete îlacekê li defia vî derdî bikin!”

Ewan cimle etibba û minecima îtifaq kirîye ku “ev birîna ji nefsa şeytanî peyda bûye û xebîs e. Îlacê wê qewî zehmet e û mezeret digihê îbadullahê. Çara wê ew e ku her rojê Benî Ademekî ciwan çarde salî bête qetilkireyn û mejîya wî bidine van maran ku sakin bibin û ger ne çare nîne!”

Îcarê Dehhak emir kir wekî qurayê bi nobet her roj neferekî Benî Ademan wekî hekîman gotî kur be we ya keç be distandeyn û qetil dikireyn, mejûya wî didane maran. Meazallah bi vê uslûbê middeyekê kêşa û ji zilm û cewra Dehhakî nas perakende bûyî, bi

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

etraf eknafan belav bûn û di nêv bajêr da hedadek hebû, navê Xerdeng Aherger bû. Ewî mirovî du kur hebûn, nobeta berê kurekî wî istandeyn û bireyn qetil kireyn. Paşê middeyekê dîsanî dor hate Xerdeng Aherger ku kurê dinê jî bistînin. Dilêd Xerdengî qewî sotî, piştmala xwe kirî beyraq û kirîye gazî “Eman ji zilma vî zalimî!”

Îbadallah li ser Xerdeng berhev bûn û êrîş birine ser Dehhak. Heman di wê demê da Dehhak qetil [kirin] û Ferîdûn kurê mamê wî înan bîat kireyn û ji boyê xwe kirîne padişah.

Da tu bizanî ku paşîya zilmê tunîne, axirê helak û berdar dibe. Wekî dilê reayetê teng bû, êdî padişah defia mezereta wan nikare bike. Bi her wechî ji boyê xundkar û hakiman, hurmet û rîayeta jêrdestan lazim e. Lewra padişah bi quweta reayetan xundkarîyê dike, bi her wechî edalet û sîyanet lazim e. Zilm dişibe kurmê darê, kurm darî dixwe, axirê dar jî berbad dibe û kurm jî helak dibe, wesselam.

Perawêz:

---

[1] Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî*, Weşanên Zanîngeha Mardin Artuklu, Mêrdîn, 2013, r.52-134 ; Ramazan Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-I*, Avesta, Stenbol, 2015, r. 90 ; Necat Keskin, *Folklor û Edebîyata Gelêrî*, Avesta, Stenbol, 2019, r.80-120.

[2] Rohat Alakom, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787/1987),* Deng, Istanbul, 1987.

[3] Ji bo agahîyên berfireh, bnr. Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*, Avesta, Stenbol, 2018, r.64-74.

[4] Bnr. Mustafa Öztürk, *Koleksîyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan)*, Lîs, Ankara, 2017.

[5] Mamoste Hêmîn Omer di sala 2019yan da tîpguhêzîya wê bo tîpên erebî ya kurdîya standart ya roja me kirîye ku dema di latînîzekirina van tekstan da min jê istifade kir. Bnr. Hêmin Omer Xoşnaw, *Durru'l-Mecalîs (Yekemîn komelleçîrok le mêjûyî pexşanî kurdî-wergêran da)*, çapxaney Hêvî, Hewlêr, 2019.

[6] Prof. Dr. Robert Dankoff- Seyit Ali Kahraman - Dr. Yücel Dağlı (haz.), *Evlîyâ Çelebi Seyahatnâmesi*, r. 66, cild 4, Yapı Kredi Yayınları, Istanbul, 2000.
Ev agahî di *Seyahatname*yê da bi zimanê xwe yê orijînal ya tirkî weha derbas dibe : **“Der-beyân-ı ulemâ-yı kibâr [u] a‘yân:** Niçe bin ferîdü'l-asr ulemâları vardır ammâ ma‘lûmumuz olan kibâr-ı kübbâr bunlardır: Evvelâ Yek-çeşm Monlâ Hasan Efendi ve Monlâ Zeynüddîn ve Monlâzâde Monlâ Ebûbekir ve Şerefîyye imâmı ve Monlâ Mihrâbzâde Alî Efendi ve Monlâ Cebrâ'il ve Monlâ Mûsâ-yı Hakkarî ve Monlâ İsrâfîl ve Monlâ Bühtânî ve...”

[7] M. Öztürk, h.b., r.128.

[8] Ji bo agahîyên berfireh di vê babetê da bnr. Mustafa Aslan & Ayhan Yıldız, “Nirxandina Kurteçîrokên Mela Mehmûdê Bazîdîyî yên bi navê Durru'l-Mecalîs ê”, *Folklor û Ziman*, 2021, r. 245-264.

[9] Hakkarili Rahmi (Ebdurrehîm Rehmîyê Hekarî), “Tazyik ve İnkişaf”, *Kurdistan*, j.1., 1919. R. Pertev, *Folklor û Nasname*, r.171., Herwiha bnr. Nevzat Eminoğlu, “Nêrinek Gelemperî li Edebiyata Kurdî ya Serdema Mîrektiya Hekariyê”, *Nûbihar Akademî*, j.13.,2020, r.81-95.

Zakho Centre for Kurdish Studies

[10] Me piranîya van agahîyan ji pirtûka *Koleksîyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî* wergirtin, bnr. M. Öztürk, h.b., r.127-132, ku ev beş ji alîyê min û Mustafa Aslan ve hatibûn amadekirin.

[11] Bnr. Auguste A. Jaba, Dawîya Destxetê (wr. 44a) : « Les Kurdes ont tiré la plupart da ces contes des histoires persanes connues sous le nom Dourer Mejalis, c'est-à-dire Les perles da la réunion. »

[12] H. O. Xwoşnaw, h.b., r. 16-17.

[13] Seccat, Aydınlu, *Firdevsi'nin Şahnamesi'inde Kürtler*, (wer. Erkan Çardakçı), Avesta, Istanbul, 2012, r.14-15.

[14] Bnr. Mewlâna Celâleddin Rûmî, *Mesnewî*, (wer. Mela Ahmedê Şerefxanî), Weşanên Çandî ya Şaredarîya Konyayê, Konya, 2015.

[15] Ji bo wergereke bi kurmancî ya van çîrokan, bnr. Serdar Roşan, *Hezar û Şevekê*, Nûdem, Stockholm, 1998.

[16] Vladimir Propp, *Folklor : Teorî ve Tarih* (wer. Necdet Hasgül, Tolga Tanyel), Avesta. Istanbul, 1998, r. 11., 18.

[17] Ji bo van berheman, bnr. Roger Lescot, *Memê Alan*, Avesta, ç.2., Stenbol, 2010.; Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, (tîpguhêzî û wer. M.Emin Bozarslan), Hasat, Istanbul, 1990.; Mela Mehmûdê Bazîdî, *Camieya Risaleyan û Hîkayetan Bi Zimanê Kurmancî*, (amd. Ziya Avcı), Lîs, Stenbol, Evdilmesîh Wezîr, "Mem û Zîn, Temaşeke Kurdî ê Abadîn", (wer. Celadet Bedirxan), *Ronahî*, j.23, 1944.; Michael L. Chyet, "Mem û Zîn, Şax û Şovên Zargotî û Şîira Ehmedê Xanî", *Çira*, j.7, 1996.; Remezan Alan, *Saturn*, Avesta, Stenbol, 2002. Herweha ji bo xwendineke berfireh, bnr. Remezan Alan, *Folklor û Roman*, Peywend, Stenbol, 2013.; Umran Aran, *Roman û Gotar*, Peywend, Stenbol, 2019, r.60-74.

[18] Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, Doz, Stenbol, 2008, r.97.

[19] Hîkayeta jimare 11. ya dosyeya 40î di koleksîyona A.Jaba de.

[20] "Her tişt vedigere eslê xwe"

[21] "Mirov bendeyê xweşîyê ye"

[22] "Ser çavan!"

[23] Ev helbesteke Mewlana Celaledîn Romî ye li vir hatiye veguhastin, sê risteyên pêşî bi farisî, risteya dawî bi zimanê tirkî ye. Kurmancîya wê:

"Her şev heta biroj
Ew kurikê pînedûz
Bang dide wek dîkilan
Kê sola qetandî heye?"

[24] Wergera ji farisî bo kurmancî : "şeva semûrê derbas bû, li ber tenûrê derbas bû"

[25] "Li vê dinyayê kesê bêxem nabe,
Eger bibe, Benî Adem nabe!" (Sadî Şîrazî)

[26] "Jin ji parsûyê çepê hatiye afirîn,
Kesekî ji çepê rastî qet nedîye!" (Molla Camî)

[27] Bnr. Pêvek 1, "Ferhad û Şîrîn"

[28] Bnr. Pêvek 2, "Dehhak"

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Molla Musa Hakkari'nin *Durru'l-Mecalis*i ve Kürt Folklor Çalışmaları Tarihindeki Önemi

Özet:

Bu makale, Kürt bilgin Molla Musa Hakkarî'nin *Durru'l-Mecalis* adlı eserine odaklanmakta ve onu çeşitli yönleriyle açıklamaya çalışmaktadır.

18. yüzyıldan beri birçok Kürt folklor malzemesi yabancı araştırmacılar tarafından derlenmiştir. Bunlar arasında özellikle Auguste Aleksandre Jaba'nın koleksiyonunda Kürt folkloruyla ilgili birçok eser bulunmaktadır. Örneğin Molla Mahmud Beyazidi'nin çalışmaları bu arşivin başlıca eserlerindendir. Bu koleksiyon, Molla Musa Hakkari'nin bugüne kadar pek bilinmeyen *Durru'l-Mecalis* adlı eserini de içermektedir. 58 hikayeden oluşan bu eser 1600'lü yıllarda yazıldığından Kürtçe/Kurmanci nesrinin ilk örnekleri olarak kabul edilebilir. Bu hikayeler arasından içeriğinde folklorik öğelerin çok açık bir şekilde görüldüğü "Ferhad ile Şirin" (23. Hikaye) ve "Dehhak" (36. Hikaye) gibi, bazıları çok kıymetli ve özgündür.

Evliya Çelebi'nin *Seyahatname'*sindeki bilgilere göre, Molla Musa Hakkari 16-17. asırlar arasında yaşamış ve Hakkari'nin önde gelen alimlerden biridir. Başta farsça olmak üzere çeşitli kaynaklardan Kürtçeye çok sayıda hikayeler tercüme etmiştir.

Molla Musa'nın hikayelerinin iki işlevi vardır: pedagojik amaç ve hoşça vakit geçirme amacı. Bir başka deyişle, bir yandan çağının değer, ahlak ve estetik ölçütlerine göre bu hikâyeler aracılığıyla topluma mesajlar vermek ve onlara gündelik yaşamda karşılaşabilecekleri durumlar karşısında doğru tutum ve davranışları göstermek istemiştir. Diğer yandan bu hikâyeler gece sohbetlerinde hoşça vakit geçirme, eğlendirme işlevine sahiptir. Hikâyelerin temaları, iyilik ve kötülük, kibir ve tevazu, adalet ve haksızlık, cömertlik ve açgözlülük, aşk ve sadakat, doğruluk ve yalancılık, zenginlik ve yoksulluk, kahramanlık ve korkaklık, yardım ve dayanışma, toplumsal mizah, kadınlar ve erkekler, peygamberlerin hayatları vb. kişisel ve toplumsal özelliklerle ilgilidir.

Bu makalemizde *Durru'l-Mecalîs'*te yer alan hikâyelerin folklorik ve dilsel özelliklerini şekil ve içerik bakımından inceleyeceğiz ve Kürt folklor araştırmaları tarihindekî önemine değineceğiz.

Anahtar Kelimeler: *Kürt folkloru, Kürt nesri, Durru'l-Mecalîs, Molla Musa Hakkari, Ferhad ile Şirin, Dehhak efsanesi.*

Molla Mousa Hakkari's *Durru'l-Mecalis* and Its Importance in the History of Kurdish Folklore Studies

Abstract:

This article focuses on the Kurdish scholar Mullah Mousa Hekarî's work called *Durru'l-Mecalis* and tries to explain it from various aspects.

Since the 18th century, many Kurdish folklore materials have been compiled by foreign researchers. Among these, there are many works related to Kurdish folklore,

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

especially in the collection of Auguste Aleksandre Jaba. For example, the works of Molla Mahmoud Bazîdî are among the main works of this archive. This collection also includes Molla Mousa Hekarî's work called *Durru'l-Mecalis*, which has not been mentioned much until today. Since this work, which consists of 58 stories, was written in the 1600s, it can be considered as the first examples of Kurdish/Kurmandji prose. Some of these stories, such as “Farhad and Shirin” (23rd story) and “Dahhak” (36th story), in which folkloric elements are clearly seen, are very precious and original.

According to the information in Evliya Çelebi's *Seyahatname* (Travel Book), Molla Mousa Hekari lived between the 16th and 17th centuries and he is one of the known scholars of Hakkari. He had translated many stories/folk tales from various sources, primarily Persian, into Kurdish.

Molla Mousa's stories have two functions : pedagogical purpose and entertainment purpose. In other words, he wanted to give messages to his society through these stories according to the values, morals and aesthetic criteria of his age and to şow them the right attitudes and behaviors in the face of situations they may encounter in daily life. On the other hand, these stories have the function of having a good time in night conversations and entertaining. The themes of the stories are good and evil, arrogance and humility, justice and injustice, generosity and greed, love and loyalty, truth and betrayal, wealth and poverty, heroism and cowardice, help and solidarity, social humor, men and women, lives of prophets.

In this article, we will examine the folkloric and linguistic features of the stories in *Durru'l-Mecalîs* in terms of form and content and, we will mention their importance in the history of Kurdish folklore studies.

Keywords: *Kurdish folklore, Kurdish prose, Durru'l-Mecalîs, Molla Mousa Hakarî, Farhad and Shirin, Legend of Dahhak.*

BIKARANÎNA HÊMANÊN FOLKLORÊ DI PIRTÛKÊN HÎNKIRINA KURDÎ (KURMANCÎ) DA: MÎNAKÊN PIRTÛKÊN WEZARETA PERWERDEYA TIRKÎYEYÊ

Dr. Şehmus Kurt
Beşa Ziman û Çanda Kurdî- zanîngeha Mardîn Artuklu/Mêrdîn Enstîtûya Zimanên Zindî/ Turkîya

PUXTE:

Folklor bi qadên xwe yên curbicur ve di gelek qadên cuda yên perwerdeyê da tête bikaranîn. Yek ji wan qadan hînkirina zimanan e. Janrên folklorê yên wekî çîrok, çirçîrok, destan, metelok, stranên gelêrî, helbestên gelêrî, mamik, xeberoşk, zûgotinok û gelekên din di materyalên hînkirina kurmancî da jî têne bikaranîn. Hinkirina kurdî li Tirkîyeyê heta salên 2010î li saziyên serbixwe û taybet bi rêve çûye. Lê sala 2012an bi biryara Wezareta Perwerdeya Neteweyî ya Tirkîyeyê ve Kurdî (Kurmancî/Zazakî) wekî dersên hilbijartî ketiye mifredata xwendinê. Li gor wê biryarê refên 5 heta 8ê dikarin dersa kurdî hilbijêrin û heke li xwendingehekê ji 10an zêdetir xwendekaran ders hilbijart, rêveberiya xwendingehê mecbûr e wê dersê veke. Ji bo amadekirina pirtûkên wan dersan li ser daxwaza wezaretê li Zaningeha Mardîn Artukluyê, ji mamosteyên Beşa Ziman û Çanda Kurdî komîsyonek hate avakirin. Vê komîsyonê ji bo refên 5, 6, 7 û 8an pirtûk amade kirin û ew pirtûk heta sala 2017an hatine çapkirin û li xwendingehan hatine belavkirin. Sala 2017an bikaranîna wan pirtûkan hate betalkiririn û vê carê dîsa li ser daxwaza wezareta perwerdeyê, komîsyoneke cuda ji mamosteyên bajarê Batmanê hate avakirin. Wê komîsyonê jî ji bo heman refan pirtûk amade kirin û ew pirtûk heya roja me li dersên kurdî yên hilbijartî wekî pirtûkên dersê têne bikaranîn. Di vê xebata xwe da em dê lê binêrin ka hêmanên folklorê di hînkirina kurmancî da çawa hatine bikaranîn. Ji bo xebatê ew herdu setên pirtûkên dersa Kurdî (Kurmancî) hatine hilbijartin yên ku li Tirkîyeyê li xwendingehên navîn hatine/têne bikaranîn û pirtûkên pola 5an yên herdu setan hatine analîzkirin. Wek metodolojiya xebatê me metoda dokûmenterî daye ber xwe. Emê ewil paşxaneyeke dîrokî ya hînkirina kurdî li Tirkîyeyê peşkeş bikin, dûvra çarçoveyeke teorîk bidin ku têda li ser teoriyên hinkirina zimanan û bikaranîna hêmanên folklorê di hinkirina zimanan bisekinin. Herî dawî jî emê li ser pirtûkên mijara xebatê hûr bibin û lê begerin ka di her yek ji wan pirtûkan da rêjeya hêmanên folklorê çend e û ew hêman bi çi awayî hatine hilbijartin û çawa hatine bikaranîn.

Peyvên Serekî: *Folklor, Hêmanên Folklorê, Perwerde, Hînkirina Zimanan, Hînkirina Kurdî.*

Destpêk:

Folklor û hêmanên folklorê gelek taybetmendiyên civakî û çandî yên miletekî dihewînin, wan diparêzin û derbasî nifşên nû dikin. Wisa jî ew dibin barhilgirê stûnên avakirina neteweyî. Lewma ji bo avakirina mîtên neteweyî, ji bo hevgirî, yekîtî û mayîndeyîya neteweyî folklor bi hemû layenên xwe ve qadeke girîng û jêneger e ji bo

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

her neteweyî. Li kêleka van taybetmendî û bikarhêneriya xwe ya li qada neteweavakirinê, folklor bingeh û çavkaniya hema bêje hemû qadên hunerî ye, di serî de edebiyat û şano û sînemayê.

Qadên sûdwergirtina ji folklorê bi qadên hunerî ve sînordar nemaye û gelek qadên wekî perwerde û psîkolojîyê jî folklor bo xwe wekî bingeh û çavkanî bi kar anîye. Bi taybetî perwerde bi gelek şaxên xwe ve cih dide hêmanên folklorîk ên wekî destan, çîrok, çirçîrok, metelok, stranên gelêrî, helbestên gelêrî, xeberoşk, zûgotinok, zûgotinok, mamik û keresteyên din ên folklor û edebiyata gelêrî. Bo mînak dastan û çîrok ji bo hînkirina nirxên civakî (values) û wisa jî qadeke berfireh a bikaranînê heye di hînkirina nirxan (value education) da. Wisa jî folklor dibe alîkar ji bo geşedana hîşî û karakterî ya xwendekaran. Yek ji qadên perwerdeyê ku zêde sûdê ji hêmanên folklorê digire, hînkirina zimanan e. Di pêvajoya hînkirina zimanî da folklor û keresteyên folklorê dikarin wekî materyalên nivîskî û yên guhdarîkirinê bêne bikaranîn. Ji bilî hindê jî, ji ber ku berhemên folklorê tijî ne bi hêmanên zimanî yên wekî peyv, biwêj, gotinên pêşiyan û formên cuda yên lêkaran, ew çavkaniyên berhemdar û kêrhatî ne ji bo hînkirina zimanekî. Li ser hindê materyalên hînkirina zimanan ên wekî hînker, metnên xwendinê, metnên guhdarîkirinê û gelekên din ji bo hînkirina mijarên cuda cuda yên zimanî, cih didin her cure keresteyên folklorê.

Kurdî (Kurmancî) jî wekî zimanekî modern ê ku li gelek peywendên cuda da ji bo xwendekarên di temen û astên cuda da tête hînkirin, di pêvajoya hînkirinê da ji keresteyên folklorîk sudê werdigire. Mirov di piraniya materyal û hînkerên zimanê kurdî da dibîne ku mînakên ji hêmanên folklor û edebiyata gelêrî ya kurdî hatine hilbijartin û bikaranîn ji bo hînkirina mijarên ziman û rêzimanî. Bi taybetî jî di pirtûkên dersê yên dersên hilbijare yên li xwendingehên navîn (ji pola 5an ta 8an) yên dewletî (li Tirkîye'yê) mirov rastî bikaranînên berfireh yên keresteyên folklora kurdî tê. Di vê xebatê te emê li çawanîya bikaranîna wan keresteyan binêrin di peywenda pirtûkên hînkirinê yên navborî. Lê ewil ji bo têgehiştina mijarê li jêr çarçoveyek teorîk hatiye pêşkêşkirin, dû ra li ser dersên hilbijare yên kurdî yên li Tirkîye'yê û materyalên wan agahî hatine dayîn. Herî dawî jî bi awayekî tetbîqî li ser hatiye rawestan ka hêmanên folklora kurdî di wan materyal û pirtûkên hînkirina kurdî da çawa û bi çi mebestê hatine bikaranîn û ew heya kîjan redeyê serkeftî ne di armancên xwe da. Ji bo tetbîqê du pirtûkên cuda cuda yên ku ji bo pola 5an hatine amadekirin (ji bo herdu pirtûkan bnr. binbeşên jêr) dê bêne vekolîn û nirxandin:

1- Kadri Yıldırım û yên din. (2012). Kurdî-Kurmancî, ç.1. Ankara: MEB (Di vê xebatê da wekî Kom-1 hatiye qodkirin).
2- Gulbeddin Gülmez û yên din. (2018) Kurdî-Kurmancî, ç.2. Ankara:MEB (Di vê xebatê da wekî Kom-2 hatiye qodkirin).

1. Paşxaneya Teorîk

2. Hînkerên Zimanî

Pêvajoya hînkirinê ji gelek hêmanan pêk tê; mekana hînkirinê, mamoste, xwendekar, materyalên hînkirin. Ji bo ku pêvajoya hînkirinê bikêrhatî û berhemdar derbas bibe, divê ew hêmanên hînkirinê baş li hev bikin û hemû ji bi hev ra rê vekin bo geşedan û guherîna hatiye armanckirin (Akış, 2006, r.1). Ji hêmanên pêvajoya hînkirinê, materyalên hînkirinê (anku materyalên dersê, materyalên alîkar) bandoreke mezin li ser

çawanîya hêmanên din û temamê pêvajoya hînkirinê dikin. Materyalên hînkirinê wekî binemaya agahî û mijarên hînkirinê ên sereke ne. Alan Cunningsworth, materyalên hînkirinê wekî “çavkaniya agahiyan” bi nav dike, li gor wî ew materyal bi mijar, metod û mînakên xwe ve xwendekaran ji bo jiyana rasteqîn amade dikin (Cunningworth, 1984, r.4).

Materyalên hînkirin helbet di hînkirina zimanî da jî cihekî xwe yê girîng û kêrhatî hene. Ji wan materyalan hinek bi awayê amadekirî têne ber destê mamosteyan, hinek ji aliyê mamosteyan ve li gor mijar û asta xwendekaran û armancên hînkirinê têne amadekirin, yan jî materyalên li ber dest li gorî armancan tên guherandin û adaptekirin. Çi hînker[1], çi materyalên amadekirî bên bikaranîn, piraniya mijarên hînkirinê û pratîka zimanî ya ku di polê da bi rêya materyalên hînkirinê pêk tê (Richards, 2001, r.251). Lewma bi qasî berbelaviya materyalên zimanhînkirinê, ew qas jî giranahiya wan heye. Gava mirov li ser serdestiya wan a di pêvajoya hînkirinê da dinêre, dîyar dibe ku pêvajoya hînkirinê bê materyal kêm e, heta bê materyal nabe. Richards, derbarê materyalên hînkirinê û girîngiya wan wiha dibêje: “piraniya bernameyên hînkirina zimanî yên îro li ser dinyayê hene, bêyî materyalên hînkariyê xwe li ser piyan nagirin”, û ew materyalên hînkirinê bi vî şiklî dabeş dike (Richard, 2001):

(a)materyalên çapkirî wekî kînkeran, pirtûkên rahênanan, kaxezên rahênanan û pirtûkên xwendinê; (b) materyalên neçapkirî wekî kaset an jî materyalên guhdarîkirinê, vîdeo, an jî materyalên li ser kompûterê; (c) materyalên hem çapkirî hem jî neçapkirî wekî materyalên li ser înternetê barkirî hwd. Dîsa materyalên wekî kovar, rojname, û materyalên di televîzyonê de yên ku ne ji bo armancên hinkirinê hatine amadekirin jî dikarin di mifredatê de cih bigirin.

Wekî ku bi awayekî aşkere têtê dîtin, sînorê materyalên hînkirinê berfireh e û li gorî jêhatîbûn û tecrûbeya mamosteyan her tişt dikare di pêvajoya hînkirinê de wekî materyal bête bikaranîn. Heta ji ber ku, di serî de hînker, hemû materyalên hînkariyê xwedî çarçoveyeke zelal in, ew dikarin bi taybetî ji bo mamosteyên nû û bêtecrûbe bibin rêber û pêvajoya hînkirinê hêsantir û berhemdartir bikin.

Hînkerên zimanî, bi gotineke din *hînker* di nava materyalên hînkirinê da, ya herî belave ye. Li gorî gelek zanyaran bêyî hînker pêvajoya hînkirina zimanekî kêm û bêfeyde ye. Hînker gelek ji materyalên nivîskî (nivîsar, diyalog, metn û perçeyên xwendinê); bihîstyarî (diyalog û perçeyên bilêvkirinê yên li qeset û CDyan barkirî); û dîtbarî (wêne, karîkatûr û xêzên derheqê babetan); bihîstyarî û dîtbarî (fîlm, fîlmên qarton hwd.) pêk têm. Ji ber vê taybetmendiya xwe, bi gotina Alan Cunningsworth ew ji bo bidestxistin û gehiştina armancên xwendekaran pêdiviyeke sereke ye (Cunningworth, 1995, 7; vgz Kurt, 2015, r.10).

Di tecrûbe û pêvajoya hînkirina kurdî ya li Tirkîyeyê da jî gîrngiya hînkerên zimanî baş hatiye fehmkirin û sala 2001an hînkera ewil hatiye çapkirin.[2] Berî wê hînkirina kurdî bêtir bi pirtûkên rêzimana kurdî ve dihate kirin.[3] Dîsa sala 2007an seteke nû ya bi nave *Hînker* hate amadekirin ji bo hînkirina kurdî. Gava mirov li van herdu hînkerên pêşeng ên zimanê kurdî dinêre, dîyar dibe ku wan bi metodên modern berê xwe dane hînkirina kurdî.

a-Folklor di Hînkirina Zimanan da

Folklor gewdeya vegêranên devkî ye ku ji nifşekî bo nifşê dîtir têne veguhastin. Ji ber ku di her destan, çîrok, metelok, mamik û hwd. da ders û nesîhetên cuda hene û ew

Zakho Centre
for Kurdish Studies

kereste û hêmanên folklorê û edebiyata gelêrî bi sembol û motîfan ve hewl didin perwerdeya civakî bidin zarok û nûciwawan, û herwisa adab û rêyên rabûnûrûniştinê pêşkêş bikin. Di heman demê da berhemên folklorê nîşaneya dewlemendî û hêza zimanî jî ne, ew çavkanîyên kêrhatî têne hesabê ji bo hînkirina zimanî. Lewma di gelek hînkerên zimanî da keresteyên folklorê têne bikaranîn ji bo pêşvebirina şiyaneweriyên zimanî yên xwendekaran (Subaşı, 2014, r.56).

Di vî warî da bi taybetî helbesta gelêrî, çîrok, stranên gelêrî, mamik û zûgotinok berhemên kêrhatî ne û guncav in ku bêne bikaranîn wekî materyalên hînkirin zimanî. Dîsa bikaranîna berhemên folklorê rêyeke baş e ji bo veguhastina çand û nirxên civakî bo hînerên zimanî (Farr, 1940, rr.260-62). Herwisa Lines nalê dikêşîne ser hindê ku bikaranîna hêmanên folklorî di perwerdeyê da rêyeke serkeftî ye bo pirçandîtî û berbelavkirina nirxên mirovatîyê yên gerdunî (Lines, bt, r.7). Helbet di bikaranîna folklorê wekî alaveke hînkirinê de divê em li ser hin xalan haydar bin; (1) Hilbijartina rê û rêbazên kêrhatî bo pêşkêşkirina folklorê; (2) Hilbijartina kereseteyên folklorê yên guncav ku li armancên hînkirinê tên; (3) Divê mamoste jê haydar bin ku hem naveroka hêmanên folklorê hem jî rêbaza pêşkêşkirinê li gor ast û temenê xwendekaran e û ew bi dilê wan in; (4) Divê bi rastî jî ew ders guncav bin ku bi rêya keresteyên folklorê bêne pêşkêşkirin; (5) Divê mamoste li ser bifikirin ka bi rastî jî encama wan dersan bi kêrî xwendekar û civakê tê; (6) Divê mamoste jê haydar bin ka bikaranîna kereseteyên folklorê ji aliyê dem û îmkanên maddî ve çi qas guncav in. Heke bikaranîna wan bi mesref be, dibe ku bikaranîna keresteyên folklorî bête betalkirin; (7) Rewş û jêhatîbûna mamosteyan e. Jixwe bikaranîna serkeftî ya hemû materyalan kêm zêde bi şarezatîya mamosteyan ve girêdayî ye û bikaranîna kereseteyên folklorîk ji bo armancên hînkirinê jî ne bêpar e ji vê yekê (Lines, bt, 11). Vêca wek ku dîyar dibe, gava pirtûkên hînkirina zimanî têne amadekirin divê ew faktorên jorîn hemû jî li ber çavan bin da ku mifayê herî bilind bête wergirtin ji mijar û naveroka ku ji hêmanên folklorê hatine wergirtin.

1. Li Tirkîyeyê Dersên Hilbijare yên Kurdî

Li Tirkîyeyê piştî avakirina komarê daxwazên perwerdeya bi zimanê kurdî her dem di rojeva civak, rewşenbîr û sîyasetmedarên kurd da bû. Lê heta salên 2000î jî pêngavên erênî nehatine avêtin ji aliye dewletê ve. Piştî nîqaşên dûvdirêj li ser perwerde û hînkirina zimanê kurdî, Lijneya Hînkirin û Perwerdekirinê ya Wezareta Perwerdeya Neteweyî (WPN) ya Tirkîye'yê 25ê Hezîrana 2012an "Bernameya Heftane ya Dersan ji bo Saziyên Xwendina Navîn (Seretayî-Navîn)" qebûl kir. Li gor wê bernameyê ji bo polên 5an ên xwendingeha navîn derseke nû ya hilbijare bi navê "Ziman û Zaravayên Zindî" hate vekirin.[4] Li nav wan ziman û zaravayan da navê Kurmancî û Zazakî jî hebûn. Li ser wê bernameya navborî jî Rêveberiya Giştî ya Perwerdeya Bingehîn a Wezareta Perwerdeya Neteweyî, giştînameyek belav kir derheqê dersên hilbijartî û rê û rêbazên hilbijartina wan.[5] Li gor wê giştînameyê heke herî kêm deh xwendekar dersekê hilbijêrin, hingê koma wê dersê pêk tê û ew ders tête vekirin. Herwisa di wê giştînameyê da hatiye dîyarkirin ku dersên hilbijrtî yên sala perwerde û hînkirinê ya 2012-2013an divê meha Îlonê bêne nasandin û karûbarên hilbijartina wan bêne kirin. Dîsa her sal mehên Îlon û Sibatê demên hilbijartina wan dersên hilbijare ye (Kurt, 2020, rr.256-160).

Piştî weşandina giştînameya dersên hilbijartî, rê li ber xwendekarên pola pêncan yên xwendingehên navîn vebû ku ji hewza dersên hilbijartî dersa li gor daxwaza

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

xwe hilbijêrin. Sala ewil li 80 bajarên Tirkîye'yê bi giştî 28.587 xwendekaran dersa Ziman û Zaravayên Zindî hilbijartin û ji nava wan 18.847 kesan Kurmancî û Zazakî hilbijartin. Ew hejmar li gor ku sala ewil bû û raya giştî ya kurdan 'eleqeyeke zêde nîşan nedabe jî, hejmareke hêvîbexş bû. Jixwe di salên dîtir da hejmara xwendekarên ku zaravayên zindî hildibijartin her diçû zêde dibû û sala 2014-2015an a perwerdeyê da gehiştiye 85.000 xwendekaran ku piraniya wan jî dersa zaravayên kurdî hilbijartibûn. Herçiqas hejmara xwendekarên ku dersên Ziman û Zaravayên Zindî hildibijartin zêde dibû jî, piştî sala 2015an ji ber pirsgirêkên rêveberî, materyalan û tayînkirina mamosteyan, êdî tenê li hejmareke gelek kêm a xwendindegahan da dersa hilbijartî ya kurdî vedibe (Kurt, 2020).

2. Pirtûkên Hînkirina Kurdî bo Dersên Hilbijare

Ji bo dersên hilbijare yên kurdî heta niha du rêzepirtûk hatine amadekirin. Pirtûkên ewil ji aliyê komîsyeneke ji mamosteyên Zanîngeha Mardîn Artukluyê (ZMA) pêkhatî ve hatine amadekirin. Ew pirtûk bi serenavên Kurdî/Kurmancî-5, Kurdî/Zazakî-5, Kurdî/Kurmancî-6, Kurdî/Zazakî-6 ve Kurdî/Kurmancî-7, Kurdî/Zazakî-7 hatine amadekirin û çapkirin.[6] Ew pirtûkên navborî heta sala 2016an li xwendingehan di dersên kurdî da hatine bikaranin (Kurt, 2020). Ew komîsyon ji wan mamosteyan pêk dihat ên ku di warê edebiyat, ziman û hînkirina kurdî da xwedan tecrûbe ne, lê tecrûbeya wan di ware amadekirina pirtûkên hinkirina zimanî da zêde nebû. Dîsa jî mirov dibîne ku li gor bername û mifredata hînkirinê hem tema, hem mijar hem jî metnên xwendinê heta radeyekê serkeftî ne. Di wan pirtûkan da em dibînîn ku gelek mînakên ji keresteyên folklore kurdî jî hatine bikaranîn (bnr. binbeşa jêr).
Sala 2016an bikaranîna wan pirtûkên berê hate rawestandin. Piştî hingê li Batmanê ji hin mamosteyên Wezareta Perwerdeyê komîsyoneke nû hate amadekirin da ku pirtûkên hînkirina kurdî ji nû ve amade bikin. Mamosteyên di wê komîsyonê da berê li hin zanîngehan perwerdeya lîsansa bilind a ziman û edebiyata kurdî wergirtibûn û piraniya wan berê li hin kurs û xwendingehan mamostetîya kurdî jî kiribûn. Vê komîsyonê jî li ser mifredat û bernameya berê ji bo polên, 5, 6, 7 û 8an tenê pirtûkên hînkirina kurmancî amade kirin.[7] Ji sala 2017an ve ew pirtûkên ku ji aliyê vê komîsyona duyem ve hatine amadekirin, li hemî xwendingehên ku dersa kurdî lê heye, wekî pirtûka dersê têne bikaranîn. Ew pirtûk jî di gelek unîteyên xwe da cih didin mînakên ji folklora kurdî.

3.1. Nirxandineke Giştî li ser Naveroka Pirtûkên Hînkirina Kurdî

Pirtûka Kom-1 bi temamî ji 9 unîteyan pêk tê û di dawiya pirtûkê da ferhengokeke bi kurdî-tirkî ya berfireh heye ku hema bêjen hemî peyvên pirtûkê pêşkêş dike. Di pirtûkê da her unîte li gor temayekê hatiye amadekirin. Unite û temayên di pirtûka ewil da ev in: 1. *Alfabeya me, 2. Ez û Malbata Xwe, 3. Xwendingeh û Jîngeha Min, 4. Laş û Tenduristî, 5. Demsal û Salname, 6. Xwarin û Vexwarinên Me, 7. Lîstik û Xeberoşk, 8. Çalakiyên Serbest, 9. Hatûçû-Geştûger*.

Di pirtûka Kom-1 da wek rêya pêşkêşkirina mijaran ji metnên xwendinê bêtir dîyalog hene. Tema û mijarên unîteyê bi dîyaloga di navbera du yan sê kesan da têne dayîn û wisa jî hewl tête dayîn ku peyvên nû û nenas bên bikaranîn û pêşkêşkirin. Wek metnên edebî yan jî yên xwendinê di unîteyên destpêkê da helbestên zarokan hatine hilbijartin û li gor temayê di nav uniteyan da hatine bicihkirin. Lê, ber bi unîteyên dawîn

Zakho Centre
for Kurdish Studies

metnên pexşanî jî cihê xwe digirin. Wekî rahênan jî bêtir dagirtina valahiyan, hevyekkirina wêne û peyvan, dîyarkirin çewtî û rastîyan, xaçepirs û serastkirina peyvan hatine hilbijartin. Bi nêrîneke giştî mirov dikare bibêje ku rêbaza pêşkêşiyê û hilbijartina naverokê ji aliye ast û temenê xwendekaran ve guncav in. Rexneyeke ku li ser pirtûkê bête kirin ew e ku wê ji aliyê rahênan û çalakiyan ve zêde bijartek bi cih nekirine, lewma hin caran dikeve dubareyê. Ew dubare dibe ku bi bandoreke neyînî li ser xwendakaran bike û piştî demekê wan ji dersê sar bike.[8]

Pirtûka Kom-2 jî li ser heman mifredat û bernameyê hatiye amadekirin, lewma jî ji aliye tema û unîteyan ve wekî pirtûka berî xwe ye. Ew jî hema bêje li ser heman mijaran hatiye dabeşkirin û bi temamî ji neh uniteyan pêk tê. Di dawiya pirtûkê da ferhengokeke berfireh ya bi kurdî-tirkî heye. Tema û unîteyên pirtûka Kom-2 jî ev in: 1. *Em zimanê xwe nas bikin, 2. Ez û malbata xwe, 3. Xwendingeh û jîngeha min, 4. Laş û tenduristî, 5. Xurek û vexurekên me, 6. Salname û demsal, 7. Geştûger û hatûçû, 8. Lîstik û çîrok, 9. Çalakiyên serbest.*

Wek rêya pêşkêşkirinê di pirtûka Kom-2'da jî diyalog û hevpeyvîn hene, lê li hin unîteyan metnên pexşan jî cihê xwe digirin. Dîsa helbestên zarokan hema bêje di her unîteyê da têne pêşkêşkirin, jixwe di her unîteyê da beşa *helbestê* heye. di pirtûka Kom-2 da jî dagirtina valahiyan, hevyekkirina peyv û wêneyan û xaçepirs rêyên rahênan û çalakîyan in. Di her unîteya pirtûka Kom-2 da bi navê *zargotin* beşeke serbixwe heye ku têde cure û hêmanên cuda cuda yên folklora kurdî têne pêşkêşkirin. Ev taybetmendî xala herî dîyarker û cudaker e ji pirtûka berî xwe. Dîsa taybetmendîyeke din a ku pirtûka Kom-2 ji ya berî xwe cuda dike, beşa *nirxandinê* ye. Di wê beşê de zanîn û destkeftiyên unîteyê bi rêya pirsan tête pîvandin.

3.2. Bikaranîna Hêmanên Folklorîk di Pirtûkên Hînkirina Kurdî da

3.2.1. Hêmanên Folklorîk di Pirtûka Kom-1 da

Di pirtûka Kom-1 da li şûna ku di her unîteyê da cih ji bo hêmanên folklor û edebiyata gelêrî bête veqetandin û ew ji bo armancên hînkirinê bên bikaranîn, unîteyeke serbixwe bi navê “Lîstîk û Xeberoşk” hatiye amadekirin. Di wê unîteyê da ku wekî unîteya 7an hatiye bicihkirin, -mînakên ji hêmanên edebiyata gelêrî yên wekî zûgotinok, xeberoşk lîstikên zarokan, mamik, çîrok û çîrokên helbestkî hatine pêşkêşkirin.

Unîte	Cure	Jimar
7	zûgotinok	3
7	xeberoşk	2
7	mamik	6
7	çirçîrok	1
7	xeberoşk	1
7	lîstîkên zarokan	4
Sercem		**17**

Tablo 1. *Cure û jimarên keresteyên folklorê di pirtûka Kom-1 da.*

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Di materyalên hînkirina zimanî da bikaranîna her cure naverok û metnan divê xwedî armacekê bin. Di wê unîteya 7an a pirtûka Kom-1ê da armancên zimanî dîyar nînin, lê dîsa jî hebûna wan hêmanên wekî zûgotinok û mamikan hewl didin şiyanên bilêvkirinê û axaftinê yên zarokan pêşve dibin. Dîsa hebûna çirçîrok û çîrokan dersên exlaqî û civakî didin xwîneran.



Wêne 1: *Mînakek ji pirtûka Kom-1 ji bo bikaranîna hêmanên folklorîk.*

3.2.2. Hêmanên Folklorîk di Pirtûka Kom-2 da

Herçend li ser heman bernameya pirtûka berî xwe hatibe amadekirin jî, pirtûka Kom-1 ji aliyê bicihkirin û bikaranîna hêmanên folklorê ve dewlemendtir e. Li şûna ku wekî pirtûka berî xwe hêmanên folklorîk tenê di unîteyekê da bi cih bike, pirtûka Kom-2 di her uniteyê da bi navê “Zargotin” beşek veqetandiye ji bo hêmanên folklorîk.

Unîte	Cure	Jimar
1	mamik	3
	pêkenok	2
2	gotinên pêşiyan	5
	pêkenok	1
	çîroka gelêrî	1
	lêhatinok (xeberoşk)	1

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

3	mamik	3
	gotinên pêşiyan	3
	pêkenok	1
	lêhatinok (xeberoşk)	1
4	pêkenok	1
	mamik	3
	gotinên xweş	3
	zûgotinok	1
5	mamik	5
	pêkenok	1
	gotinên pêşiyan	4
6	mamik	4
	adetên berê	1
	xeberoşk	5
7	mamik	4
	gotinên pêşiyan	3
	pêkenok	1
8	lêhatinok (xeberoşk)	2
	lîstikên zarokan	6
	gotinên pêşiyan	4
	mamik	5
	zûgotinok	2
	pêkenok	1
	stran	1
9	mamik	5
	lêhatinok (xeberoşk)	3
	zûgotinok	1
	pêkenok	1
Sercem		**88**

Tablo 2. *Cure û jimarên keresteyên folklorê di pirtûka Kom-2 da.*

Dewlemendîya hêmanên folklorê a di pirtûka Kom-2 da ji gelek aliyan ve xwendekaran ên zimanî ji gelek alîyan ve pêşve dibe. Bo mînak bi çalakiyên axaftinê yên têkildar bi hêmanên folklorê ve hewl dide şiyaneweriya axaftinê, bi mamikan, zûgotino, lêhatinokan ve şiyana axaftin û bilêvkirinê pêşve dibe. Herwisa pirtûka Kom-2 bi zêdebûna berhemên folklorê ve hewl dide peyvdanka xwendekaran berfireh dike û wisa jî bikaranîna zimanî li ber xwendekaran hêsantir dike. Dîsa di vê pirtûka navborî da hebûna cûreyên keresteyên folklorê ên wekî gorinên pêşiyan, gotinên xweşik, lîstîkên zarokan û çîrokên gelêrî hem şiyaneweriyên zimanî pêşve dibin hem jî ji aliye exlaq û karakterê ve bandorekek erênî dikin li ser geşedana xwendekaran.

Encam:

Di wan pirtûkên hînkirina kurdî da yên ku wekî pirtûkên dersê têne bikaranîn di dersên hilbijare yên kurdî da hêmanên folklorê qismekî mezin ê metnên xwendinê û

çalakiyên pêşvebirina şiyaneweriyên zimanî pêk tînin. Herçend di pirtûka Kom-1 da jimara hêmanên folklorê kêm bin û tene di unîteyekê da hatibin komkirin jî di pirtûka Kom-2 da di her unîteyê da beşa taybet ya folklorê heye û ew yek jî aşkere dike ka amadekarên pirtûkê çi qas girîngî dane bikaranîna hêmanên folklorê di hînkirina kurdî da.

Çavkanî:

Akış, S. (2006). *A Comparative Study of Coursebook Evaluation and Selection Principles of EFL Teachers at State and Private Schools,* Teza lîsansa bilind çapnebûyî, Ankara: Hacettepe University Institute of Social Sciences.

Cunnigsworth, A. (1984). *Evaluating and Selecting EFL Teaching Material,* London: Heinemann.

Cunningsworth, A. (1995) *Choosing your Coursebook,* Oxford: Macmillan Heinman.

Farr, T. J. (1940). "Some Uses of Folklore in Teaching English" *Peabody Journal of Education* , , 17 (4) rr. 260-262. https://www.jstor.org/stable/1489392

Gülmez, G. (2018). Kurdî (Kurmancî)-5. Ankara: Meb.

Kurt, Ş. (2015). *Nirxandina Pirtûka Hinkirina Kurdî: Hinker-Li gor nêrînên xwendekar û mamosteyan*, Teza Lîsansa Bilind Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu. Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Kurt, Ş. (2020). *Türkiye'de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi*. Teza Doktorayê ya Çapnabûyî. Diyarbekîr: Zanîngeha Dîcleyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Lines, L (Bêtarix). *Folklore in Education: A Teaching Tool in Classroom*. Ph.D. Thesis submitted to Department of Folklore, Memorial University of Newfoundland, Newfoundland.

Richards, J. C. (2001). *Curriculam Development in Language Teaching*, Cambridge: Cambridge University Press.

Subaşı, K. (2014). Ji bo Zarokan di Fêrkirina Kurdî de Rola Mamikan (Vekolîn-Senifandin). Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî, Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu. Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Yıldırım, K. û yên din (2012). Kurdî (Kurmancî)-5. Ankara:Meb.

Perawêz:

[1] Di kurdî ev peyv wek navê taybet yên hin pirtûkên zimanhînkirinê hatiye bikaranîn, lê li vir bi peyva "hînker" ve qesta me pirtûkên hînkirina zimanî (coursebook) ne.

[2] Hînkera ewil a ku ji bo hînkirina kurdî hatiye amadekirin, pirtûka bi navê *Hînker* e ku sala 1920an bi du zaravayan (Kurmancî-Babanî) hatiye amadekirin û Stenbolê hatiye çapkirin. Li vir bi hînkerê ve qesta me bêtir ew pirtûk in yên ku piştî salên 2000î li Tirkîyeyê hatine çapkirinê.

[3] Di vî warî de ji bo nirxandineke li ser pirtûkên rêzimana kurdî bnr. Şehmus Kurt, *Türkiye'de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi*. Teza Doktorayê ya Çapnabûyî. Diyarbekîr: Zanîngeha Dîcleyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, 2020.

[4] Ji bo bernameya dersên hilbijare ya sala 2012an bnr.: https://www.memurlar.net/common/news/documents/278182/25062012-69.pdf (Dîroka Xwegihandinê: 13.03.2020)

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

[5] Ji bo giştînameya ser dersên hilbijare ya sala 2012an bnr.: https://www.memurlar.net/common/news/documents/278182/meb-2012-37.pdf (Dîroka Xwegihandinê: 13.03.2020).

[6] Herçend ji aliyên heman komîsyonê ve ji bop ola 8an jî pirtûk hatibe amadekirin jî, ew pirtûk nehatiye belavkirin.

[7] Pirtûkên hînkirina Zazakî ji aliyê komîsyoneke din hatine amade kirin. Ew komîsyon ji hin mamosteyên Zanîngeha Bîngolê pêk dihat.

[8] Ji bo analîz û nirxandinên berfirehtir ên li ser vê rêza pirtûkan bnr. Kurt, 2020.

KÜRTÇE (KURMANCÎ) ÖĞRETİM KİTAPLARINDA FOLKLOR KULLANIMI: MİLLİ EĞİTİM KİTAPLARI ÖRNEĞİ

ÖZET:

Folklor farklı ürünleri ile eğitimin pekçok alanında kullanılmaktadır. Folklorun kullanıldığı alanlardan biri de dil öğretimidir. Folklor ürünlerinden olan halk hikayesi, masal, peri masalı, halk şarkıları, halk şiiri, bilmece, tekerleme gibi pek çok ürün Kürtçe öğretimi materyallerinde de kullanılmaktadır. Türkiye'de Kürtçe öğretimi 2010lu yıllara kadar bağımsız ve özel kurumlarda yürütülmüştür. 2012 yılında Türkiye Milli Eğitim Bakanlığı'nın kararıyla Kürtçe (Kurmancî/Zazakî) seçmeli ders olarak müfredata girmiştir. İlgili karara göre ortaokullarda (5-8 sınıf) okuyan öğrencilerin Kürtçe'yi seçmeli ders olarak seçebilmelerinin önü açılmıştır. Eğer bir okulda 10 ve üzeri sayıda öğrenci Kürtçe'yi seçmeli ders olarak seçerse, okul yönetimi dersleri açmakla yükümlüdür. İlgili derslerde kullanılacak kitapların hazırlanması amacıyla bakanlığının talebi üzerine Mardin Artuklu Üniversitesi bünyesinde bir komisyon kurulmuştur. Söz konusu komisyon 5,6,7, ve 8. sınıflar için Kürtçe öğretim kitapları hazırladı ve bu kitaplar 2017 yılına kadar kullanıldı. 2017 yılında bu kitaplar kullanımdan kaldırıldı. Bu kez Milli Eğitim Bakanlığı tarafından Batman'da görev yapan bir grup öğretmenden oluşan yeni bir komisyon kurdu. Yeni komisyon aynı sınıflarda okutulmak üzere Kürtçe öğretim kitapları hazırladı. İlgili kitaplar halihazırda Seçmeli Kürtçe Derslerinde kullanılmaktadır. Bu çalışmada folklor ürünlerinin Kürtçe öğretiminde nasıl kullanıldığını ele alınmıştır. Çalışma için adı geçen Kürtçe öğretim kitapları incelenmiş ve her iki sette yer alan 5. sınıf Kürtçe (Kurmancî) kitapları analiz edilmiştir. Çalışmada Dökümenter Analiz Yöntemi takip edilmiştir. Bu amaçla önce Türkiye'deki Kürtçe öğretimin serüveni sunulmuş, ardından dil öğretimi ve dil öğretiminde folklor ürünlerinin kullanımına dair teorik bir çerçeve verilmiştir. Son olarak da çalışmaya konu kitaplar derinlemesine incelenmiş ve ilgili kitaplarda folklor ürünlerinin kullanımı nitelik ve nicelik açısından analiz edilmiştir.

Anahtar Sözcükler: *Folklor, Folklor Ürünleri, Eğitim, Dil Eğitimi, Kürtçe Öğretimi.*

USE OF FOLKLORE GENRES IN KURDISH (KURMANCÎ) TEACHING BOOKS: EXAMPLE OF NATIONAL EDUCATION BOOKS

ABSTRACT:

Folklore is used in many areas of education with its different genres. One of the areas in which folklore is used is language teaching. Many folklore genres such as folk tales, fairy tales, folk songs, folk poetry, riddles and rhymes, are also used in Kurdish teaching as teaching materials. Kurdish teaching in Turkey was carried out in independent and private institutions until 2010. In 2012, with a decree of the Turkish Ministry of National Education, Kurdish (Kurmancî/Zazakî) entered the curriculum as an elective course. According to the relevant decision, students in secondary schools (5-8 grades) were able to choose Kurdish as an elective course. If 10 or more students choose Kurdish as an elective course in a school, the school administration is obliged to open the courses. A commission was established at Mardin Artuklu University following the request of the ministry in order to prepare the books to be used in the relevant courses. The commission prepared Kurdish teaching books for 5,6,7, and 8th grades, which were used until 2017 when they were deprecated. After the deprecation, a new commission of teachers from Batman province by the Ministry of National Education. The new commission has prepared Kurdish teaching books to be taught in the same classes. Related books are still used in Elective Kurdish Courses. In this study, the way folklore genres are used in Kurdish teaching is discussed. The aforementioned Kurdish teaching books were examined with the example of 5th grade Kurdish (Kurmancî) books in both sets. Documentation Analysis Method was used in the study. For this purpose, firstly the adventure of Kurdish teaching in Turkey was presented, then a theoretical framework was given regarding language teaching and the use of folklore genres in language teaching. Finally, the books subject to the study were examined in depth and the use of folklore genres in related books was analyzed in terms of quality and quantity.

Keywords: *Folklore, Folklore Genres, Education, Language Teaching, Teaching Kurdish.*

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەكولينێن كوردى

Di navbera Diyarbekir û Silîvanê da Lêkolînek Onomastîk

AHMET KAN/ Turkîya

PUXTE:

Em ê di pêşkêşa xwe da li ser guherîna navan a ji serdema Mîrektîya Merwanîyan (983-1085) heta nîvê sedsala 20. dema Komara Tirkîyeyê, bi taybetî guherîna navê cih û waran, ji Rojhilatê Diyarbekirê (Amîd-Amedê) heta bigihîje nava navçeya Silîvanê (Meya Farqinê) rawestin.

Cara pêşîn (1071) tirkên Selçûkî, bi alîkarîxwestina ji Merwanîyan peywendî bi kurdên Diyarbekir û Silîvanê ra saz kirin. Di navbera 14 salan da (1085) tirkên selçûkî, dawî li desthilata mîrektîya Merwanîyan anîn. Piştî ku selçûkî li vê herêmê bûn desthilatdar hêdî hêdî li cihê navên kurdî navê tirkî bi kar anîn.

Dewleta Osmanî di sed sala 16. da li Diyarbekirê îdareyek bi navê Mîrê Mîran, bi pêşengîya Îdrîsê Bedlîsî (1452-1520) ava kir. Piranîya bajarê kurdan (Ruha, Mêrdîn, Sêrt, Mûsil, Xarpêt, Dêrsim..) bi ser vê desthilatê ve kirin. Di vê serdemê da (1500-1900) navê cih û waran zêde neguherî. Lê ji desthilatdarîya Jon Tirkan (1900) heta bihêzbûna Komara Tirkîyeyê (1940) dest werdanek mezin a navlêkirinê hat kirin.

Onomastik (navnasî) ji onomaya grekî a bi wateya navê taybet ê tiştan an kesan hatiye dariştin. (Subaşi & Geyik, 2017: 237). Merivahî hêj di serdemên qedîm da ji ber meraq û xwesteka rastîyê, li ser navlêkirinê fikiriye û serê xwe pê êşandîye. Hem di deqên kevin hem jî di pirtûkên pîroz da li ser mijara navlêkirinê hin beş hene.

Em ê pêşkêşa xwe li gorî van binbeşên navnasîyê wiha polîn (tesnîf) bikin.

A) Zanista navê cihan toponîm (toponymy, toponymie) e.
B) Zanista navê derya, gol, çem û kanîyan hîdronîm (hydronymy) e.
C) Zanista navê merivan, antroponîm lêkolîna navê merivan dike
D) Zanista navê malbat, eşîr û gelan, etnonîm e.
E) Zanista navê çîyayan lêdikole oronîm e.
F) Zanista navê rê, kuçe û taxan lêdikole hodonîm e.
G) Zanista ku navê lehengên (karakterên) edebî û dîrokî lêdikole karektonîm e. (Aksan, 2009: 100)

Peyvên serekî: *Diyarbekir, Silîvan, Onomastîk, Merwanî, Selçûkî, Osmanî, Tirk, Kurd.*

Destpêk:

Di destpêka sedsala 20an da, bi damezrandina netewedewletên nû ve, din av sînorên neteweyî yên van dewletan da gelek proses û pratîkên cur bi cur ên netewesazîyê ketine merîyetê ku hewl didan ji alîyê çand, nasname û ziman ve kom û cemawereke yekreng pêk bînin û bi vê; xwe bigihînin wê armanca ku Anderson (2017) wekî "cimaeta muxayel" terîf dike. Li Komara Tirkîyeyê, neteweya ku hate xeyalkirin û îdeolojîyên neteweperest ên hevterîp li gel vê xeyalê hatin sazûmankirin bi temamî bi têgiha Anderson a navbirî r ali hev tê. Wekî netewe-dewleteke modern a nû avabûyî,

Zakho Centre for Kurdish Studies

Komara Tirkîyeyê kete rêya dirustkirina neteweyeke yekreng ku ji tirkan pêk dihat û bi gelek amrazên cihêreng ên zimanî, çandî, dîrokî û nasnameyî emel dikir da ku xwe bigihîne armanca xwe ya daxwazkirî. Di dirustkirina neteweyeke yekreng da, pir zimanî û pir çandinîyê rêgirî ji netewesazîyê ra dikir û nedihîşt ku bigihe serî. Bi vê armancê, gelek polîtîka û stratejîyên vederker û homojenîzasyonê li ser hêlên vê pirrengîyê hatin ceribandin ku yek ji wan wekî kevirê takêşê tim **ziman** bi xwe bû. Jixwe, ji gelek lêkolînên li ser rewşa zimanê kurdî û polîtîkayên zimanî yên li hember kurdî (Haig, 2004) tê fêmkirin ku prosesên netewesazîyê yên li Tirkîyeyê tim cexteke xurt dane li ser zimanê tirkî û zimanên xeyrî-tirkî, bi taybetî kurdî, kurdî di nav pergala yasayî da nedhatîye pesendkirin, bi ser da jî tim ew rastî rêgirî û qedexeyan hatîye. Lewra, pratîkên zimanî yên heta niha tetbîqkirî, wê rastîyê nişan didin ku neteweperestîya li Tirkîyeyê din av fêm û feraseta neteweperestîyeke zimanî da şikil girtîye. Ji berk u înkara ziman û hebûna kurdan, guvaşên li ser ziman û çanda kurdî gelek salan şikil û şêwe daye helwesta dewletê ya li ser kurdan (Zeydanlıoğlu, 2012: 101)
Di bin tesîra nêrîna neteweperest a zimanî da, gelek amrazên bi girêdayî hêz, îdeolojî û hegemonyayê di çarçoveya polîtîkayên zimanî yên tund da hatine tetbîqkirin ku yek ji wan jî tunekirina dîyarî û dîtbarîya zimanan bû ji ser rûyê erdê an jî dîmena zimanî (language landscape). Di vê çarçoveyê da, li Tirkîyeyê, bi bingehên yasayî ve lijneyeke taybet hatîye avakirin bi navê **Ad Değiştirme İhtisas Kurulu** (Lijneya Pisporan ji bo Navguhertinê) û vê lijneyê bi hezaran navên cihan ên ji zimanên xeyrî-tirkî guherandîye û di dewsa wan da navên nû yên tirkî cîbicî kiriye. Ev pratîk di cewher da, vedigere heta dewra dawî ya Dewleta Osmanî ku Jon Tirk li ser hukim bûn. Herçî piştî avabûna Tirkîyeyê, ev mîras bêxwedî nemaye û bi rengekî xurttir berdewam kiriye. Herçiqas, hikûmetên ji îdeolojî û nêrînên cüda hatibin ser hikum jî awayê destwerdanên li pergala navan zêde negiherîye û wekî pratîkên dewamdar ên navguhertinê her pêş da çûye û bi deme ra bûye yek ji polîtîkayên zimanî yê dewletê. Her çi qasî di medyayê da pratîkên navguhertinan û egera îadekirina navan çend salan carekê ji nû ve dibe mijara gelek nîqaş û gengeşeyên cur bi cur ku raya giştî pê ra mijûl dibe jî dîsa encam nayê girtin. Wate, ji salên ewil ên guhertina navan heta niha, ev babet bûye yek ji wan babetan ku timî caran çi bi hewlên sîyasetmedaran çi jî bi hewlên rêveberîyên herêmî dibe sebebê nelihevî û dubendîyan din av kom û cemawerên cüda yên li Tirkîyeyê da. Ji ber hindê, ev babeta k udi gelek astên cuda da gelek caran tê nîqaşkirin, bertek bi tê ra xwe rojane û girîng e ku divê bi hemû cihetên xwe ve bê vekolîn.

Di halê hazir da, dema meriv li nexşeyan dinêre, ji sînorên rojava yên bi Yûnanistan, Bulgaristanê vbigire heta sînorên rojhilat bakur û başûr ên bi Gurcistan, Ermenistan, Îran, Iraq û Sûrîyeyê ra hemû nexşe bi navê “xwerû” tirkî ve tijî ne. Ya rast ev nexşe sed sal berî niha ne ew çend xwerû bûn, wekî rengvedana pêkvejîyana gelek netewe û zimanên li Tirkîyeyê, pergala toponîmîk bi nav û nîşanên rengorengo ve tijî bûn. Lêbelê, piştî ku navê cihan hatin guhertin, xisarek mezin giha vê mirata toponîmîk a pirrengî pizimanî. Mîrata pirçandî, pizimanî û pirdînî ya Dewleta Osmanî k udi toponîman da jî xwe eşkere dikir, ji bo netewedewleta nû dibe sebebê tevlihevî û nerazîbûnê. Ji bo serketina dewleta nû, divîya nav û nîşanên “kevn” bihatana paqijkirin ji bîra hevpar a gel(êrî) da ku paşê nebûna sebebê dawakarîyên “bitalûke” yên kêmîneyan.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Gelek şêwaz û temsîlên ku di prosesa zimanî û (ve)navandina li Tirkîyeyê da rû dane, ji alîyê dîtbarîyê ve dest nişan dikin ku navê cihan wekî parçeyeke zimanî para xwe ji hemû wan zext û destwerdanên li ser ziman wergirtîye. Lewra, li seranserê Tikîyeyê behra bêtir ji wan toponîmên ku bi rengekî bi tirkî ra nehatine têkildarkirin, bi gelemperî ji pergala navan a adetî hatine (ve)derkirin û rêgirî li wan hatiye kirin da k udi qada giştî neyên dîtin û bihîstin. Di çarçoveya polîtîkayên zimanî yên tund da kul i Tirkîyeyê xwe gihandiye asteka rûxîner ya "zimankujî"yê (linguicide) (Hassanpour, 2020; Skutnabb-Kangas, 2006), (ve)navandina navê cihan jî nehatîye jibîrkirin, bi vî karî, zimanê kurdî bi firawanî ji pergala navan(dinê) ya li bajarên kurdnişîn hatîye vederkirinê ku şîyanwerî dida zimên (da) ku bikaribe bi rengekî civatî û mekanî dîtbar û dîyar bibe. "Nedîtbarkirin"a (invisibilisation) zimanê kurdî (Skutnabb-Kangas & Bucak 1995; Haig 2004) û vederkirina kurdî ji pergala perwerdehîya fermî, digel sînordarkirina mafê zimanî, gelek polîtîkayên din ên tadeyî (Arslan, 2015) jî hiştîye ku texrîbateke mezin bigihe ziman û têgihiştina zimên a axaftvanên wê.



Nexşeya Serdema Merwanîya. Ji Tarîxu Îbnu-l Ezraq

Kurte Dîroka Amedê

Dema em li kurtedîroka bajarê Amedê dinêrin dibînin ku bi berdewamîya dîrokê ra navên wekî Amîda, Amîd, Kara Amîd, Omîd, Amed, Diyarê Bekir, Dîyarbekir û Diyarbakir lê hatine kirin. Ji van navan hin navên wek Dîyarê Bekir, Diyarbekir navê herêmê ne, lê Amîd û Amed yên navenda bajêr in.

Di encama lêkolînên arkeolojik da, yên ku li şikeftên amedê û derdorê wê hatine kirin, meriv rastî rêç û şopên dîrokî tê ku ew ji serdema paleolîtîk dest pê dikin û hetanî serdema kevirên sîqalkirî (Neolîtîkê) tên. Delîla herî xurt a vê yeke Bajarê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Şîkeftên Hesûnê yên li nêzî Farqînê û Şikeftên Hîlarê yên li nêzî Erxenîyê ne. Dîsa rolyefên Çemê Sinagê yên li bajarokên Gêl û Çêrmûgê, ew ên li ser milên Çemên Dîcleyê ne, xwedîyê wesfeke wisan in ku vê rastîyê dipeyîtinin.

Piştî kolanên arkeolojik derketîye holê ku bajar ji serdema kevirê sîqalkirî (neolitik) heta roja me, bênavber şuna bicihbûn û jîngehê ye. Qotê ber çem ê li Erxenîya Dîyarbekirê ku ew yek ji gundê herî kevn ê cihnişînê ye, hebûna civatên gundê yên çandyar, ên ku aîdê deh hezar sal berî niha ne, bi me dide nişandan.

Encamên kolanên arkeolojik ên li Qotê Berçem, bi me dide zanîn ku jîyan li virê bênavber di navbera salên 8,500 û 5,500ê berîya zayînê da û pişte salên pey jî bi awayekî binavber domîyaye. LiLiv îihî ku meriv ji jîyana koçberîyê derbasî jîyana gundîtîyê ya dêmanî û ji jîyana nêçîrvanî-komkirinê jî derbasê hilberîna xurek (qût) bûne, hîmên pêşîn ên şaristanîya bajarîtîya roja me ya îroyîn hatine danîn. Em awayê jîyanê ya ku xwe dispêre dêmanîtî û çandinîyê û wek “Şoreşa Neolitik” jî tê zanîn, ji alîyê aborîya xwexwedîkirinê, têkilîyên meriv-hawira siruştî ve û her wisan ji alîyê vedîtinên (keşfên) der barê dîroka çandê da jî gelek tiştên destpêkî di nava xwe da dihewîne û loma ji vî alîyê hane ve jî dîroka şaristanîyê ya cîhanê ronî dike. Warê Kela Navîn ku ew li alîyê bakurê rojhilat ê sûrên Amedê dikeve, ji bo dîroka navenda bajêr pir girîng e. Piştî kolana arkeolojik a li Girê Amîda ya di nav vê warê hane da, derket rastê ku berîya zayînê di sala 3000î (sê hezarî) da hûrî û di sala 2000î (du hezarî) da mîtanî li bajêr zal û serwer bûne. Di pey hûrî û mîtanîyan da ku wan berîya zayînê heta 1260î serwerîya xwe domandîye, îcar bi dorê asûrîyan, aramîyan (Kraltîya Bit-Zamanî), ûrartûyan, îskîtan, medan, persan, mekodinyayîyan, selevkosan, partan, Kraltîya Tîgran a Ermen, romayîyan, sasanîyan, bizansîyan, emewîyan, ebasîyan, şêxîyan, hemdanîyan, merwanîyan, selçûkîyan, înalîyan, nîsanîyan, artûkîyan, eyûbîyan, moxolan, akkoyunîyan, safewîyan û osmanîyan serwerîya xwe berdewam kiriye.

“Ameda warê bawerî, ziman û çandên cuda ji hemû şaristanîyên ku lê bûne serwer ra, mazûvanî kirye û jê hatîye ku ew bibe bajarê kesên ramanwer û hilberîner.”

Lê Amedê heta Şerê Cîhanê yê Yekemîn misilmanên ku bi erebî, tirkî û bi her du zaravayên kurdî, kurmancî û kirmanckî dipeyîvîn; êzîdî, cemaetek biçûk a mûsewî û gelen ku ji mezhebên cuda cuda yên xiristîyan (ermenîyên Ortodoks û katolîk, suryanîyên Ortodoks û katolîk, protestan, nastûrî, keldanî û rûm) in, bi hev ra dijîyan. Amed ji vî alîyê xwe ve di nav wîlayetên rojhilat ên osmanî da, navenda herî kozmopolit bû.

“Amed di her dem û heyamê da taybetîya xwe ya navendbûnê ya nûyatî, rewşendarî, çand û hünere hêvişandîye.”

Kela Amedê

Kela Amedê ku bi hezaran sal e wekî emanetekî pîroz bipê notirvanîya dîrokî ya vî bajarî dike, li ser erdeke rasta fireh a platoya bazalt ava bûye û ev cih jî li alîyê rojavayê qeraxa Çemê Dîcleyê dikeve. Çemê Dîcleyê ruh dide vî bajarê dêrîn û qedîm. Bajar jî ji Kela Navîn a ku ewil hatîye lêkirin û ji kela derve ya ku wê temam dike pêk tê.

Kela Navîn wek cihê pêşîn ê cihwarbûnê, hîmê bajêr pêk anîye. Kela biçûk a liv ir, berî zayînê di navbera salên 3700-3500î da ji alîyê hûrî-mîtanîyan ve hatîye avakirin. Her şaristanîya kul i Amedê bûye serwer, li gorî hewcetîya xwe ya ewletîyê, sûr û

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

bedenen bajêr mezin û fireh kiriye. Sûr piştî zayînê di sala 349an da ji hela Împaratorê Romayê Constantiusê II. ve ji nû ve hatîye tamîrkirin.

Di sala 362yan da bi peymana k udi navbera sasanî û romayîyan da hatîye kirin, yek ji kelehên girîng ên romayîyan Kela Nisêbînê (Nîsîbîs) ketîye deste sasanîyan; îcar gelê xristîyan ê liv ir jî ji ber sedemên dînî koçî Amedê kiriye û ew li ser beşeke erda rast a li rojavayê Kelê hatine bicihkirin. Piştî vê koçê, di navbera salên 367 û 375an da sûrên li rojavayê bajêr hatine pelaştin û bi vî awayî gele Nisêbînê hildane nav sûrê. Di pey vê ra Kela Amedê bûye xwedî şiklê xwe yê nû. Piştî ku bi sûrên nû bajar fireh bûye, kela pêşîn a ku navenda rêveberîyê bûye, ketîye rewşa Kela Navîn. Firehkirina cara diduyan a Kela Navîn (ku 16 birc û 2 derî lê hatine zêdekirin), di navbera salên 1514 1526an da ji alîyê padîşahê osmanî Qanûnî Siltan Silêman ve hatîye kirin. Piştra bi lêzêdekirin û tamîrkirinan jî ketîye rewşa xwe ya vê gavê.

Li hela din li Girê Amîda ku ew li nav Kela Navîn û cihê pêşîn ê lê cîwarbûnê ye, piştî kolanên arkeolojik ên di nabera salên 1961 û 1962yan da, bermahîyên seraya artûkîyan hatine derxistin ku ew aîdê salên 1200 û 1222yan in. Gora hukimdarê merwanî Nasrûddewle Mensûr û ya hevsera wî Stînas (Sittunas) jî li Kela Navîn in.

“Amed, di demên cihê yên dîrokê da ji 33 qewm, dewlet û çandên cihê ra mazûvanî kiriye ku ew şaristanîyên cuda temsil dikin.”

Çemê Dîcleyê

Kana bingehîn a Çemê Dîcleyê ji du milan xweyî dibe ku navê wê di nav kitêbên pîroz da dibihure û ruh daye gelek şaristanîyan. Ji van milan yek jê Çemê Madenê û milê din jî Çemê Birqleynê ye. Ev her du çavkanî jî li navçeya Amedê Pîranê digihîjin hev û Çemê Dîcleyê tînin pê. “Di zimanê kurdî da navê Çemê Dîcleyê, Dîjle ye û di zimanên Rojava da jî Tîgrîs e.” Îcar gava ku bi jêr da diçe av û çemen wekî Çemê Batmanê, Xerzan, Çemê Embarê, Zêya Biçûk û Zêya Mezin dikevin sere û av boş û zêdetir dibe. Di navbera Tirkîye û Sûrîyeyê da sînorekî bi qasî 40 km.yî çêdike. Bi qasî 64 km.yî li jora Besrayê bi Çemê Ferêt ra dibe yek û navê wî jî dibe “şatulereb” û dikeve Kendava Besrayê.

Çîroka Çemê Dîcleyê

Li gorî bawerîyeke kurdan, Çemê Dîjleyê digel çemên Erez, Zê û Ferêt ji wan çar çemen bihuştê ye û wek riya ku diçe bi bal Xwedê ve tê zanîn. Gelê deverê hîn jî di rojên erafeyê û yên taybet da derdikeve ser Pira Merwanîyan (Pira Dehderî), xwestin û daxwazên xwe li ser kaxizekî dinivisîne û diavêje nav ava Çemê Dîjleyê. Bawerî ew e ku ev daxwaz û duayen hane dê bigihîjin cem Xwedê û herin qebûlê.

Li gorî mîtolojîya yewnan jî gava Nympha ji Dionysos direve ku ew li pilingekî dagerîyaye, tê ber çemekî. Ji bo ku ji vî çemî derbas bibe jî neçar dibe ku xwe biavêje bextê Dionysos û jê bi hemle dibe. Navê kalikê medan Medos li vî zarokî dikin. Navê Tîgrîs (Piling) jî li vî çemê hanê datînin ku Dionysos û Nympha bi hev ra tê ra bihurîne.

Di mîtolojîya rojhilat da jî tê gotin ku xeta derbasgeha Çemê Dîjleyê ji hela Danyal Pêxember ve hatîye kişandin. Li gorî rîwayetê; Xwedê ji Danyal Pêxember ra dibêje: “Bi darê deste xwe ji şikefta ku av jê dertê, dest pê bike xêzekî bikişîne, av dê li pey te were. Lê hay ji mal û milkê sêwîyan, jinebîyan, xizan û weqfan hebe, zîyanê negihîne wan!” Sedema çivanebûn û fetlonekîbûna Çemê Dîjleyê jî li gorî vê gotegotê ango çîrokê tê şîrovekirin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Baxçeyên Hewselê

Li alîyê rojhilatê başûr ê bajêr dikevin. Piştî ku bi domana demê ra ava Çemê Dîjleyê kêm bûye deltayek derketîye holê û bûye cihê baxçe û bostanên bêrdar. Heta salên 1960î, navê vê dere bi kurdî Hoser bûye ku dehleke gur a bi dar û hêşînahî bûye û piştre li navên wekî Hewsel, Esfel dagerîyaye. Salên dûr û dirêj pêdivîya zebze û mêweyên bajêr ji van baxçeyan hatîye temînkirin. Liv an parêz û bostanên li qeraxê Çemê Dîcleyê, bi bikaranîna zîrça kevokan zebeşên navdar ên Amedê hatine xwedîkirin û çandin. Gelê bajêr bere havînan li cihê nêzê çem ên Hewselê ji zil, çilo û daran holik çêkirine da ku xwe hênik bikin. Li ser Baxçeyên Hewselê çîrokrk wiha tê gotin: Ewlîya Çelebî gava ji hela Ruha û Qerejdaxê ve tê bajêr, baxçeyên balîcanan dibine. Dibêje “Ey wax” û gotina xwe didomîne, “Wisan dixuye ku dê li vir ji min ra pir kar hebe. Ez ê rastî gelek merivên mehdtirş û yên ku ji mîdeya xwe digazinin, werim.” Wexta Ewlîya Çelebî dikeve nav bajêr, merivên dêmên wan sor û gizirî ne dibîne û pir diheyîre. Paşê gava di derîyê Mêrdînê ra derdikeve derveyê bajêr, Baxçeyên Hewselê û bostanên li ber Çemê Dîcleyê dibîne, bîr dibe raza vê rewşê û dibêje ku “Nexwe ev zebeşên kul i van baxçeyan tên xweyîkirin, zerara balîcanan dikujin.” Di qada navneteweyî da paraztina Kela Amedê û Baxçeyên Hewselê ji alîyê UNESCOyê ve bo Tirkîyeyê hatiye spartin.

Kela Amedê û Baxçeyên Hewselê di Qada Navneteweyî da

Weka ku tê zanîn "Qada Peyzaja Çandê ya Kela Diyarbekir û Baxçeyên Hevselê" di 39emîn civîna Komîteya Mîrateyên Dinyayê ya UNESCOyê ya ku di sala 2015an da li bajarê Bonnê yê Almanyayê hat lidarxistin, di Lîsteya Mîrateya Dinyayê ya UNESCOyê da wek 14emîn mîrateya Tirkiyeyê hat qeydkirin. Lê mixabin, piştî vê biryarê, bi şerê xendekan ê ku bi provakasyon û manîpleya dewleta Tirkîyeyê, di navbera şervanên PKKyê û dewleta Tirkîyeyê da pêk hat gelek texrîbatên mezin derketin holê. Yanî ne Kela Amedê ne jî Baxçeyên Hewselê hatin paraztin.

Navê Dergehên Kela Amedê

Çar dergehên (derîyên) mezin ên sûrên Amedê hene: Derîyê Çiyê, Derîyê Mêrdînê, Derîyê Ruhayê, Derîyê nû. Li Kela Navîn jî çar derî hene ku navê wan jî Derîyê Serayê, Derîyê Kupelî, Derîyê Fethê û Derîyê Nehênî ye. Derîyê Fethê û Derîyê Nehênî li der ve û Derîyê Serayê û Derîyê Kupelî jî li alîyê hundir ê bajêr vedibin. Derîyê Fethê û Nehênî îro nayên bikaranîn.

Derîyê Çiyê: Ev derî li hela Xarpêtê vedibe. Di sala 1932yan da, parêzgarê wê demê da ku bêhna bajêr derkeve û hewa bikevê, du bircên di navbera Birca Derîyê Çiyê û Birca Bedena Tek da û bi qasî du sed metreyi jî dîwarê sûrê dane hilweşandin û rûxandin.

Derîyê Mêrdînê: Li alîyê başûrê bajarê kevn e ku jê ra Derîyê Têlê yan jî Derîyê Tepê tê gotin. Piştî tamîratê derî niha tê bikaranîn.

Derîyê Ruhayê: Li rojavayê bajêr e ku wek Derîyê Rûmê û Derîyê Helebê jî tê binavkirin. Berê li Derîyê Ruhayê du cihên têketina nav bajêr hebûne. Yek jê, ferên derîyê wê bi bismarên serpehnik xemilandî û nişana heyloyê du serî jî lê ye ku ji alîyê selçûkîyan ve hatîye temîrkirin û li alîyê Mêrgehmedê vedibe. Derîyê din jî derîyê bi kemera kevirîn e k udi serdema bizansîyan da rasterast bi Dêra Meryemayê ve têkildar bûye û tene rahîb û rahîbeyan ew bi kar anîye. Derîyê sêyemîn jî piştra hatîye vekirin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

Derîyê Nû: Derîyê rojhilat ê bajêr e, xwedî kemereke daketî û alîyekî tene yê têketina bajêr heye. Bajêr digihîne Çemê Dîcleyê. Loma ew wek Derîyê Avê yan jî Derîyê Dîcleyê tê zanîn.

Bircên Keleha Amedê

Pêşî 72 bircên Keleha Amedê hebûne. Ev ji berk u 72 şagirdên (haveriyên) Îsa hebûne, weha çêkirine. Di demeke dûr û dirêj da 10 bircên din jî çêkirine û hejmara bircan gihîştîye 82yan. Hinek birc gilover, hinek çargoşe û hinek jî pir goşe ne. Bircên herî mezin û dîrokî birca Keçikê (tirka vî navî kiriye keçî/bizin), Şagird (Ulu Beden/Evlî Beden), Westa (Heft Biran) û ya Nûr in. Piraniya bircan sê tebeq in. Tebeqeyên binî wek depo û axur, sarinc, mexzen, tebeqeya duyem û sêyem ji bo şervan û depo hatine amadekirin. Li ser her bircî terasek heye ji bo ku ji dûr ve rewşa herêmê bibînin û kontrol bikin. Lê birca Şagird û ya Westa çar tebeq in.

Birca Keçikê li Derê Mêrdînê ye û li bexçeyên Hewselê dinêre. Birca herî kevn û mezin Birca Keçikê ye, ji berk u beden cara pêşî ji Derê Mêrdînê di cadeya Gazîya îro ra heta alîyê rojhilat di navbera salên pz 346-349an da hatîye çêkirin û ev der bi Şerê Xendekan (2015-2016) gelek texrîbat dîtin.

Birca Westa (Yedikardeş), li rojhilatê birca Şagirt e. Di navbera her du bircanda heft bircên din jî hene. Lêbelê meriv heybeta van her du bircan ji dûr ve dibine. Ji vê herêma her du bircan ra amedî "Ben û Sen/Ez û Tu" dibêjin. Plan û mîmarîya her du bircan wek hev e.

Birca Şagirt (Evli Beden) li rojavayê Birca Westa ye, ev her du bir cli başûrê Amedê ne. Birca Şagirt li cihê ku dîwarê bedena başûr û rojava dibin yek hatîye avakirin. Ew wek stûneke mezin û bilind her du dîwaran bi hev ve gire dide. Beden wek masîyek panik a Çemê Dîcleyê ye. Birca Şagirt wek dûvikê masî yê jorê û Birca Westa jî wek dûvîkê wê yê jêrîn e. Herêma Serayê jî wek sere masî ye. (ji jor ve masî)

Navê gundên Herêma Diyarbekirê, bi guherîna desthilat/serwerîyê ra gelek caran hatîye guhertin. Li gorî salnameya mîladî 27ê Gulana 639an navenda Amedê ji alîyê misilmanan ve tê bi destxistin. Pirtûkek bi navê "Diyarbakır'ın Fethi, Tarihi ve Kültürü/Fetha Diyarbekirê, Tarîx û Çanda wê (7 C.evvel 17 Hicri, 27 Mayıs 639)" ji alîyê xetat Zeynel Abidin Amedî (Çiçek) ve hatîye amadekirin û di 2007an da hatiye çapkirin.

Zakho Centre for Kurdish Studies

Gundên Bajarê Navenda Amedê			
	Sala 1518an		Sala 1565an
	Gundên Amedê		Gundên Rojhilatê Amedê
1	Alîpinar	1	Abdal Görmez
2	Altun Akar	2	Ahi Ayyar
3	Anşa	3	Ak Hüseyin
4	Beşir-i Seğir (Biçûk)	4	Axmeşet
5	Cebbare	5	Axmeşedê Bettal
6	Emela li kêlek Seletê	6	Axmeşeta Koselû
7	Habeşî	7	Axwêrana Sûfla
8	Hecî Osmana	8	Elî Bardaxan mezra Omuzlu
9	Heyderlûya Ereb	9	Alîbasyan
10	Hîmera Biçûk (sexîr)	10	Elîdar
11	Îshaq Danişmendlû	11	Zîyaret Elî
12	Kabasakal	12	Altunviranî
13	Kadi Sûfla	13	Arab Meqsûd
14	Qanqird	14	Bacervan
15	Kadî Ûlya	15	Bahçelû Faxredîn
16	Qaragoz	16	Bakçelû Tavuklu
17	Kenberlû	17	Baqos
18	Qozan	18	Beyazîdlû
19	Kubek	19	Bestam Virani
20	Kubeyş	20	Beşîrî
21	Mamoş	21	Borsuklu
22	Mirze Tepesi	22	Bogurtlenlu
23	Sati Kendi	23	Çanakçi
24	Şeyhre Tepesi	24	Çekereklû
25	Şilbe	25	Çevlik-i Kara Ahmed
26	Til Alo	26	Çonat Virani
27	Til Gazi	27	Degirmenlû
28	Zoxzunç	28	Dayluy-yi Sufla

Sedsala XVIII. Navê Gundên Navenda Amedê							
I (1733)		II (1738-1739)		III (1747)		IV (1758)	
	Rojhilatê Amedê		Rojhilatê Amedê		Rojhilatê Amedê		Rojhilatê Amedê
1	Ax Meşhed	1	Arab Şaban	1	Ax Meşhed	1	Arab Şaban
2	Arslanoglu Sufla	2	Alî Bardak	2	Arslanoglu Sufla	2	Axviran-i Kebir
3	Arslanoglu Ulya	3	Alidari Sexir	3	Arslanoglu Ulya	3	Axviran-i Sexir
4	Arabdarli	4	Axmeşhedi Sexir	4	Arab Darli	4	Ali Bardak
5	Ali Darli	5	Abaraci	5	Ali Darli	5	Alidari Kebir
6	Alişam	6	Ax Huseyin	6	Alişam	6	Ax Meşhedi Sexir
7	Arabdamli	7	Arslanoglu	7	Arabdamli	7	Abaraci
8	Axvirani Ulya	8	Arzuoglu	8	Axvirani Ulya	8	Arabayli

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

9	Axvirani Sufla	9	Arslanoglu-i Arab	9	Axviran-i Sufla	9	Ax Huseyin
10	Arzuoglu	10	Ayneto	10	Arzuoglu	10	Arslanoglu
11	Abaraci	11	Arab Tayli	11	Abaraci	11	Arzuoglu
12	Ax Hasan	12	Axvirana Sexir	12	Ax Hasan	12	Arab Arslanoglu
13	Ayinşa	13	Axviran-i Kebir	13	ayinşa	13	Ayneto
14	Arab Şaban	14	Angur	14	Beşîr-î	14	Arab Vadili
15	Alidar- Kebir	15	Alidar-i Kebir	15	Boyuni	15	Axmeşhedi
16	Axmeşhed-i Kebir	16	Axmeşhed-i Kebir	16	Behram Beg	16	Alidar-i Sexir
17	Axviran	17	Arabdarli	17	Baharli	17	Beyaci
18	Axviran-i Kebir	18	Beşrik	18	Bahçecik	18	Beşrik
19	Angur	19	Baqos	19	Bayircik	19	Bismiloglu
20	Ali Bardak	20	Bayram Beg	20	Baqos	20	Biçar Omer
21	Ax Huseyin	21	Beyaci	21	Cumurti	21	Baxçecik
22	Arabtayli	22	Baharli	22	Cirnik	22	Cirnik
23	Ayneto	23	Bismiloglu	23	Çarikani Sufla	23	Çarikan-i Kebir
24	Baqos	24	Biçar Omer	24	Çarikan-i Ulya	24	Çavuşi
25	Bayram Beg	25	Baxçecik	25	Çanakçi	25	Çakalli
26	Beyaci	26	Cimrinik	26	Çikin	26	Çikni
27	Baharli	27	Cumurte	27	Çakalli	27	Çarikan-i Sexir
28	Bismiloglu	28	Cirnik	28	Develi	28	Çolak Pehlivan
29	Beşirik	29	Çarikan-i Kebir	29	Desm-i Zimmi	29	Develî
30	Boyuni	30	Çekber-i Sexir	30	Damli	30	Derviş Hasan
31	Behram Beg	31	Çolak Pehlivan	31	Darakli	31	Fatma Hatun
32	Bahçecik	32	Çarşilu	32	Develi-i tirkmen	32	Gençoglu
33	Bayirci	33	Çikin	33	Derviş Hasan	33	Goklu
34	Canbazar	34	Çakalli	34	Fahreddin	34	Gurdukanli
35	Cumurte	35	Çarikan-i Sexir	35	Guzeldere	35	Hab-germe-i Sexir
36	Cirnik	36	Çanakçi	36	Gençoglu	36	Hambazar
37	Can Pinar-i Kebir	37	Çiyan	37	Hanbazar	37	Haydarli
38	Çarikan-i Ulya	38	Çarkan	38	Haydarkulu	38	Huseyinik
39	Çarikan-i Sufla	39	Çakalli	39	Horoslu	39	Hendeseli
40	Çanakçi	40	Develi	40	Haydarli	40	Heci Osman
41	Çikini	41	Derviş Hasan	41	Heci Osman	41	Îsrail
42	Çakali	42	Delikhan	42	Heft-germ-i-Ulya	42	Îshakli
43	Çolak	43	El-Hac Osman	43	Heft-germ-i Sufla	43	Îrincil
44	Çavuşî	44	Fatma Hatun	44	Îshakli	44	Kitirbil-i Zimmi
45	Çiyan	45	Goklu	45	Îzeddin	45	Kitirbil- Muslim
46	Çakalli	46	Gorduklu	46	Încirli	46	Kadikendi
47	Develi	47	Gençoglu	47	Îsrail	47	Kasim-i Zimmi
48	Derviş Huseyin	48	Hanbazar	48	Kebirli	48	Kurd Omer

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

49	Delikhan	49	Horoslu	49	Kebirli-i Sufla	49	Kizil Muhammed
50	Derviş Hasan	50	Haydarli	50	Kadikendi Muslim	50	Kehfnecar
51	Develi-i turkmen	51	Huseynik	51	Kasimli	51	Kara Hamzali
52	Damli	52	Heci Îs	52	Kurd Damli	52	Kabi
53	Darakli	53	Heft-germ-i Kebir	53	Karaca Viran	53	Kozan
54	Enderunlu	54	Heft-germ-i Sexir	54	Karahorlu	54	Karacaviran
55	Fahreddin	55	Îsrail	55		55	Karabaş
56	Gençoglu	56	Îrincil	56	Kara Hamzali	56	Kabasakal
57	Guzeldere	57	Îshakli	57	Kara Halife	57	Kopekli
58	Horozlu	58	Îsacakli	58	Kamişli	58	Kargali
59	Heci Osman	59	Kara Ahmedli	59	Kengerli-i Ulya	59	Koruklu
60	Haydarkulu	60	Kitirbil-i Zimmi	60	Kengerli-i Sufla	60	Karakoç
61	Heft-germ-i Ulya	61	Kitirbil-i Muslim	61	Kitirbil-i Muslim	61	Korucu
62	Heft-germ-i Sulfa	62	Kasim-i Zimmi	62	Kitirbil-i Zimmi	62	Kaxidli
63	Hanbazar	63	Kadikendi	63	Kizil Muhammed	63	Kara Pinar
64	Heci Ali	64	Kengeri-i Kebir	64	Kurdgulu	64	Kara Ahmedli
65	Îsrail	65	Kengerli-i Sexir	65	Kopekli	65	Kurdgulu
66	Îshakli	66	Kurdtayli	66	Kabasakal	66	Kengeli-i Kebir
67	Îzeddin	67	Kizil Muhammed	67	Korucu	67	Molla Cebir
68	Încurlu	68	Karuklu	68	Karabaş	68	Molla Hamiş
69	Kasimli	69	Kendli-i Sexir	69	Kara Ahmedli	69	Medreseli
70	Kebirli-i Ulya	70	Keft-i Car	70	Kurd Omer	70	Muhammedli
71	Kebirli-i Sufla	71	Kaxidli	71	Kadikendi	71	Metranli
72	Kadikendi	72	Kopekli	72	Kurulu	72	Maksudlu
73	Kurddamli	73	Kebirli	73	karakeçulu	73	Nergisli
74	Karacaviran	74	Kara Hamzali	74	Kabi	74	Ortulu
75	Kara Horlu	75	Qozan	75	Qozan	75	Orenli
76	Kehfnecar	76	Kayini	76	Molla Cabir	76	Pir Huseyin
77	Kara Halife	77	Karabaş	77	Muhammedli	77	Porsakli
78	Kara Hamzali	78	Kabasakal	78	Metranli	78	Satikendi
79	Kamişli	79	Korucu	79	Molla Hamiş	79	Sadi
80	Kengerli-i Ulya	80	Kurd Omer	80	Muderris	80	Sunnioglu
81	Kengerli-i Sufla	81	Karakoç	81	Neccar Omer	81	Şemame
82	Kitirbil-i Zimmi	82	Karaviran	82	Nevruzlu	82	Şukurlu
83	Kizil Muhammed	83	Koruculu	83	Orenli Ulya	83	Toklu
84	Kurdgulu	84	Kefnecar	84	Orenli	84	Tillik
85	Kopekli	85	Kabi	85	Pir Huseyin Sufla	85	Temurhan

86	Kabasakal	86	Kurdgulu	86	Patrik	86	Tarakli
87	Korucu	87	Molla Cabir	87	Porsuklu	87	Teyyar Mezrasi
88	Karabaş	88	Molla Hamiş	88	Pîr Huseyin	88	Til Gazi
89	Kara Ahmedli	89	Muhammedlu	89	Seyid Hasan	89	Yengice
90	Kurd Omer	90	Muderris	90	Salikendi-i Zimmi	90	Yassica
91	Kadikendi-i Zim	91	Metranli	91	Sadi	91	Yarimca
92	Karakeçulu	92	Nergisli	92	Simaki	92	Zoxzunc-i Muslim
93	Kurulu	93	Ortulu	93	Salat	93	Zoxzunc
94	Kabi	94	Orenli	94	Şabanli	94	Zeynikan
95	Qozan	95	Pir Hasan	95	Sakirgali	95	
96	Kitirbili-i Muslim	96	Porsakli	96	Şemami		
97	Kasim-i Zimmi	97	Siçancik	97	Şukurlu		
98	Karagoz	98	Seyyid hasan	98	Şarabi		
99	Korukçu	99	Sunnioglu	99	Tilik		
100	Karaca Viran	100	Sadi	100	Til Alo		
101	Molla Hamiş	101	Satikendi	101	Tavuklu		
102	Muhammedli	102	Sakaroglu	102	Uçtepe		
103	Metranli	103	Şamami	103	Uzan		
104	Molla Cabir	104	Şukurlu	104	Velikan		
105	Muderris	105	Şebernil	105	Vesni Muslim		
106		106	Tilik	106	Yaylagulu		
107	Nergizli	107	Toplu	107	Yenice		
108	Nevruzlu	108	Temirhan	108	Yassica Viran		
109	Neccar Omer	109	Tel-gazi	109	Zeynikan		
110	Orenli Ulya	110	Teyyar Mezrasi	110	Zoxzunç-i Ulya		
111	Pir Huseyin	111	Tarakli	111	Zoxzunç-i Sufla		
112	Porsuklu	112	Uruslu				
113	Patrik	113	Uçtepe				
114	Siçancik	114	Yenice				
115	Satioglu	115	Yenikan				
116	Satikendi	116	Yarimca				
117	Sadi	117	Yassica				
118	Seyyid Hasan	118	Zoxzunç-i Zimmi				
119	Simaki	119	Zoxzunç-i Muslim				
120	Salat	120	Zeynikan				
121	Sakargali						
122	Şemami						
123	Şukurlu						
124	Şarabi						
125	Şabanli						
126	Tilik						
127	Til Alo						
128	Tavuklu						

Zakho Centre for Kurdish Studies

129	Teyyar
130	Temurxan
131	Til Gazi
132	Toplu
133	Uzun
134	Uçtepe
135	Velikan
136	Yassicaviran
137	Yenice
138	Yaylagul
139	Yarimca
140	Zoxzunç-i Sulfa

Di Navbera Salên 1785-1847da Gundên Navenda Amedê			
	I (1785-1797)		II (1802-1803)
	Rojhilatê Amedê		Rojhilatê Amedê
1	Ali Bardak	1	Ali Bardak
2	Ax Meşhed-i Kebir	2	Alidar-i Kebir
3	Ax Meşhed-i Sexir	3	Abaraci
4	Ayneto	4	Arzuoglu
5	Arab Şaban	5	Arab Arslanoglu
6	Ax Viran-i Kebir	6	ayneto
7	Alidar-i Kebir	7	Ak Huseyin
8	Ax Viran-i Sexir	8	Arabtayli
9	Ax Huseyin	9	Baharli
10	Abaraci	10	Bakavs
11	Arzuoglu	11	Bahçecik
12	Arab Arslanoglu	12	Bismiloglu
13	Adabtayli	13	Beşrik
14	Alidar-i Sexir	14	Cumurte
15	Ali Bervan	15	Cirnik
16	Ak Hasan	16	Çolgan
17	Arabdamli	17	Çanakçi
18	Ali Var-i Said	18	Çinar
19	Arab Metranli	19	Derviş Hasan
20	Arabdarli	20	Develi
21	Alişam	21	Enderunlu
22	Ax Husman	22	Fatma Hatun
23	Beşirik	23	Goklu
24	Boyuni	24	Hab-germ-i Sexir
25	Behramki	25	Heci Osman
26	Baharli	26	Heci Îs
27	Bakos	27	Hankendi
28	Bismiloglu	28	Hanbazar
29	Bahçecik	29	Horoslu
30	Biçar Omer	30	Haydarli
31	Behram Beg	31	Heb-germ-i Kebir
32	Bahçe	32	Haci Abbas

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

33	Babaci	33	Îrincil
34	Beşir Beg	34	Îshakli
35	Beyaci	35	Kitirbil-i Zimmi
36	Bayircik	36	Kitirbil-i Muslim
37	Cirnik	37	Kasimi
38	Cumurte	38	Kurd Gulu
39	Cennan Mezrasi	39	Korukçu
40	Canbazar	40	Kurd Omer
41	Çarikan-i Sexir	41	Kizil Muhammed
42	Çarikan-i Kebir	42	Qozan
43	Çavuşî	43	Kabî
44	Çolak Pehlivan	44	Karabaş
45	Çolgan	45	Kadikendi
46	Çiyan	46	Korucu
47	Çanakçi	47	Kara Hamzali
48	Çolakhan	48	Karacaviran
49	Çakalli	49	Kabasakal
50	Çikini	50	Kopekli
51	Çeribaşi	51	Kara Ahmedli
52	Develi-i Turk	52	Karakoy
53	Derviş Hasan	53	Kefnecar
54	Demurxan	54	Karagoz
55	Delikanli	55	Kirkpinar
56	Enderunlu	56	Kebirli-i Kebir
57	Evranlu	57	Karakoç
58	Fatma Hatun	58	Korucu
59	Guzeldere	59	Kaxidli
60	Gençoglu	60	Karakuyu
61	Goldu	61	Metranli
62	Hab-germ-i Ulya	62	Molla Cabir
63	Hab-germ-i Sufla	63	Molla Hamiş
64	Horoslu	64	Muhammedli
65	Haydarli	65	Mollaoglu
66	Heci Osman	66	Nergizli
67	Haydarkulu	67	Ortulu
68	Haci Îs	68	Pir Huseyin
69	Hanbazar	69	Patrik
70	Huseynik	70	Porsakh
71	Hamancak	71	Satikendi
72	Honbenk	72	Sadi
73	Hanend	73	Seyyid Hasan
74	Harçkar	74	Similoglu
75	Han Mezrasi	75	Şemami
76	Hakanlu	76	Şirik
77	Haci Atik	77	Toplu
78	Hasirmali	78	Tilik
79	Hankerme	79	Tavuklu
80	Hakkallu	80	Timurhan

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

81	Îsrail
82	Îshakcik
83	Îrincil
84	Îshakli
85	Încirlu
86	Îzzeddin
87	Kitirbil-i Zimmi
88	Kitirbil-i Muslim
89	Kurdgulu
90	Kasim-i Zimmi
91	Korucu
92	Kurd Omer
93	Kizil Muhammed
94	Kefnecar
95	Kaxidli
96	Kara Hamzali
97	Qozan
98	Karacaviran
99	Karabaş
100	Kabasakal
101	Kopekli
102	Kargali
103	Kengerli-i Sexir
104	Karapinar
105	Kengerli-i Kebir
106	Kara Ahmedli
107	Kadi Kendi
108	Kebirli-i Sexir
109	Kebirli-i Kebir
110	Kurdtayli
111	Karakoç
112	Şemamî
113	Kabi
114	Kirkpinar
115	Koruklu
116	Korukçu
117	Kasimi
118	Kayagulu
119	Karahorlu
120	Kara Halife
121	Kamişli
122	Karakeçulu
123	Mersin-i Muslim
124	Molla Cabir
125	Muhammedli
126	Metranli
127	Molla Hamiş
128	Muderris

81	Tarakli
82	Teyar Mezrasi
83	Yengice
84	Yarimca
85	Yassica
86	Zeynikan

129	Mersin-i Zimmi
130	Maksudlu
131	Molla Hasan
132	Maraba Viran
133	Matar-i Sani
134	Merali
135	Mollahan
136	Nevruzlu
137	Neccar Omer
138	Nergisli
139	Ortulu
140	Omer
141	Orenlu
142	Patrik
143	Porsuklu
144	Pir Huseyin
145	Seyyid Hasan
146	Simaki
147	Satikent
148	Sadi
149	Salat
150	Sakirgulu
151	Satioglu
152	Sakinca
153	Salunlu
154	Sinnioglu
155	Siçancik
156	Siçan Omer
157	Toylu
158	Şukurlu
159	Şarabi
160	Şabanli
161	Toplu
162	Tillik
163	Tavuklu
164	Teyyar Mesrasi
165	Til-Gazi
166	Timur
167	Toylu
168	Terkseli
169	Til Alo
170	Tarakli
171	Ufak Piran
172	Uzun Kişla
173	Uçtepe
174	Velikan
175	Yassica Viran
176	Yengice

177	Yarimca
178	Yayla Gulu
179	Yassıca
180	Zeynikan
181	Zoxzunç-i Ulya
182	Zoxzunç-i Sufla
183	Terkbeli

Di Navbera Salên 1785-1847da Gundên Navenda Amedê					
	III (1817 – 1826)		IV (1839 – 1842)		V (1846 – 1847)
	Rojhilatê Amedê		Rojhilatê Amedê		Rojhilatê Amedê
1	Axviran	1	Arslanoglu	1	Abbasoglu Harabesi
2	Ak Huseyin	2	Abbas	2	Arslanoglu
3	abaraci	3	Arab arslanoglu	3	Arabdaroglu
4	Arzuoglu	4	Ali Bardak	4	Ardalu
5	Aeslanoglu	5	Akmeşet	5	Arab Şaban
6	Arab Arslanoglu	6	Axşat	6	Axviran-i Kebir
7	Bismiloglu	7	Akmeşed-i Battal	7	Axviran-i Sexir
8	Baharli	8	Ak Viran-i Kebir	8	akmeşed
9	Baha Beg	9	Ak Meşhed-i Sexir	9	Arab Arslanoglu
10	Bozçah	10	Bozpinar	10	Angur
11	Çulgan	11	Baharli	11	Ayneto
12	Fare	12	Bahçe	12	Ali Bardak
13	Heci Îs	13	Baqaws	13	Bahçecik
14	Haydarli	14	Beyaci	14	Baharli
15	Hanbazar	15	Biçar	15	Ballu
16	Huseyni	16	Bilan	16	Biçar Omer
17	Îshakli	17	Bilo	17	Baqaws
18	Îrincil	18	Beycar	18	Batirbeg
19	Korukçu	19	Bilbegen	19	Beşrik
20	Kozan	20	Beştik	20	Beyaci
21	Kebirli	21	Başoglu	21	Cirnik
22	Kabi	22	Bosnaoglu	22	Çakalli
23	Kara Ahmedli	23	Bilbakan	23	Çavuşi
24	Kehfnecar	24	Biçar Omer	24	Çayana
25	Kadikendi	25	Beşrik	25	Çolgan
26	Kurdgulu	26	Cirnik	26	Çarikan-i Sexir
27	Kitirbil-i Zimmi	27	Camuk	27	Çarikan-i Kebir
28	Korucu	28	Cabaroglu	28	Derviş Hasan
29	Karabaş	29	çanakçi	29	Enderuslu
30	Kara Hamzali	30	Çarkan-i Kebir	30	Hizir Îlyas
31	Molla Hamiş	31	Çakalli	31	Heci Osman
32	Metrani	32	Çolgan	32	Heci Îs
33	Muderris	33	Çarkan-i Sexir	33	Huseynik
34	Pir Huseyin	34	Derviş Huseyin	34	Hanbazar
35	Patrik	35	Demirhan	35	Haydarlu
36	Satikendi	36	Ervan	36	Hab-germe

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

37	Sadi	37	Er Aslan	37	Horoslu
38	Seyyid Hasan	38	Farê	38	Hasan Pinari
39	Suveydi	39	Gungolu	39	Îshakan
40	Tillik	40	Gur Omeran	40	Îshakli
41	Tel-Gazi	41	Gençan	41	Îrincil
42	Yarimca	42	Gur Koseli	42	Kabi
43	Zeynikan	43	Gomeli	43	Kozan
44	Zoxzunç	44	Gurdikan	44	Koçlu
45	Dirmete	45	Harabbeyan	45	Kehfnecar
46	Esbeyan	46	Hamerani	46	Kaxidli
47	Elbistan	47	Harzemi	47	Kizil Muhammed
48	Farê	48	Harabelu	48	Kurdgulu
49	Gurtepe	49	Harbecin	49	Karakuyu
50	Guhan	50	Haruni	50	Kortepe
51	Girik	51	Harbenli	51	Kardeş
52	Gurcu	52	Hatuni	52	Kengerlu
53	Huceti	53	harkan	53	Kurddarli
54	Hatmîran	54	Hekcik	54	Kullari
55	Harzemi	55	Hacikan	55	Koseli
56	Hasankendli	56	Haydik	56	Karagoz
57	Huseyni	57	Heci Murad	57	Karacaviran
58	Hatuni	58	Hanbazar	58	Kani Sipi
59	Havar	59	Haygeçuk	59	Kadi Muslim
60	Hashavar	60	Hasani	60	Kadi Zimmi
61	Hancigaz	61	Îxya-i Muslim	61	Kabasakal
62	Hatban	62	Îxya-i Zimmi	62	Kitirbil
63	Heci Ruz	63	Îmam Ukayl	63	Karabaş
64	Harbecin	64	Kabacik	64	Koygulu
65	Hassakoy	65	Kani Sipi	65	Muderris
66	Hamuk	66	Kirkat	66	Meşkurlu
67	Harabe Huseyin	67	Karinca	67	Maksudlu
68	Haturak	68	Kode	68	Matran
69	Hameranli	69	Kurd Yengice		
70	Heci Zubeyr	70	Kabahisar		
71	Hanbazar	71	Kankirt		
72	Harabe Zeyl	72	Kamişli		
73	Hecidur	73	Korucu		
74	Hançikar	74	Kuzucuk		
75	Îfadiye	75	Kancugaz		
76	Îxya-i Muslim	76	Kaziktepe		
77	Îxya-i Zimmi	77	Karakuyu		
78	Kurdaci	78	Kilyan		
79	Karali	79	Kayacik		
80	Kakay	80	Karatepe		
81	Kankird	81	Kortepe		
82	kirkatoglu	82	Kulbiran		
83	Koç	83	Kaba Hisar		
84	Koseli	84	Kaşli		

Zakho Centre for Kurdish Studies

85	Kor Behramki	85	Katiran
86	Kani Pagik	86	Kokçiyan
87	Kobik	87	Lukûs
88	Kaşmer Viran	88	Mezraa
89	Kaziktepe	89	Mubareki
90	Kayacik	90	Molla Aliler
91	Kabacik	91	Melkiş
92	Karih	92	Orenviran
93	Kirte	93	Oteviran
94	Kuçuk	94	Orveni
95	Karakiran	95	Omer Sitil
96	Kancugaz	96	Payas
97	Kode	97	Siyak
98	Karaviran	98	Sirimi
99	Kamişli	99	Suyol
100	Kirakor	100	Seneti
101	Kani Sipi	101	
102	Karadiran	102	Sipeyan
103	Keşan Boxan	103	Sulman
104	Kopek	104	Serabci
105	Kure	105	Seydik
106	Killaş	106	Sunni
107	Kan	107	Sibyan
108	Molla Fulat	108	Selimi
109	Mucrefi	109	Sini
110	Molla Pulat	110	Selman
111	Mezdik	111	Şeyh Çoban
112	Molla Aliler	112	Şeytanoglu
113	Melkis Tepe	113	Şemikan
114	Mihrani	114	Şetbanoglu
115	Nebi Mezrasi	115	Til Alo
116	Omerani	116	Til-elek
117	Omeran-i Kiki	117	Yasli
118	Payas	118	Yukari Gozel
119	Reşan	119	Zoga
120	Sinan	120	Zavre
121	Saçlu		
122	Suveydi		
123	Suphan		
124	Siyan		
125	Sercik		
126	Selim		
127	Şukurlu		
128	Şerefi		
129	Şehratepe		
130	Şukurviran		
131	Şeyhi		
132	Tel-Arab		

133	Tez Harab
134	Turkmenaci
135	Tavşantepe
136	Tel-Aluş
137	Tel-Aboş
138	Tillik
139	Yengice
140	Yuvacik
141	Yilankuş
142	Yakacik
143	Zoran

Dema Komara Tirkîyeyê li cihê Alfabeya Erebi Alfabeya Latînî ferz kir, navê gundên Amed û Farqînê ji bi herfên Latinî di pirtûkê da tomar kiriye.







Ev Nexşeya ku hemû navên herêma Diyarbekirê li ser wê bi tirkî hatiye bicihkirin.

Zakho Centre for Kurdish Studies

	GUNDÊN AMEDÊ	
	Navê Kevin	Navê Nû
1	Abasî	Kartaltepe
2	Akinciyan	Ekinciler
3	Alanqoz	Yalanköz
4	Arepyenice	Kırmasırt
5	Arpedere	Arpadere
6	Arzoxlî	Kervanpınar
7	Askbeka	Geyiktepe
8	Axmeşat	Soğanlı
9	Axwêrana Biçûk	Küçükakören
10	Axwêrana Mezin	Büyükakören
11	Baxçecik	Bahçecik
12	Balixê	Cumhuriyet
13	Baqewsa Xerabe	Süngüler
14	Baroxlî	Baroğlu
15	Başîl	Başil
16	Beheka	Baykara
17	Bindana Mezin	Büyükçelikli
18	Bûbya	Sağdıçlı
19	Canqetran	Cankatran
20	Cûcik	Cücük
21	Cimikan	Çakmak
22	Cirnika Têrkan	Ağaçlıdere
23	Cirnik	Pınardüzü
24	Comek	İlbaş
25	Çanaxçiya Xerbê	Batıçanakçı

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

26	Çanaxçiya Şerqê	Doğuçanakçı
27	Çaroxî	Çarıklı
28	Çavşelqiya	Kayayolu
29	Çayanan	Çataksu
30	Çermo	Kumrucak
31	Çiftlik	Çiftlik
32	Çixsor	Yaytaş
33	Çolû	Tavşantepe
34	Çîçekî	Çiçekliyurt
35	Daban	Taban
36	Dahla Ezîz	Topyolu
37	Dankira	Akdibek
38	Dengecûk	Gözegöl
39	Derbeşûr	Sarıdallı
40	Derwêşhesena	Dervişhasan
41	Dewelî	Develi/Sarılar
42	Dêmî	Karpuztepe
43	Dêrimte	Eser
44	Elîbardexan	Alibardak
45	Elwanîya Jorîn	Övündüler
46	Engewra Jorîn	Yukarikılıçtaşı
47	Erebaska	Gölpınar
48	Erebşahbana	Koyungüden
49	Erdalî	Kumluçat
50	Esentepe	Esentepe
51	Eyneto Jorîn	Yüksek
52	Eyneto	Güvercinlik
53	Êxiliya	Sancar
54	Farê	Güzelköy
55	Fenûs	Harmanardı
56	Fidêlan	Alıcık
57	Gêncan	Gencan
58	Girbelek	Talaytepe
59	Girêtahlî	Karcaören
60	Gozelîya Çolê	Çölgüzeli
61	Pira Ambarê	Köprübaşı
62	Gundik	Yenidoğan
63	Hecîdel	Dumrul
64	Hecîosman	Haciosman
65	Herbecin	Tanışık
66	Hestiyan	Hatipoğlu
67	Hebeşî	Oğlaklı
68	Heftgermê	Sarıkamış
69	Hestiya	Beneklitaş
70	Heşolû	Karaçimen
71	Heşteka Behrî	Topraktaş
72	Hewralî	Kuşburnu
73	Heygecûk	Küçüktepe

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

74	Hidirilyas	Hızırilyas
75	Husênîka Deştê	Harmanlar
76	Husênîk	Kesikağaç
77	Îngice	Yenîce
78	Îsheqan	Çubuklu
79	Kahbî	Bağıvar
80	Qanqirt	Tellikaya
81	Kendeş	Yazılıpınar
82	Keklik	Keklik
83	Kengelîya Têrka	Kengerli
84	Kengelî	Kengerli
85	Keşîşlîk	Kamışpınar
86	Kelek	Sakallı
87	Kevnecar	Alabal
88	Kodê	Kolludere
89	Kortepe	Körtepe
90	Koşkê	Köşk
91	Kurdîkan	Tezgeçer
92	Koredere	Eryolu
93	Kurdomera	Bostanpınar
94	Mermera Fîsê	Bucak
95	Mermera kevn	Mermer
96	Metranî	Kuşlukbağı
97	Meyqûnî	Konacık
98	Mezrê	Aslantepe
99	Mila	Sanyar
100	Mîraxura	Beybulak
101	Muderis	Bozdemir
102	Mizah	Doğanlı
103	1Muslexîk	Dönümlü
104	Nasirî/Nesrîyeylak	Yukarınasırlar
105	Omerikan	Yaniözerli
106	Riclik	Yiğitçavuş
107	Qadyana Biçûk	Küçük Kadı
108	Qadyana Mezin	Büyük Kadı
109	Qamîşek	Güvendere
110	Qerexan	Karahan
111	Qebeseqelî	Kabasakal
112	Qerebaş	Karabaş
113	Qerekilîs	Dökmetaş
114	Qerenaz	Kavaklıbağ
115	Qereqoça Rojava	Batıkarakoç
116	Qerewêrî	Aşpu
117	Qereqûb	Karayakup
118	Qirtê	Ağaçgeçit
119	Qirxalî	Piriçlik
120	Qizilê	Sarıyazma
121	Qozan	Kozan

122	Qabaxidir	Kabahıdır
123	Sadî	Tanoğlu
124	Sencax	Sancak
125	Satya	Satıköy
126	Serqelî	Sayarlar
127	Seqer	Uyandık
128	Sersing	Yiğityolu
129	Simaqî	Erimli
130	Siltanxoce	Sultanhoca
131	Sîrîmî	Gömmetaş
132	Sungurlû	Süngüler
133	Şadî	Kladırımköy
134	Şahaban	Sivritepe
135	Şemamî	Yenievler
136	Şerabî	Nahırkıracı
137	Şêxkendikê	Dokuzçeltik
138	Şilbê	Yolaltı
139	Tawixlî	Tavuklu
140	Tilelo	Karaçalı
141	Tilêlek	Özekli
142	Tilham	Hantepe
143	Tilxarman	Dikentepe
144	Tilik	Kapaklıpınar
145	Tirkan	Göleçoba
146	Tîşo	Deveduraği
147	Ûçqa Kurtêla	Üçkuyu
148	Xashewar	Yeşildallı
149	Xirbêreş	Petek
150	Yarimcê	Yarımca
151	Yeşîlkoy	Yeşilköy
152	Yûcik	Gözalan
153	Zeynikan	Esenbağ
154	Zîmexîk	Elidolu
155	Zinarcank	Kırkkoyun
156	Zoxê/Zoxa	Özdemir
157	Zozinca Mezin	Bağpınar
158	Zozinca Jêrîn	Mezra

Farqîn, Sîlvan, Silîvan û Silîvî

"Bohtî û Mehmedî û Silîvî
Hin le'l û hinek ji zêr û Zîvê"
(Mem û Zîn), (Barnas, 2013:7)

Farqîn: Farqîn kurtkirina Meyafarqîn/Mafarqîn an Meyyafarqîn e ku navê bajarê di nava kelê (kelehê) da ye. Li rojhilat gundê Qulfayê, li nîvroyê rojhilat Gundêreşo û li bakurê rojava şifqet ji alîyê îdarê ve herçend girêdayê Farqînê bin jî Farqîn nîn in. (Barnas, 2013)

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Sîlvan: Di çaryeka dawîn a 1800î da ku Farqîn bû qeza û baregehên qeymeqamîyê vebûn, bi tirkî navê “Sîlvan” lê hate danîn. Sîlvan dejenere bûyîya navê Silîvan e ku îro bi tene tirk bi kar tînin û di nivîsên tirkî an fermî da bi kar tê.
Silîvan: Din av gel da bi piranî denge “n”ya dawî dikeve û wek Silîva tê gotin; her wekî Bota(n), Xerza(n), Şikaka(n). Silîvan navê yek ji sê konfederasyên eşîrên Kurmancan e: Milan, Zîlan û Silîvan. Ji zozanên xwe yên li Sîpanê Xelatê heta germîyanên xwe yên li rojhilat û bakurê rêzeçiyayên Qerejdax-Mêrdîn-Torê wek bergeh dane ber xwe, li wan deran danîne û bicih bûne.
Di danîna alayên Hemîdîyê da seltenet vê taybetîyê daye ber çavê û li wê gorê ji Milan Îbrahîm Paşa, ji Zîlan Kor Huseyîn Paşa, ji Silîvan jî Seyfedîn (Sêvdîn/Sêrdîn) Paşa kiriye paşayê wan herêman. Di wê deme da Farqîn hem bûye baregeha qeymeqamîyê hem jî ya Seyfedîn/Sêrdîn Paşa.
Mîr Celadet, di hejmara 34an a kovara **Hawar**ê da behsa eşîrên botan wiha dike: “Eşîra jêlîyan, eşîrek ji eşîrên Botan e. Eşîrên Botan sih, sih û pênc eşîr in û bi awayê jêrîn lêk vedibin: koçer û dêmanî. Koçer jî du bir in: Çoxsor û Şilît. **Çoxsor**: Mîran, Alikan (bi navê vê eşîrê kitêbek Beşîkçî heye), Dûdêran, Dawûdîyan, Soran, Garisan, Gergerî. **Şilît**: Batûyan, Teyan, Xêrkan, Kiçan, Mûsereşan. Eşîrên deşta Slopî: Hewêrî, Zêwkî, Spêrtî, Reşikan. Dêmanî: di vî mile avê da: Meman, Hesinan (jêrîn û jorîn), Ebasan, Aliyan. Di wî mile avê da: Berwarî, Erih, Garisan (koçerê wan jî hene) Welat-Kelhok, Welat-Kêver, Welat-Kilîs, Şûvan, Jêlîyan, Dêrşew, Hacî-Alîyan, Keran, Harûnan, Slopîyan, Hacî-Bêra: Şernax, Goyan. Eşîrên Botan tev de **silîv** in.” Silîvî: 1. Kes, tişt an rêûrêçika ji herêma Silîvan, herwekî Sîyabend an Sîyamendê Silîvî, şalwarê silîvî. 2. Awayê kurmancîya herêma Silîvan e ku ji kurmancîya Behdînan û Milan cuda ye.

Ehmedê Xanî di Mem û Zîna xwe da kurmancîyê li sê şaxan parve dike:
Botî û Mehmedî û Silîvî
Hin le’l û hinek jî zêr û zîvî (1989: Parîs, malik, 248)

Keleha Farqînê
Li gorî agahîyên ku hene keleha Farqînê teşeyeke nêzê çargoşeyî ye û bi du sûran dorpêçkirî ye. Qada ku digre ji rojhilat heta rojava 600 metre, ji bakur heta başûr 500 metre ye. Keleha ku nêzî 2200 metreyî ye 50 birc hene. Farqîn ji sedsalî zêde navenda Merwanîyan bûye. Dema di destê Eyubîyan da ye, Keleha Farqînê weka ku ji ve ava bibe bi rêk û pêk tê tamîrkirin, birc û sûrên nû li kelehê tên zêdekirin. Lê mixabin êrîşa moxolîyan a 1260î bajar û kelehê xera dike û dişewitîne.
Keleha Boşatê: Li gundê boşatê yê Farqînê ye. Bi hilpişandina xwe ya ku aîdê Ardeşîrê 1. e bi nav û deng e. Wek vê kelehê li gundê Heldayê, li gundê Başqaya Keleha Başqayayê, li gundê Dêrûnê Keleha Şemrekhê heye.
Derîyên Keleha Farqînê: Navê derîyan ev in: Derîyê Qulfê, Derîyê Amedê, Derîyê Birca Şah, Derîyê Jêrîn, Derîyê Biçûk, Derîyê Boşatê, Derîyê Meyxaneyê.
Navê Bircan: Birca Zembîlfiroş, Birca Bişêrê Eyûbê, Birca Eyûbî, Birca Merwanî, Birca Artukî.
Navê Kanîya
Kanîya Derge, Kanîya Merwanîyan.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Navê Pireyan

Pira Mala Badê: di sala 1147an da ji alîyê Timûrtaşê hukimdarê Artukî ve hatîye çêkirin. Bi firehbûna kembera xwe ya kevirîn navdar e.

Pira Kemûkê: ji alîyê Merwanîyan ve berî Pira Mala Badê hatîye çêkirin. Ev her du pire jî li ser Çemê Batmanê hatine çêkirin.

GUNDÊN FARQÎNÊ		
	Navê Kevin	Navê Nû
1	Aslo	Darköprü
2	Atşa	Susuz
3	Avenek	Sulak
4	Banodîn	Ballibahçe
5	Baqûz	Onbaşlar
6	Başboyik	Başıbüyük
7	Başnîq	Bağdere
8	Başqa	Altınkum
9	Bexça	Bahçe
10	Belawela	Çiğir
11	Bereket	Bereketli
12	Bilbil	Günüdzköy
13	Dêrika Emerê Reşo	Düzalan
14	Dîda	Yeşilbahçe
15	Boşat	Boyunlu
16	Cûmat	Dağcılar
17	Çiçikan	Ormandışı
18	Çirik	Tokluca
19	Dêrika Miqûrê	Demirkuyu
20	Dêrika Derûnê	Akçeltik
21	Dêrûn	Dutveren
22	Emerika	Kumgölü
23	Fêra	Beypınar
24	Ferhend	Kayadere
25	Fişat	Çaldere
26	Garisîya Ulya	Duru
27	Girikê Boto	Çevriksu
28	Golmez	Görmez
29	Gundikê Reqşeref	Çiftliçevre
30	Gulemîra	Doluçanak
31	Gundê Cano	Yeşerdi
32	Gundikê Hecî Brahîm	Güzderesi
33	Hacîca	Karaçalar
34	Hecîreşê	Karabacı
35	Helda	Görentepe
36	Heşter	Otluk
37	Herşen	Arıköy
38	Hesendelya	Nohuttepe

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

39	Hêlîn	Yuvaköy
40	Huseynan	Sulubağ
41	Kanîspî	Gürpınar
42	Kelê	Başdeğirmen
43	Kilêsîyê	Akyol
44	Korît	Umurköy
45	Kurbeyt	Çiğdemli
46	Kurêşa	Şanlıköy
47	Mala Elikê	Kazandağı
48	Mala Badê	Çatakköprü
49	Mêrgewaş	Akçayır
50	Mezrika Hêvo	Kıraçtepe
51	Mîrelîyan	Alibey
52	Omera	Çobantepe
53	Pîrema	Sarıbuğday
54	Pîrexala	Eskiköy
55	Qazûxan	Kumluk
56	Qewşan	Erikyazı
57	Qeya	Aşağıkaya
58	Qeyik	Heybelikonak
59	Qizlalê	Kızlar
60	Qurtê	Yolarası
61	Reşikê/Reşka	Gökçeyevek
62	Sahbê	Yenidoğan
63	Salikan	Eşme
64	Sehtê	Eskiocak
65	Sêdeqnê	Bayrambaşı
66	Sûsa	Yoaç
67	Şêliman	Dolapdere
68	Şewlera	Babakaya
69	Şêxdawidan	Kutlualan
70	Şifqet	Çardakköy
71	Tallihê	Çakıltaşı
72	Taxik	Taşpınar
73	Tewerz	Keklikdere
74	Tilmîn	İncesu
75	Tirbespî	Akdere
76	Weysikana Jêrîn	Aşağıveysi
77	Weysikana Jorîn	Yukarıveysi
78	Xirba	Yeniköy
79	Zêrê	Güçlü
80	Zinzin	Üçbasamak

Çavkanî:

Aksan, Prof. Dr. Dogan, *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim/Bi Her Awayî Ziman, Bi Xetên Esasî Zimannasî,* Weşanên Türk Dil Kurumu, Ankara 2009

Aktarlı, Mehmet, *FARQÎN Bajarê ku Roj bi Dîrokê ra Dans Dike*, Amed 2005

Anderson, Benedict, *Hayali Cemaatler-Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayıması/Cemaetên Muxeyel-Koka Neteweperwerîyê û berbelavîya wê*, Weşanên Metis, Çapa 9. Stenbol 2017

Çakar & Tîgrîs, Yildiz-Amed, *Amed Erdnîgarî, Dîrok û Çand,* Weşanên Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Amed 2012

Barnas, Rojen, Sîlvan/Silîvan FARQÎN, Weşanên Nûbiharê, Îstanbul 2013

Çiçek, Zeynel Abidin, *Diyarbakır'ın Fethi, Tarihi ve Kültürü, 7 C.evvel 17 Hicri-27 Mayıs 639 Miladi/Fetih, Tarîx û Çanda Diyarbekirê 27ê Gulana 639*, Amd. Zeynelabîdîn Amedî, Çapxane: Dîyarbekir Soz, Amed 2007
Delîkaya, Omer, *Venavandina Cihûwaran li Komara Tirkîyeyê: Mînaka Agirîyê*, Teza Doktorayê ya çapnebûyî ya li Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî a Zanîngeha Bîngolê
Dîyarbakir Salnamelerî/Salnameyên Dîyarbekirê-1286-1323 Hîcrî (1869-1905 Mîladî), 1,2,3,4,5. Ciltler/Bergên 1,2,3,4 û 5em, Weşanên Dîyarbakir Büyükşehir Belediyesi, Amed 1999
Erpolat, M. Salih, *XVI. Yüzyılda Diyarbakır Beylerbeyliği'indeki Yer İsimleri/Navê Cihan li Mîrektîya Mîran a Dîyarbekirê di Sedsala XVI. da*, teza Doktorayê ya çapnebûyî, li zankoya Selçukê ya Konyayê 1999
Rêbera Geştê ya Amedê, Serokatîya Daîreya Çand û Turîzmê ya Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Amed 2011
Ripper, Thomas, *Diyarbekir Merwanileri-İslami Ortaçağ'da bir Kürd Hanedanı/Merwanîyên Dîyarbekirê- Di Serdema Navîn a Îslamî da Xanedanek Kurd*, Weşanên Avesta, Stenbol 2012
Samî, Şemseddin, *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kurdistan ve Kürdler/Di Ansîklopedîya Pêşîn a bi Tirkî da Navê Kurdistan û Kurdan*, Wer. Tirkîya Osmanî: M. Emin Bozarslan, Weşanên Deng, Îstanbul 2001
Seyarî, Ahmet, *Kurdên Merwanî Di Tarîxu Meyyafariqînê ya Îbnu'l-Ezreq de*, Weşanên Avesta, Stenbol 2020
Edîtor Subaşi & Geyik, Kenan, Resul, *Gotarên Zimannasîyê*, Weşanên Nûbihar, Îstanbul 2017

Çavkanîyên Elektronîk

Linka Gotara bi tirkî ya Harun Tuncel e:
https://www.researchgate.net/publication/235674097_Turkiye'de_Ismi_Degistirilen_Koyler
Linka gotara Haig, E. (2004) Some Observations on the Critique of Critical Discourse Analysis. Studies in Language and Culture, 25, 129-149.
https://scirp.org/reference/referencespapers.aspx?referenceid=2083690

Diyarbakır-Silvan Arasındaki Bölgede Onomastik Bir Çalışma

Özet:

Biz bu sunumda, Diyarbakır-Silvan arasındaki bölgede, Mervani Kürt Beyliği (983-1085) döneminden Türkiye Cumhuriyeti kuruluş (20. yy. ortaları) dönemine kadar yer isimleri değişikliklerini ele alacağız.

Selçuklu Türklerinin ilk kez Kürtlerle karşılaşmaları, Malazgirt savaşı (1071) için Mervani Beyliğinden İslam ordusu adına yardım istemeleriyle olmuştur. Selçuklu Türkleri, bu ilişkiden 14 yıl (1085) sonra Mervani Kürt Beyliğine son vermişlerdir. Selçuklu Türkleri bölgedeki iktidarı ele geçirince eski isimleri değiştirmeye başladılar.

Osmanlı Devleti, 16. yy. da, İdris-i Bedlisi'nin (1452-1520) aracılığıyla Diyarbakır Bölgesinde Beyler Beyliği adıyla bir idari sistem kurdu. Kürt Şehirlerinin çoğu (Dersim, Harput, Mardin, Musul, Siirt, Urfa vs.) bu idari sisteme bağlandı. Bu dönemde (1500-1900) yerleşim yerlerinin isimleri fazla değişmedi. Fakat Jon Türklerin iktidara gelmesinden (1900) Türkiye Cumhuriyeti iktidarini pekiştirene kadar (1940) olan dönemde tüm yerleşimlerinin isimleri türkleştirildi (değiştirildi).

Zakho Centre for Kurdish Studies

Onomastik (adbilim), Yunancada yer veya kişi ismi anlamındaki “onoma” kelimesinden türetilmiştir. İnsanlık ta eski çağlardan beri, öğrenme merakından dolayı adlandırma üzerinde düşünmüş ve bununla kendini yormuştur. Hem eski metinlerde hem de kutsal kitaplarda isimlendirme konusunda bazı bölümler yer almaktadır. Biz çalışmamızı adbilimin değişik dallarına göre sınıflandıracağız.

Anahtar kelimeler: *Diyarbakır, Silvan, Onomastik, Mervani, Selçuklu, Osmanlı, Türk, Kürd*

An Onomastic Study in the Region Between Diyarbakir and Silvan

Abstract:

In this presentation, we will discuss the changes in place names in the region between Diyarbakır and Silvan from the period of the Mervani Kurdish Principality (983-1085) to the founding period of the Turkish Republic (mid 20th century).

The first encounter of the Seljuk Turks with the Kurds was when they asked the Marwani Principality for help on behalf of the Islamic army for the Battle of Manzikert (1071). The Seljuk Turks put an end to the Mervani Kurdish Principality 14 years (1085) after this relationship. When the Seljuk Turks seized power in the region, they started to change the old names.

Ottoman Empire, 16th century. He also established an administrative system called Beyler Principality in Diyarbakır Region through İdris-i Bedlisi (1452-1520). Most of the Kurdish Cities (Dersim, Harput, Mardin, Mosul, Siirt, Urfa etc.) were connected to this administrative system. During this period (1500-1900), the names of the settlements did not change much. However, in the period from Jon Turks' coming to power (1900) until the Turkish Republic consolidated its power (1940), the names of all settlements were Turkified (changed).

Onomastic is derived from the Greek word “onoma” meaning place or person name. Since ancient times, humanity has thought about naming because of the curiosity of learning and has exhausted itself with it. There are some sections on naming in both ancient texts and holy books. We will classify our work according to different branches of onomastics.

Key Words: *Onomastic, Diyarbakir, Silvan, Mervani, Kurdish, Seljuk, Turk, Ottoman.*

DI MENZÛMEYA FOLKLORÎ YA MELA XALID DE ŞOPÊN JÎYANA GUNDEWARÎ

M. Zana KARAK
Beşa Ziman û Çanda Kurdî-Zanîngeha Mardin Artukluyê/Turkîya

PUXTE:

Mela Xalidê Licî di sala 1934an de li Licêya Diyarbekirê li taxa Melan hatiye dinê. Mela Xalid ji Mala Remo ye, navê wî yê fermî Halit Ayçiçek e, mexlesa wî ya helbestê “Mayî” ye û ji ber ku bi salan e karê tamîra saetan dike weke Xalidê Saetçî jî tê naskirin. Di heft salîya xwe de li medreseyan dest bi xwendina Erebî kiriye û heta bîst saliya xwe li gelek medreseyan li ba gelek alim û melayan ders xwendiye. Mela Xalid piştî ku hînî Erebî bûye di deh salîya xwe de çûye gundê Elîbardaxa û bûye feqîyê Mela Kemalê Elîbardaxî. Mela Xalid di payîza sala 1946an de jî çûye li ba Şêx Îsmetullahê Karazî çar salan ders wergirtine. Herweha Mela Xalid derdora deh salan li medreseyên cuda yên welat xwendina xwe domandiye. Mela Xalid di bîst salîya xwe de ji bo melatiyê hatiye navenda Diyarbekirê û li vê derê hem zewicîye û hem jî di febrîqeyekê de dest bi kar kiriye. Mela Xalid di 1957an de çûye leşkerîyê û li leşkeriyê dest bi nivîsê kiriye. Piştî vegera ji leşkeriyê heta 1965an li gundê Heşolî û Batrîkê û li derdora Licê nêzî 8 salan melatî kiriye û paşê dev ji melatîyê berdaye. Ji sala 1965an û vir ve li Sûra Diyarbekirê di dikaneke biçûk de karê tamîra saetan dike û li heyatê ye.

Mela Xalidê Saetçî jî yek ji derçûyên medreseyan e û bi terza klasîk û folklorî gelek helbest nivîsîne. Heta niha li Tirkiyeyê du pirtûkên Mela Xalid hatine çapkirin. Kitêbeke wî ya çîrokên biqafiye di 2011an de bi navê *Serpêhatiyên Zana* hatiye çapkirin û Dîwaneke wî jî di 2020an de bi navê *Derdname* ve hatiye çapkirin. Berhemeke wî ya menzûm jî weke destxet li ber destê me ye ku bûye mijara vê xebatê.

Ev menzûmeya Mela Xalid ku bi piranî bi teşeya çarîneyê hatiye nivîsîn heta niha li derekê nehatiye belavkirin û xebateke akademîk li ser nehatiye kirin. Berhem weke serpêhatîyeke menzûm hatiye nivîsîn. Di vê berhemê de çavdêrîyeke xurt ya jîyana gundewarî ya Kurdan derketiye pêş û jîyana gundîyan bûye mijara sereke.

Di vê xebatê de pêşî bi kurtasî dê li ser jiyan û berhemên Mela Xalidê Licî bê sekinîn. Paşê dê li ser vê berhema ku hêj destxet e û bi tîpên Erebî hatiye nivîsîn were rawestan û dê berhem bi berfirehî bê naskirin. Di vê xebatê de dê hemû berhem ji tîpên Erebî were veguhestin ser tîpên Latînî û dê ji alîyê unsûrên folklorî ve were nirxandin. Herweha dê berhem ji aliyê ruxsarî û naverokî ve were vekolîn.

Peyvên Serekî: *Mela Xalidê Licî, Menzûme, Unsûrên Folklorî, Jîyana Gundewarî ya Kurdan, Helbest*

DESTPÊK:

Di çavkaniyên li ser folklorê de bi piranî danasîneke weha heye: Folklor ew zanist e ku çanda maddî û manewî ya gelêrî li gorî rêbazên xwe yên taybet lêdikole, berhev dike, disenifîne, tehlîl dike û dinirxîne. Folklor ji du bêjeyên Îngîlîzî pêk hatiye;

Zakho Centre for Kurdish Studies

“folk” tê maneya gel û “lore” jî tê maneya zanistê. Li gor Celadet Bedirxan “folklor, zanîn an zanistîya xelkê ye” (Yıldırım, Pertev & Aslan, 2013, r. 11). Li gor ku Remezan Pertev di pirtûka xwe ya bi navê *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)* de dibêje mirov nikare sînorê folklorê bi awayekî zelal dîyar bike. Herçiqas di destpêkê de tenê çîrokên perîyan û bûyerên awarte weke keresteyên folklorî hatibin dîtîn jî bi demê re ev yek guherîye û hemû çîrok weke keresteyên folklorî hatine dîtîn (Pertev, 2018, r. 28). Folklor di serdemên ewil de di nav çarçoveyeke dîyarkirî de hatibe dayîn jî bi demê re ev yek guherîye û sînorên ku ji bo folklorê hatine dayîn şikestine û ji holê rabûne. Ji ber ku folklor zanisteke berfireh e em di hemû qadên jîyanê de rastî hêmayên folklorî tên. Îro dema em dibêjin folklor em rastî gencîneyeke ku bîr û bawerîyên milletekî, adet û tore, rabûn û rûniştin, hizrên wan ê dînî, edebî û çandî, muzîka wan, dîroka wan, edebîyata wan û hwd. ku di xwe de dihewîne tên.

Têkîlîya folklorê ya bi edebîyatê re li gor zanistên din têkliyeke gelekî xurt e. Lewma di nav beşên edebîyatê de ku beşek bi serê xwe wek “edebîyata gelêrî” tê binavkirin heye. Folklor malzaroka edebîyatê ye, heta li gorî gelek zanyaran edebîyat pêşî folklor bû (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013, r. 38.). Edebîyat bi saya folklorê pêşve çûye û berhemên nû anîye wucûdê. Edebîyat ji ber ku parçeyeke jîyanê ye û ji malzemeyên jîyanê sûd wergirtiye bivê nevê ji foklorê jî sûd wergirtiye. Edebîyat ji alîyê nivîsê ve ji folklorê cuda dibe. Lewra berhemên edebî nivîskî ne, lêbelê yên folklorî tim devkî ne. Dema em li edebîyata Kurdî mêze dikin gelek berhemên foklorîk weke berhemên edebî derketine pêşîya me. Destana Memê Alan ji bo berhema Ehmedê Xanî ya bi navê *Mem û Zîn* bûye çavkanîya sereke (Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013, r. 39-40). Bi saya vê destana foklorîk Xanî berhema xwe ya nemir afirandiye.

Mela Xalidê Licî jî ji folklor û ji unsûrên wê gelekî îstîfade kiriye. Ev yek di hemû berhemên wî de xuya dibe. Dema em li menzûmeya Mela Xalid mêze dikin em dibînin ku folklor bûye jêdera sereke ya berhema wî. Wî di vê mezûmeya xwe de ji gelek kelûpelên folklorî îstîfade kiriye, heta em dikarin bibêjin ku wî ev helbesta xwe li ser unsûrên folklorî ava kiriye. Di vê xebatê de em dê unsûrên folkorîk yên menzûmeya wî dîyar bikin û binirxînin.

1. JIYAN Û BERHEMÊN MELA XALIDÊ LICÎ

1.2. Jîyana Mela Xalidê Licî (Xalidê Saetçî-ç.1934-...)

Mela Xalidê Licî ji Licê ji Mala Remo ye, nav û paşnavê wî Halit Ayçiçek e, lêbelê weke Xalid Remo û Xalidê Saetçî jî tê naskirin. Navê bavê wî Hesen û yê diya wî jî Emîne ye. Mela Xalidê di sala 1934an de li taxa Mela ya Licêya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Lêbelê ji ber ku di nasnameya fermî de 3 salan temenê wî biçûk hatiye nivîsîn tarîxa jidayikbûna wî jî weke 10.12.1937 hatiye qeydkirin. Di 4-5 salîya xwe de dest bi xwendinê kiriye. Herî pêşî li ba diya xwe ders wergirtiye û elîfbêya Erebî li ba diya xwe hîn bûye. Paşê li ba Esma xanima[1] jî dersa Quranê wergirtiye. Paşê mewlûda Kurmancî hîn bûye û paşê dest bi kitêbên rêzê yên medreseyê kiriye. Di 1945an de di 10 salîya xwe de çûye gundê Elîbardaxa (Ali bardak) û li ba Seyda Mela Kemalê Elîbardaxî di medreseyê de feqîtî kiriye. Paşê jî di Payiza sala 1946an de ji wir diçe Karazê (Kocaköy) ba Seyda Mela Îsmetullah û heta sala 1949an 4 salan bi Şêx Heybet re ji seyda ders wergirtine û weke feqe heta qewlê Ehmedê xwendiye.

Mela Xalid deh salan li gundên Kurdistanê li medreseyan geriya û li ba seydayên cuda xwendiye. Li Zarayê li ba Mela Fethullahê Pêçarî,[2] li Balicnê li ba Mela

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Osman, li Hezanê li ba Mela Huseynê Qenderhelî,[3] li gundê Celkê ya Licê li ba Mela Ehmedê Heqroyî feqetî kiriye. Mela Xalid li gundê Têlana li pişta Misircê (Qûrtalan) li ba Şêx Îsmaîlê Erbo jî derdora 8 mehan salekê xwendiye û paşê li Norşîn û li Oxîna mala Şêx Elaeddîn jî dîsa xwendina xwe domandiye.

Mela Xalid piştî li Karazê bi Şêx Heybet re li ba Mela Ismetullah çar salan xwend û piştî ku Mela Îsmetullah çû li Çoqreşiyê li ba Şêx Yehya emelê terîq û tesewifê dikir Mela Xalid jî li ba Mela Suleymanê Zaza xwendina domandiye heta ku seyda vegeriyaye. Lêbelê di wê demê de bi gotina wî eqîdeya wî ango baweriya wî xera bûye û bûye materyalîst. Mela Xalid dibêje ;"*Heta seyda Mela Îsmetullah ji Çoqreşê vegeriya jixwe serê min li hev ketibû û ez ji Karazê çûm, min dev ji xwendinê berda û min kitêbên xwe jî tev belaş dan xelqê. Min got êdî kitêbên Erebî nagrim destên xwe*". (Ev giş beriya eskeriyê bûn), lêbelê Mela Xalid tevlî vê yekê dîsa jî nimêja xwe kiriye. Mela Xalid paşê li ba seydayên Norşînê dîsa vegeriyaye rewşa xwe ya berê ango baweriya xwe ya berê.

Mela Xalid dibêje: *"Piştî ez bûm bist salî ez ji Lice bi malîtî hatim Diyarbekirê û ez li Diyarbekirê zevicîm. Di Febriqa şayakê (Sumer) de ez bûme xebatkar. Min li leşkerîye dest bi nivîsê kir. Ji vê demê çend beytên ku min li ser kaxizên êskerîye nivîsandîye ligel min maye".*

Mela Xalid li Misirca (Kurtalan) Sêrtê du salan wezîfeya xwe ya leşkeriyê kiriye. Di 1957an de çûye leşkerîyê û di 1959an de jî qedandiye û piştî eskeriyê Seydayê Mela Xalidê Licê nêzî 8 salan melatî kiriye. 4 salan li gundê Heşoliya Hezroyê û 4 salan jî li gundê Batrîkê ku li ber çemê Diyarbekirê û nêzî gundê Simaqê ye melatî kiriye. Mela Xalid dibêje "*ez gelekî di eleyhê beg, şêx û melayan de ye jî bûm*". Ev yek di berhemên wî de jî xuya dibin.

Mela Xalid piştî melatiya li gundan dev ji melatiyê berdaye û dîsa hatiye Diyarbekirê, di heman salê de ji zivistanê heta biharê karê qaçaxtiyê kiriye. Ji bin xetê tiştên weke saet anîne. Ji Qamişlo alavên qaçax yên weke saet anîne û pê debara xwe kiriye. Seyda ji sala 1965an û vir ve li Sûra dîrokî di dikana xwe ya saetan de dixebite. 48 sal li vê dikana li sûka Sûrê û beriya wê jî 7 salan dîsa li sûka qûnderecîyan maye û bi salan e karê çêkirin û firotina saetan dike. Mela Xalit niha li heyatê ye û 87 salî ye. Seyda niha jî li Sûra Diyarbekirê debara xwe di dikana xwe ya biçûk de bi tamîra saetan dike[4].

Xalidê Saetçî jî bi terza klasîk helbestan dinivîse. Kitêbeke wî ya çîrokên biqafiye, bi navê "*Serpêhatiyên Zana*" hatiye çapkirin. Herweha dîwaneke wî ya helbestan jî bi navê *Derdename* pêşî li Duhokê û paşê li Tirkiyeyê hatiye çapkirin

1.2. Berhemên Wî

Mela Xalidê Saetçî jî yek ji derçûyên medreseyan e û bi terza klasîk û folklorî gelek helbest nivîsîne. Heta niha em bi sê berhemên Mela Xalid haydar bûne ku du ji wan hatine çapkirin û ya sêyem jî heta niha li derekê nehatiye çapkirin. Li Tirkiyeyê du pirtûkên Mela Xalid hatine çapkirin. Kitêbeke wî ya çîrokên biqafiye di 2011an de bi navê *Serpêhatiyên Zana* hatiye çapkirin û Dîwaneke wî ya helbestan jî bi navê *Derdename* pêşî li Duhokê di 2013an de hatiye çapkirin û paşê dîsa li Tirkiyeyê di 2020an de ev Dîwan dîsa hatiye çapkirin. Berhemeke wî ya menzûm jî weke destxet li ber destê me ye ku bûye mijara vê xebatê û mela Xalid navek nedaye vê berhemê.

Herweha li gorî ku Mela Xalid dibêje wî gelek helbestên xwe jî şewitandine. Mela Xalid gava beytên xwe dide ber ên Melayê Cizîrî û Seyda Ehmedê Xanî dibîne ku

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

dirbê wan bi hev nakevin û ji ber ku yên xwe naecibîne sê hezar û 500 beytên xwe di sobê de şewitandiye.[5]

Em ê her du berhemên wî yên ewil bi kurtasî bidin naskirin û em ê bi berfirehî li ser berhema wî ya sêyem ku mijara vê xebatê ye bisekinin.

1.2.1. Derdename (Dîwan)

Mela Xalid navê "Derdname/Derdename" daye vê dîwana xwe. Mela Xalid ev berhem bi tîpên Erebî[6] û bi Kurdîya Kurmancî nivîsîye.[7] Di vê Dîwana wî ya bi navê "Derdname"yê de helbestên bi terza klasîk cî digirin. Helbestên di vê dîwanê de bi piranî bi çarîneyan hatine nivîsîn, lêbelê tê de helbestên bi sêyîne û bi malikan hatine nivîsîn jî hene.

Heta niha ev dîwan du caran bi du awayên cuda hatiye çapkirin. Çapa wê ya ewil li Duhokê di sala 2013an çêbûye û di vê çapê de 45 helbestan cî girtiye. Lêbelê di çapa wê ya nû de ku li Tirkiyeyê di sala 2020an de derketiye hem hin helbestên tê de hatine guhertin hem jî hejmara helbestan guherîne û tê de 175 helbest cî digirin.

Di vê Dîwanê de em dibînin ku Mela Xalid bêjeya "Mayî" weke mexles bi kar anîye. Ji helbestên wî yên cuda ku mexles tê de hene çend bendên nimûne weha ne:

Ger nebî jîna min nîne qet li gerdûnê demek
Tu ji min nabî xilas her ne bi ceng û herb û şer
***Mayî** tu mayî di nav derd û belayê bêjimar*
Reşgerîna derdê vala dergevan danîne ber
(Ayçiçek, 2020, r. 25, benda 4.)

Şafîyê derd û birînan baş-tebibê har û dînan
Melhemê jana evînan lewra Loqmanê min e
*Ez **Mayî**yê pergende me emrê te da amade me*
Lewra ji bo te hewce me çavnêrê dergahê te me
(Ayçiçek, 2020, r. 120, benda 6.)

Qet nekir pirsê li min rojek li zindana evîn
*Ew hal e tu dikêşî **Mayî** bê çarew hezîn*
Her wekî jar û feqîran tim dikî ah û enîn
Nabe xalî istirê te tê ji çavan tim girîn
(Ayçiçek, 2020, r. 138, benda 8.)

*Tû ji bo **Mayî** ûmidî bê te jîn nabe tu car*
Ez dikim wêran ji bo te can û milk û xan û mal
Ez bi heyrana te me ey dîlbera şeng û şepal
(Ayçiçek, 2020, r. 140, benda 6.)

***Mayî** tu heta [bi] kengê xerqê behra xemxuran*
Kî heye bê te xilas ke ew ji bin dest û pîyan
Ronî ke urdan bikêşe wek mirûd û sofîyan
Yan jî zencîran li pişt xe her wekî wan Şî'îyan
(Ayçiçek, 2020, r. 167, benda 3.)

***Mayî** tû hetta b'kengê xerqê behra xemxûran*
Kî heye bête xilas ke ew ji bin dest û pîyan
Rabe serxwe zû şîyar be xwe neke ceng û şeran
Werne dê tu pir bibînî zehmet û derdê giran
(Ayçiçek, 2020, r. 15, benda 3.)

Qet nekir pirsê li min rojek li zindana evîn
*Ev hal e tu dikêşî **Mayî** bêçar û hezîn*
Her wekî jar û feqîran tim dikî ah û enîn
Nabe xalî istirê te tê ji çavan tim girîn
(Ayçiçek, 2020, r. 190, benda 2.)

1.2.2. Serpêhatiyên Zana

Ev pirtûka ku di 2011an de çap bûye ji 255 rûpelan pêk tê. Di vê berhema Mela Xalidê Licî de hin çîrokên biqafiye hene. Di fihrista pirtûkê de çar beş hene û çîrokên tê de ji bilî beşekê hemû menzûm ango bi helbestkî hatine hûnandin.

Beşa yekem ku navê wê "Tetwan" e tê de sê çîrokên menzûm hene û serenavên wan jî ev in; "Serpêhatiyên Bavê Zana", ev beş ji 267 çarînan pêk tê û bi kêşa birgeyî ya heft kiteyî hatiye nivîsîn. "Serpêhatiyên Şivanê Kal" ev beş ji 303 çarînan pêk tê û bi kêşa birgeyî ya heft kiteyî hatiye nivîsîn. "Serpêhatiyên Zana" ev beş jî ji 870 çarînan pêk tê û ev beş jî bi kêşa birgeyî ya heft kiteyî hatiye nivîsîn.

Beşa duyem jî di bin serenavê "Roviyê Fenek" de ji 581 malikan pêk tê. Ev beş jî fableke menzûm e û bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn, lewra hemû malik di nav xwe de hemserwa ne. Ev fabl jî bi kêşa birgeyî ya heft kiteyî hatiye nivîsîn.

Di beşa sêyem de jî bi serenavê "Serpêhatiyên Şadî" çîrokek pexşan heye û di nav vê çîrokê de jî 5 xezelên bi terza klasîk hatine nivîsîn hene.

Navê beşa dawî ango beşa çarem jî "Ferhengok" e ku ev beş di pirtûkê de nehatiye dayîn û bi tenê di fihristê de weke serenav hatiye bicîkirin.

Çîrokên vê berhemê yên menzûm bi piranî bi çarîneyan hatine nivîsîn. Em ê li vê derê bendên ewil û yên dawîn ên van serenavên beşên menzûm bi rêzê bidin.

Benda ewil û ya dawî ji beşa "Serpêhatiyên Bavê Zana" weha ye:

D' sala hezar û neh sed
Digel pêncî û çara
Payîz hat erd bû cemed
Tu kes nema li wara

Bavê m' got min evana
Ji bîr mekî tu cara
Van derd û van belana
Diya m' got raze Zana
(Licî, 2011, r. 7-38)

Benda ewil û ya dawî ji beşa "Serpêhatiyên Şivanê Kal" weha ye:

Hebû li deşta Gewran
Şivanek navî Nezan
Tişt û tebaê giran
Derd û kul û kederan

Kalê şivan girt teban
Berê xwe da çû bajêr
Xatir xwestî ji tevan
Tiştê ku lazim bû jê r'
(Licî, 2011, r. 41-74)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Benda ewil û ya dawî ji beşa “Serpêhatiyên Zana” weha ye:
Roja dinê sibê zû
Axa hat hinda pezan
Got ew Kalê şivan çû
Ji min r’ got mêze Nezan

Hate kêfa gundiyan
Şahî danîn heft şevan
Ez bûme zafê ewan
Ketim nav malbata wan
(Licî, 2011, r. 77-173)
Benda ewil û ya dawî ji beşa “Roviyê Fenek” weha ye:
Hebû rovîkî fenek
Jîr û zana bû gelek

Razî me bi nan avê
Min warê xelqê navê
(Licî, 2011, r. 177-215)

1.2.3. Menzûmeyeke Folklorî ya Mela Xalid

Mela Xalid nav li vê berhema xwe nekeriye. Ji ber ku tê de gelek unsûrên folklorî hebûn me jê re got “Menzûmeya Folklorî”. Ev berhem hêj weke destxet e û nehatiye çapkirin. Nusxeya di destê me de bi tîpên Erebî û bi Kurdîya Kurmancî hatiye nivîsîn û herweha destxeta muelîf bi xwe ye. Destxet ji 14 rûpelan pêk tê.[8] Ev berhem di halê musweddeyê de maye û helbestkar êdî lê venegerîyaye. Lewra ji hin alîyên ruxsarî ve hin qusûrên biçûk tê de hene. Em ê vê berhemê ji aliyê ruxsarî û naverokî ve binirxînin. Lêbelê ji alîyê rûxsarî zêdetir em ê giranîya xwe bidin alîyê wê yê naverokî, çunkî di vê berhemê de unsûrên folklorî zêdetir balê dikişîne û herweha mijara me jî ev unsûrên folklorî yên di berhemê de ne.

2. MENZÛMEYEKE FOLKLORÎ YA MELA XALIDÊ LICÎ

2.1. Ji Alîyê Rûxsarî ve Menzûmeya Folklorî

Edebîyata Gelêrî li gorî teşeyê li ser van sê navan tê dabeşkirin; 1-Edebîyata Gelêrî ya Menzûm, 2- Edebîyata Gelêrî ya Pexşanî, 3- Edebîyata Gelêrî ya Têkel (hem pexşanî hem jî menzûm) (Keskin, 2019,146). Ev menzûmeya folklorî ya Mela Xalid jî dikeve bin beşa yekem ango dikeve çarçoveya edebîyata gelêrî ya meznûm. Çunkî Mela Xalid ev berhema xwe ji serî heta dawî menzûm ango helbestkî nivîsîye.

Di çavkanîyan de ji bo helbesta gelêrî weha tê gotin: Helbestên gelêrî bi serwa ne; zimanê wan sade ne û yên gel in. Kêşa wan li gorî cûreyan diguhere, hinek cûre bi kêşa kiteyî tên hilberîn û vegotin û yên vegotinî bêhtir serbest in û nebûna kêşa erûzê yek ji ferqên wê ji helbesta klasîk tê nirxandin (Keskin, 2019, r. 261-262). Ji ber vê yekê em dikarin vê helbesta Mela Xalid jî weke helbesteke gelêrî bihesibînin, lêbelê divê neyê jibîrkirin ku ev ne helbesteke anonîm e û nivîskarê vê helbestê diyar e.

Di vê menzûmeyê de em ê hinekî taybetîyên rûxsarî jî ji hev veçirînin û hin tesbîtan bikin. Di vê menzûmeyê de bi tevahî 111 bend hene ku piranîya wan bi çarîneyan hatine nivîsîn. Lêbelê her çiqas gelek bendên wê çarîne bin jî hin bendên navîn û yên alîyê dawî jî xwedî taybetiyên serwabendîya malikî ne. Ango li hin cihan

teşeya bendan guherîye û bûye malik. Mesela bendên 37 û 38an di eslê xwe de bi serwabendîya malikan ve hatiye nivîsî, lê me ji ber sedema yekpariyê weke çarîneyan nîşan da. Dîsa di navbera bendên 45-50yan de jî teşe guherîye û helbest veguheriye ser malikan û herweha li şûna bendan 6 malik hatine nivîsîn. Bi vî awayî car caran çarîne ketine rengê malikan.

Mela Xalid menzûmeya xwe bi piranî bi kêşa birgeyî ya 7 kiteyî nivîsîye, lêbelê di hin cihan de şikestin derketiye holê û ji heft kiteyan boriye.

Bi piranî serwabendîya menzûmeyê durust e û hevgirtinek di navbera wan de heye, lêbelê di hin bend û malikan de serwabendîya helbestê an guherîye an jî şikestinên biçûk tê de çêbûye, lê ev şikestin ne zêde ne. Di çarîneyan de şemaya serwabendîya bendan bi piranî “aaaa” ye, li hin ciyan jî helbest bi serwabendîya mesnewîyê hatiye nivîsîn.

Mela Xalid di bend û malikên vê menzûmeyê de serwa û paşserwa bi kar anîne û kiriye ku helbest ji alîyê rîtm û selîqeyê (melodî) ve estetîka wê bilind bibe.

Mela Xalid ji bilî paşserwayê di menzûmeya xwe de serwaya nîvco, tam, zengîn û ya tûnç bi kar anîye. Di dawîya risteyan de ji bilî paşserwayê ji wekhevîya dengekî tenê re serwaya nîvco tê gotin. Ji bo serwaya nîvco jî ev benda nimûne weha ye:

Bê pez û bê miy**a** me
Bê dirav û per**a** me
Bê kar û golik**a** me
Bê hêstir û dev**a** me
(8)

Di serwayê de ji wekhevîya du dengan re jî serwaya tam tê gotin. Ji bo serwaya tam jî em dikarin vê bendê weke nimûne bidin.

Kulav û palas û b**er**
Reş û spî sor û z**er**
Hinî cot û hinî f**er**
Hat raxistin heta d**er**
(18)

Mela Xalid bi piranî di bendên menzûmeyê de serwaya zengîn û ya tam bi kar anîye. Di serwayê de ji wekhevîya ji du dengan zêdetir re jî serweya zengîn tê gotin.

Ev benda jêr nimûneya serwaya zengîn e.
Li ba me çêbû x**ela**
Ji malbatek nîvm**ela**
Bê zexm û zor û b**ela**
Fatihê sûr û k**ela**
(10)[9]

Di hin bendan de serwaya tûnç jî heye ku bêjeya di dawîya risteyekê de be bi heman awayî di hundirê dawiya risteyeke din de cî bigire ev cûre serwa derdikeve holê. Nimûneyên vê cûreyê ne zêde ne, li gorî tesbîtê me di vê menzûmeyê de pênc nimûne hene.

Rêx û sergîna hey**wan**
Ew bûn arûdûyê **wan**
Zivistanê seraser
Ji axur davêtin der

(77)
Piştî ezana ‘es**rê**
Bi hevdû ra didan **rê**
Berê xwe didane mal
Ji wan nedhat galegal
(75)

Di menzûmeyê de di hin bendan de hem serwa heye hem jî paşserwa bi hev re hatine bikaranîn. Weke nimûne di vê benda 7an de tîpa “a” bûye serwaya nîvco û bêjeya “me” jî paşserwa.

Gerçi bê bav û d**a** **<u>me</u>**
Bê xwişk û bê bir**a** **<u>me</u>**
Bê qonax û ser**a** **<u>me</u>**
Bê ‘erd û bê qad**a** **<u>me</u>**
(7)

2.2. Ji Alîyê Naverokî ve Menzûmeya Folklorî

Folklor hêmayeke girîng ya helbestê ye û gelek caran ji bo helbestê, bi taybetî jî ji bo helbesta gelêrî bûye jêdereke sereke. Ji ber vê yekê ye ku dema em li helbestên gelêrî mêze dikin bêhna folklorê ji wan tê. Menzûmeya Mela Xalidê Licî jî yek ji wan helbestên menzûm e ku dema mirov dixwîne rastî gelek unsûrên folklora Kurdî tê. Em jî dê giranîya xwe zêdetir bidin ser vê beşê.

Mela Xalid ev menzûmeya xwe weke serpêhatîyeke menzûm nivîsîye. Helbestkar ev menzûmeya xwe mîna çîrokekê hûnandiye û behsa serpêhatîyekê dike. Ev serpêhatî di şiklê xewnekê de ango di kirasê xewnekê de ye û bi vê çîrokê kelûpelên jiyaneke gundewarî li ber çavê me tê raxistin. Herweha Mela Xalid di vê berhemê de zimanekî zelal, sade û nêzî zimanê gel bi kar anîye.

Di vê menzûmeyê de mirov şopên jîyana gundewarî, dawetên gundîyan, kar û barên jinan, ajalên wan, cil û bergên wan, rabûn û rûniştina wan ango tore û adetên wan bi awayekî zelal dibîne. Mela Xalid vê helbesta xwe weke serpêhatîyekê nivîsîye, lê dema ku ev serpêhatî bi helbestî anîye ziman, ji bo jîyana gundewarî jî panorameyeke giştî li ber çavan raxistiye. Ji ber vê yekê di vê menzûmeyê de ji serpêhatîyekê zêdetir; tore û adetên netewekî, jîyan û amûrên çîn û heyamekê hatiye vegotin. Helbestkar di seranserê menzûmeyê de taswîra gund, kar û amûrên li gundan, bi kurtasî taswîra jîyana gundewarîyê dike. Ji ber ku ev helbest di xwe de gelek unsûrên çanda gelêrî dihewîne, em dê li jêrê li ser van unsûran bisekinin û wan binirxînin.

2.2.1. Avahî û Mekan

Di menzûmeya Mela Xalidê Licî (Mayî) de navên avahî û mekanên weke; qonax, sera, deşt, çiya, gund, mizgeft, camî, bajar, heps, zindan, mekteb, medrese, ser ban, çol, bênder, axur, qad, bexçe, zevî, erd, qad, kanî, gom, war, zozan, kadîn, bax û bostan, rez, Serhed, ‘eywan û otaq, ban û xanî derbas dibin. Ev avahî û mekan bi piranî bi jîayana gundewarîyê re eleqedar in. Ji menzûmeyê çend bendên ku ev nav tê de derbas dibin weha ye:

Gerçi bê bav û da me
Bê xwişk û bê bira me

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Bê **qonax** û **sera** me
Bê **'erd** û bê **qad**a me
(7)
'Erd û **qad** û **bexç û rez**
Hesp û dewar berx û pez
Zevî kanî û **bostan**
Gom û **war** û tev **zozan**
(83)
Pirê wana du qat bûn
Bi **'eywan** û **otaq** bûn
Bi **kadîn** û bi **axur**
Werîs û das û bivir
(89)

Dema em li menzûmeya wî mêze dikin tê dîtin ku ji alîyê mekanan ve gelekî dewlemend e û herweha ev mekanên weke gom, axur û kadîn jî bi piranîya bi jîyana gundewarîyê re eleqedar in. Jixwe helbestkar jî di berhemê de taswîra van avahîyên li gundan kiriye.

2.2.2. Alav û Amûr

Ji ber ku di vê menzûmeya Mayî de, behs û teswîra jîyaneke gundewarî tê kirin em tê de rastî gelek alav û amûrên ku di jîyana gundewarî de tên bikaranîn jî tên. Li gundan xalî heta dereng jî ji alîyê jinên gundî ve dihatin ristin û xalîyên febrîqasyon hema bibêje tune bûn. Di menzûmeyê de kulav û palas weke xalî hatine bikaranîn. Berî traktor bikevin nav jîyana gundîyan, gundî cot û karên xwe bi heywan û alavên weke gîsin û nîran û erbeya ga dikirin. Ev amûr aborî û terza jîyana gundîyan jî dide dest.

Di menzûmeyê de amûrên weke werîs, das, taran, tenûr, meşk, bivir, 'elb û satil ku ji alavên jîyana gundewarîyê ne ew jî têra xwe hene. Hin ji wan weha derbas dibin:

Aborîya gundîyan
Taybetîya deştîyan
Cot ew dikin bi gayan
Alet û **gîsn** û **nîran**
(55)
Wê bigirin **'elb** û **satil**
Hin li dest û hin li mil
Bê derd û bê xem û kul
Nava çêra tijî gul
(107)

Gava em bala xwe didin tevahiya berhemê navên gelek amûrên bi vî rengî dê tê de bên dîtin. Ji vî alîyî ve jî dewlemendîyeke şopên jîyana gundewarîyê heye.

2.2.3. Pîşe û Kar

Di menzûmeya Mayî de em rastî gelek kar û pîşeyan jî tên weke; şivan, saman, gavan, bêrîvan, mela, îmam, xulam, mixtar, doxtor, cotyar, sazvan, dengbêj, stranvan, şaîr, ozan, pale, rêncber, aşvan, xoce, keya, kizîr, tucar, çerçî, sefar, irxat, kedkar,

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

hesinker û necar. Piranîya van pîşeyan li gundan tên dîtin û karê wan jî bi jîyana gundewarîyê ve têkildar eêweha ne:

Min got axay dilovan
Cengawerê qehreman
Xudan malbata giran
Nabim **şivan** û **gavan**
(6)
Mitrib û def û zirnan
Yan **derwêş** û ‘erbanan
Tev bilûr û **sazvanan**
Dengbêj û **stranvanan**
(40)
Pez êdî nay nav malan
Şev û rojê li çolan
Dema tê weqtê danan
Tê kêfa **bêrîvan**an
(60)
Tev axan û **xulam**an
Hem beg û hem **saman**an
Hem **rencber** û **şivan**an
Tev **pale** û **aşvan**an

Beg û derwêş û **tucar**
Ê **çerçî** yû ê **sefar**
Ê **irxat** û ê **kedkar**
Hesinker û ê **necar**
(103)

Karûbarên cotkaran û şivantî û gavantî jî dîsa li gundewarîyê tên kirin û li gundan bi piranî tên dîtin.

2.2.4. Xwarin û Vexwarin

Di menzûmeya Mela Xalid de em rastî gelek cureyên xwarinan, sebze û mêweyan tên. Dema em menzûmeya wî dixwînin em xwe li ser sifreyeke gundewarî hîs dikin. Di menzûmeya wî de ev xurek û vexurek derbas dibin; goşt, savar, şorba nîska, qelî, rûn, penîr, tomast, dew, simeydî, nok, kartol, pîvaz, sîr, gûz, be‘îv, hijîr, mehîr, girar, toraq, hêk, pincar, lêxendûr, pirpar, erîşte, şe‘îre, gebola serbizêr, nanê toraq, hêrûn, danî, kekerûn, hebenîsk, kutluk, tirşa bamyan, helîsa balîcan, pûndik, çortan, dims, eqîd, kesme, bastirme, qawirme, bastêq, meşlûrê sor, bacik, tomast, îsot, xiyar, zebeş, qatix, şorbeav, pel, hêkerûn û kofte. Ji vexwarinan jî em rastî dew û şîr tên. Çend mînakên ji menzûmeyê weha ne;

Pir xwarina wan **savar**
Digel **mehîr** û **girar**
Toraq û **hêk** û **pincar**
Lêxendûr tevlî **pirpar**
(66)
Hebenîsk û **şikeva**

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ê dilewtîne deva
Kutluk û **tirşa bamyan**
Tev **helîsa balîcan**
(68)
Şe'îre û tev **keşkê**
Toraqê navê meşkê
Dims û **'eqîd** û **kesme**
Bastirme û **qawirme**

Bastêq û **meşlûr**ê sor
Wan **bacik**ê ava şor
Penîr û tomast û **şîr**
Pîvaz û îsot û sîr
(91-92)
Qelî û **rûn** û **penîr**
Tomast û tev **dew** û **şîr**
Kartol û **pîvaz** û **sîr**
Gûz û **be'îv** û **hijîr**
(62)

Dema em li mezûmeya Mayî dinêrin ji alîyê nav û cureyên xwarinan ve gelekî dewlemend e. Ev yek jî nîşaneya dewlemendîya cûreyê xwarinên Kurdî ye. Ji vî alîyê xwe ve ev berhem di xwe de taybetîya simatîyeyê jî dihewîne, lewra gelek nav û temayên xwarinê tê de derbas dibin.

2.2.5. Riwek û Ajal

Di menzûmeya Mela Xalid de em rastî navên gelek riwek, baqil û ajalan tên. Helbestkar ji ber ku behsa jîyana gundewarîyê dike, di menzûmeyê de jî navên gelek heywan û riwekên ku li gundan tên dîtin derbas dibin.

Gîha û riwekên ku di menzûmeyê de derbas dibin hin ji wan; gul, genim, hebûb, nîsk, gilgil, şolik, garis, ceh, nok, kizin, gûz, pincar, pirpar, pûndik, pîvaz, îsot, sîr, lazût, xiyar û zebeş in.

Ev menzûme ji alîyê navê heywanan jî dewlemend e. Ajalên ku di menzûmeyê der derbas dibin jî weha ne: teyrê baz, kûsî, keslan, pez, mî, golik, hêstir, berx, karik, hesp, deve, gamêş, qaz, şamik, kew, werdek, varik, kûçik, te'jî, pisîk, kevok, boran, dîk, mêşîn, çêlek, ga, seg, conga, mirîşk û ker. Çend mînakên vê beşê weha ne:

Bê **pez** û bê **miya** me
Bê dirav û pera me
Bê **kar** û **golik**a me
Bê **hestir** û **deva** me
(8)
Mirîşk û **qaz** û **şamik**
Kew û **werdek** û **varik**
Kûçik û **te'jî** yû **pisîk**
Kevok û **boran** û **dîk**
(58)
Diçûn bona **hebûb**an

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Qîz û jin tevlî bûkan
Bizrê kitan û **nok**an
Şolik û tevlî **nîsk**an
(74)

2.2.6. Cilûberg

Di menzûmeya Mela Xalid de em rastî cil û bergên xelkên ku bi piranî li gundan dijîn tên. Mela Xalid hal û rewşa wan, serpoş, pêlav û kincên wan di menzûmeya xwe de weha anîye ziman;

Çaroq bû **pêlav**ê wan
'Eba li ser milê wan
Kum û **kefî** l' serê wan
Şalê liva bûn li wan

Bûk û jin tev **pêxwas** bûn
Qîz û keç bê **melas** bûn
Zarok tev bê **midas** bûn
Giş bi tana **kiras** bûn
(33-34)

Di van her du çarîneyan de Mayî serpoş, pêlav, cil û kincên weke 'eba, kum, kefî, şal, melas, kiras, midas û çaroq bi kar anîne. Tê dîtin ku helbestkar mirovên li gundan tevî cilûbergên wan taswîr kiriye û li ber çavan raxistiye.

2.2.7. Şahî û Merasîm

Mirovên gundî ji ber û têkîlîyeke bisînor ya bi derve re dikarin jîyaneke xweser bijîn. Ev xweserîya wan rengê xwe daye hemû jîyana wan. Heta salên dereng jî li gundan dawet û şahî li gor tore û edetên berê dihatin kirin. Li piranîya gundên Kurdan sê roj û sê şev şahî dihat kirin û di van sê rojan de ji alîyê mala dawetê ve ji bo gundîyan xwarin dihat dayîn û xizmet dihat kirin. Li meydana dawetê dengbêj stranên xwe distran, keç û xortan dîlan digirtin û govend digerandin.

Di vê menzûmeyê de jî em rastî dawetên berê tên ku sê roj û sê şev an jî heft roj û heft şev didomin. Xwedîyê dawetê bêyî ku ferqê têxe nav kesan xwarinê dide hemû mêvanan çi feqîr dibe û çi jî zengîn. Di menzûmeyê de gelek unsûrên eleqedar yên weke destmal, şekir, govend, bûk û zava, qelend û xelat, xwarina dawetê, xwendina mewlûdê, amûrên muzîkê û vexwendina mêvanên dawetê hene. Bi kurtasî unsûrên şahî û dawetê di menzûmeyê de weha derbas dibin;

Dema de'wet datînand
Destmal şekir dişiyand
Gundî û heval û nas
Ê maldar û jar û xas

Tev mirov û cîranan
Ê gundan û bajaran
Qîz û bûk û tev jinan
Xort û pîr û ciwanan

Mitrib û def û zirnan
Yan derwêş û 'erbanan

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Tev bilûr û sazvanan
Dengbêj û stranvanan

Tev li mala de‘wetê
Dibûn xwedan qiymetê
Heftekî dûr û dirêj
Didîtin sefahetê
(38-41)
Bi de‘wet û bi dîlan
Govend û kêf û seyran
Gundî malî û cîran
Mirov dimane heyran

Wê dema saz û bilûr
Zirne û def bû temam
Lêdixistin wan hawan
Xweş dibûne pê meqam

Mala de‘wetê dibûn her wekî Xirbê Xelo
Pîrê wê malê digotin wê xelas be ev gelo

Hin ciyan heftek didoman reqs û govendê ewan
Hin ciyan sê roj didoman ew li gor hêza ewan

Gundîyan xwendî dibir malê li gor hêza di wan
Alîkarî bûn eva bo xwedyê de‘wet bê guman

Nedkirin ferqa cîranî jar û maldar û feqîr
Yan beg û axa û mîr û yan keya û yan kizîr
(43-48)
Piştî bûk-hanîna mal
Keç û ciwan pîr û kal
Ê sax û kor û topal
Ê bêguh û ker û lal

Dicivîyan li ser ban
Hazir dibûn goşt û nan
Ba dikir xocew melan
Wê mewlûdê bixwendan

Piştî tevana nan xwar
Ê feqîr û ê maldar
Ê zengîn û ewê jar
Dikir pîroz û bipar
(51-53)

Zakho Centre
for Kurdish Studies

De‘wet û şahiyê wan
Mêr û jin û bûkê wan
Govend û dîlanê wan
Geş dike dengbêjê wan
(108)

Em di metnên klasîk de gelek caran rastî amûrên muzîkê tên. Herçiqas ev menzûmeya Mayî berhemeke edebîyata gelêrî be jî di wê de jî de gelek amûrên muzîkê yên weke tenbûr, ‘ûd, saz, def, zirne, erbane û bilûr cih digirin.

Ez ê jar ê belengaz
Di xew da wek teyrê baz
Li deşt û çiya û gaz
Bê **tenbûr** û **‘ûd** û **saz**
(1)
Mitrib û **def û zirnan**
Yan derwêş û **‘erbanan**
Tev **bilûr** û sazvanan
Dengbêj û stranvanan
(40)

Tê dîtin ku Mela Xalid cihekî mezin di vê menzûmeya xwe de daye şahî û merasîmên tore û adetan. Herweha ew amûrên ku bi şahiya dawetê re têkildar in jî zêde ne.

2.2.8. Kar û Bar

Di menzûmeya Mayî de em rastî gelek kar û barên gundîyan bi taybetî jî yên jinan tên. Di menzûmeyê de kar û barên weha derbas dibin; cotkirina zevîyan, dotina pezan, pijandina nanê tenûrê, kêlana dew, çêkirina sergînan, xwedîkirina ajalan û hwd. Dema mirov vê menzûmeyê dixwîne weke ku li nav gundîyan be. Helbestkar ji ber ku bi vegotineke sade û herikbar behsa kar û barên gundîyan kiriye, dîmenên gundîyan jî li ber çavên mirov zindî dibin.

Aborîya gundîyan
Taybetîya deştîyan
Cot ew dikin bi gayan
Alet û gîsn û nîran
(55)
Dema li wan tê bihar
Gîha û çêr dibe har
Germ tê êdî diçe sar
Dibe çaxa îş û kar

Pez êdî nay nav malan
Şev û rojê li çolan
Dema tê weqtê danan
Tê kêfa bêrîvanan

Wê gazî hev dû bikin
Li bênderan bicivin

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

Qîz û bûk û pîrejin
Wê ber bi çolê herin

Dema gihan hinda pez
Keç û bûkê renkgewez
Wê dest pê kin pir bi lez
Wek herin pêçana rez
(59-62)
Jinê navser û ciwan
Nan pijandin karê wan
Weharenge hevîran
Nadine destê pîran
(70)

Di hin bendan de tê dîtin ku ji bo hin karan tesnîfek jî xuya dike. Meselê hin kar weke karên jinan hatiye dîtin û bi vî rengî di menzûmeyê de cî girtine. Nanpijandin yek ji wan karan e ku weke yên jinan hatiye vegotin.

2.2.9. Çîn û Hîyerarşî

Di vê menzûmeyê de çînên di navbera mirovan de ango qatmanên civakê jî cihê xwe girtiye. Herweha bi vê mijarê ve girêdayî gelek nav û sifetên ji bo mirovan hatine vegotin jî cih digirin. Bêjeyên weke axa, beg, mîr, mixtar, keya, maldar, xas - xulam, pale, rencber, ‘am, jar, feqîr, şivan, aşvan, gavan û hwd tezad û çîna di navbera mirovan de nîşanî me dide. Hin ji wan nimûneyan weha ye:

Em dê vî bikne îmam
Wekî xelqê **xas** û **‘am**
Ê **maldar** û ê **xulam**
Pîr û **mîr** û tev zilam
(14)
Tev **axa**n û **xulama**n
Hem **beg** û hem **saman**an
Hem **rencber** û **şivanan**
Tev **pale** û **aşvan**an
(42)
Meznatiya **mîr** û **axa**n
Pirtir bûn li gundê deştan
Nadir dihat dîtin li çiyan
Hew tenê hebûn navê **keya**n
(85)

Helbestkar dîsa di van bendan û di hin bendên din de jî bi vî rengî behsa çîn û hiyerarşîya di nav civatê de kiriye. Ji van bendan jî tê fahmkirin ku di navbera mirovan de û di civatê de çînên cuda hebûye.

2.2.10. Bîr û Bawerî

Dema em li menzûmeya Mela Xalid dinêrin kêm be jî em rastî nîşaneyên hin bîr û bawerîyan jî tên. Em ji bêjeyên weke mela, ezan, sela, mizgeft, îman û camîyê bawerîya civakê jî hîn dibin.

Zakho Centre for Kurdish Studies

Gundê me bê mela ye
Bê ezan û sela ye
Bê mizgeft û hela ye
Vala nabe j' bela ye

Em dê vî bikne îmam
Wekî xelqê xas û 'am
Ê maldar û ê xulam
Pîr û mîr û tev zilam
(13-14)

Çewa ku ji van her du çarîneyan jî dîyar dibe, gundî sedemê qeza û belayan bi nebûna mela ve girê didin û wisa bawer dikin ku ger melayekî wan hebe dê ew ji qeza û belayan xelas bibin.

3. METNA LATÎNÎZEKIRÎ YA MENZÛMEYA FOLKLORÎ

1
Ez ê jar ê belengaz
Di xew da wek teyrê baz
Li deşt û çiya û gaz
Bê tenbûr û 'ûd û saz

2
Digerîyam wek kûsî
Dixwar gulê melisî
Bê zilm û zexm û pîsî
Bê sûal û bê pirsî

3
Bê çek û mekan û war
Bê îş û xebat û kar
Bê sîlah û çek û dar
Bê sewal û bê dewar

4
Rokê çûm gundek avî
Min li wir axakî dî
Baş û delal û cindî
Ew li min derket xwedî

5
Ji mir got feqîrê jar
Belengazê ustuxwar
Ger dixwazî bike kar
Were here ber dewar

6
Min got axay dilovan
Cengawerê qehreman

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Xudan malbata giran
Nabim şivan û gavan

7
Gerçi bê bav û da me
Bê xwişk û bê bira me
Bê qonax û sera me
Bê ‘erd û bê qada me

8
Bê pez û bê miya me
Bê dirav û pera me
Bê kar û golika me
Bê hêstir û deva me

9
Zanakî xwendevan im
Tiştê teban dizanim
Xortekî nûcewan im
Hîlew viran nizanim

10
Li ba me çêbû xela
Ji malbatek nîvmela
Bê zexm û zor û bela
Fatihê sûr û kela

11
Malbat bi carek rabûn
Li nav welat belav bûn
Li dû tevan em mabûn
Bêgav man em jî rabûn

12
Axa gote gundîyan
Ey mêrxas û cindîyan
Ey murûd û sofîyan
Ey cahîl û hecîyan

13
Gundê me bê mela ye
Bê ezan û sela ye
Bê mizgeft û hela ye
Vala nabe j’ bela ye

14
Em dê vî bikne îmam
Wekî xelqê xas û ‘am
Ê maldar û ê xulam
Pîr û mîr û tev zilam

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

15
Çêkin camîkî mezin
Dirav temam li ser min
Kal û pîr û xort û jin
Aydê wan teba’ê din

16
Sibê zû hatin ba hev
Li hinda mala mixtar
Ehd û peyman dane hev
Ji bona xebat û kar

17
Çêkirin camîkî rind
Pir mezin û hem bilind
Tê danîn çira û find
Hê ez bûm melaê gund

18
Kulav û palas û ber
Reş û spî sor û zer
Hinî cot û hinî fer
Hat raxistin heta der

19
Wek mizgeftek bajaran
Ciyê feqîr û jaran
Bê xebat û bê karan
Keslanê ber dîwaran

20
Li gund hebû kalek jîr
Jêr digot xalê wezîr
Ne axa û beg û mîr
Çêdikir alet û nîr

21
Xudanê du heb jinan
Mehrûmê qîz û lawan
Li mal nedman bê mêhvan
Didan wan xwarin û nan

22
Mêrxas û ‘egîd û mêr
Merd û sexî û camêr
Pir dikir qencî û xêr
Her kes hurmet dikir jêr

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

23
Dîtibûn gelek teban
Herb û pevçûn û şeran
Li bajar û li gundan
Mabûn di heps û zindan

24
Macera û serhatî
Bêçare û jêhatî
Ê qenc û baş û kotî
Ê can û dil disotî

25
Ez çûm hinda wî kalî
Wî pîrê heftê salî
Wî qencî wî delalî
Min jê kir pirsa halî

26
Got canê min bê jan e
Wek xortekî ciwan e
Bê ‘îlac û derman e
Navê qet xizmetan e

27
Ev qencîya Rebê jor
Spî bûye rî yû por
Hê neçûme ba doxtor
Divêm neçim heta gor

28
Got min melaê ciwan
Pir guh nede gundîyan
Kal û pîr û jinbiyan
Tev mîna ne sebiyan

29
Tev cotyar û nîvekar
Bê xwendin û bê kovar
Feqîr û ‘ebdal û jar
Ji ‘erd û qadan bê par

30
Bê xwendin û nivîsan
Bê mekteb û medresan
Ne şa’ir û ne ozan
Ne sela û ne ezan

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies

31
Baş tê bîram li nav gund
Vêdixistin tevan find
Datînan cîkî bilind
Ronî didan gelek rind

32
Gaz û lembe û çira
Dereng hate van dera
Ê biça nav dewara
Vêdixist beysûsa dara[10]

33
Çaroq bû pêlavê wan
‘Eba li ser milê wan
Kum û kefî l' serê wan
Şalê liva bûn li wan

34
Bûk û jin tev pêxwas bûn
Qîz û keç bê melas[11] bûn
Zarok tev bê midas[12] bûn
Giş bi tana kiras bûn

35
Dema keçek bidan mêr
Ji bonê diçûn bajêr
Jêr disendin çend heb zêr
Pel û potê jêr bikêr

36
Jinxwestin û zewcandin
Hem jîyan bûn hem mirin
Qalind gelek disendin
Xelat jî hê dixwestin

37
Ê maldar û dewlemend
Ew pê nedbûn xwedanderd
Wanê feqîr û ê jar
Ew pê dibûn ustuxwar

38
Dema de‘wet datînand
Destmal şekir dişiyand
Gundî û heval û nas
Ê maldar û jar û xas

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

39
Tev mirov û cîranan
Ê gundan û bajaran
Qîz û bûk û tev jinan
Xort û pîr û ciwanan

40
Mitrib û def û zirnan
Yan derwêş û ‘erbanan
Tev bilûr û sazvanan
Dengbêj û stranvanan

41
Tev li mala de‘wetê
Dibûn xwedan qiymetê
Heftekî dûr û dirêj
Didîtin sefahetê

42
Tev axan û xulaman
Hem beg û hem samanan[13]
Hem rencber û şivanan
Tev pale û aşvanan

43
Bi de‘wet û bi dîlan
Govend û kêf û seyran
Gundî malî û cîran
Mirov dimane heyran

44
Wê dema saz û bilûr
Zirne û def bû temam
Lêdixistin wan hawan
Xweş dibûne pê meqam

45
Mala de‘wetê dibûn her wekî Xirbê Xelo
Pîrê wê malê digotin wê xelas be ev gelo

46
Hin ciyan heftek didoman reqs û govendê ewan
Hin ciyan sê roj didoman ew li gor hêza ewan

47
Gundîyan xwendî dibir malê li gor hêza di wan
Alîkarî bûn eva bo xwedyê de‘wet bê guman

48
Nedkirin ferqa cîranî jar û maldar û feqîr
Yan beg û axa û mîr û yan keya û yan kizîr[14]

Zakho Centre
for Kurdish Studies

49
‘Urf û ‘adetê welat bûn ew ji mêj ve herwiha
Şîn û şahî jar û jînî tev belaê pir-biha

50
Ger merivkî jar bimana ew li nav gund bê umîd
Her kesek gorî hêza xwe mutleqa îşî didîd

51
Piştî bûk hanîna mal
Keç û ciwan pîr û kal
Ê sax û kor û topal
Ê bêguh û ker û lal

52
Dicivîyan li ser ban
Hazir dibûn goşt û nan
Ba dikir xocew melan
Wê mewlûdê bixwendan

53
Piştî tevana nan xwar
Ê feqîr û ê maldar
Ê zengîn û ewê jar
Dikir pîroz û bipar

54
Ê peya û ê suwar
Ê biçek û ê bidar
Ha demgerm ba ha jî sar
Ê li rê dê biban kar

55
Aborîya gundîyan
Taybetîya deştîyan
Cot ew dikin bi gayan
Alet û gîsn û nîran

56
Dajon genim û niskan
Hem gilgil û şolikan
Ceh û nok û kizinan
Garis û şa danikan

57
Xwedî dikin dewaran
Tev pez û berx û karan
Hesp û dev û hêstiran
Gamêş û tevlî keran

Zakho Centre
for Kurdish Studies

58
Mirîşk û qaz û şamik
Kew û werdek û varik
Kûçik û te‘jî yû pisîk
Kevok û boran û dîk

59
Dema li wan tê bihar
Gîha û çêr dibe har
Germ tê êdî diçe sar
Dibe çaxa îş û kar

60
Pez êdî nay nav malan
Şev û rojê li çolan
Dema tê weqtê danan
Tê kêfa bêrîvanan

61.Wê gazî hev dû bikin
Li bênderan bicivin
Qîz û bûk û pîrejin
Wê ber bi çolê herin

62
Dema gihan hinda pez
Keç û bûkê renkgewez
Wê dest pê kin pir bi lez
Wek herin pêçana rez

63.Dema pezan didotin
Kelam pê ra digotin
Nav û dilan disotin
Wek arê nava potin

64
Qût û nefeqê ewan
Piranî genmê arvan
Savar û şorba niskan
Simeydî[15] tevlî nokan

65
Qelî û rûn û penîr
Tomast û tev dew û şîr
Kartol û pîvaz û sîr
Gûz û be‘îv û hijîr

66
Pir xwarina wan savar
Digel mehîr û girar

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Toraq û hêk û pincar
Lêxendûr[16] tevlî pirpar

67
Erişte û şe'îre
Gebola serbizêre
Nanê toraq û hêrûn[17]
Danê dibe keşkerûn

68
Hebenîsk û şikeva
Ê dilewtîne deva
Kutluk û tirşa bamyan
Tev helîsa balîcan

69
Tenûr li deşta Amed
Na'ên jimar û 'eded
Pirbûna wan nîne hed
Yekemîn bo jinan ked

70
Jinê navser û ciwan
Nan pijandin karê wan
Weharenge hevîran
Nadine destê pîran

71
Jinê belengazê jar
Wan dikirin gelek kar
Sibê radibûn ji xew
Dest davêtin meşka dew

72
Sa'etek dew dikelan
Hê heywana ber didan
Firavîn hazir dikir
Di pey ra hevîr dikir

73
Hevîr dibir tenûrê
Digel wê te'b û zorê
Nan dibirin boy palan
Hê heywan datin danan

74
Diçûn bona hebûban[18]
Qîz û jin tevlî bûkan
Bizrê kitan û nokan

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Şolik û tevlî nîskan

75
Piştî ezana ‘esrê
Bi hevdû ra didan rê
Berê xwe didane mal
Ji wan nedhat galegal

76
Mehîrê dê bidan ser
Pûndik[19] danîn dikrin ber
Ji bo şîva hêvarê
Çê dikirin savarê

77
Rêx û sergîna heywan
Ew bûn arûdûyê wan
Zivistanê seraser
Ji axur davêtin der

78
Hinek ji xaniyan dûr
Di nav çal û kortê kûr
Bihar tê çaxa germê
Dawî tête li sermê

79
Wê sergîna dewaran
Wê têkin nîvê taran[20]
Li ser ‘erdê dikin rêz
Piştî hişk bû dikin dêz

هەوالنامەی کتێب

80
Ev kar jî ê jinan e
Wek şûştina cilan e
Mêr di vê da nakin kar
Ne ê maldar ne ê jar

81
Kar û xebata jinan
Digel pîr û ciwanan
Ne ew ê beg û mîran
Ne ê axa û keyan

82
Wana nedkir îş û kar
Ji sibê heta hêvar
Li hespê xwe tim suwar
Diçûn gundan û bajar

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو فەکولینێن کوردی

83
‘Erd û qad û bexç û rez
Hesp û dewar berx û pez
Zevî kanî û bostan
Gom û war û tev zozan

84
Vana tev hev ê wan in
Xelq gavan û şivan in
Giş xulam û rencber in
Hew tenê xwedyê ker in

85
Meznatiya mîr û axan
Pirtir bûn li gundê deştan
Nadir dihat dîtin li çiyan
Hew tenê hebûn navê keyan

86
Heçî gundê li çiyan
Ewanê lê dijiyan
Pirê wan xwedyê ‘erdan
Bax û bostan û rezan

87
Bê beg û mîr û axa
Tenê muxtar û keya
Aborîya wan gelek
Li ser pezan û çêlek

88
Şewata wana tev dar
Ê jar û tevlî maldar
Ban û xaniyê tevan
Çêkirîbûn ji beran

89
Pirê wana du qat bûn
Bi ‘eywan û otaq bûn
Bi kadîn û bi axur
Werîs û das û bivir

90
Zad û zexîre’ê wan
Pirê wê savar û dan
Rûn û toraq û çortan
Şolik û nîsk û nokan

91
Şe‘îre û tev keşkê
Toraqê navê meşkê
Dims û ‘eqîd û kesme
Bastirme û qawirme

92
Bastêq û meşlûrê sor
Wan bacikê[21] ava şor
Penîr û tomast û şîr
Pîvaz û îsot û sîr

93
Ev bûn zexîrê wana
Tev dijiyan bi wana
Bargerê wan tevahî
Ê deştê ê çiyahî

94
Hêstir û ker û bergîr
‘Ereba ga’ê binîr
Îca em herne Serhed
Wergerî ava cemed

95
Warê pezan û karan
Berx û mêşin û mîyan
Gamêş û çêlek û ga
Golig û sag û conga

96
Qaz û werdek û şamik
Dîk û mirîşk û varik
Hêstir û ker û mehîn
Wan hespê nêr ê bizîn

97
Aboriya ewana
Li ser pişta heywana
Hajotî ceh û lazût
Wan genimê simbêlrût

98
Xiyar û tevlî zebeş
Nokê spî û ê reş
Xelqê wan tev hurmetkar
Axa û mîr û muxtar

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینین کوردی

99
Ewê feqîr ew ê jar
Ê ciwan û ixtiyar
Ew ê nas û ê nenas
Ê ‘ewam û ewê xas

100
Dema herî ber derî
Nabin jarî feqîrî
Zana î yan jî jîr î
Ciwan î yan jî pîrî

101
Pêşwazî bo te dikin
Xort û pîr û mêr û jin
Di malê de ê mezin
Xêrhatina te dikin

102
Ha suwar bî ha peya
Mîr û axa û keya
Mêr û bûk û jinbiya
Hecî xoc û sofiya

103
Beg û derwêş û tucar
Ê çerçî yû ê sefar
Ê irxat û ê kedkar
Hesinker û ê necar

104
Dibin herî bo tevan
Şîv û taştê didin wan
Ger bimînin bi heftan
Nabine teng qet ji wan

105
Dema bihar tête wir
Giya çêre dibe gur
Mast û tomast dibe pir
Rengê çolê dibe dur

106
Şivanê berx û pezan
Şev û rojê li çolan
Dema tê çaxa danan
Tê kêfa berîvanan

107
Wê bigirin ‘elb û satil
Hin li dest û hin li mil
Bê derd û bê xem û kul
Nava çêra tijî gul

108
De‘wet û şahiyê wan
Mêr û jin û bûkê wan
Govend û dîlanê wan
Geş dike dengbêjê wan

109
Arûdûyê ewana
Tev tezekê heywana
Ê feqîr û ê maldar
Ew ê zengîn ew ê jar

110
Xwarinê wana tevan
Ê maldar û ê jaran
Ê maldar û ê şêxan
Ê sofiyû hecîyan

111
Qatix û mast û savar
Rişte û şorbew girar
Pel û keşk û hêkerûn
Kofte û tev keşkerûn

ENCAM:

Mela Xalid helbestkarekî herêma Licêya Diyarbekirê ye û heta niha du berhemên wî yên helbestan hatine weşandin û di helbestên di terza klasîk de mexlesa “Mayî” bi kar anîye. Berhema wî ya sêyem jî ev menzûme bû ku heta niha li derekê nehatibû weşandin û li vir bûye mijara vê xebatê.

Helbestkar hem di helbestên xwe de hem jî di vê menzûmeya xwe ya bênav de zimanekî sade, zelal û zimanê gel bi kar anîye. Herweha zimanê gel tesîra xwe di helbestê din ên Mela Xalid de jî xwe dide der.

Mela Xalid menzûmeya xwe bêtir bi teşeya çarîneyan nivîsîye, lê di hin ciyan de jî derbasî teşeya mesnewîyê bûye û bi malikan dewam kiriye. Me ew malik jî di forma çarîneyan de nîşan dan. Herweha menzûme bi kêşa birgeyî ya heft kiteyî hatiye nivîsîn û di hin ciyan de ev kêş ji heft kiteyan dibore. Di menzûmeyê de hem serwa hem jî paşserwa hehe û tê de serwaya nîvco, tam, zengîn û ya tûnç jî hatine bikaranîn. Li hin ciyan di kêş û serwayê de şikestin jî derketine holê.

Di menzûmeyê de gelek unsûrên cuda hebûn, lêbelê me giranîya xwe da ser unsûrên ku şopa gundewarîyê tê de hene û di encamê de ji alîyê me ve di bin 10 beşan de ev unsûr hatin nirxandin. Di menzûmeyê de unsûrên derbarê “avahî û mekan”, “alav

û amûr”, pîşe û kar”, “xarun û vexwarin”, “riwek û ajal”, “cilûberg” “şahî û merasîm”, “kar û bar”, “çîn û hiyerarşî” û “bîr û bawerî” de hatin tesbîtkirin, senifandin û nirxandin.

Mela Xalid bi bêjeyên weke şivan, pez û dewar û sergîn, tenûr, şivantî û bêrîvanî û amûrên cotkarîyê û hwd ve jiyana gundewarî ya Kurdan li ber çavan radixîne.

Dîsa bi lêvkirina dawet, govend, dîlan û jinxwestinê jî li ser tore û adetan û şahî û merasîmên Kurdan sekinîye û ev yek bi zimanekî zelal vegotiye. Navên heywanan ku di jîyana gundewariya Kurdan de gelekî li pêş e yên weke ker, golik, kûçik, hesp, hêstir, mirîşk û tejî jî dîsa di vê menzûmeyê de gelekî hatine dubarekirin. Mela Xalid çîn, statu, pîşe û hiyerarşîya di civatê û di navbera welatîyan de jî di vê menzûmê de aniye ziman û behsa axa, beg, jar, dewlemend, şivan, gavan, şêx, mela û mîran jî kiriye.

Ji çanda madî ya gel ve bêjeyên def, zirne, tenbûr, sazben, dengbêj û stranvan alîyê terza kêf û şahîyan bi me daye zanîn. Ji metbexa gel ve navên gelek xwarin û vexwarinan daye ku ev jî alîyê wê yê sîmatîye û gastronomîyê derxistiye pêş. Herweha navên sebze û fêkîyan; navê xwarinên paşîvî û vexwarinan jî bi bîr xistiye.

Ev menzûme bi unsûrên zengîn ên folklorî hatiye xemilandin û ev unsûrên folklorî êdî bûye unsûrên eslî yên vê helbestê. Herweha ev unsûrên ku şopa adet û jîyana gundewarî di xwe de vedihewîne ji bo vê berhemê bûye îskeletekî estetîk ê helbestê.

Mela Xalid di vê helbesta xwe de unsûrên çand û edebîyata gel bi têr û tîje û bi awayekî hêzdar bi kar anîye. Mela Xalid di vê menzûmeya folklorî de ji alîyê herikbarîya zimanê helbestê ve dikare bibe yek ji model û mînakên herî baş.

ÇAVKANÎ:

Ayçiçek, H. (2020). *Derdename.* Wan: Weşanên Sîtav.

Remo, X. (2013). *Derdename.* Duhok: Weşanên Hawar.

Ayçiçek, H. Destxeta “*Dîwana Derdename*”. (Kopiya wê di arşîva me de parastî ye).

Ayçiçek, H. Destxeta “*Menzûmeyeke Folklorî*”(Kopiya wê di arşîva me de parastî ye).

Hevdîtina me ya bi Mela Xalidê Licî ya di 01.02.2022yan de.

Hevdîtina me ya bi Mela Xalidê Licî ya di 25.12 2021an de.

Hevdîtina me ya bi Mela Xalidê Licî ya di Kanûna Pêşîn a 2019an de.

Keskin, N. (2019). *Foklor û Edebîyata Gelêrî*. Stenbol: Weşanên Avesta.

Licî, M. X. (2011). *Serpêhatiya Zana*. Stenbol: Weşanên Avesta.

Pertev, R. (2018). *Foklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî (1898-1946)*. Stenbol: Weşanên Avesta.

Remo, X. (2013). *Derde Name (Dîwan)*. Duhok: Weşan Hawar-Duhok.

Yıldırım, K, Pertev, R & Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî*. Stenbol: Weşanên Zanîngeha Artuklu

PÊVEK:

Pêvek 5: Rûpela Serî ya Destxeta Menzûmeya Mela Xali



Pêvek 6: Rûpela Dawî ya a Destxeta Menzûmeya Mela Xalid



Pêvek 7: *Rûpela Yekem a Destxeta Dîwana “Derdename” ya Mela Xalid*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆڵینە کوردییەکان

Perawêz:

---

1 Esma xanim qîza Şêx Ebdilqadirê Hezanî û diya Mela Ehmed Meylanî yê Miftiyê Licê bû.

2 Mela Fethullah zavayê Mela Îsmetulahê Karazî ye û diya wî jî qîza apê Mela Îsmetulah e.

3 Mela Huseynê Qenderhelî miderisê Şêx Mihemed Salih bû û gava çûye hecê, li Şamê wefat kiriye.

4 Ji hevdîtina bi Mela Xalidê Licî ya di Kanûna Pêşîn a 2019an de.

5 Ji hevdîtina bi Mela Xalidê Licî ya di 25.12 2021 û ya di 01.02.2022yan de.

6 Mela Xalid paşê ev berhem derbasî ser tîpên Latînî jî kiriye û di arşîva wî de ev nusxe jî mewcûd e.

7 Ji bo destxeta Derdenameyê ya muelîf binêrin: (Pêvek:3).

8 Ji bo destxeta vê menzûmeya muelîf binêrin; (Pêvek:1 û Pêvek:2).

9 Ev reqemên di bin parçe-helbestan de rêza malik an jî bendên helbestê nîşan didin.

10 Beysûsa dara: Darên ku li ser agir tê zûhakirin û paşê ji bo şewatê tên kutandin dibe beysûsa dar.

11 Melas: Çît û mendîl.

12 Midas: Pêlav, sol.

13 Saman: Şivan

14 Kizîr: Alîkarê keyayan (alîkarê muxtaran), eza.

15 Simeydî: Xwarineke ji danê hûrkirî çê dibe, li Licê jê re “teftî” tê gotin.

16 Lêxendûr: Navê pincarekî ye.

17 Hêrûn: Hêkerûn.

18 Hebûb: Nîsk.

19 Pûnd: Gihayekî bibêhn e.

20 Tar: Ew textê weke textê dora bêjing û moxilan e ku pê sergîn tê çêkirin.

21 Bacik: Li Licê ji îsotên sor re bacik tê gotin.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

MOLA HALÎT’IN FOLKLORİK MANZUMESİNDE KÖY HAYATI İZLERİ

ÖZET:

Molla Halit Licewî, 1934 yılında Diyarbakır’ın Lice ilçesine bağlı Melan mahallesinde dünyaya gelmiş. Mela Xalid’ın resmi adı Halit Ayçiçek olup kendisi Remo ailesindendir. Şiirlerinde “Mayî” yi mahlas olarak kullanmış ve uzun yıllar saat tamiriyle uğraştığı için “Saatçi Halit” olarak da tanınmıştır. Yedi yaşında medreselerde Arapça öğrenmeye başlamış ve yirmi yaşına kadar birçok medresede birçok alim ve molladan dersler almıştır. Arapça öğrendikten sonra Molla Halit, on yaşındayken Alibardak köyüne gitmiş ve Molla Kemal Alibardakî'nin talebesi olmuştur. Molla Halit 1946 yılının sonbaharında Şeyh İsmetullahê Karazî’nin yanına gitmiş ve dört yıl onun yanında okumuştur ve yaklaşık on yıl boyunca çeşitli medreselerde eğitimine devam etmiştir. Molla Halit yirmili yaşlarında imamlık yapmak üzere Diyarbakır merkezine gelmiştir. Burada hem evlenmiş hem de bir fabrikada çalışmaya başlamıştır. Molla Halit 1957'de askere gitmiş ve askerdeyken yazmaya başlamıştır. Molla Halit askerden döndükten sonra 1965 yılında Heşoli, Batrik köylerinde ve Lice’nin çevresinde yaklaşık 8 yıl imamlık yapmış ve daha sonra imamlığı bırakmıştır. 1965 yılından beri Diyarbakır’ın Sur ilçesinde küçük bir dükkanda saat tamirciliği yapmakta ve halen hayattadır.

Molla Halit medrese kültüründe eğitim görmüş, klasik ve folklorik tarzda birçok şiir yazmıştır. Molla Halit’in şimdiye kadar Türkiye'de iki kitabı yayımlanmıştır. *Serpêhatiyên Zana* adlı manzum hikâye kitabı 2011 yılında, *Derdname* adlı şiir kitabı ise 2020 yılında yayımlanmıştır. El yazması şeklinde olan manzum bir eseri ise elimizde olup bu çalışmamızın konusu olmuştur.

Molla Halit'in çoğu dörtlük şeklinde kaleme aldığı bu manzumesi henüz hiçbir yerde yayımlanmamış ve üzerinde herhangi bir akademik çalışma yapılmamıştır. Eser manzum bir hatırat şeklinde yazılmıştır. Bu eserde Kürtlerin köy yaşamına dair güçlü gözlemlere yer verilmiş ve eserde köylülerin yaşamı ana konu haline gelmiştir.

Bu çalışmada öncelikle Molla Halit Licewî'nin hayatı ve eserleri kısaca ele alınacaktır. Ardından Arap harfleriyle yazılmış olup henüz el yazması şeklinde olan eser üzerinde durulacaktır ve bu eser ayrıntılı bir şeklide tanıtılacaktır. Bu çalışmada bu manzum eseri Arap haflerinden Latin haflerine çevrilecek ve folklorik unsurları değerlendirilecektir. Aynı şekilde bu eser şekil ve içerik açısından da incelenecektir.

Anahtar Kelimeler: *Mola Halit Licewi, Manzume, Folklor Unsurları, Kürt Köy Hayatı, Şiir*

TRACES OF VILLAGE LIFE IN MOLA KHALID'S FOLKLORIC POETRY

Abstract:

Mela Khalid Licî was born in 1934 in the Melan neighborhood of Diyarbakır's Lice district. Mela Khalid's official name is Halit Ayçiçek and she is from the Remo family. He used "Mayî" as a pseudonym in his poems and was also known as "Clockmaker Halit" because he had been dealing with clock repair for many years. He

Zakho Centre for Kurdish Studies

started learning Arabic in madrasahs at the age of seven and took lessons from many scholars and mullahs in many madrasahs until the age of twenty. After learning Arabic, Mela Khalid went to Alibardaxa village at the age of ten and became a student of Mela Kemal Alibardaxî. Mela Xalid went to Sheikh İsmetullah Karazi in the autumn of 1946 and studied with him for four years and continued his education in various madrasahs for about ten years. Mela Khalid came to the center of Diyarbakır to become an imam. Here he both got married and started working in a factory. Mela Khalid enlisted in the military in 1957 and started writing while she was in the military. After Mela Khalid returned from the military, he worked as an imam for about 8 years in Heşoli, Batrik villages and around Lice in 1965, and later quit as imam. He has been working as a clock repairman in a small shop in Diyarbakır's Sur district since 1965 and is still alive.

Mela Xalid was educated in madrasah culture and wrote many poems in classical and folkloric style. Mela Khalid's two books have been published in Turkey so far. His story book *Serpêhatiyên Zana* was published in 2011 and his book *Derdname* was published in 2020. We have a poetic work in the form of a manuscript, which is the subject of our study.

This poem by Mela Khalid, mostly written in quatrains, has not been published anywhere yet and no academic study has been done on it. The work is a memoir written in verse. In this work, strong observations about the village life of the Kurds are included and the life of the villagers has become the main subject in the work.

In this study, first of all, the life and works of Mola Khalidê Licî will be briefly discussed. Then, the work written in Arabic letters, which is still in the form of a manuscript, will be emphasized and this work will be introduced in detail. In this study, his entire work will be translated from Arabic letters to Latin letters and his folkloric elements will be evaluated. In addition, the work will be examined in terms of form and content.

Keywords: *Mola Khalid Licî, Manzume, Elements of Folklore, Kurdish Countryside Life, Poetry.*

FOLKLOR Û RISTA WÊ YA LI SER CIVAKÊ

Mustafa Borak/ Turkîya

PUXTE:

Me got, folklor, aqilê tomerî ye û pêvajoyek dîrokî û domdar e. Bi gotinek din, folklor,hêmanek karîdar û piralî ye jî. Jiber ku eynika ruh û giyana civakan e; bi nasandina folklorê ve rewş û kesayeta gelan xwe dide xuyandin. Her gelek, li gor xwe danhevî û taybetmandiyên xwe kod û şîfreyên xwe hene. Yên ku dixwazin civakekê nas bikin, an jî midaxeleyî civakekê bikin, berî her tiştî divê wan şîfreyên wî gelî binasin. Ew şîfre jî zêdetir di nava folklora gelan da cih digirin. Lewra nirxên folklorê bi awayekî xwezahî li ser civakê bandorek zêde diafirînin. Ji ber ku duriv û kesayeta gelan e, pêwîst e folklor tenê wekî hêmanek çandî û hunarene neyê dîtin. Ji ber wê boneyê, di damezirandin û teşegirtina civakê da rolek folklorê ya girîng heye.

Peyvên Serekî: *FOLKLOR , CIVAK, Destan, gotinên pêşîyan, biwêj, çîrok, çîrvanok*

A) Folklor

Berî ku dest bi mijara folklorê ya li ser rêxistina civakî bikin, divê em di derbarê folklorê da çend agahiyan bînin zimên ku mijar baş bê têgihîştin.

Çawa ku tê zanîn, her warek jiyanê ya bingehîn, di heman demê da mijara beşeke zanistê ye. Ji van beşên zanistê yek jî folklor e. Bi gotinek din, divê em mijara folklorê wekî beşek zanistê bibînin û li gor wê nêzîk bibin. Wekî beşek zanistê pejirandina folklorê di nîvê sedsala hezar û nehsidî da berê li Îngilistanê dest pê kiriye.

Folklor jî wekî beşên din ên zanistê, ne bi tena serê xwe ye. Ew jî wekî beşên din yên zanistê bi civakzanî, erdnîgarî, felsefe, çand, dîrok, wêje, aborî, huner, mîmarî û her wekî din bi gelek beşên cihêreng ve bi awayekî diyalektîk têkildar e.

Berî her tiştî divê em bizanibin ku girîngiya folklorê ji hêza gel tê. Lewra hêmanên folklorî wekî qanûn û zagonên gel in. Ew hêman, gelek caran ji qanûn û zagonên dewletan ji yên fermî bêhtir bi bandor in. Çimkî folklor jiyan gel e. Çimkî folklor hişmendî, nêrîn û helwesta gel e. Folklor, li ser feraset û kesayeta gel, li ser edet û toreyên gel, helwest û timtêla gel, lêgerîn û lêkolînê dike. Zanista folklorê, bi awayekî rasteqîn taybetmendiyên ruh û giyana gelan, raman û mantelîta gelan diçespîne. Wan li gor azîn û rêbazên xwe dinirxîne û encamên wan ji me ra radigihîne.

Di pêvajoya mirovahiyê da her gelî, li gor têkiliyên xwe yên civakî, aborî û gîyanî çandek afirandiye. Ew çand, di encama têkiliyên hilberîn û parvekirinê da tim pêş ve çûne, û tim dewlemend bûne û tim kemilîne. Di pêvajoya demê dali ser her erdnîgariyekê, li her welatekî ew çand bi awakî hevpar û kolektîf pêk hatine û bûne hişmendî û bûne parçeyek ji jiyana gel. Em dikarin rewşa gelan a hilberînê, têkiliyên wan yên hilberîn û parvekirinê di folklorê da bi awayekî zelal bibînin. Bi guherînên civaka komûnal, koledarî, feodal û kapîtalîzmê daango di her serdemên girîng da rewşa folklorê jî guheriye û ji nû ve hatiye afirandin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Folklor, aqilê civakê, yê tomerî ye. Ji ber wê bi hêz û karîdar e. Bi saya wî aqilê tomerî di pêvajoya demê da bûyekesayet û nasnameya civakê. Lewra folklor, hemî tiştên daringî û manewî ku di jiyana gel da cî digirin tev da dihundirîne nava xwe. Bi gotineke din, folklor malê gelan e. Tecrûbe, zanîn, ked, hilberîn û nexşeya jiyana civakêye. Roniyê dide dîrokê û wê nifş bi nifş digihîne rojên pêşîn. Folklor afîrînerî, huner û merîfeta gel e. Ji ber wê jî em dikarin bi rehetî bibêjin ku destpêka civakbûnê û ya folklorê pev re meşiyane. Lewra dîroka folklorê, dîroka mirovahiyê bi xwe ye.

Mijarên folklorê hem zehf zêde ne, hem jî cihêreng in. Di nava mijarên folklorê da zêdetir dengbêjî, destan, efsane, gotinên pêşîyan, biwêj, cefen, çîrok, çîrvanok, meselok, qewlik, pêkenok, kilam, stran, payîzok, beyt, qesîde hene. Ji bilî wê, lorîyên qundaxan, pê şabûna zarokan, zêmarên li ser mirîya tên gotin, nifir, dua, tiştanok, têderxistinok, zûgotinok û her wekî din gelek mijar di nava folklorê da cih digirin. Dîsa rewşa civakê, ya edet, tore, dad, ol û aboriyê, ya berxwedan û îxanetê, ya avahî û mîmariyê, ya xawrin, vexwarinê, ya cil û bergan, di nava zanista folklorê da cih digirin.Kesayeta gel, çanda şer û aştiyê,rewşa malbatê, pîvanên civakê, felsefe û baweriyên gelan, di nava folklorê da xwe didin der. Dîsa ji bilî wan rûniştina li ser sifrê, rêbazên xwezgîniyê, lîstikên zarokan, kişik, nebelek, cirîd di nava folklorê da ciyê xwe digirin. Adetênwekî Newroz, kosegelî, def û dawet, govend, cerg û bez, qelen û cihêz, bûka baranê, bindarûk, zozan, kon, çît, berxbirr û beranberdan hemî di nava folklorê da ne. Nexş û moçikên xalî û xalîçeyan, ên tevn û teşiyan, şal û şapik, kofî û kitan, têkiliyên dê û bav û ewladan, a bûk û xesiyan, a zava û xezûran, a tî û jintiyan, a mêvan û mazûbanan, têkiliya kirîvatiyê, xinamîtiyê, destbiratî, hevaltî, dostî, lêzim û eqrebetiyê, tev da mijarên folklorê ne.

Bi kurtasî folklor ji dema hemlebûna dayîkê û ji dawa dê ketinê da dast pê dike û heta derê gorêberdewam dike. Lê li wir jî naqede, heta dua, sersaxî (taziye) xêr û xêratê didomîne. Lewra, folklor jiyan bixwe ye.

Divê li ser pênasiya folklorê da jî bi kurtasî çend tiştan em zelal bikin. Ji ber ku di nava zaravayên kurdî da hinek gengeşî hene, gelo kurd peyva folklorê çawa pênase dikin, an jî divê çawa pênase bikin?

Di zaravayê Kurmancî da *zanistiya gel,* di soranî da *xelknasî,* di Kirmanckî da *zanistiya şarî* tê gotin. Kurdên sovyeta bere jî li şûna peyva folklorê, peyva *zargotin*ê bi kar tînin. Ya rastî ev hemî pênase jî di cî da ne. Ji van pênaseyan bi taybetî ya Kirmanckî ji ber ku peyva *şar* hem wateya bajar û hem jî wateya *şaristaniyê* (medenıyetê) dide siruştî û pir balkêş tê xuyan. Lê peyva *zargotinê*jî her çiqas têra hinek mijaran neke, wekî mîmarî, kinc û libas, xwarin, vexwarin û hwd. lê bi gelemperî ew jî tê pejirandin û li kurdî jî tê. Lewra peyva *zargotinê* ji bo çanda devkî tê bi kar anîn û ji bo wê jî di cih da tê xuyan. Lê belê têgiha zargotinê wateya folklorê ya dorfireh tam nade.

Di wê derbarê da li Amedê di Mijdara sala 2019 de di komxebatên beşa folklorê da (Ya waqfa Mezopotamyayê da) me kesên ku bi folklêrê re serê xwe dêşandin, li ser vê têgihê li hev kirin ku di xebatên xwe da zêdetir peyva folklorê bi kar bînin. Her çiqas di wê komxebatê da ji parçeyên din yên Kurdistanê da jî hebûn, lê helbet ev bi tenê ji hêlekê an jî dudyan ve nabe. Her çiqasî di şerd û mercên îroyîn da pir zor be jî, lê divê di derbarê mijarên wisa girîng da li her çar parçeyên Kurdistanê pispor û zanayên wan bêne ba hev û bi azîna dengdana zêdeve biryarên têgihên wisa û her wekî din tev da bidin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

B) Rista folklorê ya li ser rêxistina civakê

Me got, folklor, aqilê tomerî ye û pêvajoyek dîrokî û domdar e. Bi gotinek din, folklor,hêmanek karîdar û piralî ye jî. Jiber ku eynika ruh û giyana civakan e; bi nasandina folklorê ve rewş û kesayeta gelan xwe dide xuyandin. Her gelek, li gor xwe danhevî û taybetmandiyên xwe kod û şîfreyên xwe hene. Yên ku dixwazin civakekê nas bikin, an jî midaxeleyî civakekê bikin, berî her tiştî divê wan şîfreyên wî gelî binasin. Ew şîfre jî zêdetir di nava folklora gelan da cih digirin. Lewra nirxên folklorê bi awayekî xwezahî li ser civakê bandorek zêde diafirînin. Ji ber ku duriv û kesayeta gelan e, pêwîst e folklor tenê wekî hêmanek çandî û hunarene neyê dîtin. Ji ber wê boneyê, di damezirandin û teşegirtina civakê da rolek folklorê ya girîng heye.

Folklor, ji bo sazîbûna pergala civakê risteke girîng dilîze. Folklornas Bedran Hîkmet girîngiya folklorê wiha tîne zimên: *“Roleke girîng a folklorê di tenzîmkirina civakê da heye. Piraniya berhemên folklorê bi rengekî xizmetê li sîstema civakî ya heyî dikin û wê diparêzin. Dema ku em civakeke bê folklor, bê urf û edet bifikirin, li wê derê ne pêkan e ku sîstemeke civakî hebe.” (Hikmet B. 2016, r.11)*

Rista folklorê ya li ser civakan bi zêdetir di demên şer, dagirkerî û asîmîlasyon û guherînê da xwe dide der. Wekî ku tê zanîn, di dinyayê da şer pevçûn, dagirkerî û talan heta niha neqediyaye û wisa tê xuyan ku hîn dê demeke dirêj jî neqede. Hîn jî masiyên mezin, yên biçûk dardiqutîne. Hîn jî hişmendiya hakimbûn û mezinbûnê berdewam e.

Bêguman, dagirkerî, mêtînkerîû serdestî tenê li ser axê pêk nayê. Serdest heta ku li ser mêjî û ruhê gelan erka xwe serdest nekin, nikarin dagirkeriya xwe mayînde bikin. Ji ber ku civak bi çand û kesayeta xwe ve heye, serdest berî her tiştî dixwazin civak ji wê kok û binyata xwe dûr bikevin, nasname û kesayetiya xwe wenda bikin û bişibin serdestên xwe. Di vê derbarê da dîrokzanê Îngiliz û serokê lijneya perwerdekirina (ango bişavtin û asîmlîlasyona) hîndistaniyan Thomas Bibington Maculay, rewşa bişavtina gelan, bi awayekî zelal radixe ber çavan ûwiha dibêje: *“Em ê bi belavkirina ziman û çanda Îngilizan a li Hîndistanê modelek, tîpek wisa biafirînin ku her çiqas ew bi xwîn, bi reng û çermê xwe Hindî bin jî, lê dê bi hişmendiya xwe ve, bi dîtin, raman ve û bi zewqên xwe ve Îngiliz bin.”*

Bêguman rewş û timtêla folklora gelan, ji hêla serdestan ve tim tê şopandin û li gor wê tê hereket kirin. Ew,her tim nirxên civakan li pêş çavan digirin û li gor wê nêzîkî wan dibin. Ji bo ku bişavtin, asîmilasyonû guherînêçi ji destên wan tê texsîr nakin. Di wê nêzîkatiya serdestan da rêbaza wan ya herî bingehîn bikaranîna dîn û baweriyê ye. Bi gelemperî dîn û baweriyê derdixînin pêş. Çimkî dizanin, her civak di derbarê baweriyên xwe da hesas e. Ji ber wê jî tim dîn û mezheban ji xwe re dikin alet, dikin hincet.

Bedran Hîkmet di vê derbarê da wiha dibêje: *“Lewra, her sîstem an jî îdeolojî dixwaze civakê li dû armancên xwe organize bike. Ji bo birêxistina civakekê desthilatbûna li ser jiyana wan a manevî, an jî tesîrkirina li ser meyla maneviyata wan gelekî girîng e. Folklor jî kêleka dîn û baweriyan, di pêkhatina baweriya civakê da yek ji çalaktirîn rolê dilîze.”(Hikmet B. 2016, r10)*

Wekî mînak dewletên li ser Kurdistanê hakim in, ji ber ku Kurd jî nola wan mislimanin û bi dînê îslamiyetê bawer dikin, wê hêmana dîn gelekî li ser Kurdan bi kartînin. Argumana dewletê ya ku herî zêde pêk tîne û tim dibêje: *“Dînê me yek e, Xwedayê me yek e, pêxemberê me yek e, qurana me yek e.”*Her çiqasî ew angaşt wekî

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

xalên cuda bêne nîşandan jî, lê hemû jî yek tişt e. Ew jî tenê dîn e. Di vê derbarê da çespandina Amîrcal Cabral pêşengê têkoşîna Angolayê gelekî balê dikişîne,Cabral dibêje: “*Dema Portekîzî hatin welatê me, di destên wan da încila pîroz û di destê me da jî axa me hebû. Lê demekê bi şûnda me dît ku, încîl di destê me da ye, axa me jî di destê wan da ye.”(*Davidson B. 1976)

Li bakûrê Kurdistanê, didema berxwedana Dêrsimê da,dewlet,ji bo heta ku amadekariyên xwe yên leşkerî pêk bîne, heyetekê dişîne Dêrsimê. Ew heyet ji ber ku Dêrsimî elewî ne, ji wan re wekî elewiyan bi sondên elewiyan sond dixwin kutiştekî bi wan nakin û ew tenê ji bo aştî û biratiyê tevdigerin. Bi wê sondêve baweriya elewiyan bi xwe tînin. Bi wî awayî demeke dirêj wan dixapînin. Armanca wan ew bûye ku di wê navberê da riya trênê çê bikin û leşkerên xwe bi trênê, bînin ser Dêrsimêû qetilamê bikin. Di encamê da jî daxwaza wan bi cih tê û qetlîamek mezin tê kirin. Hîn roja îroyîn jî bi riya dîn û mezheban ve çi xapandinên mezin pêk tên li ber çavan in.

Di guherîn û pêş ve çûna civakan da bandora destanan jîcihkî girîng digirin. Bi taybetî di pêvajoya şoreş û pêkhatina netewebûnê da nirxên wekî destan û efsaneyan rolekhêjahildigirin ser milê xwe. Ji ber ku lehengên destanan tim li hember neheqiyê, li hember zordestiyê şer dikin, ew ji gelan re dibin mînak.Mêrxasî û berxwedana lehengên destanan, hestên azadiyê û ramana welatperweriyê geş dikin. Di pêvajoyên wisa kelecan da ew lehengên destanan, ji gelan re dibin rolmodel. Ew yek jî hêza yekîtiya gelan xurt dike û dibe sedema têkoşîna azadî û serbestbûnê.

“Yên bindest her çiqasî bi awayekî aşkere nedin xuyandin jî, ji lehangan û gotin û kirinên lehengan re pir hewasa wan tê. Ew wan perest dibînin, çimkî ew gotin û kirinênlehengan, ya daxwaza dilê wan e. Çimkî mirov ji bo ku mirovatiya xwe ya hêrifandî û qels têk bibe, pêdiviya lehangan dil dike. Însan ji bo xwebawerî û giramiya xwe, ji nû ve bi dest bixe, hewcedariya lehengan daxwaz dike.”(Karataş H. 2010 , r15)

Di vê derbarê da destana Fînî ya bi navê *Kalevala* mînakek pir girîng e. Bandora vê destanê ya li ser Fîniyan hêjayî lêkolînê ye. Çîroka destana Kalevala bi kurtasî wiha pêk tê: Lêkolînvanê Fînî yê bi navê Elias Lönnrot (1802-1884) di dema lêgerîn û lêkolînan da, rastî destana Fînî ya bi navê *Kalevala* yê tê.Elias ji deverên cuda cuda4.000 malikên vê destanê berhev dike û di sala 1829 an da wekî pirtûk diweşîne. Piştî ku ev destan tê çapkirin, li seranserê welat gelekî deng vedide û gelek bala Fîniyan dikişîne. Di wê navberê da li gelek deverên Fîlandiyayê ji Fînîyan gelek malikên din yên Kalewelayê ji Elias ra tê şandin. Di encamê da hejmara malikan bi wî awayî digihîje 22.795 an. Di wê kêliyê da ji ber ku zimanê destanê Fînî bûye, di nava gel da pêşbaziya hînbûna zimanê Fînî dest pê dike. (Borak M. 2022) Piştî wê kelecanê dema ku Rûsya Fînlandiyayê dagir dike, bandora destana “Kalevala’ yê di şerê serxwebûn û azadiya da gelekî dedikeve pêş. Ev destan ji bo gel, ji bo serhildêran dibe pêşeng, dibe îlham, dibe sînerjî û gelê Fînî radike ser piyan.

William Wilson girîngiya destana Kalewala yê ya li ser netewetiya Fîniyan bi awayekî pir zelal destnîşan dike û wiha dibêje: “R*oja ku Kalevala derkete meydanê,hemî cîhana şareza berê xwe da Fîlandiyaya jibîrbûyî. Kalevala di jiyana me ya neteweyî de xaçerêyek şikestinê ye. Ya rast, wek neteweyekê peydabûna me,bi peydabûna Destana Kalevala yê ve girêdayî ye. Fînî bi Kalevalayê ve fêrî xwe bûne û ji xwe bawer kirine. Di nava gel de hişmendiya neteweyî bi kalevala ve hişyar bûye.”(*Çobanoğlu Ö, r. 121)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ji bilî wê, destana herî kevin *Gilgamiş* a Mezopotamyayê hîn jî di rojeva dinyayê da cihê xwe digire. Dîsa Îlyada û Odysseia"ya Yewnanan ku (B.Z) di sedsala 11-12 an da pêk hatiye û mînakek pir girîng û dîrokî ye. Ji bilî wan, dema ku mirov qala gelê Faris dike, berî her tiştî destana *Şehname* ya Fîrdevsî tê bîra mirov. Destana Şehname jî di dinyayê da gelekî bi nav û deng e. (Borak M. 2022 r. 4) Ji bo gelê Tirk, destan *Köroğlu*, ku li hember Mîrê Boliyê berxewdanek mêrxasî dike pir girîng e. Dîsa lehengiya*Dadaloğlu* û çîrvanokên *Dede Korkut masalları* di çanda Tirkanda girîngin. Her wekî wê,*Mahabharata* Hîndûyan, *Îgor*a Rûsan, *La Cîd* a Spanyolan tev da nîşaneya kesayet, hebûn û bingeha wan gelan in. Ew destanan bêguman ji bo wan gelan şûna serfirazî û şanaziyê ne. Ew destanan ruh û giyana wan gelan ji hemû dinyayê re didin xuyakirin.

Di vê derbarê da ji bo Kurdan jî destana Kawayê Hesinkar yê ku li hember Dehaqê xwînmij têdikoşe û Dehaqê zalim dikuje pir watedar e. Lewra Kawayê Hesinkar,yekîtiya Kurdan pêk tîne. Ev destan di pêvajoya azadiya Kurdan da kêrta kêvir e. Destana newrozê, ya Kawayê Hesinkar ji bo tekoşîna Kurdan ya îroyîn jî mînakek pir pîroz e. Girêdayî wê destanê,serhildêrê kela Amedê Mazlûm Doxan jî wekî Kawa yê dema dawîn "*Kawa yê Hemdem*" tê bi nava kirin.Îro Kurdên ku qet naçin tu şahî û cejnan jî, roja newrozê teqez beşdarî pîrozbahiyên newrozê dibin.

Dîsa destana Xano yê Çengzêrîn, ango ya destana Kela Dimdimê model û mînakek pir hêjaye. Li hember dagirkeran ceng û têkoşîna Xanoyê Çengzêrîn, bi taybetî jî berxedana diya wî û xanima wî di hukum û şexsiyeta jina Kurd da mînakên şanaz û serbilindiyê ne. Wekî destanên gel, ev hemû mînakan nîşan didin ku nirxên folklorê ji bo civakê dibin sembol û remza berxedan û rizgariyê. Wisa dixuye ku heke gel bi nirxên xwe bi baweriyên xwe xwedî derkeve, di wê astê, sînerjiyek pêk tê, ew sînerjî jî dibe hêzek mezin tu kes li hember nikare bisekine.

Ji ber hikariya folklorê ya li ser gelan, nêzîkatiya dewletên emperyal jîli ser nirxên folklorê zêdetir dibe. Bi gelemperî ji salên 1800 şûnda dewletên emperyal, bi armanca nasandinaçand û kesayetagelan, misyonerên xwe şandine welatên paş ve mayî. Ji bo ku armancên xwe yên mêtingerî pêk bînin, li wan welatan lêgerîn û lêkolîn bi destên misyonerên xwe dane çêkirin. (Borak M. 2020, r. 33) Lê li gel wan armancên qilêr, ji wan misyoneran hinek bi niyeta qenc tevgerîne û ji bo wan gelan xebatên hêja jî bi kar anîne. (Borak M. 2020, r. 33)

Nivîskar Firat Cewherî, di pêşgotina pirtûka bi navê, Kultur û Edebiyata Devkî ya Şerefxan Cizîrî da wiha dibêje: "*Loma jî riya kîjan gerok, misyoner an jî konsolosî bi Kurdistanê ketibe, li ser kurdan, li ser zimanê wan, li ser folklora wan, li ser kultira wan li ser edebiyata wan ya devkî an bi zimanê xwe, an bi zimanê kurdî tiştin nivîsandine. Ew canik û camêrên ha hem xwestine ji windabûna edebiyata kurdî ya devkî re bibin asteng, hem jî hewl dane ku ruhiyeta kurdan, dewlemendiya dîroka wan, kevinbûna zimanê wan û rabûn û rûniştina wan bi riya edebiyata wan ya devkî hîn bibin û nas bikin." (Cizirî Ş. 1999, r8)*

Di vê derbarê da Ramazan Pertev sînorên dewletên emperyal fireh dike û wiha pê ve diçe: *"Lewra hemû welatên çi totolîter, çi ne totalîter, li gor armancên xwe yên konjektorî folklor bi kar anîne. William S. Fox, vê yekê bi têgiha "polîtîkaya folklorê" pênase dike. Li gorî wî, ji Almanyaya Nazî û Rûsyaya Sovyetê bêtir, bikaranîna folklorê bi*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

armancên polîtîk li welatên mîna Fransa Îngilîstan û Amerîkayê jî berbelav e."(Pertev R. 2015, r. 31)

Di vê derbarê da ya balkêş ew e ku mixabin gelek caran rêveber û rayedarên civakan wekî dewletên emperyal girîngiyê nadin nirxên folklora civaka xwe.Wekî mînak li Bakûr di vê derbarê da xemsariyek sazî û dezgehên Kurdan li hember ziman û folklorê heye. Ew xebat zêdetir li ser milê şexsên pispor û dilxwazan tên meşandin. Ev yek kêmasî û xeletiyek pir girîng e.

Dema damezirandina dewleta Tirk da, rêveber û rayedarên Tirkan gelek rûmet dane nirxên xwe yên folklorîk. Ji ber ku wêdemê di nava gelê Tirk da hişmendiya Tirkbûnê, netewbûnê zêde tunebûye, rayedaran nirxên folklorê ji bo netewbûna gelê xwe wekî çareserî bi kar anîne. Ji bo wêyekê Komara Tirkiyeyê sala 1932 da bi navê *Malên Gel* saziyekavakiriye. Di demeke kurt da gelek şaxên *Malên Gel*li bajar û navçeyan, hetta li gundan jîhatine vekirin. Rayedarên dewletê ewqas girîngî dane wê saziyê ku butçeya wê ji ya wezartan jî zêdetir bûye. Bi wî awayî gelê ku hest û hişmendiya Tirkbûnê da pir qels bûne, di mêjiyê wan da hizra netewetiyê derketiye pêş.(BAŞGÖZ İ. 2011) (Her çiqas bi riya wê saziyê*Malên Gel* raman û hişmendiya Tirkbûnê pêş ve çûye jî, lê fikir û ramanek nijadperest û mêtînkerî jî hatiye dayîn. Taybetî bi riya şaxên xwe yên Kurdistanê jî li ser gelê Kurdan û zimanê kurdî bişavtin û asîmîlasyon jî bi karanîne.) Ji bilî wê di heman katê da ji bo xebatên ziman jî saziya TDK (Saziya Zimanê Tirk) avakirine. Bi taybetî xebatên TDKyê pir girîng in. Bi saya xebatên TDK yê hem zimanê xwe dane zelalkirin, hem jî li ser nirxên folklorîk lêgerîn û lêkolîn kirine. Di wan deman da TDK yê ji bo berhevkirina biwêj û gotinên pêşiyan, serê her gotinekê wekî heqdest pere dane lêkolînvanan.

Ji bilî wê, rist û xizmeta folklorê belkê ya pêşîn û herî girîng, parastin û pêşvebirina ziman e. Me li jor jî got, zimanên ku nebûne zimanên fermî û neketine nava nivîsê, parastina wan zêdetir bi rêya folklorê pêk hatine. Zimanên bindest, bi saya folklorê firsenda jiyanê dîtine. Bêguman,ziman bingeha ruhê neteweyebûnê yajêneger û û pîroz e. Lewra ziman ji hêla zanyaran ve wekî aqilê duyemîn tê pejirandin. Ji bo yekitiya netewayan ziman ruhekî hevpar diafirîne. Bêguman windabûna ziman, windabûna neteweyê bi xwe ye. Zimanê kurdî jî yek ji wan zimanan e. Di pêşgotina Çîrokên Biwêjan da ev rewş bi kurtasî wiha hatiye zimên. *"Ji ber rewşa Kurdistanê ya stratejîk û jeopolîtîk Kurdan zêde firsend û derfetên perwerdehî, nivîsîn û arşîvkirinê nedîtine. Her tiştên xwe bi rêya zimanê xwe dane der. Ziman ji bo Kurdan bûye gayê dîz kulozan. Hemû derd û kulên xwe, serpêhatî û karpêkên xwe li ser zimên bar kirine."*(Borak M. 2018, r. 9)

Dîsa zimanzan û nivîskar Bahoz Baran, di hevpeyvînekê da girîngiya ziman û rista folklorê ya li ser netewayan wiha bi hev re têkildar kiriye û gotiye: "*Folklornas dibêjin, folklor ruhê miletan e, em dikarin berê gotinê fireh bikin û bibêjin, ziman, bîrdozîya miletan e û folklor jî stûna wî zimanî ye. Bîr û bawerî û raman û xeyalsazîya miletekî di folklora wî miletî da dihewe. Îcar wextê gotin tê ser folkora Kurdan, em dibînin ku gur û geş û zengîn e ku mirov pir rehetî dikare gelek taybetîyên miletî di nava wê gencîneyê da bibîne.*" (Baran B. 2018, hevpeyvîn)

Hêz û zengîniya zimanê kurdî ji bingeha zargotina dewlemend tê. Ji ber wê me got, peywira parastina zimên bi taybetî bi saya çanda devkî, ango bi zargotinê pêk tê. Tekin Çîftçî di vê derbarê da wiha dibêje. *"Çanda devkî tenê beşek ji folklorê ye, lê ew ya*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

herî girîng e. Hemî çalakiyên zimanî û hestyarî di nava çanda devkî da jîn dibin.“ (Çiftçi T. 2012, têz a lîsansa bilind)

Rol û rista folklorê yek jî ya pêkanîna yekîtiya civakê ye. Wekî ku di bandora destana Fîniyan Kalewalayê da jî me anî zimên, em dikarin bibêjin ku folklor bi berhem û nirxên xwe ve di nava civakê da rêgezek hevpar û kolektîf pêk tîne. Bi gotinek din ev xizmetan, di heman demê da xîm û bingeha yekîtî û netewebûnê jî diafirînin. Di civaka Kurdan da zêdetir jî bi saya dengbêjan civakê heman stran,heman çîrok guhdarî kirine, heman pêkenokankenîne, di heman govendê da destê hev girtine, bi wî awayîdi nava civakê da yekbûnek, yekîtiyekçê bûye. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku hêmanên folklorê civak nêzî hev kiriye û yekîtiya wan xurtkiriye.

Bandora folklorê yek jî afirandin û pêşve birina çandek hevpar e. Civakbi saya folklorê dibe xwedî hişmendî ûçandek hevbeş. Ew çand û hişmendiya hevpar jî bi awayekî xwezayî mantalîteyek yekgirtî derdixepêş. Piştîewqas salan bi heman nirxan ve jiyîn û bi heman edet û toreyan ve hasilbûncivakê nêzî hev dike. Rewş tê wê astê ku li hember bûyeran,civak heman tawir û heman bertekê nîşandide.. Di nava gel da nirxên camêrî, namerdî, mêrxasî û qelsmêrî, nirxên namûs û bênamûsiyê, nirxên îxanet û berxwedanê, yên dostî û merivatiyê û her wekî din tev da dişibin hev. Her civak li gor wan nirxên hevpar, dibe xwedî giyanek xweser,teşe digire û li gor wê çandê, li gor wêmantelîteyêareste dibe.

Ji bo wê çanda hevpar mirov dikare gelek mînakan bide: Di sala 1930 da bi hezaran Ermen ji ber qetlîama dewleta Tirk li Dêrsimê xwe diavêjin ber bextê Seyîd Riza, Seyîd Riza wan diparêze. Wexta kurayedarên dewleta Tirk wan ji wî dixazin, Seyîd Riza bersîvek ku li gor çand û kesayeta Kurdan dide ji wan û ji wan re dibêje: *“Em, teyrên birîndar teslîm nakin.”*Ew helwesta Seyîd Riza mînaka mêranî û camêrî û hewldana Kurdan ya xwedîderketina mazlûm û ketiyan nîşanî me dide. Pêwîst e ev bersîv bi hişmendiya wê çanda Kurdan ve bê şirovekirin.Lewra di civaka Kurdan da çandek pir meşûr e ku her kî dibe bila bibe, dema ku kesek an jî komek xwe bavêje ber bextê malekê, axa û mîrekî, ew mal, ew axa û mîr, mirina xwe jî didin ber çavên xwe, lê wan diparêzin û nadin destên dijminên wan.

Her wekî wê piştî rûxandina Komara Mehabadê, dema Mele Mistefa Barzaniyê nemir, hewl dide ku bi tevî pêşmergeyên xwe derbasî welatê Sovyetê bibe, li bakûrê Kurdistanê li bajarê Agiriyê, di gundê Qewtxesizê da bûyerek pêk tê. Ji ber ku Agirî di sînorê Kurdistana Rojhilad da ye, li gundê Qewtxesizê da bi navê Seyîd Ûsiv seyîdek bi nav û deng bi awayekî dizî alîkariya Mele Mistefa Barzanî û pêşmergayên wî dike. Çawa dibe, leşkerên dewleta Tirk wê yekê dihesin û tên gundê Qewtxesizê. Li gund Seyîd Ûsivê kal derdixin meydana gund. Serbazê leşkeran di rûdana wî ya spî da digire û wî bi erdê re kaş dike û di nava gundiyan da uzra wî dişkêne. (Jinên gund dema wê yekê dibînin, rûyê xwe vedirûn û pişta xwe pê ve dikin ku Seyîd Ûsivê pîroz di wî halî da nebînin.) Lê heta piştî şêst salî bi şûnda jî dema qîza Seyîd Ûsiv Zelîxan Şêxzade li ser nimêjê dua dike, her roj wiha dibêje. *“Fatiha ji ruhê reza Resûlê Ekrem ra, ji Ehmedê Xanî ra û ji Mele Mistefayê Barzanî ra.”* Ev helwest, ev hest,ji me re dide xuyandin ku her çiqasî dewletan destên Kurdan ji hev qetandibin jî, her çiqas ew bi çar parçeyan parçekiribin jî, her çiqasî wan qet hevdu nedîtibin jî lê hêza ruhê netewebûnê, hêza çanda hevpar û mirazên wan yên yekîtiyê,wan nêzî hev dike û nahêle agirê doza dilê wan bête vemirandin. (Borak M. 2022, r. 7)

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Dîsa hikariyek din ya folklorê, xizmeta medyaya civakê ye. Di nava Kurdan da bi riya folklorê lê zêdetir jî bi riya beşa wê ya dengbêjiyê vekarê medyayê û ya agahdariya civakê hatiye pêk anîn. Bi saya dengbêjan dîrok û çanda Kurdan, bûyer û qewmînên herêman, pêş ve çûnên bi her awayî li her hêla welat hatine belavkirin. Ew bûyerên dîrokî, heta nifşên pêşerojê hatine gîhandin. Dengbêjan ji ber ku di kilam û stranên xwe da bûyerên dîrokî anîne ziman, gund bi gund, bajar bi bajar ew gerandine û nifş bi nifş domandine, bûne bîra civakê. Ew bûyerên dîrokî carinan bi gotin, carinan bi bi awayê stranan ve li her derê welat belav kirine. Bi vî awayî dengbêjanli gel rista arşîvê rista medyayê jî, pêdiviya nûçe û ragîhandina civakê jî bi cih anîne.

Di vê derbarê da Hayrattîn Ekîncî di xebata xwe ya li ser dengbêjan da wiha dibêje: *"Dengbêjên Kurdan, li ser hemî bûyerên takekesî, civakî û siyasî kilam û destan afirandine. Ji ber vê yekê, stranên dengbêjan arşîvên Kurdan in. Bi xêra kilaman haya Kurdên herêmên cihê cihê ji hev çêbûye. Ji vî aliyî ve kilama Kurdî, peywira medyayê jî bi cih aniye."*(Ekinci H. 2012, r.91)

Vatiniyekfolklorê jî em dikarin bibêjin yaarşîvkirina bîr û boçînên gel e. Di vê xalê da jî dîsa zêdetir rol û rista dengbêjan derdikeve pêş me. Dengbêjan ji ber ku serpêhatiyên civakê yên girîng û dîrokî anîne zimên, di heman demê da karê arşîvê jî pêk anîne.Di wî karî da rista balkêş teşa û awayê stranên dengbêjên e. Lewra di stranên dengbêjiyê da bûyer bi awayê romanan, an jî bi awayê fîlmên sînemayan tên gotin. Ji ber wî awayî ew bûyer û pêş veçûn bi hêsanî ketine nav bîr û arşîva gel. Wekî mînak: Kilama Evdalê Zeynikê ya "*Wey Xozanê, wey Xozanê*" kuşerêXozana herêma Edeneyêtîne zimên, ji ber wê awayê gotina wekî fîlm, wekî romanê,bala nifşên nû jî dikişîne û di mêjiyê wan da dibe arşîv. Çimkî nifşên nû, dema wê kilamê guhdarî dikin, hîn dibinku Kor Husaeyîn paşa çawa çûye ji bo Osmaniyan li Xozanê şer kiriye û li wir çawa çûyeba dilovanê xwe. Bi kurtasî zêdetir bi saya nirxên folklorê arşîvek ji dîrok û pêşveçûnên gel hatiye çêkirin.

Her wekî wê dîsa ristek folklorê ya li hember zilm û zorê, li hember serdestiyê, li hember neyîniyan heye. Bi taybetî jî folklorzanên marksîst, peywira folklorê ya protestoyê derdixînên pêş. Ev nirxandin jî di cih da tê xuyan. Lewra folklor tim li ser hîmê erêniyê ye û li gor daxwaz û mirazên gel e. Wekî mînak: Di destan, çîrvanok û çîrçîrokan da lehnengên çîrokan, dêwên heftserî dikujin, xezîneyên zaliman li feqîr û hejaran belav dikin, nirx û namûsa gelan diparêzin, mirazan bi hevdu didin şad kirin, xayîn û zaliman didin ceza kirin, avên çeman yên miçiqî li ser gundan û bajaran da diherikînin û zilmkar bavên wan bin jî, ji ser text dadixin jêr û kesên biyanî, lê qenc û dirust û adil li şûna wan datînin ser text. Helbet ev destan û çîrvanokan, li ser gelan bandoreke diafirînin û roj tê wan radikin ser piyan.

Maksîm Gorkî di derbarê rista folklorê ya li ser civakê da çespandinek wiha dike: *"Folklor, tîp û modelên mêrên mêrxwas, zana, leheng, hestyar, kûr û bedew diafirîne. Bi folklorê ve civakek kedkar û adil û dadmend tê avakirin."*(Zhokova E. M. 1982)

Ristek folklorê jî parastina nirxên gelan li hember bişavtin û asîmîlasyonê heye. Emdikarin bibêjin ku heke gelên bindest xwedî folklorek bi hêz, xurt û zengîn bin, dikarin li hember her cure zordariyê hebûna xwe bidomînin. Dikarin li gel wê asîmîlasyon û qirkirinê li ber xwe bidin. Belkê jî di vê derbarê da mînaka herî balkêş ya

gelê Kurd e. Lewra gelê kurd, ji ber ku di navbera dewletên mezin yên wekî împaratoriya Osmanî, dewleta Îranê û Ereban da maye, zêde firsenda felat û xweseriyê nedîtiye. Wan dewletan, li ser Kurdan asîmîlasyon û bişavtinek pir giran meşandine. Lê nikaribûne, gelê Kurd ji holê rakin. Bêguman li ku dibe bila bibe, ji holê rakirina reng û deng û cudahiyên gelan û qedexekirina zimanan, qetlîamek civakî ye û kuştina mirovahiyê bi xwe ye. Lê mixabin ew bişaftin hîn jî didome. Li Kurdistanê zimanê Kurdan gelek caran hatiye qedexekirin. Kurdên ku bi kurdî xeberdane bi hepsê û bi cezayê pereyan ve hatine cezakirin.Zimanê dengbêjan hatiye jêkirin, di gewriya wan da neft hatiye berdan, lê li gel ewqas neyîniyan, gelê Kurd dîsa jî çand, kultura xwe parastiye. Wekî mînak, li bakûrê Kurdistanê ji dema Osmaniyan bigire heta dema Komara Tirk ji bo ku Kurdan di nava xwe da bihelînin û bibişêvin, gelek caran destên hinek Kurdan ji Kurdistanê qetandine, mişextî kirine û sirgûnî nava erd û axa xwe ya Anatoliyê kirine. Li şûna wan, jî Tirk û Ereb û Azerî û koçberên Kafkasyayê û her wekî din anîne Kurdistanê di nava Kurdan da bi cî kirine. Lê pir balkêş e ku yên hatine nava Kurdan, guherîne bûne Kurd, lê Kurdên ku çûne Anatoliyê di nava wan da Kurdiya xwe winda nekirine; ziman û çanada xwe berdewam kirine û heta roja îro jî dîsa Kurd mane. Wekî mînak, Kurdên Anatoliya Navîn, ên li Qeyserî, Qonya, Enqerê, Qirşehir û herwekî din. ku 100 sal berê, 250 sal berê, an jî 500 sal berî niha sirgûnî nava Tirkan kirine, hîn jî neheliyane. Hîn jî di nava malen xwe da bi zimanê Kurdî dipeyivin. Gelek ciwanên wan di nava têkoşîna neteweya gelê Kurd da, di nava sazî û dezgehên Kurdan da cihê xwe digirin û têdikoşin. Ev yek xaleke mucîzevî ye, girîng e û bi serê xwe hêjayî lêkolînê ye.

Her wekî wê, asîmilasyon û bişavtin bi ewqasî ve jî nemaye, li gorî lêgerîn û lêkolînên NÇM (Navenda Çanda Mezopotamya) sê hezar (3000) kilam û stranên kurdî wekî yên tirkî hatine destnîşan kirin. (Yildiz Y. 1998) Dîsa di pêşbaziyên dinyayê da koma govendên Kurdan ku di cîhanê da dereceyên bilind bidestdixin, lê wekî nirx û malên Tirkan têne diyarkirin. Mirov dikare bi sedan mînakên bi vî awayî destnîşan bike.Hîn îro jî li hember dehan milyonan gelê Kurd bêrêziyek mezin tê kirin û di parlementoya Dewleta Tirkiyê da wexta ku mebûsên Kurd bi zimanê Kurdî diaxêvin, di belgeyên fermî da wekî: “Bi *zimanekî ku nayê fêmkirinhate axaftin.*” tê qeydkirin. Sed car mixabin ku ji ber wan stratejî û taktîkên bişavtin û asîmîlasyonê îro zarokên Kurdan, bi taybetî jî li bakûr zimanê dayîka xwe zêde napeyivin. Heke bi vî awayî berdewam bike, di 20 an jî 30 salên pêşîn da, zimanê kurdî li bakûr dê bi mirinê ve rû bi rû bimîne.

Dîsa taybetmendî û ristek folklorê jî têkildariya wê ya gerdûnî û navnetewî ye. Bêguman li gel hinek cudahiyên xweser, bi gelemperî aqil, mantiq û pêdiviyên mirovahiyê li her derên dinyayê dişibînin hev.Çimkî di navbera çandên gelên cîran da nirxên folklorêbûnesedema dan û standina çand, tecrube û deskeftinan. Bi wî awayî gelên cuda cuda ji hev haydar bûneû ji hev sûdewar bûne. Wê yekê jî rêya afirandinên nû li pêşiya civakan vekiriye.Sedema şibandina çand û edetên gelan ev têkiliyên wan in. Bi taybetî gotinên pêşiyan ji ber ku gotinên gerdûnî ne vê yekê bêhtir derdixin pêş.Digotinan da mantiq eynî ye, lê cudahiya tarz û teşe çêdibe.Gotinên wekî: “*Mala derewîna şewitiye, kesî jê bawer nekiriye.Dizî dizî ye, çi hêkek, çi gamêşek. Bi xweziya, dest nagihêje keziya.Merivê qenc ji kîsê Xwedê, merivê xirab ji kîsê xwe dixwe.”*û hwd.

Ji bilî wan têkilî û bandoran, ristek folklorê jî li ser wêje û edebiyatê heye. Bi salan gengeşiya têkiliya folklor û edebiyatê hatiye kirin, lê ya ku tê pejirandin ew e ku berê têkilî û bandora folklorê li ser edebiyatê pêk hatiye. Lewra edebiyat piştî folklorê bi

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

hezaran salan şûn da derketiye holê. Ji ber wê jî edebiyatê bingeha xwe ji gelek hêlan ve ji nirxên folklorê girtiye. Helbet bandora edebiyatê jî li ser folklorê çêbûye. Lê di encamê da huner pêş ve çûye. Huner, estetîk û bedewiya folklorê hevpar û kolektîf e, lê ya edebiyatê şexsî ye. Kî nivîsî ye kifş e. Taybetmendiyek folklorê jî ew e ku jêderka folklorê pir zengîn û pir fireh e. Belkê ya ji wê girîngtir jî ew e ku folklor, ango hunera gelêrî, tim bûye remz û sembola kesayeta neteweyan û tim taybetmendiya wan nîşanî cîhanê daye, lê edebiyat zêde ne hêmanek wisa ye.

Ji ber wan sedemên jorîn, salên dawîn da girîngiya folklorê, ji gelek hêlan ve derketiye pêş. Nirxên folklorê bi taybetî jî yên epîk, mîtolojîk, yên çîrvanokan bi awayekî fantastîk be jî di nava huner da bi taybetî jî sînameyê da derdikeve pêş. Êdî nivîskar,zêdetir li ser wan mijarên folklorê pirtûkan dinivîsin. Di perwerdehiya zarokan da jî nirxên çandî û dîrokî ji zêdetir cih digirin.Wekî mînak fîlma *"Troya",* rêzefîlma "*Game Of Thrones*" (Fendên Ji Bo Tac û Text) û filmên "*Mîrê Gustîlkan*" fîlmên li ser Vîkîngan (Vikings) û her wekî din, bingeha xwe ji wan mîtolojiyan digirin. Ev berhem wekîfîlm an jî rêzefîlm di tv yan da bi mesrefên milyon dolaran ve tên çêkirin û bi salan tên temaşekirin.

Di derbarê girîngiya folklorê ya li ser zarokan, gotina zanyarê cîhanê Einstein pir balkêş e. Einstein ji ber ku di dinyayê da wekî mirovê pir biaqil tê zanîn, di konferansekê da dayikan jê pirs kirine û gotine: "Ji bo ku zarokên me hîn jîrtir bibin, em dikarin çi bikin? Hûn ji me re çi pêşniyazê dikin?" Bersîva Einstein pir balkkêş e, dibêje: *"Bila zêde zêde çîrvanokan (çîrçîrokan) bixwînin."* Lewra ji bo zarokan, xeyalên di nava çîrvanokan da yên bêsînor, asoya mêjiyê mirovan firehtir dikin, xeyal dibin hosteyên pêşveçûnê û dibin avakarên paşerojê. Karl Marks hîn pêş ve diçe û dibêje: *"Hêza xeyalên folklorê, ji bo pêşveçûna mirovahiyê xelatek mezin e."*(Zhokova E. M. 1982)

Bi kurtasî em dikarin bibêjin: Hikariya folklorê di tenzîmkirina sîstemawelatan bigire, heta arestekirina qeyde û qanûnên civakê, ji wir bigire heta edet, tore, fehm û feraseta însanan, li ser afirandina huner û estetîkê ûli ser gelek mijaran heye. Ji ber van hemû hêmanan, divê folklor bi awayekî cidî bê pêşwazî kirin û rûmeta layîq jê re bê nîşandin.

Di vê mijarê da wekî gotina dawî em dikarin vê bibêjin: Ji ber taybetmendiya wê, bersîva gelek pirsan di kelepûrên folklorê da veşartî ye. Di nava Kurdan da gelo çima birakujî û îxanet zêde ye? Çima Kurdan dewletek rêk û pêk avanekirine? Ew gelê Kurd ê ku di dîrokê da bûye afrînerê gelek pêşketinan, çima îro ew qas paş ve maye? Zanyar dikarin sedama gelek pirsan di nava hûrgiliyên folklorê da peyda bikin.

Wekî neteweyek ku di nava pêvajoya vejîn û rizgariyê da, divê Kurd jî girîngiya nirxên folklorê derxînin pêş. Pêwîst e li gel pisporên folklorê, civaknas, zimanzan, dîrokzan û beşên zanistê yên din jî bibin alîkar û bi her awayî xebatan pêk bînin. Pêwîst e bi wî awayî nifşên nû jî hêdî hêdî bi çanda xwe û bi civaka xwe ve bêhtir germ bibin. Lê berî wê hewce ye rêveber û pêşengên civakê bi nirxên gelê xwe xwedî derkevin. Firîda Hecî Cewarî (Ku bi xwe keça folklorzanê mezin, Heciyê Cindî yê) di pirtûka ku li ser jiyana bavê xwe nivisiye de wiha dibêje: "Pirtûka Folklora Kurmanca, karekî pir giranbiha ye. Îspatiyeke balkêş e. Paşwextiyê, li Komara Mahabadê, Qazî Mihemedê nemir, pirtûka Folklora Kurmanca dabû destê xwe, bilind kiribû û gotibû: "*Aha ev e qurana me."*(Cewarî F. 2008, r. 49) Ew helwesta ku Qazî Mihemedê nemir ji bo folklora Kurd di sala 1946 da daye nîşandan, divê ji serok û rêberên niha ra bibe mînak.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Her çiqas hemû dinya bipejirîne ku folklora Kurdan pir zengin e jî lê ew kelepûr hîn jî baş nehatiye berhevkirin. Divê berê em destê xwe sivik bigirin, wan nirxên xwe baş berhev bikin. Ya elzem û lezgîn ev e. Ev yek di heman demê da peywira neteweparêziyê ye jî. Loma ez tim dibêjim. *"Dem, ji bo me bûye hût."* Folklorzan, dîroknas zanyarê hêja Prof. Dr. Celîlê Celîl jî dibêje: *"Bi rastî jî roj tune ku zargotina Kurdan a tradîsyonî tiştekî bi qîmet winda neke."* (Celîl C. 2018, r. 23) Em çiqasî destê xwe zû bigirin, em ê gencîneya xwe ewqasî xurt bikin. Helbet îro sinifandin û nirxandina berhemên zargotinê qels e, lê ew yek dû re jî dikare pêk bê.Bêguman roj bê dê baştir bê fêmkirin jênegeriya vê mijarê. Dibe ku piştî sîh, çil salî bi şûn da em desten xweli çoka xwe bixin, lê dîrok dê ji me ra bibêje: "Mîro borî!"

C) DI CIVAKA KURDAN DA CIHÊ FOLKLORÊ

Wekî ku her kes dipejirîne, dewlemendiya folklora gelê Kurd di cîhanê da jî cihkî pir girîng û balkêş digire. Heçî pisporên ku çand û folklora Kurdan naskirine, bûne hewaskar û hejmekarê zengîniya wê.

Zanyarê Ûris Bazil Nikitin folklora kurdî wiha dinirxîne. *"Ya ku herî zêde bala lêkolînvanan kişandiye, zehf zêde zengînbûna folklora kurdî ye."*(Bazil N. 2004, r. 445)

Celadet Alî Bedirxan ji bo pirtûka Memê Alan ya Roger Lescot dibêje, *"Folklora kurdan ew çend mezin û fireh e ko em pê dikarin îftixar bikin û di nava xelkê de serfiraz bigerin. Di folklora me de, bê şik şaheser Memê Alan e. Memê Alan malê miletekî Ewropayî bûya, Xwedê dizane di heqê wê de heta niha çend cild kitêb dihatibûne nivîsandin. Me kurdan ew çend guh nedayê. Şair û rêberê me ê mezin Ehmedê Xanî berî sêsed salî bi qîmeta vê destançîrokê hesiya û rabû li ser hîmê Memê Alan kitêba xwe a mezin û abadîn Mem û Zîn anî wicûdê."*Lescot R. 1997)

Li Kurdistanê di şevên dirêj yên zivistanan da, di dîwanên axa û began da dengbêjan stran hesilandine,qewlikbêjan qewlik gotine, alim û melayan, li ser ilm û îrfanê suhbet kirine. Di wan ode û dîwanên gundan da bi wî awayî feraseta civakê kemilandine.Xemên wan belavkirine û xeyalên wan coşandine.

Frederîk Engels vê rewşê bi vî awayî tîne zimên. *"Gundiyê ku êvarê bi awayekî jihaldeketî, ji karê xwe vedigere malê, zargotin kêfa wî tîne cih. Gelek caran bi saya çîrokên folklorîk mala karkerekî, wekîya axa û began dibe qesreke zêrînî û jina wî jî dibe keybanûyeke li ser text."* (Zhokova E. M. 1982)

Dema ku yek qala folklora Kurdan bike bêgav e ku qala dengbêjî û jina Kurd û rola wan ya li ser civakê bike. Heke berê em dengbêjiyê hildin dest, divê em bizanibin ku dengbêjî di folklora Kurdan da dayîka çanda devkî ye. Dengbêjan gotine, lê tim rastiya civakê gotine. Li Kurdistanê çi hebe, çi qewimî be, ew hasilandine û bi awayekî estetîk anîne ziman.Dengbêjan civak ronî kirine.Dengbêj bûne mamosteyên gel, bûne hostayên zimanê kurdî.Dengbêj, him afirîner, him îcrakar, him jî pispor û şopgerên çand û wêjeya devkî ne. Jixwe peyva dengbêj jî ne tenê di wateya muzîkê da ye. Peyvek hevedudanî ye û ji newayê ji muzîkê zêdetir "bêj" ango "gotin" ê derdixîne pêş.

Hayrettin Ekinci ji bo mêjûya dengbêjiyê dibêje: *"Rabirdûya dengbêjiyê di Sumeriyan de dest pê dike, bi Gutî, Qasît, Mîtanî û Medan didome, heta ku tê roja me di nava Kurdan de dibe saziyeke bi hîm û qedîm."*(Ekinci H. 2012, r. 14)

Mîsyoner E. J. Larson jî Kurdan wekî *komeke poetîk* bi nava dike û dibêje: *"Ew evîndarên mezin ên stran û muzîkê ne."*(Gültekin M. 2013, r.50)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Di hêla muzîka Kurdî da jî rista dengbêjiyê gelekî girîng e. Lewra dengbêjî, tenê muzîk an jî newayeke xweş e, ew di heman katê da opera ye, çîrok e, sînema ye kamera ye, roman e û dîrok e. Ew çîrokên muzîkalî ne. Xwedî naverokeke têr û tijî ne. Stranên Kurdî li ser hîmekî dîrokî hatine avakirin. Di naveroka wan da dîrok, serpêhatî, mêrxasî, îxanet, evîn û hesret heye. Dengbêj û çîrokbêjan ew mîrateya ku dewr hildane, li gor pêvajoya ku di nav da dijîn, moçik bi moçik neqişandine, parzûn kirine û ragihandine roja me.Ji ber wê yekê ye ku serdestan zimanê dengbêjan jê kirine û di gewriya wan da neft berdane xwarê.

Ji hêla din ve dema em pêvajoya çand û kultira civaka Kurdan dinêrin, dibînin ku dengbêj bûne sembola şan û şerafa mîr û begên Kurdan. Axa û begên Kurdan gelek caran bi dengbêjên xwe ve xwe pesinandine û ji nav û dengen wan hêz girtine. Her çiqas gelek caran dengbêj ji hêla mîr, axa û began ve hatibin fînansekirin jî, lê gelek caran dor hatiye ku dengbêjan ew axa û begên xwe jî rexne kirine. Hinek caran jî rê nîşanî wan dane û bi awayekî xwezahî bûne rêber û şêwirdarên axa û mîran. Di vê derbarê da helwesta şahê dengbêjan Evdalê Zeynikê, ya li hember Surmelî Memed Paşa helwest û rewşeke pir balkêş e. (Borak M. 2020, 32)

Di dîroka dengbêjan da Evdalê Zeynikê wekî mîrê dengbêjan hatiye pejirandin. Nivîskarê Tirk yê bi nav û deng Yaşar Kemal ku bi eslê xwe Kurd e, Evdalê Zeynikê wekî Homeros ê Kurdan bi nav kiriye û gotiye: “Evdalê Zeynikê bavê ramana min e.”(Uzun M. 1998)

Divê her kes bizane ku dengbêjî ji bo Kurdan***patentek*** e. Çimkî dengbêjî di qada navneteweyî da ji bo Kurdan taybetmendiyeke orjînal e. Ji bilî ya Kurdan di cîhanê da tu çandek şêweyek bi wî awayî tune ye. Azîn û formê dengbêjiyê şêweyek pir taybet û awarte ye. Divê Kurd rûmetê bidinê û ala dengbêjiyê di asoyên cîhanê da bilind bikin. Her çiqas wekî sazî nebe jî lê ya ku dilê mirov hênik dike îro gelek ciwanên Kurdan stranên dengbêjiyê dibêjin. Ji ber wê divê di her şerd û mercan da dengbêjî bê desteg kirin û bê xelatkirin. Wekî mînak li çar parçeyên Kurdistanê divê bi awayekî xweser û yekgirtî konferansên dengbêjiyê bêne lidarxistin û bi awayekî profesyonel mîhrîcanên dengbêjiyê bêne çêkirin.

Li cihê ku qala folklora kurdan û dengbêjiyê bê kirin, heke qala jina Kurd neyê kirin, ew pênase, ew mijar teqez wê kêm û qels bimîne. Lewra çawa dengbêjî bingeha zargotina Kurdan e, her wekî wê, jina Kurd jî bingeha dengbêjî û çanda Kurd e. Jina Kurdher dem bûye reng û dengê civaka Kurd. Bûye derdbêj, bûye dengbêj. Ji ber wê yekê jî jina Kurd bûye berdevkê çanda devkî.Ên ku bi xebatên zargotinê ra mijûl bûne, dawiya dawî rastiya jinê dîtine û pejirandine ku di navenda zargotina Kurdan da jina Kurd heye. Di her qadên jiyanê da şopa jinan dixuye. Lewra barê jiyanê herî zêde li ser pişta jinêye. Ji ber wê di gotina pêşiyan da dibêje: *“Barê dinê li mêr, barê mêr li jinê ye.”*Di şer da jî, di aştiyê da jî jin hem sedem in, hem jî encam in. Çimkî jin serkarê jiyanê bi xwe ne.

D) Di biwêj û gotinên pêşiyan da xuyandina kesayeta civakê

Hemû beşên zargotinê jî girîng in, lê ji van beşan ya herî zêde derdikeve pêş û rojane tê bi kar anîn, gotinên pêşiyan û biwêj in. Hema bigire her kes her roj biwêj û gotinên pêşiyan bi kar tîne. Çimkî însan bi gotinên pêşiyan ve hem gotinên xwe rengîn dike û dixemilîne hem jî argumanên xwe xurt dike. Gotinên pêşiyan ji bo doz û angaştan dibin şahid, dibin desteg. Ji ber ku gotinên kal û bavan in, bingehek wan, rastiyek

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەكولینێن كوردى

wanqedîm heye. Gotinên pêşiyan kurtencama tecrubeyên sedan salan in, tu kes derbarê rastiya wan da nakeve nava şik û gumanan,

Di nava gotinên pêşiyan da bi awayekî diyalektîk bingeh û jorgeha civakê xwe dide xuyandin. Ji hêla din ve gotinên pêşiyan ji ber ku bi aqilê piranî, bi aqilê hevbeş pêk hatine, gotinên rast û xurt in. Ne tenê xurt in, di heman demê da jî kurt in. Ji ber ku kurt in û hevdeng û gotinên bedew in, di aqilê mirov da bi hêsanî dimînin.

Di gotinên pêşiyan da kesayeta gel, adet û toreyên civakê, çanda eşîratiyê(Borak M. 2018*, r. 16*) xwe dide der. Derbarê îxanet û mêrxasiyê da, dirustbûn û sextekariyê da, bext û miraz da û her wekî wê, rewş û timtêla civakê radixin ber çavan. Bi kurt û kurmancî, di jiyanê da rewş çawa ye, di gotinên pêşiyan da jî wisa ye.

Gotinên pêşiyan, di heman demê da bi awayekî xwezayî awayê hilberînê û têkiliyên gel jî tînin zimên. Ji ber wê jî gotinên pêşiyan qeyde û qanûnên civakê ne. Loma jî zêdetir bi forma fermanî ve têne bi kar anîn. Gotinên pêşiyan bi wan hemî maharet û pêwendiyên xwe ve navbera nifşên pêşeroj û paşerojê digihîne hev.

Ji hêla din ve gotinên pêşiyan ne tenê li ser jiyan û têkiliya mirovan, di heman demê da li ser xwezayê (tebîetê) jî gelek çespandinan dikin. Rewşa hewayê, ya demsal û çandiniyê, pîvanên xwerin û vexwarinê, qeys û rêbazên exlaq, têkilî û timtêla erênî û neyînî nîşanî mirovan didin. Me li jor jî gotibû, taybetmendiyek gotinên pêşiyan jî ew e ku gotinên gerdûnî ne. Ango li her derên cîhanê, li her welatî û ji bo her netewewyê bi gelemperî derbasdar in.

Gotinênpêşiyan,ji bo ku tu di jiyanê da valahiyek nemîne, rewşa xwe dîsa bi gotinên pêşiyan ve nirxandinin. Ji ber wê di gotineke pêşiyan da dibêje: "*Pêşiyan ji paşiyan ra tiştek nehîştine.*" Hinek gotinên pêşiyan rewşa nakokiyên bûyeran daye ber çav û gotiye: "*Gotinê pêşiyan wekî zêr in, li erdê namînin, yek negire, yek digire.*" Dîsa ji bo rasteqînî û derbasdariya xwe dibêje: "*Gotinên pêşiyan betal nabin.*"

Gotinên li ser civaknasî û hişmendiya Kurdan.

Mîr gotî mîr be, cimaeta wî ne hêsîr be.
Tifaq çiya weldigerîne.
Alimek ji ber alemekê va ye.
Destê meriya ku nebe rêx, devê meriya nabe rûn.
Çovê êlê stûrtir e ji yê mîr.
Gotin ne xerab e, pir şîret ezab e.
Mirovê bê dijmin, mîna miryan e.

Gotinên di derbarê tendirustî, xwarin û vexwarinê da.

Sibehan parî, nîvro heta dikarî, êvaran dixwî, naxwî tu dizanî.
Taştê bi hûnkahî, şîv bi ronikayî.
Birçî rûnê, têr rabe.
Çar gulm av, beramberî (berdêlê) pariyek nan e.
Bila nan bi te bi şekir be, paşê bixwe.
Sibehan bixwe wekî mîran, nîvro mîna mîrê mîran, êvarê bi xwe wekî feqîran.
Bixwe sîr, sivê rabe mîna tîr.
Kê rûn xwar û av vewar ew mir, kê goşt xwar û av vexwar ewî bir.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Gotinên li ser mêranî û merdiya Kurdan.

An neke nericife, an dikî nericife.
Agirê dostan merivan naşewitîne.
Kê nîrê hevaltiyê xwar kir, stuyê hevalê xwe kul kir.
Di navbera mêranî û qelsmêriyê da mûyek heye.
Mirîşka melisok, serê wê jêkiriye.
Hevalê te şekir be xilas neke.
Mirov kevira davêje birca belek, navêje sepeta rêxê.
Seriyê ku neêşe, kundirek jê çêtir e.

Gotinên materyalîst.

Dinya rast e, axret derew.
Dîn û îman nan e, dema ku nan tunebe, bende îro êzîdiye, sibê misliman e.
Derb ku hate serî, Xwdê wê çawa xelas bike.
Bêxweyî bî, bê Xweda yî.
Got, malo xwedê bi te ra, got, xwediyê min jî.
Tirsa mirinê, her kesî dajo ser dua kirinê.
Xewa aliman, çêtir e ji taetê sofiyan.
Heciyo, neçe hecê, solan neqetîne li rê, hec ew e ku tu lê.
Cila ji mala te ra gerek e, ji camiyê ra heram e.

Gotinên di derbarê jinan da.

Jin kela mêran e.
Barê dinê li mêr, barê mêr li jinê ye.
Şixulê jinan sîh û sisê ne, di nav da av û ardû belî ne.
Nefsa mêran yeke, ya jinan neh in. Mêr bi wê yekê nikarin, jin bi nehan dikarin.
(*Nefsa mêran yek e lê bê perde ye. Nefsa jinan heft in, lê heft perde li ber in.)*
Jin hene ji bo rêx û reşî, jin hene ji bo tevn û teşî, jin hene ji bo şahî û xweşî.
Jinê dil kir, mêrê xwe sil kir.
Mala ku jinê ava kir, Xwedê jî xera nake.
Jinê dil kir, dîwar qul kir.

Gotinên li ser ezîtî û rojane fikirandina Kurdan.

Evro bixwe, ji sibê ra Xwedê kerîm e.
Kera ku barê min ne lê be, ez nabêjim çoş.
Pişika îro ji kezeba sibê çêtir e. (Toraqa îro ji rûnê sibê çêtir e.)
Ceneta ku ez ne lêbim, bila ker tê da vegevizin.
Bila ne li agirê min be, bila ber agirê mala bavê min be.
Girara ku para min tev tunebe, bila serîkî sa di nav da be.
Karê ku ne ji min ra, wekî bayê serê min ra.

ÇAVKANÎ:

Bedran Hîkmet, *Teoriyên Folklorê*, Diyarbakir 2016 Weşanên Lîs r . 11
Bedran Hîkmet, *Teoriyên Folklorê*, Diyarbakir 2016 Weşanên Lîs r: 10
Basil Davidson, *Angola Kurtuluş* Mûcadelesî, Yöntem yayınları Stembol 1976
Huseyin Karataş, *Însanê Di Bin mêtîgeriyê da*, Peri Yayinlari istanbul 2010 r. 15

Mustafa Borak, *Çîrokên Biwêjan Cild VI. Weşanên J&J Ankara, 2020 r.* ***31*** Li Fînlandiyayê zimanê Fînî di
navabera % 30 de tê bikaranîn. (Viki pedia)
Çobanoğlu. Ö, *Halkbilimi Kurumları* r.121
Mustafa Borak*Folklor û Rista Wê Ya LiSser Civakê* (2022)Destana Fîrdevsîya bi navê Şehname, her
çiqasî lehengê wî, Rostemê Zal bi eslê xwe Kurd e jî lê dîsa jî wekî nirxek Farisan hatiye nîşandan.Fîrdevsî bi xwe jî di Şahnameyê da dibêje : "Rostem î Kurd."Ji bilî wî Sadî Şîrazî,
Dîrokvan Şerefxan Bitlîsî û Heciyê Cindî jî Rostemê Zal wekî Kurd qebûl dikin.
Mustafa Borak, *Çîrokên Biwêjan Cild VI. Weşanên J&J Ankara 2020 r. 33*
Misyonerên Îngilîz, Rûs, Îtalyan, Alman û her wekî din li ser folklora gelên paş ve mayî sekinîne, lêkolîn kirine û gelek caran zimanê wan gelan hînbûne. Ji wan misyonerên ku hatine Kurdistanê, hinekan bi awayekî dostane ew xebatên xwe pêş ve birine û li welatê xwe weşandine. Ew weşan, ew xebat, îro ji bo Kurdan bûne belgeyên girîng. Di vê derbarê da mîsyonerê herî hêja yê Îtalyan Maurizio Garzonî ye. Maurizio Garzonî li ser ziman û çanda Kurdî xebitiye û *"Gramera Kurdî"* ya Latînî amade kiriye. Ev gramer wekî gramera kurdî ya yekem tê zanîn. Maurizio Garzonî ev xebata xwe di sala 1787 an da li Romayê çap kiriye. Ji ber vê xebata wî ya hêja, Garzonî wekî "Bavê Kurdolojiyê" tê bi nav kirin.
Mustafa Borak, *Çîrokên Biwêjan Cild VI. Weşanên J&J Ankara 2020 r. 33*
Ji wan misyoneran yek jî Alexandra (Îskender) Jabaye. Jaba yê ku bi eslê xwe Polon e. Jaba, di salên 1860 da li Erzurumê konsolosiya Ûris kiriye. Bi alîkariya Mela Mahmûdê Bazîdî zimanê Kurdî hînbûye. Dû re jî bûye pisporê kurdolojiyê. Jaba, li ser eşîratên Kurdan, çîrokên kurdî, û serpêhatiyên Kurdan xebitiye. Ji bilî wê, li ser ziman û ferhenga kurdî jî xebat kirine. Ferhenga wî ya Kurdî-Fransî hatiye çapkirin. Li Rûsyayê arşîvek kurdî ya zengîn ku ji 54 beşan û 4017 rûpelan pêk tê amade kiriye. (Ev arşîva wî ji hêla rêveberên zanîngeha Artûkliyê ve hatiye kopîkirin û niha di arşîva wan de cih digira û li benda lêkolînê ye.)
Şerefxan Cizîrî *Kultur û Edebiyata Devkî*, weşanên nûdem, Stockholm 1999 r. 8
Ramazan Pertev,*Edebiyata Kurdî Ya Gelêrî* weşanên Avesta 2015, r. 31 Stembol
İlhan BAŞGÖZ * Tûrkiye'de Folklor Çalışmaları ve Milliyetçilik Turkish or Turkic Volume 6/3 Summer
2011, p.1535-1547 Turkey
Firîda Hecî Cewarî, Heciyê Cindî Jiyan û Kar Weşanên Lîs 2008, r. 49 Stembol
Mustafa Borak *Çîrokên Biwêjan* Cild I. Weşanên J&J Dîyarbakir. 2018
Bahoz Baran *Ötekilerin Gündemi*-hevpeyvin-Amed 2018
Tekin ÇİFÇİ *Di Kilamên Evînî yên Dengbêjan da Temaya Jinê* (Teza lîsansa bilind) Mêrdîn 2012
Mustafa Borak *Folklor û Rista Wê Ya LiSser Civakê 2022* Ev bûyer ji hêla qîza Zelîxan Şêxzadê ve hatiye
gotin ku niha li bajarê Îzmirê dijî.
Hayrettîn Ekîncî *Dengbêjî,* Weşanên J&J (Pêşgotin) 2013, r. 14 Stembol
E. M. Zhokova, Sovyet Tarih Ansîklopedisi 1982)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Mustafa Borak*Folklor û Rista Wê Ya Liser Civakê* (2022)Ji ber ku peyva "*çîrok*" tê wateya çend cureyên
cuda, ji bo beşa ku bi tirkî jê ra dibêjin "*masal*" di îngilizî de "*tale* an jî *fîsh story*" tê gotin. Me jî li
şuna wê peyvê peyva "çîrçîrok" bi kar anî. Lewra di vê peyvê de *çîrkirin,* ango wateya *têfirandin,*
nepixandin û lê zêdekirin heye. Ji ber wê yeke jî baştir cih digire. Lê di komxebata li Amedê da ya
sala 2019 da ji bo wê mijarê peyva ***çîrvanok*** hate pejirandin, ji ber wê ji vir bi şûn da ez ê jî têgiha *çîrvanok* ê bi kar bînim.

Bazil Nikitin, Kûrtler, Gendaş, Istanbul, 2004 s. 445

Memê Alan, Roger Lescot , Avesta 1997

NÇM (Navaenda Çanda Mezopotamya Şaxa Îzmirê (Ji notên konferansa Yilmaz Yildiz)

Hayrettîn Ekîncî Dengbêjî, Weşanên J&J (Pêşgotin) 2013, r. 91 Stembol

Mehmet Gûltekin, *Zargotina Kurdên Serhedê* Avesta, 2013 Stembol

Mustafa Borak, *Çîrokên Biwêjan Cild V. Weşanên J&J Ankara 2020 r. 32* Di Şerê Çûkûrovayê yê Xozanê de Evdalê Zeynikê, raxneyan li Surmelî Memed Paşa dike. Dixwaze ew şer berde û vegera mala xwe. Jixwe balkêşiyek jî ew e ku Surmelî Memed Paşa jî di wî şerî de dimire.

Mehmet Uzun, *Dengbêjlerim, 1998 Stembol*

Mustafa Borak, *Çîrokên Biwêjan Cild II. Weşanên J&J Ankara 2018) r. 16* Çanda eşîratiyê: Di vir da têgîha eşîratî ne ji bo wateya rêxistiniya civakî ye. Ne di wateya feraseta paşverû ye. Di nava gel da di wateya helwest û çanda merdî, mêranî, mêvanperwerî, mirovahî, soz û bext da hatiye bi
karanîn.

Celîlê Celîl, Zargotina Kurdên Sûrîyeyê Weşanên Doz, Stembol, 2018

FOLKLOR VE TUPLUM ÜZERİNDEKİ ETKİLERİ

Özet:

Folklorel birikim, toplumun aynası, kişilğliği ve ortak aklı olduğu için, toplumun gelişiminde ve örgütlenip değişmesinde de çok önemli roller üstlenir. Genel olarak ulusal kimliğin bir sembolü ve sonucu olarak görüldüğünden, 19. Yüz yılda hem miliyetçi Almanya, İtalya, İspanya gibi ülkelerin, hem de sosyalist blok olan Sovyet ve Çin gibi ülkelerin teoristyenleri toplumu etkilemek ve değiştirmek için folklorik değerleri çokkullanmışlardır. Nasılki Osmanlı imparatorluğunda birçok değişik din ve kültürel özelliklre mensub halklar "*Osmanlıcılık*" şemsiyesi alltında birleştirilipeldetutulmaya çalışılmışsa.Socvyetlerde de "*Sovyet*" şemsiyesi adına aynı şeyler yapılmıştır. Çünkü tpolumun kültürel genetik şifreleri folklorun ruhunda gizlidir. Bu devletler folklorun bu gücüne inandıklarından, folkloru çok önemsemişlerdir.

Emperyal devletler çeşitli geri kalmış ülkeleri tanımak ve onları uzun süreli elde tutabilmek için misyonerlerini o ülkelere göndermiş, onların folklorik değerlerini ve dillerini araştırmışlardır. Hatta ilk Kürt grameri de böylece (1787)yazılmıştır.

Türkiye cumhuriyetinin ilk yıllarında (1932) "Halk Evleri" kurularak ve burada folklorel değerler öne çıkarılarakçok güçsüz olan Türkleşme, uluslaşma süreci geliştirilmeye çalışılmış, bunda da başarılı olmuşlardır. Ama bu uygulamalar, başka halkları asimile etme, hakir gürme, hakaret etme ve dillerinin, kültürlerinin yasaklamalarla gerçekleştirilmiştir. Bu konudaki detaylar kürtçe sunumda ayrıntılarıyla verilmiştir.

Egemen ve emperyal devletler işgal ettikleri ülkelerde asimilasyon politikalarında da folklorik değerleri çok kullanmışlardır. Hatta Socyetler Birliğinde ve başka ülkelerde yer yer folklor kahramanlarının adları bile değiştirilip istenen başka kişilerin adları halklara benimsetilmeye çalışılmıştır. Şüphesiz folklor değerlerinin güçlü oluşu, asimilasyon ve eritme politikalarının da çoğu zaman boşa çıkmasını sağlamıştır.

Halkların baskıya, işgale ve asimilasyona karşı direnme ve mücadelelrinde de özellikle epik kahramanlık destanları önem kazanmışlardır. Örneğin Finlilerin Kalevala destanı Rusya nın Filandıya saldırısında direniş ve mücadelenin sembolü ve ilhamı olmuştur. Tabiki mezopotamyada Gılgamış, Yunanların İlyada ve Odesası, iran ın Şehnamesi, Türklerin Köroğlu ve Dadaloğlu destanları, Hinduların Mahabharatası, Rusların İgora sı, ispanyolların La Cid i gibi bir çok destan toplumun değişim ve gelişiminde ve ruhsal dünyalarında önemli roller oynamıştır.

Kürtlerde de Newroz bayramı olarak kutlanan, Kawa'nın zalim Dehaka baş kaldırışı ve Kürtleri newroz ateşinın etrafında birleştirmesi çok önemlidir. Yine Kela Dımdımê destanı halen de heyecan verebilecek derecede önem arz etmektedir.

Özellikle devlet kuramayıp üst düzeyde örgütlenemeyen halklar için folklor hem tarihsel olayların aktarımı, hem de çeşitli sözlü etkinliklerle arşiv görevi de görmüştür. Dengbêjlik bu konuda Kürtlerde çok önemlidir. Çünkü dengbêjlikte müzik genellikle bir araç tır, çünkü dengbêjlikte olaylar, detaylarıyla şiirsel olarak anlatılır ve bir kamera gibi, göz önüne serilir.

Marksist folklorcular, folklorun protesto özelliğini öne çıkarmış ve alkların destan kahramanlarının iyilik ve yiğitlik gibi olumlu özelliklerini örnek aldıklarını öne sürmüşlerdir.

Folklor,bir çok alanda yaptığı gibi, dilin gelişimine de doğrudan etki etmektedir. Çünkü dilin özü ve kelimelerin kaynağı konusunda folklorik değerler en önemli kaynaktırlar. Bütün bunlara bağlı olarak folklorla toplumlarda ortak bir kültür oluşturulmuştur. Bunun sonucunda da ortak bir zihniyet ve mantık ve ortak tavır sahibi olma gelişmiştir.Bu yüzden hangi halkın hangi olay karşısında ne gibi bir tavır göstereceği üç aşağı beş yukarı öngörülebilmektedir.

Folklor, bir çok etkinliği ile, özellikle dengbêjlik geleneğiyle aynı zamanda tarihsel bilgi, medya ve haber alma görevini de yerine getirmiştir.

Öte yandan folkloru sadece halkların tek başına ve sadece kendi öznel yaratımı olarak değerlendirmek te doğru değildir. Çünkü tarihsel gelişim sürecinde başta komşu halklar olmak üzere, dünyanın hemen hemen bütün halkları birbirlerine çok şey vermiş ve almışlardır. Özellikle atasözlerinde büyük bir mantık ve anlayış birliği vardır. Yine iyi bir inceleme ve araştırma yapıldığında görüleceği üzere, dinlerde de cennet, cehennem, iyilik, kötülük, sırat küprüsü, aydınlık ve karanlıkinanışları birbirine çok benzerlik göstermektedir.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكولينێن كوردى

AyrıcaKürt Folklorunda kadının rolü, başlı başına genişçe işlenmesi gereken bir konudur. Çünkü Kürt kadını, kültürel gelişim sürecinde acısıyla, tatlısıyla her zaman merkezi düzeyde bir roloynamıştır. Dünyanın her yerinde olduğu gibi Kürt kadını yaratımı ve emeğiyle bu alnın da anası ve baş rol oyuncusudur.

FOLKLORE AND ITS EFFECTS ON SOCIETY

Abstract:

Folklore plays a very important role in the development, organization and change of the society, as it is the mirror, personality and common mind of the society.. It is generally seen as a symbol and outcome of national identity.

That's why in the 19th century, it has been used a lot to influence and change both in nationalist countries such as Germany, Italy, Spain, and in countries such as the socialist Soviet and China.Because the cultural genetic codes of the society are hidden in the soul of folklore.These states also gave great importance to folklore because they believed in this.In the first years of the Turkish Republic (1932), "People's Houses (or Community Centre)" were established and the process of nationalization was tried to be improved.

Sovereign and imperial states used folkloric values a lot, especially in their assimilation policies in the countries they occupied. Especially heroic epics have gained great importance in the resistance and struggle of the peoples.For example, the Finnish Kalevala epic became the symbol and inspiration of resistance and struggle in Russia's attack.

There are many epics such as Gilgamesh, Greeks' Iliad and Odessa, Iran's Shahnameh, Turks' Köroğlu and Dadaloğlu epic, Hindus' Mahabharata, Russians' Igora, Spaniards' La Cid, and these epics have played an important role in the change and development of society.

The Newroz epic for the Kurds, Kawa's revolt against the cruel Dehak and the unification of the Kurds around the Newroz fire are very important.. Again, the epic of Kela Dımdımê is still exciting.

Folklore has served as an archive for people who cannot establish a state and cannot be organized at a high level, both by transferring historical events and by various oral activities.Dengbêjlik played a very important role among the Kurds in this regard.

Folklore also directly affects the development of language.Because folkloric values are the most important source about the essence of language and the source of words. As a result of all these, a common culture was formed with folklore.As a result, a common mentality and logic and a common attitude have developed.

In addition, the role of women in Kurdish Folklore is an issue that needs to be covered extensively.Because Kurdish women played a central role in cultural development. Like all over the world, Kurdish women are the mother of this field with their creation and labor.

Folklora Kurdî di Sedsala 21emîn de: Pirsgirêk û Derfet

Doç. Dr.Necat KESKİN
Beşa Ziman û Çanda Kurdî- Zanîngeha Mardin Artuklu-Enstîtuya Zimanên Zindî/ Turkîya

PUXTE:

Peyva "folk-lore"ê di dawiya nîveka sedsala 19emîn de ji aliyê William John Thoms ve hat bikaranîn û di demeke kurt de belav bû, ket nav lîteraturê de. Heta dawiya sedsalê li gelek welatên Ewropayê Komeleyên folklorê hatin avakirin û kovarên têkildarî xebatên folklorê hatin weşandin ku ya herî temendirêj *Folk-lore Society* û kovara wê *Folk-lore* e. Pê re kongreyên navnetewî hatin lidarxistin ku di wan kongreyan de çarçove, rêbaz, sehayên xebatê yên folklorê hatin nîqaşkirin. Peyva ku dihat wateya "zanîna gel" bi van çalakî û xebatan bû navê wê beşê jî ku li ser vê "zanîna gel" dixebite.

Bêguman geşedanên xebatên folklorê bi belavbûna hestên netewî ve jî rasterast girêdayî bûn û lewma jî rewşenbîrên gelên cuda yên Ewropa û cîhanê ku dixwestin "rihê" neteweyên xwe derbixin meydanê berê xwe dan xebatên folklorê û bi taybetî jî edebiyata gelêrî ya gelên xwe. Lewma jî piraniyên xebatên vê demê bêhtir li ser helbesta gelêrî û çîrok, efsane, destan, û mitolojiyê ne.

Bi geşbûna fikrên netewperwerî, di çarîka pêşî ya sedsala 20emîn de fikir û nivîsên derbarê folklor û girîngiya xebatên folklorê di nav rewşenbîrên Tirkan de jî peyda dibin û pê re xebatên têkildarî berhevkirinê jî dest pê dikin. Heman fikir û raman bi wan rewşenbîrên kurd re jî peyda dibin ku bi yên tirk re li Stenbolê di heman derdora siyasî û çandî de dijîn. Meseleya ziman û *vegera nav gel*, berhevkirina hêmanên çandî û gelêrî dihat nîqaşkirin. Lê derketina *Şerê Cihanê yê Yekemîn* van nîqaşan nîvco dihele heta dawiya şer. Piştî şer diqede û dewleta Osmanî têk diçe, rewşenbîrên kurdan careke din berê xwe didin xebatên siyasî û çandî. Mînaka herî zelal a berbiçav ya vê demê *Komeleya Pêşketinê ya Kurd*/Kurdistan (Kurdistan Tealî Cemiyetî) û Kovara *Jîn*ê ye.

Di nav rûpelên *Jîn*ê de em rastî mînakên pêşî yên xebatên edebiyata gelêrî dibin wek yên Kemal Fewzî, Law Reşîd û Hilmiyê Sêweregî; dîsa di heman kovarê de nêrînên derbarê berhevkirina keresteyên têkildarî edebiyat û çanda kurdî jî derdikevin meydanê. Bêguman berî wan em wekî berhevkirinên Mele Mehmûdê Bazidî bi alîkarî û rêberiya August Jaba û berhevkirinên oryantalîst, mîsyoner û lêkolînerên Ewropî ku di dîroka xebatên folklora kurdî de girîng in, rastî mînakên din jî tên. Lêbelê em dikarin bibêjin ku xebatên têkildarî folklora kurdî bi armanceke zelal û bi zanebûneke diyar di dema *Jîn*ê de dest pê dikin.

Bi parçebûna Dewleta Osmanî û avabûna Komara Tirkiyeyê re Kurd jî ji hev belav dibin; çalakiyên wan ên siyasî têk diçin û di salên 1930î de careke din berê xwe didin folklor û edebiyata gelêrî li navendên cuda. Nimûneyên cureyên edebiyata gelêrî di *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* ku li Şam û Bêrûdê tên çapkirin; berhevkirin û weşanên li Erîvanê; dîsa xebatên berhevkariyê yên li Kurdistana Iraqê hinek mînak in.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Wek ku tê dîtin rewşenbîrên kurd jî di demeke ne dereng de dest avêtine xebatên folklorê; lêbelê şert û mercên tê de xebatên wan li hember ên gelên derdorê lawaz hiştine. Bêguman ev lawazbûn di serî de têkildarî rewşa siyasî ya giştî ya kurdan bû heta salên dawî. Lê ev yek li gorî nêrîna me bi tena sere xwe pirsgirêk û lawazbûna xebatên folklora kurdî rave nake. Derveyî rewşa siyasî ya kurdan û bandora wê li ser xebatên folklorê, pirsgirêkên têkildarî sehaya folklorê bixwe jî hene ku mirov dikare wek *pirsgirêkên têkildarî akademîk, sazîbûn û sepandinê* bi nav bike. Li aliyê din derfetên din jî rû didin ji bo birêkûpêkkirina sehaya xebatên folklora kurdî.

Li gorî vê çarçoveyê, di vê gotarê de, rewşa xebatên folklorê ya heyî dê bê pêşkêşkirin û li gel vê, pirsgirêk û derfetên xebatên folklora kurdî jî dê bên nîqaşkirin.

Peyvên Serekî: *Folklora Kurdî, Kovar, Sazî, Pirsgirêk, Derfet.*

Destpêk:

Folklor DNA ya me ya çandî ye. Ew hunera gelêrî, hikaye [çîrok], zanîn û pratîkên gelekî di nav xwe de dihewîne. Ligel ku ew bi hafize û dîrokê ve bikaribe bê girêdan, di heman demê de bi kevneşopiyên zindî û vegotinên afirîner ên îroyîn ve jî girêdayî ye. Folklore xwe adapte dike û her zindî ye.[1]

Malpera *Civaka Folklorê ya Emerîkî (American Folklore Society*) wisa pêşwaziya mêvanên xwe dike. Di vir de di heman demê de girîngiya sehaya folklorê jî tê îfadekirin û herweha bê folklor çi ye û çi di nav xwe de dihewîne. Lêbelê folklor ne tenê ew navê giştî yê huner, çîrok, zanîn û pratîkên gel e; di heman demê de navê qadeke zanistî ye ku li ser van berheman xebatên zanistî jî birêve dibe (Mason 1891).

Derketin û belavbûna Folklorê wek sehayeke zanistî

Folklor wek qadeke zanistî li ser çanda gelekî an jî heremekê li gorî rê û rêbazên xwe û bi nêrîneke akademîk lêkolînan dike. Di vê çarçoveyê de berhevkarî, polînkirin, arşîv û şirovekirina berhemên gelêrî jî dike û di dawiyê de jî dixwaze bigihije hinek sentezan (Örnek 2000). Îro, folklor wek beşeke zanistî di nav bernameyên gelek zanîngehên welatên curbecûr de cihê xwe girtiye. Lê wek her beşekê ew jî xwedî dîrokeke xwe, bi gotineke “folklorîk” xwedî çîrokeke xwe ya taybet e.

Folklor wek peyv (*Folk-Lore*) cara pêşî ji aliye William John Thoms ve di sala 1846an de di kovara *The Athenaeum*ê de tê bikaranîn. Thoms di nameya xwe de ku bi navê Ambrose Merton ji kovarê re şandiye, pêşniyaz dike ku ji dêvla “antikeyên popular (gel) û edebiyata popular (gel)” êdî peyva *Folk-Lore* bê bikaranîn.[2]

Her çiqasî bikaranîna peyva “Folk-Lore” cara yekem di 1846an de bûbe para William John Thoms jî, berî vê bikaranînê di dawiya sedsala 18mîn de li Almanyayê bi wateyeke nêzîk peyva “Volkskunde” jî hatiye bikaranîn (Tokofsky, 1996).[3] Lêbelê ji dêvla ya almanî ve peyva ingilîzî di nav civaka zanistî û lêkolînvanan de hatiye pejirandin û di demeke kurt de jî ev peyv belav bûye. Bêguman ev yek bi berfirehbûna bikaranîna zimanê ingilîzî ve jî têkildar e. Du zimanên din ên belavbûyî yên wê demê, spanî û frensî jî ev peyva ingilîzî wergirtine û dibe kû ev yek bikaranîna “volkskunde” ya almanî sînordar kiribe. Bi bikaranîn û belavbûna peyvê li seranserê Ewropayê re tê dîtin ku sehayeke zanistî jî ava dibe. Komele ava dibin (*Folklore Society-Civaka Folklorê*-1878), kovar tên weşandin (*The Folk-Lore Record*-1878) û kongreyên zanistî tên li darxistin

(Paris 1889; London 1991; Chicago 1893) ku bi rêya van kovar û kongreyan jî çarçoveya sehayê derdikeve meydanê.

Ev sehaya nû pêl bi pêl di nav rewşenbîrên gelên Ewropî û herweha Rusî de jî de deng dide, rêya niqaş û xebatên di wî warî de vedike. Ev pêl di destpêka sedsala 20mîn de digihije Paytextê Dewleta Osmanî. Ziya Gökalp ê ku bi eslê xwe kurd e, cara pêşî vê sehayê di 1913an, di kovara *Halka Doğru* (Ber bi Gel ve) de bi sernavê nivîsa *Halk Medeniyeti* (Medeniyeta Gel) dide naskirin. Di heman nivîsa xwe de Gökalp vê sehayê bi osmanî (tirkî) wek *halkıyat* jî bi nav dike (bnr. Tan 2013). Di heman demê de, wekî li jêr jî dê bê behskirin, di nav rewşenbîrên kurd de jî fikrên derbarê girîngiya ziman û "vegera nav gel" tên xwe didin der.

Xebatên Folklora Kurdî

Destpêkirina xebatên folklorê di nav gelek gelên cîhanê de bi geşedana hestên netewî ve girêdayî ye û yên kurdan jî kêm zêde di vê çarçoveyê de ne. Lêbelê di heman demê de xwedî hinek taybetiyên xwemalî jî ne. Berî her tiştî kurd piranî di nav xaka împaratoriya Osmanî de dijîyan. Du, xebatên destpêkê ne bi wê hizra "netewî" hatine kirin. Wekî din xebatên pêşî jî piranî ji hêla biyaniyan ve hatine kirin. Dema xebatên ji hêla biyaniyan ve hatine kirin li derve bên hiştin, tesnîfeke bi vî rengî ya dîroka xebatên folklora kurdî derdikeve meydanê ku di xebateke din de (Keskin 2019: 77-119) jî hatiye îfadekirin;

1- Serdama Dewleta Osmanî ku di dema dawî de ew hestên netewî jî li pêş in

2- Serdema Piştî Dewleta Osmanî ku heta roja îroyîn jî dikare bê şopandin.

Di serdema pêşî de wek destpêk xebatên Mele Mehmûdê Bazidî derdikevin pêşiya me ku bi hevkarî û rêberiya konsolê Rusî yê Erzoromê August Jaba derketine meydanê û dîsa bi saya wî û parastina wan li *Akademiya Zanistî ya St. Petersburgê* gihaştina berdestê me. Di nav xebatên Mele Mehmudê Bazidî de du ji wan rasterast têkildarî folklor û etnografyaya kurdan e û lewma jî di dîroka xebatên folklora kurdî de wek destpêk jî tê nirxandin (Yıldırım & Pertev& Aslan 2013; Keskin 2019). Ev xebatên Mele Mehmûd ku bi folklora kurdan ve têkildar ev in;

- *Adat û Rasumatnameya Ekradiyê* (Adet û Rêwresmên Kurdan)
- *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*

Ya pêşî de derbarê orf, adet, rabûn û runiştin, eşîrên kurdan, têkiliyên civakî agahî hene û lewma jî wek etnografyayeke dema xwe ye. Ya duyemîn jî wek ji nav jî diyar dibe hikayetên (bêhtir di çarçoveya rîvayetan de bin jî) bi zimanê kurmancî dihewîne ku wek mînakên edebiyata gelêrî dikarin bên nirxandin.

Piştî xebatên Mele Mehmûd û hevkarî wî August Jaba, em rastî xebatên ewropiyan tên ku wek mînak Alber Socin û Eugen Pyrm (1890); Oscar Mann (1906); Hugo Makas (1926) dikarin bên dayîn. Xebatên folklora kurdî yên vê demê wek *dewra pêşî ya serdema Osmanî* jî dikarin bên tesnîfkirin.

Dawiya sedsala 19mîn û destpêka sedsala 20mîn heta şerê Cîhanên yê Yekemîn ji bo kurdan serdemeke *lixwehişyarbûnê* ye. Di vê dewrê her çiqasî em rastî tevgereke "netewî" û netewperweriyê neyên jî xuya ye kurd bi xwe, bi hebûna xwe dihisin.[4]

Xebatên folklorî yên rasterast bi geşedana netewperweriya kurdî ve têkildar di serdema dawî ya Dewleta Osmanî de, di kovara *Jîn*ê de tên dîtin. Geşbûna hestên netewî û gihaştina asta netewperweriya siyasî –li gorî yên gelên din, derengmayî- di nav kurdan de bêguman bi şert û mercên siyasî, civakî û çandî ku tê de bûn ve girêdayî bû.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ فەكولینێن كوردی

Lewma li vir pêwîstî bi kurte-nêrînek derbarê geşedana netewperweriya kurdî di serdema Osmanî de derdikeve meydanê.

Kurte-nêrînek derbarê netewperiya kurdî di serdema Osmanî de

Kurd heta dawiya Şerê Cîhanê yê Yekemîn di nav Dewleta Osmanî de wek parçeyekî împaratoriyê bûn. Heta nîveka sedsala 19mîn jî wek mîrektiyan di nav rêveberiyeke serbixwe/otononom de jiyana xwe didomandin ku di dema Sultan Selîmê Iemîn de dest pê kiribû. Wê demê eşîr û mîrên kurdan li himberî Safaviyan piştgiriya Osmaniyan kirin û bi vê alikariyê jî Osmaniyan di şerê Çaldiranê yê di 1514an de Safavî têk birin. Bi rêya vê alîkarî û piştgiriyê jî ji aliyekî ve kurdan statuyeke *de-facto* otonom bi dest xistin û ji aliyê din ve jî bûn parçeyekî împaratoriya Osmanî. Ev hemtêkiliya simbiyotîk a di navbera mîrektiyên kurdan û împaratoriya Osmanî di destpêka sedsala 19mîn de diguhere û di nîveka sedsalê de bi avakirina "Eyaleta Kurdistanê" re jî bi temamî rewşeke din derdikeve meydanê. Bi gotineke din serdema mîrektiya ku ji 1514an heta 1847an bi tevahî 333 salan dewam kiribû, bi avakirina "Eyaleta Kurdistanê" re êdî ji holê radibû (Hakan 2007:253).

Împaratoriya Osmanî di sedsala 16mîn de ber bi rojhilat, rojava, û başûr ve gihaşt sînorê xwe yên herî berfireh. Di dawiya sedsala 17mînde ev berfirehbûn û pêşdeçûn rawestiyan û di sedsala 18mîn de jî hêdî hêdî paşdeçûn û windakirina erdê dest pê kir. Ji aliyekî ve geşedanên siyasî, aborî, teknolojî û herweha entellektuelî yên li Ewropayê ku wek qonaxa rewşenbîrî jî tê îfadekirin; ji aliyekî ve jî ramanên derbarê azadî û pê re netewperwerî ku bi şoreşa Frensî re belavbûn û bandor li gelên di bin desthilatdariya împaratoriyê kirin, hinek ji sedemên "paşdemayîn" û rawestina berfirehbûna împaratoriya Osmanî bûn. Ramanên ku bi Şoreşa Frensî re derketin meydanê wek pêlekê belav bûn û di demeke nêzîk de gihaştin nav xaka Osmanî jî. Mînaka herî berbiçav li vir wek tevgera gelê Yewnan dikare bê nîşandayîn ku di 1826an de serxwebûna xwe bi dest xistin.

Ji ber ku bikaribe rê li ber vê windakirina erdê û li himber têkçûna teknolojîk, aborî, siyasî bigire, Dewleta Osmanî di nîveka yekemîn a sedsala 19mîn de dest bi sepandina hinek guherînan kir ku di encamê de *Fermanên Tanzîmat (1839)* û *Islahatê (1956)* hatin îlankirin. Yek ji guherînên ku mîrektiyên kurdan rasterast eleqedar dikir jî ew helwest û tevgerên desthilatdarên Osmanî yên derbarê "navendîkirina" rêveberiyê bû. Bi gotineke din, desthilatdariya navendî ya li Stenbolê êdî ew pergala *Adem-î Merkezî* dixwest biguherîne pergaleke navendî ku ew jî di encamê de dihat wateya jiholêrakirina mîrektiyan û herweha herêmên din ên ku xwe bi xwe bi rê ve dibirin. Di serdema Sultan Mahmudê IImîn de xuya dibe ku Dewleta Osmanî dixwaze wê otonomiya mîrektiyên kurdan ji holê rabike û wan bixe nav kontrola Osmanî ya navendî (Jwaideh 2006:54).

Berteka mîrektiyên kurdan li himber van guherînên navendî yên li dijî berjewendiyên wan serî hildan bû ku di nav xwe de kêm be jî hizrên kurdewariyê jî dihewandin. Serhildana dawî ya Mîrektiya Botan an jî Bedirxaniyan bû ku di sala 1847an de têk çû. Bi vê têkçûna dawî êdî serdema mîrektiyên kurdan jî bi dawî bû. Ji dêvla mîrektiyan ve bi navê *Kurdistan* eyaletek hat avakirin ku heta 1867an dewam kir (Hakan 2007; Özoğlu 2009). Ev dewra *Eyaleta Kurdistanê* ji aliyê jinûvesazkirina rêveberiya herêmê ve wek pêvajoyeke derbase jî dikare bê nirxandin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

Ligel jiholêrakirina mîrektiyan û tevgerên Dewleta Osmanî li himberî kurdan û destkeftiyên wan, xuya ye ku serok û rêvebirên kurdan dîsa xwe wek parçeyekî Dewleta Osmanî dibînin. Ango, her çiqasî ew hizra “kurdbûn”ê hebe jî ew ne gihaştiye wê asta xwestina dewleteke serbixwe wek ya Yewnanan an jî gelên din ên mesîhî. Tişta girîng û li pêş wê demê bawerî (ol) ye ku kurdan nêzîkî Osamniyan dike. Wek mînak di şerê Rus û Osmanî yê 1877-78an de, wekî Jwaideh (2004:226) îfade dike, kurd jî wek gelên din ên Osmanî bi dilsozî di nav arteşa Osmanî de xizmet dikin.

Hizra kurdbûnê bi weşana rojnameya Kurdistanê re hinekî din berbelav dibe lê dîsa jî ew nagihije asta xwestina welatekî serbixwe. Lewma her çiqasî ew hizra kurdbûnê hebe jî ev yek, wekî îfadekirina Özoğlu, ji netewperiyê wêdetir hebûna *lixwehişyariyê (self-conciousness)* nîşan dike (2009:33). Her wekî Bozarslan jî dibêje;

Tiştê balkêş ev e ku, neteweevînî û welatevîniya ku di rojnama 'Kurdistan' da cî girtiye û hatiye karanîn, ne ber bi amanca serxwebûna Kurdistanê bûyê; bi peyveke dî, amanc ji neteweevînî û welatevînîyê ne ew bûye ku Kurdistan ji Dewleta Osmanî bê rizgarkirin û li ser axa Kurdistanê dewleteka Kurd a xweser bê sazkirin (Bozarslan 1991: 23).

Hizra kurdbûnê bi weşana *Rojî Kurd* û komeleya *Hêvî* re digihije astekî din, lê ji ber destpêkirina şerê Cîhanê yê Yekemîn ev pêvajo nîvco dimîne.

Destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi xwe re hinek rûdanên din jî tîne. Hîna di destpêka şer de tehcîrkirin û qîrkirina ermeniyan, dîsa tevgerên netewperwerî yên erebên misilman û ji Dewleta Osmanî weqetandina wan bandor li serok û rewşenbîrên kurdan jî dike. Ew fikrên girêdayî nasnameya “îslamî” ku kurd bi Dewleta Osmanî ve girêdidan jî dişikin. Piştî têkçûyîna Dewleta Osmanî ya di şerê cîhanê de kurd careke din berê xwe didin tevgerên ji bo bidestxistina mafê xwe yên netewî. Hizra netewî li gorî demên din bilindtir dibe û Kurdistan wek “welat” êdî dikeve rojeva kurdan de. Bi avakirina *Cemiyeta Tealî ya Kurd* (KTC) û weşandina kovara ne fermî ya cemiyetê *Jîn* jî netewperweriya kurdan dikare bê gotin ku digihije asteke sazîbûnê. Di vê rûdanê de bêguman rola prensîbên Wilson jî hebû. Ew hizrên netewî û herweha bandora prensîbên Wilson wek mînak di nivîsa Ewdirehîm Rehmî de dikarin bên şopandin. Rehmî di nivîsa xwe ya bi navê “Halê me yê hazir” (1918) de ku di *Jîn*ê de hatibû weşandin weha dibêje:

Belê, em Kurd heta nuha me his nekir ji ber destê hukumeta Tirkan derkevin, yanî ji menzûma Osmanîyan derkevin. Nuha em temaşe dikin, Wîlson di'bêjit 'çi Tirk nebit nadine Osmanîyan'. Hal ew e ku cîyê me dibêjin'ê Kürdistan; xeyrê du-sê memûran, ew jî ji ber memûrîyetê hatine cî bûne, bil ji wana çu Tirk çunînin. Wekî Tirk çunînin, ma Ermenî, mixeyn? Hindî Ermenî ne, mîqdarê sedan pêncê me nînin. Mixeyn jî sedan du bi zor teşkil diket. Paşê hingê, ji xeyrê Kurdan çu millete dî çunînin. Wekî we ye, Kürdistan heqê Kurdan e, ji xeyrê Kurdan heqê kesê nîne.

Li vir ya girîng ji bo mijara me ew e ku di vê demê de bi vê hişyarbûna netewî re xebatên rasterast bi folklor û edebiyata kurdî ve girêdayî derdikevin meydanê û ev xebat jî di nav rûpelên *Jîn*ê de cihê xwe digirin.

Xebatên vê demê jî di çarçoveya *dewra sêyemîn a serdema Osmanî* dikarin bên nirxandin û tesnîfkirin. Li vir divê bi kurtasî be jî bê gotin ku; di navbera xebatên *dewra pêşî* ku yên Mele Mehmûdê Bazidî û yên ji aliyê biyaniyan ve hatine kirin di nav xwede

Zakho Centre for Kurdish Studies

dihewîne; û *dewra seyêmîn/dewra Kovara Jînê*, *dewra weşanên kurdî* heye ku bi weşana Kurdistan (1898) dest pê dike û heya destpêka Şerê Cihanê yê Yekemîn didome. Herçiqasî –bi taybetî di *Rojî Kurd* de- em rastî nêrînên "lixwegerîn"ê bibin jî, xebatên rasterast têkildarî folklor a kurdan di van weşanan de cih nagirin. Lewma ev serdem jî wek *dewra weşanên kurdî (1898-1914)* dikare bê tesnîfkirin.[5]

Wek li jor jî hat gotin, Kurd berî şerê Cîhanê yê yekemîn ligel hemû rûdanan xwe wek parçeyekî Dewleta Osmanî ditînin û di vê çarçoveyê de ji bo mafê xwe yê "netewî" tevdigeriyan. Stenbol ji bilî payitaxtbûna Dewletê di heman demê de navendeke siyasî, çandî û entelluktuelî jî bû. Rewşenbîr, rayedar û entelijansiyaya kurdan jî li wir kom bûbûn. Lewma ew der ji bo kurdan û xebatên kurdan jî heya dawiya Dewleta Osmanî wek navendeke girîng bû. Li wir herweha Ew li wir hem di bi entelijansiyaya tirkan ve di nav hemtêkiliyekê de bûn û herweha haya wan ji geşedanên li Ewropayê jî çêdibû. Lewma ne tesadûf e ku gava fikra "xebatên folklorê" û "vegera nav gel" di nav enteljinasiya ya tirkan de derket, di heman demê de em rastî ramanên nêzîk, wek "girîngiya ziman" û "vegera nav gel" di nav rûpelên *Rojî Kurd* de jî tên. Bêguman wek ên tirkan behsa folklor an jî *halkiyat* naye kirin, lê girîngiya ziman, *vegera nav gel* di nav weşanan de cih digire. Ev yek wê hemtêkiliyê nîşan dide.[6]

Wek li jor jî hat gotin xebatên rasterast girêdayî folklorê em di nav rûpelên *Jîn*ê de dibînin. *Jîn* di Çiriya Paşîn a 1918an de dest bi weşanê dike. Bi tevahî 25 hejmar tên weşandin. Zimanê kovarê jî wek kovarên kurdî yên berê bi tîpên erebî du ziman in: Osmanî (tirkî) û kurdî (kurmancî û soranî). Xelîl Xeyalî di nav rûpelên *Jîn*ê de jî nivîsên derbarê ziman de berdewam dike. Wekî din Law Reşîd di reze-nivîsekê bi navê *Kürdlerde Durub-î Emsal (Gotinên Pêşiyan ên Kurdî)* de ku di hejmarên 2, 4, 5, 7 û 8an de cih digire, hewla tesnîfkirina gotinên pêşiyan ên kurdî dike. Law Reşîd di nivîsa xwe de gotinên pêşiyan ligel tirkîya wan û herweha bi mînakan di bin banê 10 sernavan de tesnîf dike. Ji bilî Law Reşîd, Siwerekli Hilmî (Hilmiyê Siweregî) jî derbarê gotinên pêşiyan de bi heman sernavî (*Kürdlerde Durub-î Emsal- Gotinên Pêşiyan ên Kurdî*) reze-nivîsek di hejmarên 14, 19, û 24an ên *Jîn*ê de weşandiye.

Ji aliyê din ve, Kemal Fewzî jî bi rêzenivîseke xwe ya bi navê *Kürd Masalları (Çîrokên Kurdî)* ku di hejmarên 22, 23 û 24an ên *Jîn*ê de tên weşandin, balê dikişîne ser edebiyata kurdî ya gelêrî. Di nivîsê de herweha jî cih dide çîrokeke bi navê *Altın Kâküllü Çocuk (Lawikê Perçemzêrîn* ku dibêje li ber tenûran ji deve dayîkên kurd hatiye berhevkirin. Herçiqasî ji devê "dayikên kurd" hatibe berhevkirin jî, di kovarê de çîrok ne bi kurdî, lê bi tirkî cih digire.

Weşandina gotar an jî xebatên bi vî rengî ji bo wê serdemê di nav kurdan de tiştekî nû ye û lewma jî hem kesên navborî û hem jî xebatên wan ên hatin behskirin di dîroka xebatên folklora kurdî de cihekî girîng digirin.

Ji bilî van gotarên derbarê nimûneyên edebiyata kurdî ya gelêrî, di vê serdemê de ji bo organîzekirina xebatên çand û folklora kurdî em rastî hewldaneke sazîbûnê jî tên ku îro jî hîna avakirina saziyeke bi heman rengî di nav niqaş û nirxandinên me de cih digire. Navê vê komeleyê jî *Komeleya Kurd ji bo Zanînê û Weşanan (KKZW)-Kürt Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti-(KTMNC)* ye ku dîsa di nav rûpelên *Jîn*ê de behsa wê tê kirin. Li gorî agahiyên di hejmara 7an a *Jîn*ê de, amadekariyên damezrandina komeleya *Kurd Tamim-i Maarîf ve Neşriyat Cemiyetî* temam bûne ku dê *derbarê ziman, dîrok û erdnîgarî û rewşa aborî û civakî ya kurdan lêkolîn û weşanan bike û di nav kurdan de*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

zanyariya hemdemî belav bike (Jîn, hj. 7, r. 12).[7] Beyanname û bernameya komeleyê jî di hejmara 10an a *Jîn*ê de cih digire. Di wê bernameya bi tevahî ji 20 xalan pêk tê de tê dîtin ku komeleyê karekî berfireh derbarê xebatên çandî daye ber xwe. Qederê nîvê xalên bernameyê têkildarî folklor û etnografyaya kurdan bûn û eger bihatana pêkanîn ihtîmaleke mezin rewş û xebatên folklora kurdan îro dê gelekî cuda buna. Herweha dikare bê gotin ku îro jî pêwîstî bi pêkanîna wan xalên bernameyê yên têkildarî folklor û etnografyaya kurdan heye.[8]

Ber bi salên 1920an ve û bi dawîbûna fiîlî ya Dewlata Osmanî re rewşa ya siyasî bi tevahî guherî û çalakiyên kurdan rastî astengî û zextan hatin. Bi van rûdanan re entelijansiyaya kurdan jî belav bû, kar û xebatên ku dabûn ber xwe nîvco man. Heya wê demê Stenbol ji bilî payitaxtbûna Dewleta Osmanî ji bo kurdan û xebatên wan jî navendeke sereke bû. Lê bi guherîna rewşa siyasî êdî derfetên çalakiyên kurdan li Stenbolê ne pêkan bûn û wan jî berê xwe dan navendên din. Lê dikare bê gotin ku di nav vê hengameya siyasî de xebatên çandî jî kêm bûn, rawestiyan an jî ji ber çalakiyên siyasî hatin "jibîrkirin".

Navendên din ên xebatên folklora kurdî

Jinûvevejîna xebatên derbarê çand û folklora kurdî *yên piştî serdema Dewleta Osmanî* careke din si salên 1930î de li du navendan dest pê dike ku yek jê Dimeşk (Damascus-Şam) a di bin desthilatdariya Frensiyan de bû û ya din jî Erîvan a paytextê Ermenistana girêdayî Yekîtiya Sowyetê bû.

Şam

Di 1932an de Celadet Bedirxan siyasetê ji *civatên welatî* (Hawar, hj.1) re dihêle û berê xwe dide xebatên ziman û çandî û pê re jî li Şamê 15ê Gûlana 1932an dest bi weşana *Hawar*ê dike. Weşana *Hawar*ê li Şamê ji aliyê Celadet Bedirxan ve îro jî bi giştî di warê xebatên kurdî de mîladek e ku cara pêşî heya 1935an weşana xwe didomîne. Di 1941ê de Hawar bi hejmara xwe ya 27an dîsa dest bi weşana xwe dike û piştî wê jî Ronahî derdikeve. Di wê demê de Kamîran Bedirxan jî li Bêrûdê rojnameya *Roja Nû* û kovara *Stêr*ê derdixe.

Kovar û rojnameyên ku Celadet û Kamîran Bedirxan li Şam û Bêrûdê derxistine di wê demê de ji bo parastin û pêşxistina ziman, edebiyat û çanda kurdî roleke gelekî girîng girtine ser xwe; bûne stargeh ji bo ziman û edebiyata kurdî ya gelêrî û bi vê yekê jî di navbera doh û îro de jî pirek danîne. Gava mirov li mînakên ji cureyên edebiyata kurdî ya gelêrî di *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû* û *Stêr*ê de dinêrê ev yek pir zelal tê xuyakirin.[9]

Êrîvan (Yekîtiya Sowyetê)

Navendeke din di dîroka xebatên folklora kurdî jî Erîvan a paytextê Ermenîstana girêdayî Yekîtiya Sowyetê ye. Di serdema ku Celadet û Kamiran Bedirxan li Şam û Bêrûdê xebatên xwe dikirin û nimuneyên edebiyata gelêrî di kovar û rojnameyên xwe de diweşandin, li Êrîvanê zanyar û lêkolînerên kurd bi awayekî ilmî dest avêtibûn xebatên folklora kurdî. Xebata Emînê Evdal û Heciyê Cindî ya bi navê *Folklora Kurmanca* ku di 1936an de hat çapkirin wek berhema pêşî ya van xebatan dikare bê nirxandin. Piştî wê jî xebatên di warê folklor, edebiyat, ziman û çanda kurdan de dewam kirin. Heciyê Cindî, Ordixan û Celîlê Celîl kesên herî navdar in ku di vî warî de gelek xebat kirine. Xebata Ordîxan û Celîlê Celîl ku bi navê *Folklora Kurda* di 1978an de çap bûye dîsa mînakeke din a vê serdemê ye. Herweha damezrandina şaxa kurdî ya *Radyoya Erîvanê* ku ji bo muzîka kurdî ya gelêrî bu sitargehek jî divê neye jibîrkirin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Herêma Kurdistan

Piştî serdema Dewleta Osmanî û bi avakirina Komara Tirkiyeyê re Kurdistana Başûr bixwe ve bû navendeke din, ne tenê ji aliyên tevger û çalakiyên siyasî ve lê herweha ji aliyên xebatên çandî ve jî. Ev serdem jî ji hêla xebatên folklorê ve dikare wek *ji destpêkê heya 1991ê*; *ji 1991ê heya îro* di nav du serdeman de bê nirxandin.

Bajarê Silêmanî di destpêkê de wek navendekê derdikeve pêşiya me. Hebûna çapxaneyan û weşandina pirtûk û kovaran jî vê navendbûnê dûpat dike.[10] Di nav van weşanan de xebatên derbarê folklor û edebiyata kurdî ya gelêrî jî derdikevin pêşiya me ku Pîremerd û pirtûkên wî yên bi navê *Kitêbî Pendî Pêşiyan (1936)*; *Çîroka Mehmûd Axayê Şêwekal (1942)*; û *Galte û Gep (1947)* wek mînak dikarin bên dayîn.

Ji aliyê din, Yekîtiya Sowyetê ne tenê ji bo zanyar û lekolînerên kurdên wir; di heman demê de ji bo zanyarên kurdên ji parçeyên din jî bû navendek ji bo serlêdan û perwerdehiyê ku Îzedîn Mistefa Resûl û xebata wî ya bi navê *Edebî Folklorî Kurdî* ku di 1970yî de li Bexdayê çap dibe wek mînak dikare bê dayîn. Di salê 1980î de jî ligel tevlîheviyên herêmê dîsa jî xebatên derbarê folklor, edebiyat û çandê de dewam dikin. Xebatên wek ên Şikriya Resûl-*Edebî Folklorî Kurdî* (Hewlêr-1984); Mehemed R. Remazan- *Mindal û Çîrokî Mindalan* (Hewlêr-1984); Kamuran Mukrî- *Edebî Folklorî Kurdî* (Hewlêr-1984) çend mînak in ji van xebatên di warê folklor û edebiyata kurdî ya gelêrî de.

Ji 1991 heya îro

Geşedanên piştî Şerê Kendalê yê Yekemîn û hebûneke *de-facto* otonom a Herêma Kurdistanê rê li ber geşedanên din jî kirin. Di warê xebatên folklorê de weşana kovara *Karwan* û *Asoyî Folklor* (berê wek pêveka *Karwan* derdikeve) wek mînak dikarin bên dayîn. Lê geşedanên çandî û xebatên derbarê folklor û çanda kurdî de dikare bê gotin ku piştî 2003an, bi avakirina fermî ya Herêma Kurdistanê re dest pê kir. Di vê çarçoveyê de ligel avakirina beşên edebî folklor di zanîngehan de, damezrandina *Enstîtuya Kelepora Kurdî* (Kurdish Heritage Institute) ji bo sazîbûna xebatên sehaya gaveke girîng e.[11] Îro jî heman sazî xebatên xwe bi awayekî dewam dike û herweha li Zanîngehên Kurdistanê de jî beşên edebî folklorî hene ku perwerdehîya folklor û edebiyata kurdî ya gelêrî didin.

Tirkiye (Bakûr)

Xebatên pêşî yên derbarê folklor û edebiyata kurdî di destpêka sedsala 20mîn de li Stenbolê hatin kirin û wekî li jor amaje pê hate kirin, piştî serdema Dewleta Osmanî û bi avakirina Komara Tirkiyeyê ya nû re her tiştê têkildarî kurdî hat înkarkirin/qedexekirin. Ev serdem her çiqasî di navbera salên 1965-80î de hinekî şikestibe jî heya salên 1990î bi tundî dewam kir. Ji aliyekî ve tevgera siyasî ya li Bakûr û li aliyê din geşedanên siyasî yên li Başûr “pirsa kurd” xistin rojeva dinyayê tevde. Di vê pêvajoyê de hebûna kurdên Tirkiyeyê jî ji hêla desthilatdarên wê demê ve hat qebûlkirin ku bi vê yekê re rê li ber xebatên kurdî jî vekir û careke din Stenbol kir navendek bo birêvebirina xebatên kurdî. *Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM-MKM)* û *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* du saziyên girîng in ku di wê pêvajoyê de li Stenbolê hatin damezrandin. Wekî din di heman demê weşangeriya kurdî û herweha xebatên muzîka gelêrî jî li Stenbolê dest pê kirin. Xwendekar û rewşenbîrên kurdan bi amatorî be jî berê xwe dan “çanda” xwe û dest bi xebatên berhevkirinê kirin

.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

Xebatên Folklora Kurdî di Sedsala 21emîn de

Mîlenyuma duyemîn dikare bê gotin ku ji bo kurdan jî bu destpêkek. Ne tenê ji aliyê siyasî ve herweha ji aliye xebatên çandî ve jî geşedanên girîng derketin meydanê. Wekî li jor amaje pê hat kirin, li başûr saziyek bi navê *Enstîtuya Kelepora Kurdî* hat damezirandin; Ligel zanîngehên heyî yên din jî hatin avakirin ku di bin banê wan de beşên Ziman û Edebiyata Kurdî jî cih digirtin.

Herweha li Tirkiye'yê jî avakirina *Enstîtuyên Zimanên Zindî* ku ya pêşî li Zanîngeha Mardin Artuklu di sala 2009an de vebû, derfetên nû ji bo xebatên folklora kurdî vekir.[12] Di van beşan de ligel dersên ziman û edebiyata klasîk, dersên folklor û edebiyata gelêrî jî hat dayîn/tên dayîn. Tecrubeyên ku ji salên 1990î heta wê demê hatibûn komkirin bi awayekî di van enstîtu û beşan de cih girtin/digirin. Êdî dikare bê gotin ku xebatên folklora kurdî li ser tecrubeyên paşerojê îro di çarçoveyeke zanistî û akademîk de tên birêvebirin. Xebatên qadê, tez û projeyên bernameyên lisansa bilind û herweha xebatên mamosteyên van beşan vê nêrîna me dûpat dike.

Ji aliyê din xebatên derveyî zanîngehan tên kirin jî derdikevin meydanê. *Weqfa Mezopotamyayê* û xebatên koma folklorê ku di bin banê Weqfê de tên kirin- herçiqasî li gorî nêrîna min xwedî pirsgirêk bin jî- mînakeke girîng e.[13] Wekî din her çiqasî derbarê wan de agahiyên me kêm bin jî –ku ew jî di nav pirsgirêkan de cih digire- em dizanin ku li Kurdistana Îranê (Rojhilat) û Suriyeyê (Rojava) jî xebatên di çarçoveya folklor û edebiyata gelêrî de tên kirin.

Pirsgirêkên Folklora Kurdî û Derfetên Heyî

Xebatên folklor û edebiyata gelêrî, wekî li jor jî hat behskirin, bi hişmendiyeke netewperwer di kovara *Jîn*ê de derdikevin meydanê û dîsa ev hişmendî di bernameya *Komeleya Kurd ji bo Zanîn û Weşanan (KKZW)* de jî bi zelalî derdikeve pêşiya me. Eger em van çalakiyan wek 'kêl"ekê binirxînin, xuya dibe ku herî kêm ev sed sale ku xebatên derbarê folklor û edebiyata kurdî ya gelêrî de tên kirin. Bi gotineke din ev dîrok nêzî dîroka xebatên folklorê yên gelên din e. Lêbelê, ligel ku xwedî dîrokeke dûr û dirêj in jî xebatên folklora kurdî ne di asta yên gelên din de ne.

Dîsa wekî hat gotin îro li her çar aliyên erdnîgariya Kurdistanê û her weha li derveyî wê jî xebatên folklor û edebiyata gelêrî tên birêveberin. Derfetên teknolojîk jî van xebatan bêhtir dîtbar dikin, lê jî aliyên din pirsgirêkên qadê jî bi heman rengî xwe didin der. Li vir em ê li gorî nêrîn û çavderiya xwe hewl bidin wan pirsgirêkên heyî îfade bikin.

Gava em behsa xebatên folklora kurdî û pirsgirêkên wê dikin, em bêhtir bala xwe didin ser berawerdinekê, ji ber ku herî baş bi ew pirsgirêk bi vî awayî dikarin bên famkirin û wekî din parçeyekî girîng ên xebatên zanistî jî jixwe berawerdkirin e. Li vir ew pirsa bê *ev berawerdkirin bi çi û bi yên kê re dê bê kirin*, derdikeve meydanê. Dikare bê gotin ku di serê pêşî de, ew berawerdkirin di çarçoveya *dîroka xebatên folklorê* de bi yên gelên din ên cihanê re divê bê kirin.

Ya duyem jî, bêguman bi yên welatên ku Kurd di nav de dijîn re; ango bi yên li Tirkiye, iran, Iraq û Suriyeyê re. Di vir de bi ya min ên herî girîng ku em bikaribin berawerd bikin ên Tirkiye û Îranê ne. Ji ber ku Iraq û Suriye, her çiqasî li ser bingeheke "netew-dewlet" hatibin avakirin jî ne xwedî "dîrok"ekeke dûv û dirêjin ku bikaribin yên din "asîmîle" bikin li gorî Tirkiye û İranê. Îro wergirtina statuyeke fermî/defacto ya

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

kurdan li van welatan jî bi ya min girêdayî vê bingeha "dîrokî" ya van welatan e. Lê gava mirov li Tirkiye û Iranê dinêre, rengekî din heye.

Herweha dikare bê gotin ku hem ji aliyê akademîk, hem ji aliye sazîbûnê, û hem jî ji aliyê sepandina wan ve xebatên folklorê yên Tirkî dikarin bo berawerdkirinê wek mînak bên bikaranîn. Wekî din ji ber ku xebatên folklora kurdî û tirkî bi awayekî di heman demê û atmosferê de bi nav hevtêkiliyekê de dest pê kirine jî (bnr. Pertev 2014) ev berawerdkirin bi nêrîna min guncav e.

Pirsgirêkên Xebatên Folklora Kurdî

Bêguman gava em behsa pirsgirêkên xebatên kurdî û bi taybetî yên folklora kurdî bikin ne mimkûn e rewşa polîtîk a kurdan a giştî paşguh bixin. Mirov dikare bi yek bersivê sedemên cudabûna asta xebatên folklora kurdî û yên din –wek mînak yên tirkî- bide: *Bêstatûbûna siyasî ya kurdan!* Bêguman ev sedemeke sereke ye û xalên têkildarî wê hene, lê tişta ku li vir dê bê niqaşkirin bêhtir dê di wê çarçoveyê de be ku wê sedeme siyasî wek diyardeyeke heyî paşguh nexe, lê di heman demê de hemû sedeman têkildarî wê jî neke.

Pirsgirêkên giştî yên xebatên folklora kurdî di xebateke din de di bin banê dû sernavan de hatibûn niqaşkirin: *Teorîk û Têgehî; û Dezgehî* (Keskin 2017). Îro em vê niqaşê dikarin hinekî din berfirehtir di bin sernavên "akademîk", "sazîbûn" û "sepandinê" de bikin ku yên berê jî di nav xwe de dihewînin.

a) Pirsgirêkên Akademîk

Li vir mebest niqaşên di çarçoveyeke akademîk de ne wek binavkirina sehayê, hebûna beş û binbeşên sehayê, diyarkirina çarçoveyekê li gorî yên cîhanê û herweha niqaşên derbarê teoriyên folklorê û têgehên derbarê wê de. Pirsa sereke ku li vir derdikeve pêşiya me binavkirina qadê ye, ango bê em ji *folklor*ê çi fam dikin. Yanî pirseke bi têgehê ve eleqedar derdikeve pêşiya me. Ji ber ku, xebat, lêkolîn, zanist li ser têgehan dimeşe, lêkolîner û zanyarên sehayekê bi rêya têgehan bi hev re dikevin têkiliyê û ji hev fam dikin. Îro li hemû cihanê di qadên zanistî de navekî *folklor*ê heye ku kêm zêde çarçoveyeke wê hîna ji kongreyên pêşî yên dawiya sedsala 19mîn ve hatiye diyarkirin. Bi gotineke din di warê "nav" de lihevhatinek di qadê de heye. Hebûna lihevhatinê li ser nav, têgeh û çarçoveyê bandorê li xebatan û niqaşên di sehayê de tên kirin jî dike. Niqaşên derbarê binavkirina sehaya folklorê wek *folklife; etnolojiya Ewropî, folkloristîk* hemû dikare bê gotin ku ji berî her tiştî bingeha xwe ji wê lihevhtina nav û çarçoveya sehayê distînin. Di yên kurdî de wisa xuya dibe ku hîna derbarê *çibûn* û binavkirina sehayê lihevhatineke giştî derneketiye holê. Gelo *folklor* çi ye, em ji *folklor*ê çi fam dikin? Tenê çîrok, hikaye, stran û gotinên pêşiyan folklor in? Gelo zargotin, edebî folklor, edebiyata gelêrî tevahiya sehaya folklorê dihewînin; dikarin bihewînin? Ev wek pirsgirêkeke sereke xuya dike ku bandorê li xebatên sehayê jî dike.

Li vir divê behsa taybetiyeke peyva folklorê bê kirin ku ew jî duwatebûna wê ye. Ji aliyekî ve hemu berhemên gelêrî, edebiyat, çanda şênber a gel wek *folklor* tên binavkirin; lê bele ji aliyê din ve *folklor* navê qadeke zanistî ye ku li ser van berheman lêkolîn, analîz û şiroveyan dike.[14] Lewma tevlîhevkirina van her du wateyan ji aliyê xebatên akademîk ve hinek gengeşiyan jî bi xwe re derdixe meydanê. Bi nêrîna min gengeşiya derbarê binavkirinê ku di nav xebatên folklora kurdî de xuya dibe jî hinekî bi vê duwatebûnê ve têkildar e. Eger çarçoveya *folklor*ê mîna yên cîhanê wek qadeke serbixwe ya zanistî berfireh bê nirxandin, wê demê dê ev tevlîheviyên binavkirinê jî ji

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

holê rabin.[15] Eger ev pirsgirêk çareser bibe wê demê dê sehaya xebatên folklora kurdî ji çarçoveya "edebiyat"ê tenê derbikeve û xebatên ji mijarên din wek festîval, cil û berg, şanoya gelêrî, monografiyên gundan jî dê bên kirin. Herweha rêjeya xebatên teorîk jî dê zêde bibin. Ango bi gotineke din pirsgirêkên akademîk bi rêya lihevhatina li ser têgehan û diyarkirina çarçoveya folklorê dikarin bên çareserkirin. Bêguman ev yek jî bi hebûn an jî tunebûna dezgehan ve têkildar e ku ew jî mijareke me ya din e.

b) Pirsgirêkên Têkildarî Sazîbûnê

Gava em li xebatên derbarê folklora kurdî hatine kirin dinerin, dibînin ku ji doh heya îro qewareyeke mezin di warê berhevkariyê de –bi taybetî di warê cureyên edebiyata gelêrî de- hatiye kirin. Lewma di vir de pirseke wek "gelo em ê çi bikin ji van berhemên folklorê yên berhevkirî?" derdikeve pêşiya me. Aliyekî pirsê têkildarî xebatên teorîk e û bi "akademî"yê ve têkildar e û aliyek jî bi hebûna/sazkirina dezgehan ve têkildar e. Aliyekî din jî heye ku ew jî bi sepandin an jî "bikaranîn"a van berhemên folklorî ve têkildar e.

Gelo bi çarçoveyeke teorîk niqaş û xebatên curbecur li ser van berhevkirina hatine kirin/dê bên kirin? Wek mînak; tîpolojiya çîrokên kurdî dikare bê derxistin? Ev berhevkarî dê çawa têkelî nav xebatên folklorê yên cîhanê bên kirin? Festîvalên kurdî di çarçoveya avakirina nasnameya kurdî de dê bên niqaşkirin an jî vekolan? Gelo ji van berhevkirinan folklornasên kurd dikarin tevkariyekê li geşedanên akademîk ê sehayê bikin? An jî dê bikin? Ev berhevkarî dibin mijarên antropolojî, etnolojî, civaknasî û derûnnasiyê? Dikevin nav niqaşên hafize, çanda devkî, veguhastin û guherînên çandî de? Çiqasî, bi çi rengî? Ev pirs hemu ku dikarin hîn jî bên zêdekirin bi xebatên teorîk û akademîk ve girêdayî ne. Ji aliyê din ve û di heman demê de jî bi hebûna dezgehan (ya rastî tunebûn/kêmbûna wan) ve jî têkildar e.

Dîroka folklorê dikare bê gotin ku dîroka sazîbûnê ye. Piştî bikaranîna têgeha folklorê ne zêde em rastî saziyên folklorê tên. Ne xelet e bê gotin ku xebatên folklorê bi rêya saziyan pêş de çûne. Îro li kîjan welatî be saziyek têkildarî folklorê heye, ji bilî yên Emerîkî û ingilîz (*American Folklore Society; Folklore Society*) ku dîroka wan û ya folklorê heme bêje yek in; yên Skandinavî, Fînî (*Nordic Folklore Institute*; *Civaka Edebî ya Finî*- ku Kalavela berhev kirin!) û herweha li welatên din. Ji aliyê din ve di bin banê van komele, enstîtu û dezgehan de kovarên têkildarî xebatên folklorê jî hatine/tên weşandin ku ew jî rê li ber niqaşên teorîk û herweha hevnasîna zanyarên sehayê dike.

Lewma êdî nebûna saziyeke kurdî ku tenê xebatên folklorê birêve bibe; folklornas, lêkolîner û xebatkarên folklorê di bin banê xwe de wek "endam" bihewîne derengmayîneke mezin û pirsgirekeke sereke xuya dike. Hebûna saziyeke zanyarî ya bi vî rengî dê gelek pirsgirêkên qadê jî bi xwe re çareser bike. Ji ber pirsgirêkên siyasî yên heyî kurd ji hev "dûr"in û herweha di nav lêkolînerên kurd de jî ev "dûrbûn" diyardeyeke. Hebûna saziyeke navendî berî her tiştî dê vê dûrbûnê ji holê rabike, platformeke hevdîtinê dê biafirîne. Ji bilî wê dê di plankirin û birêvebirina xebatên sehayê de jî roleke girîng bîne cih, rêya xebatên sehayî dê berfirehtir û pêkantir bike û herweha dê xebatên folklorê û berhemên gelêrî bêhtir dîtbar bike. Lewma saziyeke têkildarî xebatên folklorê di nîvê pirsgirêkan de cih digire û herweha hebûna wê jî di çareserkirina pirsgirêkan de dê xwedî heman rolî be.

c) Pirsgirêkên Têkildarî Sepandinê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەكۆلینێن كوردی

Pirs(girêk)eke din jî “bikaranîn”a van berhemên berhevkirî ye. Em îro dizanin û dibînin ku xebatên folklorê bûne mijarên girîng di avakirina nasnameya netewî de.[16] Herweha hemû gel an netew di gelek qadan de ji berhemên xwe yên gelêrî sûd werdigirin, wan bi awayekî bikar tînin. Wek mînak, çîrokên birayên Grimm çi bi awayekî fermî û çi bi awayekî ne fermî ne tenê li welatên almanîaxêv lebelê li hemu cîhanê jî di perwerdekirina zarokan de wek çavkanî tên bikaranîn. Herweha festîval û kevneşopiyên berê bi awayekî, bi rêya festîval û pîrozbahiyan bi gel tên nasîn; gel beşdarî van tradisyonan dibin û bi wî awayî jî derbarê paşeroja “netew”a xwe agahdar dibin. Pîrozkirina *sersalê* (Weichnachten-Chirstmas), *laterne* ya almanî; an jî *Newroz* an jî *Sêzde bi der* a li Îranê tenê du mînakin ji bo berdewamî û têkildarkirina gel bo kevneşopiyên folklorî. Herweha rewşenbîrên kurd ên wek Celadet û Kamîran Bedirxan jî tam bi vê armancê, bi armanceke netewî, berê xwe dabûn berhevkirinan; lê gelo ev îro di kîjan rêjeyî de dibin mijarên avakirina nasnameya netewî; bi çi awayî û di kîjan rêjeyî de dibin mijarên xwendin, perwerdekirin û berdewamiya çanda kurdî; an jî nêzîkkirina civakên kurdî bo hevdû. Gelo kurd di vî warî de di çi astê de ne? Ev berhemên berhevkirî yên derbarê jiyan, bawerî, edebiyata gelêrî, şano, dermanên gelêrî çiqasî dibin amûr ji bo famkirina gel û avakirina jiyaneke baştir bo gel? Ev pirs hinekî jî me ber bi mijara “bazara folklorê” ve dibin. Bazara folklora kurdî di nav kurdan de jî heye gelo? Ev bazar çawa dikare bê geşkirin? Bi gotineke din berhemên gelêrî çawa dikarin hem ji bo famkirin û pêşdebirina civakê bên bikaranîn û di heman demê de jî tevî bazara cîhanê ben kirin? Wekî mînak, festîvala lîstîkên kurdî-kurdewarî; pêşbirka dansên gelêrî yên kurdî/Kurdistanê; an jî festîval û pêşbirkên xwarinên kurdî; lîstîk, dans û stranên gelêrî yên kurdî dikarin vê “bazar”ê geş bikin. Li Tirkiyeyê wek mînak ji avakirina komarê heya niha bi sedan “komeleyên lîstîkên gelêrî” hatine avakirin/hene ku qursan didin, ji wan pereyan qezenç dikin, beşdarî festîval û pêşbirkên navnetewî dibin û bi awayekî bazarekê çêdikin. Herweha heman tişt ji bo stranên gelêrî jî derbasdar e.

Ji aliye din ve, di demên dawî de festîvalên navnetewî yên folklorê bi navê “etnofest” –ku wek bazareke navnetewî jî dikare bê nirxandin- tên lidarxistin ku di wan de berhemên folklorî wek kevneşopî, muzîk û dans, lîstikên gelêrî yên gelên cuda tên danasîn û pêşkêşkirin.[17] Çalakiyên bi vî rengî ji bo sepandina berhemên folklorê yên kurdî û Kurdistanî jî dikarin bibin mînak. Lêbelê li vir divê bê gotin ku pirs(girêk)a sepandin an jî “bikaranîn”a berhemên folklorê û xebatên akademîk ne di heman çarçoveyê de ne. Çarçoveya akademîk, van berheman bi rê û rêbazên zanistî berhev dike, tesnîf dike, analîz dike. Sepandin, an jî “zindîkirin”a kevneşopiyên gelêrî ne karê akademiyê ye. Lewma çarçoveya sepandinê ji çarçoveya akademîk cuda ye, lêbelê dikare ji xebatên akademîk sûd wergire an jî bi awayekî însîcamî li ser van xebatan bilind bibe.

Derfet û çareserkirina pirsgirêkên heyî

Pirsgirêkên li jor hatine îfadekirin di nav xwe çareseriyê jî dihewînin û dikare bê gotin ku di rewşa îro de ji bo çareserkirina van pirsgirêkan derfet gelek in. Pirsgirêkên têkildarî teori, têgeh û çarçoveya sehayê bi rêya hevnasîna lêkolêran; bi rêya parvekirina xebatên sehayî; bi rêya kongre, sempozyum û komxebatan dikarin bên çareserkirin. Lê ji bo vê yekê jî hebûna saziyan pir girîng e. Li vir tenê hebûna zanîngehan têra wî karê lidarxistina van hemu çalakiyan nake. Wekî li jor jî hat îfadekirin, dîroka xebatên folklorê bi awayekî dîroka saziyên folklorê ye jî û heman tişt ji

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

bo qadên din ê zanistê jî dikare bê gotin. Îro li seranserê cîhanê komele, sazî, enstîtu, civakên serbixwe yên têkildarî qadên zanistê yên cuda hene ku çalakiyên akademîk birêve dibin. Lewma ji bo pêşxistina sehaya xebatên folklora kurdî –herweha ji bo her qadeke zanistê yên din jî- di serî de pêwîstî bi saziyên zanyarî yên serbixwe û "durî hizbên siyasî" heye ku lêkoleran di bin banê xwe de bihewîne. Hebûna Herêma Kurdistan di vî warî de derfeteke mezin e. Li vir wek mînak avakirina saziyeke bi navê *Komeleya Lekolînên Folklora Kurdî /Folklor û Etnografyaya Kurdistan* li Herêma Kurdistan dê ji bo akademîsyenên kurd ên ku di vî warî de xebatan dikin bibe navendek. Bi rêya komeleyeke bi vî rengî ya zanistî hevnasîn û hevdîtina pisporên sehayên jî hesan bibe. Ji bilî sazkirina têkiliyan, lidarxistina kongre û komxebatan, di bin saziyeke wisa de xebatên pir cuda yên têkildarî sehayê jî dikarin bên birêvebirin. Wek mînak;

- Monografiyên gundan dikarin bên amadekirin.
- Kevneşopiyên herêmî; cureyên edebiyata gelêrî û waryantên wan dikarin bên berhevkirin
- Tesnîfkirin û arşîvkirina van berheman dikare bê kirin.
- Xebatên derbarê berhevkirin û amadekirina ferhengên devokî û herêmî dikarin bên birevebirin.
- Xebatên derbarê onomastîka Erdnîgariya Kurdistanê dikarin bên kirin.
- Di bin banê vê saziyê de arşîva folklora kurdî dikare bê avakirin.

Herweha di bin saziyeke zanyarî ya bi vî rengî de xebatên wergerên teoriya sehayê bo kurdî dikarin bên kirin; û qursên havînê (Summer School) dikarin bên vekirin ji bo xwendekar û lêkolînerên sehayê û herweha bo hevdîtin û naskirina lêkoler û akademîsyenên kurd. Hem ji aliyê akademîk ve û hem jî ji aliyê siyasî-civakî ve jî îro ew derfetên avakirina komeleyeke zanyarî ya xebaten folklora kurdî û lidarxistina çalakiyên navborî diyar in.

Ji aliyê din ve hebûna saziyeke bi vî rengî ji bilî geşbûna niqaş û xebatên sehayê, dê bandoreke erênî li ser dîtbariya berhemên folklorî jî bike. Çiqasî xebatên sehayî li ser berhemên folklorî bên kirin û ew di nav qada zanistî de cihê xwe bigirin, ewqasî jî dê bale bikişînin ser xwe û dê rê li ber niqaşên sepandina wan di warê cuda de jî derkevin meydanê. Herweha dê rê li ber kes an jî komeleyan jî veke ku dixwazin bazarekê ava bikin.

Encam:

Pirsgirêkên li jor amaje bi wan hat kirin ne tenê yên xebatên folklora kurdî ne; dikare bê gotin ku di her dîroka qadeke zanistê de heman niqaşên derbarê van pirsgirêkan de dikarin bên dîtin. Herweha dikare bê dîtin ku bê çawa ev pirsgirêk hatine çareserkirin jî. Lewma, wekî encam dikare bê gotin ku ne hewce ye kurd an jî folklornas, lêkolîner û xebatkarên qada folklora kurdî ji nû ve cîhanê "keşf" bikin, lê li tecrubeyên gelên din û xebatên folklorê yên cîhanê sûd wergirin. Di serî de jî organîzekirina van xebatan di bin banê saziyan de û her weha jî pêşkêşkirina wan bi rêya weşanan xala sereke ye kû îro pêdivî pê heye. Eger ev yek bê kirin dê asta xebatên folklora kurdî jî biguhere û tevî niqaş û pratîk ên cîhanê jî bibe.

Çavkanî:

Bozarslan, M. Emin (1985). JÎN (5 Cîld). Stockholm: Weşanên Roja Nû

Zakho Centre for Kurdish Studies

Bruinessen, M. V. (1992). *Agha, Shaikh and State: The Social and Political Structures of Kurdistan*, London & New Jersey: Zed Books Ltd.
CELÎL, Celilê (1992). *XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu‟nda Kürtler* (çev. M. Demir). Ankara: Öz-ge Yayınları.
Emrich, Duncan (1946). "Folk-Lore": William John Thoms. California Folklore Quarterly, Vol. 5, No. 4 (Oct., 1946), pp. 355-374. http://www.jstor.org/stable/1495929
Hakan, Sinan (2007). *Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürtler ve Kürt Direnişleri (1817-1867).* Ankara: Doz
Izady, Mehrdad R. (2004). *Bir El Kitabı: Kürtler* (çev. C. Atila). İstanbul: Doz Yay.
Jwaideh, Waide (2006). The Kurdish National Movement: Its Origins and Development. Newyork: Syracuse University Press.
Keskin, Necat (2017). Pirsgirêkên Giştî yên Xebatên Folklora Kurdî û Çend Pêşniyaz. *The Journal of Mesopotamian Studies,* C:2/1, r. 1-15.
Keskin, Necat (2018/2020). *Roja Nû û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-I-II*. Stenbol: Avesta
Keskin, Necat (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. Stenbol: Avesta
Mason, Otis T. (1891). The Natural History of Folklore. *The Journal of American Folklore*, Vol. 4, No. 13 (Apr. - Jun., 1891), pp. 97-105.
Mukriyanî, Mem (amd.) (2018). *Folklora Ronahiyê*. Amed: Wardoz
Örnek, Sedat V. (2000). Türk HalkBilimi (çapa 2yemîn). Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları
Özoğlu, Hakan (2004). *Kurdish Notables and the Ottoman State: Evolving Identities, Competing Loyalties, and Shifting Boundaries* (İngilizce). SUNY Press.
Öztürkmen, Arzu (1998). *Türkiye'de Folklor ve Milliyetçilik*. İstanbul: İletişim.
Pertev, Ramazan. (2014). Tesîra Modernîzmê Li Ser Xebatên Pêşî Yên Folklora Kurdî-Tirkî. *Journal of University of Zakho,* hj. 4, r. 12-24.
Pertev, Ramazan (2018). *Folklor û Nasnameya Neteweyî ya Kurdî*. Stenbol: Avesta
Serhedî, Mehpûs (amd.) (2018). *Folklora Hawarê*. Amed: Wardoz
Tan, Nail (2013). Türkiye'de Halk Bilimi Çalışmalarının 100. Yılını Kutlarken. *Folklor/Edebiyat*, c.19, hj. 75, 2013/3, r. 237-243.
Tokofsky, Peter (1996). "Folk-Lore" and "Volks-Kunde": Compounding Compounds. Journal of Folklore Research, Vol. 33, No. 3 (Sep. - Dec., 1996), pp. 207-211. http://www.jstor.org/stable/3814675
TORÎ (2005). *Aşiretten Millet Olma Yapılanmasında Kürtler*. İstanbul: Doz Yayınları.
Xendekî, Rênas (amd.) (2018). *Folklora Roja Nuyê*. Amed: Wardoz

Perawêz:

---

[1] The American Folklore Society (16.01.2022).

[2] Derbarê jiyan, xebat û nameya William Thoms bnr. Emrich 1946. Di vê xebata xwe de Emrich behsa jiyan û xebatên Thoms dike; cih dide nameya wî ya bi navê "Folk-lore" û herweha cih dide niqaşên derbarê têkiliya *Volkskunde* û *Folk-Lore* jî.

[3] Wateya her du peyvan jî yek e; an jî gelekî nêzî hev e. Lewma niqaşeke derbarê gelo Thoms ev peyv rasterast ji Almanî wergerandiye ingilîzî heye.

[4] Niqaşên cuda derbarê vê serdemê û "netewperiya kurdan" de hene. Ligel ku hinek vê serdemê û tevgerên serdemê di çarçoveya "geşbûna netewperweriya kurdan" de binirxînin (Celîl 1992; Torî 2005) jî, yên ku li dijî vê nerînê ne jî hene (Izady 2004). Wekî din hinek lêkolerên din jî vê serdemê ji "netewperweriyê" zêdetir wek

"lixwehişyarbûn" (Özoğlu, 2004) an jî "proto-netewî" (Bruinessen, 1992:250) dinirxînin.

5 Di xebateke din de ev polînkirina serdemên xebatên folklorê di heman çarçoveyê de, lê bi binavkirinên cuda hatibû kirin (bnr. Keskin 2019:81-82). Di vir de me hinek guhertinên piçûk kirin, lê çarçove dîsa wek xwe maye. Bêguman polînkirina xebatên folklora kurdî li gorî agahiyên nû dikare careke din bê kirin.

6 Ramazan Pertev di xebata xwe de bi mînakan vê têkiliyê nîşan dike. Ji bo xebatê bnr. Pertev, 2014.

7 Hemu hejmarên kovara *Jîn*ê tevî werger û tîpguheziya wê ku ji hêla M. Emin Bozarslan ve hatiye amadekirin wek 5 cîldan di 1985an de li Swêde hatiye çapkirin. Ev nivîs û agahiyên li vir ji wê çapê (Bozarslan 1985) hatine wergirtin.

8 Ji bo beyanname û bernameya komeleyê bnr. Belavoka Komela Kurd ji bo Zanînê. *Jîn* hj. 10. (Bozarslan, Jîn, c.2. 1985:489-494).

9 Di demên dawî de nimûneyên di van kovar û rojnameyan de ji nû ve hatine/tên çapkirin. Bnr. Serhedî (2018); Mukriyanî (2018); Xendekî (2018). Herweha nimuneyên ku di rojnameya Roja Nû de cih digirin jî ji aliyê me ve ligel nirxandinê di qebareya 3 cîldan de hatin/tên çapkirin. Bnr. Keskin (2019; 2021).

10 Ji bo çapxane û çalakiyên weşanên kurdî li Başûrê Kurdistan bnr. Hassanpour 1997.

11 Agahiyên berfireh derbarê Enstîtuyê di mapera enstîtuyê de cih digirtin (www.khi.krd), lê mixabin niha malper nikare bê dîtin (18.02.2022).

12 Derbarê Enstîtuyê agahî ji malpera wê jî dikarin bên wergirtin. https://www.artuklu.edu.tr/en/yasayan-diller-enstitusu/en-tarihce-history (18.02.2022).

13 Ji bo agahiyên berfireh derbarê Weqfê û xebatên wê bnr. https://www.wmezopotamyaye.org/ (19.02.2022).

14 Ev duwatebûn hîna di metnên kevin ên derbarê folklorê de jî hatine îfadekirin. Wek mînak bnr. Mason, 1891.

15 Tecrubeya me ya Zanîngeha Mardin Artukluyê wek mînak em dikarin bidin. Heya salên 2016-17an di bernameya Mastera Bêtez de tenê "edebiyata gelêrî" hebû. Lê jê û pê de ji bo ku ew tevlîhevî ji holê rabibe û hebûna folklorê wek sehayeke zanistî dîtbar bibe du dersên cuda hatin vekirin; *Destpêka Folklora Kurdî* û *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*.

16 Ev têkiliya derketin û belavbûna xebatên folklorê diyardeyek e. Di vê çarçoveyê de ji bo xebateke derbarê yên tirkî bnr. Öztürkmen (1998). Herweha xebata Ramazan Pertev (2018) jî di heman çarçoveyê de li ser xebatên kurdî diraweste.

17 Agahiyên berfireh ji malpera wan dikarin bên wergirtin. http://www.cioff.org/events-festival.cfm/en/4869/Serbia_-International_folklore_festival_ETNOFEST_-_Cacak (20.02.2022).

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Yüzyılda Kürt Folklor Çalışmaları: Mevcut Sorunlar ve Fırsatlar

Özet:

"Folk-lore" kelimesi, 19. yüzyılın sonlarında William John Thoms tarafından icat edildi ve kısa sürede edebiyatta yaygınlaştı. Yüzyılın sonuna kadar birçok Avrupa ülkesinde folklor dernekleri kurulmuş ve en eskileri *Folklore Society* ve *Folk-lore* dergisi olan folklor eserleriyle ilgili dergiler yayınlanmıştır. Folklorun çerçevesini, yöntemlerini ve çalışma alanlarını tartışmak için uluslararası kongreler düzenlendi. "Halk bilgisi" anlamına gelen bu kelime, söz konusu faaliyetler ile birlikte, bu "halkın bilgisi" üzerine çalışmalar yapan bölüm adı haline gelmiştir.

Elbette folklor çalışmalarının gelişimi, ulusal duyguların yayılması ile doğrudan ilişkiliydi ve dolayısıyla Avrupa'nın ve dünyanın farklı yerlerinde, halklarının "ruhunu" ortaya çıkarmak isteyen aydınlar folklor ve özellikle de halk edebiyatı çalışmalarına yöneldiler. Dolayısıyla bu döneme ait eserlerin çoğu daha çok halk şiiri ve hikayeleri, mitler, efsaneler ve mitoloji üzerinedir.

Milliyetçi fikirlerin gelişmesiyle birlikte 20. yüzyılın ilk çeyreğinde Türk aydınları arasında da folklor ve folklor çalışmalarının önemi ile ilgili fikir ve yazılar ve beraberinde derleme çalışmaları ortaya çıktı. İstanbul'daki Türklerle aynı siyasi ve kültürel ortamda yaşayan Kürt aydınlar arasında da benzer düşünce ve ortaya çıkmaktadır. Dil ve *halka dönüş* konusu, kültürel ve halkbilimsel unsurların toplanması tartışılmaktadır. Ancak I. Dünya Savaşı'nın patlak vermesiyle bu tartışmalar yarıda kaldı. Savaşın bitmesi ve Osmanlı devletinin yenilgiye uğramasının ardından Kürt aydınları siyasi ve kültürel faaliyetlerine yeniden başladılar. Bu dönemin en çarpıcı örnekleri *Kürt Kalkınma Derneği (Kürd Tealî Cemiyetî)* ve *Jîn* Dergisi'dir.

Jîn'in sayfalarında Kemal Fewzî, Law Reşîd ve Hilmiyê Sêweregîye ait halk edebiyatı çalışmalarının ilk örneklerine rastlıyoruz; Aynı dergide Kürt edebiyatı ve kültürü ile ilgili materyallerin derlenmesiyle ilgili fikirler de yayınlanmaktadır. Elbette onlardan önce August Jaba'nın yardım ve rehberliğinde ve Kürt folklor tarihinde önemli bir yere sahip Mele Mehmûdê Bazidî'nin çalışmalarına ve oryantalist, misyoner ve Avrupalı bilim adamlarının derlemelerine rastlamaktayız. Ancak Kürt folkloru ile ilgili çalışmalarının açık bir amaç ve hedefle *Jîn* döneminde başladığını söyleyebiliriz.

Osmanlı İmparatorluğu'nun dağılması ve Türkiye Cumhuriyeti'nin kurulmasıyla birlikte Kürtler de dağıldı; siyasi faaliyetleri başarısız oldu ve 1930'larda çeşitli merkezlerde yeniden folklor ve halk edebiyatı çalışmalarına yöneldiler. Şam ve Beyrut'ta yayınlanan *Hawar*, Ronahî ve *Roja Nû*'da yer alan halk edebiyatı türleri; Erivan'daki derleme çalışmaları ve Yine Irak Kürdistanı'ndaki derleme çalışmaları bazı örneklerdir.

Kürt aydınlarının da folklor çalışmalarına geç başlamadıkları görülmektedir; ancak içinde bulundukları koşullardan ötürü bu çalışmaları diğer çevre halkların çalışmalarına nazaran daha zayıf bir durumda kalmışlardır. Elbette bu zayıflık, son yıllara kadar Kürtlerin genel siyasi durumuyla ilgiliydi. Ancak bize göre bu, Kürt folklorunun sorunlarını ve zayıflığını tek başına açıklamaz. Kürtlerin siyasi durumu ve bunun folklor çalışmaları üzerindeki etkisinin yanı sıra, *akademi, örgütlenme* ve *uygulama* ile ilgili konular olarak adlandırılabilecek folklor alanının kendisiyle ilgili sorunları da vardır. Öte

yandan, Kürt folklor çalışmalarını iyi bir seviyeye getirmek için başka fırsatlar da bulunmaktadır.

Bu bağlamda bu makalede folklor çalışmalarının mevcut durumu sunulacak ve ayrıca Kürt folklor çalışmalarının sorunları ve fırsatları tartışılacaktır.

Anahtar Sözcükler: *Kürt Halk Bilimi, Dergi, Kurum, Sorun, Fırsat.*

Kurdish Folklore Studies in the 21st Century: Existing Problems and Opportunities

Abstract:

The compound word "folk-lore" was coined by William John Thoms in the late mid-19th century and soon became widespread in literature. Until the end of the century, folklore societies were established in many European countries and journals related to folklore studies were published, the oldest of which is the *Folk-lore Society* and its journal *Folk-lore*. International congresses were held to discuss the framework, methods, and areas of work of folklore. Through these activities, the word that meant “knowledge of the people” became a name of the field study that works on this “knowledge of the people”.

Of course, the development of folklore studies was directly related to the spread of national feelings and therefore the intellectuals of different peoples of Europe and the world who wanted to express the "soul" of their nations entered the field of folklore studies and especially the folk literature of their peoples. Hence most of the works of this period are more on folk poetry and stories, myths, legends, and mythology.

With the development of nationalist ideas, in the first quarter of the 20th century, ideas and writings about folklore and the importance of folklore work became available among Turkish intellectuals, as well as collection-related work. The same thoughts and ideas are shared with Kurdish intellectuals living in the same political and cultural environment as Turkish ones in Istanbul. The issue of language and return to the public, the collection of cultural and popular elements was discussed. But with the outbreak of World War I these debates were halved until the end of the war. After the end of the war and the defeat of the Ottoman state, Kurdish intellectuals resumed their political and cultural activities. The most striking examples of this period are the *Kurdish Development Association* /(*Kurd Tealî Cemiyetî*) and its semi-official journal *Jîn*.

In the pages of *Jîn* we actually find the first examples of works of folk literature such as those of Kemal Fewzî, Law Reşîd and Hilmiyê Sêweregî; In the same magazine, ideas about the collection of materials related to Kurdish literature and culture are also published. Of course before them we come to the collection of Mele Mehmûdê Bazidî with the help and guidance of August Jaba and the collections of orientalists, missionaries and European scholars who are important in the history of Kurdish folklore. However, we can say that the works related to Kurdish folklore start with a clear purpose and with a clear knowledge during the publication time of *Jîn*.

With the disintegration of the Ottoman Empire and the establishment of the Republic of Turkey, the Kurds also dispersed; their political activities failed and in the 1930s they once again turned to folklore and popular literature at various centers. Examples of popular literary genres are published in *Hawar*, *Ronahî* and *Roja Nû*, published in Damascus and Beirut; collections and publications in Yerevan; again the compilation work in Iraqi Kurdistan are some examples.

It can be seen that Kurdish intellectuals also started working on folklore not too late; however the conditions under which their work against those of the surrounding peoples was weakened. Of course this weakness was mainly related to the general political situation of the Kurds until recent years. However, in our view, this alone does not explain the problem and the weakness of Kurdish folklore studies. Apart from the political situation of the Kurds and its impact on the work of folklore, there are also issues related to the field of folklore itself which can be referred to as issues related to *academia, organization and implementation*. On the other hand, there are other opportunities to regulate the field of Kurdish folklore.

In this context, in this article, the current state of folklore studies will be presented and in addition, the problems and opportunities of Kurdish folklore studies will be discussed.

Keywords*: Kurdish Folklore, Journal, Institution, Problem, Opportunity.*

PIRNAVÎYA CUREYÊN VEGÊRANA GELÊRÎ Û NESTANDARTBÛNA WAN DI KURDÎYÊ DE

Dr.kenan Subaşı
Beşa Ziman û Çanda Kurdî- Zanîngeha Mardin Artuklu/ Turkîya

PUXTE:

Folklor wate bi maneya xwe zanista gel, dîsîpleneke berfireh û piralî ye. Ev zanist afirandin û jinûveafirandinên berdewam ên mirovan vedikole ku ew bi rêya neqilkirina zimanî û teqlîdê di warê zanîn, fikir û hunera gel da pêk tên. Bêguman ne pênaseyek ne jî nêrîneke yekalî dê tu carî têrî têgehiştina vê zanistê neke. Peywendîya wê bi zanistên din re, qadên ku lê parve bûyî, karîgerîya wê û gelek babetên din hêjayî nirxandinên kûr in bo têgihiştina folklorê. Loma ji nîveka duyem a sedsala 19an bigirin ta niha ji bo têgihiştina folklorê gelek xebat, komxebat, kongreyên navneteweyî pêk hatine. Di van xebatan da ji alîyê pênase, naverok, şêwaz û tesnîfê ve gelek xebat rû dane. Folkor xisûsen piştî ku weku dîsîplînekê hatîye nirxandin, hewcedarî bi polînkirina keresteyên wê hatîye û gelek ceribandinên polînkirinê bo hatine pêkanîn. Di nav Kurdan da xebat û ceribînine bi vî rengî di nîveka ewil a sedsala 20an da çê bûne. Lê ji ber qutbûn û dewamnekirina van xebatan û parçebûna Kurdistanê û peywendîya lawaz a di nav Kurdan da û nebûna perwerdeya bi Kurdî hê jî standardek di warê pênasekirin, polînkirin û navdanîna keresteyên folklorê da çênebûye. Ev xebat nîqaşa vê standartnebûnê ye ku êdî weku pêwîstîyeke sereke xwe bi vê qada Kurdî dide hîskirin. Qada lêkolîn û nirxandina vê gotarê bi keresteyên devkî anku bi edebîyata gelêrî hatîye sînorkirin ku ew jî weku sê pişkên sereke; vegêrana gelêrî, helbesta gelêrî û yên derveyê van hatîye senifandin. Di nav van pişkan da ji bo vê gotarê dê bi tenê vegêrana gelêrî û cureyên wê bê nîqaşkirin. Hewcedarîya pênase, polînkirin û navdanîna standart a keresteyan encama netewebûnê ye. Çimkî di nav Kurdan da bi awayekî herêmî jixwe heya îroj navek li keresteyên folklorî dihat kirin û bi awayekî lokal û teng civakên Kurdan di nav xwe da hev li ber dixistin ku mebest ji van cure û keresteyan çi ye. Lê îroj heke em Kurdan weku neteweyeke yekpare û Kurdî jî zimanê vê neteweyê qebûl bikin, em mecbûr in ji bo standardîzasyona di vî warî da kar bikin. Bi vê armancê di vê xebatê da ji berê (nîveka yekem a sedsala 20an) heya niha xebatên li ser folklora Kurdî yên weku xebatên folklorî yên Kurdên Kavkazê, kovara *Hawar*, *Ronahî*, *Asoy Folklor*, *Folklora Kurdan*, xebatên Enstîtuya Keleporî Kurdî û xebatên Weqfa mezopotamyayê (*Folklora Me*, *Folklor û Ziman* û Komxebata Termînolojîya Folklorê) weku bingeh hatîye hilbijartin. Li gorî van xebatan hin tesbît û encam hatine danîn û ceribîneke navdanînê ya van cureyan hatîye kirin û weku pêşnîyaz hatîye parvekirin.

Peyvên Serekî: *Folklora Kurdî, Vegêrana Gelêrî, Polînkirin, Cure, Navdanîn, Standardîzasyon*

Destpêk:

Folklor wate bi maneya xwe zanista gel, dîsîpleneke berfireh û piralî ye. Ev zanist afirandin û jinûveafirandinên berdewam ên mirovan vedikole ku ew bi rêya neqilkirina zimanî û teqlîdê di warê zanîn, fikir û hunera gel da pêk tên. Bêguman ne pênaseyek ne jî nêrîneke yekalî dê tu carî têrî têgehiştina vê zanistê neke. Peywendîya wê bi zanistên din re, qadên ku lê parve bûyî, karîgerîya wê û gelek babetên din hêjayî nirxandinên kûr in bo têgihiştina folklorê. Loma ji nîveka duyem a sedsala 19an bigirin ta niha ji bo têgihiştina folklorê gelek xebat, komxebat, kongreyên navneteweyî pêk hatine. Di van xebatan da ji alîyê pênase, naverok, şêwaz û tesnîfê ve gelek xebat rû dane. Folkor xisûsen piştî ku weku dîsîplînekê hatîye nirxandin, hewcedarî bi polînkirina keresteyên wê hatîye û gelek ceribandinên polînkirinê bo hatine pêkanîn.

Di nav Kurdan da xebat û ceribînine bi vî rengî di nîveka ewil a sedsala 20an da çê bûne. Xisûsen di nav Komaleya Kurd ji bo Belavkirina Zanînê û Weşanan (Kürd Tamim-i Maarif ve Neşrîyat Cemîyeti) da gavên ewil hatine avêtin û hewldana berhevkarî û polînkirina keresteyên folklorê hatîye dayîn û heya radeyekê jî bi ser ketine. Lê ji ber şertên konjokturel ên wê serdemê komaleyê nekarîye karên xwe yên di vî warî da bidomîne û xebatên wan ên li ser folklorê nîvco mane (bnr. Yıldırım û yên din: 2013: 60-61). Lê di çarçoveya vê gotarê da ji bo me xala herî balkêş a xebatên vê komaleyê ew e ku lîteratur bi piranî bi zimanê Tirkî hatibû danîn. Loma xebatên komaleyê ji bo binavkirin û standartkirina cureyên folklorê dê zêde mifadar nebe. Piştî vê qonaxê li nav Kurdên Kavkazê bi destpêka salên 1930yî û dîsa di heman salan da di nav Kurdên Bakur ên li bin xetê yên ku li derdora kovara *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû* berhev bûbûn û helbet di nav Kurdên Başûrê Kurdistanê da yên ku li dora kovarên *Zarî Kirmancî* û *Gelawêj*ê kom bûbûn, xebateke mezin bo berhevkarî, polînkirin û weşandina keresteyên folklorî hat kirin. Xisûsen di nav Kurdên Kavkazê da bi awayekî zanistî di enstîtuyên Akademîk da weku dîsîplîneke serbixwe kar û xebatên folklora Kurdî dihatin kirin ku cara ewil "folklor" weku çemk li cem Kurdên Kavkazê ketîye lîteratura Kurdîyê û paşê di nav kovara *Hawar*ê da jî hatîye bikaranîn. Helbet bi demê re ev çemk belav bû û gelek xebatên li her çar parçeyên Kurdistanê bi vî navî kereste berhev kirin û çap kirin.

Digel xebatên berhevkarîyê weku me got ji salên 1930yî û pê da ji alîyê navdanîn, pênase, polînkirinê jî xebat hatin kirin. Di vî warî da bi zimanê Kurdî polînkirina ewil di nav Kurdên Kavkazê da hatîye kirin û paşê herçiqas bi zanebûnî nebe jî di nav kovara *Hawar*ê da li gorî berhevkarî û weşana keresteyan polînkirinek pêk hatîye. Digel wê lêkolînerên weku Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Îzedîn Mistefa Resûl, Şukrîye Resûl gelek kesan polînkirina keresteyên folklorê ceribandine. Lêbelê heya îroj jî ji hêla navdanîn, pirnavî, polînkirin û pênaseya cureyên folklorê ve gelek arêşe hene ji bo Kurdîyê. Bêguman weku parçebûna Kurdistanê, nestandarbûna zimanî, tesîra zimanên Erebî, Tirkî û Farisî, pirdevokî û pirzaravayî, qutbûna peywendîyê ya lêkolînerên di vê qadê de, neberdewamîya xebatan weku kronolojîyekê û hêj gelek sedemên din karîger in di vê standartnebûnê de. Helbet ji bilî van sedemên hejmartî hin sedemên derveyî me Kurdan hene ku bi giştî li cîhanê di qada folklorê da weku arêşe derdikevin pêş ku ew jî têkelhevîya cureyan û kêmasîya pênase û negihiştineke encameke teqez e. Wisa dîyar e ku di qadeke bi vî rengî da dê ev şêlûbûn heya radeyekê her hebe. Çimkî di qada zanistên sosyal da mimkûn nîne meriv sedîsed encamên teqez bi dest bixe.

Digel van hemû arêşeyan xebatên Kurdî yên di qada folklorê da berdewam in û ji van xebatên dawî yek jê xebata Necat Keskin (2019) e ku wî hem pênase hem jî senifandin û navdanîneke nû anîye. Me jî di vê xebatê da polînkirina wî ya edebîyata gelêrî esas girt û em li ser vegêrana gelêrî û cureyên wê li gorî polînkirina wî tevgerîyan. Loma em ê di vê xebata xwe da xwe bi pişka vegêrana gelêrî sînor bikin û bêtir bala xwe bidin ser pirnavîya cureyên vegêrana gelêrî û nestandarbûna wan a di Kurdîyê de.

Herwiha divê bê destnîşankirin ku di vê xebatê da ji bo sepandin û nîşandana pirnavî û nestandartbûna cureyên vegêrana gelêrî li ser çend xebatên sereke lêkolîn hatîye kirin. Di serî da xebatên Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl ên di vî warî de, xebatên Hecîyê Cindî û Emînê Evdal di para Kurdên Kavkazê da bûn. Herwiha ji ber giringîya xwe weku qonaxek weşanên birayên Bedirxanî; *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* jî çavkanîyên sereke yên vê xebatê bûn. Xisûsen ji bo zaravayê Soranî jî xebata Îzedîn Mistefa Resûl, Şukrîye Resûl, xebatên Enstîtuya Keleporî Kurdî û Biwar Nûredîn, kovara *Asoy Folklor* çavkanîyên li ber destên me bûn. Weku din xebatên folklorê yên van salên dawî ku li Bakurê Kurdistanê pêk hatine weku xebata Kadri Yıldırım û hevalên wî, xebata Necat Keskin, xebatên weşanxaneya Wardozê, xebatên Weqfa Mezopotamyayê, kovarên *Folklora Kurdan* û *Folklora Me* jî çavkanîyên sereke bûn bo vê lêkolînê.

1. Vegêrana Gelêrî

Di pênaseya vegêranê da Roland Barthes balê dikişîne ser du xalan ku ya yekem; vegêran di esasê xwe da ji dîroka mirovahîyê û pê ve di her civakê da hebûye. Li gorî wî li tu derê û di tu wextî da civakeke ku bê vegêran jîyabe tuneye. Xala duyem jî wisa nîşan dike ku di cîhanê da şêwazên bêsînor ên vegêranê hene ku ev yek ji ber pirbûna cureyan pêk tê. Çimkî ji cureyên devkî bigirin heta cureyên nivîskî, ji dîmenên kînetîk bigirin heta yên statîk, hemû jest û cureyên têkel vegêranekê dihewînin (vgz. Jahn, 2015: 48). Îcar di qada edebîyata gelêrî da beşeke sereke jî vegêrana gelêrî ye ku li ser heft beşan hatîye parvekirin ku ev beş weku mît, efsane, çîrok, pêkenok, destan, hîkayet û serpêhatî ji hev cuda bûne (Keskin, 2019: 154-259).

Di nav xebatên Kurdî da vegêrana gelêrî bixwe hêj negihiştîye standarta navî ku jê re pexşan, vegotinên gelêrî, proza hatîye gotin û heta di hin xebatan da edebîyata gelêrî nehatîye dabeşkirin û wek yekûnek di nav xwe da dabeşî cureyan bûye. Yanî navê vegêrana gelêrî û dabeşkarîya bi wî rengî ya edebîyata gelêrî jî di nav Kurdan da negihiştîye standardekê. Li gorî me edebîyata gelêrî li gorî formên xwe weku vegêran, helbest, gotin dabeşî sê parên sereke bibe dê ji bo hêsankirina xebatên di vê qadê da mifadar be. Herçiqas nîqaşa “hin cureyên helbestkî lê vegêran in” hebe jî ku kilamên şer, qaremanî û dildarîyê dikevin nav çarçoveya vê nîqaşê.

Bêyî ku em zêde dirêj bikin em ê niha yek bi yek heft cureyên vegêrana gelêrî bi pirnavîyên wan, arêşeyên pênaseyên li ser wan û nestandartbûna wan a cureyî û navî ya di nav xebatên folklora Kurdî da nîşan bidin.

1.1. Mît

Mît bi gelek rengên xwe di nav jîyana mirovî da bi şikil û şêwazên cuda berdewam tên veguhastin. Di cil û bergan de, di xwarinan de, di bawerî û rabûn û rûniştina mirov û civakekê de, helbet di gotin û qewl û sêwir û xeyala mirov, civak û neteweyan da bi temsîl û tezahurên xwe ji nû ve xuya dibin. Carinan dimirin, carinan ji nû ve tên zindîkirin. Yek ji sedema herî giring a zindîkirin û zindîgirtina mîtan, bawerîya

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

bi wan û fikirîna bi rêya wan e. Mirov bi wan bawer dikin, pîroz dihebînin, jîyanê dinirxînin û loma dipejirînin û diparêzin. Ew di demeke gelek qedîm da ji roja ku mirov hebûnê meraq kirine, pirsîne, vegêrane û pê ve çêbûne. Bi piranî li ser afirandinê hatine veguhastin; afirîna Xweda û Xwedavendan, kaînatê, mirovan, siruştê, ajelan, gihayan, zimanan, neteweyan, hukûmdaran, lehengan û hwd. (Eliade, 2001: 15-16) Weku Claude Levi-Strauss (2013: 26) jî gotî mît şêwaza fikirîn û îdraqkirina mirovê seretayî yê li ser van meseleyên (afirandinên) navborî bûye.

Ev cure di kurdî da zêde ji cureyên weku efsane û çîrokê nehatîye qetandin. Heta gelek kêm xebat li ser hatine kirin û keresteyên berhevkirî pir kêm di bin navê vî cureyî da hatine destnîşankirin. Ev bêtir di bin navê qewlên Êzdîyan û kelamên Yarsanan da hatine veguhastin. *Qewlê Zebûnî Meksûr*, *Qewlê Afirîna Dinyayê* û *Kelama Xan Elmas Loristanî* ya li ser afirandinê ji bo vê yekê nimûne ne (Kreyenbroek, 1995: 170-192; Loristanî, 69-71). Herçiqas Alan Dundes (1997: 76) û William R. Bascom (2006: 116-117) ferq û cudahîyê xistibin nav mît, efsane û çîrokan jî di Kurdî da em vê ferqê pir şênber nabînin. Îzeddîn Mistefa Resûl (2010: 15) dema qala efsaneyê kirîye di ber da qala mîtolojîyê kirîye û gotîye ku di nav efsaneyan da gelek mît û tezahurên wan xuyanî ne lê mîtolojîya tiştekî cuda ye ji efsaneyê. Kemal Fewzî (1918:7-10) dema ku behsa giringîya dîrok û mîtolojîyê dike, li wir mînaka çîrokan û efsaneyan û tezahurên mîtan di wan da nîşan dike. Pitir mîtan weku efsane dinirxîne. Dîsa di nivîseke bi navê “Rengvedana Efsanê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da” M. Şivan Circîs (2019: 92-101) qesd ji efsaneyê behsa mît û mîtosê dike û heta dibêje ku di Erebî da ev weku “esatîr”, di Yewnanî da “myth” an jî “mythos” e. Herwiha bi berfirehî qala pênase û senifandinê dike û paşê mînakên weku Rostem, Sîmirx, dêw, perî û hwd. rêz dike. Bi navê “Çîrokên Çêbûna Sewalan” Mustafa Gazî (2016: 25-27) jî qala afirîn û çêbûna sewalan dike ku nêzî vê nêrînê Mehmet Emin Bozarslan (2006: 3) jî berhevkarîyeke li ser afirandin û çêbûna lawiran bi navê *Meselokên Lawiran* bi nav kirîye. Dîsa Şukrîye Resûl (2008: 5-6) navê mîtê bi zar nekirîye di xebata xwe da. Herwiha wê rasterast dîyar nekiribe ku ev cureyekî mîtan e jî weku cureyekî pexşanê “Efsaneyî Cadûgerî” sernavek danîye ku bêtir em dikarin mîtan di nav senifandina Ş. Resûlê da di wî qismî da bi cih bikin. Di kitêba *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî* da dema ku binbeş û cureyên edebîyata gelêrî hatîye senifandin qala mîtan weku cureyek nehatîye kirin (Yıldırım û yên din: 2013: 143-144). Lê beravajî vê xebatê Necat Keskin (2019: 156-167) di xebata xwe ya bi navê *Folklor û Edebîyata Gelêrî* da mît weku cureyekî serbixwe nirxandîye û bêtir vegotinên li ser afirandinan tê da bi cih kirîye û qala metnên Êzdîyan ên li ser afirandinê kirîye.

Ji van mînakên navborî xuyaye ku mît weku cureyekî serbixwe heya ku ji hêla Necat Keskin ve nehatîye destnîşankirin, di nav xebatên Kurdî de di şûna navê vî cureyî da bêtir navên efsane, çîrok, meselok, qewl, kelam hatîye gotin. Bêtir jî weku efsane hatîye binavkirin. Lê li gorî me divê mît ji efsane û çîrok û qewlan cuda û bi serê xwe weku cureyek bê nirxandin û bêtir ew vegêranên li ser afirandinan weku mît bên pejirandin.

1.2. Efsane

Çawa ku demeke berî mîtan tuneye. Wisa demeke ne berî ne jî piştî efsaneyan heye. Hin efsane her dem dijîn. Hejmara efsaneyan pir zêde ye. Bes bala li ser li gorî vegêranên din kêm e. Digel ku pareke wan a pir kêm rast be jî wisa xwe dide bawerkirin

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆڵینێن کوردی

ku bi her awayî rast e. Li gorî cureyên efsaneyan rêjeya rastîyê di wan da bi vî rengî tê dabeşkirin: Rastî kêm peyda dibe, rastî nîvenîv e an jî tu nîşaneyeke rastîyê tê da tunene. Ji dêvla kêf û şahî û wextderbaskirinê, tirs pêkara efsaneyan a herî giring e. Di nav rabirdûyeke nêzîk da û bi piranî di nav cîhana îroyîn an şibhî wê da pêk tên (Bascom, 2006: 114, 116-117, 121). Her du cîhan (dunyewî û îlahî) di efsaneyan da digel hev tên vegêran û ev telaşek pêk tîne. Tirsa cîhana xeybî vê telaşê pêk tîne. Menqibe (legende) anku keramet û mucîze nêzî efsaneyan an jî cureyek ji efsaneyan tên hesibandin (Luthi, 2006: 220-221).

Ji bo pêbawerîya efsaneyan delîlên xurt tên pêşkêşkirin. Mesela gotinên bi vî rengî “Min bi çavên serê xwe dîtin.”, “Ez li wir bûm.”, “Hate serê min.” Tên gotin an jî navê hin şahidan tê dayîn, dem û cih tê nîşankirin. Efsane balkêş in û vegêrana hadîseyên biendîşe di xwe da dihewînin. Li gorî serdemê dirûv diguherin û bi rastîyê re peywendîdar in (Buch, 2006: 226).

Efsane vegêranên kurt in. Lewma li gorî çîrokan ji alîyê morfolojîk ve ji kêm yekeyan pêk tên. Hin rêbazên morfolojîk ên çîrokan dibe ku li efsaneyan jî bê sepandin. Lê bi piranî ne wisa ye (Pentikainen, 2006: 235). Li gorî Linda Dégh (2019: 208) vegêran tunebe yanî gotin tunebin jî efsane çê dibin anku bi texlîdê jî efsane tên çêkirin. Bo nimûne pîrozkirina tiştek dibe ku bibe efsane. Di nav Kurdan da dema ku nan li erdê bibînin divê maç bikin û daînin cihekî bilind. An jî efsaneya nezerê û çav dîsa çend nimûne ne bo efsaneyên derveyî vegêranê.

Herçiqas ji hêla gelek lêkolîneran ve handanekê bo jihevqetandin û polînkirina cureyên weku efsane, mît, çîrok hebe jî di gelek senifandin û xebatan da sînorên wan baş ji hev nehatîye qetandin, heta têkelhev bûye. Li gorî Keskin (2019:167-168,175) jihevqetandineke sedîsed ne mimkûn e ku li gorî me jî ev nêrîn di cih da ye. Çimkî weku çandeke devkî ya havpar ev vegêran giştî di bin tesîra hev da mane û berdewama hev bûne. Lê ji bo xebatên maqûl li ser wan bên kirin, bêguman divê polînkirinek jî hebe. Axir di gelek polînkirinan da jî dîsa ev sînor têkelhev bûye.

Dema em bala xwe didin xebatên folklorê yên di nav Kurdan da bi piranî efsane ji bo çîrok û hîkayet û mîtan hatîye binavkirin. Di nav kovara *Asoyî Folklor* da çend nivîs derbarê efsane, pênaseya wê û cureyên wê da hene. Di hejmara 49em û nivîsa “Rengdanewey Ayînî Îslam le Efsaney Kurdî da” hatîye gotin ku hêj jî di nav Kurdan da ev çemk têkelhev bo her deqekî edebî tê gotin û hêj Kurdan standartek danenîne. Lê li gorî vê nivîsê divê “efsane” weku navekî giştî bê hesibandin û “efsaney Xwawendekan” jî taybet bo mîtan bê gotin. Jixwe ji pênase û senifandina nîşankirî ya di vê nivîsê da tê famkirin ku gelek cureyên vegêrana gelêrî weku efsane hatine destnîşankirin (Ehmed, 2010: 27-38). Dîsa di heman hejmarê da efsane û hîkayet hatîye berawirdkirin û hin ferqên wan hatine gotin ku efsane ji rastîyê dûr, xeyalî, fantastîk û nimûneyên gelek kevin û ewil in. Her wekî efsane weku çîrokên derasayî hatine nirxandin û hîkayet jî weku çîrokên asayî hatine nirxandin (Elî, 2010: 24-26). Bi heman şêweyê Xalid Cotyar (2005: 93-96) jî efsane weku hîkayetên sêhrî û cadûgerî nirxandine ku lehengên wan ji dêw, dirinde û balindeyên sêhrî pêk tên. Lê dîyar e ku di heman hejmarê da Sellah Omer (2005: 98-99) efsane weku mît û mîtos nirxandîye. Di hejmara sêyem da jî nivîseke bi navê “Efsane û Hîkayetî Lêkderewey Gîyandaran li Edebî Millî da” hatîye belavkirin ku li vir efsane di maneya “legend”a îngilizî da hatîye bikaranîn ku li gorî me ya maqûl ev e (Şareza, 2001: 86-92). Dîsa jî di seranserê kovara navborî da weku beşeke sereke

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

“efsane” hatîye danîn. Bi piranî di bin vê beşê da vegêranên sêhr û derasayî yên weku “Balindey Efsûnawî, Paşay Kore, Hesenê Genc, Îfrîtê Ecindan, Bextîyar û Pîredak, Şazadey Asik, Gawanî Xewkir û hwd.” ku li cem Hecîyê Cindî û Emînê Evdal (2015: 5-6; 2008: 551) ev nimûne weku “hikyat” hatine binavkirin û li cem Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl (1978/II: 185,199) weku “Proza” û di bin da jî weku “çîrok” hatine binavkirin. Xisûsen em di berhema Cindî û Evdal da bi navê efsaneyê nahesin. Herçiqas birayên Celîl di pêşgotina xebata xwe da di nav keresteyên berhevkirî de navê “efsene”yê bi kar anîbin jî di polînkirin û sernavên wan de em rastî vê çemkê nayên û herwiha rast li nimûneyên wê jî. Herçiqas wan sernavê giştî weku “qelîbotk, mijûlî û çîrok” danîbe jî em dibêjin qesda wan a çîrokan bi îhtimaleke mezin vegêranên derasayî ne. Şukrîye Resûl (2008: 6) bi navê efsane sê cure hejmartine weku “efsaney cadûgerî, efsaney serguzeşte, efsaney jîyan” ku em ji vir têdigehin ku mît, efsane, hîkayet û çîrok û serpêhatî giş di bin van sernavan da nirxandine. Îzedîn Mistefa Resûl (2010: 15-24) bi heman şêwazê efsaneyê di maneya vegêranên sêhrî û derasayî da bi kar anîye. Di gotina wî ya efsaneyê da xisûsen qesdeke wî ya ji bo menqibe û legendan meriv pê nahese. Jixwe ferqa efsane û çîrokê weku yek neasayî û xeyalî be û ya din rasteqîn, asayî û jîyanî be nîşan daye.

Di kovara *Folklora Kurdan* da bi navê efsaneyê nivîsek nehatîye nivîsîn û tenê em efsaneya pepûkê û çend efsaneyên din ên çêbûna sewalan bi navê “Çîrokên Çêbûna Sewalan” dibînin (Gazî, 2016: 25-27). Lê di kovara *Folklora Me* da em di hejmara yekem, duyem, çarem, heftem û nehem da derbarê efsaneyê da çi lêkolînî bin çi berhevkarî bin, xebatan dibînin. Di hejmara yekem da Surya Human (2019: 51-52) efsaneyekê li herêma Qurmikê ku li ser kesekî bi navê Êlê Şaze hatîye gotin bi zazakî tomar kirîye ku li vir em dibînin efsaneyê di maneya xwe ya esil da bi kar anîye. Dîsa Elîf Gun (2020: 14-15) di hejmara çarem a heman kovarê da efsaneyeke li ser çalekê bi navê “Efsaneya Çala Hakloyê” ji devera Midyadê berhev kirîye ku naverok û navê cureyî li hev in. Di heman hejmarê da Surya Human (2020: 66-67) li ser efsaneyê û pênase û senifandina wê sekinîye û efsaneya “Kekoyî” yan jî “Pepûke” bi zazakî neqil kirîye. Li vir efsaneyê beramberî “mît û mîtos”a Yewnanî û “ustûre”ya Erebî bi nav kirîye. Herçiqas cureyê ku berhev kirîye weku efsane bi awayekî durist bi nav kiribe jî, ji pênase û senifandina wî dîyar e ku tevlihevîyeke navî li cem wê jî heye. Heman vegêrana ku Surya Human bi zazakî bi navê “Pepûke” qal kirîye, di hejmara heftem da Mahîr Ugur (2020: 38-40) weku “Çîroka Papûke” bi Kurmancî ji herêma Meletîyê berhev kirîye û bi navê çîrokê bi nav kirîye. Di hejmara nehem a kovara *Folklora Me* da Zeyneb Yaş (2021: 11-13) efsaneyekî keviran bi navê “Efsaneya Mem Şivanê Mîrê Mirazan” tomar kirîye ku navdanîn û naveroka metnê hevgirtî ye û li gorî pênaseya efsaneyê ye. Axir dîyar e ku hevgirtineke berçav heye di kovara *Folklora Me* de. Lê dîsa binavkirina efsaneyekê weku çîrok an jî pênasekirina wê ya weku mît ku ji alîyê edîtor ve hîç nîşeyek lê nehatibe danîn, tevlihevîyekê û nestandartiyekê nîşanî me dide.

Dema em berê xwe didine xebata Biwar Nûredîn (2004: 16) ku li ser navê Enstîtuya Kelepûrî Kurdî xebatek weşandîye, tê da senifandineke ku herweku enstîtu jî qebûl kirîye destnîşan kirîye û di vir da efsane û çîrokê ji hev cuda nîşan daye. Lê bes hîç behsa mîtan nekirîye. Wisa xuyaye ku wî jî efsane û mît weku hevçeşnekê nirxandîye. Dîsa di heman xebatê da di beşa pexşana folklorîk da navê çend berheman destnîşan kirine ku ev weku “Têkstî Heşt Çîrokî Efsaney Kurdî” ya Tarîq Cembaz, “Çîrok û Efsane le

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Edebî Kurdî da” ya Salih Ruşdîyî, “Efsaney Şêtoke û Eqloke” ya Mexdîd Rewandizî, “Kawe û Newroz... Efsane û Bîrê Nwê” ya Ehmed Zerdeşt, “Tarmay Efsaney Kurdî” ya Xalid Cotyar û gelekên din in (2004: 108-125). Lê ji nav û naveroka van berheman jî tê famkirin ku di nav xebatên Soranî de jî efsane geh li beramberî navê çîrokê geh li beramberî navê mîtosê hatîye neqilkirin û têkelhevîyek pêk hatîye.

Dîyar e ku efsane li cem Kurdan bêtir di şûna mît û çîrokên derasayî da hatîye bizarkirin ku lehengên wan bi piranî sêhrbaz û efsûnî ne. Kêmek jî di wateya serê sernavê da dîyarkirî hatîye bizarkirin. Li gorî me bizarkirina efsaneyê di şûna mît û çîrokên efsûnî da ku wan jî para xwe ya mezin ji mîtolojîyê wergirtîye, ne belasebeb e. Çimkî di Farisî bixwe da jî efsane di şûna çîrokên derasayî û cadû û dêwan da hatîye neqilkirin û herçiqas di Farisî da “mît” weku “ustûre” hatibe gotin jî em dizanin ku ustûre peyveke Erebî ye. Loma pir mimkûn e di Farisî da peyva efsane hatibe terikandin û di şûna wê da ustûre hatibe bizarkirin. Di nav Kurdan da jî dema em bala xwe didine dîwana Ehmedê Xanî em dibînin ku efsane di şûna vegêrana dêrîn a weku çîrokê da hatîye bizarkirin ku ew qisim wiha derbas dibe:

“Hindek ji efsaneê Bohtan
Hindek di behaneê buhtan” (Yıldırım, 2010: 40)

Lê îroj ji ber berfirehbûna dîsîplîna folklorê û jihevcudabûna morfolojîka a cureyan hewcedarî çêbûye ku mît, efsane û çîrok weku sê cureyên cuda ji hev bêne cudakirin û binavkirin. Loma li gorî me ya herî durist ew e ku em çemka “efsane”yê li beramberî “legend”a Îngilizî bi kar bînin û ew vegêranên ku bi baweriyê re pir peywendîdar bes ji çîrok û mîtan cuda di bin vî sernavî de nîşan bidin.

1.3. Çîrok

Gotineke giştî ya vegêrannasan heye ku dibêjin her çîrokek (serpêhatîyek), vegêranek e û mirov ji roja ku li ser rûyê dinê bi mirovên din re peywendî danîye û heya niha teşneyê vegêrana serpêhatîyên xwe bûye. Çîrok jî ji wê rojê ve ye li ser zar û zimanê mirovan e. Li vir helbet çîrok di maneyeke berfireh a vegêranê da hatiye bikaranîn. Lê kifş e ku îroj weku cureyekî “çîrok” bixwe jî ji vê vegêranê nizilîye. Loma ji mîtolojiyê bigire heya her texlîd motîfek di çîrokên gelêrî de xuyane ku ji wê dêrînîyê nifş bi nifş bi xwe ra veguhastiye. Lê îroj bi binyat û forma xwe bûye cureyekî ji cureyên vegêrana gelêrî û herwiha cureyê herî berbelav û pirnimûne. Wisa bûye ku kesên weku Anti Aarne û Stith Thompson mecbûr mane îndeksek jê re derxin ku teqrîben di bin heşt sernavên giştî de du hezar û pênc sed şêwazên vî cureyî destnîşan kirine. Vê pirnimûnetîyê bi xwe ra pirnavî û têkelheviya polînkirinê anîye ku kesên weku Vladimir Propp amaje pê kirine. Lê axirî baş û xerab, kêm û zêde îndeksek derketiye holê û ji ber mifadariya xwe ya li qadê jî hatiye pesinandin.

Îcar di Kurdî da pirsgirêka navê cureyê ku di Îngilizî da jê re “folktale” tê gotin bi awayekî eyan heye. Ev pirsgirêk ne ji ber nebûna wî navî ye, berevajî egereke vê pirsgirêkê, polînnekirin, pênasenekirin û herwiha pirbûna van navan e ku weku çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, kurteçîrok, xeberoşk, xemîşok, mesel, meselok, metelok, serborî, serpêhatî, serhatî, hîkayet, hikyat, efsane hatine bikaranîn. Egereke din a vê tevlihevîyê jî weku du serdemên cuda yên edebîyatê ne ku ew weku edebîyata devkî/gelêrî û edebîyata nivîskî/nûjen ji hev diqetin. Yanî ji ber ku di van her du serdeman da cureyên deqên edebî ji alîyê teşe û naverokê ve veguherîne û ji hev cuda bûne, hewcedarî çê

Zakho Centre for Kurdish Studies

bûye ku ji alîyê navan ve jî ji hev bên cudakirin. Herwiha rastîyek heye ku edebîyata gelêrî berî edebîyata nûjen di nav civakê da zindî bûye. Lewma çi ji alîyê navdanîna cureyan ve çi ji alîyê teşe û naveroka deqên edebî ve, tesîra edebîyata gelêrî li ser edebîyata nûjen eyan e. Nimûneyeke vê tesîrê bêguman nav û cureyê “çîrok”ê ye. Ayhan Geverî (2008: 12) di pêşgotina *Antolojîya Çîrokên Nûbiharê* da amaje li vê serdema transê kirîye û balê kêşaye ser vê tevlihevîyê.

Dema ku em destpêka navlêkirina çîrokên nûjen vedikolin em dibînin ku heman navê “çîrok”ê di hejmara yekem û duyem a kovara *Rojî Kurd*ê da hatîye bikaranîn (Temo, 1913: 25). Digel wê di hejmara sêyem û çarem a heman kovarê da ji bo deqên gelêrî jî dîsa heman nav hatîye bikaranîn (Kendo, 1913: 31). Bikaranîna bi vî rengî di kovara *Hawar*ê da jî dewam kirîye û geh ji bo deqên gelêrî geh ji bo deqên nûjen dîsa navê çîrokê hatîye bikaranîn. Helbet ji bo çîrokên gelêrî navên çîrçîrok, hîkayet jî hatine bikaranîn (“Hawar,” 1998). Lê di hejmara yekem (1932: 5) da dema qala destana *Memê Alan* û di hejmara sêzdehem (1932: 5) da jî dema qala destana *Sîyabendê Silîvî* tê kirin weku “çîrçîrok” tê binavkirin û di hejmara yazdehem (1932: 6) da jî dema behsa efsaneya navê Bîngolê tê kirin weku “Çîrçîroka Bîngolê” hatîye binavkirin. Yanî hem ji bo efsaneyê û hem ji bo destanê hem jî ji bo çîrokê heman nav hatîye bikaranîn.

Di kovara *Asoy Folklor* da di sê hejmarên ewil da navên çîrok û çîvanokê bo vî cureyî hatîye gotin. Lê di hejmarên paşê da bêhtir û bi zanîn ev cure weku efsane û heqayet du cureyên ji hev cuda hatine destnîşankirin. Bo nimûne Fazil Omer (1990: 133) di hejmara yekem[1] da bi navê “Çîvanokên Êzop” çend fablên Ezop wergêrane û pêşekîyek bo nivîsîye û tê da dîyar kirîye ku çemka “çîvanok”ê bo “fable”ê bi kar anîye. Dîyar e li vir “çîvanok” weku binbeşeke çîrokan hatîye binavkirin ku jê re “çîrokên ajelan” tê gotin. Helbet çemka “çîrokên ajelan” wergêrana senifandina Anti Aarne û Stith Thompson e ku wan weku “animal tales” bi nav kirîye (Thompson, 1951: 481-487), lê di Kurdî da heke lihevkirinek hebe mimkûn e meriv di şûna navê “çîrokên ajelan” da navê “çîvanok”ê bi kar bîne. Dema em bala xwe didine hejmarên din çîrokên ajelan bi piranî di bin beşa “Heqayet” da hatine komkirin û belavkirin. Heta di hejmara sêyem da hem bi navê “Çîrokî Folklorî” beşek bo çîrok û temamê cureyên çîrokê hatîye danîn hem jî di bin heman beşê da Taban Qeracî (2001:159-161) bi navê “Çîrok û Efsaney Nawçey Kirmaşan” nivîsek belav kirîye. Dîyar e ku di kovara navborî da ji bo vî cureyî sê navên ji hev cuda weku çîrok, efsane û heqayet (hîkayet) hatine bikaranîn.

Di nav xebatên Kavkazê da em dibînin ku hem navê çîrok hem jî navên weku çîvanok, qelîbotk, mijûlî, hikyat û serhatî hatine bikaranîn. Ji bo vî cureyî Hecîyê Cindî û Emînê Evdal (2008: 551) navê hikyatê tercîh kirine. Lêbelê Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl (1978/II: 199) jî qelîbotk, mijûlî û çîrok tercîh kirine. Lê herçiqas wan dîyar nekiribe jî wisa tê famkirin ku wan ji bo pêkenok û anekdotan, qelîbotk û mijûlî bi kar anîye û ji bo çîrokên ajelan û yên derasayî jî tevde çîrok gotîye.

Weşanxaneya Wardozê di sala 2017an da ava bûye û bêtir bala xwe dide folklorê û heya niha jî bi dehan kitêbên berhevkarîya keresteyên folklorê çap kirine. Di nav weşanên vê weşanxaneyê da ji bo cureyê çîrokê bêtir navên “çîrok” û “xebroşk” hatîye tercîhkirin. Du kitêbên ku li ser navê çîrokê hatine çapkirin di naveroka wan da bêtir cureyên weku serpêhatî, pêkenok û meselok xuya ne. Kitêbek jî li ser navê xebroşkê hatîye çapkirin ku di naveroka wê kitêbê da jî bêtir vegêranên derasayî û sêhrî

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

hene (Mukrîyanî, 2017; Serhedî, 2017a; Serhedî, 2017b). Dîyar e ku Wardozê li gorî xwe senifandineke van vegêranan kirîye û bi wî şikilî nav lê danîne. Lê dema em bala xwe didin pirtûka Mustafa Aslan (2019: 5-6) a bi navê *Baqek ji Folklora Berîya Mêrdînê* em dibînin ku çar sernavên cuda yên weku "pêkenok", "çîrokên gelêrî", "serpêhatî", "fabl" hatîye danîn. Di nav sernavê çîrokên gelêrî da pêkenok, anekdot, çîrokên derasayî ku li gorî Wardozê "xebroşk" û çîrokên ajelan ku li gorî *Asoy Folklor* "çîvanok" jî vedihewin. Weşanxaneya Wardozê herçiqas di kitêbên xwe yên din da serpêhatî di bin navê çîrokê da tomar û çap kiribin jî di vê pirtûka navborî da bi serê xwe hatîye tomarkirin û bûye sernavek. Dîyar e ku ji bo vî cureyî navên weku pêkenok, serpêhatî, çîrokên gelêrî, çîrok, xebroşk, fabl têkelhev hatîye bikaranîn. Helbet ev carinan serbixwe carinan jî di şûna hev da hatine bikaranîn.

Di kovara *Folklora Kurdan* da tevilhevîya navên vî cureyî eyan e. Di vê kovarê da li ser tîpê rovî nivîsek hatîye nivîsîn û ji bo çîrokên ajelan "fabil" hatîye gotin. Nivîskar bixwe fabilê weku çîrok pênase dike û wiha balê dikişîne li ser nestandartbûna navê vî cureyî ya di Kurdî de: "Di binavkirina navê fabilê ya bi Kurdî da lihevkirinek tuneye. M. Emin Bozarslan ji bo fabilan navê 'Meselokên Lawiran' bi kar anîye. Hecîyê Cindî bêyî ku cuda bike navê 'Hikyat'ê hem ji bo fabilan hem jî ji bo çîrokên din bi kar anîye. Xalid Sadinî navê "çîrokên gelêrî" bi kar anîye. Bêwar Dîyadînî û hin kesên din jî rasterast navê 'fabil'ê bi kar tînin. Kurdên Soran jî navê 'cefen'ê bi kar tînin, herwiha hin nivîskarên Kurdên Kurmanc jî vî navî bi kar tînin. Bi gerdûnî jî navê 'fabil'ê tê bikaranîn. Ji ber ku navê Fabil'ê; resen, gerdûnî, belavbûyî û kurt e, di vê gotarê da bi giştî navê fabilê hat bikaranîn." (Dîzman, 2015: 23) Di heman hejmarê da ev nestandartbûn di kovarê da jî xwe dide der û du berhevokên Mustafa Gazî (2015: 74-75) ku yek jê çîrokeke rovîyan e û ya din jî anekdotek e weku "çîrokên gelêrî" hatîye binavkirin. Bi heman şêwazê di hejmara yekem da dîsa di bin navê "Çîrokên Gelêrî" da çîrokeke ajelan (di heman kovarê da Dîzman jê re gotibû fabil) û hikyat û meselokek hatine tomarkirin ji hêla Bahoz Baran (2015: 57-59) ve. Di hejmara duyem da jî du anekdotên ehmeq û famkoran ku weku cureyeke pêkenokan jî tê qebûlkirin, dîsa di bin navê "çîrokên gelêrî" da ji hêla Yûksel Polat (2015: 87-88) ve hatine tomarkirin. Wisa xuyaye hikyat, pêkenok, fabil, meselok weku çîrok hatine binavkirin ku herçiqas ev qismen durist be jî qismen tûşê tevlihevîyê bûye.

Di kovara *Folklora Me* da zêde navê çîrokê nehatîye bikaranîn. Wisa dîyar e ku edîtorîyê bi zanetî kirîye ku keresteyan bi navê cureyê xwe yê spesîfîk bide. Mesela weku meselok, pêkenok. Lê em di hejmara şeşem da dibînin ku Feray Olçer (2020: 46-54) vegêrana ku Hecîyê Cindî û Emînê Evdal (2008: 305,383) weku êpos û beyt tomar kirine, weku çîrok bi nav kirîye û di destpêkê da jî ketîye nav pênase û cihê çîrokê di folklorê de. Esil mêleke bi vî rengî heye di nav Kurdên Bakurê Kurdistanê da ku vegêranên gelêrî bêtir weku çîrok bi nav dikin, çawa ku di nav Kurdên Rojhelat da ev mêla li ser efsaneyê be. Em dikarin binavkirina Olçerê jî bi vê mêlê ve girê bidin. Dîsa têkelhevîyek jî di navbera meselok, hikayet û çîrokên ajelan da çêbûye di kovara navborî de. Herçiqas di hejmarên yekem, sêyem û çarem da meselokên berhevkirî û tomarkirî bi awayekî durist hatibin binavkirin jî di hejmara duyem da di berhevkarîya Evrehmanê Bello (2019: 24-25) da du çîrokên ajelan weku meselok hatine binavkirin ku ev yek wiha dikare bê zelalkirin; rast e ku her du jî du vegêranên binbeşên çîrokan in, lê belê ji hêla binyatî ve ji hev cuda ne. Loma divê meriv haydar be dema ku nav lê datîne. Dîsa di

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

hejmara heştem da di berhevkarîya Evrehmanê Bello (2021: 28-29) da vegêranên ku tomar kirîye ji hêla binyatî ve li ser meselokan be jî wî ev vegêran weku hîkayet bi nav kirine. Mîna gelek weşanên din tevlihevîya navê vî cureyî di Folklora Me da jî berdewam e. Xisûsen destan weku çîrok hatîye nîşandan û herwiha binbeşên çîrokê yên weku meselok û çîrokên ajelan hatîye têkelhevkirin ku dîsa têkelhevîya meselok û hîkayetê jî yek ji vê nimûneyê ye.

Di nav senifandina Şukrîye Resûlê da em rastî navê çîrokê nayên. Weku me berê jî amaje pê kiribû, tercîha wê ji bo navdanîna vî cureyî li ser navê efsaneyê bûye. Îzedîn Mistefa Resûl van her du cureyan ji hev cuda dike efsane çeşnek din û çîrok çeşneke din a vegêrana gelêrî nîşan dide. Heta çîrok û serguzeşteyê weku hev dinirxîne û tenê serguzeşteyê weku çîrokên kurttir pênase dike ku di nav Kurdên bakur da bêtir weku meselok û serpêhatî hatîye binavkirin. Dema ku behsa çîrokê dike, ew bixwe jî balê dikêşe li ser pirnavîya vî cureyî û wiha dibêje: “Çîrok ke le naw Kurd da hîkayet ya “neql”î pê dellên û le naw Kurdî Lor da “metelok”îşî pê dewtrê. Beşêkî gewre ye le edebî folklorî Kurdî.” (Resûl, 2010: 24) Lê pir xerîb e dema ku mînakeke şênber bo çîrokê dide qala destana *Diwanzeh Siwarey Merîwan* dike û weku vegêraneke vî çeşnî nîşan dide welew ku di xebata xwe da behsa destanan jî dike (Resûl, 2010: 30). Ji vir dîyar e ku ev tevlihevî li cem wî jî heye. Ji alîyê nav nebe jî tevlihevîya destnîşankirina cureyan dikare bê gotin bo vê yekê. Mimkûn e ew mêla binavkirina çîrokê li cem Resûl jî xwe nîşan dabe. Di nav xebatên Enstîtuya Keleporî Kurdî da senifandina Biwar Nûredîn nêzî senifandina Îzedîn Mistefa Resûl e ku vî cureyî weku çîrok û serguzeşte bi nav kirîye. Nûredîn dîsa di heman xebatê de, senifandina Kameran Mukrî jî veguhastîye û tê dîtin ku Mukrî jî serguzeşte û çîrokê weku hev nirxandîye û dabeşkarîyeke navxweyî jî weku çîrokî pirrûpûç, çîrokî asayî (komellayetî, dilldarî, ayînî û htd.) pêk anîye (Nûredîn, 2004: 14-16).

Dîyar e ku binavkirina vî cureyî bi têra xwe arêşeyan vedihewîne. Bes divê ji navbera navên ku me li jorê nîşan dane, tercîhek bê kirin. Heta hin ji van navan weku binbeşê anku bincureyê vî cureyî anku çîrokê bê destnîşankirin û wisa berev standartekê biçin. Çimkî hêj jî standardeke navdanînê bi taybetî ji bo vî cureyê gelêrî nehatîye danîn. Gotinên lêkolîneran di vî warî da herî zêde ji tesbîtan pêk hatîye ku ev jî tiştekî asayî ye. Çimkî ew ne sepînerên vê biryarê ne. Kifş e ku binavkirina vî cureyî yan li gorî herêman cuda dibe an jî li gorî tercîha lêkolînerên di vî warî da ji hev cuda dibe ku ev yek di dîsîplîna giştî da alozîyan çê dike. Bi rastî bêyî xebateke dîrokî ya li ser vî cureyî, binavkirin û senifandineke standard, zehmet e. Çimkî gelek navên ku me li jor rêz kirin dibe ku ji bo cure û celebên cuda yên vegêrana gelêrî yan jî ji bo binbeş û cureyên cuda yên cureyê çîrokê hatibin danîn ku îroj hemû tevlihev bûne û hemû jî di şûna navê giştî yê çîrokê da tên bikaranîn. Li gorî me navê çîrokê weku navê giştî bê pejirandin û ji wan navên me li jor nîşan dan jî yên guncaw bo navên binbeşên çîrokê bên bikaranîn.

1.4. Pêkenok

Stûna sereke ya pêkenokan ken û kenandin e. Ji bo ken û mîzah pêk bê pêşkêşkirina tezad/dijberîyan û encamên wê vegêraneke xurt diafirîne. Ev yek jî bi saya karakterên di nav da pêk tê ku ew bi piranî tîpîk, karîkaturîstîk, yekalî, derewîn, ehmeq û famkor in. Herwiha ji ber ku vegêr zû bigihêje encama kenandinê vegêrana pêkenokê zêde dirêj nake. Loma bi piranî kurt in. Yanî rûdaneke wan a pir girift nîne. Ji bo keneke

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

rijî nayên vegêran. Di eslê xwe da mîzahek heye tê da û di nav vê mîzahê da rexne, fêrkarî, fikirandin û balkişandin armancên sereke ne. Fonkîsyoneke pêkenokan jî derbirîna wan tiştan e ku li her derî bi eşkere nayên gotin ku ev yan ji ber şermê yan ji ber tirsê an jî hestên weku din e. Bi piranî pexşankî ne û şayesandinên dûr û dirêj nahewîne ku ev xisûsîyeteke cureyên çîrokan e jî. Hinek ji wan herêmî ne û hin ji wan gerok û neteweyî ne. Dem û cih di pêkenokan da li gorî çîrokan bêtir şêlû dibe.

Pêkenok herçiqas di senifandina Aarne û Thompson da weku binbeşeke çîrokên gelêrî hatibe destnîşankirin jî di nav Kurdan da bêtir weku vegêraneke serbixwe hatîye neqilkirin. Bêguman ev belasebeb nîne. Çimkî ji hêla binyatî ve pêkenok ji binbeşên din ên çîrokên gelêrî pir cudatir in (bnr. Subaşı, 2019). Herwiha pêkenok bixwe di nav xwe da dabeş dibin. Xisûsen anekdotên ehmeq û famkoran, anekdotên derewînan dîsa di nav vî cureyî da mimkûn e bê hesibandin. Çimkî ji alîyê form û naverokê ve pir dişibin hev. Wisa xuyaye li cem gel jî ev wekhevîya van vegêranan nêzî hev hatîye qebûlkirin û gelek nav û nûçik ji bo pêkenokê hatîye gotin.

Ji bo navlêkirina pekenokan Eşref Buran lêkolîneke berfireh kirîye û pirnavîya vî cureyî di vê xebata xwe da wiha anîye ziman: “Di kurmancî da bi qasî hatin tespît kirin, peyvên ‘galte/gelte, laqirdî, letîfe, mesele, meselok, mesqeretî, mijûlî, qelîbotk, nikte, pêkenî, pêkenîn, pêkenok, pêkenokên gelî, qerf, tevzok, yarî, xweşîpêkirin’ hatine bikaranîn. Di zaravayê kirmanckî da peyvên mîna ‘fiqrayî, meselayî’ û ‘yarenîyî’; di zaravayê soranî da jî peyva ‘galtewgep’ an ‘qisey xoş’ tên bikaranîn.” (Buran, 2018: 14-15)

Piştî ku dîyar bû ev pirnavî heye, îcar niha em ê berê xwe bidine xebatên folklora Kurdî ka çawa ev cure hatîye binavkirin an çawa nêzîkî binavkirina vî cureyî bûne. Di serî da dema meriv bala xwe bide kovara *Hawar*ê û *Roja Nû*, meriv rastî pêkenok, pêkenî an navekî din ê ji bo vî cureyî nayê ku hatibe bikaranîn. Heta ev cure bixwe di van weşanan da nehatîye tomarkirin. Lê di kovara *Ronahî*yê da gelek vegêranên ji vî cureyî hatine tomarkirin û weku nav jî ji bilî navê “henek” weku din navek nehat peydakirin. Herwiha kesê ku van henekan tomar kirîye jî weku “Yarîker” nav li xwe danîye. Dîsa di *Hawar* û *Ronahî*yê da tê dîtin ku navê “medhelok”ê ji bo gotinên pêşîyan (proverbs) hatîye bikaranîn. Bi heman rengî di kovara *Asoyî Folklor* da di hejmara pazdehem da jî di bin sernavê pendî pêşînan da “meselekanî kurdewarî” sernavek hatîye danîn û qala gotinên pêşîyan hatîye kirin û di hejmara şazdehem da bi serê xwe sernavekî weku “meselekanî kurdewarî” hatîye danîn û her du nivîs jî weku dewama hev ji hêla Ebdulla Xidir Mewlûd (2005: 86-88; 2006: 131-133) ve hatîye nivîsîn. Lê dema em berê xwe didine xebata İlyas Suvağci (2019: 657) em dibînin ku ji bo cureyê pêkenokê navê “metelok”ê bi kar anîye û derbarê navên vî cureyî da jî wiha gotîye: “Metelok bi awayekî puxtedar û nuktedar ragihandina bûyerekê yan ramanekê dikare bê pênasekirin. Ji bilî “metelokê” ji bo vî cureyî di ferhengê da gotinên wek; pêkenî, pêkenok, meselok, qelîbotk û fiqre cih digirin.” Herwiha em dizanin ku metel û metelok di Soranî û Bahdînî da bi piranî ji bo mamikan jî tê gotin (bnr. Subaşı, 2016: 76). Herwiha tê zanîn ku metel û mesel, metelok û meselok bi guherînên dengî pêk hatine û loma dema em mesele û meseloka ku Buran qal kirîye jî bihesibînin alozîyeke navî ya pir mezin derdikeve bo vî cureyî.

Di soranî da herçiqas bo vî cureyî bêtir navê “galtewgep” bê gotin jî (Resûl, 2010: 132; Nûredîn, 2004: 14-16) di nav senifandina Şukrîye Resûl (2008: 6) da ev nav

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەكۆلینێن كوردی

nabore. Lê di bin beşa pexşanê da beşek ji vegêranê weku "nukte" hatîye binavkirin ku di şûna pêkenokê da hatîye gotin. Dîyar e ku di nav lêkolînerên Soran da yekgirtinek li ser vî navî tuneye. Bes çemka "galtewgep" para bêtir digire ji bo binavkirina vî cureyî li cem wan. Di kovara *Asoy Folklor* da herçiqas zêde berhevkarî û tomarkarîya vî cureyî nehatibe kirin jî di hejmara sêzdehem da beşeke bi navê "Galtewgepê Kurdewarî" hatîye danîn û dîsa di hejmara şazdehem da Ehmed Qerenî (2006: 18) qala vî cureyî dike û bi devoka Bahdînî weku "tirane û pêkenînok" bi nav kirîye û dîyar e zêde mêla wî li ser bikaranîna navê pêkenînokê bûye.

Di nav kovara *Folklora Kurdan* da em rastî vî cure û navî nehatin. Di kovara *Folklora Me* da hejmara heftem û heştem ne tê da di hemû hejmarên din da ji bo vî cureyî berhevkarî hene. Ev berhevkarî bêtir bi du navan hatine binavkirin ku yek jê "mesele, meselok" yê din jî "pêkenok" e. Heta di heman hejmarê da hem meselok hem jî pêkenok hatîye gotin. Esil ev ne dûrî senifandina zanistî ye, çimkî hin anekdotên li ser derewîn, famkor, zane û baleyan jî weku pêkenok û cureyên pêkenokan tên nirxandin. Di hejmara duyem da Roza Sîerra (2019: 117; 2020: 80-81) bi navê "Du Pêkenok" berhevkarî û tomarkarîyeke vî cureyî kirîye û di hejmara çarem da jî dîsa heman cureyî bi navê "Du Meselokên Farqînê" weşandîye. Di hejmara sêyem a heman kovarê da ji bo vî cureyî xerîb e ku nivîsa Elîf Gunduz (2019: 4, 86-87) di naveroka kovarê da bi navê "Çar Meselokên Xîya" hatîye weşandin û di nav kovarê da jî bi navê "Pêkenokên Xîya" hatîye tomarkirin. Ev mînak jî kifş dike ku di vê kovarê da ev her du nav di şûna hev da hatine bikaranîn. Dîsa di hejmara nehem da bi navê "Behlûl û Meselokên Wî li Herêma Torê" ji hêla Elîf Gun (2021: 76-78) ve berhevkarîyek hatîye weşandin ku li gorî xebata Buran (2018: 38) jî Behlûl tîpeke pêkenokan bû. Axir ya durist ew e ku meriv vêgêrana meselok û pêkenokê baş ji hev cuda bike û li gorî wê jî van navan daîne li ser cureyên guncaw. Nexwe ev tevlihevî her dê dewam bike.

Herwiha divê em destnîşan bikin ku ji bo vî cureyî li cem Kurdên Kavkazê navên pêkenîn, qelîbotk, mijûlî û hikyat hatîye bikaranîn. Weku me berê jî gotibû. Hecîyê Cindî hikyat weku navekî giştî li çîrok û binbeşên çîrokê kirîye. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl jî herçiqas bi sînorên teqez ji hev cuda nekiribin jî û navê pêkenînê gotibin jî di polînkirinê da ji bo pêkenokê qelîbotk û ji bo anekdotan jî navê mijûlî danîne.

Li gorî xebat û lêkolînan kifş bû ku di nav Kurdan da hem pirnavîya vî cureyî û hem jî tevlihevîya cure û bincureyên wî çêbûye. Herwiha cudahîya zaravayan jî eyan e. Loma li gorî me pêkenok navê giştî û meselok jî bo bincureyên pêkenokan weku meselokên derewînan, meselokên zane û baleyan bê binavkirin dê qismen ev tevlihevî çareser bibe. Ji bilî wî navên weku henek, qerf, laqirdî, pêkenî, pêkenînok, metelok li derveyî vê binavkirinê bê hiştin.

1.5. Destan

Destan rûdanên dîrokî û civakî vedigêrin. Lê divê wê rûdanê karîgerîyeke mezin li civakê kiribe. Çendek ji van rûdanan şer, lehengî, afat û evînên trajîk in. Destan hem rûdanên asayî ku ji dîrokê dinizile û hem jî vegêrana derasayî ku ji mîtolojîyê dinizile, têkilhev dike û vedigêre. Bi piranî nasnameyeke wan a neteweyî heye. Li gorî lêkolînerinan di destanê da rûdan û macerayên mirovan bi awayekî melodîk û helbestî bi şikilê menzûm tên vegêran (Oinas: 2015: 234). Li gorî lêkolînerinan jî destan ji ber ku vegêranên pir dirêj in û mimkûn nebû ku di carekê da û li ser hev bi helbestkî bên

vegêran, loma destanbêjan carinan ji bo ku bêhna xwe vedin, diketine nav vegêraneke pexşankî û loma destan weku pexşan û menzûm têkelhev hatine vegêran (Celîl & Celîl, 2014: 11). Lêkolînerên weku Gîw Mukrîyanî (2013: 321) û Îzedîn Mistefa Resûl (2010: 33) peyva destanê û eposê weku peyv, çîrok, hîkaye, çêçêrok, çîrçîrok, rêzik, beserhat, qewatî, serbirde, kevneşop, xebroşk, mesnewî û heta birayên Celîl (2014: 10) weku romana gelêrî jî nirxandine û pênase kirine. Carinan her du formên (pexşankî û helbestkî) heman destanê ji hev cuda jî hatine neqilkirin. Loma Kurdan bêtir ji ber vê formê û bi tesîra zimanên bîyanî gelek navên din li destanê kirîye. Ev nav weku dastan, destan, destançîrok, beyt, epîk, epope, epos, poem, serpêhatîyê epîkîyê, stran û çîrokên epîkîyê, poêzîya epîkîyê û cengleme ne.

Ev arêşeya pirnavîyê li cem Necat Keskin (2019: 178-179) jî bûye mijar û ew vê pirnavîyê bi arêşeya çemk û cureyî ve girê dide û pirmaneyîya çemkan weku sedemek nîşan dide. Li gorî wî dema meriv ji gelek alîyan ve cureyan binirxîne, li gorî xisûsîyetên wan ên sereke divê navê herî maqûl û minasib bê tercîhkirin ku ew navê vî cureyî ji ber sedemên hejmartî weku destan guncaw dibîne. Îcar em ê jî niha bi giştî berê xwe bidin xebatên folklorê yên di nav Kurdan da û navdanînên wan ên ji bo destanê destnîşan bikin.

Di kovara *Hawar* û *Ronahî*yê da em dibînin ku ji bo vî cureyî sê nav hatine gotin weku destan, destançîrok û çîrçîrok. Bi piranî dema ku behsa destana Memê Alan tê kirin ev nav tên gotin. Di hejmara sêzdehem a *Hawar*ê da dema ku Hereqol Azîzan (1932: 5) qala Sîyabendê Silîvî û Memê Alan dike dibêje “Çîrçîroqa Sîyabendê Silîvî bi nav û deng e. Ev jî weq Memê Alan yeq ji çîrçîroqên me ên qevn û spehî ye. Her qes pê dizane.” Lê di hejmara çil û pêncem da dema qala Mem û Zîna Ehmedê Xanî û destana Memê Alan tê kirin li wir jî peyva destanê tê gotin: “Xanî binyanê esera xwe ji destana Memê Alan girtîye, lê ew weke xwe nehiştîye gelek tiştên wê guhartine.” (Xanî, 1942: 6) Dîsa Celadet dema di hejmara bîst û sêyem a *Ronahî*yê da qala Memê Alan dike vê carê wê weku destançîrok bi nav dike (C.A.B, 1944: 8). Kifş e ku hem tevlihevîya navî di van her du kovarên navborî da hebûye hem jî nîşana wê yekê ye ku di şûna destanê da anku vegêranên di wê şêwazê da pir bi rehetî weku çîrok û çîrçîrok nav lê hatîye kirin. Çimkî weku me berê jî amaje pê kir, di eslê xwe da ev vegêran rûdanekê, çîrokekê neqil dikin û li gorî me sedema sereke ya navdanîna çîrokê bo van vegêranan ji ber wê taybetîya wê ye. Herwiha di qismê Fransî yê *Hawar*ê da jî em dibînin ku çemkên weku légend (çîrçîrok, destan), époqu, épouse (destan) û épopée (şer û kilamên şer) jî di vê maneyê da hatine bikaranîn.

Di nav Kurdên Kavkazê da digel ku gelek nav li vê vegêranê hatine danîn jî bi piranî di tesnîfên folklorî da navê “êpos” hatîye tercîhkirin. Herçiqas Hecîyê Cindî û Emînê Evdal (2008: 305-394) navê “beyt” jî li vî cûreyî danîbin, em di berhevkarîya Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl (1978/II: 5-53) da dibînin ku beyt ji bo qewlên Êzidîyan hatîye gotin ku ev jî girêdayî teşeya wan qewlan e. Herwiha em di *Hawar* û *Ronahî*yê da jî peyva beyt di maneya teşeya helbestê ya dumalik da dibînin. Lê dema em li kovara *Asoy Folklor* dinêrin em dibînin ku bi piranî beyt di maneya destanê da hatîye bikaranîn û ji hejmara duyem bigire heya hejmara dawî jî gelek destanên Kurdan ên weku Memê Alan, Dimdim, Las û Xezal, Dewrêşê Evdî, Zembîlfiroş, Stî û Ferxê di bin sernavê “beyt” da hatine tomarkirin û weşandin. Lê bêguman beyt bi tenê ji destanan re nehatîye gotin. Xisûsen di hejmara şazdehem da berhevkarîya Nîmet Husên (2006: 126-130) a bi

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

navê “Qewlê Zebûnî Meksûr” ku qewleke gelek navdar a Kurdên Êzidî ye di bin sernavê “beyt” da hatîye weşandin. Herwiha “Qewlê Sura Afirîna Dinyayê” di hejmara bîst û çarem da û “Qewlê Tawûsî Melek” di hejmara sih û duyem da di bin sernavê beyt da hatine weşandin. Kifş e ku bêtir ji ber menzûmbûna vî cureyî navê “beyt” lê hatîye kirin. Axir dema em vegerin li ser xebatên Kurdên Kavkazê em ê bibînin ji bilî êpos û beyt navên weku destan, serpêhatîyê epîkîyê, stran û çîrokên epîkîyê, poêzîya epîkîyê û cengleme jî hatine gotin (Celîl & Celîl, 1978/I, 24-39). Dîyar e ku haya wan ji gelek navan hebûye. Lê wan bi zanetî navê “êpos” tercîh kirîye.

Di nav xebatên folklorê yên başûrê Kurdistanê da Îzedîn Mistefa Resûl (2010: 31-34) ev cure hem weku “dastan/êpos” hem jî weku “dastanî honrawe/poemî êpos” bi nav kirîye. Kifş e ku wî ev cudahî ji ber teşeya vegêranê cuda kirîye anku vegêrana pexşan û menzûm têkel awayekî destanê û vegêrana xwerû menzûm jî awayekî destanê nîşan daye. Şukrîye Resûl (2008: 6) û Kameran Mukrî û Biwar Nûredîn (2004: 14-16) ev cure bi tenê weku dastan bi nav kirîye û binbeşên wê jî weku qaremanîyetî û dildarî destnîşan kirîye. Di kovara *Asoy Folklor* da digel ku ev cure bi piranî weku beyt hatibe binavkirin jî xisûsen di çend hejmarên ewil da “dastan” jî hatîye gotin. Heta di hin hejmaran da di bin sernavê “beyt” da tê dîtin ku hin destan weku serpêhatî/serhatî jî hatine binavkirin. Bo nimûne di hejmara bîst û heştem da Ebdulla Sebrî (2007: 121-137) destana Dewrêşê Evdî weku “Serpêhatîya Zor Temir Paşayê Milê” tomar kirîye û weşandîye. Wisa xuyaye kovara *Asoy Folklor* herçiqas çemka “beyt” bo vî cureyî tercîh kiribe jî di piranîya xebatên Başûrî da “dastan” zaltir e. Li gorî me jî ya herî maqûl ew e ku weku destan an dastan bê standartkirin. Çimkî beyt çemkeke dîyarker e bo teşeya metnan û pir dûr e ku meriv weku navê cureyekî vegêrana gelêrî standart bike û herwiha gelek keresteyên edebîyata gelêrî hene ku ew jî bi beytan tên gotin.

Di nav kovara *Folklora Kurdan* û *Folklora Me* da derbarê destanê da zêde xebat nehatine weşandin. Di *Folklora Kurdan* hejmara çarem da nivîsek derbarê *Kela Dimdimê* da heye û di vê xebatê da qala destan û navê wê tê kirin û tê gotin ku di Yewnanî da “epos” hatîye gotin bo destanê. Nivîskar dema çemka “destan”ê bixwe jî analîz dike qala peyva erebî “esatîr” û yewnanî “myth” dike û destanê di beramberî wan da bi kar tîne (Borak, 2015: 61) û pir eşkere ye ku di vê xebatê da hin çemk tevlihev bûne. Lê binavkirina vegêrana Kela Dimdimê weku destan kêm zêde mebesta nivîskar nîşan dide ku bo çi cure vegêranê destan gotîye. Ji ber ku ji bilî vê xebatê derbarê destanan da xebateke din tuneye, pir zehmet e ku meriv qala pirnavî û nestandartbûneke navê vî cureyî di kovara navborî da bike.

Di kovara *Folklora Me* da di sê hejmaran da em xebat û berhevkarîyên li ser destanan dibînin. Di hejmara çarem da Ahmet Seyarî (2020: 70) qala destanên epîk kirîye û di destpêkê da li ser navê vî cureyî jî rawestaye. Piştî ku qala navên weku “epos, epic” kirîye digel wê jî ji Tekin Çiftçi veguhastinek kirîye û gotîye ku li hêla deştê bo vî cureyî “delal” û li hêla çîyê jî “lawijê siwaran” tê gotin. Di hejmara dehem da Ahmet Seyarî (2021: 16-17) dîsa li ser binbeşekî destanan xebatek kirîye ku jê re xezawetname tê gotin. Lê wî di vê xebata xwe da vî cureyî weku “çîrok” bi nav kirîye. Herwiha balkêş e ku zarbêjê xezawetnameyê jî di serê vegêrana xwe da dibêje ez ê “mesela” Borê Qer bêjim. Weku me berê amaje pê kiribû di nav Kurdên Bakur da mêlek heye ku ji piranîya vegêranên gelêrî re bibêjin çîrok an jî mesele. Li gorî me hem Seyarî hem jî zarbêj bi vê mêlê tevgerîyane û loma bi wan navan qal kirine. Weku din di hejmara nehem a kovarê

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

da jî Bawer Erîşen (2021: 26) li ser destana Kawa nivîsek amade kirîye, lê derbarê navê destanê da tu agahîyek nade ji bilî binavkirina xwe ya bo vegêrana Kawa. Kifş e ji ber kêmbûna xebatan a di vî warî da pir zehmet e meriv li ser standarta navê vî cureyî di kovara *Folklora Me* da jî bibêje. Lê bikaranîna du navên cuda bo heman şikil vegêranê ya Seyarî û midaxalenekirina edîtorî di jêrenotekê da bo me mêla nestandartbûnê nîşan dide.

Ji bo vegêranên gelêrî di Kurdî da ji tesîra zimanê Erebî dûr bêtir çemkên weku efsane, çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, xebroşk, destan, pêkenok, serpêhatî xuya ne. Herwiha çemkên weku mît, hîkayet, mesele, meselok, qise, anekdot, epos, beyt û hwd. jî bi tesîra zimanên Ewropî û Erebî ketine nav Kurdîyê û di şûna navên hin vegêranan da hatine bikaranîn. Xisûsen navên weku hîkayet, mesele, qise navên gelemperî ne û îşaretî vegêran û çîrokê dikin. Yanî mimkûn e ji bo her cureyekî vegêrana gelêrî ev nav bên gotin bêyî şaşfamîyek pêk bê, çawa ku çîrok û efsane bo piranîya van cureyan dikare bê gotin. Jixwe ji bilî navên Kurdî yên ku me destnîşan kirin gelek navên din piştî hewcedarîya standardîzasyonê anku berbelavbûna xebatên zanistî yên folklora Kurdî û lazimîya polînkirina cureyan ketine nav lîteratura Kurdî. Helbet piştî Îslamê tesîra Erebî jî divê meriv di van çemkên nû da ji bîr neke. Loma xisûsen vegêranên weku Memê Alan, Sîyabend û Xecê, Bîjen û Menîje, Rostemê Zal, Behram û Gulendam ku xuyaye vegêranên gelek kevin in di nav Kurdan da gelo bi çi navî hatibûn binavkirin? Wisa dîyar e ku ev vegêran bêtir weku destan/dastan hatine binavkirin (bnr. Mokri, 1966; Kakeyî, 2013; Chaman Ara, 2015: 312, 289; Vali, 2021: 19-22, 29, 41). Helbet herçiqas weku destan na lê bi navê lehengan weku Qeremanname, Cîhangîrname, Birzoname, Samname hin vegêran û Şehnameyên Kurdî hatibin binavkirin jî em dizanin ku ew di eslê xwe da destanên Kurdî ne. Li ser van egeran her çi kevin çi jî nû (di van çend sedsalên borî de) vegêranên ku li ser şer, trajedya, qaremanî, bergirî û lehengîya miletî be li gorî me divê weku destan bê binavkirin.

1.6. Hîkayet

Taybetîya hîkayetan a sereke ji alîyê karakter, dem û cih ve rast in. Mimkûn e ku hatibin sêwirandin jî lêbelê hem ev sêwirandin derasayîyeke weku çîrokan nahewîne hem jî muheqeq xwe ji serpêhatîyeke civakê têr dike. Hîkayet weku cureyekî transê tê nirxandin ku ji destanan nizilîne. Ya rastî li cem Kurdan hîkayet bêtir weku çemkeke giştî ya ji bo her cure vegêranê hatîye bikaranîn. Her weku Hecîyê Cindî û Emînê Evdal bo çîrok, çîrvanok û pêkenokan bi giştî hikyat gotîye û Mela Mehmûdê Bazidî ji bo çîrok û serpêhatîyên ji Farisî wergêrane navê hikyatê û ji bo serpêhatîyên ku bixwe berhev kirine navê hikyat/hîkayetê bi kar anîye (Öztürk, 2018; Jaba, 2000). Vê binavkirinê kirîye ku digel gelek tevlihevîyên navên vegêranên gelêrî weku cureyekî serbixwe jî hîkayetên gelêrî neyên nasîn û pênasekirin. Dema meriv bala xwe dide tesnîfên xebatên folklorîk ên cîhanê cureyekî bi navê “folk romance” an jî “halk hikâyesi” destnîşan kirine (Keskin, 2019: 191-193) ku ev li cem piranîya Kurdan weku vegêran teqabulê destanê kirîye. Li gorî me nebûna peyva hîkayetê berî Îslamê di nav Kurdan da û berbelavîya navê destanê di maneya vegêran, gotin, çîrok û neqilkirinê da kirîye ku Kurd xisûsen wan vegêranên ku ji mîtolojîya wan a dêrîn nizilîne weku destan bi nav bikin û herwiha vegêranên şibhî wê yên ku di çend sed salên dawî da li nav gel belav bûye jî bi heman navî bi nav bikin. Çawa ku serborîyên Kawe, Qereman, Zal, Sam, Rostem weku destan bi

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

nav kiribin serborîyên Derwêş, Kerr û Kulik, Stî û Ferxê, Sîyabend û Xecê û hwd. jî wisa bi nav kirine. Lê di nav zanista folklorê da lêkolîneran xeteke zirav kêşaye navbera herdu cureyan. Herçiqas gelek lêkolînerên Kurdan vê xetê û vegêranên li her du alîyên vê xetê, ji hev dernexistibin û cuda nekiribin jî di zanista folklorê da “hîkayetên gelêrî” vegêraneke bi serê xwe ji mît, efsane, çîrok, pêkenok, destanan û serpêhatîyan cuda hatîye nirxandin. Herwiha bi piranî wan vegêranên ku lêkolînerên Kurdan weku destan bi nav kirine li cem lêkolînerên bîyanî li gorî naverok û forma xwe hîkayetên gelêrî ne.

Li gorî me tevlihevîya vî cureyî berî her tiştî ji tesbîtnekirina şêwaza vê vegêranê tê. Yanî dema me di Kurdî da got “hîkayetên gelêrî” dê qesda me çi cure vegêran bin? Gelo divê em hîkayetên *Evdalê Zeynikê*, şer û trajedîyên di sedsala dawî da ku dengbêjên me di terza helbesta epîk da strane weku *Bavê Fexrîya*, *Metran Îsa*, *Filîtê Quto*, *Mala Elîyê Ûnis*, *Bişarê Çeto*, *Heso û Nazê*, *Memê û Eyşê*, *Heso Rebeno*, *Feqîyê Teyran* û hwd. di bin vî sernavî da binirxînin an vegêranên weku *Memê Alan*, *Kerr û Kulik*, *Xelîl Beg û Xelo*, *Sîyabend û Xecê*, *Dewrêşê Evdî* û hwd. di bin vî sernavî da bi cih bikin? An van vegêranên me hejmartî gişt di bin vî sernavî da bihesibînin? Li gorî me heya ev kar neyê kirin dê tu gavî navê hîkayetê standardeke xwe nebîne.

Ji xêncî van nîqaşan arêşeyeke din maneya peyva hîkayetê ya di nav Kurdan da ye û veneguherandina wê ji bo çemkeke zanistî ya folklorê ye. Çimkî hîkayet ji bo hercure vegêranê di maneya neqil û gotin û çîrokê da tê gotin ku ya herî zêde tevlihevî û pirnavîyê jî çê dike ev e. Loma em ê niha berê xwe bidine qada xebatên folklora Kurdî û bêtir şênber bikin ka ev tevlihevî bi çi şikilî ye.

Di nav xebatên Kurdên Kavkazê da birayên Celîl çemka hikyatê bi kar neanîne. Lêbelê Hecîyê Cindî û Emînê Evdal (2008: 665-750) di berhema xwe ya bi navê *Folklora Kurmanca* da çi çîrok, çîvanok û meselok hebin gişt di bin navê hikyatê da senifandine. Dîsa Hecîyê Cindî di berhema xwe ya şeş cildî da çi çîrok, çîvanok (çîrokên ajelan), pêkenok û meselok (anekdot) hebin bi giştî bêyî ku senifandinekê di navbera wan da bike weku *Hikyatêd Cimeata Kurda* bi nav kirine. Meriv ji xebatên Cindî têdigehe ku wî her çi cureyên vegêran û xwerû pexşankî hebin weku hikyat bi nav kirîye ku ev yek jî nêrîna me ya ku Kurd weku navekî giştî hikyatê bi kar tînin, xurttir dike. Herwiha divê em bidin zanîn ku di xebata Cindî û Evdal de ferqeke eşkere heye di navbera destan (beyt/epos) û hikyatê de. Lê qesda wan ji hikyatê ne “folk romance”a Îngilizî ye ne jî vegêranên me yên weku Memê Alan, Kerr û Kulik, Sîyabendê Silîvî ne.

Di nav xebatên bakurê Kurdistanê da xisûsen di nav xebatên zanistî yên vê dawîyê da ku yek jê xebata Kadri Yıldırım û Remezan Pertev û Mustafa Aslan (2013: 143-144) a bi navê *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî* bû tê da weku cureyekî edebîyata gelêrî qala hîkayetan nehatîye kirin. Bi heman şêwazî herçiqas nehatibe weşandin û negihiştibe encameke teqez jî di nav komxebata cure û navên keresteyên folklorê ya Weqfa Mezopotamyayê da jî qala hîkayetan nehatîye kirin û weku cureyekî serbixwe xuya nake (bnr. Weqfa Mezopatamya: 2021). Herwiha di nav xebatên weşanxaneya Wardozê da jî bi navê hîkayetê ne weşaneke serbixwe hatîye kirin ne jî di nav weşanên vegêranên gelêrî da weku sernavek cih dane vî cureyî. Di kovara *Folklora Kurdan* da bi tenê di hejmara heftem da em navê hîkayetê dibînin ku ew jî berhevkarîyeke zazakî ye ku Ugur Sermîyan (2016: 32-33) serpêhatîyeke herêma Dêrsimê bi navê “Hîkayeya Şuware” neqil kirîye. Di kovara *Folklora Me* da em tenê di du hejmaran da bi navê hîkayetê dihesin ku di van her du hejmaran da sê nivîs jî weku

anekdot, serpêhatî an jî meselok tên nirxandin. Lê Eşref Keydanî (2020: 16-18) di hejmara heftem da ji herêma Garisanê berhevkarîyek kirîye ku du vegêranên ne di nav pênasekirina hîkayetên gelêrî da tê da hene. Lê bi îhtimaleke mezin ji ber forma wan a vegêranî wê navê li wan kirîye û tomar kirîye. Di heman hejmarê da berhevkarîya bi navê "Hîkayeta Durnas û Hespnas û Mîrnas'ê" jî di heman çarçoveyê da ye. Dîsa di hejmara heştem da berhevkarîya Evrehmanê Bello ye ku me berê jî behs kiribû, sê meselokên Qereçobanê ji ber forma wan a vegêranî bi navê hîkayetê bi nav kirîye û weşandîye. Ev nimûne an jî nebûna nimûneyan bi navê hîkayetê weku vegêraneke serbixwe yên di di nav xebatên Bakur da nêrîna me ya di serî da me anîbû ziman ku Kurd hîkayetê bêtir ji bo cureyên vegêranî bi kar tînin û hêj jî weku cureyekî serbixwe tu pênase û polînkirinekê bo vî cureyî nekirine, piştrast dike.

Dema em berê xwe bidine xebatên li başûrê Kurdistanê hem rewşeke şibhî Bakur dibînin ku di xebatên folklorzanên weku Îzedîn Mistefa Resûl, Şukrîye Resûl, Kameran Mukrîyanî û Biwar Nûredîn da weku cureyekî serbixwe di nav senifandina keresteyên edebîyata gelêrî da navê hîkayetê tuneye. Li derveyî van xebatan dema ku em berê xwe didine kovara *Asoy Folklor* weku beşeke serbixwe bi navê "heqayet" em sernavekî dibînin ku hema hema di her hejmarek da gelek vegêranên gelêrî di bin vî sernavî da hatine belavkirin. Herçiqas navê heqayetê hatibe bikaranîn jî dema em bala xwe didine vegêranên ku di bin vî sernavî da hatine belavkirin, dîyar e ku heqayet di şûna çîrokên ajelan (çîvanok), pêkenok, meselok û serpêhatîyan da hatîye gotin an jî weku sernavekî giştî yên van vegêranan hatîye destnîşankirin. Em li vir jî dubare digihêjine wê qinyatê ku hikyat, hîkayet, heqayet li cem Kurdan weku navekî giştî bo vegêran û pexşanê hatîye bikaranîn û weku cureyekî serbixwe tu pênase û polînkirinek bo nehatîye danîn.

1.7. Ser(pê)hatî

Di serpêhatîyan da tecrubeyên şexsan, bi awayekî pexşan û kurt di demeke nêzîk da bi piranî ji devê kesê yekem tên vegêran û paşê bi derbasbûna demê re an jî bi neqilkirinê mimkûn e veguhere devê kesê sêyem. Xisûsîyetên serpêhatîyan ên herî berbiçav vegêr her wekî wê rûdanê jîyabe an jî şahidî wê rûdanê bûbe, vedigêre. Lê piştî ku dem bi ser da diqulibe pir mimkûn e ev serpêhatî veguherin formên din ên vegêrana gelêrî ku yek ji wan efsane ye û Honko Lauri (vgz. Keskin: 2019: 203) amaje pê kirîye. Herçiqas Carl Wilhelm von Sydow vegêranên di vê formê da yên çi ji devê kesê sêyem çi jî ji devê kesê yekem bên vegêran bi giştî weku serpêhatî binirxîne jî Linda Dégh û Andrew Vazsonyi (2015: 213-227) bi awayekî rexneyî nêzîkî vê pênasekirina Sydow dibin. Ew dibêjin piştî ku serpêhatî ji devê kesê yekem veguherî devê kesê sêyem ji serpêhatîbûnê dûr dikeve dibe cureyeke din a vegêrana gelêrî. Loma ew dibêjin mimkûn e serpêhatî ji bûyerên rasteqîn, ji gotegot û tecrubeyan pêk hatibin ku ev pêkareke sereke ye, lê li gor binyada vegêranên gelêrî yên berî xwe çiqas serbest bin jî di bin tesîra wan da mane ji hêla hûnandinê ve weku teknîka sêbarekirinê, îmtihan, dîyalogê ve. Loma ew destnîşan dikin ku hêsan nîne cureyên vegêrana gelêrî bi awayekî teqez ji hev bên cudakirin û mimkûn e ku hin cure ji hinên din nizilî bin, mimkûn e têkel bûbin, mimkûn e ku cureyek yê din tune bike û wisa pêk bê. Ji ber wê jî bêyî ku pêkarên din ên vegêranê bên hesibandin, bi tenê li gorî tecrubeya şexsî nirxandina cureyê serpêhatîyê di qalibekî wiha de, dê encameke teqez nexe destê me.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەكولینین كوردی

Li beramberî navê serpêhatîyê di kurdî da serborî, serbirde û serguzeşte jî tê gotin. Herwiha di kurdî da maneyeke berfirehtir jî ji bo serpêhatîyê heye. Ji ber ku di eslê xwe da her vegêraneke gelêrî ji serpêhatîyekê nizilîye, ev mane gelek asayî ye ku li cem Kurdan çêbûbe. Heta di şûna vegêran û hîkayetkirina rûdanê da jî tê gotin. Loma weku çemka hîkayetê, serpêhatî jî li cem Kurdan û heta li cem piranîya lêkolînerên Kurdan ên di qada folklorê da di maneya berfireh da tê bikaranîn û weku cureyeke serbixwe hêj jî xîm û bingeha wê baş nehatîye danîn. Çarçoveya serpêhatî û vegêranên gelêrî yên din ên di bin vî cureyî da bên hesibandin, nehatine eşkerekirin. Loma nestandartbûna navan xwe di vî sernavî da jî dide der. Li gorî metaryalên li ber destên me ji bilî Necat Keskin (2019: 200-204) lêkolînerekî din serpêhatîyê weku cureyekî serbixwe nehesibandîye û polîn nekirîye.

Di nav Kurdên Kavkazê da di nav xebatên birayên Celîl da peyva serhatî û serpêhatî gelek derbas dibe. Xisûsen vê çemkê weku me li jor amaje pê kir di şûna vegêranên gelêrî yên pexşankî da bi nav kirine ku qelîbotk, mijûlî, çîrok, çîvanokan û vegêranên şibhî wan weku serpêhatî hesibandine. Heta serpêhatî li beramberî çemka “proza” bi kar anîne ku di bin navê prozayê da cîazî, qelîbotk, mijûlî û çîrok polîn kirine û wî qismî wiha rave kirine: “Berevoka me da gele serpêhatîyê proza zargotina k'urda - ç’îrok, ç’îvanok, serhatî, cîazî, pêk’enîn, efsene, self û gilîyêd mayîhe xweş, yêk ji alîyê milet da bi h'izkirin têne gotinê, çapkirinê. Nek t'enê poêzîya k'urda da, lê usa jî proza wî da jîyîna xebatk'ara, rabûn-rûniştandina wî, fe'mdarîya û pek'enîna (humora) wî, fîlosofîya û p'sîxologîya wî rind hatîye dîhar kirin. Xeta eşkere me di navbeyna e'frandinêd vekirî da (proza) nek'işandîye, me ew bi t'emamî p'aravenekirîye ser p'ara, her 99 e'frandinêd vekiri me h’îmlî ser du p'ara p'aravekirîye: “Cîazî” û “Qelibotk, mijûli û çîrok”.” (Celîl & Celîl, 1978/I: 39). Balkêş e ku di bin navê prozayê da jî weku cureyekî, navê serhatîyê hilanîye. Lê qesda wan ji vî navî çi ye ne dîyar e. Mimkûn e ku ew anekdotên bi devê kesê yekem tên gotinê û hin meselok û pêkenokên derewînan weku serhatî nirxandibin ku li gorî me jî herî zêde di nav vegêrana gelêrî ya Kurdî da ew li pênaseya cureyê serpêhatîyê diguncin. Dema meriv bala xwe dide hin xebatên Hecîyê Cindî, dibîne ku çemka serhatîyê bi piranî digel çemka beytan re bi kar anîye ku meqsed jê destan in. Bo nimûne sêzdeh şaxên *Dimdim*ê, deh şaxên *Ûsîv û Zelîxe*yê, *Mem û Zîn*ê di bin sernavê beyt-serhatî da û du xebatan jî bi navên *Beyt-Serhatyê Cimeta Kurda* û *Beyt-Serhatyên Kurdaye Epîkyê* dane çapkirin (Cindî & Evdal, 2008: 39-40). Ji van nimûneyan jî tê famkirin ku Cindî bixwe jî ser(pê)hatî di maneyeke berfireh da li beramberî rûdanên bi serê miletekî da qewimî, bi kar anîye.

Di nav xebatên Başûr da Îzedîn Mistefa Resûl çemka serguzeşte digel çemka çîrokê di xebata xwe da bi kar anîye. Şukrîye Resûl jî weku binbeşeke efsaneyan “efsaneyên serguzeşte” polîn kirîye ku qesd jê meselok û anekdot in. Kameran Mukrî jî li beramberî çîrokê serguzeşte bi kar anîye û bi heman rengî Biwar Nûredîn (2004: 14-16) jî weku sernavekî vegêrana gelêrî “çîrok û seguzeşte” digel hev bi nav kirîye. Kurdên Başûrî wisa dîyar e mîna Kurdên Bakurî û Kavkazê seguzeşte di maneyeke berfireh da ji bo hemû vegêranên pexşankî û weku cureyek jî di şûna meselok û anekdotan da bi nav kirine. Ji bilî van xebatan dema em bala xwe didine kovara *Asoy Folklor*, em dibînin ku ji bo serpêhatîyê çemka “serbirde” bi kar anîne. Esil di hin nivîsên Kurmancîya Behdînî yên di kovara navborî da dîsa çemkên serhatî û serpêhatî hene. Lê ew jî bi piranî digel destan û hîkayetan hatine bikaranîn weku serhatîya zembîlfiroş, serpêhatîya Zor Temir

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Paşayê Milê, serbordey Memê Alan (soranî), beyt û sehatîya Leylî û Mecrûm û hwd. Lê serbirde weku cureyekî serbixwe yê vegêrana gelêrî di kovarê da hatîye destnîşankirin ku bi piranî di şûna anekdotan da hatîye binavkirin. Lê carinan weku di hejmara sêyem da xuyaye di bin sernavê giştî yê çîrokî folklorî da jî çemka serbirde hatîye bikaranîn ku ev bi navê "Çend Serbirdeyekî Kon" ji hêla Nazim Şêxanî (2001: 180-181) ve hatîye belavkirin. Lê ew nivîs bixwe jî çend anekdotan di nav xwe da dihundirîne. Kifş e ku xisûsen *Asoy Folklor* çemka serbirdeyê weku cureyekî serbixwe destnîşan û polîn kirîye. Lêbelê ev pênase û polînkirin bi awayekî standart di nav hemû xebatên Kurdên Başûrî da nexuyaye.

Di kovara *Hawar* û *Ronahî*yê da (bi)serhatî herçiqas xisûsen weku sernavê cureyekî vegêrana gelêrî nehatibe destnîşankirin jî tam di maneya vî cureyî da gelek biserhatîyan bo xwînerên xwe neqil kirine. Bi taybetî ew rûdanên ku bi serê şexsan da qewimîne û ji devên wan şexsan neqil bûne weku biserhatî bi nav kirine. Belkî ya herî muhîm bo me "Biserhatîya Reşoyê Darê" ye ku ev serpêhatî li Darêya Mêrdînê pêk hatîye û Cemîl Haco (1932: 4-5) vê di hejmara çardehem û qismê bi tîpên Aramî da belav kirîye. Xaleke balkêş a vê serpêhatîyê jî ew e ku vegêraneke pir nêzî wê, di nav çil hîkayetên Mela Mehmûdê Bazidî da bi navê "H'îkayeta Nozdey" derbas dibe ku di wê hîkayetê da du karakterên bi navê Cergo û Gûzel Xatûn jî şibhî vê rûdanê serpêhatîyekê dijîn (Jaba: 2000: 66-69). Wisa xuyaye weku Necat Keskin jî dîyar kirî meriv wan çil hîkayetan bi temamî nebe jî qismekî ji wan weku serpêhatî destnîşan bike dê ne dûrî pênaseya xwe be ku em mînakeke wê ya şênber di Hawarê da jî dibînin ku wek biserhatî hatîye binavkirin.

Di nav xebatên Bakur da em di nav weşanên Wardozê da di kitêba Mustafa Aslan a bi navê *Baqek ji Folklora Berîya Mêrdînê* da sernavekî xisûsî dibînin ku weku serpêhatî hatîye destnîşankirin ku tê da bêtir anekdot û meselokên ji devê kesê yekem hatine bicihkirin. Heta di xebata Mehpûs Serhedî da ku amadekarîya folklora kovara Hawarê kirîye û "Biserhatîya Reşoyê Darê" di wê berhemê da di bin sernavê çîrokê da daye. Gelek serpêhatîyên bi vî rengî di bin sernavê çîrokê da hatîye weşandin di nav xebatên Wardozê de. Ji bilî wê di kovara *Folklora Kurdan* û *Folklora Me* da pir nimûneyên ji vî cureyî tunene ku meriv nirxandineke tekûz bike. Lê di *Folklora Kurdan* da di du hejmaran da bi sernavê serpêhatî du nivîs hene ku vegêranên di bin van sernavan da li pênaseya serpêhatîyê tê ku ji wan "Serpêhatîya Mala Kapreşîyan" e ku ev rûdaneke bi serê malbatekê da hatî, vedigêre bi devê kesê sêyem û ya din jî bi navê "Serpêhatîya Tirpankêşkî" ye ku ev jî rûdanek e bi serê kesekî bi navê Rûstemo da hatî, vedigêre (Yaman, 2015: 47; Hezer, 2016: 59). Ji ber ku bi navekî din em rastî vî cureyî nehatin, êdî çi bi zanetî an nezanî dîyar e ku hevgirtinek heye û vegêranên li gorî pênaseya serpêhatîyê di bin wî navî da belav kirine. Di kovara *Folklora Me* da di du hejmaran da em sê nimûneyên vê vegêranê dibînin. Herçiqas bi awayekî durist navê du berhevkarîyan weku serpêhatî û serhatî bi awayekî li hev û guncav danîbin jî di berhevkarîya din da digel ku heman şikil vegêran e jî bi navê çîrokê bi nav kirine. Di hejmara yekem da stran û serpêhatîya strana *Lê Yarê* weku serpêhatî hatîye weşandin (Reşwan, 2019: 32-34) ku di heman hejmarê da stran û serpêhatîya *Seydiko* bi sernavê çîrokê hatîye weşandin (Botî: 2019: 99-104). Ev yek jî nîşan dide ku di vê kovarê da ev sernav bi zanetî ji bo cureyê serpêhatîyê nehatîye danîn. Mîna ku me li jorî jî amaje pê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

kir, ji ber mêla Kurdan a ji her teqlîd vegêranê re ku çawa dibêjin serpêhatî an çîrok, li vir jî ji ber heman mêlê ev sernav hatine danîn.

Di encama can xebat û binavkirinên di nav Kurdan da kifş e ku di serî da serpêhatî hêj bi giştî weku cureyekî serbixwe nehatîye pênase û polînkirin. Ji bo standartkirina navê cureyekî jixwe şertê ewil ew e ku pênaseyeke tam a wî cureyî bê kirin û bê destnîşan kirin ka kîjan vegêranên gelêrî dê di bin wî cureyî da bên nirxandin. Herwiha ser(pê)hatî digel ku di çend xebatan da weku cureyekî serbixwe hatibe destnîşankirin jî bi giştî di maneya hîkayet, vegêran û rûdana bi serê meriv da hatî, belav bûye. Lê dîyar e ku ji ber karîgerîya devok û zaravayan bi çend navên weku serhatî, serpêhatî, serborî, serguzeşte, serbirde hatîye binavkirin ku ev bixwe jî arêşeyek e li beramberî standartbûnê.

Encam:

Ji ber kêmasîya pênasekirinên binyatî û polînkirinên lawaz, berî navdanînê di Kurdî de nasîna cureyên vegêrana gelêrî û jihevderxistina wan a ji hev arêşeyeke berçav e ku ev gelek karîger e li ser pirnavî û nestandartbûnê.

Xisûsen piştî Îslamê hevnasîna Kurdan bi çand û zimanê Erebî karîger bûye ku hin çemkên nû bikevine nav Kurdîyê di şûna vegêran, gotin, çîrok, efsane, destan, serpêhatî û pêkenokê de.

Hin çemkên ku maneyên giştî wergirtine weku çîrok, mesele, efsane, serpêhatî, hîkayet bûne sebebê pirnavî û têkelhevîyê. Çimkî her cureyê ku tê de vegêran û veguhastin hebûye, bi rahetî ji bo wî bêyî ku li binyat û formê bê nêrîn ji van çemkên navborî hatine bikaranîn.

Ji bo vegêranên gelêrî di Kurdî da ji tesîra zimanê Erebî dûr bêtir çemkên weku efsane, çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, xebroşk, destan, pêkenok, serpêhatî xuya ne. Herwiha çemkên weku mît, hîkayet, mesele, meselok, qise, anekdot, epos, beyt û hwd. jî bi tesîra zimanên Ewropî û Erebî ketine nav Kurdîyê û di şûna navên hin vegêranan da hatine bikaranîn. Xisûsen navên weku hîkayet, mesele, qise navên gelemperî ne û îşaretî vegêran û çîrokê dikin. Yanî mimkûn e ji bo her cureyekî vegêrana gelêrî ev nav bên gotin bêyî şaşfamîyek pêk bê, çawa ku çîrok û efsane bo piranîya van cureyan dikare bê gotin. Jixwe ji bilî navên Kurdî yên ku me destnîşan kirin gelek navên din piştî hewcedarîya standardîzasyonê anku berbelavbûna xebatên zanistî yên folklora Kurdî û lazimîya polînkirina cureyan ketine nav lîteratura Kurdî. Ji ber ku ev nav bêyî lêkolînên binyatî yên xurt, bêtir weku werger rasterast hatine wergirtin, bûye sedem ku polînkirin û navdanîne saxlem neyê kirin. Loma ya herî muhîm berî navdanîna van cureyan divê lêkonerên folklorê pêşî bikevine dû veçirîna binyatî ya keresteyên gelêrî.

Karîgeriya hokarên weku nestandarbûna zimanî, tesîra zimanên Erebî, Tirkî û Farisî, pirdevokî û pirzaravayî, qutbûna peywendîyê ya lêkolînerên di vê qadê de, neberdewamîya xebatan weku kronolojîyekê weku sedemên şênber ên vê pirnavîyê û nestandartbûnê ne.

Ji bo her cureyî ji yekî zêdetir nav hene û herweha di bin cureyekî de bincure jî hene û bi taybetî di sernavê çîrokan de. Ji ber ku xebatên analîtîk ên di qada folklora Kurdîyê de kêm û qutbûyî ne, mecal nebûye ji hev bê derxistin gelo xisûsen kîjan nav bo cureyê giştî, kîjan nav ji bo bincureyan bêtir hatiye bikaranîn. Loma bûye sebeb ku ji bo çîrokê; çîvanok, xebroşk, meselok, çîrçîrok, efsane jî bên gotin. Lê li gorî xebata me kifş e

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

ku mêleke Kurdan heye ji bo çîrokên ajelan navê "çîvanok"ê bi kar bînin, ji bo çîrokên derasayî "xebroşk"ê bi kar bînin, ji bo anekdotê "meselok"ê bi kar bînin.

Li gorî xebatên li ber destê me kifş e ku lêkolîn û weşanên Kurdan yên xisûsî li ser folklorê di nav xwe da jî serê xwe bi standartbûnekê neêşandine. Di heman kovar û lêkolînê da meriv dibîne ku bo cureyî çîrokê efsane gotine, bo efsaneyê mît gotine, bo pêkenokê çîrok gotinê, bo destanê serpêhatî gotine. Yanî ji bo cureyekî tercîha navekî bi tenê nekirine ku ev jî li gorî min nîşaneya wê yekê ye ku standartkirina vê lîteraturê ji bo xwe nekirine armanc.

Xisûsen di cureyê hîkayetê de xuya bû ku li cem Kurdan ev çemk ji navê cureyekî serbixwe bêtir di maneyeke berfireh û giştî da ji bo vegêranê bi kar tînin. Ev cure li cem piranîya Kurdan hêj nehatiye pênasekirin û vegêraneke Kurdî ya ku di bin vî cureyî da binirxînin, destnîşan nekirine. Ji bo vegêranên me yên ku lêkolînerên folklorê yên cîhanî weku "folk romance/halk hikayesi/hîkayeta gelêrî" nav datînin, lêkolînerên Kurdan ew vegêran weku destan bi nav kirine.

Herî dawî dixwazim pêşnîyazek bikim ji bo çareserîya vê arêşeyê. Li gorî me berî her tiştî gelo ev pirnavî û polînkirina lawaz li cem lêkolînerên Kurdan weku arêşe tê hesibandin? Divê lêkolînerên qada folklorê ewil bersiva vê pirsê bidin. Ger herkes ji vê yekê heman gilî û gazincan dike, wê çaxê di serî da di nav akademîya Kurdî de divê xebatên binyatî û senifandinî bên kirin. Herwiha digel wân xebatan hevdemî ji ber parçebûn, qutbûna peywendîya lêkolîneran ji hev, pirdevokî û pirzaravayîya di nav me da divê helwestek bê nîşandan û di serî de çend rêzekomxebat bên pêkanîn bi beşdarîya her aliyekî Kurdistanê û paşê ev komxebat çend salan carekê bên pêkanîn û şopandina arêşeyên qada folklorê berdewam bê kirin.

Çavkanî:

Aslan, Mustafa (2019) *Baqek ji Folklora Berîya Mêrdînê*, Dîyarbakır: Wardoz.

Azîzan, Hereqol (1932) Çîrçîroqa Bîngolê, *Hawar*, Hejmar: 11, 6-7.

Azîzan, Hereqol (1932) Sîyabendê Silîvî, *Hawar*, Hejmar: 13, 5-6.

Baran, Bahoz (2015) Çîrokên Gelêrî, *Folklora Kurdan*, Çile-Sibat-Adar, Hejmar: 1, 57-59.

Bascom, William R. (2006) Folklorun Biçimleri: Nesir Anlatılar, (Çev.) R. Nur Aktaş ve diğerleri, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 113-132.

Bedirxan, Kamiran Ali (1932) Edebîyata Welatî, *Hawar*, Hejmar: 1, 5.

Bello, Evrehmanê (2019) Du Meselok ji Serhedê, *Folklora Me*, Hezîran-Tîrmeh-Tebax, Hejmar: 2, 24-25.

Bello, Evrehmanê (2021) Sê Hîkayetên Qereçobanê, *Folklora Me*, Kanûna Pêşîn-Kanûna Paşîn-Sibat, Hejmar: 8, 28-29.

Borak, Mustafa (2015) Kela Dimdimê, *Folklora Kurdan*, Çirîya Pêşîn-Çirîya Paşîn-Kanûna Pêşîn, Hejmar: 4, 60-67.

Botî, Dildar (2019) Çîrok û Strana "Seydiko"yê , *Folklora Me*, Adar-Nîsan-Gulan, Hejmar: 1, 99-104.

Bozarslan, M. Emin (2006) *Pepûk: Meselokên Lawiran V*, Amed: Weşanên Deng.

Buch, Wilfried (2006) Masal ve Efsane Üzerine, (Çev.) Ali Osman Öztürk, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 223-228.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Buran, Eşref (2018) *Mela Wekî Tîpekî Pêkenokên Kurdî*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.
C.A.B. (1944) Memê Alan, *Ronahî*, Hejmar: 23, 8.
Celîl, Ordîxan & Celîlê Celîl (1978) *Zargotina Kurdî I*, Moskova: Naûka.
Celîl, Ordîxan & Celîlê Celîl (1978) *Zargotina Kurdî II*, Moskova: Naûka.
Celîl, Ordîxan & Celîlê Celîl (2014) *Zargotina Kurda 2*, Wien: Înstîtûya Kurdzanîyê.
Cewerî, Firat (Amd.), (1998) *Hawar*, Stockholm: Weşanên Nûdem.
Chaman Ara, Behrooz (2015) *The Kurdish Sãhnãma and Its Literary and Religious Ipmlications*, Amazon.com.
Cindî, Hecîyê & Emînê Evdal (2008) *Folklora Kurmanca*, Stenbol: Avesta.
Cindî, Hecîyê (2015) *Hikyatêd Cimeata Kurda*, Berg (VI), Stenbol: Rûpel.
Circîs, M. Şivan (2019) Rengvedana Efsanê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da, *Folklora Me*, Hezîran-Tîrmeh-Tebax, Hejmar: 2, 91-108.
Cotyar, Xalid (2005) Efsane Çi ye?, *Asoy Folklor*, Hejmar: 7, 93-97.
Dégh, Linda & Andrew Vazsonyi (2015) Memorat ve Ön-Memorat, (Çev.) Ahmet Barış Ekiz, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 3*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 213-228.
Dégh, Linda (2019) Günümüz Bağlamında Efsane Üzerine Teorik Bir Düşünme ve Efsanenin Tanımı, (Çev.) Selcan Gürçayır, (Edt.) M. Öcal Oğuz & Selcan Gürçayır Teke, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 2*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 204-210.
Dîzman, Ridwan (2015) Di Fabilên Kurdî da Rovî, *Folklora Kurdan*, Temmûz-Tebax-Îlon, Hejmar: 3, 22-29.
Dundes, Alan (1997) Folklor Nedir? (Çev.) F. Gülay Mirzaoğlu, *Millî Folklor*, Kış, Sayı: 36, 74-76.
Ehmed, Herêm Îbrahîm (2010) Rengdanewey Ayînî Îslam le Efsaney Kurdî da, *Asoy Folklor*, Hejmar: 49, 27-55.
Elî, Husên Sabîr (2010) Serhatîyek Bo Nasînî Efsane û Heqayet, *Asoy Folklor*, Hejmar: 49, 24-26.
Eliade, Mircea (2001) *Mitlerin Özellikleri*, (Çev.) Sema Rifat, İstanbul: Om Yayınevi.
Erîşen, Bawer (2021) Li gor Teorîya Etnosembolîzmê Nirxandina Destana Kawayê Hesinkar, *Folklora Me*, Adar-Nîsan-Gulan, Hejmar: 9, 26-30.
Fewzî, Kemal (1918) Kürd Masalları, *Jîn*, Hejmar: 22, Stenbol, 7-10.
Gazî, Mustafa (2015) Çîrokên Gelêrî, *Folklora Kurdan*, Temmûz-Tebax-Îlon, Hejmar: 3, 74-76.
Gazî, Mustafa (2016) Çîrokên Çêbûna Sewalan, *Folklora Kurdan*, Tîrmeh-Gelawêj-Rezber, Hejmar: 7, 25-27.
Geverî, Ayhan (2008) *Antolojîya Çîrokên Nûbiharê*, Stenbol: Nûbihar.
Gun, Elîf (2020) Efsaneya Çala Hakloyê, *Folklora Me*, Kanûna Pêşîn-Kanûna Paşîn-Sibat, Hejmar: 4, 14-15.
Gun, Elîf (2021) Behlûl û Meselokên Wî li Herêma Torê, *Folklora Me*, Adar-Nîsan-Gulan, Hejmar: 9, 76-78.
Gunduz, Elîf (2019) Çar Meselokên Xîya/Pêkenokên Xîya, *Folklora Me*, Îlon-Çirîya Pêşîn-Çirîya Paşîn, Hejmar: 3, 86-87.
Haco, Cemîl (1932) Biserhatîya Reşoyê Darê, *Hawar*, Hejmar: 14, 4-5.

Hezer, Mehmet Emîn (2016) Serpêhatîya Tirpankêşkî, *Folklora Kurdan*, Kanûna Paşîn-Sibat-Adar, Hejmar: 5, 59.
Human, Surya (2019) Efsaneya Êlê Şaze, *Folklora Me*, Adar-Nîsan-Gulan, Hejmar: 1, 51-52.
Human, Surya (2020) Efsane Ser o Çend Malumatî û Efsaneya Kekoyî yan zî Pepûke, *Folklora Me*, Kanûna Pêşîn-Kanûna Paşîn-Sibat, Hejmar: 4, 66-67.
Husên, Nîmet (2006) Qewlê Zebûnî Meksûr, *Asoy Folklor*, Hejmar: 16, 126-130.
Jaba, Aleksander (2000) *Çîrokên Kurmancî*, (Amd.) Cankurd, Stockholm: Helwest Weşanên Çanda Nûjen.
Jahn, Manfred (2015) *Anlatıbilim; Anlatı Teorisi El Kitabı*, (2. Baskı), (Çev.) Bahar Dervişcemaloğlu, İstanbul: Dergâh Yayınları.
Kakeyî, Herwêll (2013) *Dastanî Baram û Gulendam*, Silêmanî: Înstîyutî Keleporî Kurd.
Kendo (1913) Çîrokê Kurmanca, *Rojî Kurd*, Hejmar: 2, 31.
Keskin, Necat (2019) Folklor û Edebîyata Gelêrî, Stembol: Avesta.
Keydanî, Eşref (2020) Du Hîkayet ji Herêma Garisanê, *Folklora Me*, Çirîya Pêşîn-Çirîya Paşîn, Hejmar: 7, 16-18.
Kreyenbroek, Philip G. (1995) *Yezidism Its Background, Observances and Textual Tradition*, Lewiston: The Edwin Mellen Press.
Levi-Strauss, Claude (2013) *Mit ve Anlam*, (Çev.) Gökhan Yavuz Demir, İstanbul: İthaki Yayınları.
Loristanî, Xan Elmas. Defterê Kelam, Destnivîsa Nusxeya Seyîd Xelîl 'Alînejad, (bt.) Bê Tarîf.
Luthi, Max (2006) Masalın Efsane, Menkabe, Mit, Fabl ve Fıkra Gibi Türlerden Farkı, (Çev.) Sevengül Sönmez, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 220-222.
Mewlûd, Ebdulla Xidir (2005) Meselekanî Kurdewarî, *Asoy Folklor*, Hejmar: 15, 86-88.
Mewlûd, Ebdulla Xidir (2006) Meselekanî Kurdewarî, *Asoy Folklor*, Hejmar: 16, 131-133.
Mokri, Muhemed (1966) *Dastanê Bîjen û Menîce*, Paris: Librairie Klincksieck.
Mukrîyanî, Gîw (2013) *Ferhengî Kurdistan Kurdî-Kurdî*, Amed: Weşanên Enstîtuya Kurd3i ya Amedê.
Mukrîyanî, Mem (2017) *Ebando*, Dîyarbakır: Wardoz.
Nûredîn, Biwar (2004) *Bîblîyografyay Kitêbî Folklorî Kurdî 1860-2004*, Silêmanî: Înstîyutî Keleporî Kurd.
Oinas, Felix J. (2015) Halk Destanê, (Çev.) Dilek Beden, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 3*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 234-246.
Olçer, Feray (2020) Motîfên Çîroka Leyl û Mecrûmê, *Folklora Me*, Hezîran-Tîrmeh-Tebax, Hejmar: 6, 46-54.
Omer, Fazil (1990) Çend Çîvanokên Ezop, *Karwanî Folklor*, Hejmar: 1, 133-137.
Omer, Sellah (2005) Derwazeyek bo Efsane, *Asoy Folklor*, Hejmar: 49, 98-99.
Öztürk, Mustafa (2018) Çîrokên Werger ên Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1870), *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 4, Cilt: 4, Sayı: 8, 2018/2, 33-63.
Pentikainen, Juha (2006) Efsanenin Yapısı ve Fonksîyonu, (Çev.) İsmail Görkem, (Edt.) M. Öcal Oğuz ve diğerleri, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Ankara: Geleneksel Yayınları, 113-132.
Polat, Yûksel (2015) Çîrokên Gelêrî, *Folklora Kurdan*, Nîsan-Gulan-Hezîran, Hejmar: 2, 87-88.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Qeracî, Taban (2001) Çîrok û Efsaney Nawçey Kirmaşan, *Asoy Folklor*, Hejmar: 3, 159-161.
Qerenî, Ehmed (2006) Binemayên Mêjûya Zarekî di Folklora Kurdî de, *Asoy Folklor*, Hejmar: 16, 4-20.
Resûl, Îzeddîn Mistefa (2010) *Edebî Folklorî Kurdî*, Çapê Sêyem, Hewlêr: Dezgay Çap û Bilawkirdinewey Aras.
Resûl, Şukrîye (2008) *Edebî Folklorî Kurdî*, Hewlêr: Dezgay Muzîk û Kelepûrî Kurd.
Reşwan, Sadiq (2019) Stranek, Serpêhatîyek “Lê Yarê”, *Folklora Me*, Adar-Nîsan-Gulan, Hejmar: 1, 32-34.
Sebrî, Ebdulla (2007) Qewlê Zebûnî Meksûr, *Asoy Folklor*, Hejmar: 28, 121-137.
Serhedî, Mehpûs (2017a) *Kêço*, Dîyarbakır: Wardoz.
Serhedî, Mehpûs (2017b) *Sînosêwî*, Dîyarbakır: Wardoz.
Sermîyan, Ugur (2016) Hîkayeya Şuware, *Folklora Kurdan*, Tîrmeh-Gelawêj-Rezber, Hejmar: 7, 32-33.
Seyarî, Ahmet (2020) Rola Jinê di Destanên Kurdî yên Epîk da, *Folklora Me*, Kanûna Pêşîn-Kanûna Paşîn-Sibat, Hejmar: 4, 68-78.
Seyarî, Ahmet (2021) Çîroka Borê Qer, *Folklora Me*, Kanûna Pêşîn-Kanûna Paşîn-Sibat, Hejmar: 10, 16-20.
Sîerra, Roza (2019) Du Pêkenok, *Folklora Me*, Hezîran-Tîrmeh-Tebax, Hejmar: 2, 117.
Sîerra, Roza (2020) Du Meselokên Farqînê, *Folklora Me*, Kanûna Pêşîn-Kanûna Paşîn-Sibat, Hejmar: 4, 80-81.
Subaşı, Kenan (2016) Vegotina Hêmayî û Metaforîk di Mamikên Kurdî de, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 1/1, 71-90.
Subaşı, Kenan (2019) *Kürtçe (Kurmanci) Masalların Anlatı Tipolojisi*, Dîyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Yayınlanmamış Doktora Tezi.
Suvağci, İlyas (2019) Kürtçe Fıkraların Konuları Bakımından Sınıflandırılması, *Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyum Bildirileri*, Şırnak: Şırnak Üniversitesi Yayınları.
Şareza, Kerîm (2001) Efsane û Hîkayetî Lêkderewey Gîyandaran li Edebî Millî da, *Asoy Folklor*, Hejmar: 3, 86-92.
Şêxanî, Nazim (2001) Çend Serbirdeyekî Kon, *Asoy Folklor*, Hejmar: 3, 180-181.
Temo, Fuad (1913) Çîrok, *Rojî Kurd*, Hejmar: 1, 25-26.
Thompson, Stith (1951) *The Folktale*, New York: The Dryden Press.
Ugur, Mahîr (2020) Çîroka Papûkê, *Folklora Me*, Çirîya Pêşîn-Çirîya Paşîn, Hejmar: 7, 38-40.
Vali, Shahab (2021) *Şehnameya Kurdî Rustemê Zal û Heft Xana Wî*, Stenbol: Avesta.
Weqfa Mezopotamyayê (2021) Komxebata Termînolojîya Folklorê, Xebata Neçapkirî.
Xanî, Ehmedê (1942) Memozîn, *Hawar*, Hejmar: 45, 6-9.
Yaman, Pinar Çakin (2015) Serpêhatîya Mala Kapreşîyan, *Folklora Kurdan*, Çirîya Pêşîn- Çirîya Paşîn-Kanûna Pêşîn, Hejmar: 4, 47.
Yaş, Zeynep (2021) Efsaneya Mem Şivanê Mîrê Mirazan, *Folklora Me*, Adar-Nîsan-Gulan, Hejmar: 9, 11-13.
Yıldırım, Kadri & Ramazan Pertev, Mustafa Aslan (2013) *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.
Yıldırım, Kadri (2010) *Ehmedê Xanî-Mem û Zîn (Çeviri ve Kavramsal Tahlil)*, Stenbol: Avesta.

Perawêz:

[1] Hejmara yekem a kovara *Asoy Folklor* bi navê *Karwanî Folklor* belav bûye û di hejmara duyem da navê *Asoy Folklor* wergirtîye û heya dawîya weşana xwe bi vî navî dewam kirîye.

Halk Anlatılarında Çokisimli Yapı ve Kürtçe'de Standartlaşamama Sorunu

ÖZET:

Folklor diğer bir adıyla halk bilimi çok yönlü bir disiplindir. Bu bilim dalı insanların dili aktarım aracı olarak kullanıp halkın sanat, fikir ve ilim havzasında yer alan üretim ve yeniden üretim sürekliliğini inceler. Tek başına bir tanımın veya bakış açısının bu disiplini anlamamıza yetmeyeceği kuşku götürmez bir gerçektir. Folkorun iyice anlaşılması adına diğer disiplinlerle ilişkisi, yoğunlaştığı ilim sahaları, etkisi ve daha birçok konuda araştırılması gerekir. Bu nedenle 19. yüzyıldan tutun günümüze kadar folklor üzerine birçok kongre, çalıştay, sempozyum ve araştırma yapılmıştır. Bu çalışmalarda folklorun tanımı, türleri ve teorileri üzerine çok fazla inceleme inceleme ele alınmıştır. Özellikle de folklor bir bilim dalı olarak kabul edildikten sonra sınıflandırma ve tanımlama çalışmalarına daha fazla ihtiyaç duyulmuştur. Bu alandaki benzer çalışmalar Kürtler arasında 20. yüzyılın ilk yarısında başlamıştır. Fakat bu çalışmaların birbirinden kopuk olması, devamlılık arzetmemesi, Kürdistan'ın parçalanmışlık durumu, Kürtler arasındaki iletişim kopukluğu, Kürtçe eğitimin olmayışı gibi nedenlerle bu alanda henüz standart bir tanım ve tasnife ulaşılamamıştır. Bu çalışma da tam da belirtilen standartlaşamama sorunu üzerine yoğunlaşmıştır. Bu makalenin araştırma sahası halk edebiyatı ile sınırlandırılmış ki o da kendi içinde üç ana başlığa ayrılmaktadır; halk anlatıları, halk şiirleri ve bu türlerin dışında kalanlar. Bu ana başlıklar arasında sadece halk anlatıları ve türleri bu makalede ele alınacaktır. Folklor türlerinin tanımlanması, sınıflandırılması ve standartlaştırılması millet olma bilincinin bir ürünüdür. Aslında bölgesel olarak yıllarca süregelen ve Kürtler arasında bu türleri isimlendirme ve aktarma çabası varolan bir gerçek ve gelenektir. Fakat günümüzde Kürtleri tek parça bir millet ve Kürtçeyi de bu milletin resmi dili kabul ediyorsak, folklor alanındaki standartlaşma çabalarına yoğunlaşmamız gerekir. Bu amaçla geçmişten günümüze Kürt folkloru alanındaki Kafkas Kürtlerinin çalışmaları, *Hawar*, *Ronahî*, *Asoy Folklor*, *Folklora Kurdan* isimli dergiler, Kürt Kültürü Enstitüsü ve Mezopotamya Vakfı çalışmaları (*Folklora Me*, *Folklor û Ziman* adlı dergiler ve Folklor Terminolojisi Çalıştayı) bu araştırmanın ana kaynakçasını oluşturmuşlardır. Bu çalışmalar bağlamında bazı tespit ve sonuçlar ortaya koyulmuş ve öneri olarak da halk anlatı türlerinin isimlendirme denemesine girişilmiştir.

Anahtar Kelimeler*: Kürt Folkloru, Halk Anlatısı, Sınıflandırma, Tür, İsimlendirme, Standardizasyon*

Multinomial Structure of Folk Narratives and the Problem of Their Non-standardization in Kurdish

ABSTRACT:

Folklore is a versatile discipline. This branch of science examines the continuity of production and reproduction in the art, idea and science basin of the people by using the language as a means of transmission. It is an undoubted fact that a single definition or perspective will not be enough for us to understand this discipline. In order to better understand the folklore, its relationship with other disciplines, the scientific fields it focuses on, its influence and many other subjects should be investigated. For this reason, many congresses, workshops, symposiums and researches on folklore have

Zakho Centre for Kurdish Studies

been held from the 19th century to the present. In these studies, the definition of folklore, its genres and theories have been discussed a lot. Especially after folklore was accepted as a science, classification and definition studies were needed more. Similar studies in this area began among the Kurds in the first half of the 20th century. However, a standard definition and classification in this field has not been reached yet due to the disconnection of folklore studies from each other in Kurdish, the lack of continuity of folklore studies, the fragmented state of Kurdistan, the lack of communication among the Kurds, and the lack of education in Kurdish. This study also focused on the problem of non-standardization, which was mentioned exactly. The research area of this article is limited to folk literature, which in itself is divided into three main headings; folk narratives, folk poems and the rest of these genres. Among these main topics, only folk narratives and their genres will be discussed in this article. The definition, classification and standardization of folklore genres is a product of the consciousness of being a nation. In fact, the effort to name and transfer these genres among the Kurds, which has been going on for years, is a fact and tradition. But if we accept the Kurds as a single nation and Kurdish as the official language of this nation, we need to concentrate on standardization efforts in the field of folklore. For this purpose, the studies of Kurdish folklore from past to present such as studies Caucasian Kurds, the magazines named *Hawar*, *Ronahî*, *Asoy Folklore*, *Folklora Kurdan*, the Kurdish Heritage Institute and Mesopotamia Foundation studies (*Folklora Me*, *Folklore û Ziman* and the Folklore Terminology Workshop) are the main sources of this research. In the context of these studies, some determinations and results were put forward and as a suggestion, an attempt was made to name the folk narrative genres.

Keywords: *Kurdish Folklore, Folk Narrative, Classification, Genre, Naming, Standardization*

BANDORA FOLKLORÊ LI SER HELBESTA MODERN YA KURDÎ BI MÎNAKA HELBESTVAN DIYA CIWAN

Halime UÇAR

Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî-Zanîngeha Bingolê/ Turkîya

PUXTE:

Folklor hebûna netewekî ye. Bawerî, çîrokên gelerî, stran, tradisyon û gelek biwarên din bi berhemdarîya gel hêmanên folklorîk pêk tînin. Çavkaniya Folklorê gel e û pîştî berhemanîna folklorîk bandorê li gel bixwe jî dike. Bi gotineke din kartêkerîya Folklorê dûalî ye. Hem bandorê dike hem jî bandorê werdigire. Yek ji wan biwarên ku bandorgeriya Folklorê li serê heye; Helbesta Modern e. Em ê di vê xebata xwe de li ser tekiliya folklorê û helbesta modern bisekinin. Bi mînaka Helbestvan Diya Ciwan têkiliya Folklor û Helbesta Modern dê bê lêkolînkirin.

Folklor û bandorgeriya Folklorê ya li ser Helbesta Modern di gelek qaden akademîk û Rexneya Edebî de hatiye niqaşkirin. Li gorî hin çavkaniyan Folklor ji bo helbestê çavkaniyeke berhemdar e. Li gorî hin otorîteyên din Folklor xasma helbestê sinordar dike û qalibên neguharbar jê re diafirîne. Ji loma gelek helbestvan ji folklorê dûr dikevin û pûte bi Folklorê nadin. Ji aliyekî din hin helbestvan gelekî girîngîyê bi Folklorê didin û zêde hêmanên Folklorîk bi kar tînin. Li ser vê xalê sedemên her yek helbestvanê/î ji hev cûda ye. Em ê di deqa gotarê de berfirehtir vê niqaş bikin.

Bi modernbûnê û destpêka Edebiyata Kurdî ya Modern her wextî xebatên Folklorê hatine kirin. Seyra van xebatan Folklornas Remezan Pertev di gotareke xwe de nivisîye. Ji serdemên pêşî ve Folklorê bandora xwe li ser Edebiyat û Helbesta Modern kiriye. Yek ji wan temsîlkarê Helbesta Kurdî ya Modern, Helbestvan Diya Ciwan e. Ji salên 1970yî ve helbestên modern dinivîse. Yek ji makeçavkaniya helbestên wê Folklor e. Helbestvan ji ber çi girîngî daye Folklorê? Folklorê di Helbestên Diya Ciwan de çawa cî girtiye? Helbest çima bibe veguhestinêrê Folklorê? Diya Ciwan kîjan hêmanên folklorîk bi kar anîne? Têkiliya Helbesta Modern û Folklorê dirêj e û dibe mijara tezekê. Lê ji ber sînordariya xebatê dê di çarçoveya helbestên Diya Ciwan de ev têkilî bê lêkolînkirin.

Diya Ciwan piştî serdema Edebiyata Kurdî ya Klasîk ji wan jinên pêşîn e ku helbestên modern dinivîse. Piştî serdemeke duvedirêj jina kurd di qada helbesta modern de careke din vejiyaye. Helbestvana kurd di helbestên xwe yên modern de bi berfirehî cî daye mijara Folklorê. Hevnasîna wê ya bi Cegerxwîn û Osman Sebrî re sedemên têkildariya wê û Folklorê hinekî ji me re diyar dike.

Peyvên Serekî: *Helbesta Modern, Folklor, Diya Ciwan, Edebiyata Kurdî, Bandorgeriya Folklorê*

Destpêk:

Folklor ji destpêka helbesta kurdî heta bi roja me di her wextî de bandorgerî li ser helbesta kurdî kiriye. Di vê xebatê de em dê li ser bandora Folklorê ya li ser Helbesta Modern ya Kurdî bi mînaka helbestvan Diya Ciwan bisekinin.

Zakho Centre for Kurdish Studies

Folklor li ser Edebiyatê kartêkeriyeke dûalî dike. Hem bandorê dike hem jî bandorê werdigire. Ji bo Edebiyata Kurdî mînaka wê hevbandorgeriya herî giring şanoya Memê Alan ya Ebdurehîm Rehmî Hekkarî ye. Hem çavkanîya wê Foklor e hem jî şano bi xwe jî weke berhemeke Folklorîk hatiye nasîn. Her wiha bandorgeriya Folklorê li ser Helbesta Modern ya kurdî jî heye. Nifşa Hawarê, Jînê, Roja Nû û hwd. di serdemên pêşî yê Edebiyata Modern de hem gelek xebatên foklorîk kirine û hem jî çavkaniya berhemên wan hêmanên folklorîk in. Ji aliyek din ve ritma Helbesta Gelerî jî bi kar anîne. Bi vî awayî deng û newaya helbesta Gelerî bandorgerî li ser helbesta modern jî kiriye. Dema helbesteke modern ya Ebdurehîm Rehmî, Qedrîcan, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Diya Ciwan tê xwendin ev newaya Gelerî ji helbestên wan tê bihîstin. Li gorî Mihemed Bekir Mihemedî yekem kesê ku ev ritma Gelerî aniye nav Helbesta Modern Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî ye. (Ahmed, 2017: 36)

1.Peydabûna Folklorê

Folklor ji peyvên “gel” û “zanistê” pêk tê. Di kurdî de bi navê xwe yê Gelnasî, Zanîsta Gelerî, Zargotin tê zanîn. (Pertev, 2014: 12) Xebat û lêkolînên folklorî ji bo nasîna miletekî pir giring in. Foklor bîr û bawerî, stran, destan, çîrok, lawij, keresteyên madî yên foklorîk yê neteweyekî berhev dike û li ser wan xebatên zanîstî dike. Folklor ji bîr û berhemanîna netewekî ya bi sedansalan pêk tê. Ji ber vê ye di serdemên modern de keresteyên folklorik hatine berhevkirin ji bo ku hevgiriya neteweyekî çêbibe. Heta ev bûye sedema ji nû ve vejandina neteweyan. (Pertev, 2020: 64)

Folklor bi pêvajoya modernbûnê wekî zanisteke derdikeve pêş. Beriya serdema modernîzmê Folklor wekî zanistekî ne giring e û xebatên bi rêk û pêk li ser vê qadê nehatine kirin. Weke zanîstekî destpêka Folklorê bi romantîkan û netewetiyê çêdibe. Remezan Pertev li ser peyda bûna Folklorê di xebata xwe ya bi navê “Tesîra Modernîzmê Li Ser Xebatên Pêşî Yên Folklora Kurdî Tirkî” de wîsa rave dike:

“Wekî zanist peydebûna folklorê di sedsala XIX. de ye. Lewra cereyana romantîzmê û tevgerên netewetiyê li ser xebatên folklorê tesîreke mezin çê kirine. Zanyarê elman Johann Gottfried Herder (1744-1803) yekem ji wan kesan bû ku bal kişandiye ser têkiliya çand û neteweyê. Li gorî Herder, berdewamiya serxwebûna neteweyan girêdayî parastina çand û berhemên gelêrî yên wê neteweyê ne.” (Pertev, 2014, r.12)

Sedemê peydabûna Folklorê helbet pir girîng e. Ev sedem dikare bi heman awayî bibe sedemê bikaranîna hêmanên folklorîk di Helbesta Modern de. Helbestvan Diya Ciwan jî ji seba vê hêmanên Folklora Kurdî ji helbestên xwe re dike binmetn (subtext). Ev xal dê bêtir bê ravekirin.

2. Jiyana Diya Ciwan

Di sala 1952yan de li Bakurê welêt, gundê Kundêş, girêdayî bajarê Şirnex e, ji dayik bûye. Navê Diya Ciwan, Zeyneb e. Lê ji ber çanda kurdên Rojava ew bi navê zarokên xwe yê pêşîn bi nav dibin. Ciwan zarokê helbestvan ê pêşîn ê Zeyneb Xanim e. Ji loma ev nav lê hatiye kirin. Dema berhemên xwe yên edebî jî nivîsîye ev nav pejirandiye. Diya Ciwan helbestvaneke jin e ku helbestên modern dinivîse. Her wiha ji ber xebatên xwe gelek xelatên wêjeyî wergirtine. Diya Ciwan bi gotina xwe wiha behsa xwe dike[1]:

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

“Navê min Zeyneb e. Zeyneb keça Mela Osmanê Şûzî. Ez di sala penceh û diduwê de li gundê Kûndêş li herêma Botan hatime jiyanê lê gundê bav û bapîrê mi, malbata min ji gundê Şûz in. Ew jî her li herêma Botan e. Neqeba herdû gundeka de gundê Şûz seatek birêveçûnê ye. Wek min gotî sala pênceh û diduyan hatime jiyanê di nav malbatekî têr û tijî rewşenbîrî, welatparêzî û çand û hinera kurdî bû.” (Diya Ciwan, 2021)

“…mala bavê min daîm tijî mêhvan û hatinçûn bû, ji zana ji gundiya ji deşt û çiya ji şivana. Vêca berê wê demê edetek hebû ku her ku mêhvanek dihat digotin ‘kîska mêhvana’, ewî mehvanî tiştekî ji wê malbatê civatê re digot. Ez jî gelekî pêgirê Wêjaya Kurdî, filklor û deng û awaz û her tiştî bûm. Di temenê heşt saliya min de, dema bavê min ders didane feqehên xwe, ez jî feqeha bavê xwe bûm. Ez jî qutabîya bavê xwe bûm, ber derstê bavê xwe min dixwend. Lê min gelek cara dema ewî ders didan feqehê xwe, dersê Cezîrî û Xanî min helbestên wa ji ber dikirin.” (Diya Ciwan, 2021)

“Hingî girêdana min bi wêje, folklor û toras ve hebû. Ya dî jî her êvar pîrka mi heta ku çîrok ji me re negohtane, em wek zarok me nedikarî binivin, me nedikarî em razin. Her êvar te dî bû çîrokek, didu, sê ku pîrka mi ji me re bêje û mi gelekî ser çîrokê pîrka xwe nivîsîne jî ku çi ji me re digot.” (Diya Ciwan, 2021)

Weke ku ji van agahiyan ku rasterast ji devê Helbestvan Diya Ciwan me nivîsî û bi riya ragihandinê me bi destxistî Diya Ciwan ji civaka xwe, derdora xwe û malbata xwe sûd wergirtiye. Helbesta xwe jî bi vê çavkaniya çandî ya civakî xemilandiye. Bala wê her tim li ser çîrok û bîranînan bûye. Ev di berhem û helbestên wê de jî diyar dibe. Gotinên Pêşîyan berhev kirine. “Çîrokên Kurda” nivîsîye. Her wiha “Gotinên Li Ber Mirinê” ferhengoka Diya Ciwan ya dûzimanî ye. Ev ferhengok jî ji bo parastin û berhevkirina peyvan nivîsîye. Zimanê wê erebî û kurdî ye.

Diya Ciwan di 13 salîya xwe di sala 1966an de ji bo bi pismamê xwe re bizewice diçe Rojava. Li bajarê Qamîşlo bi cî dibe. Li vir derdoreke wê ya rewşenbîrî çê dibe û hevjînê wê ji bo Diya Ciwan binivîse her demî piştgiriyê li wê dike. Li ser hevjîne xwe jî dinivîse û vê piştgiriya hevjîne xwe her demî bi şanazî bi lêv dike.

“Heqê zilamê mi ku ew kurmamê mi bû. Xwedê dilovaniya xwe lê bike ku ew seranserê jiyana min piştgirê min bû. Ew gelek bawer bû, bawermend bû bi mafê jinê, bi rolê jinê di jiyanê de, di hemî dere dî de. Her wiha piştgîrê min bû di mecela siyasetê de, piştgîrê min bû di mecela rewşenbîrîyê de, di mecala civakî de. Ew î piştgiriyekî bêrawestan ji bo min dikir. Heger rojek bihata min bigota “Ez westiham, ez ê dev ji van tişta berdim.” Qîma wî nedihat, Ew î digot “Heyf e, divê tu nerûne tu dikare bike, divê ti bike.” (Diya Ciwan, 2021)

Diya Ciwan di sala 1977an de dest bi nivivîsîna helbestan kiriye. Baran, Hêstirên Ziwa (Rondikên Ziwa), Pêlek Ji Deryayê Kovanên Min, Bênder dîwanên wê yê helbestan e. Di kovara Pênûsa Nû, Jiyan, Berbangê… de jî helbestên wê hatine çapkirin. Li Rojava pêşengiya Mihrîcana Hebesta Kurdî kiriye. Her wiha endama Komîta Helbestan Ya Osman Sebrî ye. Li Suriye endama Komîteya Parastina Mafê Jinan e. Her wiha endama PDK- Suriye ye. (Riataze, 2021), (Nûbihar,2021), (Muhammad,2018:267)

Li Şamê, Qamîşlo jiyaye. Piştî şêrê navxweyî yê Suriye goçî Herêma Kurdîstanê kiriye. Niha jî li bajarê Duhokê dijî. 4 kur,2 keç tev de 6 zarokê wê hene.

Diya Ciwan her wextî dixebite û hewl dide bi rewşenbîrên kurd re hev binasin. Diya Ciwan di sala 1982an dema di kovara Berbangê de helbesteke xwe diweşîne

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Osman Sebrî dixwaze wê nas bike. Bi vî awayî ew û Osman Sebrî hev nas dikin û heta dawiya emrê Osman Sebrî jî hev dibînin. Her wiha li Rojavayê jî bi helbestvanên weke Cegerxwîn, Tîrêj, Emerê Le'lê, Seydayê Keleş re têkiliyên wê yên xurt hebûn. (Xoser TV, 2021)

Berhem

Pêlek Ji Deryayê Kovanên Min, şi'r, Şam, 1992
Bazbend, çîrok, Şam, 1997
Hêsrên ziwa, şi'r, Şam, 1998
Çîrokên kurda, beşê 1, 2004
Çîrokên kurda, beşê 2, 2007
Gotinên pêşiya, Duhok, 2007
Gotinên Li Ber Mirinê, Duhok, 2012
Bênder, Avesta, Istanbul, 2008
Baran, Çapxaneya Xanî, Duhok, 2017
Kenê Reş, Nubihar, Istanbul, 2021

3. Folklor û Helbesta Modern

Helbesta kurdî piştî dawiya sedsala nozdehan rengekî nû werdigire. Vegotin û qalibên klasîk hêdî hêdî ciyê xwe ji rêzikên helbesta azad re berdidin. Helbesta azad û bi gotineke din helbesta modern rengê xwe li Edebiyata Modern a Kurdî dike. Hem ji hêla naverokê ve hem jî hêla şêwazê ve êdî ji bo helbestê qeîdeyên nû tên emilandin. Di Edebîyata Kurdî de pêşengê Helbesta Modern a Kurdî Hacî Qadirê Koyî tê qebulkirin. Piştî nifşê yekem ê helbesta kurdî di helbesta kurdî de helbestvanên Qonaxa Şamê/ Hawarê dertên. Li gel renginî û cudatiyên van helbestvanan, ew dibin miretayeke serdemkî ya Helbesta Modern a Kurdî.

Bi nivîsandina Helbesta Modern re, di destpêkê de motîf û hêmanên folklorîk pir hatine bikaranîn. Bi gelemperî di serdema destpêkê de bandorgeriya folklorê derdikeve pêş. Sedemên ve yeke jî bi Modernîzmê re Netewetî belav dibe û ji bo sazkirina neteweyan xebatên çandî û folklorî pêktên. Bi vî awayî keresteyên folklorîk êdî ne bi wateya xwe ya "çanda tebeqeya jêrîn" ('ewamî) lê weke gencîneyeke bêhempa ji nû ve tê vedîtin. Ji ber vê ye bandorgeriya Folklorê ya li ser Helbesta Kurdî jî di destpêkê de ji bo vejîn û veguhastina çanda neteweyî pêk hatiye.

Folklor serdemên pêşî ji nû ve hat keşifkirin. Lê piştî demekî di Helbesta Modern de razberî, xûmamî, bêwatebûn derket pêş. Ji loma angejebûn, wate, erka veguhestîner ya helbestê jî hate rexnekirin. Yek ji van mijarên din ku dihate rexnekirin jî di Helbesta Modern de bikaranîne Folklorê bû. Cemal Sureya ku helbestvanekî tirkînivîs e û temsîlkarekî Helbesta Modern e, di serdemeke jiyana xwe de bikaranîna Folklorê di Helbesta Modern de rexne dike. Li gorî Cemal Sureya: "Folklor û biwêjên gelerî bi tenê dikare helbestvanekî rabigire." Ev jî tê wê wateyê di hin serdeman de hin helbestvanên ku bi teoriya helbestê re eleqedar in Folklor ji bo Helbesta Modern wekî emrazeke astengdar dîtine. Bi vê mebestê Cemal Sureya ceribandineke bi navê "Folklor Şiire Düşman" (Folklor Dijminê Helbestê ye) dinivîse. (Zariç, 2014: 3) Cemal Sureya wekî temsîlkarekî Helbesta Modern çiqasî ji ber vê nerîna xwe hatibe rexnekirin jî di helbestê de mirovekî nûxwaz e. Wekî endamekî "İkinci Yeni" ya neteweya tirkan wî helbestên xwe bi awayekî razber, bêwate û navend ziman nivîsîne. (Zariç,2014:3) Li ser

cerîbandina Cemal Sureya rexne hatine kirin û piştre jî li gorî xebatên ku li ser helbesta wî hatine kirin wî bixwe jî di helbesta xwe de hêmanên folklorîk bi kar anine. Lê dîsa jî Folklor ji bo wî nebûye hîmekî esasî yê helbesta wî.

Folklor ji bo helbestê her wextî mifadar bûye. Helbesta Modern bi çanda devkî, gelerî re tû caran têkiliya xwe qût nekiriye. (Çelik, 2020:21) Helbestvanên ku çiqasî nûxwaz jî bin bi awayekî riya wan bi çanda devkî ya gelerî ketiye û ev hêmanên folklorîk bi kar anîne. Di Helbesta Modern ya Kurdî helbet ji bo tesbîtkirina sûdejêgirtina Folklorê dibe xebatên berferehtir bên kirin. Lê xasma bi mînakên pêşî yê temsîlkarê Helbesta Modern ya Kurdî pêwendiya wan ya bi Folklorê aşkere ye. Seyra kêmbûna sûdejegirtina Folklorê jî dibe ku piştre kêmtir dibe.

Folklor bi giştî di Edebiyata Modern de û di Helbesta Modern de ji hêla her netewî ve hatiye bikaranîn. Helbestvan û nivîskaran ji bo cûdatiya xwe ya neteweyî û çanda xwe derxine pêş hêmanên folklorîk pir bi kar anîne. Di Edebiyata Kurdî de jî ji bo serdemên pêşî ev aşkere bi kar anîne. Lê pişt re ev hêmanên folklorîk di nav helbesta Modern de xûmam bûne û bikaranîna wan veguheriye. Di Helbesta Modern de jî bi riya jêgirtin, pastîj, telmîhê ev hêmanên folklorîk careke din vejîyane.

Bandora Folklorê ya li ser helbestê di çarçoveya Navendmetnî de tê hesibandin. Tradisyonên Gelerî hem ji hêla şêweyî û wateyî ve tên guherin û veguhertin. Bi vî awayî ji nû ve tê veguhastin. (Çelik, 2020: 21)

Seyra bandorgeriya Folklorê ji bo Helbesta Modern a Kurdî heta niha bi xebatên lêkolînî bi berferehî nehatiye nivîsandin. Digel vê di destpêkê de hêmanên folklorîk bi rêjeyeke zêdetir hatiye bikaranîn. Bikaranîna Folklor û hêmanên wê ji bo serdemên destpêkê pir ber bi çav e. Weke mînak helbestên Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî, Cegerxwîn, Osman Sebrî hwd. dibe palpişt. Her wiha Diya Ciwan û Kejal Ahmed jî weke nifşê pêşî yê helbestvanên jinên Helbesta Modern a kurdî, Folklor ji bo helbesta xwe kirine binmetn. Folklor ji bo wan hem bûye gencîneyek û hem jî bûye warê rexneya civakî. Kejal Ahmed di helbesta xwe ya bi navê “Awênem Şikand” de weke motîfa gelerî “eyneyê” û wateyên ku li wê hatine barkirin rexne dike. Li gorî helbestvan bi eyneyê civak her dem dixwaze jin xwe bixemilîne, li ber eynêyê wextê xwe biborîne. Lê ku eyne şikest dê kismetê jinê bê girtin û nezerî bibe, divê şekir û xwe bi ser serê jinê bê werkirin. Bi vî awayî helbestvan bangî jina kurd dike ku weke Mestûrêyê her jinek eyneya xwe bişkîne û werkirina şekir û xwê red bike. Mestureyê eyneya xwe şikand û bi aqil û kemalê xwe xemiland.

“Awênem Şikand
Şkandim awêney teqlîdî qederê
Ke le mêj e kiçanî keç le berdemî da ewestin
Demek e nambînê û nabînim
Lew katewey: awêney cografya û mêjûm
Kirduwe be xol, wek Mestûre
Le ber awî rûnî şiîr
Ser û bestî eql û kemal ebestim.
.....
Sipêde bû
Ke le destî kewte xwarê
Awêney nazdarî bextî nazdarê

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Daykî wek dilêkî tirsa w
Miştê şekirî piya da pirjand
Bo ewey nebada
Ayîndey tarîk û
Mêrdkirdinî diwa bikewêt" (Temo, 2007: 1228-1230)

Her wiha Diya Ciwan jî motîfa eyneyê di helbesta xwe de bi kar aniye. Lê helbet vê carê wateya wê eyneyê ji bo Diya Ciwan guheriye.

"Dilê min neynikek bû...
çawa dizîvirandin...
ayîna welatê min xweş tê de diyar dibû...
Rahiştine...
Li hin guhê erdê dan...
kirin sed perçe..
dema li perçên wî nêrîn; ditin, ku
ji ayînekê,
bûne sed ayin... !!" (Diya Ciwan, 1992:21)

Helbestvan helbesta xwe ji bo nîşandana welatê xwe, edet û rêûresmên welatê xwe dike palpişt. Helbestvan bi metafora eyneyê vê erka helbesta xwe diyar dike. Eyne ango neynik hem dile helbestvan û hem jî "ayînên" welatên helbestvan disewirîne.

Helbestvan Diya Ciwan di warê Helbesta Modern de ji nifşa pêşîn ya jinan tê hesibandin. Heta li gorî kovara Hacernameyê yekem jin e ku di warê helbestê de nivîsiye. (Nûbîhar,2021) Di warê wêjeya Modern de bi piranî helbestvanên jin di salên 90î de helbestên xwe çap dikin. Saman Hasan Balaky di gotara xwe ya bi navê "The Resurgence of Kurdish Women's Poetry" (Vejîna Helbestvanên Jinên Kurd) de salên 90î ji bo Helbesta Modern ya jinên kurdên başûr weke "ronensa helbesta jinan" bi nav dike. (1,3:2011) Dema mirov li antolojiyan yan li kitebên çapbuyî binêre ev sal bi giştî ji bo her alîyê welat dibe "ronensa helbesta jinan". Helbestvanên jin yên pêşîn Diya Ciwan, Hîwa Qadir, Jila Huseynî, Fatma Bozarslan, Kejal Ahmed helbest nivîsîne. Di salên 92, 95, 96an de van jinan berhemên xwe yên pêşî weke kitêb çap kirine. (Temo, 2007:1365,1383) Van jinan pirtukê xwe yê pêşî di salên 90î de çapkirine. Diya Ciwan kurdeke Rojava ye û berhemên xwe yên pêşîn di salên 90î de çapkirin. Her wiha Fatma Bozarslan jî kurdeke bakur e û berhemên xwe li Swêdê çap kirin. Jîla Huseynî jî kurdeke Rojhilat e. (Ahmadi, 2016) Ev vejîna helbesta jina kurd li her alî pêk hatiye. Her wiha weke berhemên Hîwa Qadir û Diya Ciwan di heman salê de, 1992, berhema xwe ya ewîl çap kirine. Dibe ji bo tespîtkirina helbestên pêşîn yên di kovaran de hatine weşîn bêtir lêkolîn bên kirin.

3.1. Bikaranîna Kîteya Gelerî

Weke hemû biwarên Edebiyata Kurdî helbesta kurdî jî li gor hin serdeman geşbûye û vemiriye. Di salên piştî şerê cihanê yê duyem de jî şert û mercên dijwar ji bo Edebiyata kurdî û helbet ji bo helbesta kurdî jî dîjwartir bûye. Li kijan hêla welat bê jî helbestvan û nivîskarên Edebiyata Kurdî tuşî gelek zehmetiyan hatine. Diya Ciwan jî yek ji wan helbestkaran e ku helbestên xwe di serdemeke zehmet de nivîsiye. Li dijî qedexeyan helbestên wê gihatine xwendeyan.

Helbestvan Diya Ciwan ji salên 1970yî ve temsîlkareke helbesta kurdî ye. Di helbestên wê de hem ji hêla folklorîk ve hem jî ji hêla otobiyografîk ve em rastî gelek

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

şopan tên. Di helbesta xwe de bigiştî têgihiştineke xwe ya taybet a li ser helbestê jî dixwaze bigihîne xwînerê xwe.

Helbesta Modern ji hêla mijar û binyadê ve helbesta herî azad e. Forma helbestê jî vê azadiyê nesîbê xwe werdigire. Mijara helbestê jî bi heman awayî ne sînordarkirî ye. Folklor bi heman awayî ji bo Helbesta Modern hinekî sinoran dideyne. Diya Ciwan çend helbestên xwe bi kîteya Folklorîk nivîsandiye. Ev her çiqas ritmekê û herîkîneke bide helbesta Modern jî jê re sînoreke çêdike. Ji ber vê ye Diya Ciwan ji xeyrî 4-5 helbestan pêve helbest bi kîteyî nenivîsandine. Diya Ciwan ji bo helbesta xwe û nêrîna xwe ya li ser helbestê wiha dibêje:

"Ez nikarim qeyd û zincîran deynim ser helbestê, ez nikarim wa girê bidim yek pey yekî. Min dixwest helbesta min jî hinek azadiya wê hebe weke min ku em hemî azadiyê dixwazin. Min navê ti qeydû zincîr, mi nediviya ku li ser helbestê jî hebe." (Diya Ciwan, 2021)

Mînakên helbestan ku Diya Ciwan kîteya Gelerî bi kar aniye. Diya Ciwan kîteya 7(3+4) kîteyî û heşt kîteyî bi kar aniye di helbesta jêr de. Lê di çend risteyan de şikestin çêdibe û ne li gorî vê rêzika kîteya Gelerî nivîsiye. Hin mînak ji van helbestan:

"Qamîşloka evînê
Kur dinale ji birînê
Denge we me dihelînê
Xewe ji çava direvînê
Xeman nexwe delalê
Şerînê hem şepalê
Dayka ciwan û merda
Me dev ji te berneda
Çavan kil de em hatin
Ji bo te em xelat in
Qamişlo dayka me ye
Taca ser serê me ye
Cane me gohrî te ye
Azadiya te ya me ye" (Diya Ciwan, 2017: 27)

"Sibha cejnê tu zû were
Deriye dil veke û binere
Dehlek ji gul û gever e
Were û cejne bêne bi xwe re
Da qaskî şa bibe bi me re
Dildarek me bibe ji xwe re
Cejin bi me bextiyar e
Bexçe we bi me gul û dar e
Felek dost e ne neyar e" (Diya Ciwan, 2017: 42)

"Ye ko dil wî dixwazî
Bi hewar û bi gazî
Xurtek çalak û çeleng

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ فەكولینێن كوردی

Li her derî bi nav û deng
Ye ko dil wî dixwazî
li nav heval û hogira
Vê keve weke çira
Ye ko dil wî dixwazî
Bê gileh û bê girî
Barê giran hilgirî
Ye ko dil wî dixwazî
Nîşan be bi kom û kuloz
Dilê min jê re pîroz
Bila be min bixwazî
Bi soz û peyman û bext
Hilgire tiveng û rext
Ye ko dil wî dixwazî (Diya Ciwan, 2017: 110)

"Jinek kurd im serbilind im
Hunermend im mûm û find im
Bîrewer im j'xwe bawer im
B'rext û ber im tekoşer im

Ez dixwînim ez dibînim
Ez diçînim ez hiltînim
Cerg disojim ez bi doz im
Hem dipoşim dil bi soz im" (Diya Ciwan, 2008: 86)

"Rabe ser xwe kurê min
Ronahiya çavê min
Perçek ji nava dilê min
Semyan û pêmayê min
Rabe û banke xweha xwe
Bişon dest û ruwê xwe
Taze şehkin serê xwe
Maçkin dê û bavê xwe" (Bênder, ?: 100)

3.2. Bawerî

Baweriyên gelerî di helbesta Diya Ciwan de cî digirin. Hinek ji van baweriyan baweriyên berbelav û tewş (superstition) in. Baweriyên berbelav çavkaniya wan civak bixwe ye û di gelek civakên cîhanê de ciyê van baweriyan heye. Hin ajal, cî, rewş bi awayekî din tên watedar kirin, ji bo van jî sedemeke bi mentîq û rasyonel jî tûneye. Di helbesta Diya Ciwan de ev tîştên sembolên baweriyên berbelav hatine bikaranîn. Gelek caran ji bo metna helbesta wê bûne binmetnek û ji bo wateya wê ya folklorîk veguhestîne ev weke sembol bi kar anîne. Ev helbesta jêrê hêmana folklorîk ya kund bi kar tîne. Kund di baweriya gelerî de nîşaneya bêoxirîyê ye. Dera kund hêlîna xwe lê çê dike tê wê wateyê ku wêran bûye. Diya Ciwan jî her bi vî awayî ev bi kar aniye.

"Bizanin
Her ku we dît

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

êş
Ji gohtinên min diherikin ..
tipên min
bi nikilan
sere hev qul dikin
rezên min
rûpelên xwe gez dikin
bizanin ku kund
hêlînên xwe
li Qamislo û
li Amed û Dihok
û Mehabadê de çêdike ..” (Diya Ciwan,1998, r.13)

Yek ji baweriyên berbelav jî di çanda kurdan de nezer e. Heta ev ewqasî berbelav e ku bûye sedem di ziman de jî bi awayê biwêjî bê bikaranîn. Biwêjên mîna “çav lê xistin, nezer lê xistin, çavînî kirin, tê ber çavan” nîşanbariya wê nezerê dikin. Çavînî kirin, nezer kirin jî li gorî baweriyên gelerî dibe sedemê geler serêşîyan. Diya Ciwan ev rewş di helbesta xwe de aniye ziman. Jineke bi navê Helîmê bi nezera çavê xwe bûye sedem ku zarokaên gundiyan bimirin. Weke her baweriyî ev baweriya pûç jî ne xwedî tû rasyoneliyê ye.

“Li gundê me
Xelkê zaroken xwe
Ji ber çavên Helîmê vedişartin
Digotin:
Çavên Helîmê mirovan dikujin
Xwezî û sed hezar car xwezî
Ez bi çavên Helîmê bimrama
Ne bi derdê biyaniyê...” (Diya Ciwan,2017, r.97)

Diya Ciwan carinan hin şexsîyet û têgehên ku bi çanda islamê jî ketine nav çanda kurdan weke motîfên folklorîk bi kar tîne. Ev jî baweriyên dinî û şexsiyetên dinî bê çiqas bandorker in nîşan dide. Eyûb bi sebra xwe weke sembolekê nîşaneya wê rewşa zehmet ya xelkê rojavayê ye.

“Xelkên rojava hemû bûne Eyub
Rojava min a delalî
Biçûka her sê xwişka
Delalîka ber dile Kurda
Deyax deyax tene hinek deyax” (Diya Ciwan,2017, r.48)

Diya Ciwan her wekî din Pîra Selatê, Bang, Nimêjê weke motifên dînî di helbestên xwe de bi kar tîne. Helbet van ne di wateya xwe ya dinî de wan her wekî sembolên veguherî bi kar tîne. Nimêj ji bo wê qedirgirtin, bilindkirina çiya tê kirin. Pira selatê ji bo wê sembola rewşekê ye ku mirov bi zorî û zehmetî derbas dike.

“Ew mû li ser Pira Selatê
Di bin linge min de
Bû şûrekî seqakirî..” (Diya Ciwan,2017, r.49)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

3.3. Biwêj û Gotînên Pêşîyan

Diya Ciwan helbestên xwe de cî daye biwêj û gotînên pêşîyan. Helbesta xwe bi wan xemilandiye. Di nav helbesta xwe de gelek caran bîwêj bi awayekî rasterast bi kar anîne. Weke bîwêjên mîna "ew hewş e, le ne ew rewş e", ew war e, lê ne ew bihar e".

"Dil bê dil e... û gul ne gul e
Ew bexçe ko me danîbû bê bilbil e
Pişti te
(ew hewş e, le ne ew rewş e)
(ew war e, le ne ew bihar e)
Piştî te…
Kul û kovanan dihêrim
Xewn û xeyalan didêrim" (Diya Ciwan,2017, r.29)

"Mehbûranî kirin" biwêjeke bi kurdî ye forma wê ya "bi ber ketin" jî heye. Tê wateya ku jînên dûcanî dilê wan dibije hin xwarinên taybet. Ev biwêj jî di Helbesta Diya Ciwan de bi wateya xwe ya eslî hatiye bikaranîn.

"Dema pîrek
mehbûraniya dikin..
dilê wan dibije tirş û sor û şêrîn .." (Diya Ciwan, 1998 :156)

Diya ciwan hin caran jî di helbesta xwe ji bo hin biwêj û gotinên pêşiyan bi riya telmihê bi bîr bîne bi formeke kurtkirî ev bi kar anîne. Şûrê şamê, dara mazî… bi vî awayî bi kar anîne. Wateya wan ya biwêjî di helbesta xwe de weke metaforeke bi kar anîne. "Zilam darê şikestiye.", "Keç dara şikestiye.", "Keç dara mazî ye.", "Ji jinan dotmam, ji şûran şûrê şamê." Ev gotinên pêşiyan weke metaforan bi kar anîye. Şûrê şamê ji bo Helbestvan Diya Ciwan derziya wê ya dirûnê ye. Derzî ya ji bo ku debara xwe pê dike û şîrîkê keda wê ye ji bo wê ewqas bi qedr e. Şûrê şamê xuyaye ku demekî pir bi kêrhatî ye û din av kurdan de alavekî pir meşhur e.

"Vê derziyê çi kiriye û çi nekiriye
Bi vî qelafetê piçûk kare gesinekî kiriye
Min bi serê wê yê zirav devê birçîbûne dirût û
Xizanî bingor kiriye
Çekê mine giran ew e
Ji xencerekî tûjtir e
Ji hemî gotinên qelew jehatîtir û kerhatîtir e
Her ko di nav destê min de diçilwile
Xwîna di bin neynokê bi wê şerîntir e
Dema derdore vî cawî nîgar dike
Deşt û beyarên jiyanê tev cot dike
Bi bejna wê her ez çavê xwe kil didim
Bi kuriya wê stûna jiyane hildidim
Ko carekê ji min winda dibe
Bi hewarî lê digerim
Ta ko ronî ji çav negere
Ji we nagerim
Ez tu carî wê bi şûre Şamê naguherim. (Diya Ciwan, 2017: 116)

Dara şikestî hem weke bîwêj hem jî weke gotina pêşiyan di zimanê kurdî de cî girtiye. Helbestvan Diya Ciwan jî bîwêja dara şîkestî ji bo wê êşa pîştî mirina hevjînê xwe vebêje bi kar aniye.

“Piştî te
Ez yeka dî me
Ji nû ve ... darê şikestî me
Baş dizanim tu yê saxî û ez mirî me” (Diya Ciwan,2017, r.30)

Helbestvan Diya Ciwan hin biwêjan ji wateyan wan ya eslî derdixe wateyeke din li wan bar dike. Di helbesta xwe de bi ristaya “pêlava xwe ya çermê we ji Riwê vê deme” amaje bi biwêja “çermê rû qetin” dike. Rasterast biwêje bi kar naîne lê bi riya telmihe wê bieêje bibîr dixe.

“Şîretên pîrka xwe
Nîvdest ji berçavkên xwe
Cohtek pêlava xwe ya çermê we ji
Riwê vê demê” (Baran, r.48)

Helbestvan Diya Ciwan li ser helbestên xwe û serketiyên xwe yê li ser helbestvaniyê vedibêje di helbesta jor de. Biwêjên “rû reş kirin” û “rû spî kirin” bi kar tîne. “Rû reş kirinê” ji wateya wê ya biwêjî derdixe lê “rû spî kirin” ê bi wateya wê ya biwêjî bi kar tîne.

“Min rûyê van rûpelan reş kir û
Wan rûye min spî kir” (Diya Ciwan,2017, r.56)

Dara mazî ji bo helbesta Diya Ciwan metaforek e. Dara mazî hem ji bo ku di nav erdnîgariya kurdan de berbelav e ji wan re bûye rîyeke vebêjîyê. Dara mazî bi gotina pêşîya “keç dara mazî ne” ketiye nav gotinên qalibgirtî yê ziman de. Dara mazî di Helbesta Diya Ciwan weke sembola bihêzbûn, dilsozîyê ye.

“Xort simbelên xwe badidin
Keç keziyên xwe dihûnin
Pirejin serpehatiyen xwe dibêjin
Çiya şehîdên xwe himbez dikin
Tenê dara Mazî ji piya ye
Nobetdar e
Ew şahid e
Rasera her tiştî ye
Tenê ye ji we bilindtir
Xwedê ye” (Diya Ciwan,2017, r.99)

“Li welatê me
min serê xwe
bi jor ve hilda
da ez
dara mazî
ta bi guliya
bibînim
min dît ku
ewê jî

هەوالنامەی ئەکادیمی

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

şaxên xwe
bi ser min de
daqûl kirin
da ku
min himbêz bike..” (Diya Ciwan, 1998: 150)

“Min digot qey tu carî dara mazî hişk nabe
Û kevirên gundê me pîr nabin
Min digot qey tu carî sterk ranazên
Û birînên min carek dî hişyar nabin” (Diya Ciwan, 2017: 123)

Di helbesta Diya Ciwan de hin baweriyên pûç yên civakê hatine rexnekirin. Ev bawerî ewqas berbelav in ku êdî bûne biwêj û li ser zimanan geriyane. Kitika heft ruh, pisîka heft ruh jî yek ji wan biwêjan e. Diya Ciwan bi van biwêjan civaka ku ciyekî jinê yê ne baş saz kirine rexne dike. Warê keça kor e, weke risteyê vê gotina pêşîyan bi bîr dixe; “Gangilok ne bihar e, xox ne dar e, keç ne war e, jina bi mêr ne tû yar e.”

“Dema digriya .... digotin; neçin pêve bila bigirî.. wê bi niyazî xwedî nekin, keçe;zû bi zû namire... kitika heftruhe...

Keçên serreşin, tovê perparêne... ware keça kore.. çiqa mirov wan bi xwedi bike ji xelkê re ne... xwedê wan pir neke.

Hin evan biranînên kevne-nuh, mejiye min dikolan... ez veciniqîm bi denge banga dikê sibehê dibeje:

Herçî kesên razayî rabin bese xew.!!” (Diya Ciwan, 1992: 89)

3.4 Çîrok, Destan, Bîranîn û Pêbendiya Folklorê

Çîrok di helbesta Diya Ciwan de ciyekî wan î girîng heye. Yek ji çavkaniyên helbesta wê jî ew çîrokên ku pîrika wê jê re digotin. Di gelek risteyên helbesta xwe de weke bîranîn van şevên mîşt bi çîrok bibîrtîne. Yan jî di hin helbestên xwe de destpêkê bi awayê despêka çîrçîrokan dike. (Diya Ciwan, 1998: 107)

“Bi xweşbextane
Dibûme kopalê di bin çengê wê de
Pişkdar bû di ronahiya çaven min de
Le her êvar
Ez jî li ser baskên çîrokên wê
Diçûme seyrangeha dîrokeke kûr û dûr” (Diya Ciwan,2017, r.37)
“Sala Reş (1996)
Carek ji cara
ya ku bi serê me hat
Xweda neyne serê tu camêran..
newê serê tu sêwiyan..
tu bêkesan.. tu bêwaran ..
...
Di saleke heftseri de,
û her seriyek heft
qiloç pê ve..
bayek bi dûneh, ji nav me,
li me rabû..” (Diya Ciwan,1998: 107, 108)

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Diya Ciwan di helbestên xwe de pêbendiya xwe ya bi destan, çîrok û folklora kurdî re her wextî aşkere dinivîse. Gurzek ji ya helbesta wê ya herî girîng folklor e. Mem û Zîn, Kawa lehengên helbesta Diya Ciwan in ku bi riya telmihê di nav helbesta wê de şîn dibin. Çîroka Habîl û Qabil ya ku li nav gelek neteweyan di nav risteyên wê de vedije.

“Digohtin:
Beko bi aqilê mîrê Bohtan lîst
û Mem û Zîn
dane kuştin ..
min digoht; ev çîrok e ..!
digohtin; Qabîl û Habîl ji bo
zeriyekê hev kuştin
min digoht; ev çîrok e ..!” (Diya Ciwan,1998: 37)

Diya Ciwan her wextî pêbendiya xwe bi edet û nêrîtên kurdan, lehengên kurdan, helbestvanên kurdan qut nekiriye. Bi berdewamî ew li nav helbesta xwe de ji nû ve saz kirine. Memê Alan, Mîrê Botanê, Zinê, Zembîlfiroş her yek lehengên sembolik ê helbesta wê ne. Xanî, Cizîrî, Cegerxwîn di helbesta Diya Ciwan de hebûna kurdan e, tovê kurdî bi van helbestvanan her şîn dibe.

“Ji alîkî min dît ku Memê Alan di Mîrê Botan de xwînê ji dev û pozê xwe tavêje û li ser devê çale, Zinê xwe xemilandiye... hatiye da xatirên xwe yên dawî jê bixwaze.

Li rexeke dî min dît ku kawayê hesinkar, rahiştiye mikutê xwe... û kelha zordariyê hildiweşine...

Ji aliki di ve min nêrî... min dit ku Ceger-xwîn nav di xwe dide... dibêje :

ki me ez...

Kurdê kurdistan... kurdê serfiraz. dijminê dijmin... dostê haştî xwaz, lê çibkim, bêşer,

Dijimin naçî der...

Ji alikî di min dît ku Zenbîl-froş zenbilên xwe li milê xwe kirine... li kolanan digerîne... ji bo nanê zarokan bicivîne...” (Diya Ciwan,1992: 56)

هەولێرنامەی کتێب

“Dê tu hebî
ta ku cotkar
tov li qadê
direşîne.
De tu hebî
ta ku ji kurdan
çêdibin   Ceger-Xwîne.” (Diya Ciwan, 1992: 86)

Çîrok di jiyana Diya Ciwan de ciyekî wan î pir girîng heye. Pîrika wê û bîranînê bi pîrika wê re her tim ji bo wê bûne mijara helbestê. Pîrika wê û çîrokên pîrika wê dinyayeke folklorîk ji bo helbesta Diya Ciwan afirandine. Efsaneya gelerî ya Hekîm Loqman wekî kesekî lehengê çîroka pîrika Diya Ciwan e. Çîrok û Efsane ji bo Diya Ciwan

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

ewqas giring in ku di helbesta wê de rastiya jiyanê û lehengên van efsaneyan pev diguherin. Hekîmê Loqman şagirdeyekî pîrika wê ye.

“Ji xwe min digoht;
qey Hekîmê Loqman ê di
çîrokan de,
Şagirtiyê pîrka min bû..!” (Diya Ciwan,1998: 56)

Destana Kawa û Newroz du motîfên gelerî ne ku di helbesta Diya Ciwan de cî digirin. Kawa û Newroz weke çandeke du hezar salan bi wateya xwe ya şahî, rizgarî di helbestê de têne ristin.

“Newroz
Ji 2609 salan ve..
her salê rojekê
daweta Kawa li dar e...
Ji destpêka sibehê ve
dengê daholan;
hestên me vediceniqîne..
xwerist hemî xwe dixemilîne..
dest û çiya dadikevin hola semaye...” (Diya Ciwan,1998: 75)

Çîroka Pepûkê jî weke metaforeke sembolîk di Helbesta Diya Ciwan de hatiye nivîsîn. Çîroka Pêpukê ewqas berbelav e ku wekî biwêj jî ketiye nav kurdî de. Diya Ciwan çîroka pepûkê ji bo birakujiya navxweyî bîne ziman bi kar tîne.

“pepûk...
hêlînan di guhên min de
çê dikin..
Cihokên xwînê
riya xwe ji ser mejî
dugherin..
ez hinerê jiyanê
jibîr dikim..
xew bi rêbiwarî jî nema
riya xwe bi min dixe..
her ku yek ji min dipirse :
Çima Kurd hev û dû dikujin ?!!!” (Diya Ciwan,1998: 86)

Diya Ciwan di hin helbestên xwe de jiyana xwe ya rojane u hin bîranînên xwe jî dinivîse. Di helbesta xwe ya bi navê “Peymana Pêkvejiyanê” jî yek ji van helbestana. Hem jiyana rojane hem jî çandawê serdemê nîşan didin.

“Peymana Pêkvejiyanê
Di roja Se Gulana 1966ê de
li bajare Qamişlo, Taxa Qidur Begê
li ber ronahîya lempeka çil nemro
Bi şehdebûna

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Çar dîwaran û banekî kijûlek
Bîr û çirrik û her du dewliken wê
Dara tiwê
Tenor bi şîşa wê ve û
Bi amadeya malbata me
Li ber destê Mele Brahîm Me
Peymana pêkvejiyanê
Mohir kir" (Diya Ciwan, 2017: 98)

"Ho şivano ho şivano de rabe pezê xwe derxe ber beroja û rahêje bilûra xwe qêr bike awazên filiklorî; Eyşana Elî, Dotmam Canê, Ehmedê Mala Musa, lo lo Pismamo, ... Ho şivano ez di bextê te de me bibêje û her bibeje, heta denge te bikeve hemî malen gunde me. Belkî dîsa bi dengê bilûra te dilê gundê me lexîne, rihê jiyana wî bijenê u vejenê." (Diya Ciwan, 2017: 120)

3.5 Edet

Helbestvan di helbesta xwe ya bi navê "Bibûrin" de pêbendiya xwe ya bi edet, dabûnêrîtên welatê xwe eşkere diyar dike. Helbestvan ewqasî giringiyê bi edet û gencîneya miletê xwe dide û diyar dike ku wan tû caran bi gencîneya cihanê naguherîne. Di helbest xwe de wiha dibêje:

"Bibûrîn...
Navên paytextên welatan ne jiberim...
Naven zana u seroken cihane ne jiberim ..
çiqas ceng di cihanê de çebûne;
dîrokên wan ne jiberim...
...
Ew dest û riwên biraştî... lorikên dayîkan
jibîr nakim...
Çîrok û şîret û serpehatî gotinên pêşiyan
na -tu carî- jibîr nakim." (Diya Ciwan, 1992: 83, 84)

Diya Ciwan weke çavkanîya helbesta xwe her tim edet, bîr û bawerî, çanda kurdan dest nîşan dike. Helbesta wê bi civat û govendên kurdan xwedî bûye. Di mînakên jêr de vê rewşê tîne ziman.

"Helbestên min
Bi nanê Kurda xwedî dibin
Li kolanên wa dileyizin
Ders û dewrên xwe
Ji koçk û civatên wan distînin
Li ber derî û pencerên wan diponijin" (Diya Ciwan, 2008 :23)

"Kurdo ..
Heger zanîna te ya yekê
Ne ji şîret û serpêhatiyên dayika te be
Ya diduyê
Ne ji kolana civatên te be
Ya sisiya

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Ne ji deşt û çiyayên te be
Tê nezan bimînî
Heger zanîna cîhanê hemî
Di bin her du çengên te de be” (Diya Ciwan, 2017, r. 96)

Diya Ciwan bi helbesta xwe ya bi navê “Keç û Kur” di nav edetên kurdan yên civakî de ciyê keç û kuran diyar dike. Ev pozisyon û rola ku civakê li keç û kuran bar kiriye din av helbestên Diya Ciwan de hatiye rexnekirin. Weke ku di gotînên pêşîyan de yên mîna “Tiştê ne çê, para keçê”, “adar ne bihar e, xox ne dar e, keç ne war e” hatiye bilêvkirin rola jînê ku di civakê de astengdar e û bi awayekî pederşahî roleke dîn li jinê bar kirine. Di helbesta xwe de ev edet û rola jinê ya di civaka kurdan de hatiye rexnekirin.

“Keç û Kur
Bi cêwîti hatin jiyanê ...
lê...
ji du sînga
yek û nîv ji wî re bû..
Dema
gohtin live kirin ..
ji sisiya
dido û nîv ji wî re bû..
Dema jiyan lîve kirin;
ji gewde can ji wî re bû
Dema derd lîve kirin;
ji serî guh ji wî re bû..” (Diya Ciwan, 1998 :123)

Di helbesta Diya Ciwan de rola jinê û mêr, têkiliyê wan ya bi bav û dê re jî hatiye bilêvkirin. Di edetên kurdan de dê ji keçê re bav ji kur re mîrasa xwe dihele. Di helbesta wê de diyar dibe ku di nav kurdan de tûtina xursê, hina musilê pi navdar in û ev ji keç û kuran re weke mîrasê dimînin.

“Ji kuran re bibêje...
Bavên we qutyek tûtina xursê.. ber û bereste.. tifing û rextek berik ji wa re hiştine.
Ji keçan re bibêje;
Diyên we sincek bi nav û deng... dergûşek, ji dara Biyê... bihna nanê tenûrê... awazek ji lilandinê û, hinek ji hina Mûsile, û kil û kildan, ji we re hiştine.” (Diya Ciwan, 1992 : 34)

3.5.1 Navlêkirin

Berhemên Gelerî yên devkî piştî ku weke nivîskî belav dibin û xebatên pêşî yên Folklorîk tên kirin têkiliya Edebiyata Nivîskî û Folklorê ji nû ve tê sazkirin. Di Edebiyata Modern de jî rasterast bandora Folklorê çêdibe.

Piştî salên 1970yî Folknornasên Almanî li ser “Folklorîzma Nû” xebatan dikin. Bi vê pêla Folklorê di navbera civaka modern û folklora tradisyonel de berawirdkirina fenomenên nû tê nîqaşkirin. (Karadağ, 1992:76)

Di helbesta Diya Ciwan de weke fenomeneke civakê û nêrîteke folklorîk navlêkirin derdikeve pêşberî me. Di çanda kurdî de navlêkirina mirovan, zarokan edeteke pir giring e. Ji bo navlêkirinê seremonîyek, ayînek tê sazkirin û bi wî awayî nav li zarokan tê kirin. Bi bangê navê zarokan di guhê wan de tê xwendin. Ji loma ji bo kurdan navlêkirin fenomenek e ku pir qîmetê wê heye. Helbet ev seromoniya navlêkirinê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

berdewam dike lê bi bandora “Folklorîzma Nû” û civaka modern di helbesta Diya Ciwan de ev fenomen veguheriye. Ev mînaka ku di helbestê de tê vegotin wê têkiliya folklor û tesîra modenîzmê baş raçav dike. Bi modernîzmê veguherîna folklorê jî çawa pêkan e destnîşan dike.

“**Navên Pêşî**
Berê pêşî anî
Navê we kir Kurdistan
Yê diduwa
Nave wî kir barzanî
Yê sisiya
Nave bavê xwe lê kir” (Diya Ciwan, 2017: 89)

Helbestvan di helbesta xwe ya bi navê “Navên Pêşî” de balê dikêşe ser veguherîna fenomena navlêkirinê. Li bin helbestê jî ji bo baldariyê “Berê xelkî navê daybabên xwe li zarokên xwe yên pêşiyê dikirin, lê niha Kurdistan u Barzanî hatine pêşiya her tiştî.” dinivîse. (Baran, Diya Ciwan,89) Berê kurdan navên dê û bavên xwe li zarokên xwe dikir. Lê weke ku di vê helbestê de jî tê dîtin êdî bi tesîra neteweţî û modernîzmê kurd navlêkirine ne bi awayekî edetî lê bi fenomeneke nû û veguherî pêktînîn. Veguherîna bi modernbûnê û “Folklorîzma Nû” li ser vê kartêker e. Karadağ vê veguherîna Folklorê li hember “çanda netewî” wiha tîne ziman: “Li gorî teorîsyenan, dema ku formên nû yên çanda neteweyî pêkhatin ev ji bo folklor û folklorîzmê serdemek nû ya zêrîn bû. Lê bi rastî jî Folklor her tim di nav çanda netewî de dihele.” (Karadağ, 1992:77) Bi vê balê dikişîne ser metirsiya folknornasan jî.

Encam:

Folklor li ser Edebiyatê kartêkeriyeke dûalî dike. Hem bandorê dike hem jî bandorê werdigire. Her wiha bandorgeriya Folklorê li ser Helbesta Modern ya kurdî jî heye. Nifşa Hawarê, Jînê, Roja Nû û hwd. di serdemên pêşî yê Edebiyata Modern de hem gelek xebatên foklorîk kirine û hem jî çavkaniya berhemên wan hêmanên folklorîk in. Ji aliyek din ve ritma Helbesta Gelerî jî bi kar anîne. Bi vî awayî deng û newaya helbesta Gelerî bandorgerî li ser helbesta modern jî kiriye.

Diya Ciwan ji civaka xwe, derdora xwe û malbata xwe sûd wergirtiye. Helbesta xwe jî bi vê çavkaniya çandî ya civakî xemilandiye. Bala wê her tim li ser çîrok û bîranînan bûye. Ev di berhem û helbestên wê de jî diyar dibe.

Bi nivîsandina Helbesta Modern re, di destpêkê de motîf û hêmanên folklorîk pir hatine bikaranîn. Bi gelemperî di serdema destpêkê de bandorgeriya folklorê derdikeve pêş. Sedemên ve yeke jî bi Modernîzmê re Neteweţî belav dibe û ji bo sazkirina neteweyan xebatên çandî û folklorî pêktên. Bi vî awayî keresteyên folklorîk êdî ne bi wateya xwe ya “çanda tebeqeya jêrîn” (‘ewamî) lê weke gencîneyeke bêhempa ji nû ve tê vedîtin. Ji ber vê ye bandorgeriya Folklorê ya li ser Helbesta Kurdî jî di destpêkê de ji bo vejîn û veguhastina çanda neteweyî pêk hatiye.

Folklor serdemên pêşî ji nû ve hat keşifkirin. Lê piştî demekî di Helbesta Modern de razberî, xûmamî, bêwatebûn derket pêş. Ji loma angejebûn, wate, erka veguhestîner ya helbestê jî hate rexnekirin. Yek ji van mijarên din ku dihate rexnekirin jî di Helbesta Modern de bikaranîna Folklorê bû. Helbestvanên ku çiqasî nûxwaz jî bin bi awayekî riya wan bi çanda devkî ya gelerî ketiye û ev hêmanên folklorîk bi kar anîne.

Folklor bi giştî di Edebiyata Modern de û di Helbesta Modern de ji hêla her netewî ve hatiye bikaranîn. Helbestvan û nivîskaran ji bo cûdatiya xwe ya neteweyî û çanda xwe derxine pêş hêmanên folklorîk pir bi kar anîne. Di Edebiyata Kurdî de jî ji bo serdemên pêşî ev aşkere bi kar anîne. Lê pişt re ev hêmanên folklorîk di nav helbesta Modern de xûmam bûne û bikaranîna wan veguheriye. Di Helbesta Modern de jî bi riya jêgirtin, pastîj, telmîhê ev hêmanên folklorîk careke din vejîyane.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

Helbestvan Diya Ciwan di helbestên xwe de pir ji hêmanên folklorîk sûde wergirtiye. Gelek caran ev hêman ji Diya Ciwan re rê derbirîne vekirine. Diya Ciwan gelek caran ji bo bîranînen xwe veguhezîne hêmanên folklorîk bi kar anine. Hin caran jî biwêj, gotînên pêşiyan, baweriyên pûç di helbesta wê de hatine rexne kirin. Hin caran rasterast ji bo veguhatînê cî dide hêmanen folklorîk. Bi piranî ji bi riya telmihê hêmanên folklorîk vedijîne. Hin caran jî bi modernîzmê edetên ku bi salan kartêkar in çawa veguheriye, nişan dide.

Çavkanî:

Ahmed, Hariwan Mohammed. (2017). "Teknîka Dubarekirinê Di Avakirina Rîtma Navxweyî Ya Helbestên Kamîran Bedirxanî De -Dîwana Dilê Kurên Min Wek Nimûne". Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. Teza Neçapkiri ya Lîsansa Bilind.

Ahmadi, Ghotbadin. (2016). "Helbesta Kurdî ya Modern li Rojhilatê Kurdistanê: Pêşkêşkirineke Kurt". Zarema. Hejmar: 7.

Balaky, Saman Salah. (2011). The Resurgence of Kurdish Women's Poetry. Research in Political, International and Cultural Studies. https://www.researchgate.net/publication/317617916

Çelik, Y. "Metinlerarası İlişkiler Bağlamında Folklor ve Garip Şiiri". Milli Folklor 16 (2020): 19-27 https://dergipark.org.tr/en/pub/millifolklor/issue/58685/789229

Diya Ciwan. (1992). "Pêlek Ji Deryayê Kovanên Min". Şam: Weşanxane ne diyar e.

Diya Ciwan. (1998). "Hêsrên Ziwa". Şam: Weşanxane ne diyar e.

Diya Ciwan. (2008). "Bênder". Istanbul: Avesta.

Diya Ciwan. (?). "Bênder" (pdf). Duhok: Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd.

Diya Ciwan. (2017). "Baran". Duhok: Çapxaneya Xanî.

Diya Ciwan. (2021). "Qeydiya dengê Whatsappê". transkiribekirin: 16.02.2021

Karadağ, M. (1992). "Folklor ve edebiyatın karşılıklı olarak etkilenmeleri ve uyarlanmaları". Uludağ Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi, 7(2), 71-81

Muhamad, Farhang Muzzafar. (2018). The Role of Female Poets in Modern Kurdish Literature. Przegląd Narodowościowy.Review of Nationalities 8(1):265-277 https://www.researchgate.net/publication/331301386

Nûbihar. (2021). Dîya Ciwan – Hevpeyvîn. [video] Youtube.url: https://youtu.be/qLjtHKTSjg8

Pertev, R. (2020). Giringîya Xebatên Folklorê Li Cem Rewşenbîrên Nifşê Hawarê. Folklor û Ziman, 1(1), 61-76.

Pertev, R. (2016). Tesîra Modernîzmê Li Ser Xebatên Pêşî Yên Folklora Kurdî Tirkî. Journal of University of Zakho, Vol.4, (B) No.1, Pp 12-24, 2016

Riataze. (2021,05,09). Çîroka Jineke Rewşenbîr. [video] Youtube.url: https://youtu.be/imeIB3_f1BE

Temo, S. (2007). Kürt Şiir Antolojisi. Cilt 2. Agora Kitaplığı: Istanbul

Xoser TV. (2021,18,06). Jinek Jîyanek (Mevan: Dîya Cîwan/Helbestvan-Nîvîskar). [video] Youtube.url: https://youtu.be/iMq7_l0doUM

Zariç, M. (2014). "Cemal Süreya'nın 'Folklor Şiire Düşman' Başlıklı Denemesi Işığında 'Yunus Ki Sütdişleriyle Türkçenin' Adlı Şiiri Üzerine Bir İnceleme". Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, (11),1-14. www.e-dusbed.com.

Perawez:

[1] Diya Ciwan ji bo danasîna xwe û jînnameya xwe bi rêya Whatsapp'ê qeydiya dengî ji min re şiyand.
Min ew deng transkiribe kir.

ŞAİR DİYA CİWAN BAĞLAMINDA ÇAĞDAŞ KÜRT ŞİİRİNDE FOLKLOR ETKİSİ

Özet:

Folklor bir ulusun varlığıdır. İnançlar, masallar, şarkılar, gelenekler ve daha pek çok tema, folklorik unsurları halk üretimine dahil eder. Folklorun kaynağı halktır ve folklor eserlerinin üretilmesinden sonra halkın kendisini de etkiler. Başka bir deyişle, Folklorun işlevi ikilidir. Hem etkiler hem de etkilenir. Folklorun etkili olduğu temel alanlardan biri Çağdaş Şiir'dir. Bu çalışmamızda Folklor ve Modern Şiir arasındaki ilişki üzerinde durulacaktır. Şair Diya Ciwan örneği ile Folklor ve Modern Şiir arasındaki ilişki incelenecektir.

Folklor ve Folklor'un Modern Şiir'e etkisi birçok akademik alanda ve Edebi Eleştiri alanında tartışılmıştır. Bazı kaynaklara göre Folklor, şiir için verimli bir kaynaktır. Diğer bazı otoritelere göre Folklor, şiirin doğasını sınırlar ve onun için değişmez kalıplar yaratır. Bu nedenle birçok şair Folklor'dan uzaklaşır ve folklorik unsurların kullanımına değer atfetmez. Öte yandan bazı şairler Folklor'a çok önem verirler ve daha çok folklorik öğeler kullanırlar. Bu noktada her şairin tercih sebepleri farklıdır. Bunu makalede daha ayrıntılı olarak tartışacağız.

Modernleşme ve Modern Kürt Edebiyatı'nın başlamasıyla birlikte Folklor çalışmaları hep yapılmıştır. Folklor üzerine çalışan Remezan Pertev ilk Folklor çalışmaları hakkında bir makale yazmıştır. Çok eski zamanlardan beri Folklor'un Modern Edebiyat ve Şiir üzerinde etkisi olmuştur. Bu etkiyi şiirinde işleyen insanlardan biri de Modern Kürt Şiiri'nin temsilcisi Şair Diya Ciwan'dır. 1970'lerden beri Modern şiir yazıyor. Şiirlerinin ayırt edici özelliklerinden biri de Folklor'dur. Şairler folklora neden bu kadar önem vermişlerdir? Folklor, Diya Ciwan Şiirlerinde nasıl yer buldu? Şiir neden Folklorun aktarıcısı olur? Diya Ciwan hangi folklorik unsurları kullandı? Modern Şiir ve Folklor ilişkisi uzundur ve bir tez konusu olabilir. Ancak çalışmanın sınırlılıkları nedeniyle bu ilişki Diya Ciwan'nın şiirleri bağlamında incelenecektir.

Diya Ciwan, Klasik Kürt Edebiyatı döneminden sonra Modern Şiir yazan ilk kadınlardan biridir. Kürt kadınları uzun bir aradan sonra Modern Şiir alanında yeniden hayat buldular. Kürt şair folklor konusuna modern şiirlerinde geniş yer vermiştir. Cegerxwîn ve Osman Sebrî ile tanışması, Folklor ile olan ilişkisinin nedenlerini bize açıklıyor.

Anahtar Kelimeler: *Modern Şiir, Folklor, Diya Ciwan, Kürt Edebiyatı, Folklor Etkisi*

THE IMPACT OF FOLKLORE ON MODERN KURDISH POETRY AS AN EXAMPLE OF POET DIYA CIWAN

Abstract:

Folklore is the existence of a nation. Beliefs, folk tales, songs, traditions, and many other themes form folkloric elements by folk production. The source of Folklor is the people, and after the outturn of folklore, it also affects the people themselves. In other words, the function of Folklor is dual. It both affects and is affected. One of the

Zakho Centre
for Kurdish Studies

main areas that folklore has affected; Contemporary poetry. This study focus on the relationship between folklore and modern poetry. The relationship between Folklore and Modern Poetry analyze through the sample of Poet Diya Ciwan.

Folklore and the influence of Folklore on Modern Poetry are discussed in many academic fields and Literary Criticism. According to some sources, Folklor is a prollofic source for poetry. According to some other authorities, Folklor limits the nature of poetry and creates immutable forms for it. That is why many poets turn away from folklore and neglect it. On the other hand, some poets attach great importance to Folklor and use more Folkloric elements. Herein the reasons for each poet are different. We will discuss this in more detail in the article.

Folklore Studies have become always with the modernization and the beginning of Modern Kurdish Literature. Folklorist Remezan Pertev wrote about these works in an article. Folklore has had an impact on Modern Literature and Poetry since ancient times. An example of this influence is the poet Diya Ciwan, the representative of Modern Kurdish Poetry. She has been writing modern poetry since the 1970s. One of the characteristics of her poems is Folklore. Why did poets give so much significance to folklore? How did folklore find a place in Diya Ciwan's Poems? Why does poetry become a transmitter of Folklore? Which did Diya Ciwan use folkloric elements? The relationship between Modern Poetry and Folklore is long and maybe the subject of a thesis. The interrelation will explore in the context of Diya Ciwan's poems due to the limitations of the work.

Diya Ciwan is one of the first women to write modern poetry after the Classical Kurdish Literature period. After a long time, Kurdish women have revived in the realm of Modern Poetry. The Kurdish poet has extensively covered the subject of Folklor in his modern poems. Her acquaintance with Cegerxwîn and Osman Sebrî explains the reasons for her relationship with Folklor to some of us.

Keywords: *Modern Poetry, Folklore, Diya Ciwan, Kurdish Literature, The Influence of Folklore*

NEWEPEL Û ROLA WÊ DI BERHEVKIRINA FOLKLORA ZAZAKÎ DE

Roşan Lezgîn/Turkîya

PUXTE:

Newepel, yekem rojname ye ku xwerrû bi Kurdîya Zazakî derçûye û heta 100 hejmarî weşîyaye. Di sed hejmaran de 60 jin 252 mêr, 312 kesî rasterast bo rojnameyê nivîsînê. Ji vana, herî kêm 250 kesî cara pêşî bi rojnameya Newepelê dest bi nivîsînê kirine. Û ji vana jî, nêzîkî 60 kesî pirtûkek yan çend pirtûkên wan derçûnê. Ev, ji bo Zazakî ku di nav zaravên Kurdî de derengtirîn pê hatiye nivîsîn hejmarên gelek berbiçav in. Bi vî awayî, *Newepel* ji bo gihandin û perwerdekirina derdorek ku bişê Zazakî bixwîne û binivîse wekî xwendigehek bû.

Di sed hejmarên *Newepel*ê de 479 nivîs, 346 helbest, 319 nivîsên derbarê ziman de, 300 nûçe, 68 hevpeyvîn, 50 kurteçîrok, 32 nivîsên tercume, 32 gotin, 18 peyam, 2 nivîsên lêkolînî, 2 belge weşîyane. Û ji berhemên folklorîk jî 177 mesel, 89 xebroşk (çîrokên gelêrî), 65 kilam/stran, 61 tarîfên xwarinan, 56 pêkenok, 27 mamik, 12 efsane, 8 tiştonek, 4 lorîg û bi sedan îdyom û hejmareka zêde gotinên pêşîyan ku ji herêmên cihê û bi hemî devok û şîveyên Zazakî hatine berhevkirin di Newepelê de weşîyane, bi vî awayî ji berzebûnê reha bûne û hatine tomarkirin. Ji bo Kurdîya Zazakî ku li jêr xetereya ji nav çûyînê ye, dîsa pirranîya kesên ku berhemên folklorîk di bîra wan de hene ji ber salmezinîya xwe êdî li jîyanê nînin, ev karekî gelek mezin e ku di wextê xwe de hatiye kirin.

Foklor, ji bo neteweyetek ne ku tenya bîra dîrokî û bingehê çêbûna nasnameya neteweyî ye, herwisa, berhemên devkî yê folklorîk qeydeyên sîstema zimanê wê neteweyê jî di baştirîn radeyê de li nav xwe diparêzin. Ji vê çendê, rojnameya Newepelê di berhevkirin û tomarkirina berhemên folklorîk yên Kurdîya Zazakî de roleka gelek girîng listîye û îro ji bo folklora kurdan wekî gencîneyek arşîvkirî ye.

Peyvên serekî: *Newepel, rojname, Kurdîya Zazakî, folklora Kurdî, berhem, edebîyata gotinkî, folklor, folklora Zazakî*

Destpêk:

Newepel, yekem rojname ye ku xwerrû bi Kurdîya Zazakî li roja 15 Adar 2011li Diyarbekir dest bi weşanê kiriye û heta 100 hejmarî weşîyaye. Di sed hejmaran de 60 jin 252 mêr, 312 kesî rasterast bo rojnameyê nivîsîne. Ji vana, herî kêm 250 kesî cara pêşî bi rojnameya*Newepel*ê dest bi nivîsînaZazakî kirine. Û ji vana jî, nêzîkî 60 kesî demek paşê pirtûkek yan çend pirtûkên bi Zazakî derxistine. Bi vîawayî, *Newepel* ji bo gihandin û perwerdekirina derdorek ku dikare Zazakî bixwîne û binivisîne rola xwendingehekêlîstiye.

Rojnameya *Newepel*ê di berhevkirin û tomarkirina berhemên folklorîk yên Kurdîya Zazakî de jî roleka gelek girîng listiye ku îro ji bo folklora kurdan wekî gencîneyeka arşîvkirîye. Bo nimûne, li sed hejmarên *Newepel*ê ji berhemên folklorîk 177

Zakho Centre for Kurdish Studies

mesel, 89 xebroşk (çîrokên gelêrî), 65 kilam/stran, 61 tarîfên xwarinan, 56 pêkenok, 89 mamik, 23 lîstik, 12 efsane, 141 tiştonek, 4 lorîg, 167 îdyom, 167 gotinên pêşîyan, bi tevayî 1051 berhemên folklorîk hatine tomarkirin. Ev berhem ji herêmên cihê yên Zazakîaxêf û bi devok û şîveyên cihê yên Zazakî hatine berhevkirin. Bi vî awayî, ev hemî kelepor ji berzebûnê reha bûne. Ji berku pirranîya kesên ku berhemên folklorîk di bîra wan de hene, ji ber salmezinîya xwe êdî li jîyanê nînin û jiber ku Kurdîya Zazakî li jêr xetereya ji nav çûyînê ye, ev karekî gelek mezin e ku di wextê xwe de hatiye kirin.

Di vê gotarê de,ez ê behsa rojnameya *Newepel*ê û rola wê ya di berhevkirin û tomarkirina berhemên edebîyata devkî, yanî, berhemên foklorîk yên Kurdîya Zazakî de bikim û ji her cûreyên berhemên folklorîk mînakek nîşan bidim.

Kurdên Zaza

Miletê kurd wek netweyeka heterojen ji çend grûbên civakî pêk tê. Yek ji van grûban kurdên zaza ne ku bi navên wekî “kird, kirmanc û dimilî” jî têne nasîn. Kurdên zaza, li deverên çiyayî yên bakurê Kurdistanê li nav sînorên duwazdeh wîlayetên kurdan yên di nav sînorên siyasî yên Tirkîyê de niştecih in. Ji van wîlayetan, li Çewlîg û Dêrsimê pirranî ne lêbelê li derên din nîsbet bi kurmancan hindik in. Bo nimûne, li Bayikana Sêrtê tenê li çend gundan hene.[1]Teqrîben ji pêncan yekê kurdên Kurdistana Bakur kurdên Zaza ne.Lê piştî salên 1990î ji ber şer û pevçûnên li çiyayên Kurdistanê, gelek gundên kurdan hatin şewitandin û valakirin, hingê pirranîya nifûsa kurdên zaza jî ji cih û warê xwe koçber bûn, li bajaran, bitaynetî li bajarên rojavayê Tirkîyê belav bûn û ketin bin bandoratund ya pişaftina ziman û kultura Tirkî.Ji vê çendê, ne ku tenê folklor û kultur, Kurdîya Zazakî bi xwe jî êdî di bin xetereya jinavçûnê de ye kumuhtemelen piştî sîh salîdê tenê çend kesên ku Zazakî biaxivin hebin.

Kurdîya Zazakî

Çawa ku neteweya kurd ji çend grûbên civakî pêk tê, zimanê Kurdî jî her wisa ji çend varyantên cihê pêk tê ku ev varyant wekî *zarave*, *lehçe* yan *diyalekt* têne binavkirin. Lê ya rast, her yek ji wan varyanteka zimanê Kurdî ye. Yek ji van varyantên sereke yên Kurdî Zazakî ye ku di nav kurdan de bi navên “Kirdî, Kirmanckî û Dimilî” jî tê binavkirin. Di nav varyantên Kurdî deya ku derengtirîn derbasê nivîsînê bûye Zazakî ye. Kitêba pêşîn ku bi Kurdîya Zazakî hatiye nivsîn, *Mewlîdê Kirdî* ya Ehmedê Xasî (1867-1951) ye ku di sala 1899 de li Diyarbekirê çap bûye.

Zazakî, ji alîyê sîstema zimanî veeynî wekî Kurmancî, taybetîya nîvî akuzatîf-nîvî ergatîvî nîşan dide. Di hevokên transîtîv (gerguhêz) de, dema niha û dema bê akuzatîf, çîrokîya deman û demên bihurî ergatîv in.Di hevokên transîtîv de, li dema niha û dema bê, kirde (subjekt) di halê xwerrû de bireser (objekt) di halê tewandî (oblîk) de ye, lêker li gorî kirdeyê tê kişandin. Li çîrokîya deman û demên bihurî, îcar kirdedi halê tewandî de bireser di halê xwerrû de ye, lêker li gorî bireserê tê kişandin. Ji vê çendê, eynî wekî Kurmancî di Zazakî de jî cihnav (zemîr) cot in; yanî, ji bo halê xwerrû û ji bo halê tewandî wekî “ez/min” cihnavên cihê hene.Herwisa, hemî peyv, di nav hevokê de wek halê xwerrû û halê tewandî bi du awayîdihên bikaranîn.Dîsa, di Zazakî de jî eynî wekî Kurmancî hemî peyv yan nêr yan mê yan pirhejmar in lê di Zazakî de peyv,van taybetîyên xwe di halê xwerrû dejî diyar dikin. Kurdîya Zazakî bi van taybetîyanhem xwe wekî zimanekî kevnare hem jî wekî proto-Kurdî yanî Kurdîya qedîm nîşan dide.[2]

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Kurdîya Zazakî herçendî xwedanê edebîyateka devkî ya dewlemend be jî, yanî ji layê berhemên folklorîk vexurt be jî, lê ji ber ku gelek dereng derbasî nivîsînê bûye, ji vê çendêpiranîya berhemên folklorîk yên di vê dîyalektê deew delîve nedîtine ku bihên berhevkirin û tomar bibin; gelekê wan ji navê berze bûne. Ji alîyê din ve, ji ber ku cografyaya ku ev grûp têde niştecih e, di proseyê şerêqirêj ku li salên 1990î gelek gurr bû, hingê pirranîya gundewarên li çiyayên Kurdistana bakur hatin valakirin, gel ji cih û warê xwe hate rakirin û li bajaran, pirranî jî li bajarên rojavayê Tirkîyê û li Ewropayê belav bû. Lewre,bi valabûna cografyayê re Zazakî nekarî li warên dûr, li bajaran bijî; niha bi rastî li ber xetereya ji nav çûyinê ye. Herwisa,di vê zaraveya Kurdî de, li nik kultur û huner û edebîyatêberhemên folklorîk jî bi giranî winda bûn.Lêbelê hindik be jî, ji destpêka salên 1980yî vir de,bi xeyreta hin kesayetan, beşekji berhemên folklorîk yên Kurdîya Zazakî hatineberhevkirin, bi awayê nivîskî hatine tomarkirin ku di vî warî de niha kulîyateka baş li ber dest e. Di berhevkirina edebîyata gotinkî, yanî berhemên folklorîk yên Zazakî de rola weşanên perîyodîk gelek mezin e. Yek ji van weşanan rojnameya *Newepel* e ku di warê berhevkirina berhemên folklorîk yên Zazakî de roleka gelek mezin lîstiye.

Yekem Rojnameya Zazakî *Newepel*

Newepel yekem rojname ye ku xwerrû bi Kurdîya Zazakî li Diyarbekirê derketiye.Hejmara yekem, li roja 15 adar 2011 derket û bi hejmara xwe ya 100. di hezîrana 2017 de ji ber egerên cûr bi cûr weşana xwe rawestand.*Newepel*, bi ebadê tabloid (430 mm x 280 mm) û 8 rûpel, heta hejmara 50. bi perîyoda panzderojane derket lê piştî hejmara 51. mehane derket. Amadekar û redaktekirina nivîsan ji alîyêsernivîserê rojnameyê Roşan Lezgînî ve, karê rûpelsazîyê jî ji alîyê Bîlal Zîlanî ve hatiye kirin. Edîtorîya rojnameyê jî dîsa ji alîyê van her du kesan ve hatiye kirin. Rojname li ser navê Komeleya Ziwan Huner Kulturî vehatiye derxistin.

Di navbera derketina yekemîn rojnameya Zazakî *Newepel*ê (2011)û yekemîn rojnameya kurdan *Kurdistan*(1998) ku bi zaraveya Kurmancî derketibû de 113 sal û di navbera rojnameya *Têgihîştinî Rastî* (1918) ku yekem rojname ye ku bi zaraveyê Soranî derketibû de jî 93 sal dem heye. Ev demên hanê, ji alîyekî ve jî derengmayina Zazakî nîşan didin.

Rojnameya *Newepel*ê, di warê pêkanîna xwendevan û nivîskarên ku dikarin Zazakî bixwînin û binivîsin, dîsa di warê pêkanîna edebîyata modern ya Zazakî de û herwisa berhevkirina berhemên folklorîk de roleka gelek berbiçav lîstiye. Lê ji vana jî girîngtir serketina*Newepel*ê esas ev e ku ji zimanê gotinkî bi awayekî tendurist derbasbûna zimanê nivîskî yê Zazakî de pêşketinekagelek baş bi dest ve anîye. Yanî*Newepel*ê,zimanê nivîskî yê Zazakî rast, li gorî sîstema zimanê Kurdî bikar anîye û bi vê taybetîyê niha wek reneferanseka sereke ya zimanê nivîskî yê Zazakî li ber dest e.

Di sed hejmarên *Newepel*ê de 60 jin, 252 zilam bi tevayî 312 kesî rasterast ji *Newepel*ê re nivîsînê. Ji vana, kêmtir 250 kesî cara pêşî bi *Newepel*ê dest bi nivîsîna Zazakî kirine. Ji vana jî, beşeka mezin di kursên zimanî ku Roşan Lezgînî di navbera salên 2009-2015 de dabûn de fêrî xwendin û nivîsînê bibûn. Jixwe rojnameya *Newepel*ê di proseya van kursên zimanî de hate derxistin. Ji kesên ku yekem car bi *Newepel*ê re dest bi nivîsandinê kirine, li dora 60 kesî paşê yek yan çend kitêbên wan ên bi Zazakî derketin. Yanî,*Newepel*ê ji bo gihîştandina kadroyên ku dikarin bi Zazakî bixwînin û binivîsin rola xwendingehekê lîst.Bo nimûne, piştî derçûna *Newepel*ê li unîversîteyan bi

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Zazakî gelek tezên masterê hatin nivîsîn ku pirranîya van kesan yan li rojnameya *Newepel*ê dest bi xwendin û nivîsîna Zazakî kirine yan jî bi awayek jê sûd wergirtine. Çimkî, çi nivîsên ku ji bo rojnameyê dihatin nivîsîn, gelek bi hûrbînî herf bi herf, peyv bi peyv, hevok bi hevok dihatin redaktekirin ku redaktorê rojnameyê karê redaktekirina nivîsan wekî kursa fêrbûna nivîsîna Zazakî bikar dianî.

Ji ber ku rojname wekî kovar yan pirtûkan giran nîne, dişê bi hêsanî li her derê belav bibe û nivîsar yan kurtenûçeyên ku di rojnameyê de diweşin bi hêsanî têne xwendin. Lewre, ne ku tenê kurdên zaza bi rêya *Newepel*ê fêrî xwendin û nivîsînê bûn, herwisa gelek kurdên kurmanc jî fêrî xwendin û axaftina Kurdîya Zazakî bûn. Hetta ku gelek ji kurmancan di vê proseyêde dest bi nivîsîna Zazakî kirin. Bo nimûne, Abdulah Koçal,[3] Murad Celalî,[4] Abdurehman Önen[5] ku bi *Newepel*ê re Kurdîya Zazakî ya nivîskî naskirin, dû re, bi Zazakî nivîsîn ku gelek nivîsarên wan di *Newepel*ê de weşîyan. Ji vana, Abdulah Koçalî (Evdî Hesqera) nivîsandina Zazakî dewam kir û du kitêbên wî yên kurteçîrokan weşîyan.[6]

Li *Newepel*ê gelek cûreyên nivîsan hatine weşandin ku îro her yek ji wan dikare di warê forma cûreya nivîskî de, herwisa di warê gramer û îmlaya Zazakî de, dîsa di warêhevoksazî (sentaks) û semantîkêde bo Kurdîya Zazakî ya nivîskî bibe referans. Çimkî Zazakî tenya li deverên gundewar wek zimanekî gotinkî (verbel) dihate biakranîn. Ji bilî berhemên folklorîk di 100 hejmarên *Newepel*ê de 479 nivîs, 346 helbest, 319 nivîsên derbarê ziman de, 300 nûçe, 68 hevpeyvîn, 50 kurteçîrok, 32 nivîsên tercume, 32 gotin, 18 peyam, 2 nivîsên lêkolînî, 2 belge weşîyane.

*Newepel*bi tevayî xebateka sivîl e, bi tu rêxistin yan hêzeka siyasî ve girêdayî nebûye. Ji her alîyê ve, ji serî heta bi dawî bi îmkanên kesane derketiye. Lewre,di proseya weşana xwe de ku nêzîkî heft sal dewam kir,ji gelek alîyan ve rastê tehdayê hat. Hê di serî de,çend hejmarên rojnameyê li Çewlîgê ji alîyê hêzên dewletêve bi awayekî bêqanûnî dest li ser hate danîn û bi vî awayî pêşî li belavbûna wê hate girtin.[7]Herwisa, dewletê xwest kesên ku rojnameyê derdixin çavtirsî bikin ku dev ji derxistina rojnameyê berdin. Dîsa, bi awayekî bêqanûnî li postaxaneyan ji bo ku rojname negihê abone û xwendevanan,gelek nusxayên rojnameyê hatin windakirin. Bo nimûne, li Xarpêtê belavkarên postayê yên resmî di şûna ku rojnameyê teslîmê adresan bikin, nusxayên rojnameyê avêtin çopê. Tiştê ecêb, hem li Çewlîgê hem li Xarpêtê ew mesûlên resmî yên dewletê ku pêşî li *Newepel*ê girtin, bi rêgeza zaza bûn. Lêbelê tehdaya giran û karîger ya li ser rojnameyê esas ji hundir ve çêbû; hinek hêzên siyasî yên îdeolojîk kunaxwazin ji derveyî wan tu xebatek hebe, tim pêşî li belavbûna *Newepel*ê girtin. Bo nimûne, li Diyarbekirê rê nedan ku li hinek bayîyên rojnameyan*Newepel* bête firotin, di her firsendê de li ser xebatkarên rojnameyê mobîng danîn ku wan bêzar bikin ku dev ji derxistina rojnameyê bête berdan. Lê mobînga giran kuji vê jî zêdetir dewam kir, ji alîyê hinek bermayîyên rêxistinên stalînîst yên salên 1970yî bû ku li derdora kovarekê wekî grûb organîze bûne. Pêşî, ketin nav hewldanan ku *Newepel*ê kontrol bikin, yanî bigirin bin hegemonyaya xwe û wekî xebateka xwe nîşan bidin. Lê bala xwe dan ku ev hewldana wan naçe serî, îcar dest bi xirabkarîyê kirin. Bo nimûne, yek bi yek qance avêtin nivîskarên ku di *Newepel*ê de perwerde bûne û bi vî awayî xebatên geşedana Zazakî jehrî kirin.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Rola *Newepel*ê di Berhevkirina Folklora Zazakî de

Foklor, ji bo neteweyek ne ku tenê bîra dîrokî û bingehê çêbûna nasnameya neteweyî ye, jê vê jî wêdetir esas berhemên devkî yên folklorîk qeydeyên sîstema wî zimanî di baştirîn radeyê de diparêzin. Jivê çendê, berhevkirin û bi awayê nivîskî tomarkirina berhemên edebîyata gotinkî, yanî berhemên folklorîk karekî gelek narîn û girîng e; jê re zanîneka taybet divê. Rojnameya *Newepel*ê, tam di wext de,ji vî alîyî ve roleka dîrokî hilda û bi awayekî serkeftî dewam kir. Bo nimûne, li 100 hejmarên rojnameya *Newepel*ê ji berhemên folklorîk 177 mesel, 89 xebroşk (çîrokên gelêrî), 65 kilam/stran, 61 tarîfên xwarinan, 56 pêkenok, 89 mamik, 23 lîstik, 12 efsane, 141 tiştonek, 4 lorîg, 167 îdyom, 167 gotinên pêşîyan ku bi tevayî ji hezarî zêdetir berhemên folklorîk, ji herêmên cihê yên devok û şêwezarên Zazakî hatine berhevkirin.Ev hemî berhem, bi awayekî orîjînal û li gorî metodolojîya berhevkirina folklorê hatine tomarkirin. Bo nimûne, berhemeka folklorîk ji kîjan herêmê jê devê kê hatibe berhevkirin, agahî hatiye dayîn. Herwisa li gelek berheman jî bi jêrnotan agahîyên ronîkirinê lê hatine zêdekirin ku berhem baştir bête fêmkirin. Ev xebatên hanê ji alîyê edîtorîya *Newepel*ê ve hatine kirin. Bi vî awayî, gelek berhemên folklora Zazakî ji berzebûnê reha bûne û hatine tomarkirin. Ji bo Kurdîya Zazakî ku li jêr xetereya ji nav çûyînê ye, dîsa pirranîya kesên ku berhemên folklorîk di bîra wan de hene ji ber salmezinîya xwe êdî li jîyanê nînin, ev karekî gelek mezin bû ku rojnameya *Newepel*ê tam di wextê xwe de kiriye. Gelek berhemên folklorîk ku di *Newepel*ê de weşîyane, paşê wekî kitêb jî çap bûn. Ji vê çendê, ji her alîyî ve rojnameya *Newepel*ê di dîroka rojnamegerîya Kurdî de, bitaybetî jî di dîroka Zazakî ya nivîskî de çîrokeka serketî ye.

Wekî Encam

Di hemî zimanan de, her wisa ji bo hemî miletan rojname tê wateya hevçerxbûna wî zimanî û miletî. Nivîsar û nûçeyên ku bi rêya rojnameyê di nav gel de belav dibin, dikin ku ew gel li dor rojev û ramaneka hevpar bigihê hev. Lê ji vê wêdetir, esas rojname zimanî derdixîne piyaseyê, berbiçav dike û wî zimanî dike xwedan prestîj. Di serborîya *Newepel*ê de jî ev wisa çêbûye, çimkî kurdên ku Zazakî diaxifin bi xwe jî bawer nedikirin ku bi Zazakî rojname dikare derbikeve. Lê *Newepel*ê vê mantelîteyê guhert û kir ku kurdên ku bi Zazakî diaxifin bawer bibin ku Zazakî jî kêmtir dikare li rex Kurdîya Kurmancî bibe standardeka sereke ya zimanê Kurdî. Di dîroka Zazakî de ev serkeftineka gelek mezin e. Çimkî bi *Newepel*ê re Zazakîya nivîskî kete qonaxeka pêşkeftî ku êdî di warê nivîskî de bikaranîna wê geştir bibe. Herwisa, *Newepel*ê ji bo çêbûna kadroyên ku dikarin Zazakî bixwînin û binivîsin jî rola xwendingehekê lîstîye. Ji alîyê berhevkirin û tomarkirina berhemên folklorîk yên di Kurdîya Zazakî de jî *Newepel*ê roleka gelek girîng lîstiye ku niha ji hezarî zêdetir berhemên folklorîk yên Zazakî li rûpelên *Newepel*ê tomarkirî ne.

JI*NEWEPEL*Ê ÇEND BERHEMÊN FOLKLORÎK YÊN BI ZAZAKÎ

Li bin vê serenavê, ez ê ji 12 cûreyên berhemên folklorîk ku li rojnameya *Newepel*ê weşîyane,ji her yekê yek wek nimûne li vir veguhêzim.

1) Efsane

Şarik û Şivan

Goreyê efsane ra, Şariki (Şarê) û birayê xo Şivan deşta Diyarbekirî de keyeyê yew axayî de şoneyî (şiwanîye) kenî. Way û bira her di piya serê sibay ra pes benî

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

çirênenî, êre de anî keye. Rojêk xanima axayî hela ke pesî çirknena (doşena) yew bûya vaşeşit ra yena. Na rewşi yew mude dewam kena û xanima axayî rojêk bêrîye ra yena keye, vana, “Axa, şoneyî kamca de nê pesî çirênenî? Nê rojanê peyinan de hem şit zaf biyo hem zî yew bûya weşi ha şit ra yena.”

Axa wexta tehmê şitî ra ewnêno, şaş maneno. Çunkî axa derdorê Diyarbekirî zaf hewl şinasnen û no vaşo ke dewarê axayî werdo têna Kosipî de esto. Welakîn bi meşa dewarî Diyarbekir ra hetanî Kosipî şayiş û ameyiş rayirê rojan o. Ama ê serê sibayî şinî çere êreyê yenî keye. Axa wexta na rewşi xanima xo ra vano, xanima axayî mat manena, bawer nêkena. Axa zî bawer nêkeno welakîn o zaf hewl zano ke no vaş bê Kosipî yewna ca de çinî yo.

Axa vano ez gerek nê sirrî eşkera bikerî û rojêk înan taqîb keno. Serê sibayî Şarik û birayê xo pesî vecenî teber şinî kişta dewe. Ê bi pesî ra benî yew barsê hingan û verî xo danî Kosipî firenî. Axa peyra tera ewnîyeno, ê firdanî şinî çiman ra vinî benî. Axa a roje heta şan o ca de vindeno. Hetê vakûr ra ewnîyeno. Hetê êreyî de hewna se barsê hingan têdima firenî yenî kişta dewe de nişenî. Û sey her roje yew pesî ra ver û yew zî dim ra, yenî keye. Ê axayî nêvînenî û axa zî kesî ra behs nêkeno.

Şan de axa xanima xo ra vano zewdayê mi hedre bikeri ez yew hewte rayir şina. Roja bîn axa zî rew ra warzeno estora xo hedre keno û heta kişta dewe înan taqîb keno. Wexta ê firenî şinî hetê vakûrî ra, axa zî verê estora xo dano hetê Kosipî.

Waye û bira bi pesî ra wexta serê Kosipî de nişenî, Şarik pesî heti de vindena û Şivan seleka xo gêno şino çemê Mûradî ra awke kirîşeno lewê Kosipî. Goreyê efsane ra pê na awke warî Kosipî ser o yew ban verayştenî.

Şivan wexta awke ra yeno, kendalê Kosipî ya raştê axayî beno. Senî axayî vîneno seleka awke ca verdeno û hetê Şarike ra vazdano û miyanî lemî de xo vîn keno. Axa zî estora xo ê hetê ra ramenû. Senî vecîyeno warî ser, ewnîyeno ke Şarike ha pesî ver di deyiran reyde govend kaykena. Senî ke Şariki axayî vînena, a zî vazdana miyanî lemî de xo vîn kena. Axa derdorê Kosipî geyreno-nêgereno way û birayî ra yew eser nêvîneno.

Axa warî hetê başurê Kosipî ser o xirba banê nêmcetî vîneno. Goreyê efsane ra, diyesê (dîwar) banî pey kerre, qûm û cis virazîyayo. Lewê Kospî de ne kerre, ne qûm û ne zî cis esto. O malzeme pêro yewna ca ra kirişîyayo. Axa pesê xo xo ver şaneno gêno şino keye. Coka dewê ke ha miyanî koyanê Sipî de, nê koyî ra vanî koyî Şarikî û her serre şinî a xirbe ziyaret kenî û qurbanan serbirnenê.[8]

2) Gotinên Pêşîyan

- Aqilo sivik baro giran!
- Boça herî hesabê verî.
- Govendi durî ra weş asena.
- Gunî nêbena awe!
- Herê xwu bibesti cîranê xwu dizd meveci.
- Kermê dari dari ra nêbo dari puç nêbena![9]

3) Îdyom

- cita her û gayî biyene
- Dijeyî dest kerd leyîrê xwu ra, va “Çend nemr o!”
- Manga merde do birîya.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆڵینێن کوردی

- Mêrdek cînîya xwu rê geyreno mehneyî, vano “Ti ardan vêjena, qina xwu têşanena!”

- Merre nêşîya şêro dêsî, gezi qina xwu ya best.

- Qûtê ma wena, şarî rê hakan kena.

- Dêso to rê vana, veyvê ti bieşnawe.[10]

4) Kilam/Stran

Deyira Sayêre

Sêr Seyar id asmîn ha sîya w’
Dimûn bestiyawo, hewr bestiyaw’
Eyr vêng top û tifingû ra
Sewbîna yew veng nivecyaw’

In çi zulim, çi bela wo?
Asmîn bi adir varawo
Ma se kerdo, ma se vato?
Homay ma rî tofûn dawo

Heywax bawo, heywax bawo
Kitab kom dîn ina vato?
Însonû înson veşnawo
Qîyamet û mehşêr ma wo

Vernî eskêr şi dew resa
Peynî ey hema niasa
Seyar id yew bon niverda
Adir eşt ci hemi veşna

Komî serê xwu hawa na
Esker zalim pana fîna
Heywax leyro, heywax leyro
Gun ra rasel rabestiya[11]

5) Lîstik

Kayê Çekuyan

Ino kay bi çekuyan a kay beno. Tewr tay gereka di kaykerdoxî bibî. Kaykerdoxo yew ê bînî ra vano “Yew çekuye vaje.” O bîn zî çekuyêk vano. O verîn, a çekuye ra yew cumle virazeno. Ma vajîm ke kaykerdoxo verîn ê bînî ra vano“Vaje tase.” Kaykerdoxo diyin vano “Tase.” O wext kaykerdoxo ewilîn, mesela, vano “To werd yew mase!”

Ina rey dora kaykerdoxê diyinî ya. Kaykerdoxo diyin ê ewilînî ra, mesela, vano “Vaje dimaşkil.” Kaykerdoxo ewilîn vano “Dimaşkil.” O wext, ma vajîm ke kaykerdoxo diyin cumleya xo virazeno vano “To werd yew pişkil.”

Eke kaykerdox bizano çekuya ke o vano, ci ra yew cumleya xirabe virazîyena, eşkeno îtîraz bikero û vajo “Nê, ez wina nêvana!” La kaykerdoxo bîn eşkeno ey bixapêno yan zî îqna bikero ke cumleya xirabe nêvano.

Armancê inê kayî hîna baş mûsayîşê ziwanî yo.[12]

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینین کوردی

6) Lorîg

Hemma hayê, hewn' mi nêno
Dan kutayo, dan ê kê yo
Dan ê mîr o, şî nêçîro
Nêçîr kuşt be tîro
Hemma hayê, hewn' mi nêno
Goştê ga yo, nêpeşayo
Wer nêrisayo.[13]

7) Mamik

Lû lû
Palengû
Dimçengû
Haver ra, naver ra
Kuzeyî kergê mi berda
Peyê bonû de werda
Ne aste ne poste
Barê … qineste[14]

* * *

Awe weş a, awey derî
Seye weş a, seya Kerrî
Çetin o derdê zerrî
Gunekê mi feqîrî[15]

8) Mesel

Sedemê Nêameyîşê Hewnî

Lajey Rehmî, Xelîl, tiya ra nizdîyê hîrê seyî serrî ra ver dewa Sîmserkîsi de cûyayo. Neslê hewtin ra bawkalî min o. Dizdîya yi derûdor de vengûn dawo. Rojek dijni (şilî) zaf varena, we nîşkîyeno keye ra vecîro teber. Şew diyena, we kuweno cil ke xwu rî rakuwo la hewnê yi nêyeno. Miyanê cili de xwu na heta, a heta donû, se keno çi keno ancîna hewnî yi nêyeno. Cil ra vecîno, wardeno pay û zereyê oda de ragêreno. Sedemê nêameyişê hewnî ser o fikirîyeno. Peynî de xwu bi xwu vûno "Eyro dijni hetûn yerê varaya, ez nêşkîyo vecîro teber, mi eyro dizdî nêkerda. Aw semed ra emşo hewnê mi nêyeno."

We ca de kincûnî xwu pira gêno, keye re vecîno teber. Teber a gêreno, cayê çiyê dizdî nêveyno, şonû serî bonê birayê xwu Sofî ser, bangêrê yi tiraweno, erzeno xwu kiftî ser û beno binê dewi de erzeno qurney gozêri. Helêk ser di nêşonû, banê Sofî dalpey keno. Sofî vecêno banî xwu ser ke ban biçarno, ewnîyeno ke bangêri çin a. Sofî fikirîyeno fikirîyeno, peyni de xwu bi xwu vûno "Bibo nêbo ino gure gurey Xelî yo. Bêxêrba Xêl kes ino hewa gure nêkeno."

Ca di ban ra yeno war, hetî keyê Xêl ra şonû. Xeli zî keye di hema newe-newe girê hewnî girewto. Yeno berî ver, donû ber ro, vonû:

- Xelo! Tu bangêrê mi se kerda, berda ça?

Xel vengî birayê xwu Sofî ser o beno haya û tira vonû:

- Liya bira mi bigêr, hema newe mi hewn girewto.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Sofî vonû:

- Liya Xelo, wilay dalpû ma kerdî teber. De ti qey Homay kên, cayê yê vaji, ez xwu rî şiyero biyaro.

Xel vûno:

- De mi bigeyr liya lajek, ez pey bangêrê tu se bikero. Bangêrê tu ha binê dewi di zereyê qurney gozêri di ya.

Inê vateyî ser o Sofî bi lez vazdano hetî gozêr a. Ewnîyeno qurn ra, eke bangêr ha tede ya. We devrîyeno la nêşkeno bangêr qurney gozêri ra veciro, heyna peyser ageyreno, berî Xêlî kuweno û vonû:

- Xelo lezi şîme, to senî hawa bangêr devista qurni, heyna ay hawa veciri biyare cayê ya.

Iney ser Xel ewnîyeno çare çîn o, cil ra vecêno û dûno purî, şonû bangêr qurney gozêr ra veceno, heyna beno herindê ya de verdûno.[16]

9) Pêkenok

Çîz-vîz

Hebêke Eyndaric kolîyan beno Diyarbekir de roşeno, keyî rê teftal gêno. Pê ke rayir de boro, xwu rê zî henî nan û kebab gêno.

Rayir de beno rincan. Fekê çemî de nişeno ro. Vano "Ez xwu rê werê xwu borî."

Dismaley xwu serê tehte de fîneno ra û nanê xwu dano ser. Kebabê xwu zî dano serê nanî. La tîkeyê kebabî nanî ser ra kono war, kono miyanê awe, şino binê awe. Mêrik destê xwu binê aw de çarneno, yew beq kono destê mêrikî. Beq destê ci de keno "çîz-vîz". Mêrik vano qey ey goşt qefelnayo. Vano "Ez çîz-vîz nêzana, mi pereyê xwu dayo, ez to wena!"

Gêno beqî keno miyanê nanî û gaz dano pero weno.[17]

10) Tarîfên Xwarinan

Kaleka Dekerdîye

Malzeme: Yew kaleka bize, nîm kîlo qîyme, birinc, dendikê vaman, fistiqê çaman, eşkicê mîrçikan, bexdenûs, rûn, aqîtê firingîyan, îsoto perikin, rîhan, sole.

Viraştiş: Verî qesab ra xisûsî kaleka tame gewde ra vejenê. Seba dekerdişî kaleka raşte ya bize tercîh bena. Qesab hêtê peyînî ra cor hetanî mil kaleke sax cêkeno. Qesab peyê milî de binê hêtê verînî ra dest pêkeno, mabeynê caxan û goştî de cêb akeno. Estikê bêrokî bi usûl vejeno. Bê ke cayêk de bidirno, bi destan zereyê cêbî baş keno hîra. Êdî kaleke seba dekerdişî amade ya.

Seba malzemeyê dekerdişî, tawe de rûn qijilnenê, kewçikêk aqîtê firingîyan tede sûr kenê, birinco ke verê cû şito û nezelnayo dekenê miyanê rûn û aqîtê sûrkerdeyî. Dendikê xamî yê vaman ke verê cû awe de nermijnayê û tole kerdê, ancî fistiqanê çaman û eşkicanê mîrçikan piya dekenê miyan, qasê nîm kîlo qîyme zî veredanê ser. Badê ke eno malzeme bineyke sûr bi, îsoto perikin ke dekerdo miyanê awa germine û nermijnayo, ey zî verdanê ser. Rîhan û sole zî îlawe kenê û tasêk awa girênayî veradanê ser. Eke yew kel gina piro, yanî malzeme bineyke kelxaşî bi, adirî ser ra nanê ro.

Malzemeyê zereyî eke bineyke bi serdin, bexdenûs zî rişnenê ser û seke dolman dekerê wina malzemeyî dekenê zereyê cêbê kaleke, bi destan her ca ra seypê vila kenê. Gerak cêbê kaleke zaf pir nêbo çimkî dima birinc awe anceno xwu maseno û

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەكولینێن كوردی

kaleke feteqneno. Fekê kaleke bi lak derzenê. Eno miyan de seba terbîyekerdişê teberê kaleke yew tencereyo hîra de rûn qijilnenê û aqîtî rûn de kenê sûr. Enê terbîyeyî teber ra sawenê her cayê kaleke ra, dima kaleke dekenê zereyê eynî tencereyî, her di hetanê kaleke enê rûnê aqîtinî de rind kenê sûr. Dima heta ke bido kaleke ser awa girênayî veradanê tencere, bineyke sole zî îlawe kenê û qasê di saetî kaleke girênenê. Demeyê girênayîşî de di rey kaleke qelibnenê ke her terefê ci seypê bipeyşo.

Eke peyşa, kaleke sax tencere ra vejenê û tepsîya firine de nanê ro. Nîm saete ra zêde firine de zî kenê sûr. Eke teberê kaleke sey goştê kebabî sûr bi, êdî firine ra vejenê. Verî lako ke pê fekê kaleke deşto, ci ra ancenê. Seba ke goştê xwu baş peyşayo, caxê parsû û estikê bînî êdî bi xwu goştî veradanê. Estikan miyan ra vejenê, goştî pencirnenê. Malzemeyê zereyî yo mexlûte dekenê tebeqe, goştê pencirnayeyî dekenê ser, eke biwazê awa ke kaleke tede peyşaya, aye zî sey sosî dekenê yew tase û têdir servîs kenê.

Kaleke werdê neteweyî yê kurdan a, werdê meymananê maqulan a. Afîyet bo.[18]

11) Tiştonek

- Azan dano mela nîyo, kelawe sere de feqî nîyo? (dîk)
- Çiwa çewte peyê hewt koyan de kewte? (keskesûre)
- Ez apey manena beno derg, leze şina beno kilm? (rayir)
- Gawo gul o, hewtecil o? (piyaz)
- Letê nanî peyê banî? (aşme)[19]

* * *

Çewres heb keşîşe mi estê
Her keşîş çewres heb entarîyê xo estê
Her entarî de çewres heb cebî estê
Her ceb de çewres heb kardî estê
Her kardî, çewres heb fekê xo estê
Her fek de çewres heb qulî estê
Eceba kenê çend hebî?[20]

12) Xebroşk (Çîroka Gelêrî)

Memê Alo [Memê Alan]

Beno nêbeno. Beno nêbeno, di keyney benê. Şinê jew înî ser, şinê înî ser xwu rê awke. Ewnenê awke ra. A vana:

- Ez xasek ane.

A bîne vana:

- Ez xasek ane. Jû ja ra vana ke:

- Ne ti rind a, ne jî a rind a. Keyno miyon de Zîna Zîdanî rind a, lajeko miyon de Memê Alo rind o. Ê bi xwu keynê perîyan ê.

Vanê:

- Bê ma hele Mem û Zîn ya biyarîm pêhete, en bol kamcîn rind o. Şinê gênê anê pêhete, kumjîn erzenê bano ser, însan hewn di maneno. Şinê ay kenê xwu qoçî anê Memî hetek. No serdê dinyay ra mesela, Şam ra benê Şerq yanê benê dûrî.

Mem hesyeno bi xwu ke şewa, keyneke amewa hete. Ewneno ke keyneke bol xasek a.

Vano:

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

- Aman keynê ti ya kê ma de çiçî geyrena?
A vana:
- Ti yê kê ma de çiçî geyrenê?
O vano:
- Ez kê şima nîyamanê ke, ti amewa kêdê ma.
A kerda xwu desto ser a bişewe berda, bê xeber berda.O vano:
- Nê ti amewa kê pêrdê mi.
A vana:
- Ti ameyê kê pêrdê mi.
Nêsilasnenê, nêzanê.A vana ke:
- Ez xemel nêkeno, yanê ez ameyanê kêdê şima, ez vanane ti ameyê kêdê ma.
O vano:
- Vinde ez to rê vajî. Qonaxê pêrdê mi çewres lingin o.
A vana:
- Qonaxê pêrdê mi jî çewres û jû ling o.

Piya şinê amorenê ke heqet çewres ling o. Jû bergîrê lajêkî esto, bol rind o, istoro weş o.Vano:

- Hadê ma şime istorî hete. Seheta ke şinê istore hete, a hewna xemel kena ke, kê pêrdê lajekî yo. Yenê dîyar giştananê xwu degiş kenê, jew yatax de kewnê. Beno şewra, lajek ewnêno ke keyneke hete çin ya. Fina ê perîyon kerda xwu deston sera girota berda kêdê ci.

Lajek werzeno. Vano:

- Maya mi jû keyneke eşmo amê kêdê ma bol rindi bî, filon ca rabî, namê ci Zîne bî.

A vana:
- Oxil! Hewnê şewon o, xemel meke. To hewn dîyo.
O vano:
- Maya mi hewn nêbi. Ma giştanê xwu degiş kerdî, ma piya qisey kerd.
A jî şewra werzena marda xwu ra vana:
- Eşmo mi hewndê xwu de Memê Alo dî. Ez şîbyanê kêdê ci.
Maya ci vana:
- Oxil to hewn dîyo. Ti senî tiya ra şiya Şam kêdê ci?
A vana:
- Maya mi, mi hewn nêdyo. Ma giştanê xwudegiş kerdî, piya qisey kerd.
Mem jû tenya wo, bol qîymetlî yo. Nişeno ro istore vano:
- Ezo şirî kêdê ci.

Şino, şino, şino… Ray dûrî ya. Bol şino. Şino Xidir Xoca raştê ci yeno, destê xwu dano miyanedê ci ro. Vano:

- Ti yê şinê kê pêrdê Zîne, meşo! Şo kê dezadê Zîne.
Şino ke jû keyneka esmere, mesela yanê. Şino înî ser. Vano:
- Keynek, kê pêrdê Zîne kotî yo?
A vana ke:
- Zîne ez ane.
Vano:

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

- Aman! Ti Zîne nîya. Eke ti Zîne biyayê se ez to kena qurbandê lingda na istore, senî ti Zîne bena? Ti xar a.

La vana ez Zîne nîyane, Zîne embaza min a. Uja ra şino. Xidir Xocay ci ra vato, "Ti ke şinê, verî, di gencê ja selam ra ci de, tey xoş-bêş jî meke. Jewna wo ja qe selam jî ra ci mede, o şeytan o. Şo dîna teney a kişte estê selam bide, ê dezayê Zîn ê, şo kêdê înon." No şino hendik ci rê Zîne meraq a, selam dano ra îno, vano:

- Mi berê kê pêrdê Zîne.

Peynî meraq ra dahanî nêşeno şiro kêdê dezandê Zîne. Şino pêrdê ci wa piya dame kaykenê. Vanê ma ele kamî ro dim se, ma do ey beme çekim zîndo. Dame kaykenê, kenê. Tim Mem dame dano îna ro. O şeyton yeno vano ke:

- No qandê Zîne amewo. Şima goş mi bidê, Zîne biyarê pencera, wa o bewno Zîni ra, şima dame eyro dê, ele eyro dê.

Şino Zîne ano pencera. O ewneno Zîne ra, ê ele danê Memî ro. Vano:

- Zînê ele dawa mi ro.

Destanê ci girêdanê benê çekenê zîndo. Zîne vana:

- Mem ja veyşo se bo?

Veyndana jewerî vana:

- Ez perey dano to, aylixa to dano. Ti şewra şon de bê Memî rê nan virade bîr.

Na ne cayê qaze verdana, ne rib û kincî verdana, cayê tebawo weş nêverdana pewjena ci rê rişena. Mevaje ke o aylixçî ê hemi çî-mî bi xwu weno, ey rê jew lete nano wuşk viradano ke o qeder nêmiro ha.

Rojê pîyê ci, birayê ci şinê sûke, keye di nêbenê. Na vana:

- La mo ez helisyane jû qaze miyanê ci kena pirdê rizî pewjena û selate gêna, şina bîrî ser. Şina bîrî ser, jew çaqil viradana, vana:

- Memo!

O vano:

- Ti kam a, çaqil viradana?

Ya vana:

- Ez Zîn ane.

Vano:

- Of Zînê kê pêrdê to wedaryo, to senî jew roje jew loqme nano rind nêrişt, tim û tim nano wuşk rişt.

Ya vana:

- Kê pêrdê ê ayliqçî wedaryo. Mi aylixa jew tepişto, şewra şon de ne qaze verdê ne teba verdawo, pewto rişto. Teba nêverdawo, kê pêrdê xwu wedarnawo.

O çax vano:

- Zînê ez jû Ayata Kursî waneno, xwu çekenane hîrê metroy bîrî ra berz, ti şêna mi tefşê.

A vana:

- E la.

Seheta ke no xwu çekeno, êşena ey tefşo, fina guneno bîr ro, miyaneyê ci şikyeno. Vano:

- Zînê, miyaneyê mi şikya, ecêba ez se kirî?

Ya vana:

- Hele fina xwu çeke, ez na fin to tepşeno.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Xwu çekeno, naye de ey tefşena. Vano:

- Zînê mi rewna zanîyê xwu raderg nêkerdê. Ti zanîyê xwu rone, ez sereyê xwu sernî, radergbî û zanîyanê xwuraştî kirî.

Seheta ke ninganê xwu keno raşt, mireno. A ewnena tunikda ci de jû kardîesta, kardî gêna dana xwu ro, xwu jî ey ser o kişena. Pîyê ci û inê yenê ewnenê Zîne keye de çin ya. Şinê geyrenê ro ci ke a ya bîrî ser o. A jî merda, o jî merdo. O şeytan Beko vano:

- Biyarê ma jewere mesela asmêre de mezel kim, jewerî dew de mezel kim, wa jewbîna ra dûrî bê.

Jeweri uja dekenê, jewerî tiya dekenê. Zamanê maneno, bol şino tay şino, vîst roj are ra ravêreno, o şeytan vano:

- Hele biyarê ma mezelanê ci akim, ê se bî.

Ê Zîne akenê, a miyon de çin ya. Ê Memî akenê, o mnyo de çin yo. Vano:

- Biyarê ma bipeynim ortê ci akim ke nika eyê pêhete.

Peymenê ortê ci akenê ke êyê pêhete. O çax birayê keyneke jû govde dano ê şeytanî mil ro, milê şeytanî cikeno. Vano:

- Sebebê hemi çî ti yê, yanî ma nînan ra merdim rind dîyê keyna xwu bi ci dime. Ti biyê sebebê hurdinon.

Ê o çax benê çitê qabrixêrî, dahanî biyê eşkeray ya. Waxto ke milê ê şeytanî dano piro gunîya ey erzyena qeladê here, şino gineno ortedê înon ro. Orte de beno telîyê qerê çalî, nêverdano ke bêrê pehete, jewbînan bivînê. Nê telî şewra cikene, şan de beno. Şan de cikenê şewra beno. Yanî biyo bela. Qedyaû şî.[21]

NEWEPEL
rojnameyo kulturi yo 15 roje
15-31 adare 2011 Hûmare: 1 newepel@hotmail.com Vaya / Fiyat: 1 TL

Komela Ziwan, Huner û Kulturî
ZIWAN-KOM RONÎYA

Komela Ziwan, Huner û Kulturî (Ziwan-Kom) ke do seba averberdişê lehçeya kirdkî (zazakî) bixebitiyo Dîyarbekir de ronîya.

NEWROZ PÎROZ BO!

En roşanê kurdan o
Rocêkew nam-nişan o
Pil û bi hem qican o
Adir wekê ser koyan o
Şair Mem

Dîyarbekir de Kursê Kirdkî (Zazakî)

Nê demanê peyênan de Dîyarbekir de kirdî eleqe nîşanê kirdkî (zazakî) danê û na çerçewa de kursê kirdkî dîyenê.

ROPORTAJ
Hulya YETÎŞEN
Gilberte Favre Zaza Reyde Roportaj

Ciniya Nûredîn Zazayî

Merheba...
Roşan LEZGÎN

Her Destpêk Hêvîyanê Neweyan Îfade Keno
Serdar BEDIRXAN

Avşîne û Qederê Kirdkî
Cavit ORAK

Nêweşîya Çimnebarîye
Berxwedar PÎRANIJ

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Rûpela 1. ya hejmara 1. ya rojnameya *Newepelê*

rojnameyo kulturi
NEWEPEL
hûmara 100 xeyrêne ba
Hûmare: 100
Vaya / Fiyat: 1 TL
Roşan Lezgîn:
"NEWEPELÎ KADROYÊ ZIWANÎ ARDÎ MEYDAN"
Roportaj: Ali Aydin Çiçek
4-5
LO-LOYÊ KIRDASÎ
Murad Canşad
3
Rojnameyê Newepelî û Komelê Kirdan
Welat Raminazad

Rûpela 1. ya hejmara 100. ya rojnameya *Newepelê*

Perawez:

[1] Lezgîn, R, 2016, ***Toplumsal Kürt Gruplarından Zazalar***, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbekir, r. 33-34.

[2] Lezgîn, R, 2013, ***Ji bo Kurmancan bi Awayê Muqayeseyî: Gramera Kirdkî (Zazakî)***, Weşanxaneya Roşna, Diyarbekir.

[3] Koçal, A, 2016, "*Bê bê! Yew Kirdas Dimilî Museno*", *Newepel*, Hûmare 88,Diyarbekir, r. 1.

[4] Celalî, M, 2013, "*Kirdkî û Ez*", *Newepel*, Hûmare 35, Diyarbekir, r. 6.

[5] Önen, A, 2017, "*Dêrika Çiyayê Mazî*", *Newepel*, Hûmare 97, Diyarbekir, r. 3.

[6] Hesqera, E,2021, ***Merhebaya Nîmeyê Şewe***, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbekir. / Hesqera, E, 2021, ***Lîtreya Sayan Çend Lîra ya?***, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbekir.

[7] Lezgîn, R,2011, "*Çewlîg de Newepelî Ser o Mudaxeleyê Polîsan*", *Newepel*, Hûmare 6, Diyarbekir, r. 3.

[8] Sîwanij, W, 2011, *Newepel*, Hûmare 5, Diyarbekir, r. 6.

[9] Akalın, H, 2016,*Newepel*, Hûmare 48, Diyarbekir, r. 7.

[10] Gomayij, M, 2012, *Newepel*, Hûmare 25, Diyarbekir, r. 7.

[11] Emen, M, 2016,*Newepel*, Hûmare 92, Diyarbekir, r. 3.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

[12] Bor, Î, 2013, *Newepel*, Hûmare 51, Diyarbekir, r. 8.
[13] Tepe, S, 2013,*Newepel*, Hûmare 47, Diyarbekir, r. 6
[14] Canşad, M, 2011,*Newepel*, Hûmare 13, Diyarbekir, r. 7
[15] Laçîn, Ş, 2016,*Newepel*, Hûmare 90, Diyarbekir, r. 7
[16] Sîmserkîsij, Î, 2012,*Newepel*, Hûmare 23, Diyarbekir, r. 5.
[17] Doguç, W, 2017,*Newepel*, Hûmare 97, Diyarbekir, r. 6.
[18] Okçu, F, 2016,*Newepel*, Hûmare 83, Diyarbekir, r. 6.
[19] Aslan, M, 2017,*Newepel*, Hûmare 97, Diyarbekir, r. 5.
[20] Canşad, M, 2011,*Newepel*, Hûmare 13, Diyarbekir, r. 7.
[21] Petekkaya, H, 2013,*Newepel*, Hûmare 49, Diyarbekir, r. 7

(*Newepel* ve Zazaki Folklorunun derlenmesindeki rölü)

Özet:

Newepel, 15 Mart 2011 tarihinde Diyarbakır'd Zazakî Kürtçesiyle yayınlanan ilk gazetedir ve 100 sayıya ulaşabilmiştir. Yüz sayıda 60'ı kadın 252'si erkek, toplam 312 kişi doğrudan gazeteye yazmıştır. Bunlardan en az 250 kişi ilk kez *Newepel* gazetesiyle Zazakî yazmaya başlamıştır. Bunlardan da yaklaşık 60 kişi bir süre sonra Zazakî bir ya da birkaç kitap yayınlamıştır. Böylece *Newepel*, Zazaca okuyup yazabilen kadroların yetişmesinde bir okul rolü oynamıştır.

Newepel gazetesi, Kürt folklorunun Zazakî varyantında bulunan eserler için arşivlenmiş bir hazine gibidir. Örneğin *Newepel*gazetesinin 100 sayısında folklorik eserlerden 177 mesel, 89 masal, 65 kilam/şarkı, 61 yemek tarifi, 56 fıkra, 89 tekerleme, 23 oyun, 12 efsane, 141 bilmece, 4 ninni, 167 deyim ve 167 atasözü, toplam 1051 folklorikeser derlenip kaydedilmiştir. Bu ürünler, Zazakî konuşulan farklı bölgelerden ve farklı Zazakîşivelerinden derlenmiştir. Böylece, bütün bu sözel edebiyat eserleri kayıt altına alınmış ve kaybolmaktan kurtulmuştur. Çünkü hafızalarında bu eserleri taşıyanların çoğu insan artık hayatta değiller. Öte yandan, Zazakî Kürtçesiartık yok olma tehlikesiyle karşı karşıya olduğu için, aynı zamanda, tam zamanında yapılmış çok önemli bir çalışmadır bu.

Bu yazıda *Newepel* gazetesinden ve sözlü edebiyat eserlerinin, yani Zazakî Kürtçesinin folklorik eserlerinin derlenmesi ve kayıt altına alınmasındaki rolünden bahsedeceğim ve herbir folkloriktürden birer eseri örnek olarak sunmaya çalışacağım.

Anahtar kelimeler: *Newepel gazetesi, Zazaki Kürtçesi, Zazaki,Kürt folkloru, Zazaki Folkloru*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

***Newepel* and its role in the compilation of Zazaki folklore**

Abstract:

Newepel is the first newspaper published exclusively in Zazaki Kurdish on March 15, 2011 in Diyarbekir and has published up to 100 issues. In one hundred issues 60 women 252 men, 312 people write directly for the newspaper. Of these, at least 250 people have started writing Zazaki for the first time with the *Newepel* newspaper. And of these, about 60 have recently published a book or a few books in Zazaki. In this way, *Newepel* played the role of a school for reaching and educating some people that could read and write Zazaki.

Newepel newspaper also plays an important role in the collection and recording of Zazaki Kurdish folklore works, which today is an archived genre for Kurdish folklore. For example, 177 proverbs, 89 folk tales, 65 kilams/songs, 61 recipes, 56 jokes, 89 puzzles in verse, 23 games, 12 legends, 141 puzzles, 4 lullabys, 167 idioms in hundreds of Newepel folklore products. The first 167 words, a total of 1051 folklore productions were recorded. These products are collected from different Zazaki-speaking regions and with different Zazaki dialects and vernaculars. In this way, all these traditions are record and were liberated from getting lost. Because most people who know, remember the folklore works they are no longer alive and because Zazaki Kurdish is in danger of extinction, this is a very big job that has been done in its time.

In this article I will talk about the *Newepel* newspaper and its role in compiling and recording the works of oral literature, that is, the folklore products of Zazaki Kurdish and provide an example of all kinds of folklore works.

Keywords: *Newepel newspaper, Zazaki Kurdish, Zazaki dialects, Kurdish folklore*

NİRXANDİN Û ANALÎZA BERHEMA KELEPORÎ YA EUGEN PRYM Û ALBERT SOCİNÎ

Assoc Prof. Dr .Mustafa ASLAN
beşa ziman û çanda kurdî- Zankoya Mardin Artuklu/Turkîya

PUXTE:

Li gor agahîyên li ber destan, ji serê nîveka duyem ya sedsala XIXem heta dawîya nîveka yekem ya sedsala XXem gelek xebatên berhevkarî yên zargotina kurdî ji alîyê vekoler û gerokên bîyanî ve hatine kirin. Yek ji van xebata ducildî ya zimannasên alman Eugen Prym û Albert Socin ya bi navê "Kurdische Sammlungen"ê ye.

Di vê gotarê da em ê li ser vê berhemê rawestin ku ji 13 çîrok/serpêhatî, 16 stranên evînî, 25 destan û stiranên şer yên kurdî, helbesteka Sîyahpûş û yeke Elî Herîrî pêk tê. Gotar ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem da bi kurtasî agahî derbarê nivîskaran û rêbaza wan ya berhevkarîyê da hatine dayîn. Her weha li ser ger û rêwîtîya ku Albert Socinî ji bo berhevkirina berhemên zargotina kurdî kirîye hate rawestin. Di berdewamîya vê beşê de danasînek giştî ya berhemên herdu cildan hate kirin.

Di beşa duyem da ku ew jî du binbeşan pêk tê, li ser berhemên çîrokî yên di xebata navborî da cih girtine hate rawestin û berhem ji alî naverok û strukturê ve hatin analiz kirin. Di binbeşa yekem de rêzincîra bûyeran û serborîyên lehengan hatin analîz kirin. Di binbeşa duyem de li ser lehengên hin ji çîrokan û taybetmendîyên wan ku ji alî çîrokbêj (vegêran) ve hatine taswîr kirin hate rawestin. Di vê çarçoveyê de hêmanên derasayî ku di van çîrokan de hatin analîz kirin. Di beşa sêyem de nirxandin û analîza hinek destan û stiranên şer wekî mînak hate kirin. Bi taybetî li ser taswîrên ku dengbêjan derbarê lehengan û kiryarên wan de kirin e hate rawestin. Bi riya nirxandin û analîza van berheman me xwest em balê bikişînin ser gencîne û dewlemendîya edebî ya zargotina kurdî ya gelêrî.

Peyivên Serekî: *Eugen Prym, Albert Socin Çîrok, Serpêhatî, Destan, Zargotina Kurdî*

Destpêk

Li gor agahîyên li ber destan, ji serê nîveka duyem ya sedsala XIX-an heta dawîya nîveka yekem ya sedsala XX-an gelek lêkolîner û zimanzanên rojavayî, rûs û ermen berhevkarî derbarê zargotina kurdî da kirine. Ji xeynî Eugen Prym û Albert Socin lêkolîner û zimanzanên wekî Hugo Makas, Sargis Haykûnî, Peter Ivanovic Lerch (1828-1884), Iosif Abgaroviç Orbeli (1887-1961), Ferdinand Justi (1837-1907), Oskar Mann (1867-1917), Albert von le Coq (1860-1930) û Alexandre Jaba (1801-1894)[1] di wan demen navborî da derbarê ziman û zargotina kurdan da berhemên giranbiha çap kirine. Eugen Prym û Albert Socin wekî piranîya lêkolînerên dema xwe digel lêkolînên derbarê zimanên erebî û aramî xebatên berhevkarîya zargotina kurdan da kirine û di du cildan da çap kirine.

Zakho Centre for Kurdish Studies

Berhemên di van herdu cildan da mijara vê gotarê ne. Ji analiz û nîqaşên teorîk zêdetir, ji alî naverok, rêzezincîra bûyeran, têkîlîyên navbera lehengan, taswîra lehengan û hêza wan ve, berhem hatine nirxandin. Berhemên di herdu cildan da ji du beşên sereke pêk tên: yên pexşan ango vegotinên gelêrî ku bi piranî yan serpêhatî yan jî derasayî ne û berhemên helbestî ku ew jî bi piranî destanî ne (stranên şer an zêmar jî di nav de), lê hinek ji wan pexşan, hinek hem pexşan hem helbestî û hinek jî helbestî ne. Çi pexşan bin çi helbestî bin, zêdetir derbarê berhemên ku varyantên wan zêde nayên naskirin an ji alî struktur (avahîsazî) û rêzezincîra bûyeran ve taybetmend e nirxandin hate kirin. Her çiqas ji alî hunera edebî ve pir dewlemend in jî destanên wekî *Mêm û Zîn, Zembîlfiroş, Dimdim, Evdal Xan, Qewlê Newala Sîsebanê* û *Hespê Reş* ku di cildê duyem da cih girtine, li derveyî nirxandinê hatin girtin, lewre ev berhemên navborî hem naskirî ne hem gelek varyantên wan hene û digel vê jî bûne mijara gelek xebatên zanistî.

Gotar ji sê beşên sereke pêk tê. Di beşa yekem da agahî derbarê nivîskaran û berheman da hatine dayîn. Piştî danasîna nivîskaran di serê beşê da berhem bi giştî hatine danasîn, agahî derbarê wan da hatine dayîn.

Di beşa duyem de, berhemên pexşan di bin du sernavan de, “serpêhatî” û “çîrokên xwedî hêmanên derasayî” hatine nirxandin û analîza hêmanên derasayî û karakteran (lehengên) hatiye kirin. Ji çîrok an serpêhatîyên ku zêde nenas in, varyantên wan ku di xebatên din da cih girtine wekî referans hatine dayîn.

Di beşa sêyem da jî berhemên helbestî û destanî di bin sê sernavan de, “stranên evînê”, “stranên şer” û “destan” hatine nirxandin. Bi taybetî li ser taswîrên ku dengbêjan derbarê kesayetîya leheng leheng û kirinên wanî derasayî hatiye rawestîn, bi riya mînakan berhem hatina analizkirin.

Di encamê da me hewl da em balê bikşênin ser hunera dengbêjî û vegêrana (çîrokbêjî) kurdî di îcrakirin û afirandina berhemên zargotinî de. Hate gotin ku ev huner ne tenê di taswîra leheng û bûyerên derasayî da xwe dide der. Mirov heman zîrektîya hunerî ya vegêran û dengbêjan di hevoksazî, bikaranîna rengdêran, taswîra erdnîgarî û têkilîyên mirovantîyê bi taybetî û têkilîyên civakî da jî dibine.

Agahî derbarê nivîskaran de

Rojhilatnasê almanî Albert Socin (1844-1899), li çend zanîngehên ewropî zimanên rojhilatî xwend. Sala 1867an da ji zanîngeha Halle (Berlîn) pileya doktora wergirt. Di navbera salên 1868 û 1870an da li Rojhilat maye û tevlî Eugen Prym xebat û lêkolîn li ser zimanên erebî, suryanî û kurdî kirine.

Eugen Prym (1843-1913) jî wekî Albert Socin rojhilatnasekî almanî ye. Zanista zimanê berawirdker û zimanên rojhilatî xwendiye, û di sala 1868an doktora ji zanîngeha Bonn wergirtiye. Ji bo lêkolînên ser zaravên nûjen bû hevparê Albert Socin di geştên ber bi Rojhilat ve. Li Şamê kesekî suryanî ji herêma Torabidîn nas kir û gelek helbest, çîrokên gelêrî keleporî bi suryanî û kurdî ji devê wî girtin û di sala 1881an da çap kir. Ev xebat bû bingehek ji karên wî bi Albert Socin re yên di rojên pêş de. Jiyana xwe bi mamostetî û hînkirina zimanên sanskrîtî û farisî li zanîngeha Bonn bûrand.

Derbarê kesên ku berhem ji wan re gotine, nivîskaran ne di pêşgotina cildê yekem da û ne di pêşgotina cildê duyem da agahîyên diyar nadin. Tenê di rûpelên XV-XVIII-an yên cildê duyem da derbarê vê babetê da Albert Socin hinek agahî dide. Lê pêşî hin agahîyan derbarê gera xwe ya li herêmê dide. Paşê behsa hevdîtina xwe ya bi kesên

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

ku ji wan berhem berhev kirine dike, bêyî ku navên van kesan diyar bike. Dibêje ku ji bo şirovekirina van berheman wî carnan alîkarî ji hin kesan xwestîye.

Socin radigihîne ku di meha Hezîrana sala 1870 da ji Mûsilê derketiye û berê xwe daye gundê Tilkêfê ku niştecihên wî xaçperest bûn. Socin wan bi navê "fillehan"[2] dide naskirin. Li wir çend rojan maye û ji devê niştecihên gund hin stran tomar kirine. Piştre, ji wir çûye gundê Alqoş yê xaçperestan û çend rojan li dêra gund maye. Socin dibêje ku li vî gundî li dengbêjekî kurd rast hatiye û ji devê wî helbesteke dirêj qeyd kiriye[3], lê dengbêjî nikarîbû ji Socin re helbestê xweş şirove bike, ji ber ku xweş bi zimanê erebî nizanîbû û xelkên Alqoş jî xweş bi kurdî nizanîbûn da ku di wergerê da alîkariya wî bikin. Socin ji Alqoş derbasî Duhokê dibe û li wir keşeyekî kildanî yê bi navê Yûnān[4] nas dike; ev keşeyê ku bi kurdî jî zanîbû helbesta ku Socin li Alqoş berhev kiribû jê re şirove dike.

Piştre Socin ji Duhokê diçe Zaxoyê û li dêra Mar Yaqûb çend rojan dimîne[5]. Piştî çend rojan Socin biryar dide ku ji bo karê wî Zaxoyê cihekî baş e, loma li wir dimîne. Li gor agahîyên ku Socin dide ew bi tevahî sê hefteyan li Zaxoyê maye û Li wir li dengbêjekî kurd î kor rast tê ku jê re çend stranan bi zimanê suryanî dibêje. Lê piştre ji ber ku gelê Zaxoyê bahwer nedikir ku armanca wî berhevkarîya çîrok û stranan e, jê re astengî derxistin. Herweha dengbêjan, ji ber ku baş bi erebî nizanîbûn û ji tirsa ku Socin şiroveya berheman bi erebî ji wan bixwaze, jê re stran negotin. Socin dibêje ku dîse jî wî hinek dengbêj qayîl kirin da ku jê re bistirên, hin kesên derdorê jî jê re wergera stranên ku hatin gotin kirin. Socin ji dengbêjên ku jê re stran e behsa dengbêj Binhasê cihû dike ku bi kurdî û "fillehî" zanîbû û di nav gel da bi navê "rawî" (gotbêj) dihat naskirin. Socin dibêje ku rawî ango Binhas li nav êlên herêmên Botan û Hekarê digerîya û dengbêjekî navdar bû. Lê ji xeynî van agahîyan Socin tu agahîyên din nade û zelal nake gelo berhemên ku di cildê duyem da cih digrin ji devê Binhasê rawî girtine yan na. Wekî hemu xebatên kurdî yên kevin, Eugen Prym û Albert Socin berhemên ku berhev kirine bi tîpên Erebî nivîsîne. Lê ji ber ku li hemberî hinek tîpên bêdeng ên zimanê kurdî tîpên erebî tunene, wan rêbaza tîpguhêzîya ku di nav lêkolinerên ewropî yên ku li ser zimanên rojhilatî dixebitin bi kar anîne.

Agahî Derbarê Berheman de

Cildê yekem ji alî Eugen Pyrm û Albert Socin hatîye çapkirin. Di vî cildî da 13 çîrok û 17 stran cih girtine. Li gor mijar an naveroka wan, ji 17 stranan ji xeynî strana Casimo, stranên cildê yekem tevde yên evînê ne. Dudo ji van stranên evînê (Strana Ferho û ya Faris Axa û Brahîm Axa), ji yên din cuda ne, lewre di formata stranên şer da hatine gotin. Mînak li ser keça Brahîm Axa ku Faris Axa wê dixwaze û birayên wê dij derdikevin şer di navbera herdu malbatan derdikeve, çend kesan ji hev dikujin lê dawîyê keça Brahîm Axa ji Faris Axa re dimîne. Bi heman şêweyî Ferho keça Îskan Axa dixwaze, lê birayên wê dij derdikevin û di navbera wan da şer derdikeve, mêran ji hev dikujin di dawîyê da Ferho keça Îskan Axa ji xwe e têne. Di vî cildî da tenê strana Casimo zêmar e. Strana Casimo tekane berhema derbarê şînê da ango zêmar e ku di vê xebata keleporî ya Albert Socin û Eugen Pyrm da cih girtîye. Di çavkanîyên berhevkarî yên berdest da em li varyantê vê stranê rast nehatin. Ji naverokê tê famkirin ku dayîka Casimo pîrejinek e û Casimo ji alî du kesên bi navê Xoce Tomas û Hesen Beg ve tê kuştin. Bûyer li herêma navbera Zaxo û Cizîrê qewimîye; Casimo bi zordarî hatiye kuştin û dayîka wî ji

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

desthilatdaran xwestiye ku kujerên lawê wê bên cezakirin lê kesî bersiva wê nedaye. Di vî cildî da tenê destana Ezdîn Şêr heye.

Wekî sernavê berhemê jî diyar dike çîrok û stranên vî cildî li herêma Torê (Midyad) ango Tûrabdîn hatine berhevkirin û bi devoka vê herêmê hatine gotin. Ji alî naverok û mijarê ve çîrok balkêş in; hin ji wan di forma "serpêhatî" / "memorat" an da ne. Ji van stranên evînê ya Mihemedê Hena, ku derbarê evîna keça Şêxê Ewêna û Hena yê xaçperest da ye, ji ya Faris Axa balkêşir e.

Cildê duyem ji alî Albert Socin hatîye çapkirin û bi tevahî 21 berhem tê da hene. Ji wan dudo bênav 6 stranên evînê û 5 stranên şer in ku di formata destanî da hatine honandin. Destanên naskirî, wekî *Mem û Zîn, Yûsif û Zuleyxa, Zembîlfiroş* (du varyant)*, Cembelî, Restem* (du varyant)*, Dimdim*[6] û varyantek destana *Ezdîn Şêr*, di vî cildî da cih girtine. Ji xeynî van destanek evînî ya bi navê *Ferx û Sitîyê* jî di vî cildî da heye. Li gor agahîyê ber destê me, ev destan zêde ne naskirîye û varyantên wê yên berhevkirî/nivîsandî tunene. Varyantek vê destanê ji alî kurdolog û folklorzanê kurd Hecîyê Cindî ve bi navê *Ferxê û Stîya Ala* di destpêka sedsala XX-em da hatiye berhevkirin û di sala 1957an da berhema bi navê *Folklora Kurmancî*yê da hatiye çapkirin[7]. Her weha birayên Celîl jî di sala 1957an da ji devê çîrokbêjek ermen varyantek heman destanê bi navê *Stî û Ferxî* qeyd kirin e û di sala 1978an di berhema bi navê *Zargotina Kurda* da çap kirin e[8]. Herçiqas mijar û lehengên sereke yek bin jî her sê varyant ji hev cuda ne. Li vir ya balkêş ev e ku wekî hemû destanên kurdî ev her sê varyant li du erdnîgarîyên ji hev dûr hatine gotin û di demên cuda da hatine berhevkirin. Zimanzanê elman Oskar Mann jî varyantek heman destanê bi navê *Shekh Färkh û Khatûn Ästi* (Şêx Ferx û Xatûna Stî)[9] bi zaravayê soranî berhev kiriye. Her weha Sadiq Bahaeddin Amêdî varyantek vê destanê di sala "1972an da ji Seîdê Pîroy ji gundê Darhozanê bi ser Zaxo" berhev kirîye. Amêdî destan wekî *Çîroka Sitî û Ferxê* bi nav kiriye, (Amêdî, 2013, r. 52).

Sê destanên dînî jî di cildê duyem da hene. Dudo ji wan destanên bi nav û deng, *Newala Sîsebanê* û *Qewlê Hespê Reş* in. Varyantên van herdu destanan ji alî kesên wekî Feqîyê Teyran û Ehmedê Xanî ve hatine nivîsandin. Nusxeyek destana *Newala Sîsebanê* ku ji alî Feqîyê Teyran ve hatine nivîsandin, di koleksyona Alexandre Jaba cih girtîye. Kopyayek vê destanê di xebata keleporî ya berhevkar Sadiq Bahaeddîn Amêdî bi navê Folklora Kurdî da bi navê *Sîseban* cih girtîye. Berhevkar dibêje wî ev kopye "ji nivîsîna ku Muhsîn Salih 'Ebdul'ezîz di 05.02.1970 da ji destnivîseka bênav" girtîye, (Amêdî, h.b., r. 134). Li gorî agahîyên ku Jaba ji Mela Mehmûd Beyazîdî vediguhêzê Feqîyê Teyran destana *Qewlê Hespê Reş* (ku wekî hespê Hz. Muhammed tê qebûlkirin) jî bi helbestî" nivîsîye. (Jaba, 1860, r. 8). Folklorzan Ordîxan û Celîlê Celîl jî varyantên van herdu destanan ji kurdên Qafqasyayê berhev kirine û çap kirine[10].

Ya sêyem, ku bi navê *Cimcime Siltan/Siltan Cimcime* hatiye qeydkirin, derbarê rasthatina Îsa Pêxember li qoqê serî yê mirovek mirî da ye. Ev cara yekem e ku di berhemeke nivîskî da em li vê destanê rast tên. Tenê nêzîkî çil sal berya niha mirovek ji herêma Nisêbînê varyanteke kurt ya vê destanê carekê got û min jî lê guhdarî kir. Lê li gor agahîyên ku dîrokzan Farûk İsmaîl bi dest xistine, du destnivîs bi vî navî, bi zaravê Goranî, di nav Dstnivîsên Kurdî li Berlînê, yên ku Oskar Mann ji Kermanşah dane hev, hene[11]. Ev berhem ku helbestek di forma mesnewî da û li ser kerametên ('ecêbên) Îmam 'Ali yên ku li Babilê qoqek avêtî bi jiyan kir û pê re axivîye, di nav Şî'îyan da gelek

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

berbelav e. Di destanê da Îsa Pêxember pirsan ji qoq dike û qoq jî bersiva wî dide. Di dawîya vê cildê da helbestek Sîyapûş û yeke Elî ‘Herîrî jî cih girtîye. Ji agahîyên di pêşgotina cildê duyem da tê famkirin ku piranîya berhemên di vê cildî da ji alî Albert Socin li Zaxoyê hatine berhevkirin[12]. Berhemên di cildê duyem da bi zaraveyê Botan hatine nivîsandin. Ji xeynî destana *Mem û Zîn* ku hem pexşan û hem menzûm hatiye gotin, destanên din helbest ango menzûm in.

Nirxandin Berhemên Pexşan (Çîrok û Serpêhatî):

Ji alî honandina avahîsazîya çîrokan serkeftî ye, lê goman bi mirov re çêdibe ku vebêjer hin beşên çîrokan di dema gotinê da lê zêde kiribin[13]. Di çîrokan da peyivên argo û erotîk bi şêweya dubare hatine bikaranîn. Gelo çîrokbêj ev peyiv wekî bihîstine bi kar anîne yan wîna li çîrokan zêde kirine, em nizanin. Wekî em ê hewl bidin li jêrê destnîşan bikin, ji alî naverokê û hêman û karakter/lehengên derasayî ev çîrok pir dewlemend in. Hinek ji wan di formata çîrokên derasayî/fantastîk da hatine gotin. Hebûna mar wekî lehengê sereke di çîroka 2an û 10an da an jî lehenga keç ku li pêşberî mirovên din xwe dike meymûn herweha lehenga çîroka 13em ku keça teyrê Sîmir e lê wekî şah meymûn dema bedlê teyra ji xwe dike dibe mirov, sê mînakên çîrokên fantastîk in. Di xebata ansiklopedik ya brayên Celîl da çîrokek bi navê *Tîrem’er* ku leheng mar e û wekî Şah Meymûn li pêşberî mirovan mar e lê di rastîya xwe da xortekî lawîn e û yek bi navê *Xatûn Meymûn*[14] ku varyantek çîroka *Şah Meymûn* e cih girtine. Li jêrê em ê di bin du sernavan serpêhatî û çîrokên derasayî ango fantastîk ji alî cure û mijarê ve van berheman binirxênin.

a) Serpêhatî

Ji xeynî çîroka *Mêrik û Jina Wî* ku kurt e û derbarê sedaqeta navbera jin û mêr da ye, çîrokên din ku serpêhatî ne ji alî mijar û honandinê balkêş in. Naveroka wan derbarê têkilîyên mirovan da ne; di tevan da pêbahwerî, bêbextî, xayîntî, kuştin heye. Herweha di wan da pend hene, ango hişyarî didin mirov da ku karên çewt nekin, li dij pîvanên exlaqî yên civakê tev negerin. Mînak di çîroka *Mêrik û Jina Wî* da mêr bi jina xwe ne bahwer e û lê di şikê da ye ku wîna bixapêne. Piştî ku jin vê dibîne, bi mêrekî din wî dixapêne û piştre jê re dibêje ku ew xapand. Li ser vê mêrik diçe bajêr ji bo kar bike û hin dirav bi dest bixe. Li wir ew jî carek jina xwe dixapêne û jê re dibêje. Piştre herdu soz didin hev ku carek din hevdu nexapênin.

Çîroka *Wezîr* jî bi heman şêweyî hatîye honandin û di dawîyê da peyam ev e ku ger mirov li dijî îradeya Xweda derkeve, ew ê têk here. Lehengê sereke Wezîr xwedî du keç û du lawan e û digel dijderketina derdora wî ku jê re dibêjin ev yek li dijî îradeya Xweda ye, keç û lawên xwe li hev mahr dike. Piştre hem herdu lawê wî, hem ew dimire û kesên din herdu keçên wî û jina wî li xwe mahr dikin.

Serpêhatîya *Yûsif û Selîm* wekî çîrokên din, ji alî vegêran ve bi hostayî hatiye honandin û di çîrokê da peyamên girîng hene ku mirovan hişyar dikin da ku di têkilîyên bihevre da çewtîyan nekin û xwe ji tevgerên dijexlaqî dûr bikin. Çîrok derbarê hevaltîya van herdu kesan da ye ku li girtîgeha Amedê hev nas dikin. Ya balkêş ew e ku li ser şertgirtinê pêşî Selîm jina Yûsif jê distêne û dibe Mûsilê, paşê Yûsif diçe hem jina xwe hem ya Selîm direvêne û tê bajarê xwe Mêrdînê. Li ser vê Selîm tê Mêrdînê, mala Yûsif ku di girtîgehêde ye li Amedê, jina Yûsif û jina xwe dixapêne û wan carek din dibe

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Mûsilê. Di dawîya çîrokê da Selîm û jina xwe dimrin û, piştî ku ji girtîgehê derdikeve, Yûsif diçe Mûsilê jina xwe têne.

Çîroka *Yûsif Bajarî* derbarê serborîya keçekê da ye ku bavê wê ji ber feqîrîyê wê difroşe bazirganekî. Çîrok ji kirinên ku mirovên cuda cuda (xulam, bazirgan, wezîr) tênin serê vê keçikê pêk tê. Di dawîya çîrokê da keçik li wezîr tê mahrkirin bêyî daxwaza wê! Serpêhatîya dawî derbarê kurê jinebîyekê da ye. Wekî em zanin pirîn caran lehengê çîrokên kurdî xortekî sêwî, bav mirî ye û piştî gelek bûyerên ku tên serê wî û astengîyan lehengê xort digihe armanca xwe. Ev çîrok jî bi heman şêweyî hatiye honandin. Xort ji alî rêvbirên bajêr wekî paşa tê bijartin, lê piştre gelek bûyer tên serê wî û dawîyê digel hemû astengîyan serkeftî dibe û wekî paşayê bajêr dimîne. Di vê çîrokê da xala balkêş ew e ku yek kesên ku astengîyan ji paşa re derdixe hefrîtek e ku jina paşa bi zor li cem xwe digire, pê re dirazê, ji hefrît lawek ji jina paşa re çêdibê, lê paşê ev law ji alî paşa tê xwedîkirin û li ser daxwaza paşa diçe bavê xwe yî hefrît, ku tê êrîşî bajarê wan dike, dikuje.

b) Çîrokên xwedî hêmanên derasayî

Yek ji van çîrokan ya bi navê *Ferhat Axa* ye. Dayîka Ferhat Axa hîna bi heml e dimre, wê dixin tirbê. Di tirbê da Ferhat ji dayîk dibe. Piştî ku bavê wî jê haydar dibe, diçe wî ji tirbê derdixe û mezin dike. Ferhat di cihê bavê xwe da dibe axayek zilimkar. Gel serî li ber radike û ji welat derdixin. Ferhat diçe warek ku niştecih bi roj kêç in bi şev mirov in. Piştî gelek bûyer ku tên serê wî, Ferhat digel du jinên xwe vedigere welatê xwe. Çîrok weha bi dûmayî dibe: Du jin ji xwa re anîn, weka wa nîna. Herdû jin tevda bi hemil bûn, Xwedê du kurîk dayê, salik dî Xwedê du keçik dayê. Mezin bûn, li mal li hev mahrkirin. Xwedê mala wî zêde kir, bûn şêst nefs, li mal ji hev di zewicîn." (Prym & Socin, 1887, r. 3).

Çîroka *Mar û Kurê Wezîr* bi têkilîya navbera mirovekî xizan (feqîr) û marekî dest pê dike. Mar her roj zêrek ji mirovê xizan re tîne ta ku rojek lawê mirovê xizan dixwaze mar bikuje û zêran tevan ji qula mar derxe, lê bi ser nakeve û mar wî dikuje. Ev beşa pêşî ya vê çîrokê li herêma Mêrdînê tê zanîn. Di varyanta ku li herêma Mêrdînê tê gotin, mirov mar ji devê teyrekî xelas dike, beramberî vê qencîyê mar her roj zêrekî têne devê qula xwe û dide mirov, ta ku rojek lawê mirov tê û êrîşî mar dike ji bo bikuje û zêrê di qula wî da tevda derxe. Mar pê vedidê û dikujê, piştre bavê law tê êrîşî mar dike û dûvê wî jê dike lê mar nayê kuştin. Paşê mirov poşman dibe û ji mar lêborînê dixwazê û pêşniyaz dike wekî berê bibin dost lê mar dibêje "na", "here heta ku tirba lawê te pêşberî te be û dûvê minî qut li bîra min bê em nikarin carek din bibin dost". Lê di varyanta Pyrim û Socin da çîrok berdewam dike, lewre mar namire û dibe lehengê sereke yê çîrokê. Mînak xwe diguhere dibe derya û rê li ber bazirganekî digire, wekî derya bi bazirgan re xeber didê, baca rê jê dixwazê, bazirgan wekî bac barê hêstirek didiyê. Paşê derya dîse dibêje mar û baca xwe dibe şikefta xwe, vedike ku keçek tê da ye. Lawê wezîrê Qoçhesarê ku derketîye nêçîrê li mar û keçikê rast tê, bi wan re diçe şkeftê. Li şkeftê li keça Delû Mîrxanê Kîkî[15] rast tê û pê re di zewicê û herdu xwe ji destê mar rizgar dikin, direvin. Mar bi dû wan dikeve û keçikê direvêne. Lawê wezîr bi alîkarîya mîrê cinan jina xwe ji destê mar rizgar dike.

Heman hêmanên derasayî di çîroka *Marê Devê Kanîyê* da hene. Çîrok weha dest pê dike: Li gundekî kanîyek heye, gundî ava xwe jê diênin. Rojekê marek tê dikevê

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

devê kanîyê û nahêlê gundî avê ji xwe re bibin; ji wan re dibêje “Her roja înê keçikekê bidine min, ez bixwim, ez ê avê berdim” (Pyrim & Socin, 1887, r. 23). Her în keçikekê dixemilênin û ji mar re dibin. Rojek dor tê ser keça sultan, “ew xemilandin ji zîv û zêr, ew bi tenê çû devê kahnîyê”. Efrît li keça sultan digere; hat devê kahnîyê, keça sultan dî, rahişt keça sultan. “Mar dî efrît rahişt keçikê, mar bderket, hat efrît. Sultan û bajar difericin; efrît û mar şer dikin. Efrît şûr kişand û mar devê xwa vekir, rahişt lingê efrît, di devê xwa danî. Efrît şûrek li nîvê wî xist, kir du perçe. Keçik sax ji zikê mar bderketin” (Pyrim & Socin, h.b., r. 23).

Çîrokeke din ku bi hêmanên derasayî xemilandîye ya *Şah Meymûn* e. Wekî li jorê hate gotin Şah Meymûn li darî çavan meymûn e lê di rastiyê da jineke spehî (xweşik) e. Balkêş e ku hin caran leheng mêr be jî wekî çîroka *Tîremar* ku brayên Celîl berhev kirine leheng ango “tîrem’er” di rastiya xwe da xortekî çeleng û lihevhatî ye û wekî Xatûn Meymûn xwedî hêzên derasayî ye. Di hin çîrokên ku mijara vê xebatê ne da hirç wekî lehengê sereke ye; lê leheng her tim mê ye û mirovekî ciwan û çeleng dîl digire û wekî hevjînê xwe zorê lê dike ku pê re razê. Li herêma Mêrdînê ku Tûrabidîn beşek jê ye, di nav gel da çîrokên derbarê hirça ku mêran dîl digire û bi zor bi wan re dikeve têkilîya cinsî, an derbarê hevaltîya hirç û mirovan de, têne gotin. Di çîroka *Lawê Pîrebîyê* da bi heman şêweyî hirçeke mê, xortê ku şahê mara xezîneyek dabûyê bedêla marê ku xwedî kirîye, dixapêne bi mahneya ku ew ê jî xezîneyekê bidîyê û wî li cem xwe dîl digire. Piştre şêr tê wî ji destê hirçê rizgar dike, dibe cem xwe. Di berdewamîya çîrokê da lehengê xort rizgar dibe û bi keça şêr re dizewice, wê direvîne tê welatê xwe…

Çîroka *Herdu Xulamên Osman Beg û Keça Teyrê Sîmir* jî ji hêman û bûyerên derasayî pêk tê. Herdu birayên xulam keça teyrê Sîmir ku ji alî evd ve hatiye dîlkirin, rizgar dikin, paşê ji bo keçikê şer dikin û yek ji wan birayê xwe dikuje, keçikê li xwe mahr dike. Lê demek paşê dilê jina xwe dihêle, ew jî bedlê teyra li xwe dike û diçe welatê bavê xwe Deşta Helanê. Dema leheng têdighêje ku jina wî winda bûye, dest pê dike lê digere, li teyrekî rast tê, teyr wî li ser pişta xwe dideyne û dibe Deşta Helanê. Leheng li wir diçê mala teyrê Sîmir, jina wî leheng nas dike, dibêje dayîka xwe ku ev mêrê wê ye. Bavê wê qebûl dike ku leheng jina xwe bibe û here. Wekî em dibînin di vê çîrokê da jî wekî yên din hêman û karakterên derasayî, (evd, teyrê sîmir, keça wî ku hem dibê teyr hem jin, tevgera teyrê din ku leheng li ser pişta xwe dike dibe deşta helanê, welatê teyrê Sîmir) hene û digel lehengên mirov tevdigerin.

Bi gotineke din, hem leheng hem bûyerên van çîrokan tev derasa ango fantastîk in. Di gelek çîrokên kurdî yên derasayî da lehengên derasayî wekî dêw / dêwê heft serî, hefrît, cin / mîrê cina, hene ku hinek ji wan alîkarê lehengên mirovan in û hinek ji wan dijber in ango astengîyan ji lehengan re derdixin, li hember wan şer dikin. Di van çîrokên Prym û Socin da jî bi piranî mar, hirç û şêr wekî lehengê sereke carna wekî parêzer û carnan jî dijberê / dijminê lehengê mirovan tevdigerin.

Nirxandin Berhemên Helbestî û Destanî:

Wekî çîrokan, çi berhemên stranî çi berhemên destanî, bi awayekî serkeftî hatine gotin. Dengbêjan sahneyên şer yên van berheman pir bi hûrgulî pêşkêş kirine û hewl daye ku kesên amade bi coş lê guhdarî bikin. Heman rêbaz ji bo stranên evînê jî hatiye bikaranîn, bi taybetî dema evîndar hestên xwe pêşkêş dike an teswîra xweşikbûna (qeşengî) evîndara/ê xwe dike.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

a) Stranên Evînê

Ji stranên evînê ya *Mihemedê Hena*,[16] ku di cildê yekem da cih girtîye, ji tevan balkêştir e, lewre derbarê serborîya keça şêxê Ewêna[17] ku dil dikeve Mihemedê Hena da ye. Mihemedê Hena wekî berhevkarê bacê li ser navê metranê dêra Zaferanê diçe Ewêna. Li wir Medo keça şêx wî dibîne dil dikevîyê, ew red dike lê keçik dev jê bernade. Gelek sergêjî ji Mihemedê Hena re çêdibin lê di encamê da ew û keça şêx dimînin jin û mêrê hevdu. Ji mînakên ku di rabirdûwê da qewimîne û em dizanin bi gelemperî li herêmên ku suryanî û kurdên misilman digel hev dijîn mêrên misilman bi keçên xaçperest re dizewicin, heta pirîn caran xortên misilman keçên xaçperest revandine. Ev cara yekem e ku em li mînakek berovajî rast tên[18]…

Stranek evînê ya bi navê *Mêremê* ku di cildê yekem da ye wekî strana *Mihemedê Hena* balkêş e, bi taybetî ji alî teswîra hestên evîndaran ve. Ji rista “ji dêrê heta bdêrê” diyar dibe ku Mêremê xaçperest e. Di dirêjahîya stranê da bi mubalexa hatiye teswîrkirin bê çawa Mêrêmê tevgerîya ye da ku “sayîya delalê” xwe, ku “bi qasî bîst perek lewitî” bû di avê da bişo. Ji bo vêna Mêremê diçe Diyarbekirê, “li ber keleha Heskîfê dibûrê”, ji wir diçe Ridwanê (gundê Batmanê), derbasî Slîva dibe; bi ava wir ne razî ye ku sayîyê delalê xwe têd e bişo. Ji wir diçe Stewrê (navçeya Mêrdînê), ji wir diçe ser çemê Mûradê, lê ava çemê Mûradê ne li gor dilê Mêremê ye, loma ji wir vedigere Mêrdînê, gundê ‘Eyncewzê. Li wir jî sayîyê delalê xwe naşo, derbasî ser ava Nisêbînê dibe, li wir sayîyê delalê xwe dişo.

Di edebiyata devkî ya kurdî da gelek stranên evînê hene ku derbarê nakokîyên navbera du malbatan da ne. Bi gelemperî ji ber ku malbata keçikê naxwaze ew bi hezkiryê xwe re bizewice, şer di navbera herdu malbatan da derdikeve, di vî şerî da mêr têne kuştin. Strana *Ferho* ku di cildê yekem da ye mînakek weha ye. Ferho diçe Xecko keça Îskan Axa dixwaze lê Îskan Axa keça xwe li xulamê xwe Çeto mahr dike. Ferho diçe Çeto dikuje û Xecko bi zorê direvîne. Li ser vê şer di navbera malbata Ferho û ya Xecko da derdikeve, çend meran ji hev dikujin lê di encamê da Xecko ji Ferho re dimîne.

b) Stranên Şer

Wekî me li jor destnîşan kirîye di xebata Prym û Socin da şeş stranên şer hene. Ji wan tenê strana *Osê Zerî* ku di cildê yekem da ye bi zarava Tûr’abidîn e; her pênc stranên din bi zarava botan in, lê tevde di forma destanan da hatine gotin. Her şeş jî derbarê nakokî û berberî (berevanî) yên navbera serokeşîran da ne. Ji wan strana *Osê Zerî* û ya *Ehmedê Şeng* helbestî ne. Strana Osê Zerî derbarê şerê navbera malbata Osê Zerî û Xanê Bidlîsê ku li ser zozan derketîye: Malbata Osê Zerî pezê xwe tênin zozanê Xanê Bidlîsê, ji wa tê xwestin ku ji zozan derkevin, lê qebûl nakin. Li ser vê şer dikin û gelek mêran ji hev dikujin. Dengbêj Miradê Kinê jî varyanteke vê stranê gotîye[19]. Mijar, bûyer, cîhê bûyerê û lehengên stranê di herdu varyantan da wekî hev in[20]. Miradê Kinê vê stranê carna pexşan carna bi stran dibêjê, berovajî varyanta Albert Socin ku bi tevahî helbestî ye. Her weha qewimîna bûyeran jî ji hev cuda ne, lê di varyanta Miradê Kinê da jî nakokî li ser zozanê Xanê Bidlîsê ye ku malbata Osê Zerî hatiye li serê danîye.

Strana *Ehmedê Şeng* jî derbarê şer da ye: şerê navbera eşîra Gêsa û eşîra Ehmedê Şeng. Taybetmendîyek strana Ehmedê Şeng ew e ku di vê stranê da formul[21] bi awayekî zîrek hatiye bikaranîn. Mînak ji bo hêza derasayî ya leheng Ehmedê Şeng teswîr bike, dengbêj formula jêrîn sê caran bi kar anîye:

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆلینێن کوردی

Li ser rikêba leylikê wê rabûye
Wekî rima hêzeranî hejandîye
Ser û binê vêkre gihandîye
Rim nêv guhê leylikê da danîye
Sibhan e ji 'ezameta Xudê, mînayî birûska biharê li 'erdê wê rijîye
Li çar rexê eskerê Gêsa gerîya
Eskerê Gêsa bi hev da şidandîye
Xwe li koma 'eskerê Gêsa wê dayîye ji rexê zozanî
Li berîyê re derketîye
Ji qewlê qahêlî dibêjin bîst[22] siwar jê avêtîye

c) Destan

Piranîya destanan bi helbestî hatine gotin. Tenê çar ji wan (*Rostem I* û II, *Mem û Zîn, Ferxê û Sittî*) hem pexşan hem helbestî hatine gotin. Girîng e ku bête gotin ku di piranîya destanên ku mijara vê xebatê ne formul nehatine bikaranîn. Tenê di destana *Evdal Omer* û ya *Cimcime Sultan* ku helbestî ne formul hatine bikar anîn. Mînak, ji bo hêza Evdal Omer lehengê destanê diyar bike dengbêj formuleke weha bi kar anîye:

"Evdal mîrek temam e
'Eskerî xas û 'am e
Xudba wê birî Şam e"[23]

Formula di *Cimcime Siltan* da jî weha ye:
Ya Îsa bi wî dikim ê rehman e
Bi Xaliqê li erdan û ezman e
Ez bûm cimcima siltan e[24]

Çi bexşan û helbestî çi tenê helbestî bin, ji naveroka destanan diyar dibe ku vebêjer / dengbêjê wan xwedî huner e û di bikaranîna teswîr û ziman da jî hosta ye. Mînak di destana *Rustem I* da xwe amadekirina Rustem weha hatiye teswîrkirin:

"Subehî rabû, seharê rabû rexşê belekî kêşa derê, daxe li çil û çar mextera 'horî, lrexşê belek wepalişîn, mehes kir, gelweşîn kir, zînî mirosa ser piştêra kuta, teng û beltengê wi şidandin. Rikêbêt altozî pêve kirin. Şeş gazî çingale ber qelpûza zînî rakirin, qebûrê tîra ber qelpûza zînî rakirin. Lixavê zêrî da ser, gulfig qoteg jê berdan, gihmî û dukar tê deynan. Rostam rabû jpêva bejn û bala xwa wê fekirî, hev zerî, hev kumzerî ser êkûdû wergirtin, beşn û beyan avêt serê xwa, qeftek tîra ber pişta xwa rakirin, kemera xîretê avêt pişta xwa, bazbendê xêrê avêt milê xwa, hingustîra fet'hî kira tiliha xwa, îna keşarî bstoyê xwada kêşa, elmasê hindî avêt pişta xwa, metalê pîlayî avêt paşpîlê xwa, çekmanê zer pê xwada kêşa, qotya serêdûkî mel'hemê slêmanî avêta delxanêda, pê xwa bi rikêbê deynat, destê rastê avêt gurzê giran, hezar û êk xunkarî, destê çepê avêt rima hijde gaz, dêna ser milê xwa." (Prym & Socin, 1890, r. 95)

Çawa ku mirov dibîne vebêjer / dengbêj li vir taswîrek derasayî kirîye. Çiqas bi hêz be jî gelo pêkan e ku mirovek karibe ewqas çek û sîleh li ser xwe hilgire? Bê gûman ev di jiyana rasteqîn da ne pêkan e. Lê dema mijar lehengê destanê ye, tu kes vê pirsîyarê nake û bi gotina gelêrî vebêjer "li derewê naqelibêne" ango jê re nabêje "te çiqas derew kir". Heman teswîra derasayî ya Rostem di varyanta duyem da jî tê kirin, dema vebêjer dibêje bê çawa hespê Rostem, Rexşê Belek, ji bahrê derketîye û dûre ew û Rostem bi hev re ketine berxwedanê û ji sibehî ta piştî nîvro li ber hev didin lê yek

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

zora yê dî nabe, ta ku Rostem dibê “ez Rostemê Zal im” û dema hesp dengê wî dike xwe teslîmî dibe. Bi heman şêweyî careke din amadekirina hesp bi derasayî tê taswîrkirin: Rostem lê siwar dibe û diçe şerê “kafirê Tûranê” û wî dikuje. Piştre “Rostem li ser peya bû, herdu guhêd vî kafirî jê kirin, danîn ser pişta rexşê. Rostam vegera hate mal. Îranî hatin pêşva, xeza lê pîroz kirin. Zîn li ser serê wî reşandin. Rostam guhik bir dîwana Keyxusra Paşa. *Pazde fêris rûniştin ser, qasî ma'hfûrek ji ber wan zêde bû*.” (Prym & Socin, 1890, r. 108). Ger guhek ji yên kafirê Tûranê evqas gewre bê, gelo bedena wî çendî ye? Ya rast mubalexeya ku derbarê gewreyî ya kafirê Tûranê hatîye kirin ji bo hêza derasayî bê hempa ya Rostem bête destnîşankirin.

Ev hostayî û huner di teswîra lehengên stranên şeran da jî xwe dide der. Mînak lehengîya Osê Zerî weha hatîye taswîrkirin: Piştî ku li dîwana Xanê Bidlîsê apê wî Mîrz Axa tê kuştin, Osê êrîşî kesên dîwanê dike, bîst û heft kesan ji wan dikuje, diraje termê apê xwe û diçe li hespê xwe swar dibe, dikeve rê; di rê da li kemînê rast tê, ji lingê xwe birîndar dibe lê dîse jî hêza xwe winda nake û sih zilamên din dikujê (Prym & Socin, 1887, rr. 36-37). Bi heman şêweyî maldarî (dewlemendî) ya Ferho weha hatîye taswîrkirin. Da ku balê bikşênê ser vê maldarîyê dengbêj çûna Ferho ji bo xwazgînîya keça Îskan Axa Xecko, weha taswîr dike:

> “Çar qantira pere bar kirîya;
> Bsahrîyê dane rê, ketîya
> Li mala Îskan Axa danîya
> Go, Ferho hal û hewalê ta çiya?
> Go, mi çar bar pere anîya
> Ji boyî Xecko ji boy xwazgînîya
> Dibê Xecko qebûl nekirîya”, (Prym & Socin, 1887, r. 39).

Herçiqas wekî me li jor destnîşan kir, nivîskaran derbarê dengbêjan da zêde agahî nedabin jî, ji van teswîran ên sahneyên şer û yên destana Rostem diyar dibe ku heman kesî / kesan ev stranên şer û destanên cildê duyem navborî gotine. Diyar e ku dengbêj an dengbêjên van berheman, wekî hemû dengbêjan, pir girîngî dane taswîra sahneyên şer, lehengî û hêza bedenî û aborî ya lehengan. Ji alî taswîra sahneyên şer ve, destan û stranên şer yên di cildê duyem da pir dişibin destana *İliyada*ya Homeros. Wekî em dizanin, taybetmendîya herî bingehîn ya *Îlîyada* taswîra hostayî ya sahneyên şer û lehengîya lehengan in. Bê gûman ev hostayî û şiyankarîya dengbêjîyê di piranîya afirandin û îcrakirina berhemên destanî yên kurdî da xwe dide der, lê ji ber sînordarkirina xebatê bi berhemên xabata Prym û Socin me mînak ji destanên din nedan. Gelek berhemên destanî yên zargotina kurda hene ku lêkolînên berfireh dikarin li ser wan bên kirin. Bi hêvîya ku di pêşerojê da ev kiryarî bi encam bibe.

Encam:

Ji nirxandin û analîza berhemên di xebata keleporî ya Pyrim û Socin sê xalên balkêş derdikevin pêş: yek jê struktur ango avahîsazîya çîrokên derasayî gelêrî û berhemên destanî yên kurdî ye. Wekî li jor hate destnîşankirin, hem ji alî leheng û kiryarên wan ve hem ji alî qewimîna bûyeran ve çîrokên di vê xebata keleporî da cih girtine bi hêmanên derasayî dagirtî ne. Heta mirov dikare bibêje ku avahîsazîya wan li ser van bûyer û hêmanên derasayî hatiye sazkirin. Ger ev hêman û bûyer bêtin derxistin, ji çîrokê tiştek namîne. Wekî ji mînakên ku ji çavkanîyên din hatin dayîn jî diyar e heman leheng, kiryar û hêmanên derasayî di gelek çîrokên kurdî da hene. Herweha di van çîrokan da bi gelemperî lehengên wekî mar,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

hirç, şêr, efrît, teyrê sîmir, hwd. digel lehengên mirov (ku xwedî kiryar û hêzên derasayî ne) da tevdigerin; carinan wek dijberên wan carnan wek alîkar û hevalbendên wan.

Herçiqas di berhemên destanî da jî heman hêman û kiryarên derasayî hebin jî berovajî çîrokan di van berheman da leheng û karakterên lawir (heywan) an efsûnî (efrît, cin) tunene. Dibe ku di hinekdan da hebe lê ne di berhemên kelepora Pryim û Socin da ne di mînakên ku berdestê me da em lê rast nehatin. Berovajî çîrokan berhemên destanî ji alî taswîrên derbarê lenheng, maldarî û kiryarên wî yên derasayî pir dewlemend in. Ji çend mînakên ku li jor hatine dayîn jî ev yek xuya dike. Bêgûman çîrokên derasayî gelêrî çi berhemên destanî yên kurdî ji gelek hêlan ve (wekî hevok sazî, bikaranîna rengdêran, erdnîgarî, têkilîyên mirovantîyê bi taybetî û têkilîyên civakî bi gelemperî) dikarin bibin mijarên lêkolînên pir berfireh. Ev bar jî li ser mile pisporên sehayên navborî dimîne; bi hêvîya ku di pêşerojê da xebatên derbarê van berhemên zargotina kurdî da ji alî van pisporan ve bêne kirin.

ÇAVKANÎ:

Amêdî S. B., 2013, *Folklora Kurdî*, Lîs Diyarbakir.

Aslan M. E., 2019, *Hostayê Ribabê Miradê Kinê û Analîza Şerê Wî Yê Bi Navê Osê Zerî* (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî), Zanîngeha Van Yuzuncuyil.

Celîl O. & Celîl C., 1978, *Zargotina Kurda, Para I*, Neşirxana Naûka, Moskva.

Celîl O. & Celîl C., 2015, *Zargotina Kurda: Çîrok, Çîvanok*, Benda 9, Înstîtûta Kurdzanîyê, Wien.

Cindî H., 2016, *Folklora Kurmancîyê (Berevok)*, Lîs: Diyarbakır.

Jaba A., 1860), *Recueil da Notices et Récits Kourdes, servant à la connaissance da la langue, da la littérature et des tribus du Kourdistan* St. Petersbourg.

Mann O., 1906, *Die Mundart Der Mukri-Kurden*, Druck Und Verlag. Von Georg Reimer, Berlin.

Parry, M., 1971, *The Making of Homeric Verse. The Collected Papers of Milman Parry* (ed. Parry Adam), Oxford: Clarendon Press.

Prym E. & Socin A., 1887, *Kurdische Sammlungen*, St. Petersbourg.

Prym E. & Socin A., 1890, *Kurdische Sammlungen*, St. Petersbourg.

Pêvek:

Pêvek I: Berga cildê yekem ya xebata Eugen Pyrim û Albert Socin

KURDISCHE SAMMLUNGEN.

ERSTE ABTEILUNG.

ERZÄHLUNGEN UND LIEDER

IM DIALEKTE DES ṬÛR 'ABDÎN.

GESAMMELT, HERAUSGEGEBEN UND ÜBERSETZT

VON

EUGEN PRYM UND ALBERT SOCIN.

a. DIE TEXTE.

ST.-PÉTERSBOURG, 1887.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Pêvek II: Berga cildê duyem ya xebata Eugen Pyrim û Albert Socin

KURDISCHE SAMMLUNGEN.

ZWEITE ABTEILUNG.

ERZAHLUNGEN UND LIEDER

IM DIALEKTE VON BOHTAN.

GESAMMELT, HERAUSGEGEBEN UND ÜBERSETZT

VON

ALBERT SOCIN.

a. DIE TEXTE.

ST.-PÉTERSBOURG, 1890.

MM. Eggers et C^ie et J. Glasounof; M. N. Kymmel; Voss' Sortiment (G. Haessel)

Pêvek III. Ji xeynî kesên di lîsteya çavkanîyan da cih girtine çend lêkolînerên navdar ku derbarê zargotina kurdan da berhevkarî kirine

Haykûnî, S., 1904, *Destanên Ermenî-Kurdî* Moskva.

Justi F., 1878, *Les noms d'animaux en Kurde*, Paris.

Le coq von A., 1903, *Kurdische Texte: Kurmangi-Erzahlungen und Lieder*, Zweiter Teil, Berlin

Lerch P. I., 1857, *Forschungen uber die Kurden und die Iranischen Nord-Chladaer*, St. Ptersbourg

Makas, H., 1900, *Kurdische Texte im Kurmanji Dialekte aus der Gegend von Mardin*, Heidelberg.

Orbeli I. A. 1982, *Folklor î Bit Moksa* (Folklor û Jiyîn li Muksiyê)[25] Moskva.

Perawêz:

---

1 Ji bo berhemên van kesan bnr. Pêvek I.

2 Wekî tê zanîn kurdên misilman ji xaperestên suryan û ermen re dibêjin “filleh”.

3 Berhema 27an ev helbest e ku varyantek destana *Kelha Dimdim* e.

4 Di metnê resen da (r. XVI) Yûnan hatiye nivîsandin, lê bi bahweriya me ya rast Yûhane

5 Di jêrenotên rûpelên 272 û 273an yên cildê duyem da Albert Socin dibêje ku wî du stranên nav nediyar (39 û 40) li vê dêrê berhev kirine. Di herdu stranan da jî behsa derdora Nisêbînê û Mêrdînê tê kirin. Lê dêra ku Socin bahs dike ne Dêr Mar Yaqûba ku li gundê Telesseqif/ Tisqûya, 30 km li bakurî Musilê dimînê û dikeve navbera Elqoşê û Telkêfê da heye.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

[6] Varyantek din ya vê destanê bi navê Evdal Omer (33) di vî cildî cih girtî ye.

[7] Bnr. Cindî H., 2016, *Folklora Kurmancîyê (Berevok)*, Lîs: Diyarbakır, rr. 115-138.

[8] Bnr. Celîl O. & Celîl C., 1978, *Zargotina Kurda, Para I*, Neşirxana Naûka, Moskva, rr. 203-213.

[9] Bnr Mann O. 1906, *Die Mundart Der Mukri-Kurden*, Druck Und Verlag. Von Georg Reimer, Berlin, rr. 136-192.

[10] Bnr. Celîl C. 2004, Keşkûla Kurmancî, Wien, rr. 265-301.

[11] 1- Ms.or.oct 1153: Navê nivîskar tune, Daner: Ni'matullāh, di 1. Ša'bān 1313 h. / 16. Jan. 1896 de, 6 rûpel e; 2- Ms.or.oct 1179. Nivîskar: Malla Nūr-'Alī Kandūlayī. Navê Daner tune, sala 1318 h. / 1900-1901, li Kermanşahê, ji ber nusxeyek Orîjînal, ji sala 1250 h. / 1834-1835, hatiye nivîsîn û 16 rûpel e. Ez spasîya Mamoste Prof. Dr. Farûk Îsmail dikim ku ev agahî dane min.

[12] Berhemên ku Socin li Zaxo berhev kirin e evin: 26. Hespê Reş, 27. Cimcime Siltan, 30. Boz Beg, 31. Heme Teyar, 33. Evdal Omer, 34. Ezdîn Şêr, 35. Kakeyî Efendî, 36. Xezalê, 37. Cembeli, 42. Beyta Bilbil, 43. Sîyapûş û 44. Elî Herîrî

[13] Ji xwe nivîskar bi xwe balê dikşênin ser vê xalê. Mînak dibêjin ku dengbêj Cano (Schano) ku navdartirîn dengbêjê Torê ku wan balpiştî pê dikir, deq diguhertin û xweşik nizanîbû ji ber bistra (Prym E. & Socin A., 1890, r. XIX.

[14] Bnr. Celîl O. & Celîl C., 2015, Zargotina Kurda: Çîrok, Çîvanok, Cild. 9, Înstîtûta Kurdzanîyê, Wien, rr. 226-244; 461-466.

[15] Delû Mîrxanê Kîkî yek ji lehengê strana şer ya Boz Beg e ku di cildê duyem da cih girtîye.

[16] Ev stran du varyantin: yek jê bê nav e û hem bexşan hem helbestî ye, ya duyem bi sernavê Mihemedê Hena ye tenê beşan e.

[17] Ewêna di roja me da bajorkek bi Mêrdînê ve ye, bi 30 km dikeve bakurî bajêr.

[18] Di pêşgotina xebata xwe da Socin dibêje ku wî kesek suryan bi navê Canê li Şamê nas kirîye û Cano gelek stran, çîrok û berhemên din yên zargotina kurdî jêre gotine. Gelo stranbêjê Cano ye ku ji Socîn re ev stran gotîye, ne diyar e, lewre di berhemê da agahî derbarê vê mijarê da ne hatine dayîn.

[19] Bnr. Aslan M. E., 2019, *Hostayê Ribabê Miradê Kinê û Analîza Şerê Wî Yê Bi Navê Osê Zerî* (Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî), Zanîngeha Van Yuzuncuyil.

[20] Ji xeynî navê apê Osê Zerî ku di varyanta Albert Socin da navê wî Mîrz Axa ye, di ya Miradê Kinê da Mihemed Axa ye.

[21] Formul yek ji taybetmendîyên destanan e. Li gor pisporê Homeros Milman Parry formul "ji bo îfadekirina fikreke/ramaneke bingehîn bikaranîna komeke peyv di bin heman mercên metrîk de." (Parry, 1971, r. XXXII).

[22] Ev formul sê cara hatiye dubare kirin, tenê jimare tê guhertin, pêşî bîst û şêş, piştre bîst û pênc û cara sêyem dibe bîst.

[23] Ev formul di drêjayîya destanê da gelek caran hatiye dubare kirin, bnr. Prym & Socin, 1890, rr.234-239.

[24] Ev formul jî wekî ya jorîn di drêjayîya destanê da gelek caran hatiye dubare kirin, bnr. Prym & Socin, 1890, rr. 174-180

[25] Ev xebat ji agahîyên ku Orbeli di salên 1911-1912an da li navçeya Muksê ya Bidlîs berhevkirine pêk tê. Weşanxaneya Nûbihar xebat bi navê Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane di 2011an da çap kirîye.

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

EUGEN PRYM VE ALBERT SOCİN'İN DERLEME ÇALIŞMASININ DEĞERLENDİRME VE ANALİZİ

Özet:

Eldeki bilgilere göre XIX. yüzyılın ikinci yarısından XX. yüzyılın birinci yarısının sonuna kadar yabancı gezgin ve araştırmacılar tarafından Kürt sözlü edebiyatıyla ilgili birçok derleme çalışması gerçekleştirilmiştir. Bu çalışmalardan biri de alman dilbilimciler Eugen Prym ve Albert Socin'in iki ciltten oluşan "Kurdische Sammlungen" adlı çalışmadır.

13 Hikaye, 16 aşk şarkısı, 25 destan ve kahramanlık şarkıları, Siyahpuş'un bir şiiri ile Elî Heriri'nin bir şiirinden oluşan adı geçen eser bu çalışmanın konusudur. Çalışma üç bölümden oluşmaktadır: birinci bölümde yazarlar ve derleme yöntemleri hakkında bilgi verilmektedir. Bu bağlamda Albert Socin'in söz konusu eserlerin derlemesi için yaptığı yolculuğu üzerinde da durulmaktadır. Bu bölümün devamı olarak her iki ciltte yer alan eserler hakkında genel bilgiler verilmektir.

İki alt başlıktan oluşan ikinci bölümde adı geçen çalışmada yer alan hîkayeler üzerinde durularak, hikâyeler içerik ve strüktür açıdan analiz edilmektedir. Birinci altbölümde olaylar zinciri ve hikâye kahramanlarının yaşadıkları analiz edilmiştir. İkinci altbölümde anlatıcı tarafından tasvir edilen bazı hikâye kahramanları ve özellikleri üzerinde durulmuştur. Bu çerçevede hikâyelerdeki olağanüstü unsurlar ele alınmış ve analiz edilmiştir. Üçüncü bölümde çalışmadaki bazı destan ve kahramanlık şarkıları ele alınıp analiz edilmiştir. Özellikle ozanların destan kahramanları ve yaptıkları konusunda yaptıkları tasvirler üzerinde durulmuştur. Araştırmanın konusu olan çalışmada yer alan eserlerin ele alınıp analiz edilmesiyle Kürt sözlü kültürünün zenginliği ve estetik güzelliğine dikkat çekilmeye çalışılmıştır.

Anahtar Kelimler: *Eugen Prym, Albert Socin, Hikâye, Serüven, Destan, Kürt Sözlü Edebiyatı*

EVALUATION AND ANALYSIS OF EUGEN PRYM AND ALBERT SOCIN'S COMPILATION WORK

Abstract:

According to the available information, from the second half of the XIX century to the end of the first half of the XX century, many compilation studies on Kurdish oral literature were carried out by foreign travelers and researchers. One of these studies is the two-volume named "Kurdische Sammlungen" by German linguists Eugen Prym and Albert Socin.

The work in question, which consists of 13 stories, 16 love songs, 25 epic and heroic songs, a poem by Siyahpuş and a poem by Elî Heriri, is the subject of this study. The study consists of three parts: in the first part, information about the authors and

their compilation method is given. Related to this, the journey of Albert Socin for compiling the work in question is also discussed. As a continuation of this section, general information about the works in both volumes is given.

In the second part, which consists of two sub-titles, the stories in the aforementioned study are analyzed in terms of content and structure. In the first subsection, the chain of events and the lives of the heroes were analyzed. In the second subsection, some of the story heroes and their characteristics depicted by the narrator are analyzed. In this context, the extraordinary elements in the stories were discussed. In the third chapter, some epic and heroic songs in the study were discussed and analyzed. In particular, the depictions of the poets about the heroes of the epic and heroic songs and their deeds were emphasized. It has been tried to draw attention to the richness and aesthetic beauty of Kurdish oral literature by examining and analyzing the aforementioned study, which is the subject of this research.

Key Words: *Eugen Prym, Albert Socin, Story, Adventure, Kurdish Oral Literature.*

هەوالنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Nîşaneyên Êzdîtîyê û hêmanên folklorîk di Romanên Wezîrê Eşo da

Bahar ENÇ/Turkîya
Serhat KAYA/Turkîya

PUXTE:

Kurdên Êzidî ên Kafkasyayê di demên berê da niştecihên Kafkasyayê ne û hê jî li wir dimînin. Bi demê ra Kurdên Êzdî heya niha bi gelek zor û zehmetîyan ra rû bi rû mane. Herwiha Kurdên Êzdî ên li Kafkasyayê jî tanga xwe da edebîyatek afirandine û xwe pêş da birine. Êwra Kafkasyayê bê guman ji bo pêşdaçûnê cihekî grîng e. Wisa ku literatura Kurdî li wir bi saya Kurdên Êzîdî pêş da çûye û bawerî û edetên xwe bi berheman raxistine ber Çavan. Yek ji berhemdarê Kurd ê Êzidî Wezîrê Eşo ye ku di hersê romanê xwe da gelek cih daye bawerî û edetên Êzdîyan.Her wiha Wezîrê Eşo ji alîyê bikaranîna hêmanên folklorîk nivîskarekî serkeftî ye ku romanên xwe bi şêweyekî folklorîk honandîye.

Ev xebat di wê armancê da ye ku nîşaneyên Êzdîyatîyê û hêmanên folklorîk ên di romanên Wezîrê Eşo da bipeyîtîne. Berî ku nîşane bêtin peyîtandin li ser ola Êzidîyan û folklorê hin agahî hatin dayîn. Pê ra jî jîyana nivîskar û berhemên wî bi kurtî hate nivîsîn.

Peyvên Serekî: *Nîşaneyên Êzdîtî, Hêmanên Folklorîk, Wezîrê Eşo, Kafkasya.*

DESTPÊK:

Ji ber sedemên polîtîk, etnîk, dînî û hwd gelek caran Kurdên serhedê ji axa xwe hate dûrxistin û sirgun kirin. Dema mirov bi wêjeya wê û bi bûyerên wê ên polîtîk Êwra Kafkasyayê dimêzîne dikare bipeyîtîne ku çetînî li ser Kurdên wê derê gelek cara hasil bûye û Kurdên li wê derê gelek di wan çetînîyan da gevizîne. Piştî ku gelek caran koçberî para wan dikeve çiraya teselebûne ji bo wan jî pê dikeve û bi avabûya welatê Sovyetê hemû çînên li wê derê dijîn bêhneke fireh hildiçînin û piçekî rûyê rihetîyê dibînin. Sovyet ji bo mafên mirovan û bi taybetî ji bo çînên bindest cihekî 'xêra Xwedê' bû. Wisa ku hemû mafên mirovahî hat dayînê, pîleya perwerdehîyê bilind bû û hemû çîn bi zar û zimanê xwe 'xwe'bûna xwe bi dest xistin. Her çiqas avabûna Sovyetê bû derfeteke mezin ji bo pêşdaçûna lîteratûra Kurdî jî hin zor û zehmetî jî bi xwe ra anîn. Sosyalîzma ku hat, pergala axa û begtîyê, şêx û pîrtîyê ji binî va rakir. Di vê oxirê da gelek mirovên qenc ji ber dewlemendbûna xwe hatin sirgunkirin û mohra îxanetê li wan ket. Ne tenê hêla feodalîzmê an jî hêla ekonomîyê rûdanên nû pêk hatin. Wisa ku şûrê wêjeya Sovyetê bû terza realîzma sosyalîst û ev terz ji alîyên pêşengên Rûs ên wekî Karl Marx hatibûn amadekirin. Ev terz di nav Kurdan da jî bi mecbûrî hate bikaranîn ku gelek berhemdarên Kurd bi Sosyalîzmê û bi vê terzê va girêdayî bû. Bi vî Awayî yekem roman ji alîyê Ereb Şemo va hate nivîsîn û berhemên Kurdî dan pey hevdu û hatin. Gelek berhemdar an jî helbestvanê Kurd ên Kavkasyayê ji ber ku pesnê Sosyalîzmê nedan û rexne kirin hatin cezakirin û sirgunkirin. Helbet di nav berhemdarên Kurd ên Kafkasyayê

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

da yên ku ji bilî pesnê rexne li Sosyalîzmê dikirin hebûn. Yek ji van jî Wezîrê Eşo ye ku di romana xwe a bi navê Tosinê Ûşan û Qirmeyê da gelek vê pergalê bi devê karakteran rexne kirîye.

Kurdên ku li Kafkasyayê dijîn û ên ku li wir wêjeya Kurdî pêş da birin gelemperî Kurdên Êzidî ne. Ji ber sedemên dînî xwendina Kurdên li wir jî gelekî derengî ketîye û haylo piştî berbelavbûna Sosyalîzmê hinekî pêş da çûye. Jixwe hin kesên wek Ereb Şemo û Hecîyê Cindî yekem xwendekarên Kurd ên êtîm in ku pêşî ew xwe bi wêjeya Kurdî ra digihînin. Mirov ger li ser berhemên Kurdî ên Kafkasyayê gelemperî raweste karakterên di romanan da belengazin û li gor bûyerên romanan bi saya Sosyalîzmê rizgar dibin û gundîyên xwe ji feodalîzmê rizgar dikin. Lê hin kesên weke Wezîrê Eşo Sosyalîzm rexne kirîne û ji ber vê sedemê edet û dînê Êzdîyatîyê gelek honandîne berhemên xwe. Di romanên Wezîrê Eşo da axa, beg an jî şêx û pîrên ku ji alîyê Komînîstan va tên nefîkirin gelekî baş in û hez ji arîkarîya gelê xwe dikin. Her wiha di romanên wî da axaftinên ‘Sosyalîstkî’ rê li ber edet û hurmetên milletîyê digire. Ger mirov di romanên Wezîrê Eşo da ‘realîteya’ Sosyalîzmê bide ber çava dikare bibêje ku nivîskar pesindayînê para edet û dînê Êzdîya ra hîştîye.

Di vê xebatê da jî nîşaneyên Êzdîyatîyê û û hêmanên folklorîk ên di romanên nivîskar de dê were kolandin û zeft kirin.

Êzdîyatî Çî Ye?

Êzdî ew civata netewe-ol (etnodinsel) û netewe-çandî (etnokulturel) ye ku di roja me belavela û bi esasî li bakûrê rojava û bakûrê rojhilat ên Suriyê, li girên Cebel û Şengalê ku di navbera tixûbên Iraq û Suriyê da nin, li bakûrê Musulê, li Kafkasyayê û li bajarên Mêrdîn, Amed, Batman û Rihayê û gundên wan ku dikevine başûrê rojavayê Turkiyeyê û herî dawî jî li welatên wek Almanyayê yên Awrûpayê dijîn.[1] Ango ola Ezdîtî gelek deverên dinyayê da heye û tête jiyîn. Bingeha ola Êzdîtîyê xwe dispêre bawerîya Manî û Zerduşt. Ji ber ku di van bawerîyan da bawerî bi du Xwedayan tê kirin û yek ji van jî Şeytan e. Ji bo xweparastina Şeytan ku xirabîyan di xwe da dihewîne, ji bo xwe ji xirabîyên wî biparêzin divê îteatê wî bikin. Xwedayê duwemîn jî Tav e.[2] Bingeha ola Êzdîtîyê yek jî ew e ku piştî mirinê jîyan e, an jî bi gotineke din, koça rih e. Wisa ku li gor bawerîya Êzdîyan dibe ku heyînên pîroz di laşên Êzdîyekî da were dinyayê. Mirin wek guherîna kiras tê binavkirin di nav Êzdîyan da.[3]Di bingeha xwe da bawerîyeke vegotina bidevkî ye û pê re jî du pirtûkên pîroz ên bi navê Mishefa Reş û Kitabi Cilwe hene.[4] Li gor Êzdîyan Kurd giş beriya ku ola Îslamê bipejirînin, li ser ola Êzdîyan bûne.[5]

Kurdên Êzdî pareke mezin a netewa Kurd e ku bi xisletên xwe ên taybet di demên kevn da heta îro bi awayekî di nav miletê Kurd da bawerîya xwe parastine. Kurdên Êzdî yên Kafkasyayê ji bo wêjeya Kurdî cihekî payebilind da nin. Bi taybetî jî di dewra modern da ked û xebatên wan zêdetir derdikeve pêşberî me. Em bi rehetî dikarin bibêjin ku gavên pêşîn ên wêjeya modern bi destê wan pêk hatîye. Di romanên xwe da jî taybetîyên xwe ên olî parastine û bi awayekî eşkere bawerîyên xwe neqşê berhemên xwe kirine. Wezîrê Eşo jî yek jî berhemdarê Êzdî ye ku ji bo piştrastkirina vê îddayê mînakeke xurt e. Nivîskar hersê romanên xwe di zemanekî fireh da nivîsîye û jîyana Êzdîyatîyê di nav berhemên xwe da parastîye. Loma jî ev berhem zêdetir bala me kişandin û ji bo vê xebatê bûne materyal.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو ڤەکولینێن کوردی

Folklor çîye?

Folklor an jî bi gotineke din zanista gel, yek jî mijara herî muhîm e ku bi watedayîna jiyana gel re têkildar e. Bawerî, edet, tore, rabûn rûniştin, gotinên pêşiyan, biwêj, nifir, dua, xwarin û hwd hemû jî di bin vê qadê de bi cih dibin. Baskê folklorê wisa mezin û fireh e ku ji hemû reng û halê civatê, ji her derê dinyayê bi şiklekî cuda an jî dibe ku heman be, reng vedaye.

Folklor ew zanist e ku çanda gel berhev dike, lêdikole û digihîne sentezeke . Ango folklor hemû pêkhateyên ku ji aliyê civatê ve hatine afirandin li gor rêbazên zanistî lêdikole, tîne beranberî hev û bi wan re sentezeke nû çê dike. Ji ber ku Kurd di cografyayeke mezin de berbelavin, heman tişt bi gelek navan hatine binavkirin. Di Kurdî de ji bo beramberê peyva folklorê de gelek nav hene. Bi kurdî bêjeya folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Li gorî Celadet Bedirxan "folklor, zanîn an zanistiya xelkê ye." Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî "zargotin" û "zanista gel", bi soranî "xelknasî" û bi zazakî zanistiya şarî" tê gotin.

Folklor ne tenê zanista gel e, di heman demê de motîfên kulturî û neteweyî di hundirê xwe de dihewine. Herwiha bi dinyaya hundirîn a xelqekî û hemû hebûn û tunebûna berdest ve jî têkildar e. Folkor li ser pirsên wekî; mirovên berê debara xwe çawa derbas dikirin, dema birçî dibûn çi dixwarin, çawa rudiniştin, dewetên wan çawa bûn, di şahî û şîna de kirasên wan çawa bûn û hwd radiweste. Ev tiştên ku em di jiyana xwe de mîna tiştên kevn binavdikin, di demên berê de wateyên wan ên kurtir hebûn. Lê niha tenê wekî kevneşopî mane. Jixwe peyva folklorê ji dû peyvên îngîlîzî pêk tê folk(gel) û lore(zanist) e. Wekî ku xûya jî dike bêjeya folklorê çavkaniya xwe ji gel hildide. Hemû tiştên bi mirovan re têkîldar in, her dem û di her şertê de dikare bibe mijara folklorê. Loma jî folklor nikare bi dem û kesayetan re bê sînorkirin. Folklor tiştekî zindî ye, bi mirovan re dijî û di avakirina kesayetan de jî roleke wê ya bibandor heye. Ango folklor dize, digihîje û bi heyîneke domdar ji bo gel terxan dibe. Divê baş bê zanin ku erk û armanca folklorê ne tenê ji bo derbasbûyîna şevbihêrkan an jî aşkirina zarokan e. Li gel van tiştan di hemû qadên jiyanê de jî rolekî wê ya bibandor heye. Ji şahiyan bigire heta şînan, ji xwarinan bigire heta cil û bergan, ji lawayan bigire heta nifiran, hemû tîşt dikevin bin bask û qadên folklorê. Ji ber vê yekê jî divê em vê têgehê ji wateya wê ya bisînor veçirînin û wê bi wateya wê ya berfireh û rasteqîn binirxînin.[6]

Kurdên Êzdî ên Sovyetê:

Êwra Kafkafyayê ya ku ji bo pêşdaçûna lîteratura Kurdî cihekî girîng bû, zêdetir di nava xwe da Kurdên Êzdî dihewand. Kurdên ku li Kafkasyayê dijîyan ne ji ber şerên di navbera Osmanî-Îran, şerên Cîhanê û ji ber sedemên dîtir di wan deman da koçê Kafkasyayê kirin. Wisa ku Kurd ji belgeyên dîrokê va ‘eyan e, berê da li Kafkasyayê dijîyan. Li gor Kurdnasê rûs Mînorskî Kurd di demên pir kevnar de li herêma Kafkasyayê bi cih bûne. Li gor Gordon Childe û Vanilor, qewmên arî (ku Kurd jî di nav dane) berîya Îsa di salên 6000î da li Kafkasyayê belav bûne.[7] Kurd B.Z 2000 sal berê vir va ye di nav axa ku niha Azerbaycan e dijîn. Li gor agahiyên ku ji kolandinên arkeolojîk û berhemên dîroknasên yawnan ên antîk, qewmên Kurdan ên ûtî, gûtî, kûtî, kurtî (di wateya yên çiyayî da ne) di salên B.Z 2000an da li pêşên çemê Arasê ên başûr û bakûr, bi gotineke din di nav axa fireh ya ku navbera çemê Aras û Kur da ye û Kurdistana Sor jî hildide nava xwe da niştecîh in û ev yeka bi van agahîyan hatîye îspatkirin.[8]

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکۆلینێن کوردی

Gelemperî Kurdên ku li Kafkasyayê dijîyan Êzdî bûn û her di bin şexta koçberîyê da diman.Pêşiyê Şah Ebbas 24 Eşîrên Xorasanê dişîne Azebeycanê, dû ra gava şerê di navbera Osmanî û Safevîyan da diqede di sedsala 17an da çend eşîrên Kurd ên Mereş û Rihayê mişextîyê Gurcistanê dikin. Ev eşîrên kevn tên helandin û tên asimîle kirin. Pê ra bi sedemên şer gelek deverên Kurdistanê dikeve bin banê Rûsyayê. Pîştî şerê cîhanê yê yekem Kurdên êzîdî tên sirgunkirin û wan dişînin Qersa ku wê dewrê di nav tixûbên Rûsyayê de bû. Kurdên ku li Qersê û deverên wê dijîyan û di bin hikumdarîya Rûsan da bûn wek komên piçûk li wir dijîyan. Li gor statîtên berdestî di sala 1910an da bi qasî 5 hezar Kurdên êzidî li wir dijîyan.[9]

Gava artêşa Rûsîya dawîya sala 1917an, (piştî şorişa Oktobrê) ji Pişkavkazê vekşîya, artêşa tirkan kete wê deverê û bi deh hezaran êzdî qir kirin.[10] Pê ra bi saya mudaxaleya Îngîlîzan Tirk ji Kafkasyayê vedikişin û Kurd jî Pergala Bolşevîkan nas dikin. Bi dumahiya demê re Kurd sê caran tên sirgun kirin. Cara yekem dewra stalîn de (1937) pêk tê. Cara duyem(1944) Kurdên misilman sirgunê Qazaqîstan û Ozbekîstanê dikin. Cara sêyem(1947) jî Stalîn hinek kurdên Êzîdî ji Gurcistanê mişextî Qazaqîstan û Asya navîn dike.Kurdên êzdî li împêratorîyên Osmanî û Iranê bin zordarîya duqat de bûn; hin ya netewî, hin jî ya olî.[11]

Mirov dikare wiha bibêje ku di nav Kurdên Êzdî da xwendin an jî xwepêşxistin qet tune bû. Hejmara xwendeyên di nava wan da gelekî kêm bû û ji ber bêderfetîyê ev yeka pêş da nediçû. Her wiha şert û mercên û pergalên di wan deman da derfet nedida ku Kurd xwe bigihînin cihekî. Lewra di serdema serweriya feodalîzmê de derfetên xwendin û hişyariya çîna hejar gelek sînordar in û di nav kurdên êzîdî de jî ji ber baweriya dînî ya qedexebûna xwendinê ev derfet qet nînin. Bi danîna sîstema Sovyetê ev rewş diguhere û ji rencber, şivan û berdestiyên civaka feodal kesên zana, xwenda û pêşketî peyda dibin.[12]Di zemîneke weha de edebiyata kurdî ya Sovyetê bi giştî ji aliyê komeke kurdên êzîdî ve hat berhemanîn.[13] Zêdetir berhemdarên Kurdî di Êtîmxaneyan da mezin bûn û bi saya derfetên pergala Sovyetê di zimanê xwe da perwerde dîtin û di dav wêjeya cîhanê da cihê xwe girtin. Wek mînak hîmdarekî edebyeta kurdên welatê Sovyêtê yê ewlin, nivîskarê eyan, bavê pomana kurdî Erebê Şemo / Ereb Şamîlov/ e[14] ku yekem romana Kurmancî bi destê wî hatîye nivîsîn.

Ji ber van derfetan Kurdên Êzdi di berhemên xwe da jî li ser bawerî û edetên xwe sekinîne û nivîsîne. Di berhemên xweda ew tişt nîşan kirine ku çawa ser cinyaz distirên, kotelê çawa girêdidin, jin gulyê xwe dibirin didin ser cinyaz, hewarî çawa tên û wan çi cûreyî pêşnyaz dikin, xêrê çawa didin, usa jî qelen birîn, dewat, bindarûka cîwanan, eyda beranberdanê, berodan, eyda da li nav gund gera Kosegeldyan û gelek tiştên din. Evan tiştên êtnogirafî - debê yên usanin, ku niha gelek hatine bîrkirin.[15] Di mijara nîşankirina edetên Êzdîtîyê da Wezîrê Eşo jî cihê xwe gîrtîye û di romanên xwe da gelek li ser Êzdîtîyê sekinîye.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Wezirê Eşo Kî Ye?

Wezîrê Eşo Nivîskar, wêjezan, dîrokzan, rojnamevan û wergêrê Kurd ê bi nav û deng Wezîrê Eşoyê Hûtî Begê 1ê Mijdara sala 1934an li paytexta Gurcistanê; Tibilîsê hatiye cîhanê. Xwendin û perwerdeya xwe a destpêkê di dibistanên gundê xwe û ên li Tibilîsê de bi giranî bi zimanê Ermenî bi cî anîye. Sala 1958’an fakûltêta Zanîngeha Yêrîvanê a dîrokê xilas kiriye. Salên 1961-1963’an li Lenîngradê (niha Petcrsbûrg) di beşa Kurdzanîyê de a Înstîtûta Rojhilatzanîyê, bûye pisporê dîroka Kurdistanê. Salên 1964-1994’an wekî redaktor, serrerastkir û kontrolkirekî çapemenîya Ermenîstanê ê sereke, her wisa jî wekî redaktor û wergêrê beşa weşanên bi Kurdî a Radyoya Ermenîstanê li wî welatî; Yêrîvanê kar û barên xwe bi cî anîne. Ji sala 1995’an hetanî sala 2015an li Paytexta Belçîkayê; Brûselê jîya û afirand. Wezîrê Eşo di sala 2015an de çû li ser dilovanîya xwe.

Gelek gotar û raporên wî ên bi taybetî li ser pirsên Kurdzanîyê û li ser Kurdzanan, li ser dîrok, wêje û çanda Kurdên Yekîtîya Sovyetê û Ermenistanê bi şiklê lêkolînên zanyarî di berevok, rojname û kovarên Ermenistanê, Rûsyayê, welatên Ewropayê û Herêma Kurdistanê a Federal de bi Kurdî, Ermenî, Rûsî û Almanî hatine çapkirin.

Wezîrê Eşo, gelek berhemên nivîskarên Ermenî ên klasîk û hemdem ên pexşanê bi giranî ên li ser jîyana Kurdî û qehremanên Kurd bi wergerên xwe kirine mal û milkê xwendevanên Kurd. Bi wergera wî her wisa jî kurteromana nivîskarê Rûs ê mezin Arkadî Gayîdar a bi sernavê ***Têmûr û Koma Wî*** hatîye wergerandin ser Kurdî û di beşa pirtûka fêran a Zimanê Kurdî de hatiye bicîkirin.

Wezîrê Eşo, di radyoya Yêrîvanê de pir salan şêwirmendê derhênan bûye di warê amadekirina şanoyên radyoyê de ên li ser bingeha berhemên nivîskarên Kurd û Ermenî çêkirî. Du şanoyên radyoyê jî li ser bingeha serhatîyên wî bi xwe ên bi semavên ***Tîgran û Mehmûd*** û ***Koçekê Derewîn*** hatine amadekirin. Lê komedîya Wezîrê Eşo a bi sernavê ***Remo, Şemo, Temo***û ***Lawik***çend salan li ser dika Tîyatroya Elegezê a Kurdî a gelêrî bi serkeftin hatiye nîşandan” (Eşo, 2020: Beşa Jînenîgarîyê) Wezîrê Eşo di qada çêkirinên radyoşanoyan da xebatkar û herwiha lîstikvanekî çê bû jî. “Wezîrê Eşo tim him dilqên sereke dilîst,bhim jî dewsgirtîyê rejîsor bû” (Boyîk, 2012: 369)

2.3.2. Berhemên Wî

Berhemên wî ên sereke ev in; *Mizgînî(1976), Xebera Dostan, Dengbêj Kal Bûbû(1983), Xaçatûr Abovyan, Kurd, Êzdî (werger), Pamp-Sîpan(1986), Dosyaya Barzanî Di Sandoqa Stalîn a Polayî De, Kurdzanê Mezin Qanatê Kurdo, Zargotinzanê Kurd ê Mezin.* Gelemperî pirtûkên Wezîrê Eşo ji tîpên kirîlî hatine latînîzekirin û di roja îroyîn da hatine weşandin. Lê wek mînak pirtûka wî ye bi navê *Mizgînî* hê jî ji bo tîpên latînî nehatîye latînîzekirin. Roman û novelên Wezîrê Eşo yê ku di weşanxaneya Lîsê da çap bûne jî ev in:

Sîber, roman, 2016, Lîs
Qirme, roman, 2016, Lîs
Itibarî, novel, 2016, Lîs
Hosta Hovhannes, novel, 2016, Lîs
Tosinê Ûşan, roman, 2016, Lîs
Kilam û Pênûs, lêkolîn, 2018, Lîs
Parîyê Berdemayî, çîrok, 2020, Lîs

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

Di Hersê Romanan da Mijar li ser Çi Ne?

Wezîrê Eşo nivîskarê sê romana ye. Navê romanên wî Tosinê Ûşan, Sîber û Qirme ye. Ev roman jî weke romanên Kafkasyayê bi terza realîzmê hatîye nivîsîn. Romanên Kafkasyayê gelemperî bi vî terzî hatine nivîsîn ku dewra SSBC yê da ev terz hatibû pejirandin û nivîskar mijarên romanên xwe ji rastîyê hildidan û wisa dihunandin. Mirov dikare bibêje Wezîrê Eşo jî mijarên romanên xwe ji bûyerên rastî an jî zêdetirî wê rast hildaye. Herçiqas romannûsê me di romanên xwe da pesnê sosyalîzmê neda be û sosyalîzm rexne kiribe jî hilbijartina mijarên romanan ji jîyana rasteqîn mêtîye. Romana bi navê Sîberê da mijar li gundekî Kurdên Êzdî derbas dibe. Sîber navê keçekê ye û di wî gundî da yeke weke Sîberê bedew tine ye. Di wî gundî da û gundên dev û dor da kes nikaribûye ji bedewîya Sîberê ra kapa bavêje û heya niha tu kesî cil'et nekirîye ku here ji xwe ra bixwaze. Rojeke zivistanê ji gundên cînar hin mêvan ji bo xwezgînî tên mala Etoyê bavê Sîberê. Nava wan da yekî xerîb bi navê Arşak heye ku qedrê wî li ba bavê Sîberê gelek e. Arşak ji bo kurê Xudo Sîberê ji Eto dixwaze. Wê şevê bavê Sîberê her çiqas ji ber gotinên Xudo aciz bibe jî li ser xatirê Arşak qîza xwe dide kurê Xudo. Xudo mirovekî pîs û tima ye. berîya dewatê qelendê Sîberê kêm tînê û gelek tiştên xirab dike. Eto jî ji ber tirsa gotin û galegalên xelkê xwe kerr dike û deng dernaxe. Xudo ji ber pîsîya xwe roja sîwarkirina Sîberê jî dike çarşemê ku li gel Êzdîya roja çarşemê bûk nayên siwarkirin. Dema Sîber diçe mala xezûrê xwe gelek t'êdî û zilm dibîne. Xudo çiqas kirinên xirab hebe tîne serê bûkê. Malbavana Sîberê jî ji ber acizîya Xudo carekî tenê tê serî qîza xwe dixin. Sîber ji ber zilm û kirinên Xudo dawîya dawî berxwe nade û xwe dikuje.

Di romana bi navê Tosinê Ûşan da jî mijar li gundekî Kurdên Êzdî ê di tixûbê Ermenîstanê da ye derbas dibe. Tosinê Ûşan bî jina xwe va rojekî tên gundekî Kurdan û ji axayê gund alîkarî dixwazin. Tosin bi jinê va kêmaqil in û serxwaxtî di wan da kêm e. Ûsiv axayê gund alîkarîya Tosin û jina wî dike û Tosin dike rêncberê gund. Hemû malbatên gund heya tê destê wan alîkarîya Tosin û jina wî dikin. Tosin jî ji ber bêaqiltîya xwe her wext zulmê li ser zarokên gund ên şivan û berxvan dike. Roj bi vî terî derbas dibin û rojekî dîwana hukumeta komînîzmê tê gundê wan. Hemû kesan kom dikin û dest bi propagandaya komînîzmê dikin. Pê ra jî bîryarên avakirina kolxazê dibêjin. Ji ber ku Tosin rêncberê gund e û di nav gund da yê herî destteng û belengaz e, dîwana hukumetê Tosin weke berpirsîyar hildibijêrin. Êdî Tosin ji ber bêqailtîya xwe dest bi fesadîya gundîyan dike û şiltaxan davêje gundîyan. Axayê gund dide sirgunkirin û gelek kal û pîr jî ji gund dide derxistin. Êdî Tosin û bi jinê va bi hêza dîwana komînîstan zilmê li ser gundîyan dikin. di gund da tu kes nikare li hember Tosin biaxife û hemû kes hêsîr dimînin. Hemû hebûna gundîyan bi avakirina kolxozê xilas dibe. Roj wiha derbas dibin û rojekî Tosinê Ûşan gelek dixwaze goşt bixwe. Tenê bizineke wî û jina wî hebûye. Tosin ji ber cilektîya xwe ber xwe nade û tê bizinê serjê dike. Piştî ku bizinê serjê dike goşt dide kelandin. Lê berî ku gooşt bikele Tosin dikeve ser sîtilê û goştê nekelîyayî dixwe. Jina Tosin carekê va tê derdixe ku Tosin bi kelegoştê ketîye û mirîye. Bi vî terî zilma Tosin jî xilas dibe. Gundî Tosinê Ûşan defin dikin û roman wiha kuta dibe.

Di romana bi navê Qirme da jî mijar li ser bûk û kurê Şebabê Kurd e. Wisa ku kurê Şebab ê bi navê Tîtal ciwanekî xwende ye û berpisîyarê sedra gund e. Bi kesayet ji rih va girêdayî Komînîzmê ye û ji bo Komînîzmê kar dike. Emrê Tîtal wiha derbas dibe û wextê wî yê zewacê derbas dibe. Rojekî Tîtal diçe Tiblîsê û li wir keçeke bi navê Gezo

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

nas dike ku Gezo jî meriveke xwenda û girêdayî Komînîzmê ye. Tîtal bi saya keçmama xwe Gezo nas dike û sozê zewacê jê distîne. Bi vî terî Şebab kurê xwe dizewicîne û bûka xwe tîne gund. Ji ber ku mala şebab pîçûk bûye, ji bo bûk û zavayê teze, Şebab ji mereka mala Hesoyê Qereman cihekî çê dike û bûk û zava di vir da dijîn. Roj ji bo mala şebab bi şahî didomin û diçin. Lê rojekî Serokê KGB yê Ermenîstanê bi navê Koçoyan bi tilefonê gazî Tîtal dike. Di wê zemanê da jî dewleta Komînîzmê ji bo pêşgirtina serhildanan çekên di nava gel da bi zorê kom dikin û yên ku çekên wan tinebin jî bi zorê wan didin stendin. Tîtal dema ku diçe bi dilekî serbilind diçe lê Koçoyan bi zarekî tûj li ser Tîtal da dixe qêrînî. Koçoyan pêşî Tîtal ditirsîne ku ew bi jina xwe çûne ketine mereka Hesoyê Qereman ku di waxtê xwe da ji alîyê dewleta Komînîzmê hatîye sirgunkirin. Koçoyan ev yekî wekî sûcekî nîşanê Tîtal dide û wî ditirsîne. Bi dû ra jî Tîtal bi şertekî aza dike ku divê Tîtal Qirma bavê xwe jî bîne teslîmî tîtal bike. Lê hal ew e ku Qirmeya bavê Tîtal jî tune ye. Tîtal ji tirsan sozê teslîmkirina Qirmeyê dide û xwe aza dike. Bvê Tîtal ji ber vê bîryayê çi mal û milk hebe difiroşe û pere dide tîtal da ku bîçe Tîblîsê û bi dizî Qirmeyekî bistîne û bihere bibe Koçoyan. Tîtal dîçe Tiblîsê mala apê xwe û bi dizî Qirmeyekî distîne. Lê berî ku şeva bi rê bikeve bi tevî kurapê xwe şerabê vedixwe û serxoş dibe. Bi wî serxoşîya xwe diçe li trênê swar dibe û berê xwe dide mala xwe. Dema hê trên bi rê nakeve Tîtal derva Koçoyan dibîne û dixwaze hema li wir Qirme teslîmî wî bike. lê ji ber ku serxoşe lingê wî diteîse û li erdê dikeve. Dema Tîtal li erdê dikeve jî Qirmeya di ber wî da jî dikeve erdê. Koçoyan wî demî Tîtal wekî bi nêta kuştina xwe sûcdar dike û Tîtal dide girtine. Ji ber nehatina Tîtal, Şebab diçe cem Koçoyan lê Koçoyan wekî ku heya wî ji tiştekî tineye diaxife û sozê arîkarîya azakirina Tîtal dide. Lê êmekî şûnda Koçoyan xeberê dişîne ku Tîtal sûcekî giran li hemberî xebatkarekî Komînîzmê kirîye û hatîye sirgunkirin. A bi vî terî Tîtal tê serwinda kirin. Pişt ra wext ser serwindakirina Tîtal ra derbas dibe û kurekî Tîtal çê dibe. Gezo navê kurê xwe jî Tîtal lê dike. Piştî du sal şûnda Koçoyan dixwaze Gezo bibe berpirsîyarê gund wekî mêrê wî yê serinda. Gezo vê yekê qebûl dike û dikeve nava xebatên Komînîzmê. Rojekî Koçoyan gazî Gezo dike û bi wî ra bi nêteke xirab xeber dide û dixwaze wî tacîz bike. Lê Gezo dehfek li Koçoyan dide û wî dike erdê. Pêra dev ji karê xwe berdide û vê bûyerê tu carî ji kesî ra nabêje. Dawîyê da nivîskar di derheq Tîtal da dibêje ku Tîtal tu carî li mala xwe venagere û Gezo jî bi kesî nake, tenê kurê xwe mezin dike û dizewicîne.

Nîşaneyên Êzdîtîyê û Hêmanên Folklorîk di Romanên Wezîrê Eşo da

Weke ku me li jor jî behs kîr di hersê romanên bi navê, Tosinê Ûşan, Sîber û Qirme ên Wezîrê Eşo da mijar li ser jîyana gundîyên Êzdî ne. Di romanên Tosinê Ûşan û Qirme yê da mijar li ser têkîlîyên gundî ên di navbera hevdu da û bi pergala Sovyetê ra ne. Lê mijara romana Sîbêrê tenê li ser têkîlîyên Êzdîyan e. Nivîskar ji ber ku bixwe jî Êzdî ye, mijarên xwe li dora jîyana Êzdîyan honandîye. Wisa ku di Romanên Wezîrê Eşo da bûyerdi gundên Ermenîstanê da ku tê da Kurdên Êzdî dijîn diqewimin. Wek mînak nivîskar di romana xwe a bi navê Qirme da wiha terîfagund dike:

'Tîtal delalîyê mala Şebabê Emîr bû, li gundekî Kurdên Êzdî yê giran li navçeyeke di navbera çîyayan de li Ermenîstanê birayê çend xwişk û birayên ê herî biçûk bû.'[16] (Qirme, r.5)

Jê cuda nivîskar di romana Sîberê da têkîlîyên di navbera Êzdîyên Ermenîstan û Gurcîstanê bi devê karakterekî romanê wiha terîf dike:

Zakho Centre for Kurdish Studies

Çi qasî jî em kurê bavê hev in, wekî Êzdî gulîyê darekê ne, lê em îro hatine dawa merivatiyê ji we dikin. (Sîber, r.13)

Nîşaneyên Olî:

Herçiqas nivîskar di romanên xwe da Kurdên Êzdî bikar anîbe û li gor bawerîya wan mijar honandibe jî, di romanan da nîşaneyên bawerîyê ji yên edetî gelekî kêmtir in. Mirov dikare wiha bibêje ku bawerîyên Êzdîyên Kafkasyayê zêdetir wek edetî dihate binav kirin. Lê çi Kurdên Êzdî û çi jî yên misilman be, ji ber yekmilletîyê edet zêdetir wek hev in. Edetên cuda jî ji ber sedema olî ye ku bandorê li ser edetên gel dike. Wek mînak di nav Êzdîyên Kurd da vexwarina şerabê di Kurdên Misilman da tine. Ji ber ku Êzdîyan da vexwarina Eşqî Şems(Şems wateya tavê da ye) û gelek vexwarinên ji bawerîyê pekîyane hene. Lê di misilmantîyê da vexwarina Şerabê helal nîn e.

Dua û Nifir:

Ji bo Êzdîyên kavkazê sonda herî belav bûyî ew bi navê *Şems* bû.[17] bêguman Wezîrê Eşo jî di romanên xwe da dua, son û nifiran herî zêde bi navê Şems bikar anîye. Tenê carekî jî navê *Melekê Tawis* bikar anîye.Di romana Tosinê Ûşan da dema Tosin bi jina va xwe tên gundê Êzdîyan û ji gundîyan alîkarî dixwazin Ûsiv axa ê gund wan dihewîne. Bi bersiva erênî ra jî Tosin van duayan Ûsiv beg ra dike:

Ez ê her roj, gava Şems nedîr dide, li ber Şems dua û dirozgan li te û neferê te bikim…

-Bera Şems mertala xwe bide ser milê zilamê te.[18](Tosinê Ûşan, r.9)

Wekî ku bi van duayan tê dîtin, Şems(tav) li gel Êzdîyan pîroz e. Her wiha alîkarî bi Şems jî tê xwestin. Li gor ku me di dîyalogên romanê da dîtin, ne tenê ji bo duayan, ji bo nifiran jî Êzdî xwe dispêrin Şems.

Eger ev jî wekî ew ê te got bêesil derket, ez ê çi bikim? Ez ê bi tenê wî teslîmî şûrê Şems bikim.(Tosinê Ûşan, r.11)

Di hersê romanan da ji alîyê nîşaneyên olî va herî zêde peyva Şems hatîye bikar anîn. Her wiha karakter şikuranînê bi Şems û Melekê Tawis dikin. Wisa ku di romana Qirmeyê da dema Tîtal ji alîyê Komînîstan va nayê girtin şikra xwe û şabûna xwe wiha dide der:

-Şikir ji te re Xwedê, Şemsê Kibîr, şikir ji te re Melekê Tawis, ne ezî aza me. (Qirme, r.88)

Dawetên Rojên Çarşem:

Nîşaneyeke ola Êzdîyatîyê jî ew e ku rojên çarşemê dewat nayên kirin. Jixwe di bawerîya Êzdîyan da cejna Çarşema Sor heye ku li gor vê bawerîyê Melekê Tawis dinya roja çarşemê xilas kirîye. ji ber vê hindê di nava Êzdîyan da dewatên roja çarşeman xirab û qedexe ye. Di romanê da ji bo vê rojê û wateya wê wiha hatîye sêwirandin:

Eto bi destê zavê ve çû, rojeke bêtir nêzik ji bo wê yekê kifş kir ku diket roja pêncşemê, ji ber ku li gorî ayîna dîn û adetên Êzdîyan siwarkirina bûkê di rojeke hefteyê a çarşemê de guneh û qedexe ye. (Sîber. r.56)

Di romana Sîberê da dema malxezûrên Sîberê roja çarşemê tên ku bûkê bibin apê Sîberê Emo wiha dijî wan derdikeve û dibêje:

-Kuro, lawo, hûn Roma Reş in, ne Êzdî ne ku vê bêdadîyê, vê namerdîyê û zor û zilmê li me dikin? Îro çarşem e, hûn çawa ji Xwedê diwêrin. (Sîber, r60)

Nîşaneyên Edetî:

Weke me destnîşan kir, di romanên Wezîrê Eşo da ji nîşaneyên olî zêdetir ên edetî hene ku ev herdu têgeh têkelî hevdu ne. Di romanan da pesnê Sovyetê zêdetir rexne li pergala wan hatîye û zilma li ser Êzdîyan di gelek cihan da hatîye nîşandan. weke ku me di beşa Kurdên Êzdî ên Sovyetê da jî destnîşan kir, pergala Sovyetê li dijî axatî û şêxan bû. Ji ber vê yekê di wê demê da çi baş û çi jî nebaş, gelek şêx, axa û pîrên Êzdîyan hatin serwindakirin û mişextî kirin. Di dema Lenîn û Stalîn da jî Êzdî ji ber bawerîyên xwe gelek tedî û zilm dîtine. Di romanê da ji bo vê yekê hevokeke wiha derbas dibe ku kirinên wê demê radixe li ber çavan:

Komunîstan Lenîn û Stalîn wekî Xwedayê xwe didîtin, lê ji ber ku şêx û pîr Xwedênas bûn, xelk, mirîdên xwe jî dikirin Xwedênas, loma jî partîya komunîstan dewleta Sovyetîyê ew şêx û pîr wekî paşverû û dijminên xwe didîtin. Ji ber vê yekê jî çend şêx û pîrên gund jî sirgûn û serwinda kirin. (t.u..r73)

Mirin û Binaxkirin:

Nivîskar di romanên xwe da berî behsa edetên Êzdîyan bike her dibêje ku li gor edetî an jî edetên Êzdîyan. Wisa ku di romana Tosinê Ûşan da ji bo edeta şînan wiha teswîr hatîye kirin:

Xelk ji gundên din dihatin hewarîyê, gund û gundîtî li dora cinyaz dicivîya, jinan û mêran stran davêtin ser rehmetî, şêx û pîran qewl û beyt digotin, ên hezinî û yên dilbikul digirîyan, mêran 'Birawo' dikirin. (Tosinê Ûşan, r.79)

Di vir de 'Birawo' kirin edeteke Êzdîyan e ku dema cinyaze berîya tê definkirin ji alîyê bira, pismam û dostan va sê cara tê bilindkirin û datanîn. Her wiha dema cinyaze bilind dikin jî pev ra dibîjin 'Birawo'. Ev edet bêguman di nav Êzdîyan da heye û tê nîşaneya hezkirinê, kul û keserê û êşê.Dema helbestvan Fêrikê Ûsiv jî diçe li ser dilovanîya xwe cinazê wî tê 'Birawo' kirin.[19] Ji bilî wê di romana Sîberê da jî bavê Sîberê ji ber mirina qîza xwe û ji ber êşa wê 'Birawo' dike. ev yeka di romanê da wiha tê tasfîkirin:

Vê peyva 'Birawo' mêr bi tenê dema mirina mêran û ew jî a birayan, kurapan, merivên ji xwîn û qinyata xwe ên herî nêzîk dibêjin, lê qet tu caran ne li ser jinan.(Sîber, r.130)

Li gor edetên binaxkirina edetên Êzdîyan da romana bi navê Tosinê Ûşan wek neynikekî ye. Di romanê da dema lehengê xirap Tosin dimire li gor edetên Êzdîyan gundî cinyaz binax dikin. Wisa ku di destpêkê da ji bo binaxkirinê wiha hatîye nivîsîn:

Lê berî vê yekê em ê her tiştî li gorî urf û edetê me bikin: Cinyazê wî bi destê şêx û pîran, ên ku hetanî niha ji ber destê wî filitîne, bidin şûştin, kefen bikin û hê di nava kulêv da bipêçin û girê bidin.(Tosinê Ûşan, r101)

Li gor ku roman agahî dide me, dema di nav Êzdîyan da yek mir berî hertiştî ji alîyê şêx û pîran tê şûştin û bi dû ra jî di nav kulavan da tê pêçandin. Her wiha di derheqê defnkirinê da roman wiha didome:

Mêrên gund hemûşk hatin hundirê merekê. Li gorî edetê, jin ji ber wan rabûn ser pîyan û vê carê ew erketin derîyê malê, çimkî bê gotin, bê eşeratdan jî, ji awa, fesala hatina mêran texmîn kirin ku wê cinyaz bibin.(Tosinê Ûşan, r.110)

Piştî şûştina cinyaze, mêrên gund ji bo birina cinyaze tên li ber derîyê mala şîn li lê.

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Xortan li gorî edetên Ezdîyan, cinyaze di nav kulêv de sê caran ji erdê qetandin û sê caran danîn ser erdê, hê hilbirîn, danîn sermilên xwe û berê xwe dan pala çîyayê serfêza gund. (Tosinê Ûşan, r.111)

Pê ra jî li gor romanê da hatîye gotin, cinyaze tê kulav kirin û sê caran tê rakirin û daynanîn. Di vir da sê cara hilanîn û datanîn wateya 'Birawo' kirin e. Herçiqas di romanê da Tosin karakterekî nebaş be û ji ber vê yekê gundîyên di romanê da dema hilanîna cinyaze pev ra nebêjin 'Birawo' jî mirov têdigihêje ku wek edetî sê caran tê hilanîn û datanîn.Berîya ku gundî cinyaze bibin li ser goristan agahî didine tevirkolan ku merzelê Tosin bê şamî çê bike. Li gor edetên Êzdîyan berîya yek bête defnkirin şamî ku ji bo ronahîyê bide şamî tê dadan. Di bawerîya êzdîyan da ev edeteke kevn e lê di demên dawî da êdî agir nayê dadan. Di fîlma Zarê dajî, ku di sala 1926an hate kişandin û jîyana Kurdê Êzdî hildaye dest, dema birayê Zarê ji ber sedema şer dimire li ser cinyazê wî jî agir tê dadan.[20]

Di pirtûkê da jî ev edet wiha tê behskirin:

Çawa gotibûn tevirkolan wan jî eynî bi wî awayî mezel kolabûn. Bê şamî. Xem û talaşa kê bû mezelê Tosin de şamîyê çê bike, di ser re bi daran ava bike û hê axê bixe ser: Li gor edetên Êzdîyan. (Tosinê Ûşan, r111)

Piştî ku cinyaze tê defnkirin hemû miletên li ser mexber wek edetî tên mala şîn li lê. Ev edet ne tenê di Êzdîyan da, gelemperî di hemû bawerîyan da heye. Ji ber ku nivîskar dîsa wek edetên Êzdîyan binavkirîye em ê cî bidin vê gotinê jî:

Dîsa li gor edetên Êzdîyan, gotî hemûşk biçûna ber derîyê Tosin û li wira sersaxî bidana. (Tosinê Ûşan, r.111)

Xwekirina Cil û Libasan

Berhemdar di berhemên xwe da hin cihan wisa behs kirîye ku edetên Êzdîyan qet nehatîye jibîr kirin.

Wî zemanî Êzdîyên Tiblîsê, ku hemûşk di navbera du dehsalîyên dawî de ji gundên xwe yên Ermenîstanê çûbûn wir û girêdanên wan bi gundên wan re hê qût nebûbûn, erf û edet, deb û rizma kal û bavan, Kurdîtîyê hê jî diparastin…. Serê xwe pê şer û şemeqîyan, temezîyên ku ji wan re dogotin, heftreng girê didan, ku mêr wan serqot nebînin, ku di nava gel de wekî tiştekî bênamûsî, şermî dihat dîtin.(Qirme, r.16)

Bi wî awayî nivîskar sergirtina jinên Êzdî spartîye edetên Êzdîyan. Di hin cihan da jî behsa cil û libasan kirîye wiha gotîye:

Bira û jinbira li Tibilîsê bûn, bi ser de jî li wir çend terzîyên xisûsî hebûn ên dirûtina cil û bergên Kurmancî ku ji nava Êzdîyên wir rabibûn. (Sîber, r.43)

Her wiha rewşa Kurdên wê demê û asîmîlasyona wan ji hêla çanda cilan da nîşanê me dide. Nivîskar di hin cîhan da jî wek zimanekî rexneyî behsa bandora Gurcî û miletên din li ser Kurdên Êzdî dike:

Belkî kirin û gotina Arşak î bi vî awayî di edetên Êzdîyan ê kal û bavan, ê guund de tine bû, çimkî ev awa wê bihata hesibandin wekî 'siviktî', ' negiranî' ya mêrê ciwamêr, lê li bal mêrên Êzdîyên Tibilîsî ew awayê axaftinê ê bi heytehol di bin tesîra Gurcan û miletên dinê de bûbû wekî adeteke nû. (Sîber, r.17)

Zewac:

Weke edeteke din, di romana Sîberê da em rastî edetên Êzdîyan ên zewacê tên. Nivîskar dîsa berîya behsa edetê bike weke edetê Êzdîyan binav dike. Mirov dikare

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

wiha bibêje ku nivîskar tu derfetê nade xwîner ku li ser van edetan bifikire. Di romanê da di derheq edeta zewacê da ev nîşane hene:

-Li gorî atedên me Êzdîyan, zava nayê siwarkirina bûkê; dergistîya xwe, ew bi heval û hogiran re li ber dara xwe dimîne heta dergistîya wî tînin. (Sîber, r.62)

-Lê piştî siwarkirin û anîna bûkê gotî govend, li gorî adet, du şevan jî bigerîya; bi amadebûn û beşdarbûna bûkê.(Sîber, r.76)

-Li gorî edetên me, wekî zavayê teze riya xwe vekira, ez gorî destvala nehatama. (Sîber, r.38)

-Li gorî adên kal û bavan hetanî neçûna serlêdana qîza xwe rêya wê li mala bavê venedibû û neferên mala bavê jî xwe ji serlêdana bê sebebên grîng, ne bi adetî bi şûn de digirtin. (Sîber, r.83)

Vexwarina Şerabê:

Di romanan da nîşaneyeke edetî û sereke jî vexwarina Şerabê û Eraqê ye. Weke ku me li jor jî behs kir, di nav Êzdîyan da vexwarina şerabê edeteke û di romanan da jî di gelek cihan da derbas dibe. Li gor ku nivîskar behsa vê edetê dike di civînekî da an jî di şahîyan da berî her tiştî şerabê vedixwin û bi dû ra jî dikevine sohbeta hevdu. Şeraba ku tê vexwarin jî wek 'eşqî Şems' tê binavkirin. Ev vexwarin zêdetir ji bo şeref û tendirustîya hevdu ye. Ji bo têgihîştinê em dikarin çend heb mînak ji romana Sîber û Qirmeyê wiha bidin:

-Li gorî edet hemûşkî eşqî Şems vexwarin. Di pîşt re salixî, noşa her du gulan; bûk û zavê...Piştî vexwarina eşqa Qedîbilbanê Qedîmî û eşqa mêrê oxirê, ev yek jî li gorî edetên Êzdîyên li Sovyetê, hê mêvanên kêfxweş î serxweş xatirê xwe ji Memê û Eto xwastin.(Sîber, r.27)

-Zûtirikê nan, xwarin, fêkî û hilbet, mutulgên araq û şeraba Gurcistanê li ser sifreyê rêz kirin.(Sîber, r.41)

-Li gorî adet berî hemûşkî nan danîn. Di pîşt re mutulgeyên araq û şeraba deşta Rewanê li ser textê rêz kirin. (Sîber,r.100)

-Li gorî adetên Êzdîyên Ermenîstanê û Tibilîsê berî hemûşkan eşqa Şems, mêrên dîwanê, wekî wan ên bihurtî, pîroz bi nav dikirin, vexwarin, di pişt re hê bi salixîya mêrên amade û hilbet, wekî dîyarkirina rêz û hurmeta berî hemûşkan a mêvanan. (Sîber, r101)

-Hinek mêrên Tiblîsê yên Êzdî di warê zehfvexwarina şerabê de temamîya bajêr û gundên Ermenîstanê de jî, ji kî derê ew hatibûn wir, deng dabûn, navê wan derketibû wek şerabvexwirê ku ji vexwarina gelek şerab serxweş, sermest nabin. (Qirme, r105)

Bi vî awayî nivîskar Wezîrê Eşo xemla ola Êzdîtîyê li kirasê berhemên xwe kirîye û wisa pêşberî xwîneran kirîye.

Hêmanên Folklorîk:

Nivîskar Wezîrê Eşo di romanên xwe de li gel nîşaneyên Êzdîyatîyê, zimanekî folklorîk bikar anîye û berhemên xwe wisa xurt girtîye. Dema em bala xwe didin nîşaneyên Êzdîyatîyê jixwe gelek edet hene ku ew bixwe jî dikevin nava hêmanên folklorîk de. Ji bilî edetên ku di pirtûka xwe de bikar anîye, gelek gotinên pêşîyan û biwêj jî bikar anîye.

Gotinên Pêşîyan:

Jin jî hene jinkok jî hene. (Sîber, R.19).

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بو فەکولینێن کوردی

Berf ji spî ye, lê kûçik di ser de gû dikin. (Sîber, r.115).
Aş bi xeyalekî, aşvan bi xeyalekî. (Sîber, r. 116).
Gavan garan berda, bêxwedî û beredayî hişt, lê ji xwe xwedîyê garanê jî ew bernedan.(Sîber, r. 124)
Bê rehma Xwedê çilo ji darê nayê xwarê (Sîber, r. 16).
Bavê te siwaran kuşt an peyayan (Sîber, r. 28).
Meriv dewê xwe yî ceribandî nade bi mastê xelkê yî neceribandî (Sîber, r. 31).
Dîwaro, ji te re dibêjim, bûkê tu guhdar be (Sîber, r. 87).
Hînkiriyan hîn neke, lê gava hîn dikî, ji bîr neke (Sîber, r. 112).
Du sere çê naçin ber balgiyekê(Tosinê Ûşan).
Çima xizanî ? wî bersiv da : "çimkî nezanin" (Tosinê Ûşan).
Dîzê bîstanan kifş dibin zivistanan(Tosinê Ûşan).
Zikê xwe sal dazdeh mehên xwedê li malan diçêrand(Tosinê Ûşan).
Kurmê darê ne ji darê be zewala darê tune(Tosinê Ûşan).
Yê li bin xwe ker kiriye, lê yê wî siwar bûye dike zarezar(Tosinê Ûşan).
Meriv çi qasî şivikê ber kûçkan bihejîne ew ê bêtir dir bibin(Tosinê Ûşan).
Çêjikên gura ji meriv rre nabin bav û bira(Tosinê Ûşan).
Çaxê dibû xelaya mêran got, navê dîkan diadanîn evdilrehman(Tosinê Ûşan).
Wekî hçkerûnê di deste xwe de çêkî û bidî ber, ew bîxwe, wê bibêje : "deve min şewitî, lê deste te neşewitî"(Tosinê Ûşan).
Wekî tu goştê can î
Jê kî bidî merivê beyanî
Axir oxir dîsa tu poşman î(Tosinê Ûşan).
Hesinê ne xaş ne dibe kêr, ne dibe das. lê hesinê xaş hin dibe kêr him dibe das.(Tosinê Ûşan).
Malê dinyayê qirêja destan e(Tosinê Ûşan).
Bedilesla neke şemçirax(Tosinê Ûşan).
Ecel hat nade mecal(Tosinê Ûşan).
Xwedê dûr dike derewîn nake(Tosinê Ûşan).
Mirin emrê rebbê min e, bera sor e li ber derê her kesî ye (Tosinê Ûşan).
Gava besa yekî dikî, çi li ser xênî, çi li ber dêrî(Tosinê Ûşan).
Bertîl berê kaviran nerm dike. (Qirme , r.9)
Gewirîya qul ziwa namîne.(Qirme, r. 11)
Malê dinyayê strûyê mêrane. (Qirme, r11)
Xebatçîyê xwe yo, hezkirîyê xelkê yo. (Qirme, r 39)
Bipêje û hê ji devê xwe birêje. (Qirme, r.60)
Paşî tire, kezî kurê. (Qirme, r.65)
Mala zêra xirab dibe, mala mêra xerab nabe. (Qirme, r. 90)
Meriv dilê sê savarê xweş dike. (Qirme, r,92)
Kurê helal ne berpirsîyarê kirên bavê xwe ye, ne jî bav berpirsîyarê kar û barê lawê xwe ye. (Qirme,r.145)

Biwêj

Xemên xwe danîn ber seren xwe(Tosinê Ûşan).
Kevir li ber bûn penêr(Tosinê Ûşan).

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

Avê di solê de vexwarin(Tosinê Ûşan).
Ji rêya xwedê ketin(Tosinê Ûşan).
Xêfika dile xwe bûyîn(Tosinê Ûşan).
Qidûmê çokan nemabûn(Tosinê Ûşan).
Saw ketibû ser wan(Tosinê Ûşan).
Bîzînê wê dihate dorê(Tosinê Ûşan).
Jixwe razî bûn(Tosinê Ûşan).
Mocê dînîtiyê pê girtin(Tosinê Ûşan).
Bi hemdê xwe gav dan(Tosinê Ûşan).
Qurbet qurbet ajotin(Tosinê Ûşan).
Pifî ezman kirin(Tosinê Ûşan).
Nan û av kirin(Tosinê Ûşan).
Gef lê xistin(Tosinê Ûşan).
Ava sar ser de kirin(Tosinê Ûşan).
Xwîn ji nava wan diçû(Tosinê Ûşan).
Wekî guleyekî lê ginhavt(Tosinê Ûşan).
Li ezmana xistin(Tosinê Ûşan).
Xwîna xwe pê re xwarin(Tosinê Ûşan).
Xew neket çava(Tosinê Ûşan).
Lingên wî li erde negirtin(Tosinê Ûşan).
Pîşta xwe girêdan(Tosinê Ûşan).
Hişê xwe winda kirin(Tosinê Ûşan).
Begemiya xwe dayîn(Tosinê Ûşan).
Birnê wê şikestin(Tosinê Ûşan).
Mineta xwe ji kesî negirtin(Tosinê Ûşan).
Rûyê xwe tirş û tal kirin(Tosinê Ûşan).
Xwe bike erd û xwelî(Tosinê Ûşan).
Taba xwe neanîn(Tosinê Ûşan).
Serê poz bersiv dan(Tosinê Ûşan).
Nîskek di nava pîsiyê xwe de dîtin(Tosinê Ûşan).
Hişê xwe berevî ser hev kirin(Tosinê Ûşan).
Anîna ser zîn(Tosinê Ûşan).
Zebeş xistin bin çengên wî(Tosinê Ûşan).
Pê re kap avêtin(Tosinê Ûşan).
Kajovajî kirin(Tosinê Ûşan).
Zar û ziman lê negeriyan(Tosinê Ûşan).
Kilîta reş li der ketin(Tosinê Ûşan).
Ji rûbarê dine qeliyan(Tosinê Ûşan).
Patka stûyê xwe dîtin(Tosinê Ûşan).
Hefsa xwe kirin(Tosinê Ûşan).
Agir pê ketin(Tosinê Ûşan).
Dere ve hatin (bêtehemmul)(Tosinê Ûşan).
Agir û alaz ber çûyîn(Tosinê Ûşan).
Persenga deve xwe zanîn(Tosinê Ûşan).
Zimanê xwe karîn(Tosinê Ûşan).

Zakho Centre
for Kurdish Studies

Bi deve xwe nikarin(Tosinê Ûşan).
Emrê teyrê sîmir kirin(Tosinê Ûşan).
Siya xwe tirsin(Tosinê Ûşan).
Tab nekirin(Tosinê Ûşan).
Berbat kirin (berbelav kirin)(Tosinê Ûşan).
Pozê xwe bilind kirin(Tosinê Ûşan).
Ciyê xwe quloz bûn(Tosinê Ûşan).
Di xwe de şewitîn(Tosinê Ûşan).
Of nekirin(Tosinê Ûşan).
Teqîn ji bine beroş anîn(Tosinê Ûşan).
Ne ku hê, lezek bere,îsal heft sale mirî bûn(Tosinê Ûşan).
Loş bûyîn (wek mirikî dirêjkirî)(Tosinê Ûşan).
Kelûgoşt bûn(Tosinê Ûşan).
Bînvajkî bûn(Tosinê Ûşan).
Dinya dîtin(Tosinê Ûşan).
Anîna ser zîn(Tosinê Ûşan).
…êdî ew gotin neanîn ser per û baskê xwe (Sîber, r. 14).
Hûn kêr, em penêr (Sîber r. 18)
Em di guhê gê de bûn (Sîber, r. 34)
Lê wan jî xwe dabûn mala metê, ker kiribûn (Sîber, r. 91).
Sîber ne sêva deve wan e.(Sîber,r.7)
Linge me dixin deve xwe ku em qîzên wan ji wî kurê xwe re bixwazin.(Sîber,r.13)
Wekî serjinikan diaxive.(Sîber,r.20)
Çima! Deste min û kurên min di bin keviran de ne ku em nikarin ji bûka xwe re cil û bergan bikirin. (Sîber,r.21)
Xwedê çawa şiva reş li çavê me xisti bû. (Sîber,r.35)
Serî heye, binî tune (Qirme, r.36).
Pê sivikbûyîn (Qirme, r.49).
Aqil sivikbûn (Qirme, r.36).
Dibe şarûr û bilbil, mû li zimanê wî napiçike (Qirme, r.60).
Tama şîr ji devê wî tê (Qirme, r.66)
..xwe li ser darê du lingan bigire (Qirme, r.77)
Ro kir û pîva (Qirme, r.82)

ENCAM:

Di serdema modern da ji bo naskirina civakekî yek jî çavkanîyeke sereke roman e. Ji ber vê hindê ji bo sepandina nîşaneyên Êzdîyatîyê û hêmanênfolklorîk berhemên ji destên nivîskarên Êzdî derketine dikarin bibin çavkanîyên xurt. Wekeku hate kolandin Wezîrê Eşo li ser bawerîya xwe bû û bawerîya xwe li kirasên berhemên xwe dikir. Wisa ku di hersê romanên wî ên hatine analîz kirin de ev rewş bi awayekî eşkere xwe dide dest.

Herçiqas nivîskar ji alîyê bawerîya xwe berhemên xwe tije kiribe jî di vegotina wî da qelasîyek ber bi çav e. Lewra dema nivîskar wexta ku behsa edet an jî bawerîyên Êzdîyan dike di gelek cihan da dibêje ‘Li gorî adetên Êzdîyên Ermenîstanê..(Sîber,

r.101)’, ‘Li gorî atedên me Êzdîyan..(Sîber, r.62)’ û bi vî awayî midaxale li berhemê dike û nahêle ku xwîner li ser wan tiştan bifikire.

Jê cudatir nivîskar ne ewqas girêdayê pergala Sovyetê ye. wisa ku di berhemên xwe da ji pesnê Sovyetê zêdetir rexneyan li pergala wan dike û kirinên wan ên li ser Êzdîyan radixe ber çavan. Lê di vê vegotinê da tişta grîng ew e ku nivîskar rexneyên xwe ne rasterast, wisa ku bi devê karakteran û tevgerên wan dike.

Bi lêkolandina hersê berheman va me dît ku nivîskar heta ku jê hatiye hewl daye romanên xwe bi çavdêriyek realîst binivîse. Loma jî zimanekî sade ku di nav civatê de çawa hatibe bikaranîn eynî wîsa bikar anîye. ji bo xurtkirina romanên xwe jî gelek hêmanên folklorîk bikar anîye. Di hersê romanên xwe de gelek nifir, gotinên pêşîyan û biwêj bikar anîye ku ev jî nîşaneya serkeftina romanên wî ne ku berhemna xurt dikin. Mirov dikare bibêje ku nivîskar karakterên xwe nas dike û ji rabûn û rûniştina wan hilde heta zewac û mirina wan jî li ser vê zanebûna xwe dirêsîne. Jiyana ku nivîskar xêz dike ji xwînera re ecêp nayê û nêzî rastiyê ye. Ev jî bi zanebûna nivîskar ya civatê û xûrtbûna çavdêrîbûna wî re eleqader e.

Wek encam em dikarin bibêjin ku ji bo lêkolandina tesîra ola Êzdîtîyê û hêmanê folklorîk di romanên Kafkasyayê da ev berhemên Wezîrê Eşo çavkanîyên xurt in. Lewre di derheqê jiyana Êzdîyatî de gelek agahiyên bi qîmet hene. Ji romanên Wezîrê Eşo nîşaneyên Êzdîyan û folklorê ên di derheqê zewac, mirin û binaxkirin, dewat, vexwarina şerabê, xwekirina cil û libasan, dua û nifir dawetên rojên çarşem, gotinên pêşîyan û biwêj gelek bûn û me jî ji hevokên romanan mînak dan û raxiste ber çavan.

ÇAVKANÎ:

Berivan Can Emmez, Batman Ezidîlerinin Defin Pratikleri Üzerine Etnografik Değerlendirmeler, Antropoloji, h.29, Oca 2015.

Tosinê Reşîd, *Êzdîyatî Oleke Hê Jî Nenaskirî*, weş.Lîs, Reşemî 2010, İstanbul.

Torî*, Bir Kürt Düşüncesi Yezidilik Ve Yezidiler*, weş. Berfîn, Adar 2000, İstanbul.

Sedat Ulugana, Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî(1922-1991), Wêje û Rexne, h.9/10, Diyarbakır-2017.

Filitoğlu, Hasan, Hêmanên Folklorîk di Romanên Elîyê Evdilrehman de, Zaningeha Bingolê(Teza Mastira ya Çapbûyî), 2020.

Hêjarê Şamil, Diyaspora Kürtleri, Perî, 2015.

Hüseyin Can, *Kürtler ve Stalin*, İşçi Kolektifi Yayınları, Nîsan 2013.

Tosinê Reşîd, Kurdên Yekîtîya Sovyetê: Berê û Niha, Bîrnebûn, hej 42, havîn 2009

Zülküf Ergün, Ducemseriya Realîzma Sosyalîst Di Romanên Erebê Şemo û Heciyê Cindî De, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, C.9, h.2, Mijdar -2017.

Eskerê Boyîk*, Nûra Elegezê; Çend dîdem ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*, weşangeha Dengê Êzîdiyan, Nîsan 2004- Oldenburg.

Wezîrê Eşo, *Sîber*, Lîs, Diyarbakır,2016.

Wezîrê Eşo, *Qirme,* Lîs, Diyarbakır,2016.

Wezîrê Eşo, *Tosinê Ûşan*, Lîs, Diyarbakır,2016.

https://www.youtube.com/watch?v=jiu89U8YRig (Dîroka têgihîştinê 10.10.2022)

https://www.youtube.com/watch?v=ZAtK7jZQ8Pc&t=619s (Dîroka têgihîştinê 18.10.2022)

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Perawêz:

[1] Can Emmez, Berivan, *Batman Ezidîlerinin Defin Pratikleri Üzerine Etnografik Değerlendirmeler* ,Antropoloji, h.29, Oca 2015, r.164

[2] Torî, *Bir Kürt Düşüncesi Yezidiliik Ve Yezidiler,* weş. Berfîn, Adar 2000, İstanbul, r.53

[3] Can Emmez, Berivan, h.m, r.165

[4] Can Emmez, Berivan, h.m, r.164

[5] Reşîd Tosinê, *Êzdîyatî Oleke Hê Jî Nenaskirî*, weş.Lîs, Reşemî 2010, İstanbul, r.27

[6] Filitoğlu, Hasan, Hêmanên Folklorîk di Romanên Elîyê Evdilrehman de, Zaningeha Bingolê, 2020. R.4.

[7] Ulugana Sedat, Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî(1922-1991), Wêje û Rexne, h.9/10, Diyarbakır-2017, r.36.

[8] Şamil Hêjarê*, Diyaspora Kürtleri*, Perî, 2015, r.23.

[9] Can hüseyin, *Kürtler ve Stalin*, İşçi Kolektifi Yayınları, Nîsan 2013, r. 31.

[10] Reşîd Tosinê, ,Kurdên Yekîtîya Sovyetê: Berê û Niha, Bîrnebûn, hej 42, havîn 2009, r.14

[11] Reşîd Tosinê, h.m, r.13

[12] Ergün Zülküf, *Ducemseriya Realîzma Sosyalîst Di Romanên Erebê Şemo û Heciyê Cindî De*, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, C.9, h.2, Mijdar -2017, r.655

[13] Ergün Zülküf, h.m, r.645

[14] Boyîk Eskerê, *Nûra Elegezê; Çend dîdem ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê,* weşangeha Dengê Êzîdiyan, Nîsan 2004- Oldenburg, r.23.

[15] Boyîk Eskerê, h.b, r.38

[16] Eşo Wezîrê, *Qirme*, Lîs, Diyarbakır,2016. r.5

[17] Reşîd Tosinê, Êzdîyatî Oleke Hê Jî Nenaskirî, h.b. r.84

[18] Eşo Wezîrê, *Tosinê Ûşan*, Lîs, Diyarbakır,2016. r.9

[19] Ji bo zêdetir binêre, https://www.youtube.com/watch?v=ZAtK7jZQ8Pc&t=619s(10.02.2022)

[20] Ji bo zêdetir binêre, https://www.youtube.com/watch?v=jiu89U8YRig(10.10.2022)

Wezîrê Eşo'nun Romanlarında Ezidilik Nişaneleri ve Folklorik Öğeler

ÖZET:

Kafkasyanın Ezidi kürtleri eski zamanlardan bu yana oranın yerlileridirler ve hala da kafkasyada kalmaktadırlar. Geçmişten bu güne kadar Ezidi kürtler birçok zorluklarlar ile karşılaşmışlardır. Ayrıca Kafkasyadaki Ezidi kürtler kendi aralarında bir edebiyat yaratmışlar ve kendilerini geliştirmişlerdir. Bununla birlikte Kafkasya edebiyatı gelişim için şüphesiz önemli bir konaktır. Öyle ki kürt edebiyatı kafkasyada yaşayan kürt Ezidilier sayesinde ilerlemiş, kendi inanç ve geleneklerini eserleriyle gözler önüne sermişlerdir. Kafkasya edebiyatının yazarlarından biri de Wezîrê Eşo dur ki her üç romanında da bir çok Ezidi inanç ve geleneklerine yer vermiştir. Ayrıca Wezîrê Eşo folklorik imgelerin kullanılması yönünden başarılı bir yazardır ve romanlarının folklorik bir uslup ile yazmıştır.

Bu çalışmanın amancı Wezîrê Eşonun romanlarında Ezidi imgelerini ve folklorik öğelerinin tespit etmektir. Ezidi imgelerinin tespitinden önce Ezidilik dini ve folklor üzerine bazı bilgiler verilmiştir. Ondan sonra da yazarın hayatı ve eserleri kısaca yazılmıştır.

Anahtar Kelimeler: *Ezidilik Nişaneleri, Folklorik Öğeler, Wezîrê Eşo, Kafkasya.*

Yazidi Signs and Folkloric İtems in Wezîrê Eşo's Novels

Abstract:

The Yazidi Kurds of the Caucasus have been natives of the region since ancient times and still remain in the Caucasus. From past to present, Yazidi Kurds have faced many difficulties. In addition, Yazidi Kurds in the Caucasus created a literature among themselves and improved themselves. However, Caucasian literature is undoubtedly an important host for development. So much so that Kurdish literature has progressed thanks to the Kurdish Yazidis living in the Caucasus, and they have revealed their own beliefs and traditions with their works. One of the authors of Caucasian literature is Wezîrê Eşo, who has included many Yazidi beliefs and traditions in all three of his novels. In addition, Wezîrê Eşo is a successful writer in terms of using folkloric images and he wrote his novels in a folkloric style.

The aim of this study is to identify Yazidi images and folkloric elements in Wezîrê Eşo's novels. Before the identification of the Ezidi images, some information on the religion of Ezidism and folklore is given. After that, the author's life and works are briefly written.

Key Words:*Yezidi Signs, Folkloric İtems, Wezîrê Eşo, Caucasia.*

هەواڵنامەی کتێب

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

JÎYANA ZOZNÎYÊ Lİ COLEMÊRGÊ

Haci Tansu
Zanîngeha Colemêrgê/ Turkîya

PUXTE:

Armanca vê lêkolînê ew e ku rewşa çandî û folklorîk ya jiyana nîvkoçerî ya Kurdên Colemêrgê ku li çîya û zozanên bilind ên erdnîgariya Kurdan da, beşeke girîng a wê bi zozanêt bilind nîşan biden. Jiyana çandî û folklorî ya gelê Colemêrgê ku di dîrokê de bi xwezayê re girêdayî jiyana xwe, di nava sînorên ku bi çiyayên bilind, asteng û geliyên kûr û dijwar hatine diyarkirin de. Jî pêşketina xwe ya bêhempa nîşan daye. Ji ber ku gelên ku li herêmeke erdnîgarî ya çiyayî û asê dijiyan, nikarîbûn bi civakên li herêmên din re zêde jiyanê parve bikin. Di heman demê de avahiya xwe ya hünere, çandê û jiyana folklorîk jî di çarçoveya nirxên civaka xwe da ava kirîne. Çawa ku di jiyana niştecihbûyî de ew jîyana girîng dumandîye, ev hêmanên çandî jî di jiyana jiyana nîvkoçerî de zindî hatine parastin û heta îro jî berdewam kirine. Ji bo ku jiyaneke wiha bêhempa û çanda ku diafirîne tune bibin, em xebatên xwe yên qadê bi taybetî li çiyayên Colemêrgê bi dîmen û bi nivîskî tomar dikin. Bi vî awayî, di encama lêkolînên me yên meydanî de, jiyana zomehîyan a kurdên Colemêrgê û hêmanên folklorîk ên ku tê de hene, wê derbêxine holê. Di dema xebatê de em rastî zehmetiyên zozanîyê, li herêmên çiyayî yên ku em rastî her cure zehmetiyên erdnîgarî hatin. Em bi gelê xwe yê li zozanên bilind ên li herêma Colemêrgê dijîn re hatin cem hev û bi veguherîna li herêmê re hevdîtin pêk anîn. Ji bo ku em hemû hûrgiliyên jiyana zozanêt çîyayêt bilind ji dest nedin me bi şev li her zozanê xebatêt xwe domandin. Bi taybetî li herêmên ku piraniya xelkê lê diçin, li ser jîyanên folklorîk ên ku di jiyana kesên veguhêz de cih digirin û bi çûna zozanên Berçelan, Deşta Mergan, Feraşîn, Balaa, Deşta Nebirnav, Qirnêse, Golan, Mêrgezer, Mendênî re dibin çand, lêkolîn hatine kirin. Ji bu vê xebatê, em hemu demên cuda yên salê de zozanan di geriyan me lêkolin kir. Di xebat û lêkolînên zozanîyê de, bi balkişandina li ser hemû hûrguliyên jiyana çandî, ku ser naverok û hesasiyeta jiyan û çandê de bal hat kişandin. Di lêkolînên xwe de me dît ku di çanda gelerî de gelek taybetmendî û taybetmendîyên xwe yên herî grîng hene û em fam dikin ku ev taybetmendî dogmatîk in. Di encama vê yekê de em bi zelalî dibînin ku Colemêrg ku li herêma herî bilind, herî çiyayî û bedew a erdnîgariya Kurdistanê ye, bi pêkhateya erdnîgarî, bi çanda xwe ya bêhempa, bi jiyana folklorî û bi kesayetiyên xwe yên edebî xwedî cihekî girîng e. Li erdnîgariya bi çiya û zozanêt bilind, şert û mercên jiyana nîvkoçerî jî bû sedema pêkhatina çandekê di nava xwe de ye. Li herêmên ku sewalkarî lê zêde, kesên ku zivistanan li bajar, bajarok û gundan dijîn, havînan koçî herêmên bilind û zozanan dikin û li wir wek zozan tên bikaranîn. Welatiyên ku salê nêzî pênc mehên xwe li zozanan derbas dikin, ji bilî jiyana bilindahîyan weke jiyana rûniştî, dawet, nîşan, sersaxiyê û rojên xwe yên taybet pêk tînin. Di jiyana zozanî da, beşek ji jiyana folklorîk û çend roj û hefteyên girîng hene ku bûne parçeyek çandê. Her yek ji van rojan weke

Zakho Centre
for Kurdish Studies

coşekê tê pîrozkirin. Mînakên van rojên ku wek rîtuelan ten pîrozkırın Berxbir û Berx Şûne. Di kar û jiyana rojane ya jinan de Pez dutin /bêrîvanî weke ayîneke asayî, lê çandî ya rojane tê kirin. Pez dutin li Colemêrg û zozan wê bi zibare û hevkariyê tê kirin. Zarokên ku li bajêr bi topê dilîzin, zozanan bi daran di destên xwe de bi wek topê ya bi navê "Gok" a ji hiriya pez a li zozanên bilind hatiye çêkirin, li topê dilîzin. An jî, du tîmên ji hev cihê çêdikin û bi sê-çar tîmên hevdu bi daran ducar di destên xwe de davêjin ser pişta keran û dihêlin tîma dijber derbas bibe. Ev lîstik jî nîşan dide ku her zarokek çiqas siwarekî baş e, bi çi qas jêhatî daran diavêjin destên xwe û her yek ji wan lîstikvanek baş e. Di heman demê de lîstikên wek Kêl û Vêlanê lîstikên zarok, jin û mêran bi hev re têne leyîstin. Em ê li jêr bi berfirehî li ser rengîniya hêmanên çandê û jiyana jinan a di veguheztinê de û lîstikên zarokan de hûrgulî bidin. Di encamê de, di vê lêkolînê de hewl hat dayîn ku aliyên çandî û folklorî yên jiyana nîvkoçerî ya Kurdên Colemêrgê û bi taybetî jî beşên vê jiyana li zozanan bên eşkerekirin.

Peyvên Serekî: *Colemêrg, Deşt, Jiyana Civakî. Gelzanî.*

Çand, renge, zimane, exlaqe, jiyane û armanca hebûna mirovan e. Mijarên jiyana civakan ji aliyê çandê ve tên avakirin. Civakên xwedî çandên dewlemend di her warê jiyanê de cûdahiyekê çêdikin. Kurd jî xwediyê çandeke wisa pirreng û dewlemend in ku di her aliyê jiyanê de xwe di nav damarên civakê de dide hîskirin. Li erdnîgariyên ku mirov lê dijîn çand, huner û jiyan jî bi vî rengî tê avakirin. Li gel avahiya wî ya fizîkî, cîhana hestî, tendurustiya derûnî, pêşketina çandî û hêmanên jiyanî jî bi vî rengî pêş dikeve. Colemêrg, herêmeke bi çiyayên bilind, geliyên kûr, zinar û berojên asê, cemedên bi milyonan salî, çemên mezin, robar û deştên bilind ên bi ava paqij û geş, di dîrokê de bûye yek ji navendên jiyana nîvkoçerîyê. Jîyana nîvkoçerîyêda ya herî girîng ewe ku cıvakjiyana kominale. Hemi demen jîyanê û xebatê xwe yêt rojane jî wek zibare çêdiken. Lê belê alîkariya civakî di civakên biçûk de û bi taybetî jî li herêmên ku şert û mercên xwezayî lê dijwar de cihekî girîng digire. Gelên ku beşeke girîng a jiyana xwe li çiyayên bilind ên Colemêrgê dijîn, jiyana komunal jî kirine çand. Ya herî mezin dawet, eyîd û çalakiyên çandî yên ku cihê xwe di civakê de winda nekiri ne. Aliyekî din jî, karê nîvkoçeriyê da avakirina Zoman jî wek zibarekê têtê çêkirin. Ji ber vê sedemê di jiyana

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەكولینێن كوردی

kurdên herêma Colemêrgê de nîvkoçerî cihekî girîng digire. Di jiyana komînal de têkiliyên mirovan û diyardeya alîkariya civakê dibe parçeyek ji çandê. Li erdnîgariyeke bi şert û mercên zehmet ên erdnîgarî, deştên çiyayî û bilind, şert û mercên jiyana mirovên nîvkoçer jî di nava xwe de dibe sedemekê pêkhatina çandekê kûr û binecih. Li herêmên Colemêrgê yên ku sewalkarî lê zêde, gel zivistanê li bajar, bajarok û gundan dijîn, mehêt havînan di çine herêmên bilind û zozanan jîyana xwe wan bilindahîyêt çîyayên Colemêrgê di borînin. Welatiyên ku salê nêzî pênc mehan li zozanan derbas dikin, wekî bajar, bajaruk û gundan da jiyana xwe ya folklorik, rojêt teybet dawet, nişan, sersaxiyê û rojên xwe yên girîn jî li zozanêt derdorên çîyayên bilind jî li jiyana zomehî da pêk tînin. Ji ber vê sedemê, li zozanên ku jîngeha mirovên lê bijîn, li gorî hin planan niştecîh têne saz kirin.

Zoma Qirnêse

Cihê ku zozan lê bê avakirin ji berê ve tê diyarkirin. Cihê zozanan li gorî hewcedariyên gel û ajalên ku dê têr bikin tê biryarkirin û rewşa erdnîgariya herêmê ku dê çadir lê bên vedan jiyan berdewam bike. Bê guman, veguherînên demsalî jî têne hesibandin. Cihê ku wê zozan bihên avakirin bi giştî qûntarên başûr an rojhilat e. Di hin pêwîstiyan de, bicîhkirin dikare li gorî rêça rojavabûnê were çêkirin. Lê heta ku şert û mercên awarte nebin, li quntarên bakur ku em jê re dibêjin "nizar" zozan çênabin. Lêbelê, zoznîyêt şeve zû di radizên, serê sibê zû şiyar dibin û tîrêjên yekem ên rojê dixebitin. Ev rewş husa dike ku tîrêjên rojê yên ewil li hundirê konan dikevin û sarbûna hewaya hênik a li zozanê ji hundirê kon derdikeve. Ji ber vê sedemê jî qaîdeyek heye ku li ber rojê kon bên vedan. Her wiha divê li herêma ku zozan lê bê avakirin, av û debar têra gel û pezên ku dê têr bikin hebe. Rewşa veguheztina zoman, ber bi zozanêt dî û gundan bajarên din ên herêmê jî li ber çavan tê girtin. Dema ku şert û mercên avakirina zozanan pêk hatin, gel bi hev re ji jiyana rûniştî, ber bi koça zozanan dikin. Gelê ku herî kêm pênc mehên salê wê li zozanan derbas bikin, beriya koçberiyê amadekariyên binecih dikin. Kon tên raçandin, xalîçeyên û berikên ku dê ji bo zomê biçin cuda têne danîn, doşekên nivînan, dergûşên zarokan heke hebin û cil tên amadekirin. Ji bilî kelûpelên milbexê yên ku di zomê de têne bikar anîn, destar, meşk, dezgahê berikan, jen, teşî, ji bo tevin çekirine amîretêt tevni û hilberînê yên ku berdest kêm nakin. Ji ber ku her yek ji van amîretan amûreke bêdawî ya jiyana zozanane; Piştî ku hemû

Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ فەکولینێن کوردی

amadekarî qediyan, zomeyî hemû diçin zomê. Li vir pêdiviya jiyana komînal derdikeve holê. Hema bêje kes bi tena serê xwe konê xwe navedet. Bi vî awayî hemû kon bi rêk û pêk hewre tene vedan. Dema ku mêrên zomê bi dorê hewl didin ku konan vekin, jin karê danîn, bi rêkûpêkkirin û çêkirina parçeyên di hundirê konan de dikin. Her çiqas vekirina konan di rojekê de biqede jî, çêkirina hundirê konan çend rojan digire. Di demên kevnare de, li her malê konên reş/reşmal ên mezin ku em jê re dibêjin "kon" ji mûyê bizinê hatine çêkirin vedidan. Hundirê van konan bi dabeşkirina cudahî dihat bikaranîn. Niha bi giştî her malek du çadiran vediden yan jî çadireke mezin tê danîn û nîveka vî çadirî bi mêrzekan hatiye dabeşkirin. Niha jî şûna konên reş ên kevn de konên ji pate û qumaşên mîna wan hatine çêkirin hatine danîn.

Zoma Qirnêse

Dema me li ser vê pirsê pirsî, gotin ku konên heyî di warê bikaranîn, berhevkirin û veguhestinê de ji yên berê hêsantir in. Malbatên ku du konên cuda vedane, konekî ji bo karê rojane, rûniştin, xwaringeh û milbexê, konê duyemîn jî bi piranî weke cihê civînên êvarê, mazûvaniya mêvanan û razanê tê bikaranîn. Colemêrgê de çawa ku bajêran ji bo mêvanan qada teybet tê avakirin, zozanan jî konê mêvanan cüda tê danîn. Li gel rûniştina zozanê xebatên din ên hemwext jî tên kirin. Karên malê, dutına pez, hilberîna penîr, mast, nîvişk û şolên dî devam dike. Mijûlahîya rojê, xebat û şolêt zor zehmet westîyaneke giran têxîte ser mirovan. Piştî we westîyanê êvaran zelamêt zomê konekê berhevdibin. Ser pelêt tenûrê çayê têtê çêkirin û gûz, hingivîn û kêfa çayê sohbetên kûr tên kirin; Niha li zozanêt bilind, li çiyayan û li qiraxên zozanan jiyan bi xwezayê ve girêdayî berdewam dike. Zilam her êvar di çadirekê de kom dibin, lîstikên curbecur dilîzin, çîrokan vedibêjin û bi beşdarbûna zarokan a lîstikan kêfa xwe dikin. Dema ku jinên zomê tenûrê li derve li qadeke hevpar çêdikin û li wir bi hevre nan lê dipêjin, di hundirê her konê de tenûrên piçûktir tên çêkirin. Ev tenûr çandeke bingehîye û qadeke ku aliyê bedew ê jiyanê di afirîne. Di kon de tenûra ji aliyê jinên malê ve danê êvarê tê vêxistin. Xwarin hem di wê tenûrê de, hem jî di ser kuçkêt kevirî li ber konan hatine çêkirin, têne pijartin. Lê tenûra di kon de jî wek cureyekî sobeyê ye. Piştî ku agirê tenûran vemirî û şewat bibe êgir, pêwîst e hundirê kon were germkirin, çay were çêkirin û ji bo danê êvarê were amadekirin. Piştî ku tenûra nava kon vemirî,

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی

agirê wê bîne pel wê gavê kûrsîyê danene ser tenûrê. Kûrsi Ji sohbetên girîng ên jiyana zomê, biryarên hevpar ên têne girtin, dawet, xêr û şerên ku bên kirin, daxwaza keçekê, diyarkirina dema dawetê, bikaranîna qadên zomê, tiştên ku di dema xwe de bên tayînkirin li runiştina derdorêt kûrsîye têne ziman û biryar didin. Ew cihê ku dorêt kûrsîyê tê runiştin, rojên taybetî, serdanên li zozanêt nêzîk û hewildan û tekilîyên bên kirin ser vê sohbeta kûrsiyê têne ziman û ev sohbetene hewayek germ û dostane tê afirandin ku her tiştê ku tê axaftin tê de biryar tê girtin. Me jî xwest cihê Kursiyê di nava malê de bibînin. Li ser tenûrê di kon de maseya darîn a bi navê Kursî tê danîn. Ev kûrsi xwedî lingên kurte. Li ser masê berik û betanî danîne. Dema ku agir û plêt tenûrê hêdî hêdî wemirin, her kes, bi taybetî jî zarok, li dora vê gotarê dicivin. Niştecihên malbatê li derdorêt tenûrê rûniştine û lingên xwe di hundirê tenûrê de daliqînin, ser çokêt xwe berikêt ser kûrsiyê ratêxin. Di vê rewşê de, germa ji tenûrê dest pê dike laş germ dike. Bê guman, ji bilî çaya germ, gûz û hingiv, axaftinên kûr yek ji aliyên herî balkêş ên jiyana zozanan xweş dike. Di hewaya hênik, carinan jî sar û bilind de, zarokên ku bi germahiya kursiyê germ dibin, di nav nivînên xwe de têne hiştin, herikîna jiyanê bi ronahiya serê sibê ji nû ve dest pê dike. Niha jîyana zozanan bi parvekirina giran a ked û karên wan yên zor zehmetve ên çandî jî didome. Bi taybetî jî bandora jinê ya di vê xalê de bingehek rast û mijara sereke pêk tîne. Li vê erdnîgariyê gotina “Jin Rojê Didin” derket holê. Jin berî hilatina rojê radibin. Di dema xebata û lêkolîna xwe ya zozanan de, dema em serê sibê zû ji xew radibin li ser zozanê Berçelanê ku em sê şevan lê diman, em dibin şahid ku jinên zozanan bi hev re nan li tenûrê dipêjin. Bi berbanga sibê re, bêhna nanê ku di tenûrê de tê pijandin, bi kêf bû. Ji bo malbatên ku dê sibê zû ji xew şiyar bibin, ji bo taştê xwarin û vexwarina wan a şîr û çayê tê kelandin. Bi penîr, mast û rûnê ku ji roja berê çêkirine û herwiha bi Soxetan (mastê pîvaz, giya û rûn) ku taybetiya Colemêrgiyan e taştêyeke xweş a zomê tê amadekirin. Bi vî awayî bezîna xebata rojane ya jinan dest pê dike. Helbet di jiyana jinên zozanan, Bêrîvanî û dutina pez jî rojane ye, lê ew jî dîmeneke çandî ye. Pez dutin li Colemêrg û zozanên wê bi ferman û hevkariyê tê kirin.

Zozana Berçelan

Pez dotin li gorî demsalê rojê carekê an du danan tê kirin. Pêş amadekirina jinan li cih û demên ku rojê du caran pez bête dutin zûtir dest pê dike. Piştî taştê, ji xeynî amedekariyên firavînê, amadekariyên dutinê tê kirin. Satil, gozik, meşk, zerîk û

Zakho Centre
for Kurdish Studies

amanêt ku ji bo şîri bên bikaranîn tên amadekirin. Jin li bêrê benda hatina keriyên pezi di mînin. Pezên ku ji çiyan tên û bi şev ji aliyê şivanan ve diçêre, tînin herêma ku jê re dibêjin bêre. Qada bêrê ji berê ve hatiye amadekirin û cihê ku her Bêrîvanekê lê rûdinê hatiye diyarkirin û cihê Ser Berî jî bi awayekî ku wek kursiyê desthilatdariyê hatiye rêzkirin. Serê Berî (rêveberiya berîvanîyê) bi gelemperî ser şivan e. Amadekirina qada bêrê jî bi awayekî ku rehetiya jin û şivanên ku dê bixebitin tê kirin. Temen kerêt keviran yêt mezin bi qasî du metreyan li hember hev têne danandin, qada navîn vala dihêle. Bi navbeyna bêrîvanan nîv metre di navberê de li kêleka hev hatiye rêzkirin. Li Serê Bêriyê, dema ku bi şiklê ovalî hatibû avakirin, ji perçeyên kevirên mezintir û berekî mezin ku pişta xwe pê ve paldetê, cîhê rûniştinê tê amadekirin. Cihê kû bêrîvan û ser bêrî lê di runên mînderk, mêzerk, berikan ve têne rawêxistin. Li vê avayî êdî cihê bêrîvan û ser bêrîyan amadeye. Nav bêrîye usulek heye ew jî tu bêrî cihê bêrîya din nadirune. Dema ku jin cihê xwe di cîh de digirin, mêr jî ji bo ku pez bikeve herêmê û bi cih bibin. Ser bêrî mîna dîrektîfa orkestrayê gazî pez dike ku pez bihête dutinê. Pêşxistina zimanekî ku di navbera şivan û pez de têkilî çêbike, pezên ku her emrê şivanan pêk tînin, ew qas bi vê bûyera rotîn aşibin ku li ser bangawaziyê ber bi bêrîyê ve diçin. Dema dutina pez dest pê dike, pez ji qada fireh tînin qada teng a ku berîvan lê rûniştî. Sere şivan an jî ser bêrî her pezê ku tê nas dike, bi stûyê pez digire û dide xwediyê wê, yê ku dê bidoşe. Dema ku pez dutin dest pêdike, her mî an bizin bi rêzê da tê. Bi vî awayî ev çerx bi qasî sê saetan digire. Dema ku berê şîrê pezê di nav meşk/çerm de dihate kirin, niha gozikên plastîk li şûna cil û bergan hatine girtin û şîr tê dagirtin û piştî şîrdanê dibin konan. Gava ku kerîyê peki tête bêrê, her kerek pez nêzîkî hezar peze.

Zozana Berçelan

Ya girîn ewe ku ser bêrî û berîvan pezî hemiyan dinasin. Ser bêrî serê mihê digirît û di gehînite destê bêrîvanê. Ev mijare hem rengvedaneke jîyanêye, hem jî buye mijara çandê û keltûreke nav miletî. Lê belê ez dixwazim diyar bikim ku di dema berîyê de ya pêwîst û yên herî zêde jî dimeşin zarok in. Ji ber ku zarok di dema berê de lîstikên curbecur dilîzin, di heman demê de pez an bizinên ku ji ber bêrê reviyane digrin û dîsa tînin nav bêrê. Di dema bêrê da bizin bi gelemperî ji nav bêrê direvin. Paşê ew li ser zarokan e. Zarokên ku bizin an jî miyên ku ji dutinê reviyan digrin û tînin nav keriyê pez.

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Zarok vê rewşê wek leyîzekê tinine cih. Dema ku beşeke girîng a jiyanê li zozanan bi rengê komînê tê jiyandin, mînaka vê ya herî cüda jî bi ber bêrê pez dutine. Jin, mêr û zarok hemû bi hev re mîna ku li gorî rêgezên ji berê diyarkirî û dabeşkirina kar tevdigerin û bi pêkanîna rîtuelek rasteqîn bi dawî dibin. Bêrî yek ji nîşaneya herî girîng e ku xebatên bi rêbaza jiyana hevpar a kolektîf bi lez û bez bi encam dibin. Piştî bêrê, şîrê ku di konan de tê kirin, di destên jin ên jêhatî de tê hiştin û dibe berhemên weke penîr, jajî, mast û rûn. Ji aliyekê ve şîrê ku ji berê ve hatiye parzûnkirin di mencelokên mezin ên li ser kuçkan tên kelandin, li aliyê din jî pancar û giyayên curbecur ên ku ji çiyayan hatine berhevkirin tên kelandin ji bo nav penîr têne amadekirin.

Zozana Berçelan

Giyayên ku bi awayekî xwezayî li çiya û geliyan şîn dibin di çanda zozanîyêt Colemêrgê de cihekî girîng digirin. Helbet ev giya di jiyana rojane de hem di xwarinên cûrbecûr de, hem jî di penîr, lor û jajî de têne bikar anîn. Li bajar û gundên derdora Colemêrgê û li herêmên din ên ku Kurd lê dijîn, gîyayê ku em dibêjinê sîrik ji bo nav penîr da zede tê emelkirin. Ev giya ji ber ku bêhneke tûj heye ji aliyê welatiyên Colemêrgê ve nayê emelkirin. Giyayên xweştir û bi qîmettir ên ku li çiyayan çêdibin tên berhevkirin. Mînak, giyayê Mendê ku herî zêde li zozanêt Mergan û Bala yên li qûntara Çiyayê Cîlo yê Colemêrgê tê dîtin. Mendê ku li qûntarên cemedên çiyayê Cîlo şîn dibe û bi helîna avên cemedê tê xwarin û riwekên curbecur ên ku di xwarinê de tên bikaranîn. Yek ji wan giyayeke herî xweş û bi qîmet e. Giyayên ku li van zozanan tên komkirin ji bo di penîrên ku bêne çêkirin û bi kelandinê tên bikaranîn. Yek ji giyayên girîng ên ku kurdên Colemêrgê bikar tînin Siyabo ye. Li aliyê din nebata Siyabo li Helêl, Gova Sade, Feraşîn, Berçelan, Kanî Mehanan û zozanêt bilind bi vî rengî di çêkirina penîr de pir tê bikaranîn. Helbet nebatên ku li van çiyayan şîn dibin û di çêkirina penîr de tên bikaranîn tenê bi Siyabo û Mendê nînin. Giyayên curbecur ên wekî siyabo, mende, suwe, kewzan, birîndar, heliz, catre jî ji aliyê gelê Colemêrgê ve tên bikaranîn. Ev nebatên ku me behs kirin jî di xwarinên cûrbecûr de têne bikar anîn. Hinek tên tirşkirin û wek xwarina zivistanê tên bikaranîn; Piştî ku giyayên ku li penîrê bên zêdekirin tên amadekirin, bi şîrê ku niha sar bûye re tê hev. Bi vî awayî dem hatiye ku bibe penîrê ku bi pirbûna çiyayên Colemêrgê hatî çêkirin. Yek ji berhemên herî bi qîmet ên zozana yek jî rûnê nîvişke. Ji bo

